

# HAWAR

2

Hejmar 24-57  
(1934-1943)

[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)

NÛDEM









# **HAWAR**

**Cild 2**

**Hejmar 24 -57**

**(1934-1943)**

[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)

**NÛDEM**

Weşanên NÛDEM 34  
HAWAR  
Stockholm: 1998

© Weşanên NÛDEM  
Amadekar: F. Cewerî  
Pergala bergê û rûpelan NÛDEM  
ISBN: 91 88592-34 0

Box 177  
177 23 Järfälla-Sweden  
Tel û Fax: 8-583 564 68  
8-580 131 62

# NAVEROK

## HEJMAR (24) ..... 627

Kurd û Kurdistan	Herekol Azîzan
Yewnanîstan	Dr. K. A. Bedir-Xan
Mijde	Lawik Pijderî
Çûk û Fil	M. E. Botî
Kaxeza Eşkere	Xwediyê Hawarê
Delalê Beriyê	Stranvan
Çarînên Xeyam	Dr. K. A. Bedir-Xan
Pendname	Cegerxwîn
Dêrik	Newzad
Straninên Botan	Str. Jêliyan
Tu çire?	Remoyê Qenco
Xeyamwarî	M. E. Botî

### BIRÊ FRENZÎ

Le Beau de la Steppe	Dr. A. Bedir-Xan
Chansons de Botan	Pirs. Kurdan

## HEJMAR (25) ..... 647

Lavij	C. A. Bedir-Xan
Şêx Evdîrehman	» » »
Çarînên Xeyam	Dr. K. A. Bedir-Xan
Şîn	B. Ferîdûn
Ez û Dilber	Cegerxwîn
Bêriya Botan	Herekol Azîzan

### BIRÊ FRENZÎ

Le Beau de le Steppe	D. A. Bedir-Xan
De la grammaire kurde	» » »
Lavij	» » »

## HEJMAR (26) ..... 683

Mame-Yare	Tewfîq Wehbî
Were dotmam	C. A. Bedir-Xan
Ehmedê Zeydan	Xwediyê Hawarê

Xorto  
Koçera Mîran  
Zerdeşt  
Welatê Min  
Zozanên Bêli  
Çarînên Xeyam  
Xanim  
Dil ji min bir

BIRÊ FRENSIZÎ  
Le soleil noir  
La grammaire kurde

Hawar  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Cegerxwîn  
Lawût  
» »  
Melayê Cizerî  
Melayê Cizerî

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Dr. A. Bedir-Xan

**HEJMAR (27) ..... 683**

Tefsîra Quranê  
Hedîsên Pêxember  
Sê tarîxên Hawarê  
Dongiya Çeqel  
Derdên Cegerxwîn  
Kebanî û Mamoste  
Marşa Xortan  
Çiyayê Sasonê  
Gelawêj  
Loriya Şehîdan  
Xurşîd  
Gramêra kurdmanci  
Weşînekên Kurdî  
Ferhengok  
Loriya Fatê

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Xwediyê Hawarê  
Osman Sebrî  
Cegerxwîn  
Rewşen Bedir-Xan  
Osman Sebrî  
Osman Sebrî  
Hawar  
Mamosteyê gerok  
Nûredîn Ûsif  
C. A. Bedir-Xan  
Hawar  
Ferhengvan  
Herekol Ezîzan

BIRÊ FRENSIZÎ  
La réapparition  
La berceuse de Fatê  
Memê Alan

La rédaction de Hawar  
R. Lescot  
D. A. Bedir-Xan

**HEJMAR (28) ..... 703**

Tefsîra Quranê  
Hedîsên Pêxember  
Tarîxa Kurdistanê  
Welatê Tirîvirya  
Şivan û beran

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Osman Sebrî  
Osman Sebrî  
Çiyayê Agirî



Em arî ne  
Bi yek bin  
Strana mirinê  
Marşa rêçenasan  
Gramêra kurdmançî  
Kurd û kurdmanç  
Jin û bextiyarî  
Ferhengok  
Pehîzok  
Paşlavjok

Cegerxwîn  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Mamosteyê gerok  
Cegerxwîn  
C. A. Bedir-Xan  
Hişyar  
Rewşen Bedir-Xan  
Ferhengvan  
Stranvan  
Stranvan

BIRÊ FRENSIZÎ  
Chants d'automne  
Memê Alan

R. Lescot  
D. A. Bedir-Xan

**HEJMAR (29) ..... 723**

Tefsîra Quranê  
Lavijên Mîr Miheme  
Derketî  
Tarîxa Kurd û Kurdistanê  
Dilawerê Çardesalî  
Roviyê Jîr  
Gulê  
Ala Rengîn  
Kî bi ya min dike  
Stûna Xwendevanan  
Dilovanî û Dilgirsî  
Xwîn nabe av  
Hedîsên Cenabê Pêxember  
Gramêra Kurdmançî

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Herekol Azîzan  
Nûredîn Ûsîf  
Osman Sebrî  
Sibhî Resûl  
Osman Sebrî  
Nûredîn Ûsîf  
Cegerxwîn  
Cegerxwîn  
Hawar  
Fiad Cemîl Paşa  
N. Q.  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
C. A. Bedir-Xan

BIRÊ FRENSIZÎ  
Légende de Mîr Mohâmmed

R. Lescot

**HEJMAR (30) ..... 743**

Tefsîra Quranê  
Hedîsên Cenabê Pêxember  
Keskesor  
Diljaniya Haco Axa  
Derdê milletê me  
Divê em bibin yek

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Nûredîn Ûsîf  
Ehmed Namî  
Bedrî Cemîl Paşa  
Cegerxwîn

Kulilkên Kurdistanê  
Rewşa dinyayê  
Tarîxa Kurd û Kurdistanê  
Bi xwehên Guhderz re  
Kurd yek in  
Jîna mîlet  
Ji xortan re  
Rabûn û rûniştin  
Ferhengok  
Gramêra Kurdmancî

Telet Qedûr  
Nêrevan  
Osman Sebrî  
Rasteder  
Derketikî Dêrsimî  
Masûmê Hamidî  
Nûredîn Êsif  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Ferhengvan  
C. A. Bedir-Xan

**HEJMAR (31) ..... 763**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Mirina Gurî	C. A. Bedir-Xan
Dîk û Rovî	Osman Sebrî
Behramê Gor	Cegerxwîn
Navên Kurdmancî	Bavê Cemşîd
Dinya Tarî	M. Ehmed Botî
Delaliya delalan	Seydayê gerok
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Diljariyek	Heşyar
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan
Paizok	Stranvan

BIRÊ FRENSIZÎ

Chant d'automne

.....

**HEJMAR (32) ..... 783**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Kardûx û welatê kardûxan	Herekol Azîzan
Miletê Bêserî	Qedri Cemîl Paşa
Agahiyek	Hişyar
Dermanê Nezanîyê	Sibhiyê Diyarbekirî
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Şîretên Ehmedê Xanî	Nûredîn Êsif
Bilûra min	Seydayê Gerok
Hindik Rindik	Xeberguhêz

**HEJMAR (33) ..... 803**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Du salên şer	Hawar
Stêrk	Nûredîn Ûsif
Klasikên me	Herekol Azizan
Xebata Hawarê	Hişyar
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan

**HEJMAR (34) ..... 823**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Eşîra Jêliyan	Herekol Azizan
Welat	Sibhiyê Diyarbekirî
Cenga Canî	M. E. Botî
Edebiyata Kurdî	Refîq Hilmî
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Radyowên Kurdî	Hawar
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan

**HEJMAR (35) ..... 843**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Dîwana Melê	Qedrî Cemil Paşa
Melik û Koçer	Dilistan
Lênîngrad	Smaînê Serhedî
Perîşanî	Nûredîn Ûsif
Sond	Qedrîcan
Kurdên Ecemîstanê	Herekol Azizan
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan

BIRÊ FRENŞÎ  
Melayê Djezirî

Tawûsparêz

**HEJMAR (36) ..... 863**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Dîwana Melê	Qedrî Cemil Paşa
Kevirê Mûsyê Ehmed	Rastedar

Halan  
Rewşa dinyayê  
Vîborg  
Agirî  
Mosko  
Sînema  
Lêhîstika Şetrencê

Hişyar  
Nêrevan  
Hesenê Mistê  
Osman Sebrî  
Dilawer Çarpîne  
Evdirehmanê Rojki  
Stranvanê Hawarê

**BIRÊ FRENZÎ \* PARTIE FRANÇAISE**

La partie d'échecs

Tawûsparêz

**HEJMAR (37) ..... 883**

Tefsîra Quranê  
Hedîsên Cenabê Pêxember  
Dîwana Melê  
Hevîna Pêrixanê  
Kurdistana bakur  
Gramêra Kurdmancî  
Zêrê Ewropayê  
Di Etlantikê de  
Şer  
Rewşa dinyayê  
Şahîno

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Qedrî Cemîl Paşa  
Nûredîn Ûsif  
Hişyar  
C. A. Bedir-Xan  
Cemilê Tacdo  
Evdirehmanê Rojki  
Smaînê Serhedî  
Nêrevan  
Stranvan

**HEJMAR (38) ..... 903**

Tefsîra Quranê  
Zerdeşt  
Dîwana Melê  
Emêrike  
Noqar  
Tiştên Pesifikê  
Hedîsên Cenabê Pêxember  
Mosko  
Ez zêde dikim  
Rewşa dinyayê

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Seydayê Gerok  
Qedrî Cemîl Paşa  
Smaînê Serhedî  
Cemilê Tacdo  
Evdirehmanê Rojki  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Hesenê Mistê  
Şêx Abid  
Nêrevan

**BIRÊ FRENZÎ \* PARTIE FRANÇAISE**

Kharabo

Tawûsparêz

**HEJMAR (39) ..... 923**

Tefsîra Quranê

Dr. K. A. Bedir-Xan



Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Dîwana Melê	Qedrî Cemîl Paşa
Hêviya me	Salih Bamernî
Sengepor	Hesenê Mistê
Hindik Rindik	Xeberguhêz
Guneh	Qedrican
Çiyayên Silivan	Mihemed Cemîl Paşa
Serxwebûna mûriyan	Cegerxwîn
Rewşa dinyayê	Nêrevan

**HEJMAR (40) ..... 939**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Zilamek û Zimanek	Herekol Azîzan
Nivîsevan	Cemîlê Tacdo
Dîwana Melê	Qedrî Cemîl Paşa
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan

**BIRÊ FRENSIZÎ**  
Bavê Emîn

Diya Ferzo

**HEJMAR (41) ..... 955**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Marş	Namî
Destbosî	Miço
Ûkranye	Xalîte Genco
Ji ezmanan	Silêmanê Ferho
Hindik Rindik	Xeberguhêz
Dîwana Melê	Qedrî Cemîl Paşa
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Rewşa dinyayê	Nêrevan

**BIRÊ FRENSIZÎ**

Chahino  
Quelques Chonsons

Tawûsparêz  
Tawûsparêz

**HEJMAR (42) ..... 971**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Awayê Evînê	Hişyar
Newrûz	Herekol Azîzan

Îşê paqij  
Rewşa dinyayê  
Gramêra Kurdmancî  
Hedîsên Cenabê Pêxember  
Dîwana Melê

Şevger  
Nêrevan  
C. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Qedri Cemil Paşa

BIRÊ FRENZÎ  
Les jeux kurdes

Tawûsparêz

**HEJMAR (43) ..... 987**

Tefsîra Quranê  
Hedîsên Cenabê Pêxember  
Hilbîna Çiran  
Veşartin  
Cebeltariq  
Biserhatiyek  
Kiryariya Hawarê  
Dîwana Melê  
Rewşa dinyayê  
Gramêra Kurdmancî

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
M. E. Botî  
Hesenê Mistê  
Silêmanê Ferho  
Xelilê Genco  
Xwediyê Hawarê  
Qedri Cemil Paşa  
Nêrevan  
C. A. Bedir-Xan

**HEJMAR (44) ..... 1003**

Tefsîra Quranê  
Hedîsên Cenabê Pêxember  
Reşbelek  
Xatûn an Piling  
Dîwana Melê  
Kumandos  
Rewşa dinyayê  
Gramêra Kurdmancî

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan  
Bavê Cemşid  
Nûredîn Ûsif  
Qedri Cemil Paşa  
Silêmanê Ferho  
Nêrevan  
C. A. Bedir-Xan

**HEJMAR (45) ..... 1019**

Tefsîra Quranê  
Segê Jar  
Dîwana Melê  
Bîr û bêrî  
Çiyayê Cûdî  
Memozîn  
Sikalay  
Masîvan  
Rewşa dinyayê

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Şêx Abid  
Qedri Cemil Paşa  
M. E. Botî  
M. E. Botî  
Ehmedê Xanî  
Bengîne  
Cemilê Tacdo  
Nêrevan

Gramêra kurdmançî  
Hedîsên Cenabê Pêxember

C. A. Bedir-Xan  
Dr. K. A. Bedir-Xan

BIRÊ FRENSIZÎ  
Proverbes

Tawûsparêz

**HEJMAR (46) ..... 1035**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir Xan
Casûs	Silêmanê Ferho
Dîwana Melê	Qedrî Cemîl Paşa
Memozîna Xanî	Herekol Azîzan
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir Xan
Gramêra Kurdmançî	C. A. Bedir Xan
Proverbes	Tawûsparêz

**HEJMAR (47) ..... 1043**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir Xan
Ezmên dibarandin	Xelîlê Genco
Dîwana Melê	Qedrî Cemîl Paşa
Mehfûr	Silêmanê Ferho
Dê an Xûşk	Nûredîn Ûsif
Memozîna Xanî	Herekol Azîzan
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Ava Dîclê	M. F. Botî
Gramêra Kurdmançî	C. A. Bedir Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir Xan
Proverbes	Tawûsparêz

**HEJMAR (48) ..... 1051**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir Xan
Reşbelek	Bavê Cemşîd
Dîwana Melê	Qedrî Cemîl Paşa
Nêçîra Hirçan	Osman Sebrî
Memozîna Xanî	Herekol Azîzan
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Gramêra Kurdmançî	C. A. Bedir Xan
Gotinên şopewer	Osman Sebrî
Heyran	Stranvan
Coutumes	Tawûsparêz

**HEJMAR (49) ..... 1059**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir Xan
Memozîna Xanî	Herekol Azîzan
Civat	Reşîd kurd
Kenediyê pêşîn	Cemilê Tacdo
Telqîna Êzdiyan	Feqîrê telqîn bêj
Marşa Canbêzaran	Osman Sebrî
Lê pêşberê yarê	Osman Sebrî
Sêsalên şer	Hawar
Dîwana Melê	Qedrî Cemil Paşa
Ji Rastedar re	Şebistan
Şîhrên Zarokan	Osman Sebrî
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Medhelokên japonî	Hawar
Coutumes	Tawûsparêz

**HEJMAR (50) ..... 1071**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir Xan
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir Xan
Dîwana Melê	Qedrî Cemil Paşa
Klêopatire	Bişarê Segman
Memozîna Xanî	Herekol Azîzan
Malikeke Hafîz	Farisixwîn
Marşa Felatê	Osman Sebrî
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Piroziya Cejinê	Şêx Memdûh
Enigmes	Tawûsparêz

**HEJMAR (51) ..... 1079**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir Xan
Dîwana Melê	Qedrî Cemil Paşa
Mîr û Nêçîrvan	M. Emîn Silêman
Tiştên danezanan	Xelilê Genco
Selahedîn	Bişarê Segman
Silav li sifra hazir e	Cegerxwîn
Warê min ne î kor e	Osman Sebrî
Şûşa Dilan	Bişarê Segman
Memozîna Xanî	Herekol Azîzan
Gramêra kurdmancî	C. A. Bedir Xan
Mezin û Mezinatî	Osman Sebrî
Rewşa dinyayê	Nêrevan



**HEJMAR (52) ..... 1091**

Gawestiyayî	Qedri Cemil Paşa
Civat	Reşid Kurd
Heke Te Divêt	Şiretbêj
Keleha Şahîn	Bişarê Segman
Dîwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Pendname	Cegerxwîn
Şahê Ecem	Farisixwîn
Mirdêsan	Osman Sebrî
Gelo Dem Ji Zêr e?	Osman Sebrî
Beyta Kewê	Mela Enwer
Heyat	Hisên Emînê Perixanê
Pira Genderê	Osman Sebrî
Marşa Keyanî	Cegerxwîn
Rojên Derbasbûyî	Qedri-Can
Xanimeke Ciwan	Cegerxwîn
Roviyê Ker	Osman Sebrî
Le Mariage	Tawûsparêz

**HEJMAR (53) ..... 1107**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir Xan
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir Xan
Evîn	Osman Sebrî
Dîwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Beydaxa Kurdi	E. Şêrkoh
Memozîna Xanî	Herekol Azîzan
La vie universitaire au Kurdistan	Tawûsparêz

**HEJMAR (54) ..... 1115**

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir Xan
Dîwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Pêşkevin	Cegerxwîn
Cejinpîrozî	Osman Sebrî
Ji Wan re	Yehyayê Seyda
Sersala min	Osman Sebrî
Mela Ehmed	Selîm Hisênî
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir Xan
Memozîna Xanî	Herekol Azîzan
Pêloşî û sîstî	Hesen Hîşyar
Mela Evdîlmeçîd	Selîm Hisênî

Chansons

Tawûsparêz

**HEJMAR (55) ..... 1123**

Tefsîra Quranê  
Lwîs Pastör  
Dîwana Melê  
Daylan  
Memozîna Xanî  
Diljarê Xemgîn  
Hawar e  
Pênivîs  
Şeytanqûnî

Dr. K. A. Bedir Xan  
Herekol Azîzan  
Qedrî Cemîl Paşa  
Osman Sebrî  
Herekol Azîzan  
Ehmed Namî  
Salih Bamernî  
Mîrzangî Belbeşînî  
Osman Sebrî

**HEJMAR (56) ..... 1131**

Tefsîra Quranê  
Yûng Simpson  
Şeytanqûnî  
Dîwana Melê  
Mêşhingivî  
Keça Şî'rê  
Kitêba Totê reh  
Memozîna Xanî

Dr. K. A. Bedir -Xan  
Herekol Azîzan  
Osman Sebrî  
Qedrî Cemîl Paşa  
M. E. Botî  
Osman Sebrî  
Cemşîd  
Herekol Azîzan

**HEJMAR (57) ..... 1139**

Tefsîra Quranê  
Şeytanqûnî  
Dîwana Melê  
Gulîstan  
Memozîna Xanî  
Ya Reb  
Sefera Sicilyayê  
Hêviya Nuh  
Ez û Yar  
Çeteyên Rûsî  
Feryad  
Panama

Dr. K. A. Bedir-Xan  
Osman Sebrî  
Qedrî Cemîl Paşa  
Farisîxwîn  
Herekol Azîzan  
Cegerxwîn  
Nêrevan  
Osman Sebrî  
Cegerxwîn  
Simainê Serhedî  
M. E. Botî  
Qadirê Ferman

SAL 2  
HEJMAR 24

YEKŞEMB  
1 NÎSAN 1934

# HAWAR

ANNÉE 2  
NUMÉRO 24

DIMANCHE  
1 AVRIL 1934

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## DI VÊ HEJMARÊ DE

Kurd û Kurdistan	Herekol Azizan
Yewnanistan	Dr. K. A. Bedir-Xan
Mijde	Lawikî Pijderî
Çûk û Fîl	M. E. Botî
Kaxeza Eşkere	Xwediyê Hawarê
Delalê Bertiyê	Stranvan
Çarinên Xeyam	Dr. K. A. Bedir-Xan
Pendname	Cegerxwîn
Dêrik	Newzad
Straninen Botan	Str. Jéliyan
Tu çire?	Remoyê Qenco
Xeyamwarî	M. E. Botî

## BIRÊ FRENSIZÎ

Le Beau de la Steppe	D. A. Bêdir-Khân
Chansons de Botan	Pirs. Kurdan

ÇAPXANA MIDHIK-EL-MIBKÎ  
ŞAM—1934





## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### K—Q

Di elfabêya me de ev du herf bi hev guhêrîne: « k » ketiye şûna « q » ê, û « q » ketiye şûna « k » ê.

### KURD Û KURDISTAN

BI ÇAVÊ BIYANIYAN

— 3 —

Me jor de tixûbên welatê kurdan goti bûn. Welatê wan li bakur ji cihên bilind ko bi darên mazi û herûwê dorgirtî ne, dest pê dike û hin bi hin her bi nivro nizm dibe û digehê çolê. Li serê çiyayên wan ên biberf kani der dibin û çem û robarin diherikin, digehin medrehên birineê ko ji quntarên çiyê her bi deştê ve drêj dibin.

Di cihên bilind de çandini kêm in. Ji ber ko gava di heriyên bêdar û hej de roj her texlîl zad û çandini şin dike, digehine, serê çiyayê hêj bin herfê de ne.

Li gundên kurdan bergehêki spehî heye. Gava mirov nizingî wan dibe tof tof darên gwiz xwe şani didin. Di bin siha wan a pehn de xani veşarti ne.

Ji rexê din dora kani an keviyên robaran bi spindaran xemilandi ne. Di tu gundi de ev ne kêm in. Ji xwe ev spindarên ha di lêkirina xaniyên wan de bingehêki mezin in.

Ev dar, tîr-avexwarî û li bin rojêke geş, di zemanekî kin de digehin drêjahike welê ko mirov li wan ecêbmayî dimine. Wek zilên zeviyên ceh û genim li rex hev himbêz, bedenên wan zrav û rast, mîna nayan bilind dibin.

Li gora nizm û bilind bûna eihê avahiyyê, dîbra wan de rez, darên zeytûn, bistan û zeviyên ceh û genim hene.

Lê di gundên kurdan de, kêm tete ditin ko minareyek bi ser wan keve. Ji vaji ve gundên tirkan, ên kiçiktir ji tucar ne bêminare ne. [1]

Diwarên xaniyan bi kerpiçên ko bi heriya kakirî tete birin, lédikin; bê tu dar û dep. Li şûna penceran di jorê diwaran re qulan vedikin. Ev qulên ha bi tu tisti ne girti ne. Ji ber ko hatinditina pipok û kaxezê li wir hêj ne nas e.

Deriyê xaniyên xwe ji darê herûwê pihêt çêdikin. Di ser diwaran re bi bihustek an bi du bihustan ji hev dûr, beştinen spindaran drêj dikin, û bi mirdiyaqan neqeba beştan dadigirin û axê berdidin ser. Qederê pêki, pêyek û niv. Eve, banê xaniyên wan.

Li Havînê, kurdîmanê di ser van banan de dinivîn; û pericar ev banên ha bi diwareki çarpê bilind, dorgirti ne. Ev diwar şûna singtaldekê digirin. Xaniyên maqûlan ji di vi şikî de ne. Tenê du tayên wan hene û carinan bi mileki wan ve burceke çarparsû bilind dibe.

Belê xani bi her tiştên xwe welê hatine lêkirin ko di wextê şer û pevçûnan de bi kêrî wan bèn, ji wan re bibin sergeh û asêgeh.

Di hundirê xaniyan de ji aliyyê malê pêve mezecêke mezin tete ditin. Mezela rûniştinê û mêvanan. Li mezelê de lifîkek heye. Ji her du milên tifikê ve du dikanên nizm, lê raxisti radibin û tèn hela deri. Çend balgih li ser in. Raxera koçka maqûlan bi mehîfûran xemilandi ne. Tevayiya raxistina wan ev e. [2]

[1] Ji ber ko em kurd tucar Xwedê ji bir nakin, û ew di her derê de bi me re ye. Jû pêve kurd bêvi ko xwe bigilbinin hev û herin mizgeftê dikarin nimêja xwe bikin. Ji lewra ko em ne li xeni lê li xwediyê xeni digerin.

[2] Welê dixuye ko Marsal tenê xaniyên kefxwê û kizirau ditine. Ji ber ko herweki em dizanin xaniyên serokên eşiran bi awaki spehî raxisti ne, û bi xeml û xêz in.

Guad di nav hev de, bi şiverênen teng bi hev re girêdayî ne. Şiverênen welê ko hêstir bi xwe hê talûke tê re nikarin derbas bibin. Ev rê ji bona suwarên nehînbûyî lişteki gelek dişwar û bitirs in.

Her cih û welat di nav xwe de debara xwe pêk ditine û hewcedarî ê din nabe. Ji xwe naxwazin dan û standina wan bi xelkê dorê hebe.

Lin kirasê penbû û nivhevrişim, cawê sor û reş-xêzkirî çêdikin. Bi vi cawî şalên mêran ên fireh, û şapikên wan lên çêkirin. Jû pêve jin bi çêkirina eba, kulav û kamên wan ji mijûl dibin.

Mehfûrên xwe, ko xemla xaniyên wan a bingehî ye, an li erdê raçandî an li levnê vegirî, çêdikin. Mêr bi cotkariyê mijûl dibin, diçin ber pêz, qelûnê vedikişînin; an ne di şerî de ne.

Texminkirina nifûsa kurdan lişteki dişwar e. Lê herhal ji niv milyonî ne kêmîr in.[3]Piraniyeke wan misilman e. Di tixûbên ecem de kurdên fileh ji hene. Li Şingalê û her bi nivroyê wê ve, kurdên êzîdî rûdinin. Ji her tirkan ve êzîdî ji (.....) re diparêzin û ji lewra kirin û firotina wan re destûr heye. Filehên ermenî ko di nav wan de rûdînin û ji wan ne kêmîr in, tev de filehên ortodoks in.

Di navbera hemî kurdan de mişabeteke milî heye. Heçko demînin hev. Rengê çermê wan bi qasî wê lirkên dorê û ermenîyan ne esmer e. Kurd bi piranî bejnîbilind û bi dest û lep in. Difna wan wek tewandî ye. Lê çavên wan gelek nîzîngî hev in, û hergeheki wan welê heye ko mirov dibêje di kortikên xwe de qey dibrûskin.

Kurd di gerandina avê de gelekî şeh-raza û hinerwer in. Bêyi tu aletan, cahên avê ji kaniyên cihên bilind de rawestayî, dibin û digehînin pal û kaşan. Ji kaniyê bi saetan ve dût. Heta wê gera ko şînahî hewcedarî avê ne. Ji xwe di wan doran de, ji her texlî şînahîyan re av divêt.

Pericar palên çîyan heta bi bilindahiyeke ecêb, şehnişînwari tebeq tebeq, mîna diyarên bi serhev, ajotî û avakirî ne. Wek rezên me ên çêtir-xebitandî.

[3] Dîsan ji kurdan herçî Marşal bi xwe ditene, ne hemî kurdîstanê û tevayîya kurdan.

Belê kurd ji bona destxistîna bihustekî erdê çandbar û danîna daran holê dixebitin. Zevî û awayê gerandina avê ji bona kultûra [4] mîletê kurdan bir-haneke bes e.

Belê welat û ezmanê vi mîletî ê zelal ko bi tevayîya giyanê xwe pê girêdayî ne, holê ye.

Di sala hezar û heştêsd û sih û heştan de Hafîz paşa bi ser Çiyayê-Xerzan de girtî bû; û bi şûr û agir xelkê wî ajotî bû heta bilindeihên çiyê, deverên asê, nav fers û zîraran de.

Xelk liber disekinîn. Hetanî ko zad û qût dest bi kembûnê kirin. Hingê rispiyên wan li der konê serdarê mîzefer de xuya bûn. Jê efwa xwe dê bixwestana.

Paşê ji bona xistina vi xelkî bin destê hikûmeta xwe ji rakirina wan ji wan çiyayên asê pêve levdîreke din nizani bû. Belê dilê wan hebû wan ji cih û malên wan rakin, bibin deştê û li wê derê bi cih kin.

Paşa gelek tişt ji wan re wad dikirin. Paşa di cihêki welê de dikarî bû bi qi-ma dilê xwe comerd û destvekirî bibe.

Ji wan re digot ko, li deştê, ji her yekî wan re, ji erdê wan çeh caran hêtir erdê bîhata dayin. Dîsan sê salan, ji wan ne qemçûr ne ji wêrgû de ne hata standin. Ji mîlê din, ji wan re wêsfê dewlemendiyên deştê dida. Mîna çandîna darên tû, çêkirina hevrişim, bi xwedîkirina hespan. Li şûna ko li çiyê tûtirkan bidin hev û herin ber pêz. Lê mirov welê ji, kari bû ji masîyan daxwaz bike, ji xwe re toreke çêkin.

Rispi bi çavên zelûl li ezmen fed-kirin û tiştên ko ji wan hati bûn xwestin, pesnê wan dan, û tev xelatkirî dan rê û vejerîyan nik yên xwe. Tiştên ko seh kiri bûn, ji mirovên xwe re golin. Cih de jin û zarî rahişlîn tîfingên xwe. Kurîar ji nû ve dest pê bikirana. Her weki dest pê kirin ji. Û hetanî ko ser-

[4] Di hejmeta Heward a nuzde'm de me ji kul-tûrê re çand gotî bû û di ferhengokê de bi awayê jêrin mana kirî bû: e Ji tevayîya ilm û hiner û pişeyên spehî re çand tete gotin. Me ev pirs ji çandî-nê girt. Ji xwe di her zmanî de ji welê ye. Çand an kultûra ewrêpayî: tevayî û awayê zanîna xelkê Ewropayê ye. Eza dikarin bêjin Çanda Kurdan ji. Pê dirok, çirok, stran, dîlan, manik, medhelok û her texlî pişê, rêzik û adetên me, tene seh kirin.

xwerabi bi temami ne hatine kevandin,  
kula ne bûn. Lê hikûmetê bivênevê dev  
ji istîmara Kurdistanê berda. Ji ber ko  
bi ceribandîne têgehîştî bû ko proja  
rakirina kurdan ji çiyân û cihkirina  
wan destê nare seri.

Kurdistan seranser ji komên gundên  
jihevçihê pêkhati ye. Carinan çavê mi-  
rov di sinên çiyân, an di nav fers û  
zinarên asê de, bi burcekê dikeve.

Ev burcên ha xweserî hin began in.  
Lê beg bi xwe hergav lê de rûnanin.  
Tenê di zemanê tengî û talûkê de di  
kevin-ê; û ew ji wan re dibin asêgeh.

Ev mirekên ha, cuda cuda, di nav  
xelkê xwe de rûdinin. Destê tukesî de  
birekî welêl ê mezin nîne. Tenê di  
wextê tengî û talûkê de mirovên wek  
Begê Rewandîzê, Bedir-Xan Beg û  
Seyid Beg, birek ji xelkê xwe didin hev,  
lixin bin alên xwe û leşkerekî xurt  
ditinîz pê. Lê piştî ko talûke dibore û  
meselê şafî dibê, leşker ji hev dikeve  
û ji mezinê xwe vediqete. Ji xwe her-  
kes tenê keriyê xwe diparêzîne.

EVE QELSÎYA VÎ MILETÎ. HEKE YEK BUWANA,  
DI NAVBERA WAN DE TIFAQ HEBUWA EY MILETÊ  
HA NE DIHATE KEVANDIN Û MEËLÛB KIRIN. LÊ  
GAVA YEK DIKEVE TENGÎYÊ ÊN DÎN DI CIHÊN  
XWE DE RÛDININ, ARÎKARÎYA WÎ NAKIN. HER-  
WEKÎ GAVA REŞÎD Û HAFÎZ PASHA DAJOTIN SER  
WELATEKÎ ÊN MAYÎN LI CIHÊN XWE DIMAN,  
BI AZAHÎYEKE YEKROJÎ ŞA Û KÊFXWEŞ DIBÛN,  
HETA KO DOR DIGHA WAN JÎ.

Ber bi nivro, di beriyê de kurd gihane  
tixûbên xwe ên tebîî. Ereben ko yekcar  
vajiyê vî miletî ne, xarên wan ên paşin  
ji hev de xistine û ew sekinandine.

Herwekî şêrê ereb nikare şahîne kurd  
di bilindcihên xwe ên asê de biqefilîne,  
kurd jî welê, di beriyê de nikare wî  
bike bin destê xwe, helanî ko ji hawirê  
xwe dernekeve.

Dijminê wan ê xedartir, heke yekcar  
ji xurtiya xwe ne ketî buwan, diviya  
bû ecemên hevtixûb bibin.

Lê ji herkesî zêdetir, xwe ji paşayê  
Beşda û Diyarbekrê diparêzin. Ji lewra  
ko wî wextî, liber destê hikûmetê û di  
wan doran de, leşkerekî bi pêncî hezar  
pey-yî û karkirî hebû. (dûmahik heye)

HEREKOL AZIZAN

## ÇARÎNÊN XEYAM

Da, ji xwesdiliyê linê nav maye  
Wey hevalê gihayî, şeraba xav maye  
Destê xweşiyê, jî şerbikê şerabê mekîşîne  
Iro ko destê te de, linê piyan maye



Heya kengê gotina çar û pênc, ho meyger  
Çi yek, çi bezar; seh kirin dişwar e, ho meyger  
Em hemî, ji axê ne; kemaçe werine

[ho meyger

Em hemî ba ne, şerabê bine ho meyger



Ho çerxê! tu her, dilê min xemgîr diki  
Kirasê min, yê şahiyê zirzir diki  
Bayê ko li min dide, av diki  
Ava ko vedixum, devê min de ax diki



Ho gulê! tu wek rûyekî dilhevîn xuya dibi  
Ho şerabê! tu wek lêva canrevîn xuya dibi  
Ho bextê serûl, tu bi min re  
Her dilsar î, lê xemrevîn xuya dibi



Destê te de yaqûta ruhî heye, ho meyger  
Dilê min wek yaqûta ronak ke, ho meyger  
Piyanêke dagirtî bide destê min, ho meyger  
Da ji şerabê dilê xwe jindar kim, ho meyger



Çendan li dora xwe dinêrim  
Ji çemenan, bihuşt e; ji kewserê, çem  
Dest wek bihuştê ye; gotina dojehê berde  
Rûne vê bihuştê de, bi delaleke bihuşdem



Ronî û şerab û tava hevvê, ho meyger  
Û delaleke yaqûtreng û nazdar ho meyger  
Şerbikekî şerabê bide min herî ko  
Şerbikan çêkin ji axa min û te ho meyger



Dema spêdeyê ye, delala qedrgîran  
Lêva te bi stran be, destê te bi piyan  
Bi hezaran Cem û Key xistin erdê  
Ev çayina Tirmeh û hatina Galan



Sibeh e, xweş e, dilxweşî ye; ho meyger  
Ko şeraba şevê maye, piyanê jê dagire  
[ho meyger  
Piyanê bide destê min û qedrê vê demê bigire  
Sibehê bibi livinê aqîdê, ho meyger



Di vê rêya xedar de bi dilnêrmî bijî  
Hevqas xema dinê mexwe şa bijî  
Da ko paşayika vê dinê, neyin e  
Xwe tune hesab bike û aza bijî

Dr. K. A. BEDIR-XAN

# DELALË BERÏYË

JI DEVË EHMED FERMANË KIKI

-- 1 --

Hay lo dilo! . . . . .  
Emrê dilê min pê ra, de bajo  
V' êvarê mi rebenê! . . . . .  
Tu carê li darê dinyayê  
Nabe tu peya bi  
Li ser bozê qesirandi  
Dêl û bijî bi hena bi . . . . .

-- 2 --

W' ez tu nifira li bejna delêl nakim  
Li Beriya-Mêrdinê, li Kepezê-Kika, erdê  
[bêpiva  
Bira li delêl derkeve xarek, mîna xarê semera  
Suwarê seklawî li delêl kar bin  
Erdê bêpiva, li ci xa' bar' dir, ga' nê xwe  
[êdikin[1]

Bihustê lawê bava bi lire be  
Mêrê xerab ji mêrê çê bi şade be  
Destê xorta dizgînê negire  
Lingê lawê bava di rikêbê nesekine

-- 3 --

Şadê-güdê delêl gelek hene  
Bû hefadê koçan û kerîyan  
Navê revê, delal heram e  
Delêl were malê me va ne  
Serê stûna kona nizik e, j' te bi xuya ne  
Tevdana sing û berê min, xezalê!  
Ji eşa pêve, li nefsa canê delêl  
Suwarê seklawîya helal be

-- 4 --

Di v' êvarê, emrê dilê min pê ra  
Bira li me ne hata ji ba  
Bayê xerbi zineta rûkê dinê  
W' ezê bala xwe didim-ê, maqûlê di kika  
Kîşane oda bavê Bişar  
Şêwr û mişêwrê roja barkirinê

-- 5 --

V' êvarê xewa xelkê delal di paşila min  
[de naye

Nizam delal gütî sar û germê  
Ezê nizam delal nexweş e  
W' ez nizam seklawî ranê delêl kutane  
Nizam wacê mala bavê min kevn bûne  
[kêç ketin-ê

-- 6 --

Di v' êvarê, delal, minê ji gira girê kewkeyo  
Ketim rêz û koçan û kerîyê di kikan  
Xelka min e delal, liser nag û delûlan  
[girtiye todeyo  
Minê nihêrî bejna zirav, mîna seklawî,  
[seklawiyê Bavê-Bişar

[1] li cihê xamberindîr guhanê xwe

Li der konê Bavê-Bişar bisekine, bêreşmeyo

-- 7 --

V' êvarê . . . . .  
Seyda lawikê xelkê delal teyr û tivilkê  
[dora mala bûn  
Seyda xelkê min i delal, xezala serê geleyo  
Delal de rabe destê xwe bi destê min de  
Emê hevdi birvinin; xwe bidin dora  
[Xabûrê-Begara  
Bira Girê-Mişergan ji min û xelkê delal ra  
[bibe sitareyo

-- 8 --

V' êvarê . . . . .  
Ezê daketim Beriya-Mêrdinê, ji dilê min  
[rebenê! beriya berê  
Lê şin dibû kulilka qewanê, tûmê di xerdelê  
Salê-çûnê ez xwestika xelkê delal bûm  
Sala vê salê, ketim tora yeki pisê mirdar  
Roja barkirinê, li dewsa koç û wava dimam  
Darê dergûşê li min bû bela  
Mirata kitanê, li min rebenê, bû baskê  
[di qertelê

-- 9 --

Di v' êvarê . . . . .  
De bajo, rêdûro bajo, betiliyo bajo,  
[heyiriyo de bajo  
Li her germiya havinê rûmene, vê sibekê  
[tuê bigiri sar û germê  
Serê te biêşe, tuê nesaş bikevi  
Di welatê xeribiyê, bi emelê serê min bi

-- 10 --

Hay lo dilo! . . . . .  
V' êvarê minê Çaxirbazara şewitî  
Mî ue diye, bi saxlûxdana, bi çava ji min dûro  
Sing û berê min rebenê!  
Vê sibekê mîna başçektî, ji başçeyê Nisêbinê  
Mîna mêrgê, ji mêrgê Tilkermê  
Hawik, ji hawikê dora Xêbûro  
Emrê dilê min pêro  
Were delal tewafa sing û berê min, rebenê!  
Serê xwe deyne rakeve  
Ev stêra li me der bû, Stêra-Karwanqîranê  
Serê xwe deyne rakeve, Stêra-Sibê li me dûro

-- 11 --

Dere, hey lo, dilo . . . . .  
Delal tu terka min bidî, ez terka te nakim  
Lo! lo! melûlo, xempîro, keserkûro!  
De bajo rêya te dûro! . . . . .  
Îro du ro ji sing û berê min, rebenê! mazûlo  
Xwezika min xelkê delal bidiya  
Mîna dewr û dewrana ewilî, tev selefê  
[Bavê-Bişar  
Beriya-Mêrdinê, ser pişta hemdaniyê  
Vê sibekê li hawikê dora Xêbûro

-- 12 --

Heyto! . . . . .  
V' êva rê emrê dilê min pê ra

Vê sibekê karê tev bizîne, diçêrin li pozê  
[Çiyayê-Şingalê

Çilê delêl hatine ber şuştinê  
Ezê bistinim qalûbek sabûna Îlelebê  
Bişom ser ava Zirganê  
Bisom, lêkim ava mawerdi, ezê raxim ser  
[darê qurnefilê

—13—

Di v' êvarê . . . . .  
Kalekî mala bavê me heyê, liber rehma  
[Xwedê, roja barkirinê  
Sê brê me hene, li bin darê silehê, roja  
[qewimandin û kuştinê  
Gava çavê min nekev, li bejna xelkê delal  
Ezê berê xwe bidim, herim Mîdyatê  
Dawa taqîya xwe bibim cem hoste Melko  
[ser boyaxa reşkirinê

—14—

Dilo lo! . . . . .  
Vê sibekê xelkê min i delal çû welatê xerîbiyê  
Kesek li mala tunine, w' ezê sebra dilê xwe  
[pê binim

Derdê dilê min pir in, şevê kanûna  
[şevine drê] in  
Ezê rabim lêwik li dergûş xinim  
Ji derdê dilê xwe re rebenê, bilorinim,  
[bilorinim, bilorinim  
Hêstirê xwinê, ser sê biskê di şê, hinarê  
[rûka hibarinim  
De bajo emrê dilê min pê ra . . .

—15—

Haylo dilo! . . . . .  
Rabe herê xwe bidin welatê Kurdistanê  
Herin Diyarbekra xopan, korta gidiya  
Ezê vê sibekê herim, kevirki rakim, ji  
[bedena hevsa xwiniya  
Ezê wi kevirî têxim navbeyna xwe û ber vi dili  
Di pey bejna delal, li welatê xerîbiyê  
[sebra dilê xwe pê binim  
De bajo emrê dilê min pê ra, tim lo lo!  
De bajo rêdûro, bajo xempiro . . .

—16—

V' êvarê ji gira, Girê-Girdêşê, Girê-Girdêşê  
Xelkê min i delal suwar bû, ciwanika ibeyê  
Berê xwe da xême beriya jêrin  
Lingê ciwanika xelkê delal li keviran dikeve  
Fzê nizam teresbav solbend neçê solkiriye  
Zikê min dişewite, dilê min vê ra diêşe

—17—

Keçikê digo: lo delal ez ne jin im, na bimêr im  
Ez xweyinga heft bra me, wekî şêr in  
Dotmama donzde pismama, suwarê  
[hespê nêr in  
Gava çavê min nekev li bejna delêl  
Ezê herim biniya Nisêbinê

Her heft bra, donzde pismama şokê vedîşêrim  
—18—

V' êvarê . . . . .  
Heylo delal, li min û li Tilkerme  
Delalê malê suwar bûye; vê royê, vê rogermê  
W' ez ne ketim ber etra delalê malê  
Ez ketim ber etra bi şalê sipî, bi kirasê melesi  
Çûye serê kaniyê, vê sarê, vê saregermê  
De bajo heyriyo! . . .

—19—

Heylo dilo! . . . . .  
W' ezê diçûm ber derî, derî li min venebû  
Hilkişiyam liser banê xênî, rê tune bû  
Daketim alikî hewşê, min bala xwe da-ê  
Xelka min a delal, li bin şibakê  
Di xewa şêrin da bû  
Sura bayê xerîbi hatî bû  
Temarê li çavê min kiri bû  
W' ezê bi xwe hişyar ne bûm  
Çûm tewafa sing û bera, bi kilit û bi mifte bû  
Êhmedê Ferman, nizam ne siûda min, vê  
[sibekê, ne bextê te bû

—20—

Dere heylo . . . . .  
V' êvarê Xwedêo, rebio, minê tiştik ji te navê  
Konekî çarstûnî, çstik şikakî, navmalê  
Mêkutkî ji darê benavê  
Minê konê delal vegirtiya  
Li Beriya Mêrdinê, li Kepezê-Serê-Keniye  
Navrokê Evdiselamê . . . . .

—21—

Lê, lê xezalê . . . . .  
V' êvarê tu xezala min i, xezala binê beriyê  
Devî li çêrê, çavî li karê, guhî li gaziyê  
Heylê xezalê . . . . .

—22—

Vê sibekê Xwedê bikira miradê min û  
[xelkê delal  
Li Beriya Mêrdinê, mcha Temûz û Tebaşê  
Minê rojî bigirta li ser rojiyê  
Xwezi ez bibuwama rimek ji dwanzde movika  
Têketama ser piyê xelkê delal, suwarê  
[hemdaniyê

—23—

Di v' êvarê keçikê digo: dilê min qûma ferêt e  
Kosara Kika, Amûda rengin, stûna welato  
W' ez nakim terka bejna zirav, heya  
[serê nin nere

Diyarbekrê, ber darê celêdo . . .

—24—

Haylo dilo . . . . .  
Lo delal, heya gava mirinê  
Heya roja kuştin û qewimandinê, delal heylo  
Vê sibekê tirsna min ji wê tirsê ezê bimirim  
[welatê xerîbiyê  
Berî kalbûnê, pîrbûnê, min têr ne go  
[delal heylo....

# YEWNAVANISTAN

## ÇAVAN BISERXWE BÛYE

Di sala hezar û pêncsed û sisê de, angu berî çarsed û sê salan Yewnanistan keti bû bin destê tirkan de. Xelkê Yewnanistanê di bin destê tirkan de, jar û perîşan bû bûn. Ne şeref ma bû cem wan, ne ji dewlemendi; çî cotyari û çî dan û standin. Di sala hezar û heftsed û heştê de gava di navbeyna Ûrûs û tirkan de şer çêbû, yewnanan hevî dikirin ko Ûrûs dê bibe arîkarê wan, û ji bona biserxweyîya xwe rabûn.

Tirkan zûka esker şandin ser wan, şerên mezî, şerên giran û xwîndar çêbûn, tirkan zora wan birin û eskerên wan hatin şikestin. Lê Yewnanistanê hevîna azahî û istîqlala xwe her xurtîr kir. Piştî mîdekê şairekî yewnan, Konstantîn Rîga rabû û bidîzi civateke welatî dani. Di dora wê civatê de zelamên lêja, xwenda, zana û kêrhatî gihane hev.

Di sala hezar û nehsed û heştan de tirk ketin pey konstantîn Rîga û xwestin wi bigirin. Destê tirkan nedigîha wî, Konstantîn Rîga baz da û çû Nemseyê. Tirkan ji dewleta Nemseyê spartina Konstantîn xwestin, wê dewletê ji bestreşî vê re kir û Konstantîn spart tirkan û bi destê tirkan di bajarê Belgardê de hate darvekirin.

Hevî û gerîntiya Yewnanistanê sist nebû. Gund dişewitin, bajar xirab dibûn, mêrg û arîzên spehî dibûn tîrb û gornistan, lê di kavilên wan de gula azahiyê vedibû û xwe geş dikir. Camêr û mîrxasên nû wek Mavrokordato û Îpsilantis dest bi xebata welêt dikirin û xwe dişidandin. Dil, gotûn û armanca Yewnanistanê bû bû yek. Serxwebûna welêt an mirin!!

Ji nû ve ji ho azahîya Yewnanistanê serxwerabûneke mezî destpêkir û xelkê Yewnanistanê ji nû ve ji dinyayê re da zanûn ko xwîna wan ne kerîsiye û kurên kal û kalîkên xwe ne, wek berê egîl û gernas in; dilê wan tejtî mîranî û camêrî ye.

Îpsilantis bi duhezar zelamên mîr zora tirkan bir û tirk ji axa Yewnanistanê bakur derêxistin. Lê piştî re, di sala hezar û heftsed û yekê de Îpsilantis ji şikest û revî çû Nemseyê. Serekên din dibin emrê Georgakis de bi zelamên xwe ve di Dêra-Sekoyê de bi tirkan re şer kirin.

Tirkan çarmedora wan girtin. Yewnanan gava ditûn ko êdî ji mirin an xwespartîne pêve tu rê ne maye. bi mîranî êriş kirin ser tirkan û hemî di wî şerî de wekî şeran hatine kuştin.

Keşe Germanos gava şikestina welatîyên xwe bihist xelkê dora xwe kom kir û çû ser tirkan. Di wî şerî de (15000) tirk hatin kuş-

tin. Di wê salê û di şerêkî din de Yewnanan ji nû ve (8000) tirk kuştin. Di sala hezar û heftsed û bist û dudowan de mezînen Yewnanistanê istîqlala xwe ilan kirin. Tirkan ji nû ve esker şandine Yewnanistanê û di nav tirk û Yewnanan de şerên mezî çêbûn, gelek xwînan hatin dişîsa tirkan zora Yewnanistanê birin, (23000) zelam û (47000) jin û zaro bi destê tirkan hatin şerjêkirin.

Serkên Yewnanistanê û zelamên wan hevî û hevîna xwe sist ne kirin, ji nû ve dest bi xebat û şerî kirin. Di sala hezar û heftsed û sisêyan de di navbeyna wan û tirkan de ji nû ve şerên mezî û xwîndar destpêkirin, Vêcar (3000) tirk hatin kuştin. Lê gundên Yewnanistanê hati bûn şewitandin, nik xelkê pere nema bû, welatê Yewnanistanê xerab bû bû. Xelk ji birçîna dimirin.

Di sala hezar û heftsed û bist û pêncan de tirkan ji nû ve ordûyeke mezî pîk anin û şandin Yewnanistanê. Dîsan şerên xwîndar destpêkirin. Êdî wîsa xuya dibû qey dema mirîna Yewnanistanê hatiye; eskerê tirkan xehf û xweyçek û cebîrxane bûn. Gava mîrxasên Yewnanistanê seh kirin ko êdî mirin e, destên xwe dan hev û bi mîraniyeke ecêb şer kirin.

Dewletên din heya wê demê destên xwe ne dilivandin û arîkariya Yewnanan ne dikirin. Lê gava yekbûn û yekîtiya hemî Yewnanistanê ditin dest bi arîkariya wê kirin. Ji boyî Yewnanistanê di navbeyna Ûrûs û tirkan de şerêkî mezî çêbû. Tirk hatin şikêrandin û di sala hezar û heftsed û bist û nehan de Yewnanistan bû dewleteke xweyistîqlal û di sala hezar û heftsed û sihî de dewletên dinê hemî istîklala Yewnanistanê nas kirin.

Îsal sed û sihî û sê sal in Yewnanistan xweyistîqlal e, biserxwe ye. Mîletên hesir û dil ên bêtîr serxwe bûn, ên mayî ji dê serxwe bibin.

Xwedê însan aza û serbest afirandiye. Em ji tu mîletî ne kêmtir in. Tu mîlet ji mîletê me ne mezintir e.

Paris: Dr. K. A. BEDIR-XAN

## TU ÇIRE AXÊ DE YÎ? . .

— Ji Mela Elmedê Botî re —

Sadiyê şirazi, yek ji şairên Ecemistanê ê bi nav û deng e. Sadi du kitêbên mezî hîştine. Bostan û Gulistan. Gulistana wî ji qiseyên lelsefî û hikemî tejtî ye. Çarîna jêrin a kurdandî ya Sadi ye. Ji yara xwe a mirî re gotiye.

Rojên Buharê ne, gul û lalê û nesrin,

Ji axê dertên, tu çire di axê de yî?

Mîna ewrên Buharê, herim bi zar bigirim

Di gorna te de, ewçend ko tu ji, ji axê der bibî

REMOYÊ QENCO



## PENDNAME

Ezê bêjîm hon dilê xwe megrîn  
 Dinya ne bêja ye, emê tev hûnîrîn  
 Mala me gelekî kûr e, yek max e  
 Ew ji li bin şex heft telehenê ax e  
 Em tev bira ne, ji yek dê û hav  
 Ji miriyam ra çî nûye, ji bil nav  
 Qet şiyar nabîn, ta kengê razin  
 Hon mezin in, em ji we dikin gazin  
 Xekê dibêjin şêx û melâ  
 Westê zekata xwe, dibêjin hela  
 Çimam hezretê peyqember gotiye  
 Zekate mexwe, ger tu hûnîmî ye  
 Mafûmê we ye, ew qêra maal e  
 Lewra ji şerîfîm ra ne helal e  
 Em bi dilê xwe tev hakîm û mir in  
 Di zekate de, ji qismê foqir in  
 Madam ko em varîsê enbîyîm e  
 Çima em xerîkî karê dinya ne  
 Hes e, hon ji xew rabin, ez gori zû  
 Zarakên xwe ra bêjîm ilmên nû  
 Çimam hezretê fexrel-alemîn  
 Gotiye: «Ulîhul ilme welaw fis-sin»  
 Misilman kengê li Sin, hebûn, ew çax  
 Ax! ji derdê we şêx û melâ ax! ax!  
 Hon dibêjin em hûme qutbê razî  
 Qet yek ji we nabe miftî û qazî  
 Hon bi van her du ritban ne razî ne  
 Lewra hon belengaz û pitazî ne  
 Hon tev mîr û çeleng û xort û ciwan  
 Hon ji pîra pûrsê dikin ji bo nan  
 Ez mala me lewra dilê min dişêx  
 Xwedê rehma xwe bike di ên pêş e  
 Em hîmî tu kurî ne kirin yekem  
 Lewra em hêj mane liral û bêknr  
 Aşn, ez ketim hextê te û Xwedê  
 Ezê çend pîrsan bêjîm tu gub bidê  
 Bîncêrê di bin destê de heyê sed xan  
 Hemî belengaz û reben û gavan  
 Tu malê wan distîni her bi dilêş  
 Tevî dixî ... na memûr û derwêş  
 Ger we tev bîdawa bi top û living  
 Dê hon ji bibûna hemberî lîng  
 Lakin çî bikim we tev di bi şabaza  
 Qet kes ji we ne bû wezîr û pîrs  
 Li ser hextê min bê hon mîrê çê ne  
 Ax ax esîrê destê xelkê me  
 Hes e, hon eglê xwe bidin serê xwe  
 Destê xwe bigrîn vêcar li perê xwe  
 Çimam ji homa ax û mal û xweft  
 Perê xwe didîm bi hev dikim gîl  
 Hon mala xwe bixan her yek bi serbest  
 Di hemberê neqrîn da bibin yekdest  
 Ji hev ra pîr qene bîa û gub bidêrîn  
 Li çerxa felekê hon pîr bîncêrîn  
 Gerek ji ho neyar e, yek ji ho me  
 A neyar jê ra hat, a me bîdom e  
 Em ji şûva xwe hajon û tov biçimî  
 Dê zû şûn lê, emê wî zû bibimî  
 Çimam em rezekî datînin deş sal  
 Em maxum jê, ji kurê me re dibê mal  
 Ewê ko çêkir vîpor û baladr  
 Delî sul bi şûn ye ne ma çû mir  
 Ev tev ji me ra, rîya dîn û iman  
 Hûbl-wetênê delîl û bîrhan  
 Ez bi xwe bê êt û esîr û ebr in  
 Pêlek maye emrê min, ezê bîmîrîn  
 Hes ji homa we ye, ev qirçira min  
 Lê ez çî bikim, hon gub nadin şîra min  
 Hon dîzînan jê hon li xwe nakin bar  
 Em ji, ji dilêşî dikim hawîr  
 Fikra min maye min ev tenê dixwest  
 Lê ez çî bikim li vir qeşema min şikest  
 Bi kere, min tûj kir serê qeşema zil  
 We digel a bê bêjîm, dibin çî  
 Eger hon ji gotînen min aciz bûn  
 Hêvlî dikim ew bîkn Cegerxwîn

CEGERXWÎN

## DÊRIK

Dêrika Çayê Mazi  
 Welatê bav û kal e  
 Lê sed hawar û gazi  
 Jê dûr ketim çend sal e  
 Ez li wê hatim dinê  
 Wê dergûşê, hejandim  
 Heywax hey mala minê  
 Dîjînan, jê revandim  
 Perçake ji bihûstê  
 Besreka Zêrîn wetat  
 Îro dest nagehişt-ê  
 Ax û keser ji dil hat  
 Baş û başçe bê hejmar  
 Çi bi çî mîng û zevî  
 Li her derê, avên sar  
 Ji kaniya tê dîzi  
 Kulêbe hûye xopan  
 Dengê berê jê nayê  
 Temaşagaha xortan  
 Ji min ji sêwî mayê  
 Ji çîçekê rengereg  
 Serwest newala Govî  
 Çima îro nakî deng  
 Mîna tebayê kovî  
 Xwezî vê carê ji min  
 Serê Xabê bidîta  
 Bila ruhstîn canê min  
 Hîngê ji xwe r' bîmêta  
 Dilê min jê tîr ne bû  
 Ax! ew Asraka Bêrxê  
 Gelo ew raj heyê ko  
 Dîsa bibînim bi xêr  
 Guher hêsa ne dîbû  
 Ji keçên hûstê-lî morî  
 Çavê min li wê vebû  
 Dilê min jê ra gori  
 Mawêl û Kani-Hînar  
 Gorînê hîrê min in  
 Îro hîbe pîrsiyar  
 Cawahê derdê min in  
 Reha-Reş û Lata-Sor  
 Yek sorgul e, yeke mor  
 Bîn bikim ez dor bi dor  
 Têr nabim hetanî gor  
 Du textê Qîzê-Qîrêl  
 Hemberî hev dinêrîn  
 Li ser wan xweş qelisêl  
 Gurçik û dil çedîbin  
 Xwedê kerem bikira  
 Bibawna teyrekî baz  
 Li wan çih li wan dera  
 Bîgerim perwaz, perwaz  
 Dêrika Çayê Mazi  
 Welatê bav û kalan  
 Dîtina te dixwazi!  
 Newzad: ji te ra heyran

NEWZAD



Ji Starên Gîbê Botan:

## KÊRE

Bihar xwes dilê binê vi Seqfanî  
 Heşin dîbê kîfika ketê, ya vi bîzînanî  
 Xwezî ez bibiyam mîhkeke kurechazî  
 Şexvê çîle û kunnê, berf û bagereî  
 Min serê xwe bikîşanda bin kulavê te şivanî  
 Dîlîkî min, dîlîkî bi heylêz e  
 Bêrî û berîvan ji malê me hêne rîz e  
 Kesik ne diye ser dewr û zemana, hakîm  
 [Dîgîrîn şivanê her pêz e  
 Xwezî ez bibiyam quramîlo  
 Ez bîketam hêrikê Qereqox, erdek silomîlo  
 Keçikên Mûseresî, Xêrka, Teya, Mîra  
 [Dîketan, ez bîxîstam mîlo  
 Ez bibîranî şîka Cîzîrê bîdam bi  
 [Sîbhan û kîlo  
 Bîndiya hêxîsta çelwê rastê, ç çepê  
 [Bîna wîlo  
 Dîlîkî min bi heylêz e  
 Çelwê min yek heyv e, yek şîr e  
 Memikên min yek mîzgeft e, yê di dêr e  
 Du kelûmî navbeyna sing û berê min der bîne  
 Yek Hûsor, ye di Şipêr e  
 Heçî nexwêşê ew heft sal bi  
 Ser pîstata xwe ranebi  
 Fîrkê jê vexwê, raj bi raj her bi xêr e  
 Ezê bîlîm te, banê Bamêş bi pûş û pelêş ve  
 Ezê bîlîm te Seqfanî bi êş ve  
 Ezê bîlîm te, Sûka-Tarî bi tewbên qumêş ve  
 Mîrê min, agir bîkevê Bmê-Bamêş,  
 [Pûş û pelêş ve  
 Serê şapê pêde hê, Seqfanî bi êş ve  
 Xwedê xerabîkê Sûka-Tarî, bi tewbên  
 [qumêş ve  
 Tu lawîkê min herde malên me çîno  
 [jozawa, her beleka  
 Warkozn mi biye Banê Xawê, gerim  
 [Havînê bi şûndewaş ko û kuleka  
 Dewletê mîrê mî mezin hê  
 RÊDÛR  
 Êvar e, çaxê hevîra  
 Ezê bîlîm te, banê delal şar û mîmî ne  
 Keçikê digo: kurîko devê xwe ji xal û  
 [nişanê gerdenê min herde  
 Kurî digo mala bavî şewîtyê! xema nexwe  
 [stêra sibehê li me dîr e  
 Vê harnê lez ke, lez ke  
 Ti li serê xelkê delal şar û mîmî ne  
 Bejna te nazîkê, enterîkî tmî kesik e  
 Ji nîmêja meçrêbê ezê diçîm tewafa xal  
 [û nişanê gerdenê  
 Heta spêda sibê dîlî serê simbêlê soshit  
 [qoce bîska  
 Mî dî ti li kolanê, Xîdîr-Mame da  
 Mînê dawî enterîkî Şamê gîrt û  
 [qet bermeda  
 Ji nîmêja meçrêbê ezê diçîm tewafa şê  
 [bîskê di şê  
 Heta fecara sibê min terka cotê  
 [zeremîka ne da  
 MEMOKÊ  
 Hey lê Memokê ewanê dîlîkî kal bişoz e  
 De ti li min vekte berî û bişkojn  
 Dinya li min cineta haqî bi, te li min  
 [kir-ê doje  
 He ruhe Memokê ewanê, te şingsutêrê  
 Bî xet û bi xal û bi nişanê  
 Te li min xira kirî bi dergêhên Colemanêgê  
 Baş û başçeyên Wanê  
 Sibê ye, sê mîh ji gumê me bar kir  
 Hryê ewanê, Memokê li te şingsutêrê bi  
 [xet û bi xal û bi nişanê kir  
 Memoka min ji estê mala bavê xwe delat e  
 Te mala lawîka li min xira kir  
 STRANVANÊ JÊLIYAN

## MIJDE

### BO LAWANÎ KURD

Lawani kurd! mijde bê lêtan, le paş şeş mang diyar nebûn, ewa emro ewel nûsawi Hawar le bin çap da hate derewe. Ey brale bizanin ke hemû miletêk be zmaniye we nasrawe, we esasire. Ke zman ne bû hiç stêki tir bîni we pêkhatini dirist nabê.

Bo jiyane we serkewtini zman nûsin, bilaw kirdinewe, we rojname pêwîst e. Têmaşayê keyn lem peri Kurdistanê we, bo ew peri, le sere we, bo xwarewey law deyn le sê çapxane hew lawe nabinin. Yekêkiyan çapxaneyi Jiyani Silêmani ye. Ke emêş le bexêr-hatini piyaweki gewre, heraci mîlk, êlani tapo hew lawe stêki tiri tiya niye. Duwemin Zari Kurdmanci ye. Ke hi piyaweki feylesofi pirqiyemeti xoman e. We hemû pûl û pareyeki lew çapxane da xerc kirdawe bo herzbûneweyi zmani kurdi we le çapdani kitêbi pêşinani bêhawta, le paş ewe ke hiç yarmeti le ême ne di ewa ewişi hate halî bêxwedî. Şeyim Hawar, hawar e.

Hawar wekû hemû ezanin hedefi esasi herzbûneweyi zmani kurdi, yekxistinî her du zman e, yanî kurdi serû û kurdi xwarû we.

Ey beqêşerani niştiman, ey ew kesaneyi ke xwêni germi paki kurdayetî le leşa ecûle, ey ew kesaney ke bo herzi zmanî wilat hewl eden, himet biken, tê bikosîn bo jiyane weyi hawarman û zarman. Nûsrawekani wilatîke bibînin we tozi dilman be hi xoman we xoman bîsûtê. Bo çi emêş hewl nedeyn legel xêwi em du çapxane be nîrxeman da bo herzi we yekyeti zmanman.

Ême ke wilatî xweşewîst çawerewan mane zmanî xoman herz nekeynewe, kê hewlman bo eda, kê ho zmanman tê ekoşê. Bo çi her yeki le ême cari be yek du çiroki kurdi xoş ke her kurdêk sed ezanê, hemû rûperey hew çiroka bêhawta felsefiyane nerazenine we, bo çi be hasi xo parastin le nexoşi pir nekeynewe, ho çi dawa kirdini pêwîstî wilatî tiya bilaw ne keynewe?

Brakanim, bizanin ke jiyani nûsrawî man be ême we bestrawe, herzi ême be herzbûneweyi zman mane we ye. Yekyeti ême be yekyeti zman mane we ye. Nahê xoman hê fewtani xoman hewl bideyn. Têkoşin, be mal û be pare bo herziyî zman man wacib e leser hemû laweki dilsoz.

Ey brale, bo çi ta êsta hêştûmanê em du nûsrawe man bixewin. Bam hewl bidên bo hoşênanewe seryan bo xizmetî niştiman.

Le paş em nûstine zoreyî haware itir. Bîwam waye hemû laweki dilsoz hewlî ser-

## ÇÛK Û FÎL

Dibêjin carekê çûkekê hêlîna xwe nizikî rêya avexwarina fîleki de çêkiri bû. Hêk û ferxik ji tê de kiri bûn. Fil weke adetê xwe ê berê tê re borî, da avê vexwit. Dît ko hêlinek teji hêk û ferxik wa li ser rêya wî de ye, anî pê lê kir. Hemî kuşt û xkênandin û çû ser avê. Gava çûk hat û dît ko ne hêlin ne tiştek xuya nakin, hemî di vî halî de ne, yanî ev neqenci û xirabiya ha ji filê ye. Çûk lîri û lîser serê fil dani û jê re got :

— Ya melik te çîre ev şûret serê min de anîye, te ez di darê dinyayê de tinê hêlîştim. Ser vê qasê re em çiranên hev bin û ez digel te bê xalî-xarez bûm. Te ez kiçik û reben ditim ji lewre te hûsan li min kir. Fil lê vegerand û got:

— Belê herweki te gotî wisa ye. Ji lewre min ev li te kir.

Çûkê berê xwe jê wergerand û lîri çû bal koma teyran ve û gilfiya halê xwe li nik wan kir, û serhatiya xwe ji wan re got û ji wan daxwaz kir ko bèn hawara wê.

— Teyrîno hon digel min werin em tev de biçin bal fil ve û danin ser serê wî û çavên wî binikilînin, biqoqilînin. Disa ezê tepeke di ji lê bikim.

Teyran gotina wê dirist dêran û milên xwe dane hev û çûn lîser serê fil danin û çavên wî dane ber nikilan, heta kor kirin û ew ji qoqikên xwe rijihan.

Fil bê ronahî û xwarin û vexwarin ma, eihê xwe de. Dike hawar û zar-zar. Mês û meryan girtin kiloxê wî û qoqilandin û dest bi xwarina goştê wî kirin.

Çûkê, dîsan xwe jê ne da paş çû bal çaleke ji wan ên têrbeq ve û serhatiya xwe ji wan re ji got. Beqan lê vegerandin:

— Hey çûka reben ma tepa me di mezinahiya fil de çî ye, em çî dikarin.

Çûkê got: Bes min divêt hinek ji hewe digel min bèn û em biçin bal kortaleke nizikî fil ve û hon di wê kortalê de bixwînin û bikin qurqur. Ji lewre gava fil dengê hewe seh bike ê hawar bike ko ev dengê he ji erdeke biav têt. Dê bûguman bibê û ji êşa xwe dê bê bikeve tê de.

Beq pê qail bûn, çûn, li çalê de êwirin û tê de xwendin. Fil dengê wan bibist û tihnê lê zor kir, herê-xwe da wî dengî û qestê kir. Giha ser lêya çalê da ko avê vexut, hew dît ket û hilweşa tê de. Vêre vêre çûkê fir da û dani ser serê wî û her du çengên xwe lîser hejandin û gazî kir ê:

— Hey heywanê gunehkar, yê ko bi xurtî û zexmî, û hinermendiya xwe xira yî, ser paça xwe çûyî û ji rê derketî û tu hesab ji min nekirî, niho te çawan dibîni û dihesibîni ko min tu bi vî vê tep û hinermendiya xwe û digel vî cendekê hûr kuştî û êxistî vê çala kûr de.

Tu deng ji fil ne hat ser hev de tepistî, welê mir û çû.

M. E. BOTÎ

xistinî bîda we bo pir kirdineweyi beynî kolekekani le hemû nûsrawekî tira nûsin be zmanî xoman, kurdi xwarû, tiya bibinin bo ewey ke be her du zman ew xizmete ke Hawar hewlî bo eda pêk bêt.

LAWANÎ PIJDERÎ



## NAME

### BO LAWANÍ KURD LE IRAQA

Ey lawan! le demêke we Hawar der ne çêû. We le pêştirîş da hawar ne dihate Iraq. Çûnki hikûmetî iraq hatîni hawarî bo Iraq bend kirdî bû. Beheq û naheq bê, êsta ême gô nadeynê. Ewey ke emro ême le şwêni egereyn lew gelê mibimtir e.

Bo çî lawanî Iraq wekû pêşû meqale û şîir bo hawar nanûsin. Belê lew roje we ke hikûmetî Iraq çûni hawarî bo Iraq bend kirduwe lawanî iraqîş destî xoyan lê kêşawetewe. Ebuwaya wa ne buwaya. Ihtimal e ke hawar be dili xelik, be dili bêganekane ne bêt. Belam be dili xoman we hawilatî xoman e. Leber ewe ême derman hêna. We emroş derî ehênin. Û Xwe hez bike axirîş derî ehênin û heta dest birwa be naw hemû kurdana bilawî ekeynewe. Wekû ewe dizanin ewelemîn hedefî hawar pêkhanî, rêkxistin û pêşxistinî zmanî kurdî ye.

Hawar wekû dêberêk e. Lem dêbere de debê hemû terhe towêkî pêwe bikirê. Towî esasî em dêbere duwan e. Lehceyî bakur (şimal), lehceyî nivro (cenûb) yanî kurdî wilatî jorû û kurdî wilatî xwarû we.

Heta (15—16) jmarey, hawar be her dû kurdî derdeçû. Belam le paşa kurdî Sûran yanî Baba-Kurdî xoy kem kird. Çûnki wekû le pêşe we wîtanaw hawar îtir ne çêuwe Iraq. Êwe nûsrawî xotan le hawara ne edî, we berî koşêşî xotan ne exward. Belam ey lawan baş bizanin em rewîştî ewe ye rast niye. Ewelcar berî koşêşî ême bo ême niye. Ewa bo neweyî paşeroj e. Îşî ême tow be zewiye we çandî e. Ême ke ême pê elên tow denike, be ser zewî da bilaw ekrêtewe, we be gasin exrête bin zewiye we. Le paş ewe le ême we diyar niye, heta sewz ebêt. Nûsarî eweş her wa ye. Ême ewe le ser rûperey hawara derêjin. Renge sewzî ew bibinin, we rengîş e ney bi-

nin. Nabê ewe le ber eme dilteng bibin we le dilî xotana bilên: «Nûsrawêk ke min le şeklî çap da nabinim boçî û bo kê binûsim?» Êwe ewe bo yekyete zmanî kurdî û bo neweyî paşeroj b nûsin.

Ey lawan wekû eşîret le wextî hawar da pelamarî tîfingî xo didin eweş herwiha pîrî qelemî xotan bidin we des be îşî xotan bikin.

Kurd û kurdayetî tenha be koşêşî ewe, be koşêşî lawçak etwanê bijî.

Daxim bo ew mileteye ke lawî ew bo ew ténakoşin. Xwezegem bew mileteye ke lawî ew lê hoşyar in.

HAWAR

## XEYAMWARÎ

Şev e, tarî ye, l'me ava bû hiv  
Ka ew zend û destên wek zêr û ziv  
Ger perde rabe û derkeve roj  
Dê jê re xwe vekin kaş û beroj  
Trij dibin tîr her bi simta xwe  
Roj kurt dibin em bi qedera xwe  
Me ji biskên yarê ne girt davek  
Me her meqsedê ve n'avêt gavek  
Barana hûr bêtîrs e, xunav e  
Bêpaki em diçin nav e  
Hingî ewr bibore pey re têt tav  
Li ser me hene lerzîn û pertav  
Leylan ji dûr ve xuya ye, av e  
Wek me nezan her bêdeng û nav e  
Ji pêlên avê hiltên biqbiqok  
Em nezan dibên ev in biriqok  
Hoste bêbingeh, danî ev diwar  
Tama mirinê kirim birindar  
Govenda bûkan û stêrikan e  
Hevîna wan jana tiliyan e  
Tiştên li şunwaran mayî hiç in  
Hevalên keyfê bê şop û rêç in

MISTEFA EHMED BOTÎ



# LE BEAU DE LA STEPPE

— 1 —

O cœur! . . . . .  
La vie de mon cœur est avec toi, pousse  
[ton cheval en avant  
Ce soir, ô moi, malheureuse  
Que jamais sur la surface du monde  
Tu ne descendes du cheval (1)  
Tacheté rouge et blanc, bien entretenu (2)  
La queue et la crinière teintes en rouge

— 2 —

Je ne fais aucune malédiction sur la taille  
[de l'aimé  
Dans la steppe de Mardine, sur les collines  
[plates des kikan, terre démesurée  
Puisse-t-il surgir pour le bien-aimé une attaque  
[pareille à l'attaque des chemmars (3)  
Les cavaliers saklawi (4) se jettent sur l'aimé  
Sur la terre démesurée, que les brebis  
[elleurent de leurs mamelles  
Que l'arpent des fils des pères (5) coûte  
[une livre (6)  
Que les lâches, des héros, soient distingués  
[par témoins  
Que la main des jeunes gens ne puisse  
[plus tenir les brides  
Que les pieds des fils des pères ne  
[tiennent plus dans les étriers (7)

— 3 —

Les témoins (de la bravoure) de l'aimé  
[sont nombreux  
Il était le protecteur du convoi (8) et des  
[troupeaux  
Le nom de la suite, aimé! est interdit  
Aimé, viens, nos foyers sont ici  
Les sommets des piquets des tentes sont  
[proches, tu peux les apercevoir  
Que les mouvements de ma poitrine et de  
[mes seins, gazelle  
Après la tombée de la nuit soient donnés (9)  
[à l'être bien-aimé

(1) C'est à dire, il faut que tu ne quittes jamais la selle.

(2) L'expression (qesirandin) s'applique au lavage et au blanchissage des tissus, noirs par l'effet de différents procédés. Par ce mot on fait allusion à la propreté du cheval.

(3) Tribu arabe d'origine hédjazienne. Jadis en perpétuelle lutte avec les kurdes de la plaine de Mardine, à différentes reprises en guerre avec le fameux Ibrahim pacha, finalement battue auprès de Nissibine. Cette lutte contre un ennemi commun a servi à la réconciliation des tribus kurdes de la plaine qui se battaient entre elles.

(4) Race de cheval noble.

(5) C'est à dire les braves.

(6) C'est à dire que la lutte soit si acharnée, que les guerriers disputent le terrain avec une telle bravoure qu'un arpent de terre coûte une livre or.

(7) Toujours la définition d'une guerre éclairnée.

(8) C'est à dire « chargement du matériel, transport » d'où le mot « koyer » celui qui se transporte, non-sédentaire.

(9) Littéralement « non-prohibé, permis »

Au cavalier du cheval saklawi

— 4 —

Ce soir, que la vie de mon cœur soit  
[avec lui  
Des vents, que ne vienne pas vers nous  
Le vent de l'ouest, parure du visage du monde  
Je fais attention, je constate, les chefs des kikan  
Se sont retirés dans la chambre du père  
[de Bichar (10)  
C'est le conseil et les délibérations pour  
[le jour de chargement

— 5 —

Ce soir, le sommeil de l'être-aimé (11) ne  
[vient pas entre mes bras  
Je ne sais si l'aimé a été pris par le froid  
[ou par la chaleur  
Je ne sais si l'aimé est malade  
Je ne sais si la saklawi a meurtri (12) ses cuisses  
Je ne sais si les campements de mon père  
[ont vieilli, si les puces sont tombés (13)

— 6 —

Ce soir, bien-aimé, que parmi les collines,  
[ce soit pour moi, la colline de kawkab (14)  
Je m'achemine dans les rangs, les charges  
[et les troupeaux des kikan  
L'être que j'aime, sur les chameaux dans  
[une chambrette (15)

J'ai regardé la taille fine comme celle d'une ju-  
[ment saklawi, des saklawi du père de Bichar  
Devant la tente du père de Bichar, sans lieu

— 7 —

Ce soir . . . . .  
La chasse des garçons des belles n'était que  
[les oiselets des alentours des maisons  
La chasse de l'être aimé est la première gazelle  
[du devant du troupeau

Ce soir, aimé leve toi, mets ta main dans  
[ma main  
Enlevons nous l'un l'autre, allons au bord  
[du Khabour (16) des Begara (17)

Que la crête de Maghergan (18) serve de  
[couverture pour l'être aimé et pour moi

— 8 —

Ce soir . . . . .

(10) Hectid bey, chef des kikan, fut guerroya pendant de longues années dans la plaine de Mardine. Rival du fameux Ibrahim pacha, chef des milan. Malheureusement il est question de lui dans la biographie du chansonnier.

(11) Littéralement du « joli monde »

(12) Mot à mot « tu frappé »

(13) En cas de victoire le campement avance, change de place et se renouvelle, sinon il est toujours dans la même place.

(14) Hauteur aux environs de Hasselche, fréquemment citée dans les chansons de la plaine, de même que les monts Abdul-Aziz et Sindjar. Ils servaient de lieu de campement et d'embuscade.

(15) Petite chambrette montée sur le dos des chameaux et réservées aux femmes et aux enfants.

(16) Rivière de la Haute-Djézireh, prenant sa source à Seré-Kani. Cette rivière près de Deir-Zor se jette dans l'Euphrate.

(17) Nom du tribu arabe.

(18) Crête de la contrée.

Je suis descendu dans la steppe de Mardine  
 [ô moi malheureuse, la steppe de jadis  
 Là fleurissaient ce matin la fleur de margueritte  
 [les racines de moutarde  
 L'année passée j'étais la fiancée de l'être cher  
 Cette année je suis tombée dans le filet  
 [d'un misérable  
 Le jour de chargement je reste à l'endroit  
 [des campements  
 Le bois du berceau m'est devenu un fardeau  
 Le kitan (19) hideux, pour moi malheureuse  
 fest devenu une aile d'aigle

— 9 —

Ce soir . . . . .  
 Lance (ton cheval) lance route-lointaine,  
 [lance fatigué, lance, ô que je t'admire  
 Ne demeures pas dans la chaleur de l'été, ce  
 [matin tu seras pris par le froid, par la chaleur  
 Tu auras mal à la tête, tu tomberas malade  
 Dans le pays étranger, tu serais à ma charge

— 10 —

O cœur . . . . .  
 Ce soir le Tchakhirbazar (20) brûlé  
 Je ne l'ai pas vu de mes yeux, par ouï-dire,  
 [il est loin de moi  
 Ma poitrine et mes seins, ô moi malheureuse  
 Ce matin comme un jardin, parmi les  
 [jardins de Nissibine  
 Comme une prairie, de celles de Tilkerin  
 Comme un îlot, des îlots des alentours  
 [de Khabour  
 Que la vie de mon cœur soit avec lui  
 Viens, bien-aimé, au pèlerinage de ma poitrine  
 [et de mes seins, ô moi malheureuse  
 Pose ta tête et dors  
 Cette étoile qui est venue sur nous, c'est  
 [l'étoile Karwanqiran  
 Pose ta tête et dors, l'étoile du matin  
 (est loin de nous

— 11 —

Va, va, ô cœur . . . . .  
 Aimé, si tu me délaisse, je ne te délaisse pas  
 Lo! lo! ô triste, trop de douleur,  
 (souffrance-profonde  
 Lance (ton cheval), ô chemin-lointain  
 Aujourd'hui, privé depuis deux jours de ma  
 (poitrine et de mes seins, ô malheureuse  
 Oh! si j'avais pu voir l'aimé  
 Comme dans les anciens temps, avec le groupe  
 (des cavaliers du père de Bichar  
 Dans la plaine de Mardine, sur le dos  
 (du hemdani (21)

(19) Espèce de châle, porté seulement par les femmes mariées.

(20) Village en ruine de la contrée.

(21) Race de cheval noble.

Ce matin dans l'îlot des alentours de Khabour  
 — 12 —

Ce soir la vie de mon cœur avec (lui)  
 Ce matin, le chevreau avec la chèvre, paissent  
 (sur le cap du mont de Sindjar  
 Les vêtements de l'aimé ont besoin d'être lavés  
 Je prendrai une pièce du savon d'Alep  
 Je les laverai dans l'eau de Zirgan (22)  
 Je les laverai, je les arroserai avec de  
 (l'eau parfumée, je les étalerai sur  
 (les arbres des girôllées

— 13 —

Ce soir . . . . .  
 Nous avons un vieillard de la maison de nos  
 (pères (23) à la clémence de Dieu, le  
 (jour de chargement et de la mort  
 Nous avons trois frères, tous sous les crosses  
 (des armes, au jour du combat et de la mêlée  
 Quand mes yeux ne verront plus la  
 (silhouette de l'aimé

Je me dirigerai, j'irai à Midyat  
 Je donnerai le pan de ma robe, chez maître  
 (Melko (24) pour le faire teindre en noir

— 14 —

O cœur! . . . . .  
 Ce matin mon bien-aimé est parti pour  
 (le pays étranger  
 Il n'y a personne à la maison que je puisse  
 (consoler mon cœur  
 Les chagrins de mon cœur sont nombreux, les  
 (nuits des kanûns, ce sont des nuits longues  
 Que je me leve, pour mettre le garçon  
 (dans le berceau  
 Pour consoler les douleurs de mon cœur,  
 (que je lui chante des bercennes  
 Que je verse des larmes de sang sur les trois  
 (boucles blondes, sur mes joues  
 Lance (ton cheval) la vie de mon cœur avec

— 15 —

O cœur! . . . . .  
 Leve toi, tournons nous vers le pays  
 (du Kurdistan  
 Allons vers la malheureux Diarbekr, fosse  
 (des misérables  
 J'irai, ce matin, je leverai une pierre de la  
 (muraille de la prison des sanglants (25)  
 Je mettrai cette pierre entre mon cœur et moi  
 Dans le pays étranger je consolerai mon  
 (cœur avec elle  
 Lance, la vie de mon cœur avec, toujours lo!

(22) Petite rivière, prend sa source dans les montagnes de Ghource et se jette dans le Khabour.

(23) Veut dire: qui est transmis par nos pères. Très vieux respecté par la maison.

(24) Nom propre, Ichuturier.

(25) Le mot *axwîn* qui littéralement veut dire sanglant, signifie criminel, et dans un sens figuré équivaut à l'expatrié.

Lance, ô route-lointaine, ô plaine-douleur

—16—

Ce soir, parmi les crêtes, la crête de

(Guideche (27))

Mon bien-aimé monté sur un poulain ibe (27)

Il s'est dirigé vers le versant de la steppe  
(du sud)

Les pieds du poulain du bien-aimé se

(heurtent aux pierres)

Je ne sais pas, le malheureux maréchal-

(ferrant l'a mal ferré)

Mon corps brûle, mon cœur souffre avec lui

—17—

La fille disait: ô bien-aimé je ne suis pas

(une femme libre) je suis avec un homme

Je suis la sœur de sept frères, qui sont

(comme des lions)

Je suis la cousine de douze cousins, tous

(cavaliers des chevaux entiers)

Lorsque mes yeux ne verront plus la silhouette

(du bien-aimé)

J'irai au bas de Nissibine

Chacun des sept frères et des douze cousins

Sur la sommité de crête de Hamidiye, je

(les enterre tous)

—18—

Ce soir . . . . .

O bien-aimé, à moi et à la vue de Tilkerm

Le beau de la maison, est monté, dans ce

(soleil, dans cette chaleur du soleil)

Je ne me tourmente pas à cause du beau

(de la maison)

Je me tourmente, parcequ'il ne porte que

(le pantalon blanc et la chemise de soie)

Il est allé à la tête de la source, il va prendre

(ce froid, ce chaud et froid)

—19—

O cœur . . . . .

J'allais vers la porte, la porte ne s'ouvrait

(pas à moi)

Je suis monté sur le haut de la maison, il

(n'y avait pas de chemin (28))

Je suis descendu du côté de la cour j'ai

(fait attention)

Ma bien-aimée (29) sous la fenêtre

La brise du vent de l'est était venue

Elle m'alourdissait les yeux

Je ne me suis pas éveillé de moi même

Je suis allé au pèlerinage de la poitrine

(et des seins)

Ils étaient enfermés avec cadenas et clef

Ehmed Ferman (30) je ne sais si s'était

(mon augure)

Ce matin, si s'était ta chance

—20—

Va, lo! lo! . . . . .

Ce soir, ô mon Dieu, je ne te demandes rien

Qu'une tente à quatre piquets, une cloison

(des Chikak (31))

Un marteau du bois de benav

Puissé-je dresser la tente de l'aimé

Dans la steppe de Mardine, sur la crête

(de Serè-Kani)

Dans l'ilot de Evdiselam

—21—

O gazelle! . . . . .

Ce soir, tu es ma gazelle, tu es la gazelle

(du bas de la steppe)

La bouche à la pâture, l'œil sur le gazelon,

(l'oreille aux aguets)

—22—

Ce matin, que Dieu accomplisse mon vœu

(et celui du bien-aimé)

Dans la steppe de Mardine, aux mois de

(Juillet et d'Août)

Je jeûnerai jeûne sur jeûne

Ah! si je devenais une lance de douze pouces

Et que je tombe aux bras du bien-aimé, du

(cavalier du hamdani)

—23—

Ce soir, la fille disait: mon cœur est comme

(du sable de l'Euphrate)

Kosara-Kikan (32), Amouda (33) brillante,

(colonne de la patrie)

Je n'abandonne pas la taille fine jusqu'à ce

(que ma tête aille)

A Diyarbekr, devant l'échafaud du bourreau

—24—

O cœur! . . . . .

O aimé jusqu'au moment de la mort

Jusqu'aux jours de la tuerie et de la mêlée

(toujours lo! lo!

Ce matin, ma crainte est de cette crainte,

(je mourrai dans le pays étranger)

Avant de vieillir, et je n'aurai pas dit

(suffisamment ô aimé lo! lo!

DELALÈ-BERÏYÈ ET CHMED-FERMAN

DELALÈ-BERÏYÈ —Dalalè Beriyè mot à mot  
signifie le beau de la steppe, ou de la plaine.

Le «Delal» chant populaire lyrique et  
héroïque, est très répandu dans le Kurdistan

(30) C'est le nom du chansonnier. D'ailleurs c'est la coutume  
des chansonniers dans de pareils cas de citer leurs noms.

(31) Tribu kurde du Kurdistan du nord.

(32) Nom propre de localité.

(33) Petite ville, actuellement en Syrie.

limitrophe de la frontière turco-syrienne actuelle, de «Djéziret ibni Omar» jusqu' à la plaine de «Siroudj».

Différents groupes de tribus comme Milan et Berazan ont leurs «delab» particulier. Celui de «berî» constitue une sorte de thème commun que chaque chansonnier adopte à sa tribu. Dans le présent texte, on parle des kikan, parceque le chansonnier Ehmed Ferman appartient à la tribu kikan. Le «delab» est propre aux tribus de la contrée que nous avons désignée.

Le thème du «delab» ainsi qu'on le voit, partiellement, dans le texte que nous venons de publier, roule sur un épisode d'amour chanté sur le mode épique. C'est la bien-aimée qui chante les péripéties de guerre et l'amertume de la séparation d'avec son amant.

Pour le texte que nous venons de publier, nous avons dit qu'il ne représente le thème que partiellement. En effet il y a longtemps que Ehmed Ferman âgé de (75) ans, mais encore robuste et vigoureux, n'ayant même pas un cheveu blanc, n'a pas chanté le «delab» en compagnie des cavaliers, en allant vers le champ de bataille; expatrié depuis une dizaine d'années, il ne le chante qu'irrégulièrement en mêlant les strophes, en les invertissant, en oubliant un grand nombre, surtout de telles qui concernent les péripéties de la guerre et les faits d'armes du «delab». Lui même avoue ces lacunes, il se rappelle le temps où parmi l'entourage de son chef, à cheval, accompagné d'autres chansonniers, au moment de la charge des cavaliers, il les encourageait par ses paroles et ses mélodies.

Tout les «delab» sont du même type. Selon les contrées et les tribus les paroles varient; chaque chansonnier introduit même plus ou moins de variations.

On se souvient que dans notre huitième numéro page: 9 nous avons publié un passage du «Delalé-Beriyé» sous le titre de «Yéli Delab» chanté par «Meryem» khanoum. La comparaison du texte ci-dessus avec le petit passage chanté par Meryem khanoum peut donner une idée de la variation du delab.

Meryem khanoum est une botaniennne; elle n'appartient pas à la tribu «Pendjinaran» comme nous l'avions indiqué dans le neuvième numéro de notre revue. Elle est originaire de Botan, de la tribu Jéliyan, village de Kêrte; c'est la fille de «Hadjie Hamko», renommé pour être bon tireur et bon chasseur.

EHMED-FERMAN — Après ce court aperçu général sur le (Delalé-Beriyé) nous donne-

rons quelques renseignements biographiques au sujet du chansonnier Ehmed Ferman qui nous l'a chanté.

Ce récit contiendra aussi quelques phases de la lutte de Ibrahim pacha, chef des Milan, contre les chammaris.

Ferman est le nom de famille. Ehmed appartient à la tribu des Kikan clan «Nedjaran» de la fraction «Mir-Meman». Ehmed est né dans le village de Milehi, situé dans la montagne de Mazi, région de Mardine. Son père menait une vie paisible et tranquille. Il avait ses champs et son troupeau. Il était estimé dans son clan, car il avait sept enfants, tous des garçons. Ehmed était l'aîné. Dès son bas âge il faisait le père. Comme c'est de coutume, dès le premier jour, on l'a muni d'une flûte de père. Nous laissons maintenant Ehmed nous raconter sa vie et ses aventures de chansonnier.

«J'étais très jeune lorsque j'ai commencé à faire paître nos troupeaux à travers plaines, et montagnes. Dès les premiers jours je portai les armes, un sabre et un pistolet, pas de ceux d'aujourd'hui, un pistolet (kurmandji). Je passais mes soirées dans la société de l'agha. Jeune et timide je me retirais dans un coin et j'écoutais avec délice les chansonniers qui chantaient. J'admirais la musique. Petit à petit je commençais à les imiter. A la campagne à côté de mon troupeau je passais mon temps à chanter tout ce que j'avais entendu le soir, dans la société de l'agha. Mes camarades n'avaient pas hésité à dire à nos aghas que je me plaisais à chanter. Les aghas ont insisté et je fus obligé de chanter devant eux. C'est ainsi que j'ai commencé à m'initier au métier du chansonnier et à être connu. La chanson qui m'a fait connaître est celle que je viens de vous chanter, le Delal.»

Au bout de quelques années le chansonnier Ehmed se brouille avec son père et quitte la maison paternelle. Il se procure un fusil et quelques camarades et organise des bandes; voleur de grand chemin, il dévalise les passants. Rechid bey chef des kikan, fait chercher Ehmed et le prend à son service. Il est alors un chansonnier classique, favori du chef. Doué d'une véritable âme d'artiste Ehmed se brouille aussi avec son chef et se dirige vers Wiranchehir. Nous laissons Ehmed nous raconter sa mésaventure de Wiranchehir.

«Rechid bey s'était fâché avec moi. Je l'ai quitté et je suis allé à Wiranchehir. J'avais l'intention d'entrer au service de Ibrahim pacha, comme chansonnier. A Wiranchehir

j'avais un compatriote, je suis allé chez lui, nous devions aller ensemble chez le pacha. Entre temps quelqu'un m'avait dénoncé au pacha en disant que j'étais «kiki» et de l'entourage de Rechid bey et que j'étais venu pour espionner. Rechid bey et le pacha étaient ennemis l'un de l'autre. On m'arrêta et on m'amena chez le pacha. Le pacha me confia à un nègre du nom de «Ewat» qui faisait fonction de geôlier. Ewat me réserva la meilleure place dans sa prison, me fit coucher sur le ventre et me passa une lourde chaîne au cou. La femme du pacha (Khansa) était la fille d'un agha des (kikan) de (Dawid) agha. Mon hôte avait trouvé le moyen d'avertir (Khansa) qu'un kiki était en détention. Khansa intervient et Ewat me mit en liberté. Alors je suis rentré dans ma tribu et j'ai continué de servir mon chef.»

Ehmed après être resté encore quelques années chez Rechid bey se décide à le quitter de nouveau et s'en va chez (Omer) bey chef de la tribu (Dumiliyan) au nord de Mardine. Il est son chansonnier.

Ehmed possédait une belle jument. Omer bey, un jour, en fit cadeau à un de ses hôtes et donna de l'argent à Ehmed pour qu'il aille acheter une autre. Ehmed quitta la montagne et vint à la plaine pour chercher une nouvelle monture. Il rendit visite à sa famille. La tribu des (kikan) se préparait à la guerre contre Ibrahim pacha. On dit à Ehmed: où veux-tu aller nous sommes en état de guerre. Ehmed resta et prit part à la guerre. [1] D'ailleurs les kikan et les milan n'étaient pas en bon termes. (Huseyné Qandjo) chef des kurdes yézidîs (Dinan) et allié de Ibrahim pacha avait tué le frère de Rechid bey, (Temir) agha.

Du côté des chammaris outre les kikan se trouvaient, principalement les (Qareguetchi) et les (Tay).

C'est encore Ehmed qui fait le récit suivant :

«Entre (Qarejdagh) et (Wiranehehr) nous avons pris contact avec les forces de Ibrahim pacha. Nous avons essuyé une défaite terrible. Nous étions trahis. [2] Le chef des Tay, bien

[1] A cette époque la Hégémonie de la plaine se trouvait entre les mains des chammaris. Plusieurs tribus de la plaine, kurdes et arabes, leurs payaient tribut. Ce tribut était désigné par le mot *exweytki*, droit de mûlter ou de protection. Les chammaris s'engageaient vis à vis de leurs tribus vassales à les protéger contre les agressions étrangères et tout sorte de vol, de sorte que tout bétail ou autre chose volé à ces tribus devaient être restitué par les chammaris à ces derniers. Et évidemment les tribus vassales prenaient forcément part aux expéditions, même si celles-ci étaient dirigées contre les kurdes. Ibrahim pacha lutta contre cette hégémonie, survenue par suite de l'invasion des tribus béhaziennes dans la plaine de Mardine.

[2] Nous n'avons aucune autre preuve de cette trahison que le présent récit de Ehmed.

qu'arabe, avait mis Ibrahim pacha, au courant de la situation de notre armée. Les Tay quoique soumis aux chammaris ne voulaient pas que ces derniers soient maîtres absolus de la plaine. Les forces de Ibrahim pacha nous ont attaqué avant que nous ayons bivouaqué et pris les dispositions de combat. Quelques unes des tentes étaient dressées, d'autres se trouvaient encore sur le dos des chameaux. Nous avons laissé tout notre matériel sur place: tentes, troupeaux et autres. On entendait le cri des enfants et des femmes, sur le dos des chameaux effrayés qui couraient à tort et à travers. Presque 24 heures sans arrêt nous avons fuit et grâce à nos chevaux nous nous sommes sauvés.»

Plustard Ali Abdourrazaq le neveu de Faris de Abdulkerim qui était pendu à Mossol, organisa une *razia* contre Ibrahim pacha. Le pacha le prit vivant et l'expédia à Constantinople. Le Sultan Abdul-Hamid, qui avait pour principe de diviser, fit un bon accueil à Ali, le décora et l'autorisa de se rendre chez lui.

(à suivre)

D. A. BEDIR-KHAN

#### CHANSONS de BOTAN :

##### KÈRE

Le printemps devient agréable auprès de  
 (ce Seqlan  
 Bleue devient la fleur de la trèfle, celle  
 (de la prairie fleurie  
 Si j'avais été une brebis sans cornes  
 Les trois nuits, les quarantes jours et le  
 (kanûn, dans la neige et la tourmente  
 J'aurais retiré ma tête sous ton manteau,  
 (ô pasteur 5



Mon cœur est un cœur plein d'enthousiasme  
 On commence de notre maison à se  
 (disposer à traire  
 Personne n'a vu, dans les époques et le temps,  
 (qu'on prenne le prince comme pasteur



Puiss-je être devenu une souche sèche  
 Me trouver sur la petite pente de Qaratchokh  
 (dans une terre bien arrosée 10  
 Que les filles des Mouçarechan, des Khérkan  
 (des Teyan, des Miran, arrivent, qu'elles  
 (ne prennent sur le dos  
 Qu'elles me portent au marché de Djézireh  
 (et me vendent pour du khol  
 Que l'on mette et applique sur l'oeil droit,



(l'oeil gauche demeurant tel qu'il est



Mon cœur est plein d'enthousiasme  
L'un de mes yeux est lune, l'autre est étoile 15  
L'un de mes seins est mosqué, l'autre est église  
Deux sources ont jailli sur ma poitrine  
(et mes seins  
Une est Rûsor «de ruisseau rouge» l'autre est  
(Spipèl «des ondes blanches»  
Tout malade, tel que depuis sept an il ne  
(s'est pas redressé  
S'il en boit une gorgée, de jour en jour  
(il ira vers le mieux 20



Je te donnerais Banè Bamech avec le tapis  
(de feuilles mortes  
Je te donnerais le Seqlan avec son moulin  
Je te donnerai le Souk sombre «de Djizirch»  
(avec les pièces d'étoffe



O mon émir, que le feu tombe sur Banè  
(Bamech et le tapis de feuille morte  
Que l'avalanche tombe continuellement sur  
(le Seqlan avec son moulin 25  
Que Dieu détruise le Souk sombre avec  
(les pièces d'étoffe



Laisse mon garçon, nos maisons sont parties  
(pour les paturages d'été et les places  
(où la neige est à demi-fondu  
Les lieux des campements sont devenus les  
(toits des khans, pendant la chaleur de l'été  
Et les emplacements des brebis et agneaux  
(malades  
Que le pouvoir de mon émir devienne grand 30

### RÈDÛR

C'est le soir, c'est la période de la pâte  
Toi, sur la tête du bien-aimé il y a de la toile  
Ta taille maison détruite - avec des  
(anneaux et des chaînes (1)  
La fille disait: ô garçon, éloigne ta bouche  
(des mouches et des signes de ma gorge  
Le garçon disait: que la maison du père soit  
(brûlée! ne mange pas de la douleur  
(l'étoile du matin est loin de nous 5



Dans cette pluie dépêche toi dépêche toi  
Toi, sur la tête du bien-aimé il y a de la toile  
Ta taille ô fine, porte toujours une robe verte  
Depuis la prière du maghreb, j'allais au  
(pèlerinage des mouches et des signes

[1] Le vers ci-dessous ommis pendant la composition, man-  
que dans le texte kurde: «Bejna te kubanîle tokan à zînêr»

Jusqu'à ce que blanchisse l'aube du matin 10  
C'était la guerre des moustaches pareilles à  
(l'iris et des boucles superbes



Je t'ai vue dans la ruelle de Khidir Mame  
J'ai saisi le pan d'une robe de Damas et je  
(ne t'ai jamais quitté  
Depuis la prière du maghreb je suis allé au  
(pèlerinage des trois boucles blondes  
Jusqu'à l'aube du matin je n'ai pas quitté la  
(paire des pointes jaunes «des seins»

### O MEMOKA

O Memoka, ô jeune fille, mon cœur n'est  
(que plaie et feu  
Allons, viens ouvrir le devant de ma veste  
(et les boutons  
Le monde m'était un éternel paradis, tu  
(me l'as fait enfer



Leve toi, Memoka, ô jeune fille, la  
(poitrine hâlée  
Avec des lignes (harmonieuses) et des  
(mouches et des signes 5  
Tu as détruit pour moi les accès de Djolamerg  
Les jardins de Wan



C'est le matin, trois familles de notre village  
(ont chargé  
O jeune fille, ô Memoka à la poitrine hâlée  
Avec des lignes (harmonieuses) et des  
(mouches et des signes 10  
— Ma Memoka de l'origine de la maison de  
(son père est belle—  
Tu as détruit pour moi la maison des garçons



Leve toi, Memoka, ô jeune fille, la poitrine  
(hâlée  
Avec des lignes (harmonieuses) et des mouches  
(et des signes  
Tu as détruit pour moi les accès de  
(Djolamerg 15  
Les jardins et les vignes de Wan (2).

### COMMENTAIRE

Les trois chansons kurdes dont on a lu ci-contre  
le texte et la traduction constituent des échantil-  
lons assez caractéristique de la poésie populaire  
kurde. Elles ont été recueillies dans la tribu Jéliyan  
(fraction de Botan), et transcrites telles que les livre  
actuellement la tradition orale, qui assure leur  
transmission depuis un temps difficile à déterminer;  
elles ne constituent, dans leur forme actuelle, que

[2] Cette strophe est la répétition de la seconde, dans la  
partie kurde, elle n'a pas été répétée.

des fraguements d'ensembles plus considérables qui ont été partiellement oubliés par le chanteur.

Comme la plupart des pièces lyriques populaires déjà publiées par «Hawar», ces trois chansons traitent le thème éternel d'un amour passionné; elles fourmillent de comparaisons et d'allusions suggérées par la vie quotidienne kurde et exprimées d'une manière souvent très brève, qui constituent pour le lecteur étranger un symbolisme assez difficile à pénétrer. Les remaniements instinctifs que les chanteurs ont fait successivement subir au texte traditionnel, au gré de leurs préférences, obscurcissent encore le sens de la plupart de ces morceaux, dont la forme parfois dialoguée, par ailleurs, ne se révèle qu'assez laborieusement. C'est pourquoi un bref commentaire de ces textes ne paraît pas inutile, encore que le lecteur ne puisse manquer de retrouver, même à travers les imperfections de la traduction, l'élan lyrique très original et très spontané qui marque toute la poésie populaire kurde.



Le titre de la première pièce «Kêre» n'a pu recevoir aucune interprétation satisfaisante. Après une introduction impersonnelle (vers 1 et 2) le dialogue commence entre la jeune fille et le garçon et paraît se poursuivre comme suit: jeune fille vers 3 à 8, garçon vers 9 à 13, jeune fille vers 14 à 20. Ici intervient une tierce personne, l'émir, dont les propositions occupent les vers 21 à 23 et entraînent une réplique de la jeune fille (vers 24 à 30).

L'introduction situe la scène près de Djéziréh (ruisseau de Seqlan). Les premiers paroles de la jeune fille expriment une idée de faiblesse: brebis sans cornes, puis durant les trois nuits (les plus longues de l'année) les quarante jours (les plus froids de l'année; il s'agit d'expressions courantes au Kurdistan) et le kanân (ensemble des deux mois correspondant à Décembre et Janvier, saison très froide) aurait été enveloppé dans le manteau du pasteur tandis que la jeune fille reste sans aide et sans appui.

La strophe suivante est assez obscure. Il est possible qu'il y ait ici une lacune et que, dans le texte primitif, soit intervenu après le vers 5, l'émir, qu'on retrouvera au vers 21. En ce cas le vers 8 constituerait une réplique piquante à l'émir qui aurait offert sa protection. On pourrait trouver là, en dehors de cette hypothèse une allusion à la légende assez répandue d'un prince qui se serait fait pasteur. (Banefcha Narin)

Le garçon (vers 9 à 13) formule à son tour ses vœux sous une forme imagée, inspirée de la vie des nomades; il envie la souche que les filles des nomades ramassent et vendent pour s'acheter du kohl. La localisation géographique (pente du Karatchogh etc) est très précise; il s'agit de l'extrémité du territoire appelé «Bec de Canard» dans les pays sous mandat français.

La réplique de la fille (vers 14 à 20) contient une série de comparaisons imaginées; allusion à deux ruisseaux de la région de Botan. L'émir (vers 21 à 23) lui offre une forêt, une rivière avec moulin, tout le marché aux étoffes de Djéziréh; mais elle voue ces présents à la destruction (vers 24 à 26) et demande qu'on «laisse son garçon», car la saison

s'avance, ainsi que l'indiquent des allusions au départ pour les pâturages d'été (vers 27—29). Le dernier vers paraît destiné à faire oublier à l'émir ce que les paroles précédentes pouvaient avoir de trop audacieux.



La seconde pièce (Rêdûr, chemin lointain) commence également par une introduction impersonnelle (vers 1), puis vient un dialogue qui paraît ainsi découpé: jeune fille (vers 2) garçon (vers 3) jeune fille (vers 4) garçon (vers 5) jeune fille (vers 6 et 7), enfin à partir du (vers 8) le garçon parle seul. Encore que la répétition soit une des procédés lyriques favoris en kurde, les (vers 2 et 3) qui reproduisent des fragments de la suite sont peut être interpolés par la fantaisie d'un chanteur.

Le sens de cette chanson apparaît assez clairement. L'intérêt de la pièce réside dans l'accumulation d'allusion symboliques, dont plusieurs reviennent constamment dans la poésie kurde et y constituent des véritables clichés.

La «période de la pâte», c'est l'heure de la soirée où les femmes pétrissent la pâte devant les fours, heure propice aux conversations entre filles et garçons et à l'ébauche des idylles.

Les impécations «que la maison du père soit brûlée» etc... reviennent fréquemment. Moins qu'un vœu formel de destruction, elles paraissent traduire le désir de voir arriver tout malheur plutôt que la surprise et la séparation des amants. L'allusion, très fréquente, à l'étoile du matin, signifie que la nuit est encore peu avancée et que les amants ont encore du temps devant eux.

La plupart des allusions précises à des détails corporels sont stéréotypés: «les mouches les signes de la gorge» «le pèlerinage des trois boucles blondes» d'autres sont moins habituelles: «les moustaches pareilles à l'iris», c'est à dire adroitement contournées. Les «points jaunes» sont celles des seins ou, selon une autre expression typique «le lait n'a jamais circulé».



La troisième pièce «Memoka» reproduit l'invocation du jeune homme à sa bien-aimée. On y saisit sur le vif le procédé lyrique de répétition; on y retrouve encore les allusions stéréotypées à la beauté corporelle. Les figures symboliques sont faciles à comprendre; l'amour de la jeune fille retient le garçon, cependant que l'on s'apprête à partir pour les pâturages d'été (vers 8); c'est ainsi que le jeune homme a cessé de monter chaque été vers le Nord, Wan-Djolamerg, (vers 6 et 7, 15 et 16) d'ailleurs il s'est brouillé, à cause d'elle, avec ses camarades (vers 12) toutes ses habitudes rompues, sa vie est devenue un enfer (vers 3).



Il est difficile, dans l'état actuel de notre connaissance du folk-lore kurde, de déterminer l'origine et l'évolution de telles pièces lyriques, certainement très remaniées au cours de leur transmission orale.

Il ne serait pas sans intérêt de les comparer avec des pièces plus considérables, parceque mieux conservées, comme le «DELAL» publié dans le présent numéro.

PIRSİYARKERÊ KURDAN





www.arsivakurdi.org

Xwedî û gerînendeyê berpirsiyar : **Mîr Celadet Alî Bedir-Xan**  
**Şam—Sûriye**

Directeur / Propriétaire : **Émir Djéladet Aafî Bédîr-Khan**  
**Damas—Syrie**

SAL 3  
HEJMAR 25  
YEKŞEMB  
19 TEBAX 1934

# HAWAR

ANNÉE 3  
NUMÉRO 25  
DIMANCHE  
19 AOUT 1934

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## DI VÊ HEJMARÊ DE

Lavij	C. A. Badir-Xan
Şêx Evdîrehman	“ “ “
Çarînên Xeyamî	Dr. K. A. Bedir-Xan
Şin	B. Ferîdûn
Ez û Dilber	Cegerxwin
Bêriya Botan	Herkol Azîzan

## BIRÊ FRENŞIZÎ

<u>Le beau de la steppe</u>	<u>D. A. Bedir-Khan</u>
De la grammaire kurde	“ “ “
Lavij	“ “ “



ÇAPXANA TEREQÎ  
ŞAM — 1934



ŞAL 3  
HEJMAR 25

YEKŞEMB  
19 TEBAX 1934

# HAWAR

ANNÉE 3  
NUMÉRO 25

DIMANCHE  
19 AOUT 1934

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

---

DESTNIVÎS: Ji mêj ve ye xwendevaninen me dil kiri bûn ko em di hawarê de, carinan, çend xêzikên destnivîs belav bikin. Hingê herfên destnivîs bi dest ne diketin. Ji lewra me nikari bû em daxwaza wan bînin cih. Lê îro herfên me ên xweser û destnivîs hene. Ji îro pêve emê di her hejmarê de çend xêzikên destnivîs dê belav bikin û daxwaza xwendevanên xwe dê bînin cih. Bi belavkirina elfabêya kurdî, bi herfên gir û hûr, dest pê dikin.

A B C Ç D E F G H I J

K L M N O P Q R S

T U V W X Y Z

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o

p q r s ş t u û v w x y z

1 2 3 4 5 6 7 8 9 0



## BÊRÎYA BOTAN

Ji GIYANÊ ŞÊX EVDIREHMANÊ GARISÎ RE  
Kani Dêrşew, ka Herekol, ka Kepir  
Ka zozanên Bavê-Têli ka kê bir

Dibêjin ko Burca-Belek hitweşi  
Text û bextê botiyan de ka geşi  
Seyrangeha Bandûwa Zin ma çi bû  
Naxuyin qet xîşr û xemlên wê li kû  
Ka Westani ka Qesara ka kani  
Kani zozan, cihên bilind kebanî  
Awan ji bit kani Beko, ka nêreng  
Kani ew bezm, kani bade, kani beng  
Basiret kû, neqşibendi, terîqet  
Ka şêxên me, kani rêzik şerîet  
Kani Seqlan, Seqnefis kû, Nêrgizî  
Gul û rihan zeriyanê, tev rizi  
Ka Azizan, şêx û seyda û axû  
Kani ew qesr, tev bilind û tev awa  
Kani Sifti, kani jinmîr û cêri  
Kani ew rim, ka huwêzî, şesperi  
Mir Miheme ê neçirvan kani kû  
Çeper li kû, kovi, hevor, nêri kû  
Ka gêra wi, Gera-Xani, gejgering  
Ka şalên me, bekirbegî, xweşdevling  
Kani mîrek, ka mifirdî, kani beng  
Kani lo lo, lê lê li kû, kani deng  
Kani çeper, bestî li kû, ka celab  
Nêrekew kû, pêjn û dengên qeb û qab  
Bor-mirîşkan tenik biye kete ba  
Ez botî me dişexilim her bi pa  
Ka banê me, yê Azizan, kani war  
Kepirê de ne kozik in, ne ji dar  
Pa ez bêjim, pa dizanim çi bêjim  
Pa bi Xwedê wek nexweş im û gêj im  
Kani diwan, ne diyar e xafa mir  
Ka çirokbêj, dengbêj li kû kani pir  
Teter li kû, Axayê-Sor û ew reng  
Tenbûr û ney, kemeçê û zirne deng  
Kani dawet, qelisêl û medfûnî  
Tirşik, parêv, arok, melîr, hêkrûnî  
Kani civat, fil û şetrenc, ka zindan  
Ko tê de mir, şahê mekrîb, Mir-Alan  
Dotmir li kû, ka mir Şeref, mir Ezin  
Kani bavê sitiya Zin, mir Zengin  
Beg û axa kani tovrind, kani dot  
Ne mir mane, ne mirîfî, ne ji col  
Ne Gurgêl e, ne Finik e, ne Cizir  
Ne risipi, ne kefxwê ye, ne kizir  
Ne Buhar e, ne Havîna mir Şeref  
Zivistan e, dwanzde hêv tev ber û berf

Ne dêmîr in, ne şahînet, ne hevşin  
Kani mir Şem, kani Tacin û Gurgin  
Kani ew bext, kani bextî, ka koçer  
Sadon li kû, ew serekê şevînger  
Kani mîrxas, ka xulam û mifirdî  
Ka li kû inan ew gernasên nedîti  
Ka zirtxane, gurz û cidî, kani hesp  
Xeucer û rim, kani şûrên rast û çep  
Pira Bafet belê ev e, kevane  
Kevin hûnc, ne tiri ne, sorane  
Ji Delavê qitikan ve naye deng  
Kew û kevok di şinê de ne man çeng  
Şeylo hûne kantiyên me ka rejû  
Mazliyan de ne pel mane ne gezû  
Kani Xani, Feqelî-Teyran û Mela  
Ê cizerî, ne ji bate, kes ne ma  
Şax li kû ma, ka Berwarî, ka Dêrgul  
Tu tişt ne ma, vemirine deng û gul  
Kani Xêrkun, Harûnan û Jêliyan  
Şûvi li kû, Welat-Kelhok û Goyan  
Batûyan kû, Welat-Kilis, Sipêrtî  
Ne Soran in, ne Mûserêş, Silopi  
Kiçan, Teyan, Dûdêran kû, ka Miran  
Hacibêra, kani Şernex, Garisan  
Ne Hesint, ne Elikî, ne Memî  
Eruh li kû, ne Aliyan, Gergerî  
Ji Garisan ne koçer in, ne dêman  
Kani Zêwki, Welat-Kêver, Ebasan  
Dawûdiyan, Omerkan ji, ka Kheran [1]  
Ma kher hûne, tu deng naye ji tuwan  
Kani Xaltan, bira Zerdest, Hewêrî  
Şûrkêşên me, filehên me, Hevêrkî  
Ka şikefta mîr Miheime, ka peri  
Kani Dasnî, kani keçên surperi  
Kani Şingar, ka xwalên me, yezidî  
Balav hûne, bê rêzik in bê serî  
Dêra-Reben weke berê vala ye  
Hejale ji diyar niye raza ye  
Mifiryan kû, kani lavij, lajebêj  
Tir û kevan, şûr û mîrtal û destrêj  
Ne eşir in, ne bajari, ne fileh  
Burd û kelat, ne seqman in, ne şergel  
Kevnar ne man û nayin pê tu nûjen  
Tari her der, ne kulek in ne rojen  
Di Tanzê de ne feqelî in ne mela  
Medresa-sor xerabe ye ji nû va  
Kela Ewrex ber bi ba ye, kela kevn  
Tê de îro pîrhevok in û çend levn

[1] Me «kher» yanî mirovê ko nabihze, bi vî awayî nivîsand, da  
ko ji kerê heywan bêle veqetaniin. Ji xwe ev «kher» ji yan dîn stûrtir e.

Kani şêx in, Evdîrehman garisi  
 Ew ji kustin sorgula me çilmisi  
 Herê lawo tev de çûne nînin  
 Destê me de ne hesp mane ne ji zin  
 Kurdistanê to abadin, her heyi  
 Îro, sibe û hergav ji dê helbi

Bêrût : 29 Çiriya Paşin 1932

### HEREKOL AZIZAN

Di vê nivîsarê de hin nav û tiştên din wek navên cih û eşîrên Botan hene ko ji bona herkesî ne nas in. Ji lewra emê wan ji xwendevanan re; bi rêz ve û jê re bidin zanîn. Jû pêve û bi vê hêncetê emê tiştên din ji bi ser xî ko pelinen ji diroka cihê Botan û hin çîrok û çîngîrokan wî ne.

**HEREKOL** — Ji çiyayên Botan ê bilantir e. Havîn û Zivistan bi herf e. Qehremanekî Yewnanistana kevn heye, dibêjin-ê «Herkûl». Di navbera van her du navan de nîzingahike eşkere heye.

**KEPIR** — Di cilê Botan de zozanekî bi nav û deng e. Jê re zozanê Bavê-Têlî-Begî ji dibêjin.

**BURCA-BELEK** — Burca mirekên mala Azizan e. Navê Burca-Belek lê kirine, ji ber ko berên burcê reş û sipî ne. Avabiyeke kevn, qahim û stîwar e. Birekî wê ê nezîr îro xerab e. Hin birên himê wê di şetê Cizîrê de ne.

**WESTANÎ** — Di rojhelatê Cizîrê de meydanekê fireh û mezin e. Di zemanê herê, di vê qadê de zîrtxaneyek hebû. Pehlewan tê de hinerin çêdikirin, xelkê hesp dibezandin, cidî dilchistin. Di wêxtê şerî de leşkerê Botan di vê meydanê de digiha hev û diket rêzika ceng.

**KANIYA-QESARA** — Kaniyeke Cizîrê ye. Xelk cawê xwe tê de diqesirînin. Ji lewra jê re Kaniya-Qesara dibêjin. Navê wê kaniyê di Memê-Alapê de gelek derbas dibe. Pîstî ko Mem digehe Cizîrê, di roja sersalê de derdikeve gerê, dikeve nav xelkê, û li serê vê kaniyê de rastî Zînê têt.

**SEQLAN** — Di nivrowê Cizîrê de çemekî kiçik e. Di dora wî de çend dehlîk hene. Serkaniya vî çemî di Çiyayê-Spî de ye. Havîn û Paizan dehlên wî û parêzên dorê gelek spehî çêdibin.

**SEQNEFÎS** — Bal navê Sitiya-Nefîs ve hatiye nav kirin. Sitiya Nefîs jinek ya mirekî Botan bû û gelek hej vê kaniyê dikir. Ji bo sivikahiyê dibêjin-ê Senefîs, an Seqnefîs. Di ser kaniyê re qubek heye. Ava wê gelek çerm e, xelk li Zivistanê jî dikevin-ê. Buharê gava av lête raserî kaniyê di dora wê de her lextil kulîlk şîn dibin. Di stranên Cizîrê de navên Seqlan û Seqnefîsê gelek derbas dibin. Wekî niho :

Cizîr xweş meqau e Berherî Misr û Şanî e  
 Seqnefîs hemama me ye « . » xulama me ye  
 Seqlan piçkî zêde ye

**NÊRGIZÎ** — Ev ji jî seyrangehên Cizîrê ye. Di Cizîrê de du cihên nêrgiziyê hene. Yek di aliye rojhelat, a din di aliye nivro de ye. Ji ber ko tê de nêrgiz çêdibin navê nêrgiziyê li wan kirine. Ji van pêve di dora Cizîrê de gelek gulgeşt û seyrangeh hene. Wekî niho : Reze-Mîr, Cafere-Sadiq, Cuhtikê-Tûyan, Şkeftan, Mîr-Hesen, Eyn-Tîrb, Key-lûşk, Pira-Bafet, Emerî, Xeyda, Lawikê-Xerîb, Keh-

niya-Emo, Serê-Sinsalê, Binê-Burcan, Newala-Tilik, Çemê-Kursî, Sitiya-Heyat, Mam-Elo, Kehniya-Evdil-cellî, Mîr-Evdel, Banê-Cîrf, Şkefta-Dilop h.p . . .

**BORÊ-MIRÎŞKAN** — Borekî şetê Cizîrê ye. Dema ko ava Diclê boş dibe û çarnîkarên Cizîrê digire û Cizîr tê de wek navrokî dimîne, qeta avê a kiçik dikeve aliye Torê û deşta Hesinan. Hingê xelk xwe vedimalin û bi peyari di vî borî re diborin; av tenik e. Ji lewra dibêjin-ê B. Mirîşkan.

**TOVRIND** — Di şteçalîyê de «torin» tete golin. Eslê wê «tovrinda» e, yê ko tove wî rind û pak, malbata wî nas. (v) ji navê û (d) ji paşiyê ketine.

**BEXTÎ** — Eslê pîrsên bot, bolî, botan (bext, bextî, hextan) in. Şerefname ji holê dinivîsine. Di vî sîklî de nîzingiyek bi navê eşîra Bextiyarî tete dîtin.

**DELAVÊ-QITIKAN** — Navbera Westaniyê û Pira-Bafet de delavek e. Havîn û Paizan qitîk tîn-ê û jê avê vedixwin. Hingê xelkê Cizîrê li dora wî davan vedidin û qitikan digirin.

**EŞÎR** — Eşîrên Botan bi vî awayî lêk ve dibin : Koçer û dêmânî. Koçer jî du bir in, çoxsor û şilî. Çoxsor : Miran, Atikan, Dudêran, Dawûdiyan, Soran, Garisan. Şilî : Batûyan, Teyan, Xêrkan, Kîçan, Mûseraşan. Eşîrên Deşta-Slopî : Hewêrî, Zewkî, Spêrî, Reşikan. Dêmânî : di vî milê avê de : Meman, Harûnan, Hesinan (jêrin û jorin) Ehasan, Aliyan. Di wî milê avê de : Berwarî, Erub, Garisan, Welat-Kelhoc, Welat-Kêver, Welat-Kilîs, Şûvan, Jêliyan, Dêrsow, Haci-Aliyan, Kheran, Harûnan, Slopî. Haci-Bêra : Şernex, Goyan. Eşîrên Botan tev de siliv in.

**MÎR MIHEME** — Dibêjin ko dilê Mîr Mihemed begê nêçîrwan keti bû keçperiyekê. Mîr periya xwe li çiyê di şkeftekê de didit. Jê çend zarowên wî jî çêbû bûn. Periyê lê qewiti kiri bû ko kes bi wan mehesin. Bi vî awayî mîr û periya xwe li rex hev jîyn û kêf kirin. Rojekê mîr Miheme bi hênceta nêçîrê, dîsan çû bû bal periya xwe ve. Berî ko bigebe şkeftê xulamên xwe li cihêki lûstî bûn û ji wan re goti bû ko medin pey wî. Mîr çû; xulam, mifirdî pêleke drêj li bêviyê man. Mîr ne dilhat. Dinya li wan dibû évar. Yekî ji xulamên gûh ne da hevalên xwe ji wan veqetiya da rê û çû, li mîr bigere. Mîr û perî li her devê şkeftê raniştî bûn. Zarowan di dora wan de dileyistin. Mîr herê xwe da bû şkeftê, keçperî di peşherê wî de bû. Xulam wekê ew ditin jûvan bû, dil kir ko xwe vegêre û şûn ve vegere. Lê çavê periyê pê keti bû. Periyê bawar kir ko mîr bê-bextî lê kiriyê; bû firolek û digel zarokên xwe wînda bû. Mîr bi lîzeke ecêb ket. Xulamên darûbestek çêkirin, mîr lê kirin, herê wî dan Cizîrê. Bi rê ve, mîr çû rûmetê. Malikên jêrin jî stranekê ye ko wesiyeta mîr Miheme dibêjin-ê

Ez dê bimirin wesiyeta min li erdê medin  
 Qet min mebin nav çu miriya  
 Min deynin tabutekê de, ser milê çar mifirdiya  
 Min helbin ser girê Qirnasise  
 Ber devê her çar geliya  
 Da subehî li min xweş bê  
 Dengê şexşana, terqêna saxê di van nêriya  
**DÊRA-REBENÊ-KHER** — Ji Herekolê ji hemî deran

bilintir e. Wextê Mihemed begê nêçirvan de xaniyek li serê wê çêkiri bûn, ji bona ko biceribînin gelo mirov dikare Zivistanê lê biborine. Du zîlam digel ay û nan xistine xênî û hiştine. Buharê hatine ser û ditine ko yek miriye û yek maye; ê mayî kher bûye. Ji bona vi qasî navê wê danine Dêra rebênê kher.

**NÊRÎYÊN-MÎR**— Efnô û Hejale du nêriyên mir Miheme bûn. Mir gelek hej nêçira pezkûviyan dikir. Bi xwe nêçiruanekî serdeste bû; ji lewra digotin-ê şêxê nêçirvanan. Rojêkê di nêçirê de du kehrikên spehî girtin û nişani mir dan. Mir navê yekî kir Efnô û yê ê din Hajale. Di wê heyamê de tukes bê izna mir nikari bû here nêçira pezkûvî. Wekê diçûn ji mir qewitî li wan dikirin; bizinan mekujîn, tenê nêriyan bikujîn, ji Efnô û Hejalê pêve. Ew ji bona tov dihiştin. Her du nêri bîst salan emr kirin û gelek mezîn û spehî çebû bûn. Rojêkê mirê Amediyê—li gora gotinekê yê heکاریان—nêriyek pezkûvî kuşt. Xelk ji mezinahiya wî man ecêbmayî. Stîruhên wî pîvan bi heft bihustan derketin. Mir got: «Ezê van stîruhan ji mirê Botan re bişînim, ka ên holê di çiyayê Botan de hene» Ser vê yekê mir rabû û stîruh jê re rêkirin. Mihemed beg ji li wan ecêbmayî ma. Emri nêçirvanan kir ko herin nêrikî welê bikujîn ko stîruhên wî jê meztir bin. Nêçirvan bi çiyê ketin çend rojan geriyan, nêrikî welê bi dest ne ket. Efnô û Hêjale hebûn. Ev her du nêri her dilê mir de gelek ezîz bûn; dilê wî gelek bi wan ve bû. Lê ji bona ko ji mirê Amediyê fehitkar mebit da çavê xwe ko nêriyên xwe bi destê xwe bikuje. Bi xulam û nêçirvanan ve derket nêçirê, çû raserî Dirba-Şkêr, di Çepera-Stûnê de rûnişt. Xulam û nêçirvan pez xira kirin, bi ser mir de anîn. Hejale li pêşiya pez de dîhat, mir sê tîving berdan-ê, her sê derb lêketin, lê nêri bi xwe ne ket û ji mir daborî. Efnô li dûvê pez de bû. Mir bi derbekê Efnô cih de êxist. Dilê mir gelek pê ve ma. Li dora xwe fedkiri, çavê wî bi xulamekî xwe—Hesen—ket, jê re got: Hesen carekê bavêje ser. Hesen:

Ezê li galiya fekirim, bi hawar e  
Terqên hati bû, nizanîm şexxane ye, berwêc  
[an helqedar e  
Efnô kuştin, Hejale babê giska bi sê derba  
[birindar e

Nêçirvanan dan pey Hejalê ji, çûn pişt çeperê.  
Fedkirin ew ji wê ketiye. Mir ji xwe gihande wan.  
Hesen disan avête ser:

Ezê li Çepera-Stûnê fekirim, raserî  
[Dirba-Şkêr e

Mihemed beg xwe ji hewalan berda bi, çendik  
[wek Şeroyê serxansi, Resûlê findikî pê re  
Serê Hejalê jêkirin, bi stîruhên wî ve  
[rêkirin mirê Amediyê re

Stîruhên Hejalê pîvan bi neh bihustan derketin.  
Mirê Amediyê li stîruhnen ji wan drêjtir geriya,  
lê ne ketin dest.

Malikên jêrin ji ji stranên mir Miheme ne.

Ezê li Mihemed begî fekirime, bi vê  
[xemlê bi vê kokê

## EZ Û DÎLBER

Dilber tu were carekê ez te bibinim  
Ez dil bibirin im  
Ez iro liser textê suxen pirê evin im  
Der rûyê zemîn im  
Ger ez te dibînim di şevan fikr û xeyal e  
Yan xewn e, betal e  
Ger laf û guzafan ji xwe carek dirijînim  
Meixûlî û din im  
Ger pesnê te carek ji nedî ve ko dibêjim  
Ez serxweş û gêj im  
Yekta û tenê her li dinê ez te dibînim  
Lew xweş dibebînim  
Zanîm ko di bîstanê ciwanî de tu sorgul  
Ez bo te me bilbil  
Ez hêstir û xwinê ji xwe re pêk dicivînim  
Carek direşînim  
Der carekê dilgir dimirin ez hero sed car  
Behwer bike ey yar  
Pêtek ji evinan te di dil da digerinim  
Dil pê dikewinim  
Dermanê evina te çi ye bo me bibêje  
Ger dût û dirêj e  
Dermanekî pir qenc e mirin ez dilivînim  
Ferhadê Şêrin im  
Rîstem bi ki gerden bişiki der ben û davê  
Dê can ji xwe bavê  
Ez iro di henda te de yek inîrê hezin im  
Pur nar û enîn im  
Ger carekê angor ji xwe re min tu dibîni  
Tenha me vexwîni  
Şahî bigirim ez kul û derdan birevinim  
Ez camê vejînim  
Sundê dixwim ez li kenîşt û bi berê reş  
Sed carî bi Laleş  
Yek bûse ji rûyê te bidim ser nehilînim  
Ta can hiderînim  
Carek tu bi fermanî bibêje kesera min  
Ey lêvrşekira min  
Ta Canê Cegerxwîn ji me re bîne, dişînim  
Bes ten dihejinim

### CEGERXWÎN

Te xelîl û sirme ne, rişî berdan ser zirhokê  
De tu berê şexxanê ji bizinê biguhêrine, ve  
[nêrî wê sekini, li pêş bihokê  
Heçî me go te cewab da  
Birê nêriya xwe ji Kortikên-Qaso berda bi  
[Pilingê-Zêrin li xwe bada  
Nêçirvanên me kuri ne bi tîzê re, xwe  
[bi Beleka-Reş nav da



# ŞÎNA ŞÊX EVDIREHMANÊ GARISÎ

Yaro tu here çiyayê jorin  
Pîrsê bike kani Şêxê şerîn  
Çilmisîne gul bi hêstirên zer  
Geştir bigerin ji rûyê dilber  
Çavê xwe bi ruhni ke ji binê  
Canê xwe xwedî bike bi bihnê  
Zêrax e çiyayê tê de tabût  
Kevrê wi ji xwinê bûne yaqût  
Pûş u çilowên wi sade reyhan  
Razaye liser wi Evdirehman  
(Binve xweşiya dil û du çava)  
Roja me ji zû de çûye ava  
(Bê hêvi mebe Xwedê kerim e  
Azahiya kurd ne dûr e silme  
Her mileti bête xwin rijandin  
Nabit di cilhanê bê veşartin



Ava ko tu şuştîye ne ez bir  
Belki ji du çavê kurdê bêhîr  
Qelqel ji te re pelê gula ye  
Ronahiya hîv û pêlê ba ye  
Gorin ji te re dilê di xortan  
Rupelê hawar kûhê Botan  
Seydayi li pêşberê te bilbil  
Mina wi bixwendî tu sorgul  
Zarin û lixan dike li kurda  
Evda vi egiti ma li erda  
Gerçî di çiyê de maye avi  
Seyranê dikê l'samayê kovî  
Ew cih de bihête rokê bajar  
Pertalê wî duht û hûkê tatar  
Wêrano çiyao! ev çi av in?  
Ev darê bi xeml û xêz û rav in



Dilgir ne buwi tu qey liser wi  
Çawa te xwe girtiye libin wi  
Wi gotê mi ey birakê diljar  
Pir şin û girin û qîr û hawar  
Av ronik in xeml û xêz xwe  
[dan ser  
Mêvanê min î, delal û bêser  
Wey lalêşê her dilan te nas kir  
Ew kî bû, çi hû ji me cuda kir  
Zanîn û hiner kelayê mêran  
Azadî û serxwebûna kurdan  
Çawa li dinê tu navbilind bû  
Gora te liser çiya û dil bû

Mîrê min, vê paşiyê şêxê te bi kefena xwe a bi xwin keke xewa min  
û ev şîna ha ji min xwest. Ez jî vê pêşkeşî te dikim. B. FERÎDÛN

Şêxê min, welê dixuye, te bêriya me kiriye. Ji xwe me  
ji. . . Emê hevdu bibînin ji. . . Lê nizanîm kengê? Rêya te,  
rêya me ye ji. Emê bigehin te, di neqebê re ko tu çûyi. Heke  
em xwe nalezinin ne ji wê ye ko destê me ji dinyayê nabit.  
Destê me ji karê ko em bi hev re pê dixebitin, nabit. Ji xwe  
xebata me bi sebata me pêş ve diçit.

Şêxê min tu keti xewna Feridûn. Feridûn kurdeki hêja  
ye. Sezayî ziyareta te ye. Xwezi bi wi. Te jê re got, ji te re  
şinameyek binivisînit, navê te hildit. Ewî jî kir, navê te hilda,  
wesfê te da, te ji bira derani, anî bira. No, tu ne anî bira.  
Ji ber ko tu hergav di bira de yi. Em nikarin te ji bir bikin,  
me dil hebe ji. Ji ber ko tu xwe bi xwe, xwe bi me didi hesan-  
din, em bi kêmaniya te dihesin. Belê tu di laş û canê kur-  
daniyê de lebatek bûyi. Laşê me, laşê her tiştî ji lebatên ji  
hev cihê hevedudani ye. Û laş hewcedari her lebatê xwe  
ye. Tu lebat jê re ne bêkêr in, û tu lebat nikare bikeve  
şîna lebateki din. Ji lewra lebatê birî şîna xwe vala di-  
hîle. Tu çûyi, ji laşê me, ji laşê heyîna me hatî birin.  
Laş hawcedari te ye. Di melcetê de destê xwe dibe şîna  
te, tu nîni. Bi neyîna te dihesê, liber te dikeve. Ji lewra  
şêxê min, em nikarin te ji bir bixin. Ji ber ko şîna te  
vala, şop û rêça te a bi xwin, weke xwe ye.

Şêxê min, em dibêjin tu miriyî, tu mirî yî. Lê di rasti-  
yê de tu bi xwe jiyin î, jiyin tu bi xwe yî. Tu ji bona Kur-  
distanê mirî. Kurdistan heyîne e. Ji payedarbûna heyînekê  
re jiyînek divêt. Jiyin bi xwe, bi mirinê têtê pê. Tu mirî, tu  
bûi û tuê ji Kurdistanê re bibi jiyin. Jiyîneke welê ko tenê  
bi Kurdistanê, bi ax û dar û kevir û miletê wê re de vemirî.

Şêxê min, heye ko te dil kirî be, em navê te di rûpelên  
hawarê de hildin. Tu ne keti xewa min. Lê ez bi vê da-  
xwaza te hesiyam. Min şîhra Bêriya-Botan herî du salan  
nivîsand û pêşkeşî giyanê te kirî bû. Gava şîhra Feridûn  
gîha bû destê min, Bêriya-Botan, digel navê te, ji xwe keti  
bû rûpelên hawarê. Bi vê rasthatinê dilê min şa ye.  
Xwedê giyanê te ê bihuştin ji şa bikî. C. A. BEDIR-XAN

Roj bû mirinê xwe girte ser wî  
Hiv bû di dehanê hût de rêwî  
Gava ko li Cûdî bûye mêvan  
Azadî ne ma, ne ma gemîvan  
Xweziya bi kirin û an firotin  
Canê wî bihata ya guhertin



Dê hûr û giran û şêx û axa  
Mal û neviyên xwe dor bigêra  
Mêrxasi û xwanê qemtika rêş  
Bestî ne wekî şerîeta geş  
Afa zer û sor û kesk e, reng e  
Bêav û rû ketîye jêrî ling e

Hêja ne tenê ev e bi yekcar  
Axavtî li me birinê kevnar  
Sê-roka te maye sala sisyan  
Dê bêne birin serin bi qaman  
Herkes bi girin û xame bêjin  
Pesnê wî di dehyekê de gêj in  
Hişyariya me ji her sê şêran  
Xanî û Seid û Evdirehman  
Hurmiz wekî hevriyan çu cara  
Nakit te di nav gunahkara  
Roj û meh û ba çi peykê wan in  
Tiniin ji te re ji wa selav in  
B. FERÎDÛN

## ÇARİNËN XEYAM

Cendekê xwe xema dinê re zad meke  
Navê miriyan ji canê xwe re yad meke  
Dilê xwe ji bilî rûperiyân re girêmede  
Bê şerab mebe û jina xwe berhad meke

Bi şeraba gulreng di vê qesrê da  
Bi awakî hijî, bo mirovê zana  
Ko ba liban dibe bila axa te  
Sermest bikeve liber deriyê meyxana

Civata dilketiyan de rûniştine gî  
Ji xema dinê aza ne gî  
Ji şeraba şahiya te piyanek vexwar  
Dilaza û dilfireh û mest in gî

Ko ne nêçirvan î, behsa nêçirê meke  
Ser tiştên te nexwendî tefsirê meke  
Kengê seydayê manan ji te dipirse  
Ne ser ditina wi, ser ditina xwe bêje

Ho ji karê cihanê bêxeber, tu hiç tune yî!  
Him liser hayî ye, tu hiç tune yî!  
Heyîna me nêv du neyinan de ye;  
Du alî hene nêv de, tu hiç tune yî!

Ez bê şeraba zelal hijîm nikarim  
Hilgirtina barê cendekî, bê şerab nikarim  
Ez xulamê wê demê me ko meyger  
Yeke din dibêje û ez pê nikarim.

Dilê min ê jar, ê din û celdar  
ji hevîna delala min qet nebû hişyar,  
Wê rûjê de ko şeraba dilketiyê didan;  
Piyana min li xwîna kezêbê hilanin.

Dilê min her pê şeraba zelal de ye,  
Guhê min her pê kemeçê û blûrê de ye,  
Ger axa min dike kûze, kûzeker  
Ew kûze ji şerabê teji dibe her

Rojên xortiyê ne, şerab ronaktir e  
Bi rûperiyân şeraba rengzelal paktir e  
Çawan ev dinya fanî bi avê hilweşiya  
Tê de bi şerabê, mestî û xirabûn çaktir e

Îi awayê vê dinyaya qelsperwer  
Jiyîna min dibore bi kovan û keser  
Wek bûkikên gulistanan, dinê de dilteng im  
Wek lalê, rezê dinê de bi xwîna ceger

Heta kengê ji xema dinê diljar bibi  
Û çavgirin û dilxwin û keserkûr bibi  
Vexwe şerabê biken, bibêj  
Berî ko ji heleka jinê dût bibi

## LAVIJ

1 Lo, ev çi deng e, û çi heydedan e,  
û çi guregur e li ezmana? Dengê nefir  
û zirne û borizana. Hin dibêjin qiyametê  
e, û hin didêjin axirzeman e.

2 Lo, ma dengê stiruh û boqilnefir  
ji ezmana hatiye? Erd û ezman hejihan,  
û deng ket guhê miriyan, û rih ketin  
bedena. Xunava qiyametê bi ser wan  
de bariye, û heşin bûne weke giyayê  
ko buhar bi ser de hatiye. [1]

3 Lo, merovo, nezano! [2] berê xwe  
bide ezmana, çi qiyas (çiqas) heşin e.  
Û seyr bike li gerê di vê felekê. Hemû  
stêrikê di rengin e. [3] Û sibhan bike  
ji xudanê keremê re, yê ko ew li hewa  
êxistin û danine. Belê heyf û xebînela  
min tê li hisn û cemalê di wan, yê ko  
paşkê bikevin halê ko em pê ketî ne.

4 Lo, wi [4] dibêjin axirzeman e, û  
erd û ezman bi hev ketine [5] û dolabê  
di felekê sist bûne, û stêrik hejihan,  
û tîdarikê di xwe li ketinê kirine. Belê  
heyf û xebînela min tê li heşinan, li  
rihan û gulçîçek û pelên beybûn û so-  
sinan. [6] Yên ko xemlên xwe avehtin  
weke masiyê li bejê hişk bûne û mirine

5 Lo, wextê ko barî teala li dinê peve  
binê û defterê di xêr û gunehên me

[1] Ko di buharê de baran lê hatiye

[2] Lo însano, rêbilo

[3] Hemî stêrikê di rengin in

[4] Lo wê dibêjin

[5] Pev ketine

[6] Li şinê rihan û gulçîçek û li van beybûn û sosinan

Şerab ger ji heram e, her vexwe  
Bi cejn û govendê her vexwe  
Ko piyanek şeraba sor kete dest  
Dilopeke wê ji merijîne, hemiyê vexwe

De!alê! şeraba pak û zelal vexwe  
Bi navhilanina dilrevin û spehîyan vexwe  
Şerab xwîna tiri ye, tiri dibêje:  
Min xwîna xwe li te helal kiriye têr vexwe

Dr. K. A. BEDIR-XAN

bîné û li ber alemê û dinyayê û milyaketan bixwinê way li min bêmefero! Wekê [7] min bikişînin hizûrê ezê çi ciwaba rihê xwe bidim? Lo tu mêran û Xwedê dihebin.

6 Lo, dengêki bilind ji ezmana dahatiye. Go: bilezînin û mizgîniyê ji miriya re bibin; bila ji tirba rabin û xemlên xwe wergerin, weke kulilkê di rengîn. Lê Buhara qiyametê hatiye, pê ve [8] herin. Lê milyaketê di xwe kirine qasidê di we.

7 Lo dengêki xafil ji ezmana hatiye û me hay jê nîne. Go: mirîno ji tirba rabin, lê qiyameta heqelyeqîn e, xwe ji ax û ritamê dawêşînin, û xeml û belgîhê di qiyametê wergerin. Û serên xwe hilînin, weke zilika gîhayê heşîn.

8 Lo, dengê nefir hat ji ezmanan û ji heybetê felek hejiha û stêrik rijihan. Yeşîn weqatê di wan e ko çiyayên bilind bihelîhin û ber û behr bibin meydan, û heşîr-û-mehşûr bînin ko heft pê li pêkî bikevin. Yeşîn ko hakim nêta wî ko bikê diwana.

9 Lo, ma wekê qiyamet bê û bari teala hakim bê û Mikail gîlîhçî bê û Cibraîl şehde bê û Ezraîl dehwaçî bê û alem bê hizûrê, way li min gunehkaro! bi wê saetê bêmefero! Gelo halê min wê çi bê?

10 Lo, ez hawara xwe ji Xwedê re dişînim, ko dogeh xopan bê û bihedimê, ko ez bi çavan ne binim. Lê ne bes e derdê dinê û xema mirina ko ez her dibînim. Ji tîrsa jana dogehê ez dilê xwe pê dikewînim. [9]

[7] Kurdmançin hene (wekê) û (wekî) ji hev venaqetînin. Her duwan bi awakî û di şiklê (wekî) de bi lîv dikin. Di axaftinê de holê hebe Ji, di nivîsandinê de divêt ji hev bêne veqetandin. Gava bi manî (west) e, (wekê) ye. Lê ko bi mana (heke) ye, hîngê (wekî) ye. Wekî nîho: Wekê ewextê ez li şamê bûn. Wekî (heke) ez çûm şamê. Ji aliyê din dîsan kurdmançin hene ko (hîngê) û (hîngî) nîna hev bi lîv dikin û ji her duwan re (hîngî) dibêjin. (hîngê) bi manu west e: Hîngê min jê re got. Yanî: wî westî, wê çaxê, wê gavê min jê re got. Hîngî min jê re got. Yanî min hînde, hewqas, ewçend jê re got.

[8] Ji pê ve herin

[9] Lê zêde ji jana dikrê dogehê ko daim dilê xwu pê dikewînin

11 Lo, weylek li serê min bê, wekê min bi xezeb li hizûrê bikişîné û defterê di gunehên min bîné û liber civatê bixwinê û min destedesta bikin û bal dogehê ve bişînin . . . Xwezî ez ne buwama, min ew saet ne ditaya ko min dahîlinin zêremîna dogehê de.

12 Lo, stêrka sibehê hilatiye, û qewî dilezîné û destê xwe li ba dikê û lev (li hev) dixê û dengê xwe hiltîné. Go: lo merovo birev û tobe bike, lê milyaketê bi xezeb li pey we dikudîné; ko heçî tobe ne kir û xêr ji keda xwe ne kir wê îmanê jê bistîné.

13 Lo, merovo bes van şer û gunehan bike, biqere û rûne. Lê dingedinga ezmana tê û dergêhê di wan vebîne û bari teala bi milyaketên xwe ve dahatiye. Hîngî mirî hene ji tirba rabîne, û em gunehkar in û me tobe ne kir. [10] Qewî li me bisû ne.

14 Lo, ma erd şehde ne, û ezman gîlîhçî ne, û bari teala hakim e, û milyaketê di wî dawaçî ne. Lê heke ew rehmê ji ba xwe nekê, me eza nekê, me mefer bi kesî dî ve nîne.

15 Lo pa ez çi bikim, sefil im, sergirdan im, rûreş im, gunehkar im. Lo dikrê mirîné ne yê xêrê bê ko ez xafil gîrtim û ne hişt ko ez tobedar bim.

16 Lo, dilê min bi kerba qewî dinalê. Go: ne xwezî bi vê dinê û ne bi vî îş û bi vî halê ko mirin weke bazîhê li pey ordeke li pey me dizûrê û dikalê.

17 Lo, dilê min qewî diêşê û dinalê bi birina, û hemû ji kerba hêstîr ji çevan dibarin [11] weke peşkê di xwinê. Hemû ji xema mirîné û zêde ji ezabê dojeha ko daim tehlî ne, û girîn e.

[10] Û me gunehkara tobe ne kir

[11] Ji çêhvê min hêstîr dibarin

18 Lo, xwezî ez teyrek buwama ji teyrên li ber bayî, ko ez biçuwma keviya behra mezin û min xwe pê nihaya ko min xwe ji derdê dinê û ji gunehan xelas bikiraya. Û zêde tirsî min ji mirîna ko ez jê xafil bim û li serê min bê.

19 Lo, hilû rabe, da em tobe bikin. Malxirabino serê xwe hilinî û ji xew rabin, lê dinê bi hev ketiye û em rakîşandin pey gunehan, şuşlê me xirab e. Xwezî me ev dinya ne ditaya û ronahiya wê ne bînaya. Wê paşê eseh me bikê ber dehwa û hesaba.

20 Lo, malxirabo serê xwe hilîne û ji xewê rabe, lê dinya pev ketiye. Lo wî dibêjin axirzeman e, heyama qiyametê hatiye, dê em tobedar bin û tîdarîka axiretê bikin. Lê emê di xafil hew te di ko mirinê bi tîhna me girtiye.

21 Lê mirinê tu qewî bi lez bi ciwanî pey me dikudênî, tu daîm suwar î û li ser me pê ve tînî, tu nahilî ko em pîr bibin, heta barî teala bi sebr emanetê xwe ji me histinê.

22 Lê, dinê te ne hişt em tîdarîkê di mirinê bikin. Te em serberdayî berdane sehayê. Te got sefayê bikin bi dilê xwe, lê mirinê dût e, û niho nayê. Te em xapandin û mirinê em xafil girtin. Te ne hişt em tîr sefayê bikin li vê dinyayê.

23 Lê dinê, tu ewil nişani me didî, rahetî û sefa û xweşîyan, û paşê tu dilê me teji dikî ji jan û derd û tehlîyê. Zêde dikrê mirinê ne yê xêrê bê ko her suwar e û li serê me pê ve tînê, û me tişt û malê di pîr şemirand û me dest ji ber rihê xwe kiriye.

24 Lê mirinê tu pêşkarê me bûyî Zivistan û Havîna, û te mehbûbê dila ji me standin, xudanê hesp û rext û zin e. Lê dikrê mirinê ne yê xêrê bê ko ji dêla xemlê di nadir û serpeçanê

di nazîk te serên me bestin bi kevnîkê di heşîn.

25 Lê dinê te ne hişt em tîr sefayê bikin li vê dinyaya betal. Te axa ji me birin û te ji me re hiştin pîr û kor, kevn û kal. Lê dikrê te ne yê xêrê bê, ko te ji xema û ji kesera te serê me bestin bi kevnîkê di reş û şalan. Lê pa em çî bikin me mical bi te nîne, me tu spartî hikmê barî teala.

26 Lo malxirabino serên xwe hilinî; lê dinê em dêris kirin. Vê mirinê ji koma û ji civata, ji me ne hişt yek ji bi tenê, da em belgîhê evdaliyê wergerin û tayîl bibin li vê dinê. Lê heyf û xebîneta tê ko em bi van keser û van kulan em biçin bikevin gorinê.

27 Lê dinê te ez kirim evdalekî şeçî, ji şîrî te ez berdame peyê gunehan, ji piçûkî heta bi pîrî. Lê mirinê qonaxçî ye, cihê min kir nav agirê dojhê, û ba û pîzrûk û zemherîra.

28 Lê dinê te ez ji guneha bar kirim û te destê min ji xeyrata birine, û ez dizanim ko paşî poşmanî ye, û keser in, û şîrî e û girin e. Xwezî ez bi mirîya re ranebuwama ko min dojhê ne ditana. Lê min taqet bi ezabê wê nîne.

29 Lo malxirabo, serê xwe hilin û çavê xwe veke, û ji xew rabe, lê mirinê em dêris kirin û em sêwî hiştin ji dê û bava, û felekê em tazî hiştin li ber barana û li ber tava.

30 Lo, oxura felekê ne ya xêrê bê ko em ji tişt û malê di pîr em xizan kirin û em existin ber van mitalan û van hesaban.

31 Lo, berê xwe medin vê dinyayê, lê xayîr e û bê ra ye û derewîn e. Geh tehl e û geh şêrin e, geh şahî ye û geh şîrî e, geh ken e û geh girin e. Tehqîq tu destgirtîya min buwayî ko min tu bi yekî di bidayî. Lê pa ez çî bikim tu waka min î, min mical bi te nîne,

**32** Lê diné, tu xayin î, û bêra yi, te ez berdame peyê guneha, serberdayî. Tehqîq wekî tu destgirtiya min buwayî ko min tu bi yekî di bidayî, lê pa ez çi bikim, tu maka min î, min mical bi te nîne û tu bi min dikari.

**33** Lê diné, xwezi ez ne buwama û min xêr û mekseba te ne ditaya û ko te ez berdame pey guneha û te ez menih kirim ji hifza qewlên Xwedê û welîyan. Tehqîq tu destgirtiya min buwayî ko min tu bi yekî pir bidayî, lê pa ez çi bikim tu maka min î, û min tu spartî Xwedê û mêrên welî.

**34** Lo qulingo, tu pir bilind dibi û tu dinyayê dibîni çi mîna ye. Got: Lo çi hewce ye ko hon pîrsa dinê ji min bikin, wê li darî çava ye. Îro şahî ye, benda wê şîna e. Wesfê wê ne heja ye. Heke hewe ji min yeqîn e, ko dojeh ew bi xwe ye. Xwezi em ne buwana û me ew ne ditaya.

**35** Lo ev dinya mîna ye, Zivistana ko darê di ter û hişk û merhovê di çê û xirab yek awa ne. Û sibeha qiyametê mîna ye. Heyva nîsanê ko darê di ter û merhovê di çê wê xemlê xwe wergerin. Û fêhm bike û qenc bizane, darê di hişk, merhovê di xerab wê ji agirê dojehê re bibin xwirde û nan.

**36** Lo qulingo! tu bi ser me gazi dikî û dikûdênî. Got: Lo bihna dojehê ji vê dinê dibihim û ez hawara xwe ji Xwedê re dişînim ko laşê min tê nemînê. Xwezi bi wî merhovê ko jê birevê û xêr û xêrata bikê û li pêşîya xwe bişînê.

**37** Lo qulingo, sergirdano! ko tu qewî hewar diki û dilezênî. Got: lo ko ez direvim, ko dengê guregura agirê dojehê dibihim û dilê xwe pê dikewînim, ko ne xwezi bi cihê heramxwerê ko keda xeyran bi zilmê dixwin, ko

cihê di wan ezabekî dijwar e. Xwedê tu medî, kes nebinê.

**38** Lo qulinko, ez dibêjim tu bi cihê xwe xayin î, her zivistan tu pişta xwe didi çîyan û berfan û hamişt û sipana. Berê xwe didi deşt û beriya û sefayê diki her awana û disa ko bû germ û havîn, xwe didi çîyayên bilind û honikayîyan û zozanan.

**39** Got: lo ez ne xayin im, lê dinê xayin e, û ez ji ber direvim û dilezînim, nahêlê li derekê biqerim, ko ez emrê xwe bi rahetî biqedînim. Ez her ser wan gazi dikim û dengê xwe hillînim ko hon jê birevin, ji dinyayê, lê xayin e ko ez xayintiya wê dibînim.

**40** Lo qulingo, em nîzanin, tu bihayî an tu nivistî yi? Tu xwe bişidîni, û bi hewa xwe hilênî, lê tu qewî sist î. De em pîrsa dojehê ji te bikin, lê me dengê wê ji mêj ve bihistiye. Got: de ez saxlûxa wê qenc bidim hewe, belê jê birevin, weke mêrên margestî.

**41** Lo dojeh alikî jê behrek agir e û kufrit û zift û qîr e, û bihneke dijwar jê têt, û reş û tari û hawir e, lê dikrê wê ne êxêrê bê, ko aliyek jê behrek serma ye, û ha û pîzruk û zemherir e.

**42** Lê felekê zalimê! ev çi dûmat e ko te bi serê me de aniye, ko ji dêl xweşiyê te dilê me ji xema û kesera dagirtiye. Wekê ji me dihat em xêrata bikin, te ne hiştiye, û niha ji lişt û malê di pir te em xîzan kirin, anîtu parsekiyê.

**43** Lo qulingo, tu qewî bi hewa dîkevî û çengên xwe dihejinî û berê xwe didî ezmana û tu erş û kursi dibîni, da em pîrsa bihuştê ji te bikin, tu Xwedê û mêran dihebinî, ko em hê ciwan tu mizgînîya bihuştê ji me re binî.

**44** Lo wesfê bihuştê miqate ye, û

bajarekî bê qeder mezin e, û bilind e, û bê sûr e, û jê difûrê û diherikê bihneke xweş û behrek nûr. Hin sipî ye û hin jî heşin e, û hin kesk û suhr e. Lo behra me tê nebê, xwezi em ne buwana ko janeke mezin e, û derdekî kûr e.

45 Lo dikrê bihuştê ê xêrê bê, wesfê wê raserî me ye, tiştê ko ne çava ditine û ne guha bihistine û bi ser fikrê dila ne ketiye. Lo heke hewe ji min yeqîn e, mexelîtin ko bihuşt dinc, bari teala ew bi xwe ye.

46 Lo bihuşt welatekî bê qeder fireh û wetenekî şêrin e, û buhareke bêhed xweş e, û her daîm heşin e. Da em dia ji bari teala re bikin ko me jê mehrûm nekê, lê dilê min ji guneha şikestiyê û bi kul û birin e. Lê dogeh miqabil e, û me taqeta ezabê wê nîne.

47 Lo pa em çi bikin, ezman bilind e, û erd qewin e, û ein nizanin çi rayekê bikin bi guneha û bi va kula û bi va birina. Û mirin hatiye û me mical bi rihê xwe nîne. Lê heke bari teala bi rehma xwe me eza nekê, heke ua, me mical û mefer bi tu kesê di nîne.

48 Lo merovo, berî mirinê rayekê bike, û hilû rabe, lê bari teala adil e, ne rûmetî li ba wî heye, û ne mehaba. Mir û feqîr, xeni û xizan li ba wî yek hesab e, û her yek, fihlên wî dike mizana û cizayê wî didê-yê, heke sefa û rahetî ye, û heke cefa ye, û ezab e.

49 Lo merovo hilû rabe, dê em tobe bikin, lê talihine dijwar li ber me hene, û sisê ne, û li ber me veketî ne. Eseh emê bi ser wan kevin, daîm li derê rê ne. Yek jê mirin e, yek jî hizûr e, û êdi dogeh e. Ko jan û kul û derdê me jê ne, û bijan e. Lê pa em çi bikin ko qisas û cizayê me ne, û her sê hikmê Xwedê ne.

50 Lo qewlê kitêba em gêj kirin û

me guhdariya wan ne kiriye, ko dibêjin wê qiyamet bê, û wê mirî ji tirba rabin û bihuştî û dogehî.

51 Lo rabe em ji bari teala re tobe bikin, û bixwinin fatiheya ko: yareb, tu bi iz û celalê di xwe ki ko heke em ne hêja ne bihuştê, tu me nekî dogehê, girê hesretê besî me ye.

52 Lo ez weke qulingî hawara xwe dikim dinyayê û dengê xwe hiltînim weke kewê bestî li sehayê û ez bi hezari dixwinim û heryek navê wî hiltînim û ji hezari yek pey dengê min nayê. Yên ko ez ji te re dixwinim qewlê di pir in. Ti beha pê nayê. Lê pa ez çi bikim ji derdê dinê û kulê di axiretê, hedana min nayê.

53 Lo çi behreke bixêr hatiye bi me re û ez gerandim van mêrgan û va guhera, û liber çeman û min jê çini baqek rihan û gulçiçek ji civata nadir re, û rehmet li dê û bavê ko qewl gotin û dê û bavê hazir û guhdêra.

Herwekî tète ditin Lavij gotareke dinî ye. Tê de çêlî axiret û dinya din dikin. Ev gotara ha îro ji di dêrên filehên Torê de bi qeydeki botanî tète gotin û strandin.

Ji Lavijê sê nivîst, bi xeta siryanî, keti bûn destê min. Min ew her sê dan ber hev û ferqên wan ber pel û di bin stûnan de nîşan kirin. Ew ferq mîna ko xwendevanên me dê bibinin ne tiştinen mihim û ne gelek in jî.

Di hejmara Hawarê a 26an de ezê bendeke xweser liser Lavijê binivîstinim. û bi çend awayan lê hûr bibim.

C. A. BEDIR-XAN.





## LAVI

1 — Qu'est-ce que cette voix, qu'est-ce ce tumulte? Et qu'est-ce ce tonnerre dans les cieus? C'est le son de la corne, de la trompe, et du clairon. Les uns disent que c'est la resurrection, et les autres disent que c'est la fin du monde.

2 — Le son de la corne et de la trompe du jugement dernier est-il venu des cieus? La terre et le ciel ont tremblé, la voix a pénétré dans les oreilles des morts et l'esprit est entré dans les corps. La pluie fine de la resurrection est tombé sur eux et ils ont poussé comme l'herbe, lorsque le printemps arrive sur elle.

3 — O homme! ignorant, tourne-toi vers le ciel, comme il est bleu. Et contemple les rotations de la sphère. Tous les astres sont diaprés. Et loue le maitre de la générosité, celui qui les fit entrer et les a mis dans les airs. Oui, je les déplore, elles me désolent, la grâce et la beauté de ceux qui plus tard seront dans l'état où nous sommes tombés.

4 — On dit que c'est la fin du monde, la terre et le ciel se sont entrechoqué et les roues de la sphère sont disjointes et les astres ont tremblé et se sont apprêtés à tomber. Oui je les déplore, elles me désolent, les verdure, les basilics, les fleur-roses et les feuilles des marguerites et les fleurs d'iris. Celles qui ont jeté leur parure, et comme le poisson sur la terre sèche, sont desséchés et sont mortes.

5 — Lorsque le très Haut détruira le monde et lorsqu'il apportera le cahier de bien et du mal que j'ai fait et le lira devant la tere, l'univers et les anges, malheur à moi, qui serai sans refuge! Lorsqu'il me trainera à l'audience comment devrai-je lui répondre de mon âme, ô toi qui aime Dieu et les hommes. [1]

6 — Une haute voix est venue des cieus elle a dit : dépêchez-vous et donnez la bonne nouvelle aux morts, qu'ils se lèvent de leurs tombeaux et qu'ils se vêtent de leurs parures commes les fleurs diaprés. Qui le printemps de la resurrection est arrivé, suivez le. Il a fait de ses anges des messagers pour vous.

7 — Une voix innattendue est venue des

[1] C'est à dire pour l'amour de Dieu et des hommes.

cieus et nous n'avons pas fait attention. Elle a dit : ô morts levez-vous de vos tombeaux, c'est la resurrection promise. Secouez de vous la terre et la poussière, et revêtez-vous de votre parure et de votre tenue de resurrection et levez vos têtes comme la pousse de l'herbe verte.

8 — La voix de la trompe est venue des cieus et de la majesté la sphère a tremblé et les astres sont tombés. Voici sûrement le temps où les montagnes fonderont, où la terre et la mer s'applatiront, et où les annonceurs de la fin du monde viendront; sept pieds se mettront à la place d'un seul pied [2]. Sûrement le juge a l'intention de tenir des audiences.

9 — Lorsque la resurrection arrivera, le très Haut sera juge, Michel plaignant, et Gabriel temoin, et Israël accusateur, et le monde se présentera en audience, malheur à moi, ô pécheur, à cette heure là sans refuge! Quel sera alors mon état.

10 — J'envoie mon appel de secours à Dieu, que l'enfer soit ruiné et se détruise, que je ne le voie pas par mes yeux. Ne me suffisent-ils pas, la peine du monde et le chagrin de la mort que je constate toujours. Par la peur de l'enfer je cautérise mon cœur.

11 — Malheur soit à ma tête, lorsque avec colère il me trainera à l'audience et qu'il apportera le cahier de mes péchés, le lira devant l'assemblée et me livrera de main en main et m'enverra vers l'enfer. Oh si je n'avais pas existé, si je n'avais pas vu cette heure où l'on me fera descendre au souterrain de l'enfer.

12 — L'astre du matin s'est levé et se dépêche, il agite les mains et tes frappe l'une contre l'autre et il hausse la voix. Il a dit : homme! va, repens toi, les anges en colère sont à notre poursuite; à ceux qui ne sont pas repentis, qui n'ont pas fait de leur pouvoir des œuvres bonnes, ils leur prendront le foie.

13 — O homme! ne fait plus ce mal et ces péchés, cesse et assieds-toi. Le tumulte des cieus vient, ses portails se sont ouverts, et le très haut, lui même avec ses anges est descendu. Tous les morts se sont levés des

[2] Veut dire, il n'y aura pas assez de place sur la terre pour les ressuscités.

tombeaux, et nous, nous sommes des pécheurs et nous ne nous sommes pas encore repentis. Certes ils sont en courroux contre nous.

14 — Les terres sont témoins, les cieux sont plaignants et le haut créateur est juge et ses anges sont demandeurs. Mais si lui même n'a pas de clémence envers nous et ne nous soustrait pas au supplice, nous n'avons nul refuge chez aucun autre.

15 — Qu'est-ce que je dois faire, je suis misérable, étourdi, visage-noir, pécheur. Que le nom de la mort ne soit pas de bonne augure, il m'a surpris tout d'un coup et ne m'a pas laissé me repentir.

16 — Mon âme gémit beaucoup avec douleur. Elle a dit : Que le monde n'ait pas existé ! ni cette affaire ! que je ne sois pas dans cet état, où la mort crie comme le faucon à la poursuite du canard.

17 — Mon âme souffre beaucoup et gémit de blessures, et de douleur les larmes tombent des yeux comme les gouttes de sang. Tout cela, c'est du chagrin de la mort et sur tout du supplice de l'enfer qui est toujours amertume, douleur, deuil et pleurs.

18 — Ah si j'étais un oiseau, de ceux qui volent devant le vent, et que je sois allé au bord de la grande mer et que je m'y sois caché, que j'aie sauvé ma personne des douleurs du monde et des péchés. Surtout j'ai peur de la mort et que dans un moment de distraction elle vienne me surprendre.

19 — Mets-toi debout pour que nous nous repentions. O maisons-ruinées ! levez vos têtes et réveillez-vous, le monde s'est entrechoqué et nous a entraîné vers les péchés, notre situation est mauvaise. Puisse-t-il arriver que nous n'ayons vu ce monde et n'ayons pas aperçu sa lumière. Car plus tard on nous amènera au procès et aux comptes.

20 — Maison-ruinée lève la tête ; et lève toi, du sommeil, le monde s'est entrechoqué. On dit que c'est la fin du monde et que l'époque de la résurrection est arrivée, allons repentir et nous préparer à l'autre monde. Mais nous les distraits, voilà que tout d'un coup la mort nous a pris notre vigueur.

21 — Mort, tu nous poursuis vraiment avec ardeur et avec jeunesse, tu es toujours à cheval et tu te précipites sur nous, tu ne nous laisses pas vieillir, jusqu'à ce que le haut créateur, patiemment, nous reprend son dépôt.

22 — O monde tu ne nous a pas laissés nous préparer à la mort. Tu nous a laissés libres sur la terre, tu nous a dit : amusez vous comme il vous semble bon, la mort est loin et ne vient pas maintenant, tu nous a trompé et la mort nous a prit, tu nous a pas laissés nous amuser suffisamment dans ce monde.

23 — O monde, au premier abord tu nous montres, l'aisance, le plaisir et l'agrément, et puis tu remplis nos cœurs de douleurs, de chagrin et d'amertume. Que la mention de la mort ne soit pas de bonne augure, elle est toujours à cheval et se précipite sur nous ; et nous avons abandonné toute chose et des biens abondants et nous avons retiré nos mains de nos âmes [3].

24 — O mort, tu étais toujours, pendant l'été et l'hiver notre guide, et tu as pris de nos mains le bien-aimé des cœurs, possesseur d'un cheval, d'une armure et d'une selle. Que ta mention ne soit pas de bonne augure, au lieu des belles parures et de couvre-chef fins tu as enroulé sur nos têtes des bandes vertes.

25 — O monde, tu ne nous a pas laissé nous amuser jusqu'à ce que nous soyons rassasiés, dans ce monde périssable. Tu nous a pris l'agha et tu nous a laissé les vieux, les aveugles, les anciens et les vieillards. Que ta mention ne soit pas de bonne augure, toi qui as enroulé nos têtes par le chagrin et la douleur avec des bandes noires et des châles. Mais que faire, nous ne pouvons rien sur toi, nous te confions à l'autorité du créateur.

26 — O maison-ruinée levez vos têtes, le monde nous a infecté. Cette mort des groupes et de la société d'entre nous n'a pas laissé même une seule personne, se vêtir de l'habit d'ermite et passer dans ce monde comme disparu. Oui je me plains et me désole qu'avec ces douleurs et ces chagrins nous irons tomber dans le tombeau.

27 — O monde tu as fais de moi un mauvais ermite, dès l'âge du lait tu me laissa aller au péché, du bas âge jusqu'à la vieillesse. Oui la mort est un hôte, elle a fait ma place dans les feux de l'enfer, parmi la tempête, la bourrasque et le vent.

28 — O monde tu m'a chargé des péchés et tu m'a éloigné des bonnes actions et je sais que la fin est repentir, douleur, deuil

[3] C'est à dire : quitté nos âmes.



et pleur. Ah si je ne me levais pas avec les morts, afin que je ne voie pas l'enfer, je ne peux pas supporter son supplice.

29 — O maison-ruinée, lève la tête et ouvre les yeux, et lève-toi du sommeil. La mort nous a infecté et nous a fait orphelins de mère et de père; et la sphère nous a laissé nus sous les pluies et les lumières des corps célestes.

30 — Que la destinée de la sphère ne soit pas de bonne augure, elle qui nous a laissé dépourvus et privés des choses et d'abondant biens et nous a réduits à ces pensées et à ces comptes.

31 — Ne vous dirigez pas vers ce monde, il est traître sans racine, et mensonger, il est tantôt amer, tantôt doux, tantôt illumination, tantôt deuil, tantôt sourire, tantôt pleurs. Certes si tu étais ma fiancée je t'aurais donnée à un autre, mais que puis-je faire, tu es ma mère, je n'ai pas de force contre toi [4].

32 — O monde, tu es traître et sans racine, tu m'as abandonné aux péchés sans contrôle. Certes si tu étais ma fiancée je t'aurais donnée à un autre, mais que puis je faire, tu es ma mère je n'ai pas de force contre toi, tu as pouvoir sur moi.

33 — O monde c'eut été préférable que je n'aie pas existé et que je n'aie pas vu tes biens et tes gains. Tu m'as jeté au péché et tu m'as défendu d'apprendre les sept paroles du Dieu et des saints. Sûrement si tu étais ma fiancée, je t'aurais donné à un vieux, mais que puis-je faire, tu es ma mère je t'es confié à Dieu et aux hommes saints.

34 — O grue, tu t'enlèves à des altitudes élevés et tu vois le monde; quel cristal est-il? Elle a dit : Mais est-il nécessaire que vous demandiez la définition du monde, car il est à la vue des yeux. Aujourd'hui c'est illumination, mais c'est le deuil qui l'attend. Sa définition est sans valeur. Si vous avez confiance en moi, (je vous dis que) ceci est l'enfer même. Ah si nous n'existions pas et si nous ne l'avions pas vu.

35 — Oh oui ce monde est cristal, pendant l'hiver le bois vert comme le bois sec, les hommes bons et les hommes mauvais ont le même sort. Le matin de la resurection aussi est

cristal. Au mois d'avril les bois verts et les hommes bons se revetiront de leurs parures. Comprends et sache bien que les bois secs et les hommes mauvais seront pris au feu de l'enfer comme aliment et pain.

36 — O gruel tu nous appelles et tu te précipites sur nous. Elle a dit : je sens l'odeur de l'enfer de ce monde et j'envoie mon appel de secours à Dieu, afin que mon cadavre ne reste pas dedans. J'envie cette homme qui lui échappera et fera des biens et de bontés et les enverra devant lui.

37 — O grue, ô tête vertigineuse! tu donnes l'alarme, et tu te hâtes. Elle a dit : si je fuis, c'est que je sens le bouillonnement du feu de l'enfer et avec lui je cautérise mon cœur. Je n'envie pas la place des mangeurs des choses illicites qui mangent l'œuvre des biens avec injustice et tyrannie, et que leur place soit un grand supplice. Mon Dieu ne donne pas ceci que personne ne le voie.

38 — O grue, je dis que tu es infidèle à ton poste. Chaque hiver tu tourne le dos à ces montagnes et à ces neiges, à ces places balayées par le vent et à ces amorcellements de neige, tu te diriges vers la plaine et les vallées et tu t'amuses chaque instant, et puis lorsque la chaleur commence et que l'été arrive, tu te diriges vers les hautes montagnes, vers les fraîcheurs et les plateaux.

39 — La grue : O non, je ne suis pas infidèle, c'est le monde qui est infidèle, je fuis devant lui et me dépêche, il ne me laisse pas m'installer quelque part et finir ma vie en repos. Toujours j'appelle et je hausse la voix pour que vous le fuiez, ce monde, oui, il est traître et je vois sa trahison.

40 — O grue, nous ne savons pas si tu es avertie ou si tu dors. Il faut que tu te reprennes et que tu pèses dans les airs. Mais tu l'es beaucoup relâché, alors nous t'interrogeons sur l'enfer, oui depuis longtemps nous avons écouté sa renommée. La grue : alors je vous donnerai bien satisfaction, fuiez le comme les homme mordus par le serpent.

41 — L'enfer d'une côté c'est une mer de feu, de soufre de goudron et du poix, et il vient de lui une audeur acre (aigu) et il est noir, ténébreux, et sans issue; que sa mention ne soit pas de bonne augure et de l'autre côté il y a une mer de froid et de

[4] Je ne peux pas lutter contre toi.

vent, de tempête et de bourrasque.

42 — O monde cruel, qu'est-ce que ce malheur que tu nous fis surprendre par lui. Au lieu de délices tu as rempli nos cœurs de chagrins et de douleurs. Quand nous pouvions faire du bien, tu ne nous a pas laissés et maintenant tu nous a privés de toutes choses et de beaucoup de biens, tu nous a fait pauvres et nous a réduits à la mendicité.

— 43 O grue! tu t'enlèves en l'air et tu secoues tes ailes et tu te diriges vers les cieux et tu vois le trône et les chaires. Alors nous te questionnerons sur le paradis. Pour l'amour du Dieu et des hommes.

44 — La définition du paradis est fixe et difficile à présenter; c'est une ville sans mesure grande, haute, sans muraille, et de lui écume et coule une agréable odeur, et c'est une mer de lumière. En partie il est blanc et en partie il est vert, et aussi bleu et rouge. Si nous n'y avons pas notre part, ce serait préférable que nous n'ayons pas existé. Car c'est un grand mal et une profonde douleur.

45 — O que la mention du paradis soit de bonne augure, sa définition est au dessus de nous, c'est quelque chose que les yeux n'ont pas vu, et les oreilles n'ont pas écouté, et qui n'a point été inspiré à la raison du cœur. Si vous avez confiance en moi ne vous trompez pas, vous avez vu le paradis. Dieu c'est lui même!

46 — Le paradis est un pays d'une grandeur sans borne, et aussi un pays doux, un printemps sans limite, agréable et il est toujours vert. Prions le bon Dieu pour qu'il ne nous prive pas de lui. Mon cœur est brisé par des péchés et il est plein de plaies et de blessures. Oui l'enfer est en face et je n'ai pas la force de supporter son supplice.

— 47 Mais nous, que devons nous faire. Le ciel est haut et la terre est puissante et nous ne savons pas quel parti devons nous prendre avec les péchés et ces blessures, et la mort est venue, et nous, avec notre esprit nous n'avons pas de force. Que le bon Dieu par sa clémence ne nous torture pas, sinon nous n'avons chez nul autre d'appui et de refuge.

— 48 O homme! avant la mort prend un parti, et lève toi debout. Dieu est juste, chez lui il n'y a ni parti pris ni considération. Le prince et l'indigent, le riche et le pauvre

sont pour lui du même niveau. Pour chacun il met les actes à la balance et lui donne ce qu'il mérite, soit plaisir et repos, soit tourment et torture.

49 — O homme lève toi debout, pour que nous nous repentions. Devant nous se trouvent des pièges forts, ils sont trois et ils sont exposés devant nous. Certes nous y tomberons. L'un c'est la mort, l'un la compuration et l'autre c'est l'enfer. Notre souffrance, notre douleur et notre amertume viennent de là et c'est douloureux. Mais que devons nous faire ils sont notre talion et notre châtiment. Et tous les trois sont la sentence de Dieu.

50 — Les paroles des livres nous ont tourmentés et nous ne les avons pas écouté. On dit que la resurrection arrivera et les morts se leveront des tombeaux, ceux du paradis et ceux de l'enfer.

51 — O lève toi faisons notre repentir au haut créateur et lisons des fatiha [4] et disons: ô Dieu agis selon ta majesté et si même nous ne sommes pas digne du paradis ne nous met pas en enfer, la crête [5] de séparation nous suffit.

52 — Je fais comme la grue j'envoie mon appel de secours au monde et je lève ma voix comme la perdrix liée [6] et je chante et je cite le nom de chacun séparément et personne ne suit ma voix. Ceux que je te lie sont les paroles des «pir» [7]. On ne peut en estimer la valeur. Que dois-je faire? de la douleur du monde et de la souffrance de l'autre monde je n'ai pas de repos.

53 — O quelle mer de bonne augure nous est venue et elle me promena parmi ces prairies et ces ravins et devant les rivières.

[4] Sourate d'ouverture du Qoran.

[5] Ce mot est employé comme une image faisant supposer une montagne entre le paradis et l'homme.

[6] Au Kurdistan on fait la chasse du la perdrix avec des noeuds couants de crin de queue du cheval. Ces noeuds sont supportés par de petits pieux plantés en terre. Les chasseurs dressent des perdrix spéciales pour cette chasse. Ces perdrix sont de deux espèces. L'une en chantant attire les perdrix de la contrée; elle est placée sur un poteau et enfermée dans une cage. On l'appelle «djélab». L'autre liée par une de ses pattes se trouve au milieu des noeuds couants. Elle s'appelle «besta» qui veut dire liée. Les perdrix invitées par le chant de la «djélab» arrivent en quantité et se mettent au dessous du poteau. Alors ils aperçoivent la «besta» qui par ses gestes les incite à se battre. Elles se précipitent sur la perdrix liée. Au cours de la lutte leurs pattes se prennent dans les noeuds. L'expression de «besta» est propre à la contrée de Botan. Ailleurs elle est appelée «ribat». Djélab veut dire celle qui attire.

[7] Le mot «pir» qui signifie vieux, au sens figuré veut dire toute personne qui a atteint le sommet de son métier ou de sa doctrine, tel un apôtre.

## LE BEAU DE LA STEPPE

(suite)

Ali Abdourazzaq; arrivé chez lui, prépara avec Abdulkérim une nouvelle attaque et avec le gros de son armée il se porta au Zirgan des kikan et campa à «Girê-Mîran». Ses forces commencent à brûler les villages des kurdes, à les piller et les dévaster. A ce moment là Ibrahim pacha à la tête de ses nomades se trouvait au sud de Deir-Zor. Mis au courant de la nouvelle agression de Ali Abdourazzaq; il mobilisa ses hommes, et par une marche forcée les porta en quatre jours à «Serê-Kani» où il campa. Il convoqua les différents chefs des Milan. Ils tinrent conseil et choisirent mille cavaliers d'élites et le second jour ils attaquèrent Ali-Abdourazzaq et Mohamêd-Abdulkérim et leurs alliés. Les chammars subirent une nouvelle défaite.

Ali-Abdourazzaq après cette défaite fit teindre un chameau en noir et l'envoya à son oncle «Faris» qui se trouvait en Iraq, en lui faisant dire que Ibrahim pacha avait ravi leur honneur et que dans la haute Djézireh le prestige des chammars était menacé. «Faris» mobilisa ses forces et vint camper sur le territoire de Nissibine. Il rassembla tous les vassaux des chammars: Ahmedê-Youssif des Achitan, Ibrahim agha des Daqoriyan, Abdourahman chef des Kikan, des Qaraguetchi Khalil bey et Drei, le cheïh bes Tay, Mouslit pacha chef des Djibour et les autres chefs et tribus comme Beguara et Charabiya etc. . . Toute cette constellation de tribus kurdes et arabes marcha sur Ibrahim pacha. Comme première étape ils campèrent auprès du village de Husseynê Qandjo à «Hilêbi». Husseynê Kandjo gardant la défensive,

J'ai ramassé là un bouquet de basilic et de fleur-rose pour la société distinguée. Que la clémence de Dieu soit pour les mères et les pères de ceux qui ont dit les paroles et pour les mères et les pères des présents et des auditeurs.

Le «Lavij» tel qu'on le voit est un préche qui s'adresse aux adeptes de toutes les confessions sans faire aucune distinction de religion, excepté le mot fatiha que l'on trouve dans le (51) ème verset.

Nous avons transcrit le présent «Lavij» de trois différents manuscrits en caractères assyriens, et nous avons noté les toutes petites différences des manuscrits en marge du texte. Dans notre prochain numéro nous donnerons quelques notices historiques et légendaires du Lavij. Ainsi que nous essaierons de faire une analyse linguistique de cette assez ancienne prose kurde qui a subi l'influence de différents parlers et un peu l'influence de la langue écrite.

D. A. BEDIR-KHAN

opposa une résistance opiniâtre. Faris pour ne pas perdre du temps, ni subir des pertes préféra laisser Husseynê Qandjo tranquille et marcha vers le nord; il pénétra dans le territoire de Ibrahim pacha. Le gros de l'armée de Faris bivouaqua à (Milani), (Yaban) et (Mozikê-Şerqîyan). Le second jour les forces de Faris attaquèrent Ibrahim pacha. Ibrahim pacha après avoir repoussé l'attaque fit une contre-attaque et mit de nouveau en déroute ses adversaires.

C'est ainsi que conclut Ehned : «Le résultat de cette guerre ne fut pas plus brillante que les autres. Les chammars ne firent que d'amener du butin à Ibrahim pacha. Moi qui avais pris part à cette guerre j'ai perdu mon manteau de fourrure, mon aba et mon sac en tapisserie. Après cette défaite je suis venu chez moi. Eumer bey avait envoyé quelqu'un pour me chercher. Je l'ai suivi et je me suis rendu chez Eumer bey sans m'être acheté du cheval.

Après quelques années j'ai quitté Eumer bey et je me suis rendu à Mardin chez Abdulkadir pacha. Je l'ai servi pendant vingt ans. Il me maria. J'ai passé une dizaine d'années à Diyarbekir.

Revenons à la lutte des chammars et de Ibrahim pacha. Hadî petit fils de Ferhan pacha, cheïkh des chammars était venu camper avec ses alliés dans le territoire de Nissibine. Hadî avait bien organisé ses forces et se préparait à porter un coup décisif à Ibrahim pacha et à l'éloigner pour toujours de la haute Djézireh. De son côté Ibrahim pacha s'organisa également. Tout les kurdes, même les vassaux des chammars, de même que les plus acharnés rivaux des Milan comme les Kikan se mirent du côté de Ibrahim pacha. Les kurdes campaient à Girê-Faris. Le combat fut acharné et décisif, les arabes furent battus, et ils se replièrent vers l'Iraq. Les kurdes les poursuivaient. Hadî voyant le danger fit inonder la plaine par les eaux du Djaghdjagh et ce n'est ainsi qu'ils purent échapper aux kurdes. Comme vous le savez d'ailleurs depuis cinq années je me trouve en Syrie.»

Le récit de Ehned Ferhan prend fin ici. Nous devons ajouter que Ehned chante toujours très bien la chanson qui lui a valu sa renommée, le «Delalê Beriyê». On trouvera difficilement quelqu'un pour le concurrencer en chantant cette chanson.

Nous reproduisons ci dessous un passage d'une chanson de l'époque qui retrace les péripéties de la lutte entre Ibrahim pacha et les chammars et qui fait allusion à la victoire du pacha.

Dilê min rebenê, dileki li din e  
Beriya Mêrdinê, berike rengin e  
Geli peyê kurmanca kosk û metrisa biedilinin  
Geli segmana teng û beagê suwara bişidinin  
Qereberbangê sibê şênika li ser konê şexê  
[semêra datinin

Bi sê şopa wan dişkêninin  
Heya Kepezê Serê Kaniyê, Zirgana Kika  
[ser pey wan datinin

Talên û yextirme vedigerinin  
Zincirê delûla diqetinin

Guleyê segmana di singê xwe da dihêlînin  
Emş û Emêşa, jinê şexê şemera, qîzê  
[şexê teya

Di wara da hêşîr distînin  
Hêya nav û dengê Brahmî paşa li  
[dînyayê hebê  
Mêrê şemeri quleka mêrê kurmanca  
[narevînin

Mon cœur, malheureux, est un cœur affolé  
La steppe de Mardîne est une steppe colorée  
O guerriers kurdes, arrangez les emplacements  
[et les tranchées  
O fantassins, ajustez les sangles des chevaux  
Dans le crépuscule du matin ils dirigent des salves de  
[mousqueteries sur la tente du cheïkh des Chammaras  
Ils les enfoncent de trois côtés  
Jusqu'à la crête de Serê-Kanî, jusqu'à la Zirgan  
[des Kikan, ils poursuivent

Ils s'emparent du butin, et de trophées de guerre  
Ils cassent les chaînes des chameaux  
Ils fondent les balles des guerriers sur leurs potrines  
Les amehes et ameyches, femmes du cheïkh des  
[chammars, filles du cheïkh des Tay  
Ils les font prisonnières dans les emplacements  
[des campement

Ibrahim prêcha le héros de ces guerres de tribus  
mourût peu après la constitution ottomane dans  
des conditions assez tragiques; et il est enterré en  
territoire syrienne.

De la grammaire kurde [1]

## DÉCLINAISON DE L'ARTICLE

(suite)

En conséquence nous ne pourrions pas  
placer dans notre grammaire un article partitif  
comme celui du français. D'ailleurs nous al-  
lons voir que ce dernier disparaîtra dans les  
temps passés des verbes transitifs, en même  
temps que la déclinaison, qui n'existe que  
simultanément, nous pouvons donc dire que  
le sens partitif en kurde ne s'exprime que  
de la façon précédemment citée, et ces dé-  
sinences sont plutôt l'effet des déclinaisons.

Au sujet de la déclinaison de l'article  
indéfini nous devons noter que la déclinaison  
du masculin n'est jamais et nulle part  
négligé comme est celle du substantif. Donc  
au lieu de dire (ez hespeki dibînim) on ne  
pourra jamais dire (ez hespek dibînim).

## DÉCLINAISON DU PRONOM

Les pronoms, qui forment une partie vari-  
able du discours se déclinent également.  
Mais dans la langue kurde on trouve des  
pronoms sous deux formes distinctes. On  
peut classer ces pronoms en deux catégo-

ries, pronoms-sujet et pronoms-complément,  
c'est à dire à l'état de régime.

Evidemment les pronoms de la seconde  
catégorie sont les formes déclinaison des pro-  
noms de la première catégorie, et comme  
tels ces pronoms ont des formes propres  
de déclinaison.

### FORME SUJET

Je	Ez	Min
Tu	Tu	Te
Il, elle	Ew	Wi, wê
Nous	Em	Me
Vous	Hon	We
Ils, elles	Ew	Wan
Qui, que	Kî	Kê
Quoi	Çi	Çî

### FORME COMPLEMENT

Donnons quelques exemples :

Ez Memî dibînim	Ez wî dibînim
Je vois Mem	Je le vois
Ez Zînê dibînim	Ez wê dibînim
Je vois Zîn	Je la vois
Ez hespan dibînim	Ez wan dibînim
Je vois les chevaux	Je les vois
Mem Zînê dibîne	Kî kê dibîne
Mem voit Zîn	Qui voit-il qui

(qui voit quelqu'un et  
quelle personne voit-il)

Kîtêb li ser masê ye	Çi li ser çî ye
Le livre est sur la table	Qu'est ce qui est sur quoi
Min Memî dit	Min ew dit
J'ai vu Mem	Je l'ai vu
Min Zîn dit	Min ew dit
J'ai vu Zîn	Je l'ai vue
Min hespî ditin	Min ew ditin
J'ai vu les chevaux	Je les ai vus
Memî Zîn dit	Kê kî dit
Mem a vu Zîn	Qui a vu qui
Baranê erd kelaşt	Kê kî kelaşt
La pluie a fondu la terre	Qui a fondu quoi

De même :

Hespê kê	Dûmahika çî
Le cheval de qui	La suite de quoi
Ez te û wî dibînim	
Je (vous) vois, toi et lui	

Nous avons dit que dans les temps passés  
du verbe transitifs ces pronoms s'intervetis-  
sent, et le pronom-complément passe à la  
place du pronom-sujet, et vice versa.

Dans ce cas, le complément ne se décline  
plus et au contraire c'est le sujet logique  
qui se décline; le verbe s'accorde avec le  
complément qui en vérité est le pronom-sujet.  
C'est un phénomène propre à la langue kurde  
et qui est la base de l'organisation des verbes  
kurdes. Dans nos articles traitant des pro-  
noms et des verbes nous essaierons de déter-  
miner les motifs de la formation de ce méca-  
nisme de conjugaison, qui pour l'étranger est  
assez bizarre et difficile à assimiler. (à suivre)

[1] Voir les articles précédents traitant de la grammaire kurde  
dans les numéros du Hawar : 16, 17, 18.



www.arsivakurdi.org

Xwedî û gerîndeyê berpirsiyar : **Mir Celadet Alî Bedir-Xan**  
Şam — Sûriye  
Directeur Propriétaire : **Êmir Djeladet Aali Bêdir-Khan.**  
Damas — Syrie

### MAME-YARE

Le Girdê-Gulan binnêjin, ba le wê be tenya bîn, çünke namewê gorîşim le nîzik gorî eşikerekani Koye we ebêl. MAME-YARE

Le lay rojhelali silêmanî we nîzik be şar girdêki qûlî-rûl we liwanî heyê ke be tenya we nextê dûr le girdekani lir wek palewanêki be fiz û hêz, lûti be çeşnî berz kirdiwetewe bo asman ke herwekû biyewêt bew nîzmi xoye we, şan le şanî «Kurekajaw» we «Pî-remegrûn» bidat.

Êm girde be fîze, gîleyîyêki eger le bextli xoy bu bê, ewîş le layenî naweke yewe ye; heta nîziki si û hewl sal le mew pêş pê eyan wîl «Girdê-Gulan» belam lew salane de, Xwe be awatî xoy geyan, we de nawêk şad bû ke her çonî pê wey binazî boy rewa ye; lew sawe pê elên Girdê-Mame-Yare.

Pîr Mame-Yare ke êsta le leple-serî ew girdewe seyri kirdeweman eka, be lay zor le lawekani emrowe, bole kesêki dirin. Renge hindektan basîştan ne bisli be. Çünke jîyani emîş wekû hî hemû gewreyeki ketani gum buwe. Belam min bextiyarane be çawpêkew-tîni şad bûm.

Mame-Yare piyawêki barikeley kelegel bû. Du çawî tij we rûyêki çirçî hebû. Be rişî bulbulî çermig we simêli ber qirtênrawyewe, demênêki seyri hebû, rûxoş we rend bû, le cil û berga entikexaneyêki giyandar bû.

Le çiraxan we rojanî hebîni de zirê we kulawî zêri eposî, cûtê qerebinay zîli be pişliya şor ekerdiwe, dû deman-çey ekird be berya, şirêki ebest be

pişliyawerimêki drêji egird be destîye we, we bem çeşne le pêş mîleserif we memûran we xelqe we eroyîşt.

Mame-Yare be laybelî xoşewîstî hemû mînalêk bû, we hemû mînalêkiş layî ew xoşewîst bû, le şewî çiraxana la ew ne halaye we demançeyêki ne leqanaye zemawen desî pê ne ekird. Le ber ewe mînalên be çwar çaw çaw werewani halinî debûyin; we her ke prişki barûl le lûley demançey ewewe dereçû ilir agirbazî despê ekra.

Le bîrim dêl her wextî ême mînalên ke pey egeyîştin be çing çirewşekirî be sera dabêş ekirdî, we hemîşe her dû girfanî pîr bû lew çeşne şlane. Çak le bîrim dêl desîşî ehênay be sere we pey ewîtin; «Mînalîne! hîwam her be êwe ye».

Ewsa ke le sîrey mînalimana, ême Mameyareman tenya le ber şarayîn, bergî entîke we çerewî xoşewîst, belam ke gewre bûyin we le jîyin geyîştin em pîre ewamêre le lay xoşewîstîrewewewretîr bû.

Pîr-Mameyare nawî «Yar-Ehmed» kûri Nidir begî, Homer aşayi xelqî «Dewên-nerêne» bû ke lay «Şarbajêr». Homer aşa bapîrî yekîyek bû le dwanza swarey Meriwan, zor xoşewîst buwe lay Ewrehman paşayi bebe, ewende xoşewîst buwe le lay ke paşa ew sîrey le Taran, Feth-Eli-Şah pêşkesî kirdî bû, da bûye.

Wekû tègeyîştûyin Yar-Ehmed le salî 1801 da le «Dewên-nerêne» le dayîk buwe, ke pê ega le ser rê we şonî baw û bapîrî debê be nokerî pa-

şayi bebe, le 1810 leşkeri bebe da ekrê be zabiti topçi we heta erşekekey «Ko» ye lem firmanc da emênetewe. 1817 da meyani Ehmed paşayi bebe we Dewleti Osmani tek eçe. Dewleti Osmani le jêr fermani serdar Necib paşa da leşkirêk erazênêtewe we eynêrêl bo ser Ehmed paşa. Ehmed paşay leşkiri xoy deng eda we eçêl bo beramberi her dû leşkir le rojaway Ko ye beramber be yek ewestin.

West mangi Gulan ebê, baregayi Ehmed paşa le lay girdi «Rizetû» helêda, leşkiri kurd werewan emende be hêz buwe ke le şikani tirkekan hemû dilniya bûn, belam daxi be cergim bexti reşî kurd lêreşa ney hêna bû.

Êwarey pêneşemû ke duwayî mang ebê, serbaz we mifirdi daway mûçe eken, yekê le wezîrekan be paşa elê: [Tûle heta birsi bêt çaktir raw êkat]. Paşa emey be göy da eçe we, ew roje mûçe nadal. Em qiseye ber göy leşkirêk ekewêtewe, le serêkewe wernegirîni mûçe we le seri kilirewe bilhaw bûnewey qiseyekî wa sûk, we eige le manêş çawerawî hendê ke gwaya, şer kirdin legel leşkiri xelife pêçewaneyî din we birwaye bûn be mayey serpeçê leşkir, we le encama hemû qise eken be yek ke ew şewe bilawey lê biken, we teqey tifengyêk eken be nişaney erş kirdin.

Birînar aşay binbaşi şewê be wey zani, zû ray kird bo çadîrî paşa ke xerberi bidatê.

Her lew kate da teqey tifengyêk [1] dêt, dest be cê leşkir dest eka be bilaw kirdin. Ehmed paşayi bedbext ke eme ebinê suwar ebê we legel çend noke-rika seri xoy belegrê.

Bem renge duwa hikîmdari bebe le wilatî Mad û Ari dereçê.

[1] Wa be nawbang e, em lifenge kes ney teqandîwe. Ew şewe reşeta buwe, tifengiyêkî pir be sêweteke helwarawe kewtûte xwarewe we teqîwe.

Leşkeri tirk lem bilaweyê agadar nabin, bo sibeynê dene pêşewe bo şer. Belam hiç beramberiyek nabinun we lê egen ke kesyan le berambera nemawe. Hir be serbestî pêş ekewin. Belam kut û pir topxaney Ehmed paşades eka be gule barandîn be seryana, eyan peşokênê. Serdari tirk lêga ke le hendê topçi bew lawe kesê tir ne mawe, fermanc eda ke biyangirin. Leşkireke çwar dewri Yar-Ehmedî topçi eda we be dil girtîyanin.

Necib paşa em azayîye ke Yare niwandî bûn zor pey xoş ebê, bangî ekafe layi xoy we ew guftugoyaneyan ebê:

Necib paşa — Leşkeri paşalan hemû bilawey kird to boç be tenya beramberit kirt?

Yare — Min fermauber im, topxane be min sipêrawe, fermancî şerim pê dirabû, kari xom be cê hêna

Necib paşa — Fermanderêket seri xoy helgirt, to boç destî le şer helnegirt?

Yare — Wekû wîlim fermancî şerim wer-girtî bû, belam le paş eme fermancî şernekirdinim wernegirt

Le ser em qise lawçakaneyê Necib paşa pitir Mame-Yare eçe be dîla we delê: «Bo em lawçakiyet emewêl padaş-têkit bidimewe, çit ewê bilê

Mame-Yare — Xwe paşay xom bihêle hiçim nawêl

Necib p. — Paşayi xol ne ma royist, Hir wilateketan kewte jêr destî Dewleti Osmaniye we, dilwistit çî ye bilê

Yare — Le paş eme, jiyanim nawêl ta mali dinyam bo yêl

Necib paşa be çawekî aferînkari we dostiyewe peya rwanî we gutî; çak e.

Belam her ew roje serdar pê zani ke Yare dèyêkî be berat be destê we ye; be fermancî beratekey bo taze kir-diwe, dèyêkê nawî «Kani-Dirkeysegan» bû ke êsta be dest Ehmed aşai Gosaley xizmi we yêl.



# WERE DOTMAM

Were dotmam, awa setê me serbet e. Hev dotmam, hev dotmam.  
Pêde navê li hev dikebe. Gul û gulçêçeka nava koman  
Hevniya setê û alom ji heyamê pê- Heçî derdê dotmamê ne dîne  
[Sembere adet bi Bira ji min mekin gazinê û  
Ya min û ya dotma min li çêzira Ro- [bonan  
ba. biye qubadet e.

Ji Îlaco aña re

Dotmam welê ye, heta mirov xwe nas dikit mirov emrê xwe xelas dikit.

Ez pir bûme. Di derxika canê min de çil Buhar bîskivîne. Qurma bedena min çil Zivistan ditine. Bi sedan ha û bahosan ew hejandine, bê hejmar berf û baran lê re çûne.

Herwekî dibêjin ciwanî bizaniya pîri bikariya. Lê pesn ji Xwedê re ko hej ewçend ne pir im ko nikarin.

Wekê ez ji ciwan bûm, simbêl hej tu avêtî bûn ser levên min, dilê min bi hevniya delalan hildavêt, hon ne yek, ne dudo, ne del, ne bist bûn. Kej û gewr, esmer û genimî, hejubilind û navin, kinên we ji hebun.

Hon hemî ji min, ji me re bûn. Me kijan bixwesta, ne ewê, ne mamên me, ne digotin no. Lê min, me hemiyân nizani bûn. Çavên me bi we, bi bedewiya can û giyanê we ne dikin.

Me dev ji we berda bûn. Yekî biyani dihat, hon dixwestin. Me ji xwe re ne dikir namûs. Hon dibirin. Hon bêqeder dikirin. Di rêzika dinyayê de hon tayîb dibûn. Ev ne sûcê we, lê yê me bû.

Hon di gûlistana mala me de gul û bîskojin bûn. Başvan û didevanên we em bûn. Bihna we a xweş, rengê we ê ges û bîrews tu dibêji qey ne ji me re bûn. Em pê ne dihesiyân. Me ew ne didtin.

Yek dihat, destê xwe drêji we dikir, hon diçinin, dibirin. Pêde welê bû. Hon, gulên gûlistana me dihatin çinin, me gub ne dida, em pê bendewar ne dibûn.

Bojekê, me hew dit, gûlistan bê gul, daristan bê bilbil maye.

Em di himbêza jinên biyani, hon di bin cengê mîrên nenas de.

Bi vi awayî me xwerûtiya tovê mala

Ewî êsta lew gore larik we lenya-yey ( Girdi-Gulan ) da ehesêlêwe we girdeke be naxewewe naxewawe, em nûletperwêre gewreyeyêke 37 sala be daxewe çawerexani cejui kurd êkal.

TEWFÎQ WEHÎ

xwe, tovrindiya malbata Azizan winda dikir.

We zaro diamîn, li me, li xwalên xwe dihatin. Merd, ewanêr, xweyrimet. Ji bavên xwe re namûs dikirin.

Zarowên me li xwalên xwe dihatin. Xwalên wan kurên kê? Ji kijan ra û nijadi? Ji kijan mal û malbatê?

Wan navên me hildigirtin. Yê we ko ji zikê mala me derdiketin li ser dara bavê xwe şin dibûn.

Herê dotmam, keçmama celeng. Tu çûyi, hon çûn. Em di destê jinên biyani de, hon di bin rîkauê mîrên nenas de.

Zarowên we xwarziyên me ne. Lê ne xwarzînen adeti. Li ser xwal û xwarzi. Lê ne xwarziyên me. Ji ber ko ne ji nijadê me ne, xerîbî wi nijadî ne. Carin hene, neyarê wi nijadê pak in ji.

Belê li ser xwal û xwarzi. Xwal û xwarzi li rex hev, berê wan li armaucêkê ser dikin. Xwarziyên me li me radibin. Berê wan li berê me ye. Em armauca wan, ew armaucên me ne. Heçko em ji hev re polik in. Bi destên hev, di destên hev de dimirin.

Dotmama delal, ma ne heyl e. Xwina zikê te bi xencera min bête rêtin. Ma ne mixabin e, kekên te bi berikên berê zikê te bikevin. . . .

No! no! dotmam, heyraniya pîsman, êdî hes e, hew bibe jina xelkê, hes bibe dêya nekurdnijad, vegere were himbêza pîsmanê xwe, paxila kurnamê xwe.

«Vegere» ev ne gotineke rast e. Em nikarin ji te re bibêjin «vegere». Ji ber ko tu ne çûyi, me tu rêkirî. Me bi destên xwe tu hinarti mala xelkê.

Himbêza xwe veke ez ji te re tîm. Min himbêz bike. Min wek mîr, pîsman û her tistê xwe maço bike.

Dotmam, min ji te re got ez pir bûme. Lê pîriyê ez hisyar kirim.

Buhar ciwanî ye, Zivistan pîri. Zivistan pîstî Buharê têt. Di Zivistanê de Buharinen veşarti hene.

Herê dotmam were, xwe berde himbêza pîsmanê xwe. Ezê ji te re, ji Zivistana xwe a sar Buhareke germ çêkim.

Were dotmam, heyraniya pîsman were, xwe di germiya dilê min ê ciwan û etwaniya min a kevî de bigermîne.

Were dotmam were, ez stûna heyina te a stîwar im, tu ji bibe rewşa jiyina min a Rewsen.

Şam: 18 İlon 1934

C. A. BEDIR-XAN

## WELATÈ MIN

Welatè min tu i bûka cihanê,  
Îlemi baš û bilušt û mîrg û kani.  
Şepal û şeng û şox û naz û rînd i,  
Gelek serin û gewr û pir ciwan i.  
Serî laca Selahedinê kurdî  
Enî roj e, di birca asimani.  
Du birhên te kevanê Rîstenê Zal  
Du ziffên te ji tirên qelremani.  
Du çavên te weki deryayî Hîrmiz.  
Kepû elmas e, karê Mûş û Wanê,  
Du lîvên te kitêba Îlaci Qadir,  
Zîmanê te ji benda Şêxê Xani.  
Rûyê te agirê Zerdest û Mezlik.  
Ji te ronik seraba kamirani,  
Çena te gohê Cûd û Şax û Hevlêr,  
Qîrîk eywana taqa xusrewani.  
Di singa te kitêba Zendawesta,  
Memik ferlûr e, tê de neqşê Mam.  
Du destên te tixûbên tirk û qelhan,  
Heru ceng e, bî tirên zerweşani.  
Ji singa te bi jêr de gohê Lales  
Ziyaretgah e bo me her zemani,  
Bî nişan û bî nau û xwîrrijandin,  
Me dest girt û qelên da û, tu ani.  
Ser û pê, zend û bazin tev bîhîne,  
Îlemi sor in ji rengê zehferani.  
Bî te em şa ne bûn, ev bû dîsed sal,  
Ji me dengê lîfîngan çûye bani.  
Bira û bay û ap û pîsmam.  
Lî ser te hevîlî kuştin pehlewani.  
Ji lîwra ta bî zazan tev bi xencer,  
Dihatin hev li meydanê, bevanî.  
Bî talan û bî kuştin hem bî sulhtin,  
Me konê ser li ser singa te dani.  
Emîr û begler û paşan û axan,  
Kîrîn wêran sera û bire û xan.  
Lî alîkî te deng û ceng û halan,  
Lî alîkî sedayê şewşê sani.  
Hemû hûne mirid û şêx û sofî,  
Bilûştî ue, çî kin nav û nişan i.  
Lî axur radizîn, lê şêx diçî jor,  
Berî nivro ji bani têt girani.  
Ser û pa tev dikî gulav û ember,  
Dibê nûr e, kero ma tu çî zani?  
Bî van xapan dixwarin xwarîwên xwes,  
Weki şêx û melayên vi zemani.  
Di eşên me hebûn dijwar û şedar,  
Nezani yek ewa di her nezani.  
Weke şêr û pilingan em diçin hev,  
Ji meydanê rovi penîr hilani.  
Me ew rojên ciwanî tev bi der dan,  
Bî zîwari û belengazi û şivani.

## EHMEDÊ ZEYDAN

Diwana mir de rûniştî bûn, êvarê. Mir  
go, hey zilamê selêke mi bêjê û serê mi  
lêşihê, go pê rahet bibê ezê enterîkî lêkin.

Ehmedê Zeydan, ji civatê, go, mirê mi ezê  
selêke te bêjim.

Mir goti-yê de bêje

Mirê mi, jiuke mi hebû, gelekî Fêr  
dilê mi eziz bû, mi niv saetê ne diyana he-  
dana mi ne dilat. Rokê, ez hatim mal go pi-  
reka mi zik û pişt diqulîbî. Mi go, te çî mane  
ye, çî lte qewimiye?

Wele lîlankes ez bêhal im.

Labid dilê te diçê çî, ji telihi, ji tirşni?

Wele dilê mi diçê gostê pezkovi

Pa wextê wilo got, ez Ehmedê Zeydan  
im, wilo jîna mi Fêr dilê mi eziz, mi ra-  
hiştê tifenga xwe û nû rê girt, ez çûme neçirê.  
Lî vi diyari, li vê newalê, mi di kovi, ez li  
ber rûniştim û mi lîfîng avêtîyê, mi li bin  
çengê wi da. Mi quliband, mi xencer kişand  
û ez bezime ser. Mi serê wi jêkir, mi eyar kir  
gostê wi hûr hûr kir, mi kire eyêr de, avête  
milê xwe û ez hatim.

Lî mi bû sev. Şêflekê kete her min. Meş-  
rebê ez tê de beyilim, sê çar qurm ji xwe re  
agir kir, û ez li ber êgir rûniştim. Mi goştin  
avête ser perenga, ji xwe re birast, û qelina  
xwe dagirt. Mi di carê devê şêfê bû reş.  
Go mi halo meyizand va dehbek bi ser  
mi de bat. Ya sitar nestecirûbilah. Kezebê  
dilê mi jê qetîha. Ez ji ber rabûme ser xwe,  
mi eih dayê, wena ne hate ser eihê min, pêş-  
niqabîli nû rûnişt. Mi qelîna da dest, qelîna  
mi ne girt. Mi slay kiriyê, slava mi neveda.  
Mi goştê brastî Fêr nên dani, mi dayê da, ji  
dest mi ne girt, û ma pêşniqabîli mi rûniştî.

Şev kete nîsey, ne ez jê wêrim razim, ne  
ew dirazihê. Îleta carekê kete nêziki sibê,  
mi di carekê hema dehbeyê me xumîha, ra-  
zîha. Mi kesaxeyê xwe ji xwe kir, mi girtê  
ser goştê kovi, û mi lîfînga xwe, şeyê wê, bi  
têzekê firikand û mi berik kire ser, û ketim  
paşiya şêfê. Ez wilo mam û çavê mi ma lê,  
nû di carekê rabû û rûnişt. Lî vi milê

Herê bûkê pepîkê jar û mest i.

Lî ser singa te zava mam biyani.

Te reş dayê serê xwe her li ser me,

Lî te rokê dibê pîroz kitani.

Cegerxwîn e kurê te her dinadi,

Ji her jana xezani û nezani.

CEGERXWÎN

xwe meyizand û li wi milê xwe meyizand, ez ne ditim. Carekê meyizand kesaxeyê mi li wê derê ye, û li ser tîstekî de ye. Ji wi, we ye ez im. Hema carekê destê xwe halo kir û li kesaxê xistin. Kesaxe kire piçk û parî. Meyizand ne ez im, kûzên jê hat, halo meyizand, ez ne ditim, carekê li paşiya şkeftê meyizand, qirên pê ket û hate mi. Go herê tîfingê mi da-yê da û mi lingê wê kisand, xurmên ji tîfingê hat, mi li bin çengê dehbê xist. Kûzên jê hat û devê şkeftê ve derket.

Ez hatim, li ber agirê xwe rûniştim, mi nanê xwe, gostê xwe swar. Ya mirê mi, mi digo ez Ehmêdê Zeydan im, û mêr di ser mi re ninin. Bi serê mir ji tîrsa wê sevê kezebê dilê mi qetiba.

Mir go, piçki serê mi rahet bû  
- Mi di carekê du xort hatim, wi kurkiri ne, û rexte wa li pîsta wan e

Go: ya Ehmêdê Zeydan çi heqê te hebû te diya me-kust?

Û rahistine çepê mi, û ez birin. Ez birime civatekê, nizikiya sêsed mêri lê de rûniştiye, û dido li ser tîstekî rûnişti ne, di nivê weqa zilama da, yek jê bi serê mir heta niha ji ez dibêjim cun tu bûyi, û ê ditir gote:

- Ya Ehmêdê Zeydan çi heqê te hebû wê derba bi xezeb li ti diya mi xî

- Ya mirê mi, rixset heye ez bişexilim, heke ez ayil im, mi bikuje, û heke ew ayil bê êdi disanî emrê te ye

Go, bişexile bi rasti

- Yêna mi mesele jê re got, weke go çûme şkeftê û mi gost da-yê ne girt, û cilê xwe da-yê ne girt û qelî da-yê da ne girt. Heta go kete herê sibê ber bendî hev man, heta go ew razîha û axir mesele ji ewil heta talîyê mi jê re got

- Ewê go di rex de rûnişti devê xwe kire gûhê wi de. Heta niha ji ez didêjim ewê di rex de rûnişti tu bûyi. Kurê wê şiyand sial ji diya xwe kir, diya wina go «kêmi dibêjê û zêde nabêjê». Ji cem de civab li kur vegeviha, kur go:

Madam xayintî ji diya min e, ji cem mi mi ti efw kiri, bibin-ê cem bavê mi

Bavê wina sial ji Ehmêdê Zeydan kir. Ehmêdê Zeydan jê re stexilî, ji ewil heta bi tali. Meyizand go jina wi ayil e go, here min ti efw kiri.

Du xalama rahîştî çepê wî û aune cem kurê wî. Carekê meyizandtu qirên bi aliyê malê ket û girin, timam bû, jinik mir. Mêrê jinkê şiyand go, werinû ji mi re da ez bikujim Kurê wina go, te ji diwana xwe ew efw

kir û giha civata mi, ez nema didim

Ehmêdê Zeydan her dibêjê, ewê di rex de, bi serê mir cun tu bûyi

Kurê mirê cuna, ê li ser text rûnişti gote Ehmêdê Zeydan: ez dibinim ti geleki mitaha dikî, ti xwe çetîn megire ev tîstê hate serê te timam ji destê jina te hati serê te. Ti ji mi ne meztirî, gûhê xwe bide mi, ji te re bibêjim. Jinke mi hebû, mi niv saetê ne diyana sebra mi ne dihat. Rokê ez hatim mal go jina mi bê hal e, mi goti-yê:

- Hîrmet, ma çima?

- Go wele ez geleki nexwes im

- Ma dilê te naçê tîstekî?

--- Go, dilê mi diçê gostê teyrê tawûs

Pa teyrê tawûs cem dijminê min e, û di eîhekî asê de ye, me bin zikê erdê ji mêra ji hev teji kiriye. Mi go ez lirolek im, ez firim û çûme teyrê tawûs. Ez gîhame nivê rê mi di carekê himelhemek ji wê ve hat, dengê xwe li mi kir, xwe ji ber rîya mi bide alîkî, Ew bihurt ser rîya xwe û ez bihurtim ser rîya xwe. Go ez çûm devê xaniyê go teyrê tawûs lê de, û mi dani. Li devê xênî hishisand mi di diya wi rûniştî û pireka wi rûniştî û her di kurê wina ew ji li hindirû rûniştî, teyrê tawûs li ser refikê. Mi di diya wi dibêjê:

- Malava ev kurê mi natebîte, dil ketiye jina kurê cuna û işev careke di çû û ez dilirsim rokê di vê riyê de bê kustin.

- Ya Ehmêdê Zeydan gûhê xwe bide ser mi tîstê hati serê mi, li xwe çetîn megire, tu ji mi ne meztirî. Wextê diya wi wilo got mi fêhm kir go kurê wi dil ketiye jina mi, ez bihurtim hindirû. Mi her di kurik li hev xistin, hûr-hêra kirin, jina wi li taqê qesrê xist, mi rahîste lingê diya wina, mi ew ji li diwarî xist, mi her sê carek bi ser hev de hûr hûr kirin. Mi rahîste teyrê tawûs, mi kire paşla xwe û ez firin, ez hatim nivê rê. Mi di carekê yarê jina mi ji wê ve hat, ha kire mi, xwe ji rîya mi bide alîkî, çîqa halo çû ez hatim pêşiyê, çîqa halo vegeviha ez hatim pêşiyê, kir ne kir xilasiya xwe ji mi ne kir. Carekê mi lêxist, mi ji hev kire du çênî, mi serê wi jêkir û mi kire paşla xwe û ez hatime cem jina xwe. Mi meyizand jina mi wi xwe xenilandiye, çîqa çileqê xweşik wi li xwe kiriye û çavê xwe kil kirine. Mi go: Hîrmet ti rahet i?

- Go, ehmêdîlilah ez rahet im

- Ma te çi swar, ti rahet bûyi?

Hêbek tîrs û tehl mi swar û ez rahet bûm

Mi rahîste teyrê tawûs û li her danî, mi

## ZOZANÈN BÈLÌ

go: ez çavê te me, tiştê te xwest mi ji te re ani.

Westê çav li teyrê lawûs kir, jînkê fehm kir bê kuştina yarê wê ev teyr nayê. Madeki zer i pis bi jînkê de hat. Ya Elîmedê Zeydan li xwe çetîn megire ti ji mi ne meztir î. Mi serê yarê wê ji paşla xwe derxist û mi li her danî. Rihî ji jînkê çû. Mi goti-yê: Çima madê te qulîbî û ti bêkêf bûyi, hey qelbê

Gole mi, ez di bestê te de me

Mi go, best ji te re nîne. Mi derî lê gîrl mi sîr kişand û lêxist, mi kuşt. Dê Elîmedê Zeydan ez dibinim ti gelekî diqehiri, ev tişt lînam jîna te bi serê te kir.

Ya mirê mi, bi enîya mir ewê di rex kurê çîna de ser text rûniştî, heta niha ez dihêim eyn ti bûyi. Kurê mirê çîna go;

-- Elîmedê Zeydan, te diyê ti herî mal

Mi go, herê mi diyê ez herime mal. Emr kir ser di xortan, rahiştê çepê mi û ez avêtim pişt xaniyê mi, Xanik di pişt xaniyê mi de bû û qulekok dexê wê di xênî de bû. Ez li wi xaniyê rûniştim û di wi deriyî ve li hindirû dimeyizand. Jîna mi wi xwe xemilandiyê, çavê xwe kil kirime û li hindirû dikevê û dirabê. Mi di carekê xortek ji der de hate hindirû, ez wi eyn nas dikim, flankes kurê flankes. Wi û jîna mi destê xwe di stikura hev re anîn û rûyê hev maç kirin. Jînkê doşek dani, jê re balgî û zenberis, jê re danîn, qazek jê re ani, wi bi destê xwe gurand, jînkê hûr hûr kir, li egîr kir û birineek ji gêkir, heta kelin. Jînkê rabû kire mesrefê de, goştê qazê li ser dani, kire bin tiştê de. Wi destê xwe avête jînkê, kişande ser doşekê, dê wêna vê îşê pê bikê û nûka xwarina xwe bixwê. Pa ez bi çavê xwe dibinim hedana mi nema dihat. Mi derî vekir û ez ketime ser. Mi go: ez lîlanê flankes, ez Elîmedê Zeydan mi digo ez mirî bim kes nikarê pê li tirha mi bikê, iro ti pê li namûsa mi diki.

Wîna li mi vejerand: ti zîrta zêdeyî xwe meke, heke li mîrêkî mîrxas î, çekê bi xwe re deyne, ez û ti emê bi efrî rahiştê hev û heke ti nedeynî çeka bilêlê ez ji çekê xwe emîm û emê rajne hev, ti biçek, ez bîçek li fixra te nîne.

Westê wîlo go, mi çek avêtin, me rahiştê hev, wîna nav di jîna mi da. Jînkê rahiştê lîngê mi û ez di bin de dam erdê, gote jînkê:

Sûrê wi werine da em serê wi jêkin

Destê wê ne gîla sûr, heros kire bin piyê xwe, sûr bènê xwar. Ez di bin de mam kellefê dikim. Hîngî rihî şerîn e, gîdêmiya mi di bin taziyê mi de ye. Carekê destê mi lêket, mi gîdêmi kişand û mi avête ûrê wi. Roviye wi mi bi ser xwe de amine xwar. Mi lîngê xwe

Gelek bilind û pir av  
Gava sibê dîde tav  
Di panzlehê Gulanê  
Heya Çemê-di-Kanê  
Gîşk rêl û debl û zevî  
Lê digerin pezkovî  
Di bin hêlê de Salîk  
Gundîkekî pir kîçik  
Kesera dil Dîharan  
Ew ava wek robaran  
Keçelek gîşk dar û si  
Ka gopalên çivîlbi  
Hele warên çirikê  
Keskayî tê çirikê  
Ji Qezêz û Tîxînkêr  
Li wi erdê asbîzêr  
Heyhey dikir şivanan  
Weheweha gavanan  
Çûçik, şatîr û bilbil  
Ew loriyên piştîbil  
Gava ko zom radîbûn  
Miri ti wir radîbûn

...Ji Welato ra--

Tev şîbar û zînar in  
Çîna wer swes dîyar in  
Garê çû bûm serê zût  
Golberan û Qeretût  
Tev de kesk û bişin e  
Şag û nexal, kamî ne  
Heber malan zîmag e  
Meşelê wi devşag e  
Çî warekî bihuştî  
Canê mirov dîvejin  
Dûdrêj û Sêvdînan  
Gorî we bin sezîran  
Tevî nivîşk û lovmast  
Kêfa dilê min dixwest  
Heya Gola-Zêriyan  
Dihat dengên bêriyan  
Bî xiroşme û bilûr  
Borîna canegên stûr  
Dikin şayi û zozan  
Li ser dikin perwazan  
Dînê dibû şahînet  
Ew bû eihê tebiyet

LAWÛT

da siinga wi û mi çend kire dera ha. Jînkê hê li sîr dixebitê da sîr bènê xwar, da serê mi pê jêkin. Westê halo meyizand, mi mîrîk kuşt, go:

-- Ya Elîmedê Zeydan, ez dexila Xwedê û te, mi kir ti meke

Mi go: ma ti xwê ki kû da?

Mi da her ekfiya heta mi hûr hûr kir. Laşê wê û ê mîrîk tevda mi kire xirarekî mûwi da û bi şeritekî peve şîdandin. Mi erd kola, her di kirinê da. Mirê mi ev hû sella mi.

Mir go, b'eniya mi serê mi bi sella te rahet bû. Kuro rabin enterîki werinin, li Elîmedê Zeydan kin. Ya Elîmedê Zeydan wê rojê li ser text, di rex kurê mirê çîna de rûniştî ez bi xwe hûm û b'eniya mir go ne ji mi bana wê rojê te bikirana piçê ti pari.

Mir ji, zavayê mirê çîna, Mirê Botat Mihemed Begê nêçirvan bû.

★★★

Ev çiroka ha ji min re mîstarê Tilşeyra-Aşîlan, heci Îlemze kurê heci Silêman gotiye. Min tu tiştê wi ne gubart û herwekî ji devê heci derketiye welê ji galustiyê Hawarê. Zarê wê gelek nîzingî zarê Hevrkan e. Di Hawarê de gelek nîvisar bi zarê Hevrkan belay bûne. Xwendevanên ko bi zman nişûl dihin heke ev û nîvisarên din dane ber hev, ewê xwe bi xwe dikarin xê nîzingahiye tederim.

Di çirokê de tete gofîn ko Mihemed Begê nêçirvan, mirê Botat, zavayê çînan bû. Me di hejmarê Hawarê a hist û pênçan de bîserhatiya Mihemed begi digel keçperiyê, bi hênceta şîra «Bêriya-Botan», gofî bû.

*Xorta! Çoj diroka mîletê ewe, karek  
 li ser ewe girînge. Ew barekê giran e. Ji ewe  
 barekê giran para mîran, para mîran barekê  
 giran in. Çe ew kîriye piştê ewe û daye  
 kêşê çiyayên ku birêve bilêntir û asêtir dibin.  
 Herçend libetkîşî û ji destê dîr dikewî,  
 diwestî, lê ewçend zexm û xwarê dîtî.  
 Hawir diguhêre, tîstînen venas dibîni.*

## ÇARINÊN XEYAM

Wê şeraba yaqûti û rengsor bîne  
 Wî heval û destbrayê azayan werine  
 Tu dizani ko heyin ji axê çêbûye  
 Bayek e, tij dibore, serabê bîne.

Dizani spêdeyê de dikê sibehî  
 Çare hinde dike hawar û gazi?  
 Neynîka sibehê de nişa te dikin  
 Ko ji jiyîna te sevek borî û tu pê nîzani,

Mîn fîlek ji deftera hevînê vekir  
 Ji nişkekê ve pîsporekî bî dilgermî got;  
 Bextiyar e, ew zelamê ko mala wî de  
 Delala wî heye, heyvûrî, û şeva wî heye, drêj  
 [wek salê.

Berî ko navê te ji dinyayê hiçe  
 Vexwe şerabê xema te dê hiçe  
 Keziyên delalêkê ji hev bike  
 Berî ko lasê te ji hev bikeve.

Sernijdevanê rûdên serabê ez im  
 Ji gotîna he çûn gûelkaçbûyî ez im  
 Yê, ji vexwarîna meya zehal hêxewmayî  
 Ê bî xwîna kezehê lavelavkîrî ez im.

Xwe bigire ji giyani tê dîr bikevî  
 Lê pişt perdeyê veşartiyên Xwedê kûr bikevî  
 Serabê vexwe tu nîzani, hatiyî kû  
 Dîlxweş he, tu nîzani dê biçî kû?

Şerabê vedixum lê serxweşiyê nakim  
 Ji bîlî piyanê desdrêjiyê nakim  
 Dizani qesda min ji şerabperestiyê çi ye?  
 Da ko wek te xwepereştiyê nakim

Dîne dîtî û herê dîtî hiçe  
 Ê her tîstê ko gotî û bîhistî hiçe  
 Heke dîne seranser geriyayî  
 An ji goşeya malê de rûniştîyî hiçe

Gulê got rûyekî ji rûyê min spehîtir nîne  
 Hevqas westabûna gulavgirî ji bo çî ye  
 Bîlbîl bi zumanê halê xwe got  
 Ma ji bo kenîna rojekê kî salekê negirî.

Roja ko hespê ezuanî tê de zîn kirin  
 Ê Mîşterî û Perwîn rewşa wî kirin  
 Ji diwana qezayê nesibê me ev bû  
 Ma gunehê me çî ye, kismetê me ev kirin.

## KOÇERA MÎRAN!...

Ho koçera min! Min bi maça devê xwe  
 maç bike. Hevîna te ji şerabê spehîtir e. Bîl-  
 na te bîhneke şîrîn e. Dengê navê te wek  
 ronîya rojê belav bûye, ji lewre herkes hej  
 te, hej sura bayê te dîke.

Ho keça koçerê mîran! Tu esmer î, lê  
 spehî yî. Tavê li rûyê te neyirîye, ji lewre tu  
 esmer î. «Zêrê zer î xîrab nabî, tu koçer î  
 destî nabî.»

Dî nav kulîlkên sor û zer de kulîlka  
 spehîtir tu î. Dî nav jinên zirav û şîrîn û bî  
 hejî û bal de a çelengtir tu î.

Dî spehîtiyê de serdara serdaran û ser-  
 laca delalan tu î.

Sîngê te ezmanê min e, mîrari ser sîngê  
 te de wek stêrkan dicîrisin. Çavên te ne  
 çavên xezal û askan in. Dî çavên te de agir

## JJ MELÊ

Di Kurdistanê de mela zehf hûn. Xwedê kêmaniya wan medit, iro ji ne hindik in. Lê gava bi tenê «Mela» lête gotin herkes pê dizane ko ew mela «Malayê-Cizerî» ye. Qesta me ji ew melayê biagir e ko di bin wi de kuç di-sineirin û jinan nanên xwe pêve didan.

Diwana melê, nemaze bi felsefe û tesewifa xwe heja ye. Lê ewçend ji ji pirsên biyani teji ye. Me dil kir em çend malikên diwana wi, ji bona ceribandinê, bi herfên me ên nû û xwe-ser binivisînin. Ev in, du sezelen wi :

### XANIM :

Pir ji dina te kerib im xanim  
Ji te ser ta bi qidem heyran im  
Her bi em teşneleb û le'lan im  
Dil di benda girba zifan im  
Yûsifê cirhekesê hîcran im  
Niqetê dairaî rindan im  
Lew şebi daira sergirdan im  
Badenûşê qedehî hîran im  
Bi dil atêş ji ceger bîryan im  
Lew perîşan im û pir êşan im  
Aşiqê nazik û mehbûban im  
Tu mebê bê ser û saman im  
Gulê başê iremê Buhîtan im  
Şebeiraxê sevê Kurdistan im  
Çi tebiel beser û insan im  
Lilahlîhemd çi alîşan im  
Dî rêya yarê de li rêza san im  
Lew di eqlîmî suxen xaşan im  
Sibehê îde, û ez pê zanîm

hildibe û kortalên kûr û tari lê hene.

Zêdana dilê min çayên te ên res in.  
Hêlîna heyîna min di sila mijangên te de ye.

Koçera min, ji xewê rabe koçera min.  
Buhara pêşin e; mêrg û solin bi bihn û reng  
in, ba serxweş e, kani sar û bi kêf û gûsgus  
in; hezar stranê hevînê dixwîne.

Libadeyê te ziv e, bedena te servelati ye.  
Di zendên te de bazinên zêr û gewherkiri,  
di baskên te de bazbazingên sor û zivkiri hê-  
lîleya rawêşê distirin.

Bisk û guliyên te ên çinçinkiri bihna  
misk û enberê belav dikin û ser dilê sortan  
vedidin.

Hewa bi bihna te bihûdar, çiçek bi  
rengê te rengdar dibin.

Wek lawûsê hîleper û nazdarî, meşa  
te wek meşa qumrî û kevokan nerm û sivik e.

Ho koçera min! Serê te nêvserk û kum-

Go bi kêra te seher qurban im  
Xweş birûdarekî bê darman im  
Çarekê şefqê ke rûb im, can im  
Ji Xwedê re veke benda bîriyê  
Dinbîrê hûrî-misalê zeriyê  
Nazikê neyşekirê sorperiyê.

### DIL JI MIN BIR :

Sûx û şengê zuhrengê dil ji min bir dil ji min  
Awirê heybepilingê dil ji min bir, dil ji min  
Wê şepalê miskixalê dênûdare gerdensomalê  
Gibheta biskan sema lê dil ji min bir, dil ji min  
Zif û xalan nûn û dalan wan ji min dil bir bi naban  
Goseyên qewsên hilalan dil ji min bir dil ji min  
Dênmedirê boehirê xemrî û keysû herirê  
Sine kir armancî tirê dil ji min bir dil ji min  
Sursirîne nazeninê knştîme nakit yeqînê  
Wê bi çengala evinê dil ji min bir dil ji min  
Fell û taban da Xuraban obîeq û eubtê şibaban  
Dame ber penc û gulawan dil ji min bir dil ji min  
Xweş - xerame ez Sulamê nazikê serinkelamê  
Subtiya eywanmeqamê dil ji min bir, dil ji min  
Maberûyê miskêhoşê sar - pilingê şerexoyê  
Wê bi zilfa şibbî goyê dil ji min bir dil ji min  
Her du çesman naz û xesman kê ji ber wan  
leql û hes man  
Saheta min di bi çesman, dil ji min bir, dil ji min  
Mahitabê, afitabê, dêm ji rojê şevniqabê  
Xweş bi çengal û kulavê dil ji min bir, dil ji min  
Serwinazê serfirazê şibbî zêr remza mecazê  
Dame ber çakûçê û gazê dil ji min bir, dil ji min  
Beja û hala Jox û lala min kirin vêkera mitala  
Çiçeka terbûnê û ala dil ji min bir, dil ji min  
Mirê Xazî şêrê tazî vegeran min di bi bazi  
Kir li me ji şeflet ve Xazî, dil ji min bir dil ji min  
Şir û xiştin zif û qîştin hin veyartin bin vebîştin  
Pehlewanaan dest venîştin, dil ji min bir dil ji min  
Iuhniya çehvên mela yi ew teclaya te dayê  
Ya ji Ehmêd dîrevayê, dil ji min bir, dil ji min.

ribkiri, lîliyên te gustilkiri, gustilkên te self-  
kiri, eniya te toq-kiri, nermikên te gularkiri,  
gerdena te morikiri, zendên te bazinkiri,  
lingên te xizalkiri, bedena te biskojkiri. Sara  
serê te gulivk û serçaskiri, keziyên te şerab-  
kiri, ristika te serdilkiri ne, ho koçera min!  
Çayên xwe veke ez dixwazim stêra qedera  
xwe bihmim.

Lêvên te sor in, û wek agiri germ in.  
Gul bi kenina te dibişkiye û bi girîna te  
diwerihe.

Koçera min, rabe û min bi maça xwe  
maç bike.

Dilê min serxweşiya maça te û mesti-  
ya bihna te dixwaze. Berde, bila zenda min  
bihe kemberhestiya nêvlenga te, Dev û Lê-  
vên te kaniya ramûsanê ye, bilêle bila bîriya  
dilê min, bi ava wê kaniyê din û bêhîş  
bikeve!!! Ho koçera min.

Dr. K. A. BEDIR-XAN

# ZERDEŠT Û RÊYA ZERDEŠT

...our dear and valiant brethren, the Kurds, the only heroic people who have preserved the purity, integrity and independence of the old Iranian race.\* The Editor of The Iran League, Bombay. Vol. VI, no 1, October, 1931. Page 31.

Dinê wînda, her çavên cihan Xwedê ne bû  
Bi hawara hişê te erd û ezman rabû.  
Te got ji bo herkest yek namûs û yek best,  
Çi biçûk, çî mezin, çî hakimê şûr û text.

Baweriya te rêya rast e, ditina pak,  
Gomana rind, kirina baş û gotina çak.  
Fermana te vejand jinê ji xewa tari,  
Ronîya pêşîn î, fexra milletên Ari



Zerdešt  
ji me ye,  
û fro ji di  
Kurdistanê  
de hin  
kurd he-  
ne ko pê  
bawer in.  
Ew ji Eyzedi  
ne.

Ji berko  
za n a yê  
kurdistanê  
ê berê  
Zerdešt  
bû, ji bo  
me zanî-  
na b i n-  
y a n û  
qeydexên  
rêya Zer-  
dešt çak e.  
Ji v e z a n i-  
nê mede-  
niyeta me  
a kevî,  
bilindî û  
kûralîya  
hişê me,  
dîlpakiya  
MILETÊ  
K U R D  
xuya dihe.

Ji xwe  
felsefe û  
nivîsandin  
ango destpêka  
pêşkelîna  
cihanê bi

heyîna nijadê me ve girêdayî ye. Cihan-  
dostî, cihanbratî ji destxetê me ye.

Navê kitêba zerdeştîyan Avesta  
ye. Nivîsevanê wê Zerdešt e. Dema nivîs-  
andina Avestayê biewleynî hêj ne haliye

zanîn. Hin nivîsevanên rojavayê dibê-  
jin ko şeşsed sal berî tsa pêxember ha-  
tiye nivîsandin. Hinêkên din û zerdeştî  
bî xwe bawer in ko Avesta pêncezar  
sal berî tsa pêxember hebû. Herhal



kitêbeke gelek kevn, mezin û heja ye.

Berî Zerdeşt û Avestayê mirovan yekitiya Xwedê ne dizanin. Baweriya wan tari, bê him û bê binyan bû.

Tiştên ecêb wek heywan, ba, av, dar, çiya ji xwe re dikirin Xwedê, hej wan dikirin, ji wan difirsiyan û ji wan re lavelav û perestîş dikirin. Yekitiya Yezdan, mezinahiya wî bi Avesta hatiye belav kirin. Rastiya biş û dil, pakitiya laş û inal û cil bi fermanên Zerdeşt bûn qeydeyên jinê û armancên milletên pêşkeli. Gotina dinê Zerdeşt a paşin ev e: dinyayê de rêyek heye, ew ji rêya rastiye ye. Ma saîre Kurdan ê mezin Xani ji ne digot:

Kîzb û xîlaf mebej ger te bikin ker bi ker.

Ji bîli vi mamikê me ê delal: Derew dijminê Xwedê ye; çiqas ronak û servehatî ye.

#### HÎMÊ BAWERİYÊ

Zerdeştî divê baweriyê binin ko: Xwedê yek e, bê hewri ye, bê deng e. Abadîn e, zana û xurt e. Her hebû, her heye û her dê hebe. Ji afirandiyên xwê re mîhrivan e, qenci û xweşiya wan dixwaze.

Xwedê bi çavên me naye ditin, lê dinê ji serî heya binî şahidê heyîna wî ye. Ezman, roj û heyv, stêr, giya, av û heywan bi gotinekê her list heyîna Xwedê û mezinahiya wî nişa me didin.

Ew tiştên ha hemî bin qanonên afirandinê de hatine saz kirin. Qanonên afirandinê abadîn in, nayîn guhartin, nayîn edilandin, çawan hatine afirandin wisan dimînin, ser xwe disekinîn. Xwediyê qanonên jorin, şehînsahê wan, afirideyê wan Yezdan e.

Xwedê zana ye, ji kirin û fikirin û ji golinên me xweyhay e. Kes nikare jê-tiştêki veşêre, naye xapandî, yên qo bawer dikin Xwedê dixapînin tinê nefsa xwe dixapînin û tewza bişên xwe dikin.

#### ARMANCA VÊ ZANINÊ

Zanînen himên baweriyê, me ditine niziki veşartiyên daxwazên Xwedê. Bi vi awayî em dizanin yên û fermanên Yezdan çî ne û em çawan dikarin xwe bigehînin wî.

#### MAYÎYÊN VÊ ZANINÊ:

Ji vê zaninê xuya dibe ko başî û piyariya Xwedê bi zelamên qene re ye. Dinê û jin destên me de wek mehfûrekê ye. Xweşi, çelengi, reng û awayê mehfûrê herweki destên xebatkerên xwe de ne wisa ji, spehîti, bextiyarî, siûd û çaki û neçakiya jinê û paşiya me di destê me de ne. Herweki Xwedê piyar, mezin û neqenciya afirandiyên xwe naxwaze, ji qehr û belayên jinê tinê em mesûl in. Kirêti, jari, ketin û şerpezeyî destkuta me ne.

Ev fêkiyên jehrîna karê tirali, bêbextî û belengaziya dilên me ne. Yên ko hej Zerdeştî dikin divê hej ronahiyê bikin. Fikirin, kirin û golinên wan divê wek ronahiya rojê pak, rast û qenc bin. Tinê zelamên bêbext xwe wedişêrin.

Yên ko kirinên xwe vedişêrin, û ji bo veşartîna wan dikevin pê tariyê ne mêr û ne ji camêr in. Di nav beyna rastî û nerastî, spehîti û kirêti, ronahi u tarîti, qenci û xirabiyê de şereki mezin heye.

Em bi çavên xwe dibînin ko nerastî, kirêti, tarîti, xirabî hero sistir dibin. Ketin û xirabûna wan fermana Yezdan û armanca mêrên camêr in. Ji kirinên qene cam û dilê me şa dibe, ji kirinên nexweş tirs û êş dikeve dilê me, jina me dibe bê tam û bê xurtî. Ev hesandîna dili, ev kêfxweşi û dilêş têsîra ronahiya Xwedê ye. Jin û mêr pê dihesin û jin û mêr rehmet û eza-bên vê ronahî û tarîtiyê dizanin.

Ji xêzikên jorin dixwiye ko kurd, ji kerema Xwedê, her li ser rêya rastiye de mane. Berê bi Zerdeşt û niho bi dinê me ê delal û mezin misilmaniyê.

Dr. K. A. BEDİR-XAN



# LE SOLEIL NOIR

## Les Coutumes du Pays des Kurdes

Le plateau de Hewreman qui est situé au sud du Kurdistan entre Suleymaniyeh et Sinc - la première, ville des gens d'un esprit rare et fin, la deuxième célèbre par la beauté de ses tapis et ses objets d'arts - est une merveille de la nature.

Ce pays riche, fertile, doté d'un charme exceptionnel est par excellence le foyer des poètes et des artistes.

Pour ceux qui connaissent bien le Kurdistan, seules les montagnes et le plateau de Milles-Lacs avec ses eaux de cent couleurs pétillantes, sa végétation vigoureuse et florissante, sa situation remarquable, sa richesse minière au nord du territoire où, entourée de brumes rose se cache la source de la vie et du bonheur éternel; peuvent être comparées au plateau de Hewreman. En escaladant les montagnes de Hewreman on éprouve une sensation bizarre. On croit atteindre le ciel bleu et clair du pays, en suivant les pentes colorées et parfumées par des fleurs connues et inconnues qui grisent l'odorat et enchantent les yeux.

Mais le miracle de la nature s'accomplit à l'aurore, une heure et demie avant le lever du Soleil sur la terre d'Asie; des monts de Hewreman on le voit enfoncé dans le velours de la nuit comme un démon noir, dépassant de quatre à cinq fois sa grandeur.

Les Kurdes habitués à ce spectacle grandiose de l'Astre.

La nuit regne encore et sous la voûte étoilée, silencieuse, la terre dort et donne l'impression d'un temple vide et chaque chose apparaît nonchalante et mystérieuse.

Malgré les notions précises de la science on aime à croire que la terre se reposant dans la tranquillité immense de la nuit c'est le soleil qui avance.

L'Astre qui tout d'abord est absolument noir, petit-à-petit évolue et prend une couleur de sépia très foncée pour passer à une teinte mauve, lilas et ces différentes couleurs, par des changements très graduels, se fondent en un ton jaune vif.

Puis la coloration prend une allure plus précise, le jaune devient rose comme une flamme naissante, un rouge très vif lui

succède pour faire place au globe d'un rouge ardent comme un énorme morceau de fer brûlant qui semble verser le feu dans l'espace.

Au loin, à l'horizon sur des collines éteincelantes on aperçoit des bandes d'oiseaux parcs à des essaims bourdonnants d'abeilles. La densité de la nuit s'affaiblit, des brumes passent, des ombres et des nuages s'enfuient, entre la terre et le ciel on voit se former un rond doré comme une ceinture magique: d'où sortent des rellets rouges, bleus, gris, mauves, jaunes et blancs dans une limpidité qui laisse voir les étoiles.

Pendant une heure et demie, les yeux sont extasiés par ces jeux colorés et lumineux et se reposent en contemplant l'aurore qui naît dans la plaine. Comme une grande rose l'Astre s'épanouit dans le jardin du ciel et la terre pâlit, rit sous la lumière éblouissante dont les diverses couleurs teintent le frisson des eaux. Ce que je viens de peindre est une des mille beautés de ce pays. Mais il faut entrevoir les raisons de la vénération presque religieuse que les kurdes éprouvent pour la nature et leur culte de la lumière.

Mon séjour m'a permis de voir les coutumes intéressantes qui caractérisent la nation. Sans avoir la prétention de donner à ces lignes la portée d'une étude je veux raconter des choses vues les concernant.

Ainsi la fête de la naissance du printemps est un grand événement familial et social de ce pays, de cette race grave, libre, amoureuse, et forte. Le 21 Mars est considéré comme le premier jour de l'année. L'hiver, la nuit qui étaient tombés sur la vie passent et une clarté neuve comme l'eau limpide des sources jaillit des rochers, envahit la terre. Les belles heures s'approchent. Les arbres effeuillés s'habillent.

Le ruisseau qui pleurait tout un hiver sous les glaçons chante sur les sables à travers les buissons. Le froid n'est plus têtù, le soleil promène les fleurs dans les champs et les prairies. La neige des hautes montagnes se fond et comme le poète le chante des forteresses blanches, gigantesques tombent et s'éroulent. L'armée des roses, des tulipes, des narcisses envahit la terre doucement en la calmant. Les troupeaux chassés par la neige et réfugiés dans les plaines prennent leur marche vers les montagnes et les plateaux.

Ceux que la neige avait fait descendre

commencent à monter. Des milliers de moutons et des chèvres s'élancent vers les hauts pâturages. Un sang vif s'éveille dans les veines des hommes et des animaux. Les oiseaux chantent, les pâtres vivifient leurs flûtes et dans la fête de la montagne les échos des rêves enfuis inspirent les poètes.

Dans les villes et villages les maisons sont ornées. Les salons et les salles à manger sont fleuries de roses et dans de petites corbeilles et des vases plats les grains de blé ensemencés dans la terre mère, élancent leurs lourds épis. C'est le jour où chaque table a la grande abondance des mets et des douceurs.

Chez les Kurdes non mahométans, chez les Yezidis, les adeptes de l'ancienne religion Kurde, le vin rouge coule. La jeunesse habillée élégamment rit, chante et danse. Tout le monde est gai. On oublie les rancunes, on s'embrasse et on pardonne. Et ce jour là, le moindre mot désagréable, le plus petit geste impoli sont considérés comme une offense à la divinité au même titre qu'un acte brutal et inexcusable.

Cette vieille coutume est très respectée. Le même jour on met dans des tasses vertes remplies d'eau des morceaux de papier sur lesquels sont écrits des vers célébrant les temples antiques, la lumière divine et on boit cette eau qui est considérée sacrée.

Il est bizarre de voir les Kurdes mahométans fêter avec tant de joie la naissance du printemps, vestige de leur ancienne religion, tandis que les mêmes, surtout les nobles ferment leur cuisine pendant les deux grandes fêtes islamiques. Ils prétendent que festoyer pendant ces fêtes porte malheur.

Le proverbe turc qui dit le Kurde est musulman comparé à un incroyant «gavour» trouve peut-être sa signification dans des coutumes pareilles de cette nation.

Chez les Kurdes l'idée de la famille est très développée, la naissance d'un enfant est un événement d'une importance spéciale. Dans les villages, entre les tribus on fête publiquement pendant une période variant de 3 à 7 jours, la naissance de l'enfant.

La mère est comblée de cadeaux : montres, bracelets, bagues, jolis tapis, soieries multicolores. Le septième jour l'enfant reçoit son nom. Le prénom du père ne lui est pas donné : si celui-ci est mort avant la naissance, l'appeler par le nom de son

grand-père ou grande-mère paternels ou maternels est dans les coutumes. Le parrain est toujours un homme de bonne renommée, le plus recherché est celui qui a bu l'eau de sept mers, symbole du savoir et de sagesse. Quand l'enfant a 10 ans il est envoyé chez ses oncles.

Les frères et les sœurs recevant mutuellement leur neveu renforcent les liens familiaux. Et envoyer à la rencontre d'un voyageur ou d'un visiteur estimé le neveu au lieu du fils de la maison c'est l'honorer et le considérer.

La coutume musulmane orientale qui consistait à ce que le mariage se fit par intermédiaire, sans que les futurs époux puissent se voir, a toujours été inconnue chez les kurdes. Les femmes kurdes n'ont jamais porté le voile; aussi l'amour avec toutes ses grâces et ses conseils charmants naissait souvent spontanément et grandissait en générale d'une manière bien sage.

La femme kurde n'apporte guère au foyer conjugal que sa gracieuse personne et son cœur chaud et dévoué, la dot est chose inconnue; le mari prend tous les frais à sa charge et bien souvent assure à son beau père une somme rondelette.

Plusieurs fils à marier peuvent amener dans une famille une véritable débacle financière. Heureusement en général les jeunes hommes très ardents et moins patients arrivent à se débrouiller eux mêmes pour obtenir la main de la bien-aimée. Après l'entente intime des deux jeunes gens, la mère ou la tante du jeune homme fait une démarche discrète chez les parents de la jeune fille. Si cette démarche est encouragée le père ou l'oncle fait la demande officielle.

Le soir du jour où le consentement est accordé dans une réunion intime on fête les fiançailles. Dès cet instant le fiancé a la permission tacite de voir sa fiancée chez elle. Les jeunes gens ne se gênent pas pour user et même abuser de cette autorisation et ceux qui arrivent à s'assurer la sympathie de leur future belle mère peuvent bien se mettre à l'aise. La durée des fiançailles n'est pas fixée. En général elles ne dépassent pas une année. A partir de ce moment, des petits cadeaux offerts gentiment par le fiancé entourent la petite fille rêveuse.

Le jour heureux venu si les futurs époux

sont dans le même pays un cortège de piétons se forme, s'ils habitent des villes différentes c'est un cortège de cavaliers. La jeunesse se met en tête précédée par des enfants de dix à douze ans. La fiancée vient après ayant à ses côtés quatre jeunes femmes mariées suivies par les membres des deux familles et de leurs invités. Quand le cortège arrive à proximité de la maison nuptiale gai et chantant on entend des voix de femmes :

- Où est le gendre.. pourquoi n'est-il pas venu à la rencontre de sa fiancée?.. ah non.. dans ces conditions nous allons rentrer chez nous.. nous allons la conduire chez son père....

Les confidences des femmes âgées m'ont appris qu'il n'était pas rare que des jeunes filles innocentes et crédules palissent d'inquiétude et passent des mauvais instants en pensant à la possibilité d'un retour triste vers la maison paternelle. Les murmures persistent et le gendre qui est là dans un coin, dans une rue à peine éclairée s'avance tout rouge, timide et balbutiant des mots incompréhensibles. De nouveau des murmures, des quolibets, des exclamations montent du côté des femmes.

- Ah... tiens.. vraiment il est beau.. quelle taille... mais comme il est timide... il n'ose pas même lever les yeux...

Mais pourquoi ne parle-t-il pas? Pas même un mot de gratitude à l'adresse de cette belle fille.

Ainsi on rit, on fait des plaisanteries et on avance. L'habitude veut que cette cérémonie se passe pendant la soirée. De grands bougies illuminent le parcours. La demi-obscurité qui régit encourage même les femmes les plus timides à plaisanter librement. Arrivés au futur foyer tout le monde se réunit dans la salle, le prêtre prononce les mots rituels et dit qu'il sont liés par le mariage. Jusqu'au matin des réjouissances, des attractions, des danses enchantent les invités et pendant trois jours la fête continue...

Au cas d'un refus de la part des parents de la jeune fille, le jeune amoureux, s'il obtient l'accord de sa belle, l'enlève. Comme c'est facile à imaginer; l'enlèvement d'une jeune fille est une chose bien périlleuse. On peut risquer même la vie. Cet enlèvement est considéré comme un acte tout à fait honnête et même chevaleresque.

Le jeune homme accompagné de ses frères, cousins ou amis fait l'exploit. Le «grand» du pays ou des chefs et des notables interviennent. Souvent on trouve la possibilité d'un arrangement amical.

En tout cas tant que le mariage n'est pas conclu le jeune homme respecte la jeune fille. C'est là une question d'honneur. Des chansons prétendent que la jeunesse doit avoir un pareil souvenir et que ce souvenir arrive toujours à dissiper les malentendus, même graves du ménage.

Les craintes, les soucis, les frissons, les risques, les souffrances est les joies éprouvées par ces deux jeunes cœurs, les unissent pour toujours avec un charme indescriptible.

Un proverbe kurde dit : «celui qui ne veut pas mourir sur le chemin conduisant à la cousine (le mot cousine veut dire la bien-aimée) est un malheureux». Une coutume ancienne voulait qu'un enfant riche, devenu orphelin soit marié - même à l'âge de 10 ans - afin de sauvegarder sa fortune; cette coutume ne s'appliquait qu'à l'enfant mâle parce qu'on accordait à la femme la plus grande confiance dans sa générosité et son honnêteté.

La petite fille qui devenait orpheline ne pouvait, elle, être mariée que vers l'âge de 16 ans. Je veux donner aussi un amusant exemple de la superstition kurde.

Dans certaines régions le chiffre 13 n'est jamais prononcé. En comptant on dit : onze, douze, plus est quatorze.

Une chose bien gaie aussi est de voir comment une jeune fille développe son goût et son talent de bien s'habiller. Elle s'entoure d'un ombre de poupées qui sont ses mannequins.

Sur des chemises, des robes, des pyjamas des couvre-chefs faits pour la poupée, la jeune fille laisse courir sa fantaisie élégante. Ces vêtements après mille changements et modifications lui servent de modèles ainsi qu'à ses amies. Le travail des tapis, des kélins, des couvertures, des chales, des broderies contribue énormément à ce perfectionnement artistique tant au point de vue couleur qu'au point de vue dessin. Ces travaux d'art sont souvent exécutés sans modèle, œuvre de l'inspiration et de la fantaisie artistique pleine d'imprévu, de caprice et d'imagination... Devant le métier chantant, bavardant, si le secret du cœur est déjà

trop lourd rêvant elle travaille et produit ces chef-d'œuvres d'un goût sûr d'une richesse fine et d'une coloration éblouissante. Leur marbre c'est la laine. Ce travail a aussi sa littérature.

Les chansons dénommées «chants devant le métier» composées et chantées par les jeunes filles sont spirituelles, pleines de malice et de coquetterie. Sous les ombres des arbres, des grands rochers, à l'entrée des grottes fréquentes dans les montagnes du pays on rencontre souvent des jeunes filles assises devant leur métier bavardant avec un jeune homme. C'est un plaisir considéré comme tout à fait innocent.

Mais si le métier au lieu d'être devant elle est à l'écart on arrive à penser facilement que la relation a dépassé le simple fleur. Concernant le travail du métier elles ont une coutume qui est saisissante. Si pendant l'exécution d'un travail par la maîtresse de la maison, son mari vient à mourir on laisse le travail inachevé et on en fait cadeau à une personne étrangère à la famille, chère au défunt. Ainsi j'ai reçu de la femme de Derwiche Aga, le chef des Yézidis de la Syrie le kélim à moitié tissé, après la mort de son époux tué par un autre Yézidi.

Ce dernier avait disparu au cours de la guerre générale et Derwiche Aga le considérant comme mort avait autorisé sa femme à se remarier. Le disparu revenant au pays après une absence de 11 années tua le Aga le considérant responsable de cet abandon. Les kurdes ont beaucoup de respect pour les morts et un culte pour leur souvenir. Chaque endroit où le sang humain a coulé est indiqué par la pierre qu'érige un des amis du mort.

Les passants ajoutent d'autres pierres à celle-ci pour sauvegarder pieusement les noms de l'oubli. Les cimetières sont soignées et proprement entretenues. On vénère les morts par un feu brûlé durant trois jours dans la chambre mortuaire, puis pendant une semaine à côté de leur tombeau. Ceux-ci sont constitués par une colonne de marbre de 2 à 3 mètres de hauteur sur laquelle pour un homme on grave des dessins : poignards, fusils, outils de travail, aigles ou cercles symbolisant le Soleil alors que pour les femmes l'ornement consiste en dessin de fleurs : marguerites, mugets, ou d'objets de coquetterie : peignes, bracelets etc... Les cimetières

en général sont situés hors des villages et des villes, sur les collines.

Planter des arbres aux cimetières est une coutume. On considère que les ombres des arbres donnent le repos à l'âme dans le calme éternel. Les arbres de Judée sont les préférés.

Les kurdes ont un amour excessif pour les animaux, et une véritable vénération pour le coq et l'aigle. Le coq symbole de la gaieté qui par son chant joyeux annonce le lever du soleil et tel le sage, prédit les malheurs dans son chant intempestif.

On prétend qu'une fois dans un village du plateau de Hewremau et une autre fois à Mamed dans la région de Pijdère les coqs chantèrent pendant la soirée.

C'était un présage de malheur, auquel personne ne fit attention; la même nuit ces villages étaient détruits. Dans ces régions on ne tue jamais un coq.

Pendant les mariages on fait tourner un coq autour de la jeune mariée pour lui assurer le bonheur, la lumière fraîche et l'indépendance dans la vie.

Si un coq est introuvable il est remplacé par une statuette de coq préparée spécialement pour cet usage.

Des aigles accompagnent souvent les chefs dans leur déplacement.

Le printemps passe, le nouveau né rit et devient dans la joie un jeune homme et se marie, le vieillard répète ce mot devenu un proverbe kurde : «La mort ! Oui; mais non la vieillesse».

Dr. K. A. BEDIR-KHAN

De la grammaire kurde

## DÉCLINAISON DU PRONOM

(suite)

Pretons le verbe transitif (ditin-voir).

Conjugons son indicatif présent :

Ez dibin in	Je vois
Tu dibin i	Tu vois
Ew dibin e	Il, elle voit
Ew dibin in	Nous voyons
Hou dibin in	Vous voyez
Ew dibin in	Ils, elles voient

On voit distinctement les désinences de chaque personne qui au pluriel sont les mêmes. Citons le passé composé du même verbe.

Min dit	J'ai vu
Te dit	Tu as vu
Wi, wê dit	Il, elle a vu

Me dit	Nous avons vu
We dit	Vous avez vu
Wan dit	Ils, elle ont vu

Conformement à la règle, ci dessous mentionnée, ce sont les pronoms-complément qui ont pris la place des pronoms-sujet et en conséquence le verbe est resté sans désinence, puisque la terminaison est l'effet de l'accord avec le pronom-sujet et que ce dernier manque, et alors qu'il traîne les désinences comme partie intégrale de son propre être.

Conséquemment dans la phrase «Zin a vu» Zin - bien qu'elle soit sujet - et parce qu'elle se trouve à la place du complément, sera déclinée «Zinê ditê» et au contraire dans la phrase «J'ai vu Zin» Zin, bien qu'elle soit complément ne se décline pas, puisqu'elle s'est intervertie avec le sujet «Min Zin ditê».

Dans les phrases suivantes nous retrouverons les désinences des verbes qui avaient disparu pendant la conjugaison de ces derniers sans complément.

Zinê ez ditim	Zin m'a vu	We ez ditim
---------------	------------	-------------

On voit bien distinctement que la désinence du verbe n'est que l'accord de ce dernier, non pas avec le sujet logique, mais avec le complément qui en son origine est un pronom-sujet, de sorte que toujours c'est le sujet logique qui se décline.

Autres exemples :

Min (me) tu ditê	Je l'ai vu, nous l'avons vu
Min (me) ew ditê	Je l'ai vu, nous l'avons vu
Min (me) hon ditim	Je vous ai vu, nous vous avons vu
Min (me) ew ditim	Je les ai vu, nous les avons vu
Te (we) ez ditim	Tu m'as vu, vous m'avez vu
Tê (we) ew ditê	Tu l'as vu, vous l'avez vu
Te (we) em ditim	Tu nous as vu, vous nous avez vu
Te (we) ew ditim	Tu les as vu, vous les avez vu
Wi (wan) ez ditim	Il m'a vu, ils m'ont vu
Wi (wan) lu ditê	Il l'a vu, ils l'ont vu
Wi (wan) em ditim	Il nous a vu, ils nous ont vu
Wi (wan) hon ditim	Il vous a vu, ils vous ont vu

#### NOM DE NOMBRE ET VERBE

Des parties variables du discours il ne reste que le nom de nombre et le verbe.

En ce qui concerne le nom de nombre nous nous contenterons de ce que nous avons exposé dans l'article traitant des parties du discours et nous réserverons les détails pour l'article le concernant.

Quant au verbe, le changement qu'il subit par le fait de la conjugaison c'est la forme de flexion qui lui est propre.

Tout en réservant les détails du verbe pour l'article le concernant nous donnerons ici un tableau de conjugaison des deux verbes kurdes. Un intransitif et un transitif.

On forme les temps simples du passé en supprimant la terminaison. Dans le verbe intransitif on ajoute au radicale les désinences. Le verbe transitif se conjugue sans désinences.

KET-in		KIR-in	
Ez ketim	Em ketin	Min kir	Me kir
Tu keti	Hon ketin	Te kir	We kir
Ew ket	Ew ketin	Wi, wê kir	Wan kir
Ez ketime	Em ketine	Min kiriye	Me kiriye
Tu ketiyê	Hon ketine	Te kiriye	We kiriye
Ew ketiye	Ew ketine	Wi-ê kiriye	Wan kiriye
Ez diketim	Em diketin	Min dikir	Me dikir
Tu diketê	Hon diketin	Te dikir	We dikir
Ew diket	Ew diketin	Wi-ê dikir	Wan dikir
Ez biketam	Em biketan	Min bikira	Me bikira
Tu biketayê	Hon biketan	Te bikira	We bikira
Ew biketa	Ew biketan	Wi-ê bikira	Wan bikira
Ez dê biketam		Min dê bikira	
Tu dê biketayê		Te dê bikira	
Ew dê biketa		Wi, wê dê bikira	
Em dê biketan		Me dê bikira	
Hon dê biketan		We dê bikira	
Ew dê biketan		Wan dê bikira	

On forme les temps composés du passé à partir de l'infinitif parfait.

#### KETI-BÛN KIRI-BÛN

Ez keti bûn	Min kiri bû
Tu keti bûyê	Te kiri bû
Ew keti bû	Wi, wê kiri bû
Em keti bûn	Me kiri bû
Hon keti bûn	We kiri bû
Ew keti bûn	Wan kiri bû
Ez keti bwan	Min kiri bwa
Tu keti bwayê	Te kiri bwa
Ew keti bwa	Wi, wê kiri bwa
Em keti bwan	Me kiri bwa
Hon keti bwan	We kiri bwa
Ew keti bwan	Wan kiri bwa
Ez de keti bwan	Min dê kiri bwa
Tu dê keti bwayê	Te dê kiri bwa
Ew dê keti bwa	Wi, wê dê kiri bwa
Em dê keti bwan	Me dê kiri bwa
Hon dê keti bwan	We dê kiri bwa
Ew dê keti bwan	Wan dê kiri bwa
Ez keti bin	Min kiri be
Tu keti bi	Te kiri be
Ew keti be	Wi, wê kiri be
Em keti bin	Me kiri be
Hon keti bin	We kiri be
Ew keti bin	Wan kiri be

Le présent, le subjonctif et le futur se forment à partir de l'impératif. Dans ces temps la forme de conjugaison des deux verbes s'unifie et tous les deux se conjuguent

SUIVEZ LES GRANDES REVUES FRANÇAISES QUI PUBLIENT  
SOUVENT DES ÉTUDES SUR LA LITTÉRATURE ET ARTS KURDES

## LE TRÉSOR DES LETTRES

*Directrice fondatrice: Irmine Romanette*

Abonnement un an: (40) frs. Prix de numéro: 4 frs. 50.

DIRECTION: 3 RUE DEBROUSSE PARIS 16e.

## ATLANTIS REVUE ILLUSTRÉE D'ARCHÉOLOGIE TRADITIONNELLE

*Directeur fondateur: Paul Le Cour*

Abonnement un an: (30) frs. Prix de numéro: (4) frs.

DIRECTION 16 RUE DE MONTREUIL PARIS-EST

## DANTE REVUE DE LA CULTURE LATINE

*Directeur Propriétaire: Lionello Fiumi*

Abonnement un an: (50) frs. Prix de numéro: (5) frs.

DIRECTION ET ADMINISTRATION, 32 AVENUE DE L'OPÉRA PARIS 2e.

DEMANDEZ A VOTRE LIBRAIRIE:

Sonson de la Martinique. Roman par Irmine Romanette. Prix: (12) frs.

Survivances. Poèmes de Lionello Fiumi. Prix: (60) frs.

L'Atlantide et la métaphysique occidentale. Par Paul Le Cour. Prix: 3 frs. 50.

avec les pronoms-sujet et reçoivent des désinences.

Bikeve, bekevin, bikevin. Bike, bikin, bikin.

Ez dikevin	Ez dikin
Tu dikevi	Tu dikî
Ew dikeve	Ew dike
Em dikevin	Em dikin
Hon dikevin	Hon dikin
Ew dikevin	Ew dikin
Ez bikevin	Ez bikin
Tu bikevi	Tu bikî
Ew bikeve	Ew bike
Em bikevin	Em dikin
Hon bikevin	Hon bikin
Ew bikevin	Ew bikin
Ez de bikevin	Ez de bikin
Tu de bikevi	Tu de bikî
Ew de bikeve	Ew de bike
Em de bikevin	Em de bikin
Hon de bikevin	Hon de bikin
Ew de bikevin	Ew de bikin

Ce tableau de conjugaison a été publié pour la première fois, en 1933 dans une brochure, traitant entre autres de la langue

kurde, écrite par l'auteur de ces lignes.

### ERRATA:

Dans le numéro 25, page 16, colonne 2 un nombre de lignes ont été omises par erreur: il convient donc d'ajouter, après la ligne 11, le passage suivant:

Nous devons aussi donner quelques exemples des pronoms qui n'ont pas des formes spéciales de déclinaison et qui se déclinent d'après la règle générale.

ez mirovan dibinim	ez hemivan dibinim
je vois les hommes	je vois tous
ez Memî dibinim	ez filanî dibinim
je vois Mem	je vois un tel
ez Zîmê dibinim	ez filanê dibinim
je vois Zî	je vois une telle

ez filanan dibinim  
je vois tels, telles

Tu kijanî (kijikî) dibinî	Lequel vois-tu
Tu kijanê (kijikê) dibinî	Laquelle vois-tu
Tu kijanan (kijikan) dibinî	Lesquels vois-tu

D. A. BÉDIR-KHAN

SAL 9  
HEJMAR 27  
SÊŞEMB  
15 NÎSAN 1941

# HAWAR

ANNÉE 9  
NUMERO 27  
MARDI  
15 AVRIL 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARÊ

Tefstira Qurane	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedtsên Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Sê tarixên Hawarê	Xwediye Hawarê
Dongiya Çeqel	Osman Sebri
Derdên Cegerxwîn	Cegerxwîn
Kebanî û Mamoste	Rewşen Bedir-Xan
Marşê Xortan	Osman Sebri
Çiyayê Sasonê	Osman Sebri
Gelawêj	Hawar
Loriya Şehldan	Mamosteyê gerok
Xurşid	Nûredîn Usif
Gramêra kurdmanç	C. A. Bedir-Xan
Weşnekên Kurdî	Hawar
Ferhengok	Ferhengvan
Loriya Fatê	Herekol Ezizan

## BIRÊ FRENZÎ

La réapparition de Hawar	La rédaction
La herceuse de Fatê	R. Lescot
Memê Alan	D. A. Bêdir-Khan



ŞAM—1941  
ÇAPXANA SEBATE





## TEFSÎRA QURANÊ

### 1— SÛREYÊ DESTPÊKIRINÊ

HEFT AYET IN, DI MEKÊ DE DAHATIYE

Bi navê Xudayê pak ê dilovan û mihrivan

Pesin ji Xwedê re ye, ji nav û kerema wî re ye, yê ko Xudanê erd û ezmana ye ★ Rehman e; dilovn e; rehîm e; mihrivan e ★ Xwediyê roja pişdawayî ye ★ Em ibadeta te dikin û ji te hêvîdar in ★ Me bide ser riya rastiyê ★ Riya wan mirovên ko tu li wan hatiyî rehmê; ne peyayên ko ketine ber xezeba te û ne kesên ko dane ser riya şaş.

### 2— SÛREYÊ ÇÊLEKÊ

DU SED Û HEŞTÊ Û ŞEŞ AYET IN  
DI MEDÎNÊ DE DAHATIYE

Bi navê Xudayê pak ê dilovan  
û mihrivan.

1 - E.L.M. Ji wan herfan miraz çî ye Xwedê dizane.

2 - Ew kitêb bê şik ji bona bawermendan rêke rast e.

3 - Yên ko baweriya xwe bi xeybê (mîna bihuşt û dojhê) tinin, nîmêja xwe dikin û ji rizqê ko me daye wan, di riya xwedê da didin, arikariya séwî û belengaza dikin.

4 - Ew bawermendên ko bi kitêba ko ji te re dahatiye û bi yê ko berî Quranê dahatine bawer dikin û bi axiretê înanîya xwe tinin û pê ewle ne.

5 - Wan bi kerema Xwedê dane ser riya rastiyê û ewê bigehin rehm û qenciya Xwedê.

6 - Yên ko kufir kirine, tu wan bi ezabî bitirsînî an ne tirsînî mîna hev e, baweriya xwe bi Xwedê û bi axiretê na yînin.

7 - Xwedê dil û guhên wan mor kiriye û di ber çavên wan re perdeyek kişandiye, ji wan re ezabekî mezin heye.

8 - Hin hene ko dibêjin me baweriya xwe bi Xwedê û bi roja Axiretê aniye lê wan di rastiyê de baweriya xwe pê ne anîne.

9 - Ew qey Xwedê û mirovên bawermend dixapînin, lê ew nizanin ko pê bi tenê nefsa xwe dixapînin.

10 - Di dilê wan de nesaxiyek heye û Xwedê nesaxiya wan bêtir dike û ji bo derewên wan ji wan re eşandineke dijwar heye.

11 - Û gava ji wan re tête gotin di dinyayê de fesadî û tevdariyê mekin, ew dibêjin em rastker in.

12 - Awan û tevdayî ew bi xwe ne, lê ew pê nahesin.

13 - Û gava, ji wan re tête gotin, mîna mirovên din hon ji baweriya xwe bi Xuda û bi pêxemberê wî binin, ew dibêjin: em ji weke seftîhan pê baweriyê binin; seftî ew bi xwe ne, lê ew pê ni zanin.

14 - Û gava ew bi bawermendan re ne, dibêjin wan: me baweriya xwe pê aniyê û gava ew bi iblisên xwe re bitenê dimînin ji wan re dibêjin em bi we re ne, lê em tinaz û henekê xwe bi wan dikin.

15 - Xwedê wê henekê xwe bi wan bike û wan bihêle ko ew di serhişkiya xwe de heyirî û ecêbmayî bimînin.

16 - Yên ko bi rastiye nerastî kirine, dan û standina wan tu kar ne daye û ew tucaran ne ketine ser riya rastiye.

17 - Ew mîna mirovekî ne ko ji xwe re agirek dadide û dema ko agir dora xwe ronak dike, Xwedê ronahiya wan dibe û wan di tariye de dihêle û ew nabînin.

18 - Ew ker, kor û lal in, ji riya xwe a xwar venagerin.

19 - An ew mîna wan in ko ketine bin ewrê ezmenê têr deng û tarî, teji avtav û birûsk; ji tîrsa birûsk û kuştina xwe tiliyên xwe dikin guhên xwe. Xwedê bi halê kafiran dizane.

20 - Birûsk qey ronahiya çavên wan direvine, gava birûsk dora wan ronak dike tê de diçin û dema ko li ser wan tarî dibe disekin; heke Xwedê bixwesta bihistin û ronahiya çavên wan jî dê biçûya; Xwedê bi her tiştî dikare.

21 - Geli mirovino, ibadeta Xudayê xwe bikin ye ko hon û yê berî we afirandine, ta ko hon ne kevin ber xezeba wî, ji ezabê wî xelas bibin û bigihin rehm û kerema Xwedê.

22 - Wî ji we re erd rast û ezman ava kiriye û ji ezmenê baran barandiyê û pê ji bona we zad derêxistine û wî ew kirine rizqê we û ye heywanên we; jê re tu kesî me kin hevber û heempa; hon ji xwe dizanin ko ew bê hevri û hevber e.

23 - Heke, di dilê we de; di heqê vê kitêba ko me ji evdê xwe re şandiye xwar, şikek heye û ger hon di gotina xwe de, ko ew kitêb ne kelamê Xwedê lê kelamê Mihemed e dilrast in, ji Xwedê pêve heçî arikarên we hene, banî wan bikin, bila ew ayetekê mîna ayetên vê kitêbê pêk binin.

24 - Heke we ew pêk ve ne anî û pêkanina wê bê şik ji we nayê, êdî xwe ji agirê ko ardüyê wî mirovên kafir û pûtên xaçperestan e bidin paš.

25 - Pêxemberê min, mizgîniya mirovên ko baweriya xwe anîne û qencî kirine bide; ji bo wan bihuştine têr sih û dar hene û di wan de avên zeel diherikin û dema ko ew ji fêkiyên wê bihuştê bixwin dê bibêjin: Ew fêkî mîna wan in ko me berî di dinyayê de xwariye, lêbelê bi tenê nav û rengên her diwan weke hev e, û di wan bihuştan de ji bona wan jinên paqij hene û ew tê de her wê bimînin.

26 - Xwedê ji anîna qiyasekê bi kelmêsekê an bi tişteki jê mezintir şerm nake û mirovên bawermend dizanin ko ew qiyas ji aliyê Xudayê wan ve heq e, lê nebawermend ji xwe dipirsin: Gelo qesda Xwedê ji vê qiyasê çi ye?

Xwedê pê gelean dike ser riya xwar û gelean jî digehîne rastiye; lê xwedê bi tenê kafiran dike ser riya xwar.

27 - Yên ko li ber Xwedê swind dixwin û bi yekîtiya Xwedê û fermanên wî muqir tên û paşî bextên xwe dişkinînin û tiştine ko Xwedê bihevghiştina wan emir kiriye ji hev dûr dixin û di dinyayê de fesadiyê dikin ziyanditî ne.

Bi kerema Xwedê me tefsîra Quranê qedandiyê û em wê di rûpelên Hawarê de belav dikin. Di çêkirina wê fîrsirê de me li kitêbên jêrin bûr mêze kiriye.

«Tibyân»; tefsîra Quranê - Çapxana Arit Efendî; Derseadet 1324. «Mewakib»; Tefsîra Quranê - Çapxana Arif Efendî; Derseadet 1324.

«Tefsîra Quranê» Celaleyn: Celal-ed-dîn Muhammed; Celal-ed-dîn Ebdîr-rehman; Çapxana Haşîmiye Şam 1357 Hc.

«Qurtebî»; tefsîra Quranê; El-Qurtebî; Qahîre-1933.

Tercîna Quranê bi zmanê elmanî. «Der Koran» von Max Henning Leipzig 1901; Druck und Verlag von Philipp Reclam Jun.

Dr. Kamîran Alî Bedîr-Xan

## HEDISËN CENABÊ PÊXEMBER

### «REHMET Û SILAVA XWEDÊ LÊ BE»

1 - Ji bona her derî mifteyek heye, mifta bihuştê ew e ko mirov ji biçûk û belengaza hez bike û li halê wan bipirse.

2 - Heçî malê miletî bê rê dixwin para wan dojeh e.

3 - Bawermend divê bi şûr û gotina xwe cihadê bikin û piştî zilm û neheqiyê, derewker û zalima bişkinin.

4 - Xwedê qenc e, ji qencyê hez dike; pak e, hejl paqijan dike; comerd e, ji comerda hez dike.

5 - Di roja piştawiyê de piraniya xelkê ji ber gotinên bêrê û beredayî wê bêne eşandin.

6 - Dev û dranê xwe her paqij bigirin.

7 - Piştî imanê tiştê çak ew e ko xelk ji hev û du hez bikin.

8 - Hon brayê bev in, arîkariya hev û du bikin, rastiye bêjin hev û li hev xedari û bêbextiyê me kin.

9 - Yê ko baweriya xwe bi Xwedê û bi axiretê aniye an qencyê dibêje yan devê xwe digire.

10 - Ji gulççekên pengava û ji jinên spebt û bêesil xwe biparêze.

11 - Ma ji çavtengiyê girantir nexweşî heye?

12 - Gotin carna sihrek e û şîir carna hikmetek e.

13 - Gava dest bi karekî dikin devê xwe bigirin, xelk ji mirovên ko işê wan li rê ye dibecin.

14 - Ji nifirê bêşûca bitirsîn, navbeyna wan û Xwedê da tu perde nî ne.

15 - Ne bixweziya lê bi xebat û kirinê jiyîna xwe biborîne.

16 - Lok girêde û piştîre bispêre Xwedê,

17 - Ko qiyamet rabû û di destê te de şitilek hebe û kês pê ket divê tu wî şitil bişitilî û ji destê xwe bernedi.

18 - Gava yekî ji we enirî divê ne peyive.

19 - Yê ko timakar e; belengaz e.

20 - Yê ko zekatê dide û mêvana dihevine û arîkariya mirovên ko ketine tengasiyê dike ne çavteng e.

21 - Heke hon bi malê xwe ni karin arîkariya xelkê bikin bi gotinên şêrin qedrê wan bigirin.

22 - Dîne îslamê qaim e, îbadeta xwe nerm, nerm bike û zorê li nefsa xwe me de, me be mîna mirovê ko bar û serbarê heywanê xwe giran dike, piştî heywanê wî

qul dibe li çol û şevderê dimine, û na gihe hevalê xwe.

23 - Dîn tişteki hêsantî ye, kes ni kare zora diyanetê bibe, dîn zora her kesî dibe, ne pir bikin, ne hindik bikin, bi can û bîh bikin.

24 - Kirina qencyê şabûniya dil e; û xirabî di canê mirovan de birnek e û ew naxwazîn ko kes pê bibese.

25 - Qencyê ji dê û bavê xwe re bikin da zaroyên we ji qencyê ji we re bikin.

26 - Xatirê xelkê bigirin, dilê xelkê meşkinin.

27 - Dev ji xirabiyê berdan sedeqe ye.

28 - Nefsbiçûk bin ta ko kes li kesî mezi-nahiyê ne ke.

29 - Emanetê bidine xwediyê wî, beke kesî bêbextî li te kir tu bêbextiyê lê me ke.

30 - Rizqê xwe ji xebata xwe bixwazin.

31 - Rizqê xwe ji axê bixwazin.

32 - Rizqê xwe ji keda cotê xwe bixwazin.

33 - Yê ko derdê xwe vedişêre sewabeke mezin digihê.

34 - Heke tu şerm na ki her tiştî bike.

35 - Dev ji hevalên ne çak berde, an ne xelk wê bizanin tu kî yî.

36 - Îşê ko tê de poşmanî heye me ke, ko te kir poşman me be û efiwa xwe me xwaze.

37 - Hevalekî qenc ji xwe re bibijêre, û xwe jê biparêze.

38 - Diyarîya bidine hev hezkirina we bêtir dibe.

39 - Tohe gunehan radike.

40 - Tevdir nivê iş û debara we ye.

41 - Herwekî mirov bi nefsa xwe re rast û qenc e divê bi xelkê re ji rast û qenc bibe, ji bona li hev hatina mirova bixebite û xêrxwazê xelkê be û di feqiriya xwe de ji li hâlê belengaza binêre; bi pêkanîna wan sê tiştan îman timam dibe.

42 - Berê cîranekî baş û dawî xanîkî qenc peyda bike.

43 - Berê li cîranekî baş bigere û piştî wî re li xanîkî qenc bigere.

(1) Me heft sed hedisên Cenabê Pêxember wergerandine zimanê kurdî û em wan di rûpelên Hawarê de belav dikin.

Ev hedisên he ji kitêbên jêrin batîne biyarîtin

«Teyar-el-wisâli ila caml-il-islâm min hedîs-il-Resûl Eb-dîrreman bin Eil elmarîf bi lbn-Il Deyba Eş-şeybanî Ez-zûbeydî eş-Şafî; Çapxana Selsefiye - Misir 1346 Hc.»

«Nuzebun min el-kelam-en-Nebî; Eş-Şeyx Mîstefa el-îelâyîn; Çapxana Misbah - Beyrût 1929»

«El Caml-is-seîr min hedîs-il-Beşîrin nezîr Lî xatîmet-Il hîf-fax Celalîd-dîn Ebdîr-rebman ibn ebl Bekîr es-Siyûtî. Çapxana Hicazî; Qahîre Misir»

## SÊ TARIXÊN HAWARÊ

15 GULAN 1932

18 TEBAX 1935

15 NISAN 1941

Ji ber ko Hawar di panzdehê Gulana sala hezar û neh sed û sih û didowan de hatiye dinyayê, di panzdehê vê Gulanê de di viya bû Hawar bibe nehsall. Lê ji ber ko Hawar ji hejdehê Tebaxa sala hezar û neh sed û sih û pêncan heta panzdehê vê Nisanê şev û roj û şeş salan pêde razaye û ji ber ko demên xewê, xewên rojê, di heyîna heyberan de nayîne hesêb, Hawar îro bi tenê nûzake sêsali ye.

Di jiyîna Hawarê de sê tarixên bîraver hene. Me ew tarix di bin sernama vê bendê re şani dan.

Tarixa pêşîn: 15 Gulan 1932. Di vê tarixê de gazî û hawara Kurdan ji dil û devê wan ketine nav xêz û xêzikên çend rûpelan û kovareke kurdî anîne pê. Ji Kurdan re Hawar, Hawareke nû, Hawara zanîn û daazanîne za.

Ev roj di jiyîna Kurdmancan a civakî û edebî de rojêke tarîxî ye. Di vê rojê de Kurdmanc bûn xwediyê elfabêke biserxwe, elfabêke Kurdî û ji nîrê elfabiyên miletên din, miletên biyanî xelas bûne.

Ev elfabê alek e, ala biserxwebûna heyîna me a edebî ye.

Berê di ser keleha me a edebî re alên biyaniyan li ba dibûn. Di vê rojê de Kurdmancan ew al daxistin, çirandin û li şûna wan ala xwe a millî daçikandin û ji hêsiyîna wan bandêran filitîn, xwe dan ber siha bandêra xwe û di vê qadê de bûne biserxwe.

Belê, elfabiya ko ji sala hezar û neh sed û nozdehan ve ez lê dixebitîm, min ew di vê rojê de, di rûpelên Hawarê de belav kir.

Kurdmancên ko pê hesiyan û hîni wê bûne îro zmanê xwe bi elfabiya xwe a millî û bê tu dişwariyê dinivîstin û kovar û kitêbên ko ketine çapê bi kêfxweşî dixwînin.

Lê Hawarê gelek dem ne kir. Hejmara wê a bist û şeşan di 18ê Tebaxa 1935an de belav bû û ji hingê ve Hawar nema derket.

Lê himê xwendin û nivisandinê, elfabê belav bûbû û piştî razandina Hawarê ji gelek û bergav nebin ji carcara bin kitêb diketin çapê û digihan destê kurdmancan.

Di wan salan de ji kurdên ko bîrewerê heyîna xwe ne û di dilê wan de rûmeta

milet û welêt liêye bi hînbûna xwendin û nivisandina zmanê xwe xebitî û zanîna xwe pêş ve birin. Ew ne bi tenê xebitî û elimî, lê xebitandin û elimandin ji Belê ew ji vi miletê bédibistan re bûne dibistan, darsa welatîyên xwe gotin û ew gihandin; ji wan mirovên nezan mirovîne xwenda anîne pê.

Lê yên ko xwe, bi gotinê, Kurdên qenc û welatparêz dihesibînin wextê xwe bi kurt û pistên pûç û vala derbas kirin û ji lewre hêj (e) û (ê) ji hev ferq nakin. Lê ew bi zmanê biyaniyan û hînekê wan bi çendekan dizanin, û hin hene ko di wan zmanan de xwenda û zanayîne xurt in ji. Lê bi zmanê xwe ê mader, bi vi zmanê şêrin û delal, bi zmanê da û dapir, bi zarê kal û kalikên xwe nizanin.

Mirov dibêje qey ew ji bin hikmê bandêra biyaniyan naxwazin derkevin û hêsiyî bi wan şêrin e. Heke welê ye, divêt rayekî biyaniyan di wan gerîya be. Rakî welê ko bi dizika bi wan ve bûye. Herwekî şairê sorî gotiye:

Her kesî kurd naseraw bi hez be bonî.

[kurd ne ka

Pirsiyarî daye ley ka ta le babî xoy biga

Belê ew bi zmanê xwe ê mader nizanin.

Ew zmanê ko xwendin û nivisandina wî ji her zmanî hêsanitir e. Min bi xwe ceribandîye, kurdekî nezan, li gora şehrazahiya xwe di wextekî gelek kurt da hîni elfabiya xwe dibê; ji pênc heta sih rojî.

Malxirabîno! ma we ewçend wext nîne, hon ko ji bo hînbûna zmanên biyaniyan bi salan ve xebitîne û îro ji dixebitîn, ji bona ko bikarin «fînfoneke» derewin bi lêv bikin.

Kuro eyb e, şerm e, fehî e. An hîni zmanê xwe bibin, an mebejin em Kurd in. Bê zman Kurdî ji we re ne tu rûmet e, ji me re rûreşke giran e.

Pesn û şabaş û hezar pîroz ji wan re ko hîni xwendin û nivisandina zmanê xwe hûne û bi vi awayî miîta heyîna xwe xistine bêrika xwe û ji bin bandêra miletên biyanî bi der ketine.

Heyf û xebînet û hezar mixabin, nemaze ji wan re ko bi zmanên din dizanin bixwînin binivîstin û elfabiya zmanê xwe hêj nas nakin.

Lê ji bo hînbûnê tucaran wext ne dereng e, û wextê hînbûnê li tu kesî nabore.

Yên ko bi elfabiya zmanê xwe nizanin, lê bi zmanên din gelek dizanin, divêt bizanin ko ev elfabê rojekê, ji wan de bête pirsîn.

Lê kes nizane heke ew roj dût e an nîzing e.

Hingê bibêjin ji emê bielimin, li wan dê bête vegerandin : Me hevî hebû em di te de mamostekî peyda bikin ne şagirdekî.

Xwendevanino, bi kurtî eve dîrokiya beft salên bêhawar, wek heft salên xelayê bê av û bê baran.

Tartîxa sisiyan panzdehê Nîsana sala hezar û neh sed û çel û yekê ye, yanî tro ye.

Hawarên pêşîn, her bîst û şeş Hawar xebittine kurdmancan hînt elfabiya wan bikin. Herwekî me li jor got, Hawar di nav mîletê xwe ê bêdîbistan de, kêm û zêde karê xwe bire serî.

Hawar dîsan dê bixebite û tişteki din ji bi ser ve zêde bike : Gramêr.

Di Hawara pêşîn de min elfabiya xwe belav kiri bû. Di vê hejmarê de ezê dest bi belavkirina gramêra xwe bikim. Ev di zmanê Kurdmançî a nivîskî de -gaveke nû ye. Ji xwe hîmê zmanekî li ser sê hêmanên bîngêhîn sekiniye : elfabê, gramêr û ferbeng. Me elfabê belav kir, îro ji dest bi belavkirina gramêrê dikin, ko Xwedê hez kir ferheng ji li pey e.

Em niho hinek bi gramêrê, bi gramêra zmanê xwe mijûl bibin. Gramêr çi ye? Gramêrzanan gramêr bi awayên têvel tarîf kirine. Bi kurtî gramêr tevayîya qeydeyên rast-axaftin û rastnîvîsandina zmanê e. Ev qeyde bi xwe ji zmanê tene der. Belê herkes bi zmanê xwe ê mader bêt ko bide eqlê xwe rast daxêve. Ev rastî bi hin qeydan tete pê û mirov dema xebirdanê de bêt ko bizane bi wan ve diçe.

Gramêrzan li van qeydan hûr dibin van ji hev derdixînin û disenîftînin. Tevayîya van qeydan gramêr bi xwe ye.

Em bèn ser gramêra zmanê Kurdmançî. Gramêra ko ez îro di Hawarê de belav dikim, min bîngêhên wê di sala 1929 an de li Hestîçê danî bûn. Ji hingê ve ez lê dixehitim. Pêrîr min gramêreke dibistanî digel bînek û wezîfan çêkiri bû. Bîr destpêkirina şer min nikari bû ez wê bigihînim çapê.

Lê ji milê din hewcedariya me bi gramêrê roj bi roj bêtir dibû. Xortên ko hînt xwendin û nivîsandinê dibûn, dibatîn û li qeydeyên zmanê xwe dipirsin, gramêrekê dixwestin.

Di vê navê de me destûra derêxistinî Hawarê ji nû ve stand. Hingê min dest bi senîfandina gramêreke din kir. Ne gramêreke dibistanî, lê bîngêhên qeydeyên gramêra Kurdmançî. Îro ezê vê gramêrê di Hawarê

## DONGIYA ÇEQEL

Dibêjin ji Sipanê  
Direndeyên girs û hûr  
Rabûn civîn bûne kom  
Şewrek dido çêkirin  
Tev li Kotel civiyan  
Gotin ji me pir û can  
Wek piling û şepalan  
Kes napirse çi pê hat  
Padîşahêk me divê  
Wiya hebin du wezîr  
Dema yekî kîrê zor  
Bila bînin dîwanê  
Serê wiya bibirin  
Da ko kesê tînawir  
Me jî divê wekhevî  
Darê peşkê gerandin  
Padîşahî bû ya şêr  
Piling, şepal bûn wezîr  
Xulamî dan gurê şîn  
Şikefteke pir mezin  
Panzde ga û bîst mîhî  
Eger raxer û xwarin  
Şikefta wek goma pêz  
Textekî ji ziv û zêr  
Şêr rabû ser textê zer  
Gotê ji deşt û çîyan  
Bila bêne pîrozê

Heya dighê Îranê  
Ji çiyayên gelek dût  
Her celebêk zom bi zom  
Şandiyên xwe rêkirin  
Bû civata şandiyên  
Pir in kesên bêman  
Dixwin beqê bevalan  
Em wa dibin malmêrat  
Guhdar be roj û şevê  
Çend xulam û çend kizîr  
Ne bihistin peyiv şor  
Siltan bikî fermanê  
Çendek holê bimirin  
Li ser ê din nebit gur  
Ne zinat û bêbavî  
Heryekî yek kîşandin  
Dergevanî ya keftêr  
Hîrçê teral bû kizîr  
Gotin tu f dîrebin  
Êxistinê çel bizin  
Tev ajotin wî çihî  
Anin heya dikarin  
Mehfûr tê da kirin rêz  
Anin danin ji bo şêr  
Ban kir gurê fermanber  
Bêje weş û kovîyan  
Kuta bin ji vê dozê

de belav bikim. Ji milê din min kitêbeke kiçik bi navê « Kitêba Sinemxanê » nivîsandi bû. Ev kitêba kiçik ji bo zarokan gramêreke piçûk e. Heke min pêk anî ji Hawarê pêve ezê eva ha ji bidim çapê.

Ev bendî ji alîkî dîrokiya Hawarê, ji aliyê din pronîvîsa xebata me ye. Beriya ko ez vê bîqedînim herwekî di despêkêde min gill û gazîndin xwe ji kurdên zana û nezan kir, di xelasekê de jî ezê wezîfeyên wan ji nû ve pêş wan bikim. Tiştê ko min divê ez ji were bibêjim, bi kurtî ev e:

Hîn bin, Hîn bin, Hîn bin

Hîn kin, Hîn kin, Kîn kin

Belê bi tenê hînbûn ne best me ye. Divê em hîn bikin, jî. Her kurdê ko xwendin û nivîsandinê dizane divê yên ko nîzanin bielîmîne. Ji kurdê xwenda re divê, heke ber destên wî de -Kurdên nezan nînin, li wan bigere, wan peyda û hîn bike.

Bi hînan hînkirin bi qasî hînbûnê xweş e, heye ko xweştir û bi rûmetî e jî. Belê heke hînbûn herhevkin û standin e, hînkirin dander û dayîn e. Ji xwe Kurdmançî bi nav û deng in ko destê danê ne.

Belê hîn bin û vê carê ji berê bêtir û çêtir û bi awakî tekûz. Berê di destên we de bi tenê elfabê hebû, niho gramêr jî gihaye wê.

XWEDIYÊ HAWARÊ

Gur siwar bû li piyan  
Kire gazî gurê mûr

Xwe da şîkêr û çîyan  
Pê da dikir zûrezûr

Di ferhenga direndan  
Ne şêr, piling û şepal  
Kavilê wî deq bi deq  
Mezin berê ewa bû  
Tevan bez jê dikirin  
Nêçîrvanekî ew kuşt  
Kavil firot ticaran  
Ticar kavil wenda kir  
Li ser milê xwe danî  
Dema gurê piştbeşin  
Çeqel bi sergirani  
Berê xwe da cihê şêr  
Ditin vaye werşeq tê  
Hinan xeber dane şêr  
Piran ji me digot mir  
Şêr dizani ko werşeq  
Wê şerekî daxine  
Zû ferman da hevalan  
Hinek herin bo pêrgin  
Serjê kirin ga û pez  
Çeqel dit îş rast gerî  
Dizê req û şekalan  
Terî ji erdê dikîşin  
Hate devê derî şêr  
Gotê fermû cihanban  
Çiqas ko me kir qisûr  
Herçî tu çak bibîni  
Em li pêş te rûsarin  
Şêr gelek bi qelaşî  
Heya çûn ber textê zer  
Çeqel rabû cihê şêr  
Her do jê ra bûn wezîr  
Bê kar hiştin mamê bîrc

Heye yekî bêeman  
Jê ra nînin tu heval  
Dibêjine wî werşeq  
Mezinkî pir hêja bû  
Di riya wî dimirin  
Kaviland û cendek hişt  
Du ser sê ser bi peran  
Çeqelekî dit rakir  
Kêfa xwe pir pê ani  
Dikir gazî û qîrin  
Kavil di xwe werani  
Pêş şikeltê tije mêr  
Gîş rabûn ser dest û pê  
Gotin sahê tac bi zêr  
Eve werşeq tete hir  
Namine bê teq û req  
Holê jê ra namine  
Tev Piling û şepalan  
Hinek çekin îravin  
Kavilandin pir bi lez  
Di kêvil de mirmîrî  
Xwe dit li ser şepalan  
Gelek olaş dimeşin  
Bo çeqelê necamêr  
Bê te nînin tu siltan  
Ji me sito ji te şûr  
Li ser serê me deynî  
Tu gotinan nikarin  
Digot li pê dimeşî  
Hat pilingê dilawer  
Şêr û piling man li jêr  
Şepal disa bû kizîr  
Tev keftarê palanpirç

Gava ko yek bû bê bav  
Dê bikeve ber lîngan  
Çeqel vava dizani  
Şêr û piling welê man  
Welê heya bû êvar  
Kesek naşê xeberde  
Tev da bûne ker û lal  
Di wê gavê bê guman  
Nema karî xelas be  
Dê werê pilingê qij  
Kirê xwe jê bişkîne  
Berê kesên risipî  
«Donê gênê nabit rûn  
Dema ro çû bû hingûr  
Çeqelê me ê teres  
Wî ji weke hevalan  
Bê hemd kire qîr û zar  
Hemî bervê direvîn  
Piling ne bi bêbextî  
Kavil ji ser hilani  
Bi gewriyê pihêt girt  
Dil kir ko hîn bişdine  
Şêr rahişte milê wî  
Bo we nînin şûr û dar  
Bila were hirçê ker  
Şêpiyekê daçikîn  
Da ko tu kes carek din

Wê jê biçin dest û çav  
Bi gurmistên pilingan  
Serê xwe qet hilnani  
Rawestî ji ser lîngan  
Li der man hirç û keftar  
Nika bêhna xwe berde  
Şêr û piling û şepal  
Çeqel gelek bû poşman  
Dizani ko wê nas be  
Bigre dila wi a gîj  
Çavan ji zo derxine  
Ev pirs gotin pir li ci  
Qereçî nabit xatûn  
Çeqelan kir zûrezûr  
Jê rabû kêf û hewes  
Xwe zani di newalan  
Li direndan bû hawar  
Li dorhêlê dicivin  
Çim kir rabû ser textî  
Çeqel di bin deranî  
Bi penceyên xwe ên xurt  
Çavan ji zo derxine  
Gotê: Berde vî seyî  
Ez in fro fermandar  
Çeqel bigre bibe der  
Zûka pêda dalîqin  
Ji bîr ne ke tirra min

Ji DÎWANÂ CEGERXWÎN:

## DERDÊN CEGERXWÎN

Kurdmanc hemî axa û beg û mîr û mela ne  
Hikmet eye her dem ko belengaz û geda ne  
Axâ û began destê sitem daniye ser wan  
Talanker û diz û keleş û bê ser û pa ne  
Şêxan û melan xişt û def û xayet û enwar  
Wek gurzê giran dane milan, şêrên Xuda ne  
Dûzex wekî mertal e bihuşt herwekî şûr e  
Kurdan ji kul û derdê evan qîr û eman e  
Her yek hi hezar rengî dixwin vî miletê dil  
Lê ew bi xwe der bircên belek, xan û seran e  
Zana ne li cem her yekî sed xap û du sed fen  
Kurdmacê reben hov û dewar, dil û bela ne  
Ma ez ne ji ber derdê evan bûme Cegerxwin  
Ev derd e li nav Kurd e wekî janê di can e

Miletê Kurd her tinê maye li dinyê bê serî  
Bes yeklî tî de nine her eşrek sed kerî  
Rencherin bêrêber in, dijmin li ser wan tim

[siwar  
Tev mela û şêx û sofi, tev mirid û serserî  
Begler û axa egi in, dijminên Kurd in ji dil  
Rêber in bo kuştin û talan û ceng û berberî  
Ger nexwin in yek zman û berk û yek  
[armanc nebin  
Her bibazin wer bixwazin vî berî nabin serî  
Ew kesê birçî nebi nabêje ez Kurd im ji dil  
Paleyâ dijmin dikin sed Ismet û sed Eskerî  
Pir ecêb e ko di şerqê mane bê tarîx û deng  
Her ji Rîstem ta bi Hatem bo me tenha rencherî  
Ey Cegerxwin bes binale şehr û bazar

[mane sar  
Pûlfiroşan pûl firotin, te bi dest derma merî

## CEGERXWÎN

Ji der da hat hirçê sor Lê gîj bû bûn pirç û por  
Destê çeqel girt û bir Bi sêpî da dar da kir

Bi kirasê Sikender  
Ne ji bi gurzê guhderz  
Bi derew û virkerî  
Herçî bike bê guman  
Çêtir nine j'rastiyê  
Herçî kesê lingê xwe  
Teqez pêşî xirabe  
Di kirasê serweran  
Ne biçê tu cihê kaş  
Şîret ji bo guhdaran  
Di sito ne sûsik in

Nabî şahê dilawer  
Nabî xudan baş û rez  
Tu kar naçin wî serî  
Wê bikeve ber lîngan  
Yek pê dighê dawiyê  
Dirêj ke ji cila xwe  
Wek daxwaza wî nabe  
Nebî diçî tu deran  
Da nebîni xewnên şaş  
Divê wekî guharan  
Bi guh va binûsik in

Şam - Bîndiq: 20-10-940

Osman Sebrî





STÛNA KEBANIYAN:

## KEBANÎ Û MAMOSTE

Xwendevanên ko çavên xwe li sernameyên vê bend û vê stûnê bigerin heye ko berî ewilê bibêjin, gelo di vê stûnê de ji me re qala dirûtin û aşbaziye wê bikin. Ji ber ko bi adetî di van stûnan de qala van tiştan dikin. Ji milê din wê lê ecêbmayî biminin û ji xwe bipirsin; kebanî û mamoste bi çi awayî gihane bev û ji bona çi?

Lê heke wan sebr bi xwe da û bi nivîsara min ve çûn û ew xwendin ewê bibînin ko heq di destê min de ye û divêt kebanî û mamoste bigihin hev û di her kebanîya kurd-manc de mamosteyek hebe.

Bê şik, wezîfa jinan a pêşin diyatt û kebanîti ye. Ji bo jinan ji van pêştir tu wezîfe nîne û her kar û wezîfe di pey wan re tê. Lê gava mirov bala xwe dide û tesira jinan li ser jiyîna miletan a civakî derpêş dike dibîne ko jin rasterê û nerasterê û bi awayên têvel li jiyîna miletan kar dikin. Ji lewre jinan ji wezîfeyên xwe ên eslî pê ve wezîfeyîne din ên mihim hene.

Mêrên ko qedera miletan di destên xwe de digirin li ber destên jinan bi xwedî dibin, terbiya xwe a pêşin ji wan digirin û tiştên ko di zarotîya xwe de dielimîn heta axa gorinan ji bîr nakin û ew tim û tim li wan hikim dikin. Ji lewre medhelokê gotiye: «Kurmê şîrî heta pîr».

Ji me jinên kurdmancan re ji van pê ve wezîfeye din ji heye. Ew wezîfe ji rewşa miletê me a xweser dizê. Ji lewre, jin û diyên Kurdmancan berê xwe didim we, ji we, ji we bi tenê re dibêjin.

Xwehên min ên delal, herwekî hon ji dizanin derdê miletê me ê mezin û xedar nezani ye. Nezanî nexweşiyek e, û dermanê wê zanîn e. Nik miletên xudan hikûmet û teşkilat ve nexweşiyê di xestexaneyîne xisûsî de derman dikin û ji wan xestexanan re dibistan dibêjin. Mamoste, bijîşkên wê xestexaneyê ne.

Miletê me, ne xwediyê wan xestexanan e. Miletê me mileteki bê teşkilat, bê xwedî û serî, mileteki belawela ye û di bin hikmê miletîne din, miletîne dijmin de ye. Lê dijminê me ê mezin, ê meztir nezani ye. Divêt em serê wî dijminê xedar bikin. Di wî şerî de jî ji me jinên Kurdmanc re divêt ko arîkariya mêrên xwe bikin, zaroyên xwe bielimîn xwendin û nivîsandinê û wan ji nexweşîya nezantîyê xelas bikin.

## MARŞA XORTAN

Kurd in em şerên çiyar in, dê bijin serdest û gûr Doza me tola welêt e, bistînin bi qevdê şûr Heya dih me xwe ne nasi, lê îro bûne şiyar Dêhrifîne sihna Kurdan, çi çiyar lat û zinar Da cihan qenc zani bit ko, Kurd êdî nabin zelil Nema datînin serên xwe, namînin bindest û dil Em welatîyên ciwan in, wek piling dikine qîr Me divê yekî û xurtî, naxwazin bend û eşîr Ji îro pêve di Asiya, serdestî dora me ye Dê jêkin hemî serên ko, nebêjin va her we ye Destê me şûr û tîfing in, şopa me xwin û

[mirin

Xortino rabin dem nîzik bû, bo felatê şer kirin

Şam, Taxa Kurdan 21-7-1940

OSMAN SEBRÎ

Ev xebat ji me, ji jinên Kurdmac re ji hemî jinên dinyayê bêtir divêtin. Ji ber ko zaroyên xelkê gava diçin dibistanê berî her tiştî hînî zmanê xwe dibin. Lê yên me wekê diçin dibistanê bi zmanê xelkê dielimîn û carina ye xwe ji bir dikin, ji ber ko me dibistan nîne û zaroyên me diçin dibistana xelkê.

Ji lewre diyên kurdmanc ji diyên her welat û miletî bêtir divêt bi xwendina zarokên xwe mijûl bibin û beriya ko ew ji destên wan biflîtin û bikevin dibistana xelkê wan hînî xwendin û nivîsandina zmanê wan bikin.

Ji bona vê yekê ji ji diyên kurdmanc re divêt berî ewilê ew bi xwe hînî xwendin û nivîsandina zmanê xwe bibin da ko bikarin zarokên xwe ji hînî bikin.

Eve Hawar ji nû ve derket, yên ko kêm û zêde bi tipên kurdmancî nas dikin, bi xwendina Hawarê dikarin zanîna xwe pêş ve bibin û yên ko yekcar nizanin divêt dest bi hînbûna elfabiya xwe bikin.

Xwehên min, ez ji we re sekîni me. Ji min re binivîsinin, tiştê ko ji bo hînbûnê ji we re gerek e, ezê wan bi dilxweşî ji we re bişînim. Bi pêkanîna daxwaza we xweş bîzanin ez tu minetê li we nakim, lê mine-teke mezin li xwe dikim, ji ber ko hon bi wî awayî rê didin min ko ez xizmeta welatê xwe bikim.

Xweynginî ol ez careke din dibêjin, me jinên kurd ên îro, yên ko nîşê miletê me ye ayendê li ber destê xwe bi xwedî dikin, me du wezîfeyên giran hene: hînbûn û hînkirin. Ji lewre ji me re divêt berî pêşin em bibin şagirt û di pey re mamoste; mamosteyê zarokên xwe.

REWŞEN BEDIR-XAN

## ÇIYAYÊ SASONÊ

Ev çiya wek pir çiyayên Kurdistanê çiyaki asê û pêgera wi dijar e. Lê ne wek piraniya çiyayên mayî nenas e. Ji mêj ve bi xurtî û mîrxasiya eşîrên têda, di welatê kurdan da bi nav û deng e.

Tevî vê bi nav û deng bûnê, ez bawer im, tiştên ko di heqê vî çiyayî da zanin divê, her kurd nizane. Ji ber vê yekê, ez dixwazim zanîna xwe ya di heqê vî çiyayî û eşîrên wi da serpilki raveyî xwendevanên Hawarê bikim.

Çiyayê Sasonê: Di nîveka Kurdistanê bakur û navbera bajarên Sêrt, Mûş, Bidlîs û Diyarbekirê da bi navê çiyayê Sasonê çiyayek heye. Ev çiya ji berê da bi dijarîya cih û mîraniya xelkê têda bi nav û nas e. Ji roja ko biyanî ketine welatê kurdan heya îro xelkê wî çiyayî serên xwe ji wan ra danenin û berê tîfînga xwe ji singa wan ne guhastin e.

Ev çiya bi sînorên jêrîn dorgirtî ye. Rohelat: Motikan. Roava: Sillvan û Genc. Bakur: Deşta Mûşê. Nivro: Deşta Xerzan.

Ev cihê ko bi çiyayê Sasonê bi nav dibe, ji bist û sê çiyayên mezîna û biçûk bihekete ye. Çiyayên han her yek xweyî nav û bi geliyên kûr ji hev cida ne. Di nîveka van çiyayîna da, bi navên Karmilêh, Karnêk û Arzîv sê çiya hene ko bi bilindî û rêdijwarîyên xwe hatine nasîn. Navbera van her sê çiyayîna bi çemên Artîrêrê û kuskêti ji hev diqetin.

Çi gava ji xelkê Sasonê teng hatiye, anê hikûmetekê bi ser wan da girtiye, xwe avêtine serên van her sê çiyayîna û xwe di navçavên wan da ji hingên neyaran parastine.

Pişti ko me Karmilêh, Kornêk û Arzîv ji çiyayê Sasonê ra sernîvek nişan dan, rewşa erdnîgariya yêna mayî holê dimine. Di rohelat da çiyayên Ferşek, Sipirgîş, Kêkirnûs, Pûragan û Şînas. Di roava da çiyayên Helqîz, Qendil, Hatûra, Qemtûra, Dêrçeretin û Herşewat. Di bakur da çiyayên Horemor, Reben û Mere'î. Di nivro da çiyayên Lele, Helizdirûnan, Şelaş, Mirîçîne, Kekwas û Milêxaçê. Bi tevayîya van bist û sê çiyayîna û dorhêlê û kûntarên wan ra çiyayê Sasonê tete gotin.

Zivîstana çiyayê Sasonê wek pir çiyayên Kurdistanê di dawîya çiriya pêşîn da dest pê dike û heya nîveka gulanê bi serma, bcrf,

teyrok û bager e. Xesma aşîten ko ji nerm bûna berfê dadikevin, ji her bobelatê pirtir mirovan ditirsînin. Ji ber serma, berf û piraniya aşîtan, ji bo biyaniyan, zivîstanê di çiyayê Sasonê da gerîn dijarîyeke ko nayê li pi kirin.

Eşîrên Sasonê: Di nav û dorhêlên çiyayê Sasonê da hevde eşîr hene. Ji van eşîran Ezebo, Pisîno, Zekerî, Mûst, Bûbî û Şerwên di nav bist û sê çiyayên ko me navên wan li jor gotî da dimînin. Herçî eşîrên Sarîmî, Xî, Badîkî, Bozîkî, Bidîrî, Şîgo, Celalî, Tîmoqlî, Bekîran, Welî û Mehmûd di dorhêlê û kûntarên çiyê da ne.

Ji van eşîrên han, hinek mezîna û hinek biçûk in. Tevayîya gundên van eşîran digihîn heft sed û panzde gundan. Ev gundên han, mezîna û biçûk di zik hev da bêne hesabandin, her gundek 50-60 mal bi derdikeve.

Lê îro ev eşîrên han hemî ne di cihê xwe da ne. Ji sala 1925 an heya digehe sala 1940 î, ji şerên ko di navbera wan û tirkên da bûyî, eşîrên Şerwên, Ezebo, Mûst Zekerî, Pisîno û Bûbî di hev da ketin e, gundên wan hatine şewitandin, xelkê wan hinek di şer û hinek jî di rîyên nefî û sîngûnan da hatine kuştin û yêna mayî cîhên xwe berdane. Îro ew di ser û navçavên Karmilêh û Kornêk da dimînin. Herçî eşîrên mayî di cihê xwe da ne û xwe ne lebitandin e.

OSMAN SEBRÎ

NEŞREYÊN KURDÎ

## GELAWÊJ

Kovareke kurdî, li Beşdayê bi der têt, Kovarek bi her awayî, bi rûpel û nivîsar, hêja û dewlemend. Me çend bejmarên wê di destê nasekî xwe de ditîn û li wan temaşa kirin.

Tarîxa hejmarê çaran, adara 1940 û tarîxa a dehan, Îlona 1940 e. Li gora van tarîxan û li goreyî ko Gulawêj kovareke mehî ye divê hejmarê wê a pêşîn di meha Kanûna-Paşîna, sala 1939 an de bi der çû be.

Belê Gelawêj kovareke hêja ye. Heye ko ji hemî kovarên kurdî yêna ko heta niho derketine tekûztir e ji. Lê efsûs, me nizani bû em wê bi temami bixwînin û seh bikin. Ji ber ko ew ne bi tîpên kurdî lê bi tîpên erebî batî bû çap kirin.

Herçend zarê nivro ji me re hinek zehmet be ji bi tîpên kurdî her zarê zmanê me xweş tete xwendin. Lê kurdî bi tîpên erebî an bi tîpine din, dimîne wî mirovê ko xwe di nav cîlên biyaniyan de veşartîye. Naskirîna wî zehmet e. Me ew zehmet bi xwe da, lê disan me tiştêkî hindik têt derêxist.

Ji xwe Gelawêja kurdî bi tîpên kurdî biketa



çapê me hin nivisarên wê bi dilxweşî diguhastin  
rûpelên Hawarê.

Gelo Gelawêj çi ye? Di zarê me, di zarê  
bakur de hin Kurdmanc ji stêrekê re Gulavêj,  
xelkê Behdînan Gelavêj dibêjin. Divêt Gelawêj  
ew bi xwe be. Ji kovareke edebî re xweş nav e,  
navêf geş û spehî û têrabeng.

Xwendevanên Hawarê di nav nivisevanên Gela-  
wêjê de, şairê xort û xurt û şêrînzman Goran  
xweş nas dikin. Goran ji nivisevanên Hawarê bû.  
Hawarê gelek caran rûpelên xwe bi şîhrên Goran  
xemilandin.

Di hejmara Gelawêjê a çaran de şîhreke Goran  
heye; bi sernama « Helbestî dildar ». Bi kêmahî  
ji be, em çend malikên wê şîrê diguhêzinin hire:

Wek sere rûyî şwên amanc

Ne zaza me, ne kurmanc,

Geram Kurdistan

Germiyan û kwîstan

Ne le şar û ne le dê

Nem di kes

Wek tu ciwan bî

Tu yî, tu bes

Keçe kurdêk wek gul wa bî

Kurdistanî pê ewa bî.

Di nav nivisarên Gelawêjê de nivisareke  
Tewfîq Wehbî begî çavên mirov ber bi xwe ve  
dikişîne. Nivîsara Wehbî begî çend bendên pey-  
hev in. Me her du ên pêşîn ne ditîne. Lê ji  
yên ko me ditîne dixuye ko Tewfîq beg li bêje-  
yên « Kurd », kurdmanc, kurmanc, kirmanc » hûr  
dibe, toza hezar salan ji rûpelên tarîxê dadiweşîne,  
kûr lédixê, dikeve zandûrên teng û tarî, xelekên  
jihevketî digihine hev, zencira nav û bernavê  
me hildigire, dide kaş û berwarên asê û li xelesa  
wê a pêşîn digere; dixwaze bizane gelo bêjeya  
« Kurdmanc » bi mana « mirovê kurd » e, her-  
wekî « englishman » bi mana « mirovê inglîz » e.

Lihev û jihevxiştina pêr û parkitan çî netî-  
ce bidin ji heqîqeteke eşkere ye ko kurdmanc  
mirovine kurd in û ne mirovne nekurd.

## LORIYA ŞEHÎDAN

ADAPTATION DE L'HYMNE DE VICTOR HUGO

« A CEUX QUI SONT MORTS POUR LA PATRIE »

Mêrên ko ji bona serbestiyê,

Ji bona azahiya welatê xwe mirine,

Hêja ne ko millet gi bê

Û di pêşiya gora wan de bisekine.

Di nav navên spehîtir de,

Yên çelengtir navê wan e.

Kubari û her mezinahî,

Di pêşiya wan de bê rewş û zînet in.

Herçend ji wan di axa reş de,

Xwe dirêj kirine

Mîna dayikeke delal

Mîlet ji wan re dilorine.

Şan û mezinahî bi te dikeve  
Welatê delal û abadin.

Şan û şeref bi wan dikeve

Yên ko qurbana te bûne.

Di nav ax û xwînê da.

Gell Şehîdno .. Şehîden welêt

Mêr, Mêrxas hon in;

Û yên ko didin ser şopa we,

Û mîna we divên bêne kuştin.

Serê çîyan û zozan li wan dinêrin

Siha tirba wan li wan xweş tê.

Ji ber ko singa millet in, ew tîrb û gor,

Mîna taceke zêrîn roj lê dide,

Dema ko دنیا dibe êvar û roj dibe sor.

Şan û mezinahî bi te dikeve

Welatê delal û abadin,

Şan û şeref bi wan dikeve

Yên ko qurbana te bûne,

Di nav ax û xwînê da.

Gell Şehîdino .. Şehîden welêt

Mêr, mêrxas hon in;

Û yên ko didin ser şopa we

Û mîna we divên bêne kuştin.

Mêrxasên ko canê xwe dane welat

Ji bîr na bin, ew in rêberên bi nav û deng

Hêja ne ko millet gi bê

Û li pêşiya gora wan de bisekine.

Navê wan her sax e, navên delal,

Her dibin mezintûr û qedirgiran

Mezinahî bi wan dikeve

Bi wan dikeve şeref û şan.

Şan û mezinahî bi te dikeve

Welatê delal û abadin,

Şan û şeref bi wan dikeve

Yên ko qurbana te bûne,

Di nav ax û xwînê da.

Gell Şehîdino .. Şehîden welêt

Mêr, mêrxas hon in;

Û yên ko didin ser şopa we

Û mîna we divên bêne kuştin.

(1) Loriya şehîdan ji şîhrên şairê frensîz ê me-  
zin Viktor Hügo, (L'hymne) hate girtin. Viktor Hü-  
go di sala 1802an de bûye. Ew bi şîhrên xwe ên  
spehî û hêja di ciwaniya xwe de ji bi nav û deng bû.

Ji welatê xwe Frensê gelek hez dikir û di şîh-  
rên wî de mirov dîroka Frensê dîhine. Ji ber ko  
ew pê re şa dîbû, pê re digiriya û nivisarên wî mi-  
rêka şan û şeref û derd û kederên Frensê ne.



## XURŞID

Xurşid dewlementirê gund bû. Xorteki bi bejn û bal, çeleng û giran bû. Rojekê li ber melayê gund rawestiya û got ê:

— Kureki min çêbû; jêre naveki şîrin ji te dixwazim.

Mela hinekî ma, paşê serê xwe rakir û got:

— Bila navê wi Cemşid be!

— Wek navê min e, û di gund de naveki bi tenê ye, ji xwe min ji ev dixwest.

— Here, bi arikariya Xwedê kurê te ji bo te û ji bo millet baş be.

Xurşid, piştî ko spasên xwe ji melê re pêşkêş kirin, derket û bi dilgeşî çû mal.

..

Piştî şanzde salan rojekê Xurşid dişa çû cem mela, wek berê xurt û xweşik bû. Mela jê pirsî:

— Dîsan çi ye, mîrza xurşid?

Îsal kurê min Cemşid xwendina xwa bir serî, û di nav hevalên xwe da ê pêşin derket. Min divê îro jê ra mewlûdekê bidim xwendin. Ez hêvî dikim tu îşev xwe biêşîni bêt mala me û bi dengê xwe ê şîrin ve mewlûdê ji me re bixwinî.

— Cemşid hêja ye, ezê jê ra mewlûdekê bi kurdî bixwinim.

..

Heşt salên din borin. Xurşid dişa rojêke bi çend mirovan ve li pêş mela rawesta. Mela lê nêrî û got:

— Tu her roj xurtir dibî; di rûyê te de nîşanên xortaniyê û jiyînê dixweyin. Ev ji çi ye?

Bê derd im seyda, çima pîr bibim?

— Min diyê tu her we bi. Lê bêje dişa çi ye?

— Min ji kurê xwe re keça camêreki xwestiye, dewlemend e, pîr pere xwest. Lê kurê min yek e û li ber dilê min biha ye. Ji kerema xwe mehira wan bibire.

Mela mehîr birî û ew pîroz kirin.

..

Piştî çend heftan Xurşid û Cemşid li ser keştike piçûk di golekê da diçûn bajêr, ji bo kirina cilên bûk û zavê. Ava golê bê pêl bû, di meha gluanê de bûn. Doraliyên golê bi kulilk û hêşinayiyê xemilandî bûn. Xurşid li kurê xwe dinêrî û xwe bextyartirê dinê dizani. Cemşid wek di xewnekê de bû. Bi zendên xwe ên xurt, destikên keştiyê

zû dîlivandin û keştî li ser avê dişemîtand. Lê carna xwe ji bir dikir, eqlê wi diçû cihên din.

Ji nîşkê ve destikeke keştîyê ket avê. Cemşid zû veşerî ser û destê xwe drêji wê kir. Di wê gavê da destê wi ê din ji, ji keştîyê semitî û xwe ne girt, ket avê.

Lê Cemşid melevani ne dizanî. Bi carekê di avê da wînda bû. Derket û kir hawar. Bavê wi dest avêtê; lê ne gihayê. Cemşid li ber çavên bavê xwe çû bin avê û nema bi ser ket.

Xurşid bi çavên xwe bawer ne dibû û li benda derketina kurê xwe dima. Lê ji çend piçûkên avê pê ve tiştêk xuya ne kir.

Xurşid sê roj û sê şevan di wî cihî da ma. Roja sîsiyan laşê kurê xwe ê nepixî da piştî xwe û bir mal; sîbelirê ew veşart.

..

Piştî salêkê bi şev li deriyê melê dan. Derî vebû. Melê li pêş xwe mirovekî dirêj, kal, porsîpi û piştixwar dit. Berê ew nas ne kir. Paşê melê kûr nêrî û got:

— Ma tu ne Xurşid î, vê nivê şevê te xêr e?

— Belê ez im, hatime tiştêkî bi navê kurê xwe Cemşid bidim te, ji bo xwendina zarokên gund ên belengaz Xurşid rabû kîsek pere danî ser masê.

Mela got:

— Ev pere pîr in pîr.

— Belê, îro min nivê zeviyên xwe firotin. Cemşid dixwest bi destê xwe ji milletê xwe ra qenciyan mezin bike. Lê Xwedê ne hişt. Niha ez deynê wi didim.

Melê destê wi girt û bi dengêkî nerm gotê:

— Cemşid kurekî baş bû. Xwedê rehma xwe lê bike. Lê dinêrim tu pîr li ber dikevi. Ew tişt li min ji qewimî. Were, emê hejkirina xwe bidin zaroyên gund û ji wan, xortên xwenda, xurt û hêja binin pê.

Xurşid li ser gotina melê hinekî pêjintî, pişt re serê xwe rakir û li melê nêrî. Di çavên wî da ronahiyeke dijwar hebû. Xurşid dilê xwe da bû zaroyên gund.

..

Xurşid malê xwe, mela zanîna xwe da bûn millet. Piştî şanzde salan di gund da daweta çil xortên hêja, xwenda û millet-perwer çêdihî û Xurşid tê de bi serê sergo-vendê girti bû.

NÛRÎDÎN ÛSÎF

## BINGEHËN GRAMËRA KURDMANCI

BI NAVË YEZDANË PAK Ê DILOVAN Û MIHRVAN  
RËMANËN BERPÛSKI

1 — Gramër: Gramër tevayiya qeydeyên rastaxaftin û rastnivisadina zmên e.

2 — Zmanê Kurdmanci: Zmanê kurdmanci zmanê miletê kurdmanc e. Kurdmanc pê daxêvin, dinvisinin û bi gotinên din his û fikrên xwe pê eşkere dikin.

3 — Hêmanên zmên: Di zmanê devki de hêmanên bingehîn deng e. Deng bi tîpan têne sekinandin û bi wan zmanê niviski dest pê dike. Bi tîpan kîf û bi kîtan bêje bi hev dikevin. Pirticar bêje an kesekî an tiştêkî dinimîne. Û gava çend bêje bi awakî manadar digebin hev ji wan komek çêdibe. Komek fikreke tam dide zanin.

Bi peyhevketina komekan qiset tête pê. Qiset bi mijarekê mijûl dibe û ew zman bi xwe ye. Ji gotinên jorin dixuye ko hêmanên zmên çar in:

Tîp: a g ê u y li o p m j  
Kit: ta, den, ser, co, rût, a, poz, ê.  
Bêje: hesp, peyar, xanî, spehî, gotin, were.  
Komek: Par ez çû bûm Rewanê. Îro dinya sar e. Gundê me di navbera du avan de ye.

4 — Tîp: Her dengê ko di dev û qirika me de peyda dibe, li ser kaxezê bi îşaretekê tête sekinandin. Ji wan îşaretan re tîp dibêjin.

5 — Tîpên zinanê kurdmanci: Di her zmanî de herçend deng hene ewçend ji tîp peyda dibin. Ji ber ko di zmanê kurdmanci de sih û yek dengên bingehîn hene ji lew-  
re tîpên zmanê kurdmanci sih û yek in.

Hûrek: a b c ç d e ê f g h i j  
k l m n o p q r s ş t u û v  
w x y z

Girdek: A B C Ç D E Ê F G H  
I Î J K L M N O P Q R S Ş T  
U Û V W X Y Z

5 — Bi adetî û zeltemperî em bi hûrekan dinivîstin. Girdek kêrî caran tîpên istîmal kirin. Komek bi girdekekê dest pê dike. Tîpa seranavekî a pêşin hergav girdekek e.

6 — Dengdayiya tîpan: Tîp ji awirê dengdayiyê ve bi du biran lewa dibin: dengdêr û dengdar.

7 — Dengdêr: Dengdêr ew tîp in ko bi serê xwe ji devê me dertên û dengêkî mûst-

## DI RADYOWÊ DE WEŞINEKËN KURDÎ

Hin radyowên rohelatê nizing bi zmanê kurdî diweşînin. Em wan stasyonan li jêr û digel pronivîsa wan ji xwendevanên xwe re didin zanin.

### BÊRÛT: RADYOWA ROHELAT

Ji pêncê Adara vê salê ve ev radyo li heftê du caran, In û Çarşembê bi kurdmancî diweşîne. Her weşinek niv saet dom dike, ji saet pêncan heta pênc û nivan. Radyowa Rohelat li ser du pêlan diweşîne: pêlên kurt û pêlên navin. Drêjahiya pêlên wê: pêlên kurt (37,35) pêlên navin (293,50).

Şandiyarê Bêrûtê di her weşinekê de nûçeyên dinyayê dide zanin û di pişt re çend qewanên kurdmancî dide gerandin.

Daxwazêke guhdaran hebe dikarin binivîstînin adrêsa jêrin. Şandiyarê Bêrûtê daxwaza guhdarên xwe bi dilxweşi ditîne cih.

Adrê: Radyowa Rohelat. Şandiyarê kurdî H.C.F. Bêrût

### IRAQ: RADYOWA BEÛDAYÊ

Ev radyo ji destpêka vî şerî ve hero carekê bi kurdî diweşîne. Pêlên wê kurt (42) métr in. Weşinek piştî nivro saet çar û çel û pêncan (4,45) de dest pê dike û çarîyek saet daço.

Şandiyarê Beûdayê nûçeyên dinyayê roj bi roj dide zanin. Carina ji hin qewanên kurdmancî digerin.

### RADYOKE QEFQASÊ

Me çend caran ji stasyoneke Qefqasê stranine kurdmancî bihiştine. Lê heta niho me nizanî ew kîjan stasyon e, kengê û li ser kîjan pêlan diweşîne. Me gumana Rawanê kiriyê. Me hêvî ji xwendevanên xwe heye heke pê dizanin bila ji me re bidin zanin da ko em pronivîsa wê stasyonê ji di Hawarê de belav bikin. HAWAR

qayî tînin pê. Dengdêrên zinanê kurdman-  
cî heşt in: a c e i i o u û

8 — Dengdar: Dengdar ew tîp in ko bêt arikariya dengdêrekê nikarin ji devê me derkevin û dengêkî mûsiqayî biniu pê. Ew di devê me de dikevin hin cihan, wek lêv, dran û ezmandev û ji wan pêjneke ker peyda dibe. Dengdarên zmanê kurdmancî bist û sisê ne: b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z.

Şanek — Di pratîkê de dengdêr ji dengdaran bi awayê jêrin têne derxistin. Dengdêr bi serê xwe ji dikarin kitekê binin pê. Lê dengdar bêt dengdêrekê tu kitek nayinin pê. Herwekî di kita « par » de heke me dengdarên (p) û (r) xistin û (a) bi tenê lişt ew (a) bi serê xwe ji kitek e. Lê (p) û (r) beî (a) yê, an dengdêreke din, nikarin kitekê binin pê.

9 — Doma dengdêran: Dengdêr ji awirê domê ve bi du biran par dibin, kurt û drêj:

# FERHENGOKA HAWARÊ

Her çend zmanê me tête nivisandin, ewçend ji fireh û dewlemend dibe û bi pêş ve diçe. Ev pêşveçûna zmanê me bi çêkirin û peydakirina bêjeyîne nû tête pê. Ev bêje, bêşik, ji bemî Kurdmancan re ne nas in. Ji lewra em wan di Ferhengoka Hawarê de bi Kurdmanci mana dikin û miqabilên wan ên frensîzî ji didin zanin. Ji bêjeyên vê Ferhengokê yên ko ne di bendên Hawarê de ne, hon wan ji şandiyarê Radyowa Rohelat dibihîsin. Lê heye ko hin xwendevanên me di Hawarê de rastî bêjeyîna bèn ko di Ferhengokê de ne hatine mana kirin û ew bi wan ne nas in. Heke wan xwendevan ew bêje ji mere nivisandin em wan bi dixweşî di Ferhengokê de mana dikin.

Di nav bêjeyên vê Ferhengokê de herçî bêjeyên ko xudan zayend in, tipek li ber e. Ew tip zayendê bêjeyê şani dide: m. — mê, n — nêr.

**AWARTE** — Yê ko nakeve bin hikmê qeyda gelemper û jê tête awartin. Vê qeydê tu awarte nine. Bi awarteyî destûra wi dan. Awarte tu qeyde nayinin pê. [Exception]

**BERPÊŞKÎ** — Yê ko beriya esas û bingeh têt û wan bi ronî dîke û sehkirina wan pê hêsanî dibe. Rêmanên berpêşkî, qeydeyên berpêşkî. [Préliminaire]

**BIRAWER** — Tiştê ko hêja ye di bîran de bimîne û naye ji bîr kirin. Sala 1925 an ji bo kurdan tarîxeke bîraver e. [Mémorable]

**BÛYER** (m) — Her tiştê ko

di dinyayê de tête pê. Ev bûyerê girane ye. [Événement]

**GENKEŞTÎ** (m) Herçî keştiyên ko ji bona şer hatine çêkirin. Gir û bûrên wan hene. Wek torpiyor, bertorpiyor, krewzor, dretnewt. [Bâtiment de guerre]

**GELEMPER** — Tiştê ko ne xweser e, ji bo her kesî an ji bo her tiştî ye. Qanûna mirinê qanûneke gelemper e; tu kes jê naflite. Bi gelemperî; bi awayê gelemper. Bi gelemperî Kurdmanciyayî ne. [Général]

**HEYBER** (n) Her tiştê ko xwediyê heyînekê ye; rihber, nerihber. Heyberên tebtetê. [Objet, être]

**HÊMAN** (n) — Esas an riki-nên heyînekê. Ew tev de heyînekê ditînin pê, lê bi xwe ji hev de nakevin; yanî ew heyberîne sade ne û ne hevedidani ne. Pêşyan digot hêmanên tebtetê çar in: ax, av, agir û hewa. [Élément]

**KEŞTÎ** (m) — Jê re bi hin ferqan gemî û vapor ji dibêjin. Keştî xwerû Kurdmanci ye. Keştivan: peyayên ko di keştiyê de dixebitin û wê bi rê dixin; mîna Kelekvân. [Bateau]

**NÊREVAN** (n) — Yê ko guhdariya tiştê dîke, lê kûr dinêre û bala xwe dide; nêrevaniyê dîke. Nêrevanên siyasi, balafirên nêrevaniyê. [Observateur]

**NOQAR** (m) — Keştîya ko noqî avê dibe û di bin avê re diçe. Noqar cenkeştîyê e, tê de top û torpîl bene. Dûrebîneke wê heye ko di ser avê re dimîne. Kumandarê noqarê pê guhdariya keştiyên dijmin dîke û gava ew wan dibîne noqar dertê rûyê avê

û li wan dixê. [Sous marin]

**NÛÇE** (m) Tiştê ko ji nû ve qewimîye. Nûçeyên şer, nûçeke derewîn, li gora nûçeyên radyowê di şeşê Nisanê de elmanan drêjî Yewnanistan û Yûgoslavyayê kirine. [Nouvelle]

**PARKÎT** (m) — Kita ko dikeve paşiya bêjeyekê û mana wê diedilîne. { xew - xewar. mêr - mêranî, mal - maldar } di bêjeyên [ xew - ar, mêr - anî, mal - dar ] de [ ar, anî, dar ] parkîtin. [ Suffixe ]

**PÊRKÎT** (m) — Kita ko dikeve paşiya bêjeyekê û mana wê diedilîne. { bûn - vehûn, kirin - rakirin, anîn - hilanin } di bêjeyên { vehûn, rakirin, hilanin } de « ve ra, bil » pêrkîtin. [ Préfixe ]

**RÊMAN** (m) — Fikra ko me der heqê tiştê heye. Tu rêmana mêraniyê di wi de nine. [ Notion ]

**ŞANDIYAR** (n) — Mirovê ko ji stasyonêke radyowê nûçeyan û tiştîne din diweşîne û belav dike. Di Radyowa Rohelat de şandiyarê kurdi li heftê tu caran bi kurdmanci diweşîne. [ Speaker, émetteur ]

**TÊVEL** — Ne ji yek cîsn û celebî, ji cîsnîne ji hev cîda û biferq; ne weke hev. Ordiwa îngilizan ji eskerîne têvel bihevketî ye. [ Différent ]

**WEŞÎNEK** (m) — Karê belavkirinê, herweki di radyowê de. Weşîneka kurdi niv saet dom dike, di vê weşînekê de şandiyar nûçeyên dinyayê dide zanin û pişt re dest bi pronivîsa stranê pîke û çend qewanên kurdmanci digêrine. [ Emission ]

FERHENGVAN —

Dengdêrên kurt: e i u

Dengdêrên drêj: a ê î o û

Dengdêrên kurt bi derbekê ji devê me dertên, devê me bi nivî vedibe, doma wan hindik e, û ew tu caran drêj nabin.

Dengdêrên drêj gava ji devê me dertên dom dikin, devê me bi temami vedibe û ew tucaran kurt nabin.

Herçend dengdêrên kurt ( e i u ) û dengdêrên drêj ( ê î û ) ji aliyê şikill ve nizingî hev bibin jî, qî aliyê dengî ve ji hev dûr û gelekî biferq in. Ji ber ko cihderka her-yekê çîda ye.

10 — Xweseriya hin dengdêran: Dengdêrin hene ko nikarin bikevin pêşî an paşiya hin dengdaran. Hinên din jî di pêşî an di paşiya bêjeyan de peyda nabin.

I — Ev dengdêra ha bi gelemperî nakeve pêşî an paşiya bêjeyan. Yanî bêjeyên kurdmanci ne bi (i) yê dest pê dikin ne jî pê temami dibin; jî hin daçêk û pronavan pê ve; mîna: li, di, ji, bi, çî

Ji milê din bêjeyên ko di eslê xwe de ne kurdmanci ne, û jî zmanê biyaniyan ketine zmanê me bi « i » yê dest pê dikin. ( dûmahik heye ) C. A. BEDIR - XAN

Après une interruption de plusieurs années, HAWAR reprend sa publication avec le présent numéro.

Notre revue poursuivra, comme elle a essayé de le faire jadis, la tâche de rénovation, de perfectionnement et de diffusion de la langue et de la littérature kurdes, qu'elle s'était fixée à ses débuts. Cependant, les progrès déjà réalisés en cette matière nous amèneront à lui donner des caractéristiques nouvelles, que nous tenons à expliquer ici au lecteur.

La première série de HAWAR (No 1 à 26) était essentiellement consacrée à la publication et à la diffusion de l'alphabet kurde en caractères latins. L'action de la revue, prolongée par celle des différentes brochures (alphabets, recueils de textes, etc.) publiées en même temps par ses éditeurs, a permis à un nombre considérable de jeunes gens Kurdes d'apprendre à lire et à écrire leur langue avec les caractères latins. De la sorte, il s'est constitué un public lettré kurde, auquel la revue se doit d'apporter aujourd'hui l'aliment intellectuel nécessaire.

C'est pourquoi l'on trouvera désormais, dans HAWAR, outre les textes de littérature populaire kurde qui y ont toujours eu une place de choix, de nombreuses études sur la grammaire Kurde. Les jeunes lettrés kurdes pourront ainsi parvenir à une connaissance méthodique approfondie de leur langue, de ses ressources et de ses richesses.

Un même esprit inspirera le contenu de la partie française de HAWAR. Nous continuerons à y faire figurer, à l'intention de nos lecteurs d'Europe, la traduction des textes littéraires kurdes publiés dans le même numéro sous leur forme originale. Mais nous y ajouterons, à l'intention de nos lecteurs kurdes, quelques textes choisis de la littérature occidentale, accompagnés d'une brève notice et de leur traduction en Kurde.

Nous espérons que HAWAR, sous cette nouvelle forme, retrouvera vite les précieuses sympathies qui l'avaient accompagné durant les premiers mois de sa publication. Nous efforcerons d'ailleurs de rendre cette revue toujours plus digne de l'estime des lettrés de l'Occident, comme de l'Orient; nous souhaitons qu'ils y trouvent un bon instrument pour l'étude de la langue et de la littérature kurdes, et nous accueillerons avec reconnaissance toutes les suggestions qu'ils voudront bien nous adresser pour le perfectionnement de notre œuvre.

LA REDACTION

Ji Helebê me berê xwe da bû Kurdistanê. Di bîst û çarê Tebaxê, sala hezar û neh sed û nozdehan de, bi taştîyê ve em gihastî bûn gundê Tabyê. Tabye gundeke ji gundên Entabê ye. Ji bajêr çonaxek dûr e. Xelkê gundê hê ko me nas bikin derketin pêşiya me, em birin holika mezinê gundê ji me re pezek şerjêkirin.

Tabye gundeke biçûk e, tê da bîst xanî hene; şanzdeh xanî kurdmanç çar xanî tirk. Kurdmançan, ji bo tirkan digot ev reyîet in. Kurdmançên gund atimî ne. Tirkan jî bi kurdmançî xeber dida. Lê mirov jî serçavê wan dizanî ko ne ji nijadê me ne.

Di gund de yekî kal hebû bi navê Hisên. Hisên jî me re diroka gund qise kir û got:

— Ji gundê me re Tabye dibêjin, jî ber ko di wextê şerê Brahîm paşayê misrî de tirkan tabye di gundê me de kola bûn, hêj şopa wan xuya ye (Bi destê xwe îşaret kir û ew şanî me dan). Mîna îro, tête bîra min, tirk şikestin û eskerê Brahîm paşa ketin gund û gund talan kirin.

Ji nîşê min di gund de hêj jinîkek heye, Fatê dibêjin ê. Bi emrê ez jê mezinîm im. Lê rebenê, jî derd û xeman çavên wê tarî bûne. Kurê wê ê ciwantir di dawîya seferberiyê de hate kuştin. Bûka wê do ne pêr mir. Eqlê wê jî hinek sivik bûye, bi sêwiyê xwe ve di nav gund de digere û jê re dilorîne.

Fatê bi sêwiyê xwe ve, xwe da bû ber holikê û guhdariya Hisên dikir. Fatê serê xwe hilda, berê xwe da Hisên û got ê:

— Herê tête bîra min, eskerên Brahîm paşa jî bi kumên sor bûn.

Fatê bi biranîna kumên sor hêj bêtir li ber xwe ket, çavên xwe kir ber xwe; û paşê dergûşa xwe hejand û jî sêwiyê xwe re lorand:

Dergûşa min jî dêr e  
Min daye kewê êr e  
Ez çî bikim jî vê dergûşê  
Dergûşeke bê xêr e  
Lori, lori dergûş lori!

Lori dikim lori naye  
Ê sêwî ye kedî nabe  
Ê ariya ye aşî nabe  
Lori, lori dergûş lori!

Mî dest daye hawîrdorê  
Mî rebenê li min korê  
Celad dike lîdîla zorê  
Lori lori dergûş lori!

Dergûşa min lîber tîşk e  
Lî tenîştê yek kitîk e  
Sêwîl tê de hîlkêhîlk e  
Lori, lori dergûş lori!

Ez çî bikim jî vê dergûşê  
Dergûşeke bê xêr e.

## LA BERCEUSE DE FATÊ

L'un des genres les moins connus de la littérature populaire kurde est celui de la berceuse (LORÎ, de LORANDIN, bercer). Généralement courtes — trois ou quatre strophes de quatre vers, et chantées sur des airs très simples, les berceuses Kurdes sont le plus souvent improvisées au gré des circonstances. La naïveté de leur inspiration font qu'elles contiennent parfois des images d'une grande beauté. La berceuse de Fatê, pleine de fraîcheur et de charme, est un échantillon remarquable de cette sorte de compositions. Elle a été recueillie en 1919 par M. Herekol Azizan. Nous en donnons, ci-dessous, la traduction précédée d'une courte notice de notre collaborateur sur les circonstances dans lesquelles elle a été recueillie :

«Au cours d'un voyage au Kurdistan, en 1919, le 24 Août, vers midi, nous arrivâmes au village de Tabiye qui se trouve près d'Ayintab, à une étape de la ville. Les paysans ne nous connaissaient pas, pourtant, ils sortirent à notre rencontre et nous conduisirent chez leur chef, puis ils égorgèrent un mouton à notre intention.

Tabiye est un petit village de vingt maisons, dont seize sont kurdes et quatre turques. Les Kurdes, qui appartiennent à la tribu des Atman considèrent les Turcs comme (reiyet)(1) Ces derniers parlent aussi le kurde, mais il est facile de reconnaître à leur type qu'ils ne sont pas de notre race.

Un vieillard, nommé Hisên, nous fit en ces termes l'histoire du hameau: « Notre village s'appelle Tabiye (tranchée), parce que, lors de la guerre d'Ibrahim pacha d'Égypte, les Turcs y creusèrent des tranchées, dont on voit encore les vestiges — il nous en indiqua l'emplacement de la main. Je me souviens que les Turcs furent battus, comme ils viennent encore de l'être. Les soldats d'Ibrahim Pacha entrèrent dans le village et le pillèrent. A part moi, il y a encore ici une survivante de cette époque, une vieille femme que l'on appelle Fatê. Elle est moins âgée que moi, mais la pauvre est devenue aveugle, tant elle a eu de malheurs. Son fils cadet a été tué à la guerre. Sa belle fille vient de mourir. Elle a quelque peu perdu la raison, et elle se promène dans le village avec son petit-fils orphelin, lui chantant des berceuses. »

Fatê, l'enfant dans les bras, s'était approchée de nous et écoutait parler Hisên. Elle leva la tête, et, se tournant vers lui, elle dit: (Oui, je me souviens, les soldats d'Ibrahim Pacha portaient des bonnets rouges. » L'évocation de ces bonnets rouges raviva le chagrin de la vieille, elle baissa les yeux et se mit à bercer l'orphelin, en chantant:

Mon berceau est en bois,  
Je l'ai posé à la chaleur du feu  
Que faire de ce berceau,  
Ce berceau de malheur?  
Dodo, dodo, berceau, dodo!

(1) Les « reiyet », paysans non rattachés à une tribu, forment une classe inférieure dans la société kurde.

## MEMÊ ALAN

Ils auraient dû héberger Mem la première nuit, et ne le conduire que le lendemain chez son hôte. Pourtant, le voyageur ayant promis de ne révéler à personne que c'étaient eux qui lui avaient directement indiqué la maison des Celaliyan, ils consentirent à lui en monter le chemin.

Après avoir suivi une longue avenue, Mem arriva devant le palais des Celaliyan. Les portes étaient ouvertes. Il entra dans la cour, où se trouvaient par hasard les trois frères, entourés de leurs domestiques. Ils s'avancèrent à la rencontre de Mem: Tacin l'aida à descendre de cheval, Çeko alla lui préparer un divan, tandis que Gurgtn, le cadet s'occupait de Boz. Les valets rendaient les honneurs. Tout le monde admirait Mem. Ses hôtes l'installèrent sur un somptueux sofa, et l'entourèrent de coussins moelleux.

### EPISODE IV

#### LA FAMILLE DE ZINA ZÊDAN

Zin appartenait à la famille des Emirs de Botan, qui portaient le nom de Azizan. Ils étaient Yezidis et adoraient le dieu Eyzed. La maison princière était divisée en trois branches. La branche régnante était issue de

(1) Voir les articles précédents dans les numéros du Hawar: 1, 2, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9, 10, 11, 12, 23.

Je chante, il ne dort,  
Orphelin ne s'appivoise,  
Qui souffre ne se calme,  
Dodo, dodo, berceau, dodo!

Je tâtonne autour de moi,  
Pauvre, pauvre aveugle,  
Le destin cruel hroie les coeurs,  
Dodo, dodo, berceau, dodo!

Mon berceau est devant la cheminée,  
Un chat est assis à côté,  
Et dedans, l'orphelin halète  
Dodo, dodo, berceau, dodo!

Que faire de ce berceau,  
Ce berceau de malheur?

R. LESCOT



Mir Zengin et avait pour chef Mir Ezin, frère de Siti, épouse de Tacin, et de Zin, la fiancée de Çeko.

Les membres de la seconde se consacraient exclusivement aux affaires militaires et à la conduite de la guerre; ils avaient à leur tête Mir Tacin, surnommé Qeretacin, Çeko et Gurgin, tous fils de Mir Şem. Leur soeur, Dilovan, était mariée à Mir Ezin, prince du pays. Tacin avait déjà de Siti un garçon de 14 mois, Feleméz.

Quant à la troisième branche, ses représentants s'occupaient surtout de commerce. Ils exportaient les produits du pays et importaient des marchandises étrangères. Les plus notables d'entre eux étaient Mir Şem et Mir Sevdin, fils de Mir Bedr.

Il convient en outre de mentionner un personnage qui jouait un grand rôle à la cour de l'Emir de Botan. C'était Bekoyé Awan, Beko l'ingrattant. Il descendait d'une esclave nègre, mariée à l'un des domestiques de Mir Zengin. Beko était le favori de l'Emir, à la fois son confident et son bouffon.

Les Celali, doués d'un caractère chevaleresque, détestaient le fourbe Beko, et avaient, à plusieurs reprises, conseillé au prince de se débarrasser de lui. Celui-ci s'efforçait, de son côté, d'indisposer son maître contre les trois frères. Il avait vainement travaillé à empêcher les fiançailles de Zin et de Çeko. Malgré un premier échec, il gardait espoir et revenait sans cesse à la charge. Un jour, il dit à Mir Ezin: « Altesse, tu as sacrifié Siti sans aucune raison. Tu as donné à Tacin ce joyau que le César de Byzance t'aurait demandé pour orner la couronne de son fils! Tu l'as livrée à ce Celali, et voici que tu veux donner Zin à Çeko, cette Zin qui est digne d'un empereur! L'Emir se mit en colère et renvoya Beko, déclarant que ses cousins valaient bien les princes de Byzance et de Perse.

Le traître se rendit alors chez Mir Şem et chez Sevdin qui, en raison du rôle pacifique qu'ils jouaient dans les affaires de l'état, ne jouissaient pas du même prestige que leurs cousins. Il leur dit: « Ne descendez-vous pas des Azizan, vous aussi? Vous supportez qu'après avoir donné Siti à Tacin, notre Emir accorde la main de Zin à Çeko? Vous n'avez donc aucune prétention à faire valoir sur elle? Ne comptez-vous pas au nombre des princes de ce pays? »

S'étant laissé convaincre par Beko, les deux frères allèrent trouver Tacin et lui signifèrent qu'ils s'opposaient au mariage de Çeko et de Zin. L'affaire alla jusqu'à Mir Ezin qui, irrité par ces intrigues, fit savoir qu'il ne donnerait sa soeur à aucun noble du Botan, mais à un étranger, fût-ce un simple commerçant. Le désaccord ne fit que s'accroître entre les trois branches des Azizan. Pourtant, Zin restait légalement la fiancée de Çeko.

## EPISODE V

### LA RÉVÉLATION DU SECRET DE MEM

Zin venait d'atteindre le dernier jour de son sixième et dernier mois de deuil. Elle ne pouvait continuer à rester enfermée dans ses appartements. Qu'aurait-il pensé son frère, ses cousins et les gens de la ville? Elle songeait tristement à Mem et se disait: « S'il avait de l'amour pour moi, il serait déjà venu me chercher. Que fait-il maintenant? N'a-t-il pas trouvé une femme plus belle et plus séduisante que moi? » Puis, elle se mettait en colère, se sentant blessée dans son amour propre, et s'écriait: « Si le lièvre se brouille avec la montagne, est-ce à la montagne de s'affliger? Comment puis-je, moi, fille de Mir Zengin, soeur de Mir Ezin, fiancée de Çeko, pleurer pour un étranger, un inconnu?... »

Zin appela Rihan, son esclave favorite, et lui dit: « Rihan, j'ai soif: il y a six mois que je n'ai goûté l'eau de la source de Qesara, qui a le parfum des roses. Va m'en chercher! » Rihan prit une cruche et sortit du palais.

Comme elle rentrait de la source, elle aperçut une foule compacte, massée devant la demeure des Celali. Elle pensa qu'ils avaient enlevé une femme, ou pillé une maison. Elle voulut pourtant, s'informer de ce qui s'était passé: sans doute sa maîtresse la questionnerait-elle à son retour. Elle demanda à l'un des badauds: « Qui ont-ils encore tué? De quel rapt s'agit-il? » l'homme répondit: « On dit qu'un étranger vient de descendre au palais de Tacin; il est d'une beauté fabuleuse, magnifiquement équipé, et il monte un cheval extraordinaire ». Rihan se faufila jusque dans la cour, mais elle ne put entrer dans la salle où se trouvait Mem. Se cramponnant aux barreaux de fer, elle grimpa sur le rebord d'une des fenêtres de

la pièce, et put admirer à loisir la beauté du jeune prince. Elle en oublia les ordres de Zin, et l'eau qu'elle portait. Enfin, un curieux l'écarta et prit sa place.

Rentrée au palais, Rihan raconta à sa maîtresse ce qu'elle avait vu chez les Celaliyan. Zin comprit que Mem était venu la rejoindre. Elle ordonna à ses esclaves d'avertir les dames d'honneur, femmes et filles des aghas, qu'elle avait l'intention de sortir et de prendre part à la fête du Printemps.

C'était, en effet, le Newrúz, le Nûroj (nouveau jour), jour où le soleil entre dans le signe du Bélier, et qui marque le renouveau de la nature (1). Les habitants de Djeziré, nobles et gens du peuple, tous revêtus de leurs costumes de fête ou de déguisements, quittaient la ville pour aller se promener à la campagne et saluer la naissance du printemps.

Au palais des Celaliyan, cependant; la présence de Mem faisait presque oublier le Nûroj. La foule se pressait dans la cour; les visiteurs emplissaient le salon où se tenait le voyageur.

Tacin dit à ses frères: «Notre hôte n'est pas un hôte ordinaire, il vient d'un pays lointain. Peut-être a-t-il quelque affaire qu'il est pressé de régler. Je vais faire préparer une chambre dans les appartements de Siti, de façon à pouvoir lui parler seul.»

Il fit comme il avait dit, puis il rejoignit Mem et l'invita à l'accompagner. Mem le suivit. Lorsqu'ils furent sans témoins, Tacin, s'excusa de son indiscretion, la coutume interdisant de demander à un étranger quel est le but de son voyage, et ajouta qu'il se tenait à l'entière disposition de son hôte si celui-ci avait des affaires urgentes à régler. Mem répondit évasivement: «Mon coeur brûle, seule une coupe d'eau puisée à la source de Kaniya Qesera', où vont se mirer les belles,

pourrait éteindre le feu qui me dévore». Tacin répartit: «C'est bien. Sois sûr que tant que nous vivrons, mes frères et moi, nul ne s'opposera à la réalisation de ton vœu.»

Tacin laissa Mem dans les appartements de Siti et alla rejoindre ses frères. Il leur rapporta sa conversation avec l'étranger. Tous jurèrent solennellement sur la garde de leurs sabres de ne prendre aucun repos avant d'avoir satisfait le désir de Mem. Soudain, Tacin devint perplexe, il dit: «Nous ne savons rien de la bien-aimée de Mem, ne serait-elle pas l'épouse ou la fiancée de l'un d'entre nous? pour ma part, je m'engage dès à présent, si c'est Siti qu'il a choisie, à la considérer désormais, non plus comme ma femme, mais comme une soeur. L'embarras de Çeko était grand, mais que pouvait-il faire devant le geste sublime de son aîné? Il n'hésita pas longtemps et déclara qu'il renonçait également à Zin si c'était elle que Mem était venu chercher. «Espérons, dit Gürçin, que le choix de notre hôte n'est tombé sur aucune de nos cousines, mais sur une jeune fille qu'il faudra conquérir à la pointe du sabre, et que votre cadet pourra vous servir comme il se doit.»

Mem n'ayant nommé personne, il restait à trouver un stratagème pour l'obliger à désigner sa bien-aimée parmi les femmes de la noblesse de Cizir. Après avoir mûrement réfléchi, les trois frères arrêtaient leur plan.

A l'occasion du Newroj, tous les habitants de la ville iraient se promener à la campagne, et leur chemin les conduirait obligatoirement devant le palais des Celaliyan. Tacin alla trouver Mem et l'invita à assister de la fenêtre au défilé de la foule. Mem s'installa, le prince le quitta et alla se poster à la porte de la maison, tandis que Gürçin attendait dans la cour et que Çeko se dissimulait dans un coin de la pièce pour observer les réactions de Mem et voir si celui-ci reconnaîtrait l'élue de son coeur. Il avertirait alors ses frères, qui se précipiteraient pour enlever la jeune fille.

La foule des promeneurs s'était peu à peu écoulée, sans que Mem manifestât la moindre émotion. Seul le cortège des filles de l'Emir n'était pas encore passé. Après une longue attente, on vit déboucher dans la rue les quarante esclaves qui escortaient Zin, montée sur un cheval blanc et accompagnée de Siti.

(à suivre)

(1) La fête du Nûroj est d'origine très ancienne; elle est déjà citée dans l'Avesta. Elle s'adapte parfaitement à la nature et au climat du Kurdistan. En effet, l'hiver y est très dur et très long. Pendant des mois, tout dort sous un hijeuil de neige, les hommes vivent enfermés dans leurs demeures, les animaux ne sortent pas des cavernes. Ce n'est qu'au printemps, lorsque la neige commence à fondre, et la montagne à reverdir, que bêtes et gens renaissent à la vie. Aussi, malgré leur islamisation les kurdes n'ont-ils jamais cessé de célébrer le Nûroj, tandis que d'autres fêtes saisonnières, comme le Mihrgan (début de l'hiver), sont tombées dans l'oubli.





## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

1 Rêzana Elfabiya Kurdî	C. A. Bedir-Xan
2 Rupelnine Elfabê	C. A. Bedir-Xan
3 Dilê Kurên Min	Dr. K. A. Bedir-Xan
4 Bliya Pêxember. Bi Kurdiya dumill, bi dibaca	C. A. Bedir-Xan
5 Nivêjen Êzediyan ; bi dibaca	C. A. Bedir-Xan
6 Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re	C. A. Bedir-Xan
7 Mesela Kurdistanê	Bazil Nikitîn
8 Ji mesela Kurdistanê	C. A. Bedir-Xan
9 Elfabeya Kurdî	Dr. K. A. Bedir-Xan
10 Xwendina Kurdî	Dr. K. A. Bedir-Xan
11 Elfabeya min	Dr. K. A. Bedir-Xan
12 Dersên Şerîetê	Dr. K. A. Bedir-Xan
13 Çarînên Xeyam	Dr. K. A. Bedir-Xan
14 Proverbes Kurdes . Medhelokên Kurdî . Paris - 1937	Lucy Paule Margueritte û Emîr. K. A. Bedir-Xan.
15 Le roi du Kurdistan . Qralê Kurdistanê . Paris - 1937	Emîr. K. A. Bedir-Xan û Adolphe de Falgorolle
16 Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdistanê. Berlin - 1937	Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel
17 Der Schnee Des Lichtes . Berfa Ronahiyê . Şîhrên Kurdî Berlin - 1937	Prinz. K. A. Bedir-Xan û Dr. Curt Wunderlich

Kiriyariya Hawarê :

Sall 500 Q. S.  
Heştmehtî 300 Q. S.  
Çarmehî 150 Q. S.

Xwedî û gerîndeyê herpirsiyar: Mîr Celadet Ali Bedir-Xan. Şam—Sûrîye  
Directeur Propriétaire: Emîr Djêladet Aali Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 9  
HEJMAR 28  
PÊNCŞEMB  
15 GULAN 1941

# HAWAR

ANNEE 9  
NUMERO 28  
JEUDI  
15 MAI 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARE

Tefstra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Ûedsên Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Tarîxa Kurdistanê	Osman Sebri
Welatê Tirtviriya	Osman Sebri
Şivan û beran	Çiyayiyê Agiri
Em arî ne	Cegerxwîn
Bî yek bin	Dr. K. A. Bedir-Xan
Strana mirinê	Mamosteyê gerok
Marşa rêçenasan	Cegerxwîn
Gramera kurdmançî	C. A. Bedir-Xan
Kurd û kurdmanç	Hişyar
Jin û bextiyarî	Rewşen Bedir-Xan
Ferhengok	Ferhengvan
Pehlîzok	Stranvan
Paşlavjok	Stranvan

## BIRÊ FRENSIZÎ

Chants d'automne	R. Lescot
Memê Alan	D. A. Bêdir-Khan



ŞAM—1941  
ÇAPXANA SEBATE



## TEFSÎRA QURANÊ

28 - Ma hon çawan Xwedê inkar di-kin û pê kafir dibin!.. Hon mirî bûn, wî can-daye we; paşê, ewê we bimirîne û piştê ji kerema xwe ewê we vejîne û di dawiyê de ewê we bigihîne xwe.

29 - Wî Xudayê ko her tiştên dinê ji bo we afirandiyê û paşê dest bi ez-mên xistiye û wî ezman li ser heft tayan ava kiriye.... Xwedê bi her tiştî dizane.

30 - Gava Xudanê te, ji melyaketan re got: Ezê cihgirtiyek bişînim erdê, wan got: Yê ko tu bişîni, heye ko tê de fesa-diyê bike û xwinê birijîne, destê me li her rehma te sekiniye, û em hemî dizanin ko tu ji kêmaniyan pak î, û em bi mezinahiya te bawer in. Xwedê ji wan re got: Tiştên ko hon ni zanin ez pê dizanim .

31 - Xwedê ji cenabê Adem re navê hemî mexlûqan da zanin û paşê ew mexlûq nişani melyaketan kir û ji wan re got: Heke hon dilrast in, ke ji min re navên wan bêjin.

32 - Ferişteyan got: Mezin tu î, ji zanina ko te gihande me pê ve, em bi tu tiştî ni zanin; yê zana û fêris tu î.

33 - Xwedê got: Ya Adem! Navê mex-lûqên dinê ji melaiketan re bide seh kirin û gava Adem navê wan ji wan re da zanin, Xwedê got: Ma min ji we re ne gotiye ko ez nependiyên erd û ezmanan û tiştên ko hon di nav bey-na xwe de dibêjin an vedîşêrin dizanim .

34 - Û hîngê, me ji melaikan re got: secde ji Adem re bibin, ji şeytên pê ve hemiyan jê re secde birin, şeytên guh ne da, ser xwe ve çû û bû ji kafiran.

35 Me got: Ya Adem, tu û jina xwe pev

re di buhuştê de rûnin û ji her tiştên wê biqasi xwestina xwe bixwin, lêbelê nî-zîkî vê darê me bin, an ne honê bibin ji zalim û gunehkaran.

36 - Lê Şeytên ew xapandin û ew bû sebaba derêxistina wan ji buhuştê û Xwedê ji wan re got: Dakevin erdê û tê de weke dijminên hev biminin; di wê de heta wextekê ji we re war û qûtek dê hebe .

37 - Adem ji kerema Xwedê hîni pir-sên diayê bû, dia û tobe kir; toba wî hate qebûl kirin, ji ber ko Xwedê bi tobedaran re rehîm û piyar e .

38 - Me ji wan re got: Honê hemî dakevin erdê, emê di wê de bi kitêb û pêxemberan riya rastiye nî-şani we bikin, yê ko baweriya xwe bi wan tinin, ji bona wan tirs nîne û ew xemgir na bin .

39 - Û ewên ko kafir bûne, û derew bi aliye ayetên me ve dane; dê bikevin dogehê û tê de her wê biminin .

40 - Geli lawên Israîl!... Qenciya ko min ji we re kiriye binin bira xwe û baweriya xwe bi min binin û li ser vê baweriyê bextê xwe reş mekin heta ko ez ji li ser bextê xwe biminim; di bextxirabiyê de ji min bitirsin .

41 - Baweriya xwe bi vê kitêbê bi-nin, ev kitêb şehdetiya kitêba we Tewratê tine, kafirên vê kitêbê ên pêşin me bin û ayatên min bi tiştine erzan me firoşin .

42 - Raştî û xwariyê tékilî hev mekin û rastiye vemeşêrin, hon ji xwe pê dizanin .

43 - Nimêjê bikin, zekatê bidin û di nimêjê de tevî bawermendên din xwe bitewînin .

44 - Ma kengê dibe ko hon li xelkê

şireta qenci û bawermendiyê bikin û nefsa xwe jê bidin paş, hon Tewratê dixwînin, van tiştan dizanin, çima wiha dikin; ma hiş û aqil li serê we tu ne ye.

45 - Bi sebrê, bi roji û nimêjê hevîdarê Xudayê xwe bibin, ev hevî bitenê ji nebawermendan re giran e.

46 - Mirovên bawermend dizanin ko ewê rastî xwedê bîn û ewê bigehêjin Xudayê xwe.

47 - Gelî lawên Israîl!... Qenciya ko min bi we kiriyê binin bira xwe, min hon di ser hemî miletan re girtiye.

48 - Û ji wê rojê bitirsin ko di wê de kes nikare arikariya kesekî bike û mehdera yekî ji yekî re û dayîna fid-yê na ye qebûl kirin û tu kes ni kare gunehkaran ji ezabê xwedê xelas bike.

49 - Û binin bira xwe ko me hon ji destê Firewn û mirovên di wî felitandin, yên ko li we dişidandin, zor li we dikirin, kurên we dukuştin, û keçên we dihiştin. Xwedê hon bi vî ezabê mezin diceribandîn.

50 - Disa binin bira xwe wê dema ko me ava behrê ji hev kir û rê da we û li ber çavên we Firewn û mirovên wî di wê behrê de xeniqandin.

51 - Û cardin binin bira xwe ko me ji Mûsa re, ji bo dahatina Tewratê çil şew wade dabû, we di wê hengamê de golikek ani û ibadeta wî kir û hon pê gunahkar bûn.

52 - Û gava hon tobedar bûn û we dev ji ibadeta golikî kir; Xwedê hon efiw kirin; ta ko hon pê şikirdar bin.

53 - Disa binin bira xwe .... Me ji Mûsa re Tewrat da, ya ko rastî û xwarîyê ji hev digerine, ta ko hon bikevin riya rastiye.

54 - Disa binin bira xwe..... gava Mûsa ji qewmê xwe re got : Ya qewmê min!... We bi ibadeta golikî nefsa xwe xira kir, tobedarê Xudayê xwe bibin û di nav we de herçî suçdar hene bikujin, ev li nik Xwedê ji we re xeyr e. Xwedê tobe da wan, ji ber ko Xwedê rehîtu e, toban dide û toban qebûl dike.

55 - Disa binin bira xwe... We got : Ya Mûsa, heta ko em Xwedê bi çavê xwe ne binin, em baweriya xwe bi te na yînin, wê demê birûskek ji ezmên daket û wê hon şewitandin û we ew bi çavên xwe dit.

56 - Piştî wê mirinê, min hon vejandin ta ko hon pê şikirdar bibin.

57 - Û me di germiya deşta Tihê de bi ewrî sih da we û me ji we re gezû û kutefir barandin û me destûra xwarina vî zadê çak da we, we bi serhişkiya xwe zilim ne li me lêbelê li nefsa xwe dikir.

58 - Paşê .. me ji we re got : Bikevin vî gundi û ji zadên wî biqasî daxwaza xwe bixwin, ji deriyê wî li ser çokan derbaz bin û bi poşmanî bibin tobekekarên gunehên xwe, ta ko Xwedê ji toba we qebûl bike; ji ber ko Xwedê xweşiya mirovên qencîker zêde dike.

59 - Heçî mana pirsên ko ji wan re hate gotin guhartine, wan nefsa xwe pê xira kirine, me ji wan re ji ezmên nesaxiyeke dijwar şande xwar, ji ber ko wan riya baweriyê berda.

60 - Disa binin bira xwe.... Gava Mûsa ji bo xelkê xwe av xwest, me jê re got : Bi çoyê xwe li vî kevirî bide, wî bi çoyê xwe lê da, ji nişkê ve ji wî kevirî donzde kani der bûn û her birê xelkên Mûsa delavên xwe nas kirin û me ji wan re got : Ji zadên Xwedê vixwin û bixwin û bi nezanîna xwe di erdê de fesadiyê me kin.

61 - Û gava we ji Mûsa re got : Bi xwarineke bitenê sebra me nayê, dia ji Xudanê xwe re bike bila ew ji me re, ji hatinên erdê tiştên weke heşinafi xiyar, genim, nîsk û pîvazê bide gi-handin; me gote we: Hon tiştine heja bi tiştine ne heja diguhêrin; herin, dakevin Misrê, ew tiştên ko hon lê digerin li wê derê pêda dibin; ji ber ko wan ayetên Xwedê inkar dikir û pê kafir dibûn û pêxemberên Xwedê bê rê dukuştin û li ber Xwedê xwe mezin diditin û ji riya rastiye dûr diketin, ji erna Xwedê jarî û belengazî bi ser wan de hat.

## HEDÏSËN CENABË PËXEMBER

### REHMET Û SILAVA XWEDË LË BE

44 - Yê ko dibe sebeba qenci an xirabiyekê heçko wî ew kirine .

45 - Yê ko rastiye na bêje û derewa dike û ne xwediyê gotina xwe ye û ji emanetê re xayinitiyê dike , ew nimêja xwe bike , zekata xwe bide û bere Hec û Emrê jî , dîsa minafiq e .

46 - Spehltiya mirovan xweşiya zmanê wan e .

47 - Bubuş di bin lîngê diya de ye .

48 - Şer tep û hîle ye .

49 - Mirov kêmaniya tişteki ko jê hez dike ne dibîne û ne jî dibihse .

50 - Zanîna mîna tişteki ye ko misilman heçko wînda kiriye , ko peydâ dike dibe .

51 - Yê ko baweriya xwe bi xwedê aniyê û misilman bûye , divê xwediyê gotina xwe bibe û bêbextiyê ne ke .

52 - Fedîkirin ji baweriyê ye . Heya ji îmanê ye . Şermkirin , dîn hemî eve .

53 - Xwe ragirtin ew e ko mirov bi yekî heja bişewire û bêgotîniya wî ne ke .

54 - Di nav mirova de yê baştir ew e ko jî jin û zaroyên xwe re baş e .

56 - Mirovê xirab her îşî xira dike ; her weki sirke tama hingivî xira dike .

56 - Xelk hemî lêzên Xwedê ne , Xuda jî her kesî bêtir jî wî mirovî hez dike yê ko bikêrî wan tê .

57 - Di nav xaniyên misilmana de xaniyê çêtir ew e ko lê de sêwiyek hebe û qedrê wî bête girtin .

58 - Dîn pend û şîret e .

59 - Dev ji kirina tiştê ko ji qenci û rastiya wî ne ewle yî berde û dest bi kirina tişteki bike ko tu xweş dizanî ew qenc û rast e .

60 - Xwediyê heq divê bêje ; guh bidinê !

61 - Ji dergûşê heta mirinê minêkarê zanîne bibin .

62 - Zanîna di welatê Çîn û Maçîne de be jî lawekarê wê bibin .

63 - Li ser jin û mîra ilm û zanîna ferz e .

67 - Jin û mîrê divê minêkarê zanîne bibin , ev emrê Xuda ye) .

65 - Qedrê rastiye bigirin , yê ko wê rastiye got biçûk be mezin be , xurt be belengaz be ne tu xem e . (Rastî ne ji dewlemenda bitenê re ye .

66 - Ne guneh tê ji bir kirin ne jî qenci

wînda dibe û Xwedê jî na mire , tu bi kêfa xwe yî , her weki dixwazî bike .

67 - Dev ji riyakara berdîn ; ew bi kêr na yîn .

68 - Berê heval piştî rê .

69 - Şîr xulq diguhêre .

70 - Ji Xwedê bitirsîn ; serê hikmetê eve .

71 - Heçiyê zmanê xwe digirin heyê ko Xwedê li wan bê rehme .

72 - Yên ko bi xelkê re dilovan in ; Xwedê jî bi wan re dilovan e .

73 - Rast biwezîne û hinki bila zêde be , ta ko kême ne be .

74 - Yê ko bala xwe dide xelkê û jî tiştên xerab ko ew dikin xwe diparêze , serdest dibe .

75 - Sermiyanê miletekî ew e ko xulamitiya wî dike .

76 - Mirovên xirabtir ew in ko qedrê xelkê jî tîrsa xwe digirin û dixwazin pê jî xirabiya wan ewle bibin .

77 - Mirovên xirabtir ew in ko eqilmend nizîkî civata wan na bin .

78 - Dermanê nezaniyê pîrs û xebat e .

79 - Serêkê xirabtir ew e ko bêrehm e .

80 - Di nav xaniyên misilmana de , xaniyê xirabtir ew e ko lê de sêwiyek heyê û têtê eşandin .

81 - Di nav misilmana de mirovê xirabtir ew e ko têkilî xelkê na be , jî xwe razî ye û di emelê xwe de riyakar e .

82 - Kirina qenciye mirova jî xirabiyê diparêze .

83 - Dan û qenci erna Xwedê disekintne .

84 - Bi hejkirin û arikariya lêzimên xwe mirov emrê xwe dirêj dike .

85 - Ne xebêrdan heja ye ; lê yên ko wê seh dikin kême in .

86 - Pê zerêr jî bigihe te ; rastiye bibêje .

87 - Di derba pêşîn de divê mirov sebrê bide xwe .

88 - Mewanî sê roj in ko dirêjtir bû , bû sedeqe .

89 - Timakarî hikmet û zanîne jî dilê zanayan dirvine .

90 - Paqîjiya dil û laş nivê baweriyê ye .

91 - Yê ko bi derewînî şehdetiyê dide mîna mişrikek e .

92 - Wad mîna danê ye ; ko te wad kir bide .

93 - Zilma xedara di roja piştawiyê de jî wan re dibe mij û dûman , pêşiya xwe na binîn .

94 - Hikmê derewînê giran ew e ko li ser gumanekê hatiye dan .

95 - Zilma dewlemenda a mezin ew e ko deynê xwe na din .

- 96 - Wad deyn e .
- 97 - Yê ko hîn dike û yê ko hîn dibe di qencyê de şîrkê hev in .
- 98 - Tiştên qenc û bikêrhatî ko hon dizanin ji xelkê re bêjin , işê wan sivik bikin ; giran me kin .
- 99 - Çavên xwe ber siûd û dewlemendiya xelkê me din .
- 100 - Qenaetkar her serfiraz e û timakar her bê qedr e .
- 101 - Tiştê ko na be tu lê binêrt ; lê me meyzîne .
- 102 - Kî n û besed qencyê radikin her weki agir êzinga dişewitîne .
- 103 - Rastiye bêje , bila tehl be .
- 104 - Mirov bi ewîkîrîna qisûra bilindtir û bi nefsbîçûkahiyê mezintir dibe û mal tu cara ji sedeqan kê m na be .
- 105 - Bêbext bi nişaneki di roja piştawiyê de wê bêne nas kirin .
- 106 - Xwedê ji du sixleta hez dike : eqilmendî û xwe ragirtin ,
- 107 - Qazî sê texlî in , dido ji wan wê bikevin dojhê û yek wê here buhuştê . Yê ko zana ye û di hikmê xwe de adil bû wê here buhuştê .
- Yê ko bi nezaniya xwe hikmekî ne rast daye , wê bikeve dojhê .
- Û yê siseya ko zana ye lê bi qedr hikmekî ne rast daye wê here cehenemê .
- 108 - Ji gunehkariyê re ew bese tiştê ko dikeve guhê te û tu dibihîstî dibêjtî .
- 109 - Eqilmend xwe şîdand û tiştin pêk anin ko xelk û Xwedê jê razî bûn .
- 110 - Mirovê qels li gora eqelê xwe meşiya û her tişt bi dest Xwedê ve berba .
- 111 - Bi belengaziyê mirov kafîr jî dibin .
- 112 - Bêbextiya mezintir ew e ko tu derewa li hevalê xwe dikî û ew bawer dike ko tu rastiye jê re dibêjtî .
- 113 - Her tiştê ko serxweşiye çêdike şerab e , û her vexwarina ko mirov pê serxweş dibe heram e .
- 114 - Hon hemî şivan in û her şivankî jî keriyê xwe herpirsiyar e .
- 115 - Her weki dikî bi te dikin .
- 116 - Her qencî sedeqeyek e .
- 117 - Her kes li gora cewherê xwe tê afirandin ko zmanê wî geriya xulqê wî xuya dibe .
- 118 - Hêjabûna emelê her kesî li gora niyeta wî ye .
- 119 - Heke tu bi yekî jî xwe aqiltir şewirî işê te tu cara xira na be .
- 120 - Dilê xwe me bijînin mal û dewleta xelkê
- 120 - Mirovê ko cîranê wî jê ne ewle ye ne bawermend e ,
- 121 - Kes jî kest ne çêtir e ; lê çêtirbûn bi din û emel e .
- 122 - Gava hakim di nav beyna du peyayan de hikim dike na be ko enîrî be .
- 123 - Îmana we timam na be heta ko hon her wekî jî nefsa xwe hez dikin jî bra û destbrayê xwe jî hez bikin .
- 124 - Bawermendê pak du cara destê xwe dirêjtî kula mêr na ke .
- 125 - Çavtengiyê jî kesî me ke ta ko xelk çavtengiyê jî te ne ke , li gora taqeta xwe arikariya xelkê bike .
- 126 - Ne nefsa xwe ne jî xelkê biêşîne .
- 128 - Qisûra xelkê me de rûyê wan ta ko xelk qisûra te ne din rûyê te .
- 129 - Civat bi ewleyiyê çêdibe .
- 130 - Mirovê ko şewir pê tene kirin divê ewle be , gotina ne bêje .
- 131 - Heke karê we paş ve çû , navê we pêş ve na çê .
- 132 - Tiştê ko dilê te de heye û tu lê bi şik bûytî dev jê berde .
- 133 - Ez mizgîniya buhuştê didim wî mirovê ko bi doxin û zmanê xwe dikare .
- 134 - Ez mizgîniya buhuştê didim wî mirovê ko kari be zman û doxîna xwe .
- 135 - Heçî jî mêl û zanîne hez dikin her birçî ne ,
- 136 - Misilmanên baş dev jî tiştên ko elaqe wan pê nîne berdidin .
- 137 - Yê ko heramiyê dike baweriya xwe bi Quranê ne aniyê ,
- 138 - Bi xelkê re midara û idare kirin sedeqe ye .
- 139 - Qedrê hevalê bavê xwe bigrîn û arikariya wan bikin , bila qenciya we bigehe wan .
- 140 - Di debara malê de tevdir û idare nişana zanabûnê ye .
- 142 - Yê ko hejtî Xwedê dike jî kirîna xirabiyê şermisar dibe .
- 142 - Yê ko deyneklî dike û dixwaze wî bide ; Xwedê jê re pêk tine .
- 143 - Gava qencyekê dikî bi awaktî delal bike .
- 144 - Yê ko li ber Xwedê nefsbîçûk e ; Xwedê wî mezin dike .
- 145 - Yê ko bi kubarî bi rê ve diçe ; Xwedê lê na neyire .
- 146 - Yê ko nizikî guneha dibe beye ko bike .
- 147 - Heke tu li heytikekî bêlî rehmê ; Xwedê li te tê rehmê .



# TARİXA

## KURD Û KURDISTANÊ (1)

### 1

Heya van demên nîzik, tu kitêbên tarîxê di heqê gelê kurd û welatê wan Kurdistanê da ne hatine nivîsîn. Çiqas ko mtr Şerefê bidlîst bi navê Şerefnamê tarîxek, der heqê emaretên dema xwe nivîsandîye jî; ev kitêba han di warên dirokî û zanîstî da nabe tarîxa gel an welatekî.

Bê şik di warê heyîna mîletekî da, ev tînebûna han kêmasîyeke mezin e. Ji ber ko, jî alîkî, pîraniya kurdan nizant bûn kok û reha wan jî kû ye, daketîyên kljan mîletî ne; an berê bi çi navî bi nav bûnê. Ji milê din hin diroknivîsên ereban, bê ko rûmeta zanîna dirokî bigrin, her jî bo hin ramanên siyasî, koka gelê kurd digihandin erebên qehtanî Çiqas ko dirvê kurd û ereban bi hev nakevin jî, vê gotîna han di serê pir mirovan da cih digirt. Ewçend cih digirt ko serwest kirîna van celeb mirovan zehf dijwar bû bû.

Vê paşîyê di sala 1931 an da diroknivîsê kurdê hêja û zana Emln Zekî begî bi nivîsandîna du cild dirok bi navê (Xulaseyeke tarîxa kurd û Kurdistanê) bi zaravayê kurdên nivro «Baban», ev kêmasîya me a mezin li ber çavên yar û neyaran hilant.

Kitêba Emln Zekî begî bi her awayî di celebê xwe da yekta ye. Westa ko tê da hatiye xwarin û awayê zanîstîyê ko pê hatiye nivîsîn, hêjayî her pesn û spasê ye. Lê herwekî hemî xebatên nûser jî kêmasîyan hêsa nabin heye ko di kitêba Emln Zekî begî da jî hin kêmasî peyda bibin. Ji ber ko nivîsevan di nivîsana kitêba xwe da bi her awayî xwe spartîye kaniyên biyanî. Ji lewre ev kêmasîyên han vedigerin ser wan kaniyan.

Ji xwe Emln Zekî begî di pêşgotîna kitêba xwe, rûpelê (ye) da vê yekê han dide ber çavên me xortan û jî bo tikûz kirîna xebata xwe me dihêvoje.

Emln Zekî begî dibêje: «Ez nabêjim ko

ev kitêb tarîxa gelê kurd e û jî kêmasîyan dîr e. Ez bawer im ko tê da kêmasîyên mezin hene. Tevî gerîna di nav du sed û pêncî kitêbên inglîzî, frensîzî, elmanî, erebî, tirkî û farisî, hin dibînim ev war hewceyî ger û pirsîneke xurt e, da ko kêmasîyên wê tikûz bibin. Herçiya ez dikarim bêjim ew e ko, ev kitêb jî bo xort, zana, xwendevanên kurd û mîldarên wê dibe hêviya ger, tevda û pirsînê. Ya ko li wan dikeve, divê bi hûrbijartî bixwinin û bi xweşbînayî tenqîd bikin, da ko kêmasîyên wê tikûz bikin û herçiya tê da li hev ketî bibînin û jî hev bi derxin».

Di sala 1936 an da jî kurdên Misrê welatîyê hêja Mihemed Elî Ewnî begî ev tarîx bi awakî qenc û delal guhaztî bû zmanê erebî û da bû çapkirin.

Li cihekî wek Misrê, dûrî kurdan û Kurdistanê bendewariya ko Mihemed Elî Ewnî begî jî bo welatî û welatîyên xwe rave dike hêjayî her pesn û spasê ye. Xebata camêr hîn bi vê tenê nemaye û di bin agahiya min da, hîn bi gelek tiştên din jî dixebite. Di ber vê xebata hêja va, bila guhên xwenda û zanayên kurd ên ko di rex û nav Kurdistanê da bê liv û tevger rûniştîne biçîngin.

Emln Zekî begî jî bo vê tercîma erebî jî pêşgotînek kurt nivîsiye.

Di wê pêşgotînkê da dişa bi dilekî şewat dibêje: «Ev kitêb piştî kitêba Şerefnamê der heqê tarîxa Kurdan kitêba pêşîn e. Çawan ko min di pêşgotîna kurdiya wê da jî gotî bû, di pir cihan da hewceyî fireh û dirêjkirîne ye. Anîncîha vê yekê di warê zanîstî û welatîyê da barê xortên kurdan ên nûgihêştî ye. Tevî ko şeş sal di ser çapkirîna kurdiya wê ra borin, di vê navberê da kes bi vî karê zanîstî û welatî ra nebû. Lê vê yekê han dilê min ne şikandîye û tu caran naşkênîne. Ji ber vê min hinekî din xwe şidand û gelek tişt bi ser tercîma erebî va zêde kirin. Bi dilekî xwe ranegirtî ez li hende xortên zana, jîr û xweyîraman im, ko di vî warî da kitêban bi derxin...»

Ji ber ko ev kitêb jî bo me kurdan hatiye nivîsîn, em tucar kêma mayîna wê naxwazin. Divê, her kurdê jî rastiya vî warî haydar, bi qasî zanîna xwe, li ser kêmasîyên tê da bipeyve. Her yekî di vê rê da zanîna xwe binivîse hîn dilê nivîsevanê camêr geş dike û him jî, jî tikûziya

(1) Tarîxa kurd û Kurdistanê Emln Zekî begî wezîrê Iraqî di sala 1931 an da bi kurdî, zaravayê baban nivîsiye û li Beîdê di çapxana darcelamê da daye çapkirin. Di sala 1936 an da jî kurdên Misrê Mihemed Elî Ewnî begî ev kitêb guhaztîye zimanê erebî û li Misrê di çapxana esade da daye çapkirin. Ji ber ko hîn tişt bi ser tercîma erebî va zêde kirîne û jî ya kurdî tikûz e, jî bo tevda û xafîtinê me ew jî xwe ra kîre arzanc. Çi gava yek behsa rûpelan di bendên me da bibîne, divê jî ya erebî binêre.

## WELATÉ TIRIVIRIYAN

Dibêjin ji Serhedan  
Berê ne bûn sehristan  
Tev rêl û dehi û devî  
Hebû şahê di şêrau  
Rojekê ew çû nêçir  
Pencek lêda wergerand  
Gava zikê xwe kir têr  
Kes tine bû di geli  
Roviyekî pir xaznag  
Dema wî dit şêr raket  
Hêdî hêdî hate jêr  
Bî rêviyên zikê gê  
Revî çû ket uava kir  
Ro ji ezmen pengizî  
Heya ji xew pênişî  
Tezik da xwe bi awir  
Gelek zor da dest pê  
Rovî dit ev halê ha  
Got: bonsiwar memê şêr  
Simbêla xwe girî bada  
Şêr gelekî enirî  
Serekê weş û kovî  
Lê çî bike nika bû  
Hêdika got: birazî!  
Roviyê bi fên û fût  
Min divê te holê xweş  
Ev çiyayê pir bilind  
Çî dirende mûr û mar  
Teyrek nika bifirî  
Du sê lotik dane xwe  
Wê sevê şêr ma li wê  
Sibê roviyê xiniz  
Hate pêş şahê zerî  
Gotê: eman ya siltan  
ki bê bavê quz jin kir  
Zûka vekir piyên şêr  
— Lawê Ebasê guri  
Şêr got: bi heqê Xwedê  
Di nav van rêl û beran  
Girêdana bi Tiri  
Vê minetê nagirim  
Ji dest fênen roviyak  
Çirçirok çû diyaran

Hema 26—9—933

Heya dighê Amedan  
Ne bajar, haş û bistan  
Tê hebûn weş û kovî  
Kuç û zinar dihêran  
Di rê da dit gaki pir  
Kezeb lê bi bergerand  
Xcw ji xwe ra dit bi xêr  
Ber cendek ra vezell  
Rawestî bû di nav pag  
Rabû di nav pég daket  
Wî ji zikê xwe kir têr  
Ji şêr şidand dest û pê  
Ji girtiyê xwe hêre kir  
Rêvî li hev çingizî  
Rêvî li ser bûne ji  
Girêdana xwe bir bir  
Bo felatê nedit rê  
Rabû daket hate ba  
Yanê êvar pir bi xêr  
Li ber sêrî tût veda  
D'zêkê xwe da mirmirî  
Îro bû tewzê ravi  
Êdî gewrî ziha bû  
Te xêre, çî dixwazî?..  
Gotê: memê şehbelût  
Bibinin her bextêş  
Ko tê ninin şehîr û gund  
Ez im tê da fernandar  
Bê destûra min Tiri  
Revî çû ket kuna xwe  
Girêdayî ta sibê  
Bi semtika weke diz  
Jê ra nizim kir serî  
Gorî te bin serî çî can  
Girêpa ye ev emir  
Şêr got: navê te bi xêr?  
Xulamokê te Virî  
Bi wê keda bav û dê  
Namin im li van deran  
Berdana bi destê Virî  
Bila j'xwe ra binirim  
Şêr derketin ji çiyaran  
Rehme l'babê guhdaran

OSMAN SEBRÎ

diroka welatê xwe re dixebite. Di wî wari da pir û hindik gotinên ko bibin pêşdetir di destê droknivîsên kurdan da ji goreyî xwe dibin ronahîkê.

Piştî berpê kirina pesn û spasên xwe ji cenabê nivîsevan Emîn Zekî beg re; min dil heye li ser çend bendên kitêbê bipeyivim. Heke wek daxwaza Emîn Zekî beg kitêbeke bi serxwe nenivîsim jî, teqez li ser kitêba ko gihandiye destê me û di warên ko tê da haydar im, dê zanîna xwe bêjim û bi wî awayî bi karê xwe ê welatî rabim. Min hevî gelek mezin e ko xort û zanayên kurd zanîna xwe ya di wî wari da ji gele kurd û droka wan nehêvişnin.

OSMAN SEBRÎ

## ŞIVAN Û BERAN

BERAN:

— Şivano... derdê te çî ye, tu çîre hevqas mitalan dikî û berjêr li erdê dinêrî; fedkire... dinya bihar e; gul û ççek li çiya û zinara şin bûne; xema me xwe; Xwedê heye, xem tu ne ye...

ŞIVAN:

— Berano... berauê min ê pênçbirinî, galgala te xweş e, tu li ber dilê min dikî hêveron û ronikahi; tu beranekî pozbilindî rû bi şamî, çavên te mîna çavên şêr in, qilôçên te mezintir in ji qilôçên beranê pezkûvî, te xwe di firehiyê de ditiye, te tengî û kêmanî ne ditiye..

BERAN:

— Belê; ez li ser mêrg û çîmenên dest û zozana hatime çêrandin, min ava delavê Bingolê vexwariye, di van pûk û herf û bandevî de, li Serhedan mezin bûme, tirsê dengê gur û cinawira tu cara ne ket dilê min, ber bi êvarê li ser tehtî û pehnava min berê xwe da rojavayî û bayê xerbi li mûyên singa min dixist û di şevinkirina şivana de, min qilôçên xwe dida erdê û min stêrên ezmana dihejmartin.

ŞIVAN:

— Berano... tu xweş dibêjî; wadê ez xort bûm, dest û zozan, govend û stran, teşî û bêrivan hesi min bûn... Berî rohelatî li seh-gura sibê, gava min blûr û herbangî ji pezê xwe re lêdixist û dengê min hikim dibû li diyar û newala, dilê min vedibû, kêfa min dihat û li cem min û bevala dibû şahînet.

Wê çaxê ez serekê şivana bûm û min ji xwe re wê wextê digot: Ji Xwedê pê ve mezin ez im:

Carna min xwe ji çiyê bera dida û ez diketim destê û diçûm nav gundî û cotkariyên xwe..

Di gundê me de du xortên xwenda bebûn wan carna ji min re digot: Halê te û halê me giya ne tu halê; min henek û qeşmeriyê xwe bi wan dikir; wan li min vedigerand û digot: Tiştin hene ko tu pê ni zantî lê em dizanin.

BERAN:

Tu dibînî, li cem te bû dilxweşî û firehî...

ŞIVAN:

— Belê; lê rojekê min dixwast, ez ji xwedî kon û pez bim, Axê ji min dilgiranbû, berê xwe ne da min û herçend jî min rih û porê xwe di ber xidmeta wî de spî

## EM ARINE

Em Guhderz in serbilind in devçirên in  
[ weke Ristim bidin deng  
Doza xwe em her dixwazin welatê xwe dè  
[ em bigrin her bi ceng  
Xwîna xwe em dè birjînin bi dilxweşi ji bo  
[ kurd û Kurdistan  
Bi serbestî weke Birho weke Seydo ka  
[ Ferzende ka Ihsan  
Heya sax in ji bir nakin ji bir nakin roja  
[ cenga Şêx Seid  
Ka ew mîr û ka ew axa ka ew paşa ka  
[ gernas û ka egîd  
Top û tîfling tev diteqîn em narevin singa  
[ xwe em didin ber  
Dijmin revî ji paş ve çû de bidne dû weke  
[ mêran bidne ser  
Gelê xortan jêhatî bin xwe rapêçin di  
[ rextan da weke fil  
Da em herin cenga dijmin kumandaran  
[ weke mêran bikin dil  
Saz û awaz tev da lêxin bidne pê hev  
[ kewt û leşker tîp û kom  
Da em bigrin Şehrezor û Kermanşah û  
[ Elcizîr û Hezarom  
Xwendegahan em ji çêkin da bixwinin  
[ herçî kurd in hûr û gir  
Da em çêkin tomatîk û mîrlyoz û top û  
[ tîfling balafir  
Di cengê da li meydanê em ji rabin weke  
[ Ristem pchlewan  
Arîkarê me bi dîsa şahê Ecem pismamê me  
[ Rîza Xan  
Em arî ne tranî ne lawên Ristem lawên  
[ Guhderz serbilind  
Ma yên kê ne ev keleh û ev sera û birc û  
[ eywan şehîr û gund  
Em tev kurd in serpola ne gurçîk hesin;  
[ lê em çî bikin dilbirîn  
Çerxa felek çep geraye ax û eman îro  
[ bûnê Çegerxwîn  
CEGERXWÎN

kir, ez qewirandim; wî ez wek parsekekî hesabandim.

Wadê Aşayê min, galgal û xeberên giran ji min re digot di bira wî ne dihat ko bavê min bertî min xîdmet û şivaniya wî kir û di her pez û şivaniya wî de xwe bi kuştin da.

Aşayê min di bira xwe ne diant ko min

## BI YEK BIN

Şêx, axa, beg, gundî, pale hemî brayên hev in, û welat bi xebat û xêreta wan hemîyan aza dibe.

Gundî û mela û şêx û axa,  
Seyda û feqî, nezan û zana  
Em kurd in; erê; û yekdil in em;  
Şabûnî û matemê de hemdem.  
Axa û mela û pale, koçer,  
Kurd in û hemî bira ne yekser.

Xelkê me hemî; ji qehr û derda  
Gava digiri welatê Kurda  
Rabûn û gişa ji dil, û tev da  
Gundî weke pale, şêx û axa,  
Pev ra xwe ji bo me dane kuştin

Gundî û feqî û şêx û pale;  
Pev re dikirin fişan û nale.  
Erd û şerefa me pak e; kurd in;  
Xwîn û neseba me çak e; kurd in.  
Axa û mela û pale, koçer.  
Kurd in û hemî bra ne yekser.

Mêranî û xeyret û şehamet,  
Kevnar e, li cem me rêz û adet  
Erdê me delal e; xemrevîn e  
Tirba Mem e ew, welatê. Zîne  
Axa û mela û pale, koçer  
Kurd in û hemî bira ne yekser

Xeyda hev û du ji dil derfîn,  
Kurd in hemî em kezebîrîn,  
Tirsa we me be ji pûk û badev,  
Ilm û hînera xwe gî bidin hev.  
Axa û mela û pal e, koçer  
Kurd in û hemî bira ne yekser.

Xelkê me hejî; ji qehr û derda  
Gava digiri welatê Kurda  
Rabûn, û gişa ji dil, û tevda  
Gundî weke pale, şêx û axa  
Pev re xwe ji bo me dane kuştin

Dr. K. A. BEDİR-XAN

ji mîna bavê xwe xîdmet û xulamîya wî kir.

Wadê li min nêrî û dit ko ez ji dixwazim hibim lişteki, qehr û baca wî ji min hat û li windakirina min digeriya. Lê çavê wî di min ne birt... Lê ez çî bikim, emrê çûyî venagere... Roj li cibekî teng li min çû ava.

ÇIYAYÊ AGIRÎ

# STRANA MIRINÉ

ADAPTATION D'UN POÈME DE LAMARTINE  
« LE POÈTE MOURANT »

Piyana jiyina min hêj tejt û dagirtî şikiya  
Emr û hestiyên min pê keserên giran heliya.  
Hêstir û girin, ax û zarin,  
Ji derdê mirinê re ne tu dêrman in.  
Siha mirinê bi ser serê min de tê;  
Saeta min a dawin lédide;  
Mirinê nêztkî li min kiriye;  
Xuya ye; ezê bibim mêvanê ax û qebrê  
Ma ez çi bikim?  
Tiştêk li destê min ne maye....  
An girin, an stran û dilxweşt.  
Ezê bistirêml...  
Ko hêj dest û tiliyên min,  
Ji darê tenbûra min sar ne bûne.  
Ezê bistirêml...  
Mirin min dixaptne û dilorine;  
Ez bûm, cîranê mirinê;  
Dengê wê ê ziz û giran tê;  
Û dikeve guhê min,  
Gava saz dişkê;  
Teqîn jê tê;  
Mina teqîna tifîngekê.  
Çîra berî mirin û vemirandinê,  
Bi şewq û lehba xurt dibiriqê;  
Roj berî roavayî  
Hin mezintir û pehintir dibe.  
Bi tenê em; insanê qels û reben  
Li ber mirinê,  
Hin feqîr û belengaztir dibin,  
Rojên xwe ên borî tinin bîra xwe,  
Û wan dihejmêrin;  
Ax û ofa dikin û dinin giri...  
Ma rojên borî çi ne?  
Ma kengê hêjayî girin û hêstir in?  
Rojek e, disa rojek e;  
Saetek e, disa saetek e;  
Yê ko tê mîna şev û roja borî ye.  
Carna êş û xebat û kêf û şahî;  
Carna ax û of û girin;  
Carna di nav gul û gihê,  
Carna di nav ax û herî;  
Û dawî....  
Şeva tarî bi ser me de tê....  
Yên ko ji nezani û timakariya xwe  
Dest davêjin salên berî û rojên borî  
Û wan roja di bîra xwe tinin  
Destê xwe vedikin û parsekiyê dikin;  
Wê bibînin...  
Emrê çûyl venagere; rizqê çûyl na ye dewse;  
Wê seh bikin;  
Hêviya wan vala ye û mirada wan bê xeyr e.  
Ji bona min  
Ko tu cara rehê xwe bera erdê ne da

# MERŞA RÊÇENASAN

Rêçika keşaf û xortan yektî û dilpaqijî  
Em dixwinin da mezin bîn sertijî eql û mejî  
Pêşî her tiştî riya me zane bûn û pêşketin  
Em fedakarên welat in rêçenasên mîlet in  
Begler û axayê kurdan ser bilind in xanedan  
Şêx û seydayên dilovan rê me dan dîn û îman  
Pêşî her tiştî riya me zane bûn û pêşketin  
Em fedakarên welat in rêçenasên mîlet in  
Nav û dengê mîletê kurd çûye heta Hind û Çîn  
Her bi ceng û her bi zanîn pasibanê ilm û dîn  
Pêşî her tiştî riya me zanebûn û pêşketin  
Em fedakarên welat in rêçenasên mîlet in  
Olperest e mîletê kurd her bi nav û rûmet e  
Ta ebed ber serfiraz e bendewarê xîret e  
Pêşî her tiştî riya me zanebûn û pêşketin  
Em fedakarên welat in rêçenasên mîlet in  
CEGERXWÎN

Çûyin; bê girin û zehmet e;  
Ezê herim....  
Mîna pelekî sivik  
Ko ba ji darê diweşîne...  
Ezê herim bê ax û zarin;  
Bê şîn û girin.  
Girin û hêstir ji bona çi?  
Ezê herim!  
Mîna ba û bablîsokê,  
Mîna av û ronahiye....  
Xwedê dilê min  
Li ser sindiyana jiyinê danî;  
Û bi girane û zompên qebr û xweşiyê  
Lê da.  
Qedr û qîmeta saxiya min çi ye?  
Dilê min ji dinyayê sar bûye;  
Lê ez qedrê jiyina xwe hêj digirim  
Heta ko bikarim  
Li ser rêke hêja bimirim;  
Xwe bidim kuştin.  
Şeva tarî bi ser min de tê.  
Ez mêvanê gor û tirba me;  
Lê ezê bistirêml...  
Ko hêj dest û tiliyên min,  
Ji darê tenbûra min sar ne bûne.  
Ezê bistirêml...  
Berî mirinê  
Ax û zarin, şîn û girin  
Ji bona çi?..  
Ezê bistirêml!  
Ko hêj dest û tiliyên min  
Ji darê tenbûra min sar ne bûne.  
Ezê bistrêml!  
Strana azahî û serbestiya welatê xwe,  
Û dengê stran û tenbûra min  
Li çiya û zinara,  
Lî dest û zozana,  
Wê deng bide.

MAMOSTEYÊ GEROK

## BINGEHÊN GRAMÈRA KURDMANCI

BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DILQVAN Û MIHIRVAN

— 2 —

Wek : « Ibret, icra, iflas, imza, inkar, insaf, işaret ». Ji xwe kurdmancên kevin gava ev bêjeyên ha bi lêv dikirin « h » yek didan pêşiya wan û digotin : (hibret, hicra, hiflas, himza, hinkar, hinsaf, hişaret). Ev bilêvkirina ha hetanî fro jî di hin cihên Kurdistanê de peyda dibe.

Şanek — Dengdêra « i » di nîn bêjeyan de û gava kîtek bi wan bêjeyan ve dibe, naye xwendin, lê tete nivisandin; ji ber ko di esilê bêjeyê de « i » heye û gava kîta ko wê nade xwendin jê dibe « i » tete bi lêv kirin. Wekî niho, « i » yên bêjeyên « qetil, bihin, remil, qifil, resim, eqil, qedir, qehir, rikin, kevin, şikil, qesir, fikir, şikîr, sihir, tevin, tihin » gava bêje bi serê xwe ne tene xwendin. Lê heke kîtek bi paşiya wan ve bû ew « i » nayine bi lêv kirin. Herwekî: « qet'la wî, ev çi bih'n e? bi rem'lê dizane, bi qif'lê, van res'man, eq'lê te, qed'rê wî, ji qeh'ran, rik'nên Birca — Belek, ev kev'n e, di vi şik'lî de, qes'ra jorin, bi vê fik'rê, şik'ra xwe, bi sih'rê, li ser tev'nê, ez tih'n im » Lê ew di vê bilêvkirinê de jî vekîta xwe a binbegîn hiltinî û di şiklên jêrin de tene nivisandin. (qet'la wî, ev çi bîbin e? bi remilê dizane, bi qif'lê, van resiman, eqilê te, qedirê wî, ji qehiran, rikinên Birca belek, ev kevin e, di vî şikilî de, qesira jorin, bi vê fikirê, şikira xwe, bi sihirê, li ser tevinê, ez tihin im).

Lê heke pêr an parkîtek bi wan ve bû û pê bêjeyêke nû û hevedidanî hate pê, heke (i) ne ketiye bêjeya nû naye nivisandin. Ji ber ko ev pêr an parkîti nûya ji wê bêjeyê dibin û ev bêjeya hevedidanî bêjeyê biserxwe ye û wê vekîta xwe a xweser heye. (Kevin, kevnar. Bihin, bihnok. Tevin, tevnepirk)

Lêbelê, heke ji bervajî ve di bêjeya nû û hevedidanî de (i) hate bilêvkirin tete nivisandin jî. (Şikir, şikirdar. Sihir, sihirbaz. Remil, remildar. Eqil, eqilmend. Qedir, qedirgiran.)

Û — Ev dengdêra ha bi gelemperî dikve paşiya dengdarên « g, h, k, q, x » û di paşiya dengdarine din de kêman peyda dibe. Hunda, hundir, guh, guher, gul, gulat, gulok, guman, guzvan, kuç, kul, kuli, kum, kurt, kurm, qub, qul, qurç, qunders, qure, qurm, qurtik, xubar, xumre, xur, xurdek, xurin, xurt. Bêjeyên wek « du » û « tu » awerteyên vê qeydê ne.

Ji milê din tu bêjeya kurdmanci bi « u » yê naqede, ji hin awartan pêve; herwekî pê dest pê nake jî.

Ji xwe ev dengdêra ha hêj di zîne de

biserketina xwe ne qedandiye. Ji lewra û li gora bilêvkirina kurdmancên ko « w » û « i » yê bi temamî li hev naxin bêjeyên wek « xurdek » bi awayê « xwirdek » jî dikarin bêne nivisandin.

Ê, Î — Ev dengdêrên ha tucaran nakevin ber dengdara « y » ê. Lê heke ev dengdêr bi awakî bi « y » yê ve bûne hingê ev yanî « ê » û « î » bi dengdêra « i » yê diguhêrin û ev « i » dikeve şûna wan. Wekî niho:

	Ê	
pê	piyên min	vi piyi
dê	diya te	vê diyê
rê	riya wan	van riyani (1)

	Î	
deri	deriyê me	vi deriyi
tîlî	tîliyên min	vê tîliyê
xanî	xaniyê te	van xaniyan
kursî	kursiyên wî	van kursiyani

Lê heke « y » bêt ko bi wan ve bizeliqê kete pêşiya van dengdêran, hingê (ê) û (î) herçend (i) bêne xwendin jî di nivisandinê de bi (i) yê nayine guhartin û weke xwe diminin. Herwekî di komekên jêrin de (ê) û (î) ya bêjeyên (ki, kê, derê) « i » tene xwendin, yanî (ki, ki, deri) lê di nivisandinê de di şikilên xwe ên esilî de tene şarî kirin. [Ev kî ye? Tu kurê kê yî? Ew xelkê kûderê ye?]

Û — Dengdêra (û) tucaran nakeve pêşiya dengdara (w). Lê heke ev her du tîp bi awakî bi hev ve bûne hingê (û) jî bi (i) yê diguhêre. Herwekî di bêjeyên jêrin de:

rû	riwê min	vi riwî
xwesû	xwesîwa te	vê xwesîwê
ez bûm	ez biwam	tu biwayî
ez çûm	ez biçiwam	tu biçîwayî

Şanek — Nemaze kurdmancên ko (û) yê zirav bi lêv dikin, li şûna (w) yê li ber (û) yê (y) êkê dixin. Hingê (û) jî ber ko (û) ê (y) dikarin bigihin hev, weke xwe dimise û naguhêre.

rû	rûyê min	vi rûyî
xwesû	xwesûya te	vê xwesûyê

Ji xwe di zmanê Kurdmanci de bêjeyên ko bi dengdêrekê temam dibin kêman. Herwekî yên ko bi dengdêran dest pêdikan ne gelek in.

11 — Her sê dengdêrên mayîn, yanî (a, e, o) bi her dengdarê ve dibin û bi tu awayî bi dengdêreke din naguhêrin. Bi tenê

[1] Ji kurdmancan birakî piçûk (ê) yê bi (a) yê diguhêrtin û dibêjin:

pê	peyê min	vi peyi
dê	doya min	vê deyê

dengdêra (e) gava digehe (e) yeke din û (y) yek dikeve navbera wan, ji bo kur-  
fiyê mirov dikare van her du (e) yan bi  
(ê) an bi (a) kê bide û (y) yê yekcar ji  
navê bêxe. Wekl niho:

Maseyek masêk masak. Perçeyek perçêk perçak.  
Perdeyek perdêk perdak.  
Beyanameyek beyanemek beyanamak.

12 — Tîpa dubare: Di zmanê kurdmançî de tîpa dubare nîne. Ji lewre, heke di bê-  
jeyekê de tîpek dubare bû, yeke wan ji ber  
xwe de dikeve û tîpek bi tenê dimîne.  
Wekl niho, parkîta (tir) gava dikeve pa-  
paşîya bêjeyên ko bi (t) yê tamam dibin  
yek ji wan her du «t» yan dikeve. Ji lewre  
di nivîsandinê de ji (t) yek bi tenê tîpe nivî-  
sandin. Ji ber ko di vekîta kurdmançî de  
tîpa ko naye xwendin, naye nivîsandin.  
Ev in çend misal:

xurt	xurt - tir	xurtir
rast	rast - tir	rastir
kurt	kurt - tir	kurtir

Çend misalên din

paş - şiv	paşiv
baş - şev	başev
yek - klte	yeklîte

Tîpên tével, lê ji yek cihderkê, an ji  
cihderkên nîzîngî hev ji nadin pey hev:

rind - tir	rintir
pişt - dawî	piştdawî
bilind - lîr	billintir
dewlemend - tir	dewlementir

Şanek — Digel vê bindê û ji ber bin bêgavîyên  
vekişê, hin tîp — nemaze di daçekan de — herçend  
neyin ji bi lêv kirin, tîpe nivîsandin. Ew nayîne bi  
lêv kirin, ji ber ko bi awakî tîpeke dubare  
dîtînin pê. Lê ew ne bi hev ve ne, ji hev cîda,  
û yeke wê di diwiya bêjêkê de û a din di destpêka  
bêjêke din de ye.

Ez di gund de bûm.	(gun' de)
Dengbêj ji hene.	(dengbê' ji)
Serheng gi hotin.	(serhen' gi)
Ji gayê gewir re.	(gew' re)
Ez ji kû zanim.	(e' ji)

13 — Kit: Bi vebûn û hatîngirtina devê  
me dengêk tîpe pê. Ji tevayîya wî dengî re  
kit dibêjin. Kit ji yek an ji yekê bêtir tîpan  
hevedidani ne. Di kitên zmanê kurdmançî  
de hi gelemperî ji yekê heta pêncan tîp  
peyda dibin.

1 —	a	ê	û
2 —	no	an	ez
3 —	dev	erd	pêr
4 —	qenc	dran	deng
5 —	stran	stand	

13 — Kitên bêjeyê: Herwekî di kîtan de,  
ji yekê heta pêncan tîp peyda dibin, bêje  
jt an ji kitekê an ji çend kîtan bibevkettî ne.  
Bêjeya ko ji kitekê hatiye pê jê re yekite, û  
bêjeya ko ji çend kîtan hevedidani ye jê re  
pîrkite dibêjin.

Bêjeyên yeklîte: dar, dran, got, strand,  
xwar, deng, tîr, no.

Bêjeyên pîrkite: serşok, dengbêj, mêvân-  
dar, hilfirandin, dixwîne, qermişandin,  
balafîrgeh, rojnamevan.

Not — Bêjeyên pîrkite li gora hejmara  
kitên xwe binav dibin: yekite dukite, sêkîte  
çarkite, pêncîte...

15 — Bêje: Tîştê ko tîpe bîrê û di dil de  
radibe fikirek e. Ev fikir carina şikilêkî û  
carina manakê ditîne pê. Ev her du awayên  
fikirê bi bêjeyan tîpe eşkere kirin. Bi gotî-  
nên din her bêje nimnendeyê fikirê ye.  
Wek: dereng, hesp, reş, wan, hatin,  
jê—re, digel, ez, hevraz, berwar, mehder,  
lo, zû, dixwar, nêr, belek, çavreş, tîj, dilovan.

16 — Birên qîsetê: Bêje li gora mana û  
dehkerên xwe ji hev bi ferq in. Bireki wan  
mîrov, heywan û tîbayîne nerihber yên ko  
bi dest tîpe girtin an dikevin ber binahiya  
me şanî me didin. Birekî din tîstine welê  
pêş me dikin ko ew bi dest nayîne girtin  
lê di bir û di ber çavên me de radibin. Ji  
aliyê din bêjeyîne welê hene ko bi serê xwe  
nikarin tu tîştî raver bikin, lê gava bi bêje-  
yên din ve dibin û dikevin navbera wan  
mana wan didîlinin, dibin serî û wan bi  
hev re girêdidin. Ji lewra di her zmanî de  
bêje li gora manayên xwe û cihê ko di  
qîsetê de dibin û wezîfa ko li ser xwe digî-  
rin bi çend biran leva dibin. Ji wan re  
birên qîsetê an textîlên bêjeyan tîpe gotin.

Di zmanê kurdmançî de birên qîsetê deh  
in: navdêr, veqetandek, rengdêr, pronav,  
lêker, jîmarnav, hoker, daçek, gihanek,  
baneşan.

17 — Guhêrbarî. Birên qîsetê ji awirê  
guhêrbarîyê ve bi du biran leva dibin:  
guhêrbar û neguhêrbar. Ji birên qîsetê pênc  
guhêrbar û pêncên din neguhêrbar in.

18 — Bêjeyên guhêrbar. Bêjeyên guhêrbar  
ew in ko di qîsetê de şikilên xwe ên eslî  
diguhêrtînin, tîpe tewandin û dikevin şî-  
kilîne din.

Navdêr — Cemşîd, Sînemxan, kaxez,  
kerî, şîpane, pîling, Herekol, can, qencî,  
spîttahî, selef, mehder, xurdebin,  
Veqetandek — ê, a, ên, ek, in.



Pronav — ez, we, ew, yén min, evé ha, çî, kî, kê, ko, kîjan.

Jmarnav — Yek, du sed, heşteq, ntvyek, çare çar, xeko yeko, pênc bi pênc.

Lêker — Were, dixwar, dê bihata, keti bû, divêt, nivîsandin, xwendî bûn, daket, çikandin  
19 — Bêjeyên neguhêrbar. Bêjeyên neguhêrbar ew in ko di qisetê de şikilên xwe ên eslî tucaran naguhêrinin û hergav weke xwe diminin.

Rengdêr — Gewr, nû, qenc, bilintir, helesor, mezin, spehî, nizim.

Hoker — Holê, tro, hingê, nik, bes, kê, kû, kengê, niho, no, belê.

Daçek — di, li, ji, di—de, ji—re, der, digel, beri, paşî, piştî.

Gihaneq — wek, û, an, lê, ko.

Baneşan — lê, lo, ax, hey, way, ho, ox:

29 — Vekit: vekit tevayîya isûl û qeydeyên nivîsandin û bihevebûna bêjeyan e. Bi gotinên din her bêje vekitê wê, yanî şikilê nivîsandina wê î xweser heye. Bi tenê bêjeyên ko bi çend awan têne bilêvkerin bi çend awan ji têne nivîsandin. Herwekî: « Bihurîn, borîn. Rih, ri. Reh, ra. Nêzing, nîzik. Şehrîstan, şarîstan. Teva, teba. Bihîn, bîn. Birçî, bîrî. Nimêj, nivêj ».

Ji milê din vekit ji me re bêjeyên ko biheve dibin û yên ko biheve nabin ji hev vedigerine û awayê bihevebûna wan şanî me dide.

Qeydeyên vekitê ji tevayîya gramêrê der-tên. Di bihevebûna bêjeyan de qeyda gelemper ew e ko her bêje bi serê xwe têne nivîsandin û bi bêjeyîne din ve nabin; ji hin awartan pê ve. Wekî niho, di komeka « Ez dibî li nêçirê bûm » de tu bêje bi yeke dt ve ne bûye, ji her ko her yeke wan ji birên qisetê texlîteki din e. « ez - pronav, dihi - hoker, li - daçek, nêçir - navdêr, bûmlêker. » (ê) ya ko bi « nêçirê » ve bûye tewang e; û tewang hergav bi navdêr û pronavî ve dibin.

## NIQTEŞANÎ

30 — Qiset bi hin nişandekan ji hev dibe. Ev nişandek dawî û birên komekê pêş me dikin. Bi danîna van nişandekan mana qisetê çêtir li hev bi der têt. Ji isûlê danîna nişandekan re niqteşanî dibêjin. Ji milê din em bi niqteşanîyê, di dema xwendinê de cihên rawes û wêsihê jî dizantn û li gora nişandekan, cih cih û kê, û zêde disekinîn û biha xwe didin.

31 — Nişandekên niqteşanîyê ên bingehî in ev in:

(.) Niqte  
(?) Niqtepirs  
(!) Niqtefêbang  
(:) Niqtecot  
(;) Niqtebihnok

Ji van pê ve çend nişandekên din hene ko em wan kêman caran dixebitînin; û wezîfa wan jî ên jorîn cîda û bi awakî din in.

( ) Kevanek  
« » Dunik  
— Xêzek  
— Bendik

Niqte — Niqte paşîya komekê şanî dide. Ji lewre gava komek temam dibe li dawîya wê niqteyek têne danin: Hêv tariya şevê diedilîne. Bi reşandina avê şewat têne vekuştin. Bedena Diyarbekrê bedeneke kevna-re ye. Xwîn bi xwîne naye şîştin.

Niqtepirs — Niqtepirs dikeve paşîya komekên pirsîyarîyê. Ji manê pê ve ew jî reng û dengê pirsîyarîyê dide qisetê: Genco kengê ji welêt hatiye? Hevînd çî dinivîsîne? Te çend kew kuştine? Kî jî derîncê de ket?

Niqtebang — Niqtebang dikeve ber baneşanan û li paşîya komekên baneşanîyê. Ax li ez çiqas teşîm! Binve kezeba min; binve lo lo! Way li min ax ezo! Xwedêo! tu bi rehma xwe kî.

Niqtecot — Gava li ber komekê tişteq têne gotin an hejmartin; niqtecotek dikeve paşîya komekê. Bavekî di dema mirina xwe de ji zarowên xwe xwe re got: Zaron! ez ji we re navekî pak dihêlim; qedirê wî bizanin û wi weke xwe hillînin. Mirovê hêja bi sé tiştan hêja ye: mêranî, xêbat û comerdî.

Niqtebihnok — Niqtebihnok dikeve navbera wan hevokên ko bi hev re girêdayî ne û mana hev diedilînin û wê dibin serî. Dewlemendî bi lînerê ye, ne bi mal û pereyî ye.

Bihnok — bihnok dikeve navbera wan bêjeyên ko di komekê de dane pey hev û bi gihanekekê ne hatine girêdan. Di vi hallê de bihnok, ji awakî cihgirtîyê gihanekekê ye. Ji milê din ev nişandek dikare bikeve navbera birên komekê ên kiçîk jî. Bi şertê ko bi danîna wê mana komekê neyît guhartin. Temo, Cangîr, Hevînd û Ferzende brayên hev in. Sor, sipî, kesk û zer rengên ala me ne. Mirov bi axaftin, nivîsandin û xwendinê jî heywanan têne ferq kirin. Kurênî min, hon çire jî ya min nakin û jî ya xelkê dikin. Em bemi, emê herin şerê welêt. Belê, ez jî, ezê bi we re bêm.

32 — Rawes û wêsih. Me gotî bû ko nişandekên niqteşanîyê, di qisetê de cihên rawes û

## NAVÊN

### KURD Û KURDMANC Û CIHÊN KURDISTANÊ

Çima ji me re dibêjin kurmanç? Di zemenê tofana Nûh de, gava keştiya wi li ser çiyayê Cûdi (Cih dî) yanî (çiyakî dî) rûniştiye kurmançan gotiye li ciheki din rûniştiye. Bi erebî jê re gotine (Cûdi). Lê ev navekî kurmançî ye. Ji xwe (Nûh) ji (nih) an (nû) ye. Ji ber ko دنیا ji nû ve ava kir. Gava Nûh û hevalê xwe (heşt) peya li ser çiyê jî keştiya xwe bi derketin, li pesara çiyayê Cûdi gundekî nû ava kirin. Jê ra dibêjin (Heştîyan). Ew gund fro ji ava ye.

Piştî ko insan pir bûn û zeman dirêj bû û nijad jî hev derketin û li rûyê zeminê belav bûn; kurd li warê bavê xwe man. Ji ber vê yekê hate gotin (kurd - man - li - ci -).

Di dora zeman û zaravan da (li) winda bû; û ev gotin kete şikilê (kurdmancî) û (kurdmanc); pêşdetir (d) jî ket û bû (kurmanç).

Herwekî navê Nemrûd (Nimroz) yanî (Nivroj) e.

Ji xwe bajarê Cûdi (Şernex) e. esilê vê gotinê jî (Şehrê - Nûh) an (Şehrê - nû) ye, kurmançke xwerû; bi mana (Bajarê Nûh) an (Bajarê nû).

Gelek navên kurd û kurdistanê hene ko bi vî awayî hatine guhartin. Ko Xwedê hez kir ezê pêşdetir hinekên din jî pêş çavên xwendevanên Hawarê bikim. **HIŞYAR**

vêsihê ji şanî me didin. Herçî niqte ne cihê rawesê ne; yanî di wan de mirov qedereki disekine. Herçî bihnok û niqtebihnok in cihê vêsihê ne; û di wan de em hindik disekin. Vêsiha bihnokê jî hemiyar kurtir e.

33— Nişandekên mayin.

Kevanek — Kevanek li pêşî û li paşiya wan pirsan tete danin ko bi sebebekê ketine komekê û heke jê hatine hilanin mana komekê ne kêm dibe, û ne jî dîguhêre. Belayê (wê nexweşiya xedar) ez gelekî eşandim. Segmanên me hemiyar (qederê bist û pênc mêr) li rêlê wer hatine û şergeh girtin.

Şanek — Li şûna kevaneke mirov dikare xêzikan jî bixe. Belayê — wê nexweşiya xedar — ez gelekî eşandim. Segmanên me hemiyar — qederê bist û pênc mêr — li rêlê wer latin û şargeh girtin.

(dûmahik heye) C. A. BEDIR - XAN



## JIN

### Û BEXTIYARIYA MALÊ

Gelek jin hene; bawer dikin ko rehetî û xweşiya malê bi pere û dewlemendiye ye. Lê ne we ye. Seadet û bextiyari ne ji dewlemendan bi tenê re ye. Xincikên belengazan hene ko seadet û bextiyari, ji qesra dewlemenda çêtir û bêtir, tê de qerar digirin û bi rehetî cih dibin.

Carina seadet sadeqî ye û bextiyari pê rewşen û geş dibe. Sadeqîya xwedîya malê ew e ko bi xelkê dora xwe re mihirvan û dilovan bibe, piçûkan neşîne, bi mezinan re ji adetê der midarayê neke. Bi van wesan xwedîya malê dikare hejkirina xelkê xwe, çi kiçik, çi mezin, ber bi xwe ve bikişîne û bibe perestiya wan.

Gelek tiştên bêhemiyet hene ko carina jin li ser wan disekin û bi stûriyê pergara mala xwe xerab dikin. Ji xwe erin her tiştî tevî hev dike û tamsariyê dixê helina seadetê. Ji jiuan re divêt ji mêran bisebirtir hibin û gava mêr dixeyidin ew sebirê bi xwe bidin.

Erin agireke, ji bo vekuştina wi, jê re av divêtin, jê re hênikahi gerek e, ne agirekî din. Ber vê yekê gava mêr germ dibin divêt jin honik bibin û wê germiyê şirgerm bikin.

REWŞEN BEDIR - XAN

## FERHENGOK

HEVOK (m) — Ji her birê komekê re hevok dibêjin. Komek carina ji çend û carina jî ji hevokê keke bi tenê tete pê. Di her komekê de herçend lêker hene ewçend jî hevok peyda dibin. Komekine bi yek hevokê: Derew sêwî ye. Baran dibare. Gurgin çû welêt. Komekine bi çend hevokan: Ez bawer dikim; ko Xwedê heye. (Proposition)

MIJAR (m) — Tiştê ko asasê nivisandin an axaftinê ye. Mijara Hawarê a bingehîn zmanê kurdmancî û pêşveçûna wî zmanî ye. Mijara vê kitêbê şerên kurdistanê ye; yanî tê de qala şerên kurdistanê dikin. (Sujet)

RAWES (m) Halê rawestan û sekinînê. Tiştê destpêkîrî qut kirin û sekinin. Ev der cihê rawesê ye. (Arrêt)

VEKÎT (m) — Awa û şikilê nivisandina bêjeyan û terzê bihevêbûna wan. Vekîta Gurgin qence; yanî gava dinivîsîne xeletan nake û her bêjeyê weke xwe û rast dinivîsîne. Ez vekîta vê bêjeyê nizanim; yanî ez nizanîm ev bêje çawan tete nivisandin. (Dictée)

VEKITANDIN — Ji yekî re tiştêk xwendin an gotin û ew tişt jê re dan nivisandin. Tu ji min re vekitine ezê binivîsinim. (D.cter)

VÊSIH (m) — Di balekî de mayin û tê de ji rawesê kêmîtir sekinin. Te di vê vêsihê de dirêj kir. (P.cse)



## CHANTS D'AUTOMNE

Après les nombreuses chansons de danse, d'amour ou de guerre, déjà publiées par Hawar, les deux pièces dont nous donnons cette fois-ci la traduction représentent un genre inédit, celui du « paizok », ou « pehizok », chant d'automne.

A première vue, le « paizok » ne diffère pas sensiblement des autres compositions d'inspiration amoureuse : les thèmes développés (passion malheureuse, séparation, rendez-vous nocturnes) sont identiques, ainsi que la forme adoptée (dialogue entre les deux amants). C'est le cadre naturel dans lequel il se situe qui lui donne une tonalité particulière. Chaque strophe débute par un bref rappel du paysage d'automne dont la mélancolie inspire au poète de sombres réflexions. Le brouillard voile les montagnes, les torrents grossis par les premières pluies roulent leurs eaux tumultueuses, la neige couvre déjà les plus hauts sommets. L'hiver approche, et les tentes nomades quittent les pâturages d'été pour regagner la plaine. Jusque là groupées dans les campements de l'alpe, elles vont s'égailler dans le bas-pays. Finie l'insouciance des beaux jours ; finies aussi les amourettes à peine ébauchées, c'est le moment des adieux, et l'on regrette les aveux que l'on n'a osé faire.

Les deux chansons qui forment l'objet de cet article ont été recueillies au Botan. La première est de la région d'Ereh. Elle porte seule le titre de « paizok », la seconde nous ayant été donnée pour un « pašlavjok » genre analogue au « lavjok », chanson d'amour ; en réalité, ces deux appellations différentes répondent, dans le cas qui nous intéresse, à une simple dissemblance de forme, et non de fond.

### PEHIZOK

İro pehtz e, mi ne kiriye kar ū barē Zivistanē  
Serē bilind oxilme ne, deštikēn jēri dixwāzin  
[ reštšē baranē  
Xweztkā ez biviyama haval ū hogirē bejnika  
[ bilind

Ji Tirbikē - šēxa hata bigihama Diriyānē

İro pehtz e, mi ne kiriye kar ū barē  
[ prekanōnē  
Serē bilind oxilme ne, taviya xwe avētine  
[ kepiyē Dērebūnē  
Kuro kulmalo ! kulmal i dē-w-bavo, te  
[ čima dey ne kir par warē Havinē?  
İro pehtz e ; hatiye wextē xatir ū malbelav-  
[ bñē

Ezē nazdar im, ez nizam naziye xwe li kē kim  
Ezē li serē čiyayē bilind bisekinim wey guriya  
[ bizūrim, deštē xwe raberī Xwedē kim  
Evi teres dē-w-bavē mēra darek li zendē  
[ zērbazin daye  
Ez nizanim qerepūšiya girau ji kē re çekim

Lawikē mi hati bi ji welatē jori, min diviya  
[ ez bi mirad ū meqsed rēkim  
Dilē min kul e, kovant wa tē da  
Bireki siwarē mala bavē min derketin; reštē  
[ xwe xwil kirine li ser cezmē da  
Xweztkā ez biviyama malxwē ewē malē ya  
[ çavreša min biskbitēla min ū kevant  
[ li malē da

Ez li xemlika vē robarē fekirtime hemf sipin-  
[ çar ū šiv in  
Serē xwe dihejinin ji binē xwe dilivin  
Min heyfik ū sēsed mixabin e, kurikē bi gult  
[ bimire, jinika ciwan a nestēle, li berē  
[ kotiyē çepel, mērē kal binivin

Hawarī li mala daketiyē di mīr ū di axān e,  
[ di taxim ū di alan e  
Memikē ez bibama xulam deštē delē da serē  
[ sūka ; ew xīzan in giranbeha ne

Ezē li vi bajari fekirtime, bajaro li min mezin e  
Sirha wi bilind e, dergehē wi hesin e  
Heger tu pirsā killta cihētē memika dikl qifil  
[ ū mifte di deštē min e

### PAŞLAVJOK

İro pehtz e min nizanī  
Ezē li Herekolē fekirtime çarkokeke spī li serē  
[ xwe wer anī  
Bi Xwedē kt belekēn çavēn te reş in ; kilē  
[ sibhanī jē re meke bar ū girant.

Ez nizanim ezē xema çī jē kim  
Ezē ser berē govendē bisekinim keyyoka xwe  
[ awa awa çekim  
Selam ū kelamē xelkē dūr hatine ez nizanim  
[ çī l'şūnē rēkim.

Ezē li Talē fekirtime miqabili Azēte  
Ser berē govendē sekinime miqabili deštika  
[ Xesxērē

Ezē xulamiyē ji wē bejn ū balē re bikim  
Ya sibehtē ēvara disekine ser bin bēre

Ezē li Herekolē fekirtime va keviya  
Qalanē memikēn xwe dāne bedalt her di rūya  
Heke tu pirsā zeri esmera ji min dikl  
Xwe berde warē Kepirē nav malē Qocebegiya

Ezē li Herekolē fekirtime keyyo li min  
[ heraftin  
Du şer li ber deryē mala bavē min hene; bi  
[ tu terzi nayēn axaftin  
Min divē ez biçim tewafa xala gerdenē, gu-  
[ har ū beniya ez hingaftim

Ezê li Herekolê fekirtme , kevyo li min bûne  
 [ piçt  
 Cobarên avê ji bin herikin xwe berdane ser  
 [ kara kiçt  
 Ez nizanîm ne ramûsana nivê şevê xwez-  
 [ tir e , ne ya dora çîçt

Serê min têsîhtî dilê min di jan da  
 Koremijê xwe avête serê Herekolê  
 Şêx Miheme Girê Niskîn miqabil cewab da  
 Xwezika ji xêra Xwedê ra ez bibiyama haval  
 [ û hogirê bejna bilind  
 Ji Bena Zînt heta Şargiha kewê lal da

Pehlîz e , dilikê min ketiye ber kesera  
 Gurebaki rabiye lêdaye qatol û kelemperê  
 Çiyayê jort qulibandin şkeftin Solkera  
 Heçt dostik û yarikê bi kêfa xwe tine be  
 Bila medhê xwe nedî li tu dera

Îro pehlîz e , mi ne kiriye kar û barê Zivistanê  
 Koçerên Rewandizê bar kirine ; berê xwe  
 [ dane warkoza ji zozana  
 Xwezika ez bibiyama haval û hogirê bejna  
 [ bilind  
 Di sê şevên kanûnê û sê rojên gulânê

Dilê min li ber casûsê  
 Bayl lêdaye qatol û kelemperê çiyayê jortin  
 [ qulibandine kambaxa gola Qatosê  
 Dostik û yarikê dinê alemê diçûne zozana,  
 [ ser avên cemidî  
 Ya min bi tinê maye kambaxa karoxa we-  
 [ latê Kilisê

### Pehlîzok

#### LA JEUNE FILLE :

Voici l'automne , et je ne suis pas prête  
 pour l'hiver.  
 Les hauts sommets sont couverts de nuages,  
 les basses plaines demandent à être arro-  
 sées par la pluie.  
 Que ne puis-je être la compagne de mon  
 ami à la taille svelte ,  
 Depuis Terbekê Chêkha, jusqu'à Deriyan.

Voici l'automne, et je ne suis pas prête  
 pour l'hiver.  
 Les cimes sont couvertes , les nuages mas-  
 quent le pic de Dêreboun  
 Ami , pauvre ami, malheureux ami , pourquoi  
 n'as-tu rien dit, l'an dernier, durant le  
 campement d'été ?

Aujourd'hui, l'automne est venu , voici le  
 moment des adieux , les tentes vont se  
 disperser.

Je suis choyée , mais ne sais plus pour  
 qui faire la coquette,  
 Je reste debout au sommet de la montagne,  
 je hurle comme une louve , je tends les  
 mains vers Dieu.  
 Le méchant a frappé du bâton mes poignets  
 ornés de bracelets d'or (1) ,  
 Je ne sais plus pour qui nouer ce lourd  
 turban noir.

Si mon bien aimé était venu du haut pays,  
 il me faudrait lui envoyer un heureux  
 message.

Mon coeur est triste, il est plein de mélancolie.  
 Des cavaliers de la maison de mon père  
 sont sortis en groupe ; ils laissent flotter  
 les rênes jusque sur leurs bottes

#### LE JEUNE HOMME :

Ah ! Si j'étais le maître de cette maison , la  
 maison de ma belle aux yeux noires , aux  
 boucles fines , la bonne ménagère !

J'admire la grâce de ce vallon ; les peupliers  
 et leurs rejets agitent leurs cimes ; les  
 troncs frémissent .

Hélas ! Hélas ! Que meurent les garçons aux  
 belles boucles, ! Les jolies femmes ne sont  
 pas pour eux , elles dorment contre la  
 poitrine de vieux , dégoutants et chassieux,  
 de vieillards chenus .

Le cri d'alarme a retenti dans les maisons.  
 Il y a deux émirs et deux aghas de clans  
 différents (2) .

Mamekê , que ne suis-je un esclave mis en  
 vente par le courtier , à l'entrée du souk :  
 ces «khezan» (3) coûtent cher !

Je regarde cette ville : la ville est grande à  
 mes yeux :  
 Ses murailles sont hautes et son poche de fer,  
 Si tu demandes où est la clef des seins  
 jumeaux : serrure et clef sont dans ma  
 main .

### PAŞLAVJOK

#### LE JEUNE HOMME :

Voici l'automne , et je ne m'en doutais pas.

(1) Ce vers doit être pris au sens figuré : la jeune  
 fille se plaint non pas de la brutalité de son amoureux ,  
 mais de la manière dont il l'a abandonnée .

(2) Ce vers renferme sans doute une allusion à une  
 guerre de tribus .

(3) Le «khezan» est un bijou d'or , en forme de fleur,  
 que les femmes portent à la narine droite. Le jeune homme  
 demande à être vendu comme esclave , de façon à pouvoir  
 en offrir un à sa bien aimée avec l'argent qu'il pourra  
 ainsi se procurer .

Je contemple le Harakol (1) il a coiffé de  
travers son blanc turban « de nuages ».  
Pour l'amour de Dieu, tes yeux sont assez  
noirs, ne les surcharge pas de kohol.

Que faire avec mon chagrin ?  
Je suis à la tête de la file des danseurs,  
j'agite mon foulard, de ci, de là (2).  
Le salut et le message de la bien-aimée  
lointaine sont parvenus jusqu'à moi,  
qu'envoyer en échange ?

Je regarde vers Talé, vis à vis d'Azér,  
Je suis à la tête de la file des danseurs,  
face à la plaine de Khaskhér (3).  
Je suis l'esclave de ma belle à la taille fine..  
Du matin au soir, elle est occupée à traire  
le bétail.

Je contemple le Harakol et ses pentes que la  
neige ne recouvre pas encore entièrement (4).  
Si tu me demandes où se trouvent les belles  
brunes,  
Va au camp de Kaper, parmi les tentes  
des Qotchebegiya (5).

#### LA JEUNE FILLE :

Je contemple le Harakol, une avalanche  
s'est abattue sur moi.  
Deux lions se tiennent à la porte de chez  
mon père on ne peut leur dire le moindre  
mot (6).

#### LE JEUNE HOMME :

Je voulais aller en pèlerinage vers le grain  
de beauté que tu as sur la gorge, tu m'as  
frappé de tes boucles d'oreilles (7).

Je contemple le Harakol : la neige le recou-  
vre déjà presque entièrement.  
Plus bas, les torrents commencent à couler,  
ils inondent la mine de Ketchi.  
Je ne sais lequel vaut mieux du baiser de  
minuit, ou de celui que l'on prend autour  
des seins.

(1) Le Harakol est la plus haute montagne du Botan.

(2) Les danses kurdes s'exécutent, pour la plupart, en  
groupe. Les danseurs se placent côte à côte sur une  
même ligne, se tenant par le bras ou par la taille. Le  
chef de file agit un foulard de la main droite.

(3) Talé, Azér, Khaskhér : noms de lieu du Botan.

(4) Le terme Kurde « kevi » désigne littéralement une tache  
noire formée par de la terre ou par un rocher au flanc  
d'une montagne recouverte de neige dans sa plus grande  
partie.

(5) Les Qotchebegiya, tribu nomade botanienne plus connue  
sous le nom de Batüyan, passent l'été aux zozans de Kaper. Le  
second vers de la strophe est intraduisible.

(6) Les deux lions sont les deux frères de la jeune  
fille, auxquels celle-ci ne peut persuader de favoriser ses  
rendez-vous amoureux.

(7) Et ces boucles sont assez lourdes pour faire mal à  
celui qu'elle frappent.

Ma tête me fait mal et mon coeur souffre.  
Un brouillard épais cache le sommet du  
Harakol, et vis à vis de lui, Chaykh  
Mehamé Geré Ntskin

Que ne puis-je accompagner mon amie à  
la taille svelte depuis Bena Zini jusqu'au  
fortin de la Perdrix Muette.

Voici l'automne, j'ai le coeur plein de  
mélancolie.

Le vent du Nord s'est levé, il souffle sur  
les chardons de la haute  
montagne et les emporte jusqu'aux caver-  
nes de Solkera.

Qui n'a d'amie à son plaisir.  
Qu'il ne se vante en aucun lieu.

Voici l'automne, je ne suis pas prêt pour  
l'hiver.

Les nomades de Ravandouz ont levé le  
camp, ils abandonnent l'alpe pour rega-  
gner leurs installations d'hiver.

Que ne puis-je passer en compagnie de ma  
bien-aimée à la taille svelte,  
Les trois nuits de Février et les trois jours  
de Mai (1).

Mon coeur est livré aux espions.

Le vent souffle sur les chardons de la haute  
montagne, il les emporte  
jusqu'au maudit lac de Qatosé.

Quand les amies, les bien-aimées des autres  
rejoignaient les pâturages d'été, au bord  
des eaux glacées,

Seule la mienne est restée dans cet ignoble  
Karokh de Walaté Kelisé (2).  
R. LESCOT

NOTICES SUR LA LITTÉRATURE LES  
MOEURS ET LES COUTUMES KURDES

15

## MEMÉ ALAN

Apercevant sa bien-aimée ; Mem pou-  
sa un cri ; il se retint juste à temps ne pas  
sauter par la fenêtre et aller la rejoindre.  
Au bruit qu'il fit, Zin leva les yeux ; elle le  
reconnut et chancela sur son cheval.

Çeko qui avait tout vu comprit la triste-  
vérité. Il fut sur le point de s'élan-  
cer contre Mem pour le tuer. Il se contint,  
pourtant, et ne manifesta sa présence qu'en

(1) Les trois nuits et les trois jours les plus longs de  
l'année.

(2) Karokh est un village de la plaine de Walaté  
Kélisé (Botan).

toussant légèrement. Mem comprit qu'il n'était pas seul et se retira, plein de confusion. Zin, se doutant de quelque chose, reprit tant bien que mal une contenance indifférente et s'éloigna rapidement avec sa suite.

Tacn attendait impatiemment à son poste; il fut très étonné de voir que toutes les femmes étaient passées sans que Çeko eût donné le signal convenu. Un doute terrible se fit jour dans son esprit: il pensa que la bien-aimée de Mem ne pouvait être que sa propre femme, Siti, et que son frère n'avait pas eu le courage de l'en avertir. Il entendit Çeko qui criait du haut de l'escalier:

— Viens me rejoindre, Tacn. Toutes les femmes de la ville ont défilé devant notre palais; maintenant, je sais qui Mem est venu chercher. Nous avons tramé notre propre perte.

L'appréhension de Tacn devint une certitude:

— Voici maintenant, songea-t-il, que Çeko me confirme la mauvaise nouvelle.

Il répondit:

— Frère, tu viens de me porter un coup terrible, je sens mes jambes se dérober sous moi. Mais, qu'importe, nous avons engagé notre parole, puisque c'est Siti que désire Mem, faites vite, toi et Gurgin. Qu'elle revête un costume de noces, et conduisez-la à notre hôte; accompagnez-les jusqu'à la sortie de la ville, avec les plus grands honneurs, que l'on tire des salves, et qu'il s'en aillent au loin, tous les deux..

Çeko perdit patience et coupa la parole à Tacn

— Tacn, tu es mon aîné, tu me tiens lieu de père, puissé-je me sacrifier pour toi. Ce n'est pas Siti aux yeux noirs qu'a frappée le mauvais sort: j'ai tout vu de ma cachette, il ne s'agit que de Zin.

Tacn ne sut s'il devait se réjouir ou s'attrister: il craignait que son cadet n'eût pas le courage de tenir sa parole.

#### EPISODE VI

#### LA PAIX APRES L'ORAGE

Les deux frères se regardaient en silence, et Çeko se disait:

— Nous pensions que la bien-aimée de Mem était la fille de quelque notable. Nous aurions alors détruit la ville et massacré les gens pour le satisfaire. Mais je ne puis me couvrir de honte en lui abandonnant Zin.

Il songeait qu'il lui faudrait se battre avec Tacn, le tuer, et qu'ainsi, Mem quitterait le pays et renoncerait à Zin. S'il succombait dans la rencontre, il n'aurait du moins pas à assister aux noces de sa fiancée et de son rival.

Voyant que son frère aîné continuait à l'observer sans rien dire, Çeko déclara d'un ton arrogant:

— Chaque année, nous tirons les parts de butin au sort. A mon avis, c'est là une coutume stupide. Cette fois-ci, je prendrai tout, et l'an prochain, nous verons.

— Quand nous sommes-nous trouvés en désaccord pour des questions d'argent? répondit Tacn, prend tout ce que tu veux. Nous devons, avant toute chose, régler l'affaire de notre hôte.

— Qu'ai-je à voir avec notre hôte? Je sens la colère monter en moi. Si je descends cet escalier, je ne remettrai pas mon sabre au fourreau avant de l'avoir tranché la tête.

(à suivre)

D. A. BÉDIR-KHAN

### DI RADYOWÊ DE WEŞINEKËN KURDI

#### BÊRÛT: BADIYOWA ROHELATÊ

Pêlên kurt (37, 34) Pêlên navîn (293, 50)

Radyowa Rohelat li heftê du caran rojên. In û Çarşembê, piştî nîvro, ji saet pêncan heta pênc û nîvan bi kurdancî diweşîne.

#### IRAQ: RADYOWA BEÛDAYÊ

Pêlên kurt: (42) mêtir. Hero piştî nîvro ji saet çar û çil û pênc deqîqan heta saet pêncan bi kurdî diweşîne.

### Kiryariya Hawarê

Sali	500	Qirûşên Sûri
Heştmehi	300	Qirûşên Sûri
Çarmehî	150	Qirûşên Sûri

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar: Mir Celadet  
Ali Bedir-Khan. Şam—Sûriye

Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aali  
Bedir-Khan. Damas—Syrie



## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelnîne Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Bîyîşa Pêxember. Bi Kurdiya dumîll, bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re C. A. Bedir-Xan
- 7 — Mesela Kurdistanê Bazîl Nikîttin
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10 — Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11 — Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12 — Dersên Şerletê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13 — Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14 — Proverbes Kurdes . Medhelokên Kurdî . Lucy Paule Margueritte û Emîr. K. A. Bedir-Xan Paris - 1937
- 15 — Le roi du Kurdistan . Qralê Kurdistanê . Emîr K. A. Bedir-Xan û Adolphe de Falgerolle . Paris - 1937
- 16 — Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdistanê . Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel Berlin - 1937
- 17 — Der Schnee Des Lichtes . Berfa Ronabiyê . Şîhrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Sall	500	Qirûşên Sûrî
Heştmeht	300	Qirûşên Sûrî
Çarmebt	150	Qirûşên Sûrî

Xwedî û gerîndeyê berpirsiyar : Mîr Celadet  
Ali Bedir-Xan . Şam—Sûrîye

Directeur Propriétaire : Emîr Djêladet Aali  
Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 9  
HEJMAR 29  
—\*—  
SÊŞEMB  
10 HIZËRAN 1941

# HAWAR

ANNEE 9  
NUMERO 29  
—\*—  
MARDI  
10 JUIN 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TËXISTIYËN VÊ HEJMARÊ

Tefsira Qurane	Dr. K. A. Bedir-Xan
Lavijên Mir Miheme	Herekol Azizan
Derketi	Nûredin Ûsif
Tarixa Kurd û Kurdistanê	Osman Sebri
Dilawerê Çardesali	Sibhi Resûl
Roviyê Jir	Osman Sebri
Gulê	Nûredin Ûsif
Ala Rengin	Cegerxwin
Ki bi ya min dike	Cegerxwin
Stûna Xwendevanan	Hawar
Dilovanî û Dilgirsî	Fiad Cemil Paşa
Xwin nabe av	N. Q.
Hedisên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Granêra Kurdmanç	C. A. Bedir-Xan

## BIRÊ FRENSIZI

Légende de Mir Mohammed R. Lescot



ŞAM—1941  
ÇAPXANA SEBATÊ





## TEFSÎRA QURANÊ

62 - Ji mirovên ko hema bi dev bawer kirine û ji yên ko bûne cuhî, file an sabit, heçî ji dil û can baweriya xwe bi Xwedê û bi roja piştawiyê tinin û qenciye dikin, kerema Mirê Mirazan digehe wan û ji bo wan tîrsa ezêb nî ne û ew xemgîr na bin . . .

63 - Dîsa binin bîra xwe . . . Hon li nik me sondxwariyên Mûsa û kitêba wî bûn, me çiyayê Tûrê di ser we re da sekinandin; ew kitêba ko me daye we bi rastî û dilpakî ji xwe re bibin û hikmên di wê her car binin bîra xwe û pê emel bikin heta ko hon bigehin riya rastiyê.

64 - Di pişt re we rûyê xwe ji rastiye zivirand; heke ji kerem û rehma Xwedê ne biwa; we dê xisar bidiya.

65 - Hon halê mirovên ko di roja semiyê de bextereşî kirine û dest ji masivaniyê ne kişandin dizanin. Me ji wan re got: Bibin meymûn û ew rezil û şerpeze bûne.

66 - Me ev tişt seba ibretê ji bo haziran û çêliyên di wan da qewimandin û me pê şîret li bawermendan kir.

67 - Gava Mûsa ji mîletê xwe re got: Xwedê bi şerjêkirina çêlekekê ji we re emir kiriye, wan got: Ma tu henekê xwe bi me dikî? Mûsa got: Xwedê min jê bisitirîne, yê ko henekê xwe bi bawermendan dike, dibe ji xelkên gunehkar û nezan.

68 - Qewmê Mûsa jê re got: Ji Xudayê di xwe bipirse, bila ji kerema xwe ji me re bide zanîn ew çi texlît çêlek be?

Mûsa got: Ew ne pîr be, ne ji parone be, lê noginek be; divê hon tiştê ko ji we re hate emir kirin bi cih binin.

69 - Dîsa mîletê wî jê re got; ji Xudanê di xwe bipirse, bila ji kerema xwe ji me re rengê wê çêlekê bide zanin. Mûsa ji wan re got: Xwedê dibêje, rengê wê zerê girtî be heta ko yên ko lê fedkirin dilxweş bibin.

70 - Careke din mîletê wî jê re got: Ji Xudayê xwe bipirse, herwekî çêlek weke hev in; ji kerema xwe çilobûna wê çêlekê bila bi me xweş bide seh kirin, heta ko em bi destûra wî bigehin riya rastiyê.

71 - Mûsa ji wan re got; Xwedê dibêje, çêlekek be; ya ko tu cara ne ketiye cot û av ne kişandiye; û çêlekeke bê eyb û qisûr û saxlem be. Mîletê wî jê re got: Niho te em gihandin rastiye û dest bi şerjêkirina çêlekekê kirin, lê hindik ma bû wan dev jê berdaya; û tîrs kete dilê wan ji ber ko wan pê zor dane pêxemberê xwe.

72 - Dîsa binin bîra xwe . . . We Amil kuşt û li ser qatilê wî bi hev ne kir, Xwedê tiştine ko hon vedîşêrin eşkere dike.

73 - Û me got: ke bi lebateki vê çêleka ko we şerjêkirî, li cendekê wê bidin . . . herwekî Xwedê ev cendek bi vî awayî vejand, wisa ji di roja piştawiyê de miriyan dê vejine. Xuda ayetên xwe şanî we dide, ta ko hon bi mezinahiya wî birewer bibin.

73 - Gava we ew tişt dit, dilê we hişk bû, weke kevirêkî û hêj hişkîr; lê binêrin û birewer bin, kevirin hene ko ji wan çem hiltên û hinên din diqelîşin û ji wan av dertê û avin hene

ko ji tirsaxwedé, ji çiyayan ber bi jêr ve datên; Xwedé ji emelê we ne bêhay e.

75 - Ma hon çawan dixwazin ko cuhi bi we bawer bin? Bireki wan, gotinên Xwedé bihistin, tê gehîştin û paşê mana pirsên Xwedé qesdane gnhartin.

76 - Disa binin bîra xwe... Gava ew rastî bawermendan tèn dibêjin; ~~ew jî wê bawerîya xwe anîye û gava ew û cuhi, di nav hev de dimînin, ên minafiq ji ên din re dibêjin:~~ Ma hon çawan dikarin veşartiyên kitêbên xwe yên ko pêxemberîtiya Mihemed û rastiya dinê wî, nişxa me dike, ji misilmanan re bidin zanîn, ma hon ni zanin ko ew gotina we, li nik Xwedé, ji xwe re dikin licet.

77 - Ma ew ni zanin û seh nakin ko rastiya tiştên ko ew vedîşêrin an eşkere dikin, Xwedé pê dizane.

78 - Hinên wan cuhiyan nezan in, ne kitêb xwendine, ne ji mana wê seh kirine, bi gotina zanayên di xwe qail bûne, ew ji xwe re hema dibêjin.

79 - Xwelî li serê wan be... Yên ko kitêba xwarkirî bi destê xwe dinivîsinin piştê dibêjin ew ji nik Xwedé ye, kitêba wî ye û pê tiştine erzandî dikirin.. Xwelî li serê wan be... Yên ko bi destê xwe ew nivîsandine... Xwelî li serê wan be yên ko ew kitêba xwarbûyî firotime û pê kar kirine.

80 - Û ew dibêjin: Ji billî çend rojên hêjmartî, agir na gire me; ji wan re bêje; Heke Xwedé li ser vî tiştî bext da we, Xuda bextê xwe xira nake.

An ne, hon tiştine ko pê nizanin didin bal Xwedé ve?

81 - Lêbelê, yên ko gunehkar bûne û ji gunehên wan dora wan hatiye girtin, ehlê dogehê ne û tê de her wê bimînin.

82 - Yên ko baweriya xwe anîne û tiştine qenc kirine, ew ehlê bihuştê ne û tê de her wê bimînin.

83 - Disa binin bîra xwe... Lawên Israîl ji me re sond xwari bûn ko ji Xwedé pê ve ibadeta tu kesi ne kin; arîkariya dê û bav û mirovên di xwe û sêwî û belengazan bikin û qedrê di wan bigirin; dilê xelkê xweş bikin; rabin nimêjê û zekatê bidin. Paşê, ji

we, ji çendekan pê ve, we hemî bextê xwe reş kir; hon bêbext û serkeş in.

84 - Disa binin bîra xwe... We ji me re sond xwari bû, ko hon hev û du ne kujin, hev û du ji welatê xwe ne kin der. Hon bi xwe şahidên vê sondê ne.

85 - Gelo cuhîno.. Hon paşî vê sondê radibin, xwîna hev direjînin, bireki mirovên di xwe ji welatê wan dertêxin; destê hev digirin zor û zilmê li wan dikin û heke çendekî wan tene girtin û hêsîrên we dibin ji bo azad kirina wan hon ji wan peran distînin, derêxistina wan ji mala wan, ji we re heram bû bû; hon bi çend hikmên Tewratê baweriya xwe tinin û bi çend hikmên di wê kafir dibin.

Yên ko ji we tiştine welê dikin, bila xweş bizanin, cezayê wan di dinyayê de perişani û axretê de ezabekî giran e. Xwedé ji emelên we ne bêhay e.

86 - Yên ko ji xwe re jiyîna dinyayê ji ya axiretê çêtir digirin; ezabê wan sivik nabe û ji wan re tu arîkari naye kirin.

87 - Me ji Mûsa re Tewrat da û paş wê me pey hev pêxemberên din şandin û me ji Îsayê kurê Meryemê re mûcîze dan û me Îsa bi ruhê miqedes xurt kir; lê her cara ko ji we re pêxemberek hat û emrên di wî ne li gora daxwaza we bû we ew ne eciband, we li ber wan nefsmezinî kir, we gotina hinan şêkand û pirsên wan xistin erdê û we hinên din ji kuştin.

88 - Cuhîyan got; Dilê me dadayine, gotinên te nakevin serê di me. No.. Ya rast ev e ko Xwedé seba kufre wan, lanet li wan kiriye û ew ji piyari û arîkariya xwe dûr xistiye, lê ew bir nabin, bi tenê çendekên wan baweriya xwe anîne.

89 - Ji aliyê Xwedé ve, ji wan re kitêbek dahat; herçend ji wê kitêbê hikmê kitêba wan tesdîq dikir, ew pê bawer ne bûne; lêbelê ew berê bi kitêba xwe li ser kafiran hevîdarê arîkariya Xwedé û nisreta wî dibûn; û gava cenabê Mihemed hat û herçend ji wan ji mêj ve, ji kitêba xwe Tewratê hatina wî seh kiri bûn, wan ew inkar kir; laneta Xwedé li ser kafiran e.

## LAVIJËN MÏR MIHÈMÈ

Li gora bendeke kovara « El mecelet el betriqiye el sîryaniye » Mîr Miheme heta 1740f jî hikim dikir. Beriya niho bi du sed salî.

Mîr Miheme di nav mîrên Botan de jî şerên xwe hêtir bi nêçîr û nêçîrvaniya xwe, bi minasebetên xwe bi perî û keçperiyên bi nav û deng e. Me beriya niho jî di Hawarê de qala mîr Miheme kiriye.

Di hejmarê Hawarê a 25 an û di notên şîhra « Bêriya Botan » de bi hênceta Efnî û Hejale, me biserhatiya wî bi keçperiyê û mirina wî bi nîfirên periya xwe gotî bûn. Jâ pê ve di wê hejmarê de me Lavija ko Mîfîryan Şemûn jî Mîr re gotî bû belav kir.

Di hejmarê 26 an de çirokek bi navê « Ehmedê Zeydan » heye. Di wê çîrokê de qala yekî dikin ko zavayê mîrê cinan e. Ew, mîr Miheme bi xwe ye. Ji xwe mîr di dawiya çîrokê de mikur têt û jî Ehmedê Zeydan re dibêjt: « Ya Ehmedê Zeydan, wê rojê li ser text, di rex kurê mîrê cinan de rûniştî ez bi xwe bûm. Bi eniya Mîr go ne jî min bana wê rojê te bikuştina, bikirana piçk û parî ».

Me dil heye di vê bendê de çend lavijên Mîr Miheme belav bikin. Gava em lavijên Mîr Miheme dibêjin; du textî lavij têne birê. Lavija ko Mîfîryan jî Mîr re gotî bû û lavijên ko li ser Mîr û nêriyên wî hatine gotin.

Me lavija Mîfîryan di hejmarê Hawarê a 25 an de belav kiri hû [1]. Emê iro qala lavijên din bikin. Lavijên ko bi ser Mîr bi xwe, bi ser nêçîrvaniya wî û bi ser nêriyên wî, Efnî û Hejale de hatine gotin.

Ji xwe jî fesane û çîrçîrokên çihê Botan, gelekê wan bi aliyê Mihemed begî ve didin.

Di destên me de sê lavijên Mîr Miheme hene. Di

[1] Me hingê wehîd da bû xwendevanên xwe ko dirokiya wê lavijê jî wan re bidin zanin.

Der heqê vê lavijê riwayetê tewel in. Kovara « El mecelet el betriqiye el sîryaniye » di hejmarê xwe a şeşan, sala 1939an heyvên Kanûna paşîn û Sibatê de dibêje:

« Basilyos, Şemûnê didowan, Mîfîryanê Tora Abdin gelekî xudnî teqwa û diyanetperwer bû. Li Bamiunînê cem Evdal aza zulamekî sîryanî hebû. Wî zulamî dixwest dotmama xwe bike. Ji ber ko di şerfeta Meah de jê re cewaz ulae; Mîfîryan mehra wan ne dibiri. Xulam xwe avête bexîê jinaxa xwe. Ewê jî gote aê. Axê kir ne kir Mîfîryan bi ziwaca xulamê sîryanî û dotmama wî qatî ne bû. Evdal axa lê hate kezabê û Mîfîryan rêkir cem Mihemed begê bexîê, Mîrê Cizîrê; da ko mîr wî ceza bike û bike. Mîfîryan çû Cizîrê û ketî hata Mîr. Bi emrê Mîr jê re kasek jehîr dan. Mîfîryan bi destê xwe xacek li kasek resimand û jehîr vexwar; tu tişt pê ne hat. Mîr îê ecêbmayî ma, bonî xulam kir û jê pîrî lîeke di kasek de jehîr hebû. Xulam go, belê. Av di kasekê wer dan û dane xulam. Xulam di roja xwe de emîrê Xwedê kir.

Mîr careke din Mîfîryan anî cem xwe û jî boyî ceribandî jê xwest ko jê re bistîrîne û birêqise. Mîfîryan ne reqîsî îê jî Mîr re Lavija bi nav û deng bi zmanê kurdmançî stîrand da ko Mîrê kurdzîman seh bike. Di lavijê de qala roja erezanê û ceza û ezabê minaşqan dikin. Mîr û herçî berdevkên dora wî ne, Lavij gelek ecêbandin û pîr kêfa wan jî Mîfîryan re hat. Mîr Mîfîryan xelat kir û bi qencî û xweşî veşerand gundê wî ».

Eva riwayeta kovara sîryanî. Li gora riwayeteke din Mîr bi xwe jî Mîfîryan xwest ko jê re bistîrîne; îê bi şertê ko qala şer û dilan neke.

didowên pêşîn de qala kuştina Efnî û Hejale dikin. Bêdîro, Mîr ev her du nêri jî ho şû ndiyariya Mîrê Amediyê kuştî bûn. Herwekî di hejmarê bîst û pêncan de me dîr û dirçî da bû zanin.

—1—

Ev lavij Hacı Remezanê kerî gotiye:

Dilê min evdala Xwedê li ber keminê.  
Devçêra nêribelê min zozanê jori bt.  
Avexwarina wî li ser kehnîya Şajînê.  
Ji yeqîna dilê min ew e, Mihemed beg şêxê  
[nêçîrvana namînê].  
Ji lewmanî Efnî ma bi li Ferasînê.

Qeyntarê kul û xema hi rê ketin; şahî bi rê  
[va gihayê].  
Ez dinêrim hewalê bilind; berfîka sipî pala  
[xwe dayê].  
Ji yeqîna dilê min ew e, Mihemed beg şêxê  
[nêçîrvana namînê].  
Ji lewmanî elamet radibin dinyayê.  
Dinyayê xerabê, ji tu kest re ne mayê.

Min iro jî hisabdara pîrî bt, çîrt çî çûne çî  
[mane?]  
Çîriya ewil xelas bîne; ya paşî sê şêv û sê  
[ro jê mane].  
Ji yeqîna dilê min ew e, Mihemed beg şêxê  
[nêçîrvana namînê].  
Ji lewmanî li serê hewalê bilind govenda  
[nêriyan e].  
Ezê pîr bîm, dilê xerab qet pîr nabe.

Nêriyo, xerabo, te li vê rêdnê, li vê dimaxê.  
Devçêra nêribelê mi zozanê jori bt.  
Avexwarina wî li ser kehnîya vê Şaxê.

Ji yeqîna dilê min ew e, Mihemed beg şêxê  
[nêçîrvana namînê].  
Ji lewmanî Efnî li serê zozanê jori piştâ  
[xwe da kendala axê].

Hawarek li geliya qewimî bt, ezê nîzanîm  
[çi hewar e].  
Dengê tifekekê li Mihemed begî xweş tê.  
Ez nîzanîm, ne şeşxanê, ne berwec, ue  
[helqedar e?]  
Ji yeqîna dilê min ew e, Efnî kuştin;  
Hejale bahê glska bi çar derha birindar e.

Ezê li serê bilind difekirtim.  
Hemî li min bîne sewguri.  
Qeyntarê kul û xema hati bin; li ser dilikî  
[kul diêwiri].  
Ez rebenê Xwedê xîzmeta tu mîr û tu padî-  
[şahê mezin nakim].  
Ji xêr yê şahik û xûnkar mazûl kiri.



Herîh medresa seré maydané; li kêla-wî binêrin  
Libika şeşxanê daniye ser eniya Hejale .

Nêriyo l te û vê semaxê ,  
Devçêra Efino û Hejale kursiyê Awale .  
Avdana wî hati bi ser kaniya Şaxê .  
Mi heyf û xebnet e , Mehmed beg hakimê  
[ Bihta , bîmrê pišta xwe bide kendala axê .

Îro nêçîrvanê mala bavê mi derketiye bi tenê .  
Xwe kêşaye çepêra korê , raserî latên vê Divinê  
Nêrl ba dikir bizinê ; rabe em biçî govendê ;  
Lê Ebûzêdê - Bilikî li ber mirinê .

Mêriyo l te û vê kemînê ,  
Devçêra Efino û Hejale kursiyê Awale .  
Avadana wî hati bi Hirçekînê .  
Hingê mi zani Mehmed beg şexê nêçîrvana  
[ namine ;  
Lewma qentare nêriya dixweyin li Feraşînê .

Emê lavijên Mîr Miheme bi çend dûrikên bijarte  
biqedînin . Ev dûrik ji me re serekê eşîra Jêliyan,  
Resûl ax gotine . Ji xwe reng û dirvê maqûliye  
bi wan dikeve .

Ezê li Mihemed begî fedkirim , bi vê xemlê  
[ bi vê kokê ;  
Te xelt û sirme ne , rîşî berdand ser zirhokê .  
De tu berê şeşxanê , ji bizinê biguhêzine , ve  
[ nêrl wê sekini ; li pêş bihokê .  
Heçî me go ; te cewab da .  
Birê nêriya xwe ji Kortikên - Qaso berda bi ;  
[ Pilingê - Zêrlî li xwe ba da .  
Nêçîrvanên me kurlî ne , bi tîzê re , xwe bi  
[ Beleka-Reş nav da .

Me goti bû ko zehf çîrok der heqê nêçîrvan  
Nehmed begî hene . Emê vê bendê bi çîrokeke  
nêçîra hirçan bigehînin dawiyê .

Rojekê mîr bi xulam û mîsîrdîyan ve çû geliyan .  
Nêçîrvan li çepêran belav bûn . Ji eşîra keran du  
brayên aşîlmî di çeperekê de bi tenê sekinîn .  
Mîr gote xulamên : Heta hon dengê tîfinga min  
seh nekî tîfingê bermedin .

Dinya zelal bû . Mîr dît ; hirçêke fêris berê  
xwe daye çepêra her du Brayên aşîlmî . Hirç keti-  
bû bikimê tîfingê . Aşîlmîyan agir ne dikir . Mîr  
aciz dibû . Hirçê çepêra aşîlmîyan li xwe ba da û  
nependî bû .

Mîr bi xulamên ve rabû û çû çepêra her du  
brayên aşîlmî . Mîr gelek enîrî bû . Di dilê xwe  
de digot : « Ezê serên wan her du zelaman jêkim ;  
bila sebeb biştine ko hirç ji ber destên wan  
xelas bibe » .

Lê gava gebîştin çepêrê ; Mîr tîstêkî welê dît ko  
lê ecêbmayî ma . Hirç li wê ye , bi pişt û dest-  
malan girêdayî , li erdê veketî ye .

Hirçê gava qesta çepêra aşîlmîyan kiri bû her du  
biran pev şewirî bûn . Gelo çî bikin ? tîfingê nikari  
bûn berdî ; ji ber ko hêj dengê tîfinga Mîr seh

## DERKETÎ

ADAPTATION DE « L'EXILÉ » DE LAMENNEAIS

Terka welatê xwe da û kete dinyayê .  
Xwedê rêberiya derketiyan bike !

Ez di nav mîletan re derbas bûm , li min  
nêrin , min li wan nihêrt ; lê me hevdu  
nasne kirin .

Derketî li her derê bi tenê ye !

Gava roj diçû ava û ji xircikên newalan  
dû û dûman radibûn ; min ji xwe re digot :  
« Çiqas bextiyar e , ew mirovê ko êvaran  
vedigere mala xwe û di nav zar û zêçên  
xwe de rûdine » .

Derketî li her derê bi tenê ye !

Bi kû da diçin ew ewrên ko ba wan dide ber  
xwe ? Ba min ji wek wan dide ber xwe û  
bê hemidê min , bi kêfa xwe min dajo .

Derketî li her derê bi tenê ye !

Ev dar spehî , ev kullîk xweşik in ; lê ev  
ne dar û kullîkên welatê min in : Tu tîştî  
nabêjin min .

Derketî li her derê bi tenê ye !

Ev çem bi dilekî şikestî li destê diherike ;  
lê xurina wî ne wek ya çemê me ye ko  
min di zarotiya xwe de dibihîst ; ev tu tîştî  
nayîne bira min .

Derketî li her derê bi tenê ye !

Ev stran şîrin in ; lê ahengên wan ên ges  
û ziz ne wek yên stranên welatê min in .

Derketî li her derê bi tenê ye !

Ji min pirsin ; « Çima hergav bi girîn ? »  
Gava min sebeb gote wan ; tu kes bi min re  
ne girtî ; ji ber ko derdê min fehîm ne kirin .

Derketî li her derê bi tenê ye !

Min kalin dîtî ; zaro li wan hêwirîne ,  
mîna zeytûnên kevnare ko kelem û derxîk li  
wan hatine hev . Lê tiwan ne gote min :  
« kurê min ! » tu zarokî ne gote min « bavol »

Derketî li her derê bi tenê ye !

Min di ser kelatê hircan re alin dîtî ; lê  
ne bi reng , ne ji bi pêldana wan , dilê min ges  
ne bû ; ew ne keskesorên me bûn .

Derketî li her derê bi tenê ye !

ne kiri bûn . Lê nikari bûn hirçê berdî di çepêra  
wan re bibore . Tîfingên xwe danîn , bi destê  
û lepan bi birçê ketin ; zora wî birin û ew bi  
piştê destmalên xwe girêdan .

Vêca mesela xwe ji Mîr re gotin . Mîr gelek kêfa  
xwe ji wan re anî ; rabû navê yekî kir « Fil » û navê  
ê din « Fêngnoz » û gote wan :

— Min hon kirine maqûlên keran ; ji ber ko ma-  
qûlî heqê mêrê qenc e .

HEREKOL AZIZAN

# TARIXA

## KURD Û KURDISTANÊ

### 2

Di benda xwe a pêşin da, min ji xwendevanên Hawarê ra da bû zanî ko, ez dê li ser hin kêmasiyên kitêba Emîn Zekî begî bipeyivim. Warê vê kitêbê ko ez hinekî haydarê me, rewşa erdnîgariya kurdistanê û hejmara gelê kurd e. Piştî ko me di vî wari da zanîna xwe got, eger me xwe bi kêrî axaftina li ser warîna din ji dit; bê şik emê xwe jê bi şûnda nedin.

Di tevayîya vê kitêbê da, xwe spartina Emîn Zekî begî ya kaniyan û biyanî bûna nivîsevanên wan kaniyan, li ser gelê kurd û welatê wan kurdistanê, dişa me di benda xwe a pêşin da gotî bû. Tevî biyanî bûna wan nivîsevanan, hinekê wan bi hin qesdên siyasî xwestine ko rastiye li ber çavên cihanê veşêrin. Eger vê yekê han ji bo demekî, berê xelkê ji rastiye bada be ji ev gotinên han wekê rastiye yekser di kirasê xwe da namînin û rastiya wan dê bi derkeve. Bi ser vê yekê han da mirov dikare bêje ko, kesî ji wan nivîsevanan bi tevayî, kurd û welatê wan kurdistanê ne nasiye. Ji xwe ramana Emîn Zekî begî ji di vî wari da ne dîrî ramana me ye.

Ji ber ko pirtirî her aliyê kurdistanê, ez hêla bakur — kurdistanî tirkîyê — nas dikim; pîraniya gotinên min jî, dê li ser wê hêla welatê bin.

Di rûpelê 23 û benda «kurd li tirkîyê» da li ser gotina (Str Mark Saykîs) sinorê welatê kurdan, hêla bakur û roavê holê nîşan dide: (Alajgird — Erzirom — Zana — Egin — Meletî — Bêsni — Birecîk — Riha)

Str Mark bi xweyakirina vî sinorê han, sê wilayetên kurdan bi tevayî û sîsyan jî, nêve niv bi ser tirkan va berdide. Bi vê yekê rohelat û nivroyên Erdihan û Qersê; teva-

---

Heval, bav û bira, xweşî, rahetî û serbîndî, bi tenê li welatê hene.

Derketî li her derê bi tenê ye!

..

Derketiyê reben! ev girîn û zarî bes in! Pîr wek te dîr hatine xistin; herkesî wek te windabûna bav, bira û hevalên xwe ditiye. Hêviya xwe vejîne û xwe ragire; tu ji rojekê bigehî miraz û armanca xwe, heke îro ne be jî... sibe!

NÛREDÎN USÎF

yiya Meraş, Entab û Kiltse, bi bakurê Hêleb û rohelatê Skenderûnê va derî sinorê kurdistanê dinimîne. Di vî erdê han da pirtirî mîlyonek kurd heye.

Di vir da kirina du pirsan serê mirov dixwîrîne. 1 - Gelo, Str Mark Saykîs ev sinorê han bi qesdeke siyasî rave kiriye? an zanîna camêr di vî wari da evqas e? 2 - Ev erdê ko Str Mark ji kurdistanê ra sinor nîşan daye; gelo bi çavên xwe ditiye an li ser kitêb û nivîsarên ko di vî wari da hatine nivîsîn daye xweya kirin?

Dayîna cihaba van her du pirsan jî ne dijwar e. Ji bo pîrsa pêşin ez dikarim bêjim ko, tu qesdên siyasî li pêş Str Mark tine bûne. Çima ko, tu deman gelê kurd bi tu girêkên siyasî bi Ingilzvan va ne hatiye girêdan. Ji bo vê em nikarin ji fêlçakiya camêr di şikê kevin. Teqez di vî wari da zanîna wî evqas bûye.

Pîrsa didowan, şik tê nînc ko Str Mark ev sinorê han ne li ser ditîna xwe; hêrgiz li ser kitêb û nivîsarên ko di vî wari da hatine nivîsîn daye xweya kirin. Eger Str Mark Saykîs ev erdên han bi çavên xwe diti hana jê ra ne hewceyî dîr û kûr pîrsînê bû. Li dorhêlên Kilis, Entab û Meraşê Kulikên Reşîyan û Xidîrsoran ên giroşî; li doraliyên Qers û Erdihanê jî, kolozên serhedî û ebyayên kin û kundayî çavên wî ne dixapandin. Hînga Str Mark dê bizaniya ko, ev erdê han ê gelê kurdî û bê wan kes tê da rûnane.

Yek jî dişa di wê bendê da, dema cenabê Emîn Zekî begî li ser hejmara kurdan dipeyive; Rihayê jî weke Qonyê, Enqerê û Sêwasê derî sinorê kurdistanê rave dike. Ji bo serwest kirina xwendevanan, min divê wan çend xêzên ko serê min negirtine biguhêzim vîr. Di rûpelê 24 an da gava li ser kurdên Rihayê dipeyive dibêje;

«Li ser gotina (Str Mark Saykîs) û (Bijî şik Ferîc) bê van wilayetên [Erzirom, Wan, Bidlis û Xarpêt] jî, gelek kurd di welatê tirkîyê da he ne, eşîrên kurdan, ên ko li doraliyê «Qizil êrmaq» û di nav wilayetên Qonyê û Enqerê da (1) digehên hejde êlan. Hejmara wan nîzîkî (17000) mal e.

Di wilayeta Sêwaz û rohelatê bajarê Zarê da eşîrên Qoçgîrê rûdîne. Vê eşîrê pênc bawên wê ên bi serên xwe hene; ko di navbera

(1) Zana «M. Gorges Perrot» di sala 1865 an da, di bendên xwe ên hêja ên ko der heqên kurdên deşa Heymanê nivîsîne û di kovara he rdu dînyan (revue de deux mondes) da belav kirine.



Erzincan û Zarê da rûdinin. Hejmara wan digehê (12000) mal.

Disa di bakurê Skenderonê da 14 eşr rûdinin, ko hejmara wan digehê (12000) mal. Di liwa (Orfa — Riha) yê de eşira Berazan (2) rûdine ko, li ser diwazde bayan parva bûyî ye. Hejmara vê eşirê jî digehê (17000) mal. Tevayiya van eşiran ko 50 hezar mal e, digehin nîzka 360 hezar can. Gava me ev xistine ser kurdên Qers û Erdîhanê, tevayiya kurdên tirkîyê, bê kurdên Iraq û Sûriyê, jî du mîlyonan pirtir dibe ».

Ji vê nivîsana ban dixewine ko, Emin Zekî beg liwa Rihayê jî wek Qonye û Enqerê derî kurdistanê dihesibîne û di vê liwa kurdî ya mezîna da, Berazan tenê kurd dizane. Ne ez tenê, hemî xwendevanên Hawarê qenc dizanin ko; Riha, bê qeza Heranê tevî dorhêlên xwe kurde. Ji kurdan pêve kes di wî erdî da rûnane.

Riha bajarêkî kurdmançî ye. Xelkên tê da hemî bi zarê kurdmançî dizanin. Eger, bê zmanê xwe gelemperîya xelkên tê da bi tirkî an bi erebî zanî bûne, divê jî kurdîtiya wan tiştek kême nebe.

Dorhêlên Rihayê jî şeş qezan bihevketiye. Biçûktira van qezan Heran bi ser sinorê Sûryê va ye, ko tê da erebên Gês (Qeys) rûdinin. Lê her pênc qezayên mayî xwerû kurdin, ko emê xelkên wan qezan eşir bi eşir bêjin.

1 — Sêwrek: Xelkên bajêr jî rûki zaza ne. Di dorhêlên wê da eşirên Bucax, Qirwar Milan û Qeregêci dimînin.

2 — Hilwan (Cîrnê reş) bajarê vê qezayê biçûk û xwerû kurdmançî. Di dorhêlên wê da hêleke Milan û Qeregêçiyana tevayiya eşirên Snika, Dodikan, Hecl Mûsan, Îzolan, Badilan, Dûgerînan tevî çend gundên Gevozan dimînin.

3 — Yalaş (Hewag): bajar û dorhêlên vê qezayê bi ser û berên xwe va jî eşira Bêzikan in.

4 — Birecik: Ev qeza jî bi ser û berê xwe va Bêzik e.

5 — Ordû (Sirûc): ev qeza, bê du sê eşirên wek Mersawî û Poxpinikan biçûk, dawîya mayî hemî Berazê serxet, anê yê tirkîyê ye. Çiqas ko ev qeza berê gelektî mezîna bû jî; piştî çêbûna hikûmeta Sûriyê, di sala 1919 an da hêla Berazê a mezîna dane ser welatê

## DILAWRÊ ÇARDESALI

Cenge. Ji Piranê şexekî mezîna, sergeva-zekî hêja rabûye û dike neyaran jî Kurdistanê derine û welêt aza û bi ser xwe bike.

Her bihustek jî erdê welêt bi xwînê dihat avdan. Kurdan çek û posatê xwe girêda bûn; berî dabûn qada şer.

Dilawer xortekî çardesalî bû; bi zor diya xwe razî kir, jê xatir xwest, tîfinga bavê xwe bi milê xwe ve kir û giha şerevanan.

Şerevanî diçûn kelehê. Dijmin ev çarsed sal in; ala kurdan jî kelehê daxistî bû, ya xwe hilda bû şunê.

Leşkerên kurdan gihastî bûn pêşiya kelehê û xwe jî dirêjkirinê re pêk tanin. Dilawer xwe di erdê re kişand û ket pêşiya esker; serê xwe hilda û got:

— Mêrxasîno welat weke gulekê ye; carcara bi xwîna welatîyên xwe divêt bête avdan. Ez dibînim ko gula me çilmisiye divêt em wê bi xwîna xwe avdin.

Dilawer gotina xwe temam kir û beriya berkesî tîfing teqand û dirêjî dijmin kir.

Bi qasî du saetan li hev xistin. Dijmin hew dikarî xwe li ber lingên kurdan bigire; keleh berda û revî.

Dilawer berî hemîyan ket kelehê; ala neyar jê daxist û ala rengîna di şunê da daçikand. Dilawer giha bû mirazê xwe.

Erdê bin lingê Dilawer sor dikir. Xelkê digot qey Dilawer ala neyar xisti ye bin lingên xwe. Dilawer birîndar bû; lê tu kes pê nehesandi bû.

Şerevanî gihane dora Dilawer, dixwestin birîna wî derman bikin. Birîna Dilawer xedar bû û Dilawer pê dizanî bû. Ji xelkê dora xwe re got:

— Hevalîno! birîna min xedar e; birîna mirîne ye. Ne tu xem e. (Dilawer hinek sekîni ji bîrtka xwe aleke rengîna derxist) Bi tenê min ji we divêt hon vê alê bikin kefenê min, cendekê min di ala kurdan de bipêçin û jî diya min re bibêjin ko birîna min ne ji par re bû.

SİBHÎ RESÛL

Sûryê. Berazê Sûryê bi qeza Eyn-el-ereb (kaniya ereban) bi nav dibe.

Liwa Rihayê ko tê da Berazan tenê kurd hatine nîşandan, jî van qezan û eşiran bi hevketî ye. Xelkên tê da, bê qeza Heranê jî rûkî kurdin.

OSMAN SEBÎ

(2) Sîr Mark sayka, kitêba « tîras el xulefa ya dawiyê » rûpel 572 - 588.



## ROVIYÊ JÎR

Min bibîst ev ji kalan  
 Dîbên rojek ji rojan  
 Lê xewinûn gur û şêr  
 Zuri li pê kir gazî  
 Zuri gotê : ho birak !  
 Ewe şahê dilwer  
 Da me bibî newalan  
 Nema birçî dimîni  
 Rovi zivîrî cem wan  
 Gelek bû bû jar û qels  
 Şêr bi halê wî kenî  
 Min her dixwest ji Xwedê  
 Di vî emrê xwê ê pir  
 Mala xelkê bisojim  
 Wî çav da bû devê şêr  
 Bide pêş me zû biliv  
 Haydê ciki bi nêçir  
 Rovi di pêş wan da çû  
 Çûn devêrek bi çapan  
 Şêr dengêki gurmîjî  
 Bû kazekaz se revîn  
 Xew li şivên tewirî  
 kesek ne ma di wî ci  
 Şêr gote gur here wir  
 Bî lez û bez gur revî  
 Çû gihêste nava pêz  
 Di nava wî colê pir  
 Dema rovi dît nêçir  
 Zûka sîn kêr û sadir  
 Rûnişt li ser totikan  
 Li cem wana veket şêr  
 Gur û rovi wek biran  
 Şêr gote gur : parvake  
 Guri çepil vemaal  
 Serî , gurçik teve dil  
 Rakirin tev dane jêr  
 Dûv û herçî goştê nerm  
 Gava şêr dît yeka han  
 Gurmista xwe hilanî  
 Rep bû dêla gurê zer  
 Teriya gur dihezî  
 Got : Roviyo tu yî jîr  
 Vî goştê han parvake  
 Piştî ko ev halê ban  
 Bi sed fên û du sed lûç  
 Hol bû di ser laşa gur  
 Ne got hestî , goştê nerm  
 Birin danin li pêş şêr  
 Got : ji bo min bes e îr  
 Ji bo min ev çetir in  
 Şêr gote wî aferîn ,  
 Tu fêr bûyî seyê pir ,  
 Rovi gotê : ez xulam  
 Min ne din wek gurê zer  
 Malbata me roviyan  
 Têne nasin bi jîrî  
 Çavên Gur ên zîq û çep  
 Bela bir ji derê min  
 15-2-941 Şam — Hibûbî

Şîret ji bo hevalan  
 Rovi ki req dikojan  
 Rabû revî serberjêr  
 Rovi got : çî dixwezî ?  
 Me xulamêk divê çak  
 Divê bike te rêber  
 Bikin nêçir û talan  
 Zikî ji xwe d'êşîni  
 Silav da ji dil û can  
 Birçî , rûtal û teres  
 Rovi digot : ez benî  
 ko min têxe ser vê rê  
 Bibim xulam ji bo mir  
 Têr hestîya bikojim  
 Guri got : ho kerê nêr  
 Me j'te navê çol û çiv  
 Welê emir dike mir  
 Şêr û gur tev dane dû  
 Kerik per din bi şivan  
 Erd û ezman tev hejî  
 Mihî li hev dicivîn  
 Ew jî revî veşîrî  
 Pez hêlîstin vê xwedî  
 Du pezên çak bine vir  
 Nabêj çapan û devî  
 Dido dido kirin rêz  
 Girtin anin du kavir  
 Da lotikan li pêş mir  
 Tanin didan destê gur  
 Carcar didan lotikan  
 Gur rakirin das û kêr  
 Serjêkirin tev gura  
 Para min jê cida ke  
 kete ser goşt kir talan  
 Her du kezeb her du mil  
 Got : evana para şêr  
 Ji bo xwe hişt ma li cem  
 Ji qehra xwin ket çavan  
 Di navçava Gur danî  
 Herdu çavan baz da der  
 Şêr dane xwe du tezi  
 Were vekar tu kizir  
 Para min jê cida ke  
 Rovi dît bi du çavan  
 Bi wê geda bindirbûç  
 Rakirin kêr û sadir  
 Rakîşandin ber du term  
 Bi şûn da hat heya jêr  
 Tev rêviyê wek bilûr  
 Ji serê min zêtir in  
 Ji kû ev eqil û zanî ?  
 Kesek nabe hinde jîr l.  
 Ji Kurdistan heya Şam  
 Bê mêjû û zirt û ker  
 Di nav weşî û kovîyan  
 Para me ye kizirî  
 Dêla wî a hişk û rep  
 Pir eqil xist serê min  
 OSMAN SEBRÎ

## GULÊ

Gundi di mêvaxana Reşo de rûniştî bûn  
 û daxaftin . Dijmin ji gund bi tenê qonaçekê  
 dût bû , nixta gundê Şadiyan di nêzik de wê  
 biketa axa bav û kalan .

Herkes diponijî , û li çarekê digeriya .

Ezman girti bû ; bandevêkê ji reşîya şevê  
 re hin hêtir tirs dida . Di vê gavê de derî  
 bi şidet vebû ; qiralê çîyan , Qoço yê Pola , bi  
 heşt mirovên xwe ve ket hundir . Cilên wan  
 şil bûn ; av di tişngên wan re dihate xwar .  
 Gundîyan gîşa da ber qiran : « Polayê kurd ,  
 sergevazê çiyayên kurdistanê fermo ! »

Lê Qoço rûnenişt ; di nivê odê da ma û  
 wek serdarekî bi dengêki xurt û gur gote  
 wan : « Gundîno ! ev panzde sal in ko ez  
 gunehan dikim . Xelkê dikujim . Xerabiyê  
 dikim . Stranên min di van rêlên rojneditî  
 de hatin gotin , lê ji dihi vir da ji devê tu  
 kesî dernakevin . Belkî ji bo me hemîyan ,  
 ev şev , li ser axa welêt şeva me a dawiyê  
 be . Ji bo avêtina gunehên xwe ji ser xwe  
 min sond xwariye ko dijmin ji welêt derêxim » .

Sorahiya rivîna agirê êzingan di tîfkê de  
 li diwaran dihejiyan . Pola li dora xwe  
 dinêrî . Çavên wê diçirîsin . Çil gundi tev de  
 rabûn û gotin : « Em jî sond dixwin , em jî  
 bi te re ne , pilingê kurd ! »

Di wê gavê de , ji nişkê ve derî vebû ,  
 jinikeke zirav , narîn û şîrin , wek pelekî  
 dara bişengê li ber bayî , ket hundir û got :  
 « Ez jî bi te re me ez jî mêrê pola ! »

Gundiyan gişan bi dengêki weke ken kir qîr :  
 « Gula qehdik ! Gula bê namûs ! »

Gulê ji gund bû . Berî çend salan bavê wê  
 bi zor ew da bû yekî . Gulê rojekê mêrê  
 xwe kuştî bû , ketî bû pê Qoço û li serê çîyan  
 pê re digeriya . Gundîyan bi çavekî nebaş  
 lê dinêrin , her gav jê re dijûn dikirin û  
 deriyên xwe her gav lê digirtin . Ji tîrsa  
 Qoço ne bûya belkî ew dikuştin . Lê , ne  
 tehqîra gundiyan , ne jî tajanga Qoço ji Gulê  
 re ev rê nedida berdan . Gava Qoço ew dida  
 ber tajanga , Gulê digotê : « Li min xe pilingê  
 min ! li min xe ! heya destê te biweste ! Tu  
 jîna min ! Ez goriya te me . Bê te ez  
 nabim ! »

Di çîyan de bi Qoço re ger , di şikeftan  
 de raketin , di berfê de qufullin , jê re bex-  
 tyariyeke mezin bû .

Wê şevê Gulê dişa digiri , lê îcar ne ji êşa

tajanga Qoço va ko wek mareki xwe li bejna wê a zirav dipêçand. Xew, qet ne diket çavên wê. Dijmin dê biketa welêt... Rojên geşt ji bo wan ne diman. Her tişt dibû xeyal. Dengê topên dijmin gelek nêzik dihatin bihistin... Çiyayên Qoço ên serbest diketin destê dijmin... Jina gund a pîs li ser vî hali bi girîn difikirin. Li çara xelas bûnê digeriya. Divî bû ko gundê xwe, welatê xwe, çiyayê xwe û serbestiya pilingê xwe «Pola» ji dijmin biparêze. Ji nişkê ve rabû. Tişteke hatibû bira wê. Xencereke bi şiv girt. Ji şikeftê derket. Riya aliyê dijmin girt û winda bû.

Qoço, bi çil gundiyan xort û mêrxas ve li pêş dijmin kemîn girti bûn. Hingûra şevê bû. Li ser çiyayên bilind, nivres heyveke sor bi dilekî şikestî hêdi, hêdi hildihat. Dengê topan hati bû birin. Pola çavê xwe li ser çiyayên xwe; li ser warên xwe geran û bi keser li wan nêri:

Wî sond xwari bû; gunehên xwe yê panzede salan wê bi destê xwe rakirina, ne hişt ko dijmin derbazî tixûbên welêt bibe...

Di dilê wî ê pola de agirê serbestiyê pêketî bû. Wî tu caran wek wê şevê hej kuştin û hilanina tola xwe ne kiri bû.

Demekê, Gulê hat bira wî. Wî hej vê jî-nîkê dikir. Li dora xwe nêri; lê Gula xwe ya ko wek sihekê jê ne dibû ne dit:

Di wê gavê de nêrevanekî wan got: «Bala xwe bidin! Ji aliyê dijmin yek te.»

Siha ko xweya dikir bê tirs û telaş dihat. Dengê şikên wan rakirin: «Ev Gula qehbikê!»

Gundiyeke din got: «Qehbikê em xistin fexel! Tifingê herdê Pola l ew rêberiya dijmin dike!»

Qoço rûyê xwe tirs kiri bû; birihên wî lê gijgijîn, kûr li pêş xwe dinêri. Wî ji gotinên gundiyan rast diditin:

Gulê li cem dijmin çi dikir? Ne xwe cihê wan şanî dijmin kiri bû... qehbikî kiri bû.

Qoço di bin ronahiya heyva sor re tifinga xwe dirêjî Gulê kir û got:

— Ha ji te re, Gulê! berî dijmin berika pêşin para te be...»

Berikê wek qirekê tariya şevê çirand û armanca xwe a zirav wek çarşeveke hevrişim raxiste erdê.

Pist re Qoço rabû ser xwe û ji gundiyan re got: «Zû bin hevalino! emê nixta dijmin bigrin!»

Çûn. Lê dijmin bê li berxwedan revin. Kurd ketin asêgehê; her der vala bû. Bi tenê di odekê de tişteki ecêb dîtin.

J1 DÎWANA CEGRXWÎN:

## ALA RENGÎN

Ala rengin pîroz bi xweş Te hildigirîm diçim bi meş  
Tu' ser milên xortên ciwan Di nav te de yek rojek geş  
Ala sê rengî tu Bi nav û dengî tu  
Nişana cengî tu Ey xortên kurdan!  
Silavê lê bikin.

Iro, me tu kiriye himbêz, Rojek wê bê, te bikin rêz  
Di eywanan li ser banan Rojên şadî tu xemil û zêz  
Kesk û sor û zer î Sipî û gewher î  
Nişana zefer î Ey xortên kurdan  
Silavê lê bikin.

## KÎ BI YA MIN DIKE

Ey dewlemedê serbilind,  
Ma te çima ser daye xew,  
Pir mal û zêr û milk û gund,  
Bo çi dixwî her nan û dew?

Carek li Ewropa binêr,  
Her kî xudan milyon û zêr,  
Çaxê ko te roja welat,  
Zêran didin merdane ew.

Rabin, li we îro xebat,  
Em jî digel we, bo welat  
Çêkin dibistan û civat,  
Zarok bixwînin roj û şew.

Iro xebat, karê te ye;  
Lewra ko şans yarê te ye,  
Her kes di bin barê te ye  
Peyvên te rast, yê min derew.

Disa ceger min bûye xwîn,  
Din bûm ji dest min çûye dîn;  
Bo min welat şîrin û zîn,  
Her şev li ser axin û tew.

## CEGERXWÎN

Serê zabîtê dijmin ji laşê wî hati bû birin  
û mezel bi xwîn bû. Li ser nivînê xencereke  
bi xwîn diçirisi...

Qoço xencer rakir; wî ev xencer dabû  
Gulê? Di kulma zebîta a guvaştî de gurzek  
porên Gulê ên zer pêl dida.

Qoço kulmikên xwe gez kirin û wî pilingê  
ko çiya dihejandin ji bo cara pêşin giri û  
gote gundiyan: «We bi min gunehê paşin da  
kirin, ji Gula qehbikê re me qehbikî kir!»

Bi dengêkî têrêş, têrpoşmanî û têrbirin  
gotina xwe a paşin kir: «Gulê! te deynê  
xwe da, te gunehên xwe rakirin! Niho dora  
min e Gulê! Gula min a zer!»

Bi xencera xwîndar wek hayekî ji ode  
derket, berê xwe da dijmin û nema xweya  
kir.

NÛREDÎN ÛSIF

STÛNA XWENDEVANAN :

## HEÇI DIPIRSE DIELIME

### PIRSÎN NE ŞERM E; LÊ NEHÎNBÛN ŞERM E.

Me ev stûn ji xwendevanên xwe re vekir. Emê tê de li pirsariya wan vegehin û bixebitin bi pend û şîretên xwe bi kêrî wan bèn. Bi tenê me hêvî ji xwendevanên xwe beye pirsariyên xwe kurt binivîsin û dirêj nekin. Ji milê din ev stûn bi karê elbika postê ji wê rabe. Ev in pirsari û cewab.

#### Mirza Hişyar — Amûde

Kurdmançî divêt bi tipên kurdmançî bête nivîsandin. Ji xwe ji mektûba te dixuye ko tu qenc bi tipên zmanê xwe dizanî. Ji lewre em ji te hêvî dikin careke din nivîsarên xwe bi tipîne biyanî nenivîsinî.

Di nav nivîsarên te benda « Navên kurd û kurdistanê » bi kêr dihat; me ew xiste hejmarê 28an.

Ji nezimê hêtir mela xwe bide nesirê. Ji xwe zman bi nesirê tête pê. Ji şîhir û nezimê re qabileyeteke çihê divêtin. Ew qabiliyet ziknakî ye û di her kesî de nîne. Hebûna wê wêsfekî qenc bihe ji nebûna wê ne tu kêmanî ye.

Xortên ko dixwazin xizmeta zmanê xwe bikin û hêj ji ber xwe de nikarin binivîsin ji wan re kaniyeke kûr, mezin û şîreh heye. Ava wê kaniyê tucaran naçike: « Folklor » yanî çirok, çirçîrok, stran, medhelok, manîk; tiştên ko xelkê gotiye. Xortên me dikarin van tiştan ji dengbêj, çirokbêj û ji kalan bipirsin û bêt ko tu tiştê wan biguhêrin, weke xwe binivîsin û ji Hawarê re rêkin. Em wan bi navên xortên ko ew ber hev kirine belav dikin.

Xortên me di dora folklorê ko wê binivîsin, ji me re tiştine bi ehemiyet û spehî ji dikarin bidin zanin. Mesela, yekî stranek nivîsandîye, di dora wê stranê de gelek tişt hene ko mirov dikare wan seh bike û bide zanin. Wekî niho: heke ew stran li ser çereki ye; ew şer di navbera kîjan eşîran de çêbûye? ew eşîr li kû derê rûdinin? ew eşîr berê diçûn kîjan zozanan? xelkê wan eşîran bi çi mijûl dibin; destxetê wan çi ye? xaliçe, mehfûr an tiştine din çêdikin???

#### Mirza Fiad Melazî — Cerablûs

Kiryariya Hawarê a salî 500 qirûşên sûrî ne. Me hejmarên ko beta niho derketine şandine adrêsa te. Ji kerema xwe heqê ebonê li ser navê xwediyê Hawarê rêke.

#### Mirza Mihemed İsa Cengbaz — Telêlûn, Derbasîye

Ji hisên te ên milî re gelek kêfa me hatiye. Xwedê te bihêle û mirovên welatparêz, mîna te di nav kurdan de zêde bike. Ji kerema xwe navên mirovên ko dixwazin bibin ebona Hawarê ji me re binivîsin da ko em ji wan re kovarê rêkin.

Poste reşbelekên kurdmançî qebûl dike. Bi reşbelekê te re çend reşbelekên kurdmançî ji gîbaşîne destên me. Ji lewre, ji niho pê de ji me re bi kurdmançî binivîsin.

#### Mirza Temoyê Xelef — Cemşeref, Eyndîwar

Mirza Xelef ji me dipirse: Şer kengê dest pê kiriyê, wê çiqas dom bike û wê kengê xelas bihe?

— Şer di yekê Îlona 1939 an de dest pê kiriyê. Ev rahet e. Lê wê çiqas dom bike û wê kengê xelas bihe; ev îşekî zehmet e. Bi me di dinyayê de tu kes nikare li vê pirsariyê vegehin. Digel vê hindê tiştên ko di vê babetê de heta niho hatine gotin emê wan ji xwendevanê xwe re bi kurtî hidin zanin.

Di destpêka şerê de Çorçil, reîswezaretê Îngîlêrê gotî bû: min pênc sal dane ber çavên xwe. Hitler, rêberê elmanan, lê vedigerand û digot: ez ji karê xwe ji ho deh salan dikim.

İsal, li serê salê, Çorçil digot: şer sê salên din wê dom bike. Hitler ji di wê demê de nitêk digot û ji mîletê xwe re dida zanin ko şer di sala 1941ê de û bi zefera Elmanyayê wê biqede.

Lê piştî şerê yewnanistanê, yanî berî meh û nîvekê Hitler di Reyxstagê de nitêk da û got: « Çekên me îsal ji par bêtir in; sala tê ji îsal ji wê bêtir bibin. »

#### Mirza Hesenê Sado — Banê - Qesir, Dêrik

Pirsari — Elman li tu kesî teqîrî nakin. Heçî mîletê ko li biwara wan dikevin, li wan dixin. Nekarên me ji ketine biwara wan; çire li wan ne xistine û naxin?

Cewab — Dinya bi dor e, ne bi zor e.

#### Mirza Mistoyê Remo — Girê - Şêran, Cerablûs

P — Ji Çorçil û Hitler kî ji kê mezîtir e?

C — Bi emirê Çorçil apê Hitler e. Hitler 52 salî ye; Çorçil di ser şêstî re ye. Bi ritbe he, Çorçil dîsan ji Hitler mezîtir e. Çorçil di ordiwê de binbaşî bû; Hitler oubaşî ye. Herçî xurtî, fro bi çek û posatên xwe Hitler xurtir e. Bi tenê stola Çorçil bi piranî ji ya Hitler mezîtir e. Lê mezinahiya ko tu dibêji di dawîya şerê de wê hixuye.

#### Mirza Reşîdê Kurd — Amûde

Wer dixuye ko tu dixwazî wêsfê tixubên Kurdistanê bidî. Herwekî me ji mirza Hişyar re got şîhir bê wezin nabin. Ji lewre nivîsara xwe bi nesirê û bi awakî tekûz binivîsin da ko em hikarin wê bexin Hawarê.

#### Mirza Mewlûdê Şekir, Tilşetra Aştan, Qamişli

P — Kurdên Qevqasê bi çi zarî daxêvin? Bi kuremencî an bi bahanî?

B — Kurdên Qevqasê bi kurdmançî daxêvin. Ew kurd di xwendin û nivîsandinê de ji kurdên din pêştir in. Rojnameke wan bi navê « Riya Teze » heye. Di her gudekî wan de dibîstana zarokan û li Rewanê dibîstaneke mamostan heye. Csm wan gelek kitêbên kurdî ketine çapê.

## DILGIRSI Û DILOVANI

Miroveki xwe û zarowên xwe bi xebata destê xwe bi xwedî dikirin. Qencbûna sihet û xurtbûna milên wî, tim jê re kar û xebat pêk tanin. Bê zehmetekî pir, di riya xebatê de jîna xwe diqedand. Lê wextek hat ko belengaziyeke mezin kete nav welêt. Êdî xwedî peran nema ew li cem xwe dixebitandin. Çima ko, tu kar jî wan re di wê xebatê de ne diman. Destengî ewqas pêş de çû ko dewlemend jî birçî mayinê ditirsîn.

Mirovê han jî wek xelkê belbî hin pirtir barê dijwariya vê tengasiya han hiltanin. Ew çend qirûşên ko di firehiyê de bi xwidana eniya xwe civandî jî xwarin. Dû re tiştên nava malê jî di wê rê de çûn. Lê dawîya wan rojên teng ne dilat. Gava xwe û birçîbûn li ber hev ditin, nexweşiyê jî lingê xwe avêtî bû hundirê malê û xelkê malê li pê hev xisti bûn nav nivinê. Heya wê demê destên xwe li pêş kesî xweher kirin ne hati bû bira wî. Vi halê han ew ajotî bû ber derê ciranan.

Di rex mala wî de yek jî ê din dewlemendîr du ciran hebûn. Rabû çû nik yekî wan û halê xwe jê re got. Dewlemendê pêşin miroveki dilhişk bû. Agahiya wî ya ser halê ciranê belengaz tu deriyên qeçî û comerdîyê jî dilê wî venekirin. Bî gotinên xweş mirovê belengaz jî rûyê xwe da alî.

Ji ber ko wî mirovê zîvar di emrê xwe de destê xwe jî ber kesî xwar ne kiri bû, rûhişkiya dewlemendê pêşin yekcar ew jî comerdîya camêran bê hêvî kiri bû. Çavên jinik û zarokan li vegera wî a mal bûn; nîzani bû ko çawan destvala vegere mal. Dilê wî ê girs ne dixwest êdî here ber derê tu kesên din.

Bî dilêşî berê xwe da mal û vegeri. Dema di ber mala dewlemendê din re borî bê ko ew bibîne, mirovek wek sikê li pê wî çû bû. Gava mirovê zîvar bî dilê şikestî ketî bû xanî û nav koma zar û zêrçên xwe ên birçî û nexweş; mirovê ko li pê wî hatî jî li ber derî rawestî bû. Ew mirov ciranê wî, dewlemendê din bû.

Jin û zarokan bî diltengî li çavên wî dinêrin, dixwestin tê de şopa comerdîya ciranan bibînin. Lê sed mixabin ko jî çend hêstiran pêve tiştêk jî çavan ne dixuyan. Jina wî destvala bûna mêrê xwe bîr biri bû; lê dîsa xwe jî pirsinê ranegirt.

— Gelo, te jî ciranan tiştêk çar ne kir? Mêrik bî dilekî şewitî lê vegerand û got: — Na. Ez çûme cem yekî, rûyê xwe jî min bada. Ê din jî; ez neçûm balê. Dewlemend jî hezkirina peran pê ve çî dizanin? Wan mirovatî, camêrî, dilovani hemî jî bîr kirine.

## XWIN NABE AV XWARZÊKE KURDAN

Xanimeke xwende û mamosta dihistanê jî me re gazezek rêkiriye, digel deh lireyên sûrî. Kaxeza xanimê bî erebî ye. Me ew wergerande kurdmanciyê. Eve kaxeza xanimê.

Gerîndeyê Hawarê ê giram.

Ez bî kurdmanci nîzanim û nikarim bibêjim jî ez kurdmancim. Ji ber ko bavê min ereb e. Lê ez xwarziya kurdan im; û gelek heji wan dikim. Belê diya min kurdmanc e.

Diya me jî me re dibêje ko gava bavê wê jî Kurdistanê hati bû Şamê jî kurdmanciyê pê ve bi tu zmanan nîzani bû; ne bî tirkî, ne bî erebî.

Lê tro diya me bî xwe bî kurdmanci nîzane. Ji ber ko wê zû mêr kiriye û jî xelkê xwe veqetiya û zmanê xwe jî bîr kiriye.

Belê ez gelekî heji kurdan dikin û nemaze kêfa min jî dirûf û girêdana wan re têt. Carina ez kurdên Cizirê, li şukê dibînim û li şal û şapikê wan heşmetkar dimînim.

Ez jî we hevî dikim, min jî bêxin nav xwendevanên Hawarê û diyariya min a kiçik qebûl bikin.

Ez Hawarê di çentikê xwe de digerinim û bî kêf û xweşî lê temaşa dikim. Bê ko jî xelkê bipirsim hinî çend pirsan bûme; mîna « sal, hejmar, sêşemb ». Ji ber ko miqabilê wan ên frensîzî li ber e. Tefîstra Quranê jî pîrsek hinî min kir « çêlek ». Divêt « sûretê çêlekê » « sûret el beqere » be. Ji ber ko quran bî vi sûretî dest pê dîke.

Dilê min heye di tatilê de jî xwe re mamostakê peyda bikim û hinî zmanê kurdmanci bibim. N. Q.

HAWAR — Me jî xwarziya xwe a nekurdhav gelek minet e; em spasên xwe ên kûr jê re ber pê dikî. Heke dilê wê heye hinî zmanê kurdmanci bibe, bî her awayî em jê re sekinîne; em dikarin jê re mamostê jî peyda bikin.

Ew jî bo zirxwarziya me. Gelo xwarziyên me ên kurdhav û braziyên me çî dikin? Hinî xwendin û nivîsandina zmanê xwe dibin. Heke hin hene ko hêj dest bî hînbûnê ne kirine; me hêvî heye ko xêreta zirxwarziya me jî wan re tajan-geke xurt û dersêke kûr e.

Di wê gavê de bû ko derî vebû û yek kete hundir û got: « Ciranê delalî bê ko tu riya xwe bî min xîni, te ez jî bî agirê dewlemendê din şewitandim. Dewlemend hemî ne malperest in. Hin hene ko wek we, jî comerdîyê hez dikin. Ji tro hi şûn de tu jî wek birayêkî min di nav mala min de xweyî parî.»

Bî destê belengaz girt û bir. Ji wê şevê bî şûn de heya ew desfengî di welêt de rabû mêrikê zîvar teva zarowên xwe di mala cîfanê dewlemend de ma û tu tengî ne dit.

FIAD CEMİL PAŞA

## HEDISËN CENABË PËXEMBER

### REHMET Û SILAVA XWEDË LË BE

148 - Yê ko namûsa heval û brayê xwe diparêze, Xwedê ji namûsa wî diparêze.

149 - Yê ko devê xwe digire digihe selamete.

150 - Yê ko hîlekariyê dike ne ji min e.

151 - Misilman ew e ko xelk ji bext û zmanê wî ewle ne.

152 - Yê ko baweriya xwe bi Xwedê û hi-roja piştawiyê aniye; cînarê xwe na êşîne û aciz na ke.

153 - Yê ko baweriya xwe bi yezdan û bi axiretê aniye qedrê mêvanê xwe digire.

154 - Yê ko heywana xwe diêşîne ta ko ji siwara derkeve; ne ji min e.

155 - Mirovê ko tobe bike, weke ko gunchê ne kiriye.

156 - Heke hevalê te nefsa xwe ji tiştê ko tu pê ne qailî bîrî dîke; rast be ne rast be fîraniya xwe pê bîne.

157 - Binîvin, lê ko hon hişyar bûn dest bi gotin û kirina qencyê bikin.

159 - Saxbûn û tirali bi hev re bikêr na yin.

159 - Yê ko mirovên di xwe bi xwedî dîke weke sedeqe daye.

160 - Yê ko poşman dibe, dibe tobedarê Xudayê xwe.

161 - Xelkê hêja du texlî in yên ko hîn dikin û yên ko hîn dibin, ên mayî bê kêr in.

162 - Jin mîna xwehên mirova ne, divê qedrê wan bê girtin.

163 - Mirov mîna madena ne; hin kêmeyar in û hin ji giranbiha ne.

164 - Kovan û keser mirov digihînin nîvê pirtiyê.

165 - Yên ko devê xwe na girin her belayê dibînin.

166 - Her arîkariya belengaz û biçareyan bikin; xwedê wê arîkariya we bike.

167 - Yên ko ji taqeta xwe bêtir îbadetê dikin nefsa xwe dibin helakê.

168 - Tenayi ji civata xirab qenctir e; û civata qenc ji tenayiyê çêtir e.

169 - Wey li wî miletê ko zanayên wan, şex û axayên wan xirab û bêkêr in.

170 - Sunda me xwin; an honê poşman bibin an derewker derkevin.

171 - Heçî xedar û nefsmezin in; roja piştawiyê de wê bibin mîna mûriya û xelkê wê pê li wan bikin.

172 - Xwedê bejî wî mirovî dike yê ko gava tiştê dike qenc û rast dike.

173 - Gava hon dibînin ko mirovek xirabiyê dike; an bi destê xwe an bi zmanê xwe wî jê bidine paş, heke hon pê ni karin dia bikin ko ew dev ji wî îşê xerab berde.

174 - Heke hon zalimekî bibînin û destê wî na girin û berdidin ko ew zilmiyê bike xwedê we hemiya diêşîne.

175 - Cihada mezintir ew e ko mirov ji hakimekî zalim re fastiyê bibêje.

176 - Bav deriyê buhuştê ê navîn e, ko te qedrê bavê xwe girt, ew deri ji te re vedibe, ko te qedrê wî ne girt ew deri li ber te wê bê girtin.

177 - Ko xwedê keçikek da we; wê qenc bi xwedî bikin; ew sibe nav beyna we û agirê dojhê de dihe bedenek.

178 - Yê ko du keça bi xwedî û mezin dike; di roja piştawiyê de bi min re dimeşe.

179 - Yê ko keça xwe na êşîne û bernade ko brayê wê, wê biêşîne dikeve buhuştê.

180 - Ez û mirovê ko îşê sêwikî digêrin di buhuştê de em hevalê hev in.

181 - Yê ko rêwiyeke bibîne û xwarina wî bidiyê bêşik dikeve buhuştê, meger ko wî gunehek kiriye ko na ye efiw kirin.

182 - Tu qencyê kême me bine, dev li ken bûn ji qencyek e.

183 - Tacir di roja piştawiyê de bi fesadker û awana re ye, meger ko ew ji Xwedê tirsiyar bû, qenci kir û di dan û standina xwe de rast bû.

184 - Ko yekî qenci bi te kir divê tu ji qencyê pê hiki, heke ji destê te na ye pesnê wî bide; heke tu qencya wî na bêjî û vedîşêrî kafirî.

185 - Çavê ko ji lîrsa Xwedê giriya ye û çavê ko misilmîna ji xirbiyê parastinê agirê dojhê li wan çava na keve.

## TEFSIRA QURANÊ

Nişanek — Di çapkirina ayeta şest û şeşan de xeletek çêbûye.

1 — Tefsira ayetê a rast e ve:

Me ev tişt da qewimandin; ji bona ko mirovên hazir û çelîyên di wan îbretêkê jê bigirin û me pê şîret li bawermendan kir.

2 — Ayeta ko bi hevoka «Gava we ew tişt dît...» destpê dike ayeta heftê û çara ye; ne a heftê û sîsiya ye.

3 — Ayeta heftê û şeşan de despêka rêza sisê (em lê vedigerînin) xeleta çapê ye, di Quranê de nîne. Rêza çara de (û cuhî) ji nî ne.

4 — Ayeta heftê û nehan bi awayê jêrin despê dike: « Û gava ji aliye Xwedê ve ... » Dr. K. B.



BINGEHÊN  
GRAMÈRA KURDMANCI

BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHRVAN

— 3 —

Dunik — Dunik dikevin pêsi û paşiya wan pirs û komekên ko mirov wan ji derve ditîne û têxe qisetê. Te ne bihtsiye ko dibêjin: «Her tişt bi zravi dişkê; mirov bi stûri». Ehmedê Xanî ji bo kitêba xwe gotiye:

« Ev meywe eger ne avdar e »

« Kurdmacl ye ev qedêr li kar e »

Xêzek — Dema ko qiset dikeve şiklê axaftinê û carê ko xêberbêj diguhêre; li pêşiya gotinê xêzekê lête danin;

Mizgînî dan kerê û gotinê:

— Dehşik ji tere bû.

Kerê li wan veğerand û got:

— Êmê min kêr, barê min zêde bû.

Bendek — Bendekê datînin navbera du bêjeyên ko di navbeyna wan de hogiriyek heye. Kariyê - belek. Kariyê - kelehê. Birca - Belek. Bedir - Xnî.

Ji milê din gava ji kêmbûna cih kltên bêjeyê ji hev de dikevin ev nişandek wan kltan bi hev re girêdide. Hingê bêje dibe du perçê; perçekî wê di paşiya xêzekê de dimîne û perçê din dikeve pêşiya xêzekê nû.

Gava ev bêgavî lête pêş, divêt bêje klt bi klt ji hev de bêne xistin; bêt ko tpeke kltê jê bibe û bikeve xêzekê din. Mesela heke (nermijandin) kete paşiya xêzekê û tê de cih ne bû; ev bêje bi vi awayî lête birin: (ner mi jan din) û ji wan çar kltan hin divêt bikevin paşiya xêzê û ên an a mayîn pêşiya xêza nû, bêt ko ji tîpên her çar kltan ne tu ji ji hev bibin.

NAVDER

34 — Navdêr ew bêje ye ko kesekî heywanekî an tişteki şanî me dide. Ji lewre bêjeyên Zîn, pîsmanî, şêr, hesp, post, û kursi navdêr in. Ji ber ko ji van her şeş bêjeyan dido hin kesan, didowên din hin heywanan û didowên mayî ji hin tiştan pêş me dikin.

C. A. BEDIR-XAN

Şanek — Di hejmarê 28an de, di rûpelê zanz-dehan de li serê stûnê nişandekên niqteşaniyê hatîne hejmartin. Di wê hejmartinê de « bîhnok » hatiye ji bîr kirin. Me hêvî ji xwendevanên xwe heye serê vê stûnê bi awayê jêrîn bidîrlînin:

(.)	Niqte
(?)	Niqteplrs
(1)	Niqtebang
(:)	Niqtecot
(;)	Niqtebihnok
(,)	Bihnok

LA LÉGENDE  
DE MIR MOHAMMAD (1)

Mir Mohammad, prince de Botan, régna jusq'au 1740. Il est resté célèbre dans la tradition locale, beaucoup plus à cause de ses chasses et de ses amours avec la fille du roi des péris, que de ses guerres. Un résumé de la légende de Mir Mohammad a déjà été publié dans le numéro 25 de « Hawar » (Bériya Botan, notes).

On raconte que l'émir s'était épris de la fille du roi des péris. Il la rencontrait régulièrement dans une caverne de la montagne; il eut d'elle plusieurs enfants. Elle lui avait fait jurer de garder leurs relations secrètes. Or, un jour, le prince s'attarda au rendez-vous. Voyant la nuit venir, ses domestiques, qu'il avait quittés à quelque distance de la grotte, sous prétexte d'aller chasser seul, commencèrent à s'inquiéter. L'un d'eux partit à sa recherche et le trouva assis à l'entrée de la caverne, en compagnie de sa maîtresse et de ses fils. Le valet tenta de se dissimuler, mais la péri l'aperçut: Elle crut que son amant lui avait manqué de parole, et disparut avec les enfants. Au même instant, le prince fut pris d'une fièvre violente. Il mourut pendant que ses hommes le ramenaient à Djeziré.

Le numéro 26 de notre revue contient également un conte intitulé « Ehmedê Zeydan » où il est fait allusion aux relations de Mir Mohammad avec les génies: le héros de l'histoire relate, en présence de l'émir, les circonstances dans lesquelles il a été conduit à la cour du roi des péris, et comment il a cru le reconnaître parmi l'assistance. Le récit terminé, Mir Mohammad déclare au narrateur: « O Ahmadé Zaydan, celui qui était assis ce jour là sur le trône, à côté du fils du Roi des péris, c'était bien moi ».

Dans un article de la « Revue Patriarcale Syriaque » sur Basile Simon II (1939, no 6), nous trouvons encore une autre tradition relative à Mir Mohammad: « Basile Simon II, évêque de Tour Abdin, était très vertueux et très pieux. Il y avait à Bamenmen, chez Avdal Agha, un domestique syriaque qui désirait épouser sa propre cousine. Le prélat se refusait à bénir cette union irrégulière d'après la loi chrétienne. Le valet se plaignit à la femme de son maître, qui demanda à l'agha d'intervenir. Celui-ci eut beau faire, l'évêque ne consentit pas davantage au mariage. Avdal agha se mit en colère et envoya Basile Simon chez Mohammad beg Boti, prince de Djeziré, espérant que l'émir le ferait mettre à mort. Arrivé à Djeziré, le prélat fut introduit chez le prince. On lui donna une coupe de poison. Il fit le signe de la Croix sur le récipient, et but sans être incommodé. L'émir fut surpris; il fit appeler le domestique qui avait préparé le breuvage, et lui demanda s'il y avait vraiment du poison dans le verre. Sur la réponse affirmative de l'homme, on emplit de nouveau la coupe, et on la lui fit boire. Il mourut le jour même. Mohammed beg convoqua de nouveau

(1) Voir le texte original de l'article et des chansons dans la partie kurd de ce numéro.

l'évêque, et, dans l'intention de l'éprouver, lui ordonna de danser et de chanter. Il se refusa à danser, mais se mit à chanter en kurde le «Lavij» poème qui décrit le jour du Jugement Dernier et les châtements réservés aux pécheurs. Le prince et ses courtisans furent profondément touchés par le chant du prélat, qui fut renvoyé à son village, comblé de présents. (1)

Mir Mohammad beg était un véritable Nemrod, et il est surtout connu sous le nom de « seigneur des chasseurs ». On lui amena un jour deux jeunes bouquetins mâles qui avaient été pris vivants. Il les baptisa Afeno et Hajale, et les apprivoisa. Lorsqu'ils furent gros, il leur rendit la liberté et interdit de les tuer. Les deux animaux atteignirent rapidement une taille extraordinaire. Quelque années plus tard, le prince de Behdinan envoya à Mir Mohammad la dépouille d'un bouquetin dont les cornes avaient 7 emfans de long. L'émir releva le défi et se mit en chasse, pour tuer une pièce encore plus remarquable. Il se rendit rapidement compte que, seul Afeno ou Hajale pouvaient lui fournir un trophée supérieur à celui que lui avait offert son voisin. La mort dans l'âme, il organisa une battue, tua les deux mâles, et fit présent de leurs têtes à l'Émir d'Amadiyé: on mesura les cornes de Hajale, elles étaient longues de 9 emfans.

C'est cet événement que relate la chanson dont nous publions ici quelques variantes.

## I

Source: Hadji Ramazan Keri.

Mon coeur, malheureux, est tombé dans une embûche.

Mon bouquetin robuste paissait sur l'alpe haute,

Il s'abreuvait à la source de Chkijén.

Mon coeur a la certitude que Mohammad beg, le seigneur des chasseurs, ne survivra pas: Afeno est resté à Ferachin. (2)

Peine et chagrins cheminent en caravanes, la joie les a rejoints sur la route.

Je contemple les rocs arrondis des cimes, une légère couche de neige blanche s'y étale.

Mon coeur a la certitude que Mohammad beg, le seigneur des chasseurs ne survivra pas:

Des présages se manifestent par le monde, Ce monde de malheur qui pour nul n'est constant.

J'ai interrogé aujourd'hui les comptables pour savoir combien s'est écoulé de Novembre, et combien de jours en restent.

(1) C'est le «Lavij» dont le texte et la traduction ont été publiés dans le No 25 de «Hawar». D'après une autre tradition, l'émir aurait simplement prié l'évêque de chanter une chanson où il ne serait question ni de guerre, ni d'amour.

(2) Il n'a le pressentiment de la mort de Mohammad beg et se sent déjà en sécurité sur le terrain de chasse du prince.

Novembre est fini, il reste trois jours et trois nuits de Décembre.

Mon coeur a la certitude que Mohammad beg, le seigneur des chasseurs, ne survivra pas:

Les bouquetins mâles dansent sur les rocs arrondis cimes.

Je vieillirai, mais coeur brisé ne peut vieillir.

Bouquetin, malheureux bouquetin à la belle barbe, au nez busqué!

Mon bouquetin robuste paissait sur l'alpe haute,

Il s'abreuvait à la source de Chakh.

Mon coeur a la certitude que Mohammad beg, le seigneur des chasseurs ne survivra pas:

Au sommet de l'alpe haute, Afeno a tourné le dos aux pentes terrestres (1)

Un cri d'alarme a retenti sur les pentes, mais je ne sais qui l'a poussé.

La détonation d'un fusil résonne joyeusement aux oreilles de Mohammad beg.

Je ne sais si c'est celle d'un fusil rayé, d'une carabine, ou d'un fusil à pierre.

Mon coeur a la certitude que l'on a tué Afeno.

Hajale, le père des jeunes bouquetins mâles est blessé de quatre balles.

Je contemplais les hautes cimes,

Comme aux premières lueurs de l'aube.

Douleur et chagrin sont venus camper dans un coeur blessé.

Moi, malheureux, je ne servirai d'émir ou de grand roi,

Autrè que le prince, le souverain destitué(2).

## II

Source: Hadji Djendi, d'Ereh.

Bouquetin, malheureux bouquetin, avec cette bouche et ce nez busqué!

Les chasseurs ont brisé les rocs de Hendjé; ils ont gagné les pentes de Chakh.

Les poudrières de Mohammad beg, l'émir de Botan, sont d'or et d'argent.

Il en laisse pendre les pompons sur ses reins.

Je préfère à tout autres rendez-vous de chassé (3) celui de Stoun, au dessus de Derba Chekér,

(1) C'est à dire: est mort

(2) Allusion à Mohammad beg qui n'a plus longtemps à régner, ou à quelque autre prince de Botan?

(3) «Çepers» signifie littéralement affût cependant, les çepers de Mir Mohammad étaient de véritables rendez-vous de chasse, comportant des pavillons dont les ruines subsistent encore de nos jours.



Mohammad bég, émîr de Batan, est monté à cheval, avec une suite de valets et de domestiques, et Chero de Serkhanes, et Rasoul de Fenek.

Ils disent: « Nous allons tuer Afeno, nous enverrons sa tête au khan de Khoÿ (1).

Nous enverrons sa peau à l'Émir d'Amadiyé; Nous enverrons sa chair au cadî de la ville, pour son souper.

Ces trois choses sont au nombre des merveilles du monde.

Je préfère à tout autre rendez-vous de chasse celui qui surplombe Devené.

Les poudrières de Mohammad beg, émîr de Botan, sont d'or et d'argent, décorées à profusion.

Mon émîr, tirer sur Afeno, fais gémir sa maudite femelle.

Bouquetin, malheureux bouquetin bouquetin des pentes de Tavi!

La pointe de tes cornes est fine, la racine en est épaisse.

Mon émîr, détourne ton fusil de la femelle, vise le mâle robuste aux boucles dans le vent.

Que ne répondas tu à mes paroles!

Les bouquetins mâles descendent en file de Kureké Qaso, ils ont contourné les falaises du versant.

Nos chasseurs sont novices, c'est pourquoi ils se vantent de la qualité de leur pulvérin.

Je préfère à tout autre rendez-vous de chasse celui de Darkavoté.

Le fusil de Mohammad beg, émîr de Botan, tire deux coups par deux coups.

Je ne servirai prince ou seigneur autre que Mohammad beg, émîr de Botan.

### III

Dans la pièce qui suit, il est fait mention de la tombe de Mohammed beg. Sans doute, le poème a-t-il été composé après la mort de ce prince. D'autre part, il y est fait allusion à Abou Zayd de Balak, chasseur réputé qui accompagnait d'ordinaire l'émîr. On retrouve le nom de ce personnage dans un grand nombre de chansons et de récits. On raconte qu'il ne survécut que peu de temps à son maître.

(1) Khoÿ: ville du Kurdistan iranien.

Douleur et chagrins cheminent en caravane; la joie les a rejoints.

La brume couvre les hauts sommets,

Où s'étendent de vastes plans sans neige.

Mohammad beg le seigneur des chasseurs ne survivra pas.

D'extraordinaires merveilles se sont manifestées par le monde.

Je préfère à tout autre rendez-vous de chasse celui de Darkavot,

D'où volent les balles une par une, deux par deux.

Je ne servirai émîr ou seigneur.

Autre que Mohammad beg, prince de Botan.

Bouquetin, joli bouquetin!

Les poudrières de Mohammad beg ont des franges qui tombent sur ses cartouchières.

Détourne le guidon de ta carabine du front de Afeno et de Hajale, vise le mâle caché derrière les cognassiers.

Il me faut aujourd'hui un fusil dont le canon et la crosse soient aussi gros que ceux du fusil de Mohammed Paşa.

Je veux un mortier de poudre, écrasée par deux amoureux.

J'irai au rendez-vous de chasse de Mohammed beg, tuer Afeno et Hajale, les mâles robustes aux boucles dans le vent.

Les nuits d'hiver sont longues et le sommeil me fuit.

Le temps a passé, les Pléiades sont maintenant au Sud,

Les blessures sont profondes, ne les exposez pas à la brise ni au froid.

Les nuits d'hiver, brèves ou longues, le sommeil me fuit.

Le temps a passé, les Pléiades sont au Sud,

Les blessures sont profondes, ne les exposez pas à la brise ou au froid du matin.

J'ai contemplé une haute cime. Que je souffre!

Douleur et chagrins campent dans un cœur blessé.

Après Mohammed beg, je ne servirai prince ni seigneur.

Je servirai ce roi, cet émîr, ce souverain destitué.

J'ai bien examiné le monde, combien je suis perfléxé!

Afeno et Hajale, les pères des jeunes bouquetins,

Ont contourné l'affut de Mohommad beg, le sieigneur des chasseurs.

Si vous ne connaissez pas la tombe de Mohammed beg le seigneur des chasseurs, Allez au séminaire de l'hippodrome, voir sa stèle.

Arc et flèche et fusil y sont sculptés.

J'ai bien examiné le monde. Qu'il m'est amer !

On entend faiblement les coups de fusil qui partent de l'affut de Mohammed beg, le seigneur des chasseurs.

Si vous ne connaissez pas la tombe de Mohammed beg ; le seigneur des chasseurs,

Allez au séminaire qui se trouve à l'extrémité de la place,

Regarder sa stèle funéraire.

Il a couché Hajale en joue.

Bouquetin, robuste bouquetin !

Afeno et Hajale paissent sur la chaise d'Awal.

Ils sont descendus s'abreuver à la source de seigneur.

Hélas, hélas Mohammed beg va mourir et tourner le dos aux pentes terrestres.

Aujourd'hui, le chasseur de chez mon père est sorti seul,

Il est monté jusqu'à l'affut de Karé, qui surplombe Devené.

Le mâle appelait la femelle. Debout, allons à la danse !

Mais Abou Zayd de Belek est à la mort.

Bouquetin ! Quelle embûche on t'a dresséel Afeno et Hajale paissent sur la chaise d'Awal.

Ils étaient descendus s'abreuver à Hertchekin.

Alors, j'ai compris que Mohammed beg, le seigneur des Chasseur ; ne survivrait pas.

#### IV

Source : Rasul agha, chef des Jéliyan.

J'ai contemplé Mohammad beg, sa parure et son élégance :

Tes poudrières sont décorées d'or, de franges et de pompons.

Détourne la balle de ton fusil de la femelle, son mâle est debout derrière les cognassiers.

Tu as répondu à tout ce que j'ai dit.

Le troupeau des bouquetins mâles est

descendu du ravin de Qaso et a contourné le Pelengé Zérin.

Nos chasseurs sont novices pour ce qui est du pulvérin : ils se vantent d'être pareils au Balaka Rache (1).

Nous avons dit plus haut qu'il existait de nombreuses anecdotes au sujet des chasses de Mohammed beg ; c'est par l'une d'elle que nous concluerons cet article.

Un jour, l'émir et sa suite étaient allés dans la montagne. Les chasseurs s'étaient répartis dans les affuts. Deux frères, appartenant à la tribu des Keran s'étaient installés ensemble. Le prince avait bien recommandé à ses hommes de ne pas tirer tant qu'ils n'entendraient pas la détonation de son fusil.

Le jour se leva. L'émir aperçut un gros ours qui se dirigeait vers l'affut des deux frères. Il arriva à portée de leurs fusils, mais ils ne tirèrent pas. Mohammed beg bouillait d'impatience. Enfin l'ours contourna l'affut et disparut. Le prince se leva et se dirigea vers les deux frères, escorté de ses valets. Il était très en colère et se disait : « Je leur ferai couper la tête, pour avoir laissé échapper cet ours ! ». Cependant, lorsqu'il se fut approché, il aperçut un spectacle qui l'emplit d'étonnement : l'ours était là, étendu à terre, les pattes liées à l'aide de ceintures et de turbans.

Voyant l'animal venir à eux, les deux frères s'étaient concertés. Que faire ? Il ne pouvaient tirer, puisqu'ils n'avaient pas encore entendu le fusil de leur maître. Ils ne pouvaient non plus laisser la bête leur passer sous le nez. Ils avaient donc posé leurs fusils, et tombant sur l'ours à bras raccourcis, ils l'avaient terrassé et ficelé avec leurs ceintures et leurs turbans.

Il racontèrent à l'émir ce qui s'était passé. Celui-ci fut si content d'eux qu'il les nomma, l'un « Fil » (éléphant), et l'autre, « Fengenoz ». Il leur dit ensuite : « Je vous fais chefs des Keran, car la dignité de chef doit revenir aux braves. »

R. LESCOT

(1) Montagne du Botan.



## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelnine Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Btyîşa Pêxember. Bi Kurdiya dumilî, bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzedyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan.
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re C. A. Bedir-Xan
- 7 — Mesela Kurdistanê Bazîl Nikitîn
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10 — Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11 — Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12 — Dersên Şertetê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13 — Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14 — Proverbes Kurdes . Medhelokên Kurdî . Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-Xan Paris - 1937
- 15 — Le roi du Kurdistan . Qralê Kurdistanê . Emir K. A. Bedir-Xan û Adolphe de Falgerolle . Paris - 1937
- 16 — Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdistanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel Berlin - 1937
- 17 — Der Schnee Des Lichtes . Berfa Ronahiyê . Şîhrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Sall	500	Qirûşên Sûri
Şeşmehî	300	Qirûşên Sûri
Sêmehî	200	Qirûşên Sûri

Xwedi û gerinendeyê berpirsiyar: Mîr Celadet  
Alî Bedir-Xan, Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aalî  
Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 9  
HEJMAR 30  
SÊSEM  
1 TÎRMEH 1941

# HAWAR

ANNÉE 9  
NUMERO 30  
MARDI  
1 JUILLET 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTİYÊN VÊ HEJMARE

Tefsira Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Keskesor	Nûredîn Ûsif
Diljaniya Haco axa	Ehmed Nami
Derdê miletê me	Bedri Cemil Paşa
Divê em bibin yek	Cegerxwîn
Kullikên Kurdistanê	Telet Qedûr
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Tarîxa Kurd û Kurdistanê	Osman Sebrî
Bi xwehên Guhderz re	Rasteder
Kurd yek in	Derketiki Dêrsimi
Jina milet	Masûmê Hamidî
Ji xortan re	Nûredîn Ûsif
Rabûn û rûniştin	Dr. K. A. Bedir-Xan
Ferhengok	Ferhengvan
Gramêra Kurdmançî	C. A. Bedir-Xan



ŞAM—1941  
ÇAPXANA SEBATE



## TEFSÎRA QURANÊ

90 - Ew ji dexsa xwe baweriya xwe bi Qurana ko Xwedê şandiyê xwar ne anîne û bi vê yekê dilên xwe bi tiştekî erzan firotine.

Xwedê ji kerema xwe, ji bendeyên xwe ji kîjîkî re bixwaze; Kitêba xwe jê re dişîne xwar. Erin li ser ernekê gihaşt û bi ser wan de ket û ji bona kafiran ezabekî giran heyê û ew wan diêşîne û riswa dike.

91 - Gava ji wan re tête gotin; baweriya xwe bi Qurana ko Xwedê şandiyê xwar binin; ew dibêjin: Em baweriya xwe bi Tewratê tinin ko ji me re hate dahatin û kitêbên din inkar dikin. Lêbelê Quran heq e; û tesdîqa Tewratê dike. Pêxemberê min, ji wan re bêje: Heke hon bawermend in; we çîre pêxemberên Xwedê kuştin.

92 - Mûsa ji we re bi delilên eşkere û bi mucizan hati bû, piştî ko Mûsa çû çiyayê Tûrê, we ji xwe re golikek anî û jê re ibadet kir; hon zalim in.

93 - Dîsa binin bîra xwe... We ji me re sond xwar, me çiyayê Tûrê di ser serê we re da sekinandin û me ji we re got: Vê kitêba ko em didin we bi xurtî û dilpakî ji xwe re bibin û guhdariya emrên wê bikin. We got: Me bihîst û em guh na dine te. Ev gotina he ji devê wan derket; ji ber ko ew keti bûn kufre û hevîna golikî di dilê wan de bû.

Pêxemberê min... Ji wan re bibêje: Heke hon ji dil bawermend bûna, ma kengê baweriya we bi berdana Tewratê û bi ibadeta golikî, emrî we dikir.

94 - Pêxemberê min.. Ji wan re bibêje: Heke mîna gotina we bihuşt ji terefê Xwedê ve, bi tenê ji we re ye û heke hon di vê gotinê de dilrast in; de ji xwe re mirinê bixwazin, ta ko hon lez û bez bigehin wê bihuştê.

95 - Herweki destê wan bi xwina pêxemberan sor û xemilî ne; tu cara dilxwaziya xwe bi mirinê nîn in; Xwedê halê zaliman dizane.

96 - Tu dibîni ko ew ji mişrikan bêtir ji jiyinê hez dikin, hinik ji wan minêkarê emrekî hezar salî ne, lê ew, bi vê jiyîna dirêj xwe ji ezêb dîr na xî. Xwedê bi emelên wan dizane.

97 - Pêxemberê min... Ji dijmînên Cebrail re bêje: Cebrail e ko ev Kitêb bi destûra Xwedê ji dilê te re nazil kiriyê û ev Kitêb tesdîqa rastiya Kitêbên din dike û ji mirovên bawermend re mizgîniya rîya rastî û bihuştê dide.

98 - Xwedê ji her kesê ko neyartiya wî û melyaket û pêxemberên di wî û Cebrail û Mikail dike dixeyide; Xwedê dijmînê kafira ye.

99 - Me ji te re ayet şandine xwar, yê ko nîşanî emrên Xwedê dikin; bi tenê mirovên kafir baweriya xwe pê na yênin.

100 - Her cara ko cuhiyan sond xwar û bext dan, birekî ji wan paşê bextê xwe reş kirin; ji ber ko piraniya wan baweriya xwe bi Tewratê ne anîne.

101 - Gava ji wan re, ji nik Xwedê pêxemberek; cenabê Mihemed hat û wî hikmên Tewratê tesdîq kir; birekî ji wan xudankitêban, Tewrat avêtin pişt guhê xwe, heta ko bikarin Qurane û pêxemberîtiya cenabê Mihemed inkar bikin. Tewratê ev tesdîq dikirin.



Qey wan ne dizani bu ko Tewrat kitêba Xwedê ye...

102 - Ú cuhi ketin pey Iblisên ko di wextê Siltan Silêman de sihr dixwendin û pê emel dikirin . Siltan Silêman bi xwe sihr ne dikir , ne bu kafir ; lê Iblis bûne kafir , ji ber ko Iblisan xelk hîni sihrê dikirin .

Sihr di bajarê Babilê de , ji du melaiketên re , ji Harût û Marût re hali bu dahatin ; lê gava wan her du melyaketan xelkê hîni Sihrê dikirin ; berî dersdanê ji wan re digotin : Em ji nik Xwedê fitnekar in , yên ko hîni sihrê dibin , dibin kafir . Bi vî awayî Xwedê dilpakiya evdên xwe diceribandin , yên ko ji hînbûna sihrê xwe didan paş , bawermendiya xwe xuya dikirin û yên ko hîni sihrê dibûn , bextreşî dikirin û dibûn ji kafiran .

Xelk ji Harût û marût tiştine welê dielimin ko bi têsira wan , jin û mêr ji hev dibin . Geli bawermendino .. Zererê sihrkaran , destûra Xwedê nin be , na gehe tu kesî .

Bi hînbûna sihrê tu qenci ne digiha wan , wan bi tenê pê xisar didit û cuhiyan qenc dizani bu ko mirovên sihrkar û sihrzan ji buhuştê bê behr in .

Ya rast eve ko , wan nefsa xwe bi behayekî erzan difiroş . Heke wan bi-zaniya ...

103 - Heke wan baweriya xwe bi Quran û bi pêxember bianiyana û xwe ji cuhîti û sihrê dûr bikirana , sewaba Xwedê û xeyra wê diditin . Heke ew birewer bûna ...

104 - Geli bawermendino .. Ji pêxemberê xwe re ( raina ) me bêjin ; cuhiyan wisa digot , di vê gotinê de mana dijûnê heye ; lêbelê jê re ( inzirna ) angomêze li me bike bibêjin û ji dil û can guhdariya emrên pêxemberê xwe bikin... Ji bo kafiran ezabekî dijwar heye .

105 - Ji xudankitêban yên ko kafir bûne û mişrik na xwazin ko ji bal Xudayê we , ji we re , qencyek bête xwar ; lê Xwedê rehm û piyariya xwe ji kê re dixwaze dide û wî pê kamiran dike , kerem û comerdiya Xwedê mezin e .

106 - Gava em ayetekê hiltînin , an paş ve dibin , an li şûna wê ayeteke din têxin , em hercar ayeteke hêja min a ya ko hatiye hilandin , an yekê jê çêtir dişinin xwar . Ma tu ni zanî ko Xwedê bi her tiştî dikare l...

107 - Ma tu ni zanî ko xudawendî û sermiyaniya erd û ezmanan ji Xuda re ye û ji wî pê ve tu kes ni kare sermiyan û arikarê we bibe .

108 - Ma hon ji dil dikin ; ji pêxemberê xwe tiştine welê bipirsîn , her weki cuhiyan ji Mûsa pirsî bu . Yên ko baweriya xwe bi kufre diguhêrin , riya rastiye winda dikin .

109 - Ji xudankitêban gelek hene ko dixwazin — niho ko hon êdî misilman bûne — we ji riya Xwedê bixirinin û ji nû ve , we bikin kafir . Ew ji dexsa xwe wisa dikin , herçend ji wan Tewratê de xwendiyê ko pêxemberîtiya Mihe-med heq e , û dinê wî rast e . Guh medin wan û dev ji wan berdin , heta ko Xwedê emrê xwe li ser wan çî ye , ji me re hide zanin . Xuda bi her tiştî dizane .

110 - Nimêja xwe bikin , zekate bidin û herçî qencya ko hon ji bona xelasa ruhê xwe dikin û pêş xwe ve dişînin , honê sewaba wê li nik Xwedê peyda bikin .

Xwedê her tiştê ko hon dikin dibîne .

111 - Ú cuhiyan got : Cuhî û File bitenê dikevin buhuştê . Ew ji xwe re wisan dixwazin . Pêxemberê min... Tu ji wan re bêje : Heke hon di vê gotinê de rastdil in , kant hiceta we .

112 - No ... Ne bi gora gotina wan e . Heçî ko bi dilpaki rûyê xwe dane Xwedê û dest bi qencyê kirine , li nik Xwedê sewaba wan heye û ji bo wan tirs a ezabi nîne û ew xemdar na bin .

113 - Cuhiya got : Baweriya filehan ne li ser tişteki bi esas e , filehan got : Baweriya Cuhiyana ne li ser tişteki bi esas e ; lêbelê her diwan ji kitêbên xwe dixwendin .

Mişrik û dînnenezanan ji di heqê misilmaniyê de weke wan got . Xwedê li ser wî tiştê ko wan lihev ne dikir , di roja piştawiyê de hikmê xwe wê bide .

Ji bona Tefsîra Quranê K. k. ( kerem kin ) û 11 hejmarên Hawarê 27, 28, û 29. "binêrin".

# HEDISËN

## CENABË PËXEMBER.

### REHMET Û SILAVA XWEDË LË BE

186 - Pëxember li neviyê xwe nêrî û got : Ji boyê ko emê malê xwe ji we re bihêlin, em xwe desteng dikin ; ji boyê ko emê bikarin we bi xwedl bikin, em ber xwe dikevin û tirsonek dihin ; û heke yekî dirêji we kir ji bona parastina we em çavsor dibin ; hon ji ruh û bihna Xwedê ne .

187 - Gava Xwedê qenciya hakimeki dixwaze miroveki qenc jê re dike wezîr, heke hakim pêkanîna qencyekê ji bira kir wezîrê wî tîne bira wî, ko hakim dest bi qencyekê kir, wezîr arîkariya wî dike, lê heke Xwedê serfiraziya hakimeki na xwaze ; miroveki xirab dike wezîrê wî, ko hakim kirina qencyekê ji bîr kir wezîr wê na yêne bira wî û heke hakim dest bi kirina qencyekê dike wezîr nabe arîkarê wî .

188 - Mina mirovan dixwim û vedixwim û weke wan radibim û rûdinim ; ez ji mirovekîm û nefsiwezîniyê na kim .

189 - Nîşanê minafîqan sisê ne , gava dipeyivî derewa dikin , gava wada xwe didin lê diqulipin , ko mirov piştî xwe dayê bêbextiyê dikin .

190 - Ko hon hatine vexwendin , herin .

191 - Ji malê xwe berê nefsa xwe bi xwedl bike , paşê arîkariya mirovên di xwe û di piştî re arî ciran û hevalên xwe bike .

192 - Berê ji xwe re , pê ve meriyên xwe re , pê ve dora xwe re .

193 - Heke dilê hakim li peyayên wî xira dibe ; peya mîfsid dibin .

194 - Di roja piştawiyê de , li ba Xwedê mirovên xirabtir ew in ko du rû û riyakar in .

195 - Heke kesekî gulek da we lê vemêgerînin , kulîlk ji buhuştê derktine ,

196 - Heke ji we sê mirov bi rê ve diçin bila yekî ji wan serekîtiya ên mayî bike .

197 - Her vexwarina ko serxweş dike heram e .

198 - Mirovên bikêrnehatî pirsên ne qenc dikin ta ko zana pê şaş bibin .

199 - Ez mizgîniyê didim we û hon jî, ji yê di pê xwe re mizgîniyê bidin ; heçl ko baweriya xwe bi yekîtiya Xwedê anîne wê bikevin buhuştê .

200 - Dîm ji sê texlî mirova zererê dibîne ; ji zanayên bi tevdan , ji hakimên bi zilm û

zînat û ji xebatkerên nezan , yê ko bê rê û tertîb dişixulin .

201 - Ko zanî hate ji bir kirin xira dibe , ko nehêja hînl wê bûn wînda dibe .

202 - Erna Xwedê ji helalan berdana jina ye .

203 - Helaliya ko Xwedê jê dixeyide berdana jina ye .

204 - Xwedê ji mirovê ko di neyariyê de hare ; hez na ke .

205 - Bikêrî bikêrnehatiya werin .

206 - Ho mirov , nanê te besî te ye , pê qail na bî ; ne bi malê hindik û ne bi ê piç qîma xwe tîni , ko tu saxî , xwarîna te jî tîrî te dike , bila dinya ko bi eqlê te dikene û te dixapîne xira bibê .

207 - Kurê jinîkekê ji mîletê wê ye .

208 - Mizgeftên xwe bê xeml û rewş , lê gund û bajarên xwe bi xeml û zînet ava bikin .

209 - Celûil hat û gote min ; Her wekî dixwazi bijî dawiyê bimirî , ji kê dixwazi hez bike dawiyê jê veqetî , herwekî dixwazi bike tu ê pê berpirsiyar bibî , serfiraziya bawermenda ew e ko bi şev bi ibadetê mijûl dibin û hewcedarê xelkê na bin û çavê xwe na din her deriyê xelkê .

210 - Bi malê sêwiya ticaretê bikin ta ko malê wan bi dana zekatê kême ne be .

211 - Heke hon dixwazin dilê we nerm û çak be û îşê we here serî , li ber sêwiya bikevin û ji wan hez bikin , xêrxwazê wan bibin , dilê wan xweş bikin û ji xwarîna xwe bidin wan ; paryê deyê xwe bidin de- vê wan .

212 - Pez bi xwedl bikin , bi xeyr û bereket e .

213 - Hon dizanin piştî çi ye ? Piştî ewê ko mirov gotina yekî ji êdî re dibêje ; ta ko ew li hev kevîn .

214 - Dev ji heramiyê û ji heramê xelkê berde ta ko tu serfiraz bibî , bi mal û rizqê xwe qîma xwe bine ta ko tu dewlementirê mirovan bibî , qencyê bike ciranê xwe ta ko bawermend bibî , tiştê ko ji bona nefsa xwe dixwazi ji xelkê re ji bixwaze ta ko misilman bibî ! Pir me kene dil pê dimire ( Mirovên bêeql pir dikenin ) .

215 - Ji Xwedê bitirse , tu qencyê kême bine , gava avê ji birê dikşîni ko ava setîla te rîjiya setîla hevalê te ew jî ji we re qencyek e , xweşkirina dilê xelkê jî qencyek e , kubariyê me ke , Xwedê ji nefsiwezîna hez na ke , heke kesek bi kêmasiyekê ko tu jê bîrî yî qedrê te dişkinine , tu eyba wî me de rîyê wî , berde bila ew pê gunehkar bibe û sewaba kirîna te - jî - te re binîne ; di- jûna me ke tu kesî .

## KESKESOR

Di sala 1925an de bû. Wê salê, ez hin nû diçim dibistanê, lê dibistana tirkan.

Di meha Sibatê, Sibata dinoka welatê jorin de, di gelek cihan de, berf wek dêliya bûkekê ji rûyê erdê hildihat û geşiya hêşinahiye û kulişkên Biharê. bi tevî tazehiya wan pêş me dikir. Goya zivistan ji bi hatina tişteki hêja hesiya bû, û zû xwe da bû paş û şûna sermê, berf û hagerê da bû şirgermiya tava Biharê.

Di van rojan de bû ko li bajêr tevlihevîyek hebû: Di malan de mezin ji ker ve dig-textilîn û bi kêf û bi ken bûn. Jin bi tirs û telaş bûn û bi zarokan re pir mijûl ne dibûn. Esker bi zor dîketin xaniyên Kurdan mitralyoz datînin serê banan.

Li dibistanê, şagirdên mezin digihan bev û pir tişt digotin: « Şer ... kurd ... tirk ... standin ... » Me piçûk, me dida pey wan û bêt ko bîr bibin bi van nûçeyan kêfxweş dibûn. Lehtistik û ders bê rexbet bû bûn. Pirsên: « şer ... top ... tîfing ... kuştin ... hatin » em ser-xweş dikirin.

Mamosteyên ko giş tirk bûn bêzar xuya dikirin; di dersxanê de gēj dibûn û bê hemd dipeyivîn. Êdî stranên tirkî ne dihatin gotin û ala tirkan ne di hate çikandin ser dibistanê.

Tirs û tevger roj bi roj meztir dibû: Memûr xwe tavêtin mala mezinên kurd û bext ji wan dixwestin.

Esker top û mitralyozên xwe berdidan û direviyan. Mezinên bajêr yên ko berê berberî bi hev re dikirin li bev dihatin û çek didan mirovên xwe.

Dibistan hati bû girtin û mamoste xwe veşarti bûn. Zaroyên deh, panzdesall xencer û şeşderb hildigirtin. Pirs « tén » ji her devî derdiket; her kes bê sebir bû ...

Rojekê: « Hatin ... nêzik bûn ... kurd hatin... » digotin. Xort û mêr bi çekên xwe ve, bi dahol û zirne hin siwar, hin peya bi hezaran û bi dengên her bijî kurd ... her bijî kurdistan ... her bijî serbestî ... ji bajêr derketin û çûn pêşiya leşkerê kurd yê ko li her derê dida pey t... û ji dûr ve tirs dixistin dilê wan. Jin û zaro derketi bûn ser banan: hinan stranê şer digot, hinan govend digirt. Zaroyan debançe berdidan û besp dibezandin. Herkes ji kêfxweşiyê mest û gēj bû bû.

Bêhsa Rojêke nû û jneke geş dikirin. Piştî demekê siwar bi kum û destmal, bi

sal û şapik wek birûskan ketin bajêr û rast çûn seraya hikûmeta t...

Li serayê tişteki rengin xuya kir. Wê rojê hinek baran hati bû; di pişt re bi derketina rojê keskesor bi ezmanan keti bûn. Me got qey yek ji wan dani bû serayê.

Kelk li dora serayê kom dibûn. Em zaro ji çûn: ew tiştê rengin di ser serê me der-sekint bû. Lê ew ne keskesora ezmên bû. Ez bêsebir bûm ... li bavê xwe geriyam. Leşker rêz girti bûn, stranek digotin, çavên wan ên tûj tîrken bûn. Min ew li ser hespê dit, ez çûm cem; wî ez danim ber xwe. Min jê pirsî: « Bavo ev çi keskesor e li ser serayê? »

— Ev ala me ye; kurê min! Ev şan û gerefa milletê kurd e!

— Berê yeke sor hebû; ew çi bû bavo?

— Ew ya neyaran bû. Neyar bi zor keti bûn welatê me. Em kurd tro wan ji erdê xwe derdixinin û dibin xwediyê wî. Ha ji te re aleke piçûk! Wê deyne ser dilê xwe! Hejî wî bike û ji bo serfiraziya wê bixebite!

Ez bi gotinên bavê xwe bû bûm sermest. Dilê min hildavêt. Bavê min ez maç kirim û ez danim erdê.

Heya ko ew keskesor li sera û kelata bajêr pêl dida dinê bi me re tim Bihar bû, bihuşteke rastin. Lê Bihar me zû wergeriya Patzeke reş û bihušta me bû dojeheke dijwar.

Piştî çend mehan rewşa bajêr guhêrî. Tir-seke mezin ket şûna geşî û rahetiyê. Ji bê-bextiya kurdan û ji ber ko binekê wan ji nezaniyê arikariya dijmin kiri bûn, kurd dişikestî. Mirovên xwenda behsa bêbextî û bê-rûmetiya hin kurdan dikirin. Ev hal pir dom ne kir! rojekê dijminan dora bajêr girt û bi topan li me xist û gotin teslim bin. Lê herçend mêrên çekhilgir ne ma bin jî; jin, zaro, pir û nexweş ketin pêşiya dijmin. Hin xweş tete bira min: wê rojê gerekî no û xwindar çêbû. Kurdan arikariya dijmin dikir. Gelek ne ajot dijmin weke gurên birçî ketin bajêr... hin di ci de kustin, zaro û jinên avis dan ber sângiyan, kal bi dar ve kirin. Hinên din ji bi zar û zêçên xwe ve avêtin cihên nenas û nependî.

Ala rengin, şan û rûmeta me, çirandin avêtin ber lingên xwe, pê lê kirin û li şûna wê ya xwe, ya xwînaxwaran danin. Zman û stranên kurdî bend kirin û tirseke dijwar xistin dilê xekekê.

Ev şanzdeh sal in ko ev hal di kurdistanê de hikimferma ye. Û dîsa şanzdeh sal in ko

## DILJANIYA HACO AXA

REHMETA XWEDÊ LÊ Û LI MIRIVÊN MALBATA WÎ BE

Der sala hezar û neh sed û çil,  
Bîst û didiwê Nîsana têrgul;  
Axê me Haco ê dilovan,  
Xemxwarê feqîr û jarên kurdan.  
Yezdanê mezin bi rehmeta xwe,  
Dil şad kirî bi ceneta xwe.  
Bîst û sisîyê meha me gotî,  
Tîra felekê dilê me sotî.  
Tabûti giha bû ser mezarê,  
Rengê xwe dida riwê Biharê.  
Ezmanê Cizîrê bû bû tari,  
Wê gavê ji ewran xwîn dibari.  
Ew dem te digo ew e qiyamet,  
Zahir ko me din du sed elamet.  
Em xerqeyî pêlê hesretê bûn,  
Sewda ji serê me wê demê çûn.  
Xortê me ketin deravê kalan,  
Bi hêl û qiwet misalê dalan.  
Ser ta bi qedem hemî birin bûn,  
Têk da bi tebayî sernexwîn bûn.  
Rûdênê keça hemî wekî co,  
Bê eql û hewes ji derdê Haco.  
Şev ta bi seher melûl û gêjin,  
Xwîn in ko ji çavê reş dirêjin.  
Çerxa felekê neyar û hêbext,  
Doza te çi ye, bi min re her wext?  
Nahêle bi dilxweşî ko rûnin,  
Nisxa xêreza te em bixwînin.  
Serdarê ciwan û xort û kalan,  
Bê sûc û guneh te kir bi talan.  
Em mane di hesret û xemê da,  
Tîra ko li dil ketî te lêda.  
Bes ko kedera te em helandin,  
Can û cegerê me tev kewandin.  
Qehr û xezeba xwe bes birêje;  
Cewra te li me kirî ji mêjê.

ala rengin di dilê min û di dilê hezar xortên kurd de pêl dide.

Ji bo anînciha wesiya bav û kalan, vekirina tola wan û daçikandina ala xwe ser kelat û çiyayên Kurdîstanê em kurd li benda Biharê xwe ne; li henda baraneke bi keskesor ....

NÛREDÎN ÛSIF

Celwa xezeba xwe dagerîne;  
Sûcek me tu nîne ev çi kin e.  
Qirên û hewarên xort û bûkan,  
Lerzîn dikete dilê biçûkan.  
Fîxan ji me çûne banê barî,  
Hêja bi me re dikî neyarî.  
Ko rêçşinasê miletê kurd,  
Xemgîr li ser wî miletê kurd.  
Haco tu bi navê kurdewarî,  
Razayî li benda efwa barî.  
Emrê te meger giha bû şestî,  
Nazdarê welat tu zû nivîstî.  
Wextê te ne bû, niha tu razî,  
Doza me bi dilxweşî bixwazî.  
Însaf bike ev ne edle, zîlme;  
Rojek te ne kir kerem digel me.  
Bîstanê bi hendesê te danî,  
Guhdari hene bi dergevanî.  
Pêta li dilê te ê birindar,  
Xortê me ji xewnê kirine hişyar.  
Der heqê te de nizam çi bêjim,  
Bê sebr û qerar û dîn û gêjim.  
Feryad dikin ji bê mecalî,  
Hêstir diwerin ji her du alî.  
Tirba te li pêşberê me her dem,  
Pê sebr dikin heta xweşin em.  
Ger çendî qewî li me nihan bû,  
Navê te î xweş ji nû eyan bû.  
Namî bes e, ey şivanê derdan,  
Hêja bi xweşî dikî xebardan.  
Wek mirxê hezîn bi davê dilxweş,  
Rûne bi tenê li kuncikî reş.  
Çendî ko bibêjtî, hem binalê,  
Heta bigihîne dewrê salê.  
Dîsa tu nîzanî ev çi hal e,  
Derdê di dila ye, bê mecal e.  
Lê hêvî dikim ji Xwahê gewre,  
Vi ewrereşî li me bigore.

Daxwaz li me êdî zû xuya bê;  
Şêrîn e welat niha qe nabê.

Ey Xwahê mezin tu çendî paktî,  
Haco tu bi rehma xwe şakî.

Kemayî hebin jî, lê nebîne,  
Pir cewr û cefa ji bo me dîne.

EHMED NAMÎ

## DERDÊ MILETÊ ME

( Ez dibêjim ), ( Nema dikim )

Berî ko ez dest bi meqседа xwe bikim , ez dê çend pirsan ji bo brayên xwe yên ko li Sûriyê rûniştî bikim .

Gell biran Hawar derket , gaziya mîletê kurd . Heya kari be li Kurdistanê derkeve mehvane we ye . Divê kurdên ko li Sûriyê rûniştî ne Hawarê bijînin ; bi her hawayi alkariya wê bikin ko kari be gaziya xwe bibe serî .

Derdê mîletê me çi ye ? Ew çira heya tro ûsa maye ? Bi min ev her du pirs bo me pir xedar in . ( ez dibêjim ) çi ye ; dema ko yekî ji me , ev pirs got tu dêbêjl qey ayeteke quranê ye ; jê venagere .

Mezin û piçûk xwenda û nexwenda giş welê ne . Gell birano ma ne ûsa ye ? ev pirsên te ne rast in , welê çênabe . ( Ez dibêjim ) xelas bû . Tu çi bikî feyde nîne . Pir caran heye ko ew baweriya xwe tine ko fikra wî ne rast e , lê carekê ( ez dibêjim ) gotiye bi şûn da venagere .

Divêt hêdi hêdi weke mîletên din xwe hin bikin ko veke wan em jî bêjin ( em dibêjin ) . Klînga me vava pêk anî karê me bêtir dê bimeşe .

Ew jî çawa dibe ? Klînga ko çend heval gihiştin hev li ser fikrekê xeber dan fikra ko li piraniyê de ma wê fikrê qebûl bikin bi dû piraniyê de herin . Heya tro çend civata kurdan çêbûne . Giş ji bo ( ez dibêjim ) ne çûne serî .

Gell şêx û melan , mezin û xwendewarên kurdan ! ev kêmanî di we de jî hene . We ewçend mal û milkê xwe , istiqbala xwê ji bo xelasa mîletê kurd feda kir . Ma hon nikarin dev ji van her du pirsan berdîn ? ji we dengê derkeve kurdên nezan jî wê bidin dû we .

Pirsa din jî ( nema dikim ) e . Ev pir tiştêk ecêbe e ; bi yekî re ser fikrekê xeber bidî ; tucaran bê camêrî li te venagerîne . Pir caran dengê xwe nake , meriv dibê qey fikra me qebûl kiriye . Lê ne ûsa ye . Ji xwe ra riya revê çekiriye Qenc hat ; hevalê te ye ; ne hat ne bi te re ye ; ev diisa ne tiştêk e .

Car heye bi her awayî hevalên hev , bi sondekê mezin jî girêdayiyên hev in û li ser fikrekê jî li hev hatine , lê saeta ko şixul nêz dibe ; divê dest bi karê xwe bikin ; yek ji wan ra-dibe dibêje ( nema dikim ) .

Keko ûsa nabe , em hevalên hev bûn me sond xwari bû . Pir meriv hene ji vî rûyî dê bixesirin . Îşê mîletêkî jî bo viya dê bi şûn

## DIVÊ EM BIBIN YEK

Ji paşa û begên kurdan ,  
Di vê rê yek ne bû hişyar .  
Ji bo serbestiya kurdan ,  
Ji bo wan qet yek ne bû Xemxwar .  
Hemî talanker û mêrkuj ,  
Li ser wan dijminê xwînrej .  
Melan êriş birin Emro ,  
Heta Zeydo kirin serdar .  
Dirist bû kuştina kurdan ,  
Di şer'a şêx û mamostan .  
Beg û ağan di nav gundan ,  
Digotin her em in xunkar .  
Yên xwenda li bajaran ,  
Meger zana dibû , diisa .  
Di bin destê neyaran da ,  
Dima ew bê gem û hevсар .  
Bi zazî geh bi tazî geh ,  
Bi tirkî , geh bi tatîlî .  
Mijûl bûn ehlê bajaran ;  
Gelê kurdan ne bû yekzar .  
Bi çil gundan hebû navek ,  
Wekî xuşnav û mirdasan ;  
Ne yek berk û ziman û dil ,  
Bi vî rengî mirin yekcar .  
Li hawêr dijminê bedxwaz ,  
Ji hev em raqetandin tev ;  
Heye ko ew ji hev dir e ,  
Kirin dijmin kirin xwînşwar .  
Edîb û şairên kurdan ,  
Bi biskên şê mijûl ma bûn ;  
Yekî wek min hebûna ;  
Lê Di nav wan de dima bê çar .  
Zeman sed firsetên heja ,  
Belaş dan , kes ne bû bêjê .  
Heta hasil giha Mûsil ,  
Cegerxwîn nû dikê Hawar .

### CEGERXWÎN

de bikeve . Tu çi bikî feyde nabe . Qîma wî nayê ; dibê ( nema dikim ) .

Eviya pir caran hatiye serê me . Ez jî şêx û melan , mezin û zanayên kurdmancan hêvî dikim ; bira bixebitin vê adeta nerind ji nav mîletî rakin . Weke mîletên din em jî xwe-yiyê pîrsa xwe bin . Bira di şewrekê da rind bîskirin .

Heke pîrseke wan hebe wê gavê bêjin . Lê klînga ko soz dan serê wan jî here divê pîrsa xwe bibin serî . Di mîrani û di camêriyê de weke mîletê kurd kêm pîyda ubin .

# KULILKÊN

## KO JI KUDISTANÊ TÊN

Her sal kullik li derekê li hev dicivayan û biserhatiya xwe ji hev re digotin. Kljan emelektî baş kiri be jê re mikafatek didan.

Îsal civata wan li cem krizantêmê [1] û di bin riyaseta wê de bû.

Roja civînê kullik hemî hati bûn; ji sê kullilkan pê ve: Nergis, Beybûn û Xecxecok. Ji ber ko wext dereng bû bû li benda wan ne sekinin. Her yekê ji wan, bi dorê çiroka xwe got:

Berî hemîyan gulê dest pê kir û got:

— Min îsal tişteki hêja ne kiriyê. Bi tenê ez ketim dibistanekê û min dersxana zarokan xemiland û zarok pê kêfxweş kirin.

Kullilkan gişan, bi deveki, got:

— Aferin; ev tişteki hêja ye.

Dor gihast rîhanê. Ew got:

— Ez li dawetekê hazir bûm û min singa xanimeke xweşik xemiland....

Kullilkan ne hişt ko rîhan gotina xwe biqêdlê, pê kenin û henekê xwe pê kirin.

Lulê got:

— Tiştê ko min îsal kiriyê ev e: Berî çend rojan ez li ber serê xorteki biyani û nesax sekinim, û çiqas ji min hat min demên wî en paşin geş û sivik kirin.

Kullilkan tev de got:

— Pir baş, pir baş, ev tişteki hêja ye, divêt mikafat ji te re be.

Heçî benefê e, got:

— Ez li taştêkê hazir bûm. Mir û mezin li dora sifrê rûniştî bûn, pev dişewirin; gotina wan li ser şer û xerabiyê bû; û.....

Kullilkan ne hişt ko gotina xwe temam bike; lê rabûn û gotin:

Bes bibêj; kullilka felaketê!...

— Bi vî hawayî her yekê çiroka xwe got.

(1) Tezîlek kullik e; xelkê Diyarbekrê jê re « pat » ji dibêjin.

Dinê pê zane ko kurd weke şer in; tucaran xwe ji mirinê nadin all. Lê çî feyde tucaran ji gotina wan bi yek nabe. Em nikarin baweriya xwe bi hev binin piştî xwe li hev girêdin. Bo vê ji li bindestê biyaniyan da mane.

Heke em dixwazin bi ser xwe û xweyiyê welateki bibin divê em van tiştan ji nav xwe rakin.

Kurdino destên xwe bidin hev ta ko em kari bin dilxwaza xwe bibin serî.

BEDRÎ CEMİL PAŞA

Kullilkan dest bi sêwra xwe kir gelo mikafatê bidin kê? Çaxa ji derve dengê hat; deri vebû û her sê kullikên din: Nergis, beybûn û xecxecok, westiya û xwêhdarî ketin hundir û gotin:

— Em dereg man, qisûra me ew bikin. Em ji dereke gelek dûr, ji çiyayên Kurdistanê tîn. Li wê derê em rasti sê cendekên xortên kurd hatin. Ew di rîya welat û mîletê xwe de bi şeref û rûmet hati bûn kuştin, em li ber wan sekinin, me ji wan re sih girt heta ko hevalên wan hatin û ew veşartin.

Kullik tev de rabûn; ew rakirin ser milên xwe ji wan re çepilkan li hev xistin û gotin:

— Her bijin, her bijin; mikafata vê salê ji we re ye.

TELET QEDÛR  
HEC ELÎ BEGZADE

## REWŞA DINYAYÊ

Ji iro û pê de Hawar di her hejmara xwe de xwendevanên xwe li ser rewşa dinyayê wê serwest bike; û tiştên ko di nav mehê de çêbûne bi urfî ji wan re bide zanin.

Ji bo destpêkirinê emê bi şûn de vegerin û çavên xwe li bûyerên ko ji destpêka şer hetanî iro çêbûne bigerin.

Di şerê 1914an de zora elmanan çû bû û elman serpeze bû bûn. Tu mistemlike di destê elmanan de ne ma bû, û hin birên welatê wan ji bi ser dewletên din ve kiri bûn.

Piştî ko Hitler hikim xiste destê xwê, xebateke zor xebitî, yekfîtiya Elmanyê û Nemsê pêk anî; bîrên welatê xwe yên ko jê hati bûn birin bi şûn de vegerandin, dewleta Çekoslovakîyê ji ortê rakir û ew erd kire du wilayet û xiste bin himayeta Elmanyayê. Ji xwe erdê vê dewletê beriya şerê 1914an di destên Elman û Nemsê de bû.

Edî mesela Danzigê ma bû. Danzig di behîra Baltîqê de bendereke elmani ye. Sondxwariyan piştî 14an ew bender da bûn ser Polonyayê û ji Elmanyayê veqetandi bûn. Erdekî teng, weke liwanekê diket navbera Deuzig û erdê Elmanyayê. Ev liwan ji di destê Polonyayê de bû. Ji xwe Polonye ji wek Çekoslovakîyê piştî şerê mezin hû bû dewlet. Beriya hingê Üris, Elman û Nemsê erdê Polonyê lêk vekirin bûn. Ji Danzigê pê ve hin erdên elmani ji keti bûn nav tixûbên dewleta Polonyê. Lê elmanan hêj qala wan ne dikir.

Elmanan dixwest di navbera tixûbên xwe û Danzigê de rêkê çêkin û ew rê bi milkanê âidî wan bibê; wek erdekî elmani. Polonyê pê qail ne dibû. Ingilîz û Firensîz ji keti bûn navê.

Danzig herçend erdekî polonî be ji bi awakî xwêser dihatê idare kirin. Jê re digotin bajarê serbest. Hikim di destê walikî de bû û ew walî civata mîletan tayîn dikir. Meclîsek ya Danzigê hebû. Xelkê Danzigê herçend tev de elman bûn ji lê hemî ne ji tayê nazîyan bûn. Lê elmanê nazî, hin bi hin piraniya meclîsê xistî. Bûn destê xwe û guh ne didan hikûmeta Polonyê. Hebû ko nazî



rojekê dest daynin hikûmetê; xwe bi serxwe îlan bikin û erdê danzigê bigihin Elmanyayê.

Ji bayê Ewropayê biha barûdê dihat. Tirs hebû ko şer çêbibe; şerêkî mezin, wek şerê 1914an. Ji wextê mesela Cekoslovakayê; bêtir.

Li gora tifaqekê, Polonyê biketa şer diviya bû Frensîz û Ingilîz li piştê wê rabin. Ingilîz li hevalbendan digeriya. Heyeteke ingilîzî çû bû Moskoyê û bi zimamdarên Ûris keti bû mizakerê. Lê ji nişkekê ve wezîrxariyê Elmanyê, Von Ribentrop bi balafirêkê kete paytextê Ûris û bi dewleta Ûris re miahedekê nelihexistinê imza kir. Heyeta ingilîzan bi şûn de vegeriya Londrê.

Lê ji milê din hevalbendê elmanan ê kevîn, tirk rû jê bada û berê xwe da ingilîzan. Pêşdetir tirk ketin tifaqa frensîz û ingilîzan; û di vê babetê de li Enqerê di navbera ingilîz, frensîz û tirkan de miahedêk hate imza kirin.

Her du alîyan xwe kar dikir; şer nizing bû bû. Polonyê ciwab da Elmanyê. Li ser vê yekê li yekê Îlona sala 1939an de, rojêkê Înê ordîwa elmanan dirêjî Polonyayê kir. Elmanan bi awakî nû şer dikir û dirêjîkî diketin welatê neyarên xwe. Polonîyan herçend dest biri bin ji xwe şikestin. Elman li nehê Îlonê gîhaştin paytextê Polonyê û li 21ê mehê polonî bû çeyd û şert teslim bûn.

Zimamdarên wê revîn Romanyayê; jê çûn Frensê û jê jî berê xwe dan Ingilîterê.

Elman û Ûris Polonyê di nav hev de lewa kirin û bi vî awayî dewleteke mezin bi sih û du milyon rûniştîman ji hev de ket û ji ortê rabûn.

Herçî frensîz û ingilîz li piştê Polonyê rabûn û ji sîseyê Îlonê daketine qada şer lê arîkariya Polonyê ne kirin. Ji her ko di bejê re nikari bûn bigihin Polonyê. Di rojên pêşîn de digotin ko Ingilîterê bi stola xwe û di riya behîrê re wê bête hawara Polonyê. Lê ev proje jî ne çû serî û zora Polonyê di nav sê heftan de çû.

Ingilîzan esker şandin Frensê û her du hevalbendan bi hev re xeta Majîno asê kir. Xeta Majîno li ser tixûbên elman û frensîzan de asêgeheke ecêb bû. Drêjahiya wê 150 kilomêtr. Asêgehê jî rûyê erdê bêtir li bin erdê bû. Li bin erdê çîşeyine mezin û depoxaneyin hebûn. Hin topên wê jî danî bûn bin erdê. Wextê şer de ew derdiketin rûyê erdê; her a dijmin didan û disan dadiketin binê erdê.

Piştî şerê Polonyayê heta Bihara 1940î tişteki bi ehemîyet çênebû. Di qada şerê roava de, yani di tixûbên elman û frensîzî de topçîyan li hev dixist; û balafirên nêrevaniyê erdên hev keşif dikir.

Bi tenê di warê siyasê de bûyereke girane hate pê. Li Berlînê elman, talyan û japonan tifaqek inza kir û jê re tifaqa sêbendin gotin. Li gora madeke wê tifaqê heke jî dewletên ko firo şerê elman û talyanan dikin pê ve dewleteke din dirêjî elman û talyanan kir hingê japon jî wê bikeve şer û şerê wê dewletê bike.

Herkesî got ew dewlet Emêrika ye; ji ber ko Emêrike meylidariya domokrasiyan, yani ingilîz û frensîzan dikir. Ji milê din Elmanyê bi lihevhatînen iqtisadî navbera xwe û Ûris xurt dikir.

Her texlît madeyên hov ji cem Ûris dihatin Elmanyayê.

Ingilîzan jî herweki di şerê 1914 an de kiri bû ebloqe îlan kir; yani jî hemî dewletên dinyayê re dan zanin ko her texlît dan û standina ticarî bi elmanan re bend e. Li ser vê yekê û hetanî firo jî ingilîz vaporekê dewletên bêtereş jî li behîrê digirin; wan velo dikin û heke di nav wan de tiştin jî bo Elmanyê ditin wan û vaporan jî zeut dikin.

Di vê navê de Ûris dirêjî Fenlandiyê kir, lê îşê xwe ne bir serî. Paşê bi tîkiliya elmanan Fenlandiyê stoyê xwe ji Ûris re xwar kir û tiştê ko jê dixwest da ê.

Sala 1939an bi vî rengî qediya û bişkojên Bihara 1940î bi şerê Norwêjê vebûn.

Bêdîro, li 9ê Nisana sala 1940î, rojêkê Duşembê elmanan dirêjî Norwêj û Denîmerkê kirin. Elmanan digot: « destên me de isbat hene ko ingilîz û frensîzan karê xwe kiri bûn bavêjin ser Norwêjê û me di behîra Baltîqê de hebis bikin, ne rê ne da wan û pêşî ji wan stand ».

Denîmerkê dest hilnani û teslim bû. Norwêjê li ber xwe da. Ji ber ko di navbera Norwêj û Elmanyayê de behîr heyê; elmanan eskerên xwe di hejê re nikari bûn binî Norwêjê. Diviya bû di behîr û ezmanan re bihatan. Ingilîz û frensîz hatin hawara Norwêjê; stolên wan û ya elmanan li hev xistin; lê elman bi vapûr û bi balafirên derbas bûn û di rojêkê de ketin paytexta Norwêjê.

Qral û hikûmet xwe dan aliyê bakur, esker dan hev; û xwe pîkanin. Ingilîz û frensîzan esker derexistin bejê û digel norwêjîyan bera elmanan dan. Elmanan herçend ber bi bakur ve diçûn, ewçend jî îşê wan zehmet dibû. Bakurê Norwêjê tev de çiya ye û lê de uc rêhesin ne ji şose hene; û heta dawîya Bihara paşîn berf û qeşa jî erdê ranabin.

Şerîne dijwar di navbera elman û sondxwariyan de çêbûn. Lê gelek ne ajot, eskerên ingilîz û frensîzan digel qral û hikûmeta Norwêjê jî erdê Norwêjê rabûn û vegeyriyan cihên xwe.

Elmanan bi şerê Norwêjê bakurê Ewropê xisti bûn destê xwe û keti bûn pêşberê girava Ingilîterê. Bi ketina elmanan Norwêjê destên ingilîzan jî hesinê Îsvêgê dibûn. Ji ber ko hesinê Îsvêgê di Norwêjê re diçû Ingilîterê.

Disan elmanan da zanin ko dilê ingilîz û frensîzan heyê di Belçîke û di Holandê re bûn û li elmanan xîn. Elmanan rê jî van her du dewletan xwest ko di erdên wan re derbas bin û bikevin biwara dijminên xwe. Wan her du dewletan çewab da elmanan.

Li 10ê Gulana sala 1940î elmanan dirêjî Belçîke û Holandê kirin. Van her du dewletan arîkariya ingilîz û frensîzan xwest. Frensîz û ingilîz çûn hawara wan.

Hin erdê Holandê jî behîrê nizimtir e. Holandê rabû behîr berda ser erdê xwe. Lê tu havil jê çênebû. Li çarçêhê Gulanê yani piştî çar rojan Holandê teslim bû. Qrala wê digel hikûmeta xwe çû Ingilîterê.



Belçike 18 rojan şer kir û li 28ê Gulanê bi destê qralê xwe teslimî elmanan bû. Lê hikûmeta Belçikê çû Fransê û jê ji Ingilterê.

Ji Flandirê eskerên elmanî ketî bûn navbera ordiya sonxwariyan û ew jî hev veqetandî bûn. Pîraniya ingilzîzan li milê bakur ma bûn; ew jî Dûnkerkê li vaporan siwar bûn û vegeryane welatê xwe.

Elmanan çend rojan bibna xwe da û li 5ê Hizêranê şerê Fransê ê mezin dest pê kir. Elman ketin Parisê; hikûmeta Fransê çû Bordoyê.

Dijmîn roj bi roj; saet bi saet dihate pêş. Reiscinhûr û rejswezaretê Fransê istifa kirin; û hikim xistin destê Merşal Pêten. Merşal li 22ê Hizêranê bi elmanan re mitarekêk çêkir.

Bi vi awayî şerê qada roava jî temam bû û ji roja şerê Belçik û Holandê heta çekdaniya frensîz û elmanî, ev şer 32 rojan dom kir.

Heta vi çaxî Elmanyê bi tenê şer dikir. Lê hevalbendêke wê hebû: Îtalye. Îtalye heta hingê ne ketî bû şer. Lê piştî ko frensîz şikestin elman ketin Parisê û berê xwe dan behîra spî Îtalye jî rabû û kete şer. Talyan di hin cihan de sê çar kilomêtir ketin erdê Fransê; û digel elmanan, bi Fransê re mitarekêk imza kirin.

Piştî şerê Fransê peravên Ewropayê ên roava jî bakurê Norwêjê heta tixûbên Spanyayê tev de ketî bûn destê Elmanyayê. Elman jî wan peravan radibûn, diçûn Ingilterê li bajarên Ingilterê dixistin, nemaze li Londirê.

Carîna balafrên elmanî, bê eflahî deh diwanz-deh saetan li Londrê didan. Hin taxên Londrê jî binî edim kirin. Di perava manşê de hin bajar yekcar hilweşiyane û bûne xirbe. Ingilîz jî diçûn Elmanyayê û li bajarên wê dixistin; lê di destpêkê de ne bi xurtiya elmanan. Lêbelê piştî ko Emêrikê jî wan re balafrên mezin û dûrger şandin ingilîz jî bombardimanê xwe xurt kirin.

Piştî şerê Fransê her kesî digot elman wê dirêji Ingilterê bikin û derbasî erdê wê bibin.

Ingiltere giraveke mezin e; çarnikarên wê behir in û di tu derê re nagihê beja Ewropayê. Di navbera Ingilterê û Fransê de behîreke teng heye jê re Manş dibêjin; frehiya wê 36 kilomêtir in. Guman bû ko elman di wê û di ser wê avtengê re derbas bibin û herin Ingilterê vegirin. Ji xwe elmanan gelek esker û topên mezin anî bûn peravên Manşê û bi wan topan li bajarên Ingilterê ên peravên dixistin. Lê elmanan ev tişt yanî derbasbûna erdê Ingilterê hetanî firo jî ne ceribandine.

Şerê elman û ingilîzan di qada şerê roava de di ezmanan û di behiran de çêdibin.

Balafrên hev li bajarên hev dixin. Ji milê din li behîrê şerekî zor çêdibe. Ji wî şerî re şerê Atlantîkê dibêjin. Elantîk behreke mezin e, dikeve navbera Ewrope û Emêrikayê. Noqar û balafrên elmanî di wê behîrê de vaporên ko jî Emêrikê çêk û cebirxanê ditinin Ingilêtrê dirêji wan dikin; û carîna wan bin av dikin.

Piştî mitarekê kete navbera frensîz û ingilîzan jî. Ingilîzan bi hênceta ko frensîz stola xwe tes-

## TARİXA KURD Û KURDISTANÊ

— 3 —

Di benda berî vê de, me li ser bakur û roavayê sinorê Kurdistanê zanîna xwe gotibû. Di vê bendê da min dil heye li ser hejmara gelê kurd bipeyivim. Çiças ko der heqê hejmara kurdan tişteki rast û dirist di destê me da nine ji, mafîr ko di vi wari da pir û hindik axaftin bûne û ev axaftin ne di cihê xwe da ne; divê em xwe jê bi şûnda nedin. Di van gotinên bûyi da, eger qesdên siyasi tîne bûna, belbî ji me di vi warê nexweya da tu tişt ne digot û dihişt roja wê. Lê fêlneçakîya hin kesan em di vi wari da jî dane axaftin.

Li ser hejmara gelê kurd, xasma piştî şerê mezîm pir gotin bûne. Lê tuyên wan nizîki rastiyê ne hatine kiriu. Pîraniya nivîsanên ko di vi wari da bûne, bi qesdên siyasi ne. Ên mayin jî, ji van nivîsanên hatine girtin.

Dema min çavên xwe di kitêba Emin Zekî begî da li benda hejmara gelê kurd gerand, ez mîl mam. Hejmara kurdan di sê milyonan da heya pênc milyonan hatiye nîşan dan l. Erdeki wek kurdistanê tîreh, bi sê, çar, pênc milyon nefis çawan tijî dibe?! Tişteki li her çavan e ko, Kurdistan jî erdê pîr mîletên dorhêla xwe mezintir e. Bi avabûnê û xelkên tê da, ji wan ne kêmtir e.

Sebebên ko hejmara kurdan pê kêmtir hatiye nîşan dan dido ne:

1 — Heya van salên paşin eşîrên kurdan yekcar bîndestî hikûmetên dor xwe ne bû bûn. Ji ber vê, ji sedî şeşt-heftiyê kurdan ne keti bûn nîfûsa hikûmetan. Bi vi awayî,

limî elmanan bikin çûn li du benderên frensîz xistin. Di wan ber du benderan de yanî Dekar û Merselkebirê de cenkeştîyên frensîz li ser lengerê bûn. Ingilîzan çend cenkeştîyên frensîz bin av kirin û ji 1500î beîr. eskerên frensîz di wan şeran de batine kuştin.

Piştî mîdeki general Degol di bin himayeta cenkeştîyên ingilîzî de avête ser Dekarê, general Degol dikir Dekar zemt bike û tê re bikeve Efrîqa frensîz a bakur. Lê eskerên Merşal ew û ingilîz hi şûn de vegeandî. Û Ingilîz û Fransîz qutbî-riya xwe jî bev kirin. Sefîrên hev jî paytextên hev bi şûn de kişandin.

Elmanan bihna xwe dida. Dor gîhaştî bû talyanan. Herweki kurdmanc dibêjin: Heçî dikeve govendê divê çepilkên xwe bibêjne.

Talyanan li Efrîqa bakur, li Binîxazi û Trablîs-

**dikari bûn bûneki xwe ji şerê van hikûmetan biparêzin.** Wek dayina leşker û peran. Yê di deftera nifûsa hikûmetê da çiqas hindik bûna, leşker û dayina ko bidana ji ewçend hindik dibûn. Ji bo vê yekê, heya mikûna kurdan bebûya xwe ne dixistin qeyda hikûmetan.

Ji bo serwestkirina xwendevanan ez tiştêkî ko min bi çavên xwe ditiye bêjim. Hinga xwendevanan dikarin di vî warî da hikmê xwe bi rehetî bidin.

Xweş di bira min da ye ko, di navbera salên 923-924an da hikûmeta tirkan qanûnek bi derêxistî bû. Li ser vê qanûnê, serê her pencî hezar nefs şandiyek (meb'ûs) de bi-hata bijartin. Serekên eşiran dixwestin ko qeza me « Gexte » bi serê xwe şandiyekî bidêrine. Lê hejmara qeza me di deftera hikûmetê da ne digehiştê bist hezarî. Ji bo wê, si hezarê mayî li ser eşiran belav kirin. Hingê, her yekî ko me dixwest navê wî têxe deftera nifûsê, herwekî here ber mirinê, digot:

— Mafir ko honê navê min têxin nifûsa tirkî, qe ne kurên min mexin ê.

Kurd ewçend ji nifûsê direvîn. Piştî ko tirkî serê eşiran bi destên hev û din dane pelaxtin; di sala 928an da hejmartinek tevayî çêkir. Di vê hejmartinê da, hejmara qeza me Gextê giha bû heftê û çar hezarî. Hin ji, cih cih mirovên ko xwe an zarokên xwe ne dabûn nivîsîn pir bûn.

2 — Yek ji, mirovên ko der heqê hejmara kurdan nivîsan kirine, xwe spartine prok-nivîsên (pelêjmar) hikûmetên ko welatê kur-

dan êxistinê bin destên xwe. Ev hikûmetên han berî her tiştî dixwazin hejmara gelê kurd hindik rave bikin; da ko kurd li ber çavê cihanê mileteki bê ser û ber bêne nasîn. Di vê rê da kurdên bajarl, ji xwe dihesibînin. Çima ko hînl zmanê wan bûne l.. Pir ecêb e ko fêr bûna zmanên biyanî ji miletên din ra hiner tete zanîn; lê ji bo me kurdan, vacayî xelkê, ji miletê ko zmanê wî hînl bûne tene hesibandin l.. Zhar, bex-tereşiya ko dibên qey ev e ...

Ji xwe vê paşiyê, tirk hebûna kurdan di welatê xwe da inkar dikine, û navên wan tirkên çiyayî danîne l..

Kurdên Tirkiyê, milyon û nivêk û du milyon hatine nişan dan. Yekî ko ser û berê vê hêla kurdiştanê dîtî, nema dikare xwe li ber vê texminê ragire. Li ser teşkilata vê dawiyê, hevde wilayetên kurdan di bin destê tirkan da ne, ko navên wan ev in:

« Bayezid, Hezarom, Erzincan, Wan, Hekarî, Sêrt, Mardîn, Diyarbekir, Bidlis, Mûş, Xarpêt, Dêrsim, Meletî, Meraş, Entab, Killis û Riha ».

Di sala 1928an da gava hejmartina tevayî çêbû bû, hejmara wilayetên yek bi yek di rojnemeyên tirkan da belav kirî bûn. Hingê min hejmarên wan hevde wilayetên kurdî da bûn ber bev, tevayîya wan pencî milyon û si hezar derkeftî bû.

Di hejmartina 1928an da xwe ne nivîsandin pir kurdan me li jor gotî bû. Hikûmeta tirkan ji, serwestî wê yekê bû bû. Ji lewre di sala 1940î da car din hejmartineke teva-

xerhebê, ji sê sed heta çar sed hezarî, esker heşidandi bûn. Li 15ê Ilona 1940î ordiya talyanî dirêji Misirê kir û di axa Misirê de Sîdî-Berani zeml kir, û li wê derê sekini. Ji milê din talyanan li roavayê Efrîqeyê Somalîstana ingilîzî ji vegirtin.

Lê li 9ê Kanûna pêşin sala 1940î ingilîzan dirêji talyanan kir, talyan ji Sîdî-Berani derêxistin; ketin erdê wan û ew ajotin heta Binxaziye. Talyan perîşan bûn, vegeriyân heta Trablîsêrhebê. Li roava ji talyan bêgav man ji Somalîstanê rabûn. Ingilîzan dirêji Eritrê û Hebesîstanê ji kirin. Talyan di wan deran de ji şikestin. Ingilîzan erdê Eritrê û Hebesîstanê vegirtin; destên talyanan, de tiştêkî hindik ma.

Li 28ê Ciriya-pêşin sala 1940î talyan dirêji Yewnanîstanê ji kir. Ji ber ko Yewnanîstan dewleteke biçûk e; herkesî digot ko zûka zora wê wê biçû. Lê welê ne bû. Yewnanîstan bi xurtî li bîr dijîminê xwe sekini. Ingilîzan bi stol û balafirên xwe arîkariya wê kir û Yewnanan talyan bi şûn de vegevandî û nizingî nivê erdê Ernewidlixê ji talyanan zeînt kirin.

Elmanan berê xwe da bû Balqanan, û berî her tiştî destê xwe avêti bû Romanyayê; erdeki tîr zad û genim û cihê petrolê

Mecarîstan û Bîrxarîstan; ev her du dewletên ko ji destpêka şerî ve meyildariya Elmanyayê dikir, ev ji li Romanyayê rabûn û erdên ko Romanyê piştî şerê 1914an ji wan standî bûn jê xwestin û bi arîkariya Elmanyayê ew erd jê standin.

Qralê Romanyayê terka welatê xwe da û digel dostika xwe Madam Lepeskû, revî çû Spanyayê. Kurê wî rabû ser textê bavê xwe; lê hikim kete destê generaleki elmanperwer, Entonesko.

Ingilîzan ji di Balqanan de xebateke zor dixebitîn û dikirin dewletên Balqanan bixin tifaqa xwe. Lê xebata wan ne çû serî; û pey hev Romanyê, Mecarîstan û Slovakyê ketin tifaqa sê-bendîn; yanî tifaqa elman, talyan û japonen.

Tirkîya ko ji destpêka şerî ve hevalbendê ingilîzan bû xwe tev ne dida, bi gotin hevalbendiya Ingilîterê dikir, û wer şani dida ko heke agirê şer bi Balqanan ket hingê wê dest bibe xwe.

Eskerê elmanan ketî bûn Romanyayê û hatî bûn Tixûbên Bîrxarîstanê. Herkesî digot ko elman

yi çêkir. Xweya ye ev hejmartin ji ya berî vê, qenctir hatiye ko hejmara welatê tirkan ji panzde mîlyonan hilda hevdehan.

Min gelektî xwe eşand ko hejmara van wilayetên kurdan, diwa wek cara berê li ser rojnemeyan têxim destê xwe. Lê, mixabin ko westa min a di vê rê da vala çû. Lê qet şik tê nîne ko, ji van her du mîlyonên zêdebûyî, teqez mîlyonek yê van hevde wilayetên kurdan e. Çima ko di hejmartina sala 1928 an da, çend êrdimên welêt qada şer hûn ko hejmartin di nav xelkê van êrdiman da ne bû bû.

Ji milê din; bi qasî al hezar sirgûn tevî zarokên xwe, û ewçend ji hepsî di welatê tirkan da hati bûn hejmartin. Di hejmartina 1940 î da, hepsî û sirgûn vegeşî bûn welatê kurdan. Herçend êrdimên ko, ji dest şerên di nav da ne ketî bûn jmarê vê carê hatin hejmartin. Bi ser da, vê carê wek cara berê kurd, ji qeydkirina navên xwe û zarokên xwe ne direvîn. Ji ber van sebebên jorin, eger ji nav her du mîlyonên zêde, me yektî wî kurd hesabandiye; divê texmîna me di cihê xwe da be.

Yek ji, em ji bîr nakin ko di nava bajar û şînorên wilayetên Hezarom, Erzincan, Melettî, Meraş û Entabê da, ji sedî nisbetek tirk heye. Lê hemberê van tirkan, kurdên me ên Qers, Zara, Qoçgîrî, Stenbol, Edene û deşta Heymanê, li ser tirkan tene hejmartin; ko evana me ne xisti bûn. ser wan pênc mîlyonan. Gava em hejmara wan kurdên di nav wilayetên tirkan da bidin ber tirkên li

ser şînorê wilayetên kurdan tîtevi ko van berhevda 40-50 hezari ji kurdan kêmbûn] hejmara wan hevde wilayetan hemî kurd tîen hesabandin.

Kurdên Tirkîyê ko ji şeş mîlyonan ne kêmtir in, mîlyon û nîvek û du mîlyon hatine nîşan dan. Li ser vê mentiqê; gava biyaniyan an nivîsevanên hikûmetên doraliyê kurdan, tevayîya gelê kurd bi sê-çar mîlyonan texmîn kirin, divê em ecêbmayî nemînin.

Di nav van hevde wilayetên Kurdistanê Tirkîyê da, hejmara wilayeta min Meletiyê bi tenê (534,000) derketî bû. Ev wilayet, herê liwayeke Xarpêtê bû. Lê îro bi hejmara xwe, mezintira wilayetên Kurdistanê Tirkîyê ye. Hemî nivîsevanên ko li ser welatê kurdan peyivine, kesî ji kerema xwe ev wilayet naniye ser zarê xwe. Xweya ye ko wê li ser welatê tirkan dihesibînin. Di vî warî da, bê ko ji me xelkên wê bipirsîn; li cem xwe bi dayîna wilayeta me ji tirkan ra comerdîyeke baş dikin. Ev comerdîya ko bê haya me ye; nîzam çiqas di cihê xwe da ye!

Ez ko kurdekî welatî me, û welatê xwe tevî xelkên wî çetîrî biyaniya dinasim, hejmara kurdên di kurdistanê da pirtirî diwazde mîlyonan texmîn dikim. Berî çil salt şairê kurdan Hecî Qadirê Koyî ko piraniya Kurdistanê geriyaye; ew ji bi diwazde mîlyonan texmîn dikiye. Heke çiqas piştî Hecî Qadir kuştin û mirin di welatê kurdan da çêbûne jî, toven kurdan ên xurt û bê reşek, ev valahiya han ji me jî va tijî kiriye.

OSMAN SEBRÎ

di Bîrxaristanê re dirêjî Tirkîyê bikin, li Tirkîyê xîr û di Tirkîyê re bîn heta qenala Swêşê; û derbasî Misirê bibin.

Lê Bihara sala 1941ê şerî ne di erdê tirkan, lê di erdê Yûgoslavan de dît.

Li didowê Adarê birxar jî ketin tifaqa sêbendin û di roja wê de elman derbesî Bîrxaristanê bûn û gîştîna tixûbên Tirkîyê û Yewnanistanê. Tirkan xwe tev ne da, û vêca got: Heke pê li erdê me kirin emê şer bikin.

Talyanan şerê yewuan û ingilîzan dikir. Lê di her du qadan de jî dişikast; çî Balqanan çî Efrîqê.

Elmanan di Balqanan de herçî dewlet bene hemî jî xisti bûn bîn destê xwe; jî Yûgoslavyê û Yewnanistana ko şerê talyanan dikir, pê ve.

Li 25ê Adarê, piştî xebateke zor, Yûgoslavye jî, bi şertê ko eskerê elmanan di erdê wan re derbas nebin; ketin tifaqa sêbendin.

Lê ingilîz û emerikanî di paytextê yûgoslavan de dixebîtin. Piştî du rojan hikûmeta Yûgoslavyayê gulêrî; wesiye text û wesiîrên ko tifaq imza kirî bûn; tev de revîn û çûn Yewnanistanê.

Hikûmeta nû qralê hevdesalî rakir ser text û dest bi eleyhdariya elmanan kir. Di kûçeyên Belgradê de timobîla sefirê elmanan sekinandin li rûyê sefirî tif kirin û li wî xistin; û dirêjî hin elmanên din kirin. Bi vî awayî siyaseta elmanan di Yûgoslavyê de şikast.

Ingilîzê û Emêrikê nav di Yûgoslavyayê didaa. Ji xwe ingilîzan ordûke mezin anî bûn Yewnanistanê, û piştî ko Yûgoslavye li Elmanyê qulbî ingilîzan eskerên xwe di Yewnanistanê de xurt kirine. Emêrikê jî karê xwe kir ko jî Yûgoslavyê re çek û cebîrxane bişîne.

Lê li 6ê Nisanê elmanan avête ser Yewnanistan û Yûgoslavyayê. Balafirên ingilîzî çûn hawara Yûgoslavan jî, û bi bînceta ko balafirên elmanî jî balafirgehên Bîrxaristan û Mecaristanê radibûn; balafirên ingilîzî li hin derên wan welatan jî xistin. Ji xwe ingilîzan jî roja ko ew dewlet ketî bûn tifaqa sêbendin qutbîriya xwe jî wan kiri bû.

Şerîne no di wan welatan de çêbûn. Yûgoslavyayê jî hefteke bêtir xwe ne girt; teslim bû; qralê wê ê ciwan çû Felestinê. Şerê Yewnanistanê

## BI-XWEHËN GUHDERZ RE

Min temaşa Sorgula me dikir. Dengekl  
birlna min der da û got:

— Bavo! ev çi ye?

Min serê xwe hilda û gotê:

— Hawar e.

— Hawara kê ye?

— Hawara kurdan e.

— Heya niho çira gazi ne dikir?

— Ko hate xwendin, tête zanin.

— De bixwîne

Piştî ko min ji benda sê tarixên Hawarê  
neh deh rêz xwendin; pirsquera min got:

— Bavo! tê bira te, pêrar di kitêbeke  
kurdî da te xwendî bû:

« Hişyar mebe niho ne qenc e »

« Landik ji te re bizane qenc e »

« Bê xew mebe paşiya wê renc e »

« Binve kezba min binve lo lo! »

Çire çaxên xewê ji jiyine nayên hajmartin.

— Bi Xwedê min şerm kir ko çêliyên  
heft, heşt sall qenc û neqenc, bi bihlstinê  
dizandin û ji bir nakin; û ez bi çavên xwe  
dibînim û paşê....

Pê bistekê, min lê vegerand û got:

— Belê tén hejmartin; lê kitêb ne mîna  
merî ne. Ji lewra rojên xewa wan ne lê ye.

— Nexwe em nehêlin Hawar rakeve.

— Belê wer divê.

Yeke di got:

— Ma emê çi bikin?

— Djivê em pir bixwinin û binivisnin.

Kitêbên ko di destên me de ne paqij hillnin;  
ji bona ko em bikari bin, şûna çay û qeh-  
wê pêş nas û dostên xwe bikin û bi hev ra  
bixwinin.

— Bavo! ev pir şerm e; çawan nas û  
dost bèn û bê çay û qehwe rabin, herin.

— Kurê min şerma mezin ew e ko mirov  
nezanê xwendin û nivîsandina zmanê xwe  
be; nezan be. Nezanin hene çar rojan çay  
û qehwê didin mêvanên xwe. Lê te dit  
neyar rabû û mal talan kir û xewedi bê çay  
û qehwe hişt. Lê xwendin û zafin nayêne  
talan kirin; ew her û her yên me ne.

### RASTEDER

bêtir dom kir. Digel vê hindê beta dawîya Nîsanê  
elmanan erdê Yewnanistanê, digel giravên wê,  
ji Giritê pê ve, tev de vegirtin. Ingilîzan eskerên  
xwe ji Yewnanistanê bi şûn de kişandin û anîn  
Mîsrê.

Edî talyan ji ketî bûn erdê Yewnanistanê, û  
birek ji erdê Yûgoslavyayê bi ser erdê xwe ve  
kiri bû.

Bi vî awayî elman ketî bûn devê avten, a Çene-

qelê, heçko tirk di Mermerê de girtî ma bûn.  
Lê tirko digot hetanî ko pê li erdê min nekin  
ez nakevim şerî.

Di meha Nîsanê de şer li Efrîqê ji germ bû.  
Wer dixuye ko elmanan ji ker ve esker anî bûn  
Trablîskerbê û karê xwe kiri bûn. Ji nişkekê ve  
dirêji Bingaziyê kirin û di nav çend rojan de  
gihastîne tixûbên Mîsrê. Bi rê ve herçî keleh û  
bajar hebûn ji Tobriqê pê ve, tev de ketin des-  
tên elman û talyanan.

Di vê qada şer de eskerê ingilîzan hindik bûn.  
Ji ber ko ingilîzan piştî ko di Bingaziyê de zora  
talyanan biri bûn û ew ajotî bûn ber bi Trablî-  
skerbê mîkdarek esker ji vê qadê hişandin û anî  
bûn Hebeşistanê; û birek esker ji rêkiri bûn  
Yewnanistanê.

Ingilîzan ji li Hebeşistanê şerê talyanan kirin û  
ew yekcar şkenandin.

Li meha Nîsanê di warê siyasetê de bûyereke  
girane çêbû. Ūris û Japon li hev hatin. Li 14ê  
Nîsanê li Moskoyê di navbera Ūris û Japonan de  
lihevhatinek hatiye imza kirin. Li gora wê lihev-  
hatinê, heke yek ji van her du dewletan, yanî  
ji Ūris an japon, bi dewleteke din re Kete ser,  
dewleta din di wî şerî de wê bêterf bimîne.

Li meha Nîsanê li Iraqê hikûmet hati bû gu-  
hartin. Reşid Ali Begê Kêlanî hikûmet xisti bû  
destê xwe. Wesiyê textê Iraqê Mir Ewdilîlah re-  
vî bû Felestînê. Geleşek ketî bû navbera ingilîz û  
iraqîyan. Ji ber ko ingilîz esker anî bûn Besrê.  
Li dawiyê ingilîz û iraqîyan li hev xist û iraqîyan  
dest danin hin balafirgehên ingilîzî. Şer dirêj  
bû. Elmanan ji bi hin balafirvan arîkariya iraqîyan  
kir. Lê ingilîzan ji Hindistanê eskirine nû û çê-  
kine giran anin û bi êrîşekê zora iraqîyan birin;  
ketin Beşdayê û bajarên Iraqê din. Reşid Ali  
beg digel hevalên xwe çû Ecemîstanê; Mir Ewdilîlah  
û peyayên wî veqerîyan Iraqê. Ev şer ji bi vî  
awayî qediya û ingilîzan welatê Iraqê ji eskeran  
teji kir.

Di warê siyasetê de tevgerêdana elman û fren-  
sîzan diket ber çavan. Frensîzan nîzingî li  
elmanan dikir. Emîral Darlan çû Elmanyayê û bi  
darî Hitler ket û wer dixuye ko elman û fren-  
sîz li ser hin tiştan li hev hatin. Ev lihevhatin  
ingilîz û emêrikaniyan dixeyidand; û ev her du  
dewlet li Frensê radibûn. Ingilîzan bêbextî bi  
aliyê Frensê ve dida. Xulass navbera van her  
du hevalbedên kevin roj bi roj vedibû. Wer xuya  
dikir ko dilê ingilîzan heye ko frensîzan biêşîne.

Li meha gulanê şer nemezê di behir û di hewan  
de çêbû; hêj rastir di ezmanan re daket bejê.

Piştî şikestina Yewnanistanê qral digel hikûmeta  
xwe li girava Giritê qerar girti bû. Ji ber ko  
Girit ji beja Yewnanistanê dûr e; û derbasbûna  
behîrê ji elmanan re zehmet e. Hin eskerê ingilî-  
zî ji derbasî Giritê bû bûn û digel yewnanan  
girav asê dikirin.

Li 20ê Gulanê, elmanan bi balafirvan dirêji  
Giravê kir; û herçî balafirgeh û asêgeh in dane  
ber bomban. Ingilîzan digel yewnanan bera elman-  
nan dida. Stola ingilîzan ya behîra spi di dora  
giravê de digeriya û bera balafirvan didan.

Digel ve hîndê, elmanan di nav sê rojan de bi siwanan qedereî deh hezar esker daxistin erdê Girîtê û di hin cihên giravê de asê bûn. Şereki no di navhera elman û ingilîzan de çêbû. Piştî ko lingê elmanan di Girîtê de erd girt talyanan ji hin eskeran giravê; û şer dwanzdeh rojan dom kir, û elmanan Girît vegirt.

Di meha Gulanê de li Etlantîkê ji şereki mezin çêbû. Beriya niho şerê Etlantîkê; şerê noqaran bû. Noqarên elmanî dirêji vaporen ingilîzî yê ko çek û zad tinin, dikirin.

Li 20ê Gulanê di Etlantîkê de hin cenkeştiyên ingilîzî û hinên elmanî rasî hev hatin. Cenkeştîya elmanî Bismarkê bi 35000 tonî cenkeştîya ingilîzî Hüt bi 42000 tonî bin av kir. Lê ingilîzan dan pey Bismarkê û piştî sê rojan Bismark xerîqandin û heysa Hûta xwe hilandin.

Li Efrîqê, di çada Selonê de şer heçko sekini ye. Lê li Hebeştîstanê talyan dişkên û ingilîz didin pey. Wer dixuye ko gelek najo li erdê Hebeştîstanê talyanek ji namine.

Di vê mebê, yanî di meha Hizêranê de şer ket welatê Sûriyê jî. Herweki me gotî bû ji her ko hukûmeta Merêşal nîzîngî li elmanan dikir Ingiltere jê ne razî bû. Bireki frensîzan ji digel ingilîzan bûn. Ji wan re «golîst» digotin. Ji her ko navê mezinê wan general Degol e. Ew bi navê Frensa serbest an aza jî bi nav dibîn.

Di babela şerê Iraqê de me gotî bû ko elmanan bi balafrînan arîkariya iraqîyan kiri bû. Ew balafrî di ser Libnan û Sûriyê re derbas dibûn diçûn û ji bo standina benzînê jî datanin balafrîgehên van welatan. Piştî ko ingilîzan iraqî çêkirin ew balafrî disan di riya jorin re vedigeriyan û diçûn wargehên xwe.

Ingilîzan ev tişt ji frensîzan re hêncet digert û gazîd ji wan dikir û digot ko hin balafrînan elmanî di balafrîgehên Libnan û Sûriyê de dimînin. Bi ser ve zêde dikirin û digotin ko elmanan esker derêxistine Lazqiyê. Hikûmeta Merêşal derew bi aliyeî wan nûçeyan ve dida.

Balafrînan ingilîzî li balafrîgehên Şam; Heleb û Riyaqê dixistin. Edî xuya dikir ko ingilîz û frensîzên golîst wê dirêji Sûriyê bikin. Li 5ê Hizêranê general Denz ji Radyowa rohelat ji frensîzên Libnan û Sûriyê re nişkek got û ji wan re da zanîn ko heke ingilîzan dirêji Sûriyê kir ordîwa rohelat wê dest bibe xwe û bera wan bide.

Li sibeha 8ê Hizêranê bi şeqê ve ingilîzan û frensîzên golîst ji aliyeî nivro lîxistin û derbasî axên Libnan û Sûriyê bûn. Şer dest pê kir. Sibetirê dengê topan ji Şamê dihat bibîstin. Lê ingilîzan digot dilê me nîne em li frensîzan xin; armanca me derêxistina elmanan ji Sûriyê ye; û tekliîfî frensîzan dikirin ko bê şer teslim bibin; û ji lewre hêdî hêdî bi pêş ve diçûn. Lê frensîzên hikûmeta Vişiyê ji ya wan ne dikirin. Ji lewre şer dom dîke. Li behrê û li hewayê jî li hev dixin. Ingilîzan di bakur re ji ketine erdê Sûriyê û berê xwe dane Tîdmîr û Déra-Zorê. Ji milê din hatin pêşiya Bêrûtê jî.

Li 21ê Hizêranê wextê nivro eskerên ingilîz û frensîzên golîst ketine Şamê û eskerên hikûmeta Vişiyê xwe jê dane paş.

Di warê siyasetê de jî bûyereke girane hate pê.

Li 18ê Hizêranê li Enqerê tirk û elmanan tifaqeke nelihevîstîne imza kirin. Herweki me di jor de gotî bû Tirkîye hevalbendê Ingilîterê ye; ji lewre dinyayê li vê tifaqê ecêbmayî ma. Lê tirkan da zanîn ko bi vê tifaqê hevalbendiya wan bi ingilîzan re xerab nabe. Disan tirkan ji ingilîzan re got ko tucaran nahêlin eskerên biyani di erdê wan re bihorin.

Li 22ê Hizêranê şereki nû dest pê kir. Şerê ûris û elmanan. Herweki xwendevanên me dizanin û me jî li jor gotî bûn. Uris li ingilîzan qulipi bûn û ketî bûn tayê elmanan û bi wan re tifaqeke nelihevîstîne jî imza kiri bûn.

Lê Hitler bi hênceta ko Uris li ser gotina xwe nasêkinin gub ne da tifaqa nelihevîstîne û dirêji welatê ûrisan kir. Romanyê jî bi elmanan re dirêji ûrisan kiriye. Welatê ûrisan welateki mezin e; xelkê wî zehf in. Bivê nevé di navbera ûris û elmanan de şereki mezin wê çêbibe; û herçî dijminên Elman in wê bibin hevalên Uris.

Şam: 23 Hizêran 1941  
NÊREVAN

## KURD YEK IN

### ŞAGIRDÊN SÎNIFEKÊ WEK ZAROYÊN MALEKÊ NE

— JI BO PIÇŪKÊN KURDAN —

Dihi, piştî nivro, gerinendeyê me bi kurîkeki piçûk kete sinîfa me.

Cilên kurîk paqij, rûyê wî esmer û çeleng, porên wî reş bûn. Çavên wî ên kesk dijirîstîn û mêraniya Kurdên jorin li rûyê wî dixistin.

Gerinende, bi mamosteyê me mirza Feridûn re bi dengêki nizm axaft; derket û çû.

Kurîki nih hati li me bi tîrs dinêrî. Mamoste rabû, bi destê wî girt û gote me: «Zaroyên min! divê hon iro pir kêfxweş bin! Niho ji we re ji kurdên jorin hevalek tê. Ew li Mûşê hatiye dinê li ciyekî dût; ji kenarê bakurê Kurdistanê. Qedrê wî bigirin ji her ko ev kurê ciyekî Kurdistanê ye ko ji nîlet re mirovên bi nav û deng, xebatkarên baş, û leşkerên heja bixwedî kirine û iro ji dike. Heji wî bikin kurên min! Da ko ew xerîbiya xwe neyîne hira xwe. Da bizane ko zarokeki kurd li her dibistana kurd, û li her derê Kurdistanê ji xwe re zû hevalan û bran pêda dike.»

Paşê mamostê li diwarî, li ser xerîteya Kurdistanê Mûş şantî me kir, rûnişt û bi dengê xwe ê ahengdar banî Gurgînê Reşo kir.

Gurgîn ji ciyê xwe derket, çû li her mamostê rawesta. Mirza Feridûn gotê: «Gurgîn! di sinîfa xwe de tu ê pêşin i; divê tu bi navê sinîfê û bi navê piçûkên kurd ên Cezîrê silava xêrhatîne li hevalê xwe ê nih bikî!»



## JINA MILET

Şêxê kurdan, ferz e ser we, jiyina millet, wek  
[selat ;  
Şert û bendan bes bikin ; qebqeb nekin  
[wek kewrebat  
Şerme bo we, hon fehê nakin dixwin  
[xeyrên welat  
Xwe nekin bo sofîyan her wek'ize, pût û lat  
Xwe bikin wek aliyê şer rab'ne bo millet û din  
Mîr û begler naketin mejan û naçin camiyan.  
Herçî şêx hez naketin, mensûr be millet  
[tev melan  
Ey geli kurdan, binêrin mane em wek sêwiyan  
Xwe bikin yek, da biçin em, cem Celadet  
[Kamiran ;  
Bo bikin çare ji bo vi milletê b'ax û enîn.  
Bo Xwedê, hon bibne yek, terk bikne wan  
[bend û şera  
Rabne ser xwe da bixwînin sûretê «Alem tera»  
Mîletê kurd amirê «ma'rûf û nehya minkera»  
Ka dema ko ez bibînim vêkevit bo me çira!..  
Ta qiyamet, ez bi hesret, dilpijan û dilbirin...  
Ey geli şêx û egidan, tev li axa û melan ;  
Ma Xwedê gotiye millet hon bixwin her wek  
[guran ;  
An dibêji ceng û bendan rast bikin wek  
[dijminan  
Yan bi xîbet û nemîmet hon bikin paşgotinan  
No, dibêji bibne wek avaniyek, gêçirmeyîn.  
Rabne bo millet û dîne xwe biçûk û hûr û gir,  
Hon bi yek bin çêtir e, bo we ji top û balafir  
Paleyê dijmin /nekin, û neb'ne rençber,  
[bibne hur ;  
Heye deh milyon nifûsa me kurmanca zêdetir  
Qet tunne kes ko kurdan bikne yek û  
[bicivîn ?!..

### M. MASÛMÊ HAMIDÎ

Gurgîn zivirî û bi dengê xwe ê ziz gote mûşî:  
«Tu bi xêr hati brayê delal ! Xwe bihin fireh  
bike ! Ev der ji welatê te ye ! Em gi bra û  
yar in ! » ew himbêz kir û her du bînarikên  
wî maç kirin.

Ji kêfa, me li çepikan xist mamoste ji  
şa bû, mûşiyê piçûk ji dikenî. Mîrza Ferî-  
dûn ciyek şanî mûşî da û ew rûnand.

Mûşî hin nih rûniştî bû ko ji her derê  
sinifê jê re qelem, defter û kaxez hatin.  
Kurikeki ji Silêmaniyê jê re resmê seraya  
Silêmaniyê şand ; min bala xwe da ; ala  
rengin di ser re pêl dida û diçirisi.

### DERKETIKÎ DÊRSIMÎ

## JI XORTAN RE

Rudyard Kipling şair û feylesofê inglîzî  
şîret li xortan kiriye û gotiye :

— Te dit ko xelk di dora te de şaş bûn  
û ji te re dibêjin tu ji şaşî ; guh mede wan.

— Ko xelk ji te kete şikê, tu ji xwe ba-  
wer libe, û guh mede gotina wan.

— Heke dikarî bendewar bibi û ji bendewa-  
riyê bêzar nebi ; ko xelkê derew li te kir  
tu hergav bide ser rîya rastiyê.

— Heke xelkê ji te nefret kir tu ji wan  
mexeyide

— Xeyalan bike lê wan ji xwe re meke  
xwedi.

— Baş biükire, lê fikrên xwe ji xwe re  
meke serêş.

— Serdestî û hindestî, van her du xapino-  
kên ha wek hev bizane û xwe bi wan mede  
xapandin.

— Heke gotinên te ên rast derew derê-  
xistin û gotin ko tu xelkê dixapini tu guh  
me de wan.

— Bi salan ve dixebiti, xwediye tiştan  
dibi, pişt re, rojekê wan giş winda dikî û  
ji nû ve ji bo pêk anina wan dixebiti.

— Divê bikarî malê xwe giş bi carekê de  
bavêji hat-û-batê û bêji : Min da an min  
bir. Û ji çûna wî tu keseran nekişini û bi  
agireki xurt xwe ji nû ve bidî xebatê.

— Dil û laşê te ji mêj ve westiyane ; lê  
di giyanê tê de bêj liştek heye û nav di te  
dide û dibêje : Xebat, xebat ... û te davêje  
xebatê, dest bibe xwe.

— Bi mirovê kêm re te da û stand rû-  
meta xwe winda meke.

— Ko bi şêx û axan û dewlemendan rabû  
û rûniştî, bala xwe hîde hişê rastiyê ji te  
nebit.

— Ne ji dijminê xwe, ne ji ji dostê xwe  
ê delal meêşe.

— Qedirê her mirovî bigirê lê behayê wan  
zêde melhesibîne.

— Ji demên jiyina xwe deqîqê ji bê kar û  
havil derbas meke.

— Ko tu ketî ser şêst û pêncan ji xwe bide  
xebatê wek xortekî bist û pênc salt.

Heke tu bi şîretên min ên jorin ve çuyî,  
hingê dinê û tiştên wê dikevin destên te û  
tu dibi mirov, kurê min.

### NÛREDÎN ÛSIF

## RABÛN Û RÛNIŞTIN

Kurd gelek bi edeb û terbiye ne. Rabûn û Rûniştina wan, dan û standina wan bi rêz û tertîb e. Kurd nazik, giran û bi edeb in. Xwediyê gotina xwe ne; paşgotiniya xelkê na kin; dostê dostê xwe, û dijminê neyarê xwe ne.

Pir na xêvin, gotina xwe bê sebeb dirêj na kin, gava erê dibêjin erê ye û gava no dibêjin no ye. Beriya ko tişteki bêjin; wi tiştî xweş didin eqlê xwe û êdi ji gotina xwe bi şûn da venagerin; heke wad dan posman na bin; bi dilxweşi û ciwamêri wada xwe tinin cih.

Qeşçî û xirabiya ko ji wan re hate kirin, ji bir na kin; heke dijminê wan kete bextê wan, di sûcê wi diborin.

Lê ez dibînim, hinên di wan, rêz û rêzîkên bav û kalên xwe ji bir kirine û bi adetên miletên biyani ên nexweş emel dikin. Ev tişteki ne çak e, xerab e. Divê mirov dev ji adetên bav û pêşiyên xwe ên qenc bernede.

Tenbî û qeydeyên jêrin ji bona wan in: Gava ji keseki tişteki dixwazin, me bêjin — bide min —, lê bêjin — ji kerema xwe bide min.

Ko ji we re tişteki hate dan - spas - bêjin û pê dilxweşi û mineldariya xwe bidin zanin. Gava kesek ji we tişteki dixwaze û — kerem ke — dibêje, lê vegerinin û bêjin — di nav keremê de bimîni.

Heke kesekî banî we kir; lebê an fermû, an ez xulam, ez benî, ez gorî, ez qurban bibêjin. Kurd hemî wisa dibêjin.

Ko kesekî ji we tişteki pirsî - erê - an - no -, yan dizanim an nizanîm bêjin; bi, ha me bêjin û serê xwe mehejinin, ev kêmasiyek e. Gava hon tişteki vedixwin, bi edeb û isûl vexwin; hêdi, hêdi û bédeng bikişinin; yên dora xwe aciz me kin.

Wadê hon li ser xwarinê ne û parî di devê we de ye. Milçe milç û çelq û çelq me kin: Heke hon di civatêkê de, di nav xelkê de rûniştî ne, bi qirpe qirpa qirika xwe kari bin, hevalê dora xwe aciz me kin, nemaze ev tişteki pir eyb e; kêmaniyeke mezin e.

Pêşbiri li jin û zarokan me kin; rê li wan me birin.

Wadê hon daxêvin, dengê xwe bilind me kin û heke mirovek dipêyive, gotina wi me birin û beriya ko ew gotina xwe biqedine, dest bi axaftinê me kin. Her rastiye bibêjin; derewker rûreş in.

Dest û tiliyên xwe me kin dev û difn û guhê xwe û wan pê paqij me kin.

Wadê hon dikuxin an dibihnijin, destê xwê û hêj çêtir destmala xwe bidin ber devê xwe.

Li erdê tif me kin. Goşt û xwarina ber diranan tû me kin erdê. Ariya cigara xwe, di nav civatê de, me weşnin erdê.

Li zaroa me din, wan pir me êşnin; wan tirsîyandî û çavşkênandî me kin, ew pê derewin dibin.

Çiqas ji bixeyidînin dijûna me kin; xeberên xerab me bêjin.

Bê sebeb sond me xwin; hê îşeki giran xelkê me din ber sonda.

Di nav axaftinê de, bi serê bav û pêşiyê xwe sond me xwin û bi serê bav û kalê xelkê û gora wan ji sond me xwin; ev tişteki zehf kirê e.

Gava ko hon tèn malekê û banî we dikin ser xwariyê, bi derew me bêjin em têr in; û werin ser sifrê.

Wadê ji we tişteki tê pirsîn; xweş bala xwe bidin heta ko hon bikarin cihabê lê vegerinin.

Gava kesek ji we re tişteki dibêje an qise dike, bi lez û bez me bêjin ez dizanim; guhê xwe bidin ser galgala wi; bi bala fireh mirov hêj çêtir dihelme.

Ern û bihîntengi tiştine neqenc in; nemaze li ber mirovên qels û belengaz û jin û zaroa; dilşikestina wan kêmasiyek e.

Çavsorîya xwe li xurtan bikin, li yên di ser xwe re bikin; ne li yên di bin xwe re, ne li yên kêmi xwe.

Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

## FERHENGOK

DÛPAŞ (n) — Birê bêjeyê ê guhêrbar. Di bêjeya «ketin» de du bir hene «ket» û «in» «ket» rayek û «in» dûpaş e; û ev dikeve şikilîne din û diguhêre: Ez ket - im, tu ket - i, ew ket - in [Terminaison].

FOLKLOR (m) — Ev bêje di eslê xwe de îngilîzî ye. Lê îro ketiye hemî zmanên dinyayê. Ji lewre me jî ew xistiye zmanê xwe. Ji xwe kurdên Qefqasê heriya me ev bêje xistine zmanê me û kitêbek bi navê «Folklorê Kurdmançî» belav kirine. Folklor tevayîya adet, çirok û stranên miletêki ye. Ew adet, çirok û stranên ko ji nav xelkê bi der ketine û di dora nişan de bi ser ve ketine û gihaxîne nişan nû. Ji xwe bêjeyê folklorê bêjeke bihevketî ye û bi mana zanin an zanîtiya xelkê ye. [Folklore]

GUHÊRBAR — Tiştê ko di hal û şikilêki de namîne, diguhêre û dikare biguhêre. Ev bêje guhêbar e. Yanî şikilê wi diguhêre û di balekî de namîne. Herwekî bêjeya «bajar». Ez ji bajarê tem. Tu vî bajari dibîni. Ez van bajaran dibînim. [Variable]

Rayek (n) — Birê bêjeyê ê neguhêrbar. Di bêjeya «ketin» de «ket» rayek e û tucaran naguhêre. Ez ket - im, ew dê bi - ket - a, ez ket - i - biwam. ew ket - i bû. [Radicale]

FERHENGVAN



## BINGEHÊN GRAMÈRA KURDMANCI

BI NAVÊ YEZDANÊ PAR Ê DILOVAN Û MIHRVAN

— 4 —

35 — Hevenav û serenav. Navdêr di nav xwe de û di bingehî de bi du biran leva dibin: bevenav û serenav.

36 — Hevenav. Hevenav ji wê navdêrê re dibêjin ko ji yeki bêtir kes, heywan an tiştan dinimîne û wan bi hev re bi nav dike. Herweki rêwî, hesp, çiya. Bêdiro, gava em rêwî dibêjin; ev bêje navê her mirovî ye ko bi rê ve diçe. Bêjeya hesp ji welê ye; pê herçî heywanên wi cisnî hene têne seh kirin. Bi bêjeya çiya herçî bilindcihên dinyayê hene ko ne gir, ne mitik in û ji wan bilintir in têne birê. Ev in çend hevenav: «Şagirt, xani, evor, mase, can, binahî, derzi, kerî, pez, kevir, dar, qenci, xelk, ziwan, keskesor, navro, girav, şeh»

37 — Serenav. Serenav ew navdêr e ko bi tenê keseki, heywaneki an tişleki dinimîne û xweserî wî kesî, wî tiştî an wî heywanî ye. Herweki: Sado, Bêlan, Herekol. Ev navdêrên ha yeko yeko xweserî miroveki, seyeki û çiyaki ne. Ev in çend serenav: «Hevind, Sipau, Xabûr, Hindistan, Hezro, Kerevon, Zin, Dêrgul, Kurdistan, Agîrî, Cemşid, Ferezende».

### GUHÊRBARIYA NAVDÊRAN

38 — Navdêrên zmanê kurdmanci ji du awîrên tével ve guhêrbar in: zayend û mêjer. Ev guhêrbariya navdêran bi tewangê têtê pê. Bi gelemperî dûpaşê navdêran li gora zayend û mêjerê wan diguhêrin. Carina ji ev guhêrbari bi guhêrina tîpeke rayeki têtê pê.

39 — Zayend. Di zmanê kurdmanci de du zayend hene: mê û nêr.

40 — Zayendê nêr. Navên mirov, heywanên nêr û navên tiştîne nerihber yên ko kurdmancan ew nêr hesabandine, tev de ji zayendê nêr in. Wek: «Cemşid, mês, nêrî, ga, xanî, gir, Ferat, can, beran, Xurşid, derî, êzing, hiş, çem, kevir, law, dirhav».

41 — Zayendê mê. Navên jin, heywanên mê û navên tiştîne nerihber yên ko kurdmancan ew mê hesabandine, tev de ji zayendê mê ne. Mina: «Stnemxan, jin, meh, dar, çêlek, mehîn, tîfing, hizin, bîr, gol, pehnav, Herekol, Hezarom, co, enî, top, ejnû, Kurdistan».

42 Navên heyberên rihber. Di heyberên rihber de, carina mê û nêrê wê heyberê bi bêjeyîne cihê û biserxwe têne nişan kirin. Herweki di bêjeyên jêrin de:

Bra	Xweh
Pismam	Dotmam
Bûra	Diş
Kur	Keç
Brazi	Brazê
Hesp	Mehîn
Yekane	Mehû
Beran	Mih
Nêrî	Bizin
Dik	Mirişk

Lê gava ew heyber bi awayê jortn, bi bêjeyîne biserxwe û cihê ne binavkiri ne, hingê bêjeyên «mê» û «nêr» bi ser wan ve datnin û bi vî awayî zayendê wan, yanî mê û nêrên wan didin zantn. Di vî şikilî de veqetandekê dikeve navbera bêjeya rayî û bêjeyên «mê» û «nêr». Veqetandek bi xwe ji zayendê wan şani dide. Wekî niho:

kewê nêr	kewa mê
kerê nêr	kera mê
pisingê nêr	pisinga mê
sixurê nêr	sixura mê
hirçê nêr	hirça mê
gurê nêr	gura mê
filê nêr	fila mê
kevroşkê nêr	kevroşka mê

43 — Qeyda jorin, qeyda gelemper e. Yanî mê û nêrê heyberên rihber, nemaze heywanan, bi gelemperî bi vî awayî têne nişan kirin. Lê kêman caran û ji vî qeydê der, bêjeyên «mê, nêr, dêl, mak, mang» dikevin pêşiya bêjeya rayî û bêtî tu tiştî bi wan ve dibin; bêjeke nû û bihevketî diti-nin pê Hingê ew bêje bi hev ve têne ni-visandin. Herweki: «nêreker, maker, mê-kew, dêlegur, mange»

Şanek — Zayendê heywaneki, carina, bi veqetandek û tewangê ji têtê nişan kirin. Gava em dibêjin: «hespa min bine» an «kera min bine» xuyaye ko em qala mehîn û makerê dikin. Dîsan gava em dibêjin: «ez li hespê siwar bûm» an «ez li kerê siwar bûm» gelek kifş e ko heywanê ko em lê siwar bûne «mehîn» an «maker» e û ne «hespê nêr» û «kerê nêr» e.

(dûmalîk heye)

C. A. BEDIR-XAN





## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelnine Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Btyîşa Pêxember, Bi Kurdiya dumill, bi dibaca C. A. Bedir-Xan.
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan.
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re C. A. Bedir-Xan.
- 7 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikitîn.
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan.
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 10 — Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 11 — Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 12 — Dersên Şerietê Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 13 — Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 14 — Proverbes Kurdes. Medhelokên Kurdî. Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-Xan Paris - 1937.
- 15 — Le roi du Kurdistan. Qralê Kurdistanê. Emir K. A. Bedir-Xan û Adolphe de Falgerolle. Paris - 1937.
- 16 — Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdistanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel Berlin - 1937.
- 17 — Der Schnee Des Lichtes. Berfa Ronabiyê. Şibrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937.

## Kiryariya Hawarê

Salt	500	Qirûşên Sûrî
Şeşmehi	300	Qirûşên Sûrî
Sêmehi	200	Qirûşên Sûrî

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar: Mir Celadet  
Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emir Djéladet Aali  
Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 9  
HEJMAR 31

IN  
1 TEBAX 1941

# HAWAR

ANNEE 9  
NUMERO 31

—  
VENDREDI  
1 AOUT 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARÊ

Tefsira Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Mirina Guri	C. A. Bedir-Xan
Dîk û Rovi	Osman Sebri
Behramê Gor	Cegerxwin
Navên Kurdmanci	Bavê Cemşid
Dinya Tarî	M. Ehmed Botî
Delaliya delalan	Seydayê gerok
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Diljariyek	Heşyar
Gramêra Kurdmanci	C. A. Bedir-Xan
Patzok	Stranvan

## BIRÊ FRENŞIZÎ

Chant d'automne .....



ŞAM—1941  
ÇAPXANA SEBATE



## TEFSIRA QURANÊ

114 - Ji mirovê ko di mizgeftên Xwedê de dibe mania anîna navê Xuda û avahiyên Xwedê hildiweşîne, ma jê zalimtir kî heye? Gava ew zalin dixwazin bikevin mizgeftan, bê lertz û tirs, nî karin derbasî hundirê mala Xuda bibin. Ji wan re di dinyayê de rûreştî û perîşanî û di axiretê de eza-bekî mezin heye.

115 - Xuda xudanê rojhelat û rojava ye. Hon berê xwe ber bi kû ve bidin ji, rûyê Xwedê li we ye. Qenci û piyariya Xwedê mezin e; û ew mirazê dilrastan dizane.

116 - Cuhî, file û din-nezana got: Xwedê yek ji xwe re kiriye law... Gotina wan nagihe bilîndiya Xwedê. No... ya rast ew e ko heçî di erd û ezmanan de ne; evdên Xuda ne û guhdariya emrên wî dikin.

117 - Xuda xaliqê erd û ezmanan e. Gava xwedê bi çebûna tişteki dil dîke, jê re dibêje: Bibe û ew çêdibe.

118 - Nezanan digot: Ma çî dibû, heke Xuda bi me re biaxfta û ji te delîlek ji me re bidaya. Pêşiyên wan ji wisa digot; heye ko her du ji weke hev in. Me ayetên xwe pêş mirovên bawermend kirine.

119 - Peyxemberê min... Me tu, bi dîn û Quranê rêkiriye heta ko tu ji mirovên bawermend re mizgîniya xweşiyê bidî û ên mayîni bi ezabî bitirsîni. Ji te halê dojeketiyên naye pirs kirin, halê mirovên ko li ser rîya xwe a xwar pê didin erdê.

120 - Pêxemberê min... Heta ko tu

ji Cuhî û Fileyan nebi, ew ji te dilxweş nabin. Bêje wan: Rîya rastiye ya Quranê û misilmaniyê ye û jê pê ve tu rê nîne. Piştî dahalina Quranê û hikmên di wê, heke te li gora gotina wan bikira, tu êdî ji destê ezabî xelas ne dibûyî û tu kesî ne dikarî bû te jê bifilitîne.

121 - Yên ko... Kitêba ko me-daye wan rast dixwînin, guhdariya hikmên wê dikin û emrên di wê bi cih tinin ew pê bawer bûne.

Lê yên ko hikmên kitêbê inkar dikin an diguhêrin ew dibin kafir û ew dikevin xisarê.

122 - Gelî lawên Israîl... Qenciya ko min bi we re kiriye binin bira xwe; min kal û kalikên we ji hemî mîletan çêtir girti bû.

123 - Ji wê rojê bitirsin ko kes tê de nî kare arikariya kesî bike û dayîna berdîl û mehdera yekî ji yekî re naye qebûl kirin û hon tê da bêarî wê bimînin.

124 - Wê demê binin bira xwe... Xuda bipêkanina emrên diyanetê ji Ibrahîm re emir da û ew pê ceriband. Ibrahîm her hikmên Xwedê pêk ve anî. Xuda jê re got: Ezê te bikim nimêjgeh. Ibrahîm got: Lê çeliyê min? Xwedê lê vegerand û got: Ez hextê xwe na dim zaliman.

125 - Dîsa binin bira xwe... Me Kabe dergeh û cihê civandina xelkê û ewlegehê wan kir. Meqamê Ibrahîmî ji, ji xwe re bikin nimêjgeh. Me emrê xwe da Ibrahîm û Ismaîl heta ko ew hundirê mala Xwedê her paqij bikin ji bona tewafker û rûxistiyên di wê û ji bo bawermendên ko tê de xwe ji Xudayê xwe re ditewinin û lê secde dibin.

126 - Dtsa binin bira xwe ... Ibrahm got: Xudané min vi bajaré ko min ava kiriye ji xelké wi re bike çihéki ewle ú ji xelkén di wi heçt ko baweriya xwe bi Xuda ú roja piştdawiyé anîne, ji hatinén vi bajart qwit bide. Xuda gote wi: Ji wan pé ve ezé ji kafiran re ji tişteki kém bidim, lé pişt re, di roja piştdawiyé de, ezé wan béxim ezabé agiri, ev çüyina wan ber bi agiri ve, çî çüyineke giran e.

127 - Binin bira xwe ... Gava Ibrahim ú Ismail himé Kabé danin, gotin: Xudayé me .. Ji kerema xwe, ji me vé avahiyé ji xwe re qebûl bike, ji ber ko tu diayén me dibihisi ú daxwazén me dizani.

128 - Ibrahim ú Ismail gotin: Xudayé me, ji kerema xwe, me ji xwe re bike misilman ú ji imetén me ji bike mileteki misilman ú emrén xwe li ser ibadeté ji me re bide zanin, em ji ji gunehén xwe tobe dikin ú dikevín bexté te. Tu toban didi ú toban qebûl diki, tu mezin ú piyar i.

129 - Xudayé min ... Ji kerema xwe, ji çéliyé min é bawermend pëxembereki bibijéré ú ji wan re bişine heta ko ew kitêb ú ayetén-te, ji wan re bide zanin ú wan ji gunehan paqij bike. É delal ú zana, é mezin ú piyar tu i.

130 - Ji nefş - sefihan pé ve, tu kes xwe ji millet ú diné Ibrahim nade paş; me di dinyayé de Ibrahim kiriye réberé riya rastiyé, ew di axireté de ji, ji biré qencikeran e.

131 - Gava Xudané wi jé re got: De nefa xwe teslimi min bike ú bihe misilman: wi got: Min nefsa xwe teslimi Miré Mirazan ú Xudayé erd ú ezimanan kiriye.

132 - Ibrahim ji kurén xwe re wesiyet kir ú Yaqûb ji ji lawén di xwe re got: Xuda ji we re, weke diné rastir, diné misilmaniyé bijart ú da, beré mirina xwe divé hon baweriya xwe bi genci ú mezinahiya wi binin.

133 - Gava mirina Yaqûb nîzik bû ma hon li nik wi bûn? Yaqûb gazi Kurén xwe kir ú ji wan re got: Piştî mirina

min honé perestişî çî bikin? Wan got: Emé perestişé Xudayé te ú kal ú kalikén te Ibrahim, Ismail ú Isheq bikin, ew Xudayé ko yek e, bê hevber ú hempa ye; em bi wi re dilpak in ú em xwe davéjin bexté wi.

134 - Ibrahim ú Yaqûb ú çéliyén di wan derbas bûn çûn, ew ji emelén xwe ú hon ji ji emelén xwe berpirsiyar in; pirsra emelén di wan ji we naye xwestin.

135 - Cuhuyan ji Misilmanan re got: Bibin cuhi; Fileha ji wisa got. Tu ji wan re béje: Em ji her diwan ji nabin, em didin ser riya Ibrahim a rast, Ibrahim tucaran ji mişrikan ne bû.

136 - Geli bawermendino .. béjin: Me baweriya xwe bi Xwedé ú bi Qurana ko ji me re dahat ú bi kitêbén ko ji Ibrahim, Ismail, Isheq, Yaqûb ú ji élén di wan re nazil bûn ú bi Tewrat ú Incila ko ji Mûsa ú Isa re ú bi kitêbén ko ji hemi pëxemberén Xwedé re dahatine anîne ú em tu ferqé na xine nav bera wan. Em rastdil in ú em ketine bexté Xwedé ú nefsa xwe spartine wi.

137 - Heke Cuhî ú Filan mina we baweriya xwe anin; bi kerema Xwedé ew ji dikevín ser riya rastiyé. Lêbelé, heke wan serhişki kir ú xwe ji baweriyé bi şunda dan édt aşîkar dibe ko ew na din pey rastiyé. Pëxemberé min! Xirabiya wan na gihe te, dev ji wan berde, Xwedé bési wan e, ji heqé wan derté. Xuda dibihise ú dizane.

138 - Geli bawermendino ... Bibéjin ... Em tabién diné Xuda ne, ma ji diné wi çetir çî heye? Em perestêşkaré Miré Mirazan e.

139 - Pëxemberé min ... ji wan re béje: Ma hon di heqé Xwedé de berberiya me dikin? Ew Xudané me ú we ye. Em ji emelén xwe, hon ji ji yén xwe berpirsiyar dibin. Em bi dilpakt perestêşkar ú secdekaré wi ne.

Nisanek - Di destpêka ayeta notî de xeletek çêbûye; li şûna "ewan ji dexsa xwe", "ew ji dexsa xwe" hate çap kirin. Dr. K. B.

Ji bona Tefsira Qurané k. k. ú li hejmarén 27, 28, 29 ú 30 fedkirin.



# HEDISEN

## CENABÉ PÉXEMBER

REHMET Û SILAVA XWEDÉ LÈ BE

216 - Misilmané ko tékill xelké dibe ù derdé wan dikişine ji yé ko rûyé xwe ji wan diguhérine ù li ber derdé wan na keve çétir e .

217 - Ji Xwedé bitirsin ù xwarin ù vexwarina heywanén xwe bidin wan , wan paqij bikin , bé sebeb wan me westinin ù me éşinin ; ta ko bikéri xebat , siwar bân ù şerjêkiriné bèn .

218 - Ji Xwedé bitirsin ù di heqé zaroyén xwe de qenc ù adil bin .

219 - Bi qenciyeke , bi dana ntv xurmeyeké ji be , xwe ji agiré dojhé biparézín , sedeqe mirovan ji agiré dojhé diparéze .

220 - Kafir ji be , ji nifirén bésúcán bitirsin , di nav beyna wan ù Xwedé de tu perde nîne .

221 - Ji eqilmendiya bawermendén pak bitirsin , di çavé bawermendán de roniya Xwedé heye .

222 - Xwedé di roja qiyameté de li du texllt mirovan na neyire , yén ko qedré mirovén di xwe ni zanin ù li wan na gerin ; li gora bayé seré xwe dimeşin ù ji yén ko çiranén xwe aciz dikin , qenciya wan vedişérin ù xirahl ù kemasiyén wan ré xelké didin .

223 - Dido ji yeké , sisé ji didowan ù çar ji siseyan çétir in , ji civan , yekbân ù yekitiya xelké hez bikin . Xwedé xelké di dora yekitiya xwe de dicivtne .

224 - Ji heft tiştén neqenc ko xelk pé diçin helaké xwe biparézín : Ji mişrikiyé , ji sibirbaziyé , ji kuştina xelké béré , ji xwarina malé séwiyán ù faizé , di şer ù qewimandiné de ji bazdané , ù ji kém kirina qedré jinén xwedé namûs ù ji paşgotiniya wan .

225 - Dest ji zinaya ko Xwedé heram kiriye bikiştin , heke we ew kir emelé xwe ji xelké veşérin ù tohé bikin , heke hon mikur hatin honé bène recimandin .

226 - Ji dinya we sé tişt bi min xweş in : pirek , bihna xweş ù mirovén nimêjker .

227 - Xwedé hindik ji be ji wé xebaté hez dike ko roj pé de tété çêkirin .

228 - Xwedé bert her tişti ji cihanina ferzén diyanneté ù di pişt re ji wé kari hez dike ko mirov pé dilé xelké şa dike .

229 - Ko hon hatine vexwendin herin , diyariya xelké lé vemegerinin ù li xelké me din .

230 - Heke heq ù rast bû ko hon li miroveki hidin li rûyé wt me xin .

231 - Ji xelké ne şeba meufeeta xwe lé ji bo Xwedé an ji bona tişteki heq ù rast hez bikin an bixeyidin .

232 - Gotina min a spehltir gotina min a rastir e .

233 - Sifra spehltir li cem xwedé ew e ko xwarinxwerén wé pir in .

234 - Tişté ko ji nefsa xwe re dixwazl ji xelké re ji bixwaze ù tişté ko ji bo nefsa xwe na xwazi ji bona xelké ji me xwaze .

235 - Hevaltiya xwe de bi tevdr be ; heye ko rejeké dosté te dibe dijminé te , dijminahiya xwe de nerm be ; heye ko rojeké dijminé te dibe dosté te .

236 - Li rûyé mirovén ko pesné we didin axé birejinin .

237 - Tişté ko pesinker dixwazin bavéjin devé wan .

238 - Cilén pak ù speht li xwe bikin , li heywanén speht siwar bibin ta ko çavé xelké pé şa biben .

239 - Hej mileté min ji çar adetén dema nezaniyé ne geriyaye ; bi navé bav ù kalé xwe pesné xwe didin ù mirové ko ne ji malbateke mezin in , kémî xwe dibinin ù qedré wan na girin , li stéra dinérin ù didikin pé dema daketina barané bizanin , gava li pé darbesta miriya diçin girt ù şin dikin . Divé ew dev ji wan tišta berdin .

240 - Ko sé mirov tevî hev rûniştine ji wan her şayan dido divé bi dizi ne peyivin ù hevalé xwe pé aciz ne kin .

241 - Gava hon ji xew radibin sé caran desté xwe bişon ù di pişt re dest bavéjin tišta ; hon ni zanin di xew de . desté xwe li kû dattnin ù ji kû hiltinin .

242 - Qedré bavé xwe bigirin an ne Xwedé ronahiya siûd ù xweşiya we ditenirine .

243 - Hakim bi standina mal ù peran zalim ù qazl bi xwarina bertila kafir dibe .

244 - Sé tişt dikarin mileté min bibine helaké : zikmezînl , xewa pir ù betall .

245 - Gava hon tiştikl dikin bi pakdiliyé bikin an ne Xwedé pé qail na be .

246 - Heke tu dewlemend l Xwedé dixwaze ko tu dewlemendiya xwe bi réz ù tertib şant xelké bidî ù pé arikaiya wan biki Xwedé ji mirovén ko dewlemend in ; lé malé xwe ji xelké vedişérin hez na ke .

247 - Xwedé ji mirovén gazinker bez na ke . Mirové ko xwe avétiye hexté te me kuje .

248 Heke hon qenciyeke bixwazin ji mirovén rûspeht bixwazin .

MIRINA GURI  
Adaptation de « La mort du loup »  
d'Alfred de Vigny

Ji GIYANÊ BRAYÊ MIN  
Ê REHMETÎ SEFDER RA

Sefdo, lawecan ! Di sala hezar û neh sed û bist û didowan de em hati bûn Mûnixê. Ez û kekê te kamiran. Em şikiya bûn. Zora me çû bû. Felekê poşike reş kêşa bû ser qedera Kurdistanê. Êdî di warê siyasetê de tu hêvî ne ma bû. Me tev de digot : Zman, xwevdin û nivisandina zmanê me; bi tîpên xweser, bi tîpên kurdî. Belav kirîna kitêb, kovar û rojnaman. Min ji çiyayên Refanê ji te re elfabeke kurdî anî bû. Tu hîni wê dibûyt. Te digot : « Ez gelek kêfa xwe ji şihreke Elfrêd de Vinyî re ditînim : Mirina Guri. Rojekê zê wê wergerînim kurdmanciyê û wê belav bikim ».

Ev deh dwanzdeh sal in, kitêb û kovar bi zmanê kurdî û bi tîpên kurdî têne belav kirin. Lê îcîlekê tu beriya wan belav kiri. Feleka bextreş, mîna Kurdistanê poşike reş û tari kişande ser canê te ê lenik û çeleng ji. Bi hêviya ko giyanê te ê pak pê bihese û pêşa bibe, eve min « Mirina guri » wergande kurdmanciyê û pêşkeşî giyanê te kir.

Ewir, di ber di ser heyvê re,  
Heyva agirgon,  
Bi lez .... derbas dibûn, diçûn;  
Qey dû û dûman bûn,  
Ji şewatê hildihatîn,  
Bilind, wînda dibûn.

Ji me, heta cihê tavikê miriyan,  
Dar û daristan,  
Qurmên daran giş;  
Dixuyan .....

Wek stûnîne reş,  
Çira ma heyveron,  
Geh geh, dibû geh.

Herçî em neçîrvan,  
Bêdeng, lal û ker,  
Me da pexlaxa nerm,  
Pûşê pêlaşa zer,  
Me tev dida, seh dikir,  
Şafir, qizbe, devî, şel.

Hêdî hêdî em diçûn;  
Me rêl velo dikir,  
Em vedihatîn erdê û radibûn ser xwe,  
Ji nigkekê ve me dit;  
Pencine dehbene gir,  
Di axê re çûne; li erdê hûne xelek,  
Me bibna xwe,  
Ji ber xwe çikand û em sekinîn,  
Ser ling û nîvektî.

Hevalektî me î pîr,  
Şexê neçîrvanan,  
Şopgerînektî hêja,

Pîşporektî rêçan:  
Lê vehat, hûr lê mêze kir û got:  
Ev, rêçên gur in.  
Rêçîne nû,  
Belê rêç, ew rêç bûn,  
Rêçên gurên fêris,  
Gurên ko me da bû pey,  
Û me dikir  
Bi bêbextî .....

Di tariya şevê de ...  
Wek dizekine tirsok,  
Bi ser wan de bigirin;  
Û wan ...  
Bidin; ber tîfing û xenceran.

Dor bê deng,  
Ne pejin, ne teq, ne req,  
Tebîet lal û xamûş;  
Bi tenê di ezmanan de,  
Qulingektî virnî,  
Ji refê xwe veqetî;  
Xwe dilezand,  
Û li refê xwe diqortî,

Rêçnasê me î pîr, veketî bû,  
Li rêçan bû bû pebin,  
Rêç seh kir û got:  
Rêçîne teze;  
Gur, dêlik û dû cewrik in;  
Êdî .....

Tu şik ne ma tê de,  
Me xencerên xwe kir kar,  
Tîfingên xwe dagirt;  
Û da rê.

Şax, çiqil .... me ji hev dikir;  
Kelem di bin lingên me de, ditewiyan.  
Ko hil dibûn; li çîp û hêtên me didan.  
Sisê ji hevalên me sekinîn,  
Tîfingên wan biriqtîn.  
Min çavên xwe, girt .... vekir;  
Hûr, li şafir mîze kir,  
Di nav rejûya reş de,  
Du morî diçirîştin,  
Û jê wê ve,  
Çend xeyalên tenik  
Ji bejnan sekinî,  
Qey di heyveronê de  
Bê hay, fertqet .... direqîştin.

Gur, havê mal û malbatê,  
Xwe da bû pêş,  
Di ber devî û dar,  
Çav li dora xwe daşt .... û dit;  
Rê lê hati bû girtin,  
Dijmîn lê bû bû çarnîkar.  
Dêlika wî,  
Hinek jê dûr,  
Li ber zarowan sekinî;

Li méré xwe dinéti.  
 Nêçirvané mé 1 kal,  
 Nav di seyên me dida û digot:  
 Ha Şevger ha .... ka Bêlan ka ....  
 Reşo, tu ji, ji par re ....  
 Beriya ko se lê bêne wer,  
 Gur, stoyê seyeki,  
 Sekî şemboyl,  
 Kire devê xwe û şidand,  
 Şidand, şidand, şidand û berneda,  
 Rêxma ko bû,  
 Ziqziqa xencerên me.  
 Xencer di rûdiyên wî re diçûn,  
 Di zikê wî de,  
 Digihan hev,  
 Û berikên tifingên me,  
 Di tihêla wî re tavêtin.  
 Gur dîsan,  
 Arçûmekên xwe, şidand, şidand, şidand,  
 Lê vê carê,  
 Devê xwe vekir,  
 Seyê şemboyl,  
 Ew heywanê fêris,  
 Beriya gur ....  
 Ket erdê û mir.  
 Gur .... li ser totikan rûnîşt,  
 Xwîna xwe alast,  
 Awirek li me da,  
 Li jin û zaroyên xwe fedkiri,  
 Xatir ji wan dixwest.  
 Û paşê,  
 Erzîna wî lerizî,  
 Çavên xwe girt,  
 Û di xwîna xwe de .... vegevizî.

Min eniya xwe a germ,  
 Berda ser fola tifingê a sar,  
 Û ez,  
 Li vî rastiye dibûm hişyar:  
 Heke dêlik hişte ko méré wî,  
 Bi tena xwe, bêkes,  
 Bê piştmer, bê heval û hogir,  
 Bera san û nêçirvanan bide,  
 Û di xwîna xwe de vegezize,  
 Ne ji her ko tirsîya bû,  
 Û can lê şîrin bû,  
 Lê diviya bû .... ew.  
 Biya gurê piştres, ....  
 Bimîne .....  
 Û ji zaroyên xwe re,  
 Bide zanîn,  
 Ko li dinyayê  
 Ji guran gurtir, ji wan birçitir,  
 Di qesir û sereyan de rûnîştî,  
 Tevayek heye,  
 Jê re dibên mirov,  
 Lê secde dibin,  
 Çi kedî, çî kovî çî hov. ....

## DİK Û ROVÎ

Dikek hebû qiros û xîst, Rabû li ser dîwêr venîst.  
 Roviki jir dik dit li wir Hat cem, silav jê ra dikir  
 Gotê: ninin mizgeft û dêr Fermû were dane li jêr;  
 Îro nimêj min ne kir hêj Bo min bibî tu pêşnimêj.  
 Fêla rovî dik bir dibir, Zanî ko ew dê wî bigir.  
 Gotê: nimêj hîn ne bûye, Bi ser da min destmêj niye  
 Rovî digot: Ca wer xar, Pir in li nik min text û dar  
 Pagekî tu raveke min Li der mane zarok û jin,  
 Ava bikin xanikî çak Bo te bibin gundikî pak.  
 Kês hati bû dikê qiros, Rovî êxist feqê bi los.  
 Gotê: biliv, li pişt dîwêr Kizir bîne ez tême jêr.  
 Rovî berî da cem kizir: Lê herde bû tajikî pir.  
 Da xwe bi lez û bez revî Çû cihekî b'rêl û devî.  
 Gava ko dik halê wî di, Şa bû dikir qiqî qiqî ...

OSMAN SEBRÎ

Lê ew .... ew heytna serfiraz,  
 Ew bi xwe,  
 Cenawirekî we ye,  
 Ne wek cenawirên din,  
 Ne ji nêz û birçinan,  
 Lê ji bo kêf û henek,  
 Dide, her kesî, her tîstî,  
 Ber mirin û kustinê.

Herê, diviya bû dêlik,  
 Bimîne ....  
 Û ji cewrikên xwe re bibêje,  
 Mebin nizing, tucaran ....  
 Avahiyên ko mirov .... tê de.

Ez, şermendeyî heytna xwe, min digot,  
 Em mirov, însan,  
 Digel vî navê bilind,  
 Çiqas nizim û xwar in,  
 Bi tenê hon, heywanên fêris,  
 Hon in ko dizanin,  
 Ji vî jiyîna derewin,  
 Bê deng, lal û ker,  
 Bê ax, zar û nalin,  
 Xwe bidin paş, jê veqetin,  
 Terka wê û her tiştên wê bidin.

C. A. BEDIR - XAN

Şairê « Mirina Guri » Elfrêd de Vinyî edibeke xudan sîr û qelem bû. Bavê wî zabit bû; ewî jî da bû ser şopa bavê xwe û bû bû zabit. Lê ji ber ko firsenda jêr bi dest ne diket; Vinyî piştî ko bû keptîna jî ordîwê derket û xwe yekcar da edebiyatê.

Vinyî di sala 1797 an de di bajarê Loşê de, jî diya xwe bûye. Hêj di ciwanîya xwe de keti bû civata Vîkor Hûgo, Şarî Nodyê û edibên din ên mesin wê heyamê. Ji wê heyamê re di edebiyata frensîz de romantîzm dibêjin.

Vinyî xwe jî alayîşan digirt; xwe gelek têkîlî xelkê ne dikir. Hin eserên Vinyî di pay mirina wî re hatine belav kirin. Esera wî « Dafnê » bi'îtanê di sala 1913 an de keliye çapê.

Vinyî di sala 1863 an de jî seretane emrê Xweda kir û qedirê wî piştî mirina wî çêtir bate girtin. Mîna medhelokê gotiye: guri dimirin, porsor dibin.

## BEHRAMÊ GOR

Roja bavê Behramê gor canê xwe siparte cehanan û tacu kiyani bi şûn xwe ve hişt; Behram xorteki bengî bû. Tac da serê xwe û li ser textê şahani bê dilêşt û sergêjî rûnişt. Çiko bav û bapirên navciwan û cihangirên bê hemta welatê faris kiri bûn wekl gustilekê elmas; Behram bi hêsani û bê dijwartî tiliya xwe tê re kişand. Bi navê bav û kalan çend salan bi vî awayî welatê faris xwar. Heman piştî çaxeki hindik berê xwe ji kiyaniya xwe gerand û xiste saz û leyiz û nêçirê. Behram bevsarê kar da destên mirovên xwixwar û sitemkar. Ta ji ber derê heywanê padişah dengê belengaz û rebenan û qirên û hawarên rençber û destgiran digihanê gunbêda gerdunê ezmaûê bani.

Bi vî awayî û roj bi roj himê kiyaniya welatê faris herivtin û maxên wê hilwesiyân. Dijmîn û neyaran bêtirs destên xwe dirêj kirin nav welatê faris. Ji vî alî ve Kurdistan û ji wî alî ve Ecemistan li ber lingê neyaran şikestin û gelek ji mirovên xwedî nav û nişan ji ber Behram reviyân û ji welatê faris helistin; xwe dane ber siya kundirê neyaran.

Rojekê Behram digel mopizan û pehlewaniyên xwe ji nêçre dihat. Li bajarekî kavil û wêran rast batî û dîtî ko li serê dîwarekî du bûm bi dengêkî zîz û bilind dixwînin. Behram xwe ragirt û got: xwezî min zani biwa ka ev bûm çi dibêjin?

Nageban yekî ji mopizaniyên wî rabû ser xwe û got: Ey serbilindê welatê Îran! wey xudanê taca giran, eger tu ji bendeyê berderê eyawanê xwe re ferman bikî ezê wê kulê ji dilê te derêxim. Behram zû zû jê re fermana padişahi xwend û wê re destûr da û got, bêje.

Mopizan got: Bûmê vî alî nêr e; bûma wî alî me ye. Ê nêr gazi dike a me û dibêje: were, êvarê nik me razi. Ez û tu emê bikin henek û leqirdiyan; emê li ser gotina xwedê û pêxember herin; dê ji me re zarok çêbibin, em ji bi wan dixweş bibin û korûnde nemirin.

A me: Ez dil dikim, lêbeblê qelenê keçên malbata me giran e; ez bawer nakim ko tu kari bi di bin barê bavê min de rabi.

Ê nêr lê vegerand û got: De bêje qelenê te çi ye?

A me: qelenê min çel bajarên wêran in;

## NAVÊN KURDMANCI

Kurdmancî hene hêtanî iro jî, navine biyanî, navên Emro û Zeydon, li zaroyên xwe dikin; û gava mirov ji wan dipirse te çire navekî kurdî li keç an kurê xwe ne kir?

Hin dibêjin: maliyân ev nav eciband, ji lewre me navê keça xwe kir « Elya » an navê kurê xwe kir « Xêtsan ». Ji wan re tu gotin nîne. Mêrên ko bi maliyên xwe nikarin bivê nevé ewê bi me bikarin ! . . .

Lê hinên din dibêjin: Ma navên kurdmancî hene? Hebin jî em bi wan nizanin. Zûka em li wan vedigerinin û dibêjin: Belê navên kurdmancî hene û ew gelek çeleng û spehî ne. Ji xwe emê hinekê wan ji we re bidin zanin.

Ji her du tofên jorin pê ve tofeke ecêb û xerîb heye. Xelkê wê tofê kurdine welatparêz û miletperwer in; bi navên kurdmancî dizanin û pend û şîretan li xelkê dikin û dibêjin: Navine kurdî li zaroyên xwe bikin. Lê bi xwe navine biyanî li zaroyên xwe dikin. Do ne pêr Xwedê ji

---

da ko em zivistanê tê de bilûsin û biharan li ser wan bixwînin.

Ê nêr: Serê Behramê gor sax bê; ezê ji niha ta deh mehên din çar sed bajarên wêran bidime bavê te.

Behram ev gotin bihîstûn û bê deng û reng kete binê çadira xwe û gazî kire seydayê xwe û jê re got: Ey rêzanê welatê faris vê gotina te agir berda dilê min û cerga min herijand. Belê te birîna min şanî min da. Welê ez nizanîm dermanê wê çi ye. Ez dizanîm ko ne tu bi kes nikare birîna min derman bike. De rûne û bêje ka em çawan bikin?

Mopizan rûnişt û got: Ey padişahê welatê faris! te mirovên xwixwar û sitemkar kirîne rêzan û dergevan û rêber û serdar. Wan bi navê te reben û belengaz xudanê nav û nişan tev dîl û gerdexwar kirin. Gerek e tu van mirovên bedkar ji dergehê xwe dûr biki; gencên zêr û zîvîn ji wan bistînt û li belengazan beav biki. Divêt guhê te ji dengê belengazên te re vekirî bê; û çavê te ji wan re belkiri bîn; û tu ji wan re dilovan û nihrvan bî . . . .

Behram ev gotin xistin serê xwe û hey ji nû ve da ser rêça bav û bapirên xwe û navekî giran û uisaneke bilind bi şûn xwe ve li cihanê hişt û çû. CEGERXWÎN

xelkê wê tofê yekt re kurek da bû. Me jê pîrst; te çi nav li kurê xwe kir? Camêr hinek sekint; heçko dida eqilê xwe û di bira xwe de li navê kurê xwe digeriya. Devê xwe bir û anî û paşê bi dengê nîzim mîrmîrand û got: « Me navê Hesen Besrî lê kiriyê; lê di nav xwe de em jê re Gurgîn dibêjin ». Di nav xelkê de ji we jê re Gurgîn bigota ma eybeke mezin bû?.

Herçi peyayên tofa pêşin, yanî yên ko bi malîyên xwe nikarin; bawer bikin malîyên wan ne kurdmanc in. Êdî dem e ko em kurdmanc ji gub bidin xwîna xwe û xwînên kêr têkîllî xwîna xwe a pak nekin.

Min got: « xwîna xwe a pak ». Belê di rohelatê nîzing de û di nav hevniyadên me de tu mîletê ari xwîna xwe bi qasî me pak hilnaniye. Ji niho û pê de ji divêt em ji guh bidin xwîna xwe û paqîjiya nijadê xwe ji xirabî û kêmasiyê bipapêzin; nemaze ji têkîlbûna xwîna mîletên neurî. Ji ber ko herwekî pêşiyên me gotine « xwîn nabe av » û ew rojekê xwe şanî dide; heqê xwe dixwaze û vedigere kaniya xwe. Ma ne heyf e ko mirov rabe şîlanê li ser dara gulê biteimîne.

Anîna jinên biyanî ji milê din kurdîne nekurdziman ditîne pê. Ji ber ko zaro ne li ber destên bavên xwe lê li ber destên diyên xwe bi xwedî dibin û ji zarê bavên xwe bêtir bi zarê diyên xwe xeber didin. Ev zaro mîdeklî kurdîne nekurdziman in; lê pîştî nîşekî kurdaniya xwe yekcar wînda dikin û dibin ji wî mîletê ko bi zmanê wî dipeyivin. Carîna ji ew mîlet dijminê kurd e.

Tebîra jinan ne bi tenê di zimên de ye. Adet, zîman, rabûn û rûniştin û her texlît ayînên mîletan bi destê jinan têne hilanîn. Ji ber ko jin ji mîran bêtir bi boriyê ve girêdayî ne û dan û standina jinan bi biyanîyan re kêr e.

Jin ew peresto ye ko di mala xwe de, zar û zêçên wê lê werhati, di ber heykela pêşîyan de heyran û heşmetkar rûniştî, lê fedikere; nav di xwe dide û deriyê xwe bi çilmêreklî xurt, li rûyê her tiştê xerîb û ne jê digire; û tê de li dijmineklî nedibar diqewimîne. Ew dijminê nedibar adet, zîman û ayînên mîletên din in. Ew di ber mala wê re digerin; diçin wî serî, tîn wî serî, û heke firsend bi dest ket, teqîsr nakin, xwe nadin paş û dikevin ê.

Gava minov li bertvaniyan fedikere îsbata gotinên me di wan de dibîne. Herçi

mêr di bin egal û keşiyên dirêj de wînda bûne. Lê herçi jin hetanî tro ji helgihên xwe ên delal ne guhartine û bi kofiyên xwe ên rengereg di beriyên bedar û belg de wek kulîlkên zozanan ter û taze, serbilind û sereferaz digerin û dixingirin.

Di nav bertvaniyan de disan jin in ko navên kurdmancî hilanîne. Navên mîrên wan ji hin awartan pê ve tev de navîne biyanî ne; navên Emro û Zeydon in.

Em tro du listan li ser nevên kurdmancî belav dikin. Navên mîran û navên jinan. Bivê nevē her du liste ji kêr in. Ji ber ko em ji welêt dîr in û di dora me de ew peya nînin ko ji me re navîne din bibêjin. Lê me hevî heye ko bi artkariya xwendevanên xwe em van listan bi ser xî.

## NAVÊN MÊRAN

Ado Agir.  
Bado Babik Balo Baqoq Barano  
Baro Bazo Behlo Behrem Behrûz  
Belo Bengî Beno Berxo Bexşo  
Beybûd Bêco Bêro Biro Bişar  
Blêç Boke Bozan Bozo Bûbê Bûbo.  
Cangîr Cango Cebo Cemşîd Cano  
Cercûr Cîmo Cîno Cîroro.  
Çalo Çarta Çeçan Çeko Çeleng  
Çelepo Çelo Çemo Çerto Çeto  
Çîro Çûro.  
Dara Delo Derbas Dermo Dilawer  
Dîlo Dîmdîm Dirbo Dîbo Dogij  
Dûwan.

Efo Egîl Evdî Emîz Engî Etman  
Eto Ewanî Eyas Eylo Eyo.  
Felemez Fengenoz Ferhad Ferho  
Ferîdûn Ferman Ferzenede Ferzo.  
Garis Gefo Gemşî Gerno Gewro  
Genco Gêrto Gêso Gîsko Guherz  
Gurgîn Guro Gurzo.  
Henê Hevînd Hewran Heyrano Hêman  
Hîrço Hodo Hopo Hovnê Hozo  
Hûrik Hûşeng.

Îpal Îskan.

Kakîo Kako, Kamîran, Kekan Kemo  
Kendo Kerevon Kero Keser Keyo  
Kêfo, Koles Kono Kotos Kundor  
Kûço Kûto.

Lendö Lewend Lêzgin Lêzgo Lolo.  
 Malo Malor Menteş Mero Meto Mëlo  
 Mistê Misto Mişko Mişo Mürük.  
 Nali Nehroz Newzad Niço Nîno Nûto.  
 Olo Omo Ortas.  
 Perişan Perwîz Peşto Peyale Piling  
 Pijon Piran Piroz Poro Potê Pozo  
 Pürto Pûşo.  
 Qajo Qehfûr Qenco Qerno Qoço  
 Qubad Qulo Qulixan.  
 Remo Réso Rindo Rizgo Risor.  
 Sado Segman Serdest Serdil Sertip  
 Serxan Seydo Sêgul Sêncö Siheypûş  
 Siyabend Simko Sino Soro.  
 Şahîn Şabo Şawês Şermo Şemdin  
 Şengo Şewês Şéro Şibo Şirin.  
 Tacdîn Taco Talo Tazo Temo Té-  
 mûr Terho Teto Têli Têlo Tiro  
 Tolo Toro Tozo.  
 Ücê Ücö.  
 Vêno Vîto.  
 Welö Wendo.  
 Xelef Xerzo Xemo Xeneer Xêro  
 Xişman Xoriş Xorto Xurto Xurşid  
 Xusrew.  
 Yadîn Yado Yero Yawer Yekane.

### NAVÊN JINAN

Ano Arê Aşê Avê Axê.  
 Baran Bazê Benefş Berfê Bersê Besna  
 Beso Beybûn Beyo Bêzar Bêzê Bêzo  
 Bihar Biskê.  
 Canê Cazê Canzê Cocê.  
 Çîçek.  
 Delal Derdê Dilê Dilşa Dirê Dilber.  
 Eco Edê Edûl Esmer Etê.  
 Ferfûr Ferxê Fincê Finco.  
 Gewrê Gijê Gozê Gulçin Gulê Gu-  
 lazer Gulistan Gulizer Gulnaz Gul-  
 perî Gulşa.  
 Hafö Heftsed Helê Heyveron Hezar  
 Îné İnîkê.  
 Kejê Keser Kewê Keyné Kilê Kinê  
 Kotê Kulîlk.  
 Lalixan Layila Lehle Lêrê.  
 Mehdiyar Meles Mencê Mencol Me-

nîje Merinas Mestê Meymo Mêrê Mi-  
 rari Momê.  
 Nacime Nado Narê Narin Nazê Nazo  
 Nermûn Nesrin Neslixan Nêrgiz Nigar.  
 Otê.  
 Perişan Perizad Perwin Piroz Poşî  
 Porgul.  
 Qerê Qeşem Qumrî.  
 Rewşen Rewşê Rewşo Rindê Rihan  
 Ripê.  
 Senem Seno Sêrê Sêro Sévé Sinem  
 Sinemxan Sisê Sisin Sonê Sorgul Sosin.  
 Şayeste Şemê Şengê Şemşûl Şeno Şerbet  
 Şerbo Şêrê Şîrin Şoxê.  
 Teyrê Teyro.  
 Xané Xano Xatûn Xecê Xeco Xewê  
 Xemlé Xemşê Xensa Xezal Xizêm  
 Xumal Xumar Xunav.  
 Zelêx Zerê Zernîşan Zêrê Zêrin Zin  
 Zivik Zizê.

Di lîsteyên jorin de hin tişt hene ko mirov divêt li ser wan bisekine û li wan hûr fedkire:

1 - Navin hene ko li jinan û li mêran bi hev re dikin. Herwekî: « Baran, Boz, Can Keser, Perişan, Şeng, Şêr, Xem, Şîrin h. d. [1] » Heke ev nav li mêran hatine kirin bi tewanga nêr yanî bi « o » yê têne tewandin û gava wan li jinan dikin ew bi tewanga mê yanî bi « ê » yê têne tewandin. Mîna: Şêro Şêrê. Xemo - Xemê. Dîlo - Dilê. Perişano Perişanê.

2 - Digel vê hindê em di van lîstan de dibînin ko hin navên mêran bi tewanga mê û hin navên jinan bi tewanga nêr hatine tewandin.

Navên mêran: Bûbê, Hênê, Potê, Mistê, Hovnê.

Navên jinan: Ano, Beso, Beyo, Bêzo, Eco, Finco, Seno, Hêlo, Nazo, Xeco, Şeno, Şerbo, Şêro.

Ji milê din navên mêran bin jinan bin carina bi her du tewangan têne tewandin.

Ücö	Ücê	Xecê	Xeco
Bûbo	Bûbê	Bêzê	Bêzo
Misto	Mistê	Fincê	Finco
Besê	Beso	Nazê	Nazo
Sêrê	Sêro	Xanê	Xano

[1] Mîna van her du lîstan heta dawiyê ye. Ji ber kurtiyê holê « h. d. » têne nivîsandin.



## DINYA TARI

Heçî rêka diçim pê ve li ser min tari ye ezman;  
Belê bîninî tiriştavan li nav pêlên evan ewran.  
Ji bağ û beğçeyên avên dil im hergav birindar e;  
Dipirsim ez hero sed car çira bağ im ne hat avdan?  
Eve Adar, eve Nisan; ko roj derket cihan tisan.  
Li ser min tari ye dîsan, temasa kin geli kurdan!...  
Ji kurdan pertewek [1] derket hemî dinya pê ronî ba;  
Çi kin em her ji vi bextî ko rûres man wekî sûdan.  
Rez û bağên gelek reingî ji dest me derketin zû da.  
Dîwxazîn dor bikin sênc e, belê çi bikin niye rezvan;  
Me nûjen kir kevinbağek bi mêw û derxik û fêki;  
Hemî vêk re didin fêki, belê bo wan divêt darvan.

M. EHMED BOTÎ

[1] Muxsed Ehmédé Xani ye.

Gelek eşkere ye ko ev tişt ji qeyda gelemper der e; û wi tu qeyda xweser nine.

Gelo sebaba wî çîye? Bawer bikin tu sebaba bingehîn jê re nine. Bi tenê ji bo delaliyê an ji bo kêmgêrdiyê li keçan bi « o » yê û li kuran bi « ê » yê deng dikin. Herwekî li şûna ko « keçê » bibêjin; dibêjin « keço » û ji yekî re ko navê wî « Mîstefa » ye li şûna ko bibêjin « Misto » dibêjin « Mîstê ».

3 - Herwekî me got « ê » û « o » yên ko dikevin paşîya navan tewang in; tewangên bankirinê ne. Ji lewre diviya bû hergav ne bi wan ve bibin; û bi tenê di dema bankirinê de bi wan bikevin. Lê ew tewang bi awakî welê bi serên avên xwe ve bûne ko jê tucaran venaqetin, herwekî ji rayekê bêjeyê biwan. Digel vê hindê kurdmançên ko di zmnên de mîhafezekar in guh didin vê ferqê û nabêjin « Gulê hat » lê dibêjin « Gul hat » û bi tenê di dema bankirinê de dibêjin « Gulê were ».

4 - Me gotî bû ko « o » û « ê » tewangên bankirinê ne. Lê carina van tewangan li şûna tewangên adetî jî dixebitînin. Mesela em navê « Mîş » bibin. Ev navê ha, navekî mîran e; ji lewre diviya bû bi « i » yê bihata tewandin û li gora qeyda gelemper diviya bû mirov bibêje: « Mîş hat, Mîşî got, Mîşo were ». Lê herwekî me got « o » yê dixin şûna « i » yê û dibêjin: « Mîş hat, Mîşo got, Mîşo were ». Wek neticeke vê qeydê navên ko bi « o » yê diqedin bi tu awayî nayine tewandin. Ji lewre mirov dikare bibêje « Bozên got » lê nikare bibêje « Hêco got » divêt bibêje « Haco got » ji ber ko navê « Haco » bi « o » yê temam dibe.

5 - Heye ko di lîsteyên me de navin peyda bibin ko di eslê xwe de ne bi kurdî ne; lê kurdmançan ew bi awakî welê xebitandin ko dirfê zarê me bi wan ketiye û ew hatine kurdandin. Di zmnên de her tiştê kurdandî bi kurdî ye û ew yê me ye.

BAVÊ GEMŞID Û SÎNEMXANÊ

## DELALIYA DELALAN

Adaptation d'un poème de  
Charle Baudelaire « Le Balcon »

Stêra biserhatiyên min, delaliya delalan !!  
Tu bihara ber dilê min i;  
Bextiyari û xweşîya min ji te ye;  
Ji te ye siitû û serbilindahiya min.  
Şiriniya ramûsan, destpaşil û dilxweşîya min,  
ji bo te ye!  
Têu bira te ew rojên bextiyariyê;  
Ronikahiya mala me û xweşî û hênikahiya  
ber êvarê?  
Stêra biserhatiyên min, delaliya delalan !!

Ber êvarî, wadê tirêjên roavayî,  
Sor û zer dibin !!  
Mîna şewq û pêtiya tîfikên dîwanxanan;  
Me xwe aveti bû ber siha şehneşinê.  
Û xavikeke zeresor,  
Xwe ber rûyê dinyayê da bû,  
Di wê demê de sing û berê te,  
Xema dilê min direvandî.,  
Û dilê te ê xurt û nerm,  
Çiqas niziki min dibû û ez dihawandim,  
Me ji dilketina xwe re distirand,  
Û dinelwirand.  
Ber êvari wadê tirêjên roavayî dibin sor û zer.

Di êvarên germ de roj çiqas delal e;  
Dinya dibe fireh û pehin.,  
Dil dibe xurt û bi rewa  
Min xwe li ser te de xwar dikir delaliya delalan  
Û min bihna ciwani û rindbûna te bihn dikir;  
Di êvarên germ de roj çiqas delal e.

Şev dibû tari, li ber me dibû beden.  
Û di reşika şevê de min reşahiya çavê te didit,  
Û min bihna keçinî û çelengiya te bihn dikir.  
Navkefên destên min bû bûn dergûşa piyên te;  
Şev dibû tari û li ber me dibû beden.

Wan dem û rojên bihuri ez tinim bira xwe  
Demên ko min serê xwe da bû ser çoka te,  
Û bi nêrina çavê te  
Dinya li min dibû bihar,  
Heşin dibûn gul û dar.  
Tu î şahî û şabûnî,  
Tu î xemrevîn û dilxweşî;  
Wan dem û rojên bihuri ez tinim bira xwe.

Me li ser dilketina xwe sond dixwar  
Em sondayê bev bûn ...



## STÛNA XWENDEVANAN

P—Gelo rast e ko em kurd ji nijadê art ne ?  
Çi kurd li welatê Êris hene û ew di çi  
hall de ne ?  
Şam, Taxa Kurdan. SIBHIYÊ DIYARBEKRI

C—Belê em kurd ji nijadê art ne. Herçî  
pisporên nijadan hene di vê babetê de yek  
in. Yanî tev de dibêjin ko kurd ji nijadê  
art ne û di rohelatê nizing de weseftên artiyê  
ji hevniyadên xwe ên din çêtir û bêtir hilanîne.

Kurd artinijad û artzman in ji; yanî  
zmanê wan jî zmanekî art ye; û bi zmanekî  
art dipeyivin. Û ew, yanî kurd di kaniya  
zmanê ariyan de rûniştî ne. Li gora hin  
zmanasan dergûşa zmanên art ew welat  
e ko dikeve navbera Diyarbekir û Xuristanê  
« Xuresan ». Nivê vi welatê kurdistan e û  
nivê din jî Ecemistan e. Belê zmanas dibêjin  
ko ew der welatê zmanên art ne û zmanên  
art tev de jî vi welatê li dinyayê belav bûne;  
û di nav xwe de bi çend birên bingehin  
lêk vebûne: slav, latin, german, yewnan.  
Mirovatiya van zmanên art hetanî iro jî xuya  
ye; rehma ko herî hezar salan jî dergûşa  
xwe rabûne; bi dinyayê ketine û nema ve-  
geriyane kaniya xwe. Ev mirovati ne bi tenê  
di gramêr û di bastûrê de, lê di hin bejeyan  
de jî eşkere dibin. Ev in çend mîsal:

Lêv (bi kurdî) leb (bi farisî) lip (bi  
ingilîzî) lippe - lipe (bi elmanî).

Pol (bi kurdî) épaule - epol (bi frensîzî).

Ejnû (bi kurdî) genou-jeû (bi frensîzî)  
bi kurdî jenû jî dibêjin.

Dlop (bi kurdî) drop (bi ingilîzî) trop-  
fen (bi elmanî).

Nav (bi kurdî) nanî (bi farisî) nom  
(bi frensîzî) name (bi ingilîzî) name (bi  
elmanî) onoma (bi yewnanî).

No (bi kurdî) no (bi ingilîzî) nou (bi  
frensîzî) nein (bi elmanî).

Tu (bi kurdî) tu (bi frensîzî) du (bi  
elmanî).

O! ew ramûsanên jî dil û can !!

O! ew nalînên kûr û dûr...

..

Gelo dilketina me a borî,  
Vedigere ciwaniya xwe a berê??

Mîna roja ko diçe ber ava

Û li rohelatê hiltê

O! Ew ramûsanên jî dil û can...

O! Ew nalînên kûr û dûr.

SEYDAYÊ GEROK

Nih, new, nû (bi kurdî) new (bi ingilîzî)  
neuf - nöf (bi frensîzî) neu - noy (bi  
elmanî).

Neh (bi kurdî) neuf - nöf (bi frensîzî)  
neun - noyn (bi elmanî) nine - neyn (bi  
ingilîzî).

Kok (bi kurdî) coquet - kokê (bi frensîzî).  
Hesin, hêsîn (bi kurdî) eizen - eyzen  
(bi elmanî) ahen (bi farisî)

Par (bi kurdî) part - par (bi frensîzî).  
Çêlt (bi kurdî) child - çild (bi ingilîzî).  
Hirç, wirç (bi kurdî) ours - ûrs (bi  
frensîzî).

Mêş (bi kurdî) mouche - mûş (bi frensîzî)  
Stêr (bi kurdî) star (bi ingilîzî) stern  
(bi elmanî) astre (bi frensîzî) astron (bi  
yewnanî) stella (bi talyanî) sitare (bi farisî).

Germ (bi kurdî) warm (bi elmanî) warm  
(bi ingilîzî).

Sin (bi kurdî) cime - sîm (bi frensîzî).  
Braştin (bi kurdî) braten - bratin (bi  
elmanî).

Kurm (bi kurdî) wurm (bi elmanî)  
worm (bi ingilîzî).

Tarf (bi kurdî) tarik (bi farisî) dark  
(bi ingilîzî).

Ber (bi kurdî) pierre - pyêr (bi frensîzî)  
Ard (bi kurdî) artos (bi yewnanî).

Ev mîsalên ha bi tenê ew bêje ne ko bi  
derbekê de tene birê. Lê heke mirov zmanê  
kurdî û zmanên din ên art danî bêr hey û  
hûr li wan mêze kir wê bête ditin ko miro-  
vatiya van zmanan digel zmanê me gelek kûr  
û nizing e. Ji xwe herçî kurdî û farisî,  
ewçend nizingî hev in ko ev her du zman  
wek du zarên zmanekî dikarin bêne hesibân-  
din. Bi ferqa ko farisîyê ji kurdîyê bêtir  
hikmê erebiyê xwariye û di bin tehsira wê  
de maye.

Ji milê din Mirza Sibhî dipirse: Çi kurd  
li welatê Êris hene; û ew di çi hall de ne?

Herwekî xwendevanên me diwên bizanin  
piraniya kurdan bindestiya sê dewletan dikin:  
Iraq, Tirkiye û Ecemistan. Li bakurê  
Sûriyê û li ser tixubê tirkan ji Cezira  
Mir Şeref heta roavayê Çiyayê kurdmancan,  
di drêjahiya vê xetê de jî birek kurd hene.  
Herçî welatê Êris, di wî welatê de kurdmanc  
kêm in. Dibêjin ko nifûsa wan di ser sed  
hezari ye. Piraniya kurdên welatê Êris di  
Fîlestanê de ye. Ji ber ko baskêkî welatê ser-  
hedan digelhe Fîlestanê. Ên mayî li welatê  
Oevqasê belav bûne: Gurcistan û Azerbeycan.

Diget wê kindikbûnê, di warê çanda kurdî de kurdmancên welatê ûris ji kurdên mayin peşdetir in. Ji xwe carekê, di hejmara Hawarê a heştan de me qala kurdên Rewanê û xebata wan a kultûrî kirî bû.

Ev deh sal in di gundên kurdmancên Qevqasê de dibistanên xweser hene û zaroyên kurdmancan, çî keç çî law, di wan dibistanan de bi kurdmanci dixwinin. Ji van pê ve li Rewanê, ji bo kurdmancan, dibistanêke mamostan heye. Di wê dibistanê de ji her ilm û fen bi kurdmanci têne xwendin. Xortên ku ji dibistana Rewanê şahadetname digirin dibin mamosteyên gundan.

Ji xortên dibistana Rewanê, ên bijarte diçin Moskoyê û di dibistanên ûris ên mezin de bi rûsi dixwinin û lîsansê digirin. Ev lîsansî vedigerin Rewanê û dersa mamosteyên kurd bi kurdî dibêjin.

Kurdên Rewanê di van deh salan de bi sedan kitêb belav kirine û hero jî hinên din belav dikin. Ji kitêban pê ve rojnameke wan jî heye, Riya teze.

★ ★ ★

Ezbenî!

Îro ji postê pênc heb Hawar li ser navê min hatine. Ez hêvi dikim ji niho û pê de ji min bi tenê re hejmarekê bişîne. Ji ber ku kes Hawarê naxwîne.  
Mektele : 24, 7, 1941      HEBEŞ SMAÎN

Vitika Mîrza Hebeş Smaîn peyameke, tehil û şêrin e. Şêrin e, ji ber ku ew rastiye dibje. Lêbelê ew rasti bi xwe tehil e. Belê Mîrza Smaîn ji xwediyê Hawarê hêvi dike ku jê re ji yekê bêtir Hawaran neşîne. Çire? Çimkî di welatê wî de kes Hawarê naxwîne û pê bendewar nabe. Lê jê re hejmarekê divê ji ber ku ew bi xwe dixwîne; û ji lewre naxwaze Hawara ko bi hezar dişwariyî bi der têt di destên nezanan de telef bihe û hête çirandin.

Lê herweki me got, ev rasti bi xwe tehl e. Mektele û kaniya Ereban di Sûriyê de merkeze kurdmancan in. Ew erd bireki deşta Sirûcê ye; meqamê begler û axeler û eşran e. Ma rowayt heq e ko Mîrza Smaîn di welateki kurdmancan de ji çar hejmarên Hawarê re xwendevanan peyda nekit. Heke di dora kaniyê de hêj ew kurdên xwenda nînin jê bi tenê mezinên kurdan berpîrsiyar in. Emê li hêviya pêjna dengê xwe binînin.

HAWAR

## REWŞA DINYAYÊ

ŞERÊ SÛRIYÊ — Herweki xwendevanên me dizanin li 8ê Hîzêranê şer keti bû erdên Sûriyê û Libnanê jî. Ji ber sebêbên ko me di hejmara sihi de goti bû ingiltzan û frensîzên gollist li heştê Hîzêranê jî aliyê nivro de yanî ji Felestîne drêji Sûriyê kirin.

Ordiwa sondxwariyan xwe berda bû ser du baskan. Baskê ko jî Derheyê dihat berê xwe da bû Şamê. Baskê din, yê ko bi ser Seyda û Merceiyûnê ve dihat, berê xwe da bû Bêrûtê.

Baskê rastê, baskê ko jî Derbeyê dihat, di Ezrehê re û dirêjki kete welêt û di Xebaxîbê de qerar girt. Eskerên Merêşal jî ber dikîşiyân. Wer xuya dikir ko ewan asêgeha xwe li ser çiyayên Kiswê çêkiri bû. Sondxwariyan jî Xebaxîbê dirêji Kiswê dikir. Eskerên Vişiyê li ber xwe didan. Hêdt hêdi şer dadiket fasta Xotayê. Topçiyên frensîzan jî nav darên beşçeyên Şamê û ji çiyayê Qesyûnê, di ser Mezê, Rebwê û bajarê Şamê re agir dikirin. Sondxwari jî milê din, di Qunêtirê re hati bûn Cîdêdê. Heçko şer di nav Şamê de çêdibû; lê hêj gule rast di rast ne diketin ê. Lê tîrs hehû ko bikevin ê.

Li 18ê Hîzêranê dengê tîfing û mitralyozan ewçend nîzing bû bûn ko mirov digot qey şer gihastiye kûçê û kolanên bajêr. Bêdîro, êvarî di beşçeyên navhera Mezê û keywanê de eskerên hindi û frensîzên Şamê li hev dixistin.

Lê pisti eşayê dengê top û tîfing û mitralyozan, ji nişkekê ve hatine birin. Xelkê digot qey ingiliz ketine bajêr û freusîz çûne rayê. Sibetirê xelk di nav bajêr de li ingiltzan digeriyan, lê ew peyda ne dikirin. Bi tenê balafirên ingiltzi di ser bajêr re firîyan û hin beyaname avêtin ê. Bi van beyananan general Wilson, serfermandarê leşkerên sondxwariyan, jî general Deuz dixwest ko bajarê Şamê bajarê berdayî ilan bike û eskerên xwe jê bikiştne. Ji ber ku eskerên sondxwariyan keti bûn devê deriyê hajêr û heke şer di dora Şamê de dom bikira ehali wê bihatan kuştin. Ji xwe şer jî şevêdi ve sekint bû. Lê ingiltz ne diketin bajêr, qey hêj dût bûn. Lê herçî eskerên Vişiyê, terka Şamê didan û bajar vala dikirin. Bi saetan ve top, tang, kemyon di cada Bexdê re derbas dibûn, berê xwe didan riya Hîmsê. Lê igiliz ne dihatin. Bajar mîdeke xweş vala ma. Piştî nivro hew te di frensîzên ko berî nivro jî

Şamê rabû bûn, vegeyriyan kozik û asêgehên xwe û ber bi êvarê şer ji nû ve dest pê kir.

Ma çi li frensîz û ingilîzan qewimî bû? Pêşê hate seh kirin ko êvara hejdehê Hîzêranê mifrizeyek eskerên hindî, qedere 400-500 peya, gibaştî bû Mezeyê û li beşçeyên navbera Mezê û Keywanê belav bû bû. Frensîzan ew hêsir girtin. Lê frensîzan ne dizant bû ko ew mifrizekî biserxwe ye. Wan digot qey pêşdarê ordîwa dijmin e û dijmin, herwekl beyanama general Wilson dida zantî, gibaştîye devê deriyê Şamê û kete Keywanê. Li ser vê yekê frensîzan terka Şamê da. Lê gava dîtî ko şaş in û ingilîz hêj ji bajêr dûr in bi şûn de vegeyriyan û dest bi şerê xwe kirin. Sondxwariyan li midafihên Şamê dişidand. Li 20ê Hîzêranê topçiyên ingilîzî topên xwe li rasta Mezeyê danîn û li kelehên Mezê, Rabwê û Mihaciran dixistin. Ber bi êvarê şer xweş kirin. Carina gule diketin nav bajêr, nemaze lara mihaciran Hin berikên tîfîng û mitralyozan ji ketine serê banan. Ji 'ehaliyan bi tenê du peya hatiye kuştin û çendek ji birindar bûn.

Sîbetirê, li 21ê Hîzêranê General Denz, bajarê Şamê bajarê berdayî îlan kir û frensîz jê kişîyan. Wextê nivro ingilîz û golîst ketine Şamê. Şer ji derve dom dikir.

Ingilîzan û serekê frensîzê golîst general Degol îstîqlala Sûriyê û Libnanê îlan kirin û wad dan wan dewletan ko piştî qedandina şerê Sûriyê frensîzê golîst bi wan re mîahedeyên dostî û hevalbendîyê imza bikin.

Wê şevê xelkê Şamê bê tîrs û lîerz ketî bûn nav cihan. Lê bi sariya sibê ve bombeke ecêb teqîyan; çendên din dane pey. Balafirêk an di lowan li Şamê xistî bû. Çi balafir bûn, ne hate seh kirin îinan digot ehmamî bûn. Bombe li dora Mizgofta Eînewî û Tirba Selahedin ketî bûn. Ji bîstan bêtir zantî hilweşîyan; 82 peya hatin kuştin û ji bîstî bêtir birindar bûn.

Piştî vegirtina Şamê ingilîzan zora xwe li eniya Bêrûtê. Frensîzan di wê qadê de gelek li ber xwe dida û bi xurtî şer dikir.

Pêşdetir, ingilîzan ji Iraqê jî dirêjt Sûriyê bûn û ketin bakurê welêt Qewelên wan ên mekaniîkî berê xwe dan Tidmirê û lê wer hatin, û piştî mîhasereke sêzdeerojî midafihên Tidmirê 300 peya teslim bûn.

Ji milê din eskerên ingilîzî yê ko ji serê hati bûn ketin Dêra - Zorê, Reqê û

Qamişlokê û berê ywe dan Heleb û Cerablîsê.

Eskerên ko Tidmir zantî kiri bûn ber bi Hîmisê meşîyan. Frensîzê golîst jî piştî vegertina Şamê berê xwe dan bakur. Ewan jî piştî ko Nebek xistine destên xwe Hîmis jî xwe re kirine armanc. Baskelî din jî Şamê qesta Bêrûtê kiri bû û li ser rîya Bêrûtê giha bû Dimasê. Eskerên Merêşal di vê qadê de jî gelek li ber xwe dan û seriine no li bakur û li roavayê Şamê çebûn.

Li 7ê Tîrmehê balafirên ingilîzî di peravên Tîrkiyê de vaporeke frensîzî, bi navê « Sêndidyê » bin av kirin. Di wê vapore de jî bo frensîzê Sûriyê çek û posat û hin zabit jî hebûn; dihatin hawara ordîwa rohelat.

Di eniya Bêrûtê de eskerên Merêşal piştî ko ji Seydayê kişîyan; li ser xeta Damûrê asê bû bûn. Damûr, Kisweya Bêrûtê bû. Ji xwe Şam û Bêrût her du jî ji tixûbê Felestinê bi nîzikahi ve not kîlometir dûr in. Piştî şerîne mezin eskerên ewîstrali xeta Damûrê di hin cihan de qul kirin; lê xet bi temamî ne ket destên wan. Eskerên Merêşal bi mîrani xwe li ber dijminên xwe digirt û re ne dida wan ko bikevin Bêrûtê.

Wer dixuye ko piştî binavkirina Sêndidyê tu hêviya general Denz ne ma bû. Di roja xwe de stola frensîzî jî Bêrûtê rabû. Çend perçeyên lez berê xwe dan Frensê; hinên din jî çûn bendera Skenderonê. Tirkan ew vapor jî çek kirin û esker û deryevan girtin.

Li 8ê Tîrmehê paştî nivro, Mister Çorçîl di Meclîsê de da zanin ko general Denz mitareke xwestîye. Di roja xwe de êvarê saet heştan de general Wilson bi radyowa Felestinê jî general Denz re dida zanin ko eskerên wî bi diyarî Bêrûtê ketine û jê dixwest ko Bêrûtê bajarê berdayî îlan bike û eskerên xwe jê bikîşîne. Denz li general Wilson venegarand û şer di pêşîya Bêrûtê de dom kir.

Ingilîzan pêşnihada yanî tekllfa general Denz qebûl kir û şertên çekdaniyê yanî mitarekê jê re dan zanin. Lê hikûmeta Merêşal şertên ingilîzan qebûl ne kirin û ew bi şûn de avêtin. Dîgel vê hindê Vişiyê destûr da general Denz û jê re da zanin ko jî bo qedandina şerê Sûriyê hikûmeta Merêşal hemî selahiycet xistine destên wî. Li ser vê yekê general Denz rast bi rast bi general Wilson re kete mîzakerê û li 11ê Tîrmehê

berl nvro niminendeyên general Denz çûne Ekayê, qerargeha general Wilson.

Li 12ê êvarê di Ekayê de mitarekename bi tipên navên nîmnendeyên her du aliyan ên pêşîn hate imza kirin. Ji xwe li nivê şevê di hemî xetên şer de her du aliyan agir di brûskên xwe betal kiri bûn.

Di dema imzakirina çekdaniyê de tişteki ecêb qewimi. Gava nîmnendeyê general Denz, general Verdiyak qelem girt destê xwe û kir ko peymanê imza bike; çira wan elektrîk vemirî û heyeta mitarekê di tariyê de ma. Vêca rabûn çend kemyon anîn her pencereyên odê, mitosiklekê jî xistin devê dêrî û li ber ronahiya fanosên wan mitarekename imza kirin. Bi vî awayî şerê Sûriyê, yê ko 34 rojan dom kir, temam bû.

General Verdiyak mitarekenameke gelek bi şeref imza kir. General Wilson bi xwe pesnê eskerên Merşal da; û çekên wan bi wan re hişt. Li gora mitarekenamê jî eskerên ordiwa rohelat heçî ko dixwazin wê bikarin derbasî aliye general Degol bibin û herçî naxwazin wê vegerin Frensê.

Li 14ê Tirmehê, wextê nvro ingilîz ketine Bêrûtê û bajarên Libnan û Sûriyê ên din.

ŞERÊ ETLANTİKÊ—Şerê behra Etlantikê weke berê dom dike. Vê paşiyê di vê qada ser de bûyereke girane hate pê. Li bakurê roavayê Etlantikê giravek heye, jê re dibêjin Îslande. Ev girav dikeve navbera Ewropê û Emêrikayê û li ser rê ye. Yanî yê ko girav di destê wî de ye, çûn û hatina vaporan di navbera Ewrope û Emêrikayê de çêtir dikare bihemine.

Îslande aidî Denîmerkê bû. Roja ko elmanan avête ser Denîmerkê, 9 Nîsan 1940, ingilîzan jî esker derxistin Îslandê û tê de cih bûn. Herwekî xwendevanên me dizanin Emêrtîke bi her awayî û wek hevalbendekî arikariya Ingilîterê dike. Bi tenê hêj rast bi rast ne ketiye şer. Emêrtîke herçî vaporên talyanî, elmanî û vaporên dewletên ko erdên wan elmanan vegertine, tev de zemt kirine. Ew vapor di benderine emêrîkanî de bûn. Emêrtîkê hin jî van vaporan dane Ingilîterê.

Li 8ê Tirmehê reîscimhûrê Emêrtîkê mîster Rûzvelt da zanin ko eskerên emêrîkanî ketine Îslandê û vaporine stola Emêrtîkê di benderên Îslandê de lenger avêtine. Bi vî awayî eskerên emêrîkanî jî bo cara

## DILJARIYEK

kohê xem wer bû li min wenda kirim cewr û ezab Dil bû çênî, pare pare ma li cergê sed kulab. Tercima halê me kurdan bête awaz û îezel, Ilmê derya wer bibîne xwîn dibare afitab. Mîftiya işqê werinim dergayê mewzûn vebe Xortê nûhafî bi xame da şiyar bin jî xewab. Aweyê şîhran me danî pir bi inwan û edeb, Birca êvîna me fro hilvedaye pir xitab. Ayê kurdan fro nîne hem li erd û ta sema; Lewre deng û gaziya me nayê şerhê sed kitab. Mem jî bo Zînê li zîndan sihtiye ten û giyan; Pîra Heyzebûn diyar he xêr xwa kî bê cewab. Perda şahî me remûza ta ko azadî hebe; Fro pesnê xem rewya ye not qanûn û rebab; Ev rîya qewmî ko dûr e, pir cefa ye hat û bat. Bi hezaran reng vedane wan bi xwînê bê hesab, Şam û sûrî bo me tal e, av vexwim wek benzêl e; Ava heywên Dicle pak e, şekir û qend û gulab. Dêrazorê ta bi Qersê erdê bayê min heyê; Dewsa avê xwîn rewan e, birc û saran tev xerab. Jar û pejmîrde dinalin tev ko em pergende ne, B' tenê Heşyar şîbhî mûman nav û cegez bûn kebab.

HEŞYAR

pêşîn jî welatê xwe rabûne û ketine qada şerê ewropanyî. Lê hêj tîfîng ne teqandine. Lê bêtî teqandina tîfîngê jî ev esker bi kêrî Ingilîterê tîn.

ŞERÊ ÛRIS Û ELMANAN — Herwekî pisporên şer dibêjin ev şer, şerê dinyayê ê mezintir e. Bi rastî gava mirov dide eqlê xwe lê ecêbmayî dimîne. Di wê qadê de neh milyon mirov li hev dixin; şeş milyon ûris û şê milyon elman. Welê dixuye ko Ûris, jî berê de, xwe ji bona vî şerî kar kiri bû. Di destên Ûris de çek û her texlît hesincawên ceng zehf in; nemaze tang. Tangên Ûris gelek mezin in jî. Hin tangên wî 120 ton in, keheheke gerok û hesinî. Divêt bala-fîrên wî jî zehf bin. Eskerên wî ên siwarî jî pir in. Elman bi drêjki jî hezar kîlometrî bêtîr ketine erdê welatê Ûris. Fro di dora Smolenskê de şerê mezin çêdibe.

Li gora fikra pisporên eskerî ev şer şerê gethî ye; yanî yê ko di vî şerî de bişkê hesêb zora wî wê here, û wê nema bikare xwe li ber dijminê xwe bigire.

Di vî şerî de Ingilîterê û Emêrtîke li piştî Ûris rabûn; jî ber ko Ûris bûye dijminê dijminê wan û bi neticê ve bû dostê wan.

Van her du dewlêlên mezin wad dan Ûris ko bi her awayî wê arikariya wî bikin.

Li 12ê Tirmehê di navbera Ûris û ingilîzan de peymanek hate imza kirin. Li gora

vê peymanê her du dewlet wê arikariya hev bikin û ev her du dewlet bê hev silih nakin.

Şerê ûris ne bi tenê ji bo ûrisan lê ji bo inglîznan ji geleki mihiin e û inglîz çeneyeteke mezin didin vê meselê. Ajansan çend caran qal kiriye ko Inglîtere di Behra Manşere re wê esker derine beja Ewropayê û dreji Ejmanyayê bike. Hin cerideyên inglîzî di vê babetê de dibêjin ko jê çetir firsend bi dest nakeve. Ji ber ko elman bi ûris mijûl in û ji lewre di roavê de qewetên wi kêman in. Lê heta niho inglîznan dest bi vi îst ne kirine.

Elmanan ji li rohelatê dûr hevalbendek heye: Japonye. Di navbera elman, talyan û japonan de tifaqêq heye: tifaqa sêbendin. Li gora vê tifaqê heke dewletek, ji dewletên ko iro şerê talyan û elmanan dikin pê ve, bi wan re kete şer hingê japon ji şerê wê dewletê bike. Herkest digot ew dewlet Emêrike ye; ûris ne dihate birê. Ji xwe di mehla Nisaua 1941ê de ûris û japonan ji tifaqek imza kiri bû. Li gora vê tifaqê heke yek ji van her du dewletan bi dewleteke din biketa şer, a din di wi şerî de diwiya bû dêteref bimîne. Ji ber wan sebaçan rewşa japonan zehmet e. Ji ber ko bi her du aliyên re girêdayî ne.

Li 17ê Tirmehê wezaretê Japonyayê istifa kir. Lê disan mir Konoyê hikûmet teşkil kir, lê Mirza Metçiwoke ye ko tifaqa Rûs-û-japonî imza kiri bû ne ket hikûmeta nû. Wezirê xariciyê ê nû gava bi rojnamenivîsan re xeber dida bi awakî welê şexilî ko jê dihate seh kirin ko hikûmeta nû xwe bi tifaqa sêbendin re girêdayî dihesibîne lê gûh nadete tifaqa Rûs-û-Japonî.

Li gora nûçeyên paşin japon esker ditîne ser têxûbên ûris û xwe kar dike.

**MESELA HINDIÇINIYÊ** — Hindiçinî li rohclatê nivroyê Hindistanê mistemlekeke frensîzî ye. Di bin wê re nîngirava Melegê ber bi girava Sometrê dirêj diibe. Di nav her Melegê û Sometrê de avtengê heye, jê re avtenga Melegê dibêjin. Di devê vê avtengê de giraveke gelek kiçîk û ji beja Melegê 800 mêtir dûr giravek heye; navê wê Sengepor e. Sengepor ji weke Cebeltariqê mîlteke behran e; û ew ji di destên inglîznan de ye. Herçî vaporen ko ji Ewîstralyê, Nyûzelandiyê û bi tevayî ji Pesifikê tîn û qesta Behra-sor dikin divêt di wê avtengê re biborin. Ji milê din giravên holendî yên

## BINGEHÊN

### GRAMÊRA KURDMANCI

BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHIRVAN

— 5 —

44' — Mana û zayend: Bêjeyin hene ko gava mana wan diguhêre zayendê wan ji têtê guhartin. Mesela « dar » gava bi mana dara heşin e mê ye « Vê darê ji min re dawêşine ». Lê ev « dar » bi xwe gava bi mana darê hişk e nêr e « Vi darî ji min re bişkêntne ».

ko bi navê Hindistana holendî nas in, ji roavê ber bi rohelê û pey hev di bin wê avtengê re ne. Hindistana holendî bi her texlît madenên xwe, nemze bi petrola xwe goleki hêja ye. Di welatê japonan de hesêb petrol nine. Japon petrola xwe ji Emêrikê û ji Hindistana holendî ditînin.

Li 19ê Tirmehê di navbera Frensê û Japonyayê de lihevhatinek hate imza kirin. Li gora vê lihevhatinê Frensê û Japonye Hindiçiniyê pev re midafehe bikin. Piştî vê lihevhatinê eskerên japon ketine Hindiçiniyê û bi vi awayî nizingî li Sengeporê û Hindistana holendî kirin.

Inglîterê û Emêrikayê ev lihevhatin protesto kirin; dest danin ser pereyên japonan yên ko di banqên emêrikani û inglîzî de ne. Ji milê din Rûzvelt emir da ko ji Emêrikê tu tişt nayete rêkirin Japonyayê. Rûzvelt şandina petrolê ji bend kir û got: heta niho me ji japonan re petrol dida da ko japon bi hênceta petrolê dirêji Hindistana holendî nekin.

Par japonan bi Hindistana holendî re tifaqeke iqtisadî imza kiri bû. Li gora vê tifaqê Hindistana holendî salê (1 800 000) ton petrol bidaya Japonyê. Piştî mesela Hindiçiniyê Hindistana holendî ciwab da mişteriyê xwe û jê re da zîna ko tu petrolê nade japonan.

Nûçeyên paşin dibêjin ko di rohelatê dûr de wezîyet xedar e. Ji alîkî Japon, ji aliyê din Inglîtere û Emêrike xwe kar dikin û neçê neçê li hev dînerin. Heye ko di wê qadê de şerîne behrî û mezin çêbihin, Ev her sê dewlet jî yani Japon, Inglîtere û Emêrike dewletne behrî ne.

Şam : 27 Tirmeh 1941, NÊREVAN



45 — Di zayendê hin navdêrên ko tiştine nerihber dinimtin kurdmanc ne yek in. Hinan ew nêr, hinên din ew mê hesabandine. Ji wan bêjeyan tiştê ko heta niho me kari bû em bisenifinin bêjeyên jêrîn in. Heye ko hinên din ji peyda bibin: Çax, wext, mixdar, qeder, sing, kursî, balgih, xeber.

46 — Wezîfeyên navdêrê: Navdêr di komekê de gelek wezîfan dibinin. Bi kurtî ên bingehîn ev in:

kirar: Soro îro ji bajêr hat.

Bireserê lêkerê: Min Soro dit. Min ji Soro re got.

Bi reserê navdêreke din: kitêba Soro nû ye. Pêveberê lêkerê: Xertî tu çek e.

### MÊJER

47 — Di gramêrê de mêjer ew xweseriya navdêran e ko navdêr pê heyhereke bi tenê an heyberine gelêr dikarin şanî bidin. Bi gotinên din mêjer yekejmarî û gelejmarîya navdêran şanî me dike û em pê dizanin gelo di qisetê de qala heybereke bi tenê dikin an ji yekê bêtir. Heke navdêr heybereke bi tenê dinimine hingê ew yekejmar e; û heke ji yekê bêtir dinimine hingê ew gelejmar e.

48 — Yekejmar: Navdêr yekejmar e, gava ew ji tişt, mirov û heywanên ko dinimine yekî bi tenê raberî me dike. Navdêrên komekên jêrîn yekejmar in: « Mîr hat. Ez hespekî dibînim. Ez çiyayê bilind dibînim ». Ji ber ko ew ji miran mirekî, ji hespan hespekî û ji çiyay çiyakî bi tenê şanî dikin.

49 — Gelejmar: Navdêr gelejmar e, gava ew ji tişt, mirov û heywanên ko dinimine ji yekî bêtir raberî me dike. Navdêrên komekên jêrîn gelejmar in: « Mîr hatin. Ez hespina dibînim. Ez çiyayên bilind dibînim ». Ji ber ko ew ji miran çend miran, ji hespan çend hespan û ji çiyay çend çiyay şanî dikin.

50 — Herwekî ji misalên madeyên 48 û 49 dixuye di zmanê kurdmancî de yekejmarî û gelejmarîya navdêran bi çend awayên têvel xuya dibin. Ew nemale ji mêjerê lêker, tewang û veqetandekê dixuyin.

#### YEKEJMAR

Ev mehin e.  
Min mehin dit.  
Ez mehinê dibînim.  
Ez mehinêkê dibînim.  
Ezê ji te re mehinêke qenc peyda bikim.  
Ev kurê kê ye?  
Mehinê xwar.  
Tu vî hespî dibînî?

#### GELEJMAR

Ev mehin in.  
Min mehin dîtîn.  
Ez mehinan dibînim.  
Ez mehinina dibînim.  
Ezê ji te re mehinine qenc peyda bikim.  
Ev kurên kê ne?  
Mehinan xwar.  
Tu van hespan dibînî?

### CHANT D'AUTOMNE

Le numéro 28 de "Hawar" contenait le texte et la traduction de deux "patzok" botaniens. Nous publions aujourd'hui un nouveau chant d'automne, recueilli cette fois-ci dans la tribu des Havêrkan. Le ton de cette composition, plus léger et plus gracieux, est quelque peu différent de celui des deux premières.

(1)

Patzê li min dest da, min ne kir kar û bara Zivistanê.

Çiyayê bilind dixwaziin mij û moranê.

Beriya Xelef axa dixwazê reşîseke hûrbaranê,

Ji xêra Xwedê ra, ez bibiwama dtkeki por, ji hewlahewla nêçîrvana,

Mi xwe avêti bana hevringekê, ji ên kafir-zemanê.

(2)

Sê teyra' di ser me re siwan digirtin,

Yek qaz e, yek qumrî, yek seqer e,

Sê hingulsk di destê xelkê delal de ne,

Yek zêr e, yek ziv e, yek elmasekî hi cewher e.

Malê xelkê delal danî bûn di bin malê me re.

Şeva nivê şevê, ez çûme tewafa sing û bera.

Mi lê meyizand, gava matorekî mêra wi li ber e.

(3)

Dengek hate ji ezmana,

Hina digo: « Milyaket in, ketine piştî ewranal »

Hina digo: « Qîrêna Memê şivana! »

Hina digo: « Dengê Ristem Pehlevan e! »

Hina digo: « Cindiyê Bota kar bû ji zozanal »

Hina digo: « Beranê kovî ne, li serê Stpanê

Xelatê bi qloça li hev didanal »

Ez bûm ser tihêla rastê,

Ez qulibtim ser tihêla çepê.

Qîrên diketi toq û benti û kehrebana,

Li ser sing û berê min ê gewr û boz didana.

(4)

Xaliqo, ji te sibhani,

51 — Gelejmarîya serenavan: Ji ber ko serenav xwsertî tişteki, mirovekî an heywanekî ne, û pê bi tenê ew bi nav dibin, di rastiyê de serenav tucaran nabin gelejmar. Lê bi mecazî û ji bo misalê bi gelejmarî tene gottin. Herwekî: Ez ji te re Melayên Cizerî, Ehmedên Xanî û Feqehên teyran ji kû peyda bikim. Tu di beyabanên bêdar û belg de li Bingolan digert. (dûmahîk heye)

Hingé ez li wê bûm, çaxa rîknê Birca Belek danîn,  
Serhoste lêdikir, şakirdiya kevir dibirne banî.  
Ya serhoste, min divê ti qesrekê ji min û  
xelkê delal ra çêki.

Şekir nebat ji malê ne,  
Gul û rihan ji bihnê ne,  
Keç, werdek ji golê kevzê ne.

(5)

Kest ne di mask neqeba di behra de bimrê  
ji tihna.

Ya serhoste, min divê ti xizemekê çêki ji  
dostê ra,  
Ti ne deynt ser sindana,  
Ti lênexî bi çakûçana,  
Ti bigrî bi hesrêl mewlana,  
Ti bikşînt bi mijgulê çavana,  
Ji bona xelkê delal li pozê xwe ê çilakt xî,  
Rojê ed û daweta, da xirab nebl cihê remisana.

(1)

LA JEUNE FILLE.

L'automne m'a surprise, je ne me suis  
pas préparée pour l'hiver  
Les hautes montagnes réclament brume et  
brouillard,  
Et la plaine de Khalaf Agha (1), une averse.  
Si j'étais, par la grace de Dieu, un francolin  
que les chasseurs poursuivent à grands cris,  
Je me réfugierais dans un flot inaccessible.

(2)

LE JEUNE HOMME.

Trois oiseaux me faisaient un dais de leurs  
ailes,  
L'un était une oie sauvage, l'autre une tour-  
terelle, le troisième un faucon.  
Il y a trois bagues aux doigts du joli monde(2),  
L'une est en or, l'autre, d'argent, et la troi-  
sième, un diamant limpide.  
Les tentes du joli monde campaient en des-  
sous des notes.

A minuit, j'allai en pèlerinage vers sa poi-  
trine et ses seins.

Je les contemplai, surgit un grand benêt !

(3)

LA JEUNE FILLE.

Un cri vint du ciel.

Les uns disaient: « Ce sont les anges der-  
rière les nuages ! ».

Les autres: « C'est la voix de Memê chevan(1).  
D'autres: « C'est celle de Rustem, le héros »  
Certains: « Les guerriers du Botan (2) des-  
cend de l'Alpe ! »

D'autres, enfin: « Ce sont les moufflons mâles  
qui luttent à coups de cornes sur le Sipanê  
Khalatê ! » (3)

[En réalité], j'étais couchée sur le côté droit,  
Je m'étais retournée sur le côté gauche,  
Mes colliers et mes pendantsifs d'ambre re-  
tentissaient,

Sur ma poitrine blanche et brune.

(4)

LE JEUNE HOMME.

Gloire à toi, Créateur,  
J'étais là, lorsque l'on édifia les fondations  
de Burdja Balak (4),

Le maître maçon construisait, les apprentis  
montaient les pierres.

Maître maçon, je veux que tu fasses un  
palais pour moi et pour le joli monde.

Nous te fournirons de la maison le sucre  
candi,

De notre haleine, rose et basilic.

Jeune fille et canard, du lac couvert de  
mousse.

(5)

Nul n'a vu poisson mourir de soif en pleine  
mer.(5).

Maître, je veux que tu façannes pour l'amie  
une fleur d'or(6).

Sans la poser sur l'enclume,

Sans la frapper du marteau,

Sans la tordre avec les pinces:

Saisis-la avec d'extrêmes précautions,

Modèle-la avec les cils de tes yeux,

Pour que le joli monde la mette à son nez  
busqué,

Les jours de fête et de noce, sans gâter la  
fosselle aux baisers.

(1) Memê Chevan est un saint, protecteur des trou-  
peaux. Il est particulièrement vénéré par les Yezidis.

(2) C'est à dire, des guerriers terribles. Les Botaniens  
ont la réputation de tout faire avec excès, et l'épithète de  
« botani » implique souvent une nuance d'exagération.

(3) Montagne près du lac de Van.

(4) Le palais des émirs de Botan, à Djéziré, est  
célèbre dans tout le Kurdistan pour avoir servi de cadre  
aux amours de Mem et de Zin., le Tristan et l'Ysolté  
kurdes.

(5) Allusion au trouble-fête dont il est question dans  
le 2e. strophe.

(6) Bijou que les femmes portent à la narine gauche.

(1) La plaine de Nisibine, ou Khalaf agha, chef  
réputé livra bataille aux Arabes, près de Tell Khalaf.

(2) Ça bien - aimée.







## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelnine- Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Bîyîşa Pêxember. Bi Kurdiya dumîlî, bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mehtûb ji Mistefa Kemal paşê re
- 7 — C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikitîn
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10 — Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11 — Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12 — Dersên Şerîetê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13 — Çarnên Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14 — Proverbes Kurdes . Medhelokên Kurdî Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-Xan Paris - 1937
- 15 — Le roi du Kurdistan . Qralê Kurdistanê . Emir K. A. Bedir-Xan û Adolphe de Falgerolle . Paris - 1937
- 6 — Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdistanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel Berlin - 1937
- 17 — Der Schnee Des Lichtes . Berfa Ronahiyê Şîhrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Sall	500	Qirûşên Sûri
Şeşmehî	300	Qirûşên Sûri
Sêmehî	200	Qirûşên Sûri

Xwedî û gerîndeyê berpirsiyar: Mîr Celadet  
Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aalî  
Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 9  
HEJMAR 32  
—\*—  
DUŞEMB  
1 ÎLON 1941

# HAWAR

ANNEE 9  
NUMERO 32  
—\*—  
LUNDI  
1 SEPTEMBRE 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARE

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedisên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Kardûx û welatê kardûxan	Herekol Hzizan
Miletê Bêserî	Bedrî Cemil Paşa
Agahiyek	Hişyar
Dermanê Nezaniyê	Sibhiyê Diyarbekrî
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Şîretên Ehmedê Xanî	Nûredin Üsif
Blûra min	Seydayê Gerok
Hindik Rindik	Xeberguhêz



ŞAM—1941  
ÇAPXANA SEBATÊ



## TEFSÎRA QURANÊ

140 - An gotina we ew e ko Ibrahim Ismail, Isheq, Yaqûb û êlên di wan Cuhî an file bûn ? Pêxemberê min .. bêje wan : Ma hon çêtir dizanin an Xwedê ? Ma ji yê ko hiceta Xwedê li nik wî ye û ew wê vedişêre, jê zalimtir ki ye ? Xwedê hay ji emelên di wan heye.

141 - Ew millet derbas bû çû, keda wan ji wan re ye û keda we ji we re ye. Pîrsa emelê wan ji we naye xwestin.

142 - Ji nav mirovan yê ko sefih in dibêjin: Çi li wan qewimiye ko qibla xwe guhartin[1] Pêxemberê min, bêje wan: Xudanê rojhelat û rojava Xwedê ye, ew ji kerema xwe riya rastiye ji kîjki re dixwaze dide.

143 - Herweki me Ibrahim û çêliyên di wî bijartî bû, wiha ji me hon weke mileteki giran û delal ji xwe re neqand: heta ko hon bi rastiya pêxember û kitêben Xwedê şehdetiyê binin û pêxemberê min ji, bi qenciya wê şehdetiyê bine. Gava me Beyta Miqedes, kiri bû qiblegeha we, me dixwest em bizanin ki ji we, li pey pêxember e û ki xwe jê dide pas. Bi emrê Xwedê, guhartina Qiblê ji bona bawermendan ne tişteki giran e. Xwedê sewaba nimêja we ya ko we ber bi aliyê Beyta Miqedes ve, kiri bû, winda nake, ji ber ko Xuda bi evdên xwe re dilnêrî û mihrivan e.

144 - Me dit ko te çavê xwe li ez-mên digerland û jê dipirist. Emê berê

[1] Gava cenabê pêxember bedela Beyta Miqedes di Qudsê de Kabe kir qiblegeha misilmanan, cihyan wisa got.

te bidin qiblekê ko tu pê dilxweş bibî. Rûyê xwe bide ber bi aliyê Mizgefta Miqedes ve û hon li kû derê bin rûyê xwe her bidin ber bi aliyê wê ve. Heçî ko xudan Kitêb in dizanin ko ew guhartina Qiblê bi emrê Xuda ye, heq e. Xwedê ji emelên evdên xwe ne bêhay e.

145 - Heke te hemi delilên xwe şani xudankitêban bidî ji, dîsa ew rûyên xwe na dine Qibla te, tu ji rûyê xwe na di Qibla wan û hinên ji wan rûyên xwe nadine qibleyên hinan. Ji vir vê da ko ji kerema Xwedê zanîna rastiya Qiblê giha te heke te bi ya Cuhî û Filehan kir û rûyê xwe da Qibla wan, dibî ji zalîman.

146 - Yên ko me kitêb daye wan, ew herweki kurên xwe nas dikin, wisa ji ew Cenabê Pêxember nas dikin, bi hatina wî ji kitêben xwe seh kirine; lê birek ji wan rastiye vedişêrin û pê dizanin.

147 - Herçî ko ji nik Xuda ye û emrê wî ye, rast e, Pêxemberê min. Geli bawermendino, bila şik ne keve dilê we.

148 - Ji bo her mileteki Qibleyek heye ko ew berê xwe ber bi wê ve dide. Geli mislimanino, rûyên xwe bidin kabê û dest bi ibadetê û emelên qenc bikin û di kirina ibadet û qenciye de ser ji hev bistînin; hon li kû derê ji bin, di roja pişdawayî de Xwedê we dê bicivîne û bêxe bin destê xwe. Xuda bi her tiştî dikare.

149 - Tu ji kijan alî ji bi rê kevî di dema nimêjê de berê xwe ber bi Kabê ve bide. Ev emr û fermana Xuda ye. Xwedê ji emelên we ne bêhay e.

150 - Tu ji kijan ali ji bi rê kevi, dema nimejê de berê xwe bide kabê. Hon li kû derê ji bibin berê xwe ber bi kabê ve bidin.

Da ko nerûdana we ber bi ali Kabê ve destê Cuhî û mişrikan de ne be hicet.

Ne ji kafir û zaliman lê ji min bitirsîn, ta ko hon bigehin nimeta min; û bikevin riya rastiyê.

151 - Me ji we re, ji we pêxemberek şand, heta ko ew ayetên me ji we re bixwîne û we ji kufr û nezaniyê xelas bike, we hînî kitêb û hikmetê bike û tiştine ko hon nizanin bi we bide zanin.

152 - Min binin bira xwe, heta ko ez ji we bînim bira xwe. Şikra xwe bi min binin û serhişkiyê mekin, û ji kufrê xwe bidin paş.

153 - Gelî bawermendino! Di tengasiyê de bi nimejkirinê û girtina rojiyê û bi sebrê ji min hevidar bibin. Xudansebr digehin qenciya Xwedê, Xuda bi wan re ye.

154 - Ji mirovan re, yên ko xwe li ber Xwedê didin kuştin, mebejin mirî, canfedayên Xuda, ne mirî ne, ew sax in, lê hon tê nagehin.

155 - Emê we bi tirsê, bi birçitiyê, bi belengaziyê û bi mirandina zaroyên we biceribînin. Pêxemberê min .... Heçî xudansebr in, ji wan re mizgîniya kerema min bigehîne.

156 - Yên belakelî ko dibêjin: Em evd û xulamên Xuda ne; em ketine bextê wî û emê vegerin ba wî; ji wan re ji mizgîniya kerem û comerdiya min bigehîne.

157 - Kerem û qenciya Xuda û piyariya wî bi wan re ye û ew gihane riya Xuda.

158 - Sefa û Merwe ji li ba Xwedê qedirgiran in, yê ko mala Xwedê tewaf an ziyaret dike; jê re tu guneh nîne heke ewî Sefa û Merwe ji tewaf kir. Yê ko qencyê dike û jê hêj zêdetir, xweşhal dibe; Xwedê halê şikirdaran dizane,

159 - Herçend ji me bi Tewratê pêş wan kiriye, yên ko dişa bi hicet û delilên pêxemberitiya Cenabê Mihemed

mikur nayin ew lanetketiyên Xuda ne û laneta her kesî ji li wan e.

160 - Lê heçî ji wan, ko poşman bûne û dest ji veşartina rastiyê kişandine, û bi delil û hicetên pêxemberitiya Cenabê Mihemed mikur hatine û tobedar bûne nefsa xwe islah kirine; ez toba wan qebûl dikim û di gunehên wan dibihurim.

161 - Lê yên ko kufir kirine û bê tobe mirine ew kafir in, laneta Xuda û melaketan û hemî xelkê li wan e.

162 - Ew di vê lanetê de her dê bimînin û ji wan re bext naye dayîn.

163 - Xudayê we yek e, ji wî pê ve tu Xwedê nîne, ê dilovan û piyar ew e.

164 - Afirandina erd û ezmanan, pey hev hatina roj û şevê û kin û dirêjbûna wan, ji bona karê mirovân, çûn û hatina gemiyan ser avê, daketina baranê ji ezmên bi ya ko erdê hişk û mirî bi vê vedije, têrbûna rûyê erdê bi her texlit heywanan, hatina bayan ji her aliyên dinê, çûn û hatina ewran di navbera erd û ezmanan de; ev tişt hemî bi emr û fermana Xwedê û bi kerema wî çêdibin û di qewimandina wan de ji bo mileteki birewer hezar hikmet hene.

165 - Lê hin hene radibin, xaçên xwe dikin hempayê Xwedê û bi qasî ko mirov divê ji Xuda hez bike, ew ewçend heji pûtên xwe dikin.

Lê bêsik hejkirina mirovên bawermend ji Xudayê xwe, ji hevîna wan mişrikan, hêj xurtir e û mirovên bawermend dev ji Xudayê xwe bernadin.

Heke pûtparêz bi giraniya êş û cezayê ko ew di roja pişdawayîyê de wê bibinin bizaniyana xurtî, qudret û mezinahiya Xwedê seh dikirin û tê digehiştin. Qudreta Xwedê mezin e; girtin û berdan di destê wî de ne. Xwedê bi awaktî giran diêştine û diezibîne.

166 - Dema ko mezinê wan kafiran ezabê Xwedê bi çavên xwe dibînin û xwe ji bindestiyên xwe dûtir têxin û di navbera wan de tu bext û hevallîti namîne.

Ji bona Tefsîra Qiranê k. k. û li hejmarên 27, 28, 29, 30 û 31ê fedkirin.

# HEDÏSËN

## CENABË PËXEMBER

249 - Gava hon ji min re qasidekl diþnin mirovekl biþnin ko nav û rûyê wi spehî ye.

250 - Ko xadima we ji we re xwarina we ant, binin bira xwe ko wê bi hilm û bihna wê xwarinê dilê xwe xurt û þa kiriye, berdin bila ew ji bi we re bixwe an jê çend pariyan bidine wê.

251 - Gava yekî xanedan û malvekirî tê nik we qedrê wi bigirin.

252 - Gava Xwedê qenciya yekî dixwaze, cihê wi bilind dike û wî dike arikarê xelkê.

253 - Heke hon dixwazin qedrê yekî li cem Xwedê çî ye bizanin çav bidêrin û binêrin gelo xelk di heqê wi de çî dibêjin.

254 - Ko te xirabiyek kir qenciyeqê li pey wî bike; qenci xerabiyê diþo.

255 - Ko du misilman pev çûn û yekî e din kuþt her du ji dikevin dojehê.

256 - Gava du misilman rasti hev tèn divê silavan li hev bikin, li halê hev bipirsin, pesnê Xwedê bidin; ko wan ew kirin Xwedê di gunehên wan dibore.

257 - Tiþtê ne bi dilê te be meke.

258 - Gava mirovek tiþteki dibêje û li dora xwe dinêre, yê ko dibihise divê bizane ko ew gotina he emanet e, ji tu kest re naye gotin.

259 - Ko Xwedê kar au xebatek da we heta ko ew xwe bi xwe ji destê we ne çû dev jê bermedin. « mirov divê di xebala xwe de pê bide erdê û tê de pêþ ve here »

260 - Heke tu bi kirina xwe a qenc þa û bi a kirêt sermisar dibi bawermendî, mirovekl pak û paqijî.

261 - Heke hon dibihisin ko mirovek dibêje xelk hemî bêfesal in; bizanin ko yê bêfesal ew bi xwe ye.

262 - Xelkê dora te, di heqê te de herwekl dibêjin tu wiha yi.

263 - Heke we bihîst ko çiyayek ji cihê xwe rabûye bawer bikin; lê heke dibihisin ko mirovek eslê xwe guhartiye bawer me kin.

264 - We bihîst ko, di welatekl de êþek heye me rin wî welatî û cihê ko hon tê de ne êþek lê peyda bû jê dermekevin.

265 - Heke misilmanekl li misilmankl þûr kiþanîd heta ko ew þûr bikeve kalanê xwe Xwedê lanet li xwediyê þûrkiþandinê dike.

266 - Ko te gunehêkir li pey wî xê-

rekê bike ta ko xwedê pê gunehê te hilline. (xêr gunehan winda dike).

267 - Gava hon dienerin heke hon ji piya ne rûnin, heke rûniþtî ne vekevin.

268 - Ko misilman li hev ketin ji bona lihevantna wan bixebitin; heke hon pê nikarin tu çaran hevalkariya zaliman me kin.

269 - Ko camêrên we bûne mezinên we û comerdên we dewlemendên we û hon ji iþê xwe bi þêwiran dimeþinin jiyîn ji mirinê çêtir e; lê heke awanên we dibin serekên we û çavtengên we dewlemendên we û iþê we dikeve destê pirekan, mirin ji jiyinê baþtir e.

270 - Ko iþ ket destê peyayên bêkêr divê mirov hêvidarê çiyametê bibe.

271 - Qenciya miriyan bêjin, kêmaniya wan me bêjin.

272 - Ez wisa dibinim ko ji mirina min bi þûn de hon mizgeftên xwe mîna kenîþteyên cihyan û dêrên filan bixemilnîn, jê bigerin.

273 - Ji dan û standina faizê mezinîtr guneh ew e ko mirov paþgotiniya jin û mêrên bi namûs bike; bi xirabiyê qala xelkê me kin.

274 - Xwedê li wan tète xezebê, yê ko kirin û firotina xwe de sond dixwin; belengaz in û pozbilindiyê dikin, pîr bûne û zinayê dikin, wexta hikmê xwe de zilmê dikin.

275 - Timakarê dinyayê me be da ko Xwedê heji te bike, çavê xwe bera malê xelkê me de, ta ko xelk ji te hez bikin.

276 - Ji Xwedê fêdi bikin û ji bona tu tiþtî destê xwe li ber mezin û dewlemendan vemekin.

277 - Beriya mirinê, hisabê mirina xwe bikin, kirin û gotina we her çak û rast be.

278 - Ji bona iþekî biçûk ji hevalkariya xelkê me xwazin.

279 - Hinde ji destê te tê tu xwe çêtir bike.

280 - Her ji wicdana xwe bipirse, ewê rastiye rê te bide, miftî pê qail ne be jî, ne tu xem e.

281 - Girtiyar me êþinin, bi wan re qenc bin.

282 - Di sûtçên xelkê biborin ta ko xelk û Xwedê di sûtçên we biborin.

283 - Bindestiya mezinê xwe bikin, heke serê mezinê we hinga mewijekl piçûk be jî.

284 - Xwedîmal Xwedê ye, yê ko bawer bike xwedî mal ew bixwe ye, Xwedê xezeba xwe lê dike.

285 - Heçî li dinyayê xurtî û çawsorî li-xelkê kirine û ew êþandine di axiretê de zefh wê bêne êþandin.



# KARDÛX

## Û WELATÊ KARDÛXAN

AN KURD Û KÛRDISTAN DI WEXTÊ  
YEWNAVISTANA KEVIN DE

Piştî mirina Daryûşê diwin kurê wi e mezin Erdeşir li ser textê Ecemistanê rûnişt. Birayê wî ê kiçik Korûş, kurê Perizadê, dilê xwe lê xira kiri bû. Erdeşir pê hesiya, brayê xwe da girtin û kir ko wî bikuje. Lê Korûş, bi mehdervaniya diya xwe, canê xwe xelas kir. Erdeşir di brayê xwe bori, ew bi xatirê Perizadê da lê li cem xw ne hişt. Erdeşir Korûş kire waliyê Enedolê û ew ji cem xwe bi dûr xist.

Korûş li Enedolê jî rahet ne disekini. Agirê seltênê di dilê wî de venemirî bû. Ji ker ve xwe kar dikir. Eskerê dida hev. Ji Yewnanistanê zabîti û kumandar tanin. Ji yewnanan di bin fermadariya Klêarx de ji deh hezari bêtir peya gihandi bûn hev.

Korûş piştî ko karê xwe kir; bi ordiweke mezin ajot ser brayê xwe. Erdeşir pê hesiya bû û ewî ji xwe kar kiri bû. Di cihê ko îro jê re Xana Iskenderiyê dibêjin her du biran li hev xist. Eskerê Korûş zora dijminê xwe bîri bû, lê ji ber ko Korûş di şer de hati bû kuştin, eskerên wî ên mizêfer belav bûn û ji hev de ketin.

Ji eceman hinek derbast aliyê din bûn; hinên din revin û yewnan bi serê xwe man.

Eceman Klêarx û kumandarên din ezimandin taştîyekê û bi bilekê ew kuştin. Ordiwa yewnanan di welateki xerîb de bêserî ma bû. Şahê ecem dijminê wan, hevalbendên wan ên kevin li wan qulipi bûn. Ne dizanin wê çî bikin.

Hin zabîti û eqilmend gihane hev û şewrek danin. Di ordiwe de miroveki hêja hebû, bi navê Ksênefon.

Ksênefon xortekî hêja û xwenda û mêreki qenc bû. Di şewrê de herkes bi hêjabûna wî hesiya bû. Hevalên wî rabûn ew ji xwe re fermandar bijartin.

Ksênefon di heqê vê seferê de kitêbek, bi navê « Enêvesis » nivîsandîye. Di vê kitêbê de Ksênefon biserbatîya wî leşkerî û sefera ecem dûr û dirêj qise dike.

Yewnanan dikir ko vegerin welatê xwe. Diviya bû di Diclê re derbas bibin. Dicle rabû bû, pir lê nîn bûn; av jî bor ne dida. Eceman da bû pey û zor dida wan.

Yewnanan qerara xwe da: bindava xwe biguhêrinin, berê xwe bidin bakûr, ji welatê

kardûxan derbas bibin û tê re xwe bigehinin behra reş.

Welatê kardûxan welatê me ye. Hingê ji kurdan re kardûx digotin. Gava em hingê dibêjin, divêt bête zanin ko ev hingê ji me gelekî dûr e. Beriya Îsa pêxember bi çarsed sali. Ji hingê heta îro li me kurdan 2380 sal borîne. Lê em di cihê xwe de ne. Me ber bi bakur ajotiye; lê me xwe ji cihê wwe ê kevin ne daye paş.

Ksênefon di kitêba xwe de bi « ez » e nas-texile. Xwe wek miroveki din dihesibîne û çiroka xwe welê gill dike. Ji lewre gelek caran navê wî ji devê wî tete bihistin. Êdi guhdariya Ksênefon bikin:

« Eskerê Ksênefon xwe gihandi bû bilindcihan û raserî dijminan bû bû.

Eceman xwe dida paş û diketîa rêke din. Xrisof — kumandareki yewnanî — bi eskerê xwe ve daketi bû deştê, eskerê xwe li gundên têrzad û zexire bi cih dikir.

Piştî nivro dijmin ji nişkekê ve daket deştê û li me der bû. Kardûxan yewnanên ko ji ordiwe dîr keti bûn û da bûn pey talên kuştin. Li hire me gelek pez, ji pezên ko şivanan dikir li avê derbas bikin, standin.

Eceman gava dit ko em zadê xwe ji gundan dibin, rabûn agir berdan gundan. Ksênefon digot em herin, arikariya gundiyan û nebêlin ko gundên wan bişewitînin.

Lê Xerisof ne di vê fikrê de bû. Yewnan gotina Xrisof di ser gotina Ksênefon re girt û wan ji dest bi şewitandina gundên kardûxan kir.

Lê ji ber ko yewnanan nikari bû di Diclê re derbas bibin berê xwe dan çiyayên welatê kardûxan [1]

Tevdîra me ev bû ko em ji ker ve ji deştê rabin û beriya dijmin xwe bigehînin bilindcihan. Ji xwe ji şevê kotekî ew zeman ma bû ko em bêti ko bêne ditin ji deştê derbas bibin. Me emrî barkirinê da û bi spêdê ve em gihane çiyê.

Xrisof digel firqe û segmanên xwe ên sivik keti bû pêşiyê. Ksênefon di dimdarê de ma bû û pê re tu segmanên sivik nîn bûn, Eskerên wî tev de piyadeyên giran bûn. Ji ber ko yewnanan mihtemel ne didit ko ecem bidin çiyê, ji par re li wan vegerin, bidin pey û li wan xîn.

Xrisof, beriya ko kardûx pê bihesin, digel eskerê xwe giha bû pehnavaya çiyê. Ordiwe

[1] Bi texmin deştin ko yewnan tê de ne, ew deşt deştê Silopi ye û milê din deştê Hesloane û Diclê di ber wan re diherike. Ji hir wê bidin çiyayên Botan.

dida pey . Bi vi awayi em gihane gundên ko di newal û di gêran de bûn .

Kardûx, gava bi me hesiyan; ji gundên xwe rabûn û digel jin û zarowên xwe berê xwe dan çiyân .

Di gundên kardûxan de me gelek zad û zexlre dîtîn . Xaniyên kardûxan bi kiloz û dij-zikên tinc û sifir xemilandi bûn . Yewnanan dest ne dane wan , û ne ketin pey kardûxên ko direvîn . Ji ber ko me di dilê xwe de digot heke me bi wan xweş kir, heye ko em ji welatê wan bê teq û req û bi awakî dostane derbas bibin . Ji xwe kardûx bi xwe neyarê şahê Ecein bûn .

Lê yewnanan herçî zad û zexlre ne , tev de dibirin ; ji ber bêgaviyê .

Kardûxan guh ne da xweşkirina yewnanan û tu rûyê dostî û aşiyê şant wan ne dan .

Dimdar heta bi tariyê di cilê xwe de ma; û bi şev dakete gundan . Ji ber ko rê gelek teng bû, bi hewa ketin û dahatin rojekê ajoti bû .

Hinek ji kardûxan giha bûn hev û ajoti bûn ser yewnanên ko ji par re ma bûn . Kardûxan ew bi îfr û kevan û kevir kuştin , hinek ji birîndar kirin . Ji xêra xwedê re yewnanên ko ji par re ma bûn hindik bûn . An ne birekî ordiwê î mezin bihata şerjêkirin .

Bi şev em di gundan de man . Kardûxan li ser çiyân agir dada bû . Me guhdariya hev dikir .

Bi şefeqê ve herçî zabî û kumandar , gihane hev û qerar dan ko barxana ordiwê sivik bikin û hêsrên ko vê paşiyê hati bûn girtin , berdîn . Ji ber ko qelebalîxa hêsr û dewaran em aciz dikirin . Eskerên ko li wan miqate dibûn nikari bûn şer bikin . Hêsrana nane me jî dixwar . Li ser vê qerarê ji dewarên baş heçî ko ji me re diviya bû me ew ji xwe re bijartin û ên maynê berdan .

Pişti taştîyê ordû bi rê ket . Rojê pê de em meşîyan . Me carina şer dikir , carina jî me bihna xwe dida .

Sibetirê hapûnek li me qelibî . Digel vê hindê diviya bû em bi rê ve berin ; ji ber ko zadê me ne ma bû .

Xrisof da bû pêşiyê , Ksênefon di dimdarê de ma bû .

Kardûxan derbeke xurt li me da . Kardûxan nzingî li me dikir û kevir û hesin li me dibarandin . Yewnanan dida pey û ji par re dikişîyan . Bi vi awayî em ji rêveçûnê diketin .

Gava dijin li me dişîdand Ksênefon eskerên xwe disekinand û şargeh dikir . Me elam dida Xrisof; wi ji eskerên xwe disekinand . Lê carekê Xrisof li şûna ko bisekine , xwe wer lezand ko ji adetê der ji me bi dût ket . Bivê nevê tiştê li wan qewimî bû . Lê Ksênefon nikari bû here pêşiyê û seh bike . Dimdar jî bêgav ma û lez da xwe . Bi awakî welê ko meşa me bû bez û rev .

Di vê navê de segmaneki hêja , Klêonîm , hate kuştin . Tirek li kêleka wî keti bû . Tirê mirtal û kirasê wî î çerm qul kir û ji par re avêti bû . Segmanekî din , yekî bijarte , bi navê Basyas jî hati bû kuştin . Tirek di serê wî re çû bû .

Gava em gehîştin cihê ko em lê bimana Ksênefon bi lez çû cem Xrisof û gazind jê kirin . Ksênefon gote wî ko bi vê lez andinê dimdar mecbûr bû bû hem bi rê ve here hem şer bike . Disan jî her vê lezandinê yewnanan cendekên du peyayên hêja jî li erdê hiştî bûn , bêt ko bikarin wan veşêrin .

Xrisof lê vegerand û got : Tu van çiyayên asê dibînî ? [1] Mirov di ser destê wan re nikare here . Divê em xwe li wan bigelîbinin . Tu vê riyê dibînî , jû pê ve tu rê nîne ko em tê re bikarin derbas bibin û ji vê derê xelas bibin . Ev jî , rêke zehf asê û nexweş e . Ji ber vê yekê min xwe lezand û ez li hêviya te ne mam . Min xwe ne lezanda hebû ko dijin beriya me biketa bilindcihan û rê li me bigirta . Rêberên me bi xwe dibêjin ko ji pê ve tu rê nînin .

Ksênefon gote Xrisof :

— Bi min re du hêstr hene . Her du ji xelkê vê derê ne , em carekê ji wan jî bipirsin .

Hêsr anin û ew jî hev dût xistin û jî e pêşin pirsin heke rêke din nas dike . Kirin ne kirin wî hêsrî jî « no » pê ve tu tişt ne got . Rabûn ew , ji pêş çavên hevalê wî ve serjêkirin . Hevalê wî anin û jê pirsin . Ewî got :

— Hevalê min jî we re got ko rêke din nas nake , ji ber ko di wan gundan de keçeke wî bi mîr e . An ne rêne din hene .

Ewî kardûxî soz da yewnanan ko wan di rêke qenc re hiborîne . Rêke welê ko dewar jî tê re bi rabeti bikarin derbas bibin . Ji gotinê rêber dixuya ko di pêşiya wan de

[1] Wer dixuya ko yewnan keti bûn dora Cûdî û Herkolê û diviya bû di ber û di ser wan re hiborin . Li bîre û bi hênceta Herkolê tiştê lête bîrê . Gelo navê Herkolê jî hû halîye? Herkol çiyakî bilind û biheybet e . Di Yewnanistana kevin de qehremanek wek Rîstemê Kurd hebû ; jê re digotin «Hêrkûb» . Heye ko gava yewnanan ev çiya dît ji xwe re gotine ewek Hêrkûl e » û ev nav lê nîsye û di devên kardûx û kurdmanan da bûye Herkol .

girek heye û heke kardûx bi wan hesiyan û beriya wan kelîne gir yewnan wê hew bikarin di her re derbas bibin.

Şewrek danîn. Herçi zabîti û kumandar û segmanên bijarte, gihane hev. Diviya bû birek esker here pêşiyê û beriya dijmin bikeve wi giri û rê bihemine. Ji bo vi kari du hezar canfeda hatine bijartin.

Roj diçû awa. Canfedan emrê xwe girti bû. Piştî şivê wê bi rê ketan. Me rêberê girêdayî ji sparte wan.

Wezîfa canfedan ev bû: Ewê bi şev bikevan gir û heta spêdê, wê tê de biman. Bi şefeqê ve, bi dengê stirihan, wê îşaret bidana ordiwê û drêji dijminê ko riya mezin girti bû, bikirana. Hingê tevayiya ordiwê xwe bigihanda wan.

Baraneke hûr dibarî. Ji bo veşartina hereketa canfedan û xapandina dijmin, Ksênefon digel eskerên dimdarê li ber riya mezin şargeh bû bû. Newalek diket neqeba me û çiyê. Diviya bû em tê re derbas bibin û bi hewa kevin. Kardûxan ji jor de kevirine gir û hûr li me gêr dikirin; kevirine girover. Di nav wan keviran de hin hebûn dibûn barê erebekê.

Ev kevir gava gêr dibûn li tehtan diketin, dipengizîn, dişeqitîn, dişikestin û wek kevirên kuçkanîyê, di hewayê re, bi fikîneke tîj, difirin. Di bin barana wan keviran de me nikari bû em nîzîngî li rê bikin. Em li rêke din digeriyan; ew ji bi dest ne diket. Heta bi şevê halê me û kardûxan bi vi kari bû.

Li me bû şev. Em ji şargehên xwe rabûn; me xwe da paş û me şiv xwar. Ji xwe eskerên dimdarê taştê ji ne xwari bûn. Kardûxan bi şev ji dev ji me barneda; kuç û kevir li me gêr dikirin. Me pêjna wan dikir.

Canfedayên me bi rêberê xwe ve derbast çiyê bû bûn. Ji nişkekê ve bi ser qerekona dijmin de girtin. Kardûxan agir dada bû û di dora wî de rûniştî bûn. Bi hatina yewnanan ne hesiya bûn. Yewnanan hinek ji wan kuştin, hinên din ji, ji hevrazan de gêr kirin û ketin şûna wan.

Canfedan di dilê xwe de digot qey bû bûn raserî dijmin û ji ordiwê re rêke baş temîn kiri bûn.

Lê ew şaş bûn. Di paş wan re kelhoşkek hebû û rê di ber wî re derbas dibû. Kardûxan mifrizekî mezin êxisti bûn kelhoşkî û rê birl bûn. Digel vê hindê di neqeba girê ko keti bû destên yewnanan û wî kelhoşkî de riyek hebû. Kardûx bi şev di gir de beyittin û bi sibehê ve

bê deng û pêjin dane rê. Mijê girti bû ser erdê. Kardûx û yewnan ji hev ne dixuyan. Yewnanan nîzîngî li kardûxan kir û dema ko bi darî hev ketin, bortzanan li boriyên xwe xist û yewnanan bi zirt û fortan dirêjî kardûxan kir. Kardûxan xwe ne girt; ji cihê xwe rabûn û revîn. Ji ber ko gelek çîst û çalak bûn kardûxan xwe bi lingên xwe xelas dikir û kêr dihatine kuştin.

Xrîsof gava dengê bortzanan kir bi eskerên xwe ve û di riya mezin re ajote pêş. Kumandarên din dane rê û siverayên ko diketin pêşiya wan. Herkesi bi awaktî qesta çiyê dikir û hildikişiya ser. Hinekan rimên xwe paş xwe ve drêj dikir û hevalê xwe kaş dikir.

Riya ko rêber şanî me da bû ji bo dewar û barxanê ji hemî riyên din çêtir bû. Ksênefon bi esker û barxanê ve, tê ve diçû. Li ser vê riyê mitîkek hebû; û dijmin keti bû ê. Lê Ksênefon nikari bû riya xwe biguhêrtine. Ji ber ko dewar û barxane nikari bûn di rêke di ve herin. Yewnanan halan di hev hildan û êrtîş kirin. Lê li mitîk wer ne hatin û cihêkî revê ji dijminê xwe re hiştin. Kardûxan ji dest ne birine xwe, ji mitîk rabûn û xwe dane paş. Eskerên me tev da di ber gir re derbas bûn. Lê girekî din diket pêşiya me û tê de ji dijmin hebû: Yewnanan dil kir wî giri ji mîna girê pêşin bi êrtîşekê bibin û riya xwe vekin.

Ksênefon pê qalî ne bû. Ji ber ko esker tev da drêji wî giri bikira hebû ko kardûx veşartinê girê ko dihi lê bûn û ji par re li barxanê xî. Ji xwe ji ber tengiya rê dewar yeko yeko da bûn pey hev û barxane bû bû karwanekî dudarêj.

Ksênefon di bin fermandariya sê zabîtên heja Sefisodor, Einfikrat û Erxegoras de, birek esker di girê pêşin de hişt û bi eskerê mayî ve drêjî girê din kir û ket ê. Di pêşiya girê de kelhoşkekî asê hebû û kardûx tê de şargeh bû bûn. Ksênefon nîzîngî lê kir. Kardûxan bêt ko dest bibin xwe kelhoşk heliştin û baz dan. Yewnanan lê ecêbwayî man û di dilê xwe de gotin qey çavên dijminên xwe şênanîne û kardûx yekcar ji deştîhilanîne ketine. Yewnan şaş bûn, dixapiyan. Çavên kardûxan ne şkiya bûn. Kardûxan tiştê ko di dimdarê de çêbû bû tev de diti bûn; xwe ji kelhoşkî da bûn paş û dikirin ko li girê pêşin bêne wer û li dimdarê xî.

Ksênefon digel eskerên xwe ên ciwantir hilkişiya bû ser kelhoşkî û talûke bi çavên xwe diti bû. Ksênefon emrî eskerê xwe kir

ko hêdi hêdi bimesîn da ko ên bişûndemayî bikarin xwe bigihînin wan û gava li hev civiyar diviya bû esker tev de xwe bidin erdekl rast û bikevin qora şer .

Ksênefon hêj emrê xwe ne qedandi bû ko Erxegoras , ji nişkekê ve lê der bû û got ko kardûxan bi êrisekê ew ji gir rakiri bûn; Sefîsodor, Emfîkrat û heçî ko nikari bûn xwe ji zinaran de çeng bikin , hati bûn kuştin .

Kardûxan piştî ko zora yewnanên girê pêşin birin ; pey hev gir û mitikên din ji rakirin û ketin pêşiya kelhoşkê ko Ksênefon bi xwe lê bû .

Ksênefon bi wasta dilbendekî (tercimanekl) deng li kardûxan kir û mitarekêk ji wan xwest da ko yewnan bikarin kuştiyên xwe veşêrin . Kardûxan pêşnihada yewnanan qebûl kir; bi şertê ko yewnan nema gundên kardûxan bişewitînin . Ksênefon ji ev şert qebûl kir .

Dema ev mizakere , yanî mizakera çekdaniyê çêdibû û dawiya ordiwa yewnanan hêj dikişiya û dibate pêş, kardûxan ko ji kumbir û kelhoşkên dorê dihatin der, li hev diciviyar . Yewnan ji xwe digihandin hevalên xwe, yên ko çekên xwe danî bûn .

Ji nişkekê ve kardûxan da ber qîran . û bi heyteholê hilkişiyane kelehoşkê ko Ksênefon hêj jê daneketi bû ; û ji nû ve kevir li ser yewnanan gêr kirin .

Peyayê ko mirtalê Ksênefon hildigirt jê bi dûr keti bû . Segmanekî, bi navê Êrtlok , baz da û mirtalê xwe li ber Ksênefon girt . Her diwan di ber talda mirtalekl de meşiyar û xwe gihandine ordiwê . Yewnan ji ber kardûxan kişiyar, gihane hev û ketin xaniyên têr zad û qwîf . Di wan xaniyan de ewçend şerab hebû ko xwediyar şerabên xwe ber bîr û sarincên çementokirî da bûn .

Me kuştiyên xwe bi rêberê xwe gnhartin . Rêber çû cem xwediyar; kardûxan ji destûr da ko em miriyên xwe veşêrin .

Sibetirê, yewnan bê rêber û rêzar bi rê ketin . Kardûxan dida pey û li wan dixist , û carina ji beriya wan diketin geliyan û rê li wan digirtin .

Dema pêşdar disekinî, Ksênefon ji par re hildikişiya serê çiyar û bera-dijminan dida; ew belav dikirin . Xrtsof , ji aliyê xwe ve , gava dijmin dirêj dikir xwe dida ber û rê ji dimdarê re vedikir . Bi vî awayî pêşdar û dimdar li ber dengên hev bûn û li hev miqate dibûn .

Wextê yewnan ji bilindcihên ko hilkişiya bûn ser , dadiketin jêr kardûxan ew gelek

têşandin . Gava me dida pey wan ji me bi wan ne dikarî . Carina cihê xwe ne diterikandin, heta ko em hi temaml nzingî wan dibûn . Bi tenê ji çar pênc gavan ji ber me radibûn . Lê kardûx hewqas çist û pêşivik bûn ko disan me ne dikari em xwe bighînin wan û wan bigirin an bikujin .

Kardûxan ji tirkevan û kuçkaniyê pê ve tu çekên din hîlmedigirtin . Kardûx tirkevanîne serdeste bûn . Kevanên wan qedere du gaz û niv dirêj û tirên wan, ji gaz û nivekê dirêjtir bûn . Gava tirkevanên xwe tavêtin xwe berdidan ser lingên xwe ên çepê, weris ber bi jêr û ber bi xwe ve dikişandin . Tirên wan di zirihi û mirtalên me re derbas dibûn . Tirên kardûxan ko diketin destên yewnanan; zolek çerm bi serên wan ve girêdidan û wek yadigarekê , ew ji xwe re hiltanin .

Di vî welatê çiyayî de ji xelkê her dere bêtir xelkê Giritê bi kêr hatin .

Di roja heftan de em gehiştî bûn dawiya tixûbê welatê kardûxan û daketi bûn deştê . Me qerargêha xwe li ber ava mezin danî . Av ji çiyayên kardûxan ne gelekî dûr bû . Me di gundên deştê de gelek zad û zextre peyda kirin .

Ji ber pirahiya zadê ko keti bû destên me û ji ber şahiya ko em ji destên kardûxan xelas bû bûn, ew roj ji me re bû bû rojeke cejn û şahinetê .

Em ji welatê kardûxan di heft rojan de derbas bû bûn . Di van heft rojan de hîstekê ji me çekên xwe dananî bûn . Ezab û eziyeta ko me di van heft rojan de diti bûn, me ew ne di şerê şahê ecem ne ji piştî kûştina Korûş û di wextê perşaniyê de ji ne diti bûn . Bi xeyala ko ji wan ezaban xelas bû bûn ; yewnanan di bin tirêjen tavê ên germ de bihna xwe dida û kêf dikir .»

Çirokiya Ksênefon, di heqê biserhatiya yewnanan, di welatê kardûxan de, li hire temaml dibe . Gava mirov ve çirokê dixwîne tişteke tete birê . Gelo di ordiwa ko di welatê me re derbas bû bû, çend peya hebûn . Divêt di wê ordiwê de, gava ew ordû ji şerê Şahê Ecem vedigeriya deh bezar peya hebiwan . Ji ber ko ji vî biserhatiya Ksênefon re vegera deh-hezaran ji dibêjin .

HEREKOL AZIZAN



## MILETÊ BÊSERI

Kî ji we vê sernamê bixwine bê şik ewê bêje ko ev mêrik din bûye. Ma tu mirovên hi eqil di nav me da hene ko ez ji din nebim-Bi min heryek ji me bi hawakî din e. Eger em ji mileteki bi hiş û zana bûna halê me ev ne dibê.

Di dinê da tu jîndar hene ko kari bin bêserî bijîn? Belê.. belê henel Miletê kurd! Hon karin bibêjin mêşek, kelmêşek bê serî nabe! emê çawan bê serî bibin? Ma ez çi bikim hin ji hevalên me dibêjin ko divê em bê serî bin. Heke ji me serekek çêbe emê bi hev bikevin.

Ma wisa ye? na... na ne wisa ye. Bo me ji wek miletên din serekek (liderek) divê. Eşîrên kurdan tucarn bêserî ne mane ko em kari bin bêjin divê miletê kurd ji bêserî be.

Eşîrek kinga ko bêserî dimîne serek pir dibin, heryek ji wan dibêje ez im ko ez im. Ji lewre ev eşîr kêmdikeve, eşîrên dorê lê xurtiyê dikin û eşîra bextereş ji bêserîtiyê tim belengaz û şermisar dimîne.

Iro em ji bêserî ne, bê sergever û bê xweyî ne.

Ez ditirsim şermisarî û belengazî para me bel Zaf mixabin! ji piştgotinî pêve ji destê me tiştek dernayê. Heke em heqnas in, di nav me da ki bêtir hej ji miletê xwe dike, rast e, zana ye, xebatker e, kêrhatî ye em dê wî bikin serî, di dora wî da bicivin ko ew ji Kari be bêje ez Ilderê kurdan im.

Divê em parastîrîyê nekin. Ji hev ra serê xwe dayinin û ji emrê serekê xwe ra itaetê bikin. Ji bona ko em kari bin vê keştiya ko em lê siwar in, bi selameti bigelînin benderê.

Heke wisa nebe, ji me hikûmetek ji çêbe divê dîsa bêserî be. Çima ko em ji hev didexisin, û nikarin em ji yekî ra bibêjin tu serekê me yî. Divê ji niha da em xwe binî vî tiştî bikin ko sibe ranehêlin pêstra bev.

Divê ew serek ji nefismezîniyê neke û ji qenciya welat pêştir tu armanc negire. Dilxwaza wî bi tenê xelasiya welêt be.

Û hêdiseke cenabê pêxember dibêje ko beke ji we sê mirov bi rê ve diçin bila yekî ji wan serekîtiya ên mayîn bike. Jê têtê zanin ko sê mirov ji bêserî nabin. Em ko mileteki mezin in çawan bêserî dibin.

BEDRÎ CEMÎL PAŞA

## AGAHIYEK

Destpêka ilmê evîne pir bi me xweş bû mizac. Bebr û movik yek bi yek qelbê me de girtî rewac.

Lewra dil perwaz nede ahên û fişan nayê der. Seyra îşqê bê cefa dil nayê perhîz û mewac.

Ger nebî naxweş û bêzar şin û girî çênebe. Bijîşk nayê diyarî da bibexşîne ilac;

Lew bizane îşq û aşîq her li dinya serwer e. Şerbeta pirsane peyda ew dike cama zecac.

Evlîna paqij û hêja çêdibe werê nejad. Yekîtiya qewman dijine kev li siltan text û tac.

Çeng û tenbûr tev dinalê dengê sazê zîz û jar, Şêx û seyda ma çi zanin lezeta îşqê amac.

Ger bixwînin, wer bibînin pend û nîshê aşîqan, Leşkerê cengê siwar bin, da ji Tûran bêne bac,

Hiş û zanin çêdike top û teyare nav û deng. Leşkerê mêrxas ê camêr tîne xûgî sed xerac.

Em li ser keştê siwar in derya bextê me rewac, Dê bi limanê gihin. Hişyaro xo ke tê scac.

HIŞYAR,

## DERMANÊ NEZANIYÊ

Dinya êvar bû. Ez rastî miroveki hatim; miroveki sere. Bi min re da û stand û ji min pîrî;

— Pîmam, çi dikeve serê te, gelo kurd ji wê bikarin, mîna miletên din bibin tiştek?

Min lê vegerand û got ê: Di canê Kurdistanê da eşîr in; û tu şik tê da nûve ko her eşîk dermanek jê re divêt. Ji lewre canê Kurdistanê zehf dermanan dixwaze, da ko rihet û paşê xurt bibe. Ji her ko Kurdistan pir bi eşî e, hewcedarî bijîşkeki jîr û jêhatî ye. Da ko ew bijîşk bikare vê ne-xweşê darman bike.

Kurdino! ew bijîşk divêt rêbereki xurt, hişyar, cegerpola û desthesin be. Da ko bi xurtiya dest û dilê xwe bikare bê pêş û paş û bi zexmî her kêmasiyê ji nav miletê kurd hiltne.

Xeberbêjê min ji min pîrî û got:

— Bi te kîjan eşî berî hemîyan divêt bête derman kirin?

Min lê vegerand û got ê: Di canê miletê kurd de du kunêrên xedar hene; wan canê milet kotî kirin û gihan heştî; divêt ev her du kunêr bêne bi der kirin. Ev her dû kunêr, nezani û berberî ne.

Dermanê nezaniyê zanin, û dermanê berberiyê yekîti ye.

SIBHIYÊ DIYARBEKÎ



## BINGEHËN GRAMËRA KURDMANCI

BI NAVË YEZDANË PAK Ê DILOVAN Û MIHRVAN

— 6 —

### TEWANG

52 — Zimanê kurdmaci zimanekî tewangbar e. Yanî bêjeyên wî di qisetê de weke xwe namînin û li gora cihê ko di qisetê de dikevin ê, û wezîfa ko li ser xwe digirin têne tewandin û hin parkit bi wan ve dibin, an hin tipên wan bi tipine din diguhêrin.

53 — Ji birên qisetê bi tenê ên guhêrbar têne tewandin. Ên neguhêrbar tucaran nayîne tewandin û ew hergav weke xwe dimînin.

54 — Bi gelemperî bêje di qisetê de an kirar an bireser in. Gava ew kirar in weke xwe dimînin, û gava dibin bireser hingê têne tewandin.

Tewanga her birê qisetê herçend yekcar ji hev cida nebin jî ew kem û zêde ji hev bifêriq in. Tewanga her biri di cih û di devera wê de dê bête gotin.

55 — Tewanga navdêran : Navdêr, hev-nay bin sernav bin, li gora mêjer û zayêndên xwe têne tewandin. Bi gelemperî û di yekejmariyê de navdêrên nêr bi « f » yê û navdêrên mê bi « ê » yê û gelemjara her diwan bi « an » ê têne tewandin. Ev parkit bi paşîya navdêran ve dibin.

Hesp hat. Hesp hatin.  
Mehin hat. Mehin hatin.

Di komekên jorîn de navdêrên « hesp » û « mehin » ne hatine tewandin. Ji ber ko ew her du jî di wan komekan de kirar in û kirar nayîne tewandin. Lê ev navdêr bi xwe di komekên jêrîn de hatine tewandin. Ji ber ko tê de êdî ne kirar lê bireser in. Ez hespî dibînim. Ez hespan dibînim. Ez mehnê dibînim. Ez mehnan dibînim.

Di mîsalên jorîn de navdêr hemî bireserê lêkerê ne. Lê navdêr bireserê navdêreke din jî dibin. Hingê jî navdêr têne tewandin. Herwekî : Ev goşfê çêlekê ye. Ava golê gêrîn e. Di çiyayên Kirdistanê de her texlîl dehbe û cenawir hene. Gola Wanê goleke spêhî ye.

Şanek — Di nav bêjeyên ko bi « an » êkê temam dibin, di hinan de ev « an » jî esil û rayekê bêjeyê ye. Mîna : Rawan, baran, peyman, garan, kevan, diran h.d. Lê di hinên din de ev « an » bi xwe, tewang e, û jî ber sebebekê bi wan ve bûye.

Mîna : Serhedan, Botan, Şêrwan, Xêrzan, Hevêrkan h.d. Ji lewre ev bêjeyên ha bi tu awayî nikarin bêne tewandin. Ji ber vê yekê herwekî mirov dibêje « Ez ji Rowênê tîm » nikare bibêje « Ez ji Botanê tîm ». Ji ber ko eslê bêjeyê « bot » e, « an » ko pê ve bûye tewanga gelemjare ye. Ji xwe gava em Botan dibêjin mexsed « cihê » an « esîrên Botan » e. Bêjeya « bot » bireserê cih û esîrê ye û jî lewre hatiye tewandin û bûye « Botan ». Mîna bêjeya « dar » gava dibe bireserê hejêke din tête tewandin. Herwekî : « pêlên daran ». Bêjeyên wek Serhedan, Şêrwan, Xêrzan, Hevêrkan, Soran ji mîna wê ne û tev de yek hawî ne.

Di vê navê de bêjeya « gulan » reşma ko jî vi cîsnî ye tête tewandin. Bi rastî eslê vê bêjeyê « meha gul, meha gulan » e ; yanî « an » tewang e. Ji lewre diviya bû « gulan » ne hata tewandin. Lê ev bêje jî qeydê der û bi awerteyî careke din jî tête tewandin û dibe « gulanê » û li şûna ko bibêjin « meha gulan » dibêjin « meha gulanê ». Ji ber vê yekê « an » a gulanê divê jî eslê bêjeyê bête hesibandin.

56 — Awarte : Bi tenê û jî qeydê der di lêkerên gerguhêz û di zemanê wan ên borî de bireserên wan weke xwe dimînin û jî bervajî ve kirarên wan têne tewandin. Ji lewre, di komekên jêrîn de reşma ko bêjeyên : « Zin, hesp, çêlek, zarok » kirar in, hatine tewandin û bêjeyên ; « Sisin, ceh, pencere » yên ko bireser in weke xwe mane û ne hatine tewandin.

Zinê Sisin dit. Hespan ceh xwar. Çêlekan giya xwari bû. Zarokan pencere şkenand.

57 — Herçî navdêrên nêr in beke di wan de tipên « ê » û « a » bene. ev navdêr dikarin bi guhartina wan tipan bi « ê » kê jî bêne tewandin. Herwekî di wan komekan de : « Soro ji kêvir ket. Gurgîn çû eş. Balafir ber bi ezamên firi. Ez li hêsp siwar bûm. Ferzo ji bajêr têt. Ki li ser bèn bû ? Êm ji xênî derketin ».

Bi vê qeydê ve, divê di qisetê de hin navdêrên nêr bê tewang bimînin. Ji ber ko di hemî navdêrên nêr de dengdêrên « e » û « a » peyda nabin. Ji lewre û li nik \*kurdmancên ko bi vê qeydê ve diçin bêjeyên wek : « kum, goşt, dil, hiş, mirov, mêrik, gir, kur, mîr, mêr, gund » nayîne tewandin, jî ber ko di wan de ne « e » ne jî « a » beye. Ji ber vê yekê gava ew di qisetê de dibin bireser jî weke xwe dimînin. Piştî ko ev qeydê di zmanê de cih bûye navdêrên bi « e » û « a » jî di qisetê de bê tewang hatine gotin. Ji lewre herwekî mirov dikare bibêje « ez ji kevirî - an - kêvir ketin » dikare bibêje jî « ez ji kevir ketim » û bêjeya « kevir » netewîne.

Şanek — Ji raveka jorîn dixuye ko di navdêrên

nêr de meyildariya zmiên ber bi terikandina tewanga wan a yekejmar e; nemaze şiklê pêşin. Ji lewre her sê şiklên jêrin rast in.

Soro kêvirî tavêje. Soro kêvir tavêje. Soro kêvir tavêje.

Gurgîn çû aşi. Gurgîn çû eş. Gurgîn çû aş. Balafir ber bi ezmanî firî. Balafir ber bi ezmiên firî. Balfir, ber bi ezman firî.

Ez li hespi siwar bûm. Ez li hêsp siwar bûm. Ez li hesp siwar bûm.

Ferzo ji bajari têt. Ferzo ji bajêr têt. Ferzo ji bajar têt.

Kî li ser bani bû? Kî li ser bân bû? Kî li ser ban bû?

Em ji xaniyî derketin. Em ji xêni derketin. Em ji xani derketin.

58 — Gava çend navdêr didin pey hev herwekî mirov dikare wan navdêra li gora mêjer û zayendê heryekê yek bi yek bitewine, dikare bi tewandina hinekan jî bes bike.

Navdêrên ko dane pey hev ne ji yek zayendî ne; lê tev de ji yek mêjerî ne. Tewandina navdêra paşin bes e. «Ez hesp û mehîne dibinin. Ez hesp û mehînan dibînin. Hesp û mehînan xwar».

Navdêrên ko dane pey hev, ne ji yek mêjerî ne. Her navdêr cihê û li gora mêjer û zayendê xwe tete tewandin. «Ez mihê û bizinan dibînim. Ez hêsp û mehînan dibînim. Mihê û bizinan xwar».

Navdêrên ko dane pey hev ji yek mêjerî û tev de yekejmar in, lê ew ne ji yek zayendî ne; û navdêra paşin nêr e. Ji ber ko di tewangê de esil navdêra paşin e û hikim li mêjerê wê ye heke ew ne hatiye tewandin navdêra mê ji bê tewang dimîne. «Ezê herim keçik û kurik bibînim. Tu Rewşen û Felemêz dibîni?»

Şanek : 1 — Herçî navdêran ko bi « e » an bi « a » yê tamam dibin, çî mê çî nêr, ji ber kurtiyê, di yekejmarê de bi guhartina van tipan bi « ê » kê jî tenê tewandin. Di gelejmarê de ew « e » û « a » yekcar dikevin û « a » ya tewangê dikeve şûnâ wan.

Li ser maseyê	Li ser masê
Li ser maseyan	Li ser masan
Ber bi çiyayî	Ber bi çiyê
Ber bi çiyayan	Ber bi çiyau
Çirayê vemirine	Çirê vemirine
Çirayan vemirine	Çirau vemirine
Perdeyê rake	Perdê rake
Perdeyan rake	Perdan rake

Şanek : 2 — Bêjeyên wek Frense, Sûriye, Emêrîke, Efrîqe h.d. yên ko bi « e » kê tamam dibin, heke ew bi guhartina wê « a » yê bi « ê » kê ne hatine tewandin û ketine bin hikmê qeyda gelempê ew « e » bi « a » kê diguhêre û ew bêjê bi awayê jêrin tene tewandin: Ji Sûriyayê, ji Frensayê, ji Emêrikayê, ji Efrîqayê. Lê şiklê din,

wanî şiklê: Ji Frense, ji Sûriyê, ji Emêrikê, ji Efrîqê siviktir e.

59 — Bireserî Navdêrê: Navdêr di komekê de an bi tena xwe ne, an bêjeyê din bi wan ve bûye û hevaltiya wan dike. Ji wê bêjeyê re bireser dibêjin; ji ber ko ew mana navdêrê diediltne û dibe serî.

Bireserên navdêran, li gora cismên xwe li pêşî an li paşîya navdêran tene zêde kirin.

Bireser gava dikevin pêşîya navdêran bêt tu tiştî bi wan ve dibin: ev keçik, kîjan mirov, çar xanî, hin çiya, çend kitêb, deh bizin, van zarokan.

Lê gava navdêr bi xwe li pêş e û bireser dane pey, hingê veqetandek dikeve navbera navdêr û bireser û wan digihne hev: Beriya Mêrdînê, hespê beza, mehîna spehî, çiyayê bilind, pehna çiyê, newala kûr, rêke dirêj, stûna xêni, destê bi tenê, dara şikestî, xencera min.

60 — Navdêrek dikare çend bireseran bibe. Hin ji wan dikarin bikevin pêşî hinên din ji paşîya navdêrê. Bireserên ko ketiine pêşîya navdêrê û yên ko dane pey wê ji alikî û tev de bireserên navdêrê ne û ji aliyê din ew bi xwe bireserên hev in:

Min çend kitêb hene. Min çend kitêbên qenc hene. Ev xencera min e. Ev xencera xulamê min e. Ev xencera xulamê pismamê min e. Ev xencera xulamê citanê pismamê min e.

## II — VEQETANDEK

61 — Veqetandek bêjêke kiçik e ko dikeve paşîya navdêran û paşîya wan bêjeyên ko li şûna navdêran radibin û wan dinimînin.

Veqetandek carina di pêşîya rengdêran de jî peyda dibin.

Veqetandek bi gelemperî mêjer û zayendê navdêrê şanî didin û navdêr ji wekhevên wê vediqetin.

Bi pêvebûna veqetandekê navdêr carina binavkîrî û carina jî nebinavkîrî dibin.

62 — Di zimanê kurdmançî de du texlî veqetandek hene: veqetandekên binavkîrî û veqetandekên nebinavkîrî.

63 — Veqetandekên binavkîrî: Veqetandekên binavkîrî dikevin paşîya navdêrê ko bireserê bi wan ve bûye û ev veqetandek wan navdêran binavkîrî dikin. Ev navdêr bi vi awayî ji wekhevên xwe vediqetin, dibin xweserî kesekî, tişteki, an wesfekî wan didin zanîn. Veqetandekên binavkîrî sisê nê: ê, a, ên.

Ê — Ji bo yekejmarê zayendê nêr: Hes-



pê Soro, çiyayê bilind, deriyê malê, diwarê hewşê, pismamê min, mirovê qenc, kewê nêr.

A — Ji bo yekejmara zayendê mê: Mehîna Cemşid, newala kûr, dotmama wî, jîna delal, stûna stûr, ava tenik, destmala Sinemê, kewa mê.

EN — Ji bo gelemjara her du zayendan: Hespên Soro, Çiyayên bilind, deriyên malê, diwarên hewşê, pismamên min, mirovên qenc, kewên nêr, melînên Cemşid, newalên kûr, dotmamên wî, jînên delal, stûnên stûr, avên tenik, destmalên Sinemê, kewên mê.

Bi rasti, gava em « Hespê Soro » dibêjin, wî hespi bi veqetandeka «ê» ji hespên din vediqetînin, û xweserî Soro dikin. Bi wî awayî em dizanin ko ew hesp hespê miroveki ye ko navê wî Soro ye, û ew ne hespê Gurgin, Felemêz an miroveki din e.

Disan di mîsala « Çiyayê bilind » de ji bi veqetandekê wesfê bilindbûnê em pê ve dikin û wî çiyayî ji wekhevên wî û nemaze ji çiyayê nizim cida dikin û ferqa bilind û nizimbûnê dixin navbera wan.

Gava em « dotmama wî » dibêjin, em çelt wê dotmamê dikin ko ne ya min e, ne ji ya te ye, lê ya wî mirovî ye ko ew bi mê her diwan nas e.

64 — Veqetandek di pêşiya rengdêran de: Gava veqetandeka binavkiri dikeve pêşiya rengdêrekê ew li şûna wê navdêrê radibe ko berî bîstekê çel li wê kirine û ew bi xerbebêjan nas e. Hingê veqetandek mîna pronaveki navdêrekê dinimîne. Herweki di bersivên komekên jêrîn de:

— Tu kijan kumî dixwazi?

— Ez ê gewir dixwazim (yanî kumê gewir dixwazim).

— Tu kijan destmalê dixwazi?

— Ez a sor dixwazim (yanî destmala sor dixwazim).

Di gelemjara de:

— Ez ên gewir dixwazim (yanî kumên gewir dixwazim).

— Ez ên sor dixwazim (yanî destmalên sor dixwazim).

65 — Veqetandekên nebinavkiri: Veqetandekên nebinavkiri dikevin paşiya wan navdêrên ko ji wekhevên xwe hatine veqetandin, lê ne hatine bi nav kirin û bi biservebûna van veqetandekan kesine an tiştine nebinavkiri şanî didin. Du texlit veqetandekên nebinavkiri hene: 1— yên ko dikevin paşiya wan navdêrên ko hêj tu bireser bi

wan ve ne bûne; 2— yên ko dikevin paşiya wan navdêrên ko bireserek daye pey wan.

66 — EK, EK, IN.

EK — Ji bo yekejmara zayendê nêr.

EK — Ji bo yekejmara zayendê mê.

IN — Ji bo gelemjara her du zayendan.

Ev veqetandek dikevin paşiya wan navdêrên ko hêj bi serê xwe ne û tu bireser bi wan ve ne bûne.

Hespek hat.

Hespin hatin.

Mehînek hat.

Mehîniin hatin.

Min hespek dit.

Min hespin dîtîn.

Min mehînek dit.

Min mehîniin dîtîn.

Ev hespek e.

Ev hespin in.

Ev mehînek e.

Ev mehîniin in.

Gava em « hespek hat » dibêjin, em wî hespi ji wekhevên wî vediqetînin, lê em wî nadin zanî gelê ew kijan hesp e? an hespê kê ye? Em wî bi vê veqetandekê nebinavkiri dikin.

Wezîfa veqetandeka nebinavkiri ji hev-dûbêja jêrîn xewş tête seh kirin. Kur ji bavê xwe re dibêje:

— Ezbenî min dit, hespek hat û kete hewşê.

Bav — gelo ew kijan hesp e? an hespê kê ye?

Kur — Nizanîm ez herim lê fedkirim.

Kur diçe, lê fedkire, vedigere û ji bavê xwe re dibêje:

— Ezbenî, hespê ko hat hespê kumê e; an, hespê ko hat hespê Gurgin e.

Bêdîro, hetant ko kur ne çû û li hêsp fenekiri, kur û bav bi tenê dizanin ko yek ji heywanên ko jê re hesp dibêjin hatiye û ketiye hewşê. Lê ji ber ko tu wesfê wî bi wan ne nas e, ew hesp bi wan ne binavkiri ye û ew nizanin ew kijan hesp e. Ji lewre veqetandekê nebinavkiri pêve ye. Lê piştî ko kur diçe lê fedkire û vedigere, hingê kur û bav dizanin ko ew hesp, hespê kumê e; an, hespê Gurgin e. Bi gotinên din ew hesp bi wan binavkiri dihe. Ji xwe veqetandeka binavkiri «ê» pê ve bûye.

Şanek — Heke navdêrê ji yek mêjerî dane pey hev veqetandekê bi tenê besî wan e.

Hesp û mehînek hatin. Min keç û kurek bene.

Li şûna:

Hespek û mehînek hatin. Min keçek û kurek hene.

Lê heke navdêr ne ji yek mêjerî ne, hinên wan yekejmar û hinên din gelemjara in, hingê heryek ji wan cihê cihê veqetandeka xwe a xweser dibe.

Hespek û mehîniin hatin. Min keçek û kurin hene.

(dûmahik heyê)

C. A. Bedir-Xan

## REWŞA DINYAYÊ

### HEVDÛDÎTINA RÛWZET Û ÇORÇIL—

Mister Rûzwelt reiscimhûrê Emêrikayê he-weskareki masivaniyê ye. Lê Rûzwelt masi-yan ne bi nehk û torên adetî û di perên çem û golan de, lê bi alet û torine mezin û di behran de digire. Rûzwelt car cara û ne-maze gava ji xebata hikûmetê diweste li yexta[1] xwe siwar dibê û dikeve behran; diçe masivaniyê. Masivanî ji mîna neçtrê kêfêk e, bi ferqa ko masî zindî bi dest dikevin.

Di daviya hefta Tirmehê a pêşin de telê-grafan da zanin ko reiscimhûr ji Weşingtonê, ji Qesira Spî [2] rabûye, ketiye yexta xwe û qesta behran kiriye. Herkesî got reiscimhûr weke hercar çû masiyan.

Piştî çend rojan xelkê Londrê bala xwe da ko reiszewaretê wan jî, ji ber çawan wînda bûye û nayete meclisê. Nêrevanîna got: Çorçil çû Emêrikayê, ewê di behran de xwe bigehîne Rûzwelt.

Hikûmetên îngilîz û emêrikantî jî vê nû-çê re ne « herê » gotin ne jî « no ».

Nûçeyên ko jî yexta reiscimhûr dihatin; wan jî çala mêvanan ne dikir û bi tenê di-got: dinya xweş e; masî zehf in: reiscimhûr bikêf e.

Ev hal heta 14ê Tirmehê dom kir û kesi ne da zanin Çorçil li kû ye û çî lê qewimiye.

Li 14ê Tebaxê paşî nivro di saet pêncan de, Mécêr Etli, weklê Çorçil, di meclisê de da zanin ko Çorçil û Rûzwelt di behra Etlantikê de gihane hev û li ser şer û nizama din-yayê pev re axaftine, û mideke xweş li cem hev mane.

Di dora vê hevduîtinê de gelek tişt hatine gotin. Lê tiştê ko bi awakî resmî hate zanin beyanameyek e.

Çorçil û Rûzwelt piştî vê hevduîtinê beyanameyek belav kirin. Di vê beyanâmê de heşt niqte hene, wek çardeh niqteyên Wilson. Bi kurtî her du reîs didin zanin ko Îngilîterê û Emêrike jî rahetî û qenciya dinyayê re dixebitin û jî xwe re tu tiştî na-xwazin. Şer heta şikestina Elmanyayê wê dom bike û piştî şer her milet divê bige-he sîklê idara ko lê têt û ew jê hez dike; û nabe ko mîletek bindestiya mîletekî din bike, û herçî dewletên ko elmanan ew hilwe-şandine jî nû, ve wê bêne danin.

Bivê nevê herçî mîletên bindest kêfa xwe

[1] Yextî tezlîtek vapora, vapora geştî û gerê ye.

[2] Qesira spî xaniyê reiscimhûrê Emêrikê ye.

## Şîretên

### EHMEDÊ XANÎ

Rojekê, Ehmedê Xanî şêst zaroyên kurd — keç û kur — birin mala xwe û jî wan re daweteke mezin da. Piştê di nav wan de rûnişt û jî wan re pirsên jêrîn gotin. Divê hon wan di dilê xwe de veşêrin, jî ber ko; rêber û zanayê me ê mezin ew ne jî wan şêst zarokên bi tenê re gotine, lê jî bo hemî zaroyên kurd re. Gotinên rehmetî ev in:

Hon piçûk in, hon geş in, bê derd û xem dileyizîn û dikevin; ev dema dilxweşiyê ye.

Eger hon dixwazin hergav bextiyar bibin û tucaran pir bedbext nebin li du liştan bigerin; hejkirin û xebat,

Ki hejî we dike hejî wî bikin: îro hejî merivên xwe bikin; hejî-diya xwe, hejî bavê xwe bikin, hejî hevalên xwe bikin, piştê honê hînî hejkirina diya me gişan Kurdistanê bibin.

Ê didoyan; bixebitin; îro jî bo hînbunê, jî bo zaninê bixebitin; da ko halê dinê bizanin, bi pêş ve herin, bibin meriv, bibin hêja, bibin serdest, bibin insan!

Gava hon dersên xwe baş dizanin, dilê mamosteyên xwe xweş dikin. Hon dibînin ko hon jî geş dibin, jî bin barekî giran xelas dibin, sivik dibin. Ev hergav holê ye. Bixebitin da ko wijdana we her gav jî we razî be! Û gava wijdana insan rahat e û dilê wî bi kêfê, ew insan tucaran ne bedbext e.

Zaroyên min ên delalî niha jî bo xatirê min têr bixwin! vexwin! û bikenin! Ez bi we bextiyar im, ez dixwazim hon jî bi min dilxweş bin, da ko welatî jî bi hejkirina me hev û du hergav şa be!

### NÛREDÎN ÛSIF

jî vê beyanâmê re anîne û bêsebr û bedar hevîdarê anînciha wê ne.

### HEVDÛDÎTINA HÎTIER Û MÛSOLÎNÎ —

Li 29ê Tebaxê radyowên Berlîn û Romayê dane zanin ko jî 25ê Tebaxê ve Hitler û Mûsolîntî li cem hev bûn; Mûsolîntî çû bû Okran-yayê, qerargaha Hitler. Bi Dûçe re hin kumandarên talyanî jî hebûn. Ji milê elmanan

ji serfermandarê ordiwa elmani von Keytel û wezîrê xarçiyê von Ribentrop hazîr bûn.

Li gora danezanan di vê hevduhatîne de Hitler û Mûsolîni li ser nîzama Ewropayê a nû û li ser pêşvebirina şer axaftine.

**ŞERÊ ECEM** — Di şerê mezîn yanî di şerê 1914an de ecem ne ketî bûn şer lê ordiwên dewletên dorê û yê hevalên wan tev de ketî bûn axa ecem: ûris, tirk, inglîz elman. Lê ev ordû tev de û heryek bi awakî ji erdê eceman rabûn û ecem bi serê xwe man û piştî ko şahê pehlewî rabû ser textê ecem, Ecemîstan ketî rîya pêşevçûn û bilîndbûnê û ji xwe re ordiweke nîzami ji çêkir, bi tang û balafir û her textî hacet û hesincawên nû. Eceman di behra farîs de, ji xwe re stoleke kiçîk ji pêk anî bû. Dibêjin ko ordiwa eceman ji (200000) peyayî bihevketî ye.

Di vî şerî de her û her û bi her hêncetê eceman bêterîya xwe îlan dikîr.

Li 25ê Tebaxê, rojê Dûşembê radyowên dinyayê dane zanin ko ordiwên inglîz û rûsî ketîne erdê Ecemîstanê, ûris ji bakur de, inglîz ji aliyên nivro û roava, ji behra farîs û ji erdê Iraqê.

Tukesî li vî şerê nû ecêbmayî ne ma. Ji ber ko di rojên paşîn de gelek dan û standî di navbera van her sê dewletan de çêbû bû. ûris û inglîzan digot di welatê ecem de elman roj bi roj bêtir dibin û ev elman ji bo her sê dewletan, ûris inglîz û ecem, talûkeke mezîn in.

Eceman digot mixdarê elmanan li Ecemîstanê (690) peya ye, ne kêr, ne zêde. Lê li gora ûris û inglîzan ew elman ji (2500)î ji bêtir bûn.

Hevalbedan, yanî ûris û inglîzan digot ev elman li welatê ecem belav bûne û heçî rêhesin, karxane û tiştîne ko di wextê şer de bi kêr tîn, tev de xistine destên xwe; û di hin cihan de çek, cebîrxane, bombe û (50000) ton dinemît kom kirîne. Û ev eleman bi hênceta nêçîrê, di nîzingî Telranê de, dikevin çolê û bi talînên eskerî mijûl dibin û xwe karî şer dikin.

Ji milê din ûrisan tanî bîra eceman ko li gora mîahedeya 1921ê heke dewleteke din çavên xwe berda Ecemîstanê û ji eceman ne hat ko xwe jê biparêzin hingê ji ûris re dibe heq ko eskerê xwe bêxe erdê Ecemîstnê, bi şertê ko piştî derbasbûna talûkê vî eskerî bi şûn de bikiştîne û welatê eceman ji eskerên xwe vala bike.

Hevalbendan çend çaran miracehî hikûmeta eceman kir û jê xwest ko wan elmanan ji welatê xwe derîne. Wer dixuya ko gotin û cihabên eceman ne diket serê ûris û inglîzan û dilê wan li wan gotinan rûnedînîşt.

Eceman digot elman ji wek biyaniyên din di bin nezaretê de ne û bi karê xwe mijûl in. Lê heye ko em hinên wan ji Ecemîstanê derînin. Herçî cerîdeyên ecemî fortên xwe didan û digotin; Ecemîstan bêteref e, lê heke dewletekê dirêjî wê kir ewê di pêşiya xwe de ordiwa Ecemîstanê dê bibîne, çêliyên ecem ji bo istîqlala welatê xwe bêperwa xwîna xwe wê birîjin. Ecem nahîlin ko xelkê xerîbên û pê li erdê wan bikin Tirkan ji nav di eceman dida û digot Ecemîstana Şahê Pehlewî ne Ecemîstana kevî e. Ecemîstana îro dewleteke newîn û bi her awayî xurt e.

ûris û inglîz dihesîyan ko ecem bi wan dilehîze û dixwaze vî îşî jî bêxe herenayê. Eceman dixwest bi siyaseta xwe a kevî û bi sibe û dusibê her du alîyan bigerîne û di dema paşîn de bi aliyê xurt ve bibe.

Li ser vê yekê û li 25ê Tebaxê, sibê saet çaran de sefirên ûris û inglîzî çûne mala wezîrîarçiyê Ecemîstanê û noteyên hikûmetên xwe ji wezîrê ecem re ber pê kirin.

Wan notan tiştên ko me li jor gotîne dihejmartin û bi ser ve zêde dikirin ko vegertîna Ecemîstanê tiştêki miweqet e û tu dijîmalîya ûris û inglîzan di heqê eceman de nîne.

Demî sefiran noteyên xwe digîhandîne wezîrêarçiyê Ecemîstanê ordiwên wan ji diketin erdê Şahê ecem. Eceman di hin cihan de dest birî be jî xwe, xwe gelek ne eşand û çêtir dit ko xwe bide alî, û rê bide mîvanên xwe. ûris ji jor de, inglîz ji jêr ve zûka meşîyan û ketin hin bajarên Ecemîstanê. Inglîzan dest danî birên pêtrôle, bêt ko ecem bikarin xesarê bigîhînin wan. Tirkiya ko nav di eceman dida û li gora peymanî Sadabadê diviya bû here arîkariya Ecemîstanê, xwe tev ne da û weke hercar da zanin ko di vî şerî de ji bêteref e. Bi tenê got heyfa Ecemîstanê, tu sûc û gunehên wê nînin.

Herweki me got eceman di hin deran de çend tîfîng teqandin, lê xwe ne dane ber û bi şûn de kişîyan.

Sibetîrê, eceman ji dijîmînen xwe mitareke xwest. ûris û inglîzan şertên eceman bi şûn de avêtin û yekcar ketîne hundîrê welêt. Şahê ecem gava dit ko ûris û inglîz guh na-

## BILÛRA MIN

Bilûra min a şîrin,  
Tu di sariya sibehê  
Û hingura êvarê de  
Hevalê bêbevalan,  
Destbrayê şivan û dîlketiyan î.  
Dengê te,  
Hêstirên dilên xemgîran,  
Silava ji hev-veqetiyan,  
Girîn û zarîna dîlketiyan  
Tine bîra min.  
Bilûra min tu î,  
Xemrevîna terkeseerên dinyayê !!

★ ★ ★

Dengê bilûra min,  
Çiya û zozanên bilind,  
Kaniyên bi gul û rîhan dorgirtî,  
Guhê şkeft û serê zînanan  
Guhdarên te ne !!  
Û :sura bayê xerhî,  
Te di nav pelên darê de digerîne.

★ ★ ★

Bilûra min, were emê  
Bi wî çiyayê bilind re  
Bi bewa kevin,  
Û bihin cîranê bayên xurt  
Û hevalê kîmtên wan

Yên bi mij û dûman,  
Û tê de dengê xwe berdin,  
Û zarîna dengê me  
Bikeve nav kortal û geliyan  
Û bêcaniya erdên jêrin  
Bihejîne;  
Û pêlên ava heftreng  
Û xemzebaz  
Nalîna me bigehîne  
Deşta Sirûc û Diyarbekrê;  
Û beriya mêrxasên Berazan;  
Û kalîna berxan,  
Û Tev şehîna hespan  
Li me vegerînin.

★ ★ ★

Bilûra min, binêre û bibîbise!  
Roj çû ava,  
Stêra êvarê bû geş,  
Kolosên çiyân ên gewr,  
Û hewraniyên wan ên sor û zêrin  
Bûne cûn;  
Û pêlên ava şevê ên rêş  
Ketine deşt û nevalan,  
Heta rûyê gir û kepezan.  
Di qeraca de  
Kevir piyê şevgera dixapînin,  
Û bêdengiya şevê de

Pêjna lingên mêrxasên tîn.

★ ★ ★

Bilûra min,  
Dengê xwe berde !!  
Dinya,  
Mîna zarokekî berşîr,  
Ket dergûşa xwe;  
Dengê xwe berde bilûra min,  
Û jê re bilorîne,  
Xema wê birevîne !!  
Bilûra min tu î

★ ★ ★

Xemrevîna terkeseerên dinyayê;  
Û li rohefâtî  
Dema ko dînya hişyar dibe  
Ji xew radibe  
Ji me re  
Strana azahî û serbestiya  
Kurdistanê  
Binehwirîne  
Û dengê wê stranê, bila  
Mîna tirêjên rojê ên pak û zêrin  
Bikeve nav dil û guhên me.  
Bilûra min  
Tu î xemrevîna dîlketiyên welêt.

SEYDAYÊ GEROK

dinê, hikûmeta xwe guhart, û hikûmeta nû bi raya meclisê û bi emrê Şah şer da betal kirin û ordiwê dest ji şer berda, yanî ecem teslim hûn, û şerê ko roja Düşembê dest pê kiri bû roja Pêncşembê, û bi selamêtiyê kelas bû. Bawer bikin cem eceman şer ji betalîyê ne çêtir e, û her tişt ji şer çêtir e. Ji xwe ecaman bi xwe gotiye canê şerîna xweş e, merencîne.

Lê ordiwên ûris û ingilizî bi lez Ecemistanê vedigirin. Mister İdin di meclisê de da zanîn ko ew esker bi niweqetî lê heta roja ko talûke derbas bibe wê li Ecemistanê bimînin.

DI ROHELATÊ DÛR DE—Di rohelatê dûr de dizik dikele, lê hej ne avêtiye der. Japonan Hindîçîniya trensîzi bi temamî vegirtin û gihastîne tixûbên Siyam û Hindîstanê. Li gora nûçeyên paşin japonan (150000) esker anîne Hindîçîniyê Ingiliz û emêrikaniyan ji wargehên Sengepor û Fillipîne xurt kirine. Te digot qey hema li hev xin. Lê tişteke ne bû û kela beroşê danî.

Ji aliyê din, japonan di Mençûriyê de eskerên xwe ser tixûbên ûris kom dikin.

Piştî şerê rûs û elmanî ûris û ingiliz û emêrikani bûne yek. Ingiliz û emêrikani dikin bi her awayî arikariya ûris bikin. Ev

arîkari nemaze ji bo karkirina şerê Bihare wê bête kirin. Lê Emêrike ji niho de dike hin tiştan bişîne Rûsyayê; nemaze benzîna balafiran. Ji bo wê yekê ji Emêrikê çar vaporên bi sarinc dane ûris. Ew vapor benzîne ji Emêrikê wê binin Veladivestokê, bendereke rûsî. Ev bender dikeve pêşberê giravên Japonayê û vaporên ko berê xwe didin wê bebenderê di her û di nav giravên japonan re derbas bibin.

Ev îş li japonan zehmet e. Di welatê japonan de petrol nîne û Emêrike ji hew petrolê dide japonan. Ji milê din ûrisan petrolên Qevqasê ne di riya bejê re lê di riya behrê re dişandin Siberyayê. Piştî şerê elmanan bivê nevwê vaporên rûsî êdî ne dikari bûn ji Batomê rabin û herin Siberyayê. Japonan digot bi vi awayî ûris di Siberyayê de bê benzîna bimîne. Lê gava japonan dit ko Emêrike benzîne dide ûris gelek li ber xwe ket û got ez vi îşî qebûl nakim.

Digel wê hindê vaporeke benzîne ji Emêrikê rabû, di ber pozê japonan re derbas bû û hat û ket Veladivestokê. Japonan bi tenê dengê xwe bilind kir û ev tişt cem ûris û Emêrikê profêsto kir, yanî ji wan dewletan re mektûb şand û got ev îş ne bi

dilê min e, û heye ko ji ber vê yekê navbera me xerab bibe.

Kesi nezani çawan û çire, lê ji nişkekê ve kela japonan dani û li gora nûçeyên paşîn Japon û Emêrike ketine mizakeran, mizakereyên siri. Ew mizakere ji rast bi rast bi destên Rûzwelt têne gerandin.

ŞERÊ ÛRIS — Şerê ûris û elmanan bi xurtiya xwe a berê dom dike. Bi tenê elmanan plana xwe guhartiye û berê xwe daye nivro û paşê ji bakur.

Herweki me di hejmara 31ê de goti bû elmanan, nemaze, zora xwe dida eniya Smolenskê. Bajar bi xwe ji mêj ve keti bû destên elmanan, lê şer di wê hindavê de dibû, û ji lewre jê re eniya Smolenskê dibêjin.

Elmanan zora xwe dida vê eniyê, ji ber ko ev der mifteya riya Moskoyê ye. Di vê eniyê de şerine mezin çêbûn. Qederê çar heftan, elmanan di vê eniyê de dreji xetên ûris kir, lê ew xet nikari bûn bişkênin û riya Moskoyê ji xwe re vekin. Bivê nevê birê ordiwa ûris ê meztir yanî giraniya wê di vê qadê de bû û li her payitextê welatê xwe disekin. Elmanan dixwest vê ordiwê bişkênine, bikeve zikê welêt û ordiwa ûris ji hev de bêxe. Lê elmanan piştî ko mehekê, û beî ko bikarin gavekê ji pêş ve herin, di vê eniyê de şer kirin, plana xwe guhartin û qesta nivro, qesta Behra reş kirin û li 16ê Tirmehê Nikolayef zemt kirin. Di behra reş de tersxana ûris di vê benderê de ye. Di vê benderê de hin cengkeştiyên nivco, hêj li ser taxokan, ketine destê elmanan. Ûris dibêjin me ew cengkeştî beriya ko terka benderê bidin, xerab kirine. Elman dibêjin, tu xisar ne gihaye wan. Di nav wan cengkeştiyan de yeke mezin hebû bi (35 000) toni, Krewzorek ji bi (10 000) toni.

Nizingî Nikolayefê bendereke din heye: Odeşa. Ûris tê de asê bûne, elman digel romanan lê wer hatine, ew di mihaserê de hiştine, pêş de çûne, û ji erdê Ûkranyayê herçî li roavayê çemê Dinyéper e, tev de xistine destê xwe û li 27ê Tebaxê ketine Dinyépetrovskê. Erdê Ûkranyayê erdeklê heja û ew der mintiqeke sinhetê ye. Li Dinyépetrovskê febrîqeke elêktrîkê heye. Dibêjin ko di dinyayê de jê meztir febrîqa elêktrîkê nîne. Lê ûrisan da zanin ko bendên febrîqê berhewa kirine û erdên dorê xistine bin avê. Eskerên ûris derbasî wî aliyê çem bûne û li ber xwe didin.

Herweki me got elmanan ji milê din berê xwe da bakur û dirêji Leningradê kir. Leningrad payitextê ûrisan ê kevn e. Çar yanî imperatorên ûris tê de rûdiniştin. Ji xwe berê jê re Petresbûrg — Petrograd digotin. Piştî bolsêvîkiye navê wê guhartin û navê «Lênin» lê kirine.

Li 28ê Tebaxê elmanan di bakur de ketine Révalê (Talin). Réval di Estonyayê de bendereke mezin e û tê de tersxane yanî febrîqa vaporan heye. Réval dikeve devê Behra Fenlandiyayê. Hesêb ev behir ketiye destê elmanan û vaporên ûris tê de girtî mane. Di wê benderê de ûrisan bi xwe bin cengkeştiyên xwe bin av kirine da ko nekevin destên elmanan. Ûris beriya ko jê derkevin avahiyan benderê ji şewitandane.

Bi ketina Révalê rewşa Leningradê yekcar zehmet bûye. Niho, elman ji nivro, û ji rohelê dirêji Leningradê dikin. Ji bakur ve ordiwa Fenlandiyayê berê xwe daye payitextê çaran û li 30ê Tebaxê ketiye Vîpûriyê (Viborg).

Di navbera Mosko û Leningradê de du xetên rêhesin hene. Elmanan ji van her du xetan yek xerab kiriye û avêtiye ser a din. Heke a din ji hate xerab kirin Leningrad yekcar ji welêt wê qut bibe.

Ûris û elman her du ji fortên xwe didin, lê rastî ew e ko ev şer şereklî dijwar e û ordiwa elmanan heta niho miqawemetî ko di şerê Ûris de ditiye di tu şerî de ne diti bû. Ûris bişkên ji li ber xwe didin û gelek caran radibin hicûmê, hicûma miqabil, em jê re bi kurdancanî dibêjin berhicûm. Di şerê ûris da tabiya elmanan ne vegertina welêt e, ne ji kuştina peyan e. Ji ber ko ne welat bi vegertinê, ne ji peya bi kuştinê xelas dibin; welat ewçend fireh, peya ewçend zehî in. Elman dixwazin di deravine teng de li ordiwa ûris bişidinin û wê ji desthilaninê bixin. Elmanan çend caran kês li dijminê xwe anî be ji plana xwe bi temami nikari bû bibe serî. Welat ewçend fireh e ko gava cih li ûrisan teng dibe birek ji wan here jî birê din xwe dide paş û di devereke din de xwe ji nû ve saz dike û dertê pêşiya dijmin. Ji vî hawayî ev şer ji texminan bêtir dom kiriye û heye ko hêj bêtir ji dom bike. Ji xwe Ingiltere û Emêrike xwe kar dikin ko li Biharê arikariya ûris bikin û ji lewre ji ji niho de ûris û ingilz di Ecemistanê re ji xwe re rê ji vedikin da ko di bejekê re bikarin bigehin hev.



Di Şerê ûris û elmanan de bivê nevé kuştî û birindar zehf in. Ûrisan carekê gotî bû ko xesara elmanan digel kuştî, birindar û hêsiran du milyon û niv e. Elmanan zûka danezanek belav kir û got ko xesara Ûrisan pênc milyon e. Mina kurdmanca got devê xelkê nedoxwina mirov e, gotin ji ne pez in ko bijmêrinin û jê qemçûrê bibin, ji lewre herkes bi kêfa xwe ye û li gora xwe dibêje.

Me gotî bû ko elman ji hicûma Smolenskê geriya bûn û zora xwe da bûn nivro û bakûr. Ji danezanên her du aliyan dixuye ko vê carê û ji 26ê Tebaxê ve di eniya Smolenokê de Ûrisan dest bi hicûmê kiriyê. Elman qala vê bicûmê dikin û dibêjin me dijmin bi şûn de vegerand û xesareke mezin gihanê wi. Herçî ji hebe tu şik tê de nîne ko işê elmanan di şerê ûris d zehmet bûye û Ûris şerê xwe xweş dikin.

**ŞERÊ EFRÎQAYÊ** — Herweki xwendevanên me dizanin li Efrîqê şer di û qadan de çêdibû. Hebeştan û Libye. Ingilîzan ji mêj ve Hebeştan ji destên talyanan standine. Li Hebeştanê hesêb tu talyan nê mane.

Herçî şerê Libyayê, ji ber germa Havînê, sivik bûye. Lê divê li Patzê ji nû ve dest pê bike. Ji xwe di dirêjahiya Havînê de her du aliyan tîdarîka xwe dikir. Çend caran ingilîzan di Belra Spî de drêjî vaporên talyanî kirine; yên ko esker û hesincawên cengî talyanî Libyayê. Wer dixuye ko ji ingilîzan ra ji Emêrikê û di qenala Swêşê re gelek teng û balafir hatine. Heke di welatê ûris de bi sarbûna hewayê şer ji wê sar bibe; li Efrîqayê bi sarbûna hewayê şer wê germ bibe.

## HINDIK RINDIK

**ZANÎN Û NEZANÎN** — Herçend mirov nezan e, xwe ewçend zana dihesibîne. Ji xwe zanayên nezaniya xwe kêr in. Fedkirin zanayên rastî di vê babetê de çî dibêjin:

Ez bi tenê tiştêki dizanim; ew jî ev e ko ez bi tu tiştî nizanim. (Sokrat)

Mirov herçend dide eqilê xwe, ewçend dibîne ko bi tu tiştî nizane. (Voltêr)

Divêt mirov gelekî xwendî û xebitî be da ko bikare tiştêki hindik bizane. (Monteskyô)

Di dinyayê de sê texlit nezanî hene: Bi tu tiştî nezanî, kêr û nerast zanî; bi tiştine welê zanî ko bi kêrî xwedi nayin. (Dûklos)

Tiştê ko mirov pê nizane ew di ber çavên wî de bêkêr e. (Fontnêl)

Bi adeti, yên ko hindik dizanin gelek dipeyivin û yên ko gelek dizanin hindik dipeyivin. (Rûso)

Heke mirov ev her du tişt danîne ber hev, dibîne ko tiştê ko pê dizane, li gora tiştên ko pê nizane, gelek hindik e. (Fontnêl)

**EYLOYÊN DERKETÎ** — Ev şerê ha ne bi tenê li mirovan, lê li heywanan jî dihekume. Têxlîtek eylo hene, ji wan re eyloyên şelane dibêjin. Ev eylo li Ewropayê heke yekcar wînda ne bûne jî gelek kêr bûne. Lê vê paşiyê refina jî van eyloyan dirêjî Spanyayê kirine. Dibêjin ko çarmedora van eyloyan sê mêtir e. Wer dixuye ko ev eylo jî ber şerê ûris û elmanan bêgav mane, ji ber top û tîfîng û bombeyên balafirên revîne û berê xwe dane tixûbên Spanyayê, çiyayên Navarê. Ev eylo jî bo keriyên pez jî guran bi talûketir in. Se bi wan nikarin, ji ber ko ew jî ezmen datên û heranîne mezin dixin nav neperûşkên xwe û direvin. Refekî wan kerikî pez jî hev de dixin. Ji lewre notirvanên tixûbên Spanyayê li wan şargeh bûne û wan dikujin. Heta niho jî van eyloyan 20 deuce hatine kuştin.

**XEBATA DI NAV CIHAN** — Herçî em kurdmanca gava qala xelkê Ewropayê, qala awayê xebata wan dikin, di dilê xwe de dibêjin ew camêrên ha serê sibehê, gava radibin serçavên xwe dişon, serên xwe kur dikin û li her maseyên xwe rep û rast rûdin û welê dixebitin. Ne ko mîna me çarmêlki an li ser çong û nivêkê rûnin, an çend balgihanê bidin her enîşka xwe, palê bidin û bi îşê xwe mijûl bibin. Ji lewre heke min jî we re got ko reîshikûmetê Ingilîterê di nav cihan de dixebite heye ko hon li min ecêbmayî bimînin. Belê Mister Çorçil an di nav nivînê de an di hemamê de dixebite.

Belê Mister Çorçil hero sibe zû sact heftan de têt daira wezaretê. Di qata jêrin de odeke wî heye. Tê de nivîna wî raxistî ye. Çorçil rast bi rast diçe wê ode, cilên xwe jî xwe dike enteriyê xwe wêrdigre dikeve nav cihan û tê de xwirîniya xwe dişkênine. Piştî ko têr xwar rojnameyên xwe dixwîne û bani katibên xwe dike û di nav nivînê de dixebite, û heta dema taştîyê di vî halî de dimîne. Wextê nivro jî nav cihan radibe cilên xwe li xwe dike û diçe taştîyê. Û gava dikeve hemamê jî katibê wî li pişt derî ye. Çorçil jî nav avê jê re nitqekê an tiştêki din dide nivîsandin.

**XEBERGUHÊZ**





## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelnine Elfabé C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Bîyîşa Pêxember. Bî Kurdiya Dumîll, bi dibaca C. A. Bedir-Xan.
- 5 — Nîvêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan.
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re
- 7 — C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikitin
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10 — Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11 — Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12 — Dersên Şertetê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13 — Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14 — Proverbes Kurdes. Medhelokên Kurdî  
Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-Xan  
Paris - 1937
- 15 — Le roi du Kurdistan Qralê Kurdistanê.  
Emir K. A. Bedir-Xan û Adolphié de  
Falgerolle. Paris - 1937
- 6 — Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdis-  
tanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel  
Berlin - 1937
- 17 — Der Schnee Des Lichtes. Berfa Ronahiyê  
Şîrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û  
Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Sall	500	Qirûşên Sûrî
Şeşmehî	300	Qirûşên Sûrî
Sêmehî	200	Qirûşên Sûrî

Xwedî û gerîmendeyê berpirsiyar: Mîr Celadet  
Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aali  
Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 9  
HEJMAR 33  
ÇARŞEMB  
1 ÇIRIYA-PÊŞÎN 1941

# HAWAR

ANNEE 9  
NUMERO 33  
MERCREDI  
1 OCTOBRE 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARÊ

Tefstra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Ceuabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Du salên şer	Hawar
Stêrk	Nûredîn Êsif
Klasikên me	Herekol Azîzan
Xebata Hawarê	Hişyar
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan



ŞAM---1941  
ÇAPXANA SEBATÊ



## TEFSÎRA QURANÊ

167 - Binsteyên wan dibêjin: Vegera me li dinyayê hebiwa, herwekt wan nefsa xwe ji me dûr xist me ji xwe ji wan wê dûr bixista. Xwedê emelên wan ên xirab dê şani wan bide û ewê binalin. Herhal ew agirkeftî ne û jê dernakevin.

168 - Gelf mirovino.... Ji hatinên erdê tiştên qenc û helal bixwin û me kevin ser şopa Iblîs; Iblîs dijminê we ê nas û xedar e.

169 - Iblîs we bi tenê hîni tiştine xirab û bêar dike û ew nav di we dide heta ko hon di heqê Xwedê da tiştina bibêjin ko hon xwe bi xwe rastiya wan nizanin.

170 - Gava ji wan re tête gotin: Bîkevin pey kitêba Xwedê; ew dibêjin: Em bi ya kal û kalikên xwe dikin. Ma ev çawan dibe? Kal û kalikên wan nezan bûn, û ne da bûn ser rîya rastiye.

171 - Halê kafiran, mina pez û se-yên şivanekî ne. Şivan banî wan dike, ew dengê şivên dibihîtsin lê mana gotina şivên seh nakin. Ew ker, kor û lal in; seh na kin, serwest na bin.

172 - Gelf bawermendino! Heke hon di ibadeta xwe de dilpak in, ji tiştên qenc yên ko me dane we bixwin û şikirdarên Xudayê xwe bibin.

173 - Goştê heywanên mirî, goştê berazan û xwîna heywanên şerjêkirî. û goştê heywanên ko ne bi anîna navê Xwedê, lê bi anîna navê pût an xaçeke din hatine şerjêkirin; ji we re heram e.

Lê yê ko ji ber bêgaviyê, bêt ko dilê wî lê biçe û zikê xwe bi wan tîr

bike, heke ji wan tiştan hinik xwar gunêhkar na be.

Eftwa Xuda mezin e û Xwedê piyar e.

174 - Zanayên cuhiyan yên ko hicet û şehdetiyên kitêba xwe Tewratê li ser Cenabê Mihemed vedîşêrin û bi vî awayî çend peran dikin destên xwe rêderketî ne. Ew pereyên ko wan xwar di roja pişdawayê de, di zikê wan de dê bibe agirektî sor.

Di roja axiretê de, Xuda bi wan re na xêve, kerema Xuda na gihe wan û ew ji gunehên xwe yekcar paqij na bin û ji wan re ezabekî giran heye.

175 - Ew ji wan in ko bi rastiye nerastî û bi xufiranê ezêbê kirine. Ew bi çi êşeke giran dê bêne şewitandin.

176 - Ji ber ko ew hikmên kitêbên Xuda veşartin û bi hin kitêbên Xwedê baweriya xwe anin û bi hinên din bawer ne bûne.

Ev serhişkî û nehevîgirtina wan ji rastiye çende dûr e.

177 - Nişana pakdîlî û bawermendiyê ne bi dana rûyê xwe ber bi aliyê rojhelat û rojava ve ye, lêbelê dilrastî û bawermendî ew e ko mirov baweriya xwe bi Xwedê û bi roja pişdawayê, bi melaîketan, bi kitêban û bi pêxemberên Xuda bîne û bi xweşdîlî ji malê xwe arikariya mirovên di xwe, sêwî, rêwingî, parsek, û belengazan bike, û dişa ji bona azadkirina dil û hêşiran bi peran arikarê wan bibe; rabe nimêjê û zekatê bide, û heke bext da ji bextê xwe ne zivire, li ser bimîne û tengasiyê de sebir bike, dilê xwe sist ne ke. Yên dilrast ew in û ew ji dil ji Xwedê ditirsin, tobedarên Xuda ne û ketme ser rîya Xwede.

178 - Geli bawermendino . . . . Di kuştina hev û du de, li ser we bi qisasi hatiye emir kirin

Mirovê aza bi aza re, yê dil bi dil re, jin û dot bi jin û dot re têne qisas kirin.

Xwini divê cezayê xwe hinga kirina xwe bikişîne.

Lê dayîna bedîla xwinê jî, jî we re heye.

Yê ko bedîla kuştîyê xwe dixwaze, divê tişteki bi hînga şehîniya kuştîyê xwe ( yê kuştî ) bixwaze, ne jê zêdetir.

Xwini jî divê di dana xwe de têrçav û camêr be.

Ev destûr li ser bedîla xwinê jî we re jî ber Xwedê ve sivikahtî û piyariyek e.

Yê ko piştî standina ewada xwina xwe, dest bi kuştina xwini dike, jê re ezabekî dijwar heye.

179 - Geli mirovên bijir . . . . Di qisasi de jiyin heye. Xuda bi emrê qisasi canê we diparêze; ta ko hon jî tîrsa qisasi dest jî kuştina xelkê bikişînin û bi wî awayî xwe, bi destê xwe ne din kuştin.

180 - Ji we re emrê Xuda ye, gava mirin nizikî we dibe, heke hon dewlemend in, jî dê û bav û mirovên di xwe re tişteki li gora marûfê ango jî malê xwe, jî sê paran behrekê wesiyet bikin. Ev li ser bawermendan heq e.[1]

181 - Yên ko guhdariya wesiyetekê kirine heke ew piştî hikmê wê wesiyetê diguhêrinin, guneha guhartina wê li ser wan e. Xwedê dibihîse û dizane.

182 - Lê yê ko di wesiyetekê de nediristîyekê dibîne û jî gunehkarbûna wesiyetdari ditirse û jî ber vê yekê mana wesiyetê jî ber edaletê ve, li hev tîne jê re tu guneh nîne.

Xuda di gunehên evdên xwe dibore, Xuda piyar e.

183 - Geli bawermendino . . . . Girtina rojiyê jî we re ferz bûye, herweki ew jî pêşiyên we re jî ferz bûbû, heta ko hon xwe bidîne rîya Xwedê û dest jî gunehan bikişînin.

184 - Rojên rojiyê ên ferz hejmarti

ne; ( bîst û neh an sih roj in. ) Yên ko seba nesaxiyê an jî ber rêveçûnê rojiya xwe xwarin, divê ew bi hinga wan rojan, di rojine din de rojiyê bigirin; û yên ko dikarin rojiya xwe bigirin lê jî seba qelsiyê na girin, divê ew bedela her roja ko rojiya xwe ne girtin nanê belengazekî bidin.

Her kesê ko qenciya xwe bêtir dike qenci digehe wî.

Lê heke hon rojiya xwe digirin, jî we re jî dana nanî çêtir e.

Heke hon serwext biwan û we ew seh bikira . . . .

185 - Xuda Quranê di meha remezanê de bend bi bend, şandiye xwar. Quran rîya rastiyê û emrên Xuda pêş we dike û rastî û xwariyê jî hev dike.

Destpêka meha remezanê de ko çavê we bi heyvê ket an we pê bihist dest bi rojiyê bikin.

Lê yên ko nesax in an bi rê ve diçin û jî ber vê yekê rojiya xwe dixwin, divê ew di rojine din de rojiya xwe bigirin.

Xwedê jî kerema xwe îşê we giran na ke lê sivik dike.

Hon jî rojiya xwe bi timamî bigirin û rojiya xwe li gora emrê Xuda biqedînin.

Qedrê Xuda bigirin, bi mezinahiya wî birewer bin, û şikirdarên Xudayê xwe bibin.

186 - Ko evdê min pîrsa min jî te kirin, bêje wan:?

Ez nîzik im, ez tîm hêviya hêvidarên xwe, bila hêviya min bikin û bila ew jî baweriya xwe bi min bînin û guhdariya emr û fermanên min bikin heta ko pê birewer û serwext bibin.

Ji bona Tefsîra Quranê K. K. û li hejmarên 27, 28, 29, 30, 31 û 32 an fedkirin.



[1] Ev ayeta he bi ayeta mîrasê hate rakirin.

# HEDÏSËN

## CENABË PËXEMBER

REHMET Û SILAVA XWEDË LË BE

286 - Şikirdarên Xwedê ew in ko gava qenciya xelkê dibînin şikirdarê wan dibin.

287 - Dev ji ehmeqan berdin.

288 - Heke we ew pênc tişt anin pê ezê mizgîniya hiluştê bi we din; di parkirina miratê de neheqiyê me kin, ji nefsa xwe bêtir bi xelkê re bi insaf bin, di dema şer û qewimandinê de xwe jê me din paş û baz me din, gava talanê dijminan bi dest we di-keve xainliyê lê me kin û jê ji xwe re bê rê tiştêki hilmeyînin û heqê bêçareyan ji zaliman bistinin.

289 - Mala we vekirî û zmanê we şîrîn be.

290 - Keda helaltir keda dest e; dan û standin ji qenc û bi xêr û bereket e.

291 - Bi dilekî pak ibadeta Xwedê bike û tu tiştî me ke hevber û hempayê wî, nimêjên xwe ên ferz bike û heke zekat li ser te ferz e zekata xwe bide; heke hec li te ketiye here hecê û ayîna emrê pêk bîne; rûjiya meha remezanê bigire; tiştê ko tu dixwazî xelk ji te re bikin tu ji ji wan re bike û tiştê ko tu ji xwe re na xwazî ji xelkê re ji me xwaze.

292 - Ibadeta Xwedê hikî û tu kesî me kin hevber û hempayê wî, gava dest bi karekî dikin xwe di pêşberê Xwedê da bihesibînin û bi dilekî pak bixebitin û bînin bira xwe heke lion wî na bînin ew we dibîne; li me- xluqên Xwedê fetkîrin û mezinahiya Xwedê seh bikin, ko te gunehek kir li pey wî qenciye- kê bike, heke te ew guneh bi dizî kiriyê qenciya xwe ji bi dizî bike, lê heke te ew guneh bi eşkere kir qenciya xwe ji eşkere bike.

293 - Ji nifirê bêşûca bitirsîn, Xwedê diayê wan qebûl dike.

294 - Navê kal û kalikê xwe bizanîn; ji mirovên di xwe hez bikin, herî ziyareta wan, ji wan me gerîn.

295 - Tişt miştan mavêjin rê û tiştên ko xelk pê aciz dibin jê hillînin.

296 - Jina qencîr û delaltir ew e ko qenaetkar e.

297 - Jin divê qedrê mêrê xwe û diya wî bigirin.

298 - Hema dest bi karê xwe bikin, honê bibînin Xwedê îşê we pêk tîne.

299 - Beri ko ji destê we derkevin qedrê pênc tiştan bigirin; beri mirinê qedrê jiyinê, beri nexweşiyê qedrê saxiyê, beri xebatê qedrê rahetiyê, beri pîriyê qedrê ciwaniyê beri bêlengaziyê qedrê dewlemendiyê, an ne hon poşman dibin.

300 - Parsek ne peyar, siwar be ji tiştêki bidinê.

301 - Ko we sedeqa xwe ji dizekî re, ji jinikeke zinakar re an ji dewlemendekî re ji dan we rast kiriyê; an ewê pê ji xirabîya xwe xelas bibe an jê ibretekê bigire.

302 - Jin divê bê destûra mêrê xwe ji malê wî tiştêki me de xelkê.

303 - Li ser rê me sekinin û ma xêvin; heke disekin divê li jinên xelkê me nêrin, rê bidî mirovên ko tê re diborin, silava xelkê li wan vegezin, qenciye bikin û ji xirabiyê bigerin.

304 - Di civatekê de tu kesî ji cihê wî ramekin û li şûna wî rûmenin.

305 - Gava hon li cara evlî rasti kesekî tîn û jê hez dikin divê jê re bidin zanîn.

306 - Hon brayê hev in arikariya hev bikin, rastiye bêjine hev û li hev xedariye me kin.

307 - Zalim be, mezlûm be arikariya he- valê xwe bikin, ko mezlûm e; wî ji zilmê xelas bikin, ko zalim e bermedin ko ew zilmê li xelkê bike,

308 - Ko te di ciwaniya xwe de qenciye- kî bi pirekî kir, di pîrtîniya te de Xwedê bi destê ciwanekî qenciye- kê digihîne te.

309 - Qedrê her kesî li gora qîmeta wî bigirin.

310 - Silavan li hev bikin; bi vi awayî honê ji hev hez bikin.

311 - Silavan li hev bikin, dest vekirî bin, xelkê vexwînin cem xwe û herwekî Xwedê emri we kiriyê ji hev hez bikin, bihin brayên hev û du.

312 - Piştî imanê tiştê çak ev e ko xelk heji hev bikin.

313 - Îmanê çêtir ew e ko mirov di tengiyê de sebrê bi xwe bide û dest vekirî be.

314 - Pereyê çêtir ew e ko mirov jê berî ji bona rizqê jin û zaroyên xwe, paşê jê ji bona emê hespê xwe yê ko di piştî wî de di rîya Xwedê da şer dike, di piştî re jê ji bona hevalê xwe serf dike.

315 Qenciya ko dixwazîn bikin di dema saxiya xwe de bikin ko we wesiyyet kir êdî Xwedê dizane gelo di piştî mirina we re da xwaza we tete cih an ne.

## DU SALÊN ŞER

Ji 1Ê ÎLONA 1939AN HETA 1Ê ÎLONA 1941Ê

Ji ber ko vi şerî li yekê Îlona 1939an de dest pê kiriye li yekê Îlona 1941ê du salên xwe ên pêşin diqedîne û pê li sala xwe a sîsiyan dike. Zarokên ko di şeva yekê Îlona 1939an de bi zîkê diya xwe ketine îro panzdemehî ne û peyayên ko wê şevê not û neh salî bûn îro sed û yek salî ne.

Bi vê hêncetê em lista jêrin belav dikin. Berî destpêkirina şerî bi heft rojan yanî li 23ê Tebaxê Ūris û elmanan peymaneke nelihevîstîne îmza kiri bûn. Elmanan bi vî awayî tixubên xwe ên rohelê temîn kiri bûn.

### 1939

- 1 Îlon — Elmanan dirêjî Polonyayê kir û şerê ko ev du sal in dom dike, dest pê kir.
- 3 Îlon — Frensîz û inglîzîzan ji elmanan re dane zanîn ko navbera wan şer e.
- 17 Îlon — Piştî ko elmanan ordîwa polonyayê ji hev de xist Ūrisan ji dirêjî Polonyayê kir.
- 27 Îlon — Polonyê bê tu şert û qeyd teslîm bû û Ūris û elmanan ew di nav hev de lêk vekirine.
- 30 Çîrya-Paşîn — Ūrisan dirêjî Fenlandiyayê kir. Ev şer heta 13ê Adara 1940î dom kir.

### 1940

- 9 Nîsan — Elmanan dirêjî Norvêj û Denîmerkê kir. Norvêjê dest bire xwe, Denîmerke teslîm bû.
- 10 Gulan — Elmanan dirêjî Belçîkê û Holendê kir. Wan her du dewletan dest bire xwe û frensîz û inglîzî çûn hawara wan.
- 14 Gulan — Holende teslîm bû.
- 28 Gulan — Belçîke ji piştî ko elmanan erdê wê vegirt û ordîwa wê şikest teslîm bû. Lûksembûrg ji di bin lîngan de çû.
- 5 Hîzêran — Destpêkirina şerê Frensê.
- 10 Hîzêran — Talyan kete ser û ji frensîz û inglîzîzan re da zanîn ko navbera wan şer e.
- 24 Hîzêran — Frensîzîzan şertên elman û talyanan qebûl kirin û bi wan re mitarekêk îmzan kirin.
- 28 Hîzêran — Ūrisan Besarebye û Bûkovînye ji Romanyayê standin.
- 3 Tîrmeh — Di Wehranê de stola inglîzî dirêjî stola frensîzî kir û xesareke mezin gihand wê.
- 8 Tebax — Elmanan bi belafîran dest bi hicûma giravên İngîlterê kir. Vê hicûmê du mehan dom kir. Elmanan dixwest hi vê hicûmê derziya piştî İngîlterê bîskênfne. Lê inglîzî li ber sekenîna û ne şikiyan.
- 19 Tebax — Talyanan dirêjî Somalistana inglîzî kir û ji ber ko eskerên inglîzî tê de gelek hindik bûn talyan ketin ê.
- 15 Îlon — Talyanan dirêjî Misrê kir û di axa Misrê de Sîdî-Berani zemt kir, lê li wê derê sekinîn.
- 27 Îlon — Ji vê tarîxê heta 24ê Çîrya - Paşîn Japon, Mecar, Romanye û Slovekye, pey hev, ketin tifaqa elmanan.
- 28 Çîrya-Pêşîn — Talyanan di Ernewîdlîxê re dirêjî Yewnanîstanê kir.
- 9 Kanûna - Pêşîn — İngîlîzîzan dirêjî talyanan kir û ew ji erdê Misrê derêxistin, dane pey û ketine erdê Lîbyayê. Talyanan baz da. Ev şer heta 6ê Kanûna paşîn sala 1941ê dom kir û inglîzîzan talyan heta Binxazîyê ajotin û ketin ê.

## STÊRK

ADAPTATION DE « LES ÉTOILES »  
D'ALPHONSE DAUDET

Gava li zozanên Sipanê Xelatê min peze xwe diçêrandin, carîna hefteyin diborin bêl ko ez dengê tu insanan bibîhtsim. Ez hi tenê bi hevaltiya kûçîk û peze xwe bûm. Lê, her serê panzde rojan carê gava ji dûr ve min dengê zingîlên qantîrê me dibihîst ji kêfa xwe serê xwe radikir: gundiyeke, yan kehaniya mala axê a pîr ji min rê zadê min ê panzderojî tani.

Wê rojê, ez çîqa şa dibûn; min ji wan, nûçeyên gund dixwestin, lê tiştê ko ez ji her tiştî bêtir dilxweş dikirim pîrskirina halê Mijganê, Mijgana keça axê bû.

Bê ehemiyet min ji wan dipirsî: gelo xa-

### 1941

- 2 Adar — Birxarîstan kete tifaqa sêbendîna û di roja wê de eskerê elmanan derbasî Birxarîstanê bûn.
- 11 Adar — Emêrikê qanûna deyn û arîkariyê danî.
- 25 Adar — Yûgoslavye bi hin şertan kete tifaqa sêbendîna.
- 27 Adar — Li Yûgoslavyayê Ordîwê hikûmeta ko tifaqa sêbendîna îmza kiri bû, xist. Hikûmeta nû gub ne da tifaqa sêbendîna.
- 3 Nîsan — Elmanan ji Binxazîyê dirêjî inglîzîzan kir û ew heta tixubên Misrê vegevandine. Ev hereket deh rojan ajot.
- 6 Nîsan — Elmanan avête ser Yûgoslavye û Yewnanîstanê. Ev şer heta dawîya wê mehê dom kir û elmanan ew her du welat vegirtin. Eskerên inglîzî ji Yewnanîstanê vegeerîyan Misir û Gîrîtê.
- 13 Nîsan — Ūris û japonan peymaneke nelihevîstîne îmza kir.
- 19 Nîsan — Iraqî li inglîzîzan rabûn û Iraqî û inglîzîzan li hev xist.
- 19 Gulan — Her Hês, wekîlê Hîtler bi halafîrekê ji welatê xwe rabû û çû İngîlterê.
- 20 Gulan — Eskerên elmanî bi balafîran ketine girava Gîrîtê û girav di nav deh rojan de zemt kirine. İngîlîz ji jê vegeerîyan Misrê.
- 20 Gulan — Cengkeştiya elmanan Bîsmêrkê cengkeştiya inglîzî « Hûd » bin av kir.
- 27 Gulan — İngîlîzîzan cengkeştiya elmanî Bîsmarkê xerîqnd û heyfa Hûdê hilanîn.
- 31 Gulan — İngîlîzî ketine Beşdayê.
- 8 Hîzêran — İngîlîzîzan û frensîzîzan gollîst dirêjî Sûriye û Lîbnanê kirine.
- 22 Hîzêran — Elmanan dirêjî welatê Ūris kir û şerê dinyayê ê meztir dest pê kir.
- 7 Tîrmeh — Emêrikê esker derêxist girava Îslan dê.
- 14 Tîrmeh — Şerê Sûriyê xelas bû û inglîzî û gollîst ketin Sûriye û Lîbnanê.
- 25 Tîrmeh — Ūris, û inglîzîzan dirêjî Ecemîstanê kir.
- Eceman 72 saetan şerêkî derewîn kir û çûn rayê, yanî teslîm bûn.



nima piçnk pir diçe dawet û şahinetan yan ne? Qet dikeve govendan? Cilên speht li xwe dike? Eger ji min re bigotana: « ma ji te re çi? şivanê reben û belengaz! » minê li wan vegeranda ko ez gihame bîst salî û min lîm di spehtliya wê de tukes ne dine!

Rojeke lnê ez li benda zadê xwe bûm; beri nivro hareneke xurt hat. Heya piştî nivro çavên min li rê bûn, piştî min heviya xwe bîrî û ji sermê ketim holika xwe. Esrê, min dengê zingil bihist; zûka derketim derve; çi bibînin...? bizanin kl?... Mijgan! xanima min bi xwe bû...

Li ber holikê peya bû. Ji bayê çiyê hinarikên wê bû bûn sorgul. Li min vejeriya û got; « Gundî mijûl bûn: pirê ji çû bû cem zaroyên xwe bavê min ez şandim... »

Mijgan, bi bejna xwe a zirav û narin, bi çavên xwe ên çeleng û bi cilên xwe ên xemilandî û giran speht bi xwe bû. Çiyê wê bajar, xaniyên delal, û îşê wê govend, reqs û stran bû, lê ne çiya, zozan, rêl û qantir bûn.

Mexlûqa çeleng! çavên min jê ne dibûn. Cara pêştî min ew ji pir nêzik didit. Niha ew li ber min sekti bû û bi tenê ji bona çavên min bû.

Dilê min hildavêt, bişê min diçû û qirika min dihat girtin.

Mijgan zad ji selikê derêxist û da min. Piştî bi nêrinên tûj li dora xwe nêri, da ko ji gîyan şil nebe hinek fistanê xwe rakir û çû holika min; min da pê wê. Li hundir, li çiyê raketina min, li blûr, kulav û li darê min nêri, piştî bi dengê kl ziz û ahengdar gote min: « Tu li vir diji ne? şivanê reben! Niha tu bi tena xwe ji diltengiyê çiqas bêzar dibi? Bêje min: tu çi diki? bi çi mijûl dibi û kl tni bira xwe?... » Minê jê re bigota, « Bi tenê te xanima qeşeng ». Dilê nim derew ne dikir; lê zimanê min ne geriya û ez sor bûm.

Mijgan bi eza min hesiya û xwest hîn bêtir min biêşîne, « Hevala te a delal çima carina nayê çiyê û te nabine? »

Mijganê, gava ev pirs digotin serê xwe dikir paş û dikent; min digot qey periya spehltiyê bi xwe ye!

Lê batina wê weke xewnek bû. Piştî demekê gote min! « bi xatirê te şivano! »

Bi dileklî şikeştî min ji gotê: « Xwedê bi te re be xanim! » Piştî selikên xwe ên vala avêtin ser qantirê xwê, lê siwar bû û bi rê ket.

Ûsa dibat min ko her kuçê ko ji bin lîn-

gên qantir difirin yek bi yek li dilê min diketin. Cavên min ji rê ne dibûn û wek serxweşektî li çiyê xwe dinihêrtim.

Êvarê, gava pez, vedigeriya gomê min ji kaş dengê bihist. Gava min serê xwe rakir, min xanima xwe dişa li ber xwe dît. Lê niha wek sibê delalî û çelengi ne dikir, lê ji tîrsa dilevizî û ji sermê diranên wê dirikrin. Welê dixuya ko ji barana sibê cem rabû bû, Mijgan xwesti bû lê derbas be, avê bor ne da bû. Cilên wê şil bûn û çavên wê hêstir dikirin.

Hingûra şevê bû, êdî nikari bû wegere.

Min xwest dilê wê rahat bikim. Min got ê: « Çi xem e? Xanim şevên Tirmehê kurt in, tu sebebên tîrsê ninin, çavên xwe bigirî û vekî, sibê ye! » Paşê, zû min agireki mezin dada. Mijgan sol û cilên xwe ziwa kirin. Piştî min jê re piyanek şîr, hinek penîr, nan û fêklî anin. Lê eqle wê ne li xwarinê bû, li hal û mala xwe digirî, bê hemdê min, çavên min ji hêstir kirin.

Bû şev. Min ji xanima xwe re di holikê de ji pûşan û ji postê berxeki paqij nivinek çêkir. Xanima min çû nav ciyan û ez li ber derî rûniştim.

Ji hevina wê, dilê min diperitî û laşê min dişewitî. Lê Xwedê dizane, tu tiştê xerab ne dihat bira min.

Çawan bihata? keça axê min xwe sparti bû min û li bin parastina min bû! Welê dihat min ko Mijgan di nav keriyên min û di keriyên dinê giş de miyeke tekane ye!

Min tucaran ezman wek wê sevê kûr, û stêr wek wê şevê geş ne diti bûn. Di canê min û di çavên min de her tiştê guhêri bûn. Çavên min bi nêrinên şaş li tiştan dinêrin û eqle min di ezmanên xeyalan de ajnî dikir.

Di vê gavê de deriyê holikê vebû û wek heva çardeşevî keçika delal jê derket. Ji mayîna xwe; û ji ber nivîna ji pûş û pelaxê xew lê çû bû. Hat û li ber agir rûnişt. Min kulavê xwe ji xwe kir danî ser milên wê, agir vêjand û bê deng li cem wê runiştim.

★ ★ ★

Şev xweş û hinek hênik bû. Di dora me de cibaneke veşartî bê deng şiyar dibû.

Di her tiştî de ez livnek dihesiyam; giya mezin dibûn, kulîlk vedibûn, meywe digiban... Dilê wan ji wek yê min hildavêt û xwîna wan ji wek ya min dibeziya... Stêr bi xwe radibûn û rûdiniştin.

Ji tevgera her tiştî ji her dengî, Mijgan

ji tirsan dilerizî û xwe li min dipêçand. Ji nişkê ve di ser serê me re ronahiyeke geş borî. Me serê xwe rakir; stereke reşiya şeve çirand û ji dûri me ket erdê.

Mijgan bi tirs pirsî: « Ev çi ye? » min lê vegerand: « Ev giyanek e, dikeve bihuştê »

Paşê min şahadeta xwe ani. Wê jî, şaş şaş li min nêri û wek min kir û pirsî « hon şivan sihîrbaz in? » Min got ê: « No xanimê! Lê em li serê çîyan nêzîkî stêran in, ji lewre em ji xelkê bajaran bêtir bi hal û sirên wan dizanin ». Mijgan serê xwe dani bû ser destekî xwe û li stêran dinêri. Gava min li rûyê wê nêri min go qey şivana sêtêran e, ketiye erdê. Bi dengêki heyran gote min: « Stêr çîqa pir in, çîqa spehî ne! Min ew tu caran hevqa zehf û hevqas çeleng ne ditine! Tu bi navê wan dizanî şivano? »

Çawan nizanîm xanima min! Binêr! di ser serê me re: Komika sêwiyan e, ji rojhelatî hiltê û ber bi rojavê diçe. Hinek li bakur, Termê Mixêl e - heft in - li rastê wan, Dûptîsk e, her gav li bakur e. Li ber me, kakeşîn e. Hinek li çep; Kerwankuj e; wek stêrka sibehê ye. Ji lewre kerwanek pê xapiya ketiye rê, û bi şev ji sermê quşliye. Hinek li nivro Lêl e; dibêjin ko Lêl û Mecnûn hejî hev du dikirin - lê ne digihan hev; gava mirine giyanên wan derketine ezmên, yek çûye rojava, yek jî rojhelat. Li zivistanê Mecnûn li zozanan e, û Lêl li germiyan e. Havînê Lêl tê zozanan û Mecnûn - diçe germiyanan û gavê ji cem hev derbas dibin digihin hev, hev du maçî dikin û piştê her yek diçe aliyê xwe.

Di vê gavê de tişteki nerm, sivik û germ ket ser milê min. Ev serê Mijgan bû. Çirokên min ew lorandî bûn û bê hemdê xwe ew avêti bû xeweke giran. Min qet xwe ne livand. Stêr pir diçirîsin. Ūsa dihat min ko, cot, cot tîn min pîroz dikin, û bi ken dîsa vedigerin jor. Bi êş û keser min li Mijgan dinêri, lê tu xerabî û piştî ne dihatin bira min. Bi tenê bextiyar bûm. Min digot qey çelengtir, spehitir û xweşiktîra stêran dahatiye, xwe daye milê min û li wê vezeliyaye.

Heta derketina rojê Mijgan ez sermest hiştim. Piştê rabû, û bi ditîna rojê weke gulekê vebû û kenî.

Li goinan, berx dikalin, li ser zinarên bilind kew dixwendin, li ser xwînavaya giyaşên kesk û taze tirêjen rojeke sor diçirîsin, û ji fikra ko ezê bextiyariya xwe wînda bikim, dilê min ê reben digevizî û bi nalînên kûr û bi keser li wan, li pez, kew û çîyan vedigeriya.

NÛREDÎN ŪSIF

## KLASİKÊN ME

AN ŞAHİR Ū EDİBÊN ME ÊN KEVIN

Em dikin qala klasikên xwe bikin. Lê beri ewilî divêt em li bêjeya « klasik »ê hûr bibin. Ji ber ko ev bêje bi me ne nas e. Di edebiyata miletên ewropayî de heyamek heye jê re heyama klasikan dibêjin. Ew heyama ko tê de şahîr û edîbên klasik rabûne. Ji wan edîb û şahîran bi xwe re jî klasik dibêjin. Ewan edîbên ha teqlîdî edîb û şahîren yewnan û latînî dikirin û li gora isûl û qeydeyên wan dinivisandin; gelek bala xwe didan wan isûl û qeydan, yanî gelek isûl û şikilperest bûn. Ji edebiyatê pê ve jî her tiştî re ko di wextê kevin de û bi isûleke bijarte hate çêkirin klasik dibêjin. Di warê mûstafiyê de jî klasîsm heye. Herçî bestekarên wê heyamê ne ji wan re jî klasik dibêjin. Mîmariya klasik jî heye. Xulase herçî fen û sinhetên ko bi wê rêzîkê ve çûne ji wan re klasik dibêjin.

Gelo di edebiyatê de klasikên kurdînan can kî ne? Ew kengê rabûne û bi paş xwe ve çi eser hiştine?

Bersiva vê pirsîyariyê ne hêsani ye û jê re xebateke zor divêtin. Ji xwe jî eserên beriya îslamiyetê hesêb tişteke ne maye. Piştî îslamiyetê jî nav kurdan gelek şahîr, edîb û peyayên zana rabûne, lê eserên xwe bi piranî bi erebî, bi farisî an bi tirkî nivisandine; û ji wan milet û edebiyata wan re xizmeteke mezin kirine. Herçî şahîrên tirkan ên mezin yên ko serê tirkan bilind dikin Nabî, Nefhî û Fîzûlî her sê jî kurdmanç in. Yên ko bi kurdmançî nivisandine; gelek hindîk in û wan jî bala xwe ne daye zmên û çêtir kêfa xwe jî pirsên erebî û farisî re anîne.

Digel vê bindê ev çend eserên ko pêşîyan ji me re hiştine edebiyata me a klasik ditînin pê û di nav wan de eserine kûr û heja hene. Ji xwe herçî folklorê me ye, yanî edebiyata xelkê, di nav folklorên dinyayê de bi bijarteyî dikeve rêza pêşîn. Di rohelatê nizing de folklorê tu miletî ne gihastiye dereca folklorê me.

Herçî klasikên me, herwekî me got ev behseke dirêj û zehmet e, û jê re wextekî fireh divêt. Ev ne îşê bendekê an du bendan e. Heke iro em vê bendê dinivîsinin mexseda me ne ew e ko em li vê behsê hûr hibin û klasikên xwe bisenîfînin. Bi tenê em dixwazin vê behsê vekin; bi hêviya ko binên dîn pê mijûl hibin û tişteki tekûz hi ser xin.

Di vê bendê de emê bê awerteyî qala hemî şahir û edibên kurdmanc bikin yên ko bi kurdmanci nivisandine. Heye ko, hinekê wan bi tenê şahirê diwanê ne û ne klasîk in. Bila misenîfê klasîkan bi wan mijûl bibe û klasîkan ji neklasîkan bibijêre; û heqê herkest li gora hejabanûa wi bidiyê.

Di vê babetê de di destên me de tu we-sîqe nînin. Tiştên ko ez pê dizanim, min pirê wan ji şêxê rehmetî, Evdîrehnanê Garîst bihistine. Ji milê din di kitêba kurdîzanê ûris Eleksandr Jaba de der heqê edebiyeta kurdî hin not hene. Jaba ji melakî kurdmanc re di heqê edebiyata me de bendek da bû nivisandin. Melayê kurdmanc, ji xêra Xwedê re, benda xwe ne bi erebî, ne bi farisî û ne ji bi tirkî, lê bi kurdmanci nivisandiyê.

Ewî melayî di benda xwe de qala tarîxa bûn û wefata her şahirî jî kiriyê. Lê wer dixuyê ko mela di van tarîxan de şaş e. Melê ew bêl ko bi rastiya wan hizane, ji ber xwe de û bi texmin gotine, û li hev siwar kirine. Digel vê hindê em gotinên melayê Jaba weke xwe diguhêzîniin stûnên xwe. Di benda melê de tiştîne xelet hebin jî ew bend di celebê xwe de esereke yekta ye. Herwekî Xanî gotiyê: «Kurdmanci ew ya qedêr li kar e».

★ ★ ★

**ELÎ HERÎRÎ** — Di nav şahirên kurdmanc de yên ko piştî îslamiyê rabûne û bi kurdmanci nivisandine; ê pêşin Eli Herîrî ye. (Xwedê rehmeta xwe lê erzan bike û heke di ser bihustê re bihusteke din, bihusteke bijarte heye cih û meqamê wî tê de çêke). Li gora ko me bihistiyê gundê wî Herîrî di welatê Soran de ye û Eli bi xwe sorî ye. Lê Melayê Jaba dibêje ko Herîrî di welatê Şemzînan de ye. Me bi xwe tu esera wî ne ditiye. Dibêjin ko diwana wî heye.

Melayê Jaba der heqê Eli Herîrî dibêje: «Şahirê herê Eli Herîrî ye. Diwançeyek heye, şîhir û qesayid. Herîrî jî gundek e, di cihê û nehya Şemzînan, di sencexa hekariyan de, û şîhir û ebyatê di wî jî di nêv Kurdistanê qewî zêde meshûr û marûf e. Texmîna ko di tarîxa çar sedê hicretê de peyda bûye û di çar sed û heftê û yekê de merhûm bûye û di nav Herîrê de medfûn e».

**MELAYÊ CIZERÎ** — Mela li cem hemî kurdmancan, nemaze li cem feqehan ewçend nas e ko ne hewce wi bez wê bidim. Mela şahirekî mitesewif e, diwana wî di sala 1919 an de li Stenbolê ketiyê çapê. Beriya wê li

Petresbûrgê jî hati bû çap kirin. Min jî vê çapê nixeyek li Şamê di taxa kurdmancan de ditiye. Çapa Petresbûrgê çapeke litografîk e.

Melayê Jaba di heqê Melayê Cizerî de dibêje: «Şahirê diwê Melayê Cizerî ye. Elî wî jî Cizîra Bihtan e. Navê wî şêx Ehmed e. Di tarîxa pansed û çîlî de di nêv Cizîrê de peyda bûye. Di wî wextî Mir Imadedîn li Cizîrê mir bû û xweheke mir hebû. Ev şêx Ehmed li xweha mir aşiq bûye. Xezeliyatîne zehf gotiyê û diwançeyek tertîb kiriyê. Diwana Melayê Cizerî dibêjin qewî diwaneke misteleh e, û zehf li nik ekradan meqbûl e. Paşê, Mir Imadedîn ew şêx Ehmed ceribandiyê ko aşiqê heqîqî ye û xweha xwe da ê. Şêx Ehmed qedûl ne kiriyê. Ev şêx Ehmed jî di tarîxa pansed û pêncî û şeşê de merhûm bûye û di nêv Cizîrê de medfûn e, û ziyaretgaha xelkê ye».

Herwekî melayê Jaba gotiyê tirba Melayê Cizerî ziyaretgah e. Ji xwe hêj di saxiya wî de welayet bi aliyê wî ve didan. Dibêjin ko mela li Westaniyê, li ber şetê Cizîrê, li ser kuçekî rûdinişt û şîhrên xwe dinivisandin. Ji cizba wî kuçê welê dişincirî ko piştî ko mela jê radibû jin diçûn wî kuçî û nanên xwe pê ve didan û dipijandin.

Ji diwana melê me xezala jêrîn bijartiye. Heye ko di diwana melê de jê spehiir xezel hene. Lê me kêfa xwe jî ber gotina «Şebçî-raxî şebî Kurdistan im» jê re ani.

Pir jî dina te xerîb im xanim

Ji te ser ta bi qedem heyran im

Her bi can teşnelebî lehlan im

Dil di benda giriha zilfan im

Yûsifî cirhekeşî bicran im

Niqteyî dafreyî rindan im

Lew şebî daire sergerdan im

Badenûşî qedehî hîrman im

Bedel atêş jî ceger bîryan im

Lew perîşan im û pir êşan im

Aşiqî nazik û mehbûban im

Tu mebln bêser û bêsamana im

Gull baxê iremî Bihtan im

Şebçîraxî şebî Kurdistan im

Çi tebiat beşer û insan im

Lilehil hemd çî alîşan im

Di riya yar li rêza san im

Lew di iqlimî sixen xaqan im

Sibehtî îd e û ez pê zanim

Ko bi kêra te seher qurban im

Xweş hîrandarekî bêderman im

Carekê şefeq e rûhim can im

Ji Xwedê re veke benda beriyê.

Dinbiré hurmisalé zeriye

Naziké nişkeré sirperiyé.

**FEQEHË TEYRAN** — Melayé Jaba dı heqé Feqehé Teyran de gotiye: « Şahiré siyê Feqiyé Teyran e ko navé wi Mihemed e. Eslé wi ji qesaba Miksé ye, welatê hekariyan e. Di tarixa heft sed û diwê peyda bûye. « Hikayeta Şêxê Senhani » û « Qiseya Bersisayi » ji mewzûn gotiye û « Qewlê hespê reş » ji wisani mewzûn gotiye û zehf heyt û eşhar ji qewi milemeh û rengin gotine. Û navé wi ji di şihirê da « Mîm û Hey » e, û miqdarê heftê û pênc salan emir kiriye û di tarixa heft sed û heftê û heft da merhûm bûye û li Miksé ji medfûn e ».

Gelo Feqehé Teyran kî bû? û navé wi, çî bû? Ji ber ko Feqehé Teyran leqeba şahir e û ne navé wi ye. Ji eserên wi « Wesfê şêxê senhani » nik min heye. Yê ko ev nisxe nivisandiye di dawiya wê de bi erebî gotiye: « Qesida wesfê şêxê senhani ya ko Mir Mihemed nezim kiriye tamam bûye. Ev mîr Mihemed bi navê Feqehé Teyran meşhûr e ». Li gora vê şerhê Feqehé Teyran mîr bû û navé wi Mihemed bû. Lê mîrê kîjan welatî? Heye ko ji mirekên Miksé bi xwe bû. Ji eserên Feqeh min ji « Wesfê şêxê senhani » pê ve tu ji ne ditine. Ji xwe esera « Qiseya Bersisayi » bi guhê min ve ji ne bûye. Min navê « Qewlê hespê reş » bihistiye. Bawer bikin jê re « Hikayeta hespê reş » ji dibêjin. Min bin xezel û qesideyên wi ên peregende ji ditine.

Dibêjin ko Feqehé Teyran şagirtê Melayé Cizerî bû û li ber destên wi xwendiyê. Feqeh di wefata Melê de jê re mersiyyek ji gotiye û li tarixa wefata Melê tede bi ebcedê îşaret kiriye. Ew mersiye bi destê min keti bû lê di dema nivisandina vê bendê de ne bi min re ye.

Lê qenc tete bira min ko Feqeh di mersiyya xwe de dibêje « Heft eyn û lam ji hev bûn cida, şin û giri dîsa tê da ». Heke mirov ev pirsên ha bi hesabê ebcedê hel kir bawer bikin tarixa wefata Melê jê xuya bike. Dîsan ji wê qesidê tete zanin ko Melayé Cizerî ji gundê Hêsetê ye: Ji ber ko Feqeh dibêje:

Iro werin, lazim werin, çiran û xelkê Hêsetê.

Herçî « eyn û lam » Feqeh qala van her du tîpan di « Wesfê şêxê senhani » de ji kiriye û gotiye:

Mîksî [1] ji wê meymestihê	Tewil diket hikayetê
Mîskî ji eşqê sihtiye	Ev şihir vi şêx ve nihtiye
Halê xwe tê de guhtiye	Ji « eyn û lam » a hicretê

[1] Feqeh qala nefas xwe bi xwe diko Herwekî. me got Feqeh ji welatê Miksé ye. Lê gelek li Cizira Botan mase û tê de xwendiyê.

Gelo leqeba Feqehé Teyran çawan bi vi şahiri ve bûye. Dibêjin ko Feqeh bi zimanê teyran dizani bû ji lewre navê Feqehé Teyran lê kirine. Di vê bahetê de min ji Şêx Evdîrehmanê Garisî çiroka jêrin bihistiye.

Feqehé Teyran diçû Cizirê. Bi rê ve rasti keşeki hat; pev re hevaltî kirin Midêkî çûn, westiyan, xwe dan ber siba darekê. Bihna xwe didan. Du çûk hatin û veniştin ser darê. Çûk pev re diştexilin û Feqeh dikenî. Keşê ji Feqeh pirsî û got ê: Ma tu çire dikenî?

Feqeh got: Ev adeta me ye; em feqeh holê dikenin.

Keşê: Divêt jê re sebebê hebe, mirov bê sebeb nakene.

Feqeh: Xebera te ye, lê heke min ji te re got, ditirsim tu bêbextiyê li min bikî û belakê bîni serê min.

Keşê soz da jê ko nabeje tukesî. Feqeh rabû mesela xwe jê re qise kir û got:

—Ez bi zimanê teyran dizanim. Tu van çûkên ser darê dibîni, yekî ji ê din re dibêje, ev feqehê ha diçe Cizirê, lê nizane ko li Cizirê serê wî de bête êşandin.

Keşê deyn ne kir. Her diwan da xwe û ji nû ve bi rê ketin. Gava gehiştin Cizirê Feqeh çû Medresa sor, keşê çû Westaniyê. Li Westaniyê xelk gîha bûn hev û wek mirovine ko li tiştêki digerin diçûn, dihatin û li erdê fedikirin û dipeyivîn. Keşê sehti kir û zani ko remildarekî gotiye ko di erdê Westaniyê de xezineyek heye, lê nikari bû cihê wê şani bide. Mîrê Cizirê ji li xezinê digere.

Vê carê, keşê kenî û çû nik mir; mesela feqeh û çûkan jê re got. Mîr şande pey feqeh. Feqeh gote mir; belê ezê xezinê derinim, lê para xwe jê dixwazin.

Mîr ji şertê Feqeh pejirand, yanî qebûl kir. Feqeh ji çû hinek zad ani û reşand nava Westaniyê, û xwe li paş kevirêki veşart. Teyr hatin ser zad, zad xwarin û bi hev re şexilîn. Teyreki ji yekî ditir pirsî:

—Ma kê ev zad reşandiye vê derê?

—Feqehé Teyran ev zad reşandiye, seha xezinê.

—Ma tu nizani xezine li kû ye?

—Belê dizanim, sibehtî wextê roj hiltêt kevirê ko tavê berî ewilî lê didit xezine di bin wî kevirî de ye.

Feqeh ziviri medresê û nivist. Sibe zû rabû çû Westaniyê û piştî ko kevirê xwe nas kir berê xwe da mala mîr û gote wt: Ezhenî min xezine bi cib kir.

Mîr digel xulaman rabû, hat Westaniyê,

erd kolan û xezîne derêxistin. Maleki zehf derket. Mir ji feqeh pîrî: Para te çî ye bêje...

Feqeh got: Beramberê serê keşê bidin min.

Mir got: Serê keşê bi laşê wî ve ye, em çawan beramberê wî bidin te.

Feqeh got: Rabet e, serê keşê ji laşê wî vekin.

Anîn serê keşê jê vekirin û danîn ser şehîné û li milê din hêdî hêdî zêrên xezîné êxistin, hetanî ko zêr temam bûn. Zêr beramberê serê keşê ne batin.

Mir enîrî û gote feqeh: Te zanî bû ko serê keşê hinde giran e, ji lewre te ev şert bi min re kir.

Feqeh deyn ne kir, zêr ji şehîné rakirin û çend kulm ax avêtine şûnê. Milê axê daket, serê keşê rabû. Hingê Feqeh berê xwe da mir û got ê:

—Mir im, min zêr navêt, zêr ji te re divêtin, tu ko xwedî xulam û mêvanî. Mexseda min ew bû ko ez şanî we bidim ji serê însên girantir ax heye, û insan bi tenê bi axê têr dibe.

Ev her sê şabîrên ha yanî Eli Herîrî, Melayê cizerî û Feqehê Teyran bivê nevê herîya Ehmedê Xanî ne. Ji her ko Xanî qala wan dike û dibêje:

Min de îlema kelamî mewzûn Ali bikira li hanê gerdûn  
Binave riha Melê Cizerî Pê hey bikira Eli Herîrî  
Keyfek we bida Feqiyê Heta bi ebed bimaye

[Teyran [heyran  
Çi bikim ko qewî kesad e Nînin ji qimaş re xeridar,  
[ bazar

Ezê niho hin şîhrên Feqehê Teyran bidim zanîn. Ji Wesfê şexê senhanî:

Van qîsetan îzbar bikim Behsan kar û bar bikim  
Yar û biran hişyar hikim Da ez ji şêx dim wesfêkî  
Şêxek hebû çaxê ewil Nûrha Xwedê hel bû di dil  
Sed gumreh û dal û midil Bi destê wî tîn tobetê  
Şêxek hehû sinhaniyan Serdarê pansed sofîyan

Ji qesîdeke wî:  
Bizan ko min yar ti wî Dil ji birîndar ti wî  
Ez kuştim yekcar ti wî Çi bikim ko min yar ti wî  
Bê dest û hem pa ti wî Pir li min kubar ti wî  
Ê b'ezeh xwendî ez im Di qeyd û bendê ez im  
Zencîr bi zendê ez im Mîstaqî rindî ez im  
Aşîqê cîndî ez im Perwazî fîndê ez im  
Xweş qed û ehla ti wî Cama piyala ti wî  
Şûx bejn û bala ti wî Delala mala ti wî  
Pir bext û tala ti wî Nimeta ala ti wî.

Dûr ji wisalê ez im Yar di xeyalê ez im  
Îsa li erdan ti wî Bi girt û berdan ti wî.

MELAYÊ BATE — Melayê Jaba der heqê Melayê Bate gotiye: «Şahîrê siyê ji Melayê Bate ye. Navê wî ji Mela Ehmed e. Eslê wî ji Bate ye. Bate gundek e, ji gundê di hekarîyan. Di tartîxa beşt sed û bistî da peyda bûye,

û zehf şîhir û ebyat gotine. Diwaneke mexsûs heye, qewî qenc e, û mewlûdeke kurmaucî gotiye. Di Kurdistanê de ew meqbûl e; û heştê salî emîr kiriye û neh sedê hicrî merhûm bûye. Di nêv gundê Bate de ji medfûn e».

Li gora tiştê ko min bihistiye Bate li Behdînan û li nîzingî Amediyê ye.

Ji eserên Batê min bi tenê mewlûda wî ditiye. Herçî diwan û şîhrên wî ne, çavên min bi wan ne ketiye. Mewlûda wî di sala 1905 an de li Misrê hate çap kirin. Heke ez ne şaş im ew mewlûd di sala 1919 an de li Stenbolê ji ketiye çapê. Bi min re nisxeke destnivîs heye. Eve çend dîrik ji mewlûda Batê:

Hemê bêhed bo xudayê alemin  
Wî Xudayî daye me dinê mibîn  
Em kirine imeta xeyrel beşer  
Tabihî wî miqtedayê namwer  
Wî xudayî malikê milkê ezîm  
Daye me miras qurana kerim.

Bo cemihî mislimin û salihê  
Bo feqîrê Bate ji el-fatihê.

AŞAYÊ BÊDARÎ — Me tu eserên vî şahîrî ue ditine. Me bi tenê navê wî seh kiriye. Rawîyan gote me ko Aşayê bêdarî gelek guh daye zimên û çîqas jê hat ewçend bêjeyên erebî û farisî ne xistine şîhrên xwe. Melayê Jaba qet qala vî şahîrî ne kiriye. Dibêjin ko Axa di pey Batê re rabûye. Ji lewra me ew daniye vê derê.

EHMEDÊ XANÎ — Mela Camî di heqê Mewlana Celaledîne Rûmî û kitêba wî «Mesnewî» de gotiye:

Men çî gûyem wesfî an alicenab  
Nîst pêxember welê dared kitab.

Yanî: Ez di heqê wî alicenabî de çî bibêjim, ne pêxember e, lê kitêba wî heye.

Ev pesneki bilind û hêja ye û bi her awayî li bejna Mewlana têt.

Di heqê Ehmedê Xanî û kitêba wî «Memozîn» de, bi min be, mirov dikare jê bêtir ji bibêje. Belê Xanî ji xudan kitêb e. Lê Xanî pêxember e ji. Pêxemberê diyaneta me a millî, pêxemberê ola me a nijadî.

Xanî di wextekî welê de rabû ko — herîya niho bi sê sed û neh salan — ne li cem me, lê li Ewropayê ji xelk hêj li milyet û li nijadê xwe hişyar ne bû bûn û zelamên ji yek miletî hev û dû ji bo ketolîkî an protestaniyê dikuştin. Di heyameke welê de Ehmedê Xanî bira miliyeta xwe, bira kurdaniya xwe biri bû û ji kurdan re goti bû hon herî her tiştî kurd in, rabû ser xwe, dewleteke



kurdi çêkin û bindestiya miletên din mekin.

Melayê Jaba der heqê Ehmedê Xani gotiye : « Şahirê pêncê ji Ehmedê Xani ye. Eslê wî ji tayîfeyê hekariyan ji eşîreta xaniyan e. Bi xwe hatiye Beyazîdê, di tarîxa hezarî da tewetîn kiriye. Di zimanê kurmancî de Memozîn nav kitêbek aşîq û maşûqan gotiye û kitêbek lixet jî bi kurmancî û erebî gotiye, navê wî Nûbihar e. Zarokê di Kurdistanê hemû di piştî quranê dixwinin. Û zehf jî xezeliyat û eşharan û heyet bi zimanê kurmancî gotiye. Û di zimanê erebî û farisî û tirkî jî qewî mahîr û sahibî irfan e. Û jî şîerayê di Kurdistanê hemûyan jî meşhûr û fâiq e, belkî jî hemû şîeran meqbûl û memduh e. Û di hezar û şêst û sê da jî merhûm bûye û di nêv Beyazîdê da mizgeftêk jî bi navê xwê bîna kiriye. Û bi xwe jî li kenarê mizgeftê medfûn e ».

Xani herwekî bi xwe dibêje di sala hezar û şêst û yekê bicî de jî diya xwe bûye.

Lewra ko dema jî xeyb fek bû

Tarîx hezar û şêst û yek bû.

Kengê emîrê Xwedê kiriye em pê nîzînin. Lê gava Memozîna xwe qedandiye çil û çar salî bû.

Îsal gehîşte çilû çaran Ev pêşrewê gunahkaran Xani jî Memozînê pê ve hin eserên din hene. Nûbar : ferbengeke menzûm e. Kurdî-Erebî. Xani jî bo Nûbarê dibêje :

Ji paş hemd û selewatan Ev çend kelime jî lixetan Vêk êxistine Ehmedê Xani Nav lê nihbarapîçûkan dani Ne ji bo sahibî rewacan Belkî ji bo piçûkê di ( kurmancan

Ji eqîda imanê :

Sifatê di sebhe jî bo zilcelal

Bizan heft in ey arîfê pir kemal

Xweşî, şîn û zanîn û vên û kelam

Bihistin digel dîtî bû temam.

Xani li Beyazîdê dibistanek jî danî bû û tê de dersa zarokan bi kurmancî digot. Di pey mirina wî re şagirtê wî Smain bist salên din li wê dibistanê guhdar bû û dersên kurdmancî tê de gotin.

Li gora tiştê ko min bihtîsiye Xani kitêbeke ceşrafyayê jî çêkiriye û tê de qala ezman û stêrkan kiriye. Herçend ez gelek lê geriya bîm jî ev kitêb ne ket destên min.

Ehmedê Xani herwekî bi xwe gotiye, Mem û Zîn jî xwe re kirine behane û bi vê hêncetê kula dilê xwe bi der daye, derdê mîletê xwe ê ker û lal bi ziman kiriye û ew axivandiye.

Mem û Zîn jî bo Ehmedê Xani remzên Kurdistanê, rêzikên welatê wî ne. Xani

dibîne ko ew rêzik wînda dibin, kurdmanc bi zîmanîne din dixwînin û dinivîstin, bi rêzikên mîletên din ve diçin, belgên xwe ên nijadî jî xwe tawêjin, dikevin rengê mîletên din û bi vî awayî û bi rêva bindestiya wan dikin. Seyda dibêje :

Sazî dili kul bi zîr û hem bit  
Sazendeyê eşqî Zîn û Mem bit  
Şerha xemî dil bikim fesane  
Zîn û Memî bikim behane  
Nexmê we jî perdeyê derînim  
Zîn û Memî jî nû vejînim  
Derman bikim ez ewan dewa kim  
Wan bê mededan jî nû ve rakim  
Meşhûr bikim bi terz û îslûb  
Mîntaz bikim mîhîb û mehbûb  
Ewreng bikim jî nû serefrez  
Da bîne temaşeyî nezerbaz  
Dilber li Memî bikin girînê  
Aşîq bikenin bi derdê Zînê.

Ev meywe eger xerab e ger qenc  
Kêşaye digel wî me dused renc  
Ev meywe eger me avdar e  
Kurmancî ye ev qeder li kar e  
Ev tîfle eger ne nazenin e  
Nûbar e bi min qewî şerîn e  
Ev meywe eger ne pir lezîz e  
Ev tîfle bi min qewî ezîz e  
Mehbûb û libas û gûşware  
Milkê di min in, ne mistear e.

Ez pilewer im ne gewherî me  
Xodreste me ez ne perwerî me  
Kurmancî im û kûblî û kenarî  
Ev çend xeber in di kurdwarî.

Memozîna Xani di sala 1919an de li Stenbolê hatiye çap kirin. Seyda Hemze-îro midîrê dibistanên Hesîçê ye - jê re dibaçeyek nivîsandiye. Têde dibêje ko Xani Nûbara xwe di sala 1094ê bicî de nivîsandiye. Li gora vê tarîxê heriya qedandina Memozînê bi neh salan. Tirba Xani li Beyazîdê ziyaretgaha xelkê ye.

SMAILÊ BEYAZÎDÎ — Melayê Jaba di heqê vî şairî de gotiye : « Şairê şeşê, jî şairê di Kurdistanê Ismail e. Eslê wî jî Beyazîdê ye, jî şagirdê di Ehmedê Xani ye. Di hezar û şêst û pêncê bicretê peyda bûye û di hezar û ser û bist û yekê de merhûm bûye. Kitêbeke lixetan jî « Gulzar » nav telifî kiriye bi kurmancî û erebî û farisî, zaro dixwînin. Bi xêrî jî wê jî zehf xezel û eşharan û ehyat bi zimanê kurmancî gotiye. Cehda wî meşhûr û marûf e. Û di nêv Beyazîdê da merhûm û medfûn bûye ».

Me Gulzara Smail ne dtiye; ne ji şihirên wî. Tiştê ko em di heqê wî de dizanin ew ê ko Smail daye ser şopa Xanî û di dibistanê Beyazîdê de dersên zarokan bi kurdmançî gotiye.

**ŞEREF-XAN** — Melayê Jaba di heqê Şeref-Xan de gotiye: « Şairê heftê Şeref-Xan e, ji mirê di hekariyan e, û ji neslê Ebas. Di hezar û sed û yekê da jî li Colemêrgê ko cihê hikûmeta hekariyan e peyda bûye. Eşhar û ebyat bi zimanê kurmançî û farisî zehf gotiye. Di hezar û sed û şêst û yekê da merhûm bûye û di nêv Colemêrgê de medfûn e ».

Me ev Şeref-Xan nas ne kir. Heke jê mexsed xwediyê Şerefnamê Mir Şeref e, mir Şeref jî mirên Bidlisê ye, û me tu şihirên wî bi kurdmançî ne ditine.

**MIRAD-XAN** — Me navê vî şahirî jî ne bihistiye. Melayê Jaba qala wî dike û dibêje: « Şahirê heştê Mirad-Xan e ko di tarîxa hezar û sed û pênciyê da li Beyazîdê peyda bûye. Ew jî miqderekî xezeliyat û eşharan bi zînanê kurmançî gotiye û di hezar û sed û nehê da merhûm bûye û di Beyazîdê da medfûn e û paşt wî jî kurmançan êdî şair peyda ne bûne, heta niha ».

Herwekl me got di heqê Mirad-Xan de em tu tiştî nizanin. Li gora navê wî divêt ew jî ji mirekên Kurdistanê be.

Melayê Jaba — em wî hergav bi vî navî bi nav dikin ji bor ko bi navê wî nizanin-piştî ko heşt şairên jorin hejmartine benda xwe bi gotinên jêrîn qedandiyê:

« Berê zaf medaris di wilayetê di Kurdistanê de hebûn. Dikat, bajar, qeza û qesbe û gundan da ehle îslamê di Kurdistanê da elbete felabid medreseyek û dido û sisê û belko êdî zêde hebûn û bila derece diqet û ihtimam jî kenarê di hakim û ehaliyan der heqê emrê di medaris û îslaman hebûn. Li nik mezîna û piçûkê di Kurdistanê qedr û rîfta ilm û îleman hebû. Melayê di qewl û zûfînûn di Cizir, Amedî, Soran û Sêrt û etrafan da zaf bûn. Lakin niha êdî medrese û îlema û xwendin di Kurdistanê de qewl kêm bûye, nadir peyda dibe. Elbetde elametê axirî ye ko ilm îlema niqsan dibin ».

Kitêba kurdîzanê ûris di sala 1860î de ketiye çapê. Li gora vê tarîxê melayê ko em bi navê wî nizanin beriya niho bi 80-90 salî şairên jorin senifandine û di heqê ilm û zanîna de ev tişt bi dilekî kul gotine.

**SIYEHPUŞ** — Sed heyf û mixabin ko di heqê vî şairê hêja de em tu tiştî nizanin, jî

şihra jêrîn pê ve, ya ko vê paşiyê ketiye destên me.

Dilberê min di bi çavan Sed elif pabûstî bû  
Agirêk berda hinawan Şemh û der fanûsî bû.  
Şemh û rihniya zîlamê Agirêk berda di amê  
Zîlf û xalên û temani Qeyd kirin niehbûs bi damê  
Şerbeta şirinkelamê Terki min nadit midamê  
Sed şikir îro selamê Kir li min taze xulamê  
Şerh û teqrîrê îsamê Fîkr û teswirê kelamê  
Reng û elwanê di Camî Şibhetî tawûsî bû.

Şibhetî çavê duyengê Qews û ebrûyê du bengê  
Mir-reyê tîra xedengê Zîlf û xal û xuncerengê  
Kes ne di qet wî çî rengî Neqşê maçîn û firengê  
Qet ne ma qet wî çî rengî Hikmeta Têmur û lengî  
Sifdera mêrê du cengê Şêr û mexmûr û pilingê  
Sed hezaran wek bişengê Hikmekî kawûsî bû.

Min qebûl e hikmê rîndan Serxweş û sûretlewendan  
Lê çî bêjîm qewl û bendan Ketme tora lehl û xendan  
Zebmetek wan pir bi Kefşe bim wek gaz û sindan  
[ min dan

Dil hedef kir tîr li min dan Lê jî halê mestemendan  
Bê eded cewher bi min dan Lewmenoşê can bi der dan  
Xemzeyê pir mekr û fendan Lê li min casûsî bû.

Lê li min berda girînê Mihbeta wê nazenînê  
Bê sebeb ketme nîvinê Ax û efxan û enîne  
Lê jî ber hisna şerînê Şeq bû hedra yasemîne  
Kanî hûra ser zemînê Carekê bête girînê  
Ev bi xef, hal im bibînî Merhema bavê birînê  
Zîlf û xal û xemrevînê Bo me calînosî hû.

Zîlf û xal û mest û naz e Işweyê wan xemzebaz e  
Gerdenê gerdênfiraz e Lê jî eşqa rûyê faze  
Cerd dikin ehle mecazê Ta sedî yasî û qaze  
Xef dibin esrar û raze  
Ez çî kim eswm û nemaz e Kar û şixl û bê niyaz e  
Mîn jî dest tenbûr û saz e Dil wekî naqûsî bû.

Dil ebîr û mest û mirê Begler û şah û wezîrê  
Da li min derbek bi tîrê Ta li mir' ne min vebîrê  
Kîrme hib-ba zemherîrê Sîne kir armanc li tîrê  
Kanî mel-layê Cizêrî Mek-kî û Elyê Herîrî  
Xanî, Şêxê Babeşîrê Bêna li dengê min feqrê  
Xemrî û gîs û herîrî Şev li min kabûsî hû.

Şev dikin nalin û zari Şibhetî teyrê Bîharê  
Ey Siyehpûş tu xumarî Sahibê adab û karî  
Çend Siyehpûş tu sîtarî Lê bi eşqa dil nikarî  
Dir û yaqût û mirarî Misk û enber jê dibarî  
Hespê şahê şehsîwarî Angeh ez pabûstî bûm.

Dilberê ehle dilan bû Qatîlê cergê pijan bû  
Qasîdê rûh û we can bû.

Dibêjîn leqeba Siyehpûş pê ve bûye jî ber ko hewranîkî reş bi xwe ve dikir, li hespekî hoz siwar dibû û kolosekî spî li serê wî bû; û ew di nav hesp û kolosê spî de reş dikir.

Jî şihra jorîn em dizanin ko Siyehpûş di pişt Xanî re ye Jû pê ve Siyehpûş bi vê şihirê jî me re du şairên din dide nas kirin: « Meki » û « Şêxê Babeşîrê ».

**AXAYOK** — Gelo ev kurdê ko bi zmanê xwe bi qasî Ristemê kurd mêr e kî bû? Belê ew



axa an pisrāyeyk bû. Lê axayê kû derê, navê wî çî ye, û kengê rabûye?

Dîsan û dîsan em nîzanîn, em nîzanîn. Bi tenê çend dîrîkên wî ketine destên me û bi vî awayî me zani şahirek rabûye û leqeba wî Axayok e. Nehe ko ev-ê Axayê Bêdarê yek bihin. Dîsan em nîzanîn. Ev in dîrîkên Axayok yên ko bi dest me ketine:

Tawûs bi vî şiklê melih,	Şermendeyê saqê di rêş
Ew qjîka gûxwer binêr	Qij qij dîkî elwan im ez.
Şêrê ji heft bavê xwe şêr,	Dawayî şêrî naketin
Tûlepîsê heft kûçikan	Ewew dîkî erşan im ez.
Nanê cehî tîr naxwîtin	Tîştêk di malê da niye
Simbêl û çavan bel dîkî	Zohaşiyê qewman in ez.
Fezî û terîqa neşebend	Ger ew bi sorbe germ biya
Ew dîzika sorbe di nêv	Dê şêxê Bestamî biya
Fezî û terîqa sofîyan	Ger ew bi reh behîta wicûd
Ew nêriyê lehyetewil	Dê bê guman sofî biya
Fezî û terîqa alîman	Ger ew bi şaşa gir biya
Cismê kulîndê ser mezin	Dê qazî heyzawî biya.
Fezî û terîqa qadîrî	Ger teq teq û şeq şeq biya
Ew şeqşeqa asî, yeqîn	Dê qutbê gêlanî biya.

**MEWLANA XALID** — Şêx Xalid Ziyendîn di terîqeta neqşibendî de şîhba Xalidî daniye. Mewlana Xalid ji kurdên Silêmaniyê ye. Şêx Xalid berî ewilî li Bexdayê û di pey re li Şamê terîqeta xwe belav kiriye û di sala 1242 an da li Şamê çûye rehmetê. Di çiyayê Çilyaran de veşartî ye. Mewlana Xalid şahirekî mitesewif e; û wî diwaneke farisî heye. Min bi xwe diwan ne dîtiye. Dibêjin ko di wê diwanê de çend qesîdeyên bi kurdî an nivkurdî hene. Me got nivkurdî ji ber ko Mewlana di wan qesîdan de kurdî û farisî tevli hev kirine. Êdî mirov nîzane ew qesîde bi kurdî an bi farisî ne. Ewe qesîdeyek ji wan qesîdan:

Çî tedbîr ey misîmanan	Kî men xod ra nemîdanem
Ne tersa me yehûdiyem	Ne gehr û ne misîlmanem
Ne beriyem, ne behriyem	Ne şerqiyem ne xerbiyem
Ne ez erkani tebhîyem.	Ne ez eftakî gerdan im
Ne ez Çîn im, ne ez Hind im	Ne ez bilxar û maçin im
Ne ez milkê Iraqê me	Ne ez xakî Xuristan im
Ne ez av im, ne ez ba me	Ne ez xak im ne ez atêş
Ne ez dinya, ne ez iqba	Ne ez sîrdewsi ridwan im
Nîşan im bê nîşan başed	Mekan im lamekan başed
Ne ten başed, ne can başed	Ne min ez canî canan im
Ne baba me, ne dada me	Ne emma me, ne xala me
Li ser wechê çîraya me	Dîkim îro di efxan im
Ji efxana bes e salek	Ji maşûqan bes e yarêk
Ji bo mîbihan hero carek	Welî himî ez bi çesman im.

**MELA YEHYAYÊ MIZÛRÎ** -- Min bi tenê navê wî bihistiye û ji min re gotine ko diwaneke wî heye. Dîsan rawiyan gote min ko Mela Yehya gelek bala xwe daye zimên û di daira imkanê de, bêjeyên erebî û farisî ne xistine diwana xwe. Çiyayê mizûriyan di ser Dihokê re ye.

**MELA XELÎLÊ SÊRTÎ** — Dibêjin ko Mela

Xelil di wextê Mala Yehyayê Mizûrî de rabûye. Ewî melayî kitêbek heye bi navê «Nehcel Enam». Beytên jêrin jî wê kitêbê ne:

Tu guh dère nitq û beyana fesih  
Ji bo ferz û eynan e merdê melih  
Ko iman û îslam û sewm û selat  
Li ser malîdaran e hec û zekat  
Li ser te jî ferzan e ey nûrî can  
Bizanî tu erkan û şertê di wan  
Heçî hikmê şerhê tu mihtac dibî  
Ji ho zanîna wî tu minqad dibî  
We lêken qe yek bê yekî nabitin  
Mîsilmani bê her diwan nabitin  
Tu manayê şehdê ko bawer bike  
Telefiz eger qadîr î pê beke.

**ŞÊX EVDILQCDIRÊ GÊLANÎ** — Ev kîjan Şêx Evdilqadirê Gêlanî ye? Xwedê pê zane. Yê ko navê wî jî min re gotiye, gote min jî ko diwana wî di gundê Qelenderan de peyda dibe. Qeleneran di dora Mêrdînê de ye.

**HECÎ FETAHÊ HEZROYÎ** — Dîsan min bihistiye ko diwaneke wî heye û herwekî jî navê wî dixuye jî Hezroyê ye.

**ŞÊX MIHEMEDÊ HADÎ** — Rawiyan gote min ko pêşiyên Şêx Hadî ji Rewandîzê hatine û di Licê de cih bûne. Dibêjin ko diwana wî heye.

**ŞÊX EVDIREHMANÊ TAXÊ** — Dibêjin ko Şêx Evdirehman bidlîst ye. Tax çî ye? Ji gundên Bidlîsê ye, an Şêx ji taxeke Bidlîsê e dîr e, û jî lewre jê re Evdirehmanê Taxê an «taxî» gotine. Me dîsan bihistiye ko diwana wî heye.

**NALÎ** — Ji şahîrên Soran e. Diwana wî di sala 1931ê de li Bexdayê çap bûye û yên ko diwan dane çap kirin biserhatiya Nalî jî tê de gotine. Jê dixuye ko Nalî leqeba şahîr e navê wî Mela Xidir e, bavê wî Elmed Şawês e. Nalî di sala 1215ê hicrî de, li Şarezorê, ji diya xwe bûye. Di sala 1255an de çûye Stenbolê û heta dawîya emrê xwe li Stenbolê ma û di sala 1273an de emîrê Xwedê kir. Li Stenbolê di gornîstana Eba - eyûbê - ensarî de veşartî ye.

**ŞÊX RÎZA** — Şêx Rîza jî sorî ye. Ew jî çûye Stenbolê û li Stenbolê di civata şahîr û zanayan de gelek bi qedr û rûmet bûye. Dersa efendî û beglêrên Stenbolê digot, «nemaze bi farisî. Şêz Rîza hecawekî hêman bû. Mixabin ko tu şîhîrên wî bi min re nînin ko ez belav bikim. Bi tenê çîrokoke wî dizanim.

Herwekî me got Şêx Rîza li Stenbolê qersa edebîyatê digot. Wezîrê miarîfê gelek jî Şêx Rîza hez dikir. Lê carekê wezîr şêx xeyidand. Di mala wezîrê miarîfê de, li beywanê

postê hirçeki hebû; ev post bi kayê dagirtî bûn û li ser lîngan sekinandi bûn. Şêx Rîza piştî erna wezîr, rojekê, di dersê de qala mecaz û kinayê dikir. Ji şagirtên xwe re heçko mîsallek anî û got: « Gava hon dikevin xanîkî û li heywanê hirçekî dibînin divêt bizanin ko xwediyê malê qereçî ye ».

**HAÇÎ QADIRÊ KOYÎ** — Hacı Qadirê koyî Xaniyê didowan e. Ew jî weke Xanî bi derdê mîletê xwe dişewitî. Şîhir û qesîdeyên wî tev de li ser mîlet û welêt in.

Çend şîhirên Hacı Qadir di sala 1925an de li Bexdayê di bin navê « komela şîhirên Hacı Qadirê Koyî » de çap kirine. Di wê komelê de bîserhatiya Hacı jî gotine. Li gora wê komelê Hacı Qadir kurê Mela Ehmed e, di gundê Gorqeraçê de ji diya xwe bûye, û ji eşîra Zengenê ye. Lê ji ber ko di zarotiya xwe de guhastiyê Koyê navê « koyî » pê ve bûye.

Hacı jî weke Nall û Şêx Rîza çûye Stenbolê û ketiye civeta edîb û şahîrên Stenbolê. Ji şahîrên wê heyamê pirê wan farîsiya xwe li ber destên Hacı xwendine.

Hacı dîwaneke mezin heye an hebû. Min dîwana wî ditiye; bi destnivîseke hûr qedere 800 rûpel hebû. Hacı jî dîwana xwe du nîsxê nivîsandî bûn; heke nîsxêke wê tirkî şewitandiyê heye ko nîsxa din rojekê bikeve destên me.

Ezê îro şîhreyê Hacı e neçapbûyî belav bikim. Herwekî me got Hacı perestîşkarê Xanî bû. Hacı li ser Memozîna bavê min a destnivîs-şîhira jêrîn nivîsandiye.

Zemane resmî caranî ne mawê  
Çîraşî nazîm û mînşî kujawê  
Le dewrî eme roman û cerîde  
Egerçî meqsed e, zanînlî baw e  
Eman qedrê bizane em kitêbe  
Le dinya êsteki hemtay ne maw  
Le eyamî heyatî şexî Xanî  
Le ser nîsxey xet ew nûsîrawe  
Le layî erbabî xoy bo qedr û qîymet  
Xezîney gewher e, û kîsey diraw e  
Le mecmûhî diwêl, Soran û Botan  
Le sayey em kitêbe nasîrawe  
Le kurdan xeyrî Hacı û şexî Xanî  
Esasî nezîmî kurdî danenawe.

Hacı di sala 1912ê hicrî de li Stenbolê çûye rehmêtê. Bi eqlê min li Skûdarê di gornîs tana Reqece - Ehmed de veşartî ye. Ez dikarim bibêjim min Hacı ditiye, lê nikarim bibêjim ez Hacı nas dikim. Ji ber ko sala ko Hacı çû rehmêtê ez hêj nû ketî bûm ser lîngan.

**ŞÊX NÛREDÎNÊ BIRÎFKÎ** — Ji eserên

Şêx Nûredînê Birîfkî di destên me de bi tenê Çîroka Siltan Ebûbekrê Şîblî heye. Ji xwe jî pê ve min tu eserên şêx ne dîtine. Ev in çend beyt ji qesîda Ebûbekrê Şîblî:

Ev bendeyî şexî cihan Lazîm divî sîra nihan  
Zahir bikim qutbî zeman Da hon bizanin qîsetê  
Şêxek hebû xewse dinê. İnsan hemî jê bûn xent  
Ne d'hate xab û xwarinê Daim bi terka lezetê  
Navê ewî qutbî şerîf Şîblî Ebûbekrê zerîf  
Yekser dibû wek mû zeff Daim bi tîrs û xeyyetê  
Eslê terîqa şêx çî ye Ewîl emîrî şabiye  
Şêx hakîmek farîsî ye Siltanê mir û şewketê  
Mîrê nihawendî hû ew Şabê semerqendî bû ew.

**EVDIREHMANÊ AXTEPÎ** — Kitêbeke wî heye bi navê « Rewzel Neîm » tê de qala wêsfên pêxember û mîraca wî kiriye. Kitêb mênzûm e, û 360 rûpel in. Kitêb di sala 1302ê hicrî de hatiye nivîsandin. Evdîrehman teqlîdî Ebmedê Xanî kiriye û di şîhîrekê de qala kurdmançî û kurdmançan kiriye. Evdîrehman di beyteke wê şîhîrê de dibêje:

Me ev çend lefzî şîrîn çêkirin  
Zîmanê di tirkînan me pê jêkirin.

★ ★ ★

Heta niho me bêhsa wan camêran kir ko bi nezmê nivîsandine û xwediyê diwanê ne. Ji van pê ve çend mirovên din hene ko bi şîhîrê mijûl ne bûne lê di warên din de bi kurdmançî nivîsandine. Emê niho qala wan bikin.

Kurdîzan Eleksandr Jaba jî di kitêba xwe de qala wan dîke û welêt dixuye ko ev tişt jî jê re ewî melayê kurdmançî bi devkî gotine û Jaba ew bi frensîzî nivîsandine.

**ELÎ TEREMAXÎ** — Jaba dibêje ko kurdmançan heta 1000ê hicretê ilmên din û şerîetê bi zmanê erebî dixwendin. Piştî 1000î melayek bi navê Elî, ji gundê Teremaxê, ji qeza Miksê rabûye û ji ber xwendinê çû heta Bexdayê. Elî di medresên Bexda, Mûsil, Bêdînan û Soran de xwend û di nav alimên heyama xwe de bû bû zanakî serdeste. Ewî Eliyê Teremaxî piştî ko vegeriya welatê xwe rabû di gundê xwe de medreseyek ava kir û bi zîmanê kurdmançî kitêbeke tesrîfê jî çêkir û dersa feqehên xwe bi kurdmançî got. Hêdî hêdî ew kitêb li Kurdîstanê belav bû.

**MELA ÛNÎSÊ ERQETÎNÎ** — Jê re Melayê belqetînî jî dibêjin. Xuya ye ko « Erqetîn » an « Helqetîn » gundê wî ye.

Vi melayî daye pey Elî Teremaxî û kitêbên tesrîf, zirûf û terkîhê bi zmanê kurdmançî nivîsandine. Min ne eserên Elî ne jî yên Ûnîs dîtine ji lewre min nikarî bû ez hin tiştan ji wan belav bikim.

**MELAYÊ ERWASÊ** — Melayê Erwasê kitêbeke kiçik lê heja nivisandîye. Kitêba wî li ser nexweşî û dermanên wan e. Mela tê de qala nexweşîyan dike û dermanê her nexweşiyê û çekirina dermanên jî dibêje. Min bi xwe kitêb ne ditiye, ez bi saxlûxdanê dibêjim. Disan rawiyan gote min ko Melayê Erwasî di wextê Evdil - Xanê bavê Bedir - Xan de rabûye. Li gora vê û bi texmîn Mela beriya niho bi 150 salî emir kiriye. Ji kitêba wî re Tiba Melayê Erwasê dibêjin.

**KITÊBEKE HISABÎ** — Vê paşiyê kitêbeke kiçik ketiye destên min. Kitêbeke mewzûn. Tê de qala hesabî kirine. Ev in çend beytên wê:

Neh caran neh bi xwe hesêbêk biltemam  
Heştê û yek in, tu bizan ya ez xulam.

Heşt caran çar çend in eya şîrinbira  
Ew sih û dû ne herçî zêde ji te re.

Heft caran pênc çend in eya tîflê piçûk  
Ew sih û pênc in da ko pê nebi xudûk.

Şeş caran sê çend in eya sahib meqal  
Ew deh û heşt in tu bizan ya pirê kal.

Pênc caran pênc çend in eya mîrê çak  
Ew bist û pênc in tu bizan ey canê çak.

Çar caran heft çend in tu bêje vê demê  
Ew bist û heşt in da tu hilnegri xemê.

Sê caran neh bo te beyan kin ya delal  
Ew bist û heft in tu bizane ya heval.

Du caran çar çend in min bo te kirye xet  
Ew heşt temam in der vê nezma pir xelet.

Êk caran êk êk e bizan ya nasiha

Bo feqîrê koyî bêjin fatiha.

Di dawîya vê kitêbokê de hi erebî şerhek heye. Li gora vê şerhê xwedî kitêba xwe di şala 1345ê romî de nezîm kiriye; berî hevdeh salan. Gelo li kû derê? Li Tirkiyê, Iraqê an Sûriyê?

Xwendevanên delal. Ev nivîsara ko ji bo kitêbekê hindik lê ji bo bendeke hinek zêde ye, li hire temam bûye. Herwekî min ji we re got li vê hendê ne wek bendeke tarîxa edebîyatê lê wek listeke şahîrên me ên kevin fedkirin. Hingê hon dikarin xwe ji şaşbûnê biparêzin.

**HEREKOL AZIZAN**

**LI DINYAYÊ ÇIQAŞ HEYWAN HENE** — Tukesî heywanên dinyayê ne hejmartine lê bi texmîn hejmarên jêrin pêk ve anîne.

580 milyon pezên mîşînî. 100 milyon pezên bizînî. 120 milyon ga û gamêş. 180 milyon beraz. 90 milyon hesp. 15 milyon ker. 2 milyon heştîr. 900000 rên. Rên texlîtek garkovî ye; li bakurê Ewropê û Emêrikayê diji. Xelkê wan welatan ew kedî kirine û ji wan re taxok û ereban didin kişandin.

## REWŞA DINYAYÊ

**IŞÊ SPİÇBERGÊ** — Li bakurê Novjê giraveke heye jê re Sepîçberg dibêjin. Ev girav jî beja Ewropayê jî 500 kilometrî bêtir durr e, mirov dikare bibêje ev girav li perê dinyayê. Ji xwe jê we ve dinya qeşa ye. Li 8ê Îlonê Mister Çorçîl di meclîsê de da zanin ko eskerên sondxwariyan derketine wê giravê. Mister Çorçîl bi ser ve zêde kir û got ko sondxwariyan bi vê vegertîne pêşî ji elmanan standiye. Bi vî awayî îngilîz bûne hakîmê bakurê Ewropayê. Ji xwe girav aîdî Norwêjê ye. Lê giraveke bê xêr e. Bi tenê tê de hin kanên rejûyê hene. Divêt ji awirê eskerî ve û nemaze ji bo şerê Etlantikê ehemiyeta wê hebe.

**SERÊ ETLANTİKÊ** — Di şerê Etlantikê de vê paşiyê tişteki mezin û bi ehemiyet qewimiye. Herwekî xwendevanên me dizanin ji destpêka şerî ve Emêrike bi îngilîzan re ye û ew bi her awayî ari-kariye Îngilîterê dike. Vê paşiyê cengkeştîyên emêrikanî di Etlantikê de gava noçar û cenkeştîyên elmanan qidîtin elam didan îngilîzan ko bêtir û li wan xîn. Li 10ê Îlonê Mister Rûzwelt nitqek got û tê de da zanin ko ji niho pê de cengkeştîyên emirakanî di Etlantikê de herçî noçar, balafrî û cengkeştîyên elmanî yên ko bi biwara wan kevin ewê li wan xîn. Ji xwe elmanan vê paşiyê çend vaporên emirikanî yên ko çek û posat tanin Îngilîterê di Behira Sor û di Etlantikê de bin av kirine.

Li 14ê Îlonê kulnêl Noks wezîrê behriyê di nitqeke xwe de got ko ji niho û pê de vaporên ko ji Emêrikayê çek û posatan dibînin Îngilîterê di bin hima-yeta stola emêrikanî de bi rê ve herin. Û stola emêrikanî heke bi rê ve rasti keştîyên dijmin hat ewê wan bigire an bin av bike.

Piştl van qeraran ji elmanan re divêt an çavên xwe li vaporên ko ji îngilîzan re ji Emêrikê çek ditînin bigirin û herdin ew di ber pozê wan re biborin, an şerêkî nû bidin ber çavên xwe û weke berê li wan vaporan xîn. Li gora nitqa Rûzwelt heke elmanan li wan vaporan nexa jî nabe ko noçarên wan di navbera Îslandê û Emêrikê de bigerin. Ji ber ko Rûzwelt enîr daye stola xwe ko di wê mintiqê de dirêjî vaporên elmanî bike. Ji vî emrê Rûzwelt dixuye ko Emêrike êdî daye ber çavên xwe ko tîfla xwe biteqîne. Heke Emêrike kete şer bivê nevé barê Îngilîterê wê siviktir bibe. Lê li gora tifaqa sêhendin beke Emêrike şerê elmanan kir divêt Japon jî bikeve şer. Hingê şerê behriyê bigehe behra pesifikê jî û mesele wê mezin bibe.

**HALÊ FRENŞÊ** — Wer dixuye ko Frensê ne rahet e. Îşê Merêşal Pêten zehmet bûye. Piştl şerê ûris bolsêvîkên frensîz li hikûmeta Pêten radibin. Li Parisê û di hin derên Frensê ên din de li zabîti û eskerên elmanan dixin. Berî çendekê li Laval û li hevalekî wî xistine. Brîna Laval sax bû, hevalê wî mir. Dibêjin ko elman ji frensîzîzan hinekan jî benderên êfrîqayê dixwaze. Xilase tişte, tevli-heviyek di Frensê de heye, lê hi temamî ne xuya ye.

**IŞÊ ECEM** — Îşê ecem safî hûye. Şah Rîza - Xanê pehlewî terka tac û textê xwe da û ji Teh-ranê rabû. Kurê wî Şahpûr ket şûna bavê xwe û bûye Şahê Ecem. Ji êr ko eceman der heqê anîncîha şertên sondxwariyan de ne dilrast bûn ûris û îngilîzan ketine Tehranê jî. Ecem li ser pêşnîhada

## XEBATÂ HAWARÊ

Ali Bedir-Xan Celadet beg ji bo te pir silav  
Dir ji zarê te dibare tê de bihna sed gulav  
Lew divê esra felaket. tarîxa zar û zîman  
Edebî şîhr û kinayet lavij û lûj dan hilav  
Her bişîr pisporê Kurdistan tevî Kurdistan hijîn  
Da ko tipên me di çapxanê rijandin zêre av  
Çax û hêwana me fro maye bê deng û xebat  
Xew li çavê me dibare xem li ser me sed xûnav  
Mînet û xîşma vejale mij li sipan girtîye  
Em di bin da mane jarî hêlina derdan xûnav  
Em li bin lingê nejadûn bûne gêrik her mirî  
Zar û pejmîrde dinalin her bi dili lavelav  
Tarîxa cihan dixwaze serxwebûn û nav û deng  
Yezdanê navdar ko daye dest û lîng û çav û gav  
Ma dizanî ayê jaran nine jê re pirsîyar  
Qanûnê cihan seranser bend û serbê wan dirav  
Ger nexwînin em nebinin xwîn û cenga serxwebûn  
Yan ne çapek nih nebinin de bîmînin kal û xwaw  
Ma dijîn lawanî Kurdî ger ne ewrê reş bere  
Hêj bibare dil diyar be wê bibînin roj û tav  
Fîrset û zeman nîzane dûr û nêzik çax û beng  
Ma ne Hîşyar tu dixwazî vî zemanî çax û gav.

### HÎŞYAR

ûris û inglîzan sefaretên elmani, telyanî, bîrxarî, romani û mecêrî girtine, û elmanêr ko bi destên wan ketine teslîmî ûris û inglîzan kirine. Wer dixuye ko ûris û inglîzan nîzane Ecemîstanê wê biguhêrin.

ŞERÊ ÛRIS — Herwekî me di hejmara 32an de goti bû ûrisan şerê xwe xweş kiriye û xwe li ber elmanan digire. Lê wer dixuye ko elman gelek zorê didin ûrisan û wan pîr tîşînin. Şerîne xwîrozî di navbera wan de çêdibin. Ûris, nemaze, di eniya Smolenskê de rabûne herhûcîmanî jî. Û li gora danezanên Moskoyê ûrisan di vî eniyê de elmanan 26 kîlometir bi şûn de ji veşerandine. Lê ji milê dîn ûrisan daye zanin ko elmanan, di bakurê Kiyêvê de, ketine bajarê Çernîgovê. Di eniya nivro de yanî Okranyayê de elman li ava Dînyeper derbas bûne û ketine wî milê avê. Bi vî awayî kiyêv û nivgirava Kîrim ketine bin talûkeyê. Wer dixuye ko elmanan dikin rîya Kîrimê bigirin û ordîwa ûris ya ko li Kîrimê ye ji welêt qut bikin.

Odesa weke xwe di bin mîhaserê de ye. Elman hêj ne ketinê. Li Leningradê şerekî dojehîn çêdibe. Berfa pêşîn dest bi ketinê kiriye. Heye ko ew dojeh jê hinek honek bûye.

Di welatê ûris de cihê ko jê re Volge dibêjin, 400000 elman hebûn. Ew elman ji wextê Keterîne ve di wî welatê de ne. Ûrisan ji tîrsa ko ew elman tişteki bikin, rabûn ew ajotîne Sibêryayê.

Iglîzî û emêrikanî dibêjin emê bi ber awayî arfkariya ûrisan bikin û em nahîlin ko ûris bişkên. Wer dixuye ko hin belafîrên iglîzî çûne Rûsyê û di eniya Leningradê de serê elmanan dikin.

Herwekî me berê jî goti bû çekên ûris zehf û ecêb in. Welê dixuye ko hin tangê wan bi 250 ton mezn in.

Ji tevgera ordîwa elmanî wer dixuye ko elman di Okranyayê de tişteki nû pêk ditînin, û dikin li ûrisan derbeke xurt bidin.

## BINGEHÊN

### GRAMÊRA KURDMANCI

BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DİLOVAN Û MIHRVAN

### — 7 —

67 — FKÎ, EKE, INE.

EKÎ — Ji bo yekejmara zayendê nêr.

EKE — Ji bo yekejmara zayendê mê

INE — Ji bo gelejmara her du zayendan

Ev veqetandek dikevin paşîya wan navdêrên ko bîreserek daye pey wan.

Hespekî delal hat. Hespîne delal hatin.

Mehîneke delal hat. Mehînine delal hatin.

Hespekî Soro hat. Hespîne Soro hatin.

Mehîneke Soro hat. Mehtînine Soro hatin.

Gelek eşkere ye ko gava em « hespekî delal » an « hespekî Soro » dibêjin, ev gotin ne bi mîana « hespê delal » û « hespê Soro » ye. Em li misala « hespekî Soro » hûr bibin. Di gotina « hespê Soro » de qala hespekî welê dikin ko bi her awayî bi me nas e. Lê gava « hespekî Soro » dibêjin ev hesp bi me bi temamî ne nas e. Bi tenê em dizanin ko ew, hespekî ji hespên Soro ye. Lê ew kîjan hespê Soro ye; em pê nizanin.

68 — Veqetandekên nebinavkîrî di pêşîya rengdêran de: Veqetandekên nebinavkîrî ji wek ên binavkîrî, carîna dikevin pêşîya rengdêran. Hingê şiklên wan ev e: î, e, en. Hespekî min î qenc hebû. Hespîne min en qenc hebûn. Mehîneke min e qenc hebû. Mehînine min en qenc hebûn.

Çend mîsalên din:

Ez çûme derên çeman, çem en ser in,  
Zoranên bavê te bilind in, berf û baran lê dibarin.  
Kurê Haco ê mezin î xwenda. Hespekî min î sor hebû.

Li gora nûçeyên paşîn emîral Rîder serfemandarê stola elmanî batiye Bîrxarîstanê û elman di behra reş, di benderên bîrxarî de stolekê saz dikin. Ji bona ko ji wan wargehan û di rîya behrê, di Behra - Reş de dirêjî peravên ûris bikin. Dibêjin ko bîrxarî ji talyanan heft torpîyor kirîne. Ji ber ko Bîrxarîstan dewleteke bêteref e, divêt cenkeştîyên wê di Çeneqelê re derbas bibin. Heke ev nûçe rast e, ev torpîyor bîvê nevê ji bo elmanan in. Lê Bîrxarîstan herçend ne ketî be jî şer, nikare yekcar bêteref bête hesabandin. Ji lewre gelo tîrk ji vî îşî re wê çî bibêjin?

Herwekî xwendevanên me dizanin tîrk ji mêj ve bi inglîzian re girêdayî ye. Lê vî paşiyê bi elmanan re jî peymaneke nelibevoxistinê imza kirîye. Kurdmanc dibêjin: li guri goşt dixwe, bi şivên şînê dikişînê. Bextê romî ye, ma kes pê dizane. . .

Şam: 16 İlon 1941 NÊREVAN

Şanek — Gava çend navdêr bi biresereki ve girêdayî ne û ew henî ji yek mejerê ne, ji yek zayendî nebin jî, mirov dikare wan navdêran bi yek veqetandekê bi bireserî ve girêbide. Veqetandek ji zayendê navdêra paşin tête bijartin, yanî heke navdêra paşin nêr e, veqetandek nêr û heke ew mê ye, veqetandek jî mê ye. Herweki li şûna ko mirov bibêje: « Meta min û mamê min hatine » « Pismamê min û dotmama min hatine » Mirov dikare bibêje: « Met û mamê min hatine ». « Pismam û domama min hatine ».

Çend mîsalên din: Hesp û mehîna Lêzgin. Keç û kureki min bene. Mih û bizînine zozanan.

69 — Gava ji yekê bêtir bireser bi navdêrekê ve dibin û ew bireser tev de navdêr û pey hev bireserên hev in hingê her yekî wan li gora mejer û zayendê xwe veqetandekê dibe:

Ava me şêrin e.

Ava kaniya me şêrin e.

Ava kanike me şêrin e.

Ava kanîne me şêrin e.

Ava kaniya gundê me şêrin e.

Ava kanike gundê me şêrin e.

Ava kanîne gundê me şêrin e.

Ava kanike gundekî me şêrin e.

Ava kaniyên gundê me şêrin e.

Ava kaniya gundê ciranê me şêrin e.

Ava kanike gundê ciranê me şêrin e.

Ava kaniyên me şêrin e.

Avên kaniyên me şêrin in.

Lê heke di nav wan bireseran de rengdêrek heye, hingê û ji ber ko rengdêr ji bêjeyên neguhtêrbar e, û ji lewrê tu veqetandek pê ve nabe, veqetandeka navdêra ko rengdêr bireserê wê ye dikeve pêşiya wê rengdêrê û wê bi navdêra xwe ve girêdide. Herweki: gava em « kurê Haco ê mezin » dibêjin « ê » ya ko ketiye pêşiya rengdêra « mezin » jî « ê » ya ko bi « kur » ve bûye pê ve ne tu tişt e. Yanî yê ko mezin e, kur e, û ne « Haco » ye. « Haco » biwa meê hingê bigota « Kurê Haco yê mezin ». Heke me çêli keçên Haco bikira hingê meê « a mezin » bigota, ji ber ko veqetandeka keçê « a » ye. « Keça Haco a mezin » Lê heke me mezinbûn bi aliyê Haco ve da hingê veqetandeka « Haco » pê ve dibe: « Keça Haco yê mezin ». Çend mîsalên din: Tifinga min a dirêj. Hespekî min î xurt û beza hebû. Kitêba Hevind a peritî. Mehîna min a kumêt.

70 — Tewanga veqetandekê: Ji veqetandekên nebinavkirî « ek, ek, in » gava dikevin paşiya bêjeyên ko di qisetê de ne kirar lê bireser in, ew jî weke navdêran, tene tewandin û dibin: ekî, ekê, ina.

Hespek hat. Ez bespekî dibînim.

Hispin hatin. Ez hespîna dibînim.  
Mehînek hal. Ez mehînekê dibînim.  
Mehînin hatin. Ez mehînîna dibînim.

Şanek — Ji qeydê der û di hin cihên Kurdistanê de veqetandeka « in » carina bi « i » û « ê » yê ji tete tewandin; herçend « in » veqetandakeke gelemjmar e û parkitên « i » û « ê » yekejmara in. Mesela: Li şûna « goştî bide min » û « avê bide min » « goştîni bide min » û « avîni bide min » dibêjin.

71 — Gava navdêr bi dengdêrekê temam dibin, dema ko veqetandek bi wan ve dibin mirov dikare hin tipên ko navdêr û veqetandekê bi hev re girêdidin ji navê bêxe û wan kutehir bike. Herweki li şûna ko mirov bibêje:

« Piyekî, xaniyekî, çirayekê, maseyekê, coyekê, xwesûyekê, kursiyek, xaniyîne, maseya min ».

Dikare bibêje: « Pêkî, yanîkî, çirakê, masekê, cokê, xwesûkê, kursîk, xanîne, masa min ».

( dûmahik heye ) C. A. BEDIR-XAN

## HEYRAN [1]

Heyran! İsev meçe, li hire be,  
Wê bê pêşiya heyranê min. nijda semer  
[ û ereb e,  
Wê te bikujin, xelk ê bêjin, Eysmelana  
[ reben biye serê loman û sebeba  
Li ser serê min hat heyran, mehvanê  
[ paşmexribê.

Heyran Xwedê xerab bikê Keşanê!  
Xaniyê Mir Elmedê min raserî kolanê  
Minê divê ezê şeva nivê şevê herim te-  
[ wafa xal û nişanê gerdênê  
Devê min şemîti, keti bi ser Jefika ki-  
[ tana Eysmelanê.

Heyran tu î xirab î,  
Tu li derê mala babê min rûdîni,  
[ qet ranabî;  
Ti we bikî, ezê bêjim bab û brayên xwe  
Ev sêwiyê heyrana jî min venabê.

Heyran digo keçikê ez xirab im,  
Ez li ber derê mala babê te rûdînim,  
[ qet ranabim.  
Ti ne bêjî bab û brayên xwe  
Ti bêjî xunkarê dinê islamê ez jî te venabim

[1] Ev heyranêke Botan e; serekê Jêlîyan bi xwe jî me re gotiye.





## Kitêbxana Hawarê

Rejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rûpelhine Ellabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dîlê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Bîyîşa Pêxember. Bi Kurdiya Dumîlî, bi  
dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Pêzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mîstefa Kemal paşê re  
C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikîlî
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10— Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11— Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12— Derên Şerîetê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13— Çarûnên Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14— Proverbes Kurdes. Medhelokên Kurdî  
Lucy Paule Marguerite û Emîr. K. A. Bedir-  
Xan Paris - 1937
- 15— Le rol du Kurdistan. Qralê Kurdistanê.  
Emîr K. A. Bedir-Xan û Adolphe de  
Falgerolle. Paris - 1937
- 6— Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdis-  
tanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel  
Berlin - 1937
- 17— Der Schnee Des Lichtes. Berfa Ronahiyê  
Şîhrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û  
Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Salt	500	Qirûşên Sûrî
Şeqmeht	300	Qirûşên Sûrî
Sêmehî	200	Qirûşên Sûrî

Xwedî û garîndeyê berpiratîyar: Mîr Celadet  
Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriya  
Directeur Propriétaire: Emîr Djeladet Aalî  
Bedir-Xan. Damas—Syrie



SAL 9  
HEJMAR 34  
—  
ÇARŞEMB  
15 ÇIRIYA-PÊŞIN 1941

# HAWAR

ANNEE 9  
NUMERO 34  
—  
MERCREDI  
15 OCTOBRE 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTİYÊN VÊHEJMARÊ

Tefstra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Eşîra Jêliyan	Herekol Azîzan
Welat	Sibhiyê Diyarbekrî
Cenga Canî	M. E. Bötî
Edebiyata Kurdî	Refîq Hilmi
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Radyowên Kurdi	Hawar
Gramêra Kurdmanci	C. A. Bedir-Xan



ŞAM—1941  
ÇAPXANA SEBATÊ



## TEFSÎRA QURANÊ

187 - Di şevên remezanê de nîzikbûna we li jinên we, ji we re helal e. Ew cilên we ne û hon ji cilê wan in. Xwedê seh kiriye ko hon di şevên remezanê de nîzîkî jinên xwe dibûn û we pê nefsa xwe dixapand; lê hon êdî tobedar bûn û Xwedê tobe da we û di gunehên we bihurt.

Êdî hon dikarin, di şevên remezanê de li cem jinên xwe biminin, hêvîdarên kerem û teqdîra Xuda bibin û fêkiya qedereên xwe jê bixwazin.

Heta dema sagurê ko tê de reşiya şevê ji ronahiya rojê ji hev dibe, bixwin û vexwin lê ji wê demê û wir da heta rojavayî rojîya xwe bigirin, dest ji xwarin û vexwarinê berdin û gava hon di mizgeftan de, di itîkafê de ne, nîzîkî jinên xwe mebin.

Ev tixwibên emrên Xudê ne, nîzîkî wan ne bin. Bi vî awayî Xuda emr û fermanên xwe pêş xelkê dike da ko ew pê birewer bin, ji Xwedê bitirsin û dest ji xirabiyê bikişnin.

188 - Malê hev û du bê heq mestînin, talanê xelkê mebin, di neheqiyê de û di xwarina malê xelkê û anîna talanê di wan de ji bo pişturtiya xwe ji hakîman re bertilan medin.

Hon dizanin, ew zilm e. Laneta Xwedê li zaliman e. Zalim rûreş in, mîna kafîra ne. Kafîr dojhêketî ne û tê de her dimînin.

Ji te bête pîrs kirin:

189 - Mehên nû ji çîre ne?.. Bêje: Mehên nû demên rojîyê, fitarê hecê û ayînên di vê, çaxa dayîna deynan û me-

hikê pêş xelkê dikin. Ji par re derbasî hundirê malan mebin, ev tişteki kirêt e û bê xêr e, lêbelê di deriyaq re bikevin xaniyan, guhdariya emrên Xwedê bikin, jê bitirsin heta ko kerema Xwedê bigehe we.

190 - Yên ko qesda kuştina we dikin, di rîya Xwedê de wan bikujin, lê yê ewil hon destê xwe dirêjî wan mekin, Xuda ji tadakeran hez nake.

191 - Hon li kû derê ji rastî wan dijminên dinên xwe tên dest bi kuştina wan bikin û herwekî wan hon ji welatê we derêxistin wisa ji hon wan ji welatê wan derênin. Ji ber ko fitne ji kuştinê xirabtir e. Lê di mescida - Heramê de dest bi kuştina wan mekin, meger wan bi xwe destdirêjiya we kir; ko wan wisa kir wan bikujin, cezayê kafîran wilo dibe.

192 - Heke wan dest ji kufr û kuştinê kişand... Xuda ewî û tobê dide; Xwedê mezin û piyar e.

193 - Heta qelandina fitne û kufrê di kuştina wan de pê de herin û dev ji wan bermedin heta hingê ko bête seh kirin ko taet û ibadet bi tenê ji Xuda re ye. Lê yên ko dest ji kufrê dikişînin û poşman dibin, ji wan re dijminîti naye kirin. Xuda neyarê zaliman e.

194 - Herwekî par di meha Zil-qadê de wan rîya Mekê ji we girt û bextê xwe li ser ewleyiya wê meha giran û cihê miqedes şkênand, wiha hon ji di wê mehê de herin qezayê Emrê û dest bi kuştina wan bikin. Gava hin bextê xwe li ser ewleyiya cihekî an wextekî miqedes xira dikin ji wan re qîsas divê.

Bi her çî awayî yek ji we re xirabiyê dike bi wî awayî lê vegerinin.

Ji Xuda bitirsin û sinorên heqê xwe bizanin û dîsa bizanin ko Xwedê bi ciwanmerdan re ye.

195 - Malê xwe di riya Xwedê de bi xweşdîlî bidin û bi çavtengiyê, xwe bi xwe mavêjine tehlukê, camêr û destvekirî bin.

Xuda ji mirovên ciwanmêr û destvekirî hez dike.

196 - Ko we dest bi Hecê û Emrê kir, ji bo Xwedê ferz û sinet û ayinên di wan pêk binin û biqedinin.

Heke seba tengasiyekê, weke nesa-xî an girtina rê (şer û kuştinê) nikarin bigehin Hecê, ji we re şerjêkirina deveyekê, çêlekekê an pezekî dibe wacib.

Qurbanî we divê di wî cihî de-ko tengasî bi ser we de hat, hêj bi xêrtir di Heramê de bê şerjêkirin; û bêrî ko qurbanî we bigehe wê derê pora xwe kur mekin, yê ko seba nesaxiyekê an nexweşîya serî bivê nevé, pora xwe diqusine, jê re fîdveyek wacib e.

Hikma fîdye ev e: Sê roj girtina rojiyê an ji şes belengazan re dana şes mid genim an şerjêkirina pezekî.

Hekê tengasî namîne, û her çend ji dema Hecê bihuriye, yê ko digehe Emrê û heta ko sala nû û dema Hecê bê bi nîmeta Emrê dibe nizîkî xeyra Xwedê, jê re şerjêkirina deveyekê, çêlekekê an pezekî dibe wacib.

Heke qurbanek nakeve destê wî, divê sê roja rojiyê bigire û di vegera xwe de ji divê heft rojên din rojî bigire.

Ev hikmên Xwedê, ne ji bo xelkên Mekê û xelkên dora wê ne.

Ji Xuda bitirsin û bizanin ko Xwedê bi ezabekî giran diezibîne.

197 - Mehên Hecê mehên hejmartî ne. (Şewal, Zil-Qade û neh rojên Zil-Hicê ên pêşin) in.

Yê ko dest bi pêkanîna ferza Hecê kiriye, bila ew di Hecê de nizîkî jina xwe nebe, dest ji fisq û xirabiyê bikişîne, bi heval, xadim û xulamên xwe re pev neçe.

Çiqas ji destê wî tê bila qencyê bike. Xuda bi vê qencyê dizane. Ji bona Hecê bi peran û zad debara xwe bikin, lê zadê xweştir tobe dia û dilrastî ye.

Gelî mirovên birewer..... Ji min bitirsin.

198 - Dema Hecê de heke hon, bi kirin û firotinê, bi ticaretê rizqê xwe ji Xudayê xwe dixwazin, ev ji we re ne guneh e. Gava hon ji Erefatê vedigerin, di cihê Meşeril - Heramê de navê Xwedê binin bîra xwe, jê şikirdar û razî bin, hon nezan bûn ew ji kerema xwe riya Hecê a rast da we.

199 - Paşê weke xelkên dîn, hon ji Erefatê veşerin û werin û tobedarên Xudayê xwe bibin. Xwedê efiw û loban dide, Xuda piyar e.

200 - Gava we ayinên Hecê pêk anin û qedandin, herwekî mirov bav û bapîrê xwe tine bîra xwe welê jî, an hêj bêtir honê navê Xwedê ji dil binin bîra xwe û bi mezinahiya wî birewer bin.

Yên ko ji Xudayên xwe bi tenê hêviya malên dinyayê û mezinahiya wê dikin, ew ji axiretê bê behr in.

201 - Lê yên ji wan ko dihêjin: Xudanê me, ji kerema xwe di dinyayê de xweştir û qencyê ji me re li hev bine û di axiretê de me bigihîne kerema xwe û ji me agirê dojhê dûr bike...

202 - Ew ji hêvi û qencyên xwe xudanbehr in. Xwedê di cezadanê û keremkariyê de bi lez û bez e.

203 - Di rojên hejmartî de (ango di cejna qurbanê de ji sibeha roja erefê heta piştînvroyê roja cejnê a sisê) Xudayê xwe binin bîra xwe û bi navê wî zikrê bikin. (Awayê zikir ev e: Ê mezintir Xuda ye, Ê mezintir Xuda ye, ji Xuda pê ve tu Xuda nîne, Ê mezintir Xuda ye, Ê mezintir Xuda ye, pesn ji Xuda re ye.)

Yê ko vê zikrê bi Iez di nêv du an bi giranî di nav sê rojan de dike jê re tu guneh nîne.

Ji bona Telsîra Quranê K. K. û li hejmaêrn 27, 28, 29, 30, 31, 32 û 33 an fedkirin.

# HEDÏSËN

## CENABË PËXEMBER

REHMET Û SILAVA XWEDË LË BE

316 - Ji sedgeqeyên qenc yek ji ew e ko mirov hini tişteki çak bibe û miroveki di hini wi tiştî bike.

317 - Keda çêtir ji dan û standina pak û ji keda xebata destan û xwehdana eniyan tê.

318 - Bawermendên çêtir ew in ko exlaqê wan baş e.

319 - Bawermendên çêtir ew in ko kirin û frotina xwe bi cameriyê dikin, deynê xwe bê zehmet didin û xwediyê deynê xwe aciz nakin û deyndarên xwe na şidînin û na êşinin.

320 - Heçî eqilmend in serdestê hevalê xwe dibin.

321 - Pir merin meyin mala dewlemendan.

322 - Pir mebêjin li qisûra min me nêre honê dawi derewan bikin.

323 - Li qisûra comerda me nêrin ko piyê wan şemîti, Xwedê wan digire û bernade ko bikevin.

324 - Gunehên mezintir ew in : mişriki, kuştina xelkê bê rê, asê bûna dê û bava; danêna şehdeftiya zor.

325 - Di roja piştawivê de piraniya xelkê ji ber gotinên bêrê û beredayî wê bêne êşandin.

326 - Dêv û diranê xwê her paqij bigirin.

327 - Bila mirina we tim di bira we de be, dilê belengaza pê rahet dibe û pozbilind ji ibretê digirin û eqilmend dibin.

328 - Mirovên mezintir ew in ko ji Xwedê tirsiyar in.

329 - Qedre nanê xwe bigirin.

330 - Bawermendê çêtir ew e ko exlaqê wi baş e û xeyra jina xwê dixwaze.

331 - Jina bi zar û zêç ji jinikeke spehî lê bê zaro çêtir e.

332 - Qencyê herî ewilî ji diya xwe re bike, paşî dîsa ji diya xwe re bike, cara sîsiya dîsa ji diya xwe re bike, di pişt re ji bavê xwe re û piştê li gora nizikahiya wan ji mirovên di xwe re bike.

333 - Xwedê ji sê evdên xwe hez dike : hakimê adil, mirovê ko ibadeta wî dike û yê ko kesî na ke hevherê wî.

Xwedê ji sê evdên xwe dixeyide: mirovê durû ko paşgotîniya xelkê dike, yê ko bê rê ji xelkê pir dipirse û yê ko ziaker e.

334 - Xwedê dibêje : gava du mirov bi dilekî pak şirikê hev in ez bi wan re me, lê

heke dilê xwe li hev xira dikin ji wan digirim.

335 - Di rojê piştawivê de Xwedê ji evdê xwe re dibêje : ez ne sax ketim, te serek li min ne da; ez birçî bûm te xwarin ne da min, ez ketim tengiyê te, li min ne pirst; evdê wî jê re dibêje: Xudayê min, ma min çawan dikarî ez bizanim ko ew tişt hatine serê te. Xwedê lê vedigerine û dibêje : gava car û ciranê te nesax ketin tu ne çûyî serdana wan, ko birçî man te li wan ne nêri, ko ketin tengiyê te arikariya wan ne kir, ma ev jî ne mîna wî ye.

336 - Bi serê bav û brayê xwe sund me xwin.

337 - Xwedê emrî we dike, divê hon qedrê jina bigirin, ew dê û dot û metên we ne; ma hon na binin file ji xwe re jinekê mehr dikin û heta mirinê jê na gerin.

338 - Xwedê spehî ye û hejî her tiştê spehî dike.

339 - Pêşigera xaniyên xwe paqij bikin, mîna cuhiya rêvin me bin.

340 - Xwedê di gunehên xelkê dibore û ji mirovên ko di sûçên xelkê diborin hez dike.

341 - Xwedê bi deyndara re ye, bi wî şertê ko deyndar pereyê xwe bê rê zia me kin.

342 - Xwedê li rû û malê di we na nêre, lêbelê li dil û emelê we dinêre.

343 - Xwedê ji arikarê hewcedaran hez dike.

344 - Xwedê di her tiştî de ji xwediyê sebrê hez dike.

345 - Xwedê ji mirovên ko bawîşka tînin hez na ke.

346 - Xwedê ji mirovên bi vên û xeyret hez dike.

347 - Heke jin û mêr li hev dinêrin, dilê wan pev re rast e û hejî hev dikin Xwedê jî li wan dinêre, li wan tê rehmê û li gora dilê wan dide wan. Heke jin û mêr destê hev digirin û pê şa dibin Xwedê gunehê wan jî destê wan diweşîne û ew jî gunehên xwe pak dibin.

348 - Bi exlaqekî baş mirov digehe derêca mirovên ko hero rojiyê digirin û bi şev ibadeta Xwedê dikin.

349 - Bawermend ew e ko bi şûr û bi gotina xwe cihadê dike, راستiyê dibêje.

350 - Li cem nesaxa pir rûmênin û bi dengekî bilind ma xêvin.

451 - Mirovê ko destek cil dide belengazekî rût di axiretê de Xwedê lê tê rehmê.

352 - Bizane, çawan divê hevalê xwe bibijêrt.

## JÊLIYAN

Di hejmara Hawarê a 29an de (rûpel: 10) me hin awayên xebalê şanî xortan da û gotî bû ko xortên me ji folklorê re bixetin û herçî starn, çirok, çirçirok, medhelok û mamik in bidin hev û belav bikin. Em dikin iro di wî wari de rêke din jî şanî wan bidin. Eşîrên Kurdisianê û her texlît adet û rêzikên wan. Ma kes heye ko eşîra xwe nas neke. Nemaze heke çend peyayên eşîrekê gihane hev ewê bikarin li ser wê eşîrê tiştêki tekûz çêbikin. Ev nivîşarên ha ko gihane hev ewê bikarin tarix cexrefye û jîna Kurdistanê a civakî bînin pê.

Ji xwe Osman Sebrî di vê babetê de bendek belav kiriyê. Çiyayê Sasonê (Hawar : 27, rûpel : 8). Osman Sebrî li eşîra xwe bi xwe hûr biwa bivê nevē dikari bû tiştêki jê tekûztir bîne wicoddê.

Ezê iro jî eşîrên Botan qala jêliyan bikim. Ez dizanim ko di vê dendê de gelek kêmahî wê hebin û min dikari bû hinekê wan bidim alî. Lê dema nivîsandina vê bendê de yên ko eşîra jêliyan ji min re gotine ne bi min re ne ko ez ji wan bipirsim. Lê ev bendî dikare bi kêrî hinan bêt. Yên ko vê bendê dixwînin heke li ser eşîrîne din tiştêki nivîsandin, nivîsara wan bivê nevē ji ya min wê tekûztir bibe.

Eşîra jêliyan, eşîrek jî eşîrên Botan e. Eşîrên Botan sih, sih û pênc eşîr in û bi awayê jêrin lêk vedibin : Koçer û dêmanî. Koçer jî du bir in : Çoxsor û Şilit. Çoxsor : Miran, Alikan, Dudêran, Dawûdiyan, Soran, Garisan, Gêgerî. Şilit : Batûyan, Teyan, Xêrkan, Kiçan, Mûseraşan. Eşîrên deşta Slopi : Hewêrî, Zêwki, Spêrtî, Reşikan. Dêmanî : di vi milê avê de : Meman, Hesinan, (jêrin û jorin) Ebasan, Aliyan. Di wî milê avê de : Berwarî, Erih, Garisan (Koçerên wan jî hene) Welat - Kelhok, Welat - Kêver, Welat - Kilis, Şivan, Jêliyan, Dêrşew, Hacî - Aliyan, Keran, Harûnan, Slopiyan. Hacî-Bêra : Şernex, Goyan. Eşîrên Botan tev de siliv in.

Eşîra jêliyan serekê wan Resûl axa bi xwe jî min re gotiye. Brayê wî Egîd axa û kurmanî wî Sadiq axa jî hazir bûn û arikariya wî dikirin. Gava li ser tiştêki bi hev re dikirin Resûl axa simbêlên xwe ên termû ba dida, berê xwe dida min û digot : « Ma ezbenî, ev jî kû dizanin » û bi vî awayî zora wan dibir. Te digot qey bira û kurmanî wî ne jêlî, lê berazî an şikakî ne.

Di vê bendê de min zarê Resûl axa, di daira imkanê de, weke xwe hiştiye û ne guhartiye. Ji hin awayên gotinê pê ve; yên ko xwesserî xebêrdanê ne û nayin qelemê.

Min notên eşîra jêliyan di sala 1932an de li Hesîçê cem xwe nivîsandi bûn.

### CEXREFYA TEBIHÎ

TIXÛB, ÇIYA, ÇEM, DEŞT, NEWAL

TIXÛB — Min xerîteke cihê jêliyan çêkiri bû û tê de tixûbên wî bi her kitkitên wî şanî da bû. Di dema nivîsandina vê bendê de min xerîta xwe peyda ne kir. Bivê nevē

ev kêmahîke mezin e. Lê min nikari bû ez wê bi alîki bidim. Digel vê hindê li gora ko ez dizanim eşîra jêliyan bi eşîrên jêrin dor-girtî ye : Li baku : Şûvan; li nîvro : Hacî Aliyan, li rohelat : Dêrşew, li rova : Keran.

ÇIYA — Cihê eşîra jêliyan hin dest, hin çiya ye; hin zozan, hin jî germiyan e. Cihê germiyan jî cihê zozan zehftir e. Tê de şeş çiyayên bingehin hene. Çiyayên jêliyan jî bakûr her bi nîvro ev in : Çiyayê Kehniyan, Çiyayê Kosiyân, Çiyayê Pehnik, Çiyayê Reş, Banê Azizan, Çiyayê Findikê.

Çiyayê Kehniyan — Ji Çiravê vediqete, dikeve cihê jêliyan û her bi rojavê diçe. Di vi çiyayî de çend deriyên mezin hene. Deriyê Kêlostê, Deriyê Beristanê, Deriyê Dizi, di neqeba wan de derîki din heye, jê re Keleha Mîr dibêjn. Li vê derê şawine asê hene ko dewar tê re nikarin herin. Ji wan re Şawa Bihok, û Şawa Selpene dibêjin.

Di nîvrojê Keleha Mîr de Kehniya Botê û Deriyê Dehlê hene. Bîrek jî vi çiyayî heye jê re Başûş dibêjin. Di Başûşê de jî Bênikil, Kehniya Beytik û Ziyareta Geliyê Zêwê û Dola Eynê hene. Di Kevera Dêrawotê de jî du derî hene : Deriyê Şkêrê, Deriyê Asê.

Piştî Dêwikê çiya dibe zîni. Zîniyê Basan û di pey wî re Afîr e, jorin û jêrin. Di wan zîniyan de jî çend derî hene : Deriyê Gawat, Kevera Şex Emer, Deriyê Sûsikê, Keleha Molit.

Çiyayê Kosiyân — Ev çiya jî ji Çiravê têt. Hetanî Emûtê jê re çiyayê filehan dibêjin. Jê wê ve êdi dibe Çiyayê Kosiyân. Deriyê Gozê di birê filehan de ye. Warê wî çiyayî guher û kehni ne. Çend derî lê hene : Deriyê Kaşê, Bîrên Lodiyan, Dola Qirikan, Keleha Dêrdê, Dola kosiyân. Ev dol tejl rez e. Sotek, hewalek li vê derê heye wek, Qernasisê. Çiyayê Kosiyân di Girikê de xelas dibe û qûna wî dide deşta Mişarê.

Di vi çiyayî de cihê heye dibêjin Mehînan. Ev der erdeke rast e; deviyên wê zehf in. Xelkê Girê Hisênî, Goveşîl, Tanzih û Girdaran tê de cot dikin û erdê difetînin. Mehînan jî xwe koz e. Zivistanan koçer ten ê û lê disekinin.

Çiyayê Reş — Ji neqeba jêliyan dest pê dike û diçe miqabillî Çelikê. Di vi çiyayî de jî hin der û derî hene. Deriyê Meydanê; (li hire sarincek heye dibêjin Serinca Qubletê, serinceke kevn û mezin e, heye ko serinceke romanî ye) Deriyê Diholan, Keleha Mela Hacî, Banê Behtvê, Keleşoşik, Deriyê Tilê, Tirba

Hesênê Zer, Hewdan, (tê de çend hewd hene) Bira Gême, Birika Qubi, Bira Hirçke-iyê, Çelê Kunmêşê (di çelê wî yanî zinarê wî de kunên meşan hene) Deriyê Kêrxwer, Bira Eysîkê, Kopê Kelihê, Meydana Eli Axa, Bira Gewr, Bira Reş, Bihto (cihê rez e) Bira Çalavê, Bira Nizarê Hêvîn, Beriha Newiyan (bi xwe herih e, yanî şikeft e, sê aliyên wê girtî, alîki wê berdayî) Kevera Çêlik (di miqabili Çêlikê de ye. Ev kever cihê pezkovî ye, tê de çend geli hene, nêçirvan têne van geliyan) Gewra Kêrte, Geliyê Kehniyan, Gêra Nêwiyan, Geliyê Kûr, Geliyê Sor, Nekorte, Pêpelik (rêke asê ye) Mixalefe, Ziving, Şkêra Babîs (raserî ava Babîs e, û cihê hirçan e).

Gera Xanî — Di qûntara Çiyayê Reş de ye. Xanek li vê derê heye; çend berih jî lê hene. Ava Babîs di vê derê de tête ser ava mezin Herçî spîndarên cihê jêliya e, ditînin hire, dikin tof û kelek û rêdikin Mûsil û Bêxdayê. Sala dexil şîrin bê, ji Heskîfê û ji Bişêriyê, hi kelekên ceh û genim ditînin hire û difroşin.

Çiyayê Pehnik — Ji Goveşilê dest pê dike û diçe Kîfrê. Çiyakî bidar e, koza wî zehf xweş e. Berojê Mir Ehmed koz e. Berê Melihan jî, welê ye.

Banê Azizan — Banê Azizan ji rîya Dara Stewrê dest pê dike, diçe Goyînan. Banê Azizan koza dudêran e, tête heta Devtenûrê, raserî avê.

Çiyayê Fîndîkê — Ev çiya ji nav açî Aliyan tête nivroyê Banê Azizan, raserî ava Seyidiyan. Ava Seyidiyan di nav Harûnan de ye. Çiyayê Fîndîkê de jî çend derî hene: Ke-la Şêx Ozînan, Deriyê Gozê û Deriyê Ga.

DEŞT — Di cihê jêliyan de deşteke bi tenê heye: Deşta Mişarê. Belê yek e, lê belê herwekî dibêjin beranê çavhelek e. Deşta Mişarê deşteke gelek spehî û bi hatin e. Her du aliyên deştê çiya ne. Qubletê deştê Çiyayê Reş e, paşqubletê wê jî çiyayê Kehniyan e. Drêjahiya deştê bi peyari heşt saet e; ji neqeba jêliyan heta ava mezin. Frehiya wê, ji saetekê heta du saetan dajo.

ÇEM — Ava mezin di ber Çiyayê Reş re dibore. Jê pê ve di cihê jêliyan de hêjayî gotnê sê avên diñ hene: Royê Babîs, Royê Sor û Cowa Basixîrê.

NEWALA — Di cihê jêliyan de Newala Kehniyê meşlûr e. Newaleke biheybet e, dora wê dar û devî û dehl in.

## CEXREFYA SIYASÎ TEŞKÎLATA EŞIRA JÊLIYAN

Eşira jêliyan li ser erd lêk vedibe. Di vî erdî de neh hevêrke yanî mintiqe hene. Di her hevêrke de çend gund hene. Ev in hevêrkeyên jêliyan: Deşta Mişarê, Mendekeran, Lêfên Nêwiyan, Royê Jêliyan, Lodê, Navkura Basan, Mala jorin, Mala jêrin, Dêrûya Kurêşan.

### — 1 —

#### DEŞTA MIŞARÊ

Li Deşta Mişarê hevdeh gund hene:

Girê Hesênî — Gundekî bi dar û ber e. 60 mal tê de hene. Ava kehniya wê boş e. Gund di ser kehniyê re ye. Li dora kehniyê seyrangahek heye bi navê Deravê Miemberê. Hezar mêr dikarin di bin siha darên wê de rûnin. Darên wî spîndar, zergoz, çinar, tû, bîzo, ben, mazû û herû ne. Hatina wan hi zehfî spîndar e. Çandiniyên wan ên avî penbû, kuncî û maşîk in. Ên bejî jî ceh genim, nok, nîsk û kizin in. Ava kehniya gund di Qadê re dibore û dikeve rowê Babîs.

Li piştî gund xanîk heye jê re dibêjin Ollî. Ev der di zemanê berê de asêgehî gund bû.

Qadê — Qadê dikeve navbera Girê Hesênî û Goveşilê. Di cihê jêliyan de ji erdê wê behatir erd nîne. Lê gund bi xwe tro xirbe ye. Tê de avahiya dêr û medreseke kevin heye. Medrese digel milkê xwe, di wextê mîr Nasir de guhastine Tanzê. Ava Girê Hesênî, wextê ji Deravê Miemberê xelas dibe dikeve ser milkê Qadê. Di erdê Qadê bi xwe de gelek kanî hene. Ava van kaniyan digehin hev û rowê Qadê ditînin pê; du aş li ber vî rowî digerin. Temamî milkê wê avî ye. Hatina wê, xelkê Goveşil û Girê Hesênîyê dixwin. Ev der gundê Eli axayê qadê bû, maqûleki jêliyan.

Zorava — Ev gund xelkê Goveşilê ava kirine. Newala Kehniyê di qubletê gund de ye. Royê Babîs, ji gund, 20 deqîqe dûr dibore. Di nav gund de kehî jî heye. Milkên wan ên avî li Qadê ne. Ên bejî li deştê jî hene. Di çiyayên dorê de jî milk û eqarên gund hene. Xaniyên wan şikeft in. Hin xelk rast bi rast di şikeftan de rûdînin. Hinan jî xaniyên xwe li devê şikeftan çêkirinê. Di nav şikeftan de mezelen mezin hene ko tant [1] kirine; hinek jî bi kuçan diwar kirine û ji hev veqetandine.

[1] Tant kirin ev e: Ji darên bi, berû, spîndar an mazûyan stûnîne zîrav ditînin, binên wan didin erdê, serî wan jî didin teha şikeftê ( xanî be girşan jû wan li rex hev diçêkin. Zelamekî hoste bi şîvikan wan stûnan bi hev re dihûne û mîdeklî dihête, heta ko hişk bibin. O pajê tewek berî li rûyê wan didûn. Ev jî dibe tezlîtek diwar.



Rezên gund di qubletê gund de ne û jê du saet dût in. Lê ji gund dixuyin. Du aşên gund hene. Pireke eqid di ser Babîs re ye, dibêjin e Pira Haçikan.

Eynê — Gundekî şên e. 80 mal tê de hene. Kehni deh deqte di ser gund re ye. Av ji kehniyê tete aşê gund, jê dikeve mala Şêxê kal (şêxekî neqşibendi û şêxê jêliyan e) Av ji mala şêx dertê, diçe mizgeftê, û ji mizgeftê belav dibe ser baş û bistanan. Çiyayê Kehniyan raseri gund e. Çiya hemî rez e; rezên wî ewçend qenc in ko heçko diûs weke kehnikê jê diherike. Her texlit fêki lê hene. Gund di nav daran de naxuye. Li pişt gund çiyayekî tan heye dibêjin e Kopê Mikriyan. Xaniyên gund bi zehfî oli [1] ne. Xani hemî ji kevir in, ji kevirê kursi ne. Mizgefteke kevin lê heye, di hewşa wê de quleteynî hene. Mizgeft di zemanê berê de asêgeha gund bû.

Tilmîşar — Gundê Resûl axa bi xwe ye. 50 mal tê de hene. Di binê gund de çar kehni hene. Aşek li ber ava wan digere. Erdê gund erdeki bi nan e, û erd hemî avî ne.

Sê deqte nizingî gund girek heye dibêjin e Girê Yewnan [2] Li serê wî giri qesrek heye, qesreke kevin. Di nivroyê gund, di Çiyayê reş de kelehek beye dibêjin e Keleşok. Tev de eserên qedimî ne.

Karitan — Îro xirbe ye. Berê 30 mal lê hebûn. Babîs di ber re dibore. Di nav gund de kehni ji heye.

Basixir — 20 mal tê de hene. Cowa Basixirê jê der dibe. Ji gundên jêliyan ji hemîyan bêtir, di vî gundi de birinc, penbû, kuncî, maşik diçin. Dehlên gund hene. Li pişt gund kelehek heye dibêjin e Keleşa Mela Haci; asêgeha gund e.

Duav — 20 mal tê de hene. Ji kehniya gund pê ve avek ji Gamêş û Kerkujan têt e. Ji xwe Bahîs tê re dibore. Ji lewre ji vî gundi re gotine Duav.

Gamêşan — Gundekî kiçik e, 10 mal tê de hene. Milkê wî bejî ye; lê derametê wan heye. Wek bacan, kulind, silk h. d. Kehni di nav gund de ye.

Kerkujan — Ev ji gundekî 10 malin e. Milkê wî bejî ye. Ji ceh û genim pê ve derametên gund hene.

Xalidî — 40 mal tê de hene. Kehniya

gund heye. Cowa Girikê di nav gund re diçe. Cowa Basixirê di binê gund re diherike. Tirba Şêx Hîsênê neqşibendi di vî gundi de ye. Şêx Xalid ev gund ava kiriye û navê wî daniye Xalidî.

Girik — Girik bi xwe xirbe ye. Şêx Xalid di qubletê Girikê de Xalidî ava kiriye. Berê 40 mal tê hebûn. Cowa Girikê di nav gund re dibore. Erdê wî bi zehfî avî ye. Aşek lê heye. Di biniya gund de pireke mezin heye.

Di Girikê de zikakek heye dibêjin e zikaka fitnê. Carekê siltan Mirê Botan xwestiye Stenbolê. Rispikî mir heye, ew jî pê re çûye. Wekê gihan Stenbolê, rispî gote mir:

— Ezbenî, sibehê, ezê cilên te wergirim, bibim mir. Tu ji cilên min wergire bibe rispî. Ma em ji kû zanin siltan çire banî te kiriye. Ezê herim ba dewletê. Heke siltan ez kuştim, tu vegeerî mal. Cihê Botan namîne bêserî. Tuê zarowên min jî bi xwedî biki. Û heke siltan qencî bi min kir, jî xwe ew qencî jî te re ye.

Mir tevdira Rispîyê xwe çiband. Sibehî rispî cilên mir wergirtin û çû ba dewletê. Mir çend rojan li hêviyê ma, rispî venegeriya. Mir jî hînekan pirsî. Yekî gote mir: « Tu here mal, mir hêdî venagere ».

Mir vegeeriya mal û ji bona xizmetê rispiyê xwe ba kire kurê wî Eli û axatiya jêliyan da ye. Pênc şeş gundên qenc jî bi ax û av ve dan e.

Eli axa bû axakî gelek zexim. Gundekî jêliyan heye navê wî Basixir e. Milkên gund zehf in. Lê erdê wî bejî bû. Mezinê gund çû ba Eli axa got: « Em bê av in, me divê em cowekê binin gundê xwe ». Av di Girikê re diborî. Hingê ji Girik di destên Axayê Dêrşew de bû. Eli axa got, herin avê binin. Gundî çûn co kolan. Axayê Dêrşew seh kir, hawara xwe hilani, hat Girikê. Eli axa jî hawara xwe bir û çû. Li Girikê her du eşran li hev xist. Jêliyan berda dêrşewiyan. Nizingî pênc mêr ji wan kuştin. Dêrşewiyan laşên xwe hiştin û baz dan. Eli axa got, sikira cowa Basixirê bi keleşên dêrşewiyan çêkin. Ji bona vî qasî navê wê zikakê bûye zikaka fitnê.

Di navbeyna jêliyan û dêrşewiyan de çend salan bû neyarî. Heta Eli axa nexweş ket, mezinên jêliyan hatin dorê. Eli axa gote wan: Westê ez nîrim, min bibin ziyareta Reda Darê û li wê derê veşêrin. Ez mirî bim ji dêrşewî newêrin di ser tirba min re biborin û bêne hewe.

Tirba Eli axa îro jî li ber keviya rê kifş e. Ziyareta Reda Darê li ser riya Dêrşew e.

Meylanan — 20 mal tê de hene. Ava wan ji cowa miriyê ye. Di vî gundi de tûyên garisî zehf in.

Balokan — 40 mal tê de hene. Ava wan ji cowa miriyê ye. Di çiyayê Beytikê de rezên gund hene.

Îsxasan — Ava wan ya vexwarinê jî birê ye. Ava aviyan ji cowa miriyê ye. Fêkiyên wan kêmin in. Xaniyên wan navko ne. 30 mal tê de hene.

[1] Di cilên Botan de zanî ji gora tebeqên xwe bi nav dibin. Navko-yekitebeq. Oli-dutebeq. Qesir-sêtebeq.

[2] Gelo navê yewnan bi çî awayê lê bûye. Heye ko jî wextê Kênefon. Li hejmara: 32, rûpel 4\* fedkirin. Kardûz û welatê kardûzan.

Zovaniyan — 40 mal tē de hene. Ava Eynē tēte vi gundi ū di çandiniyēn vi gundi de winda dibe. Dehlēn gund zehf in ū bi merēs in. Rezēn wan di Çiyayē Başūsē de ne. Xelkē gund bi zehf şexzade ne.

## — 2 — MENDEKERAN

Gundēn Mendekeran ji li destē ne, dikevin rojavayē deştē. Li Mendekaran neh gund hene:

Goveşil — Cihē gund teht e. Dora gund gir ū bisti ne; cihē gund nivz e; dibe wek gerekē. Berē 100 mal tē de hebūn. Ji roja ko gund şewitye, xelk venegeryan ē. Hin çūne erdē Qadē; hinēn dīn Zorava ji nū ve ava kirine ū ketin ē.

Girxetib — Cihē gund bilind e, li ser gireki ye, gireki bi devī, deviyēn hūr. Royē Babis di bin gund re dibore. Ev her sē gund yani Girxetib, Bēder ū Gundikē Elkan hema bi hev ve ne. Avahiyeŋ gund qederē 20 mal in.

Bēdar — Gundeki tēr kehni ū tēr hatin e. 70 mal tē de hene. Spindarēn wē zehf in. Dehl ū rezēn wē ji hene.

Gundikē Elkan — Gundeki kiçik e. 15 mal tē de hene. Ava Babis di ber gund re dibore, kehniya gund ji heye.

Diyē — Xirbe ye. Berē 50 maļ tē de hebūn. Gundeki bi av ū spindar e.

Gundikē Sēvan — Gundeki xirbe ye. Berē 20 mal tē de hebūn. Cowa Sēvan di gund re diçe. Babis ji di nivroyē wi re diherike. Kehniya wi ji heye.

Dibējin ko zilamek hebū, navē wi Resulē Qēsım bŭ. Di wextē xwe de mērekī qenc bŭ. Di çiyayē Zovaniyan, di Başūsē de cibek heye, dibējin ē Bēnikil. Resulē Qēsım, li wē derē xaniyek çēkiri bŭ ū dehyeka rezēn çiyē dixwar. Mendekaran pē nikari bŭ. Ji ber ko pismamēn wi ji zehf bŭn. Resul ji ber timahiye, rabŭ ū digel brayē xwe berda pismamēn xwe. Hejdeh mēr ji wan kuştin. Wextē bi tenē ma mendekaran hatin ē, ew ū brayē wi kuştin.

Xirabgewran — 10 mal tē de hene. Ro di ber re dibore Kehni ji heye. Milkē wan avi ye, lē dehl ū rezēn wan ninin.

Gundikē Iso — Xirbe ye. Berē 10 mal tē hebūn. Kehni heye. Babis di nivroyē wi re dibore. Avi ū dēm e. Di rojavayē gund de meslek heye: Mesila ava şirin. Ev mesil tēte ser Babis.

Haçikan — Di nivroyē Geveşilē de ye. Xirbe ye. Berē 40 mal tē de hebūn. Xani hemi şikeft in. Mizgefteke zamanı ji tē de heye.

ÇIROKIYA MENDEKERAN — Dibējin ko di nav eşra Batūyan de qebileyek heye, jē re Mende-

keran dibējin. Zilamek ji wē qebllē xwini bŭye ū hatiye nav jēliyan ū konē xwe di Çiyayē Reş di guhera Kopē Kelehē de veda.

Wi xwexti Eli axayē bernihī axayē jēliyan bŭ. Eli axa derketi bŭ nēçirē. Ji taştıya wan re hinek xwē diviya bŭ. Axē gote xulameki xwe bere wi konl hinek xwē bine. Xulam çŭ koni. Sofiki pir mezinē malē bŭ, heft kurēn wi hebūn, her heft ji çekhilgir. Keçek ya wi ji hebŭ, gelek spehi. Xulam xwē bir ū vegeriya cem axayē xwe ū gote wi: « Ezbeni di-wi koni de keçek heye zehf spehi, bi kēri axē tēt ».

Wekē xulam holē got, kēfa axē ji hat. Axē got: « Rebin em herin kon ». Wextē nizingi kon bŭn, sofiyē pir gote kurēn xwe: « Cilan bibin binē wē dara mezin, mehvan ji me re hatine ». Cil kişandin binē darē, Axē diviya bēte kon, ji bona keçkē bibine. Bān kire sofī ū got: « Mamo l, em mehvanēn-kon in » Mamo got: « Axa heçi mehvanēn kon bin, li binē darē rŭdinin ». Li binē dara mezin rŭniştin, xwarin ji wan re anin. Piştı xwarinē axē gote sofī:

— Bavē kuran, min divēt tu keça xwe bidī min. Ez axayē jēliyan im, tu çiqasi bixwazi ezē bidim te.

Babē keçkē got: Axa weki tu cihē jēliyan hemi bidī min, ez keça xwe nadim te.

Eli axa ji vē gotinē eniri, rabŭ, berē xwe da Kērtē; emri xulamān kir ko herin talanē sofī binin.

Xulam çŭn li pezē wi dan. Bŭ hawar. Her heft kurē wi zilani siwar bŭn bi hawara pezē xwe-çŭn. Li xulamēn axē xistin, yek kuştin ū pezēn xwe vegerandin. Xulam vegeriyan ū tiştē ko bi wan re bŭ gotine axē. Eli axa jŭvan bŭ, hema zilamek rēkir mala wan, ū got bēje wan: Bextē Xwedē ū yē min ji wan re, bila ji cihē xwe nelehitin, tiştē ko bivēn ezē bidim wan. Min neqenc kir, ji ber vi qasi ev fehtiya ha hate pēşiya me. Ez İro diçim mal, bila sibe bēn ba min, ez xulamē xwe ji di wan borim.

Sibebi ew zilam siwar bŭ, du kurēn wi ji pē re, çŭ Bērnihē, mala Eli axa. Axē zehf qedrē wi girt ū nŭ got ē: Tu ji kŭ tē i, ū bi kŭ ve diçi ?

Wi zilami li axē vegerand ū got. « Ez ji nav batŭyan xwini bŭme. Min qesta navē te kir. Dih wextē tu hatı mala me, te pirsı iş ū halē me ne kir. Te heina got, keça xwe bide min, ev di nav eşran de eybekte mezin e. Ji bona vi qasi min keça xwe ne daye te. Ez İro ji wē nadim te. Eve ez ū zaroyēn xwe ū mala xwe li ber te ne. Heke min niho ji keça xwe da te ev dibe kēmahike mezin. Ez vē kēmahiyē li ser xwe danayimın.

Axē got: Keça te, keça min e. Ji cihē jēliyan te kŭ derē bivē ezē bidim te.

Wi zilami got: Hin şikeft hene, ji wan re dibējin Haçikan, min ew divētın.

Axē got, here min ew dane te.

Wi zilami ji mala xwe anı Haçikan. Piştı mideki kurek yē wi çŭ Goveşilē, ēn dīn Diyē, Bēdar, Girxetib ū Gundikē ū ew der ava kirin. Her neh gundēn Mendekeran ji wan heft kuran zēde bŭne, ji lewre dibējine wan Mendekeran. Ew zilamē xwini pēşiyē Resul axa bi xwe ye.

### LÊFÊN NÊWIYAN

Di Lêfên Nêwîyan de 7 gund hene. Gund tev de li qûna nivroyê Çiyayê Reş in. Ji wi çiyayî re dibêjin kever, çiyakî kêrn dar, bi teht û kevir. Di Keverê de pezkovi zehf in. Di van gundan de mirov li her deriyê xaniyan bisekine te dit hema bû qirçqirça slirihên nêriyan. Pez dikêvin heta nava gund. Ji erdê van gundan zehfê wî beji ye. Hinek aviyê wan di Royê Jêliyan de heye. Hinek ji van gundan ava Diclê vedixwin. Hin kehnt ji hene. Hatîna wan çeh û genim e. Birinc û penbûyê wan hebe ji hindik in. Tiri û hejîrên wan zehf in; avi ji hene beji ji. Hatînek ya wan ji êzing û rejûn ye. Êzing û rejûyên xwe ditînin her ava Diclê û ji ticarên Mûsil û Cizîrê re difroşin.

Serkar — Îro xirbe ye. Berê 40 mal tê de hebûn. Ji Diclê vedixwin. Ev gund di serferberligê de xerab bûye.

Çelîkê Hemeliyan — Xirbe ye. Berê 20 mal tê de hebûn. Ji Diclê vedixwin.

Geliyê Osman — Di rojhelatê Serkarê de ye. Ava ye, 10 mal tê de hene. Kehnt lê heye, ji Diclê dâr e.

Nêwîyan — 20 mal tê de hene. Kehnt heye. Ji Diclê saetek û niv dâr e.

Di nivroyê gund de xanek heye, dibêjin e Xana Kewan. Xanekê zehf mezin e. Mezezin jê hêj ava nê.

Geliyê Heftar — Di rojhelatê Nêwîyan de ye. Îro xirbe ye. Beriya serferberligê xerab bûye, 20 mal tê de hebûn.

Kêrte — Kêrte ji Diclê du saet dâr e. Kehniya wê heye, ava wê boş e. Di cihê jêliyan de bi pirahiya hejîrên xwe meşhûr e. Tiri û rezên wê ji zehf in. Di bintya gund de Kêrxwer, Gêrtin û Gêra Hejîran dehl û aeyrangah in. Avahiyên gund 30 mal in.

Mala Şêx Mihemedê kêrteyi, xelîfeyê neqşibendî di vi gundi de ye. Mizgefteke kevin ji tê de heye. Ev miygeft di zemanê Şêx Xalidê cizert de hatiye çêkirin. Hezretê Mewlana ji Şêx Xalidê Cizert re goti bû, di Cizîrê de mesekine, here Kêrtê, midekî li wê derê bimine, pasê here Basîretê û li wê derê qerar bigire. Basîretê gundek yê dêrşewîyan e. Qubên Şêx Xalidê Cizert, Şêx Salihê Sibki û Şêx Xalidê Zibari tev de li Basîretê ne.

### ROYÊ JÊLIYAN

Di Royê Jêliyan de çardeh gund hene. Ev gundên ha tev de di bakur û di nivroyê Royê Sor de ne. Royê Sor ji qwina Çiravê der dibê û di welatê Bikatê re tete neqeba jêliyan, û jê diçe Diclê. Gund hemî nizingî vê avê ne. Gelekê erdê wan avi ne. Birinc û penbûyê wan zehf e. Fêkiyên wan ji gelek in. Hinek ji van gundan di nav darên fêkiyan de naxuyin. Piraniya xaniyên wan şikeft in. Şikeftên wan gelek spehî û xweşbergeh in. Di nav wan de şikeftên oli, yanî dutebeq hene. Di şikeftan de derî diçin hev. Ji lewre mirov ji serê gund heta biniya gund di şikeftan re dikare here. Wekê li serê gund jinikek dîn bikute deng diçe heta taxa jêrtû; şikeft welê deng dînin.

Pirêdel — Yanî Pirê delal. Ev gund nivxirbe ye. Îro tê de pênc şeş mal hene. Gund dikeve bakurê Royê Sor. Ji Diclê niv saet dâr e. Di vi gundi de çinareke keverare heye; ava aşekî ji nava wê derdikeve. Di hundirê çinarê de quleteynê heye. Çarnikarên quleteynê fêrş in. Tê de yanî di qurmê darê de cihê dehl zilaman heye. Li ber vê avê aşek digere. Di nivroyê Pir de, di ser Royê Sor re pireke darîn heye. Biharan wextê av radibe mirov di ser pirê re diçe. Her du milên avê teht in, pir qederê 50 mêtir bilind e. Li vê derê ziyaretek heye dibêjin e Pirê Delal.

Bernih — Gundê Eli axayê bernihî ye. Eli axa maqûlekî xurt bû. Li Bernihê berê 100 mal hebûn. Îro gund bi xwe xirbe ye. Di nivroyê gund de, li ser Royê Sor tehtek heye jê re Keleha Bernê dibêjin. Teht hing du minaran bilind e. Keleha Eli axa li ser serê vê tehtê bû. Di nivê tehtê de nizingî bişt mezel hene. Ev mezel bi pirahî bi pencere ne. Avdiza tehtê li serê tehtê qul kirine û anîne heta Royê sor, û di nav avê re derêxistine. Di şerên herê de gava xelk di kelehê de asê dibûn û dijmin li wan dilate wer, xelkê kelehê ji serê kelehê û di avdizê re dibatin heta avê bêl ko dijmin wan bibine. Ji wan mezelen nava tehtê re dibêjin Mira Bernê.

Milkê Bernihê bê qeder zehf e û ava wê tîra milkê wî nîne. Ji lewre di tehtan re co kolane û ji çiyayên dorê av anîne. Cihên covan bilind e. Di hin cihan de co qul kirine pencere existine e, di hin deran de kulekine kiçik tê vekirine. Serê çend salan carekê xelk diçin dikevin cowê û di kulek û pence-

ran rê gelaşan yanî zibilan tavêjin derve û cowê paqij dikin. Di Bernihê de mizgeftine zemanî, mizgeftine eqid ji hene. Ji her tiştê wî xuya ye ko Bernih avahlîke kevin e, û merkeza zelamine xurt bû.

Şikeftiyan — Şikeftiyan gundeki mezin bû. Berê 100 mal lê hebûn, îro ancax 30 mal hene. Royê Sor di ber gund re dibore; kehniya wî ji heye. Xani di nav şikeftan de ne. Dehlên gund zehf in.

Çemê Gewr — Berê 100 mal tê de hebûn. Îro 20 malek lê hene. Gund di keviya Royê Sor de ye. Kehniya gund ji heye. Xani di şikeftan de ne.

Marosa Jêrin — Xirbe ye. Berê 30 mal tê de hebûn. Li ser Royê Sor e.

Marosa Jorin — Berê 40 mal tê de hebûn. Îro xirbe ye. Li ser Royê Sor e, û kehniya wî ji heye.

Asik — Xirbe ye. Berê 50 mal tê de hebûn. Ava kehniya wê tete ser Royê Sor.

Bilcûnan — 60 mal tê de hene. Di cihê Botan de ev der bi hêjir, hinar û bi dehlên xwe bi nav û deng e. Cihê wê parikî bilind e. Ji avê niv saet dûr e. Di gund de kehni heye.

Lodik — Xirbe ye. Berê 30 mal lê hebûn. Cihê wê bilind e; xweş e. Ji avê qedere saetekê dûr e. Kehniya gund heye.

Şikefta Ūsif — 40 mal tê de hene. Raserî avê ye, lê jê saetekê dûr e. Cihê wî bilind e. Kehniya wê heye. Dehlên wê di Çemê Şikefta Ūsif de ne, û zehf in. Birinc û direh (garisê spi) ji diçin.

Hintaniş — Xirbe ye. Berê 30 mal lê hebûn. Royê Basiretê di ber gund re dibore.

Goyinan — Berê gundeki geleki mezin bû. 300 mal tê de hebûn. Lê îro qedere 70 mal lê hene. Goyinan gundê Eli Hemanê bû. Mala Eli Hemanê di cihê jêliyan de maleke kevn e. Gund di qwina rizdeki de ye, cihê wî bilind e, di bin re roki kûr diherike. Miqabilê gund çiyaki bilind e. Li ser serê wî çiyayî kelehê heye, asêgeha gund e; dibêjin ê kelehê Eli Hemanê. Eli axa tê de rûdinişt. Xaniyên gund di devê şikeftan de ne. Hatina wan avi ji heye, beji ji. Du aş li ber ava gund digere. Birinc û penbû ji dajon. Hêjirên wan ji hene.

Findik — 100 mal tê de hene. Av û hewa wê zehf xweş e. Dibêjin heçtî ava Findikê vexwe û bayê wê li wî bide ew mirov zû namire. Kehniyên wê boş in. Gund bi xwe li ser cada Sêrt û Cizirê ye. Hatina wan avi ji heye, beji ji.

Dêrik — Îro xirbe ye. Berê 10 mal tê de hebûn. Di vi gundi de kanine delal hene, gelek spehî û xweşbergeh in. Cihê gund bilind e, di qwintara Banê Azizan de ye.

Gundên Lef û Royê Jêliyan hemî koz in, Zivistanê berf nagirin. Ji bo vi qasî eşira Dudêran, Zivistanê bi koçerî tene van deran.

## — 5 —

### GUNDÊN LODÊ

Gundên Lodê çar in :

Lodê — 60 mal tê de hene. Gundeki gelek spehî ye. Di nav jêliyan xweşiya av û hewa vi gundi bi nav û deng e. Gundek zehf bi zêdahî ye. Rezen wê bê qeder boş e. Di vi gundi de berê gelek roris « giyayê rengên sor û qirmiz » şin dibû. Gelek sabûn ji çêdikin.

Lodê gundê Hesam axa bû. Hesam axa maqûleki tîrnan û dewlemend bû. Dibêjin savarê wî ji nav Xerzan, ji Ridwanê dihat.

Şişil — Ev gund ji Lodê cihê bûye; yanî bireki xelkê Lodê bert sih salti Şişil ava kirine û guhastinê. Şişilji weki Lodê gundeki tîr rez e. Kehniyên wê ji boş in. Çiyayê Lodê dikeve neqeba van her du gundan.

Xwaran — Ji xwe gundeki kiçik bû. Vê paşiyê xerab bûye. Xelkê wî ji lodê bûn. Ji Lodê hati bûn vê derê û 4-5 xani ava kiri bûn. Lê debar ne kirine.

Şêx Şehwelî — 60 mal tê de hene. Gundeki dêm e. Di binê gund de hinek spîndar hene. Ehlê gund qantirçî ne. Zifistanê gelek berf tete vi gundi, û rê tene girtin. Di biniya gund de tehtek heye, ew text qul kirine û tê ve riyek vekirine. Jê re neqeba jêliyan dibêjin. Şêx Şehwelî ziyareteke meşhûr e.

## — 6 —

### NAVKURA BASAN

Di Navkurê de çar gund hene :

Basan — Berê 100 mal tê de hebûn. Lê îro 10-15 mal lê mane. Gundeki dêm e. Di dora gund de birkin hene. Li ber van birkan tîtinê diçin; tîtineke xweş lê çêdihe. Di cihê Botan de tilina Basan meşhûr e. Rêzen gund zehf û taze ne. Kehniya gund ji heye.

Milan — Gundeki dêm e. 30 mal tê de hene. Ava wan ya vexwarinê ji birê ye. Li devê gund hinek dehlên wan hene. Di bin gund re cihek heye dibêjin ê Serê Herexê. Kehniyeke mezin lê heye. Ava kehniyê diçe heta Tanzê. Perên avê hemî spîndar in.

Dewik — Li ser tixwê eşira Kever e.

20 mal tē de hene. Kehniya gund heye. Avî û bejiyên wî jî hene.

Dêrawid — An Dêra Dawid. Dikeve rojhelatê Basan. Gundeki biçûk e, titin û rezên wî baş û zehf in.

— 7 —

MALA JORIN

Mala Jorin heşt gund hene :

Tanzê — Berê bajar bû, digotin ê bajarê Tanzê. Îro gund e, 60 mal tē de hene; gundeki zehf bi av û dar û fêki ye. Gund dikeve rojavayê Eynê. Spindarên wê bê qeder zehf in. Di cihê jéliyan jî vi gundi têspindartir gund in.

Tanzê di Kurdistanê de cihêki bi navê û deng e. Cihê hakim û alîman e. Mirên Botan tē de sikeh birtne. Nemaze di wextê Mir Nasir de gelek sikeh hatine birtin. Hetanf îro wextê gundi erdê difetinin sikehên mirên Botan peyda dikin.

Medresa Tanzê mereseke meşhûr e. Di wextê berê de 500 feqeh tē de dixwendin. Medrese heta wextê Bedir-Xan begi ava bû. Bedir-Xan beg cihên wê ên herift jî nû ve da bûn ava kirin. Îro jî qederê 40 mezelen ava tē de hene. Quba Mir Nasir di hewşa Medresê de ye.

Ji mala rîsîpiyê wân re dibêjin mala Emer-Resê.

Dibêjin ko Têmûrleng Tanzê vegirti bû, lê ne gihasti bû Dêrûya Kurêşan. Eskerên wî li hire şikestin û bi şûn de vegeriyan.

Qawix — Dikeve nivroyê rojavayê Tanzê. 60 mal tē de hene. Cihê gund rast e. Gundeki bi av û spindar e. Bakurê gund çiya ye.

Motîta Emer — Ev gund nizingî ava Bihtan e. 20 mal tē de hene. Bakurê gund çiya ye. Li ser çiyê kelehek heye jê re Keleha Motit dibêjin. Ev keleh di wextê berê de asêgeha gund bû. Li piştî gund qubek heye, Ebû-Tihar, ziyareteke êzdiyan e.

Motîta Seyid — 40 mal tē de hene. Gundeki bi dehl û spindar e. Kehniya wî boş e. Aşê gund heye.

Sûsik — 40 mal tē de hene. Cihê gund girik, newal û mesil e. Piştî gund çiyayeki bi rez e. Gund dikeve bakurê Motîta Seyid.

Gawat — Cihê gund wek yê Sûsikê ye, lê jê bilintir e. Di nivroyê gund de çiyayek heye dibêjin ê Kevera Şex Emer. 20 mal tē heye.

Çemê Pirê — Gund nizingî ava Bihtan e.

20 mal tē de hene. Gundeki bi wêz e. Cihê gund bilind e. Kaniya wî boş e.

Gêra Wîşiyê — Îro xirbe ye. Berê 50 mal lê hebûn. Cihê nêçirê ye. Kewvedan û kewgiriya wî zehf xweş e. Gund dikeve rohelatê Gawatê.

— 8 —

MALA JÊRÎN

Deh gundên Mala Jêrin hene :

Kifrê — Îro xirbe ye. Berê 50 mal tē de hebûn.

Girdaran — 80 mal tē de hene. Gund dikeve nivroyê Tanzê. Gundeki avî û dêm e. Biniya gund newal e. Di vi gundi de erdek heye dibêjin ê Qusêr. Di vi erdê de bîrmek heye, bêbinî kur e. Dora bîrmê hemî penbû û birinc e.

Koxikan — Cihê gund teht e, li ber Royê Babîs e. Newalek heye, jê re dibêjin Newala-San. 20 mal tē de hene.

Serderînc — Îro xirbe ye. Berê 30 mal lê hebûn. Xaniyên gund şikeft in. Di piştî gund re rê naşixule, deverine derline.

Lepikê Şêr — An Lepikê Şêr. Îro xirbe ye. Berê 50 mal lê hebûn. Gund li ser devê latekê ye. Xani şikeft in. Di bin re Royê Babîs diherike. Cihê gund jî avê gelek bilind e. Mirov jî binî dinîhere serê tehtê, kumê mirov dikeve.

Di vi gundi de zilamek hebû, mezinê gund bû. Digotin ê Hacıyê Heso. Emrê wî çû bû 115 salan. Lêbelê tu kêmayî ne keti bû eqê wî. Maqûlên dora jéliyan rêdikirin pey, ew dibirin cem xwe, jî bona ko şîretan li wan bike.

Berê şêst salî, Ferhad axa, zabîtê jendermê qeza Dihê, hatî bû Lepikê Şêr. Ferhad axa bi xwe kurdmanç bû, jî xelkê Bidlîsê. Wî wextî kurê Hacı, Heyro mixtarê gund bû. Hacı jî ji derve, li ber diwarê xani rûniştî bû. Ferhad axa bi çend neferan ve gihasti bû raserî gund. Gotin, ve ye hinek esker hat. Hacı got, cihê min bibin mal de. Kurê wî got ê : « Çîrê tiwê biçî mal de, Ferhad axa ye » Hacı got : « Kurê min ma ez ditirsim diçim mal, min navê ez kumê ser bibînim ». Cihê wî birin mal ye.

Ferhad axa hat, peya bû, û gote Heyro : « Ka xwalê Hacı ». Heyro got ê : « Xwe jî ber te veşartîye ».

Ferhad axa ban kir ê : Xwalê Hacı, çîre tu jî ber min revî ? Ez jî wek kurê tē me.

Hacı got : Ez ne jî ber te revime. Ez jî ber kumê te revime.

Ferhad axa got : Wekî ez vi kumê sor deynim, tiwê bî ha min ?

Hacı got, belê, Ferhad axa kumê sor dani, Hacı jî hat hatê û jê re got :

— Ferhad axa, ezê ji te re mesela kumê sor



bîhêjm. Berî nîha wextê ko kumê sor hêj ne hati bûn vî welatî; virkerê vî welatê ez bûm. Ji xêrî min kesekî din nizaniya: viran bike. Wekê min jî min dikir ez vîrekê bikim, êvarê min taxek titina Dêwikê dida hûr kirin, min digote Gozê (jîna wî) « Cihê min başçe deyne, şkevika titinê jî deyne ber serê min ». Heta sibêhê min qelûn vedikişand, min lihêfa xwe jî dikîşand ser serê xwe, min mitale dikirin, heta spêdê. Min ew şkevika titinê hemî vedixwarin û ez saetkê jî ranedizam. Min vîrek pêk dianî, ser û gubên wê didan hev û min ew vir di civata maqûlekî de digot. Heta deh panzdeh rojan kesî nizaniya ko ew vir e. Wextê kumê sor batîn vî welatî ez dibînim di civatekê de zilamek radibe vîreke mezin dike; ew jî dizane ko vir e, ehlê civatê jî. Lê ne ew li ber xwe dikeve û ne kes dibêje ev çi vir e, te kiriyê. Ji ber vî qasî min navê ez kumê sor bibînim.

Bûtehran — Rasertî Diçlê ye. 10 mal tê de hene. Xaniyên wî şikeft in. Cihê gund bilind e. Milkê wan dem jî heye, avi jî. Ji xwe herçî gundên Mala jêrin in, di Qusêrê de milkê wan heye.

Wehsîd — Gund li ser rastekê ye. 20 mal tê de hene. Milkên gund avî ne. Di nav gund de kehnî heye.

Seyfî — Di ber vî gundî re ava Bihtan digehe ava Diyarbekrê. Kehnîya gund jî heye. 40 mal tê de hene.

Balak — Gundekî xirbe ye. Berê 30 mal tê de hebûn.

Bawêrnekêr — Xirbe ye. Gundekî bi spînder e. Berê 30 mal tê de hebûn.

## — 9 —

### DÊRUYA KURÊŞAN

Di Dêrâyê de neh gund hene. Gund hemî di newalekê de ne. Her du milên newalê çiya ne. Milê bakur Çiyayê Kehnîyan, milê nîvro Çiyayê Kosîyan. Babîs di newalê re dibore û taveje Diçlê. Hatînen van gundan bi pirahî goz, rez, bîrînc, spîndar û her texlîf fêkî ne. Gund di nav daran de wînda ne. Heta ko mirov nekeve nava gund xaniyan nabîne. Nemaze gozên wan zehf in. Bi tenê di Reşanê de, qederê (10 000) goz hene.

Di çiyayên van gundan de sûmên kevin zehf in. Dewarên van gundan jî ber berfê şes mehan nikarin berdin.

Reşene — 100 mal tê de hene. Gundekî têrkehnî ye. Deh deqçe di ser gund re jî qwîna Çîravê kebnîyek der, dibe, navê wê Kehnîya pehn e. Cowa aşekî jê çêdibe. Ava wê hewqas sar e ko mirov bi derbekê dê nikere têr vexwe. Ava vê kehnîyê di nav gund re derbas dibê. Bi rê vê ava çend kehnîyên

din tevî wê dibin, ev av dibe rok. Aş di nav gund de ye.

Emtê — 20 mal tê de hene. Babîs di ber gund re dibore. Kehnîya gund jî heye.

Kehnîya Biyê — Kehnîya Biyê di cihê jêliyan de kehnîke bi nav û deng e. Di dora kehnîyê de zelif darên tû û fêkîne din hene. Serê kehnîyê dibe sih û seyrangêh e. Ava-hiyên gund 10 mal in.

Bêngov — Guhd fro xirbe ye. Berê 10 mal tê hebûn

Fleziş — Ev gund di sala 1930î de ava bûye. 10 mal tê hene

Xaniyê Nîzêr — 20 mal tê de hene. Kehnîya gund heye.

Basnê — Gundekî bi dar û kehnî ye. 30 mal tê de hene.

Kûşê — Avahiyên gund 40 mal in. Gund kehnîke spehî heye.

Kûşa Kevin — Herwekî kurdmanc dibêjin: Nû hatin, kevin xelal in, piştî ko Kûşeke din ava bû, Kûşa Kevin xerab bûye.

★ ★ ★

Piştî ko me tixûb, çiya, çem, deşt, newal û gundên jêliyan gotine emê niho tîştîne din wek heywan, dar, giya, kulîlk, plşe û sinhet, heklmî, hin adetên vê eşîrê, hatînen axê û malmezînen jêliyan bibêjin.

HEYWAN — Heywanên wan ên kedî her texlîf têş û dewar in: pez, hesp, ker, hêstîr, ga, çêlek û gamêş. Hespên wan bergir in. Nik xudanmêraqan hespine kihêl jî peydê dibin.

Herçî beywanên kûvî, di cihê jêliyan de ev heywanên ha peyda dibin: hîrç, pîling, wişk, qwîz, rovl, kêrvoşî, heftar, sixur, kurî-beşk, beraz, gurî, siort, jîjo, seyavî, pezkovî, gornebaş, mar (texlîfê maran: koremar, marê-reş, marê-teyar, tîrmar, keşkîni, kere, dûvşûjî, stobazîn marê avî) marmarîşok, kêlgeratik, gumgumok, balîfzerk, semşemotîk, dûpişt, mişk, koremişk, sêvil, xilt, cirt, zof, beqmar, mûrî (texlîfê mûriyan: reş, heşin-bazîk, zer, gêrik, rêviş).

MASI — Cewr, ferxecewr, şebot, mak, marmasî, naqor, sêlexwer, heştînok, zîkdêlik, devhesp, bîrek, heftî) beq, req, kêyçal, kurkurîk, merêtest, cobîr.

TEYR — Qertel, şahîn, wîlîh, dubrak, laçîn, kurt, şîşyarîk, bazîh, başok, bûm, pepok, kund, leyleg, qîr, qîrereşk, qîra-pîştikulav, danîsorîk, qîjîk, çîlêçîlê, kew (kewê gozêl, kewê çîr, kewê sûsik, kewêkenger) tivîlî, zerêle,

silkak, kurkurtnek, gewrê, darkutik, kevok, dolavrêsk, por, beytik, zertzûr, titi, qitîk, çûkmaşik, ibêd, kerak, bilbil, şehlûl, şivanmijûlik, mirişka avê, mirişkor, kutepir, bet, quling, werdek, qaz, xewas, haciresk, semawatik, tez-tezînetî, dawidê dunikil.

**DAR, MÊW, DEVÎ** — Di cihê jêliyan de her texlit darên bi ber û bê ber hene: Hir-mê, karçik, xoş, hilû (çend texlit in: hilûyê zer, hilûyê reş, havînî) -qeysi, m'ijmijik, hêjir (çend texlit in: bêhnatî, şingali, zerik, bêr-kevanî, dirbî, bacanî, rijik, tefarî) bihok, hin-ar (çend texlit in: tîrş, şêrin, rarişok) sêv (çend texlit in: guhljok, şekiri, xişxişok, eme-rê reş, xeyll, çermkerî) tû (çend texlit in: reş, ezreqî, garisî, şemî) tûtirk, kizwan (gir, hûr, bitim, behûrik) mazû, gîlor, gijik, gîjol, guhlj, berû (berûyê berû, berûyê mazû) be-ranî, gezû, belalûk, simberî, êvrîst, soedar, spindar, bî, beniştok, kevot, benav, gulşîrem, gez, ajik, behiv, sênc, çinar. Texlitê tiriyên wan ev in: teyifî, gozane, sincêrî, kerkûşî, gençki, gewrê mir, gewrê mehmo, reşê çê, sorê difsê, berisane, tûrtori, gozanê sor, binê tat, tiliya zeynebê.

**GIYA** — Giyayên xwarbar yanî, yên ko têne xwarin: Quzmaç, tolik, soryaz, sîrmok, sîrik, tîrşok, kereng, kengzer, helis, kidadik, sêvbinêrdê, pariye mihê, benik, gozerebik, spindik, gulmêw, selmik, pûnk, kariyê-belek, kariyê-kelehê.

Giyayên nexwarbar û kulilk — Giyareş, nefel, kelik, ket, çever, zirçik, giyayê-keran, kêlemper, kariş, fîrêz, sorik, nêrgiz, hendekû, bêrzan, hêro (hişk dikin, dikin toz û jin porên xwe pê dişon; por pê nerm dibin) sosin, gemgîlok, beybûn, kullîka Nisanê, bililazik, bûklindêr, rihan, rihana lawan, gul, şîlan.

**PÎŞE Û SINHET** — Di nav eşîrên Botan de herçî dêmanî ne di tevnê de kêin; ko-çerên wan xurt in. Di nav jêliyan de jin kej, penbû, hîrî dirêsin, bi têsîyê goran çêdikin, Hinek jî tevnê çêdikin, lê sivik. Wek têrik û ciwal. Penbû bi dolavê dirêsin dikin rîs û rêdikin Sêrtê. Sinhetkarên Sêrtê heqê destên xwe dibin û pê caw û stenbolî çêdikin.

Di nav jêliyan de qeleçî hene. Ev qe-leçî gêsîn, bêjîng, serad, kêr, milhêb, hestîf, dirêşik û kilpidanan çêdikin. Hin jî van qe-leçîyan bi sinheta tîlîngê jî dizanîn.

Bacolî, reşikan çêdikin û xeratiyê dikin. Xelk bi pirahî cenan û cotkar û rezvan in.

**HÊKÎMÎ** — Li Kurdistanê hekimî bi zeh-fî wek malmelan pêma, ye. Ji wan hekiman

re, hekimên kurdmançî dibêjin. Her eşîrê ma-la hekimê wê heye. Hekimên jêliyan jî eşîra Alikan in; mala Silêmanê hekimî.

Ev hekim her texlit nexweşî û birnan derman dikin. Birnan bi kewê derman dikin. Rûn û hingivîni tevî hev dikin û pê dikewi-nin. Fitilan jî bi birnan didin. Ji bo kewê dermanekî din jî heye. Wî derwanî jî giyê û jî dermanê spî yê şexsanê çêdikin. Ev, jî her dermanên din rahatir û çêtir e. Dermanên piştî kewê jî hene, zehlên wan jî giyê çêdi-kin. Wan giyan hekim bi xwe jî çîyan didin hev. Heke berik di nav hestî de ma, goşt di-qelêşîn in û berik derdixînin. Carina hestî di-şkê. Hingê wî dicebirnin. Berik bikeve sêvo-kê û di milê din re tavêje, dermanê spî da-tinin her du devên birinê heta ko şewata wî bigehe hev. Hekim bi goşt û xwarinê din gewet didin birindarên xwe.

Carina birindar jî tîrsa canê xwe dimi-rin. Ji lewre birindaran bi tenê nahilin. Xelk têne dora wan û nav didin wan.

Xwarina nexweşan bi adetî tiştine tîrş in. Hinarê şêrin, şorbeşir, hingivî, epraxê bi-rinci; diklozê bistî jî didin wan.

Nexweşiyên ko di nav jêliyan de peyda dibin an yên ko pê bihistine ev in: Ta, êşa zirav, zerik (zerika reş, zerika zer) xurî, so-rik, êşa giran, zikêş, qolinc, bayê sor, bayê spî, guhêş, serêş, çêvkulbûn, devkulbûn, tit-me, zam, nav, xilt, mtzavokî, keçelî, gewrik, arsim, sermayî, kuxik, taya sêroje, heftawik (heftûwik) dilêş, xişrûk, neks, beqîk, haloq, şîrsîmak, argûşketin, mûmar, kulmêrû, bûkik, perde, ewr, ava-reş, skutok mêkutok, qofî, bîjî, devxwarî, falînc, hêvketin.

Bi hekiman re bazar e; heke nexweş rahat bû heqê xwe dibe, heke bi birin an bi nexweşîya xwe ket hekim bi xwe tu tiştî na-xwaze. Herçî nexweşiyên sivik xelk xwe bi xwe derman dikin. Jinên sere bi dermanên wan dizanîn.

Li Kurdistanê, nemaze di cerahiyê de hekimîne bi nav û deng peyda dibin. Ev he-kim jî eşîrên din têne xwestin.

Peyayê ko di şeran de birindar dibin heqê hekimên wan axa dide.

**HATINÊN AXÊ** — Di zemanê berê de, gava axatî hebû û Kurdistan li ser rêzîka xwe a kevin bû eşîran wêrgû dida axayên xwe. Hatinên axayê jêliyan ev bûn:

Doşanî — Li Bîharê her gund li gora halê xwe pezek an dido an hêj bêtir dibir axê.



Kêsim — Li Pehezê, her gund li gora zêdayîha xwe barek dido difs, birinc, genim dida axê.

Êdani — Di êdan de êdaniya axê hebû. Pez, dexil an difs.

Demam — Axa xurt biwa ne dihişt ko bajari demam bikin. Axê demam bikira fêda gundiyan ji tê de hebû.

Spîngari — Di Gera Xani de li serê tofa-spîndarê axê heta pênc meci diyan dibirin. Di tofekê de (300-500) spîndar hene.

Dûvikê Qemçûrê — Wextê qemçûrê wekê qemçûrcî dihatin û diketin gundan axê pezê gundiyan ve lişrtin. Guşdiyan ji tiştê dida axê.

Ticari — Wextê ticar dihatin û hin tişt dikirin, di wê çan û standinê de para axê hebû. Para axê mixtaran ji ticaran distand û didan axê. Li serê pezekî çerxiki. Li serê hiriya pezekî qemeriki. Li ser xunkariya tewaş çerxiki (xunkari heft heqe ne)

Pêrûya Kozê — Koçerên ko dihatin erdê jêliyan heqê koza xwe didan xwediyên. Jê pê ve xwediyê kozê pêrûya axê ji wan distand û dida axê. Ev koçer di mideta ko di erdê jêliyan de diman, li bin destê axayê jêliyan bûn. Şer biwa digel jêliyan diçûn şer.

Ev hatinên axê ên binavkiri bûn. Ji van pê ve axa biçûwa ba mir an ba hikûmetê, teşxeyek lê biqewimiya ji eşirê distand. Di san axa milkek bikiriya û pereyê wî tîr ne kira pereyê mayîn li gundan beş dikirin û mixtaran ew pere didan hev.

CEZA — Axaxê jêliyan wek axayên Kurdistanê ên din xelkê eşira xwe cirm dikir. Ji cezayê ko ji xelkê dihatê standin para axê ji hebû.

Dizî — Axa li malê dizî digeriya, heke ew peyda kir vedigerand xweyî û tiştê jê ji xwe re hillani.

Kuşî — Axê mala xwini talan dikir û dida xwediyê kuşî û ji xwe re ji tiştê dibir.

Birîndar — Axê heqê birinê ji carih distand û dida birindar. Tiştê ji xwe re dibîşt.

Dawa — Ji dawayên ko axê bi xwe şerîeta wan dikir heqê qazitîyê ji wan distand.

MALMEZINÊN JÊLIYAN — Herweki me di teşkilata eşira jêliyan de û di rêza gundên wan de gotiye, me selhiya şes malmeziyên jêliyan kirine.

Eli Axayê Bernihî — Tiştê ko me di heqê wî de zani di gundê Bernih de gotiye. Îro ji mala Eli axa tukes ne maye. Bernih ji gundên Royê jêliyan e.

Eli Axayê Qadê — Eli axa ji gundê Qadê ye, ji gundên deşta Mişarê. Ji mala wî du zelam hene.

Eli Hemanê — Ev Eli axa ji Goyînan e, gundekî Royê Jêliyan. Ji vê malê ji çend zelam hene.

Hesamê Lodê — Ji xwe herweki nav li ser e, Hesam axa lodi bû. Çend zelam ji vê malê ji hene.

Mala Eli Bekiran — Mala Resûl axa, axayê jêliyan a îro bi xwe ye. Çirokiya vê malê me di gundê Mendekeran de gotiye. Şecera Resûl axa ji ev e: Bekir, Eli, Miheme, Resûl, Miheme û kurê wî Resûl axa. Navê kurê Resûl axa ê mezin, yanî weliehdê wî, Evdîrehman e. Resûl axa li bin xetê ye, li Deşta Hesinan, di gundê Çem - Şeref de rûdine, û azayê meclisa mihafeza Hesiçê ye. Xwedê rikêba wî dirêj bikir.

Şam: 18 İlon 1941 HEREKOL AZIZAN

## WELAT

Welat tu î, çavreş î  
Tev bihust û her xweş î  
Tiyin di te, pîr geş î  
Tu î, tev bax û bistan.

Ez fedekarê te me  
Ez bi goşiya te me  
Leşkerê ala te me  
Mîrin li her te ezan.

Erdê te jî zehf bi xêr  
Birçî nînin, hemî tîr  
Peyayên kurd weke şer  
Piling in ew, li çîyan.

Ji bo te dilkefî ez  
Dikin bigehim bi lez  
Da bibinim mîrê û rez

Herçî zozan, Serhedan.

Lê çî tîte min ji dest  
Mame bêhîş û sermest  
Bo armançê divê west  
Aza bibî Kurdistan.

SIBHIYÊ DIYARBEKRI.

## CENGA-CANI

Hilto rabe birayê min tu kanî  
Ji hewşê-carekê derkev li banî  
Ji xew rahin hemî tev de bi carek  
Binêrin qenc ji halê vî zemanî  
Biher e dê biharit ewr û ezman  
Heşin kir dexl û danek bo me' anî  
Xebat e her xebat e her xebat e  
Bi ceng bin mal û mendal û bi canî  
Rojên serma bizanin îro çûne

Ji îro paş xweşî kefte zozan î  
Li dotmama xwe be aşiq eya kurd  
Tu qedrê wê bizane her giran î  
Me xemlandî ji bo te bûkeke taze  
Ji destê xwar û bedxwaran deranî  
Ji nav bûkan ew e pêşkêşa hemyan  
Şevq roj e bilind e aşîyan î  
Hemî dinya dixwazit wê bibinî  
Tîne em xef dikin li jorê xanî  
Ji bo te yek nivîştî botî çêkir  
Divêtin ka çî gotî tu bizanî  
Bi şahî be bi şahî be birao  
Tu her bijî bi dinya şadimantî.

M. E. BOTÎ



## REWŞA DINYAYÊ

**ŞERÊ ÛRIS** — Ev şer bêl ko xwe sist bike dom dike. Ûris gelek li ber xwe didin û bi mîrani şer dikin. Lê ji wan re çek û posat divêtin. Ingilîz û emêrikanîyan soza xwe da hû Ûris ko arikariya wi bikin. Ji hona ve yekê ji konferansê di Moskoyê de wê bihata danin. Di vê konferansê de işê arikariyê wê bihata mizakere kirin.

Ev du meh in, dinyayê qala vê konferansê dikir û Ûris dixwest ko konferans zûka çêbibe. Dawî dawî li 28ê Îlonê nîmîndeyên Ûris û Ingilîz û emêrikanî di Moskoyê de gi-hane hev û dest bi mizakera işê arikariyê kirine. Ingilîz û emêrikanîyan digot şer bi halîna Zivistanê ji xwe wê bisekine, û li Bibarê wê ji nû ve dest pê bike. Heta hingê ji wê wext hebe ko em bikarin arikariya Ûris bikin. Lê Ûris dibêjin şer li Zivistanê nasekine, elman di şerê xwe de wê pê de herin û Havîn û Zivistan ewê dirêjî me bikin, ji lewre divê arikariya Ingilîz û emêrikanî bê derengî û etlahî bigebe destên me.

Ingilîz bi xwe di şer de ne û ji her wextî hêtir hewcedarê çekan in. Çekên ko ew bi xwe çêdikin ne bêsî wan e, û ji lewre ji Emêrikê çek û cebirxanê ditinin. Herçî Emêrike ye, febrîkeyên wê tev de ji bo dewletên ko şerê elmanan dikin dixebitin. Nemaze ji Ingilîzan re. Ji milê din Emêrike ji nû ve ordûkê çêdike, ordûke mezin. Ji vê ordiwê re ji çek û posat divêtin. Ordiwa emêrikanî berê (225000) zelam bûn. Îro ew ordû gibaştîye milyon û nîvekê. Ji milê din tiştê ko ji Ûris re divêt bê hed û hesab e.

Ingilîz û emêrikanî dixwazin bi her awayî arikariya Ûrisan bikin û nehîlin ko Ûris bişkê, lê herwekî Mîster Çorçîl gotiye Ingilîzê nikare çêkên girava xwe kêm bike. Ji ber ko elman dikare herê xwe ji Ûris bade û bide Ingilîzan.

Mîster Çorçîl li 30ê Îlonê di meclîsê de li ser vê meselê xeber da û got ko di vî şerê mezin de gelek nişkegavî hecne, yanî tiştîne welê ko dikarin ji niskekê ve biqewimin. Ji lewre ji songxwariyan re divê di ner qada şer de bazir û xurt bibin.

Li gora gotina Mîster Çorçîl ve Zivistanê elman dikarin şê tiştan bikin: Şerê Ûris bisekinînin û di riya Libyayê re dirêjî Misrê bikin. Di riya Spanyayê re dakevin Efrîqa roava.

An herê xwe bidin girava Ingilîzê û rast bi rast dirêjî Ingilîzan bikin.

Ji roja ko şerê Ûris dest pê kiriye liştek heye ko hergav têle birê û di dora wî de gelek axaftîş çêdibe. Ingilîzê esker derê-xîsta Ewropayê û ji par re li elmanan bixîsta. Bi vî awayî Ingilîzê ji nû ve pê lierdê Ewropayê dikir û barê Ûris ji sivik bibû. Hebû ko bi vê derbê elman bişkê û şer ji xelas bibe.

Dema Mîster Çorçîl di meclîsê de xeber dida ev mesele ji vebû. Serckwezîrê Ingilîzan di vê babetê de stexlî û got ko herçend di şerê Ûris de xesareke mezin giha be ji elmanan ordiwa elmanan hêj xurt e. Jû pê ve Mîster Çorçîl da zanî ko ev mesele îşekî eskerî ye. Ji lewre nabe ko li ser vê meselê eskere hête xebirdan. Ji her vê yekê serekwezîrê Ingilîzan ji meclîsê re ne da zanî heke Ingilîz dikin esker bişînin Ewropayê û heke şandin, kengê.

Herçî şer bi xwe roj bi roj germtir di-be. Herwekî xwendevanên me dizanin elman ji mêj ve gibaştî hûn dora Kiyêvê - payitextê Okranyayê - û zor didan ê, lê hêj ne ketî hûn ê. Li 19ê Îlonê Kiyêv kel destên elmanan. Baskekî ordiwa elmanan berê xwe da aliyê rohelê û bajarê Poltavayê ji zemt kir. Poltava dikeve nivroyê roavayê Xerkovê û jê qederê 125 kilomêtir dûr e. Xerkov bajarekî sinahî ye. Gotino febrîkeyên Xerkovê li rojê 100 tangî çêdikin. Ji ordiwa elmanan baskekî din berê xwe daye Rostovê. Rostov deriyê Qevqasê ye. Ehemiyeta Qevqasê ji jî ber pêrolê gelckî mezin e. Li gora nûçeyên paşin dilê Ingilîzan heye di Ecemîstanê re, ordûkê bişînin Qevkasê û pêrolên Bakoyê bihemînin. Generalê Ingilîzan ê bi nav û deng, general Wêvel ve paşiyê çûye Qevqasê. Dibêjin ko ordiwa Ingilîzî wê here heta Rostovê û li wê derê pêşîya elmanan wê bigire. Ji ber ko heke elman ketin Qevqasê, ji wê derê, wê bixwazin, di riya Ecemîstanê re, dakevin Iraqê û pêrolên wê ji bexîr destên xwe. Ji lewre dikeve serê mirovan ko Ingilîz esker bişînin Qevqasê.

Leningrad û Odese weke xwe ne û şerên xwe xweş dikin. Nemaze di Leningradê de şerine giran û xwîndar çêdibin. Dibêjin ko di Leningradê de milyonek eskerê Ûris heye. Ji van eskeran pê ve ji ehliyan herçî çêk-hilgîr ew ji ketine şer. Mixdarê van çêk-hilgîran ji milyonekî bêtir texmîn dikin.

Elman di nivro de zorê didin Kirimê ji Kirim di Behra reş de nivgîravek e. Yanî

DI RADYOWÊ DE.  
WEŞINEKÊN KURDÎ

BÊRÛT RADYOWA ROHELAT  
PÊLÊN KURT (37, 34) PÊLÊN NAVIN (293, 50)  
SAET : 6, 30 heta 6, 45 p.n.

Radyowa rohelat hero piştî nivro ji saet şeş û nivan heta şeş û çel û pênc deqîtan bi kurdî diweşîne. Di her weşinekê de nûçeyên dinyayê û stra nine kurdmanci hene.

RADYOWA BEXDAYÊ  
PÊLÊN KURT (30, 50) Û (42, 50)

SAET : 5, 45 heta 6

Radyowa Bexdayê ji hero piştî nivro ji saet pênc û çel û pêncan heta şeşan bi kurdî diweşîne. Şandiyarê Bexdayê ji carina stranine kurdî dide.

sê aliyan wê behir aliki wê hej e. Ev hej ji gelek teng e, îşê çar kilometiran. Ûris di vî erdê teng de asê bûne û Kirimê midatehe dikin Di nivroyê Kirimê de Sivestopol heyê. Ev bender wargeheki stola Ûris e. Heke elmanan Sivestopol ji zemt kir ev îş ji stola Ûris re zehmet e. Ji milê din, bi ketina Sivestopolê rewşa Odesê ji xerab dibe. Ji ber ko Odesê ji bejê mehsûr e, her tişt jê re, di riya behrê re ji Sivestopolê têt. Ji lewre Ûris cehda xwe dikin ko Kirim nekeve destên elmanan.

Me qala konferansa Moskoyê kiri bû. Ev konferans sê rojan dom kir û helav bû. Dibêjiin ko di vê konferansê de ji bo arikariya Ûris her tevdir hate ditin.

Li gora nûçeyên Londrê ên paşin elman gihaxîne dora Xerkovê û zorê didin ê. Ordiwa Merêşal Bûdyeni bi xurti li pêşiya elmanan sekini ye. Dîsa li gora wê radyowê elman di Kirimê de hinek pêş ve çû bin ji Ûrisan xesareke mezin gihandiye elmanan.

ŞERÊ EFRIQAYÊ — Herweki me berê ji goti bû delêletin hene ko şerê Efriqayê wê dest pê bike. Di wê qadê de, şerên cihmaskirine (istikşaf) xurt bûne. Talyan ji bi vapoan esker û çek ditinin Libyayê. Ingiliz li wan vaporan dixin. Di dora Tobriqê de şerine topçiyar û brlatiran çêdibin. Lê şerê rastin hêj dest pê ne kiriye.

Şam : 3 Çiriya Pêşin 1941 NÊREVAN



ŞIHİR  
Û EDEBIYATA KURDÎ  
REFIQ HILMÎ

Kitêbeke spehi, çeleng û hêja, 146 rûpel. Mirov gava vê kitêbê dibê destê xwe, destê wî pê tiji, dilê wî pê geş û germ dibê. Refîq Hilmî di vê kitêbê de qala hin şairên soran ên paşin kirine. Bi kurtî biserhatiya wan gotiye û hin şihirên wan belav kirine û li eserên wan hûr bûye. Kitêb bi her awayî tekûz û lihevhati ye. «Bi tenê tipên wê ne tipên me ne. Kitêb bi tipên erebî hatiye çap kirin. Ji lewra xwendin û sehkirina wê ji bo me dişwar e. Me hin tişt jê seh kiri be ji, ne bi temamî. Di rûpelê kitêbê ê paşin de dibêje : «Hewaman wa ye ke zori pê neçê bergî diwemî em kitêbe te çap bidên». Jê dixuye ko ev kitêb ji du cildan bilhevketî ye. Ya ko di destên me deye, cilda pêşin e, a didowan ji li pey e. Refîq Hilmî kitêba xwe pêşkeşî xortan kiriye û di rûpelê pêşin de gotiye :

DIYARÎ

Em çen laperêye ke awineyeke sûret û sûreti hendi le şaire nawdarekani Kurdistanî Iraq be winey deske gulikî rengawreng û bûnxweş derêxa ke her gulikî le baxêk helbijira bi pêşkeşî lawani kurd û be taybetî pêşkeşî ew qotabiye xweşewistane ekem ke le qotabxane herzekan da exwînin û wê da le şihir û edebiyati kurd sitilkyan ber çaw nakewêt. Eger bem sipare biçûke tiwani bêtim ke giyani edebî ewan beçûlinemewe teqelayek bo, pêkbinan û deshinani bergt diwem edam lelam siwik ebi û giyani niştemanperwerim taze êbêtewe.

Di vê cildê de Refîq Hilmî li şairên jêrin hûr bûye : Ehmed begê Sahibqiran. Ehmed begê Wesman paşa. Emin Feyzî beg. Emin Zekî beg. Eştrî (Şêx Evdîlxaliq). Ahî (Salih efendî). Bêxod (Mela Mehmûd). Bêkes (Faîq). Pîremerd (Tewfiq). Hacî Qadirê koyî. Herîq (Mela Salih). Heindî (Mela Hemdûn). Xakî (Mela Mihemed). Xeste.

BINGEHÊN  
GRAMÊRA KURDMANCI

DI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHIRVAN

— 8 —

Şaneka Tarixî — Gramêra frensizî dibêje ko zinanê frensizî veqetandekên xwe ji pronaveke latîni girtine. Gelo me yêk xwe, ev bêjeyan hûr, ji kû girtine ?

Li gora tedqîqatên ko heta niho min çêkirine, me jî veqetandekên xwe ji hin pronavan girtine, lê ne ji pronavine biyani, ji pronavine xwe.

Belê, veqetandekên me ên binavkiri ji pronavine me en îşarki bi der hatine. Herweki pêş-

detir dê hête gotin « yê, ya, yên » pronavine îşarki ne û veqetandekên me ên binavkiri ji wan hatine pê. Di esl û bingehî de gava ev pronav diketin pêşiya navdêrekê û dibûn rengdêrîne îşarki « di » yek diket navbera wan û navdêrê. Mesela gotina « Hespê Soro » di eslê xwe de « Hespê di Soro » [1] ye.

Bêdiro, pronavên « yê, ya, yên » di şiklê « ê, a, ên » de bûne veqetandek û bi paşiya navdêran ve zeliqîne; carina ji ketine pêşiya rengdêran. Yanî « Ev hesp yê Soro yê » bûye « Ev hespê Soro ye ». Mîsalên jêrîn biserveketina veqetandekên kurdmancî bi temamî şanî didin.

Ev hesp, yê di Soro ye. Ev hesp, yê Soro ye.  
Ev, hespê di Soro ye. Ev, hespê Soro ye.

Ev hesp, yên di Soro ne. Ev hesp, yên Soro ne.  
Ev, hespên di Soro ne. Ev, hespên Soro ne.

Ev mehî, ya di Soro ye. Ev mehî, ya Soro ye.  
Ev, mehîna di Soro ye. Ev, mehîna Soro ye.

Ev mehî, yên di Soro ne. Ev mehî, yên Soro ne.  
Ev, mehînên di Soro ne. Ev, mehînên Soro ne.

Herçî veqetandekên me ên nebinavkiri, me şiklên wan ên pêşîn, yanî yên ko bi navdêrekê bê bireser in, me ew ji pronavên xwe ên nebinavkiri « yek » û « hin » girtine û ew xistine paşiya navdêran.

Yek hesp hat. Hespêk hat.  
Hin hesp hatin. Hespîna hatin.

Yek mehî hat. Mehînek hat.  
Hin mehî hatin. Mehînan hatin.

Herçî veqetandekên nebinavkiri, yên ko dikevin paşiya navdêrên ko bireserê bi wan ve bûye, di pêkanîna wan de, pronavên îşarki û ên nebinavkiri arîkariya hev kirine û ew anîne pê. Herwekî ji mîsalên jêrîn dixuye.

Ev hespek yê di Soro ye. Ev hespek yê Soro ye.  
Ev, hespekî di Soro ye. Ev, hespekî Soro ye.

Ev hespîna yên di Soro ne. Ev hespîna yê Soro ne.  
Ev, hespîna di Soro ne. Ev, hespîna Soro ne.

Ev mehînek ya di Soro ye. Ev mehînek ya Soro ye.  
Ev, mehîneke di Soro ye. Ev, mehîneke Soro ye.

Ev mehînin yên di Soro ne. Ev mehînin yên Soro ne.  
Ev, mehînîna di Soro ne. Ev, mehînîna Soro ne.

Bi vî awayî veqetandekên me ên binavkiri û ên nebinavkiri hatine pê.

Di vî ravekê de, kêmahiyek dikeve berçavan. Gelo « f » û « e » yên ko di gotinên « hespekî Soro » û « mehîneke Soro » de tene ditin, ji kû peyda bûne. Divêt ev tehsîra tewanga pronava nebinavkiri « yek » bibe. Ji xwe ev pronav di eslê xwe de jmarnav e, û jmarnav navdêran di-

lewîne û ev tewang yanî û tewanga jmarnavan di ser hemî tewangên din re tete girtin. Heke me ew gotin veqerandine şiklê jêrîn ew « f » û « e » ji bi der tîn.

Yek hespî Soro. Yek mehîne Soro.

Herçî « e » ya « hespîna Soro » ye ev « e » di eslê xwe de « en » bû û « n » jê ketiye û li şûna « hespîna Soro » fro dibêjin « hespîna Soro ». Ji xwe « n » îşareta gelemariyê; û ji ber ko di « ine » de « n » ek heye ji xwe jê re hewce naniye.

### III — PRONAV

72 — Pronav ew bêje ye ko dikeve şûna navdêrê. Pronav, mejer û carina ji zayendê navdêrê dide zanî. Ji hêla din pronav wezîfeyên navdêra ko dinimine li ser xwe digere û wan ditine cih.

Di komekên jêrîn de: « Zîmanê lalêki ji yê virkerêki çêtir e. Du diz ji bo kerêki dizî pev diçûn; yekî dixwest wi bifroşe, ê din dixwest pê kerêki bike. Bayê zozanan ji yê deştê xweştir e. Ewê ko hat birayê min bû » bêjeyên « yê, yekî, wi, ê, pê, yê, ewê » pronav in. Ji ber ko ew ketine şûna navdêrên: « zîmanê, dizekî, kerî, dizê, bi kerî, bayê, mirovê ».

Bêdiro, heke me ev navdêr veqerandine şûna wan pronavan ew komek dikevin şiklên jêrîn. « Zîmanê lalêki ji zîmanê virkerêki çêtir e. Du diz ji bo kerêki dizî pev diçûn; dizekî dixwest kerî bifroşe, dizê din dixwest bi kerî kerêki bike. Bayê zozan ji bayê deştê xweştir e. Mirovê ko hat birayê min bû ».

73 — Zayendê Pronavan: Pronavan sê zayend hene: mê, nêr û nêtar.

Pronavên nêr — Pronavên nêr ew pronav in ko dikevin şûna navdêrên nêr. Lêzgin got, wi got.

Pronavên mê — Pronavên mê ew pronav in ko dikevin şûna navdêrên mê. Qeşemê got, wê got.

Pronavên nêtar — Pronavên nêtar ew pronav in ko dikevin şûna navdêrên her du zayendan û li gora zayendê navdêra ko dinimînin dikarin carine nêr û carina ji mê bêne hesibandin Lêzgin hat; ew hat. Qeşem hat; ew hat.

74 — Di zmanê kurdmancî de şeş texlî pronav hene.

- 1 — Pronavên keşin
- 2 — Pronavên îşarki
- 3 — Pronava girêki
- 4 — Pronavên pirsîyarkî
- 5 — Pronavên nebinavkiri
- 6 — Pronavên xwedîn

[1] Ev şiklî hetanî, fro di bin cihên Kurdistanê de peyda dibe. Lê, bi tenê di gelemarê de tete gotin. Yanî li şûna ko dibêjin « hespîna Soro » « hespê di Soro » dibêjin û gelemariya hespan bi « di » yê didin zanî.



## Kitêbxana Hawarê

### Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabîya Kurdi C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rûpelniine Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Bîyîşa Pêxember. Bi Kurdiyâ dumilî; bi dibaca C. A. Bedir-Xan.
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan.
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re C. A. Bedir-Xan.
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikitin
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdi Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10 — Xwendina Kurdi Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11 — Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12 — Dersên Şerietê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13 — Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14 — Proverbes Kurdes. Medhelokên Kurdî Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-Xan Paris - 1937
- 15 — Le roi du Kurdistan. Qralê Kurdîstanê. Emir. K. A. Bedir-Xan û Adolphe de Falgerolle. Paris - 1937
- 6 — Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdîstanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel. Berlin - 1937
- 17 — Der Schnee Des Lichtes. Berfa Ronahiyê Şîhrên Kurdi Prinz. K. A. Bedir-Xan û Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Salt	500	Qirûşên Sûri
Şesmehl	300	Qirûşên Sûri
Sêmehl	200	Qirûşên Sûri.

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar: Mîr Celadet  
Ali Bedir-Xan. Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aali  
Bedir-Khan. Damas—Sûriye

SAL 9  
HEJMAR 35

ÇARŞEMB  
12ÇIRIYA-PAŞIN 1941

# HAWAR

ANNEE 9  
NUMERO 35

MERCREDI  
12 NOVEMBRE 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARÊ

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Diwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Melik û Koçer	Dilistan
Lênîngrad	Smainê Serhedî
Perîşani	Nûredîn Úsif
Sond	Qedrican
Kurdên Ecemîstanê	Herekol Azizan
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan

## BIRÊ FRENSIZI

Melaye Djeziri Tawûsparêz



ŞAM—1941  
ÇAPXANA SEBATÊ





## TEFSİRA QURANÊ

Di rojên jorin ên hejmarti de, piştî her nimêja ferz ev dia divê bête kirin.

Her diakarên Xudayê xwe bibin, jê bitirsin û bizanin ko honê vegerin û bigehin wî. Siûd û perîşaniya we di roja pişdawayî de, di destê Xuda de ye.

204 — Mirovek heye . . . . tê nik te û tu şexaliya wî li ser îşên dinyayê dicibini û ew dibêje Xuda şahidê min be, dil û zimanê min weke hev in, lê ew dijmineki din î dijwar e.

205 — Gava ji hafa te derdikeve, dûri te dibe, dest bi fesadiyê û xirabîya zad û çêliyan dike. Xuda ji fesad û xirabiyê hez nake.

206 — Gava jê re tete gotin: Ji Xuda bitirse, ew nefmezîniyê dike û dibe gunchkar. Dojeh têra wî dike.

Dojeh çi cihêki têrşerm û ezab e.

207 — Dîsa kesek heye, ji bona rizayê Xwedê canê xwe dide. Xuda bi evdên xwe re keremkar û piyar e.

208 — Gelî bawermendino . . . . . Bi tevayî dest bi misilmanîtiyê bikin û ji dil û can dest jê bermedin, mekevin ser şopa Iblis a xwar, mirov pê şermisar dibe.

Ew dijminê we ê xuya û xedar e.

209 — Heke hon paş dahatina aye-tên Xwedê û sehkirina wan dudiliyê di-kin, bizanin ko Xuda qadir û zana ye.

210 — Ji mişrikan pê ve her kes hevîdarê emrê Xuda ye, yê ko di sihên ewrên tenik û di xunava qiyamekê de û bi melaiketan ve digehe me û ji wan pê ve dîsa her kes bawerîya xwe bi

wê demê tine ko tê de mirov cezayê emelê xwe dibîne û her kes û her tişt vedigere ba Xudayê xwe.

211 — Pêxemberê min . . . . . Ji lawên Israil bipirse, bila ew bêjin, me ji wan re çend ayet û kitêb dane . . . . . Lê yên ko bi ayetên Xuda serwext dibin û paşê mana wan diguhêrinin, ji wan re êşe-ke giran heye, Xuda di cezadanê de dijwar e û ew bi xurti diêştne.

212 — Jiyîna dinê ji kafiran re têrxeml dixuye û ew tenazê xwe bi mirovên bawermend ên belengaz dikin, lê di roja pişdawayî de, cihê bawermendan ji yên wan bilindtir e. Xwedê ji kîjki re dixwaze nîmeta xwe bêhisab dide.

213 — Di destpêka dinê da, mirov hemî miletek bûn û gotina wan yek bû, paşê li hev ketin, Xwedê ji wan re pêxemberin şandin, heta ko ji camêran re mizgîniya xweşiyê bidin û mirovên xirab bi ezêb bilirsînin û bi wan pêxemberan re kitêbin nazil kirin, heta ko li ser tiştên ko mirov li hev ne dikirin, pêxemberên Xwedê hikmê xwe li gora heq û edaletê bidin.

Ji Cuhî û Filan pê ve tu kes bextê xwe xira ne kir; her çend jî ji Cuhî û Filan re bi Tewrat û Incilê hikmên Xwedê û emr û fermanên di wî xuyani bû bûn, wan ji dexs û xirabîya xwe hikmên kitêbên Xwedê, yên ko ji mirovan re şanî riya rastiye didan, guhartin.

Lê Xuda ji kerema xwe, evdên xwe ên bewermend û dilpak, gihandin ronîya rastiye, her çend jî ew li ser vê rastiye bi destûra Xwedê bi ya hev ne dikirin. Xuda ji kerema xwe her kesê ko dixwaze digihîne riya rastiye.

214 — Ma we ji xwe re digot honê bê zehmet bikevin biluštê? Yên beri we ketine tengiyêke giran, bela û nesa-xî, belengazî û birçitî zora xwe dida wan. Pêxemberê Xwedê û yên ko bawerîya xwe bi wî anî bûn digotin: Kanî arikariya Xwedê. . . . Bizanin . . . Ari-kariya Xuda nizing e.

215 — Ji te dê bête pirs kirin: Emê çî bidin û ji kê re bidin? Bêje wan: Ji malê xwe di riya Xwedê da ji dê û bav û mirovên di xwe re û séwî, belengaz û réwingîyan re bidin; herçî qenciya ko hon dikin, Xwedê pê dizane.

216 — Di riya Xuda de şer kirin ji we re bûye ferz û hon jê hez nakin; bizanin ko tiştin hene ko hon ji wan hez nakin lê li hev hatina wan ji bona qenciya we ye û hin tiştên din hene ko hon hejî wan dikin lê qewimandina wan bi keri we naye. Xuda pê dizane lê hon pê nizanin.

217 — Ewê ji te mesela şer û kuştinê di meha Remezanê de bipirsîn; bêje wan: Di vê mehê de şer û kuştinê gunehêke mizin e. Lê veğerandina xelkê ji riya Xwedê û ji ziyareta Mescida-Heramê û jê derêxistina ehlên di wê gunehêke hêj mezintir e; û fitne ji kuştinê xirabtir e. Geli bawermendino. . . . bizanin ko kafiran, heke ji wan bihata, heta ko hon ji dinê xwe derkevin dest ji kuştina we bernedidan.

Heçî ji we ko dev ji bawerîya xwe berdidin û dimirin dibin kafir.

Sewaba qenciya ko wan pêkanîne di dinê û axirê de pûç û winda dibe û ew agirketî ne û tê de her dimînin.

218 — Yên ko bawerîya xwe anîne û ketine riya mihaciriyê, û riya Xuda de şer kirine, ew hêvidarên rehmeta Xwedê ne. Xuda efiw û tobe dide, Xuda piyar e.

219 — Ji te mesela şerab û qumarê dê bête pirs kirin.

Bêje: Vexwarina şerabê û leyistina qumarê gunehên mezin in, herçend ew bi keri xelkê hên ji.

Lê her halê gunehê vexwarin û leyistina wan ji nehfa wan pirtir e.

Û ji te bipirsîn: Emê ji malê xwe di riya Xwedê da bi çiqasî bidin? Bêje wan: Ji malê û kedê xwe ên zêde di riya Xwedê de bidin, lê herhal bi awayekî bidin ko hon bi xwe piştire mihlaci xelkê nebin. Xuda hikm û ayetên xwe pêş we dike, heta ko hon birewer bibin.

220 — Di dinya û axirê de bi ayetên Xuda serwest bibin. Ji te mesela séwîyan wê pirs bikin; bêje wan: Gerandina tîşê séwîyan ji we re xeyr e. Heke malê we û wan tîkilî hev dibin, binin bira xwe ko séwî xweh û brayên we ên piçûk in, bi wan re camêr bin. Xwedê camêr û nekesan nas dike.

Xuda bixwesta bi netêkilbûna malê we û yê séwîyan emir dikir, lê ew ji we re zehmet dibû, ji kerema xwe bi tîkilbûna wan destûr da, ji ber ko Xwedê delal, zana û fêris e.

221 — Dot û keçên mişrikên ko hêj bawerîya xwe ne anîne ji xwe re mekin jin.

Ji dot û pîrekên mişrikan, heke we hejî wan ji kir, mehrkirina jin an cêriyêke misilman ji we re dîsa bi xeyrtir e.

Heke we mişrikek ecibandi be ji, heya ko wî bawerîya xwe bi misilmanîtiyê ne aniye, dot û jinên misilman jê re mehr mekin.

Mehrkirina dot û jineke misilman ji evdeki misilman re jê bi xeyrtir e.

Jin û mîrên mişrik we digihîtin dojehê, lê bi cihanîna emr û ferinanên Xwedê mirov dikeve riya bihuštê, û bi destûra Xuda mirov ji gunehên xwe tobe dike û jê pak dibe.

Xuda ayet û hikmên xwe pêş xelkê dike heta ko ew pê birewer bin û dest ji gunehan bikişînin.

Ji bona Tefsîra Qurânê K. K. û li hejmaêrn 27, 28, 29, 30, 31, 32 33 û 34 an fedkirin.



# HEDÏSËN

## CENABË PËXEMBER

REHMET Û SILAVA XWEDË LË BE

353 - Ko te seyê xwe şand û wi neçirek ji te re girt, jê bibe û bixwe, lê heke seyê te çû ji xwe re neçirek girt, wi jê mebe, ew rizqê wi ye.

354 - Parsekî heram e, meger ko izreke mezin hebe.

355 Jin ji parsûkê xwar hate afirandin, heke tu dixwazi wê rast biki tuê wi bişkinîni, bi sebr û nermiyê pê re bide bistine.

356 - Gava cenaze derbaz dibe ji ber wi ve rabin. (rabin ser xwe).

357 - Wada xwe bine cih, bawermend wiha dikin.

358 - Mirovên ko xelk ji xirabiya wan ditirsin di roja pişdawayê de li ha Xwedê bê qedr û rûmet in.

359 - Sebr û dilnermî du xisletên heja ne.

360 - Mirovê ko diyariyekê dide kesekî û paşê jê distine, mina seyek e ko vedirêşe û di pişt re tiştê ko veresandiyê dixwe.

361 - Gunehên mezintir ew in ko mirov mişrikiyê bike ango yekitiya Xwedê nas me ke, li dê û bavê xwe asê bibe, swindên derewin bixwe û pêşberê qazî de piştî ko bi anîna navê Xwedê sond xwariye derewan bike û pê bi qasî mûyekî ji be, zîyanê xelkê bike.

362 - Bi tenê bi malê xwe hon nikarin arikariya xelkê bikin, bi exlaqê baş û bi gotinên şîrin ew razî dibin.

363 - Ko min di heqê meselekê de hikmê xwe da û xelet kir divê ji bîr mekin ko ez ji mirovek in, dikarim xeletê bikim, lê ji ber ko min xelet kiriye heqê xwediheq wînda nabe û yê ko dizane dawa wî ne heq bû divê jê bigere, tiştê ko mirov bê heq û rê dibe perçek agir e; êdî hon dizanin, bibin an berdin.

364 - Miletên berî we mehiw bûne ji ber ko gava mezinêkî ji wan zilm û dizî bikir ew berpîrsiyar ne dikirin û ko belengazekî tiştêk dikir lê radibûn û diêşandin.

365 - Heç di civatekê de rûniştî ne swind-xwariyên hev in (bextdayiyên hev in) galgala ko di civatekê de hatiye gotin ji xalkê re me bêjin, ew tiştêkî heram e.

366 - Berî ko bikevin mala yekî destûra wî bixwazin.

367 - Xwedê bi mirovên milrivan tê rehmê.

368 - Ez ji yariyê dikim, lê disa rastiye dibêjim.

269 - Ne îşê min e ko dilê xelkê qul bikim û bizanim tê de çi heye.

370 - Tu û malê xwe tev da hon aîdê bavê xwe ne.

371 - Heqê du kesên qels ji we re zehf heram e, heqê sêwîyan û heqê jinan.

372 - Di dinya û axiretê de kes ji min bêtir ne nizikî Îsa kurê Meryemê ye, nav beyna min û wî da tu pêxember danehatiye, pêxember tev de ji bavekî ne, bi tenê diya wan cihê ye û dinê wan yek e.

373 - Ez ji mirovên ko gava belayek tê serê wan li serê xwe dixin û porên xwe dikisînin, cilên xwe diçirinin û diqetînin, bi dengê bilind ax û zarînan dikin û digirin pak û bêl me.

374 - Yê ko sêwîyan dihewine di bihuştê de bi min re ye.

375 - Îşê dinyayê hon ji min çêtir dizanin.

376 - Vexwarina ko heke we jê pir vexwar serxweş dibin ji we re heram e.

377 - Pir me bêje, pir me kene, ji feqîr û belengazan hez bike, bi wan re rûne, xêrxwazê wan be û arikariya wan bike; zehmet be ji her rastiye bibêje, qedrê mirovên di xwe bigire, ew ji te bigirin jî, tu ji wan me gere, gava dienirî bi xelkê re mepeyive, kêmaniyên xwe bizane û bi kêmaniya xelkê mijûl me he, paşgotîniya nav û hevalên xwe me ke, bi gotin, û rabûn û raniştina xwe hevalê xwe aciz me ke, heî ko bi te bikeve swind me xwe.

478 - Qedrê ciranê xwe bigirin û wan aciz me kin.

379 - Di ziwaca xwe bi pezektî ji be dawetê bike.

380 - Ezê ji nimêj, rojî û zekatê çêtir tiştêkî rê we bidim? Ew li hev anîna mirovan e; bi şer û pevçûnê xelk wînda dibin.

381 - Ezê rê bidim we, mîrxas û egîdê we ki ye? Mîrxas û egîd ew e ko gava di-enire li cihê xwe giran e, û bi nefsa xwe dikare.

382 - Ji gotin û kirina ko di dawiyê de tuê poşman bibi jê bigere.

383 - Ji gotin û emelên ko guh jê diqehire dûr here.

384 - Di mesela diyanetê de pir kîr ma jon, miletên berî we pê dinê xwe wînda kirine.

# DIWANA MELÊ

Di hejmara Hawarê a 33an de me bendek li ser klasikên xwe belav kir û tê de qala Melayê Cizerî ji kir. Iro em dest bi belavkirina diwana Melê dikin. Diwana Melê herwekî me di wê bendê de gotî bû beriya niho ji hati bû çap kirin, û ne carekê, lê çend caran. Çapa me a iro ji wan çapan gelekî bi ferq e. Ev diwan berê bi tipên erebî dikete çapê. Iro bi tipên me bi xwe, bi tipên kurdmançî de bête çap kirin.

Qedri begê Cemil paşa himet kiriyê û diwana Melê ji serî heta binî wergeraudiye tipên kurdmançî, yanî ew ji nû ve bi tipên kurdmançî nivisandiye. Xwedê jê razî be û wî di vê rîya xebatê de payidar bike.

Diwana Melê di nav kurdmançan, ne maza di nav mela û feqehan de gelek nas e, û gelek nivîstên wê ên destnîvis hene. Me hêvî ji xwendevanên xwe heye ko nivîsta Qedri begî deynin ber nivîstine diin û ferqên ko di nav nivîstan de bibînin ji me re bidin zanîn. Em wan di Hawarê de belav dikin û piştî ko diwan bi temamî qediya em li van ferqan hûr dibin û ji wan nivîsteke tekane ditînin pê.

Mela mitesewif e. Ji lewre şîhrên wî bi çend awan dikarin bêne mana kirin. Xwendevanên me ji vî awirî ve ji dikarin bixebitîn û awayê manakirina xwe ji, ji me re binivîsin.

## — 1 —

Niwaya mitribê çengê fixan avête xerçengê[1]  
Werin saqî heta kengê neşoyî dil ji vê jengê  
Heyata dil meya baqî binoşin da bi mistaqî  
«Ela ya ey-yihes saqî edir ke'sen we nawilha»  
«Ko katib dêmê cedwel ket, şikeste xet mi-  
[selsel ket

Ji yek herfan mifesele ket, ki ye vê mişkilê  
[hel ket  
Dizanî, rûd û ûd ewel çî tavêtin sirûd ewel  
«Ko eşq asan nimûd ewel, welê iftad  
[mişkilha»

Ji mihra wê şefeqsêdê, şêrtinlêlê şekerwêdê  
Dinalim şibhetî re'dê ecêb im lê ji vê ce'dê  
«Ela ya ey-yihes saqî edir ke'sen we nawilha»  
«Ji tabî ce'dê mişkilneş çî xûn iftad der  
[dilha»

Di vê tavê di vê xanê me eşq û eymeni kanî  
Kestî destet ji dewranê, nihalek vê gulistanê  
Deraxûşê çî mey ared kl ez dil canêş  
[bispared  
«Ceres feryad mîdared ki ber bendîd meh-  
[milha»

«Bi quranê bi ayatê eger plirê xerebatê  
Bibêjim secde bin latê, mirdê wî dibin qatê

[1] Birca Meris

Mirid er bê beser nebiwed zi fermaneş be  
[der nebiwed

«Ki salik bê xeber ne biwed, zi rah û resm û  
[menzilha»

Ji vê zilmata deryayê, ji mewcan qet xeber  
[nayê

Şikestî keştiya bayî, ecaca wê şefeq dayê  
Ji herfan mah û salê ma, ne hat der şiklê  
[falê ma

«Kuca danend halê ma, sebikbarani şahilha»  
Me ra ewel ji pir xamî, kişand axir bi bed-  
[nami

Ji rengê Se'dî û Camî, ji şihret pê hesan amî  
Bi deng û bang û awazî, dibêji neşmeya sazî  
«Nihan key maned an razi, kezo sazend meh-  
[filha»

Ji Hafîz, Qutbê Şirazi, Mela l fehm er biki razi  
Bi awaz û ney û sazê, bibî ber çerx  
[perwazi

Tezed min hibiha sefwa, bihi ehli hewa  
[neşwa

«Meta matelqe men tehwa, de'e-dinya we  
[ehmilha».

## — 2 —

Ismê te ye mektûb di diwana qidem da  
Herfek qelema ilmi bi teqwimi reqem da  
Eşkal û xet in, datre û niqteyi eşqê  
Ew neqşmîsal in di xeyalati edem da

Mim metle'i şemsa ehed ayine sifet kir  
Lamih ji ereb berqî li fexarî ecem da  
Da şahidî esma bi hemî wechi binasiu

Yek mestî semed kir, bi yekî neqşî senem da  
Yek girtiye zilfê, û yekî xal nimayî

Ayine bi Iskender û cam bi Cem da  
Erwahi miqedes şevi qedra te dixwazin

Nûra te ye misbah-di qendila herem da  
Da weqti liqayê bi te hey bin di beqayê

Min neqdi dil û can di fenayê bi selem da  
Yaqu'tîroşan di kefelmasî şikestin

Fw sefheyî elmas ko neqaşî qelem da  
Yareh bi çî rû leb bi seneya te kişayim

Sibhanekte len ihsiyê fi şanike hemda  
Minet ji Xuday ko bi ehde xwe Melayî

Eksirê xem û eşqê ne dinar û derem da .

## — 3 —

Meşateyi hisna ezel cengalî zilfan tab da  
Da eşq hilbit pê li pêl qelbê Melê celab da

Hisna hebîb û litfî yar avête dil eşqa xedar  
Lew selb kir ji ixtiyar, wê hisnê ev  
[teab da

Min di seher zilfên di mest, hatin sema ihram  
[best

Çûn secdeya xalê bi qest, lew haciban mi-  
 [ rab da  
 Rûh û rewanê min hebîb, disa bi telbisa [1]  
 [ reqîb  
 Rencide kir miskîn xerîb, terka dilê elhab da  
 Mehbûb bi reyhan û gulav, ker kir li min  
 [ cerg û binav  
 Zehra hilalil bû di nav, lew saqiyân celab da  
 Wan dest û zend û saidan, mey daye şêx  
 [ û zabidan  
 Mest im ji çeşmê şalidan, wî nêrgiza sirab da  
 Miskê reşandin ez dibêm, wau Hindiyê xa-  
 [ lan bi dêm  
 Lê xetê reyhan li dêm, katib ji nû irab da  
 Nazîkqeda nûrînbêşer, ew bû li min neq-  
 [ şî beser  
 Dinya xeyalî her seher, nav dideyi bêxab da  
 Ew tiliyên nazîk reqîq, pir da me fîncana eqîq  
 Ew badeya nûrîn rehtîq, minet bi min wehab da  
 Da xef nebi pêjna firê, mey rête şêlkasa surê  
 Minet ko îro dêmduz e, disa şeraba nab da  
 Mey hate fîncana sedef, ki dê vexwîl êdi bi xef  
 Saqî bi nay û çeng û def ferfûriyan mehtab da  
 Îd e hebîbê nezre lê, bang da bû qurbana Melê  
 Yareb bibînim rojhelê, sikin di dest qe-  
 [ sab da

— 4 —

Muxbeçeyên meyfirîş her seherê tèn sema  
 Badexwaran nûşenûş mane li dorê çema  
 Hin gul û hin enber in, h'n şîrîn û esmer in  
 Hin guher in daneyî misli şehyêl sema  
 Hin zeri ne pir sur in, superî ne dêmduz in  
 Min ko di çerxê we di, sebr û qerar im ne ma  
 Sebr û qerar im ko bir cerg û ceger hûr dikir  
 Zilmê wiha kê dikir can dibir û dil teha  
 Can û dilê min ew e hûrîweşê min ew e  
 Padişahê min ew e, ez li derê wî geda  
 Yuri ko di em geda dest bi dest me da  
 Em bi semayî birin reqs û sema ji we ma  
 Gote me durdaneyê em ji te û tu ji me yl  
 Lew bi heqîqet yek in, mesele bi şîbhe ma  
 Bade me noşî ji dest, çûme ji xew nîame mest  
 Qetre bi behrê gîha, behir bi eyni xwe ma  
 Gûşî bi amî mede terka midamê mede  
 Ekserûhin fi zema eklebûhin fi ema  
 Herf ji yek bûne fesil, ger bibêrt wan bi esl  
 Herf dibite yek xetek, xet ko ne ma niqte ma  
 Wehdetî mitleq Mela, nûr e di qelban cela  
 Zor divê vê meselê ehlê dilan şîbhe ma.

Melê qesîda xwe a pêşîn bi tezmîna heşt mis-  
 rahên Hafîzê Şîrazî pêk aniye. Me ew misreh xis-

tine nav dunikan û bi vî awayî ew ji yên Melê  
 vegetandine. Hafîz jî bi xezela ko ev heşt misreh tê  
 de ne dest bi diwana xwe kiriye. Heke xezela di-  
 wanekê a pêşîn bismela wê diwanê bihata hesaband-  
 in, Mela nivê bismela Hafîz kiriye bismela  
 diwana xwe

Ev xezela Hafîz gelek bi nav û deng e. Ji  
 lewre û bi vî hêncetê me dil kir em vî xezelê ji  
 xwedevanên xwe re ber pê bikin. Ewe yezel:

الا يا ايها الساقى ادر كاساً وناولها

که عشق آسان نمود اول ولی افتاد مشکها

بوی ناله کاخر سبازان طره بکشاید

زجمد زلف مشکینش چه خون افتاد دردها

بمی سجاده رنگین کن کورت پیرمغان کوید

که سالک بیخبر نبود ز راه و رسم و منزلها

مرا در منزل جانان چه امن و عیش چون مردم

جرس فریاد می دارد که بر بندید عملها

شب تاریک و بیم موج و کردایی چنین هائل

کجا دانتد حال ما سبکباران ساحلها

همه کارم ز خود کامی میدنایم کشید آخر

نهان کی ماند آن رازی کزو سازند محفلها

حضوری کرهمی خواهد آژو فائز مشو حافظ

مقی مائلق من تهوی دع الدنيا واهملها

Heke me ev xezel bi firehî bi mana kir  
 Hafîz dibêje:

Meygerî bi agahî, piyanê di civatê de  
 bigerîne û şerabê bide civatrûniştîyan.

Eşq û evîni di destpêkê de hêsantî xuya  
 kir, lê gava em gîhaştin ê, me dit ko ew xurt  
 û dişwar e.

Sira bayê sibê biskên yarê ji bev dîke  
 û jê bihnine xweş belav dibin.

Ji xelekên guliyên wê ên bi misk, xwîn  
 kete dilê dilketîyan.

Heke pirê mîxan [1]gote te, guh mede kurt  
 û pistan, secadê jî bi şerabê bi reng ke.

Ji ber ko pirê terîqetê ê karnas bi ayl-  
 nê nê vî menzilê dizane û ji wan ne bêhay e.

Di civata yarê de, ji min re tu bîstehtî  
 û rahetî nîne, ez nikarim ferîqet bim û lê  
 rûnim.

Ji ber ko naqûsa rewingîyan bang dide  
 û dibêje: kar bin û barê xwe girêbidin.

Belê, em çawan ewle bibin ko ba û  
 bahos li me rabûye, di nivê behrê de keştîya  
 me li ber gerên kûr sekinî ye.

[1] Mîr bi mana zerdestî, atesperest an meclûl ye. Bi  
 mecazî, jî meyger re jî dibêjin. Mîrpeça lawîkê meyger. Pirê  
 mîxan jî bi mana mezinê terîqetê ye.

[1] Platt, fessad

Lê xelkê peravan ên barsivik bi halê ne nizanin.

Karê min di dinyayê de, ji xodgamiyê ez avêtim bednamiyê; yanî min her û her ji ya xwe kir û pê bednav bûme.

Ma kengê ew sir veşarti dimîne ko jê civatan saz dikin, yanî sira ko di civatan de lête gotin veşartî namîne.

Ey Hafîz, heke te bîstehî divêtin, terka yar û armancê mede û li wan guhdar be.

Û gava dixwazî xwe bigehîni mehbûbê dilan terka dinê û her tiştên wê bide.

Misreha vê xezelê a pêşin, ya ko bi erebî ye, ne ya Hafîz e. Ev misreha de Yezîd kurê Mia-wiyê ye. Di heqê vê misrehê de çirokek heye. Dibêjin ko xelkê gazînd ji Hafîz kiri bû û gotî bû ê: «Ya Hafîz te di nav şairên ereb de ji Yezîd pê ve kesê din peyda ne kir ko jê misrehekê bigirî û pê dest bi dîwana xwe bikî. Ma tu nizanî ko Yezîd kafîrek e». Hafîz kenî û li wan vegevand û got: «Ma hon jî nizanin ko malê kafîr jî bawermend re helal e».

Me ji xwendevanên xwe hevî kir ko nivîsta Hawarê û yên xwe deynin ber hev û ferqên ko tê derfîn ji me re bidin zanin. Bi me re jî nivîsteke dîwana Melê heye. Me her çar qesîdeyên ko di vê hejmarê de belav dibin, danîne ber nivîsta xwe û ferqên jêrîn ditîne:  
Qesîde: 3. Misreh: 12 û 13.

Li gora nivîsta Hawarê:  
Mestî im ji çesimê şahîdan, wî nêrgîza sirab da  
Miskê reşandin ez dibêm, wan Hindiyê xalan hi dêm  
Li gora nivîsta min:  
Mestî bi çesimê şahîdan, ew nêrgîza sirab da  
Miskê reşandî ez dibêm, j'wan niqetayan hin bûne kêm.  
Qesîde: 3. Misreh: 22, 23 û 24.

Li gora nivîsta Hawarê:  
Saqî bi nay û çeng û def, ferfûriyan mehtab da  
Id e, hebîbê nezre lê, bang da bû qurbana melê  
Yareb bibînim rojhelê, sikin di dest qesab da.

Li gora nivîsta min:  
Saqî bi çeng û nay û def, ferfûriyan mehtab da  
Id e, hebîbê nezre lê, yareb bibînim rojhelê  
Yan dê bi qurban bê melê, sikin di dest qesab da.

Qesîde: 4. Misreh: 2 û 3  
Li gora nivîsta Hawarê:  
Badexwaran nûşenûş mane li darê çema  
Hin gul û hin enber in, hin şîrîn û esmer in  
Li gora nivîsta min:

Badexwaran nûşenûş mane li dorê çema  
Hin gulî bûnber in, hin di şîrîn esmer in.

Nivîsta ko bi min re ye Mela Evdiselam ew di sala 1322ê hicrî de nivîsandiye. Mela Evdiselam cizerî û alimekî zor e. Mela Evdiselam gelek bi dîwana Melê mijûlê bûye û zehf nivîstî li ber nivîsandine. Û dibêjin ko Evdiselam qene jî zane. Melê mana bike. Ji lewra nivîstên ko ewî nivîsandine gelek biqîmet û mihteber in.

Mela Evdiselam di heqê tarîxa wefata Melê

## MELIK Û KOÇER

Melik Xelil hebû; melikê Hesenkêfê bû. Hesenkêf bajarekî kevnare ye, li ser Diclê, yanî çemê Diyarbekrê, û di ser Cizira Botan re ye.

Rojekê melik Xelil û leşkerê xwe çûne rav û nêçîrê. Birek kêvî rakirin. Melik beranek jê veqetandek û (melik li hespekî siwar e) da ser pişta beranê xwe û ew gihande gelikî kûr.

Di wî geliyê de şivanekî koçeran li ber pezê xwe bû. Melik beranê xwe wînda kir. Vegeriya cem wî şivanî, silav lê kir. Şivan silava wî vevegerand. Melik enirî û got:

— Herçî şivan in wekî keraş in, guhên wan li ser kar û berxan in, ne li ser silava camêran in.

Şivan got: Ew mirov ker in ko li şolê xwe miqate nabîn û rav û nêçîr jî xwe re kirine kar.

Melik bêtir enirî û got: Şivano tu şivane kê yî, û navê te çi ye?

Şivan got: Çi şolê te pê ye; tu li şolê xwe pirsê bike.

Di wê hingê de leşkerê melik dor lê girt û silava padeşahiye lê kirin. Melik ji wan re got: Vî teresî bigirin, kuştina wî helat bûye.

Şivan got: Ya melik Xelil! destûra peyivê bide min.

Melik destûr da ê. Şivan çiroka baz û çûk ji xwe re kire behane û got:

Min bihist ko çûkekî	Rokê gote bazekî,
Ey padişahê teyrani	Hero kurê te seyran.
Tu guh nadi şolê xwe,	Serbest nakî colê xwe.
Bi ceng û fir û perwaz,	Ta ko nebin belengaz.
Baz enirî wekî şer	Xwe çim kire serbejêr.
Çûk ket nava pencênê baz,	Reben kir qir û awaz.
Çûkî gote bazê pîr:	Te ez girtim bûm hêşir.
Gote bi qir û zarî:	Ger min bixwî tu karî,
Belê zikê tey mezin,	Qe têr nabe, j'laşê min.
Bazê me çûk azad kir,	Bi tiştêkî xelat kir.
Xelat kir bi malê xwe	Jê re xweş kir riwê xwe.
Xem û kulên çûk ne man,	Firî çû ber bi ezman.

Wê hingê Melik Xelil xelateke mezin li şivan kir û kêfa xwe gelek jê re anî. Ev çirok ji Melik re bi şîret û Melik jê girte ibret.

HESAR: 9 - 4 - 1936

DILISTAN

de û bi zmanê erebî haşîyeke kiçik li ber vê nivîstê nivîsandiye û gotiye: Tarîxa wefata Melê ne xuyaye. Lê divêt berî an piştî siltan Fatih emrê Xwedê kiri be. Li gora qesîdeyên wî Mela di pey Fatih re çûye rehmêt.

C. A. B.





## LËNINGRAD

Di nav bajarên ûris de pişti Moskoyê Leningrad e. Iro di dora Leningradê de şerine (wîndar çêdibin. Di radyowên dinyayê de ier û her navê Leningradê tete gotin. Bi vê pencestê me dil kir hin tiştan li ser Leningradê, ji xwendevanên Hawarê re bidin zanin.

Mintiqa Leningradê, bi hatinên xwe ên zebihî û madenî ji her derê Rûsyayê hejatiir e. Ji lewre dewletên dorê hergav çavên xwe berdidan vî welatî. Di pêşiya sedsala (esir) sêzdehan da ordîwa Îsvêçê gilaştî bû lieta çemê Nêva Lê ûrisan îsvêçî şkenandin, ew bi sùn de veqerandin û avêtin derveyî tixûbên xwe.

Lê Îsvêç ji wî erdê dewlemend ne digerya. Di pêşiya sedsala çardehan de îsvêçiyân dîsan dirêjî welatê ûris kir û ketin erdê ûris û herê xwe dan bajarê Novgorodê. Lê îsvêçî vê carê ji şikestin û veqeriyân welatê xwe.

Di sedsala hevdehan de îsvêçiyân bi arakariya poloniyân zora ûris birin û ketin erdê Leningradê, û keheha Kronstandê ava kirin. Ev keheh iro di behra Baltikê de wargehê stola ûris e, û di pêşberê Leningradê de ye. Îsvêçî sedsalêkê li hire man û hatinên vî welatî xwarin.

Di sala 1703an de çarê ûrisan ê hi nav û deng, Pétroyê mezin, îsvêçî jî welatê xwe derêxistin. Heta hingê bajarê Leningradê nin bû. Pétro rabû li wê derê li ser çemê Nêva bajarêk ava kir û nisbet bi navê xwe ve navê Pétresbûrgê lê kir, û payîtextê ûris ji Moskoyê guhaste vê derê. Navê vî bajarî du caran hate guhartin. Di sala 1914 an de bû Leningrad. « Burg » bi elmanî « Grad » bi rûsî ye, û her du jî bi mîna hirc û bajar in.

Di sedsala nozdehan de Leningrad gelek pêş ve çûye û bûye merkezeke sinahî. Bolsêvîkî jî di vî bajarî de rabû û di sala 1919 an de Lénin zora eskerên çar birine û ew digel malbata çaran jî Leningradê derêxistine û ala sor çikande ser seraya çaran.

Ji awirê sinhetê ve Leningrad ji Moskoyê ne kêmtir e. Di sala 1939an de mîkdarê emeleyen ko di febrîkeyên Leningradê dixebitin (1200000) peya bûn. Di mintiqa Leningradê de ji febrîkeyên selloz û elûmînyom pê ve her texlît destegahên sinhetê hene. Hin febrîkeyên çek û posatan jî peyda dibin. Nifûsa Leningradê (3191000) e. Di salên paşîn de di dora bajêr de bi tene şêst febrîkeyên kewçûkê hatine çêkirin.

## PERÎŞANÎ

Li taxa Mihaciran, ji oda xwe temaşa hexçeyên Şamê dikim. Ji nişkê ve zozanên Kurdistanê ên bilind, bi dar û avên cemidî tén bira min. Ez xwe li wê derê, li ser kanîkê, li bin daran dibinim. Doraliyên min giş heşinayî ne. Ji bihnên xweşik pozê min vedibe û singa min hildibe. Ji nêzik, weke nalîne, dengê blûrekê têt, serê xwe radikim: şivanek pezê xwe tine avê. Çiqas bi kêf im, çiqas bextiyar im, bihuşt! bihuşteke rastîn.

Şivan li blûra xwe, hin bêtir bi keser dixê; laşê min giş dilerize, xwe ji bir dikim.

Gava çavên xwe vedikim, li her xwe du jendermeyên romî dibinim. Çavên wan sor in û ji rûyê wan lanet dibare, yek ji wan, tîfinga xwe ji milê xwe radike, bi dengêkî hişk û bi zmanê xwe, ji şivan re dibêje: Bes bizire, ka ji me re berxeki bine.

Şivan fehîm nake; şaş û bi tirs li wan dinêre. Jendermeyê din dikeve nav pêz û li berxeki qelew digere. Şivan razi nabe, lê bi zimanê wan nizane. Bi destê xwe îşaretan dide û dibêje: « Meke l berde l berde l » jendermeyê din tîfinga xwe hildike, dirêjî şivan dike, dibêje: « Blûr qey ne bes bû, tu bi kurdmançî jî dibêjî » û berdide. Şivan bê deng dikeve erdê û pez belav dibin. Xwînxwaran bihuşt kirine dojeheke dijwar.

Bi girin van deran berdidim û tén Cizirê. Wexta peleyiyê ye. Her der zer, zer e. Li zeviyân, jî dûr ve wek heywanan, tiştên bi can, li ser çar lîngan dilivin. Nêzikî wan dibim, bi qelafeta bedewiyân insanan dibinim. Lê bi kurdî dipeyivin; laşê wan ê tazî û spî, nerm û xweşik li ber tava Cizirê şewiti û reş bûye. Ji rûyê wan xwêdan dilop dike. Lê wek makinê dişuxulin. Bi wan re jin û zaro jî bene. Pirekan, zaroyên xwe ên serşîr avêtine erdê, nav toz û axê. Mêsan rûyê wan girtiye. Ji cilên wan ên genî bihnên pis tén.

Zaroyên deh donzde salî arikariya wan dikin. Nivtazî ne, pêxwas û serqqt in. Ji tavê, çavên wan bi zor vedibin. Bê mekteb û xwendin in!

Ji milê din Leningrad bajarekî ilm û zanistiyê ye. Tê de 58 unîversîte, 41 mozexane û 140 civatên her texlît zanistiyê hene.

Piştî mirina Lénin navê bajêr bi tema-mî guhartine û kirine Leningrad.

SMÂNÊ SERHEDÎ

Li dora xwe dinêrim: darek mine. Lê xaniyên wek koxên mirîşkan, dibînim.

Diçim rex wan. Ji derî ve serê xwe xwar dikim, diçim hundir. Alîkî, mezeleke tart, bê pênçere û nîzîm; li qunciçêkê nexweşek dinale, li alîkî jî kerek dizire. Bihna min teng dibe. Zû xwe tavêjim derve.

Ev e hal û jiyîna wan. Çandina wan çî ye? Çend elb genim û ceh. Bêtirê wan jî cotê axan, an xwedî erdên biyanî dikin. Piraniya wan, jî niha de malê xwe bê qîmet firotiye. Ji ber ko birçî û tazî ne, belkî jî deyindar in. Ên mayî, li pehîzê, jî destê tîca rên bê wîjdan, wê çî bikişînin.

Zilma memûr û jenderman jî li ser e. Şêx jî hene: Piştî paleyî û rakirina benderan deynê şêxan dimîne.

Roja çejnê ye. Ez van gundiyên reben, belengaz, cahîl, bê mirşîdên rastîn û xwedî wîjdan, li cem şêxê wan dibînim. Cilên wan peritî ne, hin pêxwas in, û jî dûr hatine.

Tên, jî dûr ve destqîfîlî, serxwar, li ber şêx disekinîn, paşê bi dor diçin secdeya weklîê Xwedê, weklîê pêxember, û dergevanê bihuştê. Lingên wî, destên wî maçî dikin, tişteklî didin ê û bi fehîf, bi tîrs û telaş li ser çongan, pêlepaş dimeşin û derdikevin.

Dinê û bihuşt tev de kar kirine. Niho ewê herin mal, û çend mehan, di koxikên xwe de, nanê tîstî û savar bixwin û jî dinê bê seber li benda biharê bin. Bextiyar in!

Vedigerim Samê, serê xwe jî pênçerê derdixînim, jî qesrên delal dengê radyowan û perwaneyên elektrîkî tên. Li ser cadeyêu pak tremway dimeşin. Li ezmên balafîrek digere. Bê hemdê xwe keseran dikişînim û jî xwe re dibêjim: nezanî... nezanî... nezantî... perîşanî.

Şam: 10 Tirmeh 1941 NÛREDÎN ÛSIF

## SOND

Rojîne derbashûyî... rind nayê bira min. Dersxana me yektebeq û nesîwaxkîrî bû. Gava deriyê kûçê dihate vekirin dehlîzêke teng û tarî û paşê hewşêke bêdar, rût xuya dikir. Di hewşê de Bermîleke avê, zîngarî hebû ko ne bi ava bê destmêj digirt.

Keçîk û lawîkan bi hev re dilistîn, bi hev re dixwendîn.

Xoca mezin jin bû; bejîndirêj, piştixwar û hebek mejçelqiyayî. Xocê biçûk kurê xoca mezin bû, hêj zarok bû.

Ez, li dawîya zarokan gişan rûdiniştîm ko darê xoca mezin negihêje min. Ji ber wê yekê navê min bû bû «Rovî». Ji xwe di dersxanê de her zarok, li ser awayê tebiyet û şiklê wî, navêkî zêde lê hati bû kirin. Gurê har, Mişkê kewarê, Gabelek....

Di dersxanê de awaktî cezayê hebû, felaqê. Heta keçikên mezin jî xwe jî felaqê xelas ne dikirin. Kesê ko jî felaqê ne tirsîya û jê ne recîfiya tine bû. Ewê ko cirma wî biçûk ba, xocê biçûk bi çend şîmaqan û xoca mezin bi çend daran canê wî ditevizand û serê wî diwerimand.

Ji aliye lîxistinê para min jî gişan kêmtir bû. Bi tenê carekê xoca mezin jî ber «derew» kê. guhê min pir zêde kişand û ez eşandim Heta çend rojan sorbûn û êşa guhê min ne çû... Digel wê qasê tu qebaheta min tune bû û min «rast» gotî bû....

Rojekê, zarokekî bilbiloka bermîla nîmêjê şikandi bû. Her du xocan dixwest bizanîn xwediyê wê cirmê kî yê? Yê ko ew şikandi bû zarokekî biçûk, ziravok, nexweş û bêcan bû... Min ew jî xoca mezin re got. Xocê dikira ew havêta felaqê Wî jî înkâr dikir. Wê gavê zarokekî din hate ba xocê û got: «Yê ko bilbilok şikandiye ez im û ne Mîsto ye». Û xwe li ber felaqê dirêj kir. Hîngî darê xoca xanimê hilat û daket; zarok bi kel û girî, bi ax û waxîn bîst, sî dar xwarin. Paşê xoca mezin li min veşariya û got: «Te çîma derew û bêbextî li hevalê xwe kir?» Wê gavê guhê min çend caran û wer kişand ko ez jî erdê bilind dibûm....

Ez giriyam... giriyam... çîma ko min derew ne kiri bû. Belê, yê ko bilbilok şikandi bû Mîsto bû; û min ew bi çavê xwe dîtî bû û paşê min jî xoca mezin re gotî bû.

Piştî ko em jî dersxanê belav bûn, min ew zarokê ko derew li xwe kir, û xwe li ber felaqê dirêj kir, dît û min bi destê wî girt û jî wî pîrsî:

— Te çîma ez derewker derêxistim û te bi ser de derew li xwe kir û bê sebeb te xwe da ber kotekan; te bilbilok ne şikandi bû.

Ewî got: Belê, min şikandi bû....

— Na, te ne şikandi bû, Mîsto şikand; min ew bi çavê xwe dît û paşê min jî xocê re got.

Êdin nikarî bû rastî veşarta, li rûyê min nêrî û qederekî ma û paşê jî min re got: «Heke tu sond dixwî ko jî xocan re nebêjî, ezê rastiyê bêjim». Min jê re sond xwar, jî min re bû bû meraq. Ewî got:

— Belê, bilbilok Misto şikandi bû, ez ji pê dizanim, lê ew pir bêcan e, nexweş e, tu nabîni, ma dikare xwe li ber felaqê bigre.

— Te çima li dewsa wi kotek xwar?

— Çima? Çima ko min bi wi re sond xwariye. Ew iro nexweş e, ez rehet im, min ew xêlas kir.

— Sond çi ye?

Ewî got: Ma tu nizani? Min got: Na. Hebek hi dîr ket û got:

— Em xwîna hevdû dimêjin û bi hev re sond dixwin. Yên sondxwarî dibin xwîn-birayên hev û heta mirinê bi her awî arikari û alikariya hev dikin.

Paşê, min bala xwe da, gelek zarok bi hev re sond xwari bûn.

Rojekê, min ev bi çavê xwe dit. Xocê biçûk, li ber bermîla avê destmêj digirt. Xoca mezin, paşiya wê li me bû; nimêj dikir. Du zarokan bi kêreke dardestî, milên hev diqelişand; dilopên xwîna sor di cihê birinkirî didan û dimêtin, û bi hev re sond dixwarin.

Sondxwarin û xwînbiratî ji min re bû bû meraq. Xwînbirakî min heba, gava xoca mezin guhê min dikişand, ewê xwe dida ber min û ne dihişt ko guhê min bête kişandin û carina ji ez ji felaqê xêlas dikirim.

Di nav dibistanê de min xwe bi tenê didît. Hinêk hevalên min hebû. Lê me bi hev re sond ne xwari bûn û em ne bû bûn birayên hev.

Rojekê min daxwaza xwe ji diya xwe re got; min ji wê re çiroka sondxwarinê da zanîn. Diya min rûyê xwe bi min re tîrş kir û got: « Nebe ko tu dîn bûyî; ez wisan zarotiyay naxwazim ».

Lê min gub ne da ê; min ev tişt « sond-xwarin » da bû ber çavê xwe. Min dixwest ji nav hevalên xwe xwînbirakî qenc bibijêrim. Rasthatineke xweş, ji min re ev heval bû xêş kir. Rojên inê zarok giş li nav bexçê mala me dicivîyan. Helanî êvarê me bi hev re dilist. Hevalekî min hebû ko ji wi bêtir navê wi bi min xweş bû. Ewî gelek caran piştê gurê har datani erdê. Gurê har, navê ko Xocexanim li « Cemo » kiri bû. Cemo bi rastî mîna gurekî har bû; canê gelek zarokan dişewitand.

Sindik Havinê, her rojên inê, bi xwe re destek darên bihê diani. Me ji van daran ji xwe re hesp çêdikirin û em bi hev re derdiketin cirdê.

Rojekê ji rojên inê dîsa Sindik bi xwe re gurzek dar anî bû. Min ji xwe re yekî dirêj û rast bijart û bi kêreke tûj min qaşilê

wi diqesart û ji hespê xwe re guhik û pazik derdixistin; min hespê xwe çêdikir.

Sindik û hevalên din li benda kêra destê min bûn, da ko wan ji mîna min hespên xwe çêkirina Nizanim çawan bû, carekê min dit kêra destê min, ji nav qaşilê darê çerixî û xwe gihand tiliya min a biçûk ya destê min i çepê û ew birin kir. Xwineke bi av û sor jê herikî. Di wê gavê de tiştê hate bira min. Sond xwarin. Min êşa tiliya xwe ji bir kir û ji Sindik re got:

— Rabe Sindik, destê min hazir e, tu ji destê xwe birtu bike, da ko em bi hev re sond bixwin û bibin xwînbirayên hev.

Sindik hebek dama, bi çavên xwe ên reş li erdê belek nêri û got: Ma dibe wisan, ji bo xwînbiratiyê divêt em xwîna zendên hev bimêjin.

Min got: Çi xem e lo!... ma ne xwîn e, ba ji dest, ha ji zend.

Sindik got, baş e, û kêr ji destê min girt û zendê xwe vemalt û birî, heta hebekî kûr ji birî. Xwîna wi hewqas tîr bû ko ne diherikî; ew bû dilopek û rabû. Me xwîna xwe tevli hev kir. Berê min mêt; tiştêkî şorgerm bû. Paşê wi xwîna tiliya min mêt.

..

Nayê bira min. Di pişt re çiqas zeman derbas bû, nizanim... mehek, salek. Min ji bir kiri bû ko ez û Sindik bûne xwînbirayên hev. Dîsa em bi hev re diçûn dibistanê, û em bi hev re vedigeran. Rojekê, dinya gelek germ bû Xoca mezin di nivê rojê de, em serbest herdan, mîna rojên pêncşembê... Ez û Sindik hêdî-hêdî vedigeriyan mal. Min destmala xwe dani bû ser serê xwe. Xwêdan ji eniya me diherikî, em li ser rêke biçûk û teng dimeşîyan. Ji nişka ve kûçikekî reş û mezin derket peşiya me. Li pê wi çend zilam bi darên xwe bi dû keti bûn. Ji dîr ve deng li me kirin û gotin:

— Xwe bidin ali, ewê bi we bigre...

Em tirsîyan û şaş man. Min got, eman em birevin. Çavên kûçik sor bû bûn; mîna agir dibiriqîn. Kûçik nêzîkî me bû bû. Sindik got, tu xwe li paş min veşêre, û xwe da peşiya min. Kûçik dirêjî wi kir; Sindik ji xwe avête ser wi. Mîna ko bi navê bileyizîn; destên xwe di nav piştê hev re birin û anîn. Kûçik ji rabû bû ser lingên xwe. Paşê her du ji ketin erdê.

Ev şer bi min pir dirêj hat. Ji tirsan ez direciffm. Zilamên ko bi dû kûçik keti bûn, gihiştin cem me û bi darên xwe li kûçik xistin.

# KURDÊN

## ECEMISTANÊ Û HALÊ WAN

Şevêdi çend xort hati bûn nik min û bi hênceta işê Ecemistanê hin tişt li ser kurdên ecem ji min pirsin.

Xortan dipirsi: Li Ecemistanê çiqas kurd bene û ew di çi hali de ne? Tixûbên wan digehin heta kû derê? Bi ketina ûris û Ingilizan wan welatan gelo halê kurdan hinek naguhêre û ew kurd, ji hatina van dewletan tu fêde nabînin?

Min û xortan li ser van pirsan me gelek xeber da. Min dil kir xwendevanên Hawarê ji li ser vê axaftinê ser wext bikim. Evê xwestinê ev bend aniyê pê.

Me got kurdên Ecemistanê. Gava mirov vê gotinê dibîne û dixwîne dibêje qey welatek heye jê re Ecemistan dibêjin û tê de hin

---

Sindik xelas bû. Lê reben, ji serçavê wî xwîn diheriki. Kûçik dêla xwe kir nav lingê xwe, serê xwe bera erdê da û çargav revî. Sindik ji min re got: « Metirse, tiştêk ne bûye, bîrîn biçûk e ». Zilaman ew kirin himêza xwe û ew birin mala wî. Ez jî bi rev çûm mal, û min serhatiya xwe ji diya xwe re got.

Roja din Sindik ne hat dibistanê. Min ji diya xwe re got: « Yadê em herin mala wan, Sindik bibînin ». Diya miş qail ne bû. Ewê digot, Sindik nexweş e, nabe ko em herin wî nerehet bikin ».

Paşê, her sibe, bi bêviya ko ez Sindik bibînim diçûm dibistanê; lê heyhat!... ew qet ne dihat. Meger ew kûçik har bû. Sindik birin Diyarbekrê ser tixtor û ji wir jî bîri bûn Stenbolê. Paşê me bihist ko Sindik mûriye.

Her rojên Havînê ko zû ji xew radi-bim û sibehên ewravi dibînim, mina herkesî, zarotiya min tê bira min. Welatê min i kesk, cihê ko lê hatim dinê tê ber çavên min û bê hemdê min hêstirên min diherikin ser destê min ê çepê. Li tiliya xwe a biçûk dinêrim, li ser movika navîn; li dewsa wê birina perestêşî xêzeke biçûk û spî xuya dike, û hêj germiya lêvên hevalê min ê fedakar tê de ye. Di pişt re xeyaleta havalê xwe a qehreman, wî hevalê ko ji bona sonda xwe, ji bona xelasiya hevalê xwe, bi kûçikê har re pence pence şer dikir.

Salqin : 12 - 9 - 1941

QEDRÎCAN

kurd hene. Disan gotinên kurdên Tirkîyê û Iraqê jî dikarin bi vi awayî bêne mana kirin. Lê rasti bi awaki din e, esil kurd in, esil Kurdistan e.

Welatê kurdan, Kurdistan welateki bi hev ve ye. Miletine din ketine wî welatî û ew welat perçe kirine û her perçe ketiye bin hikmê dewleteke din. Ji lewrê gava em kurdên Ecemistanê dibêjin mexsed ew kurd in ko di wî birê Kurdistanê de dijîn ko ketiye bin hikmê eceman. An ne kurd di her derê de di welatê xwe de ne û di tu derê de ne mêvane xelkê ne.

Em vegerin ser pîrsa xwe a bîngetin, kurdên Ecemistanê.

Birê Kurdistanê ko iro di bin hikmê eceman de ye welateki mezin e, û xelkê wî xelkê boş e. Roavayê Ecemistanê ji bakur heta nivro, hesêb tev de Kurdistan e.

Di teşkilata eceman a kevî de wilayeteke Kurdistanê jî hebû. Lê, nemaze piştî ko Şahê Pehlewî li ser textê Ecemistanê rabû bêjeyên kurd û Kurdistanê li Ecemistanê jî bûne kufr û bilêvkirina wan hate bend kirin. Herwekî tirk jî me kurdmanca re tirkên çiyayî dibêjin, eceman jî navê ecemên çiyayî li me kirine. Bi vi awayî em bûne tirk û ecem, lê em mane çiyayî û ne bûne deştî. Lê gava ew jî me re çiyayî dibêjin mana hovbûnê tê de vedişerin. Ji xwe heke ew çiya ne biwan Xwedê dizane beta niho çi ji me dikirin.

Herwekî me got roavayê Ecemistanê ji bakur heta nivro tev de Kurdistan e. Ev Kurdistan bi Kurdistanên Tirkîyê û Iraqê ve ye. Ji nivro her bi bakur ve Kurdistanê ecem, bir bi bir bi awayê jêrin bi nav dihe: Loristan û eşîrên bextiyari, Kirmanşahan, emareta Erdelan, Mikri û Sawichlax, nivroyê wilayeta Azerbeycanê. Roavayê gola Êrmiyê : di vê mintiqê de û di her sê qezayên Xoy, Selmas û Êrmi de zehf kurd hene. Herçi qeza Makû, hesêb tev de kurdmanca e. Di hir ve kurd digehin tixûbên Qevqasê. Di Loristanê re jî digehin hebrê, Xelica Besrê, bendera Benderbûşîr.

Ev, Kurdistanê Ecemistanê ye ko herwekî me got bi Kurdistanên Tirkîyê û Iraqê ve ye. Jû pê ve di gelek cihên Ecemistanê de kurd hene.

Di dora Tehranê de eşîra Pazokî. Li Xuresanê eşîrên Pejnewend, Bawenor, Zehferanlû. Li Hemedanê eşîrên Cozkan. Li Mezin-dranê eşîra Modanlû. Di wilayeta Fâris de

eşirên şevankare. Erdê van eşiran dige-  
he Xelica Faris, Benderebasê. Di Iraqa ecem  
de eşirên Embarbo. Di navbera Qezwîn û  
Gêlanê de eşirên Omerlû. Di her çar wila-  
yetên Kirman, Gêlan, Xûzistan û Qehistanê  
de ji kurd hene.

Gelo nifûsa kurdên Ecemistanê çi ye?  
Ne bi tenê li Ecemistanê, lê di tu derên Kur-  
distanê de nifûsa kurdan bi temami ne nas  
e. Ji ber ko tirk û ecem gava statistikan  
çêdikin nifûsa kurdan nadin zanin. Lê her-  
hal kurdên Ecemistanê divêt ji du milyon  
bêtir bin. Dr. Blêç Şerkûh wan digihne  
3 300 000.

Beriya Şahê Pehlewî Ecemistan dew-  
leteke mirî bû. Smail axayê şikakî ye ko bi  
navê Stmko deng daye ji waliyên Ecemistanê  
xweyiki (xokî) distandin. Digel vê hindê ece-  
man siyasetek di heqê kurdmancan de hebû.  
Ewan jî weke tirkan dixwest kurd temsîl bi-  
kin, yanî kurd bikin ecem. Ev siyaset nema-  
ze di wextê şahê Pehlewî de xwe eşkere kir.  
Beriya wî ev siyaset wek marekî sermadîtî  
bi tenê dâvê xwe tev dida, bêt ko bikare  
serê xwe hilde û jehra xwe birijîne.

Di vê Kurdistanê de emareta Erdelan  
berberî bi şahên ecem dikir. Şahên ecem, ji  
ber ko bi xurtî bi mirekên Erdelan ne dika-  
rin tevdireke din ji wan re diti bûn. Nermi-  
ya jinan. Şahên ecem bi vê nermiyê ew sist  
kirin û paşê ew şkênandin. Belê şahên ecem  
keçên xwe dan mirekên Erdelan, ew kirin  
zavayên xwe û bûn xwezûrên wan. Bi keçên  
şahê ecem re efonkeştî û meyxwerî ji ketin  
qesra wan mirekan. Piştî çendekê keçên şahê  
ecem ne bi tenê jinên mirên Erdelan bûn;  
lê bû bûn diya wan jî. Êdî karê hikûmetê,  
işê kurdên Erdelan ketî bû destên xwarziyên  
şahê ecem û wan bi ray û tevdira diyên xwe,  
yên ko keçên şahê ecem bûn ew digeran-  
din. Pêşdetir ew xwarzî çûn ser mezheba xwalên  
xwe jî û bûn şîhî. Nemaze di wê heyamê de  
sintî û şihîlî wek kufr û imanê dijminên  
hev bûn. Herçî kurdên Erdelan sintî bûn.  
Gava mirên wan bûn şîhî ewan rû ji wan  
ba da û bi vî awayî ew xelk ji destên mirên  
xwe derketin û mirekên Erdelan wek şivanê  
bê kerî di çola Xwedê de bi tena xwe û  
xelkê wan bêserî man, û ew wek keriyê ko gu-  
ran bi ser de girtî ji hev belav bûn. Ji xwe  
eceman jî ev diviya bû. Ji bona ko bikarin  
wan yeko yeko bêxin bin destên xwe. Welê  
ji bû.

Di wextê Pehlewî de siyaseta eceman  
di heqê kurdan de li her siyaseta tirkan  
hati bû girtin. Şahê Pehlewî piştî ko ordiwa  
wî gihaste 80 000 menawreyek di Kurdistanê  
de çêkir û kurd jî çek kirin. Herçî me-  
zinên kurdan, yên ko av bi wan sar û germ  
dibû, ew ji anîn Teheranê.

Kurdên Ecemistanê jî wek kurdên her  
derê - ji ber ko nezan in - bi hev ne xweş in.  
Eceman jî wek tirkan, jî vê berberiyê istifa-  
de dikir û eşirên kurdan berdidan hev.[1]

Ji milê din kurdên Ecemistanê di mi-  
liyetê de, ji kurdên hemî deran kêmtir in.  
Ew kurd bêj li xwe hişyar ne bûne. Dizanin  
ko kurd in, lê nizanin kurdîtî çi ye û dax-  
waz û armançeke kurdan heye. Herçî miletên  
bêarmanc zûka winda dibin û têkîli miletine din  
dibin. Ji lewre ji kurdên minewer re yên ko  
firsend bi destê wan dikeve divêt li hişyari-  
ya wan kurdan bixebitin.

Bi hatina ûris û ingilizan welatê Ece-  
mistanê, halê kurdan dikare biguhêre û di-  
vêt biguhêre. Lê ji bona vê yekê jî divêt  
kurd jî van dewletan re şanî heyineke millî  
bidin; da ko ew jî qedrên wan bigirin.

[1] Di vê babetê de ezê ji xwendevanên  
re tiştê ko min bi xwe dit û bihistiye bidim zanin.  
Di sala 1930î de Şahê Pehlewî, ji ber ko min ji  
ya wî ne kiri bû, ez ji Teheranê ajotî bûm Iraqê.  
Li nizingî Kîrendê, di çayxanekê de me bîhna xwe  
dida. Mihafîzê min çû bû destavê. Ez bi tenê ma  
bûn; min çavên xwe li dora xwe digêrand. Di  
alîki çayxanê de çend peya bi cilîne nîveskerî  
rûniştî bûn. Nizanim çîre, min guhî da axaftina  
wan. Bi kurdî dipeyivîn. Min nizingî li wan kir  
û min zani ko ew jenderme ne, lê jendermeyên  
çolê. Belê îşê wan di bajarane de nin bû. Yekî  
ji wan nivjenderman gote min:

— Belê ji me re ji dibêjin jenderme, lê em  
jendermeyine texlît in. Ji xwe tu nabînî cilên me  
nivî mirî nivî kurdmancî ne. Em wek jendermyên  
din timobilan nasêkinîn û ji xelkê pirsîyariya  
tezkeran jî nakin. Îşê me kuştina nijdevanan e.  
Em kurd in, ma tu jî ne kurd î? (Min got belê).  
Xelkê wan welatan hemî kurd in. Eşîra teniştê me  
neyarê me ye. Me gelek mêr ji hev kuştine. Bi  
dor em li hikûmetê asê dibin û wêrgûyê nadin.  
Hikûmetê dizane ko em pev ne xweş in; radibe  
destê yekê digire û li a din dixê. Par em li  
hikûmetê asê bû bûn, neyarên me bûn jenderme  
û li me dan. Îsal ew li hikûmetê asê ne, em bû-  
ne jenderme û li wan didin û heyfa xwe ji wan  
hiltînin. Me gelek ji wan kuştine, lê hêj me 35  
mêr di zikê wan de hene.

Di vê demê de miheffîzê min bat û got ko  
timobila me kar e. Em bi rê ketin.



## REWŞA DINYAYÊ

**IŞÊ JAPONYAYÊ** — Japon hevalbendeki mihwerê ye, yanî hevalbendê elman û talyan e. Ji xwe beriya vî şerî jî ji van her du dewletan re dewletên mihwerê digotin. Mihwer xeteke xeyalî ye ko Berlin û Romayê digehine hev.

Herwekî xwendevanên me dizanin japon jî piştî şerî kete vê tifaqê û jî her ko bi japonan xwediyên vê tifaqê ên mezin bûne sîsê, navê tifaqa sêbendin jî lê kirine.

Ev çar sal in Japonye di rohelatê dûr de şerê Çînê dike û hêj zora wê ne bi-riye. Yanî serê Japonyayê ne bê teşxele ye. Lê Japonye di rohelatê dûr de armancine mezin hene. Berî her tiştî Japonye dixwaze lingên ewropayî û emêrikuniyan jî rohelatê dûr qut bike û wan veqerîne welatê wan. Ji vî karî re jî ji tro çêtir firsend nîne. Ingiltere şerê elmanan dike, Emêrike jê re çek û ceberxinan çêdike. Jû pê ve Emêrike xelkê xwe hazir dike, roja ko xelkê çîna xwe pê anî Emêrike jî tişta xwe wê biteqîne.

Japon di vî deravî de bêqerar e. Carîna dengê xwe bilind dike, diçe wî serî têtê vî serî û zîrtê xwe dide. Li şerê Ūris fedikire û gava dibîne ko Ūris li ber xwe didin û zû zû naşken dengê xwe nizim dike û dibêje ez dixwazim her îşê xwe bi aşiyê saz bikim û radibe berê xwe dide Emêrikê. Ji xwe di meha Îlonê de serkwezîrê Japonyayê ê berê mektûbek jî mister Rûzvelt re nivisandî hû û japon û emêrikani dest bi dan û şandinê kiri bûn. Mizakere bi xef hû û mister Rûzvelt bi xwe ew mizakere digeran. Lê jê tu netice derneket û li 16ê Çiriya Pêşîn ajansan da zanin ko wezaretê mîr Konoyê istîfâ kiriyê.

Sibetirê general Toyo wezaretê japonî teşkil kir. Ingiltere û Emêrike bi vê guharîna wezaretê japonî gelek bendewar bûn û guhên xwe bel kirin. Gelo wezaretê Toyo wê çî bike?

Herhal bi ketina wan dewletan erdê eçem, bivê nevé zilma eçeman di heqê kurdan de wê kê m bibê û heke kurd dil kirin û herwekî me got şanî heyîneke millî dan, aeye ko bigehin hin heqên xwe jî.

Şam 24 Îlon 1941. **HEREKOL AZİZAN**

General Toyo jî terefdarên Japonya mezin û jî terefdarên şer e. Dinyayê got Japonyê hikûmeta xwe guhart, dike bikeve şer. Serkwezîrê nû general Toyo nitqek da û têt de nemaze li çar niqtan îşaret kirin :

1 — Qedemdina şerê Çînê

2 — Pêkanîna yekîtîya Asyayê

3 — Di hundirê wêlêt de yekîtîyeke millî anin pê

4 — Tevgirêdana Japonyayê bi dewletên mihwerê xurtir kirin.

Wezaretê general Toyo wezaretê serdarên eskerî ye. Yanî esker di warê siyaseta de zora sivilan birine û jî her vê yekê Konoyê istîfâ kir û Toyo hikim xiste destên xwe.

Lê Toyo jî ne wêrî hû bikeve şer. Çîre? Wer dixuye ko serdarên Japonyayê jî hû bûn xapinoxên nitqa Hitler a paşîn. Hitler bi wê nitqê dida zanin ko ordîwa Ūris jî hev de ketiye û hew bi kêrî şer têt. Li ser vê yekê japonan gotî hû dora me jî hatiye divêt em jî dirêji Sibiryayê bikin û para xwe jî mirata Ūris bibin. Herwekî kurdanc dibêjin : ko ga ket erdê kêr zehf in. Lê japonan hala xwe da û dit ko jî bervajî gotîna Hitler ve ga hêj ne ketiye erdê û jî piyan sekini ye. Japonan gava ev dit kêra xwe veqerand kalanê wê, û veqerîyan siyaseta herênayê.

Di şerê Ūris de wezhiyeta japonan mîna wezhiyeta talyanan di şerê Frensê de ye. Japonyayê li Mençûriyê li ser tixûbên Ūris yê rohelê esker kom kiriyê da ko Ūris mecbûr bibê birekî eskerên xwe li ser van tixûban bihîle û van nebe qada şerê roavê, pêşberê elmanan.

Herwekî me got Japonye carîna fortê xwe dide; rojnameyên japonî li Emêrikê radibin. Dinya dibêje qey Japon sibe bikeve şerî. Lê... paşê ba digubêre, li şîna bayê kurî xurt bakî xerbi î xweş û nerm radibe.

Ji xwe îşê japonan zehmet e. Ji ber ko heke Japon xwe tev da divêt, jî Çînê pê ve, şerê sê dewletên din bike, Rûsyê, Ingiltere û Emêrike. Stola emêrikani xurt e. Ingilîzan jî di behra japonan de stolek heye.

**REWŞA EMÊRIKAYÊ** — Emêrike hêj ne ketiye şer. Lê bi her awayî arikariya ingilîzan dike û jê re dixebite. Cenkeştîyên wê vaporên ingilîzî, jî çek û ceberxanê dagirtî, ditînin heta girava Îslândayê û wan bi rê ve jî noqarên elmanî dihemtînin. Elmanan heta niho jî dehanî bêtir vaporticeretên emêrikani bin av kirine. Li 17ê Çiriya Pêşîn

noqareke elmani di nizingî Islandayê de bera torpiyoreke amerîkanî — bi navê Kerney — da û ew birîndar kir. Bertorpiyor ne xerîqt, lê ji deryavanên wê 11 peya hatine kuştin. Digel vê hindê navbera elman û emêrikanîyan hêj ne şer e.

Li 27ê Çiriyê reiscimbûrê Emêrikayê Mister Rûzwelt nitqek da û tê de dirêji Hitler kir û careke din ji dinyayê re da zanin ko Emêrike xwe ji boyl şer kar dike.

Rûzwelt di vê nitqê de wek reisdewletê mileteki şerevani xeber daye. Lê qala Japonyayê ne kiriye. Dîhêjin ko ev elametek e ko Emêrike digel japonan di mizakerê de ye.

Ne bi tenê Rûzwelt qala Japonyayê ne kiriye, lê Emêrikê da zanin ko ji ûrisan re di riya Veladivestokê re êdi çek û çeberxanê naşue. Bi vi awayî heçko Emêrikê ji ya japonan kir. Ji her ko japonan çend caran ji Emêrikê re goti bû ko nikare lê razi bibe. Ji lewre Emêrike divêt çek û ceberxanê ji ûrisan re di riya bakur yanî di bendera Erkenjêlskê re an di nivro di riya Ecemistânê re, bişîne Riya bakur zehmet e, ji ber ko Zivistanê pêde bendera Erkenjêlskê dicemide. Herçî riya nivro gelek dûr e; ji Emêrikê he-ta wê derê 12000 kilometir e. Elnan ji dikin bikevin Qevqasê û vê riye bigirin.

**ŞERÊ ÛRIS** — Îro hemî dinya qala şerê ûris dike û herkesî çavên xwe berdaye wê qada cengê. Ingilîz û emêrikanî cehda xwe dikin ko arîkariya ûrisan bikin û nehilin ko dewleta bakurê Asyê û Ewropayê di bin lîngên eskerên Hitler de bête pelaxtin. Ç heq di destên wan de ye. Ji ber ko îro di pêşîya Hitler de kes ne maye ko li Ewropayê şerê wi bike. Şer dom dike û hero ji roja horî xurtir dibe. Ûris ji bi mêrani şer dikin û gelek li ber xwe didin. Herwekî stranê gotiye di vi şerî de, bihustê lawê bavên bi lire ye.

Hitler bi xwe da zanin ko şer xurt bûye û wê hêj xurtir bibe. Belê fûrer yanî rêberê elmanan li 4ê Çiriyê pêşin, li Berlînê û bi hêncela arîkariya Zivistanê nitqek da.

Hitler di nitqa xwe de, nemaze qala şerê ûris kiriye û xwestiye ji miletê xwe re bide zanin çire ev teşxela mezin aniye serê wi. Bi kurtî Hitler ji miletê xwe re got; min bala xwe dida û didî ko ûris bi me ne rast e û dilê xwe li me xerab kiriye, xwe pêk dîtine û dike li me xe. Ji lewre min da eq-lê xwe gelo ez li hêviya derba wi biminim an ez rabim û beriya ko ew li me xe ez li

wi xim. Min lêxistin di ser hatin lêxistinê re girt, û min ne xwest firsenda lêxistinê bidim dijminê xwe. Min ev fikir gihande qerarê û li 22ê Hizêranê emri ordiwa me kir ko dirêji welatê ûris bikin û wê talûka mezin ji ser serê me rakin û imperatoriya bolsêvikiyê ji bini edim bikin.

Ev, gotina Hitler e. Herçî ûris, derew bi aliyê vê gotinê ve diatin û dibêjin, Hitler rastiyê nabêje; me tucaran dil ne kir ko em li elmanan xîn. Em bi wan re dilrast bûn; lê wan hêbextî li me kir. Hitler dixwaze welatê ûris ji wek welatên din bêxe bin destên xwe, lê elmanên reben divêt bizanin ko erdê ûris, herwekî ji ordiwa Nepolyon re bû bû, wê bibe gornistana ordiwa elmanî ji.

Hitler li 4ê Çiriyê got, ev 48 saet in di qada şerê ûris de hicûmeke nû dest pê kiriye û heta çend rojan honê netica vê hicûmê bibinin. Ev hicûm ji bo ordiwa ûris wê bibe derba mirinê.

Bêdiro piştî çend rojan ajansan da zanin ko elmanan di qada nivro û navin de dest bi êrişeke nû kiriye û wer dixuye ko armancên ordiwa elmanan Mosko û riyên Qevqasê ne.

Herwekî me got ingilîz û emêrikanî qerara xwe dane bi her awayî arîkariya ûris bikin û nehilin ko ûris bişkê.

Ev arîkari, ji îro de dest pê kiriye, û dibêjin ko tangine ingilîzi gihastine welatê ûris û bi ûrisan re şerê elmanan dikin. Lê arîkariya ko her du demokrasîyên mezin dibêjin tişteki bê heft û hisab e; lê jê re hinek wext divêtin. Ji milê din dûrahiya rîyan ji heye. Rîyên navbera ûris û ingilîz û emêrikanîyan rîne dûr in; behrin hene ko dikevin navê. Di bejê re ji mîsafeyîne bîpîvan hene. Ji lewre divêt ûris êrişa elmanan bisekinin û bi çekên ko ji Emêrikê jê re bîn, li Biharê şerê xwe xweş bikin.

Elman ji bivê nevé li vê heqîqetê hişyar in û van hisaban bi xwe dikin û dibêjin, heke heriya Zivistanê me zora ûris ne bir û Zivistan li me geriya, li Biharê îşê me, wê çetin bibe. Ji lewre bi çî awayî û bi çî behayi be divêt em di van çend rojan de derbeke welê bidin neyarê xwe ko pê gêj bibe û bikeve axa mirinê.

Belê, elmanan holê got û holê jî dibêjin. Lê mîna kurdmancan gotiye; kirin û gotin ne xweh û bira ne. Ji xwe li gora gotina Hitler diviya bû di nivê Çiriyê de şerê ûris biqediya û ordiwa ûris ji hev de biketa.



Lê welê ne bû. Herçernd elman pêş ve çûne û erdine nû xisti bin ji destên xwe ordîwa ûris hêj li ser xwe ye û bi fedakarîke mezin li her xwe dide.

Hicûma ko Hitler di nitqa xwe de da zanin li 2ê Çiriye dest pê kiri bû. Pîstî şerê Smolenskê şer di eniya navîn de heçko seki, nî bû. Vê carê elmanan ji vê eniyê dest bi êrişê xwe kir û berê xwe da Moskoyê, payitextê bolşevîkan. Elmanan ji bakur û nivro ji dirêji Moskoyê kiriye û heta 60 kilomêtirî nizingî payitextê bolşevîkan bûye, û rexma çêdeke mezin elmanan nikari bû bikevin bajêr. Şer di dora bajêr de dom dike û ûris bi awakî ecêb şer dikin. Ji milê din elman dixwazin ji bakur û ji nivro bikevin piştî Moskoyê û li bajêr hene wer û Mosko ji mina Leningradê bêxin nav çemberê.

Ûris mikur tén ko payitextê wan ketiye talûkeyê. Lê newmid nabûn û şerê xwe xweş dikin. Lê herçî hikûmet ji serfermandariyê pê ve ji Moskoyê rahûye û çûye Semarayê. Semara (Kwîbişef) dikeve rohelatê Moskoyê û jê qedere 1000 Kilomêtir dûr e.

Serfermandarê eniya navîn merêşal Timoşenko bû. Stalin ew ji vê qadê rakir û general Zogov anî şûna wi.

Timoşenko çû eniya nivro. Di vê eniyê de ji rewşa ûrisan zehmet bûye. Ji ber ko elman zora xwe didin vê eniyê ji.

Ûrisan terka Odesê daye û eskerên elman û romani li 16ê Çiriya pêşin ketin bajêr û bendera Odesê. Ûrisan beriya ko jê rabin avahî sewitandin û fehrîke berhewa kirine.

Li 25ê Çiriye elman ketin Xerkovê ji. Niho erîşa elmanan li ser Rostovê ye. Rostov deriyê Qevqasê ye. Şer gîhaştîye deriyên bajêr. Lê ûrisan elman li hire sekinandine.

Ji milê din elmanan avête ser nivgirava Qirimê ji. Berzex yanî erdê ko nivgiravê digehine bejê gelek teng e, 8 kilomêtir e. Ûrisan di vê berzexê de istîhkamine asê çêkiri bûn: Elmanan qedere 15 rojan xwe dane wan istîhkaman û ew şkênandine û ketine rasta Qirimê. Di Qirimê de bendereke mezin heye Sevestepol. Niho elman wê bixwazin di avtenga Kerçê re derbasî peravên Novrosiskê bibin û jê bixwazin bikevin ser riyên Qevqasê. Bi vegertina Qirimê rewşa ûris di qada nivro de wê gelek zehmet bibe. Ji ber ko petrolên Qevqasê rast bi rast dikevin bin talûkê. Ji lewre û li gora ajansan eskerên general Wêvel berê xwe dane Qevqasê. Bivê nevé ingiliz nikare bihille ko elman bi-

## BINGEHÊN GRAMÊRA KURDMANCI

BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHIRVAN

### — 9 —

75 — Pronavên kesin. Ji van pronavan re pronavên kesin dibêjin. Ji ber ko ew, nemaze, dikevin şûna kesan û wan dinimînin. Di kisetê de sê kes hene ko dikevin axaftinê. Ê xeberbêj, yanî yê ko daxêve, û yê ko pê re tete axaftin û kesê ko axaftin li ser wi ye. Di gramêrê de ji wan re kesê pêşin, kesê diwim û kesê seyim dibêjin.

1 — Kesê pêşin. Yê ko daxêve : ez, min, em, me, xwe.

2 — Kesê diwim. Yê ko pê re tete axaftin : tu, te, hon, we, xwe.

3 — Kesê seyim. Yê ko di axaftinê de qala wi dikin : ew, wi, wê, ew, wan, xwe, ê.

Ji van pronavan « wi » nêr, « wê » mê û ên mayin tev de, yanî : « ez, min, tu, te, ew, em, me, hon, we, wan, xwe, ê » nêtar in.

76 — Pronavên lihevxiştî. Ji pronavên nêtar hinên din hene ko ji wan re pronavên lihevxiştî dibêjin. Ji ber ko ew bi lihevxiştina daçek û pronavekê tene pê.

(dûmahik heye) C. A. Bedir - Xan

Kevin Qevqasê û destên xwe deynin ser birên petrolê.

Ji lewre ingiliz çek û ceberxaneyên ko ji Ingilterê û Emêrîkê tén di benderên xelica Besrê û di riyên Iraq û Ecemistanê re dişiniu Qevqasê. Û ji bona vê yekê ji mihendisên ingilîzî wan benderan diedilînin û fi-reh dikin. Ji ber ko arikarî roj bi roj bêtrî dibe û di wan benderan de cih hinek teng e.

Li gora nûçeyên paşin elmanan Qirim, ji Sevestepolê pêve vegirtine û dest bi bombardimana Sevestepolê ji kirine.

Bi vegertina Qirimê stola ûrisan ya behra reş ji wê bikeve tengiyê. Ji ber ko di peravên Qevqasê de ji Nevrosiskê pê ve tu bender nîne ko bikare stola ûris bihewîne. Elmanan ji niho de Nevrosiskê dane ber bombardimana balafirên xwe. Di roavayê Behra reş de bendera Batûmê hebe ji ev bender nikare stoleke mezin bihewîne.

Lê herçî ji hebe, ûris xwe bi şûn de bikişînin ji bi inêranî şer dikin û gelek li ber xwe didin.

Şam : 3 Çiriya - Paşin 1941 NÊREVAN

BIRÊ FRENSIZI:

## MELAYE DJEZIRI

Mela Ahmad, plus connu sous le nom de Malayé Djezirî, est, avec Ahmadé Khani, l'un des deux classiques kurdes les plus populaires.

Nous ne savons pas grand chose de lui. Son nom indique qu'il naquit à Djeziré, mais aucun document ne permet de fixer d'une façon certaine l'époque à laquelle il vécut. On rencontre dans une élégie de Faqih Teyran, un chronogramme indiquant la date de la mort du poète. Malheureusement, le texte en est si corrompu qu'il est impossible d'en tirer une conclusion. Dans son "Recueil de notices et récits kurdes", Jaba se fait l'écho d'une opinion suivant laquelle le Mela aurait quitté ce monde en 550 H (1155-56 AD). Enfin, un manuscrit appartenant à l'Emir Djeladet Belder Khan contient une note disant que notre auteur a dû mourir à peu près en même temps que le Sultan Mehmet Fatih (soit vers 1485), mais plutôt après lui.

Cette dernière thèse paraît la plus raisonnable. En effet, la date 550 H est aussi, approximativement, celle à laquelle disparut le premier grand poète mystique de l'Iran, Senai. Or, les oeuvres du Mela sont profondément pénétrées de l'influence du soufisme persan, mais ses idées et son style rappellent ceux de Hafez (mort en 1389) et de ses successeurs plutôt que ceux de Senai. De plus, la pièce par laquelle débute le divan du poète kurde est une imitation du célèbre premier ghazel de Hafez. Elle ne peut donc avoir été composée qu'après la première édition des oeuvres de cet auteur (1368).

Malgré ces données, la question reste sans réponse. Elle ne pourra être résolue que le jour où l'on possèdera un texte correct de l'élégie de Faqih Teyran, à défaut de quelque autre document. Signalons enfin que la tombe du Mela, qui se trouvait à l'intérieur de la Medresa Sor, à Djeziré, et qui était un lieu de pèlerinage, a été détruite par les soldats turcs. Il y a donc peu d'espoir que l'on retrouve jamais son épitaphe.

La tradition orale compense dans une certaine mesure le manque de sources écrites et nous donne quelques renseignements sur la vie du Mela (cf. "Hawar", no 6). Elle nous a même conservé son portrait : c'était un homme de taille moyenne, le visage arrondi, le teint clair. Il avait les yeux et les sourcils noirs, la barbe clairsemée, le front large, le cou allongé. Il se coiffait d'un foulard maintenu par une sorte de turban. Il était ordinairement vêtu d'un caftan et d'un aba, et chaussé de sandales rouges. Son commerce était agréable, il était toujours souriant et prenait garde de ne blesser personne.

Melayé Djezirî s'appelait, de son vrai nom, Ahmad Nichani. Ayant commencé ses études à Djeziré, sa ville natale, il les continua en Iraq, en Syrie, en Egypte et en Perse. A son retour au pays, il fut un certain temps l'un des favoris de l'Emir. Mais il ne tarda pas à se brouiller avec

lui. Il se retira alors à Dyar Bekir, où il demeura quelque temps. Il regagna ensuite Djeziré et y termina ses jours.

On raconte aussi que le Mela était épris de la soeur du prince de Botan, Izz ed Din (dont on ne trouve pas trace dans l'histoire), et que le souverain, ayant compris la pureté de cet amour, maria les deux jeunes gens.

Le poète allait d'ordinaire composer ses vers aux environs de Djeziré, à Westani. La légende prétend que, lorsqu'il se levait pour partir, le rocher sur lequel il s'était assis restait tellement surchauffé par le feu de l'inspiration, que les paysannes du village venaient y cuire leur pain.

Melayé Djezirî a laissé un divan d'environ 2000 vers. Les idées et les sentiments qu'il y exprime, sont ceux du soufisme persan, le vin de l'extase, les joies et les peines de l'amour mystique (qui se confondent souvent avec celles de l'amour terrestre), l'attente du retour au Principe Universel, forment les principaux thèmes chantés par le poète. Les deux ghazels que nous traduisons (II et IV, cf. texte kurde, p. 4-5) permettront de se faire une idée de son oeuvre. Comme nous le remarquons plus haut, le style en est fortement influencé par l'Iran. Les mots persans et arabes sont nombreux dans le vocabulaire du Mela, beaucoup plus que dans celui d'Ahmad Khani. La nature de l'inspiration de son recueil, et les difficultés qu'en présentent la lecture, font qu'il est beaucoup plus populaire parmi les chaykhs et les mollahs que dans les autres classes de la société kurde. De nos jours encore, il est lu et commenté dans les écoles coraniques.

Ton nom est inscrit au registre éternel.  
La plume de la Connaissance [1] a tracé un signe dans le Grand Livre (de la création).

Tout n'est que formes et lignes à l'intérieur du cercle et des points de l'Amour mystique.

Ces figures [2] sont des symboles parmi les hallucinations du néant.

La lettre Mim a rendu le lever du soleil de l'Unité étincelant comme un miroir [3]

Elle scintille, et son éclair, parti d'entre les Arabes, va frapper la coupe de Perse.

Afin que nous puissions contempler les témoins des Noms Divins sous tous leurs aspects [4].

Elle a enivré l'un de l'Eternel, à l'autre, elle a livré la forme de l'idole,

L'un est épris de la chevelure, à l'autre est apparu le grain de beauté.

Elle a donné le miroir à Alexandre, et la coupe à Djâm [5].

Les âmes saintes désirent la nuit de ton Qadr [6].

Ta lumière est le flambeau qui éclaire la lampe du sanctuaire.

Afin de pouvoir, lorsque je te rencontrerai, trouver grâce à toi la vie dans l'éternité,

J'ai livré par avance au néant l'essence de mon cœur et de mon âme [7].

Les marchands de rubis ont brisé le diamant dans leur main,

Cette tablette de diamant marquée par le Dessinateur. [8].

Seigneur, comment mes lèvres pourraient-elles cesser de chanter ta louange ?

Gloire à Toi : je ne mettrai pas de terme aux cantiques que je t'adresse.

Grâces soient rendues à Dieu qui, à son esclave le Mela,

A dispensé l'élixir de peine et d'amour, sans dinar ni derhem [9].

..

Les fils des mages vendeurs de vin [10], chaque matin à l'aube, viennent à la danse [11].

Les buveurs, vidant coupe sur coupe restent près de la rivière [12].

Les tresses des unes répandent l'odeur de l'ambre [13], les autres sont de douces brunes.

D'autres encore, sont des bijoux pareils à Canope des cieux;

Certaines sont blondes et . . . [14], elles ont des visages de fées, des joues de perle.

Voyant que le monde allait de la sorte, je perdis patience et calme.

M'ayant ravi patience et calme, elle me déchirait le foie [15].

Qui m'opprimait ainsi ? Elle me ravissait l'âme et le cœur.

Voici mon âme et mon cœur, voilà ma belle au visage de houri,

Voilà mon roi ! Je suis un mendiant ( qui frappe ) à sa porte.

Lorsqu'elle me vit quémander, l'amie me prit par la main,

Elle me conduisit à la danse [16]. Ni danse ni musique ne s'interrompirent.

Le grain de perle me dit : « Nous sommes tienné, et tu es nôtre,

En réalité, nous me faisons qu'un, mais le problème est insoluble » [17].

Je bus le vin que me tendait sa main. Je m'éveillai, seul et ivre.

Une goutte d'eau avait rejoint la mer, mais la mer restait pareille.

N'écoute pas le vulgaire, ne renonce pas au vin.

La plupart sont dans l'affiction, la plupart sont frappés de cécité.

Toutes les lettres ont la même origine, si tu les réduis à leur principe :

Chaque lettre devient une ligne; ôte la ligne, reste le point

L'Unité absolue [18], Mela, est la lumière irradiant les cœurs;

C'est là une question difficile à comprendre, et les mystiques restent dans le doute.

## TAWÜSPARÉZ

(1) La connaissance divine.

(2) Les êtres et les objets créés.

(3) La première lettre du nom du Prophète. Est prise ici comme symbole de la révélation. L'Unité : l'unité absolue de Dieu et du monde créé.

(4) Le mot *shahid* signifie littéralement "témoin". Chez les poètes mystiques persans, il a pris le sens de "bel adolescent, belle jeune fille" (il n'y a pas de genres en persan), les beaux jeunes gens étant sur terre les témoins de la splendeur divine.

(5) *Djam* est un diminutif de *Djamchid*, nom d'un souverain légendaire de l'Iran. Le miroir d'Alexandre, et la coupe de *Djamchid* sont des objets merveilleux permettant de contempler tout ce qui se passe dans le monde.

(6) La nuit du *qadr* est celle au cours de laquelle Mahomet eut sa première révélation.

(7) C'est à dire: je me suis anéanti dans la contemplation du Seigneur, renonçant à toutes les joies du monde.

(8) Les marchands de rubis sont les ignorants qui dédaignent les trésors du mysticisme (le diamant) pour se consacrer aux jouissances terrestres (le rubis).

(9) C'est à dire: gratuitement.

(10) Les fils des mages sont les directeurs spirituels des soufis. Le vin qu'ils vendent est leur enseignement, destiné à dispenser l'ivresse mystique. Au vers suivant, les buveurs symbolisent les initiés.

(11) *Sema* : séance de musique et de danses destinées à provoquer l'extase.

(12) Variante : à l'écart de la société.

(13) Nous avons suivi le texte de la variante.

(14) Deux mots incompréhensibles

(15) Le foie, comme le cœur, est le siège des sentiments.

(16) Cf. note 11.

(17) Dieu et la création, (comme l'âme et le corps) ne font qu'un en réalité, suivant la doctrine soufie. C'est là le mystère auquel le Mela fait allusion.

(18) L'unicité de Dieu et du monde créé, cf. note précédente.





## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan
- 2 — Rupelnine Elfabê C. A. Bedir-Xan
- 3 — Dîlê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 4 — Btyîşa Pêxember. Bi Kurdiya dumîl, bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikitîn
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10 — Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11 — Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12 — Dersên Şerietê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13 — Çarînên Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14 — Proverbes Kurdes. Medhelokên Kurdî Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-Xan Paris - 1937
- 15 — Le roi du Kurdistan, Qralê Kurdistanê. Emir K. A. Bedir-Xan û Adolphe de Falgerolle. Paris - 1937
- 6 — Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdistanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel Berlin - 1937
- 17 — Der Schnee Des Lichtes. Berfa Ronahiyê Şîhrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Sall	500	Qirûşên Sûri
Şeşmehî	300	Qirûşên Sûri
Sêmehî	200	Qirûşên Sûri

Xwedî û gerinendeyê herpirsiyar: Mîr Celadet  
Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emir Djeladet Aali  
Bedir-Khan. Damas—Syrie.

SAL 9  
HEJMAR 36  
DUŞEMB  
1KANÛNA-PÊŞN1941

# HAWAR

ANNEE 9  
NUMERO 36  
LUNDI  
1 DÉCEMBRE 1941

KOVARA KURDÎ ✱ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARÊ

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Diwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Kevirê Mûsayê Elîmed	Rastedar
Halan	Hişyar
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Viborg	Hesenê Mîstê
Agiri	Osman Sebri
Mosko	Dilawer Çarpine
Sinema	Evdirehmanê Rojki
Lêhistika Şetrencê	Stranvanê Hawarê
BIRÊ FRENSIZI ✱	PARTIE FRANÇAISE
La partie d'échecs	Tawûsparêz



ŞAM—1941  
ÇAPXANA SEBATÊ





## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### TEFSÎRA QURANÊ

222 — Ewê ji te pirsî mehikê bikin; bêje wan: Mehik, tiştêkî rêvîn û bi ezab e. Gava jin mehika xwe dibinin, nîzîkî wan me bin, heta ko ew jê xelas û paqij dibin.

Ko paqij bûn, ji rîya ko Xwedê ji we re emir kiriye, nîzîkî wan bibin. Xwedê ji tobedaran hez dike û heji paqijan jî dike.

223 — Jinên we zeviyên we ne, bi awakî hon dixwazin zeviyên xwe biçin. Ji bo nefsa xwe tiştine qenc pêk bin. Ji Xudayê xwe hêviya zaroyên qenc bikin. Ji Xwedê bitirsin û bizanin ko honê rastî wî bîn. Ji mirovên bawermend re mîzginîya xweşiyê bide.

224 — Ji bona pêkanîna qenciyeke weke taet û ibadetê, ziyareta xelkên di xwe û li hev anîna mirovan, sund me xwin û ji bo nekîrîna qenciyeke navê Xwedê mekin behane. Xuda dibihîse û zana ye.

225 — Heke hon li ser tiştêkî ne rast xapiyan û we bi rastbûna vî tiştî sund xwar;

Xwedê we berpirsiyar na ke, lê heke sundxwarîna we nerast bû û hon pê zana bûn, hon berpirsiyar dibin.

Xwedê ji tobedaran re tobe dide, Xuda piyar e.

226 — Yên ko bi qesda ne nizikbûna jinên xwe sund xwarîna, ji wan re çar meh mihlet heye.

Heke ew di nav wan çar mehan de nîzîkî jinên xwe dibin, Xuda

di gunehên wan dibihure. Xuda ewî û tobe dide, Xwedê piyar e.

227 — Heke ew dest bi berdana jinên xwe dikin; Xuda dibihîse û dizane.

228 — Jinên berdayî heta sê mehikên xwe bibînin divê bisekinin.

Heke avis in, divê avîsbûna xwe veneşêrin, ji ber ko veşartîna vê ne helal e, heke wan bawerîya xwe bi Xuda û bi axiretê anîne.

Di nav wan sê mehan de vegera mêrê wan ji wan re çêtir e.

Heke mêrê wan dixwazin, bila bi jinên xwe li hevbin.

Jin û mêr divê bi devkenî û xweşdîlî bidin, bîstînin.

Lê mêr bi dayîna mehr û nanî ji wan pêşdetir in. Xuda delal û fêris e.

229 — Têlaq du car in, piştî wan du têlaqan, divê mirov jîna xwe an li gora şerîetê bi camêrî li cem xwe bihêle an bi camêrî û comerdî jê veqete.

Standîna mehra ko we ji jinên xwe re dane; bi temamî be an jê behrekê be, ji we re ne helal e.

Lê heke jin û mêr, her du dibînin ko li gora şerîetê emrê xwe bi çeyî û xweşdîlî nikarin derbaz bikin, wê gavê, Geli Qazîyan, ji bo jin û mêr di vegerandîna mehrê de, a ko mêr ji jîna xwe re da bû û li ser vê mehrê, bi tiştêkî kêr û zêde, li hev hatîna wan de, tu guneh nîne. Ev tixwibên emrên Xuda ne, derbasî wan me bin, yê ko sînorên Xwedê derbaz dibin, dibin zalimên nefsa xwe.

230 — Heke mêr jîna xwe careke din jî berda (têlaq bûne sê car) êdî ew jin, ji mêrê xwe re ne belal e. Lê-

belê heke miroveki din wê jinkê mehr dike û piştî berdidê, paş ve berdanê, heke jin, û mîrê wê yê berê, ji xwe re yeqîn dikin ko disa li gora emrê Xwedê bi xweşdili û çeyî bi hev re dikarin bijîn, ji nû ve ziwaca wan ji wan re ne tu guneh e.

Ev tixwibên emr û hikmên Xuda ne, Xwedê wan pêş xelkê dike heta ko ew bizanin û pê bîrewer bin.

231 — Heke we jinên xwe berdan û sê mehikên, di wan timanr bûn, an li gora şerîetê wan bi qenci û keremê bihêlin cem xwe an disa li gora şerîetê bi qenci û comerdîyê dest ji wan bikişnin.

Di dema mehikê de bi nîzikbûna wan tadê li wan me kin; yê ko vi tiştî dike zalimê nefsa xwe dibe. Ayet û emrên Xuda ma vêjin pişt guhê xwê. Bi şikirdarî û pakkîliyê nîmetên Xuda, yên ko ji we re hate dayîn, bînin bîra xwe. Û disa bînin bîra xwe. . . . Kitêb û ayetên Xwedê yên ko ji we re dahatine; û şîretan li we dikin.

Ji Xwedê bitirsin û bizanin ko Xuda bi her tiştî dizane.

232 — Heke mîr jina xwe berda û sê mehikên jinkê timan bûn û jin û mîr paşî ve telaqê li gora emrê Xwedê li hev hatin û mîr xwest ko jina xwe a berdayî ji nû ve mehr bike; Gellî weliyên jinan, hon manî ziwaca wan me bin.

Ev ji wan mirovên ko baweriya xwe bi Xwedê û bi roja piştawiyê anîne şîretêk e.

Bi cihanîna vi emrê Xwedê, hon ji gunehên xwe paqij dibin. Xuda pê dizane û hon pê nizanin.

## HEDÎSEN

### CENABÊ PÊXEMBER

REHMET Û SILAVA XWEDÊ LÊ BE

385 — Hingî we sir û pîvaz xwar derbazi mizgeftan me bin (xelk ji bihna sir û pîvazê aciz dibin).

386 — Derewan me kin, derew ji baweriyê dîr diçe, din û derew nabin yek.

387 — Ji jina ko dixwaze bê sebeb dev ji mîrê xwe berde bihna bihustê heram e.

388 Mezin û hakimên ko xelkê xwe dixapinin divê bizanin ko para wan dojeh e.

389 — Diya ko sê zaroyên wê mirine divê bizane ew sê zaro navbeyna agirê dojehê û diya xwe de dibin beden, diya wan rûyê agirî nabine.

390 — Mirovên camêr û ewle dibin xwedî mal û rizq, xwedî nav û rûmet, bêbext şerpeze û perîşan dibin, meydana bêbextan tune ye.

391 — Heke xeyr û bereketa xwarinê dixwazi herî û piştî xwarinê destê xwe bişo.

392 — Xwarina dawetekê a lê qedr û qîmet ew e ko dewlemend jê dixwin çavê feqîran lê dikeve û jê mehrûm diminin.

393 — Mirovên xirab ew in ko mehvanê wan nîne.

394 — Qenci wînda na be, xirabî ji na ye ji bîr kirin, Xwedê ji her heye, êdî çawa wan dixwazi bike.

395 — Tiştê ko dilê te pê rahet dibe bike û ji tiştê ko dilê te pê rahet na be bigere, heke miftî bi awakî di fetwa bide ji guhî medê.

396 — Ko hon dibinin rastiye bêjin, îşê we xira bibe disa ji rastiye xwe vemegêrin û bizanin ko îşê we her wê bimeşe û heke dibinin ko derewan bikin îşê we bimeşe disa rastiye bêjin û bizanin ko îşê we pê xira nabe û disa dimeşe.

397 — Heke te di dema Xurtiya xwe de Xwedê nas dikir, Xwedê ji di dema qel-siya te de, te nas dike.

398 — Tacirê xwedînamûs hevalê pêxemberan û ehlê Xwedê ye.

399 — Têcirê tîrsonêk kar na ke, teci-rê çavsor xurt û dewlemeud dibe.

400 — Xwedê li mirovên ko bi qels û belengazan ra dînerm in, qedrê de û bavê xwe digirin û dilê xadim û xulamên xwe xweş dikin tê rehmê û ew dikevin bihustê.

Ji bona Tefsîra Quranê K.K. û li hejmaern 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33, 34 û 35an fedkirin.



# DÎWANA MELÊ

— 5 —

Cin çin kirin zilfên siyah keski etlasan qeba  
 Êdî nişan nabin xuya têkil kirin lazim seba  
 Mîn di seba bayê seher mada ji bedrê kir du ker  
 Qews û qezeh jê hate der disan bi zilfan re teba  
 İro ji me l'bedra temam enberfeşan bin sed

Ey hudhudê şîrîn kelam ehlen we sehlen  
 Mîn diblerek wek dur heyê mehbûb û şîrîn  
 Hisn û cemalek pir heyê Belqîs-sifat mesken

Me divê perî ya dilberê lê hêj l'islûba berê  
 Lê kitş bihî tu j'pencerê tê û diçî teşbihî ba  
 Şûx û şepala meyperest ew zalima heşyar mest  
 Vê nameyê xwendî ve dest fi teyiha neşrun neba  
 Bêj' ew şîrina surperî durdaneya ez Mîşterî  
 Kan' ehd û peymanê berê bê fêdê çû teşbihî ba  
 Neysekira spî dest û zend zanîm mecâlî na-

Lêva tebesim kir ji qend maset keban fi reba  
 Dilber mecâlî name di nasî ko nişana me di  
 Nûnek mixalîf tê ne di, hel qelbiha nehwis  
 Qasîd bi meqsûda me hat ba mijde û emr û

Nişan hinarin hem xelat şehzadeya gulgun qeba  
 İro mecâlî lê hat û wext, disan ciwan bûn  
 Ew li efna danî ji text « ma kane berqen  
 (xelleba »(\*)

Selwa rewan zeynî wereq çiçek melê dîn sed  
 Yaqûtuha yehkiş şefeq yehki iqûden  
 [kewkeba (\*\*)]

— 6 —

Dilber şikinand [1] şekîrek, « fequltu ya rnhî  
 [meta » (\*\*\*)  
 Got min heta xatir hebit, min got çî kim  
 [ez ba [2] heta  
 Zilfan tu bes çin çin bike, miskîn miqabil  
 [dîn bike  
 Pêşkêşî yek zilfa xwe ke [3] milkê xeten tex-  
 [li xeta

Dil bendî dama [4] zilfekê, keftî kemenda  
 [ilfekê  
 Hel fi yedil meftûnî şey, ew keyfe esneh[5]  
 [ya feta (\*)

Zilfê di van şîrîn leban, jehri ne sibhî  
 [eqreban [6]  
 Tir tene dil wek kewkeban, girtin bi wan  
 zilfên duta [7]  
 Nisbet perî zîbayî tu, wek nêrgîzan yekta  
 [yi tu [8]

Yamen rea xulî fehêl, yuşbih bi şey'in  
 [qameta (\*\*)  
 Ji wi baxçeya [9] yar zeyinî, bê pîrs Mela  
 [sêyek çinî  
 Rubbema ceneytu cennetî elqet eleya cina-  
 [yeta [10] (\*\*\*)

— 7 —

Bi narê firqetê sotim ji ferqê ser heta pê da  
 Xedenga xefletê nihtim, ji berqa lamia lê da[1].  
 Xedenga firqetê re'd e, dilê ko nagihan l'ede[2]  
 Dibêjin ger [3] cebel bît ew, bi ker bît wê

Heçî firqet ne di hicran, bibin [4] min dax  
 [weklî lê ne  
 Ji ber [5] derbê di hicranê, firaçî ruh û  
 [can key da  
 Kesê mihnet ne di firqet, ne xwart [6] kir'e-  
 [ya hîcrê

Çî zanî [7] bê xeber jana dilê dax û ke-  
 [ser tê da  
 Bi dama mihbete bend im, xedenga firqetê  
 [dil niht  
 Bi sibhî mirxî nim besmel di hev wer tîm  
 [di xûnê da

Birûska batîni da dil, li sine pêta wî wer  
 [bû [8]  
 Ko dê pehtin di pêta dil, di nav wî nar û  
 [pêtê da [9]

Ji ilfê sibheî zilfê midam lew bê qerar im ez  
 Ko can min ezîz îro çû û dil ma di ilfê da  
 Ji mehbûb dîr kirim çerxê, feleke ez pir  
 [hilavêtîm  
 Nizanim dê bi kû det min, di vê dewran û  
 [çerxê da

Hebîbê bê xeta kuştîm, bi derba firqetê axir  
 Ji wê rojê dizanî min, ko yar tîrek li cergê  
 [da [10]

(\*) ما كان برقا خلبا  
 (\*\*\*) ياقوتها يحكي الشفق يحكي حقودا كوكبا  
 (\*\*\*) قلت باروحى متى

(\*) هل في يدالفتون شى او كرت اصنع باقتا  
 (\*\*\*) يامن رأى خلى قول يشبه بى قامنا  
 (\*\*\*) دىما جنيت جنتى قلت على جاناينا

Gelo disa bibinim ez çiraya wisletê hilbit  
 Bisojim sibhi perwanê, li ber wê nar û şew-  
 [qê da  
 Bi derba kewkeba sibhê li meşreq zihre tali, det  
 Zihel dūr bit li şeş bircan û winda bit di  
 [xerbê da  
 Ji Sindê zihre peyda bit, ji Hindê mişteri der  
 [bit [11]  
 Sipêde det Sireyayê, şefeq det qametê pê da  
 Ji şewqa ebrûyan binimêt hilal disa di  
 [qewseynan  
 Ji xawer bête der xurşid, zilam wer bit di  
 [nûrê da  
 Bi werdan zeyinin gulşen, çimen da lale  
 [bişkiftin  
 Binefûş û çiçekan vêg ra şefeq dane di rew-  
 [dê da (12)  
 Sehergeh endelîb mest in, ji bihna werd û  
 [bişkojan  
 Şibhi tûtak û goyinan dinalin em di firqê da  
 Li kêlbê asitanî xo ne persî qet hebîb carek  
 Gelo nayête birê em, di vê nêçir û ravê da  
 Dizanîm şeşwara min xezalek wê di fetrakê  
 Bi cayî seyde ez bûma di wê fetrak û bendê da  
 Çi hedî sed hezar canan di fetrakê hebîbê min  
 Ko sed Cemsîd û Keyxusrew xulam in ser  
 [di vê rê da  
 Di deh salan milazim mam û yarê rû ne da  
 [carek  
 Eger yekcar bi min rû det, bes e carek di  
 ]salê da  
 Dilo mizgîn bi te şa be, ko siltan me divê bêtin  
 Ji min bawer ke peyxamê, seher mizgîn bi min  
 |pê da  
 Şikir binahiya min hat, bi Yaqûb dide rew-  
 |şen bû  
 Bi bûya Yûsifê misrê li ken'anê beser peyda  
 Nesimê sinbil û sêvan seher da hebs û zindanê  
 Vebû qifla me bê mifte we ringînî di qelbê da(13)  
 Firaqa şev bi axir çû sipêde kifşe bû disa  
 Merixa nehs ava bû, xuya bû roj di şerqê da  
 Di çerxê wek nicûm dêmduz, sema hatin  
 [qira nayek  
 Hêva bedrê talih bû Sihel min di di reqşê da(14)  
 Ji wadi eyemên dilber, li min engûştêk izhar kir  
 Çi xweş enwarê berqê wî tecela bû di Tûrê da  
 Qirana zihreyê min di di her eqda Sireyayê  
 Ji perwinan dibêjim ekse hêj keftî di  
 [camê da  
 Hebîbê ezmi sibhet kir di caman lew şerab anî  
 Dilê min di du seyadan, ji biryan ra be-  
 [ravê da (15)  
 Bitûlên asitanê ra vexwendin Mir, li dergahê

Bi vi çavî hebîb ditim şikir ev şefeq Mew-  
 |lê da  
 Ji sibhi (16) ebrîwên saqi we bedrek min  
 [miqabil di  
 Hilalîm sed hilal iro îşaret min ji eksê da  
 Bi zarê xwey şirin xwendim, ji litfê bende  
 [nişan kir  
 Te pir cewr û cefa dîne, disilûk û se'y û  
 [cehdê da  
 Biçin werdan ji gulzarî, ko ebyaran di  
 [dest xar in  
 Ji mexsûsan di dergahê di'a min ew di  
 [hicrê da  
 Bi teşrîfa xwe ez xwendim, ji litfê bende  
 [nişan kir  
 Xelat û şifqê û dildan, şikirxwaz in ko ba  
 [xwey da  
 Me hadir secdeya şikrê li vê erdê miqedes hir  
 Bi mijganên xwe dur siftin, enî malî li  
 [erdê da  
 Eya binahiya cavan pût û iz û latê min(18)  
 Tu yl pêşber (19) sicûda min, sehergahan di  
 [xelwê da  
 Li bal ilmê te malûm e ji jina min tu yi  
 [meqsûd  
 Fidayê can me di can bit, di qesda wesl  
 [û dînê da  
 Bi hisna xwe tu agah î, bi sehm û heybet  
 [û dînî  
 Nicûm û kewkebê lamih, ji bala tèn bi bej-  
 [nê da (20)  
 Li xalên werd û nisrînan, ji qudret xet  
 [kişandin lê  
 Bi terha nêrgîza ebla sehergahan nesim lê da  
 Ko tule j'asitanê xwe neki dūr tu ji dergahê(21)  
 Ji ba xwey vê ricay nakin di babê litf û  
 [rehmê da (22)  
 Tu harê ferqetê zani nikarim(23) ez tehemil kim  
 Ji barê gohê-qendil im, meger fil im di eşqê  
 [da (24)  
 Hero (25) derdê mezin firqet, ceger sot ateşî  
 [da dil  
 Cihê sebrê ne ma çendan ferec min di  
 [di sebrê da  
 Mela! b'qameta yekta qiyamet min bi çavau di  
 Firaqa rûsiyah iro ji min canê şirin ci da(26)

Em pê de diçin û ferqên her du nivîstan, ya  
 min û ya Hawarê ji xwendevanên xwe re didin zanîn.

— 5 —

Ev xezel di nivîsta Qedri begi de yekcar nine.  
 Me ev li ber nivîsta Mela Evidisela nivîsandîye.

— 6 —

(1) Şikêna. (2) pa. (3) zilfek te bin. (4) dava

## KEVIRÊ MÛSAYÊ EHMED

Li welatê Şêrwan, di bin qesra Şebistanê re, kevîrek heye; jê re «Kevîrê Mûsayê Ehmed» dibêjin. Qesra Şebistanê, naveki din ji heye keheha Kormasê.

Beriya 80-90 salî gava fermana Şêrwan rahû mirê wî welatî Seid beg kurê Salihê lal bû. Seid beg mîreki serdestê bû. Şerê dewletê kir û gelek caran romî şkenandin û bi kumên sor rengê çiyayê xwe ê heşin kirîye sorbelek. Lê kurmê darê di nav darê de xwe tev da.

Berdevekê Seid begî hebû, bi navê Şêrik. Ew jî mîreki qenc bû. Lê bêhextî li mîrê xwe kir û derbasî aliye dijmin bû; û çû heta Stenbolê û bi hafa siltên ji ket.

Bi rêzaniya Şêrik romîyan eskerê Şêrwan şikistin. Seid beg ket hêsiyê. Dewletê ew ajot Rûmêliyê û ew di keheha Vidinê de hebs kir. Sêd beg di wê kehehê de emrê Xwedê kir û tê de hate veşartin.

Şêrik bû Şêr beg û mezinahiya cihê Şêrwan xiste destên xwe.

Keheha Şebistanê qesra mirekên Şêrwan bû. Şêrik ji xwest qesreke xwe çêke Şebistan li serê çiyê, di cihê asê de bû. Şêrik dixwest qesrekê mîna wê, lê li destê ava bike. Şêr beg dest avête kevîrê Şebistanê ên şekirî. Zibara xwe ji nav evîn û xulamên Seid begî rakir. Kevîr li ser piştê zilaman dibirin deştê.

(5) esne. (6) zîlfên bit û şîrîneban jêrî ne şîbhet egreban. (7) lê min jî zîlfan pîr kîre îro tenê girtin du ta. (8) nisbet perî zîba ye, wek nêrgîzan yekta ye ew. (9) me jî beşçeya. (10)

— 7 —

(1) tê da. (2) xedenga firqetê re'd e, dilê o xelletê lédin. (3) wer. (4) ne bi. (5) ji bil. (9) vexwarî. (7) çi zaniim. (8) birûska batîni da dil di pêtê sine wî wer bû. (9) ko dê bêtin (an: di pêtin) di pêta dil di nav wî nar û pêtê da. (10) ko yar ew tîr li cergê da. (11) ji Qundis zihre pcyda bit ji Hindîs mîsterî bit der. (12) beneş û çîçekan vêkran şefeq da yek di rewdê da. (13) rebû qîfla me bê mifte zi rengin ji qîflê da. (14) ko xweş enwar û berq in ew tecela bûn di Tûrê da. (15) ji bîryan re berê wî da. (16) ji şiklê. (17) bi zehrê xwey şerîf xwendim ko xîzmetkarê dirin im. (18) heya bînahiya çehvan Lîl û iz ew welatê min. (19) pêşen. (20) nicûnî û kewkeb û lamih ji lala tén bi hejnê da. (21) ko tu lê asitanê dîr nekî êdî ji dergahê. (22) jî la xwey vê recû nabin di habê lîf û rehme da. (23) dikarim. (34) bi narê kûl û qendil im bela fil im di eşqê da. (25) dibî. (26) şîrîn hey da. C.A.B.

## HALAN

Jî XWENDA Û MINEWERÊN KURDAN RE  
Geli kurdên minewer, ma ne bes e ev keder  
Pêti li dînya ve ket, kes ne ma bê ceng û şer.  
Agîr li me hû xelek, mîrga neyar maye şin  
Şewta cihan tev disoj, şahê Iran daye ber  
Dijmin li her dojehê, maye b'tenê bê şewat  
Mîrin jê ra sed silav, pê dilizin zo û fer  
Çendî û kurdên egîr îro hûye nagihan  
De helîne dexl û dan, bîji veji bê keder  
Çerxa felek mijde da, kurdên ciwan xortên no  
Cenga welat hatiye, rewşa cihan ceng û şer  
L' Ewirpaê tu hinêr, ten û giban tev dison  
Ji bo bîjin mir û ser, hemî teva tene şer  
Em bi tenê man nezan, belengaz û pîr xizan  
Nezanî bo me neyar, ma çi bêjim bê mefer  
Îro ne benga xewê, roja havil û gerê  
Hêvidar e qewmê kurd, ji we divê serxweser  
Rehberê qewman e ew minewerê pîr xebat  
Bapîrê qewmê min e, kesê neyar bike der  
Ma ne bes e ev hewar, hindî sal in mane jar  
Bes e êdî bin şiyar, heya kengê ev keder.

HÎŞYAR

Yekî ji kevîrkêşan, bi rê ve, kevîrê xwe danî bû erdê û pal da bû ser. Şêrik çav pê ket. Li ser piştê hespê xwe çowek li paş guhê wî danî û got ê:

— Ma tu westiyayî, an dil naki kevîrê xwe bibî?

Kevîrkêş, Mûsayê Ehmed, keserek li xwe aui û li Şêrik vegeand û got:

— Na herê, ma ez kengê diwestim. Lê texmîna tişteki dikim.

Şêrik çoweki di jî lê danî û pîrsî: Texmîna çi dikî?

Mûsayê Ehmed bê ern û xeyd, lê bî ken got ê:

— Ez dibînim ko felek li Seid begî geriyaye û tu kevîrên qesra wî liser piştê peyayên wî dibî deştê. Em herê xwe didin jêr, pêşiya me nişûv e; em diqedinin. Lê heke rojekê felek li te ji gerîya, hinên din wê rabin û kevîrên Şebistanê bidin piştê çêlî û peyayên te û wan vegezin cihê wan ê herê, serê çiyê. Didim eqlê xwe û dibêjim şikir ji Xwedê re herê me li jêre, lê peyayên te ên reben wê çi bikin herê wan wê qikeve kêş....

Mûsayê Ehmed ev gotin û rabişte kevîrê xwe, Şêrik li ber xwe ketî bû. Destên xwe berdand ber xwe, çavên wî di dîrahiya ezman de li ser niqtekê sekîni bûn. Qey tê de tiştên ko Mûsê jê re gotî bûn wek xey-

## REWŞA DINYAYÊ

**SÊ MITIQ** — Li 6ê Çiriya - paşin, Stalin serêkê ûrisan nitqek da û li Moskoyê di Meydana - sor de birek ji ordiwa sor di her Stalin re bori û bolşevikan cejna Çiriye şahinet kir. Cejna Çiriye ew roj e ko tê de Lénin bolşeviki ilan kiri bû ( 6ê Çiriya - paşin 1919). Cem bolşevikan ev cejneke mezin e; cejne wan a meztir e. Dema Stalin nitqa xwe digot balafirên rûsi di ezmanê Moskoyê de difûrin û bajêr ji hemleyên balafirên elmanî diparastin.

Stalin piştî ko weseft cejna Çiriye da qise kir û got ko di sala 1919an de halê bolşevikan ji iro xerabtir bû. Nan kêr, cebirxane hindik bû. Piraniya welêt di eleyhê bolşevikan de bû. Digel vê hinde ordiwa sor di bin femandariya Lénin de xwe pêk anî û di dawiyê de mizefer bû.

Stalin pirsê xwe pêş ve ajot û got: Îro dijmin birekî welatê me vegertiye û gihastiye deriyên Mosko û Léningradê. Bivê nêvê xesar gihaye ordiwa me. Lê ev ordû û stola me rehma van xesaran li pêşiya dijmin sekintne û şerê wî dikiu. Hêj di destên me de gelek madeyên hov, çek û cebirxane hene. Peyayên me jî zehf in. Hevalbendên me jî hene. Divê em zora elmanan bibin. Dijminê me ne ewçend xurt e, herwekî bi xwe bawar dike. Ji elmanan heta niho çar milyon û niv peya çûne. Di destên elmanan de tu peyayên ihtiyat ne mane. Elman qewetên xwe ên paşin didin der. Ji lewre hew dikarin di vê cidalê de pê li erdê bidin. Elmanya Hitler heta şeş mehên din wê ji hev de bikeve.

Li 9ê Çiriya - paşin Hitler li Mûnixê nitqek da çavên xwe li tiştên bori gerand; qala şerê ûris kir û got ko ev şer ne bi tenê ji bo Elman-

letên gabûsekê diditin. Xwedê giravi Şerîk li bêbextiya xwe hişyar bû bû û poşmaniye ew teşand. Şer beg kevir ji destên Mûsayê Ehmed xiste erdê û got:

— Keleh û kevirên wê li min herambin, ez mirovekî kurdmanc im. Ez ne mêrê Qesrê me.

Şerîk da rê û vegeriya xaniyê xwe ê kurdmancî, zibara wî jî belav bû.

Ev kevir hêj li wê derê ye û jê re « Kevirê Mûsayê Ehmed » dibêjin. Di dora wî de diwarekî hişkeber jî heye.

**RASTEDAR**

yayê lê ji bo hemî Ewropayê cidala jiyin û mirinê ye. Ji ber ko ev şer şerê Ewropayê digel bolşevikiyê ye û Ewrope tev de ketiye sefêkê û şerê bolşevikan dike.

Hitler dibêje me ji ûrisan sê milyon û şeş sed hezar hêsir standine. Bi tevayî 18 milyon eskerên ûris ji sefa şer hatine existin. Elmanyê careke din Çiriyeke wek ya sala 1919 an nabine. [ Li 11ê Çiriya - paşin sala 1919an de Elmanyê ji sondxwariyan mitareke xwesti bû û teslim bû bû ]. Her tişt têtê birê, her tişt dibe. Lê teslimbûna Elmanyayê nabe û nayete birê. Heye ko şer dom bike, tiştine nû biqewimin, ordiwen her du aliyan heta tabûrên xwe ên dawîn şer bikin. Ev jî dibe. Lê tabûra paşin ya ko di qada şer de wê bimine û bi serdestî pê li erdê bide ewê tabûreke elmanî bibe.

Rêberê elmanan çêli Emêrikê ji kir û got: Rûzwelt dibêje, min emir daye stola xwe ko bera vaporen elmanî hidin Herçîez, min emir da stola me ko li vaporen emêrikani nexin, lê xwe ji wan biparêzin û heke vaporen emêrikani dirêji wan kir hingê dest bibin xwe û xwe midafehe bikin.

Piştî Stalin û Hitler û li 10ê Çiriya-paşin, wezirê Britanyayê ê pêşin, Mister Çorçil jî nitqek da.

Mister Çorçil dibêje: Şerê ko Hitler di Polonyayê de dest pê kir hemî Ewrope vegirt, jê derbasî Efrîqayê bû û jê kete birekî Asyayê jî. Heye ko ev şer hêj firehtir hibe û agirê şer bikeve hemî dinyayê. Lê Ingiltere hero xurtir dibe. Îro balafirên me ji yên elmanan bêtir nebin jî bi qasî yên wan hene û bi hin weseftên xwe di ser wan re ne.

Çorçil qala Pesifikê jî kir û got: Ez nizamim cehda Emêrikê ji bo mihafeza aşiyê di Pesifikê de wê here serî an ne Lê divê ez bibêjim heke Emêrike bêgav ma û şerê japonan kir piştî saetekê Ingiltere jî wê şerê Japonayê bike. Japon bi qasî Emêrikê ne xurt e. Ji lewre heke Japon şerê me kir wê bikeve perşaniyê.

Mister Çorçil herî qedandî dibêje, heye ko Hitler disa qala aşiyê bike. Lê divê herkes pê bizane ko Ingiltere ne bi Hitler û ne bi tû hikûmeta nazî re behsa lihevhatinê nake.

**QANÛNA BÊTEREFIYÊ** — Emêrike bi her awayî arîkariya Ingilterê dike. Jê re her textit çek û cebirxanê rêdike. Stola emêrikani vaporeşeyên inglîzî di Atlantîkê de dihemine. Ji milê din jê re gir û hâr 60-70 cenkeştî jî dane. Bi tenê vaporen emêrikani ên



# VİBORG

ORDIWA SOR EW ÇAWAN ŞEWITAND

Herweki xwendevanên me pê dizanin gava şerê ûris û elmanî dest pê kir, Stalin da zanin ko ordiwa sor yanî ordiwa ûris heke bêgav ma û ji her dijmin kişiya ewê di riya xwe de ber tiştî bişewitine û xerab bike. Ji bona ko zad û zexîre û her tiştê ko bi kêrî mirovan têt nekevin destên elmanan.

Viborg bajarekî Fênlandiyayê ye. Di sala 1939an de Ôrisan ew bajar ji Fênlandiyayê standî bû. Vê carê fênlandiyan bajarê xwe bi şûn de vegerand. Lê ûris beriya ko jê bikişin bajar şewitandine.

Rojnamevanekî emêrikanî, Çak Benêt, heta dawiyê li bajêr maye û jê bi ordiwa sor re derketiye. Çak Benêt dibêje:

Roja 28ê Tebaxê, esirkî naqûsên dêrên Viborgê, bi hev re lédidan. Ez li cem berber bûm û min riya xwe kur dikir. Min jî berber re got:

—Piştî ko Stalin serbestiya her ayinên diyanetê ilan kir keşe jî bi naqûsên xwe dixwazin xwe şanî bidin. Lê çîre û nemaze di vî wextî de naqûs tev de lédidin? Berber cûzana xwe dani û li min vegevand û got:

—Tu ko rojnamevan î, divêt beriya min te seh kirî he ko dijmin ketiye dora bajêr û jê bi tenê çil kilomêtrê dûr e.

Dibî min jî hakimê bajêr bihistî bû merşal Veroşilov emir daye xefa rêhesin ya ko dikeve roavayê bajêr xerab bikin. Min jî berber re got:

—Ma çi îşê naqûsan pê heye?

Berber: Bûye adet, di wextên talûkê de naqûs lédidin. Ji xwe fro min jî yekî bihist ko ordiwa sor di dora bajêr de wê li ber xwe

bide hetanî ko bajêr bi temami xerab bikin.

Ez li gotina berber ecêbmayî ne mam; çimkî min dizanî bû ko ûris her bajarê ko jê radi-blîn xerab dikin.

Ji dikana berber rabûm û çûm otêla xwe; û derketim şehnişînê. Min dît ko ji taxa Romdenê dû û dûmaneke reş radihû. Romden taxa febrîke û destigahên sinhetê bû. Teqin û reqinan ji dandan pey hev. Min dilê xwe de digot, qey dijmin nîzingî li bajêr kiriyê û bi topan li bajêr dixê. Ma ne diviya bû ko hikûmet di wext û zemanî de xelkê li ser wext bike.

Ez di van texmînan de bûm ko xwediyê otêlê hate nik min û jî min re got ko polis digerin û ji xelkê re didin zanin ko saetkê berî saetkê terka bajêr bidin; ji ber ko ordiwa sor berî hatina fênlandiyan wê bajêr bişewitîne. Hingê min zanî ko ev dî û dûman û ev teq û req ne ji topên dijminan e; û ordiwa sor dest bi şewitandin û hilweşandina bajêr kiriyê.

Ji otêla xwe rabûm û çûm daîra eskerî. Ji hevalên me sîsê li wê derê bûn. Min jî wan zanî ko eskerê ûris li nivê şevê wê jî bajêr bikişê, lê beriya ko terka bajêr bide wî welê xerab bike ko kuçek li ser kuçekî nemîne.

Hakimê eskerî gote me ko ehalî tev de wê jî bajêr derkevin. Lê herçî em rojnamevanên biyani; bi dilê xwe ne, heke me divêt em dikarin bimînin. Me jî qerara xwe da ko em heta dawiyê té de bimînin.

Gava em ji daîra hêklîm rabûm me riya xwe bi stasyona rêhesinê xist. Mehşer, jin, zaro, pîr, ciwan, ser hev dikirin ko jî hev derkevin û xwe bigehinin trenê. Bi zor me jî xwe re riya yek vekir û em té re derbas

bûn. Kûçe û kolanên din jî welê teji bûn.

Saet bû heft. Topên kelehajê bajêr, li ser hev, deh derbêrdan û xwe lal kirin. Ez û hevalên xwe em di daîra belediyê de bûn. Em bikîşiyân serê hanê belediyê. Tiştê ko me dît temaşake ecêb bû. Dû û dûmanê bi ser viborgê de girti bû. Di wê perda reş re zimanîne sor dibatin der û ber bi ezmanê heşin ve bil dibûn. Depoyên benzîn û her teklîl ardiwan û seraya hikûmetê wek elbikên kertou disotin û dibûn xwelî. Di tûriya şevê de avahiyyên Viborgê wek bizotîne stûr û bilind dixuyan. Ji daîra belediyê pê ve her der dişewitî, her tişt bû bû agir û dûman. Taxa belediyê dibiştin dawiyê, ji ber ko eskerên ko bêj li bajêr bûn ewê di vî taxê re derketana.

Me xwest ko em dakevin kûçan û di dora şewatana de bigerin. Ji me re gotine ko piraniya kûçeyên bajêr lexemkiri bûn û hebû ko em pê li wan bikin û beriya eskerên fênlandiyan wan her hewa bikin.

Saet bû yanzdeh, agir heta bi zîkê bajêr ketî bû. Ter û hişk tev de dişewitîn. Esker hêdî hêdî ji ber dikîşiya û terka bajêr da. Memûrên belediyê jî me re gotine ko saet dwanzdehan de eskerên paşin jî wê jî bajêr derkevin. Ji lewre diviya bû em jî tevdira xwe bibînin. Me ji ya wî kir û me da rê. Riya ko şanî me dan té de lexem nîn bûn. Bi rê ve hevalekî me dil kir cîxarekê berde. Beresteyê wî pê ne ket. Bi me re jî kibrit peyda ne bû. Hevalê me cîxara xwe vegevand elbika wê, li bajarê ko wek daristanêke hişk dişewitî, fedikiri û got:

—Qederî emrê vê cîxareyê jî emrê wî bajarî dirêjîr e.

HESENE MISTÊ

barkêş û yê rêwingiyan nikarî bûn bikevin behrên ko té de şer çêdibe. Qanûneke emêrikanî jê re bend bû, yanî wê ne dihişt ko ew vapor herin wan behran. Dîsa madeke wê qanûnê digot ko Emêrike nikare vaportîcaretên xwe bi çek bike. Reis Rûzwelt kir ne kir û ew qanûn jî her du meclîsan re daye edlândin. Ji 15ê Çiriya-Paşin û hir ve vaportîcaretên emêrikanî wê bikarin berin benderên îngilîzî û ewê jî İngilîterê re çek û cebiracane bibin.

ŞERÊ BEHRÊ — Di meha Çiriya-paşin de di Behra-spi de şer germ bûye. Di vî behrê de nemaze talyan û ingilîz li hev dixin. Talyan di behra spi re esker, çek û cebirxanê ditînin Libyayê. Stola ingilîzî û balafrîrên wî li vaporen talyanî dixin. Di nivê vî Çiriya de ingilîzan bi ser vaporgesleke talyanî girtin. Di qeflê de deh vaporen barkêş hebûn. Ingilîzan ew her deh jî bin av kirin. Ji van pê ve jî stola ko qefle dihemenê çar bertopiyor

(Dawiya Rewşa Dinyayê di rapêlê 13an de ye)



## AGIRI

Çi gava çavên xwe digirim û herê ranmanên xwe her ve welêt diguhêzim, bê hemd navçavên Çiyayê Agirî ên bilind û pirberf tîn her çavên min.

Ew Çiyayê ko bi destê şîna Xwedê di bakurê welatê min da wek pandlgehekê hatiye daçikandin û ji ba û bager, berf û bilêk û mij û dûmanê vala namîne.

Ew Çiyayê ko, dem bi dem ji gelên doralîyê xwe ra, her carê bi awakî bûye qiblegah; iro ji di dilê welatparêzên kurd da cihêki bilind û zirav ji xwe ra girtiye. Eger di babiliskên kevin da bû bû argûna agirê zerdeştîyan û qada dêlîndêzên wan, iro ji dîdogaha gelê kurd e. Ji her ko di nav kuç û zinar, best û şikêr, pal û kûntarên xwe da; bi hezaran hestiyên şerkerên kurd vedîşêre. Ji lewra rûmeta wî ya iro ji ya dihan ne kêmtir e.

Eger zerdeştî ji bo parastina canê xwe bazgûrî bilindî û guraniya agirê navçavên wî dibûn; şerkerên kurd, ji bo serbestî û azahiya welateki binpê û mileteki bindest ywîna xwe di bilindcihên wî da rijandin; û bi vê yeka han, rûmeta wî mezin û navê wî bilind kirin.

Car caran tê bira min ko bi zaravayeki luvekar bi landika şerên welêt Çiyayê Agirî ra bipeyivim. Bipeyivim da ko daxwaza xwe jê fêr bibim.

Ev çiya ne wek çiyayên mayî ji kevirên pir bihevketî ye! Wî zeman zeman lavelavên pir mirovên wekî min ên derdimend bihistine. Çiqas ko cihaba wî ne bi dev û zimana jî, teqez dilê bazgûrbûyan ji ronahiya rastiye bê par nabêle.

★ ★ ★

Çiyayê bilind! Ji çend salan, te birek hevalên canecan û mîrxas hebûn. Ma gelo, haya te ji wan heye?

Ew hevalên ko, li nik wan parastina te, serbestî û azahiya welêt bû. Heyn û rûmeta xwe û wetatê xwe di navçavên te ên bi berf da diditin. Ji bo parastina axa te, bi comerdi xwina xwe dirijandin... Bê şik pirê wan jî, te veneqetn; axa te a çak bi xwîna xwe a paqij avdan. Iro jî bestiyên wan mîrxasan di best û şikêrên te da bayên hênîk li xwe dixin.

Yek jê Birho, tevî kurtî û piraniya neyar û rûbadana bext, nikari bû dev ji te ber-

de. Herwekî ji te ra sond xwarî bû, diviya bû gotina xwe bîne cih û dest ji te neke. Te ji bi comerdi di navderza piştî xwe da (1) gorek dayê. Çiqas ji Birho ra ew ax bi qasî bihuşteki hêja ye; ji te ra jî, di piştî te da razana şereki weke Birho hêja ye. Çi cihêki baş û pandiyekî mîrxas...

★ ★ ★

Ma gelo tu zani ko çî li Ferzende qewimî? Na, belkî ji tu nizani. Çima ko qedere ew şêr bê daxwaza wî jî best û şikêrên te bi dîr xist. Ew mîrxasê ko herdem para neyaran di dest wî da mirin bû; bi bêbextîya hin destên gunehkar, bê teq û req, şin û şîwan çû! Çûyîneke welê ecêb ko, di dema mirina xwe da ne li pişt xwe yar û ne jî li xwe neyar ne ditin.

Roja ko şer giha kûntarên te û neyar qelaçeya wî bi cih kir, hingê tu bi xwe hêrekerê mîraniya Ferzende bûyî Wê rojê neyar sed û sî guleyên topan li kozika torinê Hesenan da bûn û şeş birinên xedar di ran û parsûyên wî da vekirî bûn. Roj niziki êvarê bû ko bi hikmê topan qûça ko qelaçeyî ser bi carekê ser û bin bû. Toz û dûman di qelaçeya Ferzende da wek ewreki gewr radibûn û li kûntarên te belav bibûn. Mirov bawer ne dibûn ko di nav wê birkana êgir û dûmanê da tinawir bimîne. Lê Ferzende, weki şêrê ko di hewingê da bi birin dibe; hin nih dest bi halan û zirtan dikir.

Wê gavê hevalan digot ê: « Ferzende! neyar cihê te nasiye û birinên te xedar in, rabe em hineki te bi şûn da bibin ». Ewî bi dengê xwe ê box li wan vedigerand: « Mala we ne ava, ma hon çawan quil dibin ko neyar bêje? Ferzende rû bada!... Ma hon nizanin ko mîrxasên mala Emer jî me torinên malbatê ra riya revê venekirine. Şerên Ava - heftreng (2) û Mêrgekulavê hin di bira min da ne. Lêdin û neyar serwextî halê xwe nekin. Mirin jî bi camêri xweş e ».

Ev pandiyê te ê mîrxas, di keleha Xoyê da herî du salan hate jêhîrandin.

★ ★ ★

Di hevalên te ên xweya da bi tinê serdarê şerkerên kurd sergevazê bilindcihên te fermandarê me ê bi ronî maye. Ew jî ji yanzde salan û vir da di nav lepên eceman da nikari bû tev bigere. Lê bêhneke bi tinê wî tu jî bîr ne kirî û nake. Wî hergav, çav li kêseke bi havil e, da ko weke herê mîrxasên kurd li serê xwe bicivinc û di navçavên

# MOSKO

ASEGEHEN PAYITEXTÉ BOLŞÉVIKAN

Ji didowé Çiriyé a pêşin ve elmanan dest bi êrîşeke nû, kiriye û vê carê herê xwe daye Moskoyê, payitextê ûrisan. Dibêjin ko ûrisan dora payitextê xwe gelek asê kirine û wek xeta frensizan a bi nav û deng Mejîno, xeteke xurt di dora wê de anîne pê.

Di nivê Tebaxê de serfermandariya ordiwa ûris rojnamêvanên biyanî ezimandine ziyareta wan asêgehên. Nûyork Hêrald Tribiyûn di vê habetê de mektûbke mixabirê xwe yê Maskoyê belav kiriye. Mixabir di mektûba xwe de wextê asêgehên Moskoyê dide û dibêje :

— Timobila kulnêl Polyof yû ko em lê siwar bû bûn, di her û di nav zeviyên heşin re derbas dibû, diçû. Ew zevi bi xera sê çemên ko ava xwe dirijînin wan, her û her û salê pê de kesk û heşin in.

Piştî şaetekê, timobila me gihaste gundekî nû û spehî. Em ji Moskoyê 60 kilomêtiri bi dûr ketî bûn. Di xaniyên vî gundî de zabit cih bû bûn. Di vî gundî de em hineki sekinîn, kulnêleki lî wesîqeyên me nihêrt û paşê destûra me da Timobila me ji nû ve bi rê ket. Her du aliyên rê bi darên ekelpîtos xemilandi bûn.

Timobila me li ber siha darekê sekini. Kulnêl Polyof xwe zer kir û peya bû. Me ji da pey. Em gihastim deriki; û bêt ko em li wî din, derî vebû. Ji ber ko divedanên binêrdê hatina me diti bûn. Derî nîzîm bû, me xwe xwar kir û em tê re derbas bûn. Piştî du gavan deriyeki din ket pêşiya me. Paşê yeki sisiyan. Em di wan re ji derbas bûn û ketin hundirê asêgeha zêzeminî. Me digot, qey em ketine hundirê noqarekê yanî vaporeke ko di bin behrê re diçe.

te ên bilind da ala knrdî a rengin daçikine...

Teqez vê carê, bi tinê bi wê ji nasekine; û wê piştî xwe bide te û dirêji neyarên welêt bike.

Çiyaol bizan, şerê xelasa mîleteki heye ko bişekine lê ew beriya xelasiya wî mîletî naqede, dom dike . . . Pêş de diçe . . .

OSMAN SEBRÎ

[1] Ji goreyî ko min ji devê şerkerên Agiriyê bihlatiye, gora Birho di nava herdu Araratan di palekê da ye.

[2] Şerên Ava-heftreng û Mêrgekulavê di Serhedê da bi nav û deng in. Di van şeran da torinên Hesenan meraniyên ecêb kirine.

Belê ûris dora payitextê xwe kola bûn û li bin erdê bajarek çêkiri bûn. Gava em ketin hundirê wî bajare bînerdin beri her liştî çavên me bi dûrebîneke mezin ket. Diwar ji hemî kul bûn û di wan qulan re devê mîtralîzoan derdiketin derve û li çolê dinihêrtin. Di ber û di tanista me re bin zabit û esker diçûn û dihatin. Min dil kir ko bi wê dûrebîna mezin fedkirim derve. Destûra min dan. Min ji bin erdê rûyê erdê weke xwe didit û tiştên ko min bi rê ve ne diti bûn, niho çavên min bi wan ji diketin.

Ji vê istihkamê em derbasi istihkameke din bûn. Her du istihkam qulêri hev bûn û di navbera wan de neqebeke girti hebû. Istihkama didowan ji ya pêşin meztir bû. Diwar bi resmên Stalin, Vorosilov, Bûdyenî, Timoşenko, Gedanof û Melotof xemilandi bûn.

Çavên me bi grême fon û radyokê ketin. Kulnêl gote me ko esker di vî bajarê bînerdin de mîna xelkê ko di zikê Moskoyê de ne dijin, û kêfê dikin.

Istihkamên bînerdin li pey hev digihan êk. Zabitê ko bi min re bû got ko di dora Moskoyê de bi vî awayî yanî di bin erdê re 400 kilomêtir çarçik istihkam hene. Kulnêl pîrsa xwe pêş ve ajot û got :

— Erdê ko hon tê re hatine tev de istihkam in; binê wan erdan ji top û mîtralîzoan liji ye. Bi dûrebînên ko hon dibînin nobetdarên me dijmin ji dîr ve keşif dikin. Topên istihkamên pêşin dikarin di deqîqê de (10 000) gule berdî dijmin. Heke dijmin ew istihkam xerab kirin istihkamên din bera wî didin. Herçî tang in emê bibîlin ko ew heta 500 mêtiri nîzingî me bibin û paşê bi guleyên pênc sed kiloyî emê li wan xin. Heke dijmin gaza jehrîn îstîmal kir em jê ji natîrsin. Ji ber ko istihkamên me welê hatine çêkirin ko bi şixulandina bawêşinan tê de hewa zûka tête gulhartin. Heye ko istihkameke me bikeve destên dijmin. Ev ji ne xem e. Ji ber ko istihkameke din li pey wê ye û divêt dijmin ji nû ve xwe pêk bîne û dirêji istihkama didowan bike. Ev ji îşeki zehmet e.

Yekî ji me ji kulnêl pîrsî :

— Elman dibêjin ko xeta Stalin di çend cihan de şkenandine. Ev çi xet e ?

Kulnêl kenî û got :

— Li Rûsyayê xetek wek xetên Mejîno û Zigfrîd nîne. Serfermandariya rûsî, bi tenê di lîm cîhan de tabîye dane kolan û zeviyên torpilê çêkirine. Herçî riyên ko diçû Moskoyê û Leningradê û bajarine din en mezin û riyên

# SİNEMA

## DI ŞERÊN FLANDR Û DINKERKÊ DE

Di şerên berê de tarixê bûyerên şer dinivîsandin û dihiştin nişên ayendê. Lê di vî şerî de tarîx van bûyeran dinivîsine û resmên wan jî dibê. Bi vî awayî nişên ayendê bûyerên vî şerê bêeman û xwîndar di kitêbên tarîxê de wê bixwînin û li ser perda sinemê a spi de jî bi çavên xwe û weke xwe bibînin.

Yek ji van sinemageran biserhatiya xwe bi awayê jêrîn qise dîke:

— Li 10ê gulane sala 1940î min ji serfermandarê ordîwa îngilîzî ya Ferensê izna xwe xwest ko ez derbasî Belçîkayê bibim û sûretên şerê wî welatî bigirim. Ewî izna min da û bi çend hevalan re ez derbasî Belçîkayê bûm. Xelkê Belçîkayê derketî bûn pêşiya eskerên ferensîz û îngilîzî yê ko hati bûn hawara wan; silav li wan dikirin û çepilkan li wan dixistin. Min resmê vî nimayîşê girt û pê devê kemêra [1] xwe, vekir.

Roja din em gihastine bajarekî bimberdimankirî. Bertî bi rojekê balafirên elmanî ew bajêr da bûn ber bimban. Min li hire jî çend resim girtin. Menzereyîne zîz û elemnak. Di alîkî de jî nîkeke lîngbîrî, li darûbestê siwarkirî, qalî ne dibû here xestexanê, da bû ber qîran û dixwest kurîkê xwe bibîne; kurîkê ko eskeran cendekê wî ê hûr û cemidî jî bin rîknên bilweşiyayî derdixist.

Derketim derveyî bajêr. Min li erdê balafirêke elmanî dît û dil kir ko resmê wê bigirim. Min nîzingî lê dikir, eskerekî belçîkî gote min ko di van balafirên de carîna bimbeyên siwarkirî hene ko piştî ketîna balafirê

---

ko digehin bîrên pêtrôle bi vî awayî torpîlîkîrî ne.

Îcar min gote kulnêl ko frensîzan di sala çîlî de keriyên berazan berda bûn zeviyên torpîlê û bi vî awayî torpîlên elmanan beriya êrîşa eskerî jî berezan re da bûn teqandin.

Kulnêl dîsan kenî û got:

— Belê me hay jê heye. Lê ji zeviyên me yê torpîlê bîhneke welê nexweş radiibe ko beraz jî jê dîrevin.

Me roja xwe di nav Istîhkamên Moskoyê ên bînerdîn de qedand. Di vegeerê de min jî timobilê temaşa çolê dikir û di bin her dar û kevîrî de qey topek an mîtral-yozek didît. **DILAWER ÇARPÎNE**

bi mîdekî nenas diteqîn. Ez jê bi dûr ketim.

Li 13ê gulane em gihastin Brûkselê payitextê Belçîkê. Me şevêkê rahet û bi sîkûn derbas kir. Sibetirê hevalekî me dawetek çêkir û waliyê bajêr jî lê ezimand. Em li ser taştê bûn. Îşareta talûkê hate dayin û beriya ko em xwe bigihînin sirdaban balafirên elmanî bimbeyên xwe bera bajêr dan. Min nemerdî ne kir û digel kemêra xwe derketim şehnişînê, da ko sûretên balafir û bimberdimanê bigirim. Balafirên dijmin bi sê refan lêk vebû bûn. Bimbeyên texrîb û şewatê diketin ser taxên bajêr û jî her derê toz û dûman, pêt û agir radibû û mirin li bajêr belav dibû. Min çend sûretên din jî girtin.

Piştî nivro em ji Brûkselê rabûn û me berê xwe da Lovanê. Bi rê ve em rastî qefleyên derketîyan dihatin. Hin bi rê, hin bi zevîyan ve diçûn. Kemêrê halên wan ên pertîşan jî li ser filmê sekinand.

Menzera ko kemêrê di deriyê bajare Lovanê de girt bawer bikin ez wê menzerê tucaran jî bîr nakim. Pîrejînekê zarokek kirî bû himbêza xwe, yekî din li piştî xwe a xûz siwar kirî bû, didowên din jî ew jî dawê girtî bûn û xwe jê re didan kaş kirin. Rê jî timobil, metosîkl û ereban tîjî bû. Herkesî jî ber mirin û kuştîne baz dida. Di vî navê de mitosîkla keçîkekê, nîzanim çawan bû, li pîrejîne da. Jinik digel barê xwe ê giranbeha li erdê pehin bû. Em tev de ber pê çûn. Jinik jî lîng û jî rûyê xwe bîrîn bû bû. Zarokê ko di himbêza wê de bû mitosîklê pê lê kirî bû, serê zarokekî din li kevîreki ketî bû û mejiyê wî hati bû der. Ji her du zarokên din, lîngê yekî şikestî bû, ê din sax bû, tu tişt pê ne hati bû.

Herçî keçîka ko li mitosîklê bû zû jî erdê rabû, ji piyan sekinî û li vî mezera kuştare, bi çavîne bel û heyîrî, wek yeke ko eqîlê xwe wînda kiriye û din bûye, dînihêrt û destê xwe di ser eniya xwe a xwêhdîyî dibîr û tanî.

Yek jî timobilên ko di ber me re derbas dibûn, sekinî. Me her du cendek û her du birîndar û lawîkê sax lê siwar kirin. Me jî xwediyê timobilê zanî ko kûçe û kolanên Lovanê jî cendekan tîjî ye. Me da pêş û em gehîştin bajêr.

Li Lovanê me seh kir ko elmanan nîzingî li bajêr kirine û belçîkî jê dikişin. Lê belçîkî beriya ko jê bikişin, dikirin pîra ko li devê bajêr bû berhewa bikin. Min di dile

---

[1] Mekîna fotografê ya ko pê resmên sinemayê tîne girtin.

xwe de got; nabe ko kemera min ve firsenede ji dest bide.

Kumandarê belçikî şîret li min dikirin û digot ko di wî îşî de talûkeke mezin heye. Min ew talûke da bû ber çavên xwe. Ez ji bajêr derketim û ber bi pirê çûm. Zabitek lê bû. Min pê re da û stand û zani ko wî zabiti ev 48 saet in parîk nan ne kiriye devê xwe. Dîsa zabiti gote min ko dînamitên ko xistine ling û kevaneyên pirê bi qîmeta hezar zêrî bûn. Bi texmina wî zabiti elman ber bi êvarê wê bigihîştana pirê. West ji nîvro bû. Ez vegeyriyam bajêr da ko çend sûretên din jî bigirim.

Êvarê ez dîsan hatim ser pirê. Topçiyên belçikî tavêtin elmanên ko dirêji bajêr dikirin.

Zabîtê ko pir berhewa bikira ez bi şûn de vegevandim û gote min, ji sed mêtîrî bêtir nîzingî pirê mebe. Min kemera xwe li wê derê daçikand û ez bi xwe hinekî din bi şûn de kişiyam.

Zabiti îşaretek da min. Min jê zani ko zabiti fitila dînamitan vexistiye û ji min re dide zanin ko divê hinekî din jî xwe bidim paş. Qederê deh mêtiran min xwe da paş. Erd di bin lingên min de hejiya, stûnine reş ber bi ezmên rabûn û lê belav bûn. Bê hemdê xwe gaveke din bi şûn de vegeyriyam. Wê gavê ez ji mirinê xelas kirim. Ji ber ko cihê ko ez lê bûm bi rakirina lingê min qelişt û erd vebû, pêşiya min bû hevraz. Lê kemera di cihê xwe de bû; her tişt cem xwe û weke xwe girti bûn. Elmanan dikir ko bikevin bajêr. Roj çû bû ava, zerahiya ezmên a paşin di tariya şevê de winda dibû.

..

Ez di bin barana bimbe û gulan de di navbera xetên belçikî û Dinkerkê de diçûm, dihatim. Carekê (tu balafirên elmanî bi ser timobîla min de girtin, mitralyozên xwe li me girêdan. Şiforê min hate kuştin, timobil wergeriya lê ez xelas bûm. Carekê jî perçeki gulê li zendê min ê çepê ket û ez birindar bûm û vegeyriyam Ingilîterê. Qederê deh rojan li mal mam.

Di dewiya Gulanê de û piştî şikestina ordiwa belçikî eskerên ingilîzî jî Dinkerkê diketin vaboran û vedigeriyan welêt. Diviya bû ez herim û sûretên vegeya ordiwê bigirim.

Ji Ingilîterê ketim vaporeke kevin û min berê xwe da Dinkirkê. Beriya Dinkerkê bi saetekê mijê rûyê behrê girt û her tişt jî ber çavên me winda bûn; ne bej, ne vapor,

Ji MEMÊ ALAN :

## LEHÎSTIKA ŞETRENCÊ

Min bihistiye ko Lêzgin axa dike Memê Alan digel tercimeke frensîzî belav bike. Dîsan bi gubê min ve kirine ko bi axê re herçend gelek guharto hejî jî di tiwan de strana lehistika şetrencê nîne.

Ji xwe kêm dengbêj û stranvan hene ko pê dizanin. Di nav kaxezên xwe ên kevin de ez lê geriyam û minhoke peregende bi destê min ket. Heye ko ev minho ne tişteki tekûz û bi ser û guh e. Lê heke axê kêm û nivcobûnê di ser nînbûnê re girt divê ev minho bi kerî wî bêt.

Ez wê pêşkêşî axayê xwe dikim. Ew bi kêfa xwe ye. Girtin û ne girtin her du jî jê re bêminet in.

Sibehtî mirê min rabû, berê xwe da derizane Di ber xulaman re derbas bû hate diwanê

ne esker. . . . Bi sibehtê ve me nîzingî li Dinkerkê kir lê fermanariyê ne hişt ko em bikevin hundirê benderê; ji ber ko balafirên elmanî bê etlahî li benderê dixestin.

Zabiteki gote me ko şevêdi 300 balafirên elmanî, bi fikra ko kemên eskeran in, li girên çûm yên ko li nîzingî benderê ne xisti bûn. Di vê navê de birekî esker bi selematî li vaboran siwar bû bûn.

Bimberdîman heta rohelê dom kir. Carê ko bimbe ditegiyan vabora me bi ava behrê re dihejiya. Gava bimberdîman sekîni destûra me dan û me nîzîrgî li bejê kir. Bi me re bi sedî vapor, qayiq û her textlî filûqe nîzingî li bejê dikirin da ko esker li wan siwar bibin. Min çend daran sûretê vapor û siwarbûna eskeran girtin.

Lê vê carê siwarbûna eskeran li vaboran bi selematî ne çû seri. Dema ko eskeran qesta vaboran dikir û bi sedî peya xwe avêti bûn behrê û bi melevaniyê diçûn vaboran ewir şeqitîn û balafirên elmanî xuya kir; û vapor dan ber bimban û mitralyozên xwe li eskeran reşandin. Esker tevli hev bûn û bi hev ketin. Min digot qey di bin vê barana hesinî de kesê zindî ne maye û bender jî cendekên eskerên ingilîzî tîji bûye. Kemera min dixebitî û ji min çêtir didit û digirt.

Piştî ko hemle qedîye û toz û dûman belav bûn; min dit ko esker weke berê û jî nû ve qesta vaboran dikin.

Balafireke elmanî ket nîzingî vabora me. Me yek jî balafirvanên wê xelas kir.

Gava vabora me terka Dinkerkê dida bender û bajar dişewitîn. Kemêrê ew resim jî girtin. »

EVDIREHMANÊ ROJKÎ

Rûnişte ser textê mirên Cizira Bota  
Ser textê gewherkiri, zivîn, zêrheli  
Lêva xwe hema şil kir, bi çaya fincana ferfûri  
Go sifrê rakin, dilê min naçe tu xwarin û  
tu xwirinî.  
Mir ne kir banî xulaman, li hisabdaran jî  
ne pirsî

Lê kest ne wêri bû here balê,  
Dizanfîn mir bêmad e, mirûzdayî  
Xwe dan alî û tev de rabûn jî heywanê.  
Taliyê berdevkektî kal û bi xatir,  
Ji hindav de rabû, bi hafê ket axir.  
Qelûna mir dagirt, pereng berda ser, agir veda;  
Li dorê fedkiri, dest da balgiha, kuxî, kir  
ne kir

Mir xwe tev ne da, û poz pê ne kir.  
Kalo li xwe ma heyirt, pêlepaş çûye der;  
Nik xulaman hate ve, bê deng û lal, xwe  
kir ker.

Xulaman jê pirsî, gote wi mamô!  
Ma mir tişteke ne gote te?  
Mifirdî dey ne kir, serî hêjand, bi lali gote no.

Mir texmîn dikir, texmîneke giran, gelek  
damayî;  
Derdan serî da bû, ew û xemên xwe şevê  
pê de nerazayî  
Dihatin bira mir tiştên dihi û pêr û ên mayî.  
Ma Mem çire bi mir re ne çû hû rav û nêçirê  
Li bajêr ma û dema mir hat, bi zilaman ve,  
ji derî da;  
Torinên Çizira Bota tev de rabûn jî ber wi va  
Bi tenê Memê Alan jî cih ranebû xwe qet  
tev ne da.  
Li erdê ma perîşan, hewranî li xwe badayî.

Beko, Bekoyê awan, seypesane mirekên Bota  
Ji derve, li pişt derî, sekini  
Wi jî texmîn dikir, awa awa.  
Heçko dilê mir xwendî bû, go firsend e aniha.  
Bi pabûsî kete hundir, gote mir, mirê min  
ezbenî  
Ma meqsûd ne ew bû em vekiin qûtîya dila.  
Bila herin ba kin, jî bilî lievala Memê Ala  
Ji min zêde be jî ez bibêjim, ez bendeyê  
mir im.

Tecribe ke pê re bide bistine,  
Kirasê wî şil ke rake, bide ber tavê.  
Qet hermede hillne, deyne, biwestine heta dawî  
Tiwê her tiştî bibînî bi vl çavî.  
Bi awanî digo Beko, hema tu zora wî bibe.  
îşê te pê nine.  
Beko danî hilanî, devê xwe bir û anî, şret  
li mir kirin.

Mir ev şret ditine rast, gote xulam û  
pişekaran  
Herin tenha jî min re gazî kin Memê Alan  
Lê guh bidin, xeber neçit Tacin û her du biran  
Min iro navê bêne hafa min çî kurman û  
çî pismam.  
Cila bibin hewşê, raxin, lêhistika şetrencê  
bidin navê.  
Vexwînin herçî begler û axa giragir û tori-  
nên Bota.

Roj dihate taştîya, tavê dida bedena Birca -  
Belek  
Mevanên mir dihatin tof bi tof û yek bi yek.  
Memê Alan bi dilxweşî hat û kete civatê  
Memî digo, mir di min bori  
Herçî qisûrên min hene dane ber lingan  
Ji xwe adet jî ev e, cem mir û mezin û  
hakiman.

Mevan rabûn jî ber sifra parêv û medfûnî  
û arok  
Hina qelûn dikişand, hina jî guh dida çirok  
Mir gote Memî, mevane min î giran û hêja  
Min dil heyê iro ez bilehizim bi şerta  
Eve şetrenc, kerem ke rûne pêşmiqabil  
Şertê min ev e, yek e, sivik e, heçî şikest  
Xwe bispêre lêvok û belengazê min.  
Ewê pê re, bi kêfa xwe, henek û yarikê bike.  
Memî go li ser sera ezbenî herçî emr û  
fermana mirê Botan e  
Rabû, hat, rûnişte ber şetrencê, rêz kirin şah  
û fil û ferzîn  
Mem lehizvanekî zor bi, lê Mir pê ne dizanî  
Mem û Mir herwekî biçûna navê hevûn  
gerandin

Temaşageran zanî xurt e, Memê Alan  
Mir Ezin nikare hiline bar û berbarî  
Bi rimh û gurz û şesperi, Mem kete nav  
eskerên mir  
Sefa pêşin xera kir di baskan ve kete hundir  
Siwar jî hespa de xistin, peyar dan her  
lingên fîla  
Bera birc û harû da pêşî jî dijmin stand  
Li şah hate wer, rex û ferzîn kirin hêşir  
Beko madê xwe kir di fena wî derkete pûç  
Mem tu firsend ne da, pey hev jî mir bi-  
rin sê dest  
Beko di îş xerab e, mir dişkê bi Mem re  
maye serdestî.  
Ewî soz da bû mir Mem bigre, lê bi bindestî.  
Çavê Beko bi Zîne ket, Zîno li ber pencere  
rûniştî

Di paş Mem re, ji jor de, berê wê li mir,  
hewşê difedkiri.

Beko kenî, pê şa bû, gote mir: mirê min ezbanî,  
Di lehistikê de siûda mirov carina bi cih têt;  
Ji lewre divêtin Mir û Mem cihên xwe bi  
hev din.

Bila Mem here şûna Mir, Mir li şûna wî rûnît.  
Lehizvanan cihên xwe pev guhart  
Mem hat pêşberê dildara dilovan, lê çav pê  
ne kir

Beko dîsan rabû devê xwe vekir, gote civatê:  
Divêt birca me birceke kevnare be, neqşine  
ecêb lê ne.

Memê Alan bê hemdê xwe serê xwe rakir, li  
diwêr fedkiri

Çavê dildayî kete çavên dildarê  
Eqil terka serî da, hiş ji dil rabû, can ji ten  
bû, çû firî

Destên Memî di ser textê şetrencê re diçûn  
dihatîn

Lê Mem êdî nezantî lehistik çî ye? Mir çî  
dike nake

Fîl û hespên xwe didan bê hay, şûna seg-  
man û peyan

Bi derbine nelê diket beynelê; ferza wî dibû  
hêsr

Peyarên Mir hespên wî digirtin wek hêstir  
û bergir.

Beko digo mîrê min ezbenî, min ne go le-  
histik siûd û cih e.

Mir Ezîz bawer dikir, kêfa xwe tantî, dida  
kiş û berkîşa.

Pir ne ajot zora Memî çû, mir şeş dest jê birin  
Xulam û pişekaran şetrenc û texte ji navê  
rakirin.

Mir destûr da, herkesî berê xwe da derfazanê;  
Mir ji çû bantî, aliyê malê.

★ ★ ★

Civat belav bû, hewşa qesrê li wan ma xir û xalî  
Zîn ji li bantî, ji pencerê xwe da alî  
Beko rabû, ntzingî li Mem kir got ê, şahzade  
Li gora şertê te û mir kerem ke dest û  
lingên xwe berde.

Memî go bila be; ez bibinim çî ye yariya te  
Beko çû wertsek anî dest û lingên Mem pê  
girêdan.

Mem rabû, xwe ji cih hinek tev da  
Werts bû piç û parî, ji hev de ket qetî

Vêga Beko kete binaniya bircê zencizek anî  
Memê Alan dîsa dey ne kir dest û pê sist  
kirin, berdan.

Beko mêvanê xwe pihêt girêda xelex û girêk  
li hev badan

Mem bihnekê damayî ma, qey pêtek ji devî  
derket, pê pif kire zencir.

Hesin sor bû, helî, herikî, ket ewdê bû ma-  
reki fêris

Beko ji ber mêr revî, xwe da alî, xwe kire pis  
Mem kenî, fikand, nehwirî, mar tevizi, berê

xwe da bantî  
Mar kete quleke bircê, Beko bihna xwe da  
li ber Mem gerî.

Beko dikir lavelav, digote Mem: ezbenî  
Ma kengê ez bi te karim, divê tu rê bidî min

Mem di eqlê xwe de digot qey tev henek  
û yari ye

Memî gote Awan, kuro here stewlê çend mû  
ji dêl û bijiya Boz bine;

Çend mûyên serê min ji bigire û min pê girêde.  
Bi wan mûyan dilê min ji bir ve diçe saetkê ez  
dimînim bêhiş.

Beko nemerdî ne kir, mûyên Boz anîn çen-  
dek ji ji serê Mem rakirin

Mû li hev ba dan, kirin benekî zirav û tenik  
Tilî û pêçiyên Mem pê girêdan

Mem xwe tev ne da, cemidî, bêhiş, bû ba-  
reki sivik

Beko bi tirs lê fedkiri, li wî hâlî ma ecêbmayî  
Xeyala mêr hate birê, cendekê Mem rakir, revî

Barê xwe bir binaniya bircê dakir zindaneke  
kûr û tari.

## STRANVANÊ HAWARÊ

(DAWIYA REWŞA DINYAYÊ)

xeriqandin û du krewzor birîn kirine.  
Wer dixuye ko krewzorên talyanî dest ne  
birine xwe û çavê xwe dane revê.

Disan di vê mehê û di Behra - spî de  
ingilizan ji keştiyeke mezin winda kir. Ingi-  
lizan keştiyeke balafirhilgir hebû bi navê Erk  
Rweyel. Elemanan çend caran gotî bû me ew  
xeriqandiye. Lê Erk ne dixeriqî û her û her  
şerê dijminê xwe dikir. Lê vê paşiyê noqare-  
ke elmanî di ntzingî Cebeltariqê de û bi  
torpilekê Erk Rweyel bin av kir. Erk Rwe-  
yel 27000 ton mezin bû û qederê 70 balafir  
hildigirtin û topine mezin lê hebûn.

ŞERÊ EFRIQAYÊ — Herwekî me berê  
ji got, bi honikbûna dinyayê diviya bû şerê  
Efrîqayê ji nû ve dest pê bike. Ev penc meh  
in her du alîyan xwe pêk dîtînin. Ji ingilizan  
re di Behra-sor re ji Emêrikê bê qeder çek  
û cebirxane û tang dihatin. Herçî talyan in,  
wan ji di Behra - spî re qewet û çekine nû  
tanî Trablisxerb û Bingaziya. Lê ingilizan  
birekî wan di Behra - spî de bin av dikirin.



## LA PARTIE D'ECHECS

Les lignes que l'on va lire sont la traduction d'un passage généralement peu connu de la légende de Mamé Alân, et qu'un des collaborateurs de "Hawar" a eu la chance de pouvoir noter.

La "Partie d'échecs" se situe un peu après les divers épisodes dont le résumé a été publié jusqu'ici (cf. Hawar, No 25) : les trois frères Djelali s'étant mis d'accord pour protéger les amours de Mam et de Zin, les jeunes gens parvien-

Di nav qewetên talyani de divêt hin qewetên elmanî jî hebîn.

Li gora danezanên ingilîzî li 18ê vê Çiriyê bi şefeqê ve ingilîzân dirêjî xetên talyanî û elmanî kirine û bi derbekê xetên pêşîn şkênandine û qederê 60 Kîlômêtirî pêş ve çûne.

Ingilîzan qeweteke mezin aniye vê eniya şer. Li gora gotina rojnameyên ingilîzî vê carê ingilîz dixwazin talyan û elmanan bajon heta tixûbên Tûnisê û xwe bigehinin erdê frensîzan. Heke plana ingilîzan çû serî talyan û elman yekcar jî Efrîqê wê qut bibin. Ji xwe dilxwaza ingilîzan jî ev e.

Li gora danezana ingilîzî ya ko li 25ê mehê hate belav kirin di navbera eleman û ingilîzan de şerîne xwindar çebûne û xisari-ne mezin gihane her du aliyan.

ŞERÊ ÛRIS — Şerê ûris û elmanan weke berê bi şidet û xurtî dom dike. Piştî ko dinya bû sahi û erd cemîdî elemanan jî nû ve dirêjî Moskoyê kir. Li gora radyowa Moskoyê elman ber bi payîtextê bolsêvîkan ve dimeşin û rewşa bajêr xeternak e. Ûrisan terka hin îstîhkamên nû dane û elemanan nizingî li Moskoyê kiriye.

Lêningrad weke xwe ye. Ûris carîna dirêjî xeta elemanan dikin û dixwazin wê xetê di deverekê de qul bikin û derkevin. Li gora hin nûçeyan, ûris bi balafirên ji Lêningradê esker ditînin Moskoyê.

Herçî qada nivro, di nivgirava Kirimê de, li 16ê Çiriyê - paşîn eleman ketîne bajarê Kerçê û avtenga ko rê dide Qevqasê, xistine destên xwe.

Herçî bajarê Rostovê, li gora elmanan, bajar li 22ê mehê ketiye destên wan. Lê ûris derew bi aliyê vê nûçeyê ve didin û dibêjin ko Rostov hêj ne ketiye destên elemanan û şer di kûçeyên bajêr de dom dike û eleman di rohelatê bajêr de şikeştine û baz dane.

Şam : Çirya - Paşîn 1941 NÈREVAN

ment à avoir deux rendez-vous. Cependant, Beko le traître, travaille à la perte de Mam. Ses intrigues sont déjouées à plusieurs reprises. Il persuade enfin à Mir Ezin de tendre un piège au héros et de l'empoisonner.

De bon matin, mon émir se leva. Il se dirigea vers la galerie.

Passa devant les valets, entra dans le divan.

Il s'assit sur le trône des princes de Djezira Botân.

Sur le trône d'or et d'argent, incrusté de pierreries.

Il humecta seulement ses lèvres avec le thé de la tasse de porcelaine.

Et dit : "Otez la nappe, je n'ai pas envie de manger".

L'émir n'appela pas ses domestiques, il ne s'enquit pas non plus des intendents.

Nul n'osa s'approcher de lui :

Tous savaient qu'il était las et de mauvaise humeur.

Ils se levèrent quittèrent le perron.

Seul, un vieux courtisan, favori de son maître

Entra dans la salle.

Il bourra le tchibouk de l'émir, mit une braise sur le tabac, tisonna le feu.

Il regarda autour de lui, arrangea les coussins, toussa. Mais il eut beau faire

Le prince ne bougea pas et ne fit pas attention à lui.

Tout perplexe, le vieux sortit à reculons.

Il retourna auprès des valets, bouche cousue, sans piper mot.

Les serviteurs lui demandèrent : "Oncle, L'émir t'a-t-il dit quelque chose ?

Il resta silencieux, hochant seulement la tête pour faire signe que non.

L'émir réfléchissait profondément, perdu dans ses songeries.

Ses soucis s'étaient ranimés, il avait passé en leur compagnie toute la nuit sans dormir.

Les événements de la veille, de l'avant veille et des autres jours lui revenaient à l'esprit.

Pourquoi Mam ne l'avait-il pas accompagné à la chasse ?

Pourquoi était-il demeuré en ville ? Lorsque à son retour, il avait franchi la porte, accompagné de sa suite,

Tous les nobles de Djezira Botân s'étaient levés en son honneur.



Seul, Mamé Alân n'avait pas bougé, il était resté immobile

A sa place, l'air embarrassé, drapé dans son manteau [1]

Bako, Bako le Mauvais, le chien des princes de Botan,

Se tenait debout à l'entrée, sur le seuil de la porte.

Il réfléchissait, lui aussi à mille choses, Comme s'il avait lu dans le coeur de l'Emir. Il se dit enfin : "C'est le moment !"

Il entra, baisant le sol, et dit à l'Emir : "Je suis ton serviteur :

N'avions-nous pas pour but d'ouvrir le coffret des cocurs ?

Que l'on aille donc mander Mamé Alân et lui seul,

Même si cette proposition est déplacée de ma part, je suis l'esclave de l'Emir

Epreuve-le, cause avec lui, Mouille sa chemise et étends-la au soleil [2].

Ne lui laisse aucun répit, discute, lasse-le jusqu'au bout.

Et tu verras tout de tes propres yeux."

Bako disait perfidement : "Gagne seulement la partie, je me charge du reste."

Bako discourait, il parlait sans arrêt, prodiguait ses conseils.

L'émir trouva sage son avis, il dit à ses valets et à ses domestiques :

"Allez m'appeler Mamé Alân, et lui seul, Mais prenez garde que Tadjin et ses frères n'en soient pas avertis.

Aujourd'hui, je ne veux en ma présence ni cousins ni parents.

Portez les tapis dans la cour, étendez-les, installez l'échiquier,

Puis mandez tous les begs, les aghas, les grands et les nobles de Djezira Botan".

Vers l'heure du déjeuner, le soleil inondait les murailles de Burdja Balak,

Les hôtes de l'Emir arrivèrent par groupes et un par un.

Mamé Alân vint aussi, tout joyeux, se mêler à l'assemblée.

Il se disait : "L'émir m'a pardonné, Il a oublié toutes mes fautes,

[1] Mem s'était prétendu malade, pour ne pas accompagner l'Emir à la chasse, et était allé rejoindre Zin au palais. Surpris par le retour du prince, il dissimula Zin sous les plis de son manteau et ne put se lever.

[2] C'est à dire, tâche de découvrir ses défauts.

Suivant l'habitude des princes, des grands et des souverains."

Les hôtes quittèrent la nappe chargée de rôti de mouton, de croquettes farcies et de boulettes de viande grillée.

Les uns fumaient leurs tchibouks, les autres écoutaient l'histoire.

L'émir dit à Mam : "Mon hôte cher et bien-aimé,

J'ai envie de faire une partie avec toi, moyennant gageure :

Voici l'échiquier, viens t'asseoir en face de moi.

Quant à l'enjeu que je propose, il n'est que peu de chose,

Le perdant se prêtera aux facéties de mon bouffon,

Et nous rirons de lui à notre plaisir."

Mem répondit : "J'exécuterai volontiers tous les ordres de l'Emir de Botan."

Il alla s'asseoir devant l'échiquier, disposa les rois, les tours et les reines.

Mam était un joueur de premier ordre, mais le prince l'ignorait.

Les adversaires s'attaquèrent avec autant d'ardeur que s'ils se fussent pris à bras le corps.

Les spectateurs comprirent que Mam était fort,

Et que Mir Azin ne pourrait venir à bout de lui.

Mam chargea les troupes du prince à coups de lance, de masse et de massue,

Il bouscula la première ligne et enfonça les ailes,

Culbutant les chevaux, faisant fouler aux pieds les fantassins par ses éléphants [1]

Il attaqua, franchit la muraille et les tours de l'ennemi.

Il encercla le roi, s'empara de la citadelle, fit prisonnière la reine.

Bako faisait triste mine, voyant sa ruse déjouée.

Mam ne lui laissait aucun répit. Il gagna successivement trois parties.

Le traître vit que les choses allaient mal, l'émir se faisait battre, et Mam l'emportait,

Or il avait promis de réduire le héros à la merci de son maître, mais à condition qu'il fût battu.

Soudain, il aperçut Zin, assise à la fenêtre,

Elle se tenait derrière Mam, au premier étage, face au prince, et regardait dans la cour.

Bako se mit à rire, tout joyeux, il dit :  
Mon prince, je suis ton serviteur.

Il arrive qu'au jeu, la chance tienne à la place que l'on occupe.

C'est pourquoi il te faut changer avec Mam

Que Mam prenne le siège de l'émir, et l'émir le sien."

Les joueurs changèrent de place.

Mam s'installa en face de sa tendre bien-aimée, mais sans l'apercevoir.

Alors, Bako rouvrit la bouche, et dit aux assitants ;

"Notre château doit être fort ancien, il est orné d'étranges motifs."

Involontairement, Mam leva la tête pour examiner la muraille.

Les regards de l'amant croisèrent ceux de l'aimée.

La raison l'abandonna, la vie quitta son cœur, l'âme s'envola de son corps.

Les mains de Mam allaient et venaient sur l'échiquier,

Mais il ne savait plus où en était le jeu, ni ce que faisait l'émir.

Sans y faire attention, il sacrifiait ses éléphants et ses chevaux pour sauver ses piétons.

Il se laissa exposer à l'échec par des coups faciles; sa reine fut prise.

Les piétons de l'émir capturaient ses chevaux comme des mulets et des rosses.

Bako disait : "Mon prince, ne t'avais-je pas dit que le jeu est une question de chance et de position."

Mir Azin le croyait; tout joyeux, il continuait à mettre Mam en échec.

Mam fut vite battu : le prince lui gagna six parties.

Les valets et les domestiques enlevèrent l'échiquier.

L'émir congédia ses hôtes, chacun s'en fut vers la galerie.

Il monta lui-même à ses appartements.

L'assemblée se dispersa, la cour du palais demeura absolument vide.

Zin s'était aussi retirée de la fenêtre

Bako s'avança vers Mam, et lui dit :  
"Prince,

Pour payer ton enjeu à l'émir, abandonne-moi tes pieds et tes poings."

Mam répondit : "Soit : Voyons quel est ton gage".

Bako prit une corde; il lia les mains et les pieds de Mam.

Celui-ci fit un mouvement,

Le corde tomba en lambeaux, et se rompit.

Alors, Bako descendit chercher une chaîne dans les souterrains du château.

Mamé Alàn, toujours sans dire mot, tendit doucement ses mains et ses pieds.

Bako lia solidement son hôte, nouant les maillons de la chaîne.

Mam se recueillit un instant, puis, il souffla et l'on eût dit que des flammes lui sortaient de la bouche.

Le fer rougit, fondit, coula, se répandit sur le sol et se changea en un serpent gigantesque.

Bako s'enfuit devant le monstre, tremblant de peur.

Mam se mit à rire. Il siffla, le serpent se fit tout petit, monta,

Puis disparut dans un trou. Bako reprit son souffle et revint vers Mam.

Il se fit suppliant, et dit : "Je suis ton serviteur.

Quand pourrai-je venir à bout de toi ? Il faut que tu m'en indiques le moyen."

Mam pensait que tout cela n'était que farce et plaisanterie.

Il répondit au traître : "Mon ami, va à l'écurie, arrache quelques crins, à la queue et à la crinière de Boz,

Prends aussi quelques uns de mes cheveux, attache-moi avec.

Cela me fera perdre connaissance, et je resterai évanoui une heure durant.

Aussitôt, Bako alla chercher un peu du crin de Boz, il prit aussi quelques cheveux de la tête de Mam.

Il tordit le tout ensemble, et en fit une cordelette mince et fine,

Dont il se servit pour lier à Mam les pouces des mains et des pieds.

Mam resta immobile, figé, sans connaissance. Il n'était plus qu'un fardeau léger.

Bako le regarda avec crainte, tout étonné de ce changement.

Puis, il revit l'image du serpent. Alors il souleva le corps.

Gagna les souterrains, et le jeta dans une oubliette profonde et noire.

TAWÛSPARÉZ

[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)

## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdi C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelîne Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Biyişa Pêxember. Bi Kurdiya dumîlî, bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyân bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re
- 7 — C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikittin
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdi Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10 — Xwendina Kurdi Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11 — Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12 — Dersên Şerîetê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13 — Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14 — Proverbes Kurdes. Medhelokên Kurdi  
Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-Xan Paris - 1937
- 15 — Le roi du Kurdistan. Qralê Kurdistanê.  
Emir K. A. Bedir-Xan û Adolphe de Falgerolle. Paris - 1937
- 6 — Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdistanê.  
Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel  
Berlin - 1937
- 17 — Der Schnee Des Lichtes. Berfa Ronahiyê  
Şîrên Kurdi Prinz. K. A. Bedir-Xan û  
Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Salt	500	Qirûşên Sûri
Şeşmehî	300	Qirûşên Sûri
Sêmeht	200	Qirûşên Sûri

Xwedi û gerîndeyê herpirsiyar : Mîr Celadet  
Ali Bedir-Xan . Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire : Emir Djêladet Aali  
Bedir-Khan. Damas—Syrie

ŞAL 9  
HEJMAR 37

ŞEMBIH  
20 KANÛNA-PÊŞÎN 1941

# HAWAR

ANNEE 9  
NUMERO 37

SAMEDI  
20 DÉCEMBRE 1941

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARÊ

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
HeDISÊN Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Diwana Melê,	Qedri Cemil Paşa
Hevîna Perixanê	Nûredin Ûsif
Kurdistana bakur	Hişyar
Gramêra Kurdmanci	C. A. Bedir-Xan
Zêrê Ewropayê	Cemilê Tacdo
Di Etlantikê de	Evdirehmanê Rojki
Şer	Smainê Serhedî
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Şahîno	Stranvan



ŞAM—1941  
ÇAPXANA SEBATÊ



## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### TEFSÎRA QURANÊ

233 - Jinên berdayî heke dixwazin wextê bixwedikirina zorayên xwe ên herşîr timam bikin, divê wan du salan bimijînin. Rizqê zarok û cilê wî li gora taqetê li ser bavê wî ye.

Tu kes bi tişteki zêdeyî taqeta xwe berrisîyar nabe.

Heke dê zaroyê xwe dimijîne, nabe ko zaro jê bête standin, her weki eger dê bi mijandina zaroyê xwe qaîl bû, êdî nabe ko jê vegere û ji bavê zarokî, girtina dayînekê bixwaze.

Ko bavê zarokî mir, li ser warîsên wî jî, hikim dîsa ev e.

Heke dê û bav li ser mesela jî şîrkirina zaroyê xwe beri timam bûna du salên mijandinê dişewirin û li ser mîdekê jê hêj kurtir li hev tîn, ji wan re tu guneh nîne.

Ger hon ji bo zaroyê xwe dayînekê digirin ji we re tu guneh nîne, lê divê heqê wê li gora adet û edaletê bidin ê.

Ji Xuda bitirsîn û bizanin ko Xwedê her tiştê ko hon dikin dibîne.

234 — Jinên ko mîrên wan dimîrin û bi dimînin, bila ew çar meh û deh rojan li hêviya mehikên xwe bimînin û di vê dema hêvidariyê de xwe mexemilînin.

Paşê ji emelên wan weke xemilandin û ziwacê yên ko li gora marûfê ne, ji we re tu guneh nîne.

Xuda emelên we dibîne û dizane.

235 — Heke hon ji jînebiyekê re, di nav çar meh û deh rojên hêvidariyê de, qesda xwe a ziwacê didin zanin,

an heke hon vê daxwaza ziwacê di dilê xwe de vedişêrin ji we re ne tu guneh e. Xwedê xwe bi xwe dizane ko ev daxwaza hanî di dilê we de ye. Lê bi wan re, bi dizî maxêvin û me din, me stînin, heke bi wan re xeber didin bi dilpakî û camêri bipeyivin.

Berî qedandina wextê hêvidariyê dest bi standina wan me kin.

Bizanin ko Xwedê veşartiyên dilên we nas dike. Ji Xuda bitirsîn û ji rîya wî a rast averê me bin. Bizanin ko Xuda ji tobedaran re esîw û tobê dide Xwedê dilnerm e.

236 — Berdana jina ko hon nîzîkî wê ne bûne û we mehra wê jî ne birîye, ji we re ne guneh e.

Lê li gora taqet û edaletê bi dayîna tişteki, qedrê wan bigirin; dewlemend li gora dewlemendiya xwe, belengaz ji li gora halê xwe bila bide. Ev dayîn li camêr û comerdan tê.

237 — Heke hon jinên xwe piştî birina mehrê lê beri nîzîk bûna wan berdidin, divê ji wan re nivê mehra vebirî bidin; meger, ew bi xwe an weliyên wan jê bigerin.

Ne standina wê ji teqwayê re nîzingtir e.

Di nav hev de qenc, xatirniwaz û keremkar bin.

Tiştên ko hon dikin, Xwedê dibîne.

238 — Dest bi nimêjên xwe bikin û nimêjên xwe li gora emrê Xwedê pêk binin û bala xwe bidin nimêja navînê ango nimêja sibehê. Ji bona Xwedê bi dilekî pak rabin nimêjê.

239 — Heke hon di talûkê de ne, û baz didin, bi peyari an bi siwari,



nimêja xwe bikin û gava talûke nema; dişa herwekî Xuda ji we re da zanîn, berê we ne dizanî bû, dest bi nimêja xwe bikin.

240 — Yên ko dimirin û jinên wan bi dimînin, divê berî mirîna xwe, ji miratxwerên xwe re wesiyetê bikin, da ko ew wan jinûbiyan ji mala mêrên wan ên mirî derneêxin û ji wan re salekê nefeqê bidin. Lê heke jinebî, xwe bi xwe ji mala mêrên xwe derdikevin û bi marûfê, xwe dixemilînin an peyziwacê digerin, Geli qazî û miratxwerîno... Ji we re êdî tu guneh nîne. Xuda delal û fêris e.

241 — Ji jinên berdayî re li gora camêrî û comerdiyê divê tiştek bête dayîn, ev li ser mirovên bawermend deyn e.

242 — Xuda bi emrên jorîn ayetên xwe şanî we dide ta ko hon bi hikmên di wan birewer bibin.

243 — Pêxemberê min, te li wan ne nihêrtiye?... Ji tîrsa mirînê bi hezaran ji welatê xwe derketine. Xwedê ji wan re got: Bimirin... Piştî Xuda ji kerema xwe ew vejandî.

Kerem û qenciya Xwedê li ser xelkê mezin e, lê bêtirê wan şikir nakin.

244 — Di riya Xuda de, dest bi şer û kuştinê bikin û bizanin ko Xuda dibihîse û zana ye.

245 — Yê ko bê minet û rûtirşî di riya Xwedê de arikariya xelkê dike, Xuda ji kerema xwe a mezin vê qenciye bi zêdahî ji xwediye wî re vedigerîne. Xuda ji hikmeta xwe hinan çavteng û hinan ji destvekirî dike, qismeta hinan digire, qismeta hinan vedike.

Gelî mirovên bawermend, bizanî ko honê vegevin ba Xwedê.

246 — Pêxemberê min, ma tu pe nîzani? Piştî mirîna Mûsa mezinê lawên Israîl gihane hev û ji pêxemberên xwe re gotin: Bila ji me re mirek bête bijartin, heta ko em bi arikariya wî di riya Xwedê de, bi Calût û xelkê di wî dest bi şer û kuştinê bikin. Pêxemberê di wan got: Dîtirsim ko hon paşî vê gotinê bêbextiyê bikin û dest bi şer û

kuştinê nekin. Wan got: Ma çawan em dest bi şer û kuştinê nakin, Calût em ji welatê xwe derexistin û em ji zar û zêçên xwe bi dûr xistin.

Lê gava şer û kuştin li ser wan ferz bû, bextê xwe şkenand, bi tenê cendekên wan dest bi şer û kuştinê kirin.

Xwedê mirovên zalim û bêbext nas dike.

247 — Pêxemberê 'di wan ji wan re got: Xuda ji we re Talût kire mir.

Wan got: Ma çawan Talût dibê mirê me, em ji miritiyê re, bi her awayî jê layiqtir in, ew ne dewlemend e ko arikariya me bike. Pêxemberê wan got: Xwedê ji miritiyê ra, Talût ji we çêlir girtiye. Xuda Talût kiriyê serekê we. Bi zanîn û zexmiya xwe Talût ji we zêdetir e.

Xuda ji kîjkî re dixwaze sererazî û mezinahiyê dide.

Kerema Xwedê mezin e, û zanîna wî kûr û fireh e.

248 — Gava lawên Israîl ji pêxemberê di xwe hiceta miritiya Talût xwestin, wî ji wan re got: Ewê ji we re Tabûtê bîne. [1]

Di vê Tabûtê de tiştine welê hene ko bi arikariya wan tîrs nakeve dilê we, hon rahet dibin û mêraniya we dişide,

Û di vê Tabûtê de ji pêmayên malbatên Mûsa û Harûn çend tişt peyda dibin. Milyaketê vê Tabûtê hildigirin, û bi hatina vê Tabûtê Xuda rastiya gotina pêxemberê we şanî we dide; heke hon mirovên bawermend in...

249 — Gava Talût bi eskerê xwe ve ji bajarê Qudsê derket; Talût ji wan re got: Xuda we bi ava çemekî dê biceribîne. Yê ko ji ava wî çemî venexwar, ew ji min in, û yê ko venexwar ne ji min in, meger ko mistekê bitenê vexwin, ev ne xem e.

[1] Hin dibêjin ew Tabût Sendûqek bû, li gora gotina hinan ew legenekê zêr bû, ji bihuştê hati bû û tê de, dilên pêxemberan dihatin şuştin.

# HEDÎSÊN

## CENABÊ PÊXEMBER

### REHMET Û SILAVA XWEDÊ LÊ BE

401— Ko mezinê we ji we tiştêkî zêdeyî heq û însafê xwest bi xebera wî me kin.

402— Xwedê arîkariya wan mirovan dîke ko ji xwe re, an jinekê tinin an erdekî beyar dajon û diçin.

403— Xwedê li mirovên ko bi nekesan re ji comerd in, di şucên xelkê diborin û dilê xwe li wan vedikin û bi xadim û xulamê xwe re dilbirehm in tê rehmê.

404 — Mal bi danê kêrn na be, yê ko di tengiyê de sebrê dide xwe serfiraz dibe û yê ko tiral e, na xebite û hewcedarê xelkê dibe dawî perîşan û şerpeze dibe.

405 — Xwedê dibêje ez neyarê sê mirovan im; yê ko bi navê min sund dixwe wad dide û lê diqulipe, yê ko zaroyê xwe an zaroyên xelkê difiroşe, yê ko palekî ji xwe re tine û piştî ko pale xebata xwe diqedîne heqê taba wî nade wî.

406 — Mirov paşgotîniya sê texlît mirovan bike ne heram e :

---

Lê gava Talût û eskerên di wî gihastin lêva avê, piraniya eskerên wî ji ava çemî têr vexwarin, bes hindikê wan dest jê kişandin.

Gava Talût û bawermendên ko ji ava çemî venexwarin û pê bindestîya xwe şani Talût dan derbastî avê bûn wan ji hev û du re digotin : Îro em bê taqet in, em nikarin bi Calût û eskerên di wî dest bi şer û kuştinê bikin, jû pê ve ew pir in, em hindik in.

Lê yên ko ji kerema Xwedê bawerîya xwe ji dil anî bûn û yeqîn dikirin ko ew rastî Xwedê bân digotin : Bi destûra Xwedê çend car hate ditin ko hindikahî zora piraniyê birîye . . .

Heçî xudarsebr in digehin nisret û kerema Xwedê.

---

Ji bona Tefsîra Qurânê K.K. û li hejmaêrn 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, û 36an fedkirin.

NIŞANK — Di hejmara 36an de ayeta 24 bi awayê jêrîn destpê dîke : Ji bo ne, êkanîna ,enciyeke . . .

Paşgotîniya mirovên bêdîn û exlaq;

Paşgotîniya hakimên zalim;

Paşgotîniya mirovên ko bi tiştên ko Xwedê û pêxember ne gotine emri xelkê dîke û wan pê şaş û gēj dîke.

407— Diayê wan mirovan li ba Xwedê ne meqbûl e : dia mirovê ko di xaniyekî xerab de radibe û rûdine û dibêje : Xudayê min, ji hilweşandina wî xaniyî min biparêze; dia peyayê ko di rê û kûçan de dinive û dibêje : Xudayê min, min ji tada diza biperêze û dia wî ehmeqê ko heywanê xwe girênade û ko ew baz da dibêje : Xudayê min, heywanê min ji min re vegeerîne.

408 — Xwedê di roja piştawiyê de li rûyê sê mirova na nêre û bi wan re na peyive :

yê ko di çolê de ava xwe a zêde na de hewcedaran, yê ko ji bona frotîna malê xwe bi derewa sund dixwe û yê ko ji bona kar û xweşîya xwe mezinahiya mirovekî xedar nas dîke.

409 — Xwedê li mirovên ko li ber dê û bavê xwe radibin û bêgotîniya wan dikin, serxweş dibin û gava qenciyekekî dikin di pişt re qala qenciya xwe dikin nameyizîne.

410 — Mirov deynê xwe ne bi diayê lê bi hikmê qazî distîne.

411 — Mirovên derewker, nefsmezin, durû û yên ko xirabiyê bi xar û lez dikin û qenciye bi şûn da dihêlin û paşgotîniya xelkê dikin dikevin ber xezaba Xwedê.

412 — Bi mezîna re rabin rûnin, ji mirovên zana bipirsîn û li eqildaran bigerin; tēkill wan bibin.

413 — Malê hindik û zaroyên pir belayeke mezin e, arîkariya wan bikin.

414 — Yên ko zad û xwarin û hûr mûrên ko xelk hewcedarê wan in tinin û ji xelkê re difiroşin mîna mirov in ko di rîya Xwedê da cihadê dikin, lê yên ko ew biha difiroşin mîna mirov in ko kitêba Xwedê inkar dikin.

415 — Jin bi du giyana dibin, şîr didin zaroyên xwe, bi dilekî rehm li zaroyê xwe digerin, heke ew qedrê mêrê xwe ji digirin û nimêja xwe ji dikin bêşik dikevin bihuştê.

416 — Gava mirov ji tiştêkî zehf hez dîke her û hor dibe.

417 — Ez ji dînya we ji jîna û ji bîhnên spehî hez dikim û çavê min ji nimêjê ronî dibe.

418 — Şîretan li xelkê bikin ta ko xelk ji Xwedê hez bike û ko xelk ji Xudayê xwe hez kirin Xwedê ji hejt we dîke.

# DIWANA MELE

— 8 —

Serê zilfa te bi kulabi dia  
Hate destê me bi celabi dia  
Sofiyê xelwinîşin hête sicûd  
Her du birhên te ne mîhrabi dia  
Erzekê dibikim sûreti hal  
Ko tu yî qibleyi erbabi dia  
Ji dayê qedehek ser destê te?  
Her seher sinet e mey nabi dia  
Guli Iqbal ji gulzara qebûl  
Me çini bû di şekerxabi dia  
Her du birhên te, ne iklas û yeqin  
Ko di wi secdeye erbabi dia[1]  
Ji dilek safî bibin me di mîhrabê  
Secdeyek lazim e erbabi dia[2]  
Me bi dil irweyê-wisqa ye di dest[3]  
Ji senaya te ser elqabi dia  
Ji ezel yek cihetî daye Melê  
Her me iklas e ji esbabi dia

— 9 —

Destê qudret ko hilavêt ji bejna te niqab  
Bi cemala ceberûti, me ne ma perde hicab  
Li gulên te yê nazik ko seher girte xunav  
Di ebariqê reqîban [1] ji hesed sote gulab  
Eyni kafûre bi meşreb, me ji hisna te ê saf  
Lew di eşqa te çî dil da l'me vebû ilmi ibab  
Me ji ser çeşmeyî heywan, qedehek saf vexwar  
Nagihê lezetê zewqa ne, bi sed cildi kitab  
Lew di çengê me dixwinin [2] ko di eşqa te bi saz  
Me bi bejna te dixwinin [3] ney û qanûn û ribab  
Qehweya telx di gel zehra hilahlî bideri  
Me ji destê te mîbarek şekeramîze gulab  
Ger ji destê te mîbarek jehri qatîl vexwim ez  
Vê li min şehd û esel bit şekeramîz û xweşab  
Qelzemi eşq, ji bayê xwe mixalîf demekê  
Ne dema hate icacê me li ser destê xirab  
Seherê Xîdrê inayet ko birin çeşmeyî dil  
Bi cihanê me nezer da ko cikan eyni serab  
Bi hibabê mebe mexrûr webe [4] serkeşte Mela  
Ba ye ber keftiye wî beyhûde sergeşte hibab  
We ye hudhûd ji Seba bêt me nizanî çî ye hal  
Ko li halê me xerîban ne sial û ne cewab  
Her du birhên te ne mîhrab çî iman û çî kufr  
Bûd û nabûd ko yek in ew çî sêwab û çî iqab  
Were Nişan l bide nişani xwe bê perde seher  
Lê ji xwîné bike perhîz ko şehidan çî hisab.

— 10 —

Lîlehîl hemd ji yarê me di dest cam e lebaleb  
Ji le-bê noşî peyapey di dil îlhamî lebaleb  
Tureya wan xet û xalan, ko ne herfên qelemê ne  
Me ji feyza te ye mestane rawan [1] cam e lebaleb  
Mesti şekasi meya cazîbeyên rûh we dîn  
Rûh dizanî ko ji ber lezetê eşq mame lebaleb  
Nêrgîza mest ji bala çîmanan simbil û gul tê

Qedehi taze bi destê xwe meşî, da me lebaleb  
Wahîdek sîrf e me meşreb te çî fîksîrî wîcûd  
Em lebaleb, çî lebaleb, bi xwe hem camê lebaleb  
Şemh û perwane bi zatê xwe ji halê me di dûr in  
Ateşek sîrf e ji eşqa te vewesta me lebaleb  
Qedehek taze ji eşqê, di ezel da me hekîmî  
Yê dînoşin hey û heyhey bi xwe cama me lebaleb  
Çarekê gote Nişani; ne Mela; min were havê  
We ji xwest min dil û can û dihen kami lebaleb  
Te dizanim, te dibînim, ko tu yî nûrî [2] wîcûd  
Elah elah, ji çî nûra te serapa me lebaleb [3]  
Ji inayet nezerî xase ko her misreh û baytek  
Qedeheñ abi heyatî ne di şîhra me lebaleb.

— 11 —

Şeh bi qesda kuştina min rim hejand miş go sebeb  
Da me çeşmê qehr û xezmê, rim di dil da go edeb  
Kuştîyên didar û dîné bê-xeta her deh sed in  
Her seher dîsa ji nû va tene kêrê sed çeheb  
Dê ji çerxi pencemîn bêtin tenezil ket mîrix[1]  
Misli şemsê gerşeşin awan dê bêtin xezeb  
Her mecalê ew di çengê bêt û wert her çarekê  
Rast û çep dê bêxîtin sed, sed bi-mîzraq û qesêb  
Ristem û Cemîld û Xalid Hemzeyê şêrê Eli  
Aferin ey şeh siwarê kurd û rimbazê ereb  
Lê li tûlê asitanê çix bi wan le'an kirin  
Dergehên fethê vebûn iro limehcûran eceb  
Bendeyê sadiq seher armanci reştûzên xwe kir  
Min bi qewlê dijnîman, det ber xadengan bê sebeb  
Leşkerê qehr û xeman ve cûn hesara dil bikin  
Ke'be û beytil herame lê ne borînin receb  
Siftîne pir le'l û mercan bi nişanan heta  
Dîde rawşen bin bi dina dêmdurdê sîmin şabeb  
Yêko Xîdrî ra divêt ava heyatê bit nesf  
Dê di se'y û cehdê yeksan bin li bal wî rûz û şeh  
Xîzmeta pîrê mîxân" dê kîr keşê meqşûde mey  
Şîşe û cama zîcacê yê divêt dê rit Heleb  
Cewri Hindê dê kişînit hêr kesî tawûş divêt  
Gewher û dura yetim bê terkî ser nînin teleb  
Xefletê ew keşfê şîr dest bi dest hatin ceger  
Go xênîmet ya Melê, mîskîn Mela ker kir kezeb.

★ ★ ★

Di hin qesideyên ko di hejuraên 35 û 36an  
de belav bûne hin xeletên çapê hatine dîtin. Em  
wan xeletan li jêr rast dikin.

Hejmar: 35. Qeside: 2. Rêz: 11.

Erwahi miqedes şeva qedrê, te dixwazin.

Qeside: 3. Rêz: 2.

Da eşq hil bit pêl bi pêl

Qeside: 4. Rêz: 12.

Em bi semayê birin reqs û sema ji wê ma

Hejmar: 36. Qeside: 5. Rêz: 3.

Min di seba bayê seher madara bedrê kir du ker

Qeside: 5. Rêz: 9, 10.

Me divê ko disa dilberê, hey hey li îslûba berê

Kifş bi ji taqa pencerê bê û biçî teşbîhi ha

Qeside: 5. Rêz: 12.

Vê nameyê xef de bi dest fi teyîha neşrun neba

Qeside: 5. Rêz: 12.

Ew lamia danî ji text ma kane berqen xebeba

Q. C. P.

Ferqên niştan:

8

[1] Me di wê secde ye adab û dia. [2] Sec-

## HEVÎNA PERÎXANÊ

Rojeke pehlîza 1907an bû. Perîxan û Eysê di bexçê de dileyistin. Perîxan donzde û Eysê ji sêzde salî bû.

Wek hergav, lêstika wan dişa şer bû: Perîxan hû bû eskerê kurd û Eysê ji eskerê romî. Berê, ji dût ve bi keviran dan hev; piştê nêzik bûn û bi daran, bi silan û bi kulmikan ketin hev.

Perîxanê di van tiştan da xwe zû ji bîr dikir, bi rastî şer dikir, wek pilingeke birindar xwe tavêt ser dijminê xwe û pir dom ne dikir ew dîda ber xwe.

Eysê ji xwe li ber Perîxanê pir ranegirt, xwe sipart wê û bext jê xwest. Lê Perîxanê dilê xwê zû bi zû hênîk ne dikir: di wê de ji navê «romî» û ji romîyan re kineke venekuştî, kûr û bê payan hebû. Bi darê xwe li kumê Eysê ê hesin dixist û digot ê: «romiyên genî! hon bi bêbextî me dikujin! heqê me distînin! lê di şerî de dawîya we bi kurdan re ev e! her bijî kurd! her bijî Kûrdistan!» Qirîn, zarîn û hêviyên Eysê Perîxan sist ne dikir.

Di vê gavê de, ji aliyê malê merivekî xuya kir. Nêzik bû; ew apê Perîxanê bû. Bêhal dimeşîya; di çavên wî ên sor de şopên hêstirên ziwa xuya dikirin. Hat, destê Perîxanê girt û bi dengêkî têrêş got ê: «Bes e Perîxan! Bes e! te hevala xwe kuşt!» Perîxanê bi erin û xeyd li Eysê nêrî û lê vegevand: «Heqê romîyan û yê dostên wan ev e! bila Eysê romî nebe! Nizanim emê rojêkê tola xwe vekin!... Emê wan ji erdê xwe derêxin!... derêxin!...»

Piştê destê xwe da apê xwe û meşîyan. Piştî demekê, Perîxan hat ser hişê xwe;

---

deyek lazim e der bawî dia. [3] Me bi dil irwet û siqa te di dest.

9

[1] qeninan. [2] dixewnin; yanî xuya dikin. [3] dixewnin. [4] were.

10

[1] rewan. [2] nûrî. [3] Elah elah ji çî nûr e te serapa me lebaheb.

11

[1] Dê ji çerxî bê xemîn bêtin tenezil ket merix. C. A. B.

serê xwe rakir û li apê xwe nêrî: hialê wî ê pêrişan endişeyêke mezin xist dilê wê. Çima apê wê bêhal bû?... çima wek hergav ne dikenî û ne dipeyivî?... Bavê wê ê biha li ber dilê wê hate bîra wê... Perîxanê baş dizanî jîna bavê wê her gav di xeterê de bû. Hezar tişt hatin bîra Perîxanê û te-laşêke mezin dan ê. Dilê wê ê piçûk pir hildavêt û laşê wê ê zirav û narîn dile-rizî... Dixwest zû bigehe mal... zû...

Ezman reş bû. Bayekî pehîzê î pis pûlên daran ên çilmisî û zer dibarandin ser serê Perîxanê û apê wê. Ev pel wek laşên mirîyan diketin erdê û ew dinixumandin. Perîxanê bihintengî dikir... Mal jê re dût... pir dût xuya dikir; dimeşîyan... dimeşîyan lê ne digihan ê...

Dawiyê hatin. Ketin hundir; xelkê malê di tîwanê de bûn û digirin. Perîxan di nivê odê de ma û li dora xwe nêrî: çiyê bavê wê vala bû... Ruyê wê bû zer. Bîstekê xwe wînda kir; lê zû xwe ragirt û çavên xwe vekirin: diya wê reşa xwe girêda bû; rûniştî, digirî; serê xwe rakir; keça xwe dit, milên xwe jê re vekirin: Perîxan weke çûkeki birindar kete himbêza diya xwe û bi girîn got ê: «Dayê! Dayê! Kani bavo? ka bavê min ê delal? Kuştine! ne?...»

Bavê Perîxanê, Mûsa begê kêsanî, merivekî gir, çeleng, dewlemend û mîletperwerekî bêja bû. Wî ji piçûkayiyê da heji mîletê xwe ê dil, hergav bindest lê mêr û qelreman dikir û ji bo serbest û serbilind bûna wî dixebitî. Mûsa beg civateke veşartî digerland. Armanca wî ev bû: «yan serxwebûn yan mirin!» Tu kurên Mûsa begî nin bûn. Bi tenê Perîxana wî hebû. Ji lewre hêviya xwe bi wê girêda bû. Mûsa beg keça xwe wekî kurekî bi xwedî dikir û her tişt hiwî wê dikirin.

Êvaran ew rûdinand ber xwe û bi saetan ve wek hevalekî pê re dipeyivî. Carina ew dikir himbêza xwe, destê xwe di ser pora wê a reş re digerland û li çavên wê ên kesk û bijangreş dinêrî û digot ê: «Perîxan! ev çî çav in, Perîxan? Ev ne wek çavên xelkê ne! Çavên te pir kûr, dût û tûj dinêrin! Ev ji min re pir tiştan dibêjin. Ez di van de qedera Kurdestanê, cihanina

hêviyên xwe dibinim, min bê guman neki, Perixan ! » Perixanê milên xwe ên zirav li stoyê bavê xwe digêrand, ew maç dikir û çavên wê hêstir dikirin.

Perixanê ji niho de bavê xwe hêvîdar dikir : Memozîna Ehmedê Xanî ji ber kiri bû. Xerîta Kurdistanî mezin, tevî bajêr û gundên wê wek resamekî ji ber çêdikir û diwarên odeyên malê bi wan dixemilandin, ji dîroka kurdan pir tişt dizanin û dilgirtiya mîraniya wan dibû.

Mûsa beg ji keça xwe razî bû. Perixan rojekê bi kêrî mîlet bihata ...

Wê rojê, gava, Perixan di beşçê de dileyist, bavê wê bi hevalên xwe ve civinek danî bû. Bi bêhextiya yekî eskerên romî dora çiyê girtî bûn û ketî bûn bundir. Ew yek bi yek derêxistin, birin qîşlê û ew dan ber tîfîngan.

Gotinên Mûsa beg ên dawîn ew bû bûn. « Her bîji serhestî ! her bîji kurd ! her bîji Kurdistan ! ». Mûsa beg piştî ko ev gotin ketî bû êrdê û di xwîna xwe de vegevizî bû ...

Diya Perixanê mesele giş got ê. Perixan dilgirtiya bavê xwe bû; hinekî girî. Lê gotinên bavê wê hatin bîra wê : « yan ser-xwebûn ! yan mirin ! Perixan ! min bê guman neki ! » Belê ! Bavê wê di riyeke mi-qedes de hati bû kuştin; qurbana armanca xwe bû bû. Rabû, çavên xwe ziwa kirin û ji diya xwe re got : « Dayê ! bavê min dij-warbûna riya xwe dizanî; wî ev tişt giş da bûn ber çavê xwe. Lê wisa diviya bû. Ez riya wî digirim. Divê ez tola wî û tola we-lêt rakim ! ... rakim ! ... Ev jî ne bi giri, lê bi xebatê dibê ... »

Perixan ji liwanê derket û ket kitêbxana bavê xwe.

Şeş sal borin. Perixanê dibistana xwe xelas kiri bû û bû bû dilbereke bejinzirav, hinariksor, narîn û awirpîling. Weke hemî keçên nîşê xwe, Perixan ji dilketî bû.

Lê hevîna Perixanê ne weke hevîna herkesî hevîneke adî bû. Perixan dilketiya armanca bavê xwe, dilketiya serbestiya mî-lê xwe, dilketiya serxwebûna welatê xwe bû.

Perixan, niho, ji heyeta civata bavê xwe a kevin bû. Bi jîrî, xebat, îxlas û agirê wê, civat li her derên Kurdistanê ji xwe re lebatên hêja peyda kiri bûn. Perixan bê et-lahî dixebitî û xwe ji bo rojêke minasib ha-zir dikir. Ew roj hat.

Rojêke cejna romîyan bû. Esker li meydana mezin hati bûn rêz kirin. Serda-rê esker û hakimê Kurdistanê bi zabitên xwe li ciyekî bilind, di bin çadirekî de rûniştî bûn û temaşa esker û xelkê dikirin.

Kurd berê vî bi rojekê xwe li her derê Kurdistanê pêk ani bûn : Bi tenê ji wan re canbêzarek diviya bû. Ji bo wî jî Perixanê xwe pêşkêş kiri bû.

Dinê bihar bû. Her der bi heşmayî û bi kulilkên rengareng xemilandi bû. Perixan, bi cilên hevrişim spî, bi bejna xwe a zirav, bi porên xwe ên reş û çavên xwe ên dilbi-riş spehîtiya kulilkên biharê bû.

Perixanê bi navê bajêr ji hakim re kulilk pêşkêş hilkirana.

Perixanê kulilkên xwe danî bûn di nav sepeteke piçûk û xemilandi. Li bin kulilkan himbêk hati bû veşartin.

Niho Perixanê sepet di destên xwe de girti bû û weke periyekê di nav esker re dimeşiya. Çavên xelkê lê bûn û heyran û mest lê dinihêrtin.

Hevalên Perixanê, seşderb û bimbe bi dest ve, hêdi ... hêdi ... xwe dixistin pa-şiya esker. Hinekên jî dora qîşlê digirtin.

Perixan giha çadirekî hakim. Hakim ra-bû, çû pêşiya Perixanê û destê xwe dirêji selikê kir. Di vê gavê de, Perixanê selik rakir û çiqas jê dihat hewqas bi xurtî ew xiste êrdê. Di nav toz û dûmanê da her tişt wînda bûn ...

Ji aliyan din, dengê tîfîng û himban dihatin. Lê pir dom ne kir.

Romî bê serê ne dikarin xwe li ber agirê hevalên Perixanê bigirin. Kurd ketin qîşlê û ala xwe çikandin ê.

Piştî çend saetan, hevalên Perixanê ên serdest hatin ciyê bimbe. Ji ax û kuç pê ve tu tişt xuya ne dibû. Hinekî kolan : laşê Perixanê di ser yê hêkim re ditin. Pencên wê li stoyê wî kilit bû bûn. Hevalên wê bihin ji ber xwe çikandin û sekinin. Paşê bi hîrmet

## KURDISTANA BAKUR

Çi wexteke xweş bû. Min dibistanek bi dînzde şagirtan hebû. Belê di sala 1938an de di Senceqê de min dibistaneke kurdi dani bû û min tê de dîrsa şagirtên xwe bi kurdi digotin. Lê wek her tiştê rind û baş ev jî pir dom ne kir. Dibistana min hate girtin, şagirtên min belav bûn. Rojê min jî şagirtên xwe re derseke ceşrafyayê jî da; ceşrafya kurdîstana bakur. Min di kir ve dersê ez di Hawarê de belav hikim. Heye ko bi kêrî hinên din jî he.

Di vê dersê de min navên wilayet û qezan, nîfûs û mesahê jî gotî bû.

**AGIRI** — 4 qezayên wê hene: Diyadin, Doxê, Beyazîd, Elaşgird. Rûyê erdê wê 12600 kilômêtir çarçik. Nîfûs. 299619.

**HEZAROM** — 7 qezayên wê hene: Xînis, Sîtr, Qereyuzî, Oltî, Parsîn, Tercan, Tortom. Mesahe: 28970 K. Ç. Nîfûs: 384477.

**HEKARÎ** — 3 qezayên wê hene: Zap, Kevar, Şemzîdînan. Mesahe 15505. Nîfûs: 25016,

**BÎNGOL** — 4 qezayên wê hene: Cebeqçûr, Gênc, Kêxî, Şîlxan. Mesahe: 9157. Nîfûs, 60000.

**WAN** — 8 qezayên wê hene: Başqe, Gewêş, Erdîş, Gurpînar, Hewasar, Miradî, Ūzalîp, Şîtaq. Mesahe : 30635 Nîfûs: 142661

**MÛŞ** — 3 qezayên wê hene: Belanîx: Qulp, Varto. Mesahe: 28897, Nîfûs: 157503

**BEDLÎS** — 4 qezayên wê hene. Exlat, Hîzan, Qotor, Motkan. Mesahe. 7072. Nîfûs. 50000.

**DIYARBEKÎR** — 8 qezayên wê hene. Bîsmîl, Çêrnûk, Çînar, Egîl, Erxênî, Qulp, Lice, Sîlvân. Mesahe. 11875. Nîfûs 214875

**XARPÊT** — 6 qezayên wê hene. Bêzgi, Zalheyder, Kevanmaden, Paxîrmeden, Palo, Sêvrêj. Mesahe. 17036 Nîfûs. 235141.

**SÊRT** — 7 qezayên wê hene. Bişêrî, Erih, Xêrzan, Berwarî, Şêrwan, Şêrnex. Sason. Mesahe. 14305. Nîfûs. 127870.

laşê wê derêxistin û ew li ser destên xwe di nav bajêr de gerandin.

Ji aliyên din nûçeyên serdestiya kurdan dihatin. Kelkê hêstirên şin û şahiyê dirjandin û gîyanê Perixanê di tava ala rengin ne diçirist û jî gîyanê bavê xwe re dikenî.

NÛREDÎN ÛSÎF

## BINGEHÊN

### GRAMÊRA KURDMANÇI

BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHIRVAN

— 10 —

77 — Pronavên kesin du tofên bîser-xwe ditînin pê: pronavên kirar, pronavên bîreser.

Pronavên kirar bi gelemperî dikevin şûna wan navdêrên ko di qisetê de kirar in. Herçi bîreser dikevin şûna navdêrên ko di qisetê de bîreser in.

Ji lewre ev pronavên ha nayine tewandin. Ji ber ko şiklên wan ên bîreser şiklên wan ên tewandî ne. Lê herçi pronavên ko şiklên wan ên tewandî nînin, gava ew, di qisetê de dibin bîreser, wek navdêrên ko dînimînin tene tewandin.

Pronavên kirar      Pronavên bîreser

ez	min
tu	te
ew	wî, wê
em	me
hon	we
ew	wan

78 — Awarte: Herwekî di mada (56) de hate gotin, navdêr gava kirarê lêkerê gerguhêz in, di zemanên xwe ên borî de weke bîreseran tene tewandin û jî bervajî ve bîre-

**MÊRDÎN** — 9 qezayên wê hene. Cizîr, Dêrik, Kercos, Bêdilê, Şemreq, Midyat, Nîsêbîn, Serêkani, Sorikan, Mesahe. 13045 Nîfûs. 235020.

**ROHA** — 6 qezayên wê hene. Heran, Helwan, Sîrûc, Stwerek. Wêranşehr, Yayleq. Mesahe. 15880. Nîfûs 299194.

**DÊLECÛG** — 4 qezayên wê hene. Bozanbeg, Gulbazar, Lêvkend, Sêgot. Mesahe. 4731. Nîfûs. 125417.

**MELETYE** — 9 qezayên wê hene. Edyeman, Eqçedax, Erebgîr, Bêsni, Hekîmxan, Darend, Xekte, Egin, Petirke (Şîro). Mesahe 21265 Nîfûs 412025

Di her du wilayetên Qers û Stwasê de yên ko bi Kurdîstana bakur ve ne qedêrê (400000) kurd hene. Nîfûsa Kurdîstana bakur bi vî awayî digêhe (3168818) jî kurdên Xeymenê pê ve. Min ev hejmar jî statistîka sala 1937an girtine

HÎŞYAR



serê wan ên sererast weke xwe dimînin. Ji ber vê yekê di van lêkeran de pronavên kirar bi ên bireser diguhêrin û her yeke wan dikeve şûna a din; yanî pronavên kirar dibin bireser û ên bireser dibin kirar.

Ji lewre lêkerên wek «gotin, xwarin, xistin» di zamanên xwe ên borî de bi pronavîne bireser têne çevandin û bireserên wan ên sererast bi pronavîne kirar têne nimandin. Herweki: min got, te xwar, wî xist, we got, wê xwar, wan xist, me xwar. Çend misal: Zîne Sîsin dit. Wê ew dit. Hespan çeh xwar. Wan ew xwar. Min qelem ji destê Min ew ji destê xwe xist. xist. Cîranan em ditin. Wan em ditin. Soro ez xapandim. Wî ez xapandim.

### PRONAVÊN KIRAR

79 — Pronavên kirar dikevin pêşiya lêkeran û lêker rast bi rast didin pey wan: ez hatim, ew çû, min dixwar, wan goti bû, ezê herim, min de bigota.

80—Carina û gava di komekê de birêserin hene, hinekên wan dikevinnavbera pronav û lêkerê: Îro, ez ji Farqînê hatim. Ew dibî berî nîvro çû Diyarbekrê. Min nan xwar. Ez diçim neçîrê. Wan ev tişt ji min re di koçka we de goti bû. Ezê sibê bi birayê xwe re herim dibistanê.

81—Heke lêkerê du kirarên tével hene pronavên ko wan dinimîn, li gora rêza kesên xwe didin pey hev, yanî kesê diwim dide pey kesê pêşin û kesê seyim dide pey kesê diwim. Ji bo xurt kirina gotinê piştî pronava didowan pronaveke gelejmar û ji kesê pronava pêşin tete hildan. Ji lewre nabe ko mirov bibêje: «ew û ez em hatin» lê divê bibêje «ez û ew em hatin» an «ez û ew hatin». Ji ber ko «ew» ji kesê seyim û «ez» ji kesê pêşin e. Çend misalên din: Tu û ew hon çûn. Ez û tu emê herin. Te û wî we bigota. Min û te me ne xwar. Ez û ew em rabûn.

82—Heke di komekê de çend lêker, lê kirareki bi tenê heye hingê ne gerek e ko di pêşiya her lêkerê de pronav bête tekrar kirin. Ji lewre, li şûna ko mirov bibêje: «ew çû, ew lê fedkiri û ew vejeriya» dikare bibêje û spehitir e ko bêje: «ew çû, lê fedkiri û vejeriya». Disan li şûna «Min kiri, min fîrot

û min pê kar kir» mirov dikare bibêje: «min kiri, fîrot û pê kar kir».

83—Le heke lêker tev de ne ji yek cîsnî ne, yanî hin gerguhêz û hin ji negerguhêz in; hingê li gora pêkhatina komekê lêker bi pronavekê an bi didowan têne çevandin.

84—Pronava lêkera negerguhêz di pêşiyê de: Vêca her lêker li gora cîsnê xwe û bi pronavîne cihê têne çevandin. Yanî lêkerên negerguhêz bi pronavên xwe û ên gerguhêz, bi yên xwe. Û herweki ji misalên jêrin dixuye hevokên ko lêkeran ew anîne pê dikarin bi hevghînga «û» yê bi hev re bêne girêdan:

Ez çûm, min ji xwe re hespek kiri.  
Ez çûm û min xwe re hespek kiri.

Tu çûyî, te ji xwe re hespek kiri.

Tu çûyî û te ji xwe re hespek kiri.

Ew çû, wî ji xwe re hespek kiri.

Ew çû û wî ji xwe re hespek kiri.

Em çûn, me ji xwe re hespek kiri.

Em çûn û me ji xwe re hespek kiri.

Hon çûn, we ji xwe re hespek kiri.

Hon çûn û we ji xwe re hespek kiri.

Ew çûn, wan ji xwe re hespek kiri.

Ew çûn û wan ji xwe re hespek kiri.

Şanek — Di kesên seyim de şikilên «ew çû û wî kiri» û «ew çûn û wan kiri» îro hesêb nayîne gotin yanî ev şikil ji kar hatine êxistin. Di kesên seyim de pronavên didowan yanî «wî» û «wan» têne xistin û komek dikevin şiklên jêrin: Ew çû, ji xwe re hespek kiri. Ew çûn, ji xwe re hespek kirin.

Di vî şikilî de her du pronavên «ew» çî yekejmar çî gelejmar êdî ne pronavîne kesin lê pronavîne îşarki ne.

85 — Pronava lêkera gerguhêz di pêşiyê de:

Hingê her du lêker bi yek pronavê têne çevandin, bi pronava lêkera gerhugêz.

Min çû ji xwe re hespek kiri.

Te çû ji xwe re hespek kiri.

Wî (wê) çû ji xwe re hespek kiri.

Me çû ji xwe re hespek kiri.

We çû ji xwe re hespek kiri.

Wan çû ji xwe re hespek kiri.

Herweki di misalên jorin de tete ditin, di vî şikilî de lêkera negerguhêz ji-wek lêkerekê gerguhêz-bê dûpaş tete çevandin. Yanî «çûm, çûyî, çû, çûn, çûn, çûn» tev de



dibin « çû ». Mirov dikare bibêje qey lêkerên « çûn » û « kirin » gihane hev û lêkereke hevedidantî wek « çûnkirin » anîne pê. Û ji ber ko di lêkerên hevedidantî de hikim û ftibar li lêkera paşin e, û di karê me de lêkera paşin « kirin » lêkereke gerguhêz e, lêkera hevedidantî « çûnkirin » lêkereke gerguhêz hatiye hesêb û welê hatiye çevandin.

### PRONAVÊN BIRESER

86 — min, te, wî, wê, me, we, wan

Herweki di mada (77) an de hate gotin ev pronavên ha di eslên xwe de pronavîne bireser in: ez te dibînim, tu min dibînî, em wan dibînin, tu wê dibînî, em we dibînin, hon wî dibînin, ew me dibînin.

Lê di lêkerên gerguhêz û di zemanên wan ên horî de ev pronav dibin kirar û heke lêkerê biresereki sererast heye ew bireser bi pronaveke kirar tête guhartin: min tu ditî, te ez ditim, wî em ditin, wê hon ditin, me tu ditî, we ez ditim, wan em ditin.

Lêbelê heke bireserê lêkerê ne sererast, lê nererast e; hingê û li gora qeyda bingehîn pronav weke xwe dimînin; min ji wan re got, te ji min stand, wî ji wan girt, wê li me da, me bi wan nikarî bû.

87 — Xwe.

Ev pronava nêtar her du mêjer û zayendan ji dinimîne; yanî dikeve şûna mê û nêr, yekejmar û gelejmar: wî xwe kuşt, wê xwe kuşt, wan xwe kuşt.

Gava di komekê de kirar û bireser ji yek kesî û ji yek mêjerî ne û tevgera kirar rast bi rast li ser wî bi xwe ye, hingê pronava bireser bi pronava « xwe » tête niman-din. Bi gotinên din pronavên ji yek kesî û mêjerî û yeke wan kirar û a din bireser di komekê de nagehin hev. Ji lewre mirov nikare bibêje « ez min di neynikê de dibînim » ji ber ko « ez » û « min » her du ji ji yek kesî û ji yek mêjerî ne; û yeke wan kirar û a din bireser e. Ji ber vê hindê divêt bê-te gotin: « ez xwe di neynikê de dibînim ».

Lê di komeka: « ez pezê me diçêrinim » de du pronav ji yek kesî û yeke wan kirar û a din bireser gihane hev. Ji ber ko ew herçend ji yek kesî bin ji ne ji yek mêjerî ne; « min » yekejmar û herçî « me » gelejmar e.

Lê ji milê din em dibînin ko di ko-

## ZÊRÊ EWROPAYÊ

Îro di dinyayê de hesêb tu pereyê madentî ne maye; ji hin polikên sifir û nikel pê ve. Zêr û ziv di sto û zendên jinan an di devên mirovên kêmdran de tene ditin. Di destê xelkê de li şûna polikan kaxez heye. Lê miqabilê wan kaxezan zêr di banqeyên her dewletê de veşartî ye.

meka « ez te û birayê te dibînim » de du pronav ji yek kesî û mêjerî gihane hev. Ji ber ko her du ji bireser in û di wan de tu kirar nîne.

88 — Awarte. Pronava « xwe » ya ko di eslê xwe de pronaveke bireser e carina û bi kirareki di ve di cihê kirar de tête ditin. Herweki: « Ez û birayê xwe em hatin. Min û birayê xwe me got. Tu û birayên xwe hon ji min re sax bin ».

Di vi halî jî de mîna ko di misalên jorin de tête ditin pronavên ji yek kesî û ji yek mêjerî nagehin hev. Lê heke mêjer guhêrî hingê ew digehin hev: Ez û xulamên me em hatin. Min û birayên me xwar.

89 — Ê.

Ev pronava nêtar bi tenê yekejmarê dinimîne û dikeve şûna pronavên « wî, wê, wî, wê » yên ko di komekê de piştî lêkerê hatine hildan, herweki di misalên jêrin de:

Min da wî, wê	Min da é
Min da wî, wê	Min da é
Ezê bidim wî, wê	Ezê bidim é
Ezê bidim, wî, wê	Ezê bidim é

Lê li şûna « min da wan » « min da é » naye gotin; ji ber ko pronava « é » nikare mêjerê gelejmar binimîne.

★ ★ ★

NIŞANK — Şaneka jêrin li dawiya mada (12) wê bête zêde kirin. (Hawar: 28. rûpel: 10)

S — Di hin cihên Kurdistanê de gava ev dengdar « s » dide pey dengdêrêkê wê hinek tij weke « z » kê dixwinin. Ev awayê bilêvkirinê nakeve nivîsandinê û « s » hergav weke xwe yanî « s » tête nivîsandin û bi « z » yê nayete guhartin.

Awayê Nivîsandinê	Awayê Bilêvkirinê
Biguhêsine	Biguhêzine
Selete	Zelete
Ez çûm Parisê.	Ez çûm Parîzê.
Ez derbas bûm.	Ez derbaz bûm.
Ji pesnan diştexilê.	Ji peznan diştexilê.

C. A. BEDIR-XAN

Di vi şeri de zêrê Ewropayê bi pirani cihê xwe guhastiye û çûye Emêrikayê. Ji ber ko ev zêr malê dewletê ye û gava dijmin dikeve welateki dikare vi zêri zemt bike. Ji ber vê yekê zêrê Ewropayê ji ber elemanan revî ti qesta sirdabên Emêrikê kir.

Dewleta pêşin ya ko zêrê xwe revand Polonya ye. Tucaran ne dihate lîra Polonyayê ko elman di çardeh rojan de wê bigehin deriyên payitêrê wê. Ji lewre hikûmeta Polonyayê heta roja ko topên elmanî li istihkamên Verşovayê dan tu tevdir ji bo revandina zêrê xwe ne diti bû.

Di bin guleyên dijminan de revandina zêran îşeki zehmet bû. Zêrên Polonyanê 21 milyon bûn.

Fermandariyê kemyonên Verşovayê lev de misadere kiri bûn. Ji lewre kemyon bi dest ne diketin. Dawiyê pênc kemyonên kevin peyda kirine û mixdarê zêrê ko di wan kemyonan diçû li wan bar kirine û deli peyayên fedayî ew ji Verşovayê derxistlîne. Di nav wan deh peyan de wezirê maliyê ê berê Mazoski jî hebû.

Ji ber bimbardimanan rê xerab bû bûn. Digel vê hindê wan deh peyan ew pênc kemyon bi sehzaxî û bi lez ajotin û berê xwe dan welatê Îris. Kemyon bi şev bi rê ve diçûn û bi roj xwe di bin daran de vedîşartin. Roja din radyowa Verşovayê ji wan re dida zanin ko elman bi wan hesiyane û dane ser şopa wan. Li ser vê xeberê Mazoski vegeriya Verşovayê. Hikûmetê zêrê mayin ji li deh kemyonên din bar kirin û sparte wi. Mazoski wê rîya xwe biguharta û berê xwe bidaya nivro, ber bi behra reş.

Mazoski bi deh kemyonên nû ve xwe gihande pênc kemyonên din û zêrê welatê xwe anî Romanyayê, bendera Kostencê. Li bendera Kostencê vaporeke emêrikani hebû. Ew vapor wê biçûwa Rûsyayê. Keptan û Mazoski li hev hatin û zêrê li bar kirin û bi rê ketin. Vapor gihasti bû nivê rê, radyowên dinyayê elam didan ko Îrisan ji dirêji Polonyayê kiriye. Mazoski disa qesta keptên kir û jê xwest ko berê vaporê ji Rûsyayê biguhêrinê û bide Stenbolê. Keptên ji ya wi kir û zêrê Polonyayê anî Stenbolê.

Vêca Mazoski miracahetî tirkan kir. Tirkiyê miraceheta Mazoski qebûl kir û jê re

## DI ETLANTİKÊ DE.

### BISERHATIYA VAPOREKE SVÊÇI

Xwendevanên Hawarê hero di rojname man de dixwinin un ji radyowê dibihisin ko filan vapor di behra Etlantikê de bin av bûye.

Vaporeke svêçî bi navê Gareme li 10ê Îlona 1940î ji Emêrikê rabû û dihate Ingilterê. Barê vaporê çek û cebirxane bûn. Vaporê ew dianî Ingilterê. Gareme li 25ê Îlonê di nizingî Îslandeyê de hate bin av kirin. Naxuda yanî keptanê vaporê biserhatiya xwe bi awayê jêrin qise dike:

— Ji xwe beriya vi şeri bi salekê me

ji bo guhastina zêran ji Stenbolê li Helebê trêneke bi çek û mihafiz pêk ani. Lê hikûmeta Tirkiyê ji bo kirê trêne 1000 zêrên zer dixwestin. Ev pere bi Mazoski re nin bû. Şirketeke emêrikani ev pere bi kerê xwe da Mazoski û wi ji zêrê xwe anî Helebê. Zêr ji Helebê hatin Bêrutê. Li bendera Bêrutê du krewzorên frensîzî li benda wi bûn. Zêr li wan bar kirin û rêkirin Emêrikayê.

Dewletên din, ji halê Polonyayê îbret girti bûn. Holandê beriya ko eleman bikeve welatê wê, bi du mehan, zêrê xwe rêkir Emêrikê. Zêrê Holandê 160 milyon bû.

Denimêrkê ji 21 milyon zêrê ywe şande Emêrikayê.

Herçi Norvêç, beriya ko 37 milyon zêrê xwe birevine elman keti bû welatê wê. Digel vê hindê norvêçiyên zêrên xwe bi şev revandinê û li vaporekê bi navê Yomê bar kirine û bi selamet gihandine Emêrikê.

Gava eleman ketine Norvêçê îsvêçiyên ji zêrê xwe revand.

Herçi Frense 130 milyon zêrê xwe hefta dawiyê di sirdabên benqa xwe de bişti bû. Lê gava elman ketin dora Porisê hikûmeta frensîz ew zêr li krewzora Vensan bar kir û şande Emêrikayê. Krewzor ji xisti bûn bin bandêra emêrikani.

Dibêjin ko Svîçre zêrê xwe di şikeftên çiyayê Elpê de veşartiye û bi tenê çend peya bi cihê wi dizanin.

Disan dibêjin ko yewnan û yûgslolan ji di wextê de xwe zêrên xwe revandinê.

Herçi Belçike, xebere, bi tenê bireki zêrê xwe karî bû birevine.

CEMİLÊ TACDO

di Etlantikê de talûkeke mezin derbas kiri bû. Dinya Zivistan bû, behir gelek nexweş bû, pêlên behrê di ser vapore me re radibûn û dadihatî. Me birekî mezin ji barê xwe avête behrê û bi vî awayî em xelas bûn. Digel vê hindê di dema firtînê de çar kes ji deryavanên me keti bûn behrê û xerîqî bûn.

Di pêşiya sala 1940î de, di nizingî peravên Emêrikayê de em rastî krewzora elmanî, Graf von Spé, hatin. Krewzorê îşaret daye me ko em bisekinin. Lê ji her ko em di peravên Emêrikayê de bûn em ne sekinîn. Krewzorê guleyek avête me û hingafte serê vapore. Sê deryavanên me hatine kuştin û em sekinîn. Elmanan vapore velo kir û gava dîtî ko vala ye dev jê berdan. Me xwe gihaunde bendereke emêrikani. Ji hingê ve em di navbera Emêrike û Ingilîterê de diçûn û dihatin û me ji ingilîzan re çek û cebirxane tanîn.

Li 10ê Sibata 1941ê em bi qeslekê ve diçûn Ingilîterê. Bi rê ve rastî noqar û balafirên elmanî hatin. Bimbeyên balafirên dora vapore me û herçî torpil di ber û di tanîsta me re wek marine teyar diborin. Herçî torpiyorekî me em mihafiz bera noqar û balafirên didan. Me digot qey em ketine dojehê. Lê Xwedê welê bez kir û em ji wê cehe nemê bi selameti xelas bûn.

Vê carê dilê me hebû em herin wela-tê xwe û zar û zêçên xwe bibînin û bihna xwe bidin. Destûra me dan. Bi hewake xweş em ji Nüyorkê rabûn. Bi rê ve em rastî cenkeştîyên emêrikani hatin. Wan qesleke emêrikani dihemand.

Li 20ê Îlonê emîraliya emêrikani elam da me ko bertorpiyorekê elmanî di van cihan de digere û wê û du bertorpiyorekî emêrikani herçend li hev da bûn ji bertorpiyora elmani ji destê wan xelas bûye. Emîraliyê digote me ko em berê xwe bidin Îslandayê. Ji dût ve me bertorpiyora elmani dît û berê xwe jê bada.

Li 24ê Îlonê me dengê balafirêkê bihist. Balafir bilind difirî. Me ne zanî çî balafir e. Lê gelek ne borî balafir daket û li vaporekê da, bi navê Brizîs. Brizîs di cih de xerîqî. Ev vapore bi 4000 tonî mezin bû. Ya me 8000 ton bû. Me digot dor gihafîye me jî. Lê balafirê bi Brizîsê bes kir û li me ne xist û

## ŞER

### WÊ KENGÊ XELAS BIBE

Rojnameke misrî bûyera jêrin dide zanî: Di tremwayeke Cizê de çar peya hebûn. Her çar ji ji Cizê diçûn Qahirê. Xenimek, du zelam û zabiteki hindi. Zabî derêxist û ji bilêçî re heqê du bilêtan da û got ê:

— Yek ji min re û yek ji bo xanimê.

Xanim enîrî û bi xeyd gote zabî:

— Çîre, ma tu min ji kû nas dikî ko heqê bilêta min didî

Zabî got: Ma çî xem e Xanim, ji kere-ma xwe vê bilêtê ji min qebûl bike.

Xanimê disan bi xeyd lê vegevand û got:

— Tu sebeb nîne ko ez bilêta te qebûl bikim, min pere heye

Zabî hindi got: Xanim mexeyide, lê te pere nîne. Te pereyê xwe li mal ji bîr kiriye.

Xanimê çentê xwe vekir û dît ko bi rastî pereyê xwe li mal ji bîr kiri bû.

Rêwingî tev de li vî îşî ecêbmayî man û ji zabî pirsin ko çawan ev tişt zanî. Zabî ji rewîgiyan re da zanî ko bi xwe ji feqtrên Hindîstanê ye û ji lewre bi van tiştan dizane. Hingê rêwingîyan jê xwest ko der heqê istiq-bala wan hin tiştan ji wan re bibêje. Hindî ji ber ko zabî ko nikari bû li fala wan binêre.

bi riya xwe de çû. Me bi hêtêlê elam da stola emêrikani û me jê xwest ko hête hawara me.

Di Brizîsê de 87 deryevan hebûn. Me 39 peya ji wan xelas kirin. West bû bû nivê şevê, em bi cenkeştîyekê hesiyan. Me digot ko keştîyê emêrikani ye, bêtela me girtiye û hatiye hawara me.

Lê gelek ne borî, me zanî ko keştîya ko nizingî li me dikir, ew bertorpiyora elmani bû ko em jê direvin. Keptanê bertorpiyore emri me kir û got: dev ji mixaberê berdî û di nav deh deqîqan de filûqeyên xwe daxî behrê. Me bi emrê wî kir û li filûqeyên xwe siwar bûn. Em hêj ji vapore xwe bi dût ne keti bûn ko bertorpiyore topên xwe li vapore me girêda û ew bin av kir.

Piştî çîl deqîqan sê cenkeştîyên emêrikani gehîştine me û em birin Îslandayê. Me ew bertorpiyora elmani nema dît.

EVDIREHMANÊ ROJKÎ

## REWŞA DINYAYÊ

**REWŞA TIRKIYÊ** — Heta niho kest nezani Tirkiye hi kê re ye. Bi her du aliyan di de distine û ji her du aliyan re xweş dike. Mina medhelokê gotiye bi guri goşt dixwe û bi şivên şîné dikiştne.

Herwekî xendevanên me dizanin Emêrikê qanûneke deyn û kirêkirinê heye. Li gora vê qanûnê Emêrike ji dewletên ko şerê elemanan dikin bi deyn çek û posatan dide an wan ji wan re kirê dike. Ji ber ko ev dewlet wan çek û posatan bi pereyê pêşin nikarin bikirin.

Li 4ê vê Kanûnê mister Rûzvelt reiscim-hûrê Emêrikayê emirnameyek imza kir û pê da zanin: ji ber ko midafêha Tirkiyê ji bo selametiya Emêrikê gerek e Emêrike ji Tirkiyê re ji li gora qanûna deyn û kirêkirinê çek û her texlît hesincawên cengê wê bişîne.

Ji milê din Emêrikê da zanin ko ji şer mehan de ye Emêrikê her tişt ji tirkan re dişand; lê li ser destên ingilîzan û ji ho her carê emirnameke Rûzvelt diviya bû. Ji niho û pê de ewê rast bi rast ji hikûmeta tirkan re bişînin. Di nav çekên ko ji tirkan re wê bêne şandin cilên eskerî ji hene.

Digel vê hindê Tirkiye di şerê Japon û Emêrikê de ji bêteref e.

**SERÊ LIBYAYÊ** — Ji 18ê Çiriya - paşin ve şerê Libyayê ji nû ve dest pê kiriye. Ingilîzan dirêji talyan û elmanan kir û ji hingê ve di sebrayê de şerê xwindar dom dike.

Ingilîz di vê qada şer de gelek xurt in, Esker, çek û çebirxaniyên wan bê qeder zelif in. Havînê pê de tangên emêrikani û her texlît hesincawên cengê di riya Siwêşê re dihatin vê eniya şer.

Şerê Libyayê an Misrê ji 15 Îlona sala 1940î de dest pê kiriye. Hingê talyanan dirêji Misrê kir û ordiwa Merşal Greçyant, di

---

Lê gote wan ko dike here eniya Libyayê û dizane ko di şer de wê birtudar bibe. Lê çî bike ev jî qedera wî ye.

Rêwîngiyan jê pirsî: Ma şer kengê wê biqedê.

Zabit got: Şer di wextekî nîzinge de wê xelas bibe. Û dibînim ko bajarên Ewropayê di cejna Miladê de wê bi ronî bibin.

SMAÎNÊ SERHEDÎ

erdê Misrê de gihaste heta Sîdi-Berani; lê jê hir ve ne hat.

Dîsan par li 9ê Kanûna-pêşin ingilîzan dirêji talyanan kir; ew jî erdê Misrê derêxistin û ajotin heta Bingaziye. Lê paşê elêman derbast Efrîqayê hûn û li 3ê Nisana sala 1941ê ingilîz jî erdê talyanan derêxistin û ew veqerandine tixûbên Misrê, lê asêgeha Tobriqê di destên ingilîzan de ma. Elemanan Tobriq mihasure kir lê aliye behrê vekirî ma û ingilîz tê re eskerên xwe bi xwedî dikir.

Par plana ingilîzan wekê din bû. Ingilîz ji Merst-Metrûh û rast bi rast di peravên behrê ve meşiya hûn û pey hev Sîdi-Berani, Selûm, Bardiyê, Tobriq, Berqê û Bingazi vegerti hûn; hêl ko riya xwe bi kûrabiya çolê xin.

Lê îsal ingilîz bi planeke din ve çûn. Û li şûna ko jî pêşiyê dirêji dijminê xwe bikin dil kirin lê bêne wer û wî di çemherê de bixeniqînin.

Eleman di lîwana Helfayayê de çeper û kozikên xwe çekirî hûn û tê de asê bû hûn. Ingilîzan xwe ne da wê xetê.

Ordiwa ingilîzan jî çend deran de dirêji dijminê xwe kir.

Eskerên nyûzelandi ji nivroyê Sîdi-Emer derketin û berê xwe dan Kepûço û jê derbast Bardiyê hûn û lê hatine wer. Birekî vî eskerî jî pêşiya Bardiyê berê xwe da Cembûtê û gihastiyê. Ji Cembûtê nyûzelandi pi dan ber eskerên ko dirêji Sîdi-Riziq dikirin. Birekî din dirêji Tobriqê kir û xwest xwe bigihîne ingilîzên asêgehê.

Baskekî din di bakurê Madelenê û di çolê re dirêji Birelgobi kir û jê berê xwe da Sîdi-Riziq, û li qewetên elmanî ên mekanîkî hate wer.

Ji milê din eskerine hindî di kûrahîva selrê û di Cexebûhê re ser Caloyê meşiyan û ketin e. Ev esker xwe pêk dihatin û dikin di riya çolê re berê xwe bidin bakur û bikevin Bingaziye.

Bi vî awayî birekî ordiwa elmanan di navbera Kepûço, Sîdi-Riziq û Kebra-Salih de kete nav çembera ingilîzî û ji giraniya xwe qut bû. Di nav vê çemberê de tang û timobilên her du aliyan ên zirihoş li hev dan û hevdu kirin piç û parî. Ingilîzan Sîdi-Emer ji elmanan vegirt, lê elmanan dîsan ew bi

şûn de vegerand; û şer hinek sar bû; qey her du alî birlînê can û tangên xwe derman dikirin.

Pişti 25ê Ciriya—paşin şer ji nû ve germ bû û general Römél—fermandarê elmanî—kir ne kir û di Sîdî-Rizîq de xeta mibaserê şkê-nand û eskerên mehsûr gilfandê giraniya ordî. Ingilîzan bi xwe pesnê Römél û eskerên wî da.

Bêdiro, Römél bi çalakt û hinerwerike mezin ordîwa xwe ji talûkeke mezin xelas kir. Lê hêj talibine kûr û dûr di pêşiya wî de hene.

Li 5ê Kanûna-pêşin, ingilîzan piştî ko xwe pêk ve anî ji nû ve dirêji talyan û elemanan kir.

Di vê êrtîşê de ingilîzan Sîdî-Rizîq bi şûn de vegerand, berê xwe da bakur û mihasera Tobriqê vekir. Eleman û talyanan ji ber ingilîzan rabûn û xwe dane paş û neketin nav çembera britaniyan. Bi tenê qewetên ko di Selûm û Bardiyê de bûn tê de mehsûr man û ingilîz li wan hatine wer û di perava behrê re dane pey dijminên xwe û ew ber bi Xezalê ajotine û ketine Bîra-Hamid, Bîra Hamid di nîvro-rohelatê Tobriqê de ye.

Li gora danezana ingilîzî ya 14ê mehê eskerên britanî gehîştine pêşiya Xezalê û ji her alî lê hatine wer. Xezalê li perê behrê û di navbera Tobriq û Dernê de ye. Lê hêj bêtir nizingî Tobriqê ye.

Ji milê din herwekî me li jor got ingilîz li nîvro û di çolê re ji dikin xwe Bigilîtin Bingaziyê. Ev baskê ha hêj li Ciyalo ye.

Li gora rawîşa şer welê dixuye ko general Römél di pêşiya dijminekî xurt û serdert de dike xwe bispêre çiyayên ko dikevin nîvro-rohelatê Dernê û tê de asê bibe. Lêbelê ingilîz bivê nevwê ev plan bîr birine û ji lewre dikin di çolê û ji par re çarnikarên çiyê bigirin û ordîwa Römél tê de edim bikin an vê ordîwê hêsr bigirin.

Ji milê din ingilîz bê etlahî didin pey ordîwa Römél û dikin jê re firsendê nedin ko bikare xwe pêk bîne.

Römél gava ji alîkî eskerên xwe ên piyade dike bispêre çiyê; ji aliyê din ji bi qewetên xwe ên mekanîkî di rastê de şerê ingilîzan dike. Bêdiro li gora nûçeyên 15ê mehê şer di rasta Tobriq û Xezalê de ji nû

ve germ bûye; û welê dixuye ko vê carê zora elemanan diçe.

ENTÛKUMÎNTERN — Di sala 1936an de di navbera eleman, talyan û japonan de peymanek hate bû imzâ kirin, bi navê peymanana entikumintêrn yanî peymanana berbolşevikiyê.

Li gora vê peymanê dewletên ko ev peyman imza kiri bûn di eleyhê bolşevikiyê de dê bixebitiyan. Lê ji roja ko ev şer dest pê kir û ûris û elemanan peymaneke nelihexistinê imza kiri bû ev peyman ji kar ne hati be ji êxistin pê emel ne dikirin. Lêbelê piştî ko elemanan dirêji ûris kir ev peyman ji nû ve hate xebitandin.

Li dawîya Çiriya—paşin li Berlinê darsala peymanê hate şahînet kirin û bi vê hêncetê konferansê hate danin. Sêzdeh dewlet ketine vê konferansê. Li gora elemanan ev konferans himê Ewropa nû û nizama wê ye.

ŞERÊ JAPON — Ji sibeha 8ê Kanûna-pêşin ve Japonye ji dewleteke şerevanî ye.

Herwekî xwendevanên me dizanin Japonye ji mêj ve hevalbendê eleman û talyanan e; û ev pênc sal in Japon şerê Çînê dike.

Di rohelatê dûr de pêşkepiyên Japonayê Emêrike û Ingiltere ne. Japonan digot ma çîre Ingiltere û Emêrike têkiliî işên Asiyayê dibin. Ev her du dewlet ji ne asiyaî ye. Yek ewropayî, a din emirakanî ye, bila dev ji Asiyayê berdîn; em asiyaîyî işê xwe dizanin û emê ji Asiyayê re nizameke nû deynin.

Herçî ingilîz û emêrikani, wan ji ya japonan ne dikir; lê yekcar qntbiriya xwe ji ya japonan ne dikirin; û dixwestin Japonayê mecbûr bikin dev ji şerê Çînê berdê û li gora lihevhatinekê eskerên xwe ji Çînê bikişîne. Japonan pê dida erdê. Herçî emêrikani ne wan ji arîkariya Çînê dikir pl dida ber wê û ew xurt dikir.

Di vê navê de japonan bi destûra Frensê (40000) esker şandin Hindeçiniyê. Ingilîz û emêrikaniyan ev hereket protesto kirine û ebloqa Japonayê şidandine. Ev ebloqe, ebloqeke iqtisadî bû; yanî ingilîz û emêrikani ne di hîştin ko Japon ji welat an mistemlikeyên wan tiştan bikire û bibe welatê xwe. Japonye ji vê ebloqayê gelek êşiya; kir ne kir Emêrike ji şertên xwe danehat û ebloqe ranekir.

Ji aliki ev mizakere çêdibûn; ji aliyê din her sê dewletan xwe kari şer dikir. Ingilîz û emêrikani wargehên xwe di Pesifîkê de xurt dikirin. Ingilîterê ji bo wê yekê bin wargehên xwe dan Emêrikê ji. Japon ji esker tanin Hindeçiniyê.

Di meha Çiriya-pêşin de di Weşingtonê de mizakera her du dewletan germ bû bû. Hinan digot wê li hev bîn; hinên din digot lihevhatina wan ne maye wê ji hev qut bibin. Di wê navê de hikûmeta Emêrikê noteyek da Japonyayê û tê de şertên xwe ên paşin jê re dan zanin. Ev note ne hate belav kirin. Lê dibêjin ko Emêrikê ji Japonyayê daxwaz dikir ko eskerên xwe ji Çin û Hindeçiniyê bi şûn de bikişîne.

Qederê deh panzdeh rojan ev note bê cewab ma. Rûzwejt ji imperatorê japonan re ji mektûbek rêkir.

Li 8ê wê Kakuûnê radyowên dinyayê didan zanin ko gava sefirê japonan li Weşingtonê cewaba hikûmeta xwe ji Emêrikê re ber pê dikir stol û balafirên japoni di pesifîkê de bi ser wargehên ingilîzî û emêrikani de digirtin.

Japonye û Emêrike di bejê re nagehin hev. Japonye ji çend giravan bihevketî ye û ev girav dikevin bakurê rohelatê Asiyayê, dawiya welatê Ūris. Emêrike jê gelek dîr e; behir, behira Pesifîkê dikeve navbera wan her du dewletan.

Lê Emêrike di Pesifîkê de giravin hene û Emêrike di wan giravan de wargehên stol û balafirên çêkirine. Stol û balafirên emêrikani dikarin ji wan wargehan rabin û li giravên Japonyayê xin. Nemaze giravên Filipînê nizingî giravên japoni ne û dikevin nivroyê wan.

Ji ber wê yekê stol û balafirên japoni beri ewilî dirêji wan giravan kir û li girava Haway, Midway, Weyk, û Filipînê xistine.

Giravên Hawayê ji erdê Emêrikê, ji Senfrensiskoyê 2200 mil dîr in. Ev girav heçko di Pesifîkê de berqerekola Emêrikayê ne. Ji lewre emêrikaniyan ew girav asê kirine û tê de wargehên stol û balafirên çêkirine. Dema japonan bi ser wan giravan de girt bireki stola emêrikani di wargehan de bû. Welê dixuye ko stol û balafirên japoni xesareke mezin gihandine wargehan û çend cenkeştîyên emêrikani ên mezin bin av kirine.

Herçi giravên Filipînê, japonan bi ba-

lafir û cenkeştîyên xwe li wan giravan ji xistine. Ji milê din balafirên eskerên piyade, ji jor de, bi peraşûtan, hera erdê dane û vaporan ji esker û tang derêxistine bejê. Bi vi awayî lingê japonan di Filipînê de erd girt. Niho japoni û emêrikani di bejê de ji li hev didin. Ji van pê ve japonan li hin giravên din ên emêrikani ji xistine û li hinan ji bi peraşûtanê û di bin himayeta stolê de esker ji derêxistine.

Li gora gotina Rûzwejt xesarîne mezin gihane stola emêrikani û wargehên wê. Nemaze di girava Hawayê de. Ji lewre Rûzwejt heyetek şandiye Hawayê da ko berpirsiyarên wê şikestîne bi nav bikin. Ji milê din her sê fermandarên pesifîkê hatine guhartin: emiralê stolê, kumandarê eskerên bejê û generalê qewetên hewayî.

Japonyayê li pesifîkê sê dînanînen bingehin hene: Emêrike, Ingilîterê û Holende. Ji xwe Çin ev pênc sal in şerê japonan dike.

Tistê ko bi Emêrikê ve ye, me ew li jor got. Herçi Ingilîterê; wê dewleta mezin, herwekî di her derên dinyayê de ye, li Pesifîkê ji wargeh û mistemlikên mihim hene.

Sengepor: Sengepor mifta behran, kilfta Pesifîkê ye. Vaporên ko ji behra sor û behra hindi û ji peravên Efrîqa roava tîn tê re derbas dibin û dikevin Pesifîkê. Bi gotinên din Sengepor Cebeltariqeke xwe e û ji lewre ingilîzan ew xistiye destên xwe û asê kiriye. Sengepor dikeve nivro û pozê nivgirava Melayayê û bakurê girava Simatrayê. Ji hebra ko asêgeh tê de ye avtenga Melayayê dibêjin. Nivgirava Malayayê ji di destên ingilîzan de ye. Lê Melaye bi xwe di bejê re nagihe tu erdê ingilîzî. Siyam, bi navê xwe e nû Teyland dikeve navbera Melayê û Birmanyayê. Birmanye bi xwe birek ji Hindistanê ye û di bin hikmê ingilîzan de ye.

Stola ingilîzan ya pesifîkê li Sengeporê dimtne. Balafir û noqarên japoni dirêji avtenga Melayayê kirin û xesarîne mezin gihandine stola ingilîzan.

Japonan di dora Sengeporê û di behra Bankokê de du keştîyên hêja bin av kirine.

Me got ko Teyland dikeve navbera Melayê û Hindistanê. Ji lewre japonan ji aliki, ingilîzan ji aliyê din ajotîne ser vi welatî. Ingilîzan diviya bû Teylandê bexin destên xwe û tê re û di Melayê re esker, çek û cebir-



xané. bişinin Sengaporé. Ji japonan re ji diviya bû li pêşiya dijminê xwe bisekirin û rê he bigirin. Japonan ji rohelê û di bejê re ajol ser Teylandê û bi vaporan esker derê xistin peravên wê ên nivro. Ev esker berê xwe da Birmanyayê. Teylandê qedere sê çar saetan şerê japonan kir û paşê çekên xwe daft. Japon û Teyland li hev hatin û eskerê japonî he şer di erdê Teylandê re borin û berê xwe dan Birmanyayê û baskek ji ber bi jêr bû û herê xwe da Melayayê. Japon û ingilîzan li hev da û japon ketin Birmanyayê û hajarê Viktoryayê xistin destên xwe. Li Viktoryayê balefirgeheke mezin heye. Balafirên ko ji Hindistanê radibûn û diçûn Sengaporê jê difirin.

Herçî Melaye, eskerên japonî di Teylandê re û ji behrê ji ketine wî welatî ji û şerine no di navbera ingilîz û japonan de çêdibe. Li gora danezanên paşin di Melayayê de japon qedereki pêş ve çûn û mizingî li Sengaporê kirine. Lê Sengapor cihêki gelek asê ye û dibêjin ko ew hevîr gelek av hilline.

Ingilîzan di pêşberê peravên Çînê de di hindava Kentonê de giravek heye, bi navê Honkong. Ev ji berçerêkol û wargeheki ingilîzî ye. Japonan avête ser vê giravê jî. Ingilîz û japon li hîr jî li hev dixin. Li hîre Çîn arikariya ingilîzan dike û ji par re li japonan dixê.

Japonan esker derêxiste girava Borneoyê jî. Ev girav yek jî giravên holendî ye. Ji tevayiya van giravan re Hindistana holendî dibêjin. Ev Hindistan bi pêtról û bi her textil madenên xwe gelek dewlemend e. Li Ewropayê Holendê bi xwe herçend ketî be jî destên elemanan di vê mistemlikê de hikûmet, ordû û stoleke holendî heye.

Çarçeka Borneoyê ya ingilîzan, a mayîn ya Holendê ye. Erdê ingilîzan dikeve bakurê giravê. Japonan eskerê xwe derêxiste vî birê giravê, yanî erdê ingilîzan.

Di cihên ko me li jor gotine şer dom dike. Lê hîu giravên kiçik û bê ehemiyet jî niho de û yekcar ketine destên japonan.

Bi vî şerî dewletên dinyayê ên mezin têk de têkiltî şer bûne û şerê me bû şereki gelemper.

Li 11ê vê Kanûnê eleman û talyanan jî dane zanin ko digel hevalbendê xwe yanî

bi japonan re, ew jî şerê Emêrikayê dikin. Dîsa di vê rojê de li Berlînê her sê dewletên peymanana sêgane yanî Îtalye, Elemanyê û Japonyayê peymaneke din imza kirin. Li gora vê peymanê ev her sê dewletên ha bêt hev bi dijmin re nakevin mizakarê û pê re tu silhê imza nakin.

Di vî şerê nû de ûris hêj rewşa xwe xuya ne kir; yanî bi japonan re ne kete şer. Ûris bivê nevê dijminê Japon e. Lê bi elemanan ewçend mijûl e ko naxwaze dijminahiya xwe eskere hîke. Herçî Japon dema ko şerê du dewletên dinyayê ên meztir dike newêre barê ûris jî hilline. Ji lewre hevalbendê ingilîz û emêrikaniyan di Pesifikê de hêj ne ketiye şer. Heye ko Ûris midektî din jî di vî halî de bimîne.

Herçî Emêrike, Rûzwelt bi xwe dibêje, bi nişkegaviya japonan di Pesifikê de ketiye halektî neqenc. Lê Emêrike xwe pêk diine. Rûzwelt dibêje di şer de ne derba pêşin lê derba paşin hêja ye û bi tenê ev derb e ko dewletan digehine zefere, zefera rastin.

ŞERÊ ÛRIS — Pergara şerê Ûris vê dawiyê guhêrî. Qey Kanûn, berf û serma li Ûris hatine û herçî eleman in Kanûnê ew çevandine.

Li 22ê Çiriya — paşin eleman bi nişke gaviyê ketî bûn Rovstoê; lê jê wê ve ne çû bûn. Ji her ko Rostov li ser rîya Qevqasê ye û deriyê wê tete hesêb windakirina wî ji ûrisan re tişteki xedar û ji elemanan re zefereke mezin bû. Lê Rostov di şerê ûris û elemanan de bû fetlonekek; jê û tê ve qedera şer guhêrî. Ûris li elemanan vegeyriyan ew jî Rostovê derêxistin, ketin pey û ew ajotin he-ta Tagendrofê. Elemanan baz da û xwe di dora Tagendrofê de li ber ûris girt.

Ji milê din Zivîstana wî welatî li elemanan dişidand. Dibêjin ko di dora Moskoyê de piyadeyên elemanî êdî nikari bûn xwe li erdê pehin bikin. Ji lewre jî piyan disekinîn û welê şer dikirin. Çimkî heçî ko li erdê pehin dibû di çend deqîqan de bi berf û kurşê ve dizeliqî û nema jê vedibû. Herçî ûris eskerên sibêrî anî bûn dora Moskoyê. Xelkê Sibêryayê salê pê de di nav berfê de dijîn. Ew dimînin kurmên berfê. Ji berfê aciz nabin lê nikarin jê bigerin. Heke jê geriyane yanî ji berfê derketin nema dikarin bijin. Bêdîro



# ŞAHİNO

— 1 —

Strana Şahîno straneke cihê Botan e. Me du guhartoyên Şahîno hene. Lê her du ji ne temam in. A pêşîn ji « v » yên wê xuya ye ko ew yekî erihî gotiye. Ji ber ko xelkê Erihê weke serhediyên « b » yan hi « v » yê diguhêrinin. Herwekî li şûna « cewabkê » gotiye « cewavkê ». Disan gotina « bê » bi « vê » yê guhartiye û gotiye « Heger hindik vê ».

Hey malikwêraho, Şahîno tu dey naki  
Tu şixleki, emeleki d'mala havê xwe de naki  
Qelenê mi giran e, tê ji kû peyda ki?  
Havîn e, xweş Havîn e,  
Dar û eqarê mala bavê mi çêbine.  
Xelkê digo Ehmedxan gul e, mi digo kula [lê  
[min e.

heke mirov kurmên herfê ji herfê derant ew kurm dimirin.

Hitler digot me karê xwe kiriye emê li Zivistanê ji şer bikin û zora ûrisan bibin. Lê gotina wî ne çû serî û general Zivistan hate hawara ûrisan.

Piştî Rostovê eleman di eniya Mosko- yê de ji şikestin û bajarên ko bi şerine no keti bûn ê, ji dest dan û bi şûn de vege- ryan. Ji 6ê Kanûna -pêşîn ve eleman terka bajarên dora Moskoyê didin û ûris dikevin ê. Li 13ê vê Kanûnê hikûmeta ûris ji Kwî- bişefê vegevera Moskoyê. Ji ber ko Mosko we- ke herê bû hû bajarekî bi selamet; ordîwa elemanan jê bi dûr keti bû û siwariyên ûris da bûn pey wê.

Herçî eleman, wan ji danezanek belav kir û tê de got ko ji ber xurtiya sermayê şer di eniya ûris de sekeniye û ordîwa elemanî heta Biharê wê di midafehê de himine û xeta şer ji nû ve û li gora şerê mi- dafehê wê bête saz kirin û ji lewre di hin cihan de eskerên elemanî xwe didin paş û dikin bikevin çeperine nû.

Lê ûris ji elemanan nagerin; her û her dirêj wan dikin da ko eskerên elemanî yên ko xwe didin paş tu firsendê nebînin ji bona ko ji xwe re istihkamine nû bikolin û bikevin ê. Heçî deran de ji ko eleman ketine istih- kamine nû ûris di wan deran de ji hicûmî elemanan dikin. Bi kurtî heta niho eleman dirêj dikir û ûris xwe dida alî û li ber xwe dida. Lê ji vê Kanûnê ve ûris dirêjî elema- nan dikin û eleman tabye û istihkaman di- kolin û dikin tê de xwe midafehe bikin.

Herçî Leningrad weke xwe ye. Eleman di dora bajêr de sekintue. Di nivro de Seves- topal di bin mibaserê de ye û hawara wê di riya behrê re têt.

Şam : 19 Kanûna-pêşîn 1941 NÊREVAN

Bihar e, malê me çûne zozana,  
Ezê kolekê ji Şahînê xwe re çêkim ji gul û  
[rihana  
Heke hindik vê, ezê ker-kim ji mala cîrana.  
Dewarê mala bavê min hespîn,  
Serbarê wa xurme ne, binbarê wa qesp in,  
Cewavkê bidin Şahîn axa hosyanya ez  
[xwestin.

Dewarê mala bavê mi hêstir in,  
Serbarê wa xurme ne, binbarê wa şekir in  
Bi xwedê ki cewavkê bidin Şahîn axa  
[hosyanya ez birim,  
Şahîno mal î wêraho tu dîn î, tu ne dîn î...  
Tu kaxez pê kaxeza dişinî,  
Qelenê mi giran e, tê ji kû bini?  
Şahîno tu dîn î, tu ne dîn î,  
Tê xweyê cânika bozheşîn î,  
Ti ne ew mêr î, mi bixwazi yan mi birevînî.  
Şahîno kurê axê.  
Rezîkê Şahînê mi li ber kezaxê.  
Tu vî destê mi bigre, birevine, agirki berde vî  
[milk û vê ocaxê.

— 2 —

Şahîno dîno rabe mi birevine emê herin zozana,  
Ezê kolekê ji Şahînê xwe re çêkim ji gul û  
[bergê rihana,  
Heke têr î ne kir ezê ker kim ji malê gundî  
[û cîrana.  
Şahîno! dîno tu dîn î, tu ne min distînî, ne min  
[direvînî,  
Nextikê mi giran e, te ji kû bini,  
Tu ji Xwedê natirsi etfa zivî li ser singê mi  
[dihejinî.  
Singê mi bêxçê gulan û sêvan e, dema bihna  
[te teng bi,  
Were demkê, da tu xemên dilê xwe jê birevînî.  
Xaniyê bavê min mezin e, êla koçera danî  
[li bin e  
Mi şevêdi xewnek ya xêrê li xewna xwe di bi,  
Mi di dêka te rebenê dibî xwesûya min e.



## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelîne Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Biyişa Pêxember. Bi Kurdiya dumîlî, bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re
- 7 C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikîtin
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10 — Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11 — Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12 — Dersên Şerîetê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13 — Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14 — Proverbes Kurdes . Medhelokên Kurdî  
Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-Xan  
Paris - 1937
- 15 — Le roi du Kurdistan . Qalê Kurdistanê .  
Emir K. A. Bedir-Xan û Adolphe de  
Falgerolle . Paris - 1937
- 6 — Der Adler von Kurdistan. Biyoyê Kurdistanê.  
Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel  
Berlin - 1937
- 17 — Der Schnee Des Lichtes . Berfa Ronahiyê  
Şîhrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û  
Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Salt	500	Qirûşên Sûrî
Şeşmehî	300	Qirûşên Sûrî
Sêmehî	200	Qirûşên Sûrî

Xwedî û gerîndeyê berpirsiyar : Mîr Celadet  
Alî Bedir-Xan . Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire : Emir Djêladet Aali  
Bedir-Khan. Dîqmas—Syrie

SAL 10  
HEJMAR 38  
PÛNCŞEMB  
22 KANÛNA-PAŞIN 1942

# HAWAR

ANNEE 10  
NUMERO 38  
JEUDI  
22 JANVIER 1942

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TËXISTIYÊN VÊ HEJMARÉ

Tefsira Qurané	Dr. K. A. Bedir-Xan
Zerdéşt	Seydayé Gerok
Diwana Melé	Qedri Cemil Paşa
Emêrike	Smainé Serhedî
Noqar	Cemilê Tacdo
Tiştên Pesîfiké	Evdirehmané Rojki
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Mosko	Hesené Misté
Ez zêde dikim	Şêx Abid
Rewşa dinyayé	Nêrevan
BIRÉ FRENSIZÎ ★ PARTIE FRANÇAISE	
Kharabo	Tawûsparéz

ŞAM—1941  
ÇAPXANA SEBATÉ



## TEFSÎRA QURANÊ

250 — Gava wan bi Calût û eskerên di wî dest bi şer û kuştinê kirin, Talût û eskerê wî gotin: Xudanê me ê mezin . . . me bi sebr û mêraniyê bişidîne û li ser qewmê kafiran nisretê bide me.

251 — Xuda nisret da wan û bi destûra Xwedê zora dijminên xwe birin û Dawûdî Calût kuşt. Xwedê jê re pêxemberîti û mirîti da û jê re her çi ji wî xwest da zanîn.

Heke Xwedê destê hinan bi hinan ne girta û bi vî awayî di dinyayê de tixwibên rêz û tertîbê qaîm ne kira, dinya xira dibû, lê kerem, qenci û piyariya Xuda li ser erd û ezmanan e.

252 — Ev ayetên Xuda ne, em ji te re didin zanin, bê şik û şibhe ev rast in û tu ji pêxemberê Xuda yi.

253 — Me hin pêxember ji hinên din çêtir girtine. Hin ji wan hene ko bi wan re Xuda rastbirast peyiviye. Xuda qedrê hinan ji hinan bilindtir kiriye. Me ji İsa kurê Meryemê ra mucize û hicet dan û me ew bi rûhê miqedes zexm kirin.

Heke Xuda bixwesta pişti hatina pêxemberan û ayetên Xwedê yên ko şani riya rastiyê dikin, xelk hev û du ne dikuştin; lê wan bi hev ne kirin; birekî ji wan bi dinê Xwedê baweriya xwe anîn, birekî din kafir bûn. Heke Xuda bixwesta ew li hev ne diketin û hev û du ne dikuştin. Lê Xwedê her çi ji dixwaze dike.

254 — Geli bawermendino . . . Ji malê xwe tiştên ko me bi dana wan emri we kiriye bidin; bidin berî wê roja ko tê de kirin nîne, hevaliti û xatir girtin nîne, kes ni kare mehdera kesekî bike.

Ën ko kafir in, zalim in û ên ko zekatên xwe ne dane, weke kafiran zilm li nefsa xwe kirine.

255 — Xwedê yek e û ji wî pê ve tu Xuda nîne, sax e; her sax e; abadin e, her hebû, her heye û çûna wî nîne. Ne diponije û ne ji radize.

Her tiştên erd û ezmanan milkê wi ne. Tu kes bê destûra Xwedê ni kare mehdera kesekî bike.

Ew pêşi, hal û dawiya me dizane. Ew bi qasi daxwaz û destûra xwe, me digehîne zanîna xwe.

Textê wî dora erd û ezmanan digire û parastina erd û ezmanan jê re ne tu zehmet e. Ê bilindtir, ê mezintir, û ê çêtir ew e.

256 — Di dinê Xuda de, zorkirin nîne. Tu kesî ji bo na ko ew bibe misilman me êşînin. Êdi bi kerema Xwedê kufr û din, rasti û nerasti ji hev veqetiyane.

Yên ko destên xwe ji parastina Taxûtê, ji pûtên mişrikan kişandine û baweriya xwe bi Xwedê anîne; wan destên xwe xistine destikekê xurt û jê venaqetin. Xwedê dibihise û zana ye.

257 — Xuda piştixurtî û arikarê bawermendan e. Xuda wan digihîne ronahiyê, lê muîn û arikarê kafiran Iblîs e, û ew wan ji ronahiyê dibe tariyê.

Kafir wê bikevin agirî û ew her tê de biminin.

258 — Ma te ew ne ditiye ?... Ew Nemridê ko ji kerema Xwedê xudan milk û devlet bû bû, paşê nefsmezinî kir û rabû bi Ibrahîm re di mesela mezinahiya Xwedê de pev çû... Gava Ibrahîm jê re got: Xudanê min ew e ko dimirine û miriyan vedijîne. Nemrûd got: Ez jî dimirinim û vedijînim. Lê gava Ibrahîm lê vegerand û got: Xudayê min rojê ji rojhelatî dide hilatin, ka tu wê ji rojavayî bide hilatin.

Vê gavê Nemridê kafir şaş bû.

Ji ber ko Xwedê zaliman nagihîne riya rastiye; ew ji kerem, piyarî û ari-kariya Xwedê dûr in.

259 — Ma te ne bihistiye... Ji wi mirovê ko di ber gundekî hilweşandi re derbaz dibû û gava halê gundê wê-ran û kambax dît ji xwe re got: Ma Xwedê çawan vî miriyî, vî gundi, vî xirbeyî dikare ji nû ve ava bike.

Xuda ew mirov mirand, sed sal mirî hişt û piştê wî ew vejand û jê pirsî: Tu çiqasî li vir mayî? Wî got: Rojekê an danê rojekê. Xuda got: No... sed sal in tu lê yî. Li xwarin û vex-warina xwe mêze ke, ew xira ne bûne; li kerê xwe jî binêre; em dixwazin tiştên ko me anî serê te ji xelkê re bibe ibret û li hestiyên kerê xwe fedkire... me çawan hestiyên wî dane hev û piştê me goşt li wan kiriye.

Gava wî ev tiştên ha dîtin got: Min zanî, Xuda bi her tiştî dikare.

260 — Wê demê binin bira xwe... Gava Ibrahîm got: Xudanê min ji kerema xwe pêş min bike, tu çawan miriyan vedijîni? Xuda got: Ma te hêj baweriya xwe bi min ne aniye?

Ibrahîm lê vegerand û got: çawan... min baweriya xwe bi te aniye,

Lê dixwazim bi çavê xwe bibînim û pê dilê xwe bişidînim.

Xuda jê re got: çar teyran bine û wan xweş nas bike û paşê wan teyran ker bike, perçe bike û her perçeyekî ji wan bavêje ser çiyayekî, piştê hanî wan bike, lez û bez ewê bèn cem te û êdî bizane ko Xuda delal, xwedîqudret û fêris e.

261 — Yên ko di riya Xwedê de ji malê xwe bi xweşdiliyê didin, mîna toveki ne ko jê heft sinbil derketiye û her sinbilekî wî sed heb girtine. Xuda jî kijikî re dixwaze du caran dide. Xuda zana ye û comerdiya wî mezin e.

262 — Yên ko malên xwe, bê minet û bi xweşdiliyê di riya Xwedê de didin û êdî qala qenciya xwe na kin, Xuda wan digihîne xeyr û kerema xwe. Ji hona wan di roja piştawiyê de tirs nine û ew xemdar nabin.

263 — Gava parsek di xwestina sedeqeyê de we aciz dikin bi wan re gotine-ke şîrin û çîw kirina qisûra wan jî dayineke bi minet û eza çêtir e,

Xuda dewlemend û dilnerm e.

264 — Geli bawermendino... Xeyr û qenciya sedeqeyên xwe bi minet û ezayê xira ne kin, me bin mîna wan ko ji ber ditina xelkê ji malê xwe tiştêkî didin lê baweriya xwe bi Xwedê û bi roja piştawiyê ne anîne. Ew mîna zinarêkî ne ko ax li ser e, baraneke xurt lê dikeve, ax diçe û zinarê hişk rût dimîne. Ew ji xeyra qenciya xwe bê behr dibin

Xwedê riya qenci û rastiye pêş kafiran na ke.

265 — Lêbelê yên ko malê xwe di riya Xuda de ji bo pêkanina emr û mirazên Xwedê û ji bo zexmkirina baweriya xwe didin, mîna bistanekî cihbilindin ko lê baraneke xurt datê an xunavek û hatina wê ducar dibe. Xuda tiştên ko hon dikin dibîne.

266 — Ma kesek ji we dixwaze ko ew xudanê dehlekî be, bi av û kanî,



## ZERDEŠT

Wexta ko Zerdešt sih sali bû, ji weletê xwe derket, dev ji gol û kaniyên erdê xwe herda û hilkişiya ser çiyân û tê de deh salan xweşiya tenahî û tezeta eqilmendiya xwe tam kir û jê têr ne bû.

Lê dawi fikra xwe guhart û rojekê li rohelati hat pêşiya rojê û got:

Tu stêra mezin! Halê te çi dibû heke yên ko tu rondar diki ne hebûna, wê gavê sirûd û mezinahiya te bikêrî çi dihat?!

Deh salan pê de, her roj tu bi hewa diketi û dihati hir, heta her şikefta min û te em rondar dikirin; bê min û mar û eyloyê min, bê şik tu ji riya vî çiyayî û ji ronîya xwe aciz dihûyî...

Lê me her rû di sariya sibehê de çavneriya te dikir û ronahiya te a zeyde dibir û em pê şikirdarê te dibûn û pesnê te dida.

Binêre ... ez ji eqilmendiya xwe aciz bûme, mîna meşa hingivîne ko ji piraniya hingivê xwe têr dibe, min destin divêtin yên ko xwe dirêj dikin û dixwazin. Ez dixwazim diyari bikim û lêkvekim; beta ko di nav mirovan de, ên aqil bi dîniya xwe û ên

---

têr darên xurme û mêw û fêki û ew pîr be û zaroyên wî biçûk bin û biderbêkê babilîskeke germ û agirnak wê dehlê bişewitine? Xuda bi vî awayî ayetên xwe pêş we dike heta ko hon serwext bin.

267 — Geli bawermendino ... Ji kedên xwe ên qenc û ji zadên erdê ko me ji we re da gihastin di riya Xwedê de bidin.

Gava didin, tiştine qenc û hêja bidin, tiştine welê ko heke ji we re bihata dayîn, we ne seha şermisariyê lê bi kêf û xweşdiliyê bîstandana.

Bizanin ko Xuda dewlemend e û qedrê evdên xwe digire.

---

Ji bona Telsira Quranê K.K. û li hejmaêrn 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 36, û 37an fedkirin.

feqîr û belengaz bi dewlemendiya xwe ji nû ve şa bihin.

Ji bona vê yekê divê ez bikevim xwar, herweki tu li êvarê diki, dema ko dadikevî li wî aliyê avê, heta ko ji dinyayê jêrin re roniyê bini. O ... tu, stêra dewlemendtir...

Herweki mirov dibêjin, divê ez herim ava, dakevim xwar da ko bigehim mirovên ko hewcedarî zanin û dewlemendiyê ne.

O tu çavê rahat û bêteşxele, tu i ko bê hesed û tîma dikari li siûd û bextiyariyeke mezin ji binêri ... Were, xêr û qenciya min bixwaze!! Xêr û qenciya wê piyanê bixwaze, ya ko dike di ser ra birije, ta ko aveke zelal û zêrin jê biherike û geşî û xweşiya ronîya te bibe her derî ... Binêre! Ew piyan dike careke din vala bibe û Zerdešt dixwaze ji nû ve bibe mirov.

Daketina Zerdešt bi vî awayî destpêkir. Zerdešt ji çiyê bi tenê kete xwar û kes rastî wî nehat.

Lê dema ko zerdešt giha rêl û daristanan, ji nişka ve dit ko li ber wî miroveki pîr sekiniye; ew ji holiika xwe derketi bû û dixwest li daristanê rayê giyan û pelên heşîniyan berhev bike.

Û wî bi awayê jêrin dest bi axaftinê kir û got: Ev rêwingiyê he ji min re ne keski xerib û nenas e; beri çend salan ji vir birêbiwarî derbaz bû bû; navê wî Zerdešt e, lê xwe guhartiye.

O Zerdešt! Tu di wî wextî de xweli a xwe diani çiyê; gelo tu diki niho agirê xwe bini deşt û nevalan?!

Ma tu ji cezayê ko pê mirovên şewatker têne eşandin na tirsi?

Erê, ez Zerdešt nas dikim, çavên wî pak û zelal in; û tu xirabî di devê wî de çih na gire. Ma meşa wî ne mîna wî mirovî ye ko ketiye govendê! Zerdešt hatiye guhartin; Zerdešt bû bû mîna zarokeki; Zerdešt niho miroveki sere û hişyar e; ma tu li ba mirovên razayî çi digeri, tu ji çayîna ba mirovên razayî çi hevî diki?

Te di bédengi û tenahiye de mîna li behrê emir dikir û behrê tu li ser pêlên xwe hillani! Wey li te, tu diki niho bikevî erdê? Ax li te, tu diki ji nû ve barê giyanê xwe hilgiri?

Zerdeşt lê vegerand û got : Ez ji mirovan hez dikim.

Mirovê pir û miqedes got ; Ma çire min xwe kişandiyê tenahiya rêl û daristanan . . . ne ji bona wê yekê ko min gelek hejî mirovan dikir. Niho ez ji Xwedê hez dikim û ji mirovan hez na kim; mirov tiştêki nepêkhatî ye û hevina wan ez bikuştama.

Zerdeşt lê vegerand û got : Min qala hejkirinê kir, ne were ye ? Ez ji mirova re diyariyekê tînim ! Mirovê pir û miqedes got : tu tiştêk me de wan; çêtir ji wan tiştêki bibe û pê barê wan siviktir bike û barê wan ê mayî bi wan re hilgire; ewê pê hêj kêfxweş-tişt bibin; bi tenê heke tu ji pê dilxweş dibi ? .

Zerdeşt got : No . . . Ez sedeqê na dim, ji bona dana sedeqê divê mirov zehf feqîr be; ez ne hinde belengaz im.

Mirovê pir û miqedes bi ser zerdeşt kenîya û got : De binêre; ko ew diyariya te qebûl bikin. Ew ji mirovên ko di tenahiye de dijîn ne ewle ne û pê qîma xwe na yênin û bawer na kin ko ew tèn da ko diyariyekê bidin wan.

Dema ko em dikevin bajarê wan û li ser riyên wî ên tena dimeşin, pêjna piyên me li wan nexweş tê; û berî bi saetên ko ro hiltê gava ji rê û kûçan dengê piyên me dibihîsin, ew di textê xwe de texmîna dikin û ji xwe re dibêjin : Gelo ew diz dixwaze here kû.

Meçe ba mirovan û di rêl û daristanan de bimîne ! Hêj çêtir here nav dehban ! Çire na xwazî min min bibi . . . di nav hirçan de hirçektî û di nav teyran de teyreki . . .

Zerdeşt jê pirs kir û got : Mirovê kal û miqedes di nav rêl û daristanan de çi dike ? Mirovê pir û miqedes lê vegerand û got : Ez stranan çêdikim û wan dihêjim; û gava ez stranan çêdikim, dikenim, digirim û dinehwirînim û pê pesnê. Xwedê didim. Bi stran, girîn, kenîn û nehwirandinê Xwedê dibe. Inînim; yê ko Xudayê min e.

De bêje, te çi diyarî anîye me ?

Gava Zerdeşt ew xeber bihistin, selav li pirî kir û got : Ma ez çi dikarim ji we re bigerinim diyarî; baştir ew e ko herdin, bila ez zû ji vir herim; ta ko ji we tiştêki me stînim !

## DÎWANA MELÊ

— 12 —

Min di dil kovan hezar in, dağ û keybir bê hisab  
Mihneta werdên bixar in wê di dil da sed nişab  
Sed nişab in min di dil îro ji xarên sorgulan  
Yek bi yek peykan civî bûn çûne cergê da kulab  
Pir bi wan cerhan xweş im, lew ko tèn derman  
dikin [1]

Şerbet û ava heyatê şekir û qend û gulab  
Ger du' sed peykan di nêva dil biwan dê xweş  
biwan

Her dema kewkeb bidîna nêcm û perwîn bê hicab  
Zihre û eqda sireya kifşe bûne ew di şerq  
Sayeya bextê me daim ma li ser perde niqab  
Wajgûn dewrê nîma min çerx û bayê lewlehan  
Kewkeban seyri mixalîf girtî têkil kir hesab  
Vêketin [2] Şems û Zihel îro di birca eqrebê  
Heyf çû destê Merixê milki dil lew bû xerab [3]  
Lew tenezil kir Merixê nobê çû dewre Zihel  
Çû teref inîhra sipehrê nez - zili erdan ezab  
Lew ji şeş bircan Elarid j'astabê dûr bû  
Lê Zihel bû Mişteri avête çerxê inqilab  
Şew - wişî nezma nicûma heyeta çerx û biruc  
Lew li wesfek dernetêtin mah û Zihre astab  
Minqelib min di menazil vajî ew seyrê dikin  
Yek bi yek xûn jê dibarin atêş û lemû û şehab  
Zihreyê cengê siwar in di ji çeng avêt çeng [4]  
Xweş li pey qanûnî wî, wê guh de tu qanûn ribab  
Ez dibêim axirzeman e, dê qiyamet rabitin  
Lew şeva tarî kişandî wî ne hişt eswed xûrab  
Xweş li min alem siyeh ma stêr û kewkeb qet ne ma  
Ez ji wê rojê ditirsim axirî zû kir şitab  
Ev ne ew iqlîm e ya şems û kewakib tê di seyr [5]  
Ez ne wê erdê dibînim ya ko lê ew mahitab  
Cin û teyarek me di wer bû li min [6] winda kirim  
Dante ber penc û kulaban hilfirandim wek iqab  
Sîflewî înam û avêtîm zemîna zilmetê  
Lê ko hişyar im gelo ya xewn e min dîtî bi xab  
Dêwê mel'ûnî minafiq ey Xwedê rûreşkîrî  
Me bi bala hilkişînit aqîbet çi bit selab.  
Sirperî ilef nîzanî silriya ebyed diket  
Pir xelet erzan me di der heqê wî alîcîna [7]  
Ehremen talim da bû destî ebyed tê hebû

Bi vî awayî mirovê pir û mêrê sere bi ken û xweşî ji hev veqetîyan, bi kenê ko du zaro pevne dikin û pê şa dibin.

Lê dema ko Zerdeşt bi tenê ma, ji xwe re got : Ma imkana wî heye . . . ! Vi mirovê pir û miqedes di nav rêl û daristanan de hêj ne bihistî be ko Xwedê miriye. [ ]  
SEYDAYÊ GEROK

[1] Ji vî Xudayî mexsed ne Xudayê erd û ezmanan e; lêbelê baweriyên pûç û şaş in.

## EMËRIKE

### XWË ÇAWAN KAR DIKE

Emërike xwe kar dike, xwe ji bo şereki dūr û dirêj kar dike. Ji gotinên Mister Rûzvelt wer dixuye ko şerê japon û emërikaniyan wê gelek dom bike û Emërike ne li tenê di Pesifikê de, lê di her qadê de wê bikeve şer û heta zora dewletên mihwerê biçe şûrê xwê venagerine kalanê wî.

Mister Rûzvelt li 7ê Kanûna Paşin di pêşberê Kongrê de nitqek daye: « Divêt em nehêlin ko dijmin nizingî peravên me bibe. Divêt em xwê bigehinin erdê wî û şerê xwe di erdê wî de bikin. Eskerên emërikani ji bo çêkirina dijmin wê herin her derên dinyayê, lê bêne wer û zora wî bibin. »

Piştê Mister Rûzvelt ji kongrê re da zanîn ko ji bo serbestiya dinyayê û çêkirina dewletên mihwerê divêt Emërike mesrefine mezin bidê her çavê xwe. Ji niho de di hîca herbiyê de 56 milyar dolar hene.

Rûzvelt dibêje ko heta sala 1943an balafir û tangên Emërikayê ji vên mihwerê wê sê caran bêtir bibin. Yanî di pêşberê tang an balafireke mihwerê de sê tangên sê balafirên emërikani wê hebin. Febrîkeyên emërikani di sala 1942an de wê (60 000) balafir (45000) tang û (20 000) topên herbalafir çêkin. Herçi sala 1943an e, di wê salê de emërikani (125000) balafir (75 000) tang û (35 000) topên herbalafir çêkin. Ji van pêve tersaneyên emërikani di sala 1942an de 8 milyon ton û di sala 1943an de 10 milyon ton vapor wê binin wicûdê.

Rûzvelt beriya ko nitqa xwe biqedine gotiye: Ev hejmar besî japon û elemanan in. Evê ji van hejmaran bizanin mirov çawan digehe zefêrê.

### SMAÎNÊ-SERHÊDÎ

Pir bi wê talim û rayê hati bû çû bû xitab  
Ab eyamên wê wisalê ew ko xwêş borin û çûn  
Ew şeraba îş û nûşê ma li pêşber min serab  
Şerbeta şîrinleban zehra bilahil bû di nav  
Lew bi narê firqetê axir li min dil bû kebab  
Hudnudek xwêş tebhe min iro divê herwek nesîm  
Da bi bal dilber hinara b'aniya dîsa cewab  
Erzihalê min bigota yê bi inwana edeb  
Asitan bikra ziyaret çêtr û seywan û teneb.

## NOQAR

### YANÎ VAPORÊN KO DI BIN BEHRÊ RE DIÇIN

Ji şerê 1914 û 18an ve du çekên nû dikevin her çawan: noqar û balafir. Ev her du çekên ha ji gelek caran bera çekine din, çekine ji xwe meztir didin û zora wan dibin. Noqar an balafirek carina cenkeştike bi 30 000 tonî an jê meztir bin av dike. Balafir di ezmanan de difire, noqar di bin ava behrê re diçe. Di vê hendê de emê qala noqaran bikin.

Îşê noqarê berî ewilî di sala 1777an di şerê istîqlala Emërikê de hate bira mirovan. Emërikaniyan ji bo istîqlala xwe şerê dikir. Heta hingê Emërika bakur ne bi serê xwe lê mistemlekeke ingilîzî bû. Herçi Kenade ew jî mistemlekeke frensîzî bû.

Ingilîzan ji emërikaniyan bêşir girti bûn. Ew hêşir li vaporan siwar kiri bûn û dikirin bibin Ingilîterê. Ew vapor di bendera Nûyorkê de kar bû bûn û cenkeştike ingilîzî bi navê Îgel ew vapor dihemandin. Yekî emërikani bi navê « David Bihnel » noqarek çêkiri bû û navê « Tûrtel » lê kiri bû. Tûrtel ne weke noqarên iro bû. Bi tenê noqî avê dibû û di bin behrê re diçû. Şiklê wê girover û dirêj weke sigarekê bû. Tê de peyaki bi tenê rûdinişt û ew dimeşand. Serê noqarê wek singokê tûj bû û pê ve bimbeyek hebû. Noqarê diviya bû dirêjî dijminê xwe bikira û bi singowa xwe ew qul bikira. Di vê qulê re himbe wê biketa hundirê vaporê û wê tê de biteqiya.

Li 25ê Nisana sala 1777an de noqarê di bendera Nûyorkê de dirêjî cengeştîya ingilîzî Îgel kir. Lê ji her ko singowa noqarê niktari

Da di çesman min werîna xakê herwek tûfiya  
Ya hebîb lê pê nihadê b'aniya wî ew tirab  
Her kesê rabê bi behsê carekê mehder biket  
Xêrî heftê hec didêrî belkî behtir ew sewab  
Wehde da bû dê şehîd kim wî bi şûrê xwe î şerîf  
Ma nebi iro peşîman ew jî tedbira sewab  
Şerhî halê min mela nazî beyadê hê temam  
Wê siwadê gerçî her dem jê birin sed intixab.

### FERQÊN NIVÎŞTAN

— 12 —

[1] Pir bi wan cerhan xwe têr in lew ko di derman dikir. [2] Vêk ketin. [3] Sêf çû destê Merixê milki dil lew bû xerab. [4] Zibreyê çeng siwa j'ev di ji çeng avête çeng. [5] lê bi seyr. [6] di min. [7] Pir xêlet erzan me di derheq xwe û alîcenab.

bû bi temami bedena cenkeştiyê qul bike bimbe ji der ve teqiya û xesar ne giha cenkeştiyê. Lê cenkeştiyê ji tu xesar ne gihande noqarê. Ji ber ko naqar beriya ko cengeşti li topên xwe bixebite noqî avê bû û xwe jê xelas kir.

Ev tecriba pêşin bû û ne çû seri. Sed sal ketine navê, emêrikanîyan şerê hevûdu dikir. Ordiwa Emêrika bakûr di nivro de bajarê Çerlestonê mihasure kiri bû. Noqa rekê dirêji kerewzora Nû - Eyrenseyd kir. Nû - Eyrenseyd kerewzoreke xurt bû. Noqara ko dirêjt wê kir bi navê « David Lègel » bû. Tê de sê peya hebûn Di pêşiya vê noqarê de ji singoyek hebû. Bi singoyê ve ji bimbeyek bi pênci kilo barût hebû. Vê noqarê ji diviya bû xwe li dijminê xwe biqelibine û bedena wî qul bike. Noqarê dirêji krewzorê kir. Lê deryavanên krewzorê zû lê hişyar bûn û bera wê dan. Guleyek ket serê noqarê û her sê peyayên noqarê teslim bûn. Bi vî awayî ev tecrîbe jî peşîl. Digel vê hindê mihendisên behri dev ji vaporên binbehri beruedan û lê xebitin.

Di sale 1880î de mihendisêki talyanî bi navê Remezoni li ser hisabê hikûmetê Fren-sê noqarek çêkir. Ev noqar di bendera Tulo-nê de daket behrê. Dirêjahiya noqarê 20 mêtir bû û noqar bi 180 sentîmetir bi ber bû. Lê vê noqarê jî aletên torpilavêj nin bûn. Evê jî wek yê berê diviya bû xwe li dijminê xwe biqelibîne û bi vî awayî himbeyên xwe biteqlne. Digel vê hindê ev noqar wek maka noqarên iro tête hesêb. Lê ev noqar ne kete şer.

Noqarên torpilavêj di şerê 1914an de peyda bûn û di vî şerî de ketine şikileki tekûztir. Di noqarên iro de li gora mezinahiya noqarê 40-50 deryevan, çend top û torpil hene.

Bi tenê japonan, di şerê Pesifikê de noqarine nû bi kar anîne. Dibêjin ko ew noqar gelek hûr in û bi destên do peyan têne xebitandin. Di wan noqaran de torpileke bi tenê heye û ev noqar beta sê sed mêtirî dikevin binê behrê. Di san dibêjin ko vaporine xweser wan noqaran li xwe siwar dikin û gava nîzîngî dijmin dibin wan dadixin behrê. Li gora vê gotinê divêt wek vaporên bala-fîrhilgir vaporên noqarhilgir jî hebîn.

#### CEMILÊ TACDO

## TIŞTÊN PESIFIKÊ

Bi şerê japonî jî her wextî hêtir deng bi Pesifikê ket. Ji lewre me dil kir ko xwendevanên xwe li ser hin tiştên Pesifikê serwest bikin.

**PESIFIK** — Pesifik yek ji pênc behrên dinyayê ên mezin e. Pesifik dikeve navbera Asyê û Emêrikayê. Rohelatê behrê Emêrike, roavayê wê Asya ye. Bi gotinên din Asyê dikeve rohelatê Pesifikê û Emêrike di roavayê wê de ye.

Japonye di vê behrê de wek Ingilterê wela-teki giravan e. Ev girav di rohelatê Asyayê de ne û dikevin pêşberê Mençûko û Sibêryayê. Di nav van giravan de a meztir Nipon e; ji lewre jî japonîyan re niponî jî dibêjin.

Di Pesifikê û di navbera Japonye û Emêrikê de giravine din jî hene. Hinek ji van giravan yê Emêrikê, hinên din jî yê Japonyayê ne, û ev girav têk de wargehine behrî û hewayî ne. Herçi giravên ko li ser riyên behrî ne bi piranî di destên Emêrikê de ne. Di navbera Japonye û Emêrikê de du riyên bingehîn hene.

Yokohama - Senfrensisko — Yokohama bendera japonî û Senfrensisko bendera emêrikani ye. Li ser vê riyê girav û wargehê Harbûrê heye. Ji Yokohama heta Harbûrê (2395) û ji Harbûrê heta Senfrensisko (1941) mil in. Di navbera Yokohama - Senfrensisko re rêke din jî heye û ev dikeve nivroyê rîya pêşin. Ev rê di girava Midweyê û giravên Hewayê re diçe. Ji Yokohama heta Hewayê (3379) mil û ji Hewayê heta Senfrensisko (2068) mil in.

Giravên Hewayê wargehêki gelek mezin û bi eheniyet e. Kîşwerê Hewayê jî çend giravan tête pê. Honolûlû mezkeza van giravan û wargehê stola emêrikani ya Pesifikê ye. Dibêjin ko emêrikaniyan jî bo çêkirina vî wargehî bilyonek dolar serf kirine. Nifûsa Hewayê (256000) e. Ji vê nifûsê (159000) peya japon in.

Ji Honolûlû heta Manîlê merkeza Filipînê, û di ser girava Wêkê re (4797) mil hene.

Emêrikê jî yê jinorin pê ve di Pesifikê de grav û wargehên din jî hene: wek Giwani, Conson, Kenton; ji giravên Filipînê pê ve. Filipîn hi xwe welatek e.

Ingilîzan jî nîstemlikên mezin di Pesifikê de hene. Ewîstralye, Nûzêland, Gina - nû. Ji Sidneyê, payîteyê Emîstalyayê heta bendera Emêrikani, Senfrensiskoyê (3658) mil in. Rê di giravên (Kwik) û (Tahiti) re derbas dibe, Ji Sidneyê heta Hewayê jî (4476) mil hene û rê di girava (Fici) re dibore. Fici ji Sidneyê (1743) mil dûr e.

Nûzêland, ev girav dikeve nivroyê rohelatê Ewîstralyayê û welatekî mezin e.

Gina — Nû. Ev girav di navbera ingilîz û holendîyan de bi nivî ye. Rohelatê giravê yê ingilîzan û roavayê wê yê holendîyan e û ev herêki Hindîstana holendî ye.

Bakurê Bornêo jî yê ingilîzan e.

# HEDISËN

## CENABË PËXEMBER

### REHMET Ò SILAVA XWEDË LË BE

419 — Yën ko gava dev ù destê xwe dişou navbira didan ù tiliyên xwe ji paqîj diкин çiqas spehî ne.

420 — Yê ko ji bona din ù welatê xwe şer dike ji bona parastina wan şevokê hişyar dimîne, xewê li xwe diherimîne ji mirovê ko hezar rojî rojî girtiye ù hezar şevî nimêj kiriyê çêtir e.

421 — Qedrê jinên mirovên ko di riya din ù welatê xwe de şer diкин minâ yê diya xwe bigirin.

---

Herçî Holendê vê dewleta kiçîk ji di navbera Ewistalye ù Hindeciñiyê de giravine gir ù hûr hene ù ji tevayiya wan re Hindistana holendî dibêjin ù Japonye çavên xwe berdaye nemaze vî welatî.

HINDISTANA HOLENDÎ — Belê Japonan nemaze çavê xwe berdaye Hindistana holendî. Ji ber ko Hindistana holendî welatekî mezin ù dewlemend ù nemaze, bi madenên xwe ên tével heja ye. Di Hindistana holendî de gelek petrol heye ù ev made di Japonayê de heke yeqcar nin be ji gelek kême.

Hindistana holendî ji nivgirava Malêzyayê ber bi rohelê heta bakurê Ewistralyayê dirêj dibe. Ev kişwer welatekî giravan e. Mezintirên van giravan ji roavê ber bi rohelê Sîmetre, Cawe, Selebis, Bornéo ù birekî Gina - nû ye. Di vî welatî de 63 milyon peya rûdinin. Herçî miletê serdest yanî Holende nifûsa wî di Ewropayê de 6 milyon ù tiştek e.

EWISTRALYE — Ewistralye rast bi rast ne mistemlekeke inglîzî ye. Jê re dominyon dibêjin. Welat di îşên xwe ên daxilî de bi ser xwe ye lê di îşên xaricî de tabihî tacu Inglîterê ye. Girava Ewistralyayê welatekî mezin e, rûyê erdê wî digel Tesmanyayê (7704000) kilomêtir çarçike, 15 caran bi qasî Fransê. Xelkê wî tev de ji nijadê engloeskson in, ù di wextine kevin de ji Inglîterê hatine vê derê. Xelkê çihê eslî ji ber van revîne ù xwe dane nivroyê roavayê giravê, çihine beristan. Mîxarê wan qedere niv milyon e. Herçî engloeskson 6 milyon ù 400 hezar in.

Ewistralye welatekî gelek dewlemend e. Pezê wan zehf e. Di sala 1938an de di vî welatî de 100 milyon pez hatine hejmartin. Zade wan jî boş e. Genimê Ewistralyayê diçe Emerikê, Ewropê ù welatên rohelatê dîr. Berê, di Ewistralyayê de gelek kanên zêr hebûn. Îro zêr bi tenê di mintiqa Kelgorî de peyda bide. Ji axa vî welatî madenên wek ziv, zeng, sîfir, hesin ji dertên.

### EVDIREMANË ROJKÎ

422 — Mirov qedrê xadim ù xulamê xwe bigire jê re xeyr ù bereket e.

423 — Mirov divê ji qe ne ve li hefteyê carkê ser ù giyanê xwe bişo.

424 — Pênc guneh hene ko bi kefaretê na yin şuştin ù ew minâ kufr in :

Mişriki, bê rê kuştina xelkê, bê rê xwarina malê xelkê, ji şerî bazdan, derew ù sund xwarina bi derewan.

425 — Hakimê qenc ew e ko hon ji wî hez bikin ew ji hej we dike ù hon bibin arikarê wî ew ji arikariya we dike, hakimê neqenc ew e ko hon jê dixeyidin ù ew ji li we na nêre, hon lanetê lê diкин, ew ji laneta li we dike.

426 — Qencên we ew in ko xwediye gotina xwe ne.

427 — Çêtirên we ew in ko dilê mirovên di xwe xweş diкин.

428 — Mirovê çêtir ew e ko bi kêrî xelkê tê.

429 — Ziwaca bastir ew e ko xeyd ù zehmet tê tu ne be, qelenê wê ne giran be.

430 — Xortên we ên bastir ew in ko minâ mirovên sere giran in ù kalên we ên xirab ew in ko pir bûne ù li ciwaniyê digerin.

431 — Çaktirên we ew in ko xêrxwaz ù xêrkarê jin ù zaroyên xwe ne.

432 — Camêr ù mêrxas qedrê jina digirin, dilê wan na şkinînin, mirovên pis ù bêqedr jina diêştin.

433 — Çêtirên we ew in ko ji bona din yayê dev ji axireta xwe ù ji bona axiretê dev ji dinya xwe bernadin ù ji xelkê re na bin bar.

434 — Yê ko heqê xelkê bi timamî dide serfiraz dibe.

435 — Dêza, xaltiyên we minâ diya we ne, qedrê wan bigirin.

436 — Xelk hemî mirovên Xwedê ne, Xwedê ji nav wan ji mirovê ko ji hemiyan bêtir bi kêrî xelkê tên hez dike.

437 — Her xatirê mirovên xwe ên nesax bipirsîn, herin serikî bidin nexweş ù nesaxên xwe.

438 — Deynkirin kêmaniyeke mezin e.

439 — Deyn nîrek e, gava Xwedê kêmaniya yekî dixwaze wî nîrî datîne ser stoyê wî.

440 — Destpêka eqildariyê tirsax Xwedê ye.

## MOSKO

### NEPOLÉON, HİTLER Û STALİN

Şerê ûris li 22ê Hizêrana sala 1941ê de dest pê kiri bû. Dinyayê digot ko zora ûrisan heke ne di çend heftan de be ji di çend mehan de wê here û ûris dê bêne şkenandin. Bi tenê Stalin serekê kişwerê bolşevikan, pê li erdê dida û digot, Rûsye naşkê, heye ko eleman bèn heta Moskoyê, dibe ko Moskoyê ji bistinin, lê pê zora me naçe û em serê xwe li Hitler natewinin. Napoléon

ji hati bû heta Moskoyê, lê serdarê frensizan ê mezin bi zefera xwe şikest û pol û poşman, di bin pûkên berfê de ji cem me vegoriya û Mosko ji ordiwa wî re bû gornistan. Dawiya Hitler ji ev e.

Gotinên Stalin hêj bi temami ne çû bin ji seri Hitler ji plana xwe ne bire seri.

Elemanan pênc mehan yanî ji 22ê Hizêranê heta 22ê Çiriya - Paşin, roja vegirtina Rostovê, ji zeferekê dida pey zefereke din. Lê jê bi şûn de û bi Pirekanûnê ve stêrka elemanan sernexwin bû. Elemanên mizefer xwe ji eniya ûris dane paş.

Me got ko Stalin di destpêka vi şerî de qala Napoléon kiri bû û goti bû ko Hitler ji wê bibe hevalê wî. Stalin dibêje ko qedere n Hitler û Napoléon gelek diçin hev. Ma qedera Napoléon çi bû?

Di vê babetê de zabiteki elemani bi navê Klewziç tarixek nivisandiyê û tê de qala seferê Moskoyê kiriyê. Napoléon di sala 1812 an de aveli bû ser welatê ûris. Di wê tarixê de xurtiya Napoléon gihaştî bû dereceke welê ko dewletên ewropayî tev de keti. Bûn bin hikimê wî û Napoléon hû bû hakimê Ewropayê. Napoléon gava dirêji ûris kir zabiteki elemani Klewziç xwe gihande ordiwa ûris û pê re serê Napoléon kir. Klewziç di heqê wî şerî de dibêje :

Tabiya Napoléon serê brûskin yanî şerê bi lêz bû. Napoléon eskerê xwe li cihekî kom dikir û ji nişkekê ve tavê ser dijminê xwe. Îşê xwe wer zû pêk tanî û diqedand ko firsend ne diket destê dijminê wî ko xwe pêk bîne û li pêşiya wî bisekine. Ji lewre şerên Napoléon ji çend rojan bêtir ne tajot û di van çend rojan de Napoléon zora dijminê xwe dibir û ew dişkênand.

Gava Napoléon avête ser Rûsyayê, ûrisan di pêşiya vê tabiyê de tevdirên jêrin ditin û pê ne hiştin ko tabiya Napoléon here seri. Belê Ûris bêtî ko bikevin şerîne mezin ji ber ordiwa Napoléon dikişyan, di cihên ko ji dest didan rê, pir, zad, avahî û her tiştên ko dikari bûn bi kêrî dijmin bèn xerab dikirin. Ji milê din gava ordiwa ûris dikişiya di cihên bisemt de çete ji par re li ordiwa frensizan dixist. Bi vi awayî, ordiwa Napoléon ya ko ber bi pêş diçû hero qelstir

441 — Pir hene bi şev nimêjê dikin û jê karê wan bi tenê kêm xew mayin e û pir ji hene her bi rojî ne û jê karê wan tih nû birçî man e.

442 — Pir hene zikê wan têr e, şikirdarê Xudayê xwe ne û ji mirovên bi rojî û birçî çêtir in.

443 — Xwedê li mirovên pakdil û pakziman tê rehmê.

444 — Herê wekî mirov silava xelkê lê vedigerine wiha ji divê cihaba kaxeza wan li wan vegerine, ev heq û rast e.

445 — Destê ko li ber te vekiriyê vala vemegerine.

446 — Yê ko bertila dide û yê ko dişîne mêvanê dojhê ne.

447 — Yê ko li insan û heywana tê rehmê û bi dilekî xweş û birehm li wan dinere bila bizane; Xwedê wê wer lê binêre.

448 — Xulqîrehi û dilbirehmi destpêka qilmendiyê ye.

449 — Yê ko bi dilekî pak ji yekî hez dike bila bizane ko Xwedê ji hej wî dike.

450 — Pir li çûn û hatina xwe lezê me kin hevaltîya we wê bêtir bibe.

451 — Herin goristana, ber serê miriyê we, pê axiret tê bira we.

452 — Zina perîşanî ye.

453 — Herin bigerin, laşê we pê rahat û sivik dibe.

454 — Herin bigerin, bi rêke dûr û dirêj herin, bedena we pê rahat û malê we bêtir dibe.

455 — Destê xwe direjî can, mal, namûs û şerefa xelkê me kin, ew ji we re hez e û bon pê kafir dibin.



## HEKE WE ŞIKIR KIR EZ ZÊDE DIKIM

« AYETA QURANÊ »

Xwedê li ser şêx, mela, weli û seydan û li ser hemî rêberên dinê islamê ferz kiriye ko ew spasên xwe ên kûr ji miletê kurdi re pêşkêş bikin da ko Xwidayê gewre ji wan re peyar bit û ji wan razî bit û nîmeta xwe li ser wan zor bikit.

Da bête zanin ko ew mitî vê ayetê ne, ayeta ko min li serî gotiye.

Heger yek ji cenabên wan comerdan ji min re hêjî ji ber çî spasên şêxan û ew-

---

diket û ordiwa ûris ya ko xwe dida paş, ji alikî şer dikir û ji aliye diin xwe pêk tani.

Nepolêon di dilê xwe de digot ko bi standina Moskoyê mesele wê safî bibe û ûris aşiye yanî silhê wê bixwazin. Ji Nepolêon ve gava ordiwa wî bigelîsta Moskoyê ewê ji xwe re cih û qîşleyên germ û her texlit zad û zexire wê peyda bikira û tê de wê bikuriya bilhna xwe bide.

Belê Nepolêon Mosko zemt kir, lê hêviya wî pûç derket. ûrisan beriya ko terka payitexê xwe bidin ew şewitandi bûn û tistên ko agir bi wan ne diket ew ji xerab kiri bûn. Nepolêon û ordiwa wî ne keti bûn bajarekî, lê keti bûn xerabzarekê. Ji xwe li Moskoyê ji feqîr û belengazan pê ve kes ne ma bû.

Nepolêon di Kremlînê, di qesra çarên ûris de li hêviya şertên aşiye bû; lê ew ne dihatin. Herçî çar yanî imperatorê ûrisan û fermandarên wî ordiwa ûris ji nû ve pêk ve tanin û li ber fikan desekinîn. Wekê Nepolêon bêgav ma û ji Moskoyê kişiya ûrisan da pey ordiwa wî û ew gelek êşand.

Gava Nepolêon ji Moskoyê vedigeriya hemî Ewrope di bin hikmê wî de bû ji Ingilterê pê ve. Ingilterê xwe ji bo şerê Nepolêon kar dikir. Piştî sê salan Ingilterê digel hevalbendên xwe di Vetêrloyê de zora Nepolêon bir.

Tistê ko li Nepolêon qewimî ev e. Nepolêon ket Moskoyê. Herçî Hitler nizingî li Moskoyê kir û bêt ko bikev -ê ji ber kişiya û ûrisan da pey. Ayende wê ji me re bide zanin heta Bihare ûris elmanan wê vegerinin heta kû derê.

HESENÊ MISTÊ

liyan ji bo miletê kurdi ferz e? Hecar û herdem ez dikarim cewaba xwe bidim, bi hindik û rindik.

Belê her hosa ye, wek ko ez dibêjim. Çinko miletê kurdi di çaxê saxiya wan de xidmeta şêxan û ewliyan kiriye.

Ew ewliya bi arikariya miletê kurdi gihastine wê reyê, riya hîdayetê û bextiyar bûne. Piştî ko ew wefat bûne kurdan gelek tekiye û mezar li ser tîrbetên wan ên spehî çêkirin. Ewan ew xaneqahên wan û mezarên wan hemî bi mehfûr û bi heran xemilandine. Zêr û zivê xwe helandin, kirine gumbet li ser mezarên wan.

Kurdan gelek malê xwe xerc kir di reya nan û danê wan xaneqan da û heya niho kurd hemî malên xwe serf dikin di reya xêratên di wan comerdan de. Û piştî wefata wan malên xwe didin zaroyên wan ji.

Ew zaroyên ha çî kesb çî kar ninin. Heger ew di dinyayê de bi torinî û bextiyarî dijin rizqê xwe ji Xwedê û ji miletê kurdi dixwazin.

Herçî şêx û ewliya wan ji hevaliya tu miletê din ne kir ji xeynî miletê kurdan. Çinko tu kesê din ji kurdan pê ve elba wan ne pîvaye. Ji ber vê yekê hemî ewliya û şêxên gewre wek şêx Ebdilqadirê Gêlanî, Şahê Neqşebend, şêx Nûredînê Birivkani, şêx Xalidê duçeng, şêx Xalidê Cizerî, Xêwsê Hizanê, şêxê Nêrî, şêx Ehmedê Xani, şêx Ehmedê Cizerî û Kak - Ehmedê Şêse di nav Kurdistanê de rûdimîştin heya ko tîrbetên di wan ketine nav Kurdistanê.

Van comerdan hevaliya kurdan kir, bi saxiya xwe ew terk ne kirin, bi wefata xwe ji. Çinko wan agehî bi dilê miletê kurdi ê paqij û xûna wan a pak ya weko hercar û herdem di laşê wan de dijiviye û ji bona razîkirina dilê wan hebû.

Wan comerdan her bi vî awayî xwe ji kurdan hesêh dikir. Ji van comerdan herçî ne kurd bûn ji îtirafa kurdi li ser xwe dikir.

Çinko ew bi enaniya miletê kurdan bi wan re hisiya bûn, dilê wan her west bi kurdan re sax bû. Kurd ji di çaxa wan de bextiyar bûn, zengin bûn, malê wan pir bû û tebietsilûk û ji terîqetên wan bûn. Heya niho ji kurd bi vî awayî ligel zariwên wan mixlis mane.



Eger vi çaxî kurd yek ji zariwên şex-  
an û ewliyan dibinin ko kesk li serî ye, he-  
ma dibeziu, diçin tewafa destê wî û her  
tiştê ko ew ji malê wan daxwaz dikin, ew  
bi wan didin, bi niyeta dilê xwe ê paqij û  
xwina xwe a pak.

Heger kesek qencî ligel yekî bikit di,  
vét ew qenciya wî ji bîr nekit, eger qenci  
li wî ne vejerit, şûna wê çî xerabiyê nekit.

Ez yek ji zariwên wan ewliyan im. Ji  
wextî ez hatime dinyayê heta vi çaxî ez  
rizqê xwe û toriniya xwe û bextiyariya xwe  
ji miletê kurdî dixwazim û her hosa; kalikê  
min şex Nûredîn û kalikê kalikê wî ji rizqê  
xwe û yê xaneqa xwe û sifra mihvanên xwe  
û şilana diwanxana xwe ji miletê kurd  
xwestine, û ji miletê kurd birine.

Belê vi çaxî em zariwên şexên vi ze-  
manî bi xwe perîşan bûne. Em ji bavên xwe  
perîşantir in; destê me kurt bûye; toriniya  
me winda bûye.

Ma jê re sebeb çî ? Sebeb ev e, çaxê  
kalikên me torin û bextiyar bûn wî çaxî li  
nav kurdan yekîti hebû, kurd serbixwe bûn,  
her bextiyar û torin bûn. Vi çaxî kurd perî-  
şan bûne, em ji bi perîşaniya wan perîşan in.

Heger mirov ji rezekî tiriş xwari bit  
û salekê ew rez tiriş ne da, nabit ko mirov  
pişta xwe bidit wî. Divêt mirov wî xweyt  
bikit heta saleke din.

Gelek em zariwên şex û ewliyan ji  
Xwedê bixwazin û jê hevîdar bibin û ji kali-  
kên di xwe daxwaz bikin ko ew di xwestina  
yekîti, bextiyarî û toriniya miletê kurdî de  
hemi himetên di xwe serf bikin da ko mile-  
tê kurd ji bindestiya dijminên xwe derkevit  
û bibit serbixwe.

Eger em bi mayîna terîqên xwe û  
silûkên xwe bawerimend in û dixwazin bi  
rêsika kalikên xwe biçin divêt her bi vi  
awayî ji Xwedê xwe bextiyarî û biserxwebûna  
kurdan bixwazin.

Ez xatircem im, ji hemî ewliya û şex-  
xên kurdan yê vi zemanî wek şex Brahim  
Heqî Şahê Basiret, şex Elmedê Xiznê quthê  
rebanî û şex Ebdilqudûsê zilî û şexên kurdên  
Îraqê û hemî şexên kurdan ko ew hemî çar  
qunûtek zêde li ser nivêja xwe bikin û ji  
bona serxwebûna kurdan ji rebê xwe teka  
û hevîyê bikin. Çinko rêsikên din û diyane-

## REWŞA DINYAYÊ

ŞERÊ LIBYAYÊ — Di hejmara 37an de  
me goti bû ko general Rômêl di peşberê di-  
jminekî xurt û serdest de eskerên xwe li  
çiyayên ko dikevin nivrorohelatê Dernê di-  
heşidîne û dike tê de li ber xwe bide. Rômêl  
welê ji kir, lê di wan çiyân de jî gelek ne  
ma, ji ber ko ingilîzan da pey û dirêjtî eske-  
rên Rômêl kir. Rômêl bi ingilîzan re ne kete  
şerektî mezin û ji vê derê jî kişiya û terka  
Bingaziyê ji da. Li 25ê Kanûna pêşîn ingilîz  
ketin Bingaziyê. Wer dixuye ko Rômêl dixwa-  
ze bi eskerên xwe ên mayîna ve xwe bide Tra-  
blisxerbê. Ji pêşiya vê mehê ve Rômêl di  
Egedabyayê de ye. Egedabye li ser tixûbên  
Trablisxerbê ye û par eskerên general Wêvel gi-  
haştî bûn heta vê derê.

Ordiwa Rômêl û eskerên talyanî gava  
ji ber ingilîzan dikişyan di Selûm, Berdiye û  
Helsayayê de qewetin hiştî bûn û ew qewet  
di wan deran de asê bû bûn. Wan qewetan  
birektî ordiwa ingilîzî bi xwe re dihişt.

Bi vi awayî û bi wan qewetan birektî  
peravên Libyayê jî di destê ordiwên mih-  
werê de dima. Qewetên mihwerê dixwest  
herwektî ingilîzan par di Tobriqê de kiri bû  
di Berdiyê de di erdê dijmin de bîminin û  
li riyên menzila dijmin xî û bi vi awayî bi  
qewetîna hindikî işine mezin bibînin.

Belê Tobrik heft mehan di bin miha-  
sara eleman û talyanan de ma û ne ket. Ji  
ber ko di behra spî de serdestî bi ingilîzan  
re ye. Ingilîzan eskerên Tobriqê di riya behrê  
re bi xwedi dikirin.

Lê eleman û talyanan nikari bû asêgeha  
Berdiyê mîna ingilîzan di riya behrê re  
bi xwedi bikin û jê re zad, çek û cebir-

---

tê ji miletê kurd pê ve bi tu kestî re ne  
maye û di nav miletan de ji miletê kurdî  
hêjatir û sezatir nîne.

Ez xwe, bi tenê bi miletê kurd re torin  
û bextiyar dibînim û ji Xwedê mezin serfi-  
razî û serxwebûna wî daxwaz dikim. Her hi-  
jî miletê kurd.

### ŞEX ABID

Ji famliya şex Nûredînê Bîrvîkanî

Amûde : 10-12-1941

xanê bişînin. Ingilîzan jî bê etlahî li Berdiyê dişîdand. Dawiyê li 2ê vê mehê ingilîzan Berdiyê stand û eskerên, tê de hêsir bûn. Herçî Selûm e, li 6ê mehê qewetên mîhwerê jê kişîyan û ingilîz ketin ê.

Pîştî Selûmê li Libiyayê di destê mîhwerê de bi tenê Helfayê ma bû. Li 17ê vê Kanûnê Helfayê jî teslim bû. Helfayê ehemiyetêke mezin hebû. Helfayê li ser rîya mezin, rîya ko jî tixubên Misrê diçe tixubên Trablîsê xerhê ye. Ji lewre helanî ko qewetên elemanî û talyanî tê de bûn qefleyên ingilîzî di nivroyê wê û di çolê re diçûn û dibatin. Radyowa Londrê dibêje ko di Helfayê de jî xwe zad ne ma bû; newaze av. Hêsirên ko ketine destên ingilîzan hev karî bûn jî piyan bisekinîn.

Bi vî awayî ingilîzan Libye jî dijmin paqij kir û êdî bi rabetî ew dikarin xwe bidin ordîwa Rômêl. Wer dixuye ko giraniya ordîwa Rômêl berê xwe daye Trablîsê xerhê û dikîşe. Bi tenê dimdar di Egêdabyayê de ye, şerê pêşadaren ingilîzan dike û giraniya ordîwê dihemîne.

**ŞERÊ ÛRIS** — Herwekt me di hejmara bori de gotî bû elemanên ko gehîştî bûn heta ber deriyên Moskoyê bi şûn de vedigerin. Û wer dixuye ko Hitler û fermanderên wi êdî bi hev nakin û tiştek di navbera wan de qewimiye. Hitler li 19ê Kanûna pêşîn beyanâmêk belav kir û pê da zanin ko destê serfermandarê ordîwa elemanî merşal von Brewxîç jî kar hate kişandin û Hitler bi xwe ketiye şûna wi û hûye serfermandarê ordîwa awe.

Ji zarê beyanainê xuya dikir ko Hitler û Brewxîç li ser sefera ûris, li ser domkirina wi di wextê Zivistanê de jî ne yek bûn. Disa li gora zarê beyanâmê jî Hitler bêtir Brewxîç dil kirîye ko reşma Zivistanê ordîwa elemanî direjt Moskoyê bike. Herwekt ew êriş çêbû, lê ne çû seri.

Îro plana elemanan ev e: Heta Biharê di midafehê de mayîn û di vê navê de xwe jî bo êrişê Biharê kar kirin, û çîqas jî wan hat ewçend di nizingî armancên xwe de mayîn û jê ne dûrketin.

Herçî plana ûrisan ev plan divê xerabkirina plana elemanan bit. Ji lewre ûris di her derê de direjt xetên elemanî dikin û zorê didin wan û di hin cihan de elemanan bi şûn de vedigertin. Ûrisan di hin deran de

nemaze di dora Moskoyê de jî 150 kilomêtirî bêtir pêş ve çûne û eleman bi şûn de vegeandine û bajarên Kelînin, Oskoyî, Kelûge, Nêrokominsk, Pilof, Folkof, Kozelek, Tafok û Ogorski zemt kirine.

Di qada nivro de êrişê ûrisan piştî standina Rostovê di pêşiya Tagendrovê de sekintî bû. Ûris di vê qadê de, lê di dereke di ve pêş ve çûne, xwe zer kirine nivgirava Kirimê. Bi vapor û balafirên avêtine ser bajarên Kerç û Fêodosyayê û li 30 û 31ê Kanûna hori ev her du bajar zemt kirine. Kerç li ser avtenga behra Ezovê ye, û dikeve aliyê avlengê yê roavê. Ji xwe aliyê rohelê di destê ûrisan de bû. Bi vî awayî avteng bi temamî û jî nû ve ketiye destê ûrisan.

Di vê Kanûnê de jî êrişê ûrisan pêş ve çû û li 2ê mehê ûrisan xerçereya rêhesinî Novikîrşî vegirt û pê elemanên ko li Novogrodê ne û yên ko di dora Leningradê de ne jî hev qut bûn. Li 3ê mehê ûrisan Maloyerosloviç zemt kir. Bi ketina Maloyerosloviçê Mojayesk jî diket bin xeterê. Li 4ê mehê ûrisan bajarê Voroskê jî xist destê xwe û pê 40 kilomêtir nizingî li Mojayeskê kir. Li 8ê mehê ûris gihastine heta bajarê Mişofskê; 130 Kilomêtir nivroyê Moskoyê û 38 Kilomêtir roavayê Kelûgayê.

Ûris zorê didin Fenlandiyayê jî. Ûrisan di Kereliyê de hicûmî fenlandiyan kiri be jî fenlandî li pêşiya wan sekintî û ne şikestin.

Li 10 û 11ê mehê ûrisan di qada navîn de Mosalek û Lodinovo zemt kirine. Mosalek dikeve 140 kilomêtir roavayê Smolenskê. Herçî Lodinovo 70 kilomêtir bakurê Briyanskê ye.

Li 16ê mehê ûrisan esker daxiste nivroyê Sevestopolê û bajarê Kelavayê zemt kir. Kelava 16 Kilomêtir dûrî Sevestopolê ye. Herçî ûrisên ko di Sevestopolê de ne niho ew jî dikin xeta mihaserê bişkênînin û xwe bigebînin ûrisên ko daketine erdê Kirimê.

Li 19ê mehê ûris ketine Mojayeskê. Herçî eleman in, wan jî li 20ê mehê di Kirimê de bajarê Têodesyayê bi şûn de vegeandiye.

**ŞERÊ PESIFIKÊ** — Di şerê Pestifikê de nişkegaviya japonan dom dike û japon di hemî qadan de serdest in. Lê Emêrike xwe pêk ditîne û dewletên gir û hûr dide dora xwe.

Li 22ê Kanûna bori serêkweztrê Ingilîterê Mîster Çorçil çû Weşingtonê. Bi Mîster

## KHARABO

La chanson de Kharâbo a été recueillie chez les Omeris, tribu de vigneron fixée près de Mardine; elle présente de ce fait quelques particularités dialectales que l'on reconnaîtra aisément en parcourant le texte kurde (go pour ko; mi pour min, etc.): Le poème est l'oeuvre d'une jeune femme abandonnée par son fiancé, qui a quitté le village pour aller se marier ailleurs. Elle a dû,

de son côté, épouser un de ses cousins. Elle évoque le souvenir de ses rendez-vous avec l'infidèle qu'elle aime et déteste tout à la fois. Elle le maudit, mais veut être seule à le faire, aussi couvre-t-elle de ses imprécations quiconque se permettrait d'adresser des reproches à son Kharâbo. Les sixième et septième strophes contiennent des formules de malédiction très intéressantes pour l'étude de la magie populaire kurde.

TAWÛSPARÊZ.

Çorçil re hin fermandar û pistor ji hebûn. Mirovdewletên îngilîzi û emêrikani gihane hev û li ser awayên hevkarîyê xeber dan. Li Weşingtonê konferansê hate danin. 26 dewletên ewropayî û emêrikani ketine wê konferansê. Mister Çorçil qedere mehekê li Weşingtonê ma û li 17ê vê Kanûnê vegeriya Londrê.

Dîsan li 16ê vê mehê civîneke diin li Riyodejaneroyê de çêbû. Herçî dewletên Emêrika navîn û nîvro ne ketine vê civînê.

Herçî şer, japonan li 25ê Kanûna borî Honkong zemt kirîye. Li 2ê vê Kanûnê japon ketine Menîlayê, merkeza giravên Filipînê. Lê hêj Fillpîn bi temami venegirtine; sêr tê de doin, dike.

Japon ji her derê betir zora xwe didin Melêzyayê û dikin xwe bigehinin Sengeporê. Ji aliyê din japon û îngilîz xwe di Birmanayê de jî tev didin. Çenkeyê serekê Çîna nevegirtî eskerên çîni şandine Birmanayê.

Lê şer nemaze di nivgîrava Melêzyayê de germ e. Wer dixuye ko japon di vê qadê de bi temami serdest in û îngilîz xwe didin paş û ber bi Sengeporê dikişin. Japon ji alîkî di bejê re tîn ji aliyê din esker dixistin her du milên nivgîravê û bi vi awayî dikevin paş ordîwa îngilîzi. Û balafirên japonî jî hê etlahtî Sengeporê didin ber himbeyên xwe.

Li 19ê mehê japonan qedere 70 kilonêtir nîzingî li Sengeporê kiri bûn û rîya avtenga Meleqê birî bûn. Li 20ê mehê radyowe Londrê dida zanin ko hin balafirgehên Melêzyayê ketine destê japonan û japonan jî wê ve esker derxistine Bêtîmarê 90 mil bakurê Sengeporê.

Îngilîz bi xwe dibêjin ko Sengepor kî-tîta bebran di bin xeterê de ye.

Sam 20 Kanûna Paşîn 1942. NÊREVAN

Xerabo, Xerabo, weleh û bileh, tu xerab î. Tu bi galigalê, bi gotinê çênabî.

Malê te pir e, ji canê te re edabo !

Qama te kin' e, hemberî taximê memikê mi nabo !

Şevê kanûna dirêj in, tu ji ber serê min ranabo !

Belkî debara te dibe, ehûra mi di mala bavê mi de nabo !

Xerabo, weleh, tu xerab î,

Tuê jî dinyaê, ji alemê xerabtî î.

Tu jî koma pismamê mi çêtir î.

Serê memikê mi, rebena Xwedê, minayî tiriyê Çelîkê Eliyê Remo, di çax û benga xwe de dikemilî.

Serê memikê mi, rebena Xwedê mina Qesrê Pirota, serê Mihela Meşkina avakirî.

Xerabo, dîno, havin e, xweş havin e.

Nanê cehin e û dewê tirşîn e.

Serax û binraxa min û xelkê delal ebakî şalîn e.

Heçî derdê dîla ne di be, bila nebîne !

Tu rabe, ji mi re gwîzaneke berbera bine..

Ezê serê memikê xwe hiçpîlînim, ji kala re bikim taştê, ji xorta re bikim feravîne.

Bazê dilê min rojîka rojîya sê meha digire, bila êvarê pê sitara xwe bişkênîne.

Xerabo, xerabê dînê, te mîka xwe daye bi bizînê,

Te gula xwe daye bi sosînê.

Te herê xwe daye qetlê û sêpaê zinê.

Ez û xerabê bi tenê şevê nivê şeva li zîkaka bîniya mala li hev rûniştin,

Me gilîkê xwe pev kirin û gazîndê xwe dihiştin, Kundê şkêra, wawîkê ber devê çema li halê

min û bejna zirav diponîştin,

Mirikê gorê di mezela, ê go tsal hezar û pênc sed sal miri bûn, kefenê xwe li cencûmê serê xwe gerandin, li ser qebrê xwe rûniştin, Li halê min û bejna zirav diponiştin.

Ez bi te re dost bûm, tu bi mi re dijmin bûyi. Tu li paş xanîka li min dikelistî, te derbek bi tîfîngê berda mi, ez dikuştim.

Şevê nivê şeva, te bi destê tola jina xwe girt, û ez li ber diwara dihiştim.

Xerabo, dîno, mi bihistî tu zewicî, te ji xwe re yek dixwestî.

Heke ji mi çêtir be, bila li te helal be, li wi canî, ya na, ezê tu nîfira li te nakim. tu dûrdest î.

Xwedê teala bike, Rebî, goştê canê te bihele, li hewa bîmîne komek hestî,

Tu kwîr bibî, têkevi ber vî destî.

Xerabo, dîno, tu zewicî, te yek anî, Hege ji min çêtir be, bila li te helal be, li wi canî.

Ya na, Xwedê teala bike, Rebi, li canê te keve derdek, tu nebîni tu dermanî.

Ezê serê sibehê rabim, bi destê te bigirim, te bikişînim wi cebanî.

Xerabo, Xerabo! Xwedê teala bike, Rebî, heçî ji xerabê min re bêje: "Tu xerabo", Bila karî û warîna zarokê nêr tu carê di mala wan de nabo!

Bila sed olçek genimê sor li binê beriya Mêrdînê biçîne, li şwinê bila qereziwana reş rabo!

Êmayî, bila kuliyê par û pêrar lê rabo! Bila salekê bîne ser hênderê, gêre bike, û bidêre, ew ji jê re bi ka bo, Kulmek zadê ji wan re safî nabo!

Heçî ji Xerabê mi re bêje: "Tu baş î, tu pir qenc î" Xwedê teala bike, Rebî, kulmek garisê li piştê mala biçîne,

Lî şwinê sed olçek genimê şor hilîne; Bi ofara binî qîza şexkî, axakî ji xwe re bîne; Zîkatê malê vê salê bide min û bazê dîla, emê pê daweta xwe li dar xînin.

Min di bazê dîla barê xwe bar dike, berê xwe dide aşê mala Hacî Şemdin e.

Tu li wê newalê timam bigere, tu li heft seriya bigere, tu çavkî di wan de nabîne.

Mî di mirata çapê li arvanê bazê dilê min dixîne,

Heft çap û nîva ji arvanê bazê dilê mi hiltîne, Daweta min û Xerabê bi tenê sala vê salê nêv cî li dar dinîne.

Xerabê mi xeyidî ji gundiya, ji maliya.

Mî di da ser rêka Omeriya, Minê dîgo: "Ezê rabim, ban kim heval û hogir û hemşeriya,

Bila herin xelkê delal vegerînin bi kêf û eşq û laqirdiya

Bila Xwedê teala biqedîne miradê miradxwaza û dilketiya,

Bila miradê min û Xerabê mi bîmîne heya koçerê me vegerin ji deşta Mûşê, rûnin akinciya.

Xerabo, dîno, xerabê xelkê, Te bejin ziravo, bi terha benikê, Dilkê min û bejna zirav di hev hebû çî kula gô ketiye mala xelkê.

Xerabo, dîno, mala bavê keleşgewra mi li wê çivê, li wê cwcê, li wê zîkakê, li wê fittekê Te meşqazê, meşqetîkê, meşordekê, Heçiyê xortê go bi çavê xwe di û bi dilê xwe zewicî, ewê sê roj û sê şevê xwe kuştine ji dinyayê, ji qoce felekê.

Xerabo, dîno bila li te be, li wi dîli, Bila li mala hezar û heft sed bavê te be, li wê sewdanê, li wi aqîli,

Çewa te dev ji mi, kihêla serê tewla berda, tuê li bergîla şîxulê Rişmîliya û Qîbaliya dihesilî.

Mî ji te re ne go: "Di meha biharê, bergîla li şwîna kihêla metewilî!"

Li xûşka mezin binêr, dû re xûşka biçûk ji xwe re werî.

Lawîko, dîno, ezê çî bikim? Şala vê salê, ez bi mêr im, tu bi jin î.

Kul û kederê te gelek in, şak berdane ser vî dîli.

Kul û kedera ji bîra nakim, heya axê meze lan, kêlê di kevirî.

Kul û kederê te pir bûne, tucar dernakevin ji vî dîli.

Xelkê digô : " Keleşgewra te esmer e û genim-  
şwin e."

Bi xelkê tehl e û bi nevs a mi şerîn e.

Tu rabe, serê xwe di kulek û şibakê qesrê  
re biderxtne,

Bila sira haê Qerejdaşê li ser şebiskê te ê  
şê xîne,

Bi ser henarkê rûkê rastê te veşerîne.

Ez dikim herim welatê xerib û xurbetê, tu  
kanî ramisaneke bi mi de, ji boşaza qirikê,  
ji xanûmanê ger enê,

Bila kederê ramisanê te keçikê li welatê xer-  
rib û xurbetê di dilê mi de nemîne.

Wexta Ezraîl dakeve rûhê mi bistîne,

Wê gavê, bila diwanzde mikweta zêdi heqê  
mi li mi xîne,

Bila heqê ramisanê keleşgewra mi ji mi hilînel

Xerabo, Xerabo, Xerabo ! Wey li minê, wey  
li minê, wey li minê !

Çewa îro hatiye cewaba nexêr e,

Ji mi keçikê re.

Digo : " Delalê dilê te li welatê xerib û xur-  
betê nexweş e, nexweşekî li ber mirinê.

Ezê ji komê pismama ne wêrim herim sereki  
bidimê.

Xwezî ji xêra Xwedê re, ezê bîstekekê li te-  
nişt a Xerabê xwe rûniştama, meyê li hevûdu  
helal bikira heqê ramisana, malîfeta derdê  
dilketinê !

Gell gundî û malino, car û cirano, hûnê bi  
qedrê Xwedê kin, mala Xerabê mi ziyareteke  
pir evzel e, hûnê bi destê min bigirin û mi  
bibinê.

Çi darika di bexçê mala bavê mi de bû, ji  
gula, ji beybûna xemilandî,  
Xerabê mi rahiştî hejki, lîxisti, timam  
diweşandî.

Bê lome be, çewa dostikek mero gelik î he-  
dew hebe,

Li çiyaki mîna çiyayê Omeriya be,

Mero dev jê berde, dil pêkeve erebekê, li  
binê beriya jêrî, û lîvdeqandî !

Xerabo, wile, tu xerabo,

Malê te pir e, ji canê te re edabo !

Tu bi şexkî diwazde elmi bo,

Sed wêrdê te di bêrfika mi de bo

Qenyatiya dilê mi bi te nabo !

## TRADUCTION

Kharâbo, Kharâbo, tu es vraiment méchant.  
Tu ne te laisses pas toucher par mes paroles.  
Tes biens sont nombreux, puissent-ils cau-  
ser ton tourment !

Tu es petit, tu n'arrives même pas à la parure  
d'argent qui couvre mes seins.

Les nuits de Décembre et de Janvier sont  
longues, ne quitte pas mon chevet.

Peut-être parviens-tu encore à vivre. Chez  
mon père, je ne le puis !

Kharâbo, tu es vraiment méchant.

Tu es pire que ce monde (maudit),

Et pourtant, tu vaux mieux que mes cousins !

La pointe de mes seins—pauvrette de Dieu !—

est pareille aux raisins de Tchéléké Aliyê

Ramo (1), lorsqu'ils sont bien mûrs sur le cep.

La pointe de mes seins—pauvrette de Dieu !—

est pareille au Château des Moines, qui do-  
mine Mehela Mechkina. (2)

Kharâbo, insensé, c'est l'été, le bel été !

Nous avons du pain d'orge, du petit-lait aigre;

Nous avons, mon bien-aimé et moi, pour

couverture et pour dessous de lit (3), un

mantéau de soie.

Puisse qui ne connaît le mal des cœurs, l'igno-  
rer pour toujours :

Va me chercher un rasoir de barbier,

Je couperai la pointe de mes seins, j'en ferai

le déjeuner des vieillards, le goûter des garçons.

Le faucon de mon cœur observe trois mois

d'abstinence en plus de Ramadan, qu'il en

mange le soir, pour rompre son jeûne !

Kharâbo, Kharâbo insensé, tu as échangé ta

brebis pour une chèvre,

Ta rose pour un lis. (4)

Tu te précipites vers la mort et le gibet.

Avec mon Kharâbo solitaire, à minuit, j'étais

assise dans la rue, au pied des maisons;

Nous échangeions nos plaintes, laissant tout

reproche.

Les chouettes, perchées sur les pierrailles, les

chacals au bord des rivières baissaient triste-

ment la tête, pleins de pitié pour nous.

Les morts du tombeau, enterrés depuis quinze cents ans avaient enroulé leurs liçeuils autour de leur crâne, et s'étaient accroupis sur leurs sépulcres.

Ils baissaient tristement la tête, pleins de pitié pour moi et pour mon ami svelte.

Je t'aimais, tu me détestais comme un ennemi.

Tu m'as guettée, caché derrière les maisons, pour me lâcher un coup de fusil. Tu m'as tuée. Puis, prenant ta maudite femme par la main, tu m'as laissée seule, en pleine nuit.

Kharâbo, insensé, j'ai appris que tu t'es marié, que tu as demandé la main d'une fille. Si elle vaut mieux que moi, que Dieu consente à votre union. Sinon, je ne te maudirai pas davantage : tu m'es inaccessible !

Mais, fasse le Seigneur que ton corps se dissolve, et qu'il ne reste de toi qu'un tas d'ossements exposés en plein vent !

Puisse-tu devenir aveugle et tomber à ma merci !

Kharâbo, insensé, j'ai appris que tu t'es marié, que tu as épousé une fille.

Si elle vaut mieux que moi, que Dieu consente à votre union !

Sinon, fasse le Seigneur que ton corps soit atteint d'un mal sans remède !

Je me lèverai de bon matin pour te trainer par la main jusqu'au cimetière.

Qui dira à mon Kharâbo : " Tu es méchant ! ", Fasse le Seigneur que jamais sa maison ne retentisse aux cris des enfants mâles;

Qu'il sème cent oltchaks (5) de blé rouge dans la basse plaine de Mardine, qu'il n'en pousse que de l'ivraie,

Et que toutes les sauterelles d'antan s'attaquent au reste;

Qu'il mette durant un an sa récolte sur l'aire, qu'il batte, qu'il vannie, et n'en tire que de la paille,

Sans une poignée de grain propre !

Mais, qui dira à mon Kharâbo : " Tu es bon. tu es brave ",

Fasse le Seigneur qu'il sème une poignée de maïs derrière sa maison,

Et qu'il en pousse cent oltchaks de blé rouge; Que les grains restant sur l'aire lui suffisent pour demander en mariage la fille d'un chaykh ou d'un agha,

Et qu'il me donne, ainsi qu'au faucon de mon coeur, l'aumône de l'année (6) ! nous en aurons assez pour notre noce.

J'ai vu le faucon de mon coeur charger ses bêtes et aller au moulin des Hadji Chamdin.

— Explore la vallée d'un bout à l'autre, avec ses sept sommets, tu n'y trouveras pas une seule source (7) —

J'ai vu le meunier mesurer la farine du faucon de mon coeur

Et en prélever sept boisseaux et demi (8).

Mes noces avec Kharâbo le solitaire en resteront là pour cette année.

Mon Kharâbo s'est brouillé avec les gens du village et avec ses proches.

Je l'ai vu s'en aller par le chemin des Omeris.

Je me suis dit : " Je vais appeler les amis et les voisins,

Qu'ils partent chercher mon bien-aimé à grand liesse.

Que Dieu exauce les vœux des amoureux,

Même si la réalisation des miens et de ceux de mon Kharâbo doit attendre jusqu'au moment où nos nomades reviendront de la plaine de Mouch, pour se fixer au sol (9).

Kharâbo insensé et cruel,

Kharâbo à la taille fine comme une jeune pousse de lentisque,

Mon coeur et celui de mon svelte bien-aimé endurent à eux deux toutes les peines du monde.

— La maison du père de ma belle est au tournant de cette rue.

O toi dont ta démarche est gracieuse comme celle des oies et des canards sauvages, et des perdrix du désert,

Quiconque se marie selon le désir de son coeur, après avoir contemplé celle qu'il aime, soustrait trois jours et trois nuits au monde, au destin.

— Kharâbo, insensé, Malheur à toi, malheur à ton coeur (10);



Malheur à la famille de tes dix-sept cente ancêtres, malheur à ton amour, malheur à ta raison !

Moi, la jument de race que l'on attache au fond de l'écurie, tu m'as délaissée pour cette rosse des Rechmela et des Qebaliya (11). Ne t'avais-je pas dit qu'au printemps, il ne faut pas attacher les bidets à la place des chevaux pur sang ?

Regarde l'ainée, épouse ensuite la cadette (12). Fol ami, que faire ? Cette année, j'ai un mari, et toi, une femme !

Tu me causes des peines nombreuses, qui me déchirent le cœur.

Je ne pourrai les oublier, jusqu'au (jour où je dormirai dans) la terre du tombeau, (sous) la stèle de pierre.

— Les gens disaient : " Tu belle est brune et noireude. "

Amère aux autres, elle m'est douce.

Mets la tête à la lucarne du château,

Laisse la brise du Harabdagh frôler tes boucles blondes et les rabattre sur ta joue droite.

Je vais partir au loin, laisse-moi prendre un baiser au défilé de ta gorge, à ton cou pareil à celui des femmes de ta famille !

O jeune fille, fais qu'une fois en terre étrangère, je ne garde pas au cœur le regret de n'avoir pu l'embrasser.

Et, quand Azrail descendra du ciel, pour chercher mon âme,

Qu'il me donne douze coups de maillet en sus de mon compte (13),

Pour me faire payer le baiser de ma belle !

— Kharâbo, Kharâbo, Kharâbo, malheur à moi, malheur à moi, malheur à moi !

La mauvaïse nouvelle vient de me parvenir, Pauvre fille !

On m'a dit : " Celui que ton cœur aime est malade au loin, malade à mourir.

Je n'ose aller le voir par crainte de mes cousins. Que ne puis-je, par la grâce de Dieu m'asseoir un instant auprès de mon Kharâbo.

Nous nous acquitterions de notre dû de baisers, ce remède au mal d'amour !

Villageois, amis, voisins, pour l'amour de Dieu, la maison de mon Kharâbo est un sanc-

tuaire très saint, il faut me prendre par la main et m'y conduire.

Les arbres du jardin de mon père étaient tous parés de fleurs et de boutons,

Mon Kharâbo a pris une perche et les a gaulés. Je ne lui reproche rien, puisque, quand on a une si belle amie,

Dans une montagne comme celle des Omeris,

On la laisse pour s'amouracher d'une bédouine de la basse plaine, aux lèvres tatouées !

Kharâbo, tu es vraiment méchant,

Tu possèdes des biens nombreux, puissent-ils causer ton tourment !

Si tu étais un chaykh instruit des douze sciences,

Et si je portais dans ma poche cent de tes charmes,

Mon cœur n'aurait pas davantage confiance en toi.

## NOTES

(1) Village omeri.

(2) Quartier de Mardine.

(3) Binrax : couverture ou tapis que l'on place entre le sol et le matelas sur lequel on dort.

(4) C'est à dire : tu m'as abandonnée pour une autre qui ne me vaut pas.

(5) Un olchak vaut environ 60 kgs.

(6) L'aumone rituelle que les Musulmans doivent verser chaque année (zekat).

(7) Ce vers doit sans doute s'interpréter comme une malédiction lancée contre le meunier : son moulin ne peut fonctionner sans eau.

(8) Les meuniers kurdes sont payés en nature.

(9) Les Omeris sont de très anciens sédentaires, aussi est-il douteux que les nomades auxquels il est fait allusion ici fassent partie du groupement. Il s'agit, plus vraisemblablement de fractions étrangères venant hiverner sur le territoire de la tribu.

(10) C'est à dire : malheur à toi qui en as aimé une autre.

(11) Les Rechmela et les Qebaliya sont les habitants de deux villages des environs de Mardine. Ils sont assez méprisés par leurs voisins.

(12) Kharâbo n'est sans doute pas content de son mariage : il aurait dû suivre le conseil donné par ce proverbe, et bien examiner la soeur aînée, pour voir ce que deviendrait plus tard la cadette, qu'il se proposait d'épouser.

(13) Suivant la croyance musulmane, l'ange qui descend au tombeau chercher l'âme du défunt frappe ce dernier pour lui faire avouer ses fautes.





## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdi C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupehine Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Bîyîşa Pêxember. Bi Kurdiya dumill, bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikitîn
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdi Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10— Xwendina Kurdi Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11— Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12— Dersên Şerîetê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13— Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14— Proverbes Kurdes. Medhelokên Kurdi Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-Xan Paris - 1937
- 15— Le roi du Kurdistan. Qralê Kurdistanê. Emir K. A. Bedir-Xan û Adolphe de Falgerolle. Paris - 1937
- 6— Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdistanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel Berlin - 1937
- 17— Der Schnee Des Lichtes. Berfa Ronahiye Şîhrên Kurdi Prinz. K. A. Bedir-Xan û Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Sall	500	Qirûşên Sûri
Şeşmeht	300	Qirûşên Sûri
Sêmeht	200	Qirûşên Sûri

Xwedi û gerîndeyê berpirsiyar: Mîr Celadet  
Ali Bedir-Xan. Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aali  
Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 10  
HEJMAR 39  
-----  
YEKŞEMB  
15 ŞIBAT 1942

# HAWAR

ANNEE 10  
NUMERO 39  
-----  
DIMANCHE  
15 FEVRIER 1942

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TEXISTIYÊN VÊ HEJMARE

Tefsira Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Çenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Diwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Hêviya me	Salih Bamernî
Sengepor	Hesenê Mistê
Hindik Rindik	Xeberguhêz
Gûneh	Qedrican
Çiyayên Silvan	Mihemed Cemil paşa
Serxwebûna mûriyan	Cegerxwîn
Rewşa dinyayê	Nêrevan



ŞAM—1942  
ÇAPXANA SEBATE



## TEFSİRA QURANÊ

268 — Iblîs we bi belingaziyê ditirsîne û şîretên çavtengiyê li we dike. Xuda bi efiw û kerema xwe best dide we, Xuda zana ye; kerem û comerdiya Xwedê mezin e.

269 — Xwedê ji kîjkî re dixwaze ilm û marifetê dide û Xuda bi vê dayinê xeyrekê mezin digehine wî. Lê bi tenê mirovên bîrewer û eqilmend qedr û bihayê vî ilmi dizanin û pê emel dikin.

270 — Xuda tiştên ko we ji malê xwe di riya wî de daye an nezra ko we kiriye dizane; kes nikare zaliman ji ezabî bifilitîne.

271 — Heke hon sedeqa xwe aşikare didin çê ye, lê heke hon ji belengazan re bi dizî didin hêj çêtir e.

Sedeqa we hin gunehên we hiltîne. Xwedê tiştên ko hon didin an dikin dizane.

272 — Pêxemberê min.... Anina mirovan ser riya rastiye ne wacibê te ye. Xuda her kesê ko dixwaze digihîne rastiye. Tistên ko hon ji malê xwe didin, xeyra wê ji we re ye.

Hon xeyra her tiştê ko seba xwestina rizaya Xwedê didin bi zêdahî wê bibînin û tu neheqî li we naye kirin.

273 — Arîkariya hewcedaran bikin yên ko di riya Xuda de, di şer û kuştinê de ne û ni karin dest bi ticaretê bikin, ên nezan wan dewlemend dihesibînin,

ji ber ko ew belengaziya xwe pêş xelkê na kin, lêbelê Pêxemberê min, ji rengê rûyên wan tu wan xweş nas diki. Ew bi xwestina sedeqeyê xelkê aciz na kin.

Gell camêrino.... heke hon arikariya wan dikin Xuda pê dizane. Xuda dizane we ji kê re da û ji bona çî da.

274 — Yên ko ji malê xwe, di riya Xwedê da şev û roj, bi dizî an bi aşikare didin xeyra Xwedê digehine wan, di roja piştawiyê de ji wan re tirsane ezêb nîne û ew xemgir nabin.

275 — Yên ko faizê distînin, halê di wan di roja piştawiyê de gava ji gora xwe radibin, mîna wan in ko Iblîs destê xwe da ye wan û ew gêj, û din bûne.

Ji ber ko wan got: Kirin û firotin mîna standina faizê ye.

Ne were ye... Xuda kirin û firotin helal lê standina faizê heram kiriye. Lê yê ko bi emrê Xwedê bîrewer dihe û edî dest ji standina faizê dikiştne, gunehê wî tê efiw kirin û faizên ko wî berî emrê Xwedê standî bû, jê naye pirs kirin.

Lê yên ko piştî emrê Xwedê ji nû ve faizê distînin wê bikevin agirî û tê de wê her biminin.

276 — Xuda keda faizê xira dike û malê ko jê sedeqe tê dayin digihîne zêdahiyê. Xuda ji kafir û gunehkaran hez nake.

277 — Yên ko bawermend bûne û tiştine qenc pêk anîne, nimêja xwê kirine û zekatê dane sewaba wan li nik Xuda heyê.

Xuda wan digihine sewabê.

Ji bo wan di roja piştawiyê de tirs nine û ew xemdar na bin.

278 — Geli bawermendino .... Ji Xuda bitirsin û dev ji standina faizên mayîn berdin .... heke we baweriya xwe bi Xwedê aniye.

279 — Heke we dev ji standina faizê bernedaye, bizanin ko hon bi Xuda û bi pêxemberê wî di şerî de ne. Lê heke hon tobedar dibin rêsmalê we ji we re ye. Zilmê ne kin da ko zilm ne gihe we

280 — Heke deyndarê we di tengasiyê de ye, li hêviya destfiraahiya wî biminin û eger hon di heqê xwe diborin ji we re hêj bi xêrtir e. Heke we bizaniya ....

281 — Ji wê rojê bitirsin ko honê bigehin Xudayê xwe. Tê de her kes li gora emelê xwe li ser heq û edaletê berpirsiyar dibin û tu neheqî li we na ye kirin.

282 — Geli bawermendino ... Gava hon deyneki dikin û ji bo vegerandina wî deynî wexteki datinin, divê hon wî binivîstin, bila katibekî bi çî awayî hon li ser vegerandina wî deynî li hev hatine li gora wê binivise.

Bila yê ko dinivise, her weki Xuda jê re da elimandin rast binivise û xwe jî vê nivisandinê ne de paş.

Deyndar divê ji katib re teqrir bike û ji Xuda bitirse ji deynê xwe lişteki kê m ne ke.

Lê heke deyndar kêmaqil, lal an sefih e û nikare teqrir bike, bila weliyê wî ji bo wî li gora rastiye teqrir bike.

Di wî îşî de banî şahidan jî bikin. Şahid divê dido û mêr bin, heke dî mêr peyda na bin bila mêrek û du jin bin. Jin divê dido bin da ko heke yekê jî wan jî bîr dike şahida din bikare arikariya wê bike.

## HEDISÊN

### CENABÊ PÊXEMBER

REHMET Û SILAVA XWEDÊ LÊ BE

456 — Hest mirov hene ko her kes ji wan bigere jî, Xwedê dev ji wan bernade: yê ko bi dileki pak nimeja xwe dike, yê ko jineke spehî û dewlemend jê hez bike jî, ji tîrsa Xwedê pê re zinayê na ke, yê ko bi dileki pak û rast ji hevalê xwe hez dike, yê ko gava qisûra xelkê dibine çavê xwe digire, yê ko di dema şerî de tim li pêşiyê ye, yê ko qisûr û gunehên xwe her tîne ber çavê xwe û ji bona xelasiya nefsê xwe dixebite; yê ko xêrxwazi xelkê ye û ariya wan dike.

Gava ji bo şehdetiyê banî şahidan dikin bila ew xwe jê ne din paş.

Deyn piçûk be mezin be tirali û kêmgirtiniyê me kin, her dest bi nivisandina deynî û dema vegerandina wî bikin.

Emrê Xwedê jî adet û daxwazên we zêdelir li gora edaletê ye û nivisandina deynî li nik Xuda hêja ye, ji ber ko seneda we a deynî gotina şahidan dişidine û îşê we pêk ditîne û we jî şik û şibheyê diparêze; meger ko dan û standina we bî malhazirî çêdibe; vê gavê ne nivisandina şenedê jî we re ne tu guneh e.

Her hal ko firset kete destê we di dan û standinê de her banî şahidan bikin. Bila ji katib û şahidan re tu zerer ne gihe; divê ew îşê xwe li gora rasti û edaletê pêk binin û hon jî bi wan re li gora rasti û edaletê himeşin.

Ko zererê we giha katib û şahidan, hon gunehkar dibin.

Ji Xuda bitirsin, hon dibinin ko Xwedê we hîni zaninê dike.

Xwedê her liştî dizane.

Ji bona Tefsîra Quranê K.K. û li hejmaern 27, 28, 9, 2 30, 31, 32, 33, 34, 35, 36, 37 û 38 an fedkirin.

457 — Ne pir bikin, ne hindik bikin,  
bi cau ù bèn bikin.

458 — Yè ko li dinyayé digere ù bîrbira  
zanina dinyayé dibe, mina mirovek e ko roji  
digire.

459 — Mirovèn ko ji bona debara feqir  
ù belengaza dixebitin, mina mirovèn ko rojèn  
xwe bi girtina rojiyè ù şevèn xwe bi nime-  
jè diborin an riya Xwedè da şer dikin qedr-  
giran in.

460 — Mirovè xirabtır ew e ko zana ye  
ù neçè ye.

461 — Comerdi darek ji bihuştè ye ko  
şax ù guliyeñ xwe ber ra erdè daye; yè ko  
destè xwe davèje guliyeñ wè darè ù comerdi-  
yè dike, cihè wi bihuşt e; ù çavtengi darek  
ji dojhè ye ù şax ù guliyeñ wè li erdè xwar  
ù marà bûne, yè ko destè xwe davèje guliyeñ  
wè darè ù çavtengi ù serberjèriyè dike mè-  
vanè dojhè ye.

462 — Giran bin, giran bin, xulqîreh ù  
baldirej bin, Xwedè ji giran ù dilbirelmiyè  
hez dike, li xwe me kin lez.

463 — Mirov bi xulqîrehiyè digelhe mi-  
radè xwe; bi ecelè jè mehrûn dimîne.

464 — Mirovèn xirabtır ew in ko ji  
malbateke dewlemend in, her tiştè wan zeliş  
ù cak e; paşi radibin henekè xwe bi xelkè  
dikin ù feqir ù belengaza kêmi xwe dibinin.

465 — Mirovè xirab ew e ko zar ù zè-  
çen xwe di tengiyè de dihéle.

466 — Mirovè ko xelk ji dest ù zimanè  
wî ditirsin peyayekî xirab e.

467 — Ji bona mirova du belayèn me-  
zin hene; tirs ù çavtengi.

468 — Ibadet ù qenciya ko ji bona xa-  
pandina xelkè tête kirin mişriki ye.

469 — Mirov pir dibin lê di hejkirina  
mal ù saxiyè de, dilè wan her ciwan dimîne.

470 — Miriyè deydar di gora xwe de  
girèdayi ye, ko deynè wî hate dayin serbest  
dibe.

471 — Sedeqa ko bi dizî tête dayin xwe-  
diyè xwe ji xezeba Xwedè diparèze.

472 — Gava nimèja xwe dikin sola xwe  
ji piyè xwe me kin, me bin mina cuhiya.

473 — Xewa sibelè dibe manî rizqè we.

474 — Mirov bindestiya bavè xwe bike  
qey bindestiya Xwedè kiriye, lê rabûn li ber  
Xwedè asèbûn e.

## DÎWANA MELE

— 13 —

Lew seker cewlan didet hayè sehayè rast ù çep  
Sosin ù siubil bi mestî tèn semayè rast ù çep  
Da ji nuhraba du nûnan secde bit eswed hecer  
Dil bi mîzan mahî nû ebrû nimayî rast ù çep  
Dil ji biskan şifilîn nû ser dida xala siyah (1)  
Şehperi zilfa şepal wî dalè daè rast ù çep  
Aleiné wêrani zilfên te ji rengè enberè  
Çerx ù perwazè didin carek li bayi rast ù çep  
Xencer ù tîr ù teber barîne şibih berq ù birûsk  
Misriyan lanîh ji elnasan didaî rast ù çep  
Teblik ù eqd ù şerab ù nitrik ù berk ù wereq  
Her bi lerz ù cezbeyèn yaqût ù taî rast ù çep  
Bişkoyèn benda girèbanè ji rengè kewkeban  
Berq ù tîr ù şîr ji xurşidè vedayè rast ù çep  
Kewkeb ù qewsi quzeh lûlû (2) li benda heyderî  
Tèn tewafa zilf ù xalèn dilribayè rast ù çep  
Dil dixûnit zilf ù xalan dêm ù balayèn ji nûn (3)  
Her bi qanûn mijdè da xeybè ji nayè rast ù çep  
Zengiyân qewsên vebestîn pêşberè coça hebes

475 — Xwarina yekî best didiwa ye;  
xwarina didiwa hesî çara ye, ù a çara best  
heşta ye.

476 — Xwarina comerdeki şifa ù der-  
man e, a çavtengeki derd ù bela ye.

477 — Heke mezîn ù zana şirela li xel-  
kè dikin heq ù rast e, heke nezan wî isî  
dikin, isè bê rê ù durûtiyè dikin.

478 — Barè xelkè sivik bilkin, giran me  
kin, nav di wan bidin, xeyreta wan meş-  
kinînin.

479 — Xwedè dev ji xelkè bêbext ù  
tevløkè berdide ù li wan na ye rehniè.

480 — Xwedè pişt ù qiwetè dide miro-  
vèn ko digehin hev ù pev re dixebitin.

481 — Xwedè ji wan xebatkera hez di-  
ke yèn ko bi dil ù can dixebitin.

482 — Wext hene ko mirov tê de sebrè  
bidè xwe mina agir di mista xwe de bigire  
giran e.

483 — Tirs we ji belayè na parèze.

484 — Bawermend bêhextiyè na kin;  
tu kest na xapînin, hîlebaziye li kest na kin, li  
wada xwe na qulipin ù li pê wada xwe  
derin.

485 — Destè xwe bê rê ina vèjin malè  
xelkè.

486 — Mirovè ko mèvana na hewine  
bêker e.



## HËVIYA ME

Ax û afêt me dijwar in;  
Brin kûr in, sed hezar in;  
Xosya nre welat û war in;  
Hemi la dipîşk û mar in;  
Welat bê te em ne minin!

Bihušta me kurdistan e;  
Şêrê mezin Kamiran e;  
Pilingê lat û gelyan e;  
Serdarê hemî miran e;  
Bo ditna te em yêt din in!

Kurdistanê . tu ya şeng î  
Hemî dema ya bê deng î

Da birestin yek bi yek çûn ber liwayê rast û çep  
Çingêçinga bişkowan awaz û dengê zêrgowan  
Sed melaik gul didin ber vê newayê rast û çep  
Lew ji eşqa wî dinalin bazin û berk û wereq  
Cezheya dil min ji remza wan gihayê rast û çep  
Zihre û eqda Sireyayê ji şerqê keş-sifin  
Leyletilqedrê ji mekreb perde daye rast û çep  
Zihrerengê mah û xurşidê ji bala wî nima  
Lew du kewkeb çûne vê ra istîwayê rast û çep  
Bête eywanê ji xelwê hûriya qudsî sirîst  
Sed hezaran rûhi qudsî tén liqayî rast û çep  
Ma melayî ez lebi leilabi heywan bit nesîb  
Qudsiyan raqirtine destê diayê rast û çep.

— 14 —

Nêrgîzên şeng di inest in çep û rast  
Saqiyan cam di dest in çep û rast  
Rast û çep tene (1) ceger sine kulab  
Ererên şeng di mest in (2) çep û rast  
Tuxl ala ko xuya bin ji ecem  
Ereban tîp şikestin çep û rast  
Pir bi şerqê û seher westayin  
Hindiyên rojperest in çep û rast  
Qeyserê rûm li serhadi fîreng  
Top û zencîr vebestî çep û rast  
Her du destên xwe hemalî şevêkê  
Me ji bo yar dixwestin çep û rast  
Li Melê sirperiya hûri - sîfat  
Sed melek dest bi dest in çep û rast

### FERQËN NIVIŞTON

— 12 —

(1) Dil ji bîskan fîlîlin nû fer dida xala  
siyeh. (2) lûlû û benda heyderî. (3) ji nûr.

— 14 —

(1) dane. (2) dibestin.

Şêrê mezin heta kengi?  
Birin dijwar in, xûn pengî  
Hemî gava b'toz û, şîn in.

Gula mezin ji çakiya;  
Biji, biji; mirê çiya!  
Tu baran î, em in giya  
Nê neyaran welat kiya  
Heta kengî dê ho minin!

Celadet beg li gel te da  
Roj in, l'nav esmanê me da  
Pişt we dinê kesek ne da  
Hindav hemî li bin we da  
Paşt we, me ne vêt rûnin.

Hin in hîvya Kurdistanê  
Roj in radikin taristanê  
Bihar in, diben zivistanê  
Ewr in jor da den baranê  
Gî divin emê wet binin.

Em sotiyê ditna we ne,  
Kuştîyê viyana (1) wey ne  
Tu her ser î, em her pêy ne  
Xudanê mey hindi hey ne  
Bê serbestî em na rûnin.

SALIH BAMERNI

(1) viyan - hevîn.

## SENCEPOR

Di şêrê Pesifikê de japonan piştî ko  
li wargehên emêrikanî dane û stola emêrikanî  
ji bo midekl ji riya xwe bi dûr xistine, zora  
xwe, nemaze dane Senceporê û di Melêziya-  
yê û di riya behrê re dirêjî wê kirine. Sen-  
cepor jî bi her awayî hêja ye û jê re kilîta  
behran dibêjin.

Sencepor giravek e, û dikeve nivroyê  
Melêziyayê û li her pozê vê nivgiravê û li  
bakurê girava Simatrayê ye. Simatre jî gira-  
vek jî giravên Hindistana holendî ye.

Girava Senceporê 44 kilomêtr dirêj û  
22 kilomêtr pehin e. Ev girava hûr-lê hêja  
û biqîmet jî Londrê, jî payitextê Inglîstanê  
13000 milên behrî dûr e. Ji Senceporê heta

Loudrè ù li ser riyèn Behra hindî ù behrèn sor ù spi de sê kiltèn din hene : Babelmendeb, Siwêş, Cebeltariq. Ev her sê kilit ji di destê Ingiliterê de ne

Di girava Sengeporê de 500000 çini, 100000 melêzi ù qederê 10000 ewropayî rûdinin. Me ev hejmar ji statistikeke kevin girtine. Dibêjin ko nifûsa giravê fro di ser milyonêki re ye. Mixdarê ewropayîyan yanî ingiliz ù peyayên wan, bivê nevé, di wextê şer de bêtir dibin. Bi wan re wek hindî ù ewstralîyan, milletine din jî ù bi hênceta eskeriyê têne giravê.

Ingilîzan jî bo asêkirina Sengeporê gelek pere dane der ù jî vê giravê keleheke nestandbar aninêpê. Xebata asêkirina giravê he- ta 14ê Sibata sala 1938 an dom kiriye ù 600 milyon freng lê çûye.

Ji birc ù barû, şargehên top ù mitral- yozan pê ve, di giravê de jî bo zad ù cebirxane ù ardiwên avin depoyine zêrzemîni hatine çêkirin. Di wan depoyan de milyonêk ton benzîn dikare bête veşartin. Tonek benzîn 50 teneke ne. Li gora vi hisabi mixdarê benzîna ko di wan depoyan diçe 50 milyon teneke ne.

Di dora Sengeporê de giravine hûr wek Bolan ù Tikang hene. Ingilîzan ew girav jî asê kirine ù bilindcibên wan topine giran ù her textlit hesincawên cengê existine.

Balafirgeheke giravê heye; dibêjin ko di dinyayê de jê meztir ù spehîtir tu balafirgeh nîne.

Di bendera Sengeporê de gir ù hûr, jî bo her textlit vaporen barkêş ù cenkeştiyan tersaneyin hene. Ew vapor heke xesarzede bûne di wan terşanan de tamir dibin ù jî nû ve bi kêr tèn.

Pesarekeke (1) Sengeporê heye ko bi tenê jî bo anîna rikin, dep ù stûnên wê ên hesinî 38 milyon freng hatiye serf kirin. Li ser pesarekê qederê 60000 peya cih dibin.

#### HESENÊ MISTÊ

(1) Cibê ko vapor lê pal didin ù barê xwe pê dadikin ù rewingiyên xwe lê peya dikin.



## HINDIK RINDIK

SER Û BERAZ — Ma çi îşê berazan di şeri de heye. Heta niho herçi misilman in ew dikuştin ù jî bela wan xelas dibûn. Herçi filehan ew dikuştin ù goştê wan dixwar. Lê di vi şerê xedar ù bêman de beraz bi kêri mirovan tèn ù bi wan re têne kuştin.

Herweki şerevanî li behrê torpîl direşinin ù gava vapor li wan dikevin ew diteqin ù pê vapor berhewa dibin welê jî ù di şerê bejê de jî erdê torpîl dikin ù gava eskeran erebeyên mitorkirî di wan erdan re derbas dibin ew torpîl diteqin ù xesarine mezin digihin esker ù ereban. Ji lewre gava esker dikevin erdê dijmin keriyek berez didin pêşiya xwe ù bi vi awayî beraz 'pê li torpîlan dikin wan diteqînin ù li şûna mirovan ew dimirin.

TEVNEPIRK — Belê di vi şeri de tevna pîrê jî bi kêr têt. Ew tevna ko kebaniyên malê jê aciz in ù hero jî qucukîten diwarên xwe rêş dikin ù tavêjin zibilgehê. Di cenkeştî ù balafirvan de jî bo ditîna armancê ù lê nişangîrtinê dûrebin ù teleskopîn hene. Ji wan aletan re tayine gelek zirav ù li gora wê ziraviyê xurtî jî divêt. Wer dixuye ko di vê ziraviyê de jî tayên tevnepirkê xurtir tu ta nînin. Ji lewre van tevnan didin hev ù jî wan tayan dûrebin ù teleskopê çêdikin.

GUR Û ŞÛR — Îsal di her derên dinyayê de sermane xurt çêbûne ù jî adetê derberf bariye. Zivistan li Bîrxaristanê jî xurt bû, gund ù bajar jî hev qut bûn ù di bin berfê de man; gurên birçi bi keriyên daketin dora avabiyên. Zabitêki birxarî li dora gundekî de rasti kerikî gur hatiye. Guran dirêji wt kir. Bi zahit re çi tîfing çi şejderb hebû. Zabitê mîr ù camêr li şûrê xwe xebitî ù jî keriyî çar gur kuştin. Gurên mayn revîn; lê piştî mîdekî disan li zabit vegeyîyan. Zabit disan da şûrê xwe lê şûrê wî hew dibirî, jî ber ko xwîn lê cemîdî bû ù şûr bû bû rotîkek. Guran zabit kirin piç ù parl. Gava gundî gihaştine ser di mextela zabit de jî şûr ù çizmeyên wî pê ve tişteq ne ma bû. Guran bi tenê ew ne xwarî bûn.

TOP Û COTKARÎ — Herweki nas e, casûsî di şeran de çekeke xurt e. Di hetariyeke rûsî de kumandar bala xwe dida ù di-

dît ko balafirên elemanı zûka cihê wî keşîf dikirin û li betariya wî dixistin. Lê elemanan bi awaktî welê dihingastine betariyê ko kumandar lê ecêbmayî dima. Dawiyê kumandar gote peyayên xwe : « Zarono çavên xwe vekin divêt dora me de yek hebe ko rêzaniya dijinin dike ».

Eskeran bala xwe da. Li nizingî betariyê cotkarek hebû û di bin barana bimban de bê tirs û lerz cotê xwe dikir. Kirasekî spî li cotkarî hebû. Eskeran çû, cotkarî girt û ani. Cotkarî çasûsektî elemanı bû. Kirasekî spî li xwe kirî bû ji bona ko balafirvanên elemanı di reşahiye de wî zûka bibinin. Cotkarî bi haletê xwe şavîne welê radikirin ko ew tev de îşaretin bûn û balafirvanên elemanı pê cihên topên dijmin nas dikirin. Ne hewce ye em bibêjin ko cotkariyê me îşareta dawîn di sêpiyê de da.

**FRENKO Û DELALKE EMÊRIKANI** — Vê paşiyê balafirvanekî kenadî bi navê Vitdal bi artîsteke emêrikani — Edîr Roge — zewicîye û gava general Frenko diktetor û serkewletê Spanyayê bi vê ziwacê hesiyaye gelek enîrî û li ber xwe ketiye. Ma Frenko çî ji vê ziwacê ye? Delala emêrikani Edîr Roge Frenko xapandî bû.

Di şerê Spanyayê de balafirvan Vitdal di xizmeta soran yanî cimbûriyetciyan de bû û şerê eskerên Frenko dikir. Vitdal di şerê de hêstir ket û bû mehkûmî idamê. Sibetirê ewê bihafa bi dar ve kîrin. Jina Vitdal ji Frenko re kavezek rêkiri bû û efiwa mêrê xwe dixwest. Sûretê jinikê jî bi mektûbê ve bû; jinikeke delal û bedew. Frenko Vitdal efiw kir û gava şer qediya balafirvan vegeriya welatê xwe. Edîr Roge artîsteke emêrikani bû, di Ewropayê de dîgeriya û piştî îşê Vitdal deng pê ketî bû. Lê ew ne jina Vitdal bû û ew nas ne dikir jî. Hîle li Frenko kirî bû û vê paşiyê gava vegeriya Emêrikê rabû û Vitdal kir. Frenko jî ber vê fena jinikê xeyidî lê hew dikarî bû Vitdal bi dar ve bike.

**XEBERGUHÊZ**



## GUNEH

Carekê min di kitêbekê de xwendî bû : « Serhatiyê meriv çiqas kevnar be, di mejiyê meriv de hewqas şopên kûr dinêle . . . »

Rast jî wisan e; testên ko min di biçûkiya xwe de ditine, serhatiyê wê gavê iro pîr qenc, gelek bi zelalî tîn bîra min . . . Lê tiştin hene ko dihi, pîr min ditine; an bihtstine, an jî hatine serê min bi xwe, iro zû bi zû nayên heşê min . . .

Qey gava meriv zaro be, mejiyê meriv hêj hêtir nerm û taze ye; jî lewra bîrok û serhatiyê meriv bi hêsanî lê de cih digirin û her ko zeman derbas dibe şopên kûr dihêlin . . . Eve, yek jî serhatiyê biçûkî :

Bihar, diqediya. Havinê, nih dest pê dikir. Êdî herkes jî germa rojê derçevîyan; xwe davêtin bin siha darekê an diwarekî . . .

Piştî xwendinek heşt mehan, dibistana me jî deriyê xwe li me digirt . . . Ez, bi xwe pîr kêfxweş bûm; heşt meh xwendin, di nav wê girigêçê û hay û hûyê de, di nav wan diwarên teng û tari de, ne tenê canê min, rihê min bi xwe jî hawî bû bû. Dilê min kufik û zingar girtî bû . . .

Gava mamosteyê me mizgina belavkirîna dibistanê ya havînî da me, ne tenê ez, hemî suxteyên dibistanê mina çivikên jî qefesê azad dibin, çirevîtik didan xwe, kumên xwe ber bi ezmanan davêtin. û digotin : Her bijî Mamosta ! Her bijî Mamosta ! . . . Tenê sê, çar zarokên tiral digiriyan, di sinifa xwe de ma bûn, û li her mamoste û hevalên xwe rûsar diman : Tirsa dê û bavê wan jî da bû ser dilê wan, bêhemd jî çavê wan hêstir diherikin. Giriya van zarokan hinek kêfa min kêmîtir dikir, dilê min bi halê wan dişewitî . . .

★ ★ ★

Piştî girtina dibistanê qederek derbas bû bû; rind naê bîra min, Xwedê zane mehek an meh û nîvek. Ez û çend hevalê xwe jî ser zinarekî derbasî ser latekê dibûn, kaş bi kaş, newal bi newal li hêlinê çûkan digeriyan; bi saetan ve bi dû çêlikê wan ên nihfîrî diketin; me ew digirtin, ew heywanê bê zar û ziman heta di nav pepikê me de bimirana, me bi wan dilistin . . .

Em, carina serqot, carina ji pëxwas digeriyan û ji vi halê xwe bêtir şa dibûn. Kum û sol û cilê me ji me re teng dihatin, bi her hawayî me dixwest em serbest bin...

Çiqas car histiriyê kaşan lingên me diqelaşt, û kelemên dar û deviyau lingên me xwin dikirin. Dîsa ne xêma me bû. Haya me ji me tune bû; lisk, serbestî, azadî em sermest û serxweş dikirin... Çend caran me ji dê û bavê xwe gotinên tal dibihîstin, dîsa me guh ne dida wan...

Piştî heşt meh xwendin û ew jiyîna zindani, sê çar mehên havînê serbestî para me bû heqê kesî tune bû me ji vî azadîyê bê par bike.

Rojê min û sê çar hevalau me gotina xwe kirin yek: emê biçûna Şikefta Bîrxêrê, nêçira çêlkewan... Şikeft ji gundê me bi sê çar saetan dûr bû. Ji ber germa havînê kewan teva çêlikên xwe, xwe davêtin bin siha vî şikeftê. Di şikeftê de kaniyek jî hebû. Lê şikeft ne xali bû; cihê pîrebok, cin û periyau bû. Heta min ji pîrika xwe carekê bihist ko Şikefta Bîrxêrê payitextê padîşahê cin û periyau e, kes ne wêrî bû here hundirê vî şikeftê. Heta peyayên mezin bi xwe jî taqet ne dikirin. Lê zarolî, ji bona nêçira çêlkewan, ne cin li ber çavê me xuya bûn ne perî... Ji xwe me dixwest cara ewilî em vî mêraniyê nişan bidin; di şikefta cin û periyau de nêçira çêlkewan bikin.

Reşo û Remo li ber derî man, ez û Cemo jî ketin hundirê şikeftê; ha li vir, hali wir me sê çar çêlkew girtin. Ew pîr biçûk bûn, nikarî bûn bifiriyan. Di wê gavê de dinya bi genc û xezinê xwe ve bidana me, em hewqas kêfxweş û dilgêş ne dibûn. Lê em hebekî westiyân; li her derê şikeftê darek tûê hebû, em li bin siha wê rûniştin, me him xwe rehet dikir, him jî em bi nêçirên xwe şa dibûn... Hingî Cemo ti bû bû; dixwest here hundirê şikeftê avê vexwe, lê bitenê ne wêrî bû. Min dizanî bû li xwe danîne ji kesî re bêje: bi min re were hundirê şikeftê, ez ne wêrim bi tenê herim. Min, bêgûman dizanî bû ewê bi tenê here... Di wê gavê de şeytaniyek hate bira min. Min xwest ko mêraniya Cemo biceribinim. Min xwe jî wan vedizî û ketim hundirê şikeftê. Ne Cemo ne jî tu hevalan çuyîna min a şikeftê ne di-

tin. Min di quncîkê de xwe veşart. Min dit Cemo hêdi hêdi, bi tirs lingê xwe daveje û tû. Şikeft tari bû, hêj av venexwarî bû, gava nêzikî min bû, ji nişka ve, bi dengêki bilind min go: pix... pix!

Heyhat!... Cemo, di dilê xwe de got qey cin e, bi tîrseke mezin vecîniqî û ket erdê; dev û diranê wî ketin hev. Çiqas min deng lê kir qet li min venegerand. Bi tenê çend caran çavê xwe vekir û bi tirs li min nêrî. Çavê wî ê kesk di nav tariya şikeftê de mîna du cîncîqan diçirîsîn... Hingê min famî kir ko min qebahetek, an hêj bêtir, gunehekî mezin kir. Ez çûm cem hevalan û min jî wan re got: werin bê çî li Cemo hatiye?

Em her sê çûn cem wî, çiqas me kir ne kir me nikarî bû ew jî cihê wî bilivanda. Ji xwe em giş zarok bûn, em her sê çar jî, heft heşt salî bûn... Hingê dengê bilûrekê jî dûr ve hezin hezin dihat. Me dizanî bû xwe-diyê vî bilûrê şivanek e. Reşo û Remo li ber Cemo man, min xwe li dengê bilûrê girt. Piştî qederekê min xwe giland şivên û min serhelîya me ji wî re got. Şivan, ji dûr ve, merivê Cemo dihat; pezê xwe sipart hevaleki xwe û bi min re hat şikeftê; Cemo li piştî xwe kir û em bi hev re veşeriyau gund. Hêj zimanê Cemo ne digeriya, min jî jî fediyau, qebaheta xwe vedîşart, heta min jî hevalên xwe re jî rastî ne digot.

Em çawan vedigeriyau gund? Dê û bavê Cemo ewê ji me re çî bigotina. Meê jî dê û bavê xwe re bigota çî?! Çar ne çar em diçûn.

Çiroka me zû li nav gund belav bû. Bavê min, di mal de ez heps kirim. Min bihist ko hevalên min jî mîna min heps kirine. Hêj jî zimanê Cemo venebû bû. Her kesî digot: Ciniyê wî şeytani ye, ne rehmani ve û gişan, ji dawîya Cemo ditirsiyan, tenê Şêx Sedeqe...

Şêx Sedeqe, bi cin û periyau dizanî bû. Ev kalê risipî ko zeman piştî wî xwar kiri bû, bi nav û deng bû... Eslê wî yan jî Mekê bû yan jî Medîne... Min bihist ko Şêx, ji bavê Cemo re gotiye. «Heke tu deh zêran (pênc pêşîn, pênc paşîn) bidî min ezê kurê te rehet bikim...» Bavê Cemo jî qail bû bû û goti bû «Tu kurê min rehet bike mal û milkê min giş jî te re pêşkêş in...»

Êdin her kest hêvi dikir ko şêx ewê Cemo rehet bike... Tenê min bawer ne dikir. Min derd û êşa Cemo ji Şêx hêtir û çêtir zani bû...

Gava cemo birin cem şêx, şêx ez ji xwestim nik xwe, û ji min çend pirs-kirin: «Wexta ko Cemo çû şikeftê, cihê ko lê keti bû xwar, û çiqas nezîkî qozîya çepê bû, çiqas dûrî qozîya rastê bû?» û bi kitêba xwe dinêri û bi qelesa xwe a qijoti li ser kaxetekê çend xêz û nixtik çêdikir û serê xwe dihejand û digot: «Min fam kir... Min nas kir kîjan cin e... ev cinêkî şeytanî ye, jê re dibêjin: polotox...»

Paşê li ser neynûkên dest û lingê Cemo bi qelesa xwe tiştin nivisand û got «Min cini di laşê wî de heps kir, heta ez wî ne kujim, bera nadim, ka ji min re destek şivê ter binin».

Xulamê wî Dilo, gurzek şivê binarê jê re anin û bi lingê Cemo girt û bilind kir, şexê wî ji, şiv bi şiv di lingê wî zarokê reben dişikand... Cemoyê ko heta wê gavê zimanê wî ne digeriya qirîna wî diçû ezmanan. Lê şêx digot «ev ne dengê Cemo ye, hêj zimanê wî girêdayî ye û dest bi lêxistina xwe dikir û digot: Efrît... şeytan... ma tu ji destê min bi kû da birevî» û bi zimanê cinan çend pirs li ser dikirin: tîmatîm... tenatîm... şin... şin...

Xwin ji bin lingê reben diherikî, gava her darek li bin lingên reben diket, tirên birûskê li dilê min dixist... Min nikari bû rastî bigota. Ew roj ne bû êvar, Cemoyê reben ji ber darên wî zalimê xedar mir.

★ ★ ★

Ev bûn bist, bist û çend sal... ev çirok li serê min qewimiye. Hêj ji bîra min ne çûye. Ji min re bûye derdek, di hundirê min de bûye girêkek, di dilê min de bûye birinek... birineke pir kûr. Sal bi sal nêma û kêma wê hêtir, êşa wê zêdetir dibe. Giyanê min ji ber diheje... Gelek caran, Cemo di xewna xwe de dibinim; li hember min melûl melûl disekine û bi gilî û gazin ji min re dibêje.. bêbext... bêbext!

A-Ziwan : 28-1-942 QEDRÎCAN

## ÇIYAYÊN SILIVAN

Çiyayê Silivan, Çiyaki bi dar û av e. Darên çiyê ji mêj ve ji sêv, ji şeqoq, ji hejir, bi gwiz û bi dêli ve xemilandi ne.

Ev darên ha giş bê xwedî ne. Xelkên vi çiyayî bi serbestî jê dixwin. Dar û deviyên vi çiyayî gelek mezin in.

Çiyayê Elbatê bi timami bi darên hêjiran xemilandi ye. Dirêjahiya wî çiyayî 30 û pehniya wî 25 kilomêtir heye.

Satarê tu kesi tê de nîne. Di ser rîya Erqenîsê geliyê gûza heye; di vi geliyê de bi hezaran û bi sed hezaran darên gwizan hene.

Di vi geliyê de ji satarê tu kesi nîne.

Ev çiya ko kela Mëreniyê li ser e, teji darên sêv û şeqoq e û bi dêliya xemilandi ye. Di wî çiyayî de, du kaniyên mezin bi kuleteynan hene. Ev her du kani seyrangelê xelkên Navikê ne.

Di Navikê de nizikahi ve sih gund hene.

Ev gund cihê cihê giş bi navdest û çiya, bi av û bi aş e. Şewil hene ko tê de hevde û hejde aş digerin. Rûniştimanên gundan hind jê penceş mal, hindekî ji sed mal hene.

Havin û pehiza vi çiyayî gelek şirin û hênik e. Navdestên vi çiyayî giş dehl, rez û bi darên fêki teji ne. Ev erdê ha yê navdest bi satar in.

Hêja bûna vi çiyayî nemaze ev e ko tê de kana kevirên aşan peyda dibin.

Divê neye ji bir kirin kî aşên Kurdistanê kevirên xwe ji kana vi çiyayî tinin.

Di kurdîstana me de li deştê Şor û Deqnat, li çiyê Hêlda û Boşal bi nav û deng in. Şor û Deqnat di deştê Silivan de ev cih in ko ji qûntara çiyê avên bist, sih aşî hi hev re û bi carekê ji kaniyê dertê ser rûyê erdê.

Hêlda û Boşal berberê hev û her yek ser zinareki yekperçe du qesrên mezin in.

Di navbeyna wan de deştê Narikê heye. Di ser vê deştê û bi her du qesran û gundên di wan re, çiyayê Elbatê û çiyayê Fişatê bilind dibin.

Ji xwe deştê Narikê ne deşteke dorberedayî ye, ew di navbeyna çar zinarên bilind û dirêj de ye, ew zinarên he mîna bi şûr hati-ne birandin yekperçe ne.

kariyê bikin, û riyên Bürmê û Hindistanê midafehe bikin.

Ji milê din japonan li 23ê Kanûna paşin esker derêxistine giravên Selmon, Gîna-Nû, Îrlanda-Nû û Britanya-Nû, tev de mistenlikêyên taca îngilîzî. Şer di wan giravan de jî dom dike.

**ŞERÊ LIBYAYÊ**—Herwekî xwendevanê me dizanin li 18ê Çiriya paşin 1941 şerê Libyayê jî nû ve dest pê kiri bû û îngilîzan berda bû talyan û elemanan û ew jî Libyayê derêxisti bûn û beta bi lixûbên Trablîsêrbê ajoti bûn. Ber bi dawiya mehla Kanûna Paşin 1942 îngilîz gihaştî bûn Egêdabayê û ketî bûn ê. Romel eskerên xwe jî Egêdabayê heta bi şeş kilometri wê ve kişandi bû û berê xwe da bû Trablîsêrbê.

Di vê navê de balafirên talyan û elemani li rojê 10-12 caran li girava Maltê dixist. Dihate bira nitrov ko dilê elemanan heye bi peraşutan esker daxinin Maltê. Lê ev tişt çênebû. Wer dixuye ko jê mexsed melisandina stola îngilîzî bû. Da ko rîya behrê jî wan re yanî jî talyan û elemanan re serbest bimîne û tê re jî xwe çek, esker û cebirxanê bînin. Balafirên îngilîzî di behra spi de hin jî vaporên ko ev tişt diguhasin bin av dikirin. Lê bivê nevé hinên din derbas dibûn.

Li 25ê Kanûna Paşin 1941 jî nişkekê ve wezîyet di Libyayê de gubêrî û eskerê Romel yê ko berê xwe da bû Trablîsêrbê li neyarê xwe zivirî. Eleman û talyan jî midafehê derbast êrişê bûne. Îngilîzan xwe dane paş. Eskerên Romel li pey hev Egêdabaye, Bingazî û Derne vegirtin û li 6ê vê Sibate gihaştine dora Xezalê û li wê derê sekinine. Xezalê dikeve 60 kilomêtir roavayê Tobriqê. Niho şer di dora Xezalê û di navhera pêşdaran de dom dike; şerêkî sivik. Lê bivê nevé ev şer bi êrişê yekî jî her du şerevanan wê xurt bibe.

**ŞERÊ ÛRIS**—Êrişê ûrisan di dirêjahiya eniyê de dom dike. Elemanan dikin li ser xetekê bisekinin û li hêviya Biharê bimînin. Lê ûris naxwazin vê firsendê hidin neyarên xwe û tim û tim dirêjî wan dikin. Li gora danezanên rûsî piştî ko ûrisan Mojayesk bi şûn de vegevand êdî Mosko jî her talûkê bi dût ketiye. Ûrisan piştî ko eleman jî dora Moskoyê bi dût xistine niho dikin mihasera Leningradê vekin. Ji bona vê yekê jî ûris di

navhera gola Ilnen û Smolenskê de rabûne hicûmê û xetên elemanan di vê mintiqê de qul kirine û niho dikin vê qulê fireh bikin û bikevin paşiya eskerên elemani yên ko li Leningradê çarnîkar hatine. Ji milê din ûris gelek zorê didin Xerkovê. Xerkov di Okranayê de merkezeke sinahî û gelek bi ehemiyet e. Li gora nûçeyên radyowa Moskoyê ûrisan qedere deli kilomêtiran nizingî li bajaran kirine; û heye ko Xerkov di van rojan de bikeve destê ûrisan.

**ÇIN Û MAÇIN**—Ev çar sal û tiştêk e ko japon şerê Çînê dike û hêj zora wê ne birîye. Belê japonan birekî Çînê, nemazê peravên wê vegirtine. Lê Çîn mîna welatê Ûris Kişwerekî mezin û bê pîvan e, xelkê wê jî boş e. Çîn li gora Japonyayê welatekî bişûndemayi ye. Lê herçî neyarên japonan hene jî destpêka sefera Çînê ve arikariya Çîn û Maçînê dikin. Piştî ko japon dirêjî Emêrikê û Îngîlterê kir ev her du dewletên mezin bi çar destan bi Çînê girtine û dikin bi her amayî arikariya wê bikin da ko Çîn bikare li pêşiya japonan bisekine û şerê wan bike. Di şerê Pesifikê de herwekî Emêrike kaniya çek û posatan e; di vî şerî de Çîn jî ji hevalbandan re wê bibe kaniya mirovan, kaniya şerevaniyan.

Çîn û Maçîn îro hûye du dir. Birê vegirti û birê nevegirti. Di birê vegirti de japonan hikûmetek danî û ew hikûmet bitenê jî ya japonan dike. Herçî birê nevegirti tê de hikûmeteke din heye û serekê vê hikûmetê merêşal Çenkeysek e. Ya ko şerê japonan dike ev hikûmet, yanî hikûmeta Çenkeysek e.

Herwekî me li jor got îro Çenkeysek li Hindistanê ye û bi genêral Wêvel û ferman-darên îngilîzî ên din dide distîne û eskerên çini hin bi hin tînin Birmanayê. Wer dixuye ko emêrikanî û îngilîzî hêviyeke nezin di Çenkeysek de heye. Ji xwe midafeha Birmanayê midafeha Çînê bi xwe ye; jî her ko Çîn di vê rê re xwe digehîne behrê. Heke ev rê kete destê japonan halê Çînê wê zehmet bibe.

Şam : 10 Sibat 1942 NÊREVAN





## REWŞA DINYAYÉ

**NITQA ÇORÇIL** — Pişti ko Mister Çorçil ji Emèrikê vegeriya di welatê ingilizan de li ser halê şer, nemaze li ser şerê rohelatê dîr, kurt û pist zêde bû bûn. Rojnaman digot ko serekwezîr Mister Çirçil di pêşberê Meclisê de wê xeber bide û ji meclis û millet re rewşa siyasi û eskerî wê bide zanin.

Dêdiro, li 26ê Kanûna paşin, Mister Çorçil di pêşberê meclisê de xeber da û bi vê xeberdanê mizakerêk vebû û ew sê rojan dom kir. Serekwezîrê ingilizan di nitqa xwe de nemaze tiştên jêrin gotine:

Berî her tiştî divêt meclis û millet bizanin ko di parastina azahî û heqê mirovan de êdî Ingiltere ne bi tenê ye. Ingiltere yek ji bîst û şeş dewletan e ko ev bar hilanîne û kirine piştî xwe.

Çorçil qala Hes kiriye û gotiye ko Hes hati bû Ingilterê ji bo mizakera aşiyê. Lê aşîke welê ko şertên wê Hitler wê bivekilanda, yanî bi emir bigota. Ev aşî ji piştî êxistina hikûmeta Çorçil wê bihata mizakere kirin.

Herçî şerê Libyayê serekwezîr gotiye ko general Romel, xwe pêk tani û dikir dirêji deşta Nil bike. General Oçinlêk, fermandarê qewetên imperatoriya britani rê ne da wî û planên Romel ji hev de xistine û ew tevî hev kirine. Me Libye ji nû ve vegirt û heke me nikarî bû qewetên dijmin bi temami edim bikin me du seyekên wê qewetê qeland. Belê di vi şerî de me ji dijmin 36500 hêstir standine; ji wan 10600 kes eleman in. Kuştî û birindarên elemanan 11500 peya ne. Herçî talyan in wan ji 13000 peya ji dest dane. Me 1852 balafirên dijmin xistine erdê û 386 tangên wî xerab kirine. Di Libyayê de serêkî nû pêk ve têt; ji ber ko ji dijmin re piştmerîne nû hatine.

Mister Çorçil ji ehemiyeta zefera Libyayê peyiviye û gotiye ko di saya vê zeferê de Qevqas û welatên rohelatê nîzing hatine xelas kirin. Serekwezîr şexzaliya xwe pêş ve birîye û gotiye: Em îro pêşiya xwe ji berê çêlir û ronaktir dibînin û ji her wextî bêtr ewle ne ko zefer wê bikeve destê me.

Belê rewşa me di rohelatê dur de ne pir e geş e. Ji lewra me bi japonan midare

dikir; heta roja ko me zani ko êdî Emèrikê ji we bikeve şer. Îro Britanye piştî xwe daye vî hevalbendê xurt û xwe bi wî girtiye.

Hin dibêjin ko me qewetên xwe weke xwe belav ne kirine û qewetîne kafi ne rênêkirine Sengeporê Heke me gelek esker bişanda Sengeporê meê deşta Nil bixista talûkê û eskerên ko biçawan Sengeporê wê tê de bi mehan û salan ve bêkar û emel bimana.

Îro ji rohelatê dîr xebêrine neqenc tèn. Heye ko di ayendê de nûçeyên ji van xirabtir ji bigehîne me.

Gava di Etlantikê de min Rûzwelt dit me li ser ketina Emèrikê şer ji xeber da. Herçend wext diborî, ewçend em ewle dibûn ko heke japonan dirêji me kir em ne bi tenê ne, piştmerên me hene.

Divêt bête birê ko stola emèrikani di Hewayê de bû. Ji lewre me mimkin ne didit û ne diket serê me ko japon ev stola xurt û mezin li ser bask û li paş xwe bihîle û li Sengepor û Melêzyayê xe. Digel vê hindê me zîrehoşa mezin « Prins of Wels » şande Sengeporê û me Sengepor û Honkong ewçend xurt kir ko bikarin midekî dirêj xwe ji êrîşa dijmin biparêzin.

Li 7ê Kanûna-pêşin gava nîminendeyên niponî li Westingtonê digel yê emèrikaniyan mizakere dikirin japonan ji nişkekê ve bi ser me û bi ser emèrikaniyan de girt. Japonan di Pesifikê de bi miweqetî be ji stola emèrikani ji kar êxistine û xesarîne mezin gihanîne stola me. Ji bona îro di Pesifikê de, serdestiya helrê ji destê her du dewletên behrê ên mezin, Ingilterê û Emèrikê, ketiye destê japonan. Gelo ev serdestî wê çiqasî dom bike? Ewê hinde dom bike ko di wê midetê de japon de bikarin di Pesifikê de hin mistemlekeyên hevalbandan bixin destên xwe. Bêşik japon di wê midetê de û di wî erdê fireh û bêpîvan de serdestiya hewan ji wê bêxe destê xwe û derêxistina wî ji wan deran wê bibe îşekî zehmet.

Ji xerabkirina Japonayê re wextekî dirêj û bilneke fireh divêtin. Belê mirov dikare bi hezaran peyan bişîne wan qadên şer ên dîr. Lê hetanî ko serdestî di destê japonan de ye ew peyan, nikarin bi kêrî tu tiştî bînin bill ko bibin qurbana gule û berikên dijmin. Min got ko hetanî ko serdestî di destê



japonan de ye. Lê rojektê ev serdesti, serdestiya behir û ezmanan ji destê japonan wê bikeve destên me.

Herçi şerê Sengeporê ye ez naxwazim di vê habetê de tu kehanetê bikim. Lê ewçend dikarim bibêjim ko erdê Sengeporê host bi host dê bête midafehe kirin. Ji bo rêkirina qewetîne nû rohelatê dâr me her tevdirên gerek ditîne. Di nîzing de honê herên van tevdiran bibinin.

Mister Çorçil di vê navê de qala Ewistralayê ji kir û got : Heke eskerên ewistralayê ko îro di qadên şer ên tével de ne dil kirine ko vegeirî Ewistralayê û rast bi rast welatê xwe midafehe bikin em manîi vegera wan nabin.

Herçi şerê ûris, Mister Çorçil piştî ko pesnê eskerên rûsi daye gotiye : Emê bi her awayî arikariya ordiwa ûris a qehreman dikin. Tiştên ko Stalin ji me xwesti bûn ne ew hemî jê re rêkirine. Heye ko ji her nexweşiya hewayê rêkirîna hin tiştan bi derengi ketiye Lê di Sibatê de emê tiştên derengmayî jî bigehinin ûrisan.

Çorçil di dawiyê de got : Bi hatina Zivistanê emê bikarin qewetên xwe ji nû ve kar bikin û pêk ve binin. Û qet nebit, ji bona niho Iraq, Sûriye, Felestin, Îran, Qevqas û bîrên pêtrôle duri talûkê ne. Ji roja ko hikûmeta Vişiyê em terikandîne tucaran hal û rewşa me weke îro pêkhatî ne bûye. Bi fêdakarinê mezin di van du salan de em di rû de mane û ne xerîqîne.

Hinan digot divêt em esker derinin bêja Ewropayê û di erdê Frensê û Holendê de şerê elemanan bikin. Niho ez didim eqlê xwe û dibînin ko heke me ji ya wan bikira emê bi temami xerab û edim biwan. Ji niho û pê de di hilgirtina barê dijminan de imperatoriya britanî ne bi tena xwe ye; Emêrike bi me re ye.

Mister Çorçil di dawiya mizakera ko sê rojan ajot ewlehiya meclisê xwest. Lebatên hazir, ji yekî pê ve, tev de dengên xwe dane hikûmeta Çorçil.

**ŞERÊ PESÎFÎKÊ** — Şerê vê eniyê bi xurtiya xwe a berê û bi serdestiya japonan dom dike. Emêrikani di giravên Filipînê de bi mîranî şer dikin û li ber xwe didin. Japonan ew girav hêj bi temami venegirtine.

Qewetên emêrikani di van giravan de hindik in û tu piştîmêr ji wan re nayin. Lê werdixuye ko fermanderê wan jeneral Ertîr mîreki qenc û şerevaneki serdeste ye û dilê wî heye bi qewetên xwe ên hindik heta dawiyê şerê japonan bike û erdê Filipînê host bi host midafehe bike. Herweki stranê gotiye : Bihustê lawê heva bi lire be. Mêrê xerab ji mîrê çê bi şade be.

Di erdê holendiyî, yanî di Hindistanê holendî de ji tevgera japonan di van rojan de xurt bûye. Japonan ji çar giravên vê Hindistanê ên bingehin dido, yanî Bornêo û Selebîs besêh vegertine. Li Bornêoyê birine petrolê en hêja hena. Lê holendiyî beriya ko terka giravê bidin ew bîr şewitandîne. Di Bornêoyê de erdê ingilîzan jî heye. Berê ye elmanan jî hebû.

Japon niho zora xwe didin her du giravên din, Cave û Simatrayê. Balafirên japonî her û her li wargêhên van giravan ên behrî û hewayî didin.

Herçi qada ingilîzan, herweki Mister Çorçil gotiye weziyet tê de ne ewçand baş e. Japonan piştî ko Melêzye safî kir û erdê vê nivgiravê an mingiravê vegirt topine mezin anîne pêşberê girava Sengeporê û dest bi lîxistina vê keheha asê kir. Girava Sengeporê gelek nîzingî beja Melêzyayê ye. Japonan qedere çar rojan bi top û halafirî li balafirgelî û istihkamên Sengeporê dane û li 9ê Sibatê, di tariya şevê de lingên eskerên japonî di axa Sengeporê de erd girt û japonan di paravê de çend kozik xistine destên xwe û dirêji xetên ingilîzî kirine. Danezana ingilîzî dibêje ko şerîne nê di navbera japon û ingilîzan de çêdibe.

Disan li gora danezanên ingilîzî, ingilîz di Birmaniyayê de jî xwe dane paş û japonî ber bi pêş çûne. Japonî dikin Rengûnê—payitextê Birmaniyayê—bêxin destên xwe. Rengûnê benderek e û li serê rîya Bîrmayê; rîya ko diçe Çîna nevegirtî. Ev rê gelek bi ehmîyet e; ji ber ko çek û cebîrxane yên ko Çenkeysek pê şerê japonan dike jê re di vê rê re tene şandin.

General Wêvel çû bû ziyareta Çenkeysek. Vê paşiyê Çenkeysek jî hate Hindistanê. Ji xwe eskerên çîni hati bûn Birmaniyayê û hîn jî tîn. Yanî çîni digel ingilîzan dikin hev-

## SERXWEBÛNA MÛRIYAN

Direjahiya wan a hakur û niroyî panzde; a rohelat û roavayî neh kilomêtir in.

Ji çiyayê Fişatê û ji yê Elbatê avên kaniyan datên û di ser wan zinaran ve gelek ciyan de dişindilin erdê.

Di hundirê deşta Narikê de gundekî kevn û romanî heye ko jê re Bakûs dibêjin û li gora gotina xelkê gava yewnanî jê derbas bûn navê wê deştê daniye bihuşt.

Di zinarên ko dora deşta Narikê digirin şikeftine destkolayî bene û di wan şikeftan de avahiye û ko xelkê berê ji xwe re çêkiri bûn, mina xani, dikan bi pêpelingên xwe ve hêj îro têne dilin û li çêkirina wan niroy ecêbmayî dimiye.

Pehîzê ji axa û mala wî pê ve xelkê wî çiyayî bi hev re diçin Erqenîsê, lê armanca wan daniye, xort armanca dihingêvin, segmanên wî çiyayî roja Erqenîsê têne nas kirin. Her gund bi tevalî wek malek tên Erqenîsê.

Ew nan û pezê xwe bi xwe re tinin, her gund cihê, cihê bi hev re dixwin.

Ava Erqenîsê ji zinareki dertê dikeve nav tehtekî yekperçe, bi du sed gavi dimeşe, piştê dikeve kuleteyna piçûk û ji wê jî dertê digehe kuleteyna mezin, ev kuleteyn bi xox û xiyar û bi tîri tete teji kirin.

Ava Erqenîsê hevqas sar e ko ev fêki tê de diterikin. Temamî xelkê Erqenîsê bi serbestî û bi tevayî jê dixwin.

Ev xelk sê roj û sê şevan li wê diminin û roja çaran axayê Silvan bi tevi zaro û xatûna xwe ve têne Erqenîsê.

Xelk diçin pêşiya Axê û bi şahî gelek tîfinga berdidin. Axa bi malbat û zaroyên xwe ve tê serê kaniyê û xelk dest bi govand û şûr û mirtalan dikin û govandê digerin.

Êvarê xelk xatir ji axayê xwe dixwazin û her kes diçe ser kar û şixlê xwe bes serbendê malbatan li vir, li cem axê diminin.

Axa heft rojan bi tevi serbendan li ser Erqenîsê disekine, xwarin û vexwarina wî ji gundê çiyayê Narikê ji ber xwe ve jê re tê; axa lê mehvanê eşira xwe ye.

Di nav wan heft rojan de axayê Silvan bi tevi maqûl û serbendên xwe ve bi rojê nêçirê û bi şeva tavê boyvê de, bi govandê mijûl dibe.

Dişt heft rojan Xatûna Axê maqûlên

Hero şêrê Sileyman	Diçû şehré mûristan
Ewî şêrê neynûk-kuj	Bajar li wan dikir doj
Bi vî kari dexl û dan	Ji wan distand bi talan
Gavil hiştin şehr û sûk	Kuştin zar û zêrç û bûk
Li wan çawa bû hawar	Li ser hev bûn kero bar
Ne aña man ne jî beg	Teva şewra xwe kir yek
Tev de rabûn yekî jir	Ji bo xwe re kirin mîr
Dane hevdi soz û bext	Jê re anin tac û text
Hemî çûn ber derê wî	Sûnda wan bû serê wî
Tevan çepkên xwe kutan	Biji bijî mûristan
Mirê weki Iskender	Ji eywanê hate der
Ewî mirê dilovan	Bi serbestî gote wan
Ez dixwazim ziv û zêr	Da ez herim gilyê şêr
Ziv û zêr û dil û can	Danê çû cem Sileyman
Bi wan lingên xwe ên hûr	Berê xwe da rîya dîr
Belê mirê qudd û jir	Dane cem xwe çend wezir
Geh firin û geh meşin	Ta gihane Filistin
Xelkên bajêr hûr û gir	Karê xwe wan sivik kir
Xwas û peya hemî çûn	Pêrgî mirê mezin bûn
Xweş xweş hatin gote wan	Li eywanê hû mevan
Her dû miran şev û ro	Pev re kirin guft û go
Go ey şahê ser bi zêr	Ez hatime gilyê şêr
Divê wî daleqênî	Tola me jê bistênî
Sileymanê keysçihû	Pirsek ne xweş day rû
Go ez mûkî dûvê şêr	Nadim bi sed hezar mêr
Mir rabû ser lingê xwe	Lê vegevand dengê xwe
Go jîniha û çarê dî	Binêr çî tê serê wî
Sileyman jî ne bû tirs	Ne kir serê xwe ev pîrs
Mir nivisi yek ferman	Şand welatê mûristan
Li kû bon şêr bibênin	Çavên wî zû derênin
Şêrê mezin pir qelew	Ji êvar de kete xew
Mûri rabûn weke mêr	Ketin poz û guhên şêr
Şêrê sar ê qerbeleq	Nava rojê hû kelek
Hudhud gote Sileyman	Ka ew şêrê dergevan
Kurê Dawûd pê kenî	Hudhud got-ê ez benî
Ew şêrê pir hinermend	Îro sê ro bûye zend
Marî tev de bûne yek	Kuştin şêrê çavbeleq
Arikarî yekîti	Mûri kirin rûsipî
Ta ko kurd û Kurdistan	Nebin weke mûristan
Ne bajar û ne jî gund	Tev de nabin serbilind
Ko tune bin mêr û zêr	Emê çawa berin şêr
Wawik û şêr û keftar	Di me bikin tar û mar
Bê yekîti em dijin	Lewra em hûn cegerxwin

CEGERXWÎN

xwe, serbendên xwe bi diyariya xelat dike û destûra wan dide. Piştê axa jî tevi xulamên xwe vedigere mal.

MIHEMED CEMİL PAŞA BIRC





## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelnine Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Blyîşa Pêxember. Bi Kurdîya dumilî, bi dîbaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mîstefa Kemal paşê re C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikitîn
- 8 — Ji mesela Kurdistanê. C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10— Xwendîna Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11— Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12— Dersên Şerîetê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13— Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14— Proverbes Kurdes. Medhelokên Kurdî Lucy Paule Margueritte û Emîr. K. A. Bedir-Xan Paris - 1937
- 15— Le roi du Kurdistan. Qralê Kurdistanê. Emîr K. A. Bedir-Xan û Adolphe de Falgerolle. Paris - 1937
- 6— Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdistanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel Berlin - 1937
- 17— Der Schnee Des Lichtes. Berfa Ronahiyê Şîhrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Sall	500	Qirûşên Sûrl
Şeşmehî	300	Qirûşên Sûrl
Sêmehî	200	Qirûşên Sûrl

Xwedî û -gerîndeyê berpirsiyar: Mîr Celadet  
Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriye.  
Directeur Propriétaire: Emîr Djêladet Aalî,  
Bedir-Khan. Damas—Sûriye

SAL 10  
HEJMAR 40

ŞEMBIH  
28 ŞIBAT 1942

# HAWAR

ANNEE 10  
NUMERO 40

SAMEDI  
28 FEVRIER 1942

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARÊ

Tefsîra Qurane	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Zilamek û Zinanek	Herokol Azlzan
Nivîsevan	Cemilê Tacdo
Diwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan

## ★ BIRÊ FRENŞIZÎ ★

Bavê Emîn	Diya Ferzo
-----------	------------



ŞAM—1942  
ÇAPXANA SEBATÊ



SAL 10  
HEJMAR 40

ŞEMBIH  
28 ŞIBAT 1942

# HAWAR

ANNEE 10  
NUMERO 40

SAMEDI  
28 FEVRIER 1942

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TEFSİRA QURANÊ

283 — Heke hon di seferê de ne û katibek nakeve dest bila deyndarê we ji we re gerewekê bide. Lê ger hon ji hev û dû ewle ne û gerew nastinin, divê deyndar ji Xuda bitirse û deynê xwe bide.

Şahid divê tiştên ko dizane veneşêre û bi esehî şehdetiyê bide. Şahidê ko zanîna xwe vedişêre, dilê xwe gunehkar dike. Xuda tiştên ko hon dikin pê dizane.

284 — Her tiştên erd û ezmanan milkê Xuda ne. Tiştên ko di dilê we de ne, heke hon ew vedişêrin an aşikare dikin Xuda pê dizane, û bi we re hisabê wan dike.

Xuda ji kîjkî re dixwaze efîw û toban dide û her kesê ko dixwaze diezibîne. Xwedê bi her tiştî dikare.

285 — Pêxember baweriya xwe bi kitêba ko jê re nazil bûye aniye, misilmanan ji baweriya xwe pê anîne.

Hemî bawermendan baweriya xwe bi Xwedê, bi melaîketên wî, bi kitêbên

wî û bi pêxemberên di wî anîne û ew tu ferq naxin di navbera şandiyên Xwedê.

Hemîyan got: Xudanê me, me'emrê te bihist û me tev da bindestiya te kirin û em gî ketine bextê te.

Em hevîdarên kerema te ne; efîw û tobê bide me; emê vegerin ba te.

286 — Xwedê li tu kesî ji qiweta wî bêtir bar na ke. Barê her kesî li gorra taqeta wî ye. Keda her nefsekê jê re ye.

Her kes qenci û neqenciyê ji nefsa xwe re dike; û mêvanê êmelê xwe ye.

Me ji ber guneh û ji birkirinên me ber pirsîyar me ke.

Weke ên herî me, tiştine giran li me bar me ke.

Xudanê me, barê me ji taqeta me zêdetir me ke. Gunehên me efîw bike, tobê bide me.

Me ji rehm û dîlovaniya xwe dûr me ke, me bigihîne xîfran û mihrivaniya xwe. Xudan û sermiyanê me tu î, em ketine bextê te, û li ser qewmê kafiran nisretê bide me.





### III

## SUREYÊ MALBATA IMRAN

### DU SED AYET IN, DI MEDÎNÊ DE DAHATIYE.

#### BI NAVÊ XUDAYÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHRIVAN

1 — E. L. M. ji wan herfan miraz çî ye Xuda dizane.

2 — Ji Xwedê pê ve tu Xuda nîne, yê sax û abadin ew e, ew her hebû, her heye û her dê hebe, çûna wî nîne.

3 — Xwedê ji te re bi delil û bice-tan Quran şandîye xwar û Quran hik-mên kitêbên din tesdîq dîke. Berî Qur-anê Tewrat û Incil nazil bû bûn;

4 — Da ko ew rîya rastiye pêş xel-kê bikin. Berî dahatina wan, Xwedê ki-têbên din ji şandîne xwar, wan ji rastî û xwarî ji hev dikirin. Yê ko ayetên Xwedê inkar kirine û pê kafir bûne ji wan re ezabekî giran heye. Xuda xurt e û tola xwe vedike.

5 — Xuda her tiştên erd û ezmanan dizane, jê tu tişt naye veşartin.

6 — Ew e ko di maka diya we de, li gora daxwaza xwe şikleki dide we. Ji Xuda pê ve tu Xuda nîne, ê xudan-qudret û fêris ew e.

7 — Ew e ko ji te re Quran rêki-riye. Manayê hin ayetên Quranê, kifş in, sehkirina wan hêsani ye û ew aye-tên ha himên Quranê ne, hinên din managiran, mana wan zû bi zû nayin sehkirin.

Mirovên dilxwar û fitnekar dikevin pey ayetên managiran û li gora daxwa-zên xwe mana wan ayetan seh dikin û didin seh-kirin û pê dest bi fitne û fesadiyê dikin.

Ji Xuda pê ve tu kes mana wan

ayetên giran nizane û bi awayî li he-vanîna manayên wan ne şehreza ye.

Mirovên zana û dilpak dibêjin: Me bawerîya xwe bi hemî ayetên Xuda anîne, ew hemî ji wî ne, li serser û li serçavê me ne. Lê bi tenê zelamên bi-jîr digehin vê rastiye.

8 — Mirovên zana û dilpak dibêjin: Xudanê me, te em kirin rîya rastiye, êdî, şik û dudiliyê ji me dûr bike, me jê safî bike, me bigihîne piyariya xwe, efiw û tohê bide me. Keremkar tû î û em ji te hêvidar in.

9 — Xudanê me... Tu me hemî yan di rojêke ko di hatina wê de tu şik nîne - dê bicivîni. Tu bextê xwe xi-rra naki.

10 — Divê kafir bizanin... Dewle-mendî û zar û zêç, wan ji ezabê Xwedê na filitîne. Ew ardüyên dojhê ne.

11 — Ew bawerîya xwe - mîna mi-letê firewn û qewmên berî wî - bi aye-tên Xwedê nayênin, û ayetên Xuda in-kaar dikin. Xwedê ew eşandin. Xwedê bi ezêbekî giran diêşîne.

12 — Pêxemberê min... bêje wan: Zora we wê bête birin, honê bikevin dojhê; dojh çî dereke terezab e. Do-jeh cihê eş û perîşaniyê ye.

13 — Di roja şerê Bedir de gava du bir rastî hev hatin, tiştên ko di wî şer û kuştinê de qewimîne delil û hicetên pêxemberîtiya Cenabê Mihamed pêş xelkê dikin.

Ji wan du biran yek misilman-êdi kafir bû. Misilmanan di riya Xwedê da dest bi şer û kuştinê kiri bûn.

Herçend misilman hindik bûn, lê hafiran ew ji xwe du cara betir diditin û misilmanan zora kafiran birin.

Xwedê her kesê ko dixwaze bi nisretê xwe zexm dike. Di vê de, ji bo mirovên birewer ibretine mezin hene.

14 — Jin û hevîn, zar û zêç, bar bi bar zêr û ziv, xweşî û dewlemendi, hespên esîl, keriyên pez û dewaran, çêre û zeviyên fireh tiştine têrxeml in, hej kirîna wan şîrîn û dilrevîn xuya dibê, lê ew tişt hemî malê dinyayê ne, dergehê çaktir û bilindtir dergehê Xuda ye.

15 — Pêxemberê min ... bêje wan: Ezê ji we re bi tişteki hêj bixêrtir mizginiyê bidim. Li ba Xwedê ji bo mirovên dilpak û bawermend bihuştine bi av û kanî hene û ew tê de her dimînin û di wê de ji bo wan jinên paqij û bedew peyda dibin û rizayê Xuda ê giranbiha digehe wan. Xwedê emelên evd û beniyên xwe dibîne.

16 — Ew in ko dibêjin : Xudanê me, me baweriya xwe bi te aniye, ji gunehên me bigere, tobe bide me û me ji ezabê agirî biparêze.

17 — Yên ko xudansebr in, xudanbext in, itaetkar in, camêr û comerd in û di şaguri de radibin nimêja xwe.

18 — Xuda delilên xwe anin ko ji Xwedê pê ve tu Xuda nîne.

Milyaket û bawermendên zana ji rabûn bi edaleta wî mikur hatin û gotin : Ji Xuda pê ve tu Xuda nîne, ê delal, ê xudanqudret û fêris ew e.

19 — Dinê heq li ba Xwedê, dinê islamê ye,

Xudankitêb berî di heqê islamîyetê de berberiyê ne kirine; lê gava delîl û hicetên rastiya dinê islamê hate zanin wan berberiya hev û du kirin û ew ji ber dexsê bi hev ketine.

## HEDISÊN

### CENABÊ PÊXEMBER

REHMET Û SILAVA XWEDÊ LÊ BE

487 — Xwedê ji xebatkeran hez dike.

488 — Mirovên ko ne xebatker in bi kêrî dinya û axiretê na yin.

489 — Xwedê arikarê xebatkeran e.

490 — Zekat û sedeqeyên xwe bidin peyayên ko ji ber qelsî û nesaxiyê bêçare ketine û nanê xwe ni karin ji keda destê xwe bixwin.

491 — Tu heywan, tu teyr, tu cih, tu roj û tu tişt ne bi çifte ne, yên ko dibêjin ne were ye, derewin in.

492 — Xwarina we hazir be an îşekî we hebe dest bi nimêjê me kin; mirov divê nimêja xwe bi rahetî bike.

493 — Yê ko qebahetan kiriye li qisûra xelkê na nêre; yê ko dinya ditiye xelkê nas dike, qedr û xatirê mirovan dizane.

494 — Bi xwarin û vexwarinê zorê li nexweşên xwe me kin, me din ser kêfa wan û me tirsin ko ew ji birçîna dimirin: (kes ji birçîna na mire.)

495 — Me enirîn, me xeyidin; nerm bin, bihna xwe fireh bikin.

496 — Ko yekî dest bi kar û îşekî kir heta xelas kirina îşê xwe, qenc be, xerab be tu tiştî me bêjin, û dawiyê qerarekê li ser wî bidin.

497 — Bi ketina hevalê xwe dilxweş me bin, tiştê ko Xwedê anî serê wî dikare bine serê we ji.

498 — Jin çêrî ji bin li wan me din.

499 — Ji avahiya dûr me çin û li cihên nepenî rûmenin, yê ko lê rûdinin mina miriyên merzellan in.

500 — Dijûniya li Iblis me kin, sitariya xwe ji Xwedê bixwazin.

---

Yên ko ayetên Xwedê inkar dikin û pê kafir dibin divê bizanin ... Xuda zû diêştne û zû ji digehîne qenciye.

---

Ji bona Tefsîra Quranê K.K. û li hejmaêrn 27, 28, 29, 30, 31, 32, 33, 34, 35, 36, 37 38, 39 an fedkirin.

501 — Galgalên neqenc ji miriyan re me bêjin.

502 — Ji kesî re me bin serbar, heke hon siwar in û tajanga we ji destê we ket, hon bi xwe peya bin û wê ji erdê hillnin.

503 — Tirbên miriya ji xwe re me kin ziyaret û mizgeft.

504 — Gava mêvan-tên ba we bi tiştên li mal hazîr be qedrê wan bigirin.

505 — Xwe dûrî xelkê me girin, ji mirovên xwe bidûr me kevin, dev ji zewacê bermedin, derê nepenî ji xwe re me kin cih û war,

506 — Ji firax û piyan, tas û sênîyên ziv û zêr me xwin û vemexwin.

507 — Tiştên mina mehûj, behiv û nok yek li pê yekî bavêjin devê xwe, wan tišta bi kulma me xwin.

508 — Misilman xwediyê gotina xwe ne û pê tene nas kirin.

509 — Misilman ew e ko xelk ji dest û zmanê wî ewle ne.

510 — Para hilekar û bêbextan agir e.

511 — Mirovê ko pereyê wî hehe û deynê xwe ne de bêbext û zalim e.

512 — Xwediyê gotina xwe bibin û arîkariya Xwedê bixwazin.

513 — Şiretker divê bi dileki pak şiretan bide û bêbextiyê ne ke û galgala hate jê re gotin bila ji devê xwe dernexe.

514 Mirovên pak zû tene xapandin, mirovên xerab xwe vedîşêrin, xwe davêjin pişt dîwara; heta derb li wan ne keve.

515 — Jin û mêr mina kevirên bedenekê ne, hev û du himbêz dikin û qiwetê didine hev.

516 — Yê ko xirabiyê dike li saxiya wî xerabi tê pêşiya wî.

517 — Heçî ji Xwedê na tirsin ji xelkê jî fedî na kin.

518 — Mirovê ko bi çavê rehmê li xelkê na nêre Xwedê rehma xwe lê na ke, mirovê ko toba xelkê qebûl ne ke, Xwedê jî toba wî qebûl na ke, mirovê ko di sûçên xelkê na bore, Xwedê di di gunehên wî na bore.

519 — Heçî ko ji xelkê xeyr û qenciyê dibînin û şikiriya xwe bi wî xelkê na kin, şikirdarê Xwedê jî na bin.

520 — Heçî ko li hemberê dijmina de

## ZILAMEK

Û

## ZIMANEK

Belê heke ew zilamê xurt û bi vên peyda bû zilamek dikare zimanekî jihevdeketî saz bike û carina zimanekî mirî vejîne. Herwekî emê niho bibêjin ew zilam peyda bûye û zimanekî mirî vejandiye û ew xistiye nav zimanên zindî, nav wan zimanên ko mirov pê daxêvin û mexsedên xwe pê eşkere dikin.

Me got zimanên mirî û zimanên zindî. Bêdîro, ji awtrê jiyînbariyê ve ziman ji wek mirovan û wek her heybera rihber dizên, dijtî û dimirin.

Ji zimanên mirî hin hene warkor û kordûnde diçin, di pey xwe re tu tiştî nahêjin; ne kél ne kitêb. Hinên din di pey xwe re eserine mezin, kitêbinê heja dihêlin û ew kitêb hetanî tro ji tene xwendin. Lê ew ziman bi xwe mirî ne, ji ber ko êdî ew ne zimanê devkî ne û tu kes bi wan napeyive.

Li Ewropayê latîni, li rohelatê nîzing ibranî zimanine mirî bûn. Latîni tro ji zimanekî mirî ye. Lê herçî ibranî êdî ne zimanekî mirî, lêbelê zimanekî zindî ye.

Belê ew mirovê bivên di nav cihyan de derket û zimanê ibranî vejand. Ibrani zimanekî samî, zimanekî kevnare, hevalê erebiyê ye. Tewrat yek ji çar kitêbên mezin pê hatiye gotin û nivîsandin. Bi tenê zanayan pê dizanin û di kîniştan de tewrat bi vî zimanî dihate xwendin.

Herçî cihî bi zimanine din, bi zimanên welatên ko tê de rûdiniştin xeber didan. Yanî cihyan zimanekî milî, zimanekî xweser nin bû û ji lewre wan bi zimanên xelkê xeber didan.

Di sala 1877an di şerê ûris û tirkî de zora tirkan çû bû û herçî milletên Belqanê hene ji bindestiya tirkan xelas bû bûn. Xe-

---

berê zimanandina neyara an kuştina xwe çok zimanê erdê û berê xwe ji dijmina na guhêrin, di gora xwe de na yin eşandin.

521 — Heçî ko bi zar û tewleyê dileyizin li ber Xwedê û pêxember asê dibin.

laskirina dewletên Belqanê nemaze bi destê çarê ûris çû bû serî û milletê ûris bi xwe bi vî îşî bendawar dibû û rojnameyên rûsî gelek qala dewletên Belqanê ên nû dikir.

Dî welatê ûris de xortekî cihî bi navê Elyêzer bin Yehûda hebû. Kurê Yehûda wek herkesî bi vî şerî hendewar dibû û didît ko milletên bindest wek Sirbistanê û Bîrxaristanê û ên mayî ji nîrê zorkerên xwe xelas dibûn û digihaştin îstîqalên xwe. Yehûda bi van bûyeran li miliyeta xwe hişyar dibû û li her halê milletê xwe diket. Yehûda didît ko balê milletê wî ji halê her milletê din xirabtir e. Cihî ne bi tenê bê welat û bê hikûmet in; lê zimanê wan ji nîne û bi zimanên xelkê xeber didin.

Xortê cihî qerara xwe da û di dilê xwe de got: divêt cihî vegerin welatê pêşiyên xwe; welatê kurên Israîl, û disan divêt ko cihîyan ji weke xelkê zimanekî hebe û tek de pê baxêvin. Ew ziman ji zimanê pêşiyân, zimanê ibranî ye.

Yehûda hîni zimanê xwe bû û di sala 1878an de qesta Parisê, qesta wî bajarê mevasuwîn kir.

Li Parisê, Elyêzer bin Yehûda têkill cihîyên Parisê bû. Elyêzer ji alîkî zimanê xwe pêş ve dibir û ji aliyê din fikrên xwe ên mill belav dikirin. Lê welatîyên wî bi xwe lê radibûn û heye ko digotin ev mirov din e. Lê Yehûda guh ne dida wan û ji esera xwe a mezîn re bi vênêke xurt û mezîn û bi serê xwe dixebitî. Yehûda kirî bû serê xwe ji milletê xwe ê bêzîman miletekî bizîman bîne pê.

Yehûda bi xwe hîni zimanê xwe, hîni ibranîyê bû bû. Niho diviya bû ibranîyê di nav civata milletê xwe de belav bike. Ji bo çandina tovê xwe jê re zeviyek diviya bû. Di sala 1881ê de Elyêzer keça mamosteyê xwe ji xwe re anî û berê xwe da Felestinê. Bi vî awayî jinîkek, hîmê xanimanekê, ketî bû destê wî. Zaro wê bidana pey. Yehûda, bi rê ve, di vapore de darsa jîna xwe got û hetanî ko gihastîne erdê Felestinê jîna wî hîni çend pîrsên ibranî bû bû.

Gava pê li erdê pêşiyân kirin Yehûda gote jîna xwe, ji niho û pê de emê bi tenê bi ibranî xeber bidin. Ibraniya jinîkê gelek hindik bû. Jinîkê kir ne kir. Lê mêrê wê ji qerara xwe ne geriya. Ne hewceyî gotinê ye

ko zaroyên Yehûda hetaîf ko bûne xort ji ibranîyê pê ve bi tu zîmanî ne dizantn û ji lewre di nav xelkê de lal dihatîne hesêb. Lê bi vê laliyê milletê cihî wek milletîne din bû xwediyê zîmanekî, xwediyê zîmanekî xweser.

Yehûda û xelkê mala wî di zîvariyê de dijîn. Lê çî xem. Ji fikirîne mezîn re fedakarîne mezîn divêtin. Ji ber ko xelk bi derbekê bîra fikîra mezîn nabe. Yehûda nanê tîsî dixwar lê gava didît ko xelkê mala wî bi ibranî xeber dida, bawer bikin, xwe bex-tiyartirê mirovên dinyayê dihesiband.

Dawiyê Yehûda rojnameke bi ibranî belav kir û ji xwe re xwendevan ji peyda kirin. Bi rê va û di hin dibistanên cihî de dest bi xwendina ibranîyê jî kirin.

Ji milê din Yehûda ferhenga milletê xwe cêdikir û hêjeyên ko di zîmanekî mirî de nînin ew jî pêk ve tanin. Zîmanê ibranî jî di nav cihîyan de belav dibû. Di sala 1922an de gava Elyêzer bin Yehûda mir zîmanê ibranî yê ko berî 30-40 salî zîmanekî mirî bû, bû bû zîmanê miletektî. Ev zîman îro di Felestinê û di rex erebî û îngiltziyê de zîmanekî resmî, zîmanê dewlet û hikûmetê ye jî.

Kurdîno, eve zilamek û zîmanek û tiş-tê ko bi vîna zilamektî tete pê. Di kar û biser-hatiya vî zilamî de pend û derseke mezîn heye. Herçî milletên bindest û bêzîman an bê zîmanê nivîskî divêt jê ibretê bigirin. Herçî em kurd, me zîman, me zîmanekî delal heye û em pê daxêvin û pîraniya me ji vî zîmanî pê ve bi tu zîmanî nizanîn. Bi tenê divêt em hîni xwendin û nivîsandina zîmanê xwe bibin.

Îro hînbûna xwendin û nivîsandina zîmanê mader ji bo her milletî edî ne bi tenê wezîfêke şexsî lê wezîfêke millî ye jî. Heçî bi vê wezîfê ranebûne wezîfa xwe a millî pêk ve ne anîne û bi kêrî milletê xwe ne hatîne. Ji bona ko mirov bikare xwe ji miletektî bi-hesibîne divêt bi kêrî wî bêt.

Piştî ko em kurd jî wek milletên din bûne xwediyê elfabeke xweser, xwendin û nivîsandina zîmanê me gelek hêsanî bûye. Tec-rîbê şanî daye ko li gora jîriya mirov kurd ji heftêkê heta çar heftan de dikarin hîni xwe-ndin û nivîsandina zîmanê xwe bibin.

Belê pîraniya kurdan bi tenê bi zîmanê awe ê mader dizanin û ji lewre li mal be ji derve be bi tenê bi kurdî dipeyivin. Lê di

## NIVISEVAN

NE DI ÇAPXANÊ LÊ DI QADA ŞER DE

Nivisevanên rojnaman di şerên berê de jî, bi ordiwan re, beta bi nizingî qada şer diçûn, di qerargahên fermanbaran de diman; û ji rojnameyên xwe re, nûçeyên şer bi telegrafê didan zanîn.

Lê di vî şerî de ev xudanqelem derbasî tixûbên xwe ên kevin bûne û nizingî li qadên şer kirine. Ev camêrên ha îro li balafir û cenkeştîyan siwar dibin û digel şerevaniyan xwe didin ber agirê şer.

Yek ji wan, yekî emêrikanî, bi navê Larî Elin, di krewzora inglîzî « Golte » de bû; gava balafir û noqarên elemani di avên Qêrewanê de, li Behra-spi, dirêjî wê kirine. Larî Elin biserhatîya xwe bi awayê jêrîn gîlî dîke :

Nivê şevê bû. Radyowa krewzorê da zanîn ko talûke nizingî bûye. Herçî topçî çûn û li ber topên xwe sekinîn. Ez di kebîna (mezela vapore) kumandar de nivistî bûm. Nobetdar ez hişyar kirim. Min lez da xwe û xwe gihandê hevalê xwe Eleksandr Henderson, mixabirê Royterê. Me her diwan piştên canxelas bi xwe ve kirin û di tariya şevê de hilkîşîyan pira vapore a jêrîn. Û jê, me berê xwe da pira jorîn. Em hêj ne gihastî bûn-ê, torpilek li paşîya krewzorê ket, pê û rivîni jê belav bûn û krewzor bi hejêke xurt hejîha. Heçko torpilan da bûn pey me. Gelek ne borî torpileke din li orta vapore ket. Qey brûskek li vapore keti bû. Dor ewçend bi

---

nav kurdan de hindikahiye kiçik heye û xelkê vê hindikahiye an di welatê xerîbiyê de bûne an îro tê de dijîn. Tiştê ko ji vê hindikahiye re divêt, heke bi zimanê xwe nizanin bert ewilî hîni wî bibin û piştê di nav mala xwe û bi zar û zêçên xwe re herweki Elyeyer dikir bi tenê bi kurdi xeber bidin.

Belê ji van kurdan re divêt, gava ji derve tene mal, herweki cilên xwe ji xwe dikin û wan bi cilên malê diguhêrinin, zimanê xwe ji welê biguhêrtin û bi zimanê kûçê di nav malê de naxêvin û zimanê malê, zimanê mader wek tiştêki miqedes hilînin.

HEROKOL AZÎAN

ronî bû bû ko çavên mirov pê kor dibûn. Torpila sisiyan li pêşîya vapore di bin birca topên pêşîn re ket. Ji pozê vapore duktî stûr û tari rabû. Krewzor gelek êşîya bû, qey dilê wê li hev keti bû; hew dikari bû ji piyan bisekine.

Min da eqlê xwe û dit ko êdî imkan ne ma bû ko ez xwe bigehînim pira jorîn. Ez bi şûn de vegeyriyam. Gava, devên topên aliyê çepê berê xwe didan ezmanan, ji aliyê rastê keştyê xwe xwîl kiri bû û noqî avê dibû,

Êdî tu wext ne ma bû ko ez wînda bikim; min da piştê xwe a kewçûk û ew nepixand. Krewzor li xwe qelibî; ez û çend sed zabîti û deryevan em têk de avêtine behrê. Heta hingê Henderson bi min re bû û em bi hev re keti bûn avê.

Lê jê bi şûn de em ji hev bi dûr keti bûn. Carekê bi guhê min ve bû Henderson hin tişt ji zabîtekl re digotin. Lê min ew seh ne dikirin; û ji hingê ve min Henderson ne dit.

Herçî ez; ez bi nîevaniyê nizanîm. Herçî piştê min a kewçûk ez jê ne gelek ewle bûm; tiştêki kevin bû; hebû ko di nav avê de biteqîya. Wê çî li min biqewimiya. Min ew pişt ji balafîlhilgira Ilîstriyûs girti bû. Li 10ê Kanûna-paşîn sala 1941, roja ko balafirên elemani bi ser Ilîstriyûsê de girti bûn û ew da bûn ber bîmban ez jî tê de bûm. Ez di van texmînan de bûm ko min hew dît ez di nav du diwarên avin de diqeliqim.

Herçî cenkeştî di nav pêlên behrê de wînda dibû û di paş xwe re, li rûyê behrê teweke donê e stûr berdida. Belê krewzor noqî avê dibû û dişewitî. Tirs kete dilê min: Agir biketa cebîrxane û depoyên barûtê em di nav behrê de ji dibûn piç û parî. Şikir ji Xwedê re tiştê ko hate bira min li me ne qewimî. Bi tenê dema ko Golte ji çavan wînda bû tiştêki tê de teqîya, lê teqîneke sivik; bêt ko zerer bigêbe me.

Hetanî ko min xwe careke din li rûyê avê dît min gelek av û don daxwari bû. Min piştê xwe li xwe şidand û li dora xwe fedkiri. Ruyê behrê ji serên mirovan tijî bû bû. Min cehda xwe dikir da ko ji cihê ko vapor tê de xerîqî bû ez xwe jê bi dûr xim.

Min dît ko çend deryevan hildikîşîyan ser mitorbotekê. Min bêz da xwe ko ez ji

xwe bigehnim wan û pê li tişteki lişk bikim. Bêfêde, ez careke din noqi avê bûm Ewçend av û don çû bûn hundirê min, min digot qey kezeba min wê biteqe. Min deng li dora xwe kir û got: hawar, hawar ....

Min da xwe, û careke din min ceriband ko ez xwe bigehnim filûqe û hilkişim ser. Lê ewçend peya lê siwar bû bûn ko heriya ko ez bigehim-ê, filûqe noqi avê bû û peya ji nû ve ketin behrê. Herçi ez disan noqi avê bûm. Gava avê ez ber bi jor hiltavêtim, serê min li tişteki lişk ket. Ew tişt filûqe bi xwe bû; ez lê siwar bûm û lê rûniştin. Hew min dît filûqe dahat; ez ji pê re. Min disan av û dona krewzorê daxwarin. Êdî di min de taqet ne ma bû. Pêlên behrê, bê hemde min ez dibirim û tanim.

Avê ez gihandim deryavanên krewzorê. Min ji tevgera wan zani ko hawara me hatiye; torpiyorên inglîzî di dora me de ne û li me digerin. Bi tûkesî re fanosê elêktirik an tişteki ronak nîn bû ko cihê me şani torpiyoran bide. Lê torpiyorekê heta 75 mêtiran nîzîngî li me kiri bû. Herkesî berê xwe da bû wê. Min ji da xwe ko ez ji weke wan bikim. Heyhat, pêlêke xurt ez jê bi dûr xistim û ez kişandim binê avê.

Lê nizanîm çawan bû, pêlêke din ez dam rûyê avê û ez gihandim heta torpiyorê. Piştî min li bedena keştiyê ket. Di şilahiya avê de qirika min ziwa bû bû. Lê dengê jê hat û min kire hawar û gazî. Bi min hesiyan. Dengê ji torpiyorê hat. Wi dengî digot: « Eve ji te re werisek, vî werist di bin çengên xwe re derbas bike û xwe pê girêbide, emê te bikişinin ». Min lê vegerand û got: « Ez nikarim, taqet di min de ne maye ». Di dora min de werisekî pls û genî / wek marekî digeriya.

Deryavanên torpiyorê got: « Hinik were pêş emê ji te re pêpelûkeke weris bavêjin pê re were jor ». û pêpelûk daxistin behrê. Di vê navê de qayîxek bi ser min de hat û sê çar çaran pozê xwe li min da. Min dida ber qîran û digot: « Kuro hêdî, we ez kuştim ». Ma kengê bi min dihesiyan. Peyayên wê pê li serê min dikirin û hi pêpelûkê re bi hewa diketin, hildikişyan torpiyorê.

Dawiyê min çengeki xwe di pêpelûkê re derbas kir û ez pê ve zeliqim. Lê min nikari bû ez bi hewa kevim. Laşê min giran bû bû; dest û lingên min ne diliviyân. Deryavanekî inglîzî bi navê Notî werisek di stoyê min re gerand, didowên din arikariya wi kirin, min ji arî wan kir, û nizanîm çawan bû; min carekê dît ez li ser pira torpiyorê me. Deryavanan ez girtim û deverê ez berdâm erdê, lingên min ber bi jor kirin, milên min dilivandin. Ji dev û difua min ava behrê zêt û dona krewzorê diheriki. Cilên min qedere sê tili don girtî bûn.

Gava çavê deryavanekî bi bazûbenda min ket bi madekî xweş qîr kir û got: « Eve yekî emêrikani ».

Ji ber ko nikari bûn cilên min ji min bikin ew çetandin û ez birim diwanxana xwarinê. Qezazedeyine din ji tê de hebûn; dîktor li wan miqate dibû Derziyek li min ji xistin. Qederê deh saetan ez raketi mam, bêt ko ez bikarim xwe têk bidim. Di van deh saetan de torpiyor û bertorpiyor li noqara ko em torpil kiri bûn geriyan; lê ew peyda ne kirin.

Torpiyora ko ez tê de bûm 100 û yeke din 75 zabî û deryavan xelas kiri bûn. Di Goltê de 580 peya hebûn. Di nav windabûyiyan de kumandarê krewzorê jî hebû.

Gava em gihastine Iskenderiyê min hêj nikari bû ez ji piyan bisekinim. Du zabî ketine bin çengên min û ez anîme bejê. Ez vê bendê li otelê û di nav cihan de dinivîsînim.

Herçî Henderson, mixabirê Royterê, ew jî di nav windabûyiyan de bû. Heyfa wî, zela nekî hêja û mêrekî qenc bû. Gava şerê behrê dest pê dikir Henderson hildikişiya serê pira keştiyê û di nav guleyên vapor û bim-beyên balafiran de disekinî û temaşa şerî dikir.

CEMİLÊ TACDO





## DÎWANA MELÊ

— 15 —

Bilbilê mecrûhê eşqê taqata xaran nehî  
Dê gulava rişê sine pişkokaan bê xarî bit  
Her dilê bazisîfet seyde de teyîxûnek hebî  
Fir-r û perwazê humayê pençeyê şenqal bit  
Yar divê hakim bitin qewlê reqîban guh ne kit  
Şahê mlkê dilherê dê failek mixtari bit  
Da bi zilmê qet ne sojî xenc û xet xalên di hûr  
Keyrixwahên dewletê mîr dê li wan guhdar bit  
Teyrê dil bê temhe ki nayête dest şehzadeyan  
Quşciyê şahin di dest wê li pey azarî bit  
Bendeyê ha xweyê bivê d' meyla sîm û zer ne kit  
Da elaya pîdîsahanê bê hed û hejmarî bit  
Sar dibît ma dil bi sed cewr û cefayên zer-reyek  
Eşqê tebiyet nar e hingî dê biçit dijarî bit  
Leşkerê alem meger yekser te dîmîn bin mela  
Xem bi mûyek nakîşîni ger te dilber yarî bit.

— 16 —

Qelbê me şîbih zêr e, ji feyza te cela girt  
Ma rûsiyeh û sifresêfet rengê sefa girt  
Teşbihî cedawîl me di nêv atesê eşqê  
Dilî qelbî heqîqet bi te eksîrî huma girt  
Salik kî ye hatî ji mecazê bi heqîqet  
Sûret ne şînasî û bi mana ne fena girt  
Tênhê ne li min lamibî bisna te şefeq da  
Alem bi xwe wê hisn û cemalî di xwe da girt  
Teyîxûn e di dest de û heye dewlet û iqbâl  
Herçî te bivê daw di tora xwe huma girt  
Canê xwe me kir daneyê dama ko vedayî  
Ahûsîfet ew pê hesiya rahi xeta girt  
Enqa ne şîkara kes e dafan tu biçîn ber  
Dafa ko tu l' enqa ko vedî badîhewa girt  
Herkes seherê talibî tişteki bi çimen hat  
Hin sosin û hin sinbil û hin zillê duta girt  
Destê me seher girt û birin seyrî hebîbê  
Filhal reqîbî ji hesed lîrêze û ta girt  
Ew keb kî xereman ko li kozê li qebo hat  
Şahîne qezayê bi tefâfîl jî xwe re girt  
Zînhare kesî dest bibit erqemî li ser wê  
Bi îşweyê lehlanîne bi tilsimê jiha girt  
Sebrê berê şîrîn e û istad xeber da  
Lew dil me bi tehlî û xeman xur-rem û şa girt  
Her neşter û şokên ko hebîbê me li dil da  
Min yek bi yek û têk li derdê xwe şîfa girt  
Aşîq jî xemê sayef mey came teleb kir  
Pir eqilî didêrid me ji qismê hukema girt  
Sef sef ne tenê gezme dibarin jî kevanan  
Dil kakilê zilfan jî kemendê bi teba girt  
Dîwane herî t-ê ne di vê silsilebendê  
Go misteheqî Xusrewê û xûban bi ceza girt  
Peyweste di fêris jî me re dê bertîzin dil  
Zilfan bi çep û rast li oxîlme cema girt  
Qewse du hilalan ko li ser birci esed bit  
Bû şîhre di amî ko li enğuştê nîma girt  
Şîhra te mela şîhrî şeker-rîz e bi mûcîz  
Zanim jî lebê lehîl te ew feyz û eda girt.

## REWŞA DINYAYÊ

ŞERÊ MANŞÊ — Manş ew behr e ko  
dikeve navbera Frensê û Ingilterê û Etlantika-  
navîn digehine Behra-bakur. Hin derên Manşê  
gelek teng in û ew di navbera Giravên Britanyê  
û Frensê de avtengekê diînin pê. Cihê wê ê  
tengtîr 34 kîlomêtir e. Di parastina Ingilterê  
jî êrişê biyaniyan de ehemiyeta Manşê gelek  
mezîn e. Nepolêon piştî ko Ewrope vegirt di-  
kir dirêjî Ingilterê bike, Nepolêon jî ber vê  
yekê stolek jî da bû çêkirin Lê plana wî  
jî ber Manşê, jî ber aveke 34 kîlomêtir dirêj  
ne çû seri.

Di vi şerî de jî gava balafirên elemanî  
bi çend litir benzîn diçûn û şev û roj li  
Londrê dixistin, armanca rastîn bivê nevé ve-  
girtina Ingilterê bû. Lê ev kar jî wan ne hat.  
Ji ber ko lingê wan digihaşt şilahiye û nikari  
bûn li ava Manşê derbas bibin.

Elemanî di behrê de kêmbibin jî çend  
cenkeştîyên wan hene. Ji wan cenkeştîyan  
sisê : Şernhorst, Gneyzênaw û Prins Ôgen, ev  
qederê salekê ye ji benderên elemanî bi dûr  
ketî bûn û di bendereke frensîzî, Brêstê, de  
diman. Brêst li roavayê bakurê Frensê ye û  
li ser pozektî ye. Ev poz ber bi Etlantikê ve  
dirêj dibe.

Balafirên ingilîzî di ser Brêstê re difri-  
yan û her û her li cenkeştîyên elemanî di-  
xistin. Li gorê gotina Mister Çorçîl jî 4000  
hêtir bimbe avêtine wan. Vegera van keştîyan  
Elmanyayê îşekî zehmet bû; an ewê di Man-  
şê re derbas biwan an derketana Etlantikê û  
di piştî giravên Ingilterê re xwe bigihandana  
Behra-bakur û bihatana welatê xwe.

Li 13ê Sibatê emîraliya ingilîzî da zan-  
în ko her sê cenkeştîyên elemanî bi bin  
himayeta torpiyor û bertorpiyor û balafirên  
de di Behra Manşê de xuya bûne û stol û bala-  
firên ingilîzî dirêjî wan kirinê. Şerek di nav-  
bera stol û balafirên de çêbû; îc-kenkeştîyên  
elemanî digel hicûma ingilîzan di avtengê re  
derbas bûne û xwe gihandine benderên we-  
latê xwe.

Jî ber ko serdestiya behran di destên  
ingilîzan de ye ev kar jî elemanan re miwe-  
feqiyetek hate hesabandin. Xelkê Ingilterê jî  
vi îşî enfrine kasûlî bi aliyê hikûmetê ve dane.  
Di meclisê de mînaqesêk di vê babetê de



çebû û Mister Çorçil got ko ne diviya bû ev cenkeştî bi selamet di her peravên Ingilîterê re biborin; lê diviya bû ew bihatana bin av kirin. Serekwezîr dibêje; digel vê hindê ev bûyer di lêhê me de ye. Ji ber ko bi vi awayî ev cenkeştî ji Etlentikê bi dût ketine û ji ber riya vaporçefleyên me rabûne; û ji milê din di benderên elemani bi xwe de ji me re armancine nû anîne pê. Di dawiyê de Çorçil ji meclîsê re dî zanin ko heyetek dê bête teşkil kirin û ev heyet li ser vê mesele wê tehqîqatê çêke da ko bête zanin heke kasûlî heye û heke heye berpîrsiyar kl ne.

**ŞERÊ SENGEPORÊ** — Di şerê Pesifikê de yek ji armancên japonan ên bingehîn ke-  
 Jaha Sengeporê bû. Me ehemiyeta Sengeporê di hejmarên pêşin de gotî bû. Japonan piştî ko nivgîrava Malêzyayê bi temamî vegirtî li 9ê Sibatê esker derxistê Sengeporê û dirêji kelehê kir. Ingilîzan gelek li ber xwe da. Şer şeş rojan dom kir û li 15ê Sibatê fermandarê ingilîzî jî fermandarê japonî re da zanin ko ordîwa ingilîzî dike teslîm bibe û di wê rojê de ew asêgeba giranbeha kete destê japonan û bi vi awayî jî şerê Pesifikê birê pêşîn gihaştê dawiyê.

Ketina Sengeporê, bivê nevē, ingilîzan eşand û di meclîsê de di vê babelê de gelek dan û standin çebû. Mister Çorçil bêt ko ehemiyeta vê bûyerê veşêre, jî meclîsê re da zanin ko ji roja ko stolên emêrikani û ingilîzî di Pesifikê de şikeştî bûn û serdestiya behrê ketî bû destê japonan qedera Sengeporê xeternak xuya dikir. Ji ber ko Sengepor wargehekî behrî bû û bêt stolê nikarî bû, weke xwe, hête midafehe kirin.

Piştî Sengeporê japonan avête ser giravên Cave û Simatrayê; her du giravên Hindîstana holendî. Ji çar giravên Hindîstana holendî ên bingehîn a meztir û jî awirê eskerî ve bîhemiyetir Cave ye. Ji milê din Cave dikeve bakurê roavayê Ewîstralayê jî. Ji xwe qerergaha genêrat Wêvel serfermandarê qewetên sondxwariyan yên Pesifikê jî li vê giravê ye.

Di pey Sengeporê re japonan berda Simatrayê û bi peraşûtan esker daxistine Palembangê. Birên petrolê yên Hindîstana holendî di Palembangê de ne. Lê holendîyan beriya ko xwe jê bikişin agir berdan wan biran

û herçî avahiyên wan, berhewa kirine. Japonan bi vaporan jî esker derxistin beja Simatrayê û van eskeran xwe gihande eskerên ko bi peraşûtan daketine giravê. Şer di navbera japonî û holendîyan de dom dike. Lê şerê mezin di girava Cavê de wê çêbihe. Nifûsa Cavê 42 milyon e û giraniya qewetên holendî di vê giravê de ye. Ji milê din li gora hin nuçeyan ingilîzî û emêrikaniyan jî esker rêkirine Cavayê. Japon bi balafirên li Cavê didin lê lej ne ceribandine ko esker derînin bejê.

Herçî Ewîstralayê ye, japonan avête ser wî welatî jî. Balafirên japonî çar-çar li wargehên giravê didin. Li 19ê mehê japonan esker derxistê girava Timorê jî. Bi vegirtina Timorê japon çetir nîzingî li Ewîstralayê dikin. Ji xwe Ewîstralayê xwe kar dike. Hikûmeta Ewîstralayê heçî çekhilgir hene banî wan kirine. Wer dixuye ko Emêrike bi xurtî arikariya Ewîstralayê dike. Heye ko hin çek û eskerên emêrikani gihaştî bin Ewîstralayê. Lê îşê Ewîstralayê îşekî zehmet e. Ewîstralayê welatekî mezin û bîpîvan e. Rûyê erdê wê digel Tesmanyayê 7704000 kilômêtir çarçik e; 15 caran bi qasî Frensê mezin. Ji lewre vegirtina wê dişwar e. Pîsporên eskerî bawer nakin ko Japonye bikare vi barî jî hilgire.

**BİRMANYE** — Piştî ketina Sengeporê japon gelek zorê didin Bîrmanyayê jî: Bîrmanyê du ehemiyetên mezin hene. Bertî her tiştî Bîrmanyê dev û deriyê Hindîstanê ye. Ji milê din riya Bîrmanyê, yanî riya ko Çîna nevirgtî digehine behrê tê re derbas dibe. Ji xwe heke Çîn ev pênc sal in şerê japonan dike xêra vê riyê ye. Çekên emêrikani di vê rê û di erdê ingilîzî re digiha Çenkeyşek. Vê paşiyê japonan, piştî ko di Bîrmanyayê de, Merteban jî xistine destên xwe rast, bi rast dirêji Rengûnê, paytêxte Bîrmanyayê û serê riya Bîrmanyê kirine. Li gora danezanên 24ê mehê japonan di hin deran de qedere sed kilômêtirî û jê kêmîrî jî nîzingî li Rengûnê kiriye.

Ji ber vê yekê riya Bîrmanyê ketiye bin xeterê. Eskerên ingilîzî digel eskerên çînî, yên ko vê paşiyê hatine Bîrmanyayê jî bo parastina Rengûnê gelek li ber xwe didin. Digel vê hindê ingilîzî û çînî jî niho de li şûna riya Bîrmanyê dest bi çêkirina reke din kirin.

riye. Ev rê wê di Kelkûtê re derbas bibe û Behra-hindî wê bigehîne Çînê. Ev rê di ser û di nav newelîne kûr û çiyayîne asê re wê derbas bibe. Lê wer dixuye ko di vê nîzlagahiyê de rê wê teman bibe. Ji ber ko bi hezeran çîni li ser dixebitin. Çimkî heke rîya Bûrma-yê kete destê japonan Çîn ji behrê wê qut bibe.

**ŞERÊ LIBAYÊ** — Herwekî xwendevanên me dizanin Romel ji Egêlê li neyarên xwe vejeriya û li 6ê vê mehê gihaştî bû nîzîngî Xezalê. Li vê derê sekîni û ji hingê ve xwe tev ne da. Herkesî hêvî dikir ko Romel dirêjî Tobriqê jî bike û wê bixwaze ji nû ve xwe bigehîne tixûbên Misrê.

Herwekî Romel xwe tev ne da, inglîzan jî dirêjî wî ne kir Giraniya her du ordîwan jî hev dût in; bi tenê mifrizeyîne mî-torkîrî carîna li hev didin û balafirên her du alîyan benderên hev didin ber bîmban. Herçî girava Maltê balafirên elemanî û talyanî bêtir li wê didin. Li behrê jî şerî çêdibin. Ev şer jî bo binavkirina vaporen hev e. Herçî dewletên mîhwerê, ji ber ko di hejê re nagehin Efrîqê çek û eskerên xwe di vaporan de û di rîya behrê re ditînin Libyayê.

**ŞESÊ ÛRIS** — Ev şer rehma berf û baran û sermayê dom dîke û wer dixuye ko Zivistan li ûrisan têt. Ji ber ko ûris jî pêşîya Zivistanê ve dev ji êrişê bernedan. Herçî eleman di hin cihan de xwe ji nû ve didin paş û bi gelemperî şerêkî mîdefîhê dikin.

Li gora danezanên rûsî jî 20ê vê mehê ve ûrisan çend bajarên din bi şûn de vejerandîne. Lê danezan wan bajarên bi nav nake. Li 23ê mehê danezaneke rûsî dida zanin ko di eniya Smolenskê de eleman rahûne hîcûmîne xurt, lê ûris ew hîcûm sekiwandîne û eleman bi şûn de vejerandîne.

Li 24ê mehê radyowên Mosko û Londrê dane zanin ko ûris ketine hundirê Xerkovê û ûris û eleman di kûçeyên bajêr de li hev didin.

Disan wan radyowan got ko ûrisan ji Leningradê dirêjî xetên elemanî kiriye, ew şkenandîne û şer di istîhkamên elemanî de dom dîke.

Şam : 25 Sibat 1942 NÊREVAN

## BINGEHÊN GRAMÊRA KURDMANCI

BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHRIVAN

— 11 —

### PRONAVA BERBIHEVÂN

90 — HEV, ÊK.

Pronava berbihevîna ew pronav e ko di qisetê du kesên tével bi hev re dinimîne û li şûna wan dikeve. Ferqa vê pronavê jî yên din ev e ko pronavên din bi tenê kesekî (kesê pêşîn, kesê diwim an kesê seyim) dinimînin. Herçî pronava berbihevîna divêt du kesan an sê kesan bi hev re binimîne; an jî kesekî çend peyan. Ev pronava ha tucaranîkare kesekî bi tenê binimîne. Herwekî li jor têtê ditin ev pronav du şikil hene : hev û êk. Şikilê paşîn « êk » bi tenê li nivro-rohelelatê Kurdistanê de têtê gotin.

Me got ko ev pronava li du an sê kesên tével dinimîne. Bêdîro, gava em « em brayên hev in » an « em brayên êk in » dibêjin pronava berbihevîna; li gora hazîrbûnê kesan du an sê kesên tével dinimîne. Heke yên hazîr « ez » û peyaktî din e « hev » kesê pêşîn û diwim û heke yên hazîr ji du kesan bêtir in, hingê « hev » her sê kesên qisetê dikare binimîne.

1 — Yên hazîr « ez » û peyaktî din e. Hingê komeka « Em brayên hev in » mana jêrîn dide : Ez brayê te me, tu jî brayê min i ».

2 — Yên hazîr « ez » û peyayîne din in. Hingê komeka « Em brayên hev in » bi awayê jêrîn têtê mana kirin : Ez brayê we me, hûn jî ( yanî tu û ew ) brayên min in.

Çend misalên din. Medhelokê gotiye : « Kalo ji hêkesî, pirê jî bînefsî her diwan li hev pîrsî ». Di vê medhelokê de « hev » jî kesê seyimê du mirovan dinimîne : kalo û pirê. Heke me medhelok jî hev de xist mana jêrîn jê bi der têt : Wî ( kalo ) li pirê pîrsî; wê « pîrê » jî li kalo pîrsî.

Dijmînan xar berda hev. Yanî wî aliyî berda wî aliyî û wî aliyî jî berda wî aliyî.

Em du heval in û em jî hev ne razî ne. Yanî ez jî wî ne razî me, ew jî jî min ne razî ye.

## PRONAVÊN LIHEVXISTI

91 — Ev pronavên ha herwektî di mada 76an de hate gotin bi libevxistina hin daçekan bi hin pronavan hatine pê û li gora pêkhatina komekê ev wan daçek û pronavan dinimtin Herçî daçek « ji, li, bi, di » ne. Herçî pronav an « vî, vê, wî, wê » ne, an « hev, êk » in. Ji lewre ev pronavên ha du tofan ditnin pê.

92 — Tofa pêşin jê, lê, pê, tê.

Min jê stand : min ji vî stand, min ji wî stand, min ji vê stand, min ji wê stand.

Ez jê distînim : ez ji vî distînim, ez ji wî distînim, ez ji vê distînim, ez ji wê distînim.

Min lê pîrsî : min li vî pîrsî, min li wî pîrsî, min li vê pîrsî, min li wê pîrsî.

Ez lê dipîrsim : ez li vî dipîrsim, ez li wî dipîrsim, ez li vê dipîrsim, ez li wê dipîrsim.

Min pê karî bû : min bi vî karî bû, min bi wî karî bû, min bi vê karî bû, min bi wê karî bû.

Ez pê dikarim : ez bi vî dikarim, ez bi wî dikarim, ez bi vê dikarim, ez bi wê dikarim.

Min tê da : min di vî da, min di wî da, min di vê da, min di wê da.

Ez tê didim : ez di vî didim, ez di wî didim, ez di vê didim, ez di wê didim.

Herwektî ji misalên jorin ve dixuye ev pronavên ha bi tenê yekejmarê dinimtin û nikarin bikevin şûna gelejmarê. Ji lewre li şûna « min ji wan stand » « min jê stand » nayeke goin.

93 — Tofa diwim : hev — jêk, lev — lêk, pev — pêk, tev — têk.

Me hev — jêk stand : me ji hev — êk stand.

Em hev — jêk distînin : em ji hev — êk distînin.

Me lev — lêk pîrsî : me li hev — êk pîrsî

Em lev — lêk dipîrsin : em li hev — êk dipîrsin.

Me pev — pêk nikarî bû : me bi hev — êk nikarî bû.

Em pev — pêk nikarin : em bi hev — êk nikarin.

Me tev — têk da : me di hev — êk da.

Em tev — têk didin : em di hev — êk didin.

( dûmahik heye ) C. A. Bedir-Xan

## BIRÊ FRENŞIZI :

### BAVÊ EMÎN

La chanson que nous présentons aujourd'hui aux lecteurs de Hawar a été transcrite d'un disque Odéon enregistré par la cantatrice kurde Miryam Khanoum, originaire du Bolân (tribu Jéliyan).

Le poème relate la mort de Ahmad agha, ancien chef des Remân, qui, après avoir passé la majeure partie de sa vie en lutte ouverte contre l'autorité du Sultan, finit par tomber au cours d'un engagement avec les forces gouvernementales. Lors de la disparition d'Ahmad agha, son fils aîné, Amin, était encore trop jeune pour lui succéder. Ce fut donc Perikhân, la femme du défunt qui prit à sa place le commandement de la tribu.

Aussi intelligente et courageuse que jolie, elle continua de mener le combat contre le pouvoir central, avec encore plus d'acharnement que n'avait fait son mari. Elle montait à cheval, portait les armes, et marchait à la tête de ses guerriers, accompagnée de dengbêj (poètes populaires) qui chantaient ses exploits. Sa réputation ne tarda pas à éclipser celle d'Ahmad agha, dont les enfants ne furent bientôt plus connus que sous le nom de "fils de Perikhân" personne n'appela jamais Amin, l'aîné, autrement que Eminê Perixanê, ce qui d'ailleurs, lui déplaisait fort.

Après avoir participé à la révolte de 1925, Amin se réfugia en Syrie avec sa mère. Tous deux rentrèrent en Turquie, lors de la proclamation de l'amnistie de 1928; mais le jeune agha des Remân fut presque aussitôt abattu par des gendarmes turcs. Perikhân mourut quelques années plus tard.

Actuellement, l'aîné des enfants d'Amin se trouve en Syrie, et malgré tout le déplaisir qu'il en éprouve, ses compatriotes continuent à joindre au sien le nom de sa grand-mère (1).

Le cas de Perikhân n'est pas unique dans les annales kurdes. Elles conservent au contraire le souvenir de nombreuses femmes énergiques qui surent prendre en main les destinées de leurs tribus, et dont le rôle politique eut souvent plus qu'une importance locale. L'un des personnages les plus influents du Kurdistan irakien était, durant la dernière guerre, la fameuse Adela Khanoum, avec laquelle nous ont familiarisé les voyageurs anglais.

DIYA FERZO

Lê Dayé . . . . .

Lê dayê, dibê sibe ye, baki sera w' aġao vè sibê li min saa tê.

Dengê top û cebirxana li dora qesra havê Emin çarnîkar tê.

Derbeka lédane havê Emin, way li min por bikurê w'ezê!

Çardara havê Emin girédane bi şelîtê, bi merbetê, bi reqeta mêra her bi mal tê.

De w'ezê çîqa xiyala xwe didim devê vè birinê, wezîro, vè sibê xwîna sar tê.

..

Lê Dayé . . . . .

Dibê sibê ye, aġao vè sibê, sibê ye, vè sibê baki sera li mi sar e.

Dengê top û cebirxana li ser singa havê Emin, wezîro, vè sibê çarnîkar e.

Çardara havê Emin girédane bi şelîtê; vè sibê bi beraqê tavê re her bi mal e.

Ferman e, ferman e, aġao ferman e.

..

Lê Dayé . . . . .

Dibê Dar û kursî xopâna koza şewitt Dar û kursî!

Dibê heçî jî wê ve hatî min por bi kura Xwedê vè sibê jê pirsî.

Derbeka lédane havê Emin simbelê zersosinê

Lê, Xwedê zanê, vè sibê di nav xwîné digevîzi.

### TRADUCTION

O ma mère, ô ma mère !

Ce matin, souffle sur nous, ô mon agha, un vent froid qui vient du sérail (2).

Le grondement du canon, le fracas des obus retentissent autour du château du père d'Amin. Ils ont touché le père d'Amin ! Malheur à moi, infortunée aux cheveux coupés court ! (3)

On a lié le père d'Amin sur la civière, avec des cordes et des entraves. Voici son brancard qui s'avance vers la maison, suivi de quelques hommes.

J'ai beau regarder, ce matin, les lèvres de cette blessure, ô mon vizir (4), je ne vois couler qu'un sang glacé !

..

O ma mère, ô ma mère !

Ce matin, souffle sur moi, ô mon agha, un vent froid qui vient du sérail.

Ce matin, le grondement du canon, le fracas des obus retentissent tout autour de la poitrine du père d'Amin, ô mon vizir !

On a lié ce matin le père d'Amin sur un brancard, avec des cordes. Le voici qui s'avance vers la maison, aux premières lueurs du soleil ! Nous sommes proscrits, ô mon agha, nous sommes proscrits, proscrits ! (5)

..

O ma mère, ô ma mère !

Maudit Dar û Kursî ! Puisse le feu te brûler, Dar û Kursî (6) !

Ce matin, malheureuse aux cheveux coupés court, j'ai interrogé tous ceux qui venaient de là-bas

On m'a répondu : " Ils ont touché le père d'Amin, le guerrier aux moustaches dorées comme les lis.

Sans doute ce débat-il au milieu de son sang, ce matin ! "

### NOTES

(1) Il est à noter que beaucoup de filles venues au monde dans les tribus voisines des Remân, à l'époque de Perikhân, ont reçu à leur naissance le nom de cette dernière.

(2) C'est à dire : le gouvernement exerce ses repêrailles contre nous.

(3) En signe de deuil, les femmes se coupent les cheveux et se répandent des cendres sur la tête.

(4) On donne souvent aux bons guerriers les titres de vizir ( ministre ) ou mir ( prince ).

(5) Ferman : décret impérial. En kurde, ce mot s'emploie le plus souvent dans le sens de " proscription ".

(6) Nom de lieu. Sans doute celui de l'endroit où se déroula le combat fatal à Ahmad agha.



## Kitêbxana Hawarê .

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdi . C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelnine Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Bîyîşa Pêxember. Bi Kurdiya dumili, bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re
- 7 C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikitin
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdi Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10— Xwendina Kurdi Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11— Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12— Dersên Şerietê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13— Çarînên Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14— Proverbes Kurdes . Medhelokên Kurdî  
Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-Xan  
Paris - 1937
- 15— Le roi du Kurdistan . Qralê Kurdistanê .  
Emir K. A. Bedir-Xan û Adolphe de Falgerolle . Paris - 1937
- 6— Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdistanê.  
Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel  
Berlin - 1937
- 17— Der Schnee Des Lichtes . Berfa Ronahiyê  
Şîhrên Kurdi Prinz. K. A. Bedir-Xan û  
Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Sali	500	Qirûşên Sûri
Şeşmehi	300	Qirûşên Sûri
Sêmehi	200	Qirûşên Sûri

---

Xwedî û gerîndeyê herpirsiyar : Mir Celadet  
Alî Bedir-Xan . Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire : Emir Djêladet Aalî  
Bedir-Xan. Damas—Syrie

SAL 10  
HEJMAR 41  
-----  
YEKŞEMB  
15 ADAR 1942

# HAWAR

ANNEE 10  
NUMERO 41  
-----  
DIMANCHE  
15 MARS 1942

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARÊ

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Marş	Nami
Destbost	Mişo
Ûkranye	Xelîlê Genco
Ji ezmanan	Silêmanê Ferho
Hindik Rindik	Xeberguhêz
Dîwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Ĥedisên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Rewşa dinyayê	Nêrevan

## ★ BIRÊ FRENSÎZÎ ★

Chahino	Tawûsparêz
Quelques Chonsons	Tawûsparêz

ŞAM—1942  
ÇAPXANA SEBATÊ





## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### TEFSÎRA QURANÊ

20 Ko Cihî û Filan di heqê din de berberiya te kirin; bêje wan: Min xwe û bindestên xwe spart Xwedê. Ji nezanan bipirse: Gelo we baweriya xwe aniye? Heke gotin belê, ew ketin ser riyarastiyê; heke gotin na, bizane ko wacibê te agalkirina wan e. Xuda emelên evdên xwe dibîne.

21 — Yên ko ayetên Xwedê inkar kirine û pê kafir bûne û bê rê pêxemberên Xwedê kuştine û dest bi kuştina şretkerên riyê Xwedê kirine; bila bizanin .... Ji bo wan ezêbekî dijwar heye.

22 — Emelê wan bi kêri dinya û axiretê naye, halê wan li her du dinyayê xirab e û kes nikare wan ji ezabê Xwedê bifilitîne.

23 — Ma tu wan nabînî ... Ew cuhiyên ko, ji kitêba Xwedê xudanbehr in, li ser meselekê li hev nekirin û gava ji bo helkirina wê meselê, li gora kitêba Xwedê, me bani wan kir, birekî ji wan kitêba Xwedê avêtin piştguhê xwe û jê xwe dane paş.

24 — Ji her ko wan digot: Agir bi tenê di rojên hejmartî de dest bi me dide û wan bi vê gotina bêesas nefsmezinî dikir û pê nefa xwe dixapand.

25 — Gelo halê wan çito bibe .... Di wê rojê de ko di hatina wê de tu şik nîne; gava em wan dicivînin û tê de her kes bi kedê xwe berpirsîyar dibe û neheqî nîne û naye kirin.

26 — Pêxemberê min ... Bêje: Xu-

dayê min, tu xudanê milkê şahî û dewlêmendî yî, tu ji kîjkî re dixwazî padişahiye didî û ji kîjkî dixwazî padişahiye distîni, her kesê ko dixwazî serfiraz û serbilind dikî û her kesê ko dixwazî reben û şermisar dikî, qencî di destê te de ye, tu bi her tiştî dikarî, ê xudanqurdet tu î.

27 — Bi fermana te şev digehin rojê û roj digehin şevê, û ew hin kurt û hin dirêj dibin; tu ji miriyan saxan û ji saxan miriyan dertîni. Ji kîjkî re dixwazî bê hesab mal û milk didî. [1]

28 — Nabe ko mirovên bawermend dest ji misilmanan herdin û ji xwe re kafiran bikin hevalbend û arîkar.

Yê ko wisa kiriye li gora emrê Xwedê ne meşiyaye; neger ko cih li we teng dibe û hon bi wan re midarayê dîkin. Xwedê, emrê xwe pêş we dike û we bi ezabî ditirsîne; guh bidin ê. Dergehê we dergehê Xuda ye. Dergehê we ê paşin, dergehê Xuda ye.

29 — Bêje; Tiştên ko hon di dilê xwe de vedîşêrin an eşkere dîkin, Xuda pê dizane. Her tiştên erd û ezmanan jê re xuyani ne. Xuda bi her tiştî dikare, yê xudanqurdet ew e.

30 — Di roja piştawiyê de, her kes kedê xwe ê qenc û xirab di ber xwe de wê bibîne û ji xwe re dê bêje: xwezî emelê min ê xirab nîzîkî min ne hata. Xwedê dixwaze ko hon dest ji

[1] Ko. Xwedê da napirse tu kurrê kê yî.  
MEDHELOK

gunehan berdîn. Xuda bi evdên xwe re mihriyan û dilnêrm e.

31 — Pêxemberê min ... Ji Cihî û Filan re bibêje: Heke hon ji Xwedê hez dikin, werin bîndestîya min bikin, dako Xwedê jî hejî we bike û di gunehên we bibore. Xuda ewî û toban dide, Xwedê piyar e.

32 — Bêje ... Bîndestîya Xwedê û pêxemberê di wî bikin, heke hon xwe jê didin paş, bizanin ko Xuda ji kafîran hez nake.

33 — Xuda Adem, Nûh, Malbata-Ibrahîm û Imran ji bo erd û ezînanan bihartine.

34 — Ew hemî ji çêliyekê ne, ji xwîn û rayekî ne. Xuda dibihîse û Xwedê zana ye.

35 — Binin bira xwe ... Jina Imran ji Xudanê xwe re gotî bû: Xudayê min, ev zaroyê ko hêj di maka min de ye, min ji te re nezîr kirîye, tu wî ji xwe re qebûl bike; ji ber ko tu gotina min dibihîstî û qesda min dizanî.

36 — Gava jina Imrani zaroyê xwe anî û dît ko keçîkek e, dilê wê şikiya û got: Xudanê min, min keçîkek anî.

Xuda zanî bû çî zaye, ji xwe keçîkek ne kurek e.

Jina Imran got: Min navê wê kir Meryem; û min keça xwe û çêliyên di wê, bi te sipart, Xudayê min, wan ji Iblîsê recimkirî bisitirîne.

37 — Xuda Meryem bi awakî delal qebûl kir û wî ew bi xweşî da xweyî kirin û Zekerîya bû bergerê wê. Her cara ko Zekerîya diçû balê, didît ko cem Meryemê zad û fêkî peyda dibûn. Zekerîya jê pirs kir û got: Lê Meryemê, ev zadê ha ji kû tê? Meryemê got ê: Ev zad ji bal Xuda ve ye, ji ber ko Xuda ji her kesî re ko dixwaze rizqekî bêhisab dide.

38 — Zekerîya hema derbasî hundirê mezela xwe bû û got: Xudayê

## MARŞ

Xortên kurdan tev de rabin, dil şad û xweş  
Em kurên Kurdistan in her bijin bijî  
Her bijî Kurdistan her bêjin bijî  
Ev welatek pir şêrin e her bêjin welat  
Rêherên xwînros in bo jina welat  
Her bijî Kurdistan her bêjin bijî  
Serbilindî kes nabinê bê rojên dijwar  
Wek şêrên birindar in bo te ne xwînaxwar  
Her bijî Kurdistan her bêjin bijî  
Roja cengê em tev mêr in şagirtên Rostem  
Serbestî doza me ye heroj û her dem  
Her bijî Kurdistan her bêjin bijî  
Welatê me pir hêja ye terka wî nakin  
Ger di vê rê de îro em can fîda kin  
Her bijî Kurdistan her bêjin bijî.

NAMÎ

min, ji kerema xwe ji min re zarokekî çak bide, ji ber ko tu diayan dibihîstî.

39 — Ew hêj di mihrabê de disekinî û nimêj dikir ko Cebrail banî wî kir û got: Xuda ji kerema xwe bi Yehyâ mizgîniyê bi te dide, Yehya tesdîqdarê hatina Îsa pêxember ji bal Xwedê ve ye. Yehya ji mirovên salih re dê bibe pêxemberk, û wê bibe zelamekî pehrizkar û mezinê miletê xwe.

40 — Zekerîya lê vegerand û got: Ma çawan ji me zarokek çêdibe, ez pir im û jina min stêwr e. Cebrail got ê: Emrê Xwedê ev e; û Xuda her çî ji dixwaze dike.

41 — Zekerîya got: Xudanê min, delîlekî pêş min bike da ko ez bi avîsbûna jina xwe bawer bim.

Xuda got ê: ka ji te re delîlek; tu ê sê roj bêdeng binînî, lal bibî û bi xelkê re bi îşaretan bipeyivî.

Navê Xudanê xwe her bine bira xwe û şev û roj dest ji kişandina tesbihê bermede.



## DESTBOSÎ

### JI APÊ MIN NÛREDÎN RE

Ji bo apê min Nûredîn dilovan  
Hero sed Hatem û Kawis hi heyran  
Selavan ez bi gulavê dinosim  
Bi lêvên xwe du destên te dibosim  
Li Bêrûtê tu mayî yan li Parêz  
Min resmê te şev û ro kiriye himbêz  
Bi vi dengê xwe ê ziz dinalim  
Wekî Ferhad û Mecnûn ez dikalim  
Hezar û neh sed û sala çil û yek  
Me jî noşî meya işqê peyalek  
Min zanî derdeki dijwar giha min  
Hemî xort û heval û hogirê min  
Bi xwe ez bi ehwalan nizanim  
Belê derdê dilê bavê xwe zanim  
Çiko rokê min jê re gotî babo  
Xeberdanên te ez solim bes e lo!...  
Digotî min kurê min tu nizanî  
Ji apê xwe bipirse ew dîzanê  
Ne ez tenha bi vî derdî birindar  
Hemî lawanê kurdi bûne xwinxwar  
Cegersoj in birindarên evin in  
Divên rokê welatê xwe bibinin  
Min got derdê we êşek pir xedar e  
Bi vî rê de kesê bimirê ne ar e  
Meger zahir biçûk im, lê dibinim  
Li kovara Hawarê ko dixwinim  
Hene tê de kelam û şîhrên mewzûn  
Gelek bêtir ji apê min Cegerxûn  
Ewî masa peyala işqê dani  
Bi navê rêberê seydayê Xanî  
Kesi wek wî ne noşî mey ji camê  
Berî herkes bi şîhrê çûye damê  
Bi te ey şandiyarê rohelatê  
Dikin fexrê bi wî kar û xebatê  
Te pir wek min ji xabê kirne hişyar  
Eger çerxa felek bo me bibe yar  
Bijî apo bi van rojên ciwani  
Bijî dîsa bijî apo tu kanî  
Mişo me ez li zanistê me sami  
Li te pirsê dikê bavê min Namî

## ÛKRENYE

Di şerê ûris û elmanan de navê Ûk-  
ranyayê gelek caran tête gotin. Di vî welatî  
de şerine mezin çêbûne û iro jî çêdibin. Ji  
lewre me xwest xwendevanên Hawarê li hin  
tiştên vî welatî ser wext bikin.

Ûkranye dikeve nivroyê welatê ûris. Rû-  
yê erdê wê 443000 kilomêtir çarçik e. Ji  
Frensê hinek kêmtir. Ruyê erdê Frensê 551000  
kilomêtir çarçik e. Erdê Ûkranyayê ji nivro  
digihe heta behra reş. Ji aliyê rohelê tixûbên  
wê diçin heta Qevqasê. Di aliyê roava de  
welatên Polonye û Romanyayê hene. Herçî  
tixûbên bakur bi erdê Rûsya spi dorgirtî ne.

Erdê Ûkranyayê erdeki raşt e, tev be-  
ristan e, bi tenê aliyê nivro de hin cihên  
biлинд hene.

Çemê Dinyeper di nivê vî erdî re di-  
bore û welat dike du perçeyên wekhev. Di-  
rêjahiya Dinyeper 2250 kilomêtir e. Çemên  
wek Birbiyat, Dêsna, Bûg, Donz û Dinyester  
dikeyn Dinyeperî.

Cimhûriyeta Ûkranyayê a sovyetî bi heşt  
mintaqê an wilayetan par dibe: Kiyêv, Çer-  
nigof, Odêse, Donz, Xerkov, Dinyepetrovsk  
û Moldavye. Kiyêv payitextê Ûkranyayê ye.

Di erdê Ûkranyayê de her textî maden  
hene: Xwê, bismûlt, zeybeq, mengenez, kuf-  
rit, lîmf, û di mintîqa Donbasê de komira  
kevir.

Di Ûkranyayê de nemaze komira kevir  
û hesin zehf in. Di mintîqa çemê Donz de  
rûyê kanên komira kevir 23000 kilomêter  
çarçik e. Di sala 1937an de ji van kanan 71  
milyon ton komir hatiye derêxistin.

Di mintîqa Çemê Donbas de kanên  
hesin gelek dewlemend in. Di sala 1937an  
de ji van kanan 21 milyon ton hesin derê-  
xistine. Kanên Korskê ji wan jî dewlementir  
in. Hesinê van kanan bi tenê jî hemî hesi  
nê dinyayê bêtir e.

Herçî fesfor û mengenez di Ûkranya  
rohelat de boş in.

Axa Ûkranyayê, axeke reş e hûr e. Li  
Ewropayê ji erdê Ûkranyayê çêtir nîne. Di  
zemanê bolsêvikiyê de cotkariya Ûkranyayê gelek  
pêş ve çûye. Di sala 1938an de zadê Ûkran-  
yayê ji hemî zadên Elmanyê, Polonye û  
Meceristanê du caran bêtir bû.

MIŞO



## J I EZMANAN

HETA ÒNIYA BEHRÉ Ò JÉ LI RUYÉ ERDÉ

Di vi şeré mezin de hivé nevê tiştine mezin û nedîtî diqewimin. Lê em bi hêtirê wan nahesin. Ji ber ko yên ko ew tişt li wan diqewimîne pericar pê dikevin û dimirin. Lê hinên din heta bi guhên me ve dibin.

Herweki xwendevanên me dizanin şerê girava Giritê şerê ecêb û xariqilade bû. Elman di ezmanan re dihatin û pê li erdê dikirin. Ingiliz ji bi balafirên xwe derdiketin pêşiya wan û cehda xwe dikirin ko wan bişkênînin û nehîlin ko liugê wan erd bigire.

Elmanan hin esker daxistî bûn balafirgeha Malêmiyê. Balafirên inglîzî dihatin û li wê balafirgehê dixistin. Di nav wan de balafirvanek hebû bi navê Honor. Honor hera du balafirên elmani da bûn. Lê balafira wî ji birindar ketî bû û ber bi jêr dibû. Honorê balafirvan dibêje:

— Dijmin hingaftî bû baskên balafira min. Min dit ko êdî hê fêde bû. Min ne dikarî ez şerê dijminê xwe bikim. Ji lewre min digot ji min re çêtir e ez jê bi dût kevim. Lê dijmin dev ji min bernedida û berikên mitralyoza xwe li min dibarandin. Di navhera min û behrê de 200 mêtir ma bûn. Ji nişkekê ve balafira min wek kevirêki, bi lez ket û heta çil mêtiri noqî avê bû û tê de rûnişt. Lê ji ber ko derî û pencereyên balafirê qenc girî bûn av ne kete cihê ko ez lê bûm. Min kirasê xwe ê canparêz li xwe kir û di qula balafira xwe re derketim derve. Kirasê min ez

Di Ûkranya nivro de zebeş, gundor û her texlîl fêkî çêdibin. Tişta wan ji heye. Ji sala 1927an ve cotkariyên Ûkranyayê dest bi candina penbû ji kirine.

Ji milê din di wan salên paşin de giyayê kewçûkê ji diçînin. Şekirê Ûkranyayê ewçend heye ko têra hemî Rûsyayê dike.

Nifûsa Ûkranyayê 35 milyon e. Bajarekên Ûkranyayê ên mezin ev in: Xerkov (800 000) Kiyêv (650 000) Dinyêpropetrovsk (300 000) Odêse (500 000) Ertmosk (225 000) Stalino (290 000) Vorosilovgrad (100 000) Nikolayef (100 000) Keson (100 000).

KELİLÊ GENCO

anîm rûyê behrê. Behir bi pêl bû. Pêlan ez davêtim çep û rastê. Niho min şerê pêlên behrê dikir. Qederê sê saetan min ajnî kir û ez gehiştim hejê û ketim şikeftêkê. Ewçend westiya bûm ko min xwe li erdê şikeftê dirêj kir û heta sibehe tê de nivistim.

Roj li min hilat. Ez rabûm, ji şikeftê derketim. Êdî li zadeki digeriyam. Piştî saetekê gihîştim dêrekê, dêreke vala û bêkes. Di dêrê de, min hinek av û çend darikên kibritê peyda kirin.

Wê rojê ez li dêrê beyitîm. Sibetirê min da rê û ez gehiştim şikeftêkê. Min tê de hinek nîsk peyda kir. Qey min di emrê xwe de jê tандартir tiştêk ne xwarî bû. Min terka şikeftê ji da û ez ji nû ve bi rê ketim. Ji dût ve hin dar û şinahiyeke xuya dikir. Ez ber pê çûm. Piştî çar saetan ez gihîştim ê.

Ew der gundek bû. Zaro civiyane dora min û ez birin dêrê. Keşe hinek nan û mast daye min. Min ji keşê zantî ko di gundê de inglîzîkî din ji heye. Ew ji balafirvan bû û ketî bû vi gundî. Ez çî biblînim hevaleki min. Em her du ji bûn mêvanê keşê.

Ditira rojê me ji gundiyan seh kir ko eleman ji gund bi tenê 20 kilomêtir dût in. Di san gundiyan gotê me ko elmanan ji gundiyan gundekî din 6 zelam kuştî bûn. Ji ber ko wan tiştên ko elmanan dixwestin ne gotî bûn wan.

Gundî bû bûn du bend. Hinekan dixwest ko em xwe bispêrin elmanan, hinên din digot bila bi kêfa xwe bin. Dawiyê her du bend hûne yek û gotine me, hon serbest in. Me ji qerara xwe da ko em ji gund rabin û ji elmanan bi dût kevin.

Bi şev me terka gund da. Şev tartî û hewa ne xweş bû. Heta bi nivê şevê em bi rê ve çûn. Em westiya bûn, me bihna xme dîda. Ji nişkekê ve dengê balafirekê bi guhê me ve bû. Me digot qey balafireke elmanî ye. Lê gava balafir hinekê din dahat û nizingî li me kir me ji dengê wê zantî ko ew ne balafireke dijmin, lê yeke herikên, balafireke inglîzî ye.

Fanosa min a elektrîkî bêj bi min re bû. Min pê îşaret dan balafirê. Ewê ji li me ve gerand û dant. Em lê siwar bûn û ji erdê Giritê rabûn.

SILÊMANÊ FERHO

## HINDIK RINDIK

**MELEVANIYA JAPONAN** — Li gora nûcayên ko ji Sengeporê gihaştine rojnameyên ewropayî japonan piştî ko Melêzyc vegirline û gihaştine pêşberê Sengeporê bi her awa û û bi her wasitêyê keheha Sengeporê keşif dikirin. Di vê navê de eskerên japonî bi şev xwe tavêtin behrê û bi melevaniyê li kenala Goherê derbas dibûn û digihaştin peravên Sengeporê û erd keşif dikirin. Dibêjin ko japonan di êrişa Sengeporê de ji van keşifan gelek istifade kir. Ji ber ko eskeran beriya hicûmê erdê ko lê pê bikira ji berê de nus kiri bû.

**HINDISTAN** — Hindistan mistemlikeke ingilzî ye. Lê çî mistemlike, ji Ewropayê bêtir têrnifûs. Ruyê erdê wê 1808680 kilomêtir çargoşe û nifûsa wê 375 milyon e. Herçi Ewrope ji Rûsyê pê ve, digel giravên britanî 2084296 kilomêtir çargoşe ye û nifûsa wê 354250000e. Li gora vî hisabî nifûsa Hindistanê ji ya Ewropayê 20 milyon û 750 hezar bêtir e.

**PETROLA HINDISTANA HOLÊNDÎ** — Hindistana holendî ji çend giravan pêk ve têt. Erdê van giravan erdeklî gelek dewlemend û bi nan e. Bi tenê petrola vî erdî hêjayî milyonan e. Ji vî erdî li salê 7400000 ton petrol bi der têt. Hatî bi vî awayî bi giravan lêk vedibe: Simetre 5000000, Bornéo 1600000, Cave 800000 ton. Herçi Birmanye jê ji qederê 1500000 ton petrol dertêt.

Herçi birên Bornéo û Simatreyê ne ketinê destê japonan. Lê holendiyên ew berî ko terka wan bidin şewitandine û berhewa kirine.

**ŞER Û MIKAFAT** — Di her derê û di her welatî de xelk bi her awayî nav di eskerên xwe didin û wan dihewojin ser. Herçi kurdmançî, delalê beriyê û lewîkê siwaran ev hemî ji şerevaniyan re navtêdan in. Lê herçi emêrikani bi pere û mikafatan ji nav di eskerên xwe dînin. Şirketeke emêrikani îlan kiriye û gotiye: ji her balafirvanê emêrikani re yê ko balafireke dijmin bide erdê; 500 dolar mikafat dê bête dayîn.

Mister Lèvi, disa midtrê şirketekê; evî jî mîkefetek ji bo deryavanan danî. Mister Lèvi ji her deryavani re ko cenkeştiya wî di

bakurê Etlahtikê de noqareke dijmin bixerigine, wê 200 dolar bide. Ji milê din Mister Lèvi ji Mister Rûzwelt re 1000 dolar rêkirine. Ev 1000 dolar ji deryevanên wê cenkeştiyê re dê bête belav kirin ko krewzoreke dijmin, di ser 6000 tonî re, bin av bike.

**ÇEKÊN NÛ** — Mixabirê « Gazet de Lozan » ji Londrê dide zanin. Ingilzian bimbeke nû çêkirine. Ev bimbe wek balafirvan, xwe bi xwe dikeve firê û her bi armanca xwe ve diçe. Bimbe di şikilê balafirvan de ye. Ev bimbe bi baskên xwe difere û gava digehe ser serê armanca xwe baskên wê têne girtin û bimbe bi serî ve û zîçikî dikeve ser armancê û di-teqe. Ev bimbe 20 kilo giran e.

**ÇAVÊ CAM** — Di wextê şerê 1914 û 18an de yekî ji mihafizên tixûbên frensîz û spenyolî bala xwe daye ko di nav rêwîngiyên de mirovên kor, yekçav ji adetê der bêtir bûne. Mihafiz ev tişt gotê screkê xwe û yek ji wan mirovan girtin û çavê wî ê pipok derêxistin. Di nav çavê pipok de vîtiyek hebû; lê bi xetêke zirav hatî bû nivisandin. Kaxez xwendin û zanin ko merik casûs e; koirên mayin ji hevalên wî ne.

**PORDARWIN** — Ji destpêka vî şerî ve navê Ewîstralayê her û her tete gotin. Beriya şerê japonan ji ber eskerê wê navê wê dihate bihistin. Ji ber ko eskerên wê di her qada şer û di bin bandêra ingilzian de şer dikin. Piştî şerê japonan ji vî ber midafeha wê gelek qala wê dikin. Japonan nîzingî lê kiriyê û balafirvan wan li bender û wargehên wê didin; nemaze bendera Pordarwin.

Pordarwin bajarekî gelek kiçîk e; heye ko ewîstrali bi xwe pê rind nizanin. Pordarwin merkeza Ewîstralya bakûr e û 3000 nifûsa wê heye. Cihekî gelek germ û hewa wê ne xweş e. Lê ji awirê eskiriyê ve Pordarwin ehemiyetêke mezin heye. Bender û balafirgehên wê gelek bi ehemiyet in û dora bajarê bi xwe asêgeh e. Ji vî 3000 nifûsî bi tenê hezar peya xelkê spî ne; ên mayin xelkê Ewîstralayê ê kevin in. Rengê van mirovan reşêş in e. Bajar ewçend germ e ko jê re bajarê tilnê dibêjin.

Xelkê bajarê bi piranî nêçira lûlû, games û timsaban dikin. Herçi lûlûvan japon in. Îşê wan herçend zehmet be ji kara wan ji ewçend zêde ye. Her lûlûvan di çar mehan de

600 dolar kar dike. Yê n ko nêçira gamêşên kûvi dikin salê ji 1000 dolari bêtir kar dikin.

Lê îro di vê benderê de bi hezaran peya gihane hev û çûu û hatin lê de zêde hûye. Ji ber ko dijimin heye ko bixwaze tê re bikeve hundirê welêt.

**ŞER WÊ KENGÊ BIQEDE** — Me bi xwe bi çavê xwe ne dit, me ji xelkê bajêr bihist Şiforek, ji Şamê diçû Bexdayê. Mêrikê me beriya ko bi rê bikeve depoya timobîla xwe ji banziwê dagirti bû; ewçend ko têra riya Dêxdayê bike. Lê şifor nîzani bû ko depoya timobîla wî qule. Mêrik riya xwe hêj bi nivî ne kiri bû ko timobîl sekini. Şifor daket li mitorê fedkiri; kir ne kir, timobîl ne meşiya. Dawiyê iş çî ye zani û kire hawar û gazî û got: ya Xwedê, ya Mihemed, ya İsa, ya Mûsa, ya Meryem. Ji nişkekê ve jinikeke bedewî lê peyda bû; cerek li ser milê jinikê ye. Şifor mesela xwe ji jinikê re got. Jinikê got: ka vi cerî bibe û bera depoyê bide. Şifor got: hirmet ma kengê timobîl bi avê meşiyaye; ji min re bantzî divêt. Jinikê gelek li ber şifor da û mêrik cerê jinkê bera depoyê da û timobîl bi rê ket.

Şifor piştî ko çend gavan ji jinikê bi dût ket gote xwe: heye ko ev hirmet dixwaze here derekê, ka ez jê bîpirsim. Şifor lê ziviri, jinikê got: ez naçim tu deran ev der cihê min e. Şifor jê pirsî: Hirmet ma tu kî yi. Jinikê got: ez Meryem im. Şifor çû destê wê û dîsan jê pirsî: Ji kerema xwe ka ji min re bibêje ev şer wê kengê biqede. Meryemê got, di cejna İsa pexember de.

Şifor gava ji Bexdayê veşerîya Şamê biserhatiye xwe ji hevalên xwe re got. Hevalên wî gotin ê: Ma te jê ne pirsî kijan cejna İsa û cejna kijan salê.

Heybat şifor ev ji bîr kiri. Bûn û ji Meryemê ne pirsî bûn. An ne meê, bi sal û roj û meh, bizaniya ev şerê xedar wê kengê bigehe dawiyê.

### XEBERGUHÊZ



## DÎWANA MELÊ

— 17 —

Mehbûb bi dil bît me bi efrazi çî hacet  
Enqa bi xwe bêtin fir û perwazî çî hacet  
Ne î dût e hebîbê me ko feryad û fîxan kîu  
Wî gul li zemir û dil e, awazî çî hacet  
Go sixte mirada xwe ji min telbe ke îro  
Min tu kerin î, ji te daxwazî çî hacet  
Min nalc refîq in xemî û tehlî ne misahîb  
Feryad enîsê min e demsazî çî hacet  
Dildan û niwaziş çî ne dîşnami bes in min  
Pir derd û cefa hurmet û fzaçî çî hacet  
Sihbet bi mey û çeng û hebîbê me divêtin  
Feryad û fîxan ma ne bes in sazi çî hacet  
Razên me çî hacet ko ji xem-mazî bizanî  
Eşkên me bes in dîdeî xem-mazî çî hacet  
Her lehze çî hacet ko bi nazan bikujî min  
Cana ji xwe qurbanî te me naz çî hacet  
Ta çende bi hicra te tu min tecrîbe bîni  
Zêrê ji xwe xalis mihek û gazê çî hacet  
Hacet niye cana yedî beyza bîderîni  
Inkari di dîn da nebit fcazî çî hacet  
Esrari ezel dê di ebed bêne zihûrê  
Encam û serencam ji axazî çî hacet  
Ger lûlûyê mensûr ji nezime tu dixwazî  
Wer şîhrê Melê bin te bi Şirazî çî hacet.

— 18 —

Ewil ko yarê da me yek zereyek inayet  
Qismet me xemr û came di deftera bidayet  
Hîsu û cemali canan nadêritin tu payan  
Herçî nebit bidayet esla nehîni nihayet  
Fezva ilûm û hikmet cama sefa ko gêra  
Me ji destê mişbeçan dît bi mişef bi ayet  
Arif heta ne noşî mey ji destê meyferoş  
Xaib ne bû ji hûşî peyda ne kir wilayet  
Gûnah û zihûd û tamat hilnagirî xerabat  
Kesê ko bi vî derdî divê bikî riayet  
Eşqê ji her du çerşman ewil dît dil eser kir  
Lê zere zere axir sotin kir û sirayet  
Şakî silahî herdem bikuştina Melê bît  
Gazindîyan ji kê kîu, ji kê bîkîm şikayet  
Cama di destî şahid jengê ji dil dîşotin  
Pîri mîxan ji rindan weh weh dikir riwayet  
Etwari eşq û mestî esrari pîterestî  
Teqrîri bi riwayet nakî ji bo kifayet  
Liyitmeîni qelbî eynelyeqîn dibexştî  
Eyneleyan divêfîn kafi nehîni riwayet  
Mîrî û padişahî mûyek li nik Melayî  
Nadîm bi milki alem yek zereyî inayet

— 19 —

Er'xeram e bi qed û qamet  
Yek bûse da me bi sed qiyamet  
Yek bûse hexşî ewil bi ihsan  
Axir li min kir cîrm û xeramet



# HEDISËN

## CENABË PËXEMBER

REHMET Û SILAVA XWEDË LË BE

522 — Xwedë ji mirovën ko bi cilën pehl nefa xwe mezin dikin dienire.

523 — Şahidë ko şehdatiya xwe ne da, mina şehdetiya zorë ye.

524 — Heçi ko baweriya xwe bi axiretë anine xelkë aciz na kin, zirara kesî na kin.

525 — Bi zaroyan re li gora aqilë wan bimeşin, bi wan re bileyizîn.

526 — Heçi ko baweriya xwe bi Xwedë û bi axiretë anine arikariya ciranën xwe dikin.

527 — Porën xwe bişon û bişkinin.

528 — Heçi ko bext dide miroveki û wi mirovl dikuje, bêbextiyê pê re dike, çavê wî li bihuştê na keve; ew melvapê agirê dojehê ye.

529 — Heçi ko di nav xelkê de fesadiyê dikin, wan bera hev didin, ne ji me ne, durrî me ne.

530 — Heçi ko xelkê dixapinin, hilebaziye li wan dikin, ne ji me ne, durrî me ne.

531 — Heçi ko sêwiya dihewinin û wan bi xwedî û mezin dikin para wan bihuşt e.

532 — Heçi ko pis û kêmaqil in, serê wan bê mejî ye tim ezabê xwe dibinin.

533 — Senhetên xwe de pê bidin erdê, wî senhetê xwe me guhêrin.

534 — Heçi ko roja tengayiyê de mina şewat û rabûna avê, arikariya xelkê dikin, Xwedë qedrê wan weke mirovên ko di riya wî de hatine kuştin digire.

---

Ji jeng û zirqê dil da bişotin  
 Cama sedef bin rind û keramet  
 Ji her du çeşman tê mest û xunriz  
 Nûra du çeşman kê di selamet  
 Li derd û êşan pêkan û nişan  
 Me j' her du çeşman kişin elamet  
 Riswayê eşqê tenba ne ez bûm  
 Kes di zemanan hlb bê melamet  
 Du secde ferz in filhal bibin ber  
 Dema xuya bit ew qed û qamet  
 Da eybl rindan nekî beyant  
 Nifûsî qewmî beha tesamet  
 Mela li te emrî bêfêde borî  
 Kêşa bi zoran qehr û nedamet.

535 — Xwedë ji mirovên nezan yên ko nezaniya xwe nizanin û li ser rûyê xwe dikevin hez na ke.

536 — Heçi ko bi dileki rast û pak nefsiçûk in, Xwedë wan mezin dike.

537 — Xwedë ji mirovên ko di civata de xwe dinepixinin, di ser xelkê re rûdinin û bi giranî û çapanî bi rê ve diçin hez na ke.

538 — Heçi ko iş û xebata xwe bi hihufirehiyê diqedinin kar dikin, Xwedë poşmaniye na de wan, lê heçi lez û bezê li xwe dikin meydana wan kin e, zererê dibinin.

539 — Jinên pir û stêwr ji xwe re me yinin.

540 — Li mirovên seqet û nesax bi çavên kirinê me nêrin, dilê wan dimîne.

541 — Kêfxweşiya xwe bi şer û kuştinê me yînin, lê ko hon ketin şerî heta ko zora dijminê xwe bibin û wî bişkininin pehniya xwe bidin erdê û li cihê xwe giran bin.

542 — Mirina xwe me xwazin.

543 — Gava hon dikin rakêvin agirê xwe bitemirinin.

544 — Gava hon li nişanê dixin, heywana me yinin ber nişana xwe.

545 — Yê ko silava xwe na de merhebabûn jê re na be.

546 — Tiştê ko hon jê têsîn me xwin.

547 — Bi wî şertê ko mirov wezîfeyên dewlemendiyê pêk bîne, destvekirî be dewlemendi hêja ye û xeml û zineta Xwediyê xwe ye.

548 — Yê ko ne xwediyê gotinê xwe ye û li wada xwe diqulipe ne miroveki misilman û bawermend e.

549 — Ko pere li cem we peyda ne bû tiştêki me kirin, xwe me kin deyndarê xelkê.

550 — Teneyî ji civata mirovên xerab çêtir e, lê hevaltiya miroveki qenc ji tenahiye baştir e.

551 — Xwell li serê wî mirovê he ye ko bi derewa xelkê dikenîne.

552 Navbeyna du mirovan bê destûra wan rûmenin.

553 — Ne li ser ava herikandi û ne ji li ser ava golê me mîzin.

554 — Însan û heywana bi jehr, hişewitandin û xeniqandinê me kujin.

555 — Jin û zarowa me kujin.

## REWŞA DINYAYÊ

**ŞERÊ MANŞÊ** — Di hejmara 401 de m qala Manşê kiri bû. Vê carê şer ne di behra Manşê lê di vi aliyê Manşê, li ser erdê Irensizan çêbû. Li yekê vê mehê danezanêke îngilîzî qala vi şerî kir û got ko peraşûftîstên îngilîzî ji balafîran daketine erdekl Frênsa vegirtî, di peravên Manşê de, û dirêji stasyonêke elemanî kirine. Di vê stasyonê de elemanan balafîrên xwe ên xesardîtî tamîr dikirin. Eskerên îngilîzî i êji vê stasyonê kiriyê û ew şikênandiye. Ingilîzan xesarîne mezin gihandine elemanan û hin hêsr ji bi xwe re anîne Ingilîterê.

Eskerên îngilîzî piştî ko bi karê xwe rebûne xwe gihandine perava Manşê û di bin himayeta topên stolê de, vegeyriyane welatê xwe. Xesarên îngilîzî kê m in.

Radyowa Londrê piştî ko qala vê zefera îngilîzî kir digot ko ev hereketeke bi ser xwe bû an ne-mexseda ingilîzan ne vekirina enike nû ye. Radyowa Londrê ev tişt got ji ber ko mesela enike nû vê paşiyê û dîsan tete gotin. Bêdiro, Litvinof, sefirê ûrisan li Weşingtonê di nitqeke xwe de digot ko ji sondxwariyan re divêt di roavê de enike nû vekin, yanî esker dertnin Ewropayê û dirêji elemanan bikin; da ko barê ûrisan siviktir bibe. Litvinof di nitqa xwe de nemaze tiştên jêrîn gotine :

• Ji bo şikêstina qewetên mihwerê divêt em şerê wan di çend eniyan de bikin. Û divêt ev enî ji hev dûr bibin. Tu şek tê de nine ko Elmanyê û Îtalye, li Biharê, xebateke zor wê bixebitin. Me hêvi heye ko dost û hevalbendên me vi hali bir bibin û bi karê ko ji wan re gerek e rabin. Reşma mizeferiyetên ordiwa ûris dijmin hêj xurt e û zora wî ne çûye. Dijmin di paş enfyê re xwe ji bona Biharê kar dike. Ehemiyeta eniya rohelat, eniya ûris mezin e û dawiya şer li gora rewşa vê eniyê wê qerar bigire.

**ŞERÊ LIBYAYÊ** — Şerê Libyayê weke xwe ye. Eskerên Romel gihastine dora Xezaleyê û lê sekiitune. Lê ingilîzan ji dirêji wan ne kir. Çaxê şerê Efrîqayê ji dibore. Dema ko berfên Rûsyayê wê bihelin, qûma Efrîqayê wek kuçên tişkê wê bikele û wê bisincire.

Ji lewre divêt ko heriya Nisanê di Libyayê de hereket ji nû ve dest pê bike. Herçi şerê balafîran, her du all li wargeh û qerargchên hev dixin. Dewletên mihwerê di lêxistina Maltê de pê didin erdê û balafîrên wan hero li wargehên giravê didin.

**ŞERÊ ROHELATÊ DÛR** — Herweki me di hejmara çilî de gotî bû japonan ji Hindistana holendî piştî Bornêo, Selebis û Simatrayê çavê xwe berda bû girava Cavayê a mezin û balafîrên wan bender û wargehên giravê didan ber bimbûn.

Li 27ê Sibatê de nizingî Sirabayayê de — bendereke Cavayê — di navbera stolên emêrikani, îngilîzî, holendî û japoniyan de şerêkî behrî çêbû. Li gora danezanên îngilîzî û emêrikani balafîrên sondxwariyan stola japonî di nizingî behra Cavayê de diti bûn û elam da bûn stolên xwe. Di pey stola japonî re, ji êskaran teji, çil vaporên barkêş hebûn. Li ser vê xeberê her sê stolên sondxwariyan derketin pêşiya stola japonî û li wê dan. Ev şerê behrî qederê 36 saetan ajot û balafîrên her du aliyan ji bi stolan re şer kirin. Stolên sondxwariyan bi mêranî şer kirin û piraniya cenkeştîyên japonî hirtin kirin, hinekê wan bin av kirin û ew hemî ji xeta şer bi dûr ketin. Ji aliyê din bimbe û gule li piraniya vaporên eskerî ji ketin û japon begav man û ji behra Cavayê baz dan. Di vi şerî de nemaze stola hotendî qehremanike mezin şant da.

Emêralê vê stolê emir da kumandarên cenkeştîyên xwe ko qeweta dijmin çiqas serdest bibe ji dirêji wê bikin û heta dawiyê li her xwe bidin. Wau kumandaran ji welê kir û du krewzorên holandî yê ko di vi şerî de bin av bûne reşma ko behir hilkişiya bû pira wan a jêrîn topên xwe şixulandin û bera dijminê xwe dan.

Sibetirê ejansa emêrikani dida zanîn ko japonan esker derêxistine Cavayê û lingê wan di giravê de erd girtiye û japonî û sondxwarî di hejê de li hev didin. Japon derketi bûn sê cihên giravê û dikirin li merkeza giravê, li Betavyayê wer bûn. Li gora ejansan li Cavayê ji qewetên ingilîzî, emêrikani û ewistralî pê ve 150 000 eskerên holendî bene. Japonan di derba pêşîn de 60000 esker derêxistin Cavayê. Lê hero qewetîne nû ditînin. Holendî

ù sondxwari gelek li ber xwe didin. Digel vè hindè èrişa japonan ber bi pèş diçe à japon dikevin hundirè giravè. Li 5è Adarè japon ketin Betavyayè: Helanî iro serdestiya behr à ezmanan, di Pesifikè de, di destè japonan de ye à japon bi vè serdestiyè tuvèjin her derè. Herçi ingiliz à emèrikani xwe kar dikin à li hêviya dora xwe diminin. Û di-bèjin ko tiştèn ko emèrikani à ingilizan di Pesifikè de ji dest dane ev qerekonèn wan ên pèş bûn; mina Melèzye, Sengapor à Hindistana holendi. Xelèn wan ên bingehin hêj li paş in.

Herçi ingiliz xwe di Hindistanè de kar dikin. Japon li ber deriyè Hindistanè ne; yani li Birmaniyayè ne à dixwazin rojkè berî rojkè işè Birmaniyayè safî bikin. Japonan di Birmaniyayè de gihastin riya Bûrmayè à niho zora xwe didine Rengûnè; payitextè vi welatî. Japonan qedere 80 kilomêtir nizingi li Rengûnè kiri bû à li wê derè sekini bûn. Ji pencè Aderè ve à ji nû ve dest bi èrişè kirine à li 8è mehè japon ketine Rengûnè à serè riya Bûrmayè, xistene destè xwe

Herçi emèrikani wer dixuyè ko xwe di Ewistraliyayè de kar dikin. Heke japonan piştî Cavayè avète Ewistraliyayè heye ko japon di vî welatî de di pèşiya xwe de emèrikaniyan peyda bikin.

Èrişa japonan, herweki me herè ji goti bû ji bo sondxwariyan nişkegaviyeye mezin bû. Sondxwariyan hisabè vi şeri ne kerî bû. Mister Çorçil li 26è Sibatè, di vè babetè de à di meclisè de gotiye: Min hergav hêvi dikir ko Emèrike şerè dewletèn mihwerè wê bike. Lê tucaran ne dihate bira min ko japon ji wê bikeve şer à dirêji me bike. Ji lewre ez, herçi milletèn ingiliz-ziman heke şretan li wan dikim à dibêjim, sebrè bi xwe bidin à li hêviya encamè biminin. Èrişa japonan di wextekî welè de hate rû ko hingè ji me dixwestin ko em di Frensè an di Holandeyè de enike nû vekin à ji par re li elemanan bidin.

Piştî ko japonan pê li erdè Cavayè kir, fermandarè ingilizî è bi nav à deng, general Wèvel ye ko qerargaha xwe danî bû Cavayè, jê rabû à vejeriya Hindistanè, ser wezifa xwe a pèşin; fermandariya ordiwèn Hindistanè. Generalekî holendi ket şûna wî.

Japon beriya ko vegirtina Cavayè temam bikin avêtine ser Gina-nû ji à li 7è Adarè esker derêxistine vè girava mezin.

Li 8è Adarè japonan da zanin ko di Cavayè de eskerèn holendi teslim bûne à di wê giravè de şer gihastiyè dawiyè. Radyowa Londorè herçend derew bi aliye vè nûçeyên ve ne da lê ji gotiye ko di rojèn paşin de mixabere bi Hindistana holendi re hatiye birin; ji lewre ji Cavayè tu xeber ne gihastiyè Londrè.

Japonan giravèn Filipinè hêj bi temami safî ne kirine; emèrikani hin tê de ne à li ber xwe didin.

Bi vegertina Sengapor, Rengûn à Hindistana holendi japon gihastine Behra hindi. Behra hindi ji bo ingilizan gelek bi ehemiyet e. Ji ber ko vapor di vè behrè re tèn à dikevin Behra sor à jê dertèn Behra spî. Herweki ji navè wê dixuye Hindistan bi vè behrè dorgirti ye. Di nivroyè Hindistanè de giravek heye jê re Seylan dibêjin. Ev girav xçereya vè behrè ye; yani vaporèn ko di vè behrè de tèn à diçin, komir à pêtrola xwe jê dibin.

Di van rojan de gelek qala Seylanè dikin à dibêjin heye ko japon bavêjin ser Seylanè ji. Ev in dührahiyan navhera Seylan à bendeine din: Rengûn-Seylan 3200 kilomêtir, Sengapor-Seylan 3600 k. Seylan-Besre 6500 k. Seylan-Eden 6150 k. Sengapor-Medegeskar 9700 k. Seylan-Medegeskar 6700 k.

Di vè navè de me qala Medegeskarè ji kir. Medegeskar giravek e à dikeve nivro-rohelatè Efriqayè. Ev girava mezin mistemli-keke frensizi ye. Wê di şerè Behra-hindi de ehemiyeteke mezin heye à di van rojan de di dora wê de kurt à pist zehf bûne. Gotine ko hikûmeta Vişiyè di vè giravè de hin wargehan wê bide Japoniyayè. Lê hikûmeta Vişiyè derew bi aliye vè gotinè ve da.

**ŞERÈ ÛRIS** — Di hin derên welatè jêrin de darin bişkiwt bin à bihna Biharè dest bi belavhûnè kiri be ji di welatè ûris de hêj Ziviştan e; herf à qeşa pûk à baran e.

Digel vè hindè şer bi xurtke mezin çom dike. Ji vî mill be ji wî milli, èriş à berêriş, hicûm à berhicûm in. Lê teşebis di destè ûrisan de ye. Bihar nzing bûye. Bi Biharè ve èrişa elemanan wê dest pê bike. Ûris pê dizanin à ji lewra ehad xwè dikin ko elemanan

## CHAHINO

Les deux fragments qui suivent ont déjà été publiés en kurde dans le numéro 37 de Hawar. Tous deux été recueillis au Botan, l'un dans la région d'Erüh, l'autre chez les Jéliyân.

### I

Maudit Châhino, tu ne dis rien !  
Tu ne fais rien dans la maison de ton père.  
Ma dot est forte, où te la procureras-tu?(1)  
C'est l'été, le bel été !  
Les arbres et les champs de mon père portent leurs fruits.  
Les gens disaient : " Ahmad Khan est une fleur. " Je répondais : " Il est la plaie de mon cœur ! "  
C'est le printemps. Nos tentes sont parties pour les zozâns (2).  
Je construirai pour mon Châhino une cabane avec des roses et des basilics.  
Et, si j'en manque, j'en emprunterai chez les voisins.  
Mon père n'a que des chevaux pour bêtes de somme.

---

bi şûn de, ber bi tixûbên wan ve vegîrînin û herçî cihên mihim, ji niho de wan bêxin destê xwe; da ko di dema êrîşê de bikarin li ber wê bisekînin û wê bişkênînin.

Ûrisan di danezanên xwe yên 26 û 27ê Sibatê dane zanin ko di nivroyê gola Ilmenê de zora elemanan birine û di wê mintiqê de li ordîwa elemanan a 16an wer hatine. Li gora danezanê di wê mintiqê de 94000 eleman ketine nav çemberê ûrisan; û elemanan di şerê Stereyarûsayê de şikestîneke wer pîs şikistîne ko çek û topên xwe berdane û çavê xwe dane revê; lê ûrisan ew edim kirine.

Li 6ê Adarê ûrisan da zanin ko eleman di Stereyarûsayê de rabûn hicûmê û dil kirine xetên rûsî bişkênînin lê ev hicûm ne çûye serî. Ji milê diin ûris dibêjin ko nizingî li Smolenskê kirine û ghaştine deriyên Orêlê û Orêl li ber ketinê ye.

Di qada nivro de ji merêşal Timoşenko, li ser eniyeke 400 kilomêtir fireh rabûye hicûmê û zora elemanan biriyê. Di wê eniyê de ûrisan bi 90 firqeyî dirêjî elemanan kiriye.

Şam 14 Adar 1942 NÊREVAN

Ils portent des dattes en haut de leur charge, des cannes a sucre par dessous.

Prévenez Châhîn agha de Hochani que l'on a demandé ma main.

Mon père n'a que des mulets pour bêtes de somme.

Ils portent des dattes en haut de leur charge, du sucre par dessous.

Pour l'amour de Dieu, prévenez Châhîn agha que l'on m'a prise en mariage.

Maudit Châhino, es-tu fou? N'es-tu pas fou! Tu envoies lettre sur lettre.

Ma dot est forte, où iras-tu la chercher?

Tu possèdes une pouliche grise,

Mais tu n'es pas homme à demander ma main, ni à m'enlever,

Châhino, fils d'agha!

On est en train de tailler les vignes de mon Châhino.

Prends-moi, enlève-moi toute le feu à cette ferme, à cette maison!

### II

Châhino, enlève-moi, nous irons aux zozâns. Je construirai pour mon Châhino une cabane avec des roses et des pétales de basilic.

Et si j'en manque, j'en emprunterai chez les villageois et les voisins.

Châhino, fou, tu es fou! Ni tu ne me prends pour femme, ni tu ne m'enlèves.

Ma dot est forte, où iras-tu la chercher?

Tu ne crains donc pas Dieu pour brandir ainsi le poignard d'argent sur ma poitrine?

Ma poitrine est un verger plein de roses et de pommes. Lorsque tu es triste,

Viens un instant, tu y chasseras la peine de ton cœur.

La maison de mon père est vaste, une tribu nomade campe en contre-bas.

La nuit dernière, j'ai fait un rêve de bon augure:

J'avais ta pauvre maman pour belle-mère!

T'AWÛSPARÊZ

---

(1) Le mot qelen, que nous traduisons par dot désigne la somme que doit verser le jeune homme aux parents de sa fiancée au moment du mariage.

(2) Zozân : pâturage d'été.

## QUELQUES CHANSONS

A part "Koçerê" et "Lo Miro" les textes que l'on va lire ont été notés au Botan. Le premier d'entre eux, Berdolavi, est une chanson à filer (le mot berdolavi, qui veut dire "devant le rouet" n'est pas le titre de la pièce, mais désigne l'un des genres de la littérature populaire kurde). Les autres sont des refrains de danse. On remarquera que les vers qui les composent sont uniformément de sept pieds, et que les rimes en sont beaucoup plus régulières que celles des autres chansons. Trois de ces couplets renferment des allusions à des événements historiques qu'il nous a malheureusement été impossible d'identifier : Ce sont Malko (exécution d'un chef chrétien par un prince kurde) ; Amar agha et koçerê (révolte des Mirân). Le dernier, Lo miro, est une épigramme composée il y a quelques années, sur un de nos amis, par un vieux chanteur.

TAWÛSPARÊZ

Kesek nînin kul û xemê dinê ne di dil de.  
Dilê min rebena Xwedê, sitila kuçkîrî agir di bin de.  
Heke delalê dilê min nas nakî, êvara dimeşit d'nava gun' de.

Ezê çûme reza, rêza gula, gula li mi zer kir.  
Min û delalê xwe çînine, li hev di wer kir.  
Tilîk ji perê dilê mi ma bû kêr.  
Eşq û evîni li halê min eser kir.

Ezê çûme reza, rêza gula, gula li mi spi kir.  
Min û delalê dilê xwe çînine, henek û yarî kir.  
Tilîk ji perê dilê mi ma bû kêr.  
Minê rojê sê cara, mina heval û hogira, li halê xwe gill kir.

Ezê çûme Cizira Bota, ber de çem e  
Xizêma keleşgewra mi zêr û ziv e, çar dirhem e.  
Ez, rebenê Xwedê şeva, nivê şevê, dema henek û yârîka.  
Bihnekê rûniştam li cema.

## TRADUCTION

Il n'est personne qui ne porte en son cœur souffrances et peines du monde.  
Le mien, pauvrete, est un vase qui bout sur les chenets, le feu brûle en dessous.  
Si tu ne sais quel est celui que j'aime; il se pavane le soir au milieu du village !

Je suis allée à la vigne. Des haies de roses !  
Leur vue m'attriste.  
Le bien-aimé et moi, nous les avons cueillies, pour nous battre avec.  
Il restait de mon cœur moins large qu'un doigt,  
Tant l'amour me troublait.

Je suis allée à la vigne — Des haies de roses !  
Leur vue me rend joyeuse.  
Le bien-aimé et moi, nous les avons cueillies; nous avons badiné, joué.  
Il restait de mon cœur moins large qu'un doigt.  
Trois fois le jour, je me lamente, comme font mes compagnes

— Je suis allé à Djezir de Botan, au bord de la rivière.  
Le bijou que ma belle porte à la narine est d'or et d'argent, il pèse quatre drachmes.  
Hélas ! Que ne puis-je, à minuit, l'heure des jeux d'amour, rester un peu chez elle !

## MELKO

Melko xwestî diwanê.  
Sê fincan qehwe danê.  
Paşê, celad berdanê.  
Melko go : " Ez melko me ! "  
Şero go : " Ez Melko me,  
Xweyê şwîrê bi co me,  
Kilê çavê Silto me ! "

On fit venir Malko au divan.  
On lui donna trois tasses de café,  
Puis on le livra au bourreau.  
Malko dit : " Je suis Malko ! "  
Le lion dit : " Je suis Malko ,

Je possède un sabre à nervure,  
Je suis le kohol des yeux de Selto ! "(1)

### EMER AĀA

Emer aāa aāa ye,  
Şêrê Soro aāa ye.  
Şwirê misri kêşaye,  
Nav eşira xwe daye.

Amar agha est un chef,  
Il est le lion de Soro agha.  
Il a tiré son sabre d'Égypte,  
Et chargé sa propre tribu.

### MÊRG

Mêrga pišta malano,  
Çi mêrgeke heşn e !  
Keç'ko d'rêsin teşêko,  
Xirxiro wê jê têno.  
Dostika min esmer e,  
Esmer, şêrîn esmer e !

La prairie derrière les tentes,  
Comme elle est verte !  
Les filles y font fourner leurs que-  
nouilles  
Que l'on entend ronfler.  
Ma mie est brune,  
Brune ! C'est une douce brune !

### KOÇERÊ

Kesera mêrê berê,  
Koçerê cer li mil kir,  
Qesda kanika gir kir.  
Cer qul bû, taqt şil bû.  
Dilê lawik bikul kir  
Koçer ji malê Mira,  
Reş'kandin bendê şêra.  
Ez te nadim b' tu eşira;  
Koçer ji malê Bota.  
Raş'kandin bendê cota.  
De lê û lê, koçerê,  
Pozqulê, xizêm zerê;  
Kesera mêrê berê !

Tourment des braves (2)  
La nomade avait pris sa jarre sur l'épaule

Et s'en allait vers la source du coteau.  
La jarre était fêlée la robe était mouillée.  
La belle a blessé le cœur des garçons.  
Les nomades des tentes Mirân  
Ont brisé leurs chaînes comme des  
lions (3).  
Je ne te donnerai pour aucune autre  
fille de tribu.  
Les nomades des tentes de Botan  
Ont brisé leurs entraves comme des  
beufs .  
Tralala ! Ma nomade,  
Aux narines percées, au khezêm d'or(4),  
Tourment des braves.

### LO MÎRO

Lo miro, lolo miro !  
Ro dihate nimêja niro.  
Oda mirê min b'soring e,  
Heçi dosta wi firenge;  
Emrê wi emrê quling e.  
Lo miro, lolo miro !  
Ro dihate n'mêja niro.  
Oda mîrê min b' hene ye,  
Heçi dosta wi file ye,  
Emrê wi j'emra zêde ye.

Emir, émir !  
Voici l'heure de la prière de midi.  
La chambre de mon émir est de couleur  
pourpre  
Toutes ses bonnes amies sont d'Europe.  
Il a vécu moins longtemps qu'une grue(5).  
Emir, émir !  
Voici l'heure de la prière de midi.  
La chambre de mon émir est couleur  
de henné.  
Toutes ses bonnes amies sont chré-  
tiennes.  
Il a vécu plus longtemps que quiconque.

(1) C'est à dire : Je suis le bien-aimé de Selto.  
(2) Mêrê berê, homme de jadis, a le sens  
de brave.

(3) Les Mirân sont une tribu nomade du  
Botan. Ces deux vers renferment sans doute une  
allusion à une de leurs révolte ( Celle de Brâhim  
agha contre son suzerain, l'Emir de Botan vers 1830 ? )

(4) Khezêm : bijou que les femmes portent  
dans la narine gauche.

(5) La croyance populaire veut que la grue  
ait une vie très courte.





## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelnine Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Blyîşa Pêxember. Bi Kurdiya dumilt, bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re C. A. Bedir-Xan
- 7 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikitin
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10 — Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11 — Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12 — Dersên Şerietê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13 — Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14 — Proverbes Kurdes, Medbelokên Kurdî Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-Xan Paris - 1937
- 15 — Le roi du Kurdistan. Qalê Kurdistanê, Emir K. A. Bedir-Xan û Adolphe de Falgerolle, Paris - 1937
- 16 — Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdistanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel Berlin - 1937
- 17 — Der Schnee Des Lichtes. Berfa Ronahiyê Şîhrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

## Kiryariya Hawarê

Sali	500	Qirûşên Sûri
Şeşmehi	300	Qirûşên Sûri
Sêmehi	200	Qirûşên Sûri

Xwedi û gerinendeyê berpirsiyar: Mir Celâdef  
Ali Bedir-Xan. Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aali  
Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 10  
HEJMAR 42  
ÇARŞEMB  
15 NİSAN 1942

# HAWAR

ANNEE 10  
NUMERO 42  
MERCREDI  
15 AVRIL 1942

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARÊ

Tefsira Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Awayê Evinê	Hişyar
Newrûz	Herekol Azizan
Îşê paqij	Şevger
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Gramêra Kurdmanci	C. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Diwana Melê	Qedri Cemil Paşa

## ★ BIRÊ FRENSIZÎ ★

Les jeux kurdes	Tawûsparêz
-----------------	------------



ŞAM—1942  
ÇAPXANA SEBATE



## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### TEFSİRA QURANÊ

42 — Wê demê binin bira xwe.... Cebrail ji Meryemê re got: Lê Meryemê, Xuda tu bijartiye û ji gunehan paqij kiriye. Xwedê tu ji hemî jinên dinyayê çêtir girtiye.

43 — Lê Meryemê.... Ji Xudayê xwe re hindestiyê bike, guhdari emrên wî bibe û bi nîmêjkeran re secde bibe Xudayê xwe û xwe lê bilewîne.

44 — Pêxemberê min.... Qiseyên Meryem, Zekeriya, Yehya û İsa tişline xeybê ne; emê ji kerema xwe wan tiştan bi te didin zanîn; herwekî gava ji bo bijartina bergerê Meryemê, bist û heft miridên Dergehi, qelemên xwe avêtin avê û gava ew li hev ketin, tu ne li cem wan bûyî û pê nî zani.

45 — Wê demê binin bira xwe... Cebrail got: Lê Meryemê, Xuda bi pirsekê mizgîniya kurekî bi te dide, navê wî Mesîh İsa kurê Meryemê ye. Qedre wî, di dinya û axiretê de wê mezin bibe; ew yek ji yên nîzîkî Xuda ye.

46 — Ewê hef di landika xwe de, bi xelkê re wê baxêve û di mezinahiya xwe de ji bi wan re dê bipeyive.

Ew ji dilpakan e.

47 — Meryemê got: Xudayê min, tu mêr nîzîkî min ne bûye, çawan ji min zarokek çêdibe. Cebrail got ê: Emrê Xwedê ev e, Xuda her kesê ko dixwaze dixuliqîne. Ji xwe gava Xwedê bi çêbûna tişteki mirad dike, ji wî tiştî re dibêje: Bibe, û ew tişt çêdibe.

48 — Xwedê jê re kitêb û hikmetê û Tewrat û İncilê dê bide zanîn

49 — Xuda İsa ji lawên İsrail re bi

pêxemberitiyê de bişîne û İsa ji wan re dê bibêje: Ez ji bal Xuda ve, bi ayet û delilan hatime nik we. Lawên İsrail wê jê bipirsîn û bibêjin; Delilên te çi ne. İsa ji wan re dê vegeşîne û wê bibêje: Ezê ji ax û heriyê ji we re teyrekî çêkim û jê re bi kerema Xwedê can bidim, ezê yên ko ji diya xwe kor bûne, sax bikim; çavên wan dê vebin; û nexweşên bawêşinê bigehînim saxiyê û bi destûra Xwedê miriyan vejînim; û herçend ji min tiştên ko hon dixwin û mala xwe de kom dikin ne ditîne, ezê navê wan bi we bidim zanîn. Ev delil û hicetên pêxemberitiya İsa ên heja ne; heke we baweriya xwe pê aniyê!

50 — İsa wê bibêje: Ez tesdiqdarê kitêba we Tewratê me û tiştên ko ji we re hate heram kirin, ezê wan ji we re dîsa helal bikim û ez ji we re bi ayetên Xuda tîm, ji Xwedê tirsîyar bibin û bindestiya min bikin.

51 — Ji her ko Xuda, Xudayê min û we ye, jê re taet û ibadetê bikin, rîya rast ev e; û rîya rast, rîya Xwedê ye.

52 — Gava İsa bi kafiriya cihyan hesiya, pirsî û got: Di rîya Xwedê da, heval û arikerên min kî ne? Hewariyan lê vegeand û got: Em di rîya Xwedê de arikar û destbrayên te ne, me baweriya xwe bi Xwedê aniyê û tu bibe şahidê me ko em misilman in.

53 — Xudayê me, me baweriya xwe bi İncila ko te şandiye xwar aniyê û bindestiya pêxemberê te kiriye, me ji şahidên mezinahiya xwe bihesibîne.

54 — Cihî di heqê İsa pêxember de, dest bi bêhextiyê kirin. Xuda ji di heqê

cihiyan de welé kir. Xuda di her tiştî de, ji her kesî xurlir e.

55 — Bine bira xwe ... Xwedé, ji İsa re got: Pêxemberê min, ezê te binivîninim û piştî te bal ezmanan, cihê melyaketan ve hilinim û ezê te ji dijminên te pak û safî bikim. Ezê tabîên te, di axiretê de li ser kafiran serfiraz û cihbilind bikim. Di roja pişdawayî de kafir wê bîn pêşiya min, û wê bikevin hafa min, û li ser tiştê ko we bi hev ne fikir, ezê pirsra xwe a paşin bibêjim û hikmê xwe bidim.

56 — Ezê kafiran di dinya û axiretê de bi ezabekî giran biêşînim; kes nikare tê de arikariya wan bike.

57 — Lê yên ko misilman bûne û tiştine qenc lihev anîne, emê wan bigihînin kerem û comerdiya xwe. Xuda ji xedaran hez na ke.

58 — Em bi wehî û ayetên xwe ji tê re tiştên heja û hikmetdar didin zanin.

59 — Zayîna İsa, li ba Xwedê weke afirandina Adem e; Xuda Adem ji axê da afirandin û jê re got: Bibe û ew çêbû.

60 — Herçî ko ji bal Xuda ve ye, bêşik rast e, duditiyê me ke.

61 — Piştî hatina delil û hîcetên pêxemberitiya İsa, heke dişa hinan berberiya te kir, bêje wan: Geli mirovîno ... Werin, em banî jinên me û we, zaroyên me û we, nefsên me û we bikin û piştî niyazmendên Xuda bibin û ji bona derewkeran dest bi xwestina laneta Xuda bikin. Yên ko pêxemberitiya İsa inkar dikin, divê bikevin laneta Xwedê.

62 — Ev qiseyên hanî, qiseyên rast in. Ji Xuda pê ve, tu Xuda nîne, ji Xwedê pê ve delal, fêris û xudanqudret tu kes nîne.

63 — Heke wan ji qebûlkirina rastiyê xwe dane paş, bila bizanin, Xuda mifsidan nas dike.

64 — Pêxemberê min ..., Ji Cihî û Filan re bêje: Xudankitêbino ... Werin emê li ser qiseya ko, di heqê

## AWAYÊ EVINÊ

Ma dizanî aşiqan dilber xiyala şev û roj  
Wer dinalin xwin dimalin ew ji çavan şev û roj  
Dilgîrên dama evinê, wan j'nedî ve gotiye  
Gult û goyên zilf û xalan dane zanin şev û roj  
Me l'tenê dîlber divaye, yara bê ten û gihan  
Ew sirîştî zende gaye landika me şev û roj  
Bihuşt û zenda gihane wê di cihan daye deng  
Wê ji me sed dil rewa ye em li bendê şev û roj  
Qenc û naze, tengdaz e, padişahêk bê wefa  
Her dema bersef dixwaze minekar im şev û roj  
Berfa yarê ji xuyina me nivîsî xêzexş  
Soz û peyman me dida wê olperest im şev û roj  
Karê maştûqan wiha ye, aşiqan erzan didin  
Wan bi xîşmê dil hewa ye xwin dirêjin şev û roj  
Sorgula bilbil divaye xîşmê seywan lê veda  
Ma li ser lat û zinaran tîm şîyar e şev û roj.  
HIŞYAR

wê de, gotina kitêb û pêxemberên Xuda yek e li hev bîn û em bibêjin: Em yekitiya Xwedê dizanin, ji Xuda pê ve ji tu kesî re ibadetê na kin, tu kesî na kin hevri û hempayê wî, ji wî pê ve tu kesî na hesibinîzin mezin û sermiyanê xwe. Pêxemberê min ... heke wan xwe jê dane paş, bêje wan: Hon bibin şahidê me ko me baweriya xwe bi yekitiya Xwedê aniye, û em misilman in.

65 — Geli xudankitêbino ... Cihî dibêjin, İbrahim ji me ye; file ji dibêjin, no ew ji me ye; çire hon wisa bërberiya hev û du dikin, ma hon bir na bin ko Tewrat û Incil, ji we re piştî wî hate rêkirin.

66 — Hon çî millet in ... Bi tiştê ko hon esl û rastiya wî dizanin qaîl na bin û baweriya xwe pê na yênin, zidê wî dimeşin; û bi tiştê ko nizanin berberiya hev û du dikin. Xuda pê dizane, lê hon pê ni zanin.

67 — İbrahim ne cihî, ne ji file, lê misilmanekî pak û dilrast bû û ne ji koma kafiran bû.

68 — Nizikên İbrahim ew in ko li ser şopa wî çûne; û ew ji pêxember û mirovên bawermend in.

Xuda xwedî û arîkarê bawermendan e.

# HEDÏSËN

## CENABË PËXEMBER

### REHMET Û SILAVA XWEDË LË BE

556 — Nezir ù qurbana me kin, ko filan işe min çêbù ji filan pëxember ù ewliya re qurbanekê şerjê bikim me bêjin.

557 — Di şîna xwe de ax ù zarîna ù qir ù wira me kin.

558 — Heçî ko her ji koçeriyê hez dîkin dibin hovê serê çiya, yên ko her bi seyî ù nêçirê mijûl dibin ji kar ù işe xwe xafil dibin ù bi şûnda dimînin, mirovên ko her li pey mezînen dewletê digerin fitnekar dibin.

559 — Heçî bêsebeb xaniyê xwe difiroşin ji wan peran xêr na binin.

560 — Xwedê li mirovên ko gava tişteki difiroşin xerabî ù kêmaniya wî na bêjin tê xezebê.

561 — Heçî ko xaniyê xwe difiroşin ù bi pereyê xaniyê xwe xaniyekî nastînin xeyr ù bereketa wan peran nabînin.

562 — Heçî ko bihna rûn ù goşt ji destê wan tê ù bê destişîtin radikevin ù pê nesax dibin divê bizanin ko ew sûcdarê nefsa xwe ne.

563 — Yê ko xurtî ù çavsooriyê li xelkê dike ù bê heq malê wan dixwe ne ji me ye.

564 — Wextê ko hon sir' ù pîvazê dixwin gerek hon ne yin civatê camêra.

565 — Heçî ko bê destûra xwediyê wan kaxez ù deferen xelkê li hev dixê ù li hundirê xaniyê wan dinêre ù saxiya xaniyên wan dike, divê bizanin ko xirabî ù heramiyê dîkin, heqê wan ew e çavê wan bê rijandin.

566 — Yê ko malê diziyê dikire bi diz re gunehkar dihe.

567 — Yê ko nişanvan e ù dev jê berdide ù avêtina lîfing ù nişanê ji bir dike ji nîmeta ko Xwedê da bû wî mehrûm dihe.

568 — Tiştê ko sinet ù Quran tê tu ne be inaniya xwe pê meînin ù pê emel me kin.

569 — Heçî ko dixwazin xelk li her wan rabe piya, bila hisabê rûniştina xwe li agirê dojhê bikin.

570 — Heçî ko bêsebeb ù bêheq mirovên nemîsilman diêşînin ez neyarê wan im ù ez li axiretê dawadarê wan dibim.

571 — Heçî ko bê sebeb ù bê heq xelkê diêşînin Xwedê ji xwe dixeyidin.

572 — Bêbextiya mezinîr ew e ko mezinê welateki bi zad ù xwarina xelkê ji xwe re ticariyê dike.

573 — Li Încîlê hatiye nivîşandin : wek te bi wan kiriyê wê bi serê te ji bê; wek te bi wan dikî ew ji wê bi te bikin.

574 — Ji bona mirovên ko qenciye dîkin masiyên behra ji dia dîkin.

575 — Heçî dar ù xerza dişitilînin ù erd ù cotê xwe dikin Xwedê qedrê wan digire.

576 — Yê ko dielime tişteki ù bi xelkê na de zanin kirin, mîna mirovek e yê ko zêrên xwe vedîşere, diçe bin erdê ù pê arikariya xelkê na ke.

577 — Mirovê ko şîreta qenciye li xelkê dike ù ew bi xwe qenciye na ke mîna çirayek e ko dora xwe reş dike ù ronahi dide xelkê.

578 — Heçî ko dilê wan di dana deynê wan hebe Xwedê arikariya wan dike.

579 — Ji qenciye hêjatir tiştekek tune, qenciker mîna mirovek e ko her nimêja xwe dike ù rojiya xwe digire.

580 — Li ba Xwedê sedeqa mezin ew e ko mirov rastiye bibêje.

581 — Mezin heint pîgirêdayî wê bân hafa Xwedê, emelê wan ên qenc wau ji pîgirêdanê xelas bikin.

582 — Yê ko di roja tengahiye de bi kêri hevalê xwe ne hat ko ew ket tengasiyê kes ji bi kêri wî na ye, xweditiyê lê nake.

583 — Mirovê ko deriyê xwe digire li ber xizan ù belengaza, Xwedê deriyê rehm ù keremê lê digire.

584 — Xwedê mezinê mîletê ko li ser rast ne meşiyaye ber bi rû ve davêje dojhê.

585 — Tu dilê bê xem tune ye.

586 — Sebir, baldirêji ù bihnûrehi zînet mirova ye.

587 — Xwedê di gunehên tobedaran dibore.

588 — Tirsê tu kest ji mirinê xelas ne kiriyê, feyda tirsê tune ye.

589 — Du gur hinde hakimeki zalim keriyî na êşînin.

590 — Tu hinde xebata xulamê xwe sivik dikî bi wî qasî Xwedê sewaba te bê-tir dike.

591 — Wesiyetê xwe binivîsinin ù li cem xwe hillînin.

592 — Yên ko qedrê kal ù piçûk ù zayoyên me na girin ne ji me ne.

593 — Yê ko gava ciranê wî birçî ye, zikê xwe dadigire ù li ciranê xwe na pîrse ne camêr e.

# NEWRÛZ

## BÎST Û SISEYÊ NISANÊ

Herçi Kurdistan, nemaze welatê jorin ditine, qenc bir dibin ko ev cejna mezin, cejna me a mili û nijadin, Newrûz, ji tebîeta welatê me bi xwe hatiye der; şertên jiyîna welatê me ew xwestiye.

Belê herçi welatê kurdan û Zivistana wê ditine û tê de jiyiyane rind dizanin ko Zivistana wî welatî heyama berf û pûk, zipik û teyrok û boranê ye. Heta dera ko binahiya mirov lê hikim dike çav ji spîahiya berfê pê ve tu tiştî nabîne. Welat di bin poşike nerm û stûr, di bin poşike spî de, lal û bêdeng nivîstî ye.

Di tariya şevê û di hişkesayîyê de, jê re, bi tenê guregura ezmanan û reqîna blêç û birûskan ditorînin. Di şevên sayî de hîlma erdê di navhera erd û ezmanan de wek perdeke zivîn disekine û di heyveronê de ev perde wek tûleke tenik dilve û dirêfê. Ev şev dirêj û bi melal in; roj kurt in. Roj kêman caran xwe şanî dide; û دنیا ji ronahiyê bêtir di tariyê de dizivire, tê û diçe, li rojê, li çira û li tehma wê digere.

Cih cih çiyayîne bilind, wek Agiri, Sipanê Xelatê zozanê Bingol û Şerevdînê û Herkola welatê navîn çarkokine spî li serên xwe wer anîne û ji jor de, li hin reşahiyên deştê, wek li wan ecêbmayî, fedikirin; serên xwe ber bi ezmanan hildidin û çarîkên xwe her û her, bi hiriyeke xwerûspî û ji nû ve dixemilînin.

Her rihber û candar daye pey cihêkî germ; çî bau çî şikeft, hemî ji bona wan qenc in. Tîşk dildara herkesî, hewînga her tiştê bican e. Tiştê ko mirov dixwaze çend perengênê gir an tirêjêke tavê ye.

Herçi heştaht ne; di bin poşîya berfê de xwe germ hiltînin; berf agirê wan e. Heçko erd mîrî ye û tiştên rihber jê direvin; qey ditirsîn û naxwazîn û nesaxîya wê bikevin.

Dilê herkesî bi imîd û hevîke tekane hiltavêje : Çile û rojên serma pîrejîyê û herçî git in derbas bibin û roj bi tirêjên xwe ên zêrîn şopa ewrên reş ji slnga ezmên bîmale û Bîhar bi xestanê xwe ê rengereng rûyê erdê ji nû ve bigire; berf û qeşa bihelin; roj û robar û çem biherikin; di mîrg û deşt û çîyan de heştaht serî hildin; darên rût û tazî bikevin xeml û xêzên xwe ên kesk û şîn; hezar di gulistanan de dasitanên xwe ji

gulbinan re bixwinin, hacîreşk bi fira xwe a lez li slnga ezmanan xetên xwe ên 'hê rêç û sop ji nû ve bikişînin.

Xwedê vê hevîya mirovan dibe serî û Bîhar lête rû; diya vedije û herçi mîletên îranî yên ko berî herkesî û bi rêberîya Zerdest yekîtiya Xwedê nas kirine vê rojê şahînet dikin û jê re newrûz an nûroj dibêjin. Ji ber ko di gera rojê de roj û heyameke nû dest pê dike.

Dibejin ko ev cejin panîşahê îranî î lesanewî Cemşîd daniye û piştî afirandîna dinê herçi stêrk in di vê rojê de bi ger û firê ketîne, û ji hev belav bûne.

Elmedê xanî vî şairê kurdan ê mezin, yê ko daye pey her tiştê mîletê xwe ê millî û nijadin; di Memoziya xwe de qala Newrûzê ji kiriyê û gotiyê :

Xel-laqî cihan ji feyzi fitret  
Heyatî felek bi wechî qudret  
Bê qalib û bê mîhîr û miqyas  
Bê alet û bê mişîr û meqras  
Evçende miez-zem û midew-wer  
Evrênge misen-neh û miker-rer  
Înane bi marezâ wicûdê  
Kêşane bi menzera şîhûdê  
Hikmet ew e, ev hemî li kar in  
Hindek di peya û hin siwar in  
Hindek di betî û hin serî in  
Hindek di metn û hin ment in  
Hin midbir in û hinek mideb-bir  
Hin miqbîl in û hinek miqed-dir  
Hin katib in û hinek di îstad  
Hin mitrib in û hinek di cel-lad  
Hin rojperest in û hin şebefrûz  
Hin xus-sarevîn û hin xemendûz  
Hindek di misalî Zîn zeri ne  
Hin şîbhi Memî di mişterî ne  
Bilcîmle nîseyqel û minir in  
Hin padîşeh in, hinek wezîr in  
Hindek ji teher-rika tehlî  
Ew tene bi niqteya rebfê  
Tecdlî dikin ji bo we salê  
Gava weko tene îtdalê  
Danayî miem-merî kuhensal  
Evrêngehe go ji bo me ehwaî  
Got adetî pêştî û zemanan  
Ev bû li hemî cih û mekanan  
Wextê weko şehsiwarî xawer  
Tehwil dikir di mahî Azer  
Yanî ko dihate birçî sersal  
Qet kes ne dima di mesken û mal  
Bilcîmle diçûne der ji malan



Heta digehište pir û kalan  
 Roja ko dibûye idi newrûz  
 Tazîm ji bo dema dilefrûz  
 Selîra û çemen dikirne mesken  
 Bêda û demen dikirne gulşen  
 Xesma ezeb û keçên di bakir  
 Elqîs-se cewahirên di nadir  
 Têk da li mizey-yen û mileb-bes  
 Vêk ra li tefer-ricê mirex-xes  
 Lîken ne bi tehmêt û bi min-net  
 Belkî bi terîqî şerh û sin-net  
 Lewre ko ewan xerez ji goştê  
 Meqsûd ji çûyîna bi deştê  
 Ew bû ko çî talib û çî mettûb  
 Yani du terel mîhib û mehbûb  
 Ev her du celeb ko hev bibîn  
 Kufwê di xwe ew ji bo xwe binin.



### ZERDEŞT

Rêber û Rêzanê mîletên îrani û  
 xwediyê Avestayê

Dewra felekê ji hextî lêrûz  
 Dîsan ko nîma ji nû ve newrûz  
 Mebnî li wê adetê mîbarek  
 Şehri û sipahiyan bi carek  
 Bajâr û kelat û xani berdan  
 Teşbîh bi nijdiyan û cerdan  
 Sef sef dimeşîne kûh û deştan  
 Ref ref dixweştê seyr û gëştan  
 Esnafi imem sîxar û kub-bar  
 Qetha ve ne ma di şehri dey-yar

Hindek bi peyari çûne başan  
 Hindek bi siwari çûne raşan  
 Hindek bi tebayi û bi kesret  
 Hindek bi hevali û bi wehdet  
 Rabûne ve xanim û xewatîn  
 Wan ji tîji gul kirin besalîn  
 Hûran kire meskenê xwe cen-net  
 Bê perde û bê melal û min-net  
 Dûşize û dixter û rewalan  
 Pakîze îzar û zill û xalan  
 Etrab û kewaibê di ezra  
 Mordan û mirahiqê di zîba  
 Eshabi qîmaq lîllî rîxar  
 Erbabi metah lîsni didar  
 Wan lêk dikirin metah yek erz  
 Texmin dikirin bi tûl û w'elêrz  
 Sewdakerî eşq bûn di bazar  
 Hem bayî lîsni û hem xerîdar  
 Sersali û bakir û rewalan  
 Sedşali ciwan û pir û kalan  
 Sersal li resm û rahi mahûd  
 Gêran diçû meqami mehmûd.

Qendili minir dêrî ezreq  
 Mişkât hemil kirin mirew-weq  
 Sersal ko bû ji nû ve mamûr  
 Mîr daye gerê di taze destûr  
 Destûr ko bû ji bo wişaqan  
 Rabûn hemî şîbheti îşaqan  
 Têk çûne bi marezê mezadê  
 Dildadeyî meqsed û miradê  
 Il-la bi tenê Memo û Tacdîn  
 Wan dane xwe dîxterane tezyîn  
 Yani di dema ko bûye tehwîl  
 Ew her du bira di came tebdîl  
 Istebreq û sindîsin di ber da  
 Çend meher û mîqrime bi ser da  
 Kakûl kîrî bûne lîr-re her sê  
 Perçem kîrî bûne zîlf û gësû  
 Wan lew kîrî bû libas tesrif  
 Da qet nobetîn li wan çu teklîf  
 Pûşide libasi dilberanî  
 Seyran dikirin bi sergîrani.

Tîştê ko Xani di heqê Newrûzê de  
 gotiye ev e. Xani digel sebebên wê cejnê ên  
 felekî ayîn û azînen wê ên civakî jî gotine.  
 Ji qesîdeyên Xani dixuye ko di wê  
 heyamê de kurdmancan ev cejn bi ayînine  
 mezin şahînet dikirin û ev cejn gelek biqedir  
 dizanîn. Welê xuya dike ko mîr bi xwe di  
 cejnê de hazîr dibû û ayînen şahînetê bi  
 emîrê wî dest pê dikirin. Herçî ciwan di wê  
 cejnê de di îexçe û bîstanan de rasti hev

## ÎŞÊ PAQIJ

— JI ROJNAMEKE —

Aşir beg çil û pênc salî bû; lê hin jin ne anî bû. Ev bûne 22 sal. Aşir beg li ber mûsa defterxanekê de dixebitî. Xwîngîran bû. Kerek ji destê wî bi zor derdiket.

Ko jê re bigotana: « Li kerema xwe hinek lez bike û vî îşî zû xelas bike » Aşir beg dienirî û digot: « No, zû qedandin ji min nayê. Metelek heye dibêje: Îşê paqij di şeş mehan de çêdibe ».

Eger îşê heval an nasekî biketa destê wî Aşir beg pê dişewiti. Ewê di defterxanê de destqîlîl biçûwa wî serî, bihata vî serî û dîsa wê veşerîya cihê xwe. Hemi bêfêde, dawîya îş ne dihat.

Hevalên wî carina digotî: « Bêkariyê ev zîlam xistiye vî hali; carekê bizewiciya ». Lê Aşir beg tucaran jin ne tanîn bîra xwe. Heval û hogîran jê re sexlîxa gelekî didan. Lê cihaba Aşir beg, hergav ev bû: « Niho ne wexta wê ye. Jinanî li kû ez li kû? Ji îro bi şûn de serê xwe bexîm belayê ».

Aşir beg herî di wexta xwe de dihat dafrê li her ma ê rûdinişt û ji guhdarîne nexuyayî re çend caran « Îşê paqij di şeş mehan de diqede » digot, û xwe ji bin burê xelatê xelas bikir.

Wext guhêrî bûn. Jin ji minî mîran

dihatin û bûk û zava hevdû didîtin û hinkûfên xwe dibijartin.

Zerdeşt di Avêstayê de rast bi rast çêll Newrûzê ne kiri bê ji qata cejîneke Biharê kiriyê û jê mexsed bivê nevê Newrûz bi xwe ye.

Îro ev Cejîna me a millî û nijadî di nav me de kêrî kiri he ji dîsan di hîa bajarên Kurdistanê de wê şahînet dikin. Lê herçî kurdên êzîdî ne jê re « Cemayî » dibêjin û wê wek cejîneke miqedes dizanin. Di vê rojê de kurdên êzîdî cilên xwe ên nû li xwe dikin û di erdekî rast de digehin hev. Her mal xwarîna xwe bi xwe re diîne. Firaxan tevî hev dikin û wan firaxan dirêjî li erdê rêz dikin û li her du aliyên wê sifrê rûdînin û firaxîna xwe dixwîn. Rojê pêde li colê dimînin, direqîsin, distrên û dileyîzin.

Newrûz di nav kurdan de kêrî kiri be ji ji milê din di welatê rehelatê nîzing de ji bo milêten neartî ji di çaxên salê de bûye destpêka Biharê. **HEREKOL AZIZAN**

memûr dibûn û di dafran de dixebitîn; nemaze li her mekîneyên nivisandinê. Tilnivîsek anî bûn dafrî Aşir beg jî. Ew keçîkeke porzer, bejînzîrav û hergav devbiken bû. Di destpêkê de ev tişt ji Aşir beg ra xweş ne hat. Çavên wî li keçîkê diketin û Aşir beg digot: « Îşê pak di şeş mehan de diqede »; û bi ser ve zêde dikir: « Fesibhanelah... dafrên dewletê gihane çî halî; em di nav jin û keçîkan be mane ».

Lê Roj bi roj çavên Aşir beg hin bêtir li keçîka tilnivîs dimihêrtin, lê êdî dafrayên dewletê gihane çî halî ne digot, lê pîrsa « Îşê qenc di şeş mehan de diqede » jî devê xwe ne dixist. Ji her ko niho jî berê bêtir îşê tukesî ne diqedand. Kijan xudangîl qesta wî bikira, kijan dergevan kaxazek jê ra bianiya bêl ko bipirse û bêl ko bizane îş çî ye û bêl ko çavên xwe ji tilnivîsê ba bide; li wan vedgerand û digot: « Îşê pak di şeş mehan de temam dibe ».

Rojekê di dafrê de şexalîyek çêbû l. « Aşir beg jin tîne . . . . .

— Piştî çil û pêncan ?

— Ma lê . . . û çawan yeke mtîna xezalan

— Gelo kê tîne ?

— Di defterxana wî de keçîkeke tilnivîs heye

— Ne lo ! . . . Ma tu çî dibêjî ?

Ev gotin ne vala bûn. Bi rastî Aşir beg tilnivîsê mehir dikir. Dilê keçîkê jî bebû. Aşir beg, Aşir begê berê bû. Dîsan bi xwîngîranî ji xudankaran re digot: Îşê pak di şeş mehan de diqede.

Jina Aşir beg dev ji xebata dafrê berda bû û bû bû kebanîya mala xwe. Lê ev kebanîlîl pîr dom ne kir. Piştî zewaca wan bi şeş mehan jinika reben bi jana zirav ket û çû . . . .

Gava heval bi mirîna jina wî hesiyân çûn ayîna veşartîna wê. Hin cenaze li mal bû. Hevalên Aşir begî borandîn mezeleke li piştî derî. Aşir beg bi çavîne bihêstir kete hundir. Ji hevalan ê meztîr, başkatîbê dafrê jî bo seryweşîya wî çend pîrs gotin. Herwekî dibêjin: bila serê te sax bê, her tişt emrê Xwedê ye; dînya ji tu kesî re ne maye . . . h. d. . . .

Aşir beg çavên xwe ên bihêstir li hevalên xwe gerand; dil kir ko tiştêkî bibêje. Lê eql û me'yê wî hewqas bi hev ketî bûn ko tiştêk ne hat bîra wî. Rûyê xwe ji hevalan bada û bi zor mîrmîrî: « Îşê paqij di şeş mehan de diqede ».

**ŞEYGER**

## REWŞA DINYAYÊ

**IŞÊ HINDISTANÊ** — Bûyera siyastî a girantir ya van rojên paşin Işê Hindistanê ye. Şerê Pesifikê gihastîye deriyên Hindistanê Japon jî propogendeye mezîn çêdikin û xelkê Hindistanê li ingilizan dieliminin. Hindi jî listiqalala xwe dixwazin. Nemaze jî her rewşa îro ingiliz jî gelek guh didin mesela Hindistanê.

Sir Steford Krips, jî bona vê yekê li 22ê Adarê hate Hindistanê. Bi Krips re projeye wezareta Ingilistanê hebû. Li 30ê Adarê Krips ew projeye belav kir û da zanin ko tiştê ko Ingiltere dikare bide Hindistanê ev e; û projeye bi tu awayî nayete tadil kirin. Ji hindîyan re divêt an projê weke xwe qebûl an red bikin.

Li gora vê projê Ingiltere heqektî minahêqê dominyonan dida Hindistanê. Kenede û Ewistralyeyê dominyon in. Di idara dominyonê de welat di işên daxillê de misteqil e; herçî xariciyeyê bi taca Ingilistanê ve girêdayî ye. Di vê projê de du şertên bîşandehîştî hebûn: projeye piştî şerî wê bête tetbîq kirin û hela dawîya şer herçî işên eskerî ne, tev de di destê ingilizan de wê biminin.

Serekên Hindistanê piştî ko li projê hêr bûn jî ber van her du şertan ew red kirin. Lê Krips bi serekên Hindistanê re bi siyasêtiyê bi rê ve çû û ne hişt ko mizakere yekcar bêne birin. Ji milê din nîminendekî Rûzvelt, kulnêl Conson û Çenkeyşek ketin navê û dikin ingiliz û hindîyan li hev binin.

Hindi têk de ne jî yek din û mezheb û zimani ne û jî lewre di nav hev de jî ne yek in. Di nav hindîyan de qedere 80-90 milyon misilman hene. Herçî misilman bi hindîyên bûdaperest ne xweş in û çêtir meylîdariya ingilizan dikin û dibêjin heke heqek jî Hindistanê re bête dayîn divêt hindîyên misilman hikûmetêke cihê binin pê.

Ji milê din li Hindistanê merrace hene. Ev merrace wek mir û axayên me ên berê ne; serekên eşiran in. Xelk bi her awayî bindestiya wan dikin û ev merrace gelek dewlemend in. Heke li Hindistanê hikûmetêke millî û adetî hate çêkirin bivê nevê işê hikûmetê wê bikeve destê mirovên xwendî û karnas û hikîmê merracan ê eşirî wê qels bibe û ew hêdi hêdi li ber qanûn û nizamê wê bihele û jî ortê rabe. Ji ber vê yekê merrace jî ewçend meylîdariya vî işî nakin.

Lê herwekl me got mizakere dom dikin

û ingiliz dixwazin işê Hindistanê rojekê herî rojekê saflî bikin.

Li gora nûçeyên paşin Sir Krips vegera xwe bi şûn de hiştîye, general Wêvel ketiye navê û dikin tevdiroke wêlê bibinin ko her du alî qîma xwe pê binin. Lê ev teşebîs jî ne çû serî û li 11ê Nisanê Sir Steford Krips jî Nûdehiyê û bi radyowê da zanin ko kongra hindîyan û civata misilmanan qîma xwe bi şertên projaya ingilizî ne anîne û projeye bi şûn de avêtine. Hindi dixwazin projeye îro bêt tetbîq kirin û di meclîsa mîdafelaha Hindistanê de nîminendekî wan hebe.

**ŞERÊ PESIFIKÊ** — Şerê Pesifikê giraniya xwe daye nemaze Ewistralyayê û tixûbên Hindistanê.

Herçî Ewistralya ye, herwekl me berê jî gotî bû emêrikaniyan mîdafelaha wê li ser xwe girtiye û tê de xwe kar dikin. Li 15ê Adarê general Mek-Ertûr, yê ko li Filipinê bû hate Ewistralyayê û bûye serfermandarê leşkerên sondxwariyan yê Pesifika-Nivro Merk-Etûr di Filipinê de bi xurtî li pêşiya japonan sekinî û bi merranî şerê wan kiri bû. Ji hingê ve deng bi vî generalê emêrikaniyê ketiye.

Japonan piştî ko esker derêxistine giravên Timor û Giina-Nû gelek nizingî li Ewistralyayê kirine. Balafirên japonî jî wargehên wan giravan radibin û her û her li wargehên Ewistralyayê didin. Mirov digot qey dilê japonan heye esker derînin Ewistralyayê jî. Lê japonan ev tişt hêj ne ceribandîye.

Herçî Şerê Filipinê, vê paşiyê, di ulv-girava Batanê de emêrikaniyan terka kozikên xwe da bin jî zora wan ne çûye, xwe dane paş, ketiye kozikên din û li her xwe didin. Japonan jî nû ve derêjî emêrikaniyan bikin û işê Filipinê bi temami saflî bikin.

Piştî şerîne xurt emêrikaniyan terka Batanê da û li 9ê Nisanê kişiyane girava Korêjdorê. Ev girav di xelca Mentîlyayê de ye û tê de kelehek heye. Lê birekî eskerê emêrikaniyê di Batanê de mane û ketiye destê japonan. Wer dixuye ko şerê Filipinê gihastîye dawîya xwe. Lê herçî jî hebe emêrikaniyan di Filipinê de bi qehremantî şer kirine û şantî dinyayê dane ko merrane qeçî bi çekên kêm jî dikarin li ber dijminê xwe bisekinin. Bêdîro ev çar meh in Filipin jî welêt qut bûye û jî hingê ve jê re ne piştîmêr ne jî çek û cebîrxane ne hatine. Gelek heye ko eskerên Filipinê balafir jî nin bûn; lê bi xwe

mêrine qenc bûn. Mêrê qenc dikare her tişt bike; ko hewce bû dihe barôt, dihe gule û dikeve ser serê dijminê xwe.

Herçî Cave, Simetre, Bornêo û giravên Hindistana Holendî ên meyn tev de keti bin jî destê japonan, di hin deran de şerên çetan dom dike û balafirên ingilîzî û emêrikani li wargehên wan giravan, yêr ko Iro di di destê japonan de ne, gah gah hîcûm dikin û li wan dixin.

Ji milê din di Pesifikê de şerine betri jî çêdibin û nemaze noqarên emêrîkanî dikin vaporên japonan ên barkêş bin av bikin.

Li niyê Hindistanê şer nemaze di Birmanyayê de germ bûye. Di vê eniyê de nexasim eskerên çini li pêşiya japonan sekinine.

Piştî ketina Rengûnê şer di dora Tongo û çemê Îrewadî de çêdibe. Li dawiya Adarê japonan Tongo zemt kir û eskerên çini û ingilîzî xwe jê bi şûn de kişandin.

Ji milê din japonan avête ser giravên Endemanê û ew xistine destên xwe. Giravên Endemanê dikevin nîvroyê xelca -Bengalê. Rojnameyên Londrê di vê babetê de dibêjin: standina wan giravan delleke din e ko dilê japonan heye dirêjî Hindistanê jî bikin. Di hejmara 41ê de me qala girava Seylanê kiri bû û goti bû ko mihtemel e ko japon herdin vê giravê jî.

Piştî ketina Sengeporê ehemiyeta Seylanê bêtir bûye. Li 5ê Nisanê balafirên japonî bi ser vê giravê de girtin û ew dan her bimbeyên xwe. Dîsan di vê rojê bi xwe de balafirên japonî li Medras û çend benderên Hindistanê ên din jî xistine. Medras û benderên din dikevin nivro rohelatê Hindistanê û jî 400 heta 800 kîlometirî di ser Seylanê re ne. Seylan û benderên lêxistî tev de jî wargehên japonan gelekî dûr in. Tu balafir nikare jî wan wargehan rabe, here Seylan û benderên din û dîsa vegere wargehê xwe.

Ji lewre û welê dixuye ko çend vaporên balafirhilgir hatine nizingî wan benderan û balafirên xwe ber bi wan benderan ve firandine. Balafir piştî ko bi karê xwe rabûne vegeiriyane ser balafirhilgiran.

Lê wer dixuye ko ingilîzan di Seylanê de tevdira xwe diti bûn û beturiyên balafirşiken xurt kiri bûn. Ji ber ko danezana ingilîzî ya ko di heqê vî şerî de hate helav kirin dibêje: Japonan bi 75 balafirên dirêjî Seylanê kiriyê. Me jî wan 27 balafir di cih de avêtine erdê. Xesarine welê gihastine 25ên

din ko divêt ew jî bi rê ve keti bin behrê û ne gihasti bin vaporên xwe.

ŞERÊ ÛRIS — Dinyayê tev de çavê xwe berdaye vê eniya şer. Ji vî milî be, ji wî milî, mirovdewletên sivil û eskerî, pisporên şer û iqtisadî yekzar û yekziman dibêjin ko şerê Ewropeyê di vê eniyê de û bi şikestina yekî jî her du şerevaniyan wê bigene encamê.

Ji milê din serekdewletên sondxwariyan bi tevayî mikur tèn ko jî ho sivikirina hare Rûsyayê divêt di roavayê Ewropayê de enike nû hête danin; yanî jî sondxwariyan re divêt esker derînin peravên Ewropê yên roavê.

Lord Biverbrûg di vê babetê de gotiye: « Rûzwelt, Çorçil û Mekenziking ehemiyeta eniya Ûris qenc bir dibin. Ji xwe heke ordiwa Ûris begav ma û kişiya piştî çiyayên Oralê imidên me jî bîntî bêne qelandin. Şerê Biharê wê bibe şerê encambêşx. Ji Emêrikê re divêt di şerê Biharê de roleke mezinî bilehtze. Xebata febrîkan bi tenê bi şizulandina tevayên febrîkê, di qadên şer de bi kêr têt ». Biverbrûg pê dixwaze bide zanî ko jî Emêrikê re gerek e esker bişîne Ewropayê û divêt ew esker bi sondxwariyan re şerê elemanan bikin.

Li gora kaniyên bêteref û yên sondxwariyan Emêrike jî xwe jî bona vê yekê kar dike. Li 7ê Nisanê genêral Mersal relsê erkanherbiya Emêrikê hate Londrê. Dibêjin ko hatina genêral Mersal Londrê jî ber vê yekê ye. Genêral jî rojnamevanan re gotiye: eskerên emêrikani besebir li hêviya wê rojê ne ko pê li erdê Ewropayê bikin.

Herçî eleman in ew jî karê xwe jî bo şerê Biharê dikin û dizanin ko şerê qada Ûris jî hona wan şerê heyin û mirinê ye. Li gora ajansan eleman xwe ne bi tenê di Rûsyayê de lê di deverine din de jî kar dikin. Di vê navê de eleman eskerine nû ditînin Belqanê, giravên behrê Êjê û peravên Îtalyayê. Ji milê din merşal Von Brewxiç helîye Yewnanistanê.

Li gora hawirên Londrê, li Biharê, eleman di Behra-spi de jî wê rabin hîcûmêke gelemper. Pisporên eskerî yên Londrê û Enqerê dibêjin eleman jî milekî dirêjî Qevqasê bikin; jî milê din jî di Maltayê re bavêjin Libyayê û di Qibrîsê re berdîn Sûriyê û bi vî awayî wê bixwazin li Swêşê bêne wer.

Di eniya Ûris de şer jî hêdî hêdî germ dibe. Lê elemanan hej dest bi êrişê ne kirîye. Yên ko radibin êrişê Ûris in. Ûris dixwazin beriya êrişa elemanan bilindcibên mibim

# BINGEHEN

## GRAMÈRA KURDMANCI

BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHIRVAN

— 12 —

**ŞANEK** — Ji daçekên ko ji birekî bihevketî ne û dikevin pêşiya bêjeyan (li, hi, ji) tu daçek nikare bikeve pêşiya pronavên libevxistî. Ji her ko ev di wê de hene. Ji lewre mirov nikare bibêje; Mozê bi wi pê veda. Divêt bibêje: Mozê bi wi veda. An: Mozê pê veda.

Lê herçî daçekên ko ji tu biran bihevketî ne (di-de, jê-re, bi-ve) birê wan ê paşin dikare bide pey pronavên libevxistî: ez tê de bûn, min jê re got, ev her du gund pev ve ne. Birê van daçekan ê paşin ji xwe di wan de ye.

Ji milê din pronavên libevxistî dikarin bidin pey hev. Ji her ko di wan de daçekek û pronavek heye û ji lewre gava didin pey hev ji pronavek dikeve navbera her du daçekan: Min jê lê pirsî. Yanî: min ji vi li wi pirsî.

### PRONAVÊN ÎŞARKI

94 — Pronavên îşarkî ji kes tişt û hêwanan bi tenê kesên seyim dinînin û gava dikevin şûna wan, wan bi îşaretkirinê şanî didin.

95 — Di zimanê kurdmancî de du fexlî pronavên îşarkî hene:

ji destê elemanan bistînin û êrişa wan ji niho de kêmsûd bikin. Elman ji li ber xwe didin.

Di qada nivro de herçî ji xwe heliyaye û tang dest bi karê xwe kirine. Li 9ê Nîsanê di nîvgirava Kerçê de ûrisan bi lîngan dirêjî elemanan kiriye.

Herçî elemanên ko di Stareyarosê de ketine nav çemberê ûrisan hêj li ber xwe didin û hin zora wan ne çûye. Qada Smolenskê weke xwe ye. Di dora Xerkovê de ji tu tişt ne guhêriye. ûrisan di dirêjaliya eniyê de hin gund û heledan bi şûn de vegêrandî bin ji navên wan ne dane zaniin.

**ŞERÊ LIBYAYÊ** — Di rojên paşin de gelek caran hati be ji gotin ko Romel wê rabe hicûmê, beta niho tiştekan xuya ne kir û şer di navbera pêşdar û qerekolan de çêdibe û balafirên her du aliyên li wargeh û depoxaneyên hev dixin. Herçî Malte ye; balafirên elemanî, carina bêetlahî û bi şev û roj li wê didin. Herwekî me herê ji got Malte di Behra sîpl de wargehektî stola inglîzî ye û li ser rîya Libyê û Îtalyayê ye.

Şam: 12 Nîsan 1942 NÊREVAN

Ên pîvene: ev, ew

Ên qersene: yê, ya, yên

96 — Pronavên îşarkî ên pîvene pronavîne nêtarin û ji her ko şikilên wan ên kirar û bîreser cihê cihê niûn li gora mêjer û zayendê navdêra ko dinînin têne tewandin û veqetandekên wan dibînin. Ji veqetandekên, bi tenê ên binavkirî bi van ve dibînin. Ên nebinavkirî bi van ve nabînin. Ji her ko ev bi îşaretkirinê ewçend binavkirî ne ko nikarin bibin nebinavkirî.

Ev — Tiştê dîzing an nevdeira ko di qisetê de piştî hemîyan hate gotin şanî dide.

Ev hat Evi got, evê got, ez evi dibînim, ez evê dibînim.

Ev hatin Ewan got, ez ewan dibînim.

Ew — Tiştê dîr an navdêra ko berî çendekê di qisetê de hate gotin şanî dide.

Ew hat Ewl got, ewê got, ez ewi dibînim, ez ewê dibînim.

Ew hatin Ewan got, ez ewan dibînim.

**ŞANEK** — Ev pronavên ha di şikilên xwe ên tewandî de, gelek caran bêtî « e » yê têne bi kar xistin: Vi got, wê got, ez vi dibînim, ez wê dibînim, van got, ez van dibînim. Wi got, wê got, ez wi dibînim, ez wê dibînim, wan got, ez wan dibînim.

Lê neexistina « e » yê çêtir e. Ji ber ko gava « e » hate existin pronava îşarkî « ew » bi pronavên kesî « wî, wê, wan » tevî hev dibe.

Şaneka jêrin di pey mada 90a re de lête senfandî.

**ŞANEKA TARÎXÎ** — Pronava herbihevîn bi bîserveçûna zimên ketiyê şikilê xwe ê ro « hev, êk » . Ev pronav di esilê xwe de ji sê bêjeyan bihevketî ye: « hev-û-din » an « êk-û-din » . Ji lewra berê li şûna « em birayên hev in » , « em birayên êk in » « em birayên hevûdin in » an « birayên êkûdin in » digotin. Piştî « û » ji ji navê ketî û pronav bû « hevûdin, êkûdin » . Lê birêva di vi şikilî de ji hin tadil hatine rû . Herwekî: Hevdî, hevdu, hevdu. Êkdi, êkdu, êkdû.

Şikilê bingehîn bi temamî wînda ne bûye û hetanî îro di hin derên Kurdistanê de weke xwe lête gotin. Ji milê din, ji ber xweşdengiyê, nemaze di zimanê nivîskî de û gava pronavên herbihevîn didin pey hev an ev pronavê ketîne pêş an paşê bêjeyîne yekite di şikilên kevin de têne istîfmal kirin.

Me ji hev re gotî bû ko sibe em hev bibînin.

Me ji hev re gotî bû ko sibe em hevdu bibînin.

Me hev nas ne kir.

Me hevdu nas ne kir

Piştî ko em li esilê wê pronavê hîr hûn emê wê ji hev de bêxin û li hemanên ko ew anîne pê hûr mize bikin.

Ji xwe di şikilê « êk-û-din » de mana her bêjeyê çêkere ye. Bi tenê tê de « yek » hûye « êk » . Herçî « hev-û-din » gelek heye ko « hev » ji bi mana « yek » e. Bêdîro di zarakî kurdî, di zarê dumilî de ji « yek » re « jew » an « yew » dibêjin.



## DIWANA MELÉ

— 20 —

Emrê zayî bo me bê dilber ebes  
Wê li vî (1) emrê me borit pir ebes  
Dil emanet da bi naehlan ne di  
Lê bi naehlan mede gewher ebes (2)  
Da di seyra eşqê bê dilber neçî  
Low (3) dibit seyra te bê dilber ebes  
Pir li pey weslê me se'yî û celde da  
Cêhde û se'ya me hatin der ebes  
Ahûyê (4) kuştim bi derba xencerê  
Ma di mêlakê derit xencer ebes  
Dil ji derba kaşowan bû parepar  
Ko di meydanê dibit sed ger ebes  
Meldera wî sixteyî iro bikin  
Ez dibêjim nabî ev mehdêr ebes  
Kîşt û manê kî li lewhî simê wî (5)  
Niqteyî misk û xetî enber ebes  
Da mela hişyar bit lê pir kesan  
Sine pir lê dane sing û ber ebes.

— 21 —

Femî (1) enberşikenê bêt ji enber meke behs  
Bil ji wê sîlsile û zîlî nîenber meke behs  
Veke lêvê û ji nêvê biwerin qend û nebat  
Ji lebrî laleşekir bêt ji şekir meke behs  
Bi ser engûstê eqiqê bide fîncana rehîqê  
Abî heywan te çî yin nav ji kewser meke behs  
Zeriyên şehle û dirdane bibin şahidî bezin  
Ji genim reng û siyeh celre (2) û esmer meke behs  
Di beşaret bi îşaret ji neyê hête sîma  
Tu b'wê nay û semayê bike hawer meke behs  
Di nihantî bi deraxûşê bidî canî şîrin  
Şaxî emrî bi xwe hirjî û ji Qeyser meke behs  
Ayeti hisnî mîfes-sal kî ji keş-şafî cema  
Ilmî eşqê bike tefsîr û ji deşter meke Behs  
Razî dehrê ji sîpehrê tu nizani bi cedel  
Hikmetî dawer e ew tu ji hikmet meke behs  
Avî heywan te divêtin tu bibe hemre Xidir  
Camî Cem bin û ji Dara û Sikender meke behs  
Ji ezel aqîbêlî kar ko malûm ne bitin  
Ganî mey noş ji teqdîrî miqed-der meke behs  
Dilê yarê me ne bû nerm bi sed ab û giri  
Ji dilê dilherî ma berê mermîr meke behs  
Tir bi sed tene çeger, sine li ber maye çeper  
Ji dil û cerg û kul û sineyî kerker meke behs  
Şîrê elmasî kişînit tu ji lamîh de xeber  
Vegritî heq-çeçî yaqûlî ji gewher meke behs  
Ji şefeq zîbre xuya hit tu binêr perwînan  
Cîhetê (3) ew binimêl tu j'meh û xawer meke behs  
Lî rûyê yar di nû ve me qeran dîne di mest  
Tu ji seyri qemer û talî û exter meke behs  
Pir ji dêmê xet û xalan te xeber daye mela  
Nezerê wer bide bejnê ji mîfes-sîr meke behs.

## FERQÊN NIVÎŞTAN

— 20 —

(1) tevî. (2) me da gewher ebes. (3) lê  
(4) ab wê (5) kîşt e manê kî li lewhî sim wî

— 21 —

(1) Nami. (2) çirde. (3) cîbhetî.

## LES JEUX KURDES

Le jeu, les voyageurs l'ont souvent remarqué, tient une grande place dans la vie des paysans kurdes. A chaque occasion (fêtes, mariages, etc.), les enfants, et même les jeunes gens et les hommes faits se rassemblent dans les prés qui entourent les villages, et organisent des parties endiablées. L'ardeur puérile et l'acharnement que des gaillards de trente ans et plus apportent à un tournoi de saute-mouton ou de colin-maillard offrent à l'étranger un spectacle bien pittoresque. Sans aller jusqu'au Kurdistan, sur une place de Beyrouth voisine du port, on peut voir assez souvent des crocheteurs oméris en train de se disputer quelques piastres aux billes, et tellement absorbés par cette occupation qu'il semble que le reste du monde n'existe plus pour eux.

Naturellement, les jeux guerriers et les combats d'animaux étaient autrefois les divertissements les plus appréciés. Le Charaf Nameh (XVII<sup>e</sup> siècle) nous apprend que "les jeunes kurdes passaient tout leur temps à jouer au polo et à tirer à la cible." L'Anglais Rich (Narrative of a residence in Kurdistan, 1826/7) parle des exercices d'escrime pratiqués à la cour des Babân. L'un d'eux consistait à trancher d'un coup de sabre une pièce de feutre épaisse d'une quarantaine de couches, mouillée au préalable, et qui était soit étendue sur le sol, soit suspendue au plafond. (t. I, p. 132). A la même époque, la lutte était également très en vogue, et les rencontres donnaient lieu à des paris (ibid, t. I, p. 120). Cependant, comme la pratique de ce sport provoquait souvent des bagarres sanglantes (le vaincu, que soutenaient ses amis, ne voulait jamais reconnaître sa défaite) on ne s'y adonne plus que très rarement. D'après Millingen, (Wild life amongst the Kurds, 1870), des joutes, des concours de lancement de pierres étaient fréquemment organisés (I. 256-257).

Dans les pays de cavaliers (Kurdistan persan, Serhedan), on pratique encore de nos jours certains jeux à cheval. H. Massé, (Croyances et coutumes persanes, p. 421), décrit l'un de ces divertissements, appelé taghaleh : il s'agit de cuir à chacune de ses extrémités, et qui rebondit aux côtés du cavalier. Celui-ci doit le saisir au vol.

Les courses, les joutes, le djérid arabe (cidi) sont eux aussi très répandus.

Les récits des voyageurs du siècle dernier renferment de nombreuses allusions à des combats d'animaux, qui s'accompagnaient de paris en argent. Rich (t. I, p. 102) parle d'un propriétaire de Koy Sandjak, qui envoyait son chien jusqu'à Suleymaniyé, pour le faire se mesurer avec un adversaire réputé. A Seldouz (Wilson cité par H. Massé, p. 423, n. 2), et dans la région de Qotour (Millingen, p. 256-7), on organisait des batailles de buffles; elles avaient généralement lieu le soir, à proximité de l'abreuvoir. Enfin, Rich (t. I, p. 91-3 et p. 109) décrit les rencontres de perdrix qui passionnaient la population de Suleymaniyé. Les perdreaux de combat avaient chacun leur nom, et leurs maîtres les soignaient avec amour; ils leur faisaient même passer l'été à la montagne, pour les maintenir en bonne forme. Les oiseaux jeûnaient pendant vingt-quatre heures, la veille du match. Au moment de la rencontre, on disposait les cages en cercle, et les assistants se plaçaient un peu en retrait. On faisait alors sortir successivement les deux adversaires, et la lutte commençait. Elle se terminait lorsque l'un des champions arrivait à mettre l'autre en déroute, ou à le saisir par la nuque et à le trainer deux ou trois fois auteur du ring. Rich cite encore des combats de béliers, et l'on trouve souvent dans les chansons des comparaisons inspirées par ce sport. Un chant de guerre déclare :

Şerê feqrê Êzldiya n soliyê Misilmana  
Xweştir e ji şerê nêrl n herana!

La bataille que livrent des faqirs yezidis (1)aux soufis musulmans

Est plus belle à voir qu'un combat de boucs ou de béliers!

Les jeux suivants, qui se pratiquent en plein air, sont appelés jeux d'été.

Hol, ou Gok (hockey) —. Analogue au hockey européen. La crosse s'appelle çewgan, çemik, ou kaşo, et la balle, gok. C'est de loin le jeu le plus populaire au Kurdistan. Il arrive que l'on se lance des défis de village à village. Les équipes adverses se rencontrent à mi chemin, et la compétition dure parfois une journée ou plus.

Baûtan (saute-mouton) —. Dans certaines régions ce jeu s'appelle aussi kervanê xwê (la caravane de sel). Durant la partie, on chante le refrain suivant :

"Baûtan, xweş baûtan!  
Sera didiwan çûme çiyân,  
Min digo : "Pirê, piçîkî rûn!  
Gahê reştî nav kevîran."

(Saute-mouton, joli saute-mouton!  
Pour la seconde fois, je suis allé sur les monts.  
Je disais : "Vieille, un peu de beurre!"  
Le bœuf noir est dans les pierres.)

Çire. — Notre jeu de barres.

Talûl. — Chacun des joueurs est muni d'un long bâton. L'un d'eux, le talûlçî, se place sur une butte, et lance à ses camarades une petite pièce de bois nommée talûl. Les joueurs se la renvoient les uns aux autres, à l'aide de leurs crosses. Si le talûlçî manque son coup lorsque le talûl revient vers lui, il est exclu du jeu (dîmire, il meurt) et un autre le remplace.

Qaq (billes) —. Se joue à deux. Chacun des adversaires a deux billes. Celle que l'on lance s'appelle qaq, et celle qui sert de but, gule. Si l'on parvient, à l'aide de la première bille, à envoyer la seconde à plus de trois pas, on a le droit de redoubler son coup. Celui des joueurs qui réussit le premier à couvrir de la sorte une distance de cent pas a gagné.

Apê Mûs (colin-maillard) —. Se joue à deux. Les adversaires sont séparés par une grosse pierre, un escabeau, etc, sur lequel chacun doit tenir la main gauche. L'un d'eux a les yeux bandés. il est muni d'une corde qu'il brandit en criant : "Apê Mûs, adeta te derbeke bê namûs!" (Oncle Mûs, tu as l'habitude de frapper en traître.) Il s'efforce d'atteindre son partenaire qui se dissimule, cherchant à éviter les coups. S'il est touché, les joueurs changent de rôle.

Sora berda Mema (Les Soran poursuivent les Maman) (2) —. Les joueurs se divisent en deux camps, Soran et Maman. Entre les deux groupes, deux comparses tiennent un manteau tendu à la manière d'un rideau. Un Soran et un Mema s'approchent simultanément du manteau, en rampant, de manière à n'être pas vus. Un arbitre les interroge alors tour à tour, à voix basse : il s'agit pour chacun des adversaires en présence de deviner qui se trouve en face de lui. Si c'est le Soran qui y réussit le premier, l'arbitre crie; "Sora berda Mema!", ou inversement : "Mema berda Sora!" Le groupe indiqué s'élance sur



les traces de l'autre, qui prend la fuite. Si l'un des poursuivants parvient à attraper un ennemi du camp adverse, le partie est gagnée, et les vainqueurs sont récompensés par une promenade à califourchon sur le dos des perdants.

**Dik à mirtşk** (les coqs et les poules) — Deux camps, celui des coqs, et celui des poules. Le parti des poules est commandé par un coq. Les poules sortent, se tenant dos à dos, autant que possible. A ce moment, les coqs du groupe adverse se jettent sur elles et tentent de leur sauter sur les épaules. Leur coq cherche à les défendre. S'il parvient à désarçonner l'un des assaillants, le camp des poules a gagné et les coqs doivent se laisser chevaucher.

**Doşek à balif** (matelas et coussins) — A quelques détails près, analogue au précédent.

Les jeux que nous venons de citer ne sont plus guère pratiqués de nos jours. Certains sont même complètement tombés dans l'oubli. Les circonstances politiques et matérielles ne tarderont pas à faire disparaître ceux qui subsistent, comme d'ailleurs bien d'autres traditions kurdes. Les seuls divertissements auxquels on s'adonne régulièrement à l'heure actuelle sont ceux dont la mise en train nécessite moins d'apprentis. La liste qui suit — et elle est loin d'être complète — montrera qu'ils ont encore nombreux.

Les jeux que nous allons décrire se répartissent en deux catégories: jeux d'hiver, exécutés à l'intérieur des maisons, et jeux d'été, qui demandent plus d'espace et ne peuvent s'organiser qu'en plein air. Cette distinction, qui semble très nette, m'a été précisée par plusieurs informateurs.

**Şetrenc**(échecs) — Les échecs sont connus depuis fort longtemps au Kurdistan. Comme dans la Perse ancienne, tout membre de la noblesse doit en posséder une bonne connaissance, sous peine d'avoir une éducation incomplète. Un vieux chef auquel un de mes amis demandait un jour s'il savait y jouer répondit simplement: « Je crois passer aussi pour un agha kurde. » Les noms des pièces sont les suivants: şah, le roi; ferzin, la reine; hesp, le cavalier; fil, le fou; rex, la tour; peydek, ou peya, le pion.

**Çûkîrt** (pigeon vole) — Les joueurs s'installent en cercle. Le chef du jeu lève la

main en disant: "Çûkîrt fîrî fîrî!" (Moineau vole!) ou "Qaz fîrî fîrî!" (Oie vole!), ou encore: « Qazî fîrî fîrî! » (Cadi vole!). Les participants doivent lever la main ou la garder baissée, suivant que les êtres ou les objets cités sont susceptibles ou non de voler. Celui des joueurs qui se trompe est puni: on couche le perdant face contre terre; l'un de ses camarades lui pose la main sur le dos, un second place la sienne sur celle du précédent, puis un troisième, etc. On dit alors:

"Dombîla, dombîlî!

Axçî ko nas?

Gûê heraz, inçî ko nas?

Destê kt li ser desta?"

(Tambour, tambourin! — Qu'est-ce, ô gens? — Excrément de porc, qu'est-ce, ô gens? — Qui a la main par dessus celles des autres?) (1). Si la réponse donnée est juste, le joueur reprend sa place, sinon, on le frappe et l'on recommence jusqu'à ce qu'il ait deviné.

**Dibistan** (l'école) — Se joue en hiver. Des enfants s'accroupissent en cercle et étendent leurs mains. Le chef de jeu tire un de ses camarades au sort, en s'aidant de la formule suivante: "Yekê yekê, yekankê, dibistanê, gula çepê, malê me ye, malê we ye, xîlexîle ye, beba cê ye, hîst li te ye!" (Un par un, l'un d'entre eux, rose de gauche, c'est à nous c'est à vous, cela remue, c'est un grain d'orge, le vingt à toi!) Celui sur qui est tombé "le vingt" enfouit aussitôt les mains dans ses vêtements, pour les réchauffer. Le chef désigne alors un autre de ses partenaires, puis un troisième, etc. qu'il ne reste plus personne, il demande: "Germ bûye, germ ne bûye?" (Est-ce chaud, ou non?). Les uns répondent oui, les autres: "Pas encore." Le maître de jeu ordonne alors à ceux qui prétendent s'être réchauffés de lui toucher les joues avec les mains, s'ils ont menti, il les punit: Il tire l'oreille du délinquant tout en le questionnant, jusqu'à ce qu'il obtienne une réponse satisfaisante. Un dialogue s'engage: "As-tu fait boire mon âne? — Oui, je l'ai fait boire. — Lui as-tu donné de l'eau chaude ou de l'eau froide? — De l'eau chaude. — Tu lui as brûlé la bouche! — Non, de l'eau froide! — Tu lui as gelé la bouche! — Non, non, de l'eau-tiède! — Alors, c'est bien, tu lui as refratchi la bouche."

**TAWÚSPARÉZ**

(1) Je ne saurais garantir l'exactitude de la traduction de ce refrain, qui est en kurde mêlé d'arménien.

(2) Les Soran et les Mëman sont deux tribus du Botan.



## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelnine Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Btyîşa Pêxember. Bi Kurdiya dumill, bi  
dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re
- 7 — C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikitin
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10— Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11— Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12— Dersên Şerîfê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13— Çarînên Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14— Proverbes Kurdes . Medhelokên Kurdî  
Lucy Paule Marguerite û Emir. K. A. Bedir-  
Xan Paris - 1937
- 15— Le roi du Kurdistan . Qralê Kurdistanê .  
Emir K. F. Bedir-Xan û Adolphe de  
Falgerolle . Paris - 1937
- 6— Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdis-  
tanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel  
Berlîn - 1937
- 17— Der Schnee Des Lichtes . Berfa Ronahiyê  
Şîhrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û  
Dr. Curt Wunderlich Berlîn - 1937

## Kiryariya Hawarê

Sall	500	Qirûşên Sûrî
Şeşmeht	300	Qirûşên Sûrî
Sêmeht	200	Qirûşên Sûrî

---

Xwedî û gerinendeyê berpirsiyar: Mir Celadet  
Ali Bedir-Xan. Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aali  
dir-Khan. Damas—Syrie

SAL 10  
HEJMAR 43  
—  
SÊŞEMB  
5 GULAN 1942

# HAWAR

ANNEE 10  
NUMERO 43  
—  
MARDI  
5 MAI 1942

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTİYÊN VÊ HEJMARÊ

Telsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hêdisên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hilbîna Çiran	M. E. Botl
Veşartin	Hesenê Mistê
Cebeltariq	Silêmanê Ferho
Biserhatiyek	Xelilê Genco
Kiriyariya Hawarê	Xwediyê Hawarê
Dîwana Melê	Qedrî Cemil Paşa
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Gramêra Kurdmançî	C. A. Bedir-Xan



ŞAM—1942  
ÇAPXANA SEBATE



## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### TEFSÎRA QURANÊ

69 — Birek cihî dixwazin we ji dinê we vegeřinîn, we şaş bikin lê ew bes nefsa xwe şaş dikin û pê na hesin.

70 — Geli xudankitêbino..... ayetên Xwedê inkar mekin û pê kafir ne bin, hon delil û hîcetên pêxemberitiya Bezma Mihemed xweş nas dikin.

71 — Geli xudankitêbino: ... li rastiye cîlên nerastiye me kin, rastiye veneşêrin, hon bi xwe dizanin.

72 — Ji xudankitêban hinan ji hinan re got: Destpêka rojê de, baweriya xwe bi Quranê binîn û dawîya rojê de bi wê kafir bibin, da ko misilman we bibinin û bikevin dudiliye û ji dinê xwe vegeřin.

73 — Gava cihiyên Xîberê ditin ko hîlebaziya wan bi kêr ne hat, ji cihiyên Medîne re gotine: Bi tenê bi mirovên ji dinê xwe bawer bin. Pêxemberê min, bêje wan: Dinê heq, dinê islam e û rîya rast, rîya Xwedê ye.

Cihiyên Xîberê ji cihiyên Medîne re digotin: Hikmet û zanîn, gezû û kutefir bi tenê ji we re û ji xeynî we, ji tu kesî re ne hate dayîn û baweriya xwe me yênin ko misilman li cem Xwedê dikarin berberiyê bi we bikin.

Pêxemberê min. bêje wan: Zanîn û kerem di destê Yezdanê pak de ne, ew ji kîjkî re dixwaze jê re didê. Xuda zana ye û zanina Xwedê kûr û fireh e.

74 — Xuda ji kîjkî re dixwaze, pêxemberitî û rîya rastiye dide, kerem û comerdiya Yezdan mezin e.

75 — Ji cihiyên xudankitêb hin hene ko tu ji wan re qantarek zêr biktî emanet, ew wî vedigerinin te û hin

hene ko ji wan re zêreki bîdi, heta ko tu pê ne di erdê, ji te re wî zêrî ve-nagerinin; ji ber ko ew ji xwe re dibêjin, heqî ne cihî ne û Tewrat ne xwendine, malê wan ji me re helal e.

Ew bi xwe dizanin kò derewan dikin, Xwedê di Tewratê de tişteki welê ne gotiye.

76 — Belê, gotina wan ne rast e, Yezdan ji mirovên xudan hext û camêr hez dike, ji yê n ko gava ji wan re tişteki bi emanetî lê dayîn wê emanetê ji xwediyê wê re vedigerinin û ji Xuda ditirsîn û destê xwe ji gunehan dikşînin.

77 — Ew cihiyên ko seba xatirê peran, emrên Xuda davêjin pişt guhê xwe, mana Tewratê diguhêrinîn û hextê xwe xira dikin, ew ji nimeta axiretê bê behr in, Yezdan di roja pişdawiye de li wan na neyire, bi wan re na peyive, û wan ji gunehan paqij na ke. Ji wan re ezabekî giran heye.

78 — Ji cihiyên xudankitêb hin hene ko mana Tewratê guhartine û ew, vê guhartoyê bi devki xweş dixwinîn, da ko hon cihên Tewratê ên guhartî seh ne kin û wan cihan ji, ji eslê kitêbê bihesibînin. Ew dibêjin cihê he ji, ji eslê Tewratê ye; lê ne were ye; û disa ew dibêjin; ew ji ji nik Xuda ye; lê ew cihên he, ne ji nik Xwedê ne. Ew derewan dikin û pê dizanin; pirsên ko ne yê n Xuda ne, dikin yê n Xwedê.

79 — Ma layiqî mirovekî ye ko jê re Yezdan kitêb, hikmet û pêxemberitî daye, rabe û ji xelkê re bêje: Dev ji Xuda berdîn û bibin evdê min. Mirovekî wisa divê, li ser rîya Xwedê bisekine, xweş hînf emrên Xwedê bibe û herwekî jê re hate gotin, ji xelkê re, dinê Xwe-

dé bide zanin û pey emr û fermanên Xuda bimeşe.

80 — Ew ji we re nabêje: Pêxember û melyaketan bikin ji xwe re xwedî. Ma kengê ew piştî ko hon misilman bûne, bi kafiritiyê emrî we dike.

81 — Binin bira xwe... Xuda bi hemî pêxemberan li hev hat û ji wan re got: Piştî kitêb û hikmeta ko min bi we da, ezê pêxembereki rêkim, ew tesdiqdarê kitêbên li ba we, Tewrat û Incilê ye. Divê hon baweriya xwe bi wî bi Bezma Mehemed binin û ariariya wî bikin.

Xuda ji pêxemberan pirsî: Gotîna me yek bû, we soz da? Pêxemberan lê vegerand û got: Belê, gotina me yek e, me soz da.

Xwedê gote wan: Bibin şahidên vê soz û qerarê, ez ji bi we ra şahid im.

82 — Yên ko piştî vê qerarê xwe jê didin paş, ew minafiq û kafir in, fasiq û mizawir in.

83 — Ma ew, ji dinê Xwedê pê ve, dîneki dixwazin...

Her tiştên erd û ezmanan, bivê nevé bindestiya Xuda dikin, xwe dispêrin wî; û hemî dê vegerin ba Xwedê.

84 — Pêxemberê min... bêje: Me baweriya xwe bi Xwedê û bi Qurana ko ji me re û bi kitêbên ko ji Ibrahim, Ismail; Isheq, Yaqûb û çêliyên di Yaqûb re û bi Tewrat û Incila ko ji Mûsa û Îsa re û bi kitêbên ko ji pêxemberên Xuda ên din re dahatine, aniye. Em tu ferqê naêxin di navbera wan de û me xwe sipartiyê Xwedê û em xulamên wî ne.

85 — Yê ko ji dinê islamê pê ve dineki dixwaze û dibe, ew din jê weke dineki rast naye qebûl kirin û ew di axiretê de dixesire.

86 — Ma çawan Xwedê mileteki ko baweriya xwe tine û piştî kafir dibe digihîne rastiye.

Delîlên pêxemberitiya Bezma Mihemed giha bû wan û wan bi pêxemberitiya Canabê Mihemed şehdetî da bûn. Xuda qewmên zalim, nagihîne rastiye.

## HEDÎSEN

### CENABÊ PÊXEMBER

REHMÊT Û SILAVÂ XWEDÊ LÊ BE

594 — Dewlemendi ne bi mal e, bi dil û comerdîyê ye.

595 — Girtina rojiyê ne ew e ko mirov dev ji xwarin û vexwarinê berde, lêbelê xwe ji gotin û îşê xerab ji bigire.

596 — Xurtbûn ne bi dest û lep e, Xurtbûn ew e ko mirov wexta xeyda xwe de bi nefsê xwe bikare, ji devê wî dijûn dernekeve û ji destê wî xerabî çênebe.

597 — Gotin û dîtîn wek hev na bin.

598 — Heqê siwara silava li peyan bike, heqê mirovê ji piya silava li ê rûniştî bike.

599 — Heke Xwedê di gunehên peyayên ko heywanên xwe diêşinin û barê wan giran dikin bihoriya, kes gunehkar ne dima.

600 — Bi tenê bi gotina xelkê, bê delil û îshat divê kes kesî ne êşîne.

601 — Heke hon tişteki xerab di hundirê şikefta de ji dikin ew tê dîtîn û bihistin, dev ji îşên xerab berdin.

602 — Ji bona her derî mifta wî heye, mifta bihûştê ew e ko mirov ji piçûk û belengaza hez bike û li halê wan binêre.

87 — Eve cezayê wan; laneta Yezdan, melyaketan û laneta xelkê li wan e.

88 — Ew di vê lanetê de her dimînin, ezabê wan sivik nabe û tu kes li wan na neyire, li halê wan fenakire.

89 — Lê yên ko di piştî poşman û tobedar dibin û nefsê xwe îslah dikin, bila bizanin; Yezdan ji tobedaran re tobe dide, Xuda mihriyan û piyar e.

90 — Lê yên ko baweriya xwe anîne û piştî kafir bûne û li ser vê pê dane erdê û wilo kifra xwe hêj zêdetir kirine, toba wan na ye qebûl kirin, ew mirovên rêşaşkiri ne.

91 — Yên ko kufir kirine û pê mirine, ew kafir in, heke li cem wan zêrê dinyayê hebe ji û ew wî zerî feda bikin ji, ji wan re xelas nîne; ji bona wan ezabekî dijwar heye û ji wan re tu artîkar nîne.



603 — Qurbana xwe bi anîna navê Xwedê û di riya Xwedê da şerjê bikin; laneta Xwedê li ser wan mirova be yên ko qurbana xwe li ser navê ewliya û enbiya, şêx û ziyareta şerjê dikin.

604 — Yên ko bêviya xwe bi hişti û berhejna dikin, em dest ji ber wan hiltînin, bila berhejn û niştê wan, wan ji tengasiyê xelas bin.

605 — Milet hemî bi belayekê têsîn, belâ miletê îslamê jî hakimê zalim in.

606 — Dirêj me kin, kin û rast bibêjin, bi axaftîna zêde û bêrê xelkê jî xwe aciz me kin.

607 — Laneta Xwedê li wan he yên ko rû û laşê xwe dideqînin, birûyê xwe bi mûçînga zirav û dirêj dikin, porên li erdê mayî tînin û bi serê xwe ve dikin.

608 — Xwedê laneta li wan mirova dike yên ko di qehr û kerba xwe de rûyên xwe bi neynûka diqelêşin, cilên xwe diçirînin û diqetînin û qir û wir dikin.

609 — Cilên xwe ên kevn û pînekirî li xwe bikin, lê nûyê xelkê li xwe me kin, xwe me xîr bin mineta xelkê.

610 — Li ser tîrba miriya rûmenin, li ser sêla agir rûnin çêtir e.

611 — Mirovê ko di dema saxiya xwe de xêr û qencikê dike ji wî insanê ko li ber mirîna xwe du sed xêr û xêratan dike ji bi xêrtir e.

612 — Xurtî û hikmê Xwedê jî ên we mezintir e, zor û çavsoyîyê li xelkê me kin.

613 — Xelkê di bin xwe re me girê, tu jî di bin emrê Xwedê de yî, û Xwedê jî te mezintir û xurtir e.

614 — Gava hon rastî zaroka hatin silava li wan bikin.

615 — Ma Xwedê wê çawan jî miletê ko peyayên wî ên qels û belengaz heqê xwe nikarin ji yên jî xwe xurtir bistînin hez bike û li wan bê rehûnê?

616 — Bixwînin, bielimîn û li gora zanîna xwe bimeşin, bi gotîna xelkê xwe şaş me kin.

617 — Hakimên we jî li gora hezkirin û tifaqa we li we dinêrin, heke hon qedrê nefsa xwe nizanin, tadayaiva hev dikin, hakimên we jî we diêşnin.

618 — Bixwîn û vexwîn çavfirehtî û camêriyê bikin, lê bêrê pereyê xwe ma vêjin çolê.

619 — Xwarîna xwe jî qiraxa firaxê bixwîn, kevçiyê xwe mavêjin serê firaxê.

## HILBÎNA ÇIRAN

Feqeh Mistefa benda jêrîn berf heşt salan nivisandîye. Tê de du tişt hene ko dikevin ber çavan. Awayê nivisandinê. Me ew weke xwe hiştiye ji bona ko bibê nimûneke zarê wî. Mistefa jî Kurdistanê hati bû Bêrûtê û di xanîkî pakraxistî û têronî de rûniştî bû. Wî xaniyî û wan çiran ev bend ji Mîslefê re daye nivisandin.

Mistefa bi vê bendê ronî û medeniyeta ko li Bêrûtê di tiye ji bo welatê xwe ê xopan daxwaz dike.

Kurdistan heta niho weke şeveke larî û dijwar bi, bi berf û bager û baranê. Kesî ne dikarî lê bigere û bê û biçê mala dost û heval û hogir û çiranên xwe; ji bo serdana hev, ka kî sax e, kî mirî ye; ji ber teqereka ezmana û birîska ko ji rojhelat û rojava derdiketin; digotin ev birîskên he ê li me bidin û me bikujin; em ne wêrîn bîn û biçin û bigerin.

Tirsîhan, rûniştin malên xwe de û berf bi ser wan de hat û ket û stwir bi û berfê ew nixumandin û ew manc bende û derneketin; beta çavên wan tarî bîn û pîr bîn û xerfîn û bi kêrî tu şolan ne hatin.

Di ser vî qasî re guriyên bar jî xwe kiri bîn rexên rîyan û kengê yek ji wan tê re bibore hemî bi hev re xwe bavêjin-ê û bigirin û bibên û birevînin û bêxîn newaleke kwir de û bixwîn.

Paşê ev kurdên he pê hesihan ko guriyan xwe kirîne kemîn û revde û xwe di pêşiya wan de veşartîne û nikarin ji wan derbas bibin. Çînkî destvala bîn; ne ko bêzirav bîn. kurd mane rawestayî di malên xwe de.

Eva guriya jî gelek ziyarên wa kiri bîn û pez û dewarên wa xwarî bîn. Nema-ze herxên wa ên helî û serceleb û nişankirî û beranên wa ên tov, ên ko dilê wan li ser dişewitî.

620 — Hon hemî şivan in û pîrsa keriyê we ji we dibe; pîrs û cihaba malê ji bav, ya xelkê jî mezinan û ya miletî jî hakimîna tene kirin.

621 — Hon hemî insan in û kalikê we Adem jî axa reş hate afirandin, bi navê bav û kalê xwe.

622 — Xwe mezin me kin, mezinahî li gora kar û zanînê ye.

Heta çêştek welê ev guriyên he hîn bi  
hîn û dihatin eşkere radidan ser wa, ziyân  
û xesara wan dikirin û diçûn.

Yekî ji wan ne dikarî wa guriya hikuji  
nu ser xwe bidit rexekî. Ji ber ko ew bê  
çek û bê lîfing hîn. Bi ser qira didan. Gurtî ji  
bi wa hesilan ko halê wa ev e; ji bilt qira  
tiştêk ji wa nayê. Vêca qenc hîn hîn û ne tirsî-  
han; hîn nayarên ji dil û rast. Herçi tiştê ko  
kêfa wa xwest ji xwe re kirin û birin û  
xweyî hêlistin rwtl weke marî û birçî weke  
xwe. Ê mir, mir; ê revî, revî. Halê me û wa  
ev e; ji xwe re bibînin û seyrê bikin.

Ev ciranên ko niho hazir in ji wan  
dûr hîn; ne dikarin li hawar û bangîna wan  
bên û van guriyan ji wan bidin alîkî û wan  
biparêzin.

Kongê hawar û bangîna digihandin cira-  
nan û ji wan re digotin em ketin hextê we  
de, himek gurtî hîn bîne me, tiştêk ji me re  
ne hêlistîne, heta mirovan ji dixwin û har û  
devbixwin bîne; em çar ji wan nakî. Cirana xwe  
kar dikirin û dihatin wan biparêzin. Revda  
guriya diçû pêşiya wa; ew ji dixwarin û dix-  
pandin, weke mesela gur û rêvî.

Paşê ew berfa stwîr bi şape û bi ser  
wa de hat; hwîr û gir û qor û zexim li  
ber xwe bir; û çiya û rêlên mezin û tari  
û têrdar ji helî û til kirin, weke deştekê rast  
lê kir; û ew bê xudan hêlistin,

Lê çend zilam ji ber wê şapê kuta hîn  
û sax û paraztî derketin Spas ji Yezdanê  
pak re.

Ev zilamên he li hev civihan û kom  
hîn û ji hev re gotin: Herê birano em tev birçî  
û fazl ne; keke qiyamet e, em ji diçin heke  
ne qiyamet e ji xwe hun diçin û hîn dimînin.  
Em li wa dera bigerin û binêrin ka kesek li  
rasta me nayê; ji me re zadekî, avekê bidit;  
heta ko piyên me ax girtin û şidihayin.

Çûn û gerihan Ne mirov, ne heywan,  
tu tişt xuya nabit. Dîtin ko gund û bajarên  
wa hemî bîne kaviî û xirbe. Totik û pepok  
û goylî û kundê kor, di wan de dixwinin û  
hêlînen xwe di şikêrê wan de çêkirine û kerbeş  
û kunnêrî tê derketine û kiloxên zilaman û  
jinan û zarowan bîne weke sêncî dora rezî;  
bilind bîne. Heywanan ew jî xwe re kirine  
gew û tê de rûniştine.

Gava hûsa dîtin agir di hinavê wa  
de şixullî û dilê wa şewitî. Serkol û pêxwas  
li dinyayê ketin û gerihan. Ji xwe re mecbûrî  
kirin nik xelkên biyenî. Ji xwe re malek  
nûjen çêkirin û danî û peyda kirin û lêkdan

## VEŞARTIN

DI ŞER DE XWE Û HER TIŞTÊN XWE VEŞARTIN

Ji roja ko çekên bi barût peyda bûne,  
di şer de xwe, çek û her tiştên xwe veşar-  
tin hû fenek û di talimên eskerî de vê fenê  
hînî eskeran dikin.

Belê ev tişt, veşartin û xwe veşartin  
piştî derketina barût û hesinê bi qul hate rû.  
Bewê ne tiştêk ewçend bi ehemiyet bû. Ji  
ber ko şerevaniyên bi şûr û xencer û rimh  
û gurz, beriya ko bigelîh hev û çav bi hev  
bikin nikari bûn hevûdin biêşînin.

Ji xwe pêşiyan gotiye: piştî ko hesinê  
biqul derket mîranî ne maye. Lê hişên din  
dibêjin ne ko mîranî ne maye; lê bûye bi  
nivî; nivê din hû para fen û sinhetê.

Gava lîfing nû derket şerevaniyên kevin  
ew ne ecibandî bûn. Dibêjin ko wî wextî  
yekî qeredaxî dijminê xwe bi tîfingê kuşt û  
çû serê wî anl. Gava ew veşariya nik heva-  
lên xwe gote wan: ev hesinê dîrûvêj ne tu  
çek e; divêt mirov qederekî bi rê ve here  
da ko bikare serê neyarê xwe bîne.

Di vî şert de veşartin ji şerên herê bêtir  
ehemiyet girtiye. Di şerên herê de bi siwarî  
û bi dîrebinan hevûdin bi tenê ji rû û jî  
tenîştan keşif dikirin û li ser halên hev ser-  
wext dibûn. Lê tro bi balafiran şerevani ji  
jor de ji halên hev dihinin. Ji lewre îşê ve-  
şartin û nixumandinê bêtir pêş ve çûye.

Herçi wextê bêrê û şerên kurdmançî  
dîline dîvêt bizanin ko şerevani gava diketin  
kozikan kolosên xwe ên dirêj, ji xwe dûr,

û li hev guhdar hîn û xebitîn. Ev mal danî  
û bînyana he ji her boş hî û kêrn ne bi û  
kêrn nahe.

Xwedê hez kir heta çêştek welê çend  
gund û bajarên xwe ên kaviî û xirbe ava  
kirin û nav û dengê wan di dinyayê de gerî-  
han û belav hîn serê dijmin û neyaran ê  
nizim bibin û stoyên wan bête şikestin û  
çavên wa ê tari bibin.

Ew zilam bîne weke keroblke du sed û  
pêncî hejmar û hilawistî di nêva mezelekê  
ji wa ên rayexistî û xemilandî, bi her tiştên  
spehlî ê laze.

Çiqas delalî û rind e. Û mirov divê  
her lê hinêre û tê de rûne. Mirov jê re  
heyran dibê û dimîne û pesnê vî ji her cihetî  
ve dide. Îro Kurdistan ji wisa ye.

Bêrût 1934 M. EHMED BOTÎ

datanin erdê û ew kolosên bêserî dikirin armanca neyurê xwe. Lê îro bajar û benderin bi temamî ji çavên dijmin lêne veşartin. Di Dûseldorf û Kolonyayê de elemanan ji texte û kertonê febrîkeyin çekirine da ko balafirên inglîzî bîn û li wan xîn. Herçi febrîkeyên rastîn ew ji xistine şikilê xaniyên adetî.

Di şerê çin û japonan de ji bo cara pêşîn çiniyan balafirgehên derewîn çekirine û lê heykeline balafirên danine. Japonî dihatin û li van balafirên didan û ew balafirên texte dişkênand û dişewitandin.

Herwekî xwendevanên me dizanin balafirên inglîzî gelek caran diçûn û li bendera elemanî Hembûrgê dixistin. Hembûrg wargehekt behri ye û tê de tersaneke stola elemanî heye. Di vê tersanê de du hawiz hene; yeke mezin, a din piçûk. Ev her du hawiz bi rêhesinê digelî hev û rêhesin di ser pîrekê re derbas bibe. İngilîzan dikir vê pîrê û avahiyên hawizan xerab bikin. Eleman rabûn li dirêjahiya rêhesinê dar danîn û her du hawizan ji qayixine welê teji kirin ko ew ji jor de wek xaniyên piçûk xuya dikirin. Bi vi awayî pîr û hawiz hatin veşartin. Elemanan di cihektî din de pîrêke derewîn û du hawizên din digel avahiyên çekirin; hemî ji texte û kertonê.

Berî ewilî balafirên inglîzî pê xapiyan û bimbeyên xwe her û her berdidan pîr û rêhesina derewîn. Lê piştîre gava resmên ko beriya nixumandina pîrê û yên ko di pey nixumandinê re hati bûn kişandin danîn ber hev û balafirvanên inglîzî li hîla elemanan hişyar bûn. Resnan şani wan dida ko cihê pîrê guhêrî bû.

Çenkeştîyên elemanî, Gneyzenaw û Şernhorst yên ko di Sibate de di Mansê re vegeyriane welê di bendera frensîzî Brestê an di bendera ke di hûn. Balafirên inglîzî heke ne hero be ji serê du sê rojan carekê bi ser wan de diçûn û ew didan ber bimbeyên xwe. Danezanan digot xisarîne mezin gihane çenkeştîyên elemanî. Lê ew bin av ne dibûn. Piştîre hate seh kirin ko elemanan di bendera Brestê de mîna Şernhorst û Gneyzenaw du keştîyên derewîn çekirî bûn û daxistî hûn behrê. Balafirên inglîzî dihatin û bimbeyên xwe berdidan wan keştîyên sehwr. Herçi çenkeştîyên rastîn ew di cihektî din de û bi awakî veşartî bûn. Bivê nevé inglîzî bi vê hîlê ji hesiyan û ji vaporên texte û kerton geryan.

## CEBELTARIQ

Di rojên paşîn de û bi hênceta şerê Biharê ji nû ve çêlî Cebeltariqê lête kirin. Cebeltariq yek ji her du deriyên Behra spî ye. Deriyê din Swêş e. Swêş dikeve nîvrrohelaê ve behrê û di Behra-sor re Behra-spi digelîne Behra-hindî.

Herçi Cebeltariq e di roavayê Behra-spi de ye û bi vi deriyî ve Behra-spi digehe Etlantikê.

Ji xwe ev her du derî ne biwan Behra-spi dibûn golek û ne digelî behrên mezin. Ji xwe deriyê nîvrrohelaê, yanî kenala Swêşê, hej ne bûne sed sal ko hate vekirin. Heta hingê ehemiyeta Cebeltariqê ji îro hêtir bû. Lê herçi riyên Hindistan û Pesifikê ji îro dirêjtir bûn.

Cebeltariq zinarektî nîvgirav e, di nîvroşê Spanyayê de ye û bi bejtengêkê digehe erdê Spanyayê. Jê re Cebeltariq gotine ji ber ko femandarê erebî Tariq kurê Zeyad, di vê avtengê re derbasî Ewropayê bûye.

Heta sala 1704 an Cebeltariq di bin hikimê spanyolan de bû. Di vê salê de emîralê inglîzî Bok ji nişkekê ve herda ser Cebeltariqê. Sfola Bok di pêşiya bajêr de lenger avêt û inglîzian bajar û keleh zemt kirin û tê de cih bûn.

Hingê bajar di zikê zînêr de û ji çend avahiyên pêkhati bû. Herçi keleh ew ji ne tişteki asê bû. Tê de hin tabiye hebûn. İngilîzan keleh xurt û asê kir. Di sala 1705 an de spanyolan dirêjtî Cebeltariqê kiri be ji teşehîsa wan ne çû serî, û ew bi şûn de vegeyriyan.

Piştî ko inglîzî tê de cih bûn, herçi dewletên Ewropayê ên mezin, yên ko herêguh ne didanê çavên xwe herda bûn Cebeltariqê.

Di sala 1762 an, di wextê Lwtî 15 qralê frensîzan de jeneral De Valyêr ji bo vegirtina Cebeltariqê planek çekirî bû. Li gora wê planê mihacim di behir û bejê de dirêjtî kelehê bikirana. 18000 piyade digel 100 topî ji bejê û sih çenkeştî ji behirê.

Di sala 1781ê de Kriyon gava diçû sefera giravên Balêarê bi tabiyeke nû dirêjtî Cebeltariqê kir û wi ji siûda xwe ceriband.

Ji xwe digotin şer tep û hîle ye. Lê di vi şerî de ev tep gelek pêş ve çûye. Ew çend ko carina bajarîne derewîn çêdikin û ew dikin armanca balafirên neyar.

**HESÊNÊ MISTÊ**

# BISERHATIYA

## KUMANDARÊ NOQAREKE ELEMANI

Rojnameke îngilîzî bêl ko navê wî ê rastîn bide zanîn biserhatiya kumandarê noqareke elemanî bi awayê jêrîn dide zanîn. Zabitêkî elemanî, herwekî bi xwe wê bibe, ke liye esaretê û di qerargaha hêstran de biserhatiya xwe ji rojnamevan re gotiye. Rojnamevan navê Von Şleysen li zabitê elemanî kiriyê û bi wî navî çêlt wî dîke û dibêje :

Von Şleysen mirovekî hejnavîn û zirav e. Bi qasî îngilîzêkî bi îngilîzî dizane û gava bi îngilîzî dibêje mirov nabêje ko ew eleman e. Emrê wî di dora sih û pêncan de ye, zewîçî ye û wî du zaro hene. Li her min li

Di pey re spanyolan bi xwe careke din dil kir ko îngilîzî ji Cebeltariqê derînin. Lê ev teşebîsî jî ne çû serî.

Ji van pêve çend carên din frensîz û spanyolan berda Cebeltariqê û ew jî hej û behîrê ve ebloqe kir. Lê hercar stola îngilîzî ebloqe vedikir û digihaşt hawara kelehê.

Lê iro çekên hicûm û midafehê û her tişt gnhêrtne. Ji lewre heke yekî dirêjî Cebeltariqê kir, wer dixuye ko rehma her tiştî wê bikeve bin barekî jî berê girantir. Ji ber ko îngilîzan asêgeha xwe gelek xurt kiriyê.

Îngilîzan topên dûravêjî di nav tebtî û zinaran de çib kirine; bi awakî welê ko bi tenê devên topan dixuyin. Mitralyozên 340 millimêtirî jî bi wî awayî hatine veşartin. Ji van mitrolyazan li Sengeporê jî hebûn.

Dibêjin ko di her wan topan re tu cenkeştî, bi selamet nikare derbas bibe.

Ji aliyê din îngilîzan li her derên kelehê topên balafirşikên danîne. Ji milê din û vê paşiyê mihendisên îngilîzî bajarekî binerdin çêkirtne. Di wextê şer de, nemaze di hicûma balafirên de, esker û ehali xwe di wî bajarê binefdin de wê veşêrin.

Lê herwekî me got Cebeltariq ne girav; lêhelê nîvgiravek e û bi bejtengekê hi bejê re girêdayî ye. Ji lewre dijmin herwekî di mexlê berê de bû, dikare di bejê re jî dirêjî kelehê bike. Ji lewre îngilîzan cilê bejtengê ê tengtir kola û tê de çalekê 50 mêtir dirêjî û 6 mêtir kûr daye çêkirin. Bi wî awayî û di mehcetê de Cebeltariq di çend saetan de dikare ji bejê qut bibe û bibe giravek.

SILÊMANÊ FERHO

ser kursîkî rûniştîye û biserhatiya xwe gili dîke û dibêje :

— Ev cura pêşîn bû ko em derdiketin seferê. Emê biçawan dora Şotlandê. Li nivê sevē me terka Vilhelmslafenê da. Behîr hinek bipêl bû. Ez pê hi kêf bûm. Ji her ko gava behîr holê ye mirov dikare neynika didevanîyê jî derve bibile û dijmin nikare wê bibîne. Bi sefeqê ve min emîr da ko noqar bikeve heta çil mêtirî binê behrê. Ji aliyê rohelê çend torpiyozên dijmin xuya kirin. Dîviya bû dora me de vaporên torpilavêjî hebîn. Em li wan gerîyan lê me ew peyda ne kirin. Heta saet dehan em di binê avê de man.

Gava me da rûyê avê, me dit ko torpiyoz jî bi dûr ketine û jî me ve daxuyin. Êdî em li rûyê avê man. Ji ber ko di dora me de tu vaporên dijmin xuya ne dikirin.

Piştî nivro saet sîsiyan de dengê hate min : jî dûr ve dû dixûye.

Min terka kebiqa xwe da û ez hilkişiyam jor. Belê jî dûr ve dîyek xuya dikir û her bi me ve dihat. Di pey re qeretûx xuya kir. Min emr da ko torpilê hazir bikin. Vapor berê xwe da bû pozê noqara me û di rîya torpiyozên ko me berî nivro diti bûn diçû. Gava me dû diti bû em keti bûn binê avê û wekê vaporê nîzingî li me kir me dîsa da bû rû. Me noqar xistê weziyeta şer. Dilê min hiltavêt. Ev şerê me ê pêşîn bû. Êdî em gelek nîzingî hev bû bûn. Li ser vaporê qelebalîxek çêbû û me dit ko mirovine bi cilên resmî gihastine dora topekê. Me zani ko bi me hesiyane û dikin li me xîn. Min emîr da ko torpilê havêjin. Vapor yeke îngilîzî bû: lê min nikarî bû ez navê wê bibinim.

Min dit torpil di nav kefên spî û şînahiya behrê de rîya xwe vedikir û her bi vaporê ve diçe. Gelek ne bori pêlên behrê ber bi ezmanan rahûn û perçeyên hesin li dora me belav bûn. Me hingaftî bû. Piştî sê deqetan teqinê din hatine bihistin. Min got qey vapor jî cebîrxanê barkirî ye. Paşê me zani ko torpil li malika makinan ketî bû.

Xelkê vaporê bi hev ketin. Deryavanan ber bi şilûqan ve bezin. Du şilûqe daxistin behrê. Deryevanan bi yekî ko cilên resmî lê bûn girti bûn. Me zani ko ew keptanê vaporê ye. Keptan bi çavîne ziz li me difidkirt. Deryavan xwe tavêtin behrê. Dilê min bi wan ve ma bû. Min ne xwest xerqûna wan bibinim. Min emîr da, noqara me ket binê behrê. Min zani bû ko mezinên min ji bona wî îşî ewê

min piroz bikirina, lê ez bi xwe tu fexrê pê ne hesiyam.

Von Şleysen biserhatiya xwe a didowan û a paşn bi vi awayî gili kir :

— Dinya hêj nû zelal bû bû. Şevê pêde ez ne nivisti bûm. Dinyayê dikir ko ronî bibe; lê jê ne dihat; mijê ne dihişt. Mijeke kûr û tari, me nikarî bû em pêşiya xwe bilînin. Noqara me bêî ko pêşiya xwe bibîne diçû, berî ber bi armançê. Tirs hebû ko em bikevin ser torpilekê. Saet dehan de me hin tirêjên tavê ditin, lê gelek hindik. West bû bû nivro, perda mijê ji nişkekê ve çiriya. Hêj me li ber xwe ne diti bû ko zabiteki deug li min kir û got;

— Torpiyorek, berê xwe daye me....

Min emirê xwe da û got:

— Zû, li binê behrê

Torpiyore em diti bûn. Noqara me bi nvi keti bû avê ko guleyek li ber pozê wê teqiya û noqar hejiha. Gule lê ne keti bû. Em ji bi temami keti bûn nav avê û ji her çavên torpiyore winda bû bûn. Min dengê perwana torpiyore dikir. Torpiyor di ser serê me re digeriya. Bihneke din, du bimbeyên binavî di ber noqara me re teqiyân. Noqar çend caran çû û hat. Lê disan bimbe li me ne keti bûn. Qederê du saetan em di bin avê de man. Gava me da rûyê behrê, me dît ko torpiyor ji me geriyaye û winda bûye. Min destê xwe di ser eniya xwe re bir û ani. Xwêhdaneke cemidî jê dilop dikir. Me bir dibir ko heke kêlike din em noqî avê ne biwan emê welê noqî biwan ko careke din em derdiketin.

Heta êvarê em li rûyê avê man. Em di ber peravên Skoçyayê de bûn. Di van deran de vaporên peravîn ên kiçik gelek caran rastî mirov tîn. Min ne dixwest torpila xwe bavêjim armançekê welê hûr. Ji xwe stolîne ji wan keştiyan ji dûr ve xuya dikirin. Stoleke din, disan ji wan keştiyên hûr ber bi me ve dihat.

Min kumanda noqbûnê da. Em daketin beta sîh mêtiri. Lê em ne digihaştin biniya behrê. Mêtironimayê şanî 32 mêtiran da. Biniya noqara me li tehtan ket. Me qesta pêşiyê kir. Lê bê fêde. Me rind guh da. Tişteki li noqarê diket û jê dengêki hesinî radibû. Min tavîl zant çî li me qewimiyê. Em keti bûn nav toreke hesinî.

Min got, ber bi paş. Bêfêde, perwana noqarê li benine fola diket û dixişîst. Ewan

vaporên hûr ev tor avêti bûn û em keti bûn-ê. Li gora saetê roj ji mêj ve çû bû ava. Emê şeva xwe di nav noqara torgirtî de derbas bikirina. Lê sibe.

Min banî deryavavan kir û tiştê ko li me qewimiyê gote wan û bi ser ve zêde kir: — Di pêşiya me de sê tişt bene: Teslim bûn, an bi bimbeke binavî mehiw bûn an bi destê xwe noqara xwe teqandin û tê de mirin. Niho bidin eqle xwe û bêjin min hon kijanî dixwazin.

Deryavanan li hevdu nihêrt û deng ne kir. Zabîtê mihendis bi selaveke eskerî qedimî û got :

— Kuşandan! tu miroveki zewicî, xudan zaro û ciwan î ji. Û tu dizanî ko can şêrin e. Te çawan xwest welê bike em bi qerara te razî ne.

Herçî ez, min nikarî bû 46 welatiyên xwe di biniya behrê de bi kuştin bidim. Min li zabîtê mihendis venegeand; bi tenê gote hemiyan; bila herkes here ser karê xwe.

Herkes çû cihê xwe. Min ser hev çend qehwe vexwarin û min qerara xwe li deftera noqarê nivisand.

Ber bi destê sibê di xew re çûnî. Lê min xewnîne ecêb diditin. Saet heftan de ez hişyar bûm û çûm kebîna nêrevaniyê. Tora hesinî wer li me geriya bû ko me pê re nikarî bû em li rûyê avê derkevin.

Heta saet yanzdehan em di vi hall de man. Ji nişkekê ve me dengê perwanekê kir û tişteki giran ket ser pira noqara me. Me zant ko dixwazin bi me re bidin bistinin. Me aleta mixaberê şixuland. Wan digot : « Rûniştimanên noqarê hon, di çî hall de ne, zindî an mirî .... Cebirxana xwe bavêjin ».

Min li wan vegeand : « Em tev de zindî ne û heta sê deqîqan di me de tu cebirxane namîne ».

Me cebirxane avêt û em derketin rûyê avê û ketin filûqeyên ko di dora me de digeriyan.

Herwekl tu dibinî her pênc zabîten wê noqarê di wê hêstirgahê de ne. Dilê min her bi vapora inglîzî ve ye; ya ko min di sefera xwe a pêşin de bin av kiriye ».

**XELILÊ GENCO**



# KIRIYARIYA HAWARÊ

Li 15ê Nisana sala 1942an saleke belavbûna Hawarê temam bûye. Ji lewre ji ebonyeyên Hawarê re divêt ji vê terlxê ve kiriyariyên xwe nû bikin û heqê kiriyariyê ji gerlnendeyê Hawarê re rêkin.

Belê ev ji bo kiriyariyê ye. Lê vê sala belavbûnê ji milê diin tiştine heja şanî me dane. Me divêt em çêll van tiştan bikin. Ji her ko ew di tarixa çapa kurdan de niqteyine pêşveçûnê ne.

Di sala 1934an de gava Hawar nû belav bû ji xwediyê Hawarê re diviya bû di nav kurdan de bigere û kiriyariyên Hawarê hîde hev. Hingê kurdan kiriyariya Hawarê didan, lê bi vî şerti, yanî gava xwediyê Hawarê diçû cem wan û ji wan dixwest. Lê vê carê holê ne bû. Kurd ji xwe her bi Hawarê mijûl bûn û mil dane her. Belê mirovine nenas, xortine belengaz, wek xortên mîletên pêşveketî, pênc kaxezên xwe dikirin nav zerfêkê de û ji xwediyê Hawarê re dişandin û nav di xelkê didin û digotin arikariya Hawarê bikin. Hawar kovara me a tekane ye; divêt ew bijlî, jiyandîna wê li ser me ferze. Û Hawar jiyiya û di salekê de li şûna 12 caran 16 caran belav bû. Di saleke welê de ko her tişt beha bûne. Belê kaxeza ko berê bi qemerikî bû îro bi panzdeh qemerîyan nayete kirin. Her tişt bi vî awayî.

Ji milê diin mezin û dewlemendên kurdan ji bi diyarina arikariya Hawarê kirin. Divêt em çêll wan jî bikin. Di nav wan de nemaze serekê eşîra Hevêrkan; Hesen axa Haco bi diyarîke giranbeba hate serdana Hawarê. Belê vê paşiyê gava Hesen axa hate Şamê 400 lireyên sûrî dane Hawarê. Hesen axa gava ev pere dane Hawarê digot; Min kumîratek stand û jê çend pere kar kirine. Ji vê karê min para Hawarê hilant; ev e para Hawarê.

Belê Hesen axa bi vê diyariyê pêşî ji hemîyan stand. Digel vê hindê em mirovên ko ji kiriyariya resmî bêtir û bi navê arikariyê pere dane Hawarê nikarin ji bîr bikin. Di vê navê de nemaze kurdên Şamê gelekî bi kêr hatin; di şevêkê de 200 kaxez dane hev û ji nû ve derxistina Hawarê temîn kirine.

Em digel şikraniya xwe navên mirovên ko ji 5 kaxezan bêtir pere dane Hawarê li şîre belav dikin:

Lireyên Sûrî		Lireyên Sûrî	
Hesen axa Haco	400	Şêxmûs axa Hacı Xelef	15
Elî axa Zilfo	50	Lêzgin axa	12
Mûlmûd axa Zirki	50	Arif beg Ebas	10
Dr Ehmed Nafiz beg	30	Şêx Mihemed Zekî	10
Mihemed beg Cemil paşa	25	Yekî Serhedî	10
Silêman efendi Qotrey	25	Mihisn beg Berazî	10
Emer axa Şemûn	20	Mendûlî Selim beg	10
Bekir axa Alost	20	Mihemed Elî axa Şêxmûs	10
Ehmed axa Qereçolî	20	Mihemed Hec Evdê axa	10
Qedri beg Cemil Paşa	15	Receb axa Zilfo	10
Ekrem beg Cemil paşa	15	Tahir beg Bedir-Xan	10
Bedri beg Cemil paşa	15	Xanimekê	10
Miqdad beg Cemil paşa	15		
Faiz beg kurdi	15		

Ji mezin û dewlemendên kurdmancan hin hene ko navê wan ne ketiye lista jorin. Ji ber ko wan hêj tiştêk ne daye. Heye ko rê bi wan ne ketiye. Gava ew jî bidin, emê navên wan jî dê belav bikin.

Me got ko her tişt beha bûye. Lê me kiriyariya Hawarê zêde ne kir. Xwendevanên me bi xwe, bivê nenê vê behabûnê wê derpêş bikin û ji bona sala nû, herkes li gora balê xwe tiştêkî bi ser kiriyariya resmî ve dê zêde bike. Lê heçî halê wan tenik e bila disan pênc kaxezan bişnin, me ji wan qebûl e.

Ji yêkê Nisanê ve me dest bi belavkirina kovareke diin kiriyê: Ronahl.

Ronahl kovareke bi resim û sûret e. Di tarixa çapa kurdan de tiştêkî nû. Belê heta niho tu kovarên kurdi bi resim û sûret belav ne bûne. Ji lewre belavbûna Ronahiyê di jiyîna me a milî û civakî de bûyereke girane ye.

Digel vê hindê ne Hawar ne Ronahl ne jî çend kovar û kurazeyên din nikarin kitêbxana me a milî û civakî ya ko yekcar vala ye tijî bikin. Ev her du kovar dilopine behîreke mezin in; dilopine behîra zanîne ne. Di vê behîrê de ji me kurdan bêtir kêmpar tu mîlet nîne. Heçî mîletê ko îro doza heq û heylîna xwe dike divêt di vê behîrê de xudanpar bibê; lê ne bi dilopan, belkî bi çal û çalik û gotikan.

Belê, ava çalan jî hî dilopan tene pê û her mîletî jî holê dest pê kiriyê. Bi tenê divêt dilop bidin pey hev. Heke ewan ne da pey hev dilopên pêşî di stînga axa bişk de wînda dibin.

Me kiriyariya Ronahiyê jî kiriyê 5 lireyên sûrî. Lê me hêvî heye ko ji xwendevanên me



# DIWANA MELÊ

— 22 —

Tu sehergeh were bazari hidûs  
Li te bê faide azar nedif xari hidûs  
Da ji dil xuncelebê nazik û dirdane pert  
Bî tebes-sim bi te ra bêt ji gulzari hidûs  
Sed gireh min di dil in çep û rastê wê dikir  
Şahidê hisnî qidem zilnî girehdari hidûs  
Bil ji siltani qidem min bi te iqrar nehin  
Ger li kapan nehin menqebi dew-wari hidûs  
Dil di deryayi qedem qaf e; bi sabit qedem i  
Gerçi daimî li serê ferqe me mînsari hidûs  
Belkî diwar bi guh bin bi Xwedê kî bi Xwedê  
Bi tu rengî ne gerî eşkere esrari hidûs  
Lemheyek ger ji kenarê qedemî pertewê det  
Dê ji her wê seetê mehiw bine enwari hidûs  
Ser bi sed pencereyan daye şîaya qedemê  
Kunbete eşq li ser kursiyî diwari hidûs  
Tu hidûsê wer bibin qenc nezer dih carek  
Li esasê qedemê daniye diwarê hidûs  
Here estê xwe û tertîb û qiyasê jêke  
Ger nizanî çi ye yekcar berê dari hidûs  
Ateşî eşq şibhi zêr wê wicudê liel ket  
Heye unimkin ne srit zeybeqî fer-rari hidûs  
El-lah el-lah tu di emrê xwe te carek ne bihî  
Çi sêda têt ji wê kunbedî dew-wari hidûs  
Tu ji ber perdcyî wehinê were der da bibihî  
Çi newa têt bi sed neşme li ewtari hidûs  
Hal û misteqbel û mazî di xwe da tek yek in  
Sibhe mewcud e bi eynê xwe di êvari hidûs  
Rast û çep gav û seet her li me da derbê nebit  
Zilfçari qedemê heyderî ker-rari hidûs  
Rast û evraz û nişivê mi biwartin yek û yek  
Lê tenê wê li me bû daire berwari hidûs  
Dê li qelbê me çi det lamiyê islamê  
Ko li canê xwe me xef bestiye zen-nari hidûs  
Reng û jengê hedesê neqşê bidûs me di dil  
Bide her rindeşî eşqê ev e qes-sari hidûs  
Can li ser dest nihaî di riya canan da  
Rûhi sef sef ko wewestane di bazarê hidûs  
Lê ji xeflet biretin saye zewalê ey dil  
Rûnenî da tu emanet bi şîya dari hidûs  
Da nigarê xwe bi sed rewşî bibinî fro  
Were carê bike seyrê tu di etwari hidûs  
Tu bi halê me dizanî çi ye her lehze Mela  
Me di dil têt û derîl xencerî xed-derî hidûs.

Qesîda 15an di hejmara 401 de nîvco hate belav kirin. Yanzdeh malikên wê ên pêşin kêman in. Em wan malikan li jêr belav çîkin:

ên demlewend yên ko tu diyarî rênekirine Hawarê vê kasîliyê bi hênceta belavbûna Ronahiyê wê bi şûn de vegeftin. Bi vi awayî ronahî jî weke Hawarê, rekma dilaxêva kaxezê, wê bikare bijî û kurdan du kovar û di behîra zanîne de li şûna dilopekê du dilop wê hebin.

XWEDIYÊ HAWARÊ

# REWŞA DINYAYÊ

ENIKE NÛ — Ji mej ve ye ûris dibêjin, li Patzê me êrîşa elemanan di pêşiya Moskoyê de sekinand, Zivistanê pê de me şerê wan kir, di hin deran de me ew bi şûn de vegeftand û me xesarîne mezin gihande ordîwa Hitler. Lê di şerê Biharê de divêt arîkariya me bête kirin, ji arîkariya çek û cebîrxanan pê ve; divêt hevalbendên me esker derînin peravên Ewropê ên roavê û ji par re li elemanan xin. Ji hevalbendan mexsed nemaze İngiltere bû. Terefdarên vê fikirê li İngilterê jî hebûn. Ji xwe bi vi awayî û bi derbekê inglîz wê bikarin zora elamanan bibin.

Lê İngilterê jî bo vi işî karê xwe hêj teman ne kiri bû û İngiltere bi tena xwe bû. Lê iro li rex İngilterê Emêrike jî heye. Herwekî xwendevanên me dizanin eskerên emêrikî dest bi hatina İngilterê jî kirine. Emêrike eskerên xwe li bakurê Irlandê kom dîke. Vê paşiyê rêşê erkanherbiya Emêrikê general Mersal jî hate İngilterê û qederekî lê ma.

Berê digotin İngiltere û Emêrike di sala 1943an de wê esker derînin Ewropayê û li elemanan bidin. Lê di rojên paşin de ev fikir hate guhartin. Iro dibêjin inglîz û emêrikî ewê tsal derkevin heja Ewropayê. Ji ber ko elemanan piraniya eskerê xwe li qada ûris heşidandîye û di roavayê Ewropayê de qewe-

Ger ji wê hûristriştê işweyek izhar bit  
Dê bibit narê hebibîl-lah û dogeh sar bit  
Ger ji ber perde yedî heyza bi mi'ciz bête der  
Şems û kewkeb dê hilên alem tijî enwar bit  
Wer ji eksa xunriyan qewsi qezeh det ysemîn  
Dê gul û rihan bibarin têk ve erd gulzar bit  
Şemhê dê can det ji şewqê bête ger siphî nefes  
Narî axir ger bi mûyek behsî zilfê yar bit  
Dê xeta bit nafeî mîsk er nafeî tatar bit  
Toq û gerden helqeya zin-nari zilfa yari min  
Dê kilita qelbê eşqê helqeya zin-nar bit [1]  
Eqda îhrâmê di eşqê da ko pîrê eşq bit  
Dê çi xem ger xerqe rehîne xaneyê xem-mar bit  
Gezmeyek qewse şevîn aşîq bi nêva dilkevî  
Dê ji can destan bişot xesma [2] kevân nûbar bit  
Ger ji qewseyan bi nîlzan bête der cotek xedeng  
Dê ceger bit pare pare sine tarûnar bit  
Xwîn ji mêlakê bi derba xencerê ko hate der  
Bo şehidê eşqê êdlê dê ji kû hişyar bit  
Dê ji wan lehan şifayê dil bi qanûn tobe kit  
Da îşaret xweş bikin dê berkesî bîmar bîf  
Bilbilê mecrûhê eşqê . . . . .

[1] Dê kilita qelbê eşqê da ko pîrê eşq bit  
[2] xasax



teke gelek kêm hiştiye û Elemanyê di vê eniyê de tucaran evçend kêmqewet namine. Ji milê din heke ûris di pêşiya êrîşa elemanan de bi tena xwe maye, heye ko nikare li ber vê êrîşê bisekine.

Qinyata hawîrên sondxwariyan û ya bêterefan ev e. Yanî dema ko eleman dirêji ûrisan bike ingiltz û emêrikani ji wê dakevin beja Ewropayê û ji par re li elemanan bidin û elemanan bêxîr nav du agirin de.

**ŞERÊ PESÎFIKE** — Herwekl xwendevanên me dizanin ji roja ko şerê Pesîfîkê dest pê kiriye şer di erdê ingiltz û emêrikaniyan de çêdibe û ev her û her erdine xwe ji dest didin. Ji ber ko van ji bo vi şerî weke japon xwe kar ne kiri bûn. Lê li 18ê Nisanê û ji nişkekeve balafirên emêrikani di ser erdê Japonayê re firiyane û li Payitextê wan li Tokyoyê û li hin bajarên din xistine.

Ji ber ko emêrikaniyan di vê babetê de hêj tu danezan belav ne kirine me qenc nezani mîxdarê xesara ko gihastiye japonan çi ye? Herçi japon in dibêjin xesar hindik in.

Lê bi tevayî divêt bajarên japonî ji êrîşên hewayî gelek xesardibe bibin.

Ji ber ko di erdê Japonayê de gelek zinzal çêdibin; yanî erd diheje, ji lewre japonî xaniyên xwe ji textê çêdikin û diwarên wan xaniyan ji kaxezê ne; kaxezeke welê ko di bin makînan de hate dewisandin. Bi vê dewisandinê ew kaxez dibin depine hişk û qaşim. Digel vê hinde texte texte ye, kaxez jî kaxez e.

Ji lewre divêt bajarên japonî, wek bajarên ewropayî, li ber bimbeyên balafirên nikarin bisekinin.

Bi tenê tiştê heye, ew xanî zû hilweşin jî naşewitin. Ji ber ko di texte û kaxezên wan xaniyan de madekî welê heye ko agir bi wan nakeve. Mina kertonên girover, yê ko dikin ser vaporên primûs û pê tehma agir dişkêninin.

Japonye ji bej û wargehên Emêrikayê gelek dûr e. Ji lewre balafirên emêrikani çawan nîzingî li erdê Japonayê kirine. An balafir bi balafirhilgiran hatine heta peravên Japonayê an ji erdê Çîna nevegirtî firiyane. Herçi ji hebe ev îşekî zehmet bû û sondxwariyan gelek kêfa xwe jê re anî.

Li gora nûçeyên rohelatê dûr Emêrikê ev balafir rêdikirin ordiwa Çînê. Balafir li ser balafirhilgiran hetine heta nîzingî Japonayê û jê firiyane û piştî ko li Tokyo û li

bajarên din xistine berê xwe dane roavê û çûne Çînê. Herçi belafirhilgir piştî ko balafir ji wan firiyane vegeiriyane wargehên xwe. Ji lewre japonan da be jî pey vaporên balafirhilgir nişkari bûn xwe bigehlenen wan.

Şerê Filîpinê bi temamî safî ne bûye. Emêrikaniyan piştî ko terka niygirava Batanê dane kişiyane ser girava Korêgîdorê. Li Batanê 60000 eskerên emêrikani ketine destê japonan. Ji lewre divêt di Korêgîdorê de eskerên emêrikani hindik bin. Lê ew esker bi xurtî û mîrani li ber xwe didin. Eskerên emêrikani top û mitrolyozên xwe veşartine nav zinarên giravê û şerê xwe xweş dikin. Japon jî, herwekl eleman li Maldayê dikin, her û her Korêgîdorê didin ber bombeyên balafirên xwe. Lê emêrikani pê li erdê didin û teslim nabin, û kes nizane şerê Korêgîdorê hêj çiqas wê dom bike. Ji ber ko şikênanîna mîrên qene ji şikênanîna top û tanga jî diwartir e.

Rewşa Ewistralyayê weke xwe ye. Wer dixuye ko emêrikaniyan gelek esker, balafir û çekine din anîne Ewistralyayê û hêj ji ditînin. Balafirên japonî gelek li bender û wargehên Ewistralyayê da bûn. Herkest digot qey dilê wan heye esker derînin Ewistralyayê jî. Lê ev tişt çêbibe û li gora pisporên eskerî êdî nikare çêbibe jî; japonan ev firsend jî destê xwe revandiye.

**ŞERÊ ROAVÊ** — Şerê roavê ew şer e ko di roavayê Ewropayê de û di navbera ingiltz û elemanan de çêdibe. Ev şer îro bi tenê di hawan de ye. Ji ber ko di beja Ewropayê de ingiliz ninin û hêj lê venegeiriyane.

Ev şer di van rojan de xurt bûye. Bi sedan balafirên ingilîzî di ser Manşê re derbas dibin û li bajarên Frensa vegirtî û li bajarên elemanan didin. Dibêjin ko ingilîz bi van hicûman dihingivtînin du armancan: ferbrike û destegahên ko ji bo elemanan dixebitin û ji wan re çek û posatan çêdikin xerab dikin û ji milê din elemanan mecbûr dikin birekl balafirên xwe di vê eniyê de bihilin û nekarin wan hişinin eniya ûris. Ji xwe dibêjin ko ingilîz li şûna ko esker derînin beja Ewropayê heye ko bi van hicûmên hewayî bes bikin û bi vi awayî arîkariya ûrisan bikin. Lê herçi ûris pê didin erdê û dibêjin ko bêt ko ingilîz û emêrikani esker derînin Ewropayê barê me sivik nabe. Bivê nevé, di vê babetê de gotina paşîn ji erkanherbiya sondxwariyan re ye. Gelo wê çi bibêjin û wê çi bikin. Tiştê ko bikin divêt di van rojan de xuya bikin.

**PIRSA FRENŞÊ** — Herwekl xwendevanên

me dizanin roja ko hikûmeta merêşal Pêten bi elemanan mitarekeyek imza kir — 22 Hîzêran 1940 — frensîzên ko pê qall ne dibûn, terka Frensê dan û di bin serkariya gênerâl De gol û di Londrê de encimenek çêkirin û dan zanin ko ewê di rex Ingilîterê de bîmînin û şerê elemanan bikin. Bi vl awayî frensîz bûne du bir yên ko xwe bi merêşal girtine û yên ko dane pey De Gol.

Di hikûmeta Merêşal de Laval, yek ji serakwezîrên Frensê, bû bû serekwezîr û siyaseta dewletê digêrand. Ji nişkekê ve Merêşal Laval avêt û emîralê stolê Darlan anî şûna wî. Hingê Laval gelek meyildariya elemanan kiri bû û ji lewre Pêten hikim ji destên wî standin û ew kirin destên emîral Darlan.

Digel vê hindê ingilîz û hevalbendên wî ji emîral Darlan ji ne razi bûn û digotin heye ko Darlan stola frensîzi teslimî elemanan bike. Lê Darlan, herçend bi elemanan gelek da û stand, lê ev tişt ne kir.

Herçî Laval çû bû Parisê ê lê rûniştî bû. Carina qala wî dikirin, lê bi awaki resmî tekilî îşê hikûmetê ne dibû. Lê ji pêşiya ve mehê ve çend caran Laval û merêşal Pêtan hevûdin ditin. Di dora van hevûdîtînan de gelek kurt û pist çêbûn. Hinan got rast e, hinan got derew e, lê îro kirdeyek li ber çavên me ye. Ji 20ê Nisanê ve Laval serekê wezaretê Vişiyê ye. Herçî wezaretên daxilî û xaricîyê ne ew jî di destê Laval de ne. Ji xwe Merêşal di nitqeke xwe de da zanin ko siyaseta Frensa a daxilî û a xaricî her diwan bi destê Laval de bêne gerandin. Herçî emîral Darlan bûyê serfermanderê qewetên bej û behîr û hewayê bêj ko bibe wezîr. Lê emîral wê bikare, bikeve mizakera meclîsa wezîran; nemaze gava mizakere li ser midafeha Frensa û kişwerê wê ye.

Bi vê guhartinê, bêşik hikûmeta Vişiyê, bêtir nîzingî li elemanan kiriye. Lê ji vê nîzingbûnê hêj tu kirde ne hate der.

Laval piştî ko hikim xiste destê xwe gotarek yanî nitqek da û got: « Di kanûna sala 1940î a pêşin de gava min hikim ji destê xwe da min Frensêke xurt hiştî bû. Du salên hebextiyê Frensê xistine halê îro. Merêşal îro hikim xiste destê min. Digel emîral Darlan ezê cehda xwe hikim Frensê ji erdê rakim. Em di saetine dişwar de dijîn. Welat di nav zivari û sefaletê de vedigevize.

Ji sala 40î ve dafra şert hêj firehtir bûye. Frensîzino l honê qebûl bikin ko hin frensîz yêr ko hebextî û xiyaret li welatê

xwe kirine herin di hin erdên kişwerê we de rûnin. Ingilîzan piştî ko em xistine şer û piştî ko em di qada şer de di tena xwe hiştine û stola me bin av kirine; îro jî dixwazin kişwerê me ji destê me bibin.

Frensîzino l ez berê xwe didim we û arîkariya we dixwazim. Heke we dil kir Frensê wê bikare di Ewropa nû de serê xwe hilde û bi şeref û rûmet cihê ko sezayî wê ye bêxe destê xwe ».

Didevanên ko gotarê Lavêl mana kirine dibêjin ko niyeta Laval heye dirêji erdên Frensa aza bike. Di wan ardan de frensîzên aza ne bi tena xwe ne; di her derê de ingilîz bi wan re ne. Heke Laval tişteki welê kir ewê şerê ingilîzen jî bike.

ŞERÊ ÛRIS — Di vê eniyê de şer weke xwe dom dike, êrîş û herêrîşa her du aliyan. Di rojên paşîn de -ûrisan êrîşên xwe kêmkirine. Dibêjin ko ûris jî di hin derên eniyê de xwe ji nû ve kar dikin û ji lewre êrîşên xwe hinek sist kirine. Digel vê hindê danezanên rûsî dîsa dibêjin, me çend gund bi şûn de vegevandine, lê wan gundan bi nav nakin. Herçî şerê balafrînan ji bervajî ve di rojên paşîn de xurt bûye. Ji ber ko neyaran li rê û eskergehên hev dixin û dikin kom kirina eskeran ji hev re zehmet bikin.

Ji milê din balefirên elemanî, nemaze, zora xwe dane bendera Mûrmanskê. Ev bender dikeve bakurê Rûsyayê û gelek bi ehemiyet e. Ji ber ko emêrikani jî ûrisan re di wê benderê re çek û cebîrxanê diştin. Balafrînan elemanî jî sed carî bêtir li vê benderê xistine. Digel vê hindê çûn û hatina vaporan di vê benderê de qut ne bûye.

Ev tiştine bêhemiyet in. Şerîne kiçik in. Lê hemî dinyayê îro diperse û dibêje: Bi pirani, berf di Rûsyayê de jî heliyaye; nemaze jî Moskoyê heta Behra reş; ma gelo çîrcêrîşa Biharê hêj dest pê ne kiriye. Bi rastî berf heliyaye û derece di Rûsya navîn de di ser sifrê re heta 25an jî rabûye. Lê êrîşa elemanan hêj dest pê ne kiriye.

Herçî par şerê ûris li 22ê Hîzêranê dest pê kiri bû. Gelo elemanan çîre beriya wê tarîxê dest pê ne kirin bûn. Ji ber sebebên hewayî an jî ber sebebîne din. Em pê nizanin; lê tiştê ko em dizanin Zivîstana Isal gelek xurt bûye û pir dom kiriye û hatina Biharê bi derengî ketiye. Ji lewre divêtî tidarîkên elemanan jî ji adetê der, bi şûn de ma bin Di vê babetê de gotin zehf in. Hin dibêjin ke ev êrîş li peşiya Gulanê, hin dibêjin li nivê

## RECTIFICATION

A la suite d'une erreur de mise en page, le passage de l'étude de notre collaborateur Tawûsparêz sur les jeux kurdes (Hawar N° 42) compris entre les lignes 40 de la page 11 (1<sup>re</sup> colonne) et 20 de la page 12 (2<sup>e</sup> colonne), et qui forme la fin de l'article, s'est trouvé intercalé au milieu du texte.

Gulanê wê dest pê bike. Li gora pisporine din ev êrtîş beriya Hizêranê nikare dest pê bike.

**ŞERÊ LÎBYAYÊ** — Di vê qada ser de tiştêkî nû nîne. Balafirên mihwerê her û her li girava Maltê didin û jê nagerin. Heta niho ewan balafirên ji du hezar cari hêtir li Maltê xistiye. Digel vê hindê ev girava piçûk digel her tiştên xwe di cihê xwe de ye de û topên wê ên balafirên li dijîman vedigerine.

**ŞERÊ HINDISTANÊ** — Gelo japon dil heye dirêjî Hindistanê jî bike? Ji xwe jî roja ko japon ketine Birmaniyayê hesob şerê Hindistanê dikin. Ji xwe jî milê din li Seylan û Madrasê jî xistine. Li ser vê yekê fermandariya ingilîzî emir da çaliyan ko herçî di midfeha giravê de ne xudankar in terka giravê bidin. Jê dixuye ko fermandariya ingilîzî mimkin dibîne ko japon esker derînin Sêylanê jî. Ji xwe pisporên Loudrê ên eskertî dibêjin ko piştî safî bûna şerê Filipînê di destê japonan da 100000 eskerên hêkar dimînin. Ji van pisporan ve japon van eskeran bînin qada Hindistanê. Ji lewre gelek nihtemel e ko di van rojan de di vê qadê de şerîne mezin çêbibin û japon berdin ser Seylan û Kelkotayê.

Ingilîz hîvê nevé ehemiyeteke mezin didin tîş û şerê Hindistanê. Ji lewre dil kirin tîş Hindistanê safî bikin û hindiyên bikin hevalbandên xwe. Lê hindiyên pêşnihada ingilîzan bi şûn de vegerand û her tişt weke xwe ma.

Herçî Bîrmanya ye; şer tê de dom dîke. Ingilîz û çiniyan piştî ketina Tongoyê xwe daye paş. Di Bîrmaniyayê de bîrên petrolê hene. Japon gihastîne heta wan biran. Lê ingilîz beriya ko jê rabin ew bîr xerab kirine û avahiyên wan şewitandine.

Emêrikant di vê qadê de jî artîkariya ingilîzan dikin. Ji xwe li Bîrmaniyayê dalaf-rvanên wan hebûn. Vê paşiyê eskerên emêrikant bi her texlî çêkên xwe ve gihastîne Hindistanê.

Şam : 27 Nisan 1942

NËREVAN

## BINGEHËN

### GRAMËRA KURDMANCI

BI NAVË YEZDANË PAK Ê DILOVAN Û MIHÎRVAN

— 13 —

97 — Pronavên îşarki ên qersene sê pronav in : yê, ya, yên. Ev pronav li kes, tişt û heywanan bêt ko dîr an nizingbûna wan hidin zanîn îşaret dikin û di komekê de hergav kirar in û tucaran uabin hîreser.

Yê ko hat birayê min bû.

Yên ko hatin birayên min bûn.

Ya ko hat dotmama min bû.

Yên ko hatin dotmamên min bûn.

Herweklî di misalên jorin de tête ditin ev pronavên ha tucaran ne bi serê xwe ne û hergav hîreserek dide pey wan. Ev hîreser jî pronava girêkî « ko » ye.

98 — Ha. Ev hêje jî texlîtek psonaveke îşarki ye. Ev pronav dikeve paşîya pronavên îşarki ên pîvene û bi veqetandekê digelê wan û fikira îşaretkirinê xurtir dîke :

Evê ha            Eva ha            Evên ha

Ewê ha            Ewa ha            Ewên ha

Ji milê din ev pronava ha dide pey navdêran jî û bi veqetandekê bi wan ve dibe.

Mirovê ha            Mirovên ha

Jinika ha            Jimikên ha

**ŞANEK** — Hin pronavên îşarki, di zimanê devkî de, cih cih ketine şikilîne din û esilê xwe wînda kirine. Ev tişt bi lihevîstina pronavên îşarki ên pîvene bi pronava « ha » hatiye pê.

Evê ha            Eva ha            Evên ha

vîna            vêna            vênna

Ewê ha            Ewa ha            Ewên ha

wîna            wêna            wênna

Di vî şikilî de mê û nêr yanî zayendê hêjeyê disan xuya dîke. Lê tiştê ko li aliyê rîqavayê welêt qewimiye ev ferq jî ji ortê rakirîye û bi tenê ferqa mêjer hiştîye.

Evê ha            Eva ha            Evên ha

vaya            vava            vavana

Ewê ha            Ewa ha            Ewên ha

waya            wava            wavana

Nemaze ev şikil bi tu awayî nikare bikeve zimanê nivîskî.

(dûmahik heye)    C. A. BEDIR-XAN





## Kitêbxana Hawarê

Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelnine Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Blyîşa Pêxember. Bi Kurdiya dumili, bi dîbaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re
- 7 — C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazl Nikitîn
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10 — Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11 — Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12 — Dersên Şertetê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13 — Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14 — Proverbes Kurdes . Medhelokên Kurdî  
Lucy Paule Margueritte û Emir. K. A. Bedir-  
Xan Paris - 1937
- 15 — Le roi du Kurdistan . Qralê Kurdistanê .  
Emir K. F. Bedir-Xan û Adolphe de  
Falgerolle . Paris - 1937
- 6 — Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdis-  
tanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel  
Berlîn - 1937
- 17 — Der Schnee Des Lichtes . Berfa Ronahiyê  
Şîhrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û  
Dr. Curt Wunderlich Berlîn - 1937

Kiriya Hawarê 500 Qirûşên Sûrî

---

Xwedî û gerîndeyê berpiraniyar : Mîr Celadet  
Ali Bedir-Xan . Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire : Emir Djeladet Aali  
Bedir-Khan. Damas—Syrie

SAL 10  
HEJMAR 44  
-----  
ÇARŞEMB  
20 GÛLAN 1942

# HAWAR

ANNEE 10  
NUMERO 44  
-----  
MERCREDI  
20 MAI 1942

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARÊ

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Hedisên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan
Reşbelek	Bavê Cemşîd
Xatûn an Piling	Nûredîn Ûsif
Dîwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Kumandos	Silêmanê Ferho
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan



ŞAM—1942  
ÇAPXANA SEBATE





## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### TEFSİRA QURANÊ

92 — Heta ko hon ji malên xwe ên hêja di riya Xwedê de ne din, hon nagehin xeyr û qenciye. Yezdan her qenciya ko hon dikin dizane.

93 — Ji lawên Israil re, her zad helal bû, bes heri dahatina Tewratê, wan xwarina hin liştan-seba nezrekê-jî xwe re heram kiri bûn; weke şîr û goştê devê.

Piştîre cuhî rabûn û gotin herambûna wan di Tewratê de nivisandîye. Bêje wan: Heke hon dilpak û rastiya in, ka Tewratê bînin û bixwinin.

94 — Heçî piştî wî, gotina vir li ser Xwedê dikin, ew ezabdarên nefa xwe ne.

95 — Pêxemberê min... bêje wan: Xuda rast got, Yezdan rastiye dibêje, bi gotina wî qail bibin, bikevin pey mîletê Ibrahim. Ibrahim li ser rastiye sekiniye û ji bêdînan ne bûye.

96 — Mala pêşin ko ji bo bawermendan hate ava kirin, Mala Xuda ye; di Mekê de. Qedrê wê giran e û ew ji erd û ezmanan re şani riya rastiye dide.

97 — Di Mala Xuda de, delîlên mezinahiya wê ên aşikare hene, weke Meqamê Ibrahim û ji wî pê ve her kesê ko dikeve hundirê wî, ji talan û kuştinê ewle dibe û Yezdan ji her kesî re ko taqeta wî heye, qesda ziyareta Hecê emir û ferman kiriye. Yê ko emrên Xuda davêjin piştî guhên xwe bila bizanin... Xwedê ne hewcedarê taet û ibadeta wan e. Yezdan, mezin û dewlemend e.

98 — Bêje wan: Geli xudankitêbino... Çima hon ayetên Xuda li ser

Hecê inkar dikin, Xwedê emelên we dizane.

99 — Bêje wan... Geli xudankitêbino... Ma çire hon dest bi vegerandina mirovên bawermend ji riya Xwedê a rast dikin, Hon bi xwe dizanin ko dinê heq, dinê islam e. Xuda ji emelên we ne bê hay e, ew pê dizane.

100 — Geli bawermendino... Heke we, bindestiya mirovên xudankitêb kir, divê bizanin, piştî ko hon misilman bûne ewê we ji nû ve, ji dinê islamiyetê dertêxin û vedigerinin kafiritiye.

101 — Ma hon çawan kafir dibin? Ji we re Quran tê xwendin û pêxemberê Xwedê di nav we de ye û ji we re şîretan dike. Yê ko li gora emir û fermanên Xuda dimeşin û xwe dispêrin Xwedê, bila bizanin, Yezdan wan digihîne riya rastiye.

102 — Geli bawermendino... Emir û fermanên Xuda her bînin bira xwe, ji dil ji Xuda bitirsin, heri nizîkbûna mirinê bibin misilman û misilman binirin.

103 — Bi dilekî xurt bikevin ser riya Xwedê û bi ya Quranê bikin, dev jê bermedin û destê hev bigirin, gotina xwe bi yek bikin, û kerema Yezdan binin bira xwe, hon dijîninê hev bûn, wî dilê we li hev anî û bi kerema wî hon bûne brayên hev, hon di ber lêva kortalekê têragir de bûn; wî hon jê xelas kirin. Xuda bi wî awayî ayet û delîlên xwe şani we dide, ta ko hon li gora wan bimeşin û bînin ser riya rastiye.

104 — Divê ji we, miletek rabe ko ji xelkê re li gora şertetê bi cihanîna

qencyê û bi ne kirina xirabiyê emir dike. Miletên wisa bextxweş in û digehîna rastiyê.

105 — Mebin, weke wan mirovên ko pişti hatina ayetên Xwedê di sa gotina xwe nakin yek, li hev dikevin, qayîş û berberiya hev dikin. Ji wan re ezabekî mezin heye.

106 — Di roja piştawiyê de, rûyên hinan gewr û rûyên hinan bibe reş û ji yê rûş re dê bê gotin: we baweriya xwe anî û hon jê paşê kafir bûne, ji ber vî yekî niho ji herîna tama dojehê biceribînin.

107 — Lê yê rûgewr, dikevin bihuştê û ew tê de her dimînin.

108 — Ev ayet û hikmên Xuda ne, ji te re rast tîna xwendin; Xuda naxwaze ehlê erd û ezmanan biêşîne.

109 — Her tiştên erd û ezmanan milkê wî ne û her tişt vedigere ba Xwedê.

110 — Miletê çêtir hon in; hon ji xelkê re li gora şerîetê bi cihanîna qencyê û bi nekiriya xerabiyê emir dikin û baweriya xwe bi Xwedê tinin. Heke xelkên xudankitêb ji baweriya xwe bianiyana, ji wan re qenc dibû, (rast e ko) ji wan hin mirovên bawermend hene, lê bêtîrên di wan fasiq in.

111 — Zererê wan nagihê we; ew, we bes aciz dikin, heke wan bi we re dest bi şerî kir, dê bêne şêkêandin û wê baz bidin û nisret nakeve destê wan û ew nagehin felatê.

112 — Ew li kû derê ji bibin ewê bikevin perîşanî û şermisariyê, meger ko misilman dibin an dikevin bextê misilmanan. Herwekî wan ji rastiyê xwe dane paş, êna Yezdêna gîha wan, ew dê şerpeze û belengaz bibin.

Ji ber ko wan ayetên Yezdan inkar kirin û pêxemberên Xuda bê rê kuştin, ji ber ko wan gunehkarî dikirin û îşin dikirin ko ji serê wan zêde bû.

113 — Xudankitêb hemî ne weke hev in; ji wan miletek heye ko li ser baweriya xwe sekiniye, di şevê de ava-

## HEDÎSEN

### CENABÊ PÊXEMBER

REHMET Û SILAVA XWEDÊ LÊ BE

623 — Yê ko bê heq û rê xelkê diêştin para wan dojeh e.

624 — Yê ko misilmanekî pak e dibe xerabî jê çêbibe lê li kesî derew û bêbextiya na'ke.

625 — Yê ko talanê xelkê tine, heqê xelkê dixwe cihê wî dojeh e.

626 — Her kes di dilê wî çî hebe wê kifş bike: qencîker bi qencya xwe, derewin bi derewê xwe, bêbext bi rûşîya xwe, mêr bi mêraniya xwe, camêr bi camêriya xwe tene nas kirin.

627 — Mal û xwîn û namûsa we li hev heram e.

628 — Derewa mekin, dawîya derewê tu ne ye, hon pê dinya û axireta xwe bi zmanê xwe xera dikin, lê di sê tiştê de derew ne kêmani ye, yek di şer de ji ber ko şer tep û hîle ye, a didiwa; ji bona dilxweşkirina jina xwe, heta ko dilê wê ji mala wê ne reş be, a sisiya; ji bona li hev hatina mirova ji ber ko bi hev ketina mirova xerabî

---

tên Xuda dixwînin û secde ji Yezdan re dibin.

114 — Wan baweriya xwe bi roja piştawiyê aniye; ew li gora şerîetê bi cihanîna qencyê û bi nekiriya xirabiyê emir dikin û di kirina qencyê de bi lez û bez in û ew ji mirovên salih in.

115 — Yê ko qencyê dikin, divê bizanin ko qencya wan tu caran naye ji bir kirin. Xuda ji wan re bi zêdahi qencyê dide. Yezdan emelên evdên xwe ên qenc û dilpak dibîne û dizane, Xuda qedirdan e.

116 — Mal û zar û ziçên kafîran, tu caran nikarin li ber Xwedê arîkariya wan bikin. Ew dojehketî ne û tê de her dimînin.

117 — Di dinyayê de comerdiya wan kafîran mîna zeviya gunehkaran e ko bayekî sar û cemidî lê dide û zadê wê zewiyê dişewitîne. Xwedê ew ne êşandîne, ew bi destê xwe mala xwe xira dikin.

û fesadî jê çêdibe, ko agir bi erdê ket' gerek wî agirî mirov vemirtine, avkê li wî agirî bike; ne ko mirov agir xweş û gûr bike.

629 -- Li xirabiya xelkê me gerin, ew ji bona we xeyreke mezin e.

630 -- Poşmani ji niv tobak e, heke we guneh ne kirana Xwedê mileteki di xulq bikira heta ko gunehkar bibin û Xwedê di gunehên wan bibore.

631 -- Yê ko çavê wî tim li neyartî û xerabiyê ye xçyra kesî na xwaze gunehkar dibe û ew guneha ko Xwedê li ser stoyê wî daniye besî wî ye.

642 -- Heke tu her tiştê ko bi guhê xwe dibihisî û bi çavê xwe na binî dibêji dawî tu derewin derdikevî.

643 -- Heke tu dibêji ez heqê xwe temam distînim û tişteki xwe yê zêde bi ser wan de bernadim wê gavê mirov dizane ko tu çavteug û temakar î.

634 -- Tîrsa Xwedê elamê zaniyê ye û ji xwe razî bûn û pozihilindî ji destê nezaniya me ye.

635 -- Bi nav û dengê pêşiyên xwe, xwe mezin me kin, mezinahi bi camêrî û emelê qenc, bi zanî û marîfet e.

636 -- Heke hon eqilmend in li pêş xwe li dinyayê binêrin û jê îbretê bigirin.

637 -- Di sêçên deyndarên xwe liborin ta ko Xwedê ji di gunehên we bibihore.

638 -- Xwedê di gunehên mirovên ko li ser rîya heq û rastiyê hatine kuştin dibihore.

639 -- Tiştên rast û heja ko hon pê dizanin binivîstin, ta ko ew tişt wînda ne bin, û xelkê dawî jê aqildar bûn.

640 -- Îşê xwe bi asus deyne paşî bispêre Xwedê.

641 -- Bêjin: Xudayê me efiwa te ji gunehê me mezintir e, em hevîkarê comerdiya te ne.

642 -- Bêje: min baweriya bi Xwedê anî û bide ser rîya rastiyê.

643 -- Yê ko dilpak e xwediyê gotina xwe ye.

644 -- Heçl dora ko xelk li bin siha wê radikevin û vedizelin dibirin, Xwedê wan bi ser rûyê wan davêje dojehê.

645 -- Qeda û heft bela li mala cuhiya bikeve yên ko tîrba pêxemberên xwe kirine mizgefta xwe.

646 -- Ji nîmeta ko bi xweydana eniya xwe û keda piyê xwe na keve destê we bigerin, devberdana wê ji mineta xelkê çêtir e.

## REŞBELEK

### Jî Cemşîd û Sînemxanê Re Li Bêrûtê, Mewanên Mamê Xwe.

Zarona l

Ev bûne deh panzdeh roj we terka mala havê xwe da û hon çûne Rêrûtê; nik mamê xwe.

Bawer bikin êdî wext e ko em li ser vê çûyinê hinek xeber bidin. Bivê nevê hon ji honê bixwazin bizanin di pey we re û bêt we hergehê mala bawê we çawan dixuye û di pergara mala we de çi hatiye guherlin û ev çawan guhêriye û bi vê guhartinê gelo em razi ne, an em bêriya wextê berê, wextê ko hon li mal bûn, dikin.

Hon bi xwe ji dizanin ko îşê we zehmet e, teşxele ye, teşxeleke mezin e.

Belê, piştî çûna we mala me dimine qadeke şer ko dengê top û tîfingên lê sekinîne. Lê herç li wê qadê mane gumêna top û tîfing û mitralyozan hêj di guhên wan de ye. Roj bi roj ew gumên ji wînda dibin. Lê ji ber ko ew, ên bişûndemayî, hînî bédengiyê ne bûne, ji xwe dipirsin: ma çi li me qenimiye; ev çi bédengî ye. Qey guhên wan ji bédengiyê diwestin. Qey ji vê rahetiyê aciz in û li nerahetiyê digerin.

Îro, xaniyê me ji berê papijtir e. Kes

647 -- Qencî xwediyê xwe ji tengaiyê derdixê.

648 -- Li ba min qedrê zaniyê ji xeyra îbadetê çêtir e.

649 -- Paşgotiniya heval û ciranê xwe me kin, ew tişteki xerab û pir guneh e.

650 -- Jinikeke xerab seyekî bê av dit, av kişand û her ra her wî da, Xwedê di guhên wê pîrekê hemî hort.

651 -- Pez xeyr û bereket e. Xwediyê devê xelayê na bîne, heta roja piştawiyê eniyê hespa bi xeyr û oxir e, xulam û xadimê we hevalê we ne, hergavê dilê wan bi danekê şa bikin, û gava ew dikevin tengiyê wan di wê tengasiyê de me hêlin.

652 -- Ez ji tîrcalî bêtir ji wan dîndar û misilmanan ditirsim yên ko gotinek bi rastî ji xelkê re na bêjin, ji bona kar û menfeeta xwe xelkê xêstî û nezan dihêlin û wan didin ser rîya xwar.

653 -- Mirovê ko tiştên li ser rîya ko xelkê jê aciziya dikin ji rê hiltîne digihe kema Xwedê û Xwedê di gunehên wî dibore.

nlne ko kuxezan biçirine û wan li ser meh-  
fûran bireşîne Mehfûr bi xwe jî kêntoz in.  
Herçî firax ew jî weke berê nışkên Heke  
yek biçê jî, hêdeng e, ji her ko wê diya  
we dişkênine. Ji xwe divêt hon bizanin ko  
dizika kebanîyê şkênendi hêdeng e

Gava hon li mal bûn; min nikari bû  
ez bixebitim. Ji her ko we ne dihişt Diviya  
bû ez bidim pey we û li we miqate bibim,  
nehlim ko hon nizingî li sobê bikin, biçin  
ber avê û nehlim ko hon hikevin û blêşin.

Min fikir ne fikir, carina hon bêl  
min diketin, we xwe birin fikir; hon digirtin,  
min ji we re digot: Xwedê ji we rezî ne tu  
xem e ko hon ketine; serê we jî biçê ne tu  
xema min e, seriyê he deq û şeq ji xwe  
kundur e; lê megirtin, ez ne li her êş, lê li  
ber giriyê we dikevim, ez jê aciz im. Girtî ne  
karê mêran e. Ji lewre û nemaze ji hona  
Cemşîd qet çênabit. Mêrên kenc nagirin; lê  
ew dijninên xwe digirtin.

Lê bêfêde; min digot... digot... lê hon  
dîsa diketin û digirtin... Guhên me hînl  
giriye we jî bû hûn. Carina hilqetîlqa kelo-  
giriye we jî dibû; wek defeke nekokirt.

Diget vê hindê divêt ez mikur bêm ko  
di van ketinan de par û sûcê min an par û  
sûcê priyê jî divêt hebe. Ji her ko gava  
herçavik bi çavên min ve ne ez we gah dibî-  
nim, gah nabînim. Belê ev herçavik jî, ber-  
çavikên priyê, tevayine ecêb in. Gava tu wan  
bi guhên xwe ve dikî, yanî perdeke cam di  
pêş çavên xwe re dikîştî jî nizingî xweş  
dihîni; lê ji dûr ve nabîni. Û heke te ew jî  
ber çavên xwe dantne heta dawîya dinyayê  
dibîni; lê ber pozê xwe, biçkojên kirasê xwe  
nabîni. Ev jî yek ji hezar halên priyê ên,  
ne tu. Pêşyan bila sebeb ne gotiye pirt  
hezareybî.

Belê, gava we niyeta seferê kir, min jî  
niyeta xebatê kir û di dilê xwe de got: Heke  
zaro çûn ezê bikarim qenc bixebitim. Min jî  
xwe re projeyine mezin çêkiri bûn.

Min digot ezê di vê navê de giramêra  
xwe û Kitêba Sînemxanê biqedinim û hinde  
nivsarau bîvîstînin ko têra çend hejmarên  
Hewarê bikin.

Lê welê ne bû. Min kotek Hawara ko  
di bin çapê de ye qedand û ji bo Hawara tê  
min xêzek jî ne nivisand.

Ma gelo çire ? Ez jî kû zanim. Gava  
hon li hir bûn ez ji repera we aciz dibûm;  
min nikarî bû ez bixebitim. Lê niho, mal xir  
û xall, ne deng e, ne pejin; mêşek bişre em

pê dihesin. Bawer bikin ez niho jî têrabetiyê  
aciz im; ji lewre ez nikarim bixebitim.

Gava hon li mal bûn, bi min he, ez  
çêtir dixebetim. Ez bi şefeqê ve radibûm û  
heta ko hon hişyar dibûn saetkê an du saetan  
ez bi nivisandinê mijûl dibûm.

Berî ewilî Cemşîd hişyar dibû Qey ca-  
mêr jî xewê bêtir bi kêrî hişyarîyê dihat. Ez  
dianîm. Lê heta hingê min qederê deh rûpel  
nivisandi bûn.

Lê niho ez dereng radibim. Ez jî xwe  
re dibêjim, ma çire ez zû hişyar bibim; çî li  
min qewimîye, zaro ne li mal in; kes nîne  
min aciz bike; ez dikarim bi kêfa xwe  
bixebitim.

Carina, bi şev dengê we dikim û hişyar  
dibim; çavên xwe li textên we digerinim.  
Paşê, tete bira min, ez dibêjim selwîr e, ma  
zaro ne çûne Bêrûtê.

Berê min diya we hişyar dikir; niho  
diya we min hişyar dike.

Berê ez dereng diçim çapxanê; lê zû  
vedigeriyam mal. Niho zû diçim, lê dereng  
vedigerim. Paşnîvro, ji rojên dibistanê pê ve,  
hesêb, tucaran ez dernediketim derve. Lê niho  
piştî nîvro jî ji xwe re îşektî peyda dikim û  
diçim hajêr. Li min dibe şev û paşê ez ve-  
digerim mal û ez nikarim bixebitim. Ma hon çî  
dibêjin, heke hon vejeriyam mal ezê bikarim  
bixebitim. An Ronê min dîsan aciz bikin.

Zarona herwekî min jî we re got di mala  
me de rahetî û hêsahike ecêb heye. Lê gelo  
kêfa me ewçend jê re têt.

Maleke hêdeng, bawer bikin, wek jiyl-  
neke bê saz û stran e.

Ma gulî ne jî hona bihtîstîne ne. Divêt  
mirov bibihise û deng bi guhê mirov bikeve.  
Lê ji roja ko hon çûne deng û gazî di mala  
me de daneketine.

Belê zarone l mala me tîro dimlne wê  
kumpereya ko zêrên wê jê ketine, tu çiqasî  
wê bilhejinî jî deng jê nayê.

Şam : 12 Nîsan 1942. BAWÊ CEMŞÎD



# XATÛN AN PILING

JI FRANK STOCKTEN

Di wextekê de padîşahêk hebû. Fikirên wî padîşahi ne wek fikirên ên din bûn. Fikirîna wî en ecêb hebûn. Di wexta wî de padîşahan ji bo şahiya xelkê xwe, di cejin û dawetan de peya û dehbe berdîdan hev.

Lê wî padîşahi ji wê adetê re tişteki nû zêde kiri bû. Di van temaşan de ne bi tenê xelkê kêf dikir; lê peyayên qenc xelat û ên xerab dihatin ceza kirin. Gava mirovek bi xerabiyê dihate itham kirin ew tavêtin hepsê û piştê ew tanin meydana temaşê. Wexta meydan ji temaşageran tiji dibû û padîşah li ser textê xwe rûdinişt temaşa dest pê dikir.

Di dawîya meydanaê de, li cem hev du deriyên wekhev hebûn. Girti di meydanaê re derbes didû û diçû û derêk ji wan deriyan vedikir.

Eger girti deriyê sîcan vekira, jê pilingekî birçî derdiket, xwe tavê ser wî û ew dikir perçe perçe. Hingê xuya dikir, yan padîşah welê bawar dikir ko mêrik bisûc e û bela xwe ditiye.

Lê ko mêrik deriyê din vedikir, jê xatunê delal û ciwan derdiket û padîşah ew xatûn ji mêrik re mehir dikir û xelkê ji şahiyê ji wan re li çepîkan li hev dixist. Mêrik bi jin ji biwa padîşah jê re ew jinik ji dida. Ji ber ko bi vekirina wî deriyê mêrik şanî dida ko bêsûc e û zilamekî qenc e.

Li cem qîralan ew isûl pir heja bû. Ji ber ko bi carekê de peyayên xerab bela xwe û peyayên qenc mikafata xwe digirtin.

Xelkê ji hejî wê tewaşiyê dikir; temaşake bîmera. Xelkê gava dihatin temaşagahê û hetanî ko girti deriyek vedikir, wan ne dizanî gelo ewê dawetekê an kûstarekê bibînin. Piling carîna ji wî deriyê û cerîna ji wî deriyê derdiket.

∴

Keçikeye padîşah e delal hebû û li ber dilê wî gelek ezîz bû. Wê keçikê, dizîka, ji peyayên serayê hejî xortekî mêr û çeleng dikir. Lê ji ber ko ew xort ne ji mîrekan bû hejkirina wî sîceklî mezin bû. Ji lewra gava padîşah bi ewîna wan hesiya ew xortê delal avête hepsê. Li gora isûlê wî ew xort ji wê biçûka û di temaşagahê de deriyek wê vekira. Bi wî awayî wê bîhata zanîna hejkirina keça padîşahê lê dibû sîc an ne. Herkesê û padîşah ji dizanî ko ew tiştî lê sîc e. Lê adet û rêzîk

diviya bû bîhata ci. Ji ber ko sîc mezin bû di welêt de li pilingê xurtir û li xatûna çelengtir gariyan.

Roja hikîm hat. Xelkê bi tofan diçûn temaşagahê. Cih hemî tiji bû bûn. Herkesê xwe ker kiri bû. Ewçend ko teptepa dilê xelkê wê bîhata bibîstin. Îşaret hate dayîn û xort kete meydanaê. Çiqas bibejin û rîft û zirav, çiqas mêr û spehî dixuya. Li xwe zivirî û serê xwe li padîşeh nîzim kir. Lê, lê ne nêri çavên wî diçûn dotmîra ko li cem havê xwe rûniştî bû.

Dotmîr ne xwestî bû li mal bînin. Hati bû ko qedêr û sernivîsa dilgirtiyê xwe bibîne. Ji roja ko ewîna wan bû bû eşkere dotmîrê ji ewîna wî pê ve ber tiştî ji bîr kiri bû, niho wê çi bikira? Tişteki kiri bû ko heta wê wextê ji destê tu kest derneketî bû. Ewê sira deriyan derêxisti bû. Belê ewê dizanî kljan derî keçik û kljan derî piling vedigêre.

Dotmîrê ne bi tenê deriyê keçikê lê keçikê bi xwe jî nas dikir. Keçika li paş yekî ji her du deriyan weşartî ji xatûnê qesirê a xweşiktir bû. Dotmîr ew xweşî dinast. Ewê çend caran bi çavên xwe dîtî bû ko keçika li paşderî bi çavên ewîna li dilgirtiyê wê nêrî bû û carekê du caran ji dotmîrê bawer kiri bû ko dilgirtiyê wê ji li nêrinên wê keçikê vegehandî bû. Û dawiyê, rojekê dotmîrê ew dîtî bûn ko bi hev re daxaftin. Vê keçikê wêrî bû li dilgirtiyê dotmîrê binêre û pê re baxêve. Ji lewra dotmîr lê hati bû xezehê. . . xezebeke gur û kûr. . .

Gava xort serê xwe ji padîşah re xwar kir û li dotmîrê nêrî bû; çavên wî jê dipirsîn: kljan? Xort dotmîrê xweş nas dikir, qudreta wê dizanî; heşîk dotmîrê sira deriyan derêxistiye. Ji lewra xort li dotmîrê gelek bi hevî nêrî. Çavên wî jê pirsî bûn û xort zanî bû ko pirsîyariya wî jê re eşkere bûye. Diviya bû lê vegevine.

Dotmîr piçîk destê xwe rakir û ew her bi aliyê rastê bada. Ji dilgirtiyê wê pê ve tu kest ew ne dit. Ji ber ko her keşî çavê xwe herda bû xort û awirên wan her bi deriyan diçûn. Xort ne sekini, bi mêrani û bi gavîna lez her bi deriyan çû. Dilên temaşageran qey sekini bûn, herkesê bîhna xwe girti bû. Xort her bi deriyê milê rastê ve çû û deriyê rastê vekir.

∴

Niho, tîjika çîrokê ew e. Gelo ji deriyê ko hate vekirin piling an jinikek derket? Herçend em wê meselê didin eqilê xwe

# DIWANA MELE

— 23 —

Şimsadi xeram serwi xen-nac  
Canan dibirit bi işwe tarac  
Min di seherê di xabi mestl  
Da rengê tezer û lale der-rac  
Bişkift ji xunce nêrgiza mest  
Bû ferq li ser qedê ve tarac  
Cebhet kesifi ji sibhi sadiq  
Nûrê ko veda bi şibhetl dac  
Elmas nimane şibhi misrê  
Danîn ceğerê me dil kir amac  
Nesrîn û benefşe tew-wizandin  
Mawerd reşande şûşeyl ac  
Cihê hebeşan bi tîrfetileyn  
Ant qederek ji Isfehan bac  
Sima ko nima ne ma li biş sim  
Sîmah ji xecle ma ji ixrac  
Mîrata Sikenderî li pêş e  
Behrûn we leha ikusi emwac [\*]  
Dora qemerê ji ber şefeq da  
Ko spêde li ferq ser niha tac  
Çerx û felek û melek diborin  
Ev Şems û kewakib û di ebrac  
Zihre bi qirani qabi kewseyn  
Welnecmi iza hewa bi midrac [\*\*]

çend cihaba wê çetintir dibe. Ji ber ko dotmîr  
pir hejl wî peyayl dikir û bi hêsanî ji  
yeke din re terka wî ne dida. Carina di xewnên  
xwe de didît ko dîlgirtiyê wê derî vedikir û  
pilengeki birçî xortê wê didirand. Carina jî  
xewinane din dîtî: didît ko derî vedibû û  
keçikek jê derdiket û bi dîtina keçika ciwan  
xort şa û dilxweş dibû û xelkê jî wan re  
çepilk li hev dixistin û jî kêfê didan ber  
qîran. Dîsan dotmîrê dîtî bû ko wî xortî ew  
xatûna çeleng wek jîna xwe biri bû mal û  
qet li evîna wê ne pîrsî bû. Ma bi carekê  
mirin jê re ne çêlir bû?

Bi saetên dirêj ve, bi şev û bi roj  
dotmîr dama bû. Ewê çî hikira? Ewê dizant  
ko xort deriyê xerê jê bipirsîya. Dawiyê  
dotmîr qerara xwe da bû û gava xort jê  
pirsî bi lez destê xwe rakiri bû û deriyê  
aliyê rastê şant wî da bû.

Gelo dotmîrê kîjan derî bijarti bû?  
Ez bi xwe nikarim li vê pîrsiyariyê vegertî-  
nim. Ji lewre ez wê jî we hemîyan re dibêlim:  
Ji deriyê ko hate vekirin çî derkel, piling  
yan xatûn.

NÛREDÎN ÛSIF

Dengê melean dibête zimzim  
Erwah ji eşqê têne mirac  
Dil helirek e sed hezar mewc in  
Arif çî xeber ji behri mew-wac  
Borî û bi xencetê Mela kuşt  
Ew xenceleha delal û xen-nac

— 24 —

Dil jî ilacê ko bi der ket mizac  
Dê jî lehbê nûşt eta bit ilac  
Aylneî camî cihan bîn cem  
Badel lal ne di cama zicac  
Avî heyatê bi we da şebetek  
Zinde kirim ma jî ediw re nişac  
Bend kirim gerçî şibhi fîl bûm  
Sîmberê saîd û bazû jî ac  
Exterî iqbal û mehê birç û bext  
Mîhr û sîpehr û kemer û text û tac  
Kos ko hiingaft bi şayl li text  
Padişahan neqdi rewan da xerac  
Xusrew û Şîrin li der bendî hisin  
Sîmberan lazîm e lê mîhr û bac  
Sîk-keyl şîhra me bi navê te hat  
Lew bi eyarê di cihan da rawae  
Abî rewan min diye şîhra Mela  
Yinkir il mal li sût-l-mizac [\*\*\*]

— 25 —

Dîsa jî nû bêhal e dil saqî werîn cama zicac  
Mîştaqî xemra al e dil lew xweş bi rokê bit mizac  
Saqî ko dê mehweş bitn kakul jî şêva reş bitin  
Qerqef bila afeş bitin em dê bi wê dil kin ilac  
Da em bi wê dil hey bikin sîne daş û key bikin  
Sed menzilan pê tey bikin ew dê di sêrê kit rewac  
Bê nûr û narê mîhbetê bêneqş û sînhê qudrêtê  
Naçîn meqamê wisletê nûrîn lena wel-leylû dac  
Ev nar seyqelî dil e, daîm li wê qala dile  
Newrûz û sersala dil e, weqtê ko hilbit ew sirac  
Heta bi nûra badeyê rengîn nekî sec-cadeyê  
Dûrî jî wî şehzadeyî dirdaneya gerdên jî ac  
Dirdaneya gerdên bilor rihan li ser dêm bûne hûr  
Hey hey bi mestî tete dor xala li nik ferqa bi tac  
Mîhra te pir ebter kirim, xalan jî bîskan tu derîn  
Zîlfa miselsel enberin, çîn çîn jî çîne têne bac  
Heryek li ser çebvan dîdî j' Ispehanê tên xerac  
Çebvân belek qewsen belek çerx û felek xalib melek  
Fî hib-biha emri delek welhib-bî yecrî fî ecac [\*\*\*\*]  
Şahîd b'hezar reng xem-mîlîn reqş û semayê  
[kem-mîlîn  
Iro Mela em sed dil in, saqî werîn cama zicac.

(\*) بحر ولما الكوس امواج

(\*\*) والتجم اذا هوى بمدراج

(\*\*\*) ينكر للماه لسوء المزاج

(\*\*\*\*) في حبا عمري ذلك والحب يجري في عجاج



## KUMANDOS

Xêra medeniyetê, medeniyeta sedsala histan, wek her tiştên dinyayê şer, aletên şer, awayên şer û her tiştên şer gelektî gubêrine û bînbûna wan bûne tiştine zehmet, fenine zirav û dişwar. Di vê navê de emê tro behsa kumandos bikin.

Kumandos çi ye? Kumandos bi gotina me nijdevan an çeteçî ne. Lê ew ne wek çeteçiyên me bi tenê dizanin tîfingê bişixulînin. Ew mirovine xwendî û medenî ne û bi gelek tiştan dizanin.

Kumandos gotineke portekizî ye. Gava ingilzîan di nivroyê Efrîqayê de şerê boêran dikir, boêran çeteyîne kumankos teşkil kirî bûn û bi wan şerê ingilzîan dikirin. Di vî şerî de piştî ko ingiltzî ji Donkerkê kişiyân û lingê wan jî erdê Ewropayê qut bû ev kumandos saz kirine. Peyayên kumandos fedayî ne. Taltmeke xweser dibînin. Divêt ew segmanîne baş bibin û bi melevaniyê bizanin. Ji milê din kumandos divêt xweş bizanin xerîtê bixwinin û li gora plan û xeritan bi rê ve biçin û tiştên ko plan şanî didin di tariya şevê de jî bikarin li ser wan vehin. Ne hewce ye ko em bibêjin madam ew şerevanî ne herî her tiştî divêt ew mêrine qenc bibin. Ji ber ko heke ne mêrine qenc in dema ko tîfing teqîya jî tîrsan ilm û fen û her tiştî jî bir dikin û hema çavê xwe didin revê.

Yekî jî wan kumandosan biserhatîyeke xwe jî rojnawenanekî ingiltzî re bi awayê jêrin qîse kirîye û gotîye:

Vê carê meê dirêjî Berdiyayê bikira. Berdiye di peravên Libyayê de bendereke kiçîk e. Dijmin di vê benderê re çek û zad dibirin. Kepûço û deverîne din; yê ko jî behîrê dûr bûn.

Li gora talimatî ko da bûne me diviya bû em seh bikin: Eskerên dijmin di nav bajêr de dimînin an konên xwe di dora bajêr de vedigirin? Eskerên Berdiyê talyan an eleman in? Berdiye bi rastî ehemiyata ko didin-ê. Lê heye; yanî di wê benderê re jî dijmin re gelek tiştên?

Ji milê din û li gora talimatî ko me jî fermandariyê girtî bû diviya bû em hemta xwe welê bikin ko dijmin bawer bike ko ev hicûmeke mezin e û mecbûr bibe ji deverîne din esker bîne. Bi vî awayî me barê hin eskerên xwe sivik bikin. Rê bi me biketa meê pir, depo ê her textî avahiyên neyar xerab bikin.

Li me bû şev, em li vaporeke piçûk lê bîlez siwar bûn û bi rê ketin. Diviya bû em saet yanzdehan de bigihaştana armanca xwe û di saet didowan de jê vegeeriyana. Bi vî hisabî jî bo qedendina îşê xwe me sê saet wext hebû. Heke me û dijmin li hev ne xîsta ev wext têr dikir.

Berdiye li ser zinarekî ye. Di vî zinari û di peravê de çar qelş hene ko mirov dikare li wan peya bibe. Li van qelşan çar mifrize wê peya bibiwan. Gava em li vaporê siwar bû bûn her mifrize yeko yeko wezîfa xwe nas kirî bû.

Bi rê ve. herçî serekên mifrizan, xerite û fitograf bi dest, peyayên xwe da bûn dora xwe û wezîfa her kesî jê re digel her hûrahîyê didan zanî. Ji van mifrizan şeş peya bijartin; ewê di vaporê de bimana. Mifrizeyek jî li paş me bimaya ko keke lihevxiştin çêbû ewê riya piştmerên dijmin bibira.

Her tevdir û talimat xelas bû bû û em bêj ji armanca xwe dûr bûn. Diviya bû em hinekî rakevin û bihna xwe bidin. Lê em ewçend di beyecanê de bûn ko xêwa me ne dihat. Em jî hev belav bûn û heryek bi tiştêkî din mijûl dibû. Piraniyê çekên xwe paqij dikirin. Hinekan solên xwe ên spî yê folbolê reş dikir. Hinên din bombeyên destan li ber piştên xwe dikirin h. d. . .

Dinya hinek sar bû bû û behîr xwe têk dida. Em tîrsyan ko firtineyek derkeve û bê ko em bi karê xwe rabin em vegarin wargehê xwe.

Bi adetî şevên Behîra-spî ne ewçend reş in. Lê îşev tarîke ecêb li me daketî bû. Me kotek ezman didit.

Dawiyê em gihastin. Filûqe daxistin behîrê û em li wan siwar hûn. Ecêb, peyayên ko di vaporê de nikari bûn binivîn, niho di filûqe de di xew re çû bûn. Ji nişkekevê jî binê filûqe xişiniyek hate bihîstîn. Me utzingî li bejê kirî bû û filûqe li qûmê rûniştî bû. Em dakatin avê û jê gihastin qelşikên zinare Berdiyê. Herkesî da bû pey serekê xwe û bi lez ber bi armancê ve diçû.

Piştî midekî min dit ko li pêş tiştêkî neadetî heye. Min xwe da pêş û ez gihastim sefa pêşîn. Peya li ber çalekê şekîlî bûn û dikirin di ser wê re xwe zer bikin. Çal jî nivî bêtir jî avê tijî bû. Talîke tanga bû. Di fitografên ko balafirvanên me girtî bûn ev çal xuya ne dibû. Ji lewre me jî berê de tevdira wê ne dîtî bû. Em li çalê derbes bûn. Lê me pê bist deqîqe wînda kirin. Em hildikişyan



serê teht û zinaran. Lê ne gelek bi zehmet. Ji her ko em li wan li ser xerite û fitografan hûr bû bûn. Em ketin newalekê; newalek minn hêrmekê, biniya wê teht. Me lingên xwe kiri bû nav kulavan, da ko dijmin pêjina lingên m nekît. Lê ji her ko em di newalê de bûn rexma her tiştî carina deng û berdengîn dibatin bihîstîn.

Ji nişkekê ve û pey hev sê derb halîne berdan û herik di ser serê me re borîn. Peyayên mifrizê di cih de sekinîn û li xwe xebitîn. Lê dîsan bi rê ketin; qesta pêş kirin. Min di dilê xwe de digot gava em daketin hej dijmin bi me hesiya bû lê deng ne kiri bû û hiştî bû ko em ji behrê bi dûr bikevin. Û gava em ketin newalê bi ser me de girtin. Lê ne were bû. Piştî wan her sê derban dîsan bêdengiyê dorê me girt.

Me da hû kumbireki û me fikir em lê hilkişin. Bû bû hilqehilqa dil û sîngên me. Me lez dida xwe; ji her ko em dereng ma bûn û wext li me dihori. Saet hû bû yek kêr çarîk. Diviya hû saet dido û kêr çarîk de em vejeriyana peravê û li saet didswan bigihastana vapora xwe. Ji xêra Xudê re mifrizeyên din yên ko di riyezî din ve çû bûn gihasti bûn bajêr û dest bi îşê xwe kiri bûn.

Bajar vava hû. Di Meydanekê de gornîstaneke timobîlan hebû; timobîline şikestî û şewitî. Kumandosên ko beriya me gihasti bûn bajêr dinamîtt datanîn depoxaneyan. Herçî pir me dinamîtt bi wan jî xisti bûn. Depoke kewçûk jî ket destê me em bi karê wê jî rabûn. Dijmin bi me ne dibesiya. Dinamîttên ko me danî bû depoxanan û lingên piran beriya ko em vejerin voporê wê biteqyan.

Ji nişkekê ve me dengê motoran kir. Du mitostîkl di ber me re borîn. Me agir kire ser wan lê me ne hingaft. Lê bi vî awayî dijmin bi me bihesiya û wê bigota ko qewetên inglîzî daketine Berdiyê û bi ser me de tang û qewetîne mēkanîkl rēkira. Ji xwe me jî ev diviya hû. Da ko dijmin mecbûr bibe û di qalekê de qeweta xwe kêr bike.

Me îşê xwe qedand û berê xwe da peravê. Dinamîtt teqyan; pir û depoxane herhewa bûn û agir bi avahîyan ket. Bi ronîya şewatê me pêşiya xwe çetir didit. Êdî dijmin bi me hesiya bû û topên xwe li me girêda bû. Lê tu zerer ne gihî me û em gihastin vapora xwe. Balafirên dijmin rabû bûn; di ser Berdiyê re difiryan û li me digerîyan. Me peyayên xwe hejmartin; bireklî mifrezê

## REWŞA DINYAYÊ

ŞERÊ BÎRMANYAYÊ — Vê paşiyê şerê Bîrmanyayê germ hû bû, Japonan lez dida xwe û dixwest rojkê berî rojkê şerê Bîrmanyayê xelas bike. Ji her ko di Gulanê de barana wî welatî dest pê dike, erd dibe herî û herketên eskerî lê disekinîn.

Ji xwe radyowa Londrê jî digot ko di Bîrmanyayê de wezîyet xedar û giran e. Hawara japonan her û her dihat. Japon gewî bû bûn û berdan ser çîni û inglîzian. Ewan jî li her vê zorê çend caran xwe daye paş û ketin çeperîne nû û bi destpêka Gulanê ve bajarên Laşyo û Mendelay jî dest dane. Ev her du bajar jî bajarîne mezin û mihîm in. Mendelay merkeza Bîrmanyayê ye. Herçî Laşyo li tixûbên Çînê û jî behîre ve dawîya rîya Bûrmayê ye û jî hîre rê dikeve erdê Çînê.

Rîya Bûrmayê herwekî xwendevanên me dîzanin jî bo çîniyan gelek hîr ehemîyet bû. Çîn, Çîna Çenkeysek bi tenê di wê rê re digihast behîrê.

Ji Tirmeha sala 1937an yanî ev pênc sal in japon şerê Çînê dikin. Japonan berî her tiştî peravên Çînê vegirtin û ew jî behîrê qut kirin da ko jê re di rîya hehîrê re tu çek û cebîrxane nayit. Lê Çenkeysek di rîya Bûrmayê û di erdê inglîzian re û nêmaze jî Emêrtîkî jî xwe re her tişt tani. Ji milê din di hejê re û jî Rûsyê jî hin tîşî jî Çenkeysek re dibatin.

Japonan digot heke me zora Çînê ne birîye sebeb rîya Bûrmayê ye û zor didan inglîzian ko wê rê bigirin. Inglîzian guh ue dida japonan. Lê piştî ko inglîzî di Ewropayê de û di şerê elemanan de bi tena xwe man jî bēgaviyê bi japonan re li hev hatin û rîya Bûrmayê jî ho sê mehan girtin. Di vê navê de japonan bi destûra hikûmeta Vîşiyê esker anî Hindeçîniye. Inîltzan dît ko bi japonan re midare bē fêde ye, piştî sê mehan rîya Bûrmayê jî çîniyan re vekir.

Ji roja ko japonan dirêjî inglîzî û emêrikaniyan kir Çîn bû hevalhendê wan. Ji hingê ve inglîzî û emêrikani ne bi tenê di rîya Bûrmayê re lê bi her awayî û di rêne din ve jî her tiştî diştin çîniyan û çîntî di sefên inglîzîyan de şerê japonan dikin.

---

didowan hej venejeriya bû. Saet bû bû dido, dijmin bi me hesiya bû, me nikarî bû em li heviya wan bimînîn. Vapor bi rê ket.

SILĒMANÊ FERHO

Ji xwe Mister Rûzwek gava japonan ev rê hîrî da zanî ko hevalbendan li şûna ve riyê riyên din saz kirine û ji çiniyan re weke herê her textit çek û posat de bête şandin.

Japonan piştî ko ev her du bajar xistine destên xwe dikin bi manawrakê eskerên çini û ingilizî ji hev veqetînin. Di hin cihan de ji xwe ketine baskên wan û li wan tene wer.

Bêderew, japonan piştî ko Laşo vegirt derbasi erdê Çînê hû û qederkî tê de meşîya. Bi vi awayî çini û ingilizî ji hev qut bûn û japon ket navbera wan. Herçend ingilizî di newalekê de ma bin ji li gora danezanên ingilizî ev esker bi isûl û nizam xwe didin paş û dikin xwe bigehînin giraniya ordiwa Hindistana.

Ji milê din japon berê xwe daye bakurê roavayê Birmaniyayê û dike rîya ko di Kelkotê re diçe Çînê, wê ji hibire û bi vi awayî Çîna Çenkeysek yekcar ji riyên behirê merrûm bike. Li gora nûçeyên paşin çini pê li erdê didin û li her êrişê japonan disekinin. Çîni bi xarekî berdane ser rêhesina Laşo-Mendelay û ev rêhisin birine. Li 15ê Gulanê radyowa Londrê digot ko şerê Birmaniyayê divê bête hesêb ko xelas bûye.

**PIRSA MEDEGESKARÊ** — Medegeskar girav û mistemlikeke frensizî ye. Ev girav dikeve nivrorohelê Efrîqayê. Medegeskar ji ber cihê xwe e ceşrafî gelek bi ehemîyet e. Yê ko Medegeskar di destê wî de ye dikare riyên nivroyê Efrîqayê û rîya Behira-sor li neyaran bigire. Piştî ko japon derketine Behira hindî di dora Medegeskarê de gelek kurt û pist çebûn. Digotin ko hikûmeta Vîşiyê wargehên Medegeskarê wê bidit japonan; japon wê esker derînin Medegeskarê.

Herçî dewletên mihwerê ne ji bervajî ve digotin ko ingilizî û emêrkaniyan dil heye ko Medegeskar hêxin destên xwe û ji lewre li hêncetan digerin. Ji milê din digotin ko heyeteke japonî gihastîye Medegeskarê û digel memûrên giravê ên firensiz hevkarîyê dikit.

Li 5ê Gulanê, serê sibehê radyowa Londrê ji dinyayê re dida zanî ko eskerên ingilizî gihastîne Medegeskarê û dikin dakevin bejê. Hikûmeta Londrê danezana jêrin belav dikir:

« Dewletên sondxwarî ji bona ko pêşî ji japonan bistînin û nehîlin ko japon esker derînin bendera Diêgo-Swarês, ji diht ve qewetên ingilizî gihastîne pêşberê Medegeskarê. Emîralê stolê ji zimamderên giravê ên firensiz

re da zanî ko sondxwarî ji her sebebên eskerî û bi miweqell giravê de vegirin; lê girav her firensiz e û her wê firensiz himîne ».

Herçî Emêrtke ewê ji danezanek belav kir û tê de got ko îşê Medegeskarê bi raya wê çêbûye û her du hikûmet, Ingiltre û Emêrtke di vê babetê de yek in û piştî şerî an roja ko ji vegertina wê re hewce ne ma, Medegeskar wê vegere Firensê. Ji milê din Emêrtkê digot heke hikûmeta Vîşiyê dest hilani û li ber xwe da emê ve hereketê jê re di heqê sondxwariyan de dijminatî de bihesibînin.

Emîralê stola ingilizî ji waliyê Medegeskarê teslîmkirina giravê xwest. Wall ev tekîf bi şûn da avêt û da zanî ko eskerên giravê wê dest bibin xwe û li ber xwe bidin. Li ser vê cihabê ingilizan berda giravê û şer dest pê kir.

Zimamdarên Vîşiyê ji ev pêşnihad qebûl ne kir û Pêten û Laval û Darlan heryekî cihê cihê emîr da wallî û kumandarê Medegeskarê ko hela dawiyê şerê ingilizan bikin. Nemaze emîral Darlan di emîrê xwe de di heqê ingilizan de tiştine gelek giran digotin. Emêrtkê ji noteyek da bû Vîşiyê. Laval li vê noteyê vegerand û hereketa ingilizî û emêrtkaniyan protêsto kir.

Enî bèn qada şer. Bendera Diêgo-Swarês dikeve bakurê Medegeskarê û jê bi erdekî teng veqetandî ye; heçko nivgiravek e. Di benderê de hawizên tersanê heur ko tê de krewzorên mezin ji cih dibin û tene tamir kirin. Jû pê ve balafirgeh û depoyên benzînê lê hene. Devê benderê gelek teng e, avtengek e. Li her du milên avtengê topên peravîn ên behrî hene. Ev top durravêj in û nahîlin ko dijmin di rîya behirê re nziingî li benderê bike. Bi tevayî Diêgo-Swarês benderê nûjen tete hesêb.

Ingiliz digel tangîne kiçik di paş benderê re daketin bejê û ji par re dirêj benderê kirin û stola xwe ne xistin ber topên benderê. Herwekî me got firensizan dest bire xwe. Ingilizan noqar û vaporeke kiçik yê firensizan hin av kir û şer nemaze li bejê germ bû.

Li gora ajansan firensizan li Medegeskarê 7000 esker hebûn. Ji vi eskerî 2000 û hin li bendera Swarêsê bûn. Şerê Swarêsê se rojan dom kir.

Li 8ê Gulanê piştî nivro Mister Çorçil di meclisê de da zanî ko Diêgo-Swarês teslîm bûye. Mister Çorçil di vê babetê de gotiye: Bertê se mehan me dest bi karê Mede-

genkarê kiri bû. Di vê navê de fermandarên me tevdirên xwe dîtin û herweki we dîtiye eskerên me bi mîrant û qehremant ser kir û di du roj û nîvan de bendara Swarêse zêmt kirin. Ev zefer gelek bi isûl û nîzûm çêbû û her sê çekên me hej û behir û hevnyê hejandûna xwe şant dan. Midafihên firensîz ji xweş ser kirin. Lê heyfa min lête wan, yê ko diht hevalbendên me bûn iro şerê me dikin. Em ji xelesa Firensîz re dixebitîn. Em dikarin vê xesara firensîzan, fedakariyek di rîya şerê xelâsê de bilhesibînin ».

Ji milê din Vîşiyê ji da zanin ko midafihên Swarêse agir û birûskên xwe betal kirine û teslim bûne lê eskerên din yê ko di cihên giravê ên din de ne ewê şerê ingilîzan bikin.

Rojnameyên ingilîzi û emêrikant ji kêfa xwe gelek ji vê zeferê re anîne û pesnê eskerên ingilîzî dane. Rojnameyên emêrikant dibêjin ko Medegeskar xelesa sînsilekê a pêşîn e. Di pey Medegeskarê ji sondxwariyan re divêt Dekar û herçî mistemlekeyên firensîzî yê ko di şer de bi kêrî hevalbendan tîr divêt hêne îşkal kirin. Nîzingî Emêrikayê ji hin giravên firensîzî hene. Welê dixuye ko Emêrike ji ho selametiya hemîyan ewê esker derîne wan giravan.

Hin rojnamayên emêrikant dibêjin madam firensîzan di Medegeskarê de dest bire xwe êdl navhera Vişî û Emêrikayê şer e.

Mister Çorçîl di meclîsê de goti bû ko xesara ingilîzan gîhaştîye hezar peyayî. Lê piştî xuya kir ko xesara ingilîzan jê kêmîr e. Peyayî hebûn ko hêsr keti bûn destê firensîzan û ingilîzan ji her ko pê ne dîzanî ew windayî dihesibandin. Piştî teslimbûna benderê ew hêsr vegehiyan cem xwedîyan.

**ŞERÊ FILÎPÎNÊ** — Welê dixuye ko şerê Filîpînê bi temamt safî bûye û çend giravên hûr yê ko şer di wan de hej dom dikir ew ji teslim bûn. Di nav wan giravan de asêgeha Korêgîdorê piştî ketina Batanê 27 rojan bi eskereklî hîndîk û bi çekine kêrî şerê japonan kir.

Korêgîdor li 6ê Gulanê teslim bû. Lê hetant ko dijîmîn pê li bejn giravê ne kir û li stoyê midafihên wê sîwar ne bû kelehê li ber xwe da û çekên xwe ne danî.

Japonan piştî ko 27 rojan li Korêgîdorê ji Batanê bi guleyên topan û ji ezmanan hi bombeyên balafiran xist û dit ko keleh bi tu awayî teslim nabe eskerên piyade xiste filûcan û di tariya şevê de berê wan da giravê.

Midafihên Korêgîdorê pê hesiyân û bi top û mîrfalyozan hera wan filûcan da. Di nav filûcan de gelek xesar digîha eskerên japonî. Esker xwe çeng kire avê, ji hev belav bû û bi melevaniyê gîhaşte peravê. Gava lingên eskerên pêşîn di giravê de erd girt, eskerên mayî hê zehmet digîhaştî hejê. Fermandarê emêrikant gava ev hal dit teslim bû. Di pey Korêgîdorê re giravên din ji ji desthilatinê gerîyan û teslim bûn û şerê Filîpînê bi qehremaniya mîrant genc û canfeda gîhaşte dawiyê. Japonan bi xwe pesnê midafihên Korêgîdorê da. Ma dijîmîn û mîrê genc ji dost û mîrê pis ne çêlir e. Heye ko ji bo herkesî ne welê ye; lê eqilê min fî kurdmancî holê dibêje.

**ŞERÊ ÛRIS** — Êrtîşa Biharê hej dest pê ne kir. Hin dibêjin ko eleman hej tîdarikên xwe temamt ne kirine. Ji aliyê din li dawîya Nîsanê di eniya Ûris de hewa guhêriye. Ji nişkekê ve baranîne xurt hatin û di pey baranê herf ji barî û dereca ko rabû bû heta 28an kete binê sîfirê heta du derecan.

Di vê navê de Hitler peyivî. Ev midexek e rêberê elemanan xwe ker kiri bû. Li 26ê Nîsanê piştî nivro Hitler di pêşberê meclîsê de xeber da. Lê vê carê Hitler weke berê ne digot ezê vî şerî îsal biqedînim an ordîwa Ûris ji hev de ketiye û heta 15 rojan ewê çekên xwe deyne. Rêberê elemananan vê carê ji hervajî ve gelek îhtîyatkar bû. Ewçend ko çêlî Zivîstaneke din ji kir.

Di vê gotara Hitler de niqta mîhim îşê daxill ye. Dixuye ko Hitler ji hinan ne razî ye; divêt hin ji ji Hitler ne razî bin. Hitler got: « Dema ko bi hezaran xortên eleman di eniyên şer de ji bona xelasi û selametiya welêt xwe bi kuştin didin ez nikarim qatî bibim ko qaziyên me bi xayî û canîyan re bi mîhîrvaniyê bi rê ve hiçin. Ji lewre ez ji we selahiyetina di ser selahiyetên edliyê re dixwazim ».

Meclîsê ev selahiyet dane Hitler. Li goran van selahiyetan Hitler ji niho û pê de wê bikare bêt mîhkeme her cezayî li xelkê bike. Divêt di hundîrê Elemanyayê de him tişt hebin ko ne bi kêfa Hitler in.

Yekê Gulanê cejina bolsêvîkan e. Di vê rojê de Stalin serekê Ûrisan ji ordîwê re emîrek belav kir û nav di eskerên xwe da. Stalin di emîrê xwe de nemezê gotiye ko îro: Elemanyê ji par qelstir e, herçî Rûsye îro ji destpêka şerî bi gelekî xurtir e û divêt eske-

rên sor tsal elemanan ji erdê Rûsyayê bavê-  
jin derve û bigehin zefere.

Di navhera nitqa Hitler û emirê Stalin  
de hevdu dîtinek çebû. Li 29ê Nisanê Hitler  
û Mûsolîni li Selzbûrgê gihane hev. Wezîrên  
wan yên xariciyê û pisporên wan ên eskerî  
ji bi wan re bûn. Hitler û Mûsolîni qederê  
du rojan li cem hev man. Çi kirin, ne kirin;  
çi gotin, ne gotin; bivê nevê ev ne halîne be-  
lav kirin. Kurt û pist zehf in. Lê kes bi ras-  
tiyê nizanê.

Dibêjin ko piştî vê hevdu dîtîne di rîya  
Romanyeyê re gelek eskerên talyanî diçin  
enîya şerê ûris.

Herwekl me got di enîya ûris de hêj  
tiştekl girane ne hatiye rû. Bi tenê li bakur  
û di dorê Mûrmanskê û gola Îmnenê de ji pêşiya  
Gulanê ve eleman carîna zorê didin xetên  
ûrisan. Şerê balafirên roj bi roj xurtir dihe.

Li 13ê Gulanê ûris û elemanan ji niş-  
kekê ve di danezanên xwe de dane zanin ko  
li Kerçê şerîne no çebûne û hêj çêdibin.

Kerç li nivroyê Rûsyayê, li bakurê Behîra  
reş û di nivgirava Kîrimê de ye û dikeve  
rohelatê nivgiravê. Kerç bi xwe ji nivgira-  
vekê diîne pê û ev nivgirav bi bejtengê  
bi nivgirava mezin Kîrimê ve ye. Firehiya  
bejtengê qederê bîst kilometirên e. Ji bejten-  
gê heta pozê nivgiravê derî ko bajarê Kerçê  
lê ye 80 kilometir e.

Par, elemanan nivgirava Kîrimê bi  
temamî vegirti hû û rûs jê kişiya bûn. Lê  
li Zivistanê û gava behîra Azovê cemidî hû ûris  
di ser qeşayê re derhas bûn zor dan elema-  
nan û nivgirava Kerçê bi şûn de vegeandin  
û tê de cih bûn û nemaze bejtengê asê kirin.  
Pêşiya Kerçê avtengê e û jê re avtenga Kerçê  
dibêjin. Ev avteng Kîrimê ji beja pêşmiqabil  
vediqelîne û firehiya wê bi tenê çend kilometir  
in. Heke mirov derhasî beja pêşmiqabil hû  
dikeve riyên ko digehînin Qevqasê.

Li gora danezanên 13ê Gulanê elemanan  
li 8ê Gulanê û bi şefqê ve dirêjî nivgirava  
Kerçê kiriye û piştî şerîne ko pênc rojan  
dom kir ûrisan xetên bejtengê ji dest dane  
û bi şûn de kişiyane. Eleman dibêjin ko ûris  
şerpeze hûne û tevli hev baz dane û bi hezeran  
hêsr û bi sedan top û tang ketine destê ordî-  
wa wan. Lê herçî ûris derew bi aliyê van  
gotinan ve didin û dibêjin ko xesarîne mezin  
gihandine elamanan û bi tsûl û fesal û bi nizam  
û tertîb ji xetên xwe rabûne, xwe dane paş  
û ketine xetîne nû.

Ji milê dîjn danezaneke rûsî ya 14ê

Gulanê dide zanin ko ordîwa **Merşal Timo-  
şenko** dirêjî Xerkovê kiriye, elemanan baz daye  
û eskerên rûsî gihastine heta girên ko li Xer-  
kovê hikim dikin.

Digel vê kûndê dibêjin ko şerê Kerçê ne  
destpêka êrişê Biharê ye. Ev şer erd xweş  
kirin e. Eleman dixwazin ûrisan ji Kerçê  
derînin û di erdê Kerçê de tîdarîka xwe ji  
bo hîcûma Qevqasê bikin.

Li 15ê Gulanê eleman ketin bajar û  
bendera Kerçê û gihastine avtenga Kerçê. Ev  
avteng helra Azovê digehîne Behîra-reş. Şerê  
Xerkovê bi şidet dom dike û radyowa Lon-  
drê dibêje hêj mexseda Timošenko ne xuya ye.

**ŞERÊ ROAVÊ** — Di vê enîyê de şer  
gelek germ û nemaze bêeman bûye. Balafirên  
ingilîzî bi şev û bi roj û hê etlahî di ser erdê  
Elemanyê û erdê Fransa vegirti re difirin û bajar  
û destgehên wan didin ber bomban. Di vê  
navê de û li dawîya meha Nisanê balafirên  
ingilîzî herdan bajarê Rostokê. Rostok di  
Behîra-haltîkê de ye Bajareklî kiçîk, lê tê de  
febrîkeyên balafirên Heynkel hene. Ingilîzan  
sê çar çaran li Rostokê xist û ew bi erdê re  
rast kir. Ji xelkê 8000 peya hatine kustin 30000jî  
bê ban û sekan mane û guhastine hajarîne din.

Li 3ê Gulanê balafirên ingilîzî bi refîne  
mezin direjî Hembûrgê kirine û ew dane ber  
bombayên xwe. Xesarîne mezin çebûne û bi  
hezeran peya hatine kustin an birindar bûne.

Li 5ê Gulanê balafirên ingilîzî gihastine  
heta Danzingê yanî erdê Polanyayê. Danzingî  
balafirgehên ingilîzî divê 1500 kilometir dûr  
bît. Heke destê ingilîzan gihaste Danzingê  
hêye ko sihe balafirên wan xwe bigehînin xetên  
enîya ûris û ji par re li elemanên ko şerê  
ûrisan dikin bidin. Divê ev balafir halarî-  
firine nû û dîrger bibin. Hêye ko ev ji  
Emêrlîkê hatine.

Hitler di gotara xwe de qala êri-  
şên hewayî kirin û got heke ingilîzan li  
xelkê me ê sivil xist em jî emê derhên wan  
bi derhîne jê xurir li wan vegertînin. Bêdîro,  
ji hingê ve balafirên elemanî jî ji nû ve  
dest bi lîxîstana bajarên ingilîzî kirine. Lê  
derha elemanan ne weke herê, ne wek êrişên  
Tehax û Ilona sala 1940 ye; jê bi gelekî astîr  
e. Herçî ingilîzî ji hingê ve gewt hûne.

**ŞERÊ LİBYAYÊ** — Di şerê Lîbyayê de  
tişteklî nû nîne. Bi tenê bombardimanên  
Maltayê dom dikin. Girav li her xwe dide.  
Lê li 8ê Gulanê kumandan û wadiyê giravê  
istîfa kiriye û yekî din li şûnê hata tayîn  
kirin. Sebeba vê istîfayê ne hate selî kirin.  
Herweklî adet e, gotîne jî ber sebebên sihî.

**GÎNA-NÛ Û EWÏSTTALYE** — Gîna-nû dikeve bakurê Ewîstralyayê û nîzingî wê ye. Japonan ji mêj ve avetî bû Gîna-nû û hirekî wê vegerti bû. Piştî emêrkaniyan esker derêxiste giravê û erîşa japonan sekinaud. Ji hingê ve japon di vê qadê de di midafehê de ne bi tenê serê balafirên e. Balafirên her du aliyan li balafirgeh û wargehên hev dixin. Li gora danezanên Weşingtonê balafirên emêrikani xesarîne mezin digehînin japonan.

Vê paşiyê di dora Ewîstralyê û Gîna-nû de şerekî behrî çêbû. Stola japonan û ya inglîz û emêrkaniyan qedere heft rojan ji 3e Gulanê heta 10ê wê li hev dan. Li gora danezanên emêrikani dilê japonan behrî esker derînin giravên ko dikevin robelatê Ewîstralyayê. Stolên inglîz û emêrikani xesarîne mezin gihaudine stola japonî û ev stol pol poşman vegeyî wargehê xwe.

**MERTINİK** — Mertinik giravêk ji giravên Entlên kiçik e û ya Fransê ye. Mertinik li behira Etlantikê û li robelatê Emêrika navîn e. Piştî mesela Medegeskarê rojnemeyên emêrikani qala giravine Fransê en din ji kiri bûn.

Li 10ê Gulanê hikûmeta Emêrikê heye-tek şande Mertinikê û ev heyl rast bi rast bi waliyê Mertinikê re kete mîzakerê; hêl ko hikûmeta Vîşiyê bête serwest kirin Digel vê hindê waliyê firensîz hikûmeta xwe serwest kir û hikûmeta Vîşiyê di vê babetê de notak da Emêrikayê. Lê wer dixuye ko Emêrike naxwaze bi Vîşiyê re bide bistne û ji xwe re çêtir dibîne işê xwe rast bi rast bi waliyê Mertinikê saft bike.

Emêrike dibêje ko Mertinik wê firensîz bistne û weke berê ala firensîzî di ser seray û kelehên wê re wê li pêl bi bit. Bi tenê emêrikani ewê esker derînin hin cihên giravê û tê de wê cih bihin.

Li Martinikê stoleke firensîzî heye. divê çêkên vê stolê ji bêne rakirin. Di vê stolê de ji keştiyên hûr pê ve balafirhilgirek bi 22000 tonî û du krewzorên mezin hene. Jû pê ve li Martinikê 140000 ton vaporên barkêş hene. Emêrike dixwaze van vaporan ji bistne. Bi şertê ko kirê wan bide.

Hikûmeta Vîşiyê di nota xwe de çî gotiye ne ans e. Lê li gora nuçeyên paşin dest bi jêkirina cenkeştîyan kirine. Lê wall û heyeta emêrikani li ser tevayîya meselê hêj li hev ne hatine. Lê wer dixuye ko emêrikani bi çî awayî hebe ewê vi berî bibin serî.

**NUÇEYÊN ECEMISTANÊ**—Piştî ko ûris

## BINGEHÊN

### GRAMÊRA KURDMANÇ

BI NAVÊ YEZDANÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHIRVAN

— 14 —

### PRONAVA GIRÊKÎ

99 — Pronava girêkî dikeve paşîya navdêr an pronaveke din û wan bi komeka ko di pey wan re têt girêdide. Di zimanê kurdmançî de ji bo her du mêjer û zayendan bi tenê yek pronave girêkî heye ew jî «ko» ye.

Pronava «ko» di komekê de, li gora navdêra ko dinimîne carina kirar û carina jî bireser e.

Kirar: Mirovê ko tu ditî birayê min e.

Yê ko tu ditî birayê min e.

Bireser: Mirovê ko te ditî birayê min e.

Yê ko te ditî birayê min e.

Çend mîsalên din: Destmalên ko te kirîne spehî ne. Ez îro li hespê ko te dihl jî gund anl, siwar bûm. Çiyayê ko li pêş me ye Herekol e. Mîfta ko min pê ev derî vedikir wînda bûye.

100 — Herwekî di cih û deverê de de bêle gotin di zimanê kurdmançî de ji «ko» ya pronav pê ve «ko» ke din jî heye. Ew ko gihanek e û wezîfa wê di qîsetê de weke dine. «Ko» ya gihanek dikeve navbera hevokên komekê û wan digehîne hev. Ji lewre ev «ko» hergav dide pey lêkerêkê: Min got ko ez nayim. Ew hatin ko me biezimînin.

Ev ko bi xwe gava bi mana «heke» ye bingê beriya lêkerê tete gotin: Ko Lêzgin hat emê herin neçirê.

û inglîzî ketine Ecemistanê kurdên Ecemistanê hinek bihna xwe da. Lê eceman ev serbestî ji kurdan re lişteki zêde hesibande û ji nû ve dest bi şidandina kurdan kir. Li ser vê yekê kurd li ber hikûmeta Tehranê asê bûne. Ecem û kurdan li hev xistine. Di girtînhêvên pêşîn de, wer dixuye, zora eceman çûye. Eceman di vê mehê de, li Tehranê ordiwek saz kirîye û li 18ê mehê ev ordû berê xwe da Kurdistanê.

Ji milê din waliyê Kurdmançşahê û serokên kurdan gihaîne hev û wall daxwaza kurdan ji serokan pirsî. Daxwazên kurdan ev in: Wall û herçî memûrên kurdistanê divê kurd bibin û di dibistanên Kurdistanê de divê her tişt bi zimanê kurdî bête xwendin. Ji van pê ve kurd dixwazin ko hatînen Kurdistanê li Kurdistanê bêne serf kirin.

Şam: 19 Galan 1942 NÊREVAN



## Kitêbxana Hawarê

### Hejmar:

- 1 — Rêzana Elfabiya Kurdî C. A. Bedir-Xan.
- 2 — Rupelnine Elfabê C. A. Bedir-Xan.
- 3 — Dilê Kurên Min Dr. K. A. Bedir-Xan.
- 4 — Bîyîşa Pêxember. Bi Kurdiya dumill, bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 5 — Nivêjên Êzediyan bi dibaca C. A. Bedir-Xan
- 6 — Mektûb ji Mistefa Kemal paşê re
- 7 C. A. Bedir-Xan
- 1 — Mesela Kurdistanê Bazil Nikitîn
- 8 — Ji mesela Kurdistanê C. A. Bedir-Xan
- 9 — Elfabeya Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 10— Xwendina Kurdî Dr. K. A. Bedir-Xan
- 11— Elfabeya min Dr. K. A. Bedir-Xan
- 12— Dersên Şerîetê Dr. K. A. Bedir-Xan
- 13— Çarînen Xeyam Dr. K. A. Bedir-Xan
- 14— Proverbes Kurdes . Medhelokên Kurdî  
Lucy Paule Margueritte û Emîr. K. A. Bedir-  
Xan Paris - 1937
- 15— Le roi du Kurdistan . Qralê Kurdistanê .  
Emîr K. F. Bedir-Xan û Adolphe de  
Falgerolle . Paris - 1937
- 6— Der Adler von Kurdistan. Eyloyê Kurdis-  
tanê. Prinz K. A. Bedir-Xan û Herbert Örtel  
Berlin - 1937
- 17— Der Schnee Des Lichtes . Berfa Ronahiyê .  
Şîhrên Kurdî Prinz. K. A. Bedir-Xan û  
Dr. Curt Wunderlich Berlin - 1937

Kiriya Hawarê 500 Qirûşên Sûrî

Xwedî û gerîndeyê berpirsiyar: Mîr Celadet  
Alî Bedir-Xan . Şam—Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emîr Djêladet Aalî  
Bedir-Khan. Damas—Syrie



SAL 10  
HEJMER 45  
—\*—  
ŞEMBI  
20 HIZÊRAN 1942

# HAWAR

ANNEE 10  
NUMÉRO 45  
—\*—  
SAMEDI  
20 JUIN 1942

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

## TÊXISTIYÊN VÊ HEJMARE

Tefsira Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Segê Jar	Şêx Abid
Diwana Melê	Qedri Cemîl Paşa
Bir û Bêri	M. E. Botî
Çiyayê Cûdi	M. E. Botî
Memozin	Ehmedê Xanî
Sikalay	Bengine
Masivan	Cemilê Tacdo
Rewşa dinyayê	Nêrevan
Gramêra Kurdmancî	C. A. Bedir-Xan
Hedîsên Cenabê Pêxember	Dr. K. A. Bedir-Xan

## ★ BIRÊ FRENŞIZÎ ★

Proverbes	Tawûsparêz
-----------	------------



ŞAM—1942  
ÇAPXANA SEBATÊ

## TEFSİRA QURANÉ

118 — Geli bawermendino. . . . .

Cuhiyan me kin hevalé xwe; divé misilman di nav xwe de bibin hevalên hev. Cubi bi her awayî xirabîya we dixwazin û tu cara jê dest na kişinin; ew minêkarê perîşani û şermisariya we ne. Dilê wan ji dev û gotina wan reştir e. Em ayet û şîretên xwe şanî we didin da ko hon pê serwest bibin.

Heke we seh bikira. . . . .

119 — Geli bawermendino. . . Divê honê halê cuhiyan xweş bizanin. Hon heji wan dikin, lê ew ji we hez nakin. We baweriya xwe bi hemî kitêbên Xwedê aniye; ew bi tenê gava bi we re ne dibêjin: Me baweriya xwe bi Qurane aniye, lê gava ji we vediqetin û bi tenê dimînin, ji erna xwe kumikên tiliyên xwe gez dikin.

Pêxemberê min. . . . Bêje wan: Di erna xwe de bifetisin. . . Yezdan kîn û erna dilê wan dizane.

120 — Gava qenciyeke digehe we, ji dexsê bihna wan teng dibe û nîrûçê wan diqermeçe; lê gava xirabîyek dest bi we dike, we diêşîne, rûyê wan dikene, kêfxweş dibin. Heke hon seh dikin û ji Xudayê xwe tirsîyar in, bizanin ko zerrera kîn û hîlebazîya wan nahiye we; ji ber ko zanîna Yezden dora emelên wan digire û cezayê wan mizawiran dide.

121 — Wê demê bîne bira xwe. . . . Te sibe zû zaroyên xwe berda û bi qesda rastkirina şergehekê — ji bo bawermendan — tu ji mala xwe derketî. Xuda bihistîyar û zana ye.

122 — Du bir ji we, dest bi bazdanê kiri bûn. Lê piştî zanîna ko Xwedê xwedî û arîkarê wan e. Misilman divê dilê xwe bi Xwedê bigirin, Yezdan nisretê dide wan.

123 — Di şerê Bedir de ji, hon hin-dik bûn; lê Xuda ji kerema xwe nisret da we; ji Xudayê xwe tirsîyar bibin da ko hon bi nîmeta wî şikirdar bibin.

124 — Pêxemberê min. . . te ji bawermendan re digot: Xuda bi sê hezar

melyaketên ko da dahatin arîkariya we dikir; ma ev ne besî we ye.

125 — Heke hon dilê xwe sist na kin, sebr dikin, guhadrê emrên pêxemberê xwe dibin û jê ditirsîn; bizanin ko heke dijminên we li we har bûn, Yezdan bi pênc hezar melyaketên nişankirî arîkariya we dike.

126 — Herwekî Xuda ji we hez dikir, bi vê arîkariyê mizgîniyê dide we, ta ko tirs ne keve dilê we, dilê we sist ne be. Di şerî de nisret ji kerem û danê Xwedê ye. Xuda fêris û delal e.

127 — Xuda di roja şerê Bedir de ji kerema xwe bi kuştîna hin kafiran û bi xistîna hinên din li erdê, zora wan bir, ew şikestin û nisret da we.

128 — Heke Xwedê dixwaze tobe dide wan, an wan diêşîne, ji ber ko ew zalim in. Pêxemberê min. . . Tu tîkîlî şîxlê wan nabî.

129 — Her tiştên erd û ezmanan mil-kê wî ne; ji her kesî re ko dixwaze tobe dide û her kesê ko dixwaze diêşîne. Xuda gunehan xira dike, Xuda piyar e.

130 — Geli bawermendino. . . . Du bare, sê bare faizê mestînin û me xwin, ji Xudayê xwe tirsîyar bibin da ko hon ji ezabê axiretê ewle bin; ezabê axiretê ne gihe we.

131 — Ji agirê ko ji bo kafiran hatiye dadan, we hay ji xwe hebin, jê bitirsîn.

132 — Bîndestîya emrên Xuda û pêxemberê di wî bikin ta ko hon bigehin rehma Xwedê.

133 — Li hev anîna tiştên rast û qenc de lezê bikine xwe heta ko hon bigehin xîfrana Xwedê û bihuşta ko pehni, firehî ê mezinahiya wê bi qasî erd û ezmanan e û ji bo mirovên dilpak û bawermend hatiye ava kirin.

134 — Yên ko di tengî û firehiyê de destvekirî ne û arîkariya mirovan dikin, erna xwe hiltînin, xwe digirin û xelkê di sûçên xwe dibortînin bila bizanin. . . . Xwedê hejî qenckeran dike.

135 — Yên ko tişteki neçê dikin an ezabdarê nefsa xwe dibin, divê Xwedê

blnin bira xwe, tobedaré wi bibin û jê toban bixwazin. Ma ji Xuda pê ve ki dikare di gunehê xelkê bihore. Ew divê ji xirabiya ko kirine û pê birewer bûne destê xwe bikişnin û lê venegerin.

136 — Mikafatê qencikeran çiqas spehlî ye, Xuda gunehên di wan efiw dike, ji bona wan bihuştine têr av û kanî hene û ew tê de her dimînin.

137 — Berî we ji, ji miletên dinyayê re emrên Xuda dahat û pir tişt qewimîne... Di erdê de bigerin û xweş binêrin; gelo dawiya dilxar û derewkeran çawan bû.

138 — Quran halê wan pêş we dike, riya rastiye şani we dide û li mirovên ko ji Xwedê ditirsin şîretan dike.

140 — Gava hon bikevin tengiyê, birindar dibin, binin bira xwe ko ew tiştên ha li dijîninên we ji diqewimin. Carna hon, carna ew birindar dibin. Xuda bi vi awayî wê diceribîne û mirovên bawermend nas dike û wan digehîne nîmeta şehadetê. Xwedê ji xedaran hez na ke.

141 — Xuda bi vi awayî, mirovên bawermend ji gunehan paqij dike û pê kafîran diperçiqîne.

142 — Gelo we ji xwe re digot... berî ko Xwedê şerkerên riya cihadê û mirovên xudansebr nas bike, honê hema bikevin bihuştê.

143 — Beriya ko şer û kuştin destpê bike hon di riya Xuda de mirêkarê mirinê dibûn, lê gava ev çêbû, we ji dûr ve nihêrt.

144 — Mihemed pêxemberê e, berî wî jî pêxemberên din hatin û çûn, heke ew bimira an bihata kuştin ma hewe pişt pehniya xwe bi wan ve bikira û baz bidaya. Yên ko baz didin zererekê ji nagihînin Xuda. Ew ezabdarên nefsa xwe ne. Yezdan ne hewceyê mêraniya wan e. Lê Xuda camêr û şikirdaran digihîne xeyr û qenciye.

145 — Tu kes bê emrê Xwedê na mire, dema mîrina her nefseki li cem Xuda nas e. Em ji mirovan re, wextê

ko ew sewaba dinyayê dixwazin, jê didin û ji yên di re ko ji ya axiretê dixwazin wê digehinin wan.

146 — Ma çend car pêxemberên Xuda bi komên mezin re dest bi şerî kirin û hatin kuştin, lê wan tu cara dilê xwe sist ne kir, ji şerên riya Xwedê aciz ne bûne, wan xwe ne avêt hextê dijminên xwe, xwe pis ne kirin; Xuda ji mirovên dilgirtî û xudansebr hez dike.

147 — Golîna wan ev bû û wan ji vê pê ve tiştilik ne digotin: Xudayê me, di gunehên me bihore, dilê me bişidine û li ser qewmê kafîran nisretê bide me.

148 — Yezdan ji kerema xwe ji wan re sewaba dinyayê, nisret û dewlemen-diye û sewaba axiretê a spehlî û qedirbilind, bihuşt da. Xuda hejî qencikeran dike.

149 — Geli bawermendino... Heke hon, guh li kafîran didin, ew we vedigerînin li ser dinê xwe û دنیا û axireta we diçe, wînda dibe.

150 — Lê hon dizanin... Xudan û sermiyanê we Yezdan e, Xudan û sermiyanê bilindtir û spehtir ew e.

151 — Einê dilê kafîran bitirsînin... Ji her ko wan, bê izna Xwedê tiştine dikirin hevber û hempayê Xwedê. Cihê wan dojeh e, dojeh ji xedaran re cihêki têr êş û têr ezab e.

152 — Xuda li ser gotina xwe seki niye, lê diviya bû, hon dest bi kuştina dijminên xwe bûkin. We çî kir? we sistî û kêmasî kir, we guh ne da emrên pêxemberê xwe, we baz da, her çend ji riya nisretê pêş we de bû; hin ji we ketin pey malê dinyayê, dest bi falanî kirin; ji we, bi tenê hinan di riya Xwedê de dest ji şer û kuştinê ber ne dan. Ji bo ceribandina we. Yezdan berê we ji dijminên we zivirandin û wî hon şikênadnin. Piştî, herweki hon poşman bûne, Xuda efiw da we; Xuda bi bawermendan re comerd, delal û keremkar e.

## SEGË JAR Û ŞEXË TEYLES

Di dema Silêman pêxember de şexeti teyles hebû. Cilên wi ciline kesk bûn. Zor zor birûmet bû. Kurê wi ticaret bû. Bi xwe li bajareki dadenîşt. Di sûka ticaretê de bi keskên xwe û cilên xwe ên teylesan zora herkesi dibiri bû.

Şêx heroj beyaniyan ji mal der diçû û taşt ne dixwar. Qîza wi a biçûk taşt wi, jê re, dibire sûkê. Rojekê ji rojan qîzika şêx rahû, taşt bavê xwe jê ra bir. Teqereza Xwedê, wê rojê taşt şexê min keleparçe bû.

Wekû taşt geha cem şêx û rabîste xwarinê, wi çaxî, segeki jar û melûl û bêxweyi yê ko li wê rê bû; xwe avêti bû erdê û temayi dikir ko şêx çend hestiyar pavêjit ber wi da ko pi wan hestiyar debara xwe bikir, heya çend demekê.

Ko şêx taşt dixwar çi dikir? Hema wi goşt ji hestiyar vedikir û dixwar û hesti li teniştê xwe dikir kom. Segê jar wi çaxî kuriya xwe li hijiya xwe dida û dihejand û çavên wi biraherê şexê kesk req bûn. Lê çu himet ji şêx ne dtin. Wi çaxî çavên qîza şêx bi dilovaniyê bi layê seg ve çû û dilê wê ê kaçûç pê şewitt. Çavên xwe bi dilovant ji seg vegerand û bi çavêki xezehê nêri îlavê xwe û got ê:

— Bavo tu çira van hestiyar li teniştê xwe diki kom û. nadt vi segê jar û birçî, ne guneh e, hinde ew li te dinêrit.

Bavê wê yê ko şexê Xwedê bû, lê vegerand û got:

— Qîza min, bisekine ez ji xwarina xwe xelas bibim, ez dê bidim ê.

Ko şêx ji xwarinê xelas bû dest bire hestiyar û ew lûlaq yek bi yek li ser segê jar wer kirin û lêxistin; heya ko yek ji wan lûleqan li ser destê segê jar ket û destê wi şkand. Wi çaxî segê jar bi qirin û hewar û fixan qesta Silêman pêxember kir û çu cem wi; da ko gili û gazindiyên perîşaniya xwe ji destê şexê kesk i rihzerê tacir bikir. Ko giba cem Silêman ageliya daberizna şêx li ser wê da zanû.

Wi çaxî giliyên hemt beşaran û heywanan diçûn cem Silêman. Ko Silêman segê jar di wê perîşaniyê de dit dilê wi c dilovan bi perîşaniya wi peritt. Wê gavê ew xwe da bi layê balbasên xwe ve û ferman kir ser wan û gote wan:

— Zûka, zûka wi şexê kesk i rihzer û tacir yê kô daberizt ser segê jar bînin hire; da ko ez tola vi rebenî jê vekim.

Balbas çûn û şex anin cem Silêman û li navbera destên wi rawestandin. Silêman hakimeki zor adil û heqperest bû. Ko Silêman şex dit bi çavê xezehê lê nêri û got:

— Şexê rihzer û kesk, te çire li vi segê jar xist, heya ko te destê wi şkand; ma te bext nine? Çire heya vê derecê tu bi zaran ra sitemkar i? Hey bêbext û bê kovan ....

Silêman qedereki lê nêri; paşê careke din li şex vegeiya û got ê:

— Tu hê çî dey naki, ma ji ber çî te destê wi şikand, bi min bêje.

Şex çavên xwe pil kirin û bi vi awayî cehaba xwe da û got:

— Ya pêxemberê Xwedê, tu pê agahî ko ev seg segeki herimi ye û pis e, ev heroj tet cem min. Ji min re ne çak e çu se li nizin-gahiya min rûnin da ez ne herimim, da xelk xwe ji min nedîh paş.

Silêman pêxember lê vegeand û got:

— Ma te, an Xwedê ew inandiye Cihanê, hey bêbext

Silêman berê xwe ji şex dagerand û gote segê jar.

— Segê jar bixwaze, ez bo te çî tol ji şexê daberizt bistinim.

Segê jar ma sekint û haziran xwe ker kir. Silêman careke din gote seyê jar:

— Ez bo te destê şex pêş destê te ve bişkinin

Seg li Silêman vegeand û got:

— No, ne destê min, ne destê wi bi tin-ha ye. Bi destjikandina wi gelek zîç û zaroyan wê heyf bibin; hextê min qebûl nakit Silêman lê nêri û got.

— Dixwazt ez wi bo te hebis kim

Segê jar bi hebiskirina şex ji qall ne bû. Silêman gelek di gumana tolvekirina segê jar da ma; serê xwe li ser singa xwe rakir û li seg got:

— Pa ez ji te re çî li şex bikim bêje

Seg li Silêman vegeand û got:

— Ezbenî ez ji te dixwazim ko van cilên şex yên haweriyê jê vekl û cilên wek yên xelkê li ber wi bikir da ko beywanên din wek min jar û reben bi van cilan nexapin û nzingl li şex nekin. Her ez vi ji te dixwazim..

Silêman ferman kir cilên şex jê kirin û ciline adeti lê kirin.

Çiqas xiyala xwe didim vê çitrokê, di

## DIWANA MELÉ

— 26 —

Pir meke israf di qetli mibah  
Sefki demi aşiq mala yibah [1]  
Sine bi. dest xwe miharek veke  
Te'refu kem fi kebedt min cirah [2]  
Dil ji hewaye te di fikrên dihûr  
Fî licecl beyni hibûbir-riyah [3]  
Eşq giha kê û li eqli xo ma  
Yefteku bil aşiqi hisnîl melah [4]  
Dê du siyeh sirmeyê çelvên xwe kit  
Xaki reh yari seba her sebah  
Toz û xibarê seherê pir çneş  
Qed neşere-l-ley-yibû bilmiski fah [5]  
Fêris û rimbaz gihahe yek bi tir  
Elmede sil-beyni qetilir-rimah [6]  
Bûsezanan her ki ber an asitan  
Mek-kene min cebbetil ebrah [7]  
Hel-le lehûl qetle bi şerî'l huda [8]  
Men keşefes-sire bis-siri bah [9]  
Hisn û ednya te mela herki di  
Seh-he lehû in-neke eynil fesah [10]

- (١) سفك دم العاشق ما لا يباح
- (٢) تصرف كم في كبدتي من جراح
- (٣) في ليج بين هبوب الرياح
- (٤) يفتك بالعاشق حسن الملاح
- (٥) قد نشر الطيب وبالملك قاح
- (٦) احمد في الدين قتيل الرياح
- (٧) مكن من جهة الابراج
- (٨) حل له القتل بشرع الهدى
- (٩) من كشف السر وبالسر باح
- (١٠) صح له انك عين الفصاح

— 27 —

Heyfî qeyda xak û gul bit arif çalak rûh  
Da micer-red bit ko pertew det ji nû ew pak rûh  
Qeydi xak û gul nebit da bê-hicab û perde bi  
Misli bedrê carinan texit xisûfê xak rûh  
Şembi sir nûf-naditin ger ew nekit perhizi dil  
Zewqî cama eşqê nakit ger nekit imsak rûh  
Dil bi tayek nêrgizan dih nazikek terwende di  
Gul dikin teşhîhî xaran her xes û xaşak rûh  
Cami eşqê paki rûhanî fihûra batin e  
Ê nenûşî her we ma hel-ta ebed napak rûh  
Heyeta kêf û kenê bê kêf û kêfa arif e  
Dê biminit ger nebit naçar bê tiryak rûh  
Dê bi gulzara cemala sebzepûşan dê çi bit

dilê xwe de dibêjim ma kengê li Kurdistanê  
de jî ev hikimdarê adil rabit û van cilên teyles  
ji me bikit û xelkê wekû segê jar dilşad  
bikit.  
ŞÊX ABID

Ey di mîhrê da nebi dil pare pare çak rûh  
Bil ji can der-rakeyek rewşentir û wala divêt  
Sûreti hisna niqed-des da bikit idrak rûh  
Ger xeberdar i ji sir-ra « kunhi kenze » guh bidêr  
Da bi sed nûri beyan kit maneyê lewlak rûh  
Lamihi sir-ra tecel-li ser li tora dil dikit  
Zebî nakit wê necalê sed hezar esfaki rûh  
Her du êlanên te di min toqi gerden kir midam  
Da me her bêtin tebes-sim wek gula Del-haki rûh  
Cewheri hisna eda teuha dihit meqbûli tebh  
Ger ne seygel dit bi nûri eşq wek hek-kaki rûh  
Dê bi vî endaz û terzi key hibit sihrê hilal  
Ger ne bala tebh bit wek pehlewana çalak rûh  
Dilber-im avêt melê wî bari kir qewşê şevê  
Dê bidit ber gezmeyan bêşuc e ew sef-faki rûh  
Şehsiwar îro kenend avêtine qelbê Melê  
Bend nakit xeyri fetraqa te sed fetrak rûh.

— 28 —

Eşqê ko hidin bi yek du erwah  
Pêweste di vê bi hev bin eşbah  
Can û cesedan ko it-tihad e  
Wel ma lehil-mizac bir-rah [1]  
Wesla te li can û dil heyat e  
Men zaqê meraretel-newa tah [2]  
Tenha ne di sine min xedeng in  
Min lehzeke fil-qilûbi emah [3]  
Perwin ji şefeq seher xuya bûn  
La hed' we fihi minke misbah [4]  
Lew mest û minel hewa keban in  
La hed' we qed timilû erwah [5]  
Her şam û seler bi destê xoban  
Min xemretina tedûl eqdah [6]  
Ifteh bi liqakê qifli qelbi  
Fel-qelbû lehû liqak mifteh [7]  
Sey-yah me din di xelwe îro  
El-lah ko çi xelwe û çi sey-yah  
Berqê ko veda ji ber niqahê  
Wel-lami' min sinah qed lah [8]  
Qews û qezehan me din ji bala  
Wel-enberû men şezah qed fah [9]  
Ayineyi dil Mela cila dih  
Min tele'tehû feqed sefar-rah [10]

- (١) والماء له المزاج بالراح
- (٢) من ذاق مرارة النوي طاح
- (٣) من لحظك في القلوب ارواح
- (٤) لا بدع وفيه منك مصباح
- (٥) لا بدع وقد تميل ارواح
- (٦) من حمرتنا تدوح أقداح
- (٧) فالتلف له لقاء مفتاح
- (٨) واللامع من سناه قد لاح
- (٩) والمغرب من شذاه قد قاح
- (١٠) من طلعت فقد صفا الراح

## BÎR Û BÊRÎ

Wextê em di Kurdistanê de digerihaştin û herê me diket çêl, çiya û zozanên Kurdistanê em bilind û rengin û em derdiketin ser serên wan û me temaşa li dinyaya Kurdistanê dikir û li her çarexên xwe dinêrt; me didit ko ew kaş, kendal, heroj, pesar, lat û zinarên welatê Kurdistanê heryek bi awa û rengêki spehlî xemiliye.

Hinek jê heşin in, avên sar û cemidî jê derdikevin û serhejêrt mêrg û çimenan dibin û her texlî gul û gulçêk li ber wan heşin dibin û hilbil û şehlûl di nav wan gulên bihindar de heryekî bi reng û awazekî dixwênin û distrin.

Hinek jê zer in; giya û guliyên wan nîzîkî bişkinê bûne. Bûkik û kumikên wan diwerihin û bihina wan belav dibit. Ba û hewa wê bihinê difirînin û li ser mirovan de tînin. Difîna mirov hergav bihina xweş hildikişnît û mirov tucar bê bihina xweş namînit û pelên ewrên reş û tarî li ser re rawestane; û siha wan dikevit ser wan gul û giyayên zer; û hêdû hêdû taviyên baranê jê dirjîhîn û dibarin ser wan. Ji nû ve destekî din gul û giyayên nû serên xwe hildidin û derdikevin û ji binê xwe heşin dibin û her hev lîl radibin û xwe li stoyên hevdu dipêçin û herwekî keskesorên meha Adar û Nîsanê xuya dikin.

Hinek jê reş in; ji ber ko hingî hemiz û tîk re ne û tîrdar in û terh û şitilên wan ên zirav û dirêj pal dane hev; guli helçimên wan ser hev de xelîhane û dihejin. Ba û hewayekî hûr û rahet li wan didin û ser hev de xwîl dikin û wan dikin gîmş û di nav wan de xawişe, rizde û berên mezin û ferşên tûl û bilû hene. Ronahiya wan li wê reşatiyê didit; mirov dikarî wan ji hevdu ferq hikî.

Hinek jê çiya û rûyalên mebeb û mezin û hilind in. Navser, pal û pehnawên wan fireh û vekirî ne. Ko mirov derket ser serên wan û li ber xwe de nêrt û fedkîrt mirov dibînit ko ser dinyayê ketiye. Herwekî mirov li ezmanan bifirît; welê dinya, çêl û çiya li pêş çavên mirov ve hûr û kiçik xuya dikin û hemî ji mirov nizimtir e û li bin mirovan re ye. Ew nav û heyna vala vekîrt, beredayî navbera geht û newalan de li hewa pêl bi pêl her texlî reng û lewin weke fîlimê stnemayê dikîştin û li ber çavên mirov re tînit û diborînit. Ko mirov li rasta singê

xwe û li ser xwe re li wan hêşû û bîstî û sermilên bilind dinêrtî dibînit ko roj û ezmanan pêk ve pala xwe dane ser wan. Û ew sermil û çiya û hêşû ji wan re bûne balgeh û nalhenîşk û pêk ve mane û bûne yek û welê dixweyin.

Gava min holê li wan dinêrtî û ew tîşt diditin, min xwe ji bir dikir û di dilê min de tu mîraq, kul û keser ne diman û min digot ko niho ez gîham mexsed û mirada xwe. Ew tîşt min ji Xwedê xwestî da min. Ew ji bihûsta weletê min, welatê Kurdistanê ye.

Car caran min digot xelk çiqas bîeqil in. Li bajaran perên xwe didin û diçin steman û xisara xwe dikin. Ma çîre nayên Kurdistanê û seyra sinema û bihûstên wê nakin. Hemû belaş in.

M. E. BOTÎ

## ÇIYAYÊ CÛDÎ

Serê çiyayê Cûdî tu raweste û binêr  
Axa welatê kurdan hemî ziv e û tev zêr  
Ji wê dê tu dibînt Şernex Zaxo û Cizîr  
Sed heyf û sed mixabin hemî bê bakim û mîr  
Gulî, sindî, silopî weko eynê diyar e  
Bêspîn Bêşêr û Hevler hatin-bi yadigar e  
Berde Dêrgul, Herekol, heta biçit Piştkever  
Tor û Şingar û Bêxêr kela Memê beranber  
Hemî qesta te dikin, ey Cûdiyê miradan  
Tu qiblegabî Iro ji bo vî qewmê kurdan  
Çendî xweşî, bilindî, tu ey çiyayê Cûdî  
Te çend nav û nîşan hişt ji bo vî qewmê kurdî  
Bejna te bejna Zîne, mîranî wek Memê al  
Dinalim ser te Iro ji qehran hûme evdal  
Taca serê te zêrin, tu serbilindê Eyran  
Wextek hebî te zû da, hemî ji bo te heyran  
Heke nîzik heke dûr, weko Mekeh Medîne  
Ev jî cibek miqedes werin da em herin ê  
Ko roj hate rasta te, heval heyiv û stêr in  
Li vê rewş û xemla te, hemî pêk ve dinêrin  
Selam û erzi hîrmet ji bo Cûdî Nûh-neht  
Tu misteheqî fexrî bibêjtî ma kî hebî  
Botî bo te dibêjtî hero sed car ezbenî  
Taqê eywana Kesra li pêş te her dikent.

M. E. BOTÎ



# MEMOZIN

Rehmetî Hacı Evdîlqadirê Koyî der heqê Memozînê digot: « Kitêba mîletê me ye ». Holê digot; ji her ko di gotina « quran an mishefa mîletê me ye » de ji Qurana ezînuşan re kêmhîrmîtiyek didit. Bafin bi çî awayî bêne eşkere kirin mexsed û mirazê di xwe de vedîşêrin.

Herwekî me di henda « klaskên me » de dot ( Hawar: 33 ) Hacı perestîşkarê Xant bû û xwe şagirtê wî dihesiband. Hacı di diwana xwe de gelek çêl li Xani kiriye. Efsûs ew diwan ji bo îro windayî ye. Bi tenê şîh-reke wî bi min re heye. Hacı ev şîhir bi destê xwe li ser Memozîna bavê min a destnivîs nivîsandîye. Ez wê şîhirê careke din diguhêzî-nim stûnên Hawarê:

Zemane resmî caranî ne mawe  
Çîraxî nazim û mînuşî kujawe  
Le dewrî ême roman û ceride  
Egerçî meqsed e zanîni baw e  
Eman qedrê bizane em kitêbe  
Le diwîya êsteki hemtayî ne mawe  
Le eyamî heyatî şexî Xanî  
Le ser nîsxey xet ew nûsîrawe  
Le layî erbabî xoy bo qedr û qîymet  
Xezîney gewher e û kîsey diraw e  
Le mecmûbî diwel, Soran û Botan  
Le sayey em kitêbe nasîrawe  
Le kurdan xeyrî Hacı û şexî Xanî  
Esasî nezamî kurdî danenawe.

Heçî kurdên birewer hêl min û  
bêl Hacılqenc bir dibin Memozîn çî ye û  
Xant kl ye.

Xant ew mirov e ko gava xelkê Ewropayê hevûdin ji bo dozên mezhebtî dikuştin, li miliyeta xwe hişyar bûye; dil kiriye û xebî-tîye mîletê xwe ji hişyar bike û wî bigelîne azahl û serxwebûnê. Mîlet pê ve ne çû. Ji ber ko wî, tiştên ko Xanî digotin bir ne dihirin, ew seh ne dikirin. Wek her mirovê mezin, wek her pêxemberî Xanî ji beriya wextê xwe hati bû; wextê wî ew seh ne kiri bû. Gava Xanî herevaniya mîlet, nijad û welatê xwe dikir welatîyên wî li ber tiştîne din sekinî bûn.

Me got ko Xant wek her mirovê mezin û her pêxemberî beriya wextê xwe hatiye. Ma gelo welê ye? An ew di wextê xwe de tîn û tov li erdê wer dikin. Ev tov heta ko şîn bibe midekî dirêj li bin erdê dimîne. Heye ko ji lewre dibêjin filan beriya wextê xwe hatiye. Tovê Xant ev sê sed sal in li bin

erdê ye. Ma hêj dema şûnbûna wî ne hatiye. Ev çend sal in zeviya Xant di hin cihan de dest bi şûnbûnê kiriye.

Ji hejmara Hawarê a 35an ve me dest bi belavkirina Diwana Melê kir. Ji vê hejmarê ve ji emê Memozîna Ehmedê Xant bi tipên kurdmançî de belav bikin.

Ji esera Xant re Memozîn dibêjin. Ev gotin ji du hêjyan bihevketî ye. Mem û Zîn; navên qehremanên çîrokê. Lê melayên kurdan ew xistîne sikilê Memozîn û tro jê re ji « Mem û Zîn » bêtir « Memozîn » têtê gotin.

Xant biyanê esera xwe ji destana Memê Alan girtiye; lê ew weke xwe ne biştiye û gelek tiştên wê guhartine. Xant bi vî awayî ji Memê Alan re guhartoke nû guhartoke nivîsandî saz kiriye û ev guharto di hin cihên Kurdistanê, nemaze di cihên ko tê de medrese hene, li guhartoyên xelkê tesir kiriye û ew kêr û zêde daye guhartin.

Belê feqehên ko di medresan de Memozîn dixwendin, di civatên begler û aqeleraan de qesîdeyên Xanî bi saz û qeyde digotin. Dengbêjên ko di wan civatan de qesîdeyên Xant seh dikirin hin birên wan qesîdan bi îslûbên xwe dixistin kilam û stranên xwe û bi vî awayî di Memê Alana di wî welatî de de hin tişt dibatî guhartin. Bivê neyê wan dengbêjan qesîdeyên Xant xelet û li gora xwe seh dikirin û stranên xwe bi vî terzî diidlandin. Bi vî awayî Memê Alana xelkê ji Memozîna Xant carîna tiştîne welê digirtin ko Xant ew bi xwe tucaran ne gotî bûn.

Ji xwe me dil heye di cil û deverê de em li van ferqan îşaret bikin û guhartoyên xelkê deynin ber guhartoya Xant.

Xelk îro ji, esera Xant ji dustana xelkê ferq dikin û dibêjin li gora Memê-Alan Mem padîşahê welatê mîxribyan e, û li gora Memozînê, Mem, kurê deblêrê diwana Mîr e.

Em ji dema qala van her du eseran bikin ji ya Xant re Memozîn û ji ya xelkê re Memê-Alan dê dibêjin.

Xant Memozîna xwe bi 50 qesîdan lêk vekiriye û di qesîdeyên pêşîn de qala Xwedê, pêxember; kurdîlî û Mîrê Botan kiriye.

Li ser qesîdeyên Memozînê li şûna ser-namê çend xêzik nesir hene. Ev xêzik Xant bi xwe nivîsandine an hinên din piştê ew bi ser ve zêde kirine em pê nizanin. Herçî ji hebe ew nesir ne rast in. Îslûba wan ne kurdmançî ne farisî ne jî erebî ye. Ev nivîsar ji ber du îslûban der, ne nezîm ne jî nesir in. Digel vê hindê em van xêzikan diguhêzînin



stûnên xwe da ko minhowa li her destê me weke xwe bikeve destê nîşgên ayendê.

Qesîda pêşîn li ser Xwedê ye û bê sername ye. Xanî di malîka vê qesîdê a pêşîn de bi mecaz dibêje ko ev qesîde sernama kilêbê bi xwe ye.

## — 1 —

Sernameî name namî El-lah  
Bê namî wî natemam e wel-lah  
Ey metlei hisnî eşqbazî  
Mehbûbî heqîqî û mecazî  
Namê te ye lewhî namiya eşq  
Ismê te ye neqşî xamiya eşq  
Bê neqşî te neqşî xame xam e  
Bê namî te name natemam e  
Namê te ye şahî beytî meqsûd  
Fihristî mikatebatî mehmûd  
Mezmûnî miraselatî lareyb  
Meşhûdî mikaşefatî bilxeyb  
Mehbûbî qilûbî men lehil qelb  
Qelban tu diki bi ba xwe ve celb  
Maşûq tu yî bi fexr û nazî  
Aşiq tu î lêk bêniyaz î  
Mittêq tu mifîd û mistefad î  
Bê şîbhe mîrdî û hem mirad î  
Nûr î, tu di hisnî rûyî dildar  
Nar î, tu di qelbî aşiqî zar  
Şemh î, ne jî qîsîmî nûr û nar î  
Şems î, jî eyan tu perdedar î  
Genc î, tu û nêv tîlîsmî alem  
Kenz î, tu eyan jî ismî adem  
Ev alem û ademî û meşhûd  
Ev mimkin û masîwayî mewcûd  
Hemîyan bi te ye midare û debr  
Fey-yazî riyazî xulki wel-emr  
Emrê te bi lefzî « kun » [1] du alem  
Mewcûd kirin xerez çî adem  
Adem bi xwe yek jî her diwan e  
Yek herf jî emrî « kun-fekane »  
Ew herf heqîqeta miheq-qeq  
Hem emr e bi qudreta te hem xelq  
Eşbalî mîres-sem in jî nasût  
Erwah miwes-sem in bi lahût  
Ev rûh û cesed bi cebr û ikrah  
Tezwîc biwîn bi emrî El-lah  
Nasûtî egerçî rengsîfal e  
Lahûtî jî pertewa cemat e  
Herfa ko me gotî neqşî hûr e  
Lê meqsed û manîya wê kûr e  
Zahir te eger ne maye sîkra  
Batin ew e, neqşî xame kubra  
Mewcûd e di wê şehadet û xeyb  
Meşhûd e di wê siyadet û eyb

Insan bi xwe hem zilum e hem nûr  
Adem jî te hem qerîb e hem dûr  
Hîndê weko cînsî alemî ne  
Ew tabî'î new'î ademî ne  
Evrenge felek hemî mîez-zem  
Evçende melek hemî mîker-rem  
Ev karîgeha ezlm û dew-war  
Ev barîgeha bedî û sey-yar  
Evçende zemin digel enasîr  
Evrengehe erd digel cewahîr  
Evçendehe nîmet û nefats  
Evrengehe me'kel û melabîs  
Evçendehe mid-dea û mellûb  
Evrengehe mîstela û mehbûb  
Heywan û meadin û nebatat  
Mellûb û meqasîd û miradat  
Bîlcîmle jî bo me re li kar in  
Fîlcîmle jî bo me ber debar in  
Heq-qa ko te xweş nîzam û rewneq  
Tertîb kirin jî bo me elheq  
Em xafîl û atîl û gunehkar  
Mayîne di qeydî nefîsî em-mar  
Nînin me di qelbî sîkr û zîkrek  
Nakîn bi zebanî hemd û şîkrek  
Xanî ko nehîn bi qelbî zakîr  
Barî hîde wî zebanî şakîr.

## — 2 —

TADADI NÎMETŞIMARÎ Û TEKRARÎ: ŞIKIR-GIZARIYA BARRÎ DI SÛRETÊ AYÎNEDARÎ Û PERDEBERDARIYA PERWERDIGARÎ DA DIGEL IXTITAMA BI MINACATEKÎ MIXTESERÎ KURDÎ.

Ey şîkrî te cewlîtera zebanî  
Wey zîkrî te seyqela cenanî  
Ey wahîdî hêşerîk û yekta  
Wey wacîdî bênezîr û hemta  
Ey baqîyî bîzewal û daim  
Wey hadîyî bîfenn û qatîm  
Ey xalîqî erd û asîmanan  
Wey xalîqî cimle'îns û canan  
Mîlk û melek û felek bi carek  
Bîlcîmle te çekîrin teberek  
Sîbhaneke kul-lema xeleqte  
Ehsente fe keyfe ma feleqte  
Herçî ko te çekîr ey nîkûkar  
Heryek di hedê xwe de sezâwar  
Ev ne sedef îr di pîr mîrarî  
Dir-ri di sefid şefaf û tarî  
Heft in di misalî dir-ri xeltan  
Her şeş cîhet û çîhar erkan  
Her sê weledê di pîr mewalîd  
Xebra û sema digel meqalîd  
Lewh û qelem û sewabî û erş  
Heywan û nebat û maden û ferş  
Zahir kirin evçeder senayîh

Peyda kirin evqeder bedayih  
 Heryek ji edem kirin te peyda  
 Ibdah kirin te bê heyûla [2]  
 Filcimle çî ew-wel û çî axir  
 Elqis-se çî mûmin û çî kafir  
 Heryek ji te-ra we bûnê mezher  
 Ewreng di wan tu bûyî mizmer  
 Bê hisin te nîne wan wicûdek  
 Bê nûr te nîne wan nimûdek  
 Hikmet ew e hatîni û zahir  
 Qudret ew e xalî û hazir  
 Nînin te tecez-zî û temek-kîin  
 Em-ma we [3] di wan dikî tewet-tin  
 Goya hemî cismek in tu can î  
 Goya hemî şehrek in tu xan î  
 Hisna te ye zînetî hebîban  
 Rişka te ye xêretî reqîban  
 Meyla te ye aşîqan dikêşit  
 Dêrdê te ye, dil ji ber diêşit  
 Şîrîn te kîre şekîr li Perwîz  
 Ferhad ji rengî eşki xûnrîz  
 Leyla te kîre bela li Qesê  
 Ramin bi te ram bû li Wêsê  
 Yûsif te çîra nîma Zilêxa  
 Wamiq te kusa ginande Ezra  
 Şêxl wekû pence hec hijari  
 Dîn kir te ji bo keça kufari  
 Nîloferê nazperwerî kir  
 Ew jî te li mîhrî mîşterî kir  
 Balayî bilind te daye ser wan  
 Pabendi bela te da tezerwan  
 Sorgul te kirin ji xar peyda  
 Bilbil te kirin hezar şeyda  
 Xweşrengî te da giyayê sorgul  
 Xweşdengî te da newayê bilbil  
 Ronahl te da serê şemalan  
 Perwane kirin bi şewqê talan  
 Mehbûb te çekirin di dilkeş  
 Meczûb te pê kirin mişew-weş  
 Ev eşq û mîhbete di dil da  
 Ev zîlfî selasî di mil da  
 Aya ne [4] te çekirin miqabil  
 Heryek te bi hev kirin miadîl  
 Aytne te çekirin miqabil  
 Aytne te çekirin mîker-rer  
 Hisna xwe di wan te kir misew-wer  
 Aytne li pêş lûtîyan girt  
 Davek te li pêş kovîyan girt  
 Aytne ji wan we ye ko av e  
 Ew eks ji wan we ye ko tav e  
 Neqşê te dibînin ew di avê  
 Nakin hezerê ji av û davê  
 Lehteşne teleb dikin zelalî  
 Wî dane û dam û zilf û xall

Meqsûd ko bû ji pêş ve bazir  
 Dê qesd hikim cemlî nazir  
 Tûtî bi xwe ma şekîr dirêjin  
 Herçî dibîlin [5] ewî dibêjin  
 Wê meqsedê mixteser dibînin  
 Pabend dibin gelek dimînin  
 Meqsûd û miradî dil tu şa yî  
 Em-ma tu « tedel-lû men teşa î » [6]  
 Herçî te divê bîftî delalî [7]  
 Pabend dikî bi zilf û xall  
 Herçî ko tu bînt ser hidayet  
 Vê ra bikirî bîktî inayet  
 Hazir wî dibî meqamî malûm  
 Ger xadim e wî digêrî mexdûm  
 Bê secde te ey cenabî mabûd  
 Adem kîre qiblegah û inescûd  
 Îsa te kusa gîbande ew can  
 Aya bi çî te hebände ew can  
 Dersa ko bi xef te gotê İdrîs  
 Elbet diçû « meqamî teqdis  
 İblîsî feqrê bê cinayet  
 Hindê te hebû digel inayet  
 Her roj dikir hezar tael  
 Lewra ko te da wî istîtaet  
 Wî secde ne kir li xeyrî mabûd  
 Gêra [8] te ji ber derê xwe merdûd  
 Yek secde ne bir li pêş ekyar  
 Qehra te kîre mixel-lidin-nar  
 Elqis-se ji hikmeta te agah  
 Ferdek mî ne di teberekal-lah  
 İrfanî teleb di sahib idrak  
 Der heq-qî te gotê ma erefnak  
 Xanî bi nizaniya xwe der heq  
 Gumrah bibit ne dûr e eiheq  
 Il-la ko meger mîln Xuda bit  
 Ya rahberê wî Mîstefa bit  
 Yareb bi heq-qî mîstefa kl  
 Xanî bi xwe re tu aşîna kî [9]

[1] İşaret li ayeteke Quranê ye. Wê ayetê gotiye:  
 وَإِنَّمَا أَمْرُهُ إِذَا أَرَادَ شَيْئًا أَنْ يَقُولَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ

[2] Mexsed jî heyûlayê nimûne ye. Yanî, jî  
 Xwedê re, te her tiştên tebiatê bê nimûne  
 afirandine

[3] Di vî şiklî de manakîrîna misrehê zehmet  
 e. Lê heke ev « me » « tu » biwa hingê mana  
 eşkere ye. Mana ew e ko tu di wan de rûdîni,  
 yanî cihê Xwedê nîne an ew ne nas e, lê Xwedê  
 di herkesî de ye. Mîn nikarî bû ez vê misrehê bi  
 « we » ye mana bikim. Heke hîndê din kart kerem  
 bikin û jî me re bidin zanîn.

[4] Heke jî bo weznê « ne » avêtiye pêşiyê;  
 dikarî bû bibêje:

Aya te ne çekirin miqal.

Ji her ve yekê heye ko di libernivîsan-  
 dinê de « te » û « ne » pêş û paş bûne.

## SIKALAY POR U KEW

Ewa por û kew lèk hatine ziban  
 Be gileyî kirdin li halê kurdan  
 Por be kew elê: « Ey kurd teblat !  
 Li her çî hawrêrê exête zillet ?  
 Boç bo bêgane tu xot emrênt ?  
 Be qesbe qesb bo çî exwênî ?  
 Ewan be sire ehênîye bin dor ?  
 Rawçî nûstiwe tu ey key luşyar.  
 Be demaxî xoy miştiyan lê egîrî.  
 Be hrludarl serîyan ebîrî.  
 Le ciyati ewe bo yan bikey şin  
 Xênîyan emji eley aferîn !  
 Ya li meydana beqin exwênin  
 Ke têkiş her bûn wekîrê eskênin  
 Xozge em halem lê ehû halî  
 Mêşkim lem ilme ne debû xalî !  
 Kew: « Pore kiçani wale kinace  
 Em qewme êsta bûn dese paçe;  
 Bê wan dirat û germiyan û kôstan  
 Êstas diyare dewreyê Kertm-Xan.  
 Emeş le kewî kurdan xulqawîn.  
 Wek ewan ejîn her çend fêwtawîn  
 Ger xundewarî tarîx ezanî  
 Kirdeweyî eme be baş ezanî;  
 Be eqil biwaye xelkî Ewropa;  
 Her glz ney edl teyare û homba.  
 Ême bilên çî le kirdeyî Yezdan  
 Hîç kes be koşîş nûgate kurdan. »

### BENGINE

[6] Yanî herçî ko dibihîsin.

[6] اما توتصل من تشائي

[7] Ne delaliya kurdmançî; lê bi dadê nevinî  
 û xirabiya erebî. Me dikarî bû em wê bi « z » yê  
 binivîsin; lê hingê dibu « zelalî » û jê maneke din  
 bi der diket. Bi tîpên erebî:

هرجى ته دى بى ضلالي

[8] Ji « gêra » mexsek « kirin » e. Yanî te ew  
 ji her derê xwe kirîye merdûd. Ji xwe berî 12  
 misrehan Xanî dîsa şûna kirinê bi « gêran » ê  
 emel kirîye û gotîye:

Ger xadim e, wî digêrî mexdûm.

Yanî heke ew xadim e tu wî dikî mexdûm.

[9] Herçî sairên kevin in bi minacatekê  
 dest bi esera xwe kirine. Ew minacat hemî kêm  
 û zêde weke hev in. Lê minacata Xanî di celebê  
 xwe de yekta û tekane ye. Nemaze tîştên ko di  
 beqê lîblîs de gotîye yekcar negotî û nebihîstî ne.  
 Xanî ji Xwedê dipirse û dibêje; ma te çîre lîblîs ji  
 diwana xwe bi der kir; bi min be tu sûcê wî  
 nine. Ewî ji mabûd pê ve perestîgî tu keş ne kir.

Xanî midetkî, welê dide zanin ko heq di  
 destê lîblîs de ye. Ji ber ko secde xweserî Yezdan  
 e. Ji lewre lîblîs secde li pêş Adem ne birîye.  
 Lê paşê Xanî xwe dispêre hikmeta Xwedê û jê  
 dixwaze wê hikmetê jê re eşkere bike. An ne,  
 Xanî ditirse ko heke gelek da eqîl xwe, û Xwedê  
 rêberîya wî ne kir; rîya xwe dê wînda bike.

Belê Mihemed Mistefa, pêxemberê Xwedê

## MASIVANÊN

### DIHÎ TORPILÇINÊN ÎRO

Xelkê Britanyayê wek her xelkê girav û  
 peravan gelek meyln xwe didin masivaniyê.  
 Masivani di nav wî xelkê de sinheteke mîlî  
 têtê hesêb. Nemaze gundiyan peravan hesêb  
 bi masivaniyê dijîn. Beriya vi şerî li Britanyayê  
 qedere 27000 masivan hebûn. Ev masivanên  
 ha îro, ji rû û ji biniya behirê, ji masiyan  
 bêtir torpilan digirin.

Mesele holê çêbû. Eleman li riyên behirê  
 yên ko ji Etlentik û Pesifikê têne Ingilterê  
 torpil direşînin. Eleman van torpilan ji jor de bi  
 balafirên berdidin jêr. Ev torpil li behirê belav  
 dibin û qedereki dikevin binê avê. Gava vapor  
 di ser wan re diborin bi têtên ko li rûyê avê  
 dimînin ew derlên rû, li vaporan dikevin,  
 diteqin û wan bin av dikin.

Di vi şerî de selametiya riyên bihirê  
 ji bo ingilîzan gelek bi ehmiyet e. Ji ber ko  
 her tîştên Ingilterê ji derve û di riyên behirê  
 re tên. Wek her stolê di stola ingilîzî de ji  
 vaporên torpilçin hebûn. Lê eleman ewçend  
 torpilan direşînin behirê ko ew vapor ji bo  
 rakirina wan tîr nakin.

Herçî vaporên masivanan reşma şerî  
 derdiketin behirê û bi îşê xwe mijûl dibûn.  
 Lê ji ber ko ew vaporine dijîmin bûn balafirên  
 elemanî ew didan ber bombeyên xwe û ew  
 dixeriqandin. Ji lewre ew vaporên bêçek hew  
 dikarî bûn derkevin behirê. Hikûmetê bi  
 miwafeqeta xwedîyan ew vapor bi çek kirin  
 û li wan top û mitrelyozên balafirşîken û  
 topeke ji bo noqaran danin. Bi vi awayî  
 vaporên masivaniyê hûne cenkeştî. Piştî ko  
 ew vapor bi çek bûn wezîfêke nû li ser  
 xwe girtine: Çinîna torpilan.

Ev îşekî zehmet û bi talûke ye. Lê  
 masivanên dili bi şehrâziya bi karê xwe  
 ê nû radibin.

Herwekl me got torpilên ko eleman ji  
 jor de tavêjin, xwe di bin avê de vedîşêrin.  
 Îcar rabûn li vaporên masivaniyê cihazek  
 siwar kirin. Têline wê cihazê berdidin kûra-  
 hiya behirê. Ev têt têtên torpilan her bi xwe  
 ve dikîştînin û wan ditînin der, rûyê avê.  
 Gava torpil xuya kirin masivan bi tîfing an  
 mitrelyozan bera wan didin û wan diteqînin.

### CEMÎLÊ TACDO

rîya rast şanî daye. Lê Xanî di wê rê de ji ne  
 xatircam e; dixwaze ko Xwedê bi xwe, xwe jê re  
 eşkere bikî. Xûfrana di ser rehmetê re li Can û  
 gîyanê te Xanî.....

## REWŞA DINYAYÊ

**ŞERÊ ÛRIS** — Di dawiya Gulan û di pêşiya Hizêranê de ûris û elemanan, xwe kêr û zêde tev da. Lê dibêjin hêj êrişa mezin, êrişa Biharê dest pê ne kiriye.

Elemanan piştî ko Kerç bi şûn de ve gerand û ûris jê derêxist di Gulanê de dest bi herketêke nû ne kir. Lê herçî ûris beriya ko îşê Kerçê safî bihe, di mintîqa Xerkovê de, li 13ê Gulanê dest bi êrişê kiriye. Li gora pisporên eskerî armanca ûrisan xerabkirina plana elemanan û bişûndevegerandina Xerkovê bû. ûrisan bi qewetîne mezin û zirehpûs dirêjî Xerkovê kir. Eleman qederê heftekê di midafehê de man û li 19ê Gulanê rabûn berhicûmê. Ev şer hela dawiya Gulanê dom kir û her du aliyan got; me zora e din bir. Herçî ûris in, wan Xerkov bi şûn de venegerand. Lê elemanan jî tu erdê nû venegirt.

Elemanan li 29ê Gulanê danezanek belav kir û got ko şerê Xerkovê bi şikestina ûrisan xelas bûye û di vi şerî de 240000 hêsir ketine destê elemanan.

Li 31ê Gulanê ûrisan jî ji Kwibişefê danezanek belav kir û tê de got ko elemanan êrişa xwe nikari bû bihe serî û hicûma elemanan peşiliye. Danezanê digot ko xesara elemanan kuştî, birindar û hêsir 94000 peya ne. Ji ûrisan 5000 kuştî 70000 hêsir hene.

Bi vi awayî, şerê Xerkovê, bêt ko yekî jî her du aliyan tişteki heja bi ser de bêxe, qediya.

Di nivgirava Krimê de jî Kerçê pê ve Sevestepol jî di destê ûrisan de ye. Ji xwe elemanan par jî Sevestepol ne standî bû. Sevestepol bendereke gelek bi ehemiyet û wargeheki stola Behira-reş e. Par elemanan dor lê girti bû û ûris tê de mehsûr ma bûn. Sevestepol jî biketa dest êdî di erdê Krimê de eskerên ûris ne diman. Ji milê din stola rûsî bi Sevestepolê wargeheki hêja jî jî dest dida.

Li 6ê Hizêranê elemanan bi çekên xwe ên hewayî û bi eskerên hejê dirêjî Sevestepolê kir. Balafir û topçiyayê qederê çar rojan li tabiyên kelehê da û di derekê de xetên rûsî şkenandin. Lê ûrisan ew der pine kir û li ber êrişa elemanan sekinin. Îşê ûrisan di Sevestepolê de zehmet e. Ji her ko kelehi di mihaserê de ye û jê re tu imdad naye.

Ji milê din û li gora radyowa Moskoyê, li 11ê Hizêranê elemanan di mintîqa Xerkovê

de jî, jî nû ve rabûne hicûmê.

Herçî eniya bakur, di Leningard û di gola Ilmenê de herçend şer hinek germ bûye jî; di vê eniyê de hêj tu delêletên êrişê nînin.

**ŞERÊ ROAVÊ** — Şerê roavê di van rojan de gelek germ bûye. Ji xwe şerê vê eniyê şerê balafirên e. Li 30ê Gulanê bi şev qederê 1250 balafirên îngilîzî bi ser bajarê Kölnê de girtin û qederê 3000 ton bombe berdane bajêr û febrîkeyên dorê. Di tarîxa şerê balafirên de hela niho tucaran 1250 balafir bi hev re bi ser dijmin de ne girtine.

Elemanan gava Londre bombaran dikir carekê an du caran bi 700-800 balafirên bi ser Londrê de girti bûn; lê tucaran miqdare balafirên wan ne gihasti bûn 1250î. Dibêjin ko bajarê Kölnê hesêb xerab bûye û xelk jê direvin û diçin bajarine din. Piştî du sê rojan, disan qederê 1000 balafirî avêtine ser febrîkeyên Krûpê û xesarine mezin gihandine wan febrîkan. Îngilîz dibêjin: « ev lê l! lê l ye, lol lol hêj li pey e ».

**ŞERÊ PESIFIKÊ** — Piştî ko şerê Birmanyayê safî bû û japon di tixûbên Hindistanê de jî îngilîzan veqetiyayê ordiya japonî zora xwe da Çînê û di wilayeta Çekyangê de dest bi êrişê kir. Japonan di vê wilayatê de du bajarên mezin û girane zemt kirine, Kêniwa û Laçi û êrişa xwe pêş ve birine. Çiniyan li 2ê Hizêranê dane zanin ko di wilayeta Çekyangê de çar bajar bi şûn de vegevandine. Lê çiniyan ev bajar hêj bi nav ne kirine.

Di Pesifika navin û di navbera japon û emêrikanîyan de şerê behrî û hewayî çêbû. Di vi şerî de zora japonan çû û emêrikanîyan tola Pêrherbûrê jî dijminê xwe hilant.

Di Pesifika navin de giravek heye jê re Midwey dibêjin. Ev girav wargeheki behrî ye û dikeve roavayê giravên Hewayê û mifta wan tete hesêb.

Li 4ê Hizêranê japonan stoleke mezin digel vaporên barkêş şande Midweyê. Di vaporan de eskerên hejê hebûn.

Mexseda japonan vegertina girava Midweyê bû. Balafirên emîrîkanî stola japonî beriya ko bigelhe dora giravê keşif kir û elam dan stola emêrikanî. Her du stolan û çekên hewayî li hev da. Ev şerê ha qederê 3-4 rojan ajot. Stola japonî sîkest û bi şûn de vegeviya. Li gora danezanek emîraliya emêrikanî xesareke mezin gihastiye stola japonî Qederê 15 cenkeştiyên japonî bin av bûne an xesar gihaye wan. Di nav vaporên binavhûyî de çar vaporên balafirhilgir hene.

Herçl emêrikani ji wan ji vaporeke balafir-hilgir bin av bûye, û xesarîne sivik gihastîne çend vaporen din.

Piştî vê şikestinê japonan esker derêxiste giravên Elêûten. Ev girav li bakurê Emêrikê ne û ji nivgirava Elaskê wek xetekê her bi jê r dibin. Elêûten ji hezar û hin giravan bihevketî ye. Lê piraniya giravan xalî ne û xelk tê de nînin. Emraliya emêrikani dibêje ko japonan, nemaze esker derêxiste giravên xalî.

**ŞERÊ LIBYAYÊ** — Di qada Libyayê de, piştî ko midekî dirêj her du aliyan bilma xwe da, şer ji nû ve dest pê kir. Romel li 26ê Gulanê dirêji xetên inglîzî kir. Ingilîzan ji berhîrê her bi heriyê, ji Xezalê heta Bîrhekîmê, xetêke midafehê çêkiri bûn û pêşiya vê xetê ji torpîlan tîji kirî bûn. Elemenan bi qewetên xwe ên mêkankî û zîrehpûş ji par re li Bîrhekîmê hate wêr. Ji milê din elemanan ji pêşiya xetên inglîzî torpîl rakirin û ji qewetên xwe re du riyên teng vekirin û piştê ev her du rê gihandine hev û rêke fireh anîne pê. Lê li hire şekin. Herçl inglîzî in, wan ji ji alîkê êrişê elemanan sekînan û ji aliyê din ew ji ketin paşiya elemanan û li riyên ko tê re ji elemanan re çek û cebîrxane dilhat, dixistin.

Di navbera inglîzî û elemanan de şerîne xwîndar çêbûn. Midafeha Bîrhekîmê qewetên Frensa Aza li ser xwe girti bû. Frensîzan bi mêrani û qelîremani şer kir. Frensîzên Aza piştî ko 16 rojan li ber dijminekî xurt sekînine xwe dane paş. Ji xwe herçl firçeyên talyani ne, frensîzên aza ew tarîmar kirîne. Lê ji her ko cih li wan gelek teng bû bû serfermandariya inglîzî li 12ê Hizêranê emîr da eskerên Bîrhekîmê ko jê bikişin. Di tariya şevê de birekî ji frensîzên aza xwe da paş û ji Bîrhekîmê xelas bûne. Bîrhekîm bi xwe û birekî frensîz ketine destê elemanan.

Piştî Bîrhekîmê şer di dora Harmatê de dom dîke

**PEYMANEKE NÛ** — Mister Îdin wezîr-xaricîyê Ingilîterê da zanin ko Molotov wezîr-xaricîyê Rûsyê li mela Gulanê li Londrê bû û jê çûye Weşingtonê û li 26ê Gulanê, di Londrê de, di navbera ûris û inglîlîzan de peymanek hate imza kirin.

Ev peyman ji 8 bandan bihevketî ye. Li gora vê peymanê her du alî ji bo şikestina Hitler, ewê bi her awayî arîkariya hev bikin û heta zora elemanan bibin wê şerê wan bikin û tu ji her du aliyan bêtê dîn bi

elemanan re silh nakin.

Ev peyman piştî şerî ji wê dom bike û ûris û inglîlîzan her tevdiê bibînin da ko elemanan nikarin ji nû ne serê xwe hildin û dirêji xelkê bikin.

Mideta peymanê bist sal in

**PIRSA ENIYA NÛ** — Bi peymanê rûsî û inglîlîzî ve pîrsa enike nû ji nû ve bû girêka gotinê.

Mister Îdin di meclîsê de gava qala peymanê rûsî û inglîlîzî kir ji milê din da zanin ko ûris û inglîlîzî û emêrikani di vê babetê de yek in û di sala 1942an de, yanî îsal di Ewropayê de enike nû dê bête danîn. Yanî inglîlîzî û emêrikani di Ewropayê de şerê elemanan bikin. Lê bi çî awayî, sondxwarî wê esker derînin heja Ewropayê an bi şerê balafirên wê bes bikin. Bivê nevwê ev ne hatiye gotin û nayî ji gotin. Ji her ko ev ji sirên eskerî ye.

Lê tiştêk heye û ev tişt bi darî çavan e. Emêrikani her û her qewetîne nû rêdikin Ingilîterê. Heta niho balafir û eskerên bejê hati bûn. Lê vê paşiya her du hikûmetan da zanin ko stoleke emêrikani ji gihastîye Ingilîterê. Ev stol ji niho de bi stola inglîlîzî hev-kariyê dîke.

**NÛÇEYÊN COL :**

Berî çendekê vaporeke hikûmeta Meksîkê a petrolkêş hati bû bin av kirin. Li ser vê yekê Meksîkê ji japon, talyan û elemanan tezmînat xwest. Dewletên mîhwerê guh ne da pêşnihada Meksîkê. Meksîkê ji ji wan her sê dewletan qutbiriya xwe kir û da zanin ko navbera wan şer e.

Meksîkê di Emêrika navîn de ye û welatekî fireh e. Nemaze kanê petrolê tê de zehf in.

Ji milê din Emêrike ji bi qerara kongrê da zanin ko navbera Emêrike Bîrkarîstan, Mecarîstan û Romanyayê ji şer e. Di nav hevalbendên Elmanyayê de Fenlandîye jî heye. Rûzweît got me ji Fenlandîyê re herbî flan ne kir ji ber ko hêj me imîd heye ko em Fenlandîyayê ji elemanan veqetînin.

Şam: 15 Hizêran 1942 NÊREVAN



## PROVERBES

### DIVERS:

- 1 — Her warek biharek e.  
Nouveau camp, nouveau printemps.
- 2 — Berxé nêr li ber du maka ye.  
Le bétier suffit à deux brebis.
- 3 — Bexté nêr keré jî dîke nêr.  
Chance mâle fait de l'ânesse un âne.  
(C'est à dire: bonne chance permet l'impossible).
- 4 — Stîrî navbeyna goşt û neynûk de cih digîrît.  
L'épine s'est introduite entre la chair et l'ongle.  
(Se dit d'un parasite).
- 5 — Dê û dotê şer dîkir, kêmaqîla bawer dîkir.  
La mère et la fille se sont chamaillées; les imbéciles s'y ont laissés prendre.
- 6 — Mîrov zêrê xwe di sûka ceh de nafişê.  
On ne vend pas son or au marché à l'orge.
- 7 — Du hespê nêr li ser alîfki nabin.  
Deux étalons ne peuvent paître ensemble.
- 8 — Masî jî serê xwe genî dibe.  
C'est la tête du poisson qui se gâte d'abord.
- 9 — Mêrê çê li navê xwe lê.  
Le brave vient à l'appel de son nom.  
(Même sens que le proverbe français: quand on parle du loup, il sort du bois).
- 10 — Mîrov bi zîmanê xwe tê girêdan.  
On se lie avec sa langue.
- 11 — Mîrov xwîndar bit, kerdar nebit.  
Il vaut mieux avoir une vengeance à poursuivre que des dettes à payer.
- 12 — Mû bi mû, rihek çêbibe.  
Poil par poil, on arrive à faire une barbe.
- 13 — Şev radîzin, dijmin ranazîn.  
Les nuits dorment, mais les ennemis ne dorment pas.
- 14 — Gurtî dimîrîn, porsor dibîn.  
Les teigneux morts, il deviennent roux.  
(On ne dit que du bien des morts).
- 15 — Ava hêdî hêdî me ecêb jê dî.  
L'eau qui dort, nous en vivons merveille.
- 16 — Kevroşka mê û nêr, mîrovê xurt dizane.  
Seuls les puissants peuvent dire si le lièvre est mâle ou femelle.  
(On ne contredit jamais plus fort que soi).
- 17 — Nanê sêlê durû ye.  
Le pain cuit sur le « sêl » est à deux faces.

(Le « sêl » est une plaque de métal que l'on fait chauffer et sur laquelle on colle de minces feuilles de pâte pour la cuisson. Le pain ainsi obtenu a deux faces semblables. Ce proverbe s'applique aux hypocrites).

- 18 — Wextê leglegê çû bi leqleqê.  
La cigogne a passé son temps à claquer du bec.  
(Se dit de quelqu'un qui se livre à des occupations futiles).
- 19 — Heta Xwedê li me pîrî, kefenê me rîzî.  
Quand Dieu s'enquit de notre sort, notre linceul était déjà pourri.
- 20 — Ma te rîh li ber tava hêvê splî kirîye.  
Tu as blanchi ta barbe au clair de lune.  
(Se dit à un rêveur, à un inutile).
- 21 — Mîrov biçûkê biran nebê, seyê gundan bê.  
Plutôt que cadet, chien de village.
- 22 — Aş çû, emê li çeqçeqokê bipîrsîn?  
Le moulin est perdu, chercherons-nous le traquet?
- 23 — Berf û baran dahat, rêç winda kir.  
Neige et pluie sont tombées, effaçant la sente.
- 24 — Berû da bizîné, û dest avête gemçîkê.  
Il donne un gland à sa chèvre et lui tâte aussitôt la queue (pour voir si elle a engraisé).
- 25 — Berxê çê jî ber kozîkê xuya ye.  
Bon bétier se reconnaît dès le seuil du bercail.
- 26 — Bi berxîlî têr şîr ne xwar, bi kavîrtî têr giya ne xwar.  
Chevrette, elle ne teta pas à sa faim, chèvre, elle ne brouta jamais assez.
- 27 — Bila ez xwerê şêran bîm, û ne nêçîra çeqel û roviyan bîm.  
Que je serve de pâture aux lions, et non de proie aux chacals et aux renards.
- 28 — Ji giya nermtir nîne, di bin kevîran da namîne.  
Rien n'est plus faible que l'herbe, pourtant, elle ne reste pas sous les pierres.  
(Les faibles eux-mêmes parviennent à secouer le joug de l'oppression).
- 29 — Bi lavlavê mîrov jî ber jîna xwe nake der.  
Ce n'est pas avec des prières que l'on gouverne sa femme.
- 30 — Çiyayên bilînd bê berf nabin, newalên kûr bê av nabinî.



Il n'y a ni hautes montagnes sans neige, ni vallées profondes sans eau.

( C'est à dire : les grands doivent toujours subir des épreuves ).

31 — Dar, behra wi li bihuştê heye.

Le bâton a sa récompense au paradis.

( Même sens que le proverbe français : qui aime bien châte bien )

32 — Dar dikeve, herî bi kû da?

L'arbre s'abat, où tombera-t-il ?

( On ne peut prévoir les conséquences d'un acte ).

33 — Darê bi tenê mina méré li ber hikmê jinê, darê dido agirê Kodo, darê sisê agirê tisê, darê pênc û şeş agir dike xweş.

Une bûche solitaire est pareille à un homme soumis à une femme; deux bûches, c'est le feu de Kodo; trois, un feu mesquin; cinq ou six font une belle flamme.

34 — Darê zorê ji bihuştê hatiye.

Le bâton de la violence vient du paradis ( cf. No 31 ).

35 — Dest destan dişo, vedigere ruyan dişo.

Une main lave l'autre, les deux, le visage.

( C'est à dire : l'union fait la force )

36 — Destê bi tenê, deng jê nayê.

Main isolée ne peut applaudir.

( Cf. No 35 ).

37 — Di koşa min de rûniştiye, bi riya min dileyize.

Il est assis sur mes genoux et joue aec ma barbe.

( Se dit d'un jeune homme prétentieux ).

38 — Riya dûr çêtir e ji tirba kûr.

Longue route vaut mieux que tombeau profond.

( C'est à dire : les entreprises dangereuses sont préférables à l'inaction ).

39 — Bilûra ber ga ye, çira ber kora ye. C'est jouer de la flûte aux boeufs, et donner une chandelle aux aveugles.

40 — Bira bira ye, bazar cida ye.

Un frère est un frère, mais les affaires sont les affaires.

41 — Bira di li bi dill bi, tûrê parsê li milli bi.

Que deux cœurs s'aiment, tant pis si les épaules portent la besace de la mendicité.

42 — Bizina gurl ji serê kaniyê vedixwe.

La chèvre galeuse boit en haut la source !

( Se dit à propos des gens qui ne savent pas rester à leur place. )

43 — Cer di riya avê de dişkê.

Tant va la cruche à l'eau qu'à la fin elle se casse.

44 — Cê keran şami dike, mesqel şûran misri dike, xizani mêran kotî dike.

L'orge fait d'un baudet un âne de Damas; la meule, d'une mauvaise lame un sabre d' Egypte; la misère, d'un homme un vaurien.

( Les ânes de Damas sont renommés pour leur taille et leur force ).

45 — Çekê mêra nivê kar e.

L'outil fait la moitié du travail.

46 — Çiqa go: « Kew e, » mi go: « Nikilê wi sor e. »

Il avait beau dire: « C'est une perdrix! » Je répondais: « Elle a le bec rouge. »

( S'emploie en parlant d'une discussion inutile ).

47 — Çiya hewceyî çiyê dibê.

Une montagne a besoin d'une autre montagne. ( On a beau être puissant, on ne peut se passer d'aide ).

48 — Diz hebe, şeverêş pir in.

Pour peu qu'il y ait des voleurs, les nuits obscures sont nombreuses.

( C'est à dire: qui cherche l'occasion la trouve ).

49 — Giyayê hewşê ji xwediyê malê ra tehil'e.

Les herbes qui poussent dans la cour sont amères pour le propriétaire.

50 — Go: « Ev çî ye tu diçîni? » Go: « Wekê heşin bi, tê bibinî. »

— Que plantes-tu là? — Une fois poussé, tu le verras!

51 — Golikekî vijoker garanekî dilewitne. Un veau foireux salit tout le troupeau.

52 — Gotine gur: « Here berxanî » go: « lingê min têşe. »

On dit au loup: « Va tuer les agneaux ! » Il répondit: « J'ai mal à la patte ! »

53 — Gotine rovi: « Me tu kirî mfrê mirişka. » Rovi girî û go: « Ez ji siûda xwe ne bawer im. »

On dit au renard: « Nous t'avons fait prince des poules ! » Il repartit en pleurant: « Je n'ose croire à mon bonheur ! »

( A suivre )

TAWÛSPARÊZ



# BINGEHËN

## GRAMËRA KURDMANCI

BI NAVË YEZDANË PAK Ë DILOVAN Ò MIHIRVAN

— 15 —

### PRONAVËN PIRSIYARKI

101 — Pronavên pirsiyarki dikevin komekên pirsiyariyê û li gora pêkhatina komêkê, carina kirar û carina jî bireser in.

102 — **Ki-Kê, Çi-Çi.** Ev pronavên ha herwekî têtê dîtîin xwediyê du şikilên in, kirar û bireser; jî lewre nayîne tewandin.

#### KIRAR

Kî hat ?

Çi hat ?

#### BIRESER

Tu kê dibînt ?

Tu çi dibînt ? [1]

Pronavên « kî » û « kê » bi gelemperî û bi tenê kesan û pronavên « çî » û « çî » tiştên mayîn û carina û bi awakî nerêrast kesan jî dinimînin. Ji van pronavan bi tenê « çî » carina veqetandekê dibe.

Ev kî ye ? Ev Hevînd e. Ev zarokek e. Ev miroveklî min e.

Tu kê dibînt ? Ez Hevînd dibînim. Ez zarokeklî dibînim. Ez miroveklî xwe dibînim.

Tu kî yî ? Ez dergevanê dibistanê me.

Ev çî ye ? Ev kitêb e. Ev çîya ye. Ev xapandin e.

Tu jî çî yî ? Ez jî ji xwe re zîlamêk im.

Ev çiyê te ye ? Ev pîsîmamê min e.

Çend mîsalên din: Tu bi kê re hatî ?  
Yê ko hat kî bû ? Ez çî jê bikim ? Ez pê çî bikim ? Kê kî kuştî ? Kî kê dîkuje ? Kê gotî ?  
Çi dest daye te ? Kê dest daye te ? Te çî xwarî ?  
Tu çî dixwî ? Kê karî kê ? Kî kare kê ? Ev bi çî ye ? Te destê xwe daye çî ?

103 — **Kîjîk, kîjan.** Ev her bu pronav mîna hev in, yanî çiyok in û bêferq jî bo kesan û her tiştên din têne gotin û jî ber ko şikilên wan ên kirar û bireser, çihê çihê nînin, wek navdêran û li gora navdêra ko dinimînin têne tewandin.

Kîjîk hatî ? Tu kîjîkî, kîjîkê dibînt ?

Kîjan hatî ? Tu kîjanî, kîjanê dibînt ?

Kîjîk hatî ? Tu kîjîkan dibînt ?

Kîjan hatî ? Tu kîjanan dibînt ?

Çend mîsalên din: Kîjanî gotî ? Kîjîkan bigirtî ? Te jî kîjanê re gotî ? Wê jî kîjîkî

[1] Piraniyekê kurdmancan e mezîn di pronava « çî » de kurt û dirêjbûna « î » yê derpêş nakin û « çî » û « çî » yê bi yek awayî bi lêv dikin. Ji lewre her du jî di şikilê « çî » de dikarin bêne nivîsandin.

xwestî ? Kîjan rabû ? Tu li kîjanî siwar bûyî ?  
Kêfa te jî kîjîkê re têtî ?

**ŞANEKA TARIXÎ** — Herwekî jî xwe ber dixuye pronavên « kîjîk » û « kîjan » bêjeyîne hevedidanî ne. Divêt ev jî bêjeyên « kî - jî - van - yek » hihevketî bin. Kurdmancan gava ev bêje lhevîstî û jî pronaveke pirsiyarkî anî pê; hinan jî nav van bêjeyan « kî » « jî » û « yek » girtî û jî pronava xwe re şikilê « kîjîk »ê dan. Hinên din li şûna « yek »ê « an »a « van »ê girtî û jî pronava xwe re şikilê « kîjan »ê dane.

Kî - jî - van - yek Kîjîk

Kî - jî - van - yek Kîjan

Ji ywe em îro jî dikarin bibêjin: « Tu kê jî van dixwazî ». Lê bi vî şikilî bi tenê mirov têne nîmîndin.

104 — **Çend.** Ev pronava ha bi tenê gelemarê dinimîne: Ev çend in ? Te çend dîtî ? Tu çendan dixwazî ?

Jî ber ko ev pronav bi tenê gelemarê dinimîne, herwekî di mîsalên jorin de têtê dîtîin bi tenê bi tewanga gelemarê têtê tewandin. Ev çend bi xwe carina pronava nebinavkirî ye.

105 — **Kû.** Ev pronav bi tenê jî bo pirsiyariya çih têtê gotin: Tu çûyî kû ? Ew li kû bû ? Hon jî kû tîn ?

### PRONAVËN NEBINAVKIRÎ

106 — Pronavên nebinavkirî dikevin şûna navdêran ko di qisetê de bi awakî mîhîm batîne şantî kirin. Bi gotinên din ev pronav wan kes, tişt an heywanan dinimînin ko di qisetê de ne binavkirî ne. Ji ber ko van pronavan şikilêkî bi tenê heye, gava ew dibin bireser wek navdêran têne tewandin.

Di zîmanê kurdmanci de gelek pronavên nebinavkirî hene û li gora pêkhatina komêkê û mehcetê; jî bêjeyîne têvel; û jî nû ve hinên din jî têne saz kirin.

Ën bîngehin e in :

107 — **Yek. Heryek.**

Yek hat. Yekî digot. Yekê digote yekî. Ez yekî dibînim. Min jî yekê re got. Heryekê digot. Heryekê dixwend. Yekî din digot. Yeke din digot.

108 — **Tu. Kes.**

Min tu ne dît. Kes ne het. Kesî ne got. Ez tiwan nabînim. Tiwan ne xwar.

109 — **Tukes. Tutîşt.**

Tukestî ne got. Tukes nabêje. Tukes ne bat. Ez tukestî nas nakim. Min jî tukestî re ne got. Tutîşt nîne. Min tutîştî ne dît.

110 — **Herkes. Hertîşt. Tîşte.**

Herkestî digot. Min jî herkestî bihîst. Herkes dibêje. Tîşteket. Hertîştî hazir e. Ji hertîştî bêtir. Tîşteketî heye. Ez tîşteketî dibînim.

# HEDISEN

## ÇENABÉ PÊXEMBER

REHMET Û SILAVA XWEDÉ LÊ BE

654 — Zanîn û hînbûn ji îbadetê hêjator e, bi îbadetê mirov nefsê xwe xelas dike, bi zanîna din, mîlet û welat xelas dibin.

655 — Zanyarên we yê n ko bi kêrî dinayê nayin li axiretê ji xeyra wan tune.

656 — Rasti, qencî û rûspkîrin e, bi rastiyê mirov digehe mirandê xwe, derew rûreşî ye, rûyê xwediyê xwe reş dike û mala wî xirab dike.

Di îşê diyanetê de zêde me rîn, zêde merin, din û diyanetn we jê zerere dibine.

657 — Tim bala xwe bidin tîfîng û şûr û xencera û ji destê xwe herra medin, mijûlahiya spelutir, mijûlahiya silehê ye.

658 — Qenc û mîhrivan, comerd û dil-rehm bin, xatîrê xelkê meşkênînin, qedrê wan bigirin.

659 — Çavê we bila ne li malê xelkê bê, dilê xwe me hijînin bi mal û dewlemendiya xelkê, timakariyê me kin, dewiya wê poşmanî û helengazî ye.

660 — Tiştê hêja ko hon dizanin ji xelkê re jî bidin zanin, îşê xelkê sivik bikin mezin ne kin.

661 — Jina teşîrê ya ko di mala xwe de hiriya xwe dirêse bi qedr û qîmet e.

662 — Zaroyên xwe hînî soberiya avê û nîşana tîfîngê bikin.

663 — Çaxa dê û bavê we pev re bawî we kirin bert werin cem diya xwe.

111 — Hin, Hinek.

Hin hatin. Ez hînan dibînim. Hînan got. Min hin dîtin. Hinek hatin. Hinekan got. Ez hinekan dibînim. Hînen din dibêjin. Hineken din hene.

112 — Filan. Behvan. Filankes. Ev pronavên ha dikevin şûna navên mirovan û li gora tîşer û zavendên wan tîne tewandin.

Filan hat, behvan ne hat.

Soro hat, Hevind ne hat.

Filanê digot. Mebêje filan û behvan, yek bi yek binav bike. Filankes çîre ne hat?

113 — Ji van pê ve bêjeyên wek yê n jêrin hene ko gelek caran wek pronavên nebinavkî tîne istîmal kirin: Çend, çendek, hemî, gîş, tev, gelek, heçî - h. d...

( dûmahîk heye ) C. A. Bedîr- Xan

954 — Di roja tengayîyê de arikariya mirova bikin, maldar bi malê xwe, zana bi zanîna xwe, karker bi xwehduna eniya xwe, pale bi qeweta lep û piyê xwe...

Heke qenci ji we na ye, xirabiyê bi keş me kin.

665 — Xwedê ji wî mirovî hez dike yê ko hevalên wî dişkên û direvin, lê ew bi xwe jî cihê xwe na lebite, şer û lîxistinê dike û li hember dijîminê disekine, an dijîminê dişkênine ya rûhê xwe dide

666 — Derman bidin nesaxên xwe, Xwedê derd daye û derman jî daye.

667 — Yê ko serkî dide nesax û birindara parek wî di bihuştê de heye.

668 — Dewlemendê ko li gor demletîya xwe nan û av dide xelkê û arikariya kêmketîya dike, mîna mirovê ko sê meha digire qedigiran e.

669 — Cil û nivînê xwe, derw û hewşa xwe, gund û bajarên xwe papîj bikin wek cuhiya gemar û rêvî me bin.

670 — Mizgîniya xweşiyê bidin wî camerê ko bi eyb û kêmaniya xwe mijûl dibe, xelasa nefsê xwe dixwaze tadê li nefsê xwe dike, hewce bû xwe diêşîne û jî ber vê yekê bi qisûr û kêmasiya xelkê mijûl na be.

671 — Dev ji zanîna ko bi kêrî axiret û dinyayê na ye berdîn.

672 — Mijûlbûna saetekê li ser zanînê jî nimêj û îbadeta şevêkê çêtir e û mijûlbûna rojekê li ser zanînê jî sed mehên rojiyê bi xêrtir e.

673 — arikariya wî helengazî bikin heya ko heqê xwe ji yê xwe xurt-tir bistîne

674 — Ne bi tenê li mezela mîrên xerîb, heke mezela diya we be jî bert ko hon der-bazî hundir bibin li derî bidin.

675 — Li her tiştî Xwedê bi qenci emr kiriye, gava mirovekî dikujin an heywanekî şerjêdîkin zehmetê me din wan, destê xwe li wan sist bikin, bila bi rabetî can bidin.

676 — Çaxa hon derbaz dibin civatekê silavê li wan bikin û gava hon derdikevin didin ser rîya xwe xatîr jî wan bixwazin.

677 — Gava hon tîne hundirê civatekê û gava hon bi şûn da vedigerin silava bikin û xatîr bixwazin.

Kiriya Hawarê 500 Qîrûşên Sûrî

Xwedî û gerîndeyê bepîrsiyar: Mîr Celadet  
Ali Bedîr-Xan . Şam—Sûriye

Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aali  
Bedîr-Khan, Damas-Syrie

## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Tefsira Quranê	Dr. K. A. Bedir Xan
Casûs	Silêmanê Ferho
Diwana Melê	Qedri Cemil paşa
Memozîna Xani	Herekol Azizan
Rewşa Dînyayê	Nêrevan
Hedîsên Pêxember	Dr. K. A. Bedir Xan
Gramêra kurdmancî	C. A. Bedir Xan
Proverbes	Tawûsparêz

### TEFSÎRA QURANÊ

153 — Gava hon şikiyan û hilkişiyân ser çiya, we baz dida û li dora xwe ne dinihêrt, pêxemberê Xuda peyayên di wi di dora wi de, bani we dikir, we guh ne dida; bi derbekê dengê rabû û got: Mihemed hate kuştin. Yezdan bi êşa şikênandinê û bi hawara kuştina Bezma Mihemed, hon xistin halekî welê; ta ko hon li ber kuştina hevalên xwe û talanê ko ji destê we çû mekevin û xemdar nebin; Xwedê emelên we dizane.

154 — Piştî vê eş û zarîne, ji bo rahetî û ewlebûna we, Xuda xeweke sivik bi ser we de ani, dilê we rahet bû û pê şidiya. Lê ji we birekî din diket derdê halê xwe û weke mirovên dema nezaniyê zen dikirin ko Xwedê ne heq e, û ji xwe re digotin, îşê bezma Mihemed naçe serî û jê re digotin: Ma ji emr û mizgîniya nisreta Xwedê para me heye an ne? Pêxemberê min, bêje wan: Her tişt bi emrê Yezdan çêdibe. Pêxemberê min... Tiştin hene ko we di dilê xwe de vedîşêrin lê ji te re

nabêjin, herwekî gava ew dûrî te ne dibêjin: Heke li gora gotina Mihemed, Xuda û nisreta wî bi me re biwa, em ne dihatin şikestin û hevalê me, ne dihatin kuştin. Pêxemberê min... Bêje wan: Divê hon bizanin... Heçî ji we ko Xwedê bi mirina wan emir kiriyê, di mala xwe de rûniştî bûna jî, bivê nevê, ew li gora emrê Xwedê jî mala xwe wê derketana û di meydana şerî de wê bihatana kuştin.

Emrê Xuda ew bû, da ko nependiyên dilê we aşikare bibin, û dilpak û fitnekariyê ji hev cihê bibin û dilê we ji destê Iblîsê waswas bifilite. Xuda veşartiyên dilê we nas dike.

155 — Di roja şerê Ihdê de, yên ko hatine şikestin keti bûn dawa Şeytên, dest ji parastina asêgehê berdan û xwe da bûn pey talanê.

Lê Yezdan ji kerema xwe di gunehên wan borî, ji ber ko Xuda ji tobedaran re tobe dide, Xuda delal û dilnerm e.

156 — Geli bawermendino... Me bin mîna kafîrên ko di heqê mirovên di xwe de ko di riya ticaretê de, di welatê xeribiyê de dimirin an di riya Xwedê da tînan kuştin dibêjin:

Heke ew li cem me, di Medtne de biwana, mirin dest bi wan ne dikir û ew ne dihatin kuştin. Hicrana gotina wan ew e ko; Xuda dil dike wan biceribîne û biêşîne. Yê ko mirovan vedijîne û dimirine Xuda ye. Xuda binayê emelê we ye; û her tişê ko hon dikin ew wî dibîne.

157 — Ji we re, kuştina we di riya Xwedê da an inirina we di xaniyê xwe de û elîw û piyariya Xuda; ji zêr û malê wan kafîran ko ew dicivînin, bê şik çêtir e.

## CASÛSÉ

### KO-DAN BER TIFINGAN

General Yablonski, generalekt Rûsya kevin, Rûsya çaran, vè paşiyé ji rojnamevaneke emêrikanti re kirdeya jêrîn e xêrtb gotiye û bi ser ve zêde kiriye ko tê de tu xilaf nîne û mirovdewletên wî zemant ji pê dizanin. Yablonski dibêje:

— Ji keplêtu Taname ne biwî me şerê 1904an wînda ne dikir. Me ew şer wînda ne kira bolşevîki di welatê ûris de ramedibû û îro me jî çarek wê hebiwa.

Di şerê 1904an de em şikestin û japonan zora me bir. Bi vê şikestinê di welatê ûris de fikirên ixtilalê dest pê kir. Lê heke Taname ne biwa me ew şer wînda ne dikir û xelk li çariyê ramedihû.

Taname di sala 1901ê de hati bû Petrêsbûrgê. Di sefaretê japonî de wezîfa wî hebû; zabîte îrtibatê. Taname xortekî bejinbîlind û stûr bû. Bejineke welê ko di nav japonan de kêmpayda dibê. Mêrik kirê lê devkenok û cazîbeder bû. Ji lewre jinan kêfa xwe jê re tanî.

Hingê, ez ji kepitên bûm û di istixbarata ordiwê de dixebitim. Me gelek guh dida Tanamê. Ji ber ko zabîte îrtibatê bû; yanî casûsê dewleta xwe.

Taname ji maleke kevin bû. Bavê wî yek ji mistêşarên Mîkado, yanî imperatore japonan bû. Taname gelek di welatên xeriban de geriya bû û bi hemî rêzîk û adêten civatan dizant û ji lewre zûka bi xelkê re dost dibû.

Me gelek guh dida Tanamê; ji ber ko me dizant ko dût û nîzing emê şerê dewleta wî bikin. Ji milê din zabîte me yê ko li Tokyoyê bû ji me re dida zanin ko hin sirên me ên eskerî digihan erkanherbiya japonan. Bivê nevê Taname dikarî bû ji me re bibêje ev sir çawan digihaştin Tokyoyê.

Taname gelek pere serf dikirin. Bi qumare dileyst û her gav wînda dikir. Du hevalên min ên zabîte hebûn ko pê re dileystin û her û her jê dixwarin.

Salekê me da pey Tanamê; lê me tu tişt tê ne anî der. Herçî raporên sefaretê me ya Tokyoyê digot ko sirên me ên eskerî tim û tim digihin erkanherbiya japonan.

Me kir ne kir me tu tevdir ji Tanamê re ne dit. Dawiyê me qerara xwe da em wî mecbûr bikin û bi xwe terka Petrêsbûrgê bide. Me digot heye ko yê ko bête şûna wî jê kêmtir bibê. Me dizant ko Tanamê eleqayek

## DIWANA MELE

— 29 —

Ahî ji derdê dil dîkî herçî ki di azari çerx Derban li nêva dil didit lamî sîfet nûbarî çerx Tênişeyan peykan nehî amanci wan tîran ew in Dama belayê der kenin her koşê dora marî çerx Bira xwe tinin xûnceyan aşîq di nêv îşkenceyan Tavête dil ber penceyan herdem ji nû şenqarî çerx J'kûvan letif in gul'îzar lew tîn ji bilbil ah û zar Şûna gulân restîne xar nav çîmenan gulzarî çerx Sed baziyanî hîq-qebaz têtin bi hîle kari saz Geh geh bi naz û geh niyaz seh-har e pîr mek-karî çerx Herçî bixwînit sîlbelê axir di cama şerbetê Zelra hilahl didit-ê dil daima azarî çerx Ev er-reya jehrê didan min ji di dil da bin sinan Ma behrî ferqê dijîmînan bêt û birê minşarî çerx Dîjûm ji can talan bitîn ew xweher û nalûn bitîn Mêlakî dil kalan bitîn lê bêt û red xed-darî çerx Da kuhnexana misli dêr çendin kewakib tene sêr Pêkan bi davê şîbî teyr her jê dibarin narî çerx Şemsî bi şemsê cam bi cam het-ta dîkin dewrê temam Ateş dirêjî her mîdam ev kumbetî dew-warî çerx Agir bi avê gîl dîket qelban ji qelban hîl dîket Misqeb di can û dil dîket daim nevinî kari çerx Çendî di xûhan in rezlu min ji di dil danin geziin Amanci wan remzan ez in sereskerê sey-yarî çerx Min pîr şevan het-ta seher danine rê sem' û beser Ew mahrû ma bête der ta hûme nobeldarî çerx Kes di li lewhî sîne qet neqşek vehalî bê xelet Herdem ji nû yek taze xet tavête der pergari çerx Me j'hesreta şîrinleban xew nîne çelvan qet şevan Feryad ji destê kewkeban pîrsê bike j'hidari çerx Van rehrewên him-metbilind berdane meydanzê semend Serkeşte yin het-ta bi çend ev rekbi meş'eldarî çerx Gavek ji dengî zê gîlan eymen çî ninin menzilan Hey bey bû bendê mehmelan feryad e her çentari

[ çerx  
Pîr min ji vê çerxê Mela kêşane afalî bela  
Ebleh dibinin wey hela herçî ji dil bit hari çerx.

bi artistekê heye: Îlinskayê Ez çûm cem Îlinskayê û min jê re mesele got. Berî ewîll jînikê pê qail ne bû. Welê dixuya ko hejî Tanamê dikir. Min ew lîrsand û Îlinskayê soza xwe da me ko Tanamê mecbûr bike ji Petrêsbûrgê rabe.

Wê şevê Îlinskayê çû nik Tanamê û jê xwest ko wê mehir bike. Taname ji vê xwestinê gelek aciz bû û ji artistê re da zanin ko li welêt jîna wî heye û zabîte japonî nikarin jinên biyanî binin. Îlinskayê jê re got: Ji te re 24 saet mîhlet, heke te ez ne kirinî ezê rezaletêke mezin binim serê te.

Ditira rojê Taname ji bo îşkê mihim ez ezimandi bûm mala xwe. Ez çûm. Gava em bi darî hev ketin Tanamê gote min:

— Tê bîhist, ecêba ko Îlinskayê dixwaza bîne serê min.

Min xwe danî nezaniyê û min kir ko

ez bi tu tišti nizanim. Tanamé gotina xwe pêş ve bir û hi ser ve zêde kir û got:

— Tu dizani ko havê min ji misteşarên Mikado ye û mala me maleke gelek kevin e. Heke li Tokyoyê hate hihlstin ko min elaqe bi artistekê heye ev ji ho rûmeta mala me rezaletêke giran e. Belê heke ev tişt hate bihîstin ne ez ne havê xwe ne ji mamên xwe em nikarin biminin. Ezê ji Petrêsbûrgê berim. Lê Îlenskaye min ditirsine û dibêje ko heke min ew terikand û ez çûm weletê xwe ewê min caris bike û xelkê min bi minasebata me bihesîne Heger Îlenskaye tehdida xwe bire serî bavê min wê intihar bike û şerefa mala me wê payimal bibe. Êdî tu dizani; ez di hextê te de me, divêt tu arikariya min biki. Çi şertên te hebin ji ji niho de min ew qebûl in.

Min jê re got ko ezê bi serek û hevelên xwe bişewirin. Ez ji nik Tanamé kêfxweş derketim û çûm dâtrê û min mesele ji hevalên xwe re got. Tev de kenîyan û li min vegeadin:

— Taname henekê xwe bi me dike. Qey ji hona ko ji rezaletiya artistekê xelas bibe ewê di cleyhê welatê xwe casûsiyê bike.

Kumandan Oblenof got: mexasda wi çskere ye. Taname dixwaze, bi vê hêncetê ji me re planine derewin bişîne û me bixapîne. Digel vê hindê ev planên derewin ji bi kêrî me tèn Emê bi wan bikarin bizanin gelo erkanherbiya japonî, me di kijan cih û niqtan û bi çi awayî dixwaze bixapîne. Ji lewre em jê plana Porarlûr û Mençûriya nivro bixwazin.

Me ev fikir tev de eciband. Hema wê evarê min Taname dît û sibetir casûsê me terka Petrêsbûrgê da.

∨ Havîna sala 1902an bû. Me karê xwe dikir. Êdî tu şik ne ma bû ko dilê japon hebû barê xwe li barê me xe. Me Taname ji bir kiri bû. Lê ewî xwe ani bira me. Di Kanûna wê salê a pêşin de ji-çentê sefareta me ya Tokyoyê zerfêk derket. Me zerf vekir, planeke eskerî tê de hebû. Tanamé ew şandi bû. Plana hîcûma Porarlûrê, planeke fenî û hêja: Cihên ko japonan esker derêxistana; armanca her firqê û her kitkitên êrişê. Em lê hûr bûn û em lê ecêbmayî man. Oblenof got: Xuya ye ko japon di derew û hilan de gelek şebraza ne.

Zabitekî got: Heye ko ev plan rastin e. Me plan avête dolabekê de. Piştî şeş mehan Tanamé ji me re zerfêke din rêkir. Vê carê plana şerê Mençûriya nivro bû. Li gora vê

planê armanca ordiya Mençûriyê Mûkden bû. Me ew ji avête dolabê. Piştî sê mehan me ji Tanamé zerfêke din girt. Vê carê ji me re plana çemê Yalo şandi bû. Beriya ko em lê hûr bibin me bihîst ko Tanamé dema ko ji erkanherbiyê planên eskerî didizin hate girtin û bi lihmeta casûsiyê hate bi dar ve kirin. Bert ewill em bi vê xeherê bawar ne bûn. Lê piştî çend rojan zabîte me ji Tokyoyê ji me re da zanin ko xeber rast e û Tanama hate kuştin. Gelek ne borî rojnaman ji ev xeber belav kir û jû pêve rojnaman da zanin ko havê wî ji ji her bînamûsiya kurê xwe intihar kiriye.

Êdî tu şik tê de ne ma bû ko Taname ne derewin, lê rastin bû. Planên ordiya japonî weke xwe dane bû me. Tawil me ew her sê plan derêxistin û erkanherbiya me planên me li gora wan edilandin.

Di sala 1904an de şer çebû. Me û japonan hi bev da. Gotinên Tanamé rast bûn; japonan di deverên ko wî şantî ne dan dirêjî me kirin. Lê di her derê de em şikestin. Ne ji ber ko qewetên me kêm bûn. Lê ji ber ko me qewetên xwe danî bûn cihine welê ko ji niqleyên êrişên japonan gelek dûr bûn û ji me re wext ne dima ko em wan qewetan bînin cihên ko lê gerek bûn. Ma japonan, planên xwe, piştî ko bi xiyaneta Tanamé hesiya bûn guhartî bûn ?..

Min cihaba vê pirsyariyê peyda kir; lê dereng. Ez bi xwe di eniya şer de bûm. Çend zabîten japonî keti bûn destê me. Me ji wan pirsî heke Tanamé nas dikin. Wan zabitan gote min: ma li Japonyayê kes heye ko Tanamé nas nake, ew qehremanekî millî ye. Împerator mala wi bi nişana rojê mikafat kiriye.

Min got: Hingê ne hate idam kirin, herwekî di wextê xwe de rojnaman nivîst ?

Wan got: Belê bi tehmata casûsiyê hate idam kirin. Lê piştî ko şer dest pê kir hate seh kirin ko Taname ne casûs lê canfedekî millî bû. Lê ev tevdir ji we re diti bû, xwe bi kuştin da bû da ko hon baweriya xwe bi planên wî binin. Bavê wî jî intihar kir; ev ji rast e.

∴

Çiroka general Yablonski û biserhatiya Tanamé ev e. Di biserhatiya vî zabîte japonî de ibreteke mezin heye. Belê Tanamé di xizmeta welatê xwe de ne bi tenê canê xwe, lê canê bavê xwe jî feda kiriye.

SILÊMANÊ FERHO

## MEMOZINA EHMEDÛ XANÏ

— 3 —

DI NATA QELEMI MESNÔAT  
Û SERDEFTERI MEWCÔDAT  
Û EQIL Û MAQÛLAT Û  
PÊŞDESTE [1] MEXLÔQAT  
HEZRETÛ SEY-YIDIL-SADAT  
MIHEMED MISTEFA ELÛH  
EFZELIS-SELEWAT

Eyya bi hesab dellî û birhan  
Nabin çu meger [2] wicûb û imkan  
Wacib yek e, zati kibriya ye  
Mimkin pir e, cem'i masiwa ye  
Wey wacibi mimkinati berçe'  
Mimkin wi ji ho xwe kirne metle'  
Yani ewê vê [3] hibit mirbirhen  
Hisna wî biderkevit ji mekmen  
Gencinoi cewheri hibit faş  
Sabit bibitin ji neqş neq-qaş  
Lê sinheti wî hekimê dana  
Neqşî ewî qadiri tiwanê  
Ne dibû ko bibit ewî risûmek  
Lalq ewî dê hebit riqûmek  
Herçî wêko bûne bêreçen bû  
Lew ew-weli maxeleq qelem bû  
Ev ew-wel û rûh û eqil ew-wel  
Her sine bi ew-weli mew-wel  
Em-ma meke wan ji hev tu tefriq  
Evrenge ewan bigire [4] tewfiq  
Bê şeykî wahid in bi carek  
Te'dad û te'd-did itibarek  
Ew-wel biriqî ji hisni sermed  
Nûrek bûye maniya Mihemed  
Ew nûr bi enri alemil-xeyb  
Bû menşey feyzi alema xeyb  
Erwah ji maniya peyember  
Çêbûn mesela nebat û şek-ker  
Bo esli esili cimle nefsan  
Nefsa sîeda û nefsi nehsan  
Hemîyan ji wî ditine tefer-ri'  
Hemîyan bi wî girîme temet-ti'  
Hêja ne zemîn, ne ev sema bû  
Ew serweri cimle enhiya bû  
Xelqa felekan ji bo wî rabû  
Secda melekau ji bo wî rabû  
Ew rehmeti cimle alemin bû  
Adem di meyani ma' û tir bû  
Pêxemberi cem'i ciz'i kul bû  
Adem bi xwe bêj av û gil bû  
Ew pencereya cemali barî  
Şemsa feleka dilê di tari  
Gava kete sûreti cihani  
Pêxemberi axiriz-zemani  
Wî berzaxi mimkinat û wacib  
Wî padîşehî li şiklî hacib  
Menxûx kirin wî dîn û mil-let  
Me'lûl kirin etil û il-let  
Fikrê ko cilan cem'i kifr e  
Kêşa ji nibiw-weta xwe sifre  
Xelkê ko hebûn li rûyê erdan  
Teklif kirin hemî bi merdan  
Xaqan bi xwe hindîwî kemîn bû

Fekfûr ji xwanê kaseçin bû  
Qeyser bi qisûriya xwe qasir  
Hazir kiriya bi eyni basir  
Şahi ereblî elem ko rakir  
Kesrayî ecem eceb duta kir  
Rûm û hebeş û fireng û tatar  
Herçî ko ne kir bi dînî iqrar  
Naçar gelek beşir fena bûn  
Het-ta ko hinek bi dîn teba bûn  
Pitxane bi agiri dişiştin  
Ateşgede cimleki vekuştin  
Gava ewî dîn kir aşikara  
Dawidî û sibti û nesara  
Tewrat ewan ji bir kir ekser  
Incil û zebûr çûn ji ezher  
Isayî dema dixwende incil  
Behsa wî dikir ho hey û tenzil  
Go mijde didim resûlî emced  
Dê paş me bê bi navê Ehmed  
Dehwa xwe dikir bi dest û idman  
Destê wî bi seyf û dev bi quran  
Xweşilqet e, hem resûl e, hem mir  
Pur [5] hikmet e, hem kitab e,  
[ hem şîr

Naxwende sebeq mider-risi am  
Bê mal û menal sahib in'am  
Bê xel û heşem bi xwe cihangir  
Bê tebl û elem cihan seda gir  
Herçî te didî meger hej ew bû  
Lêşker ji cinûd « lein terew » [6] bû  
Bê xeyme û barîqalî û eywan  
Ewran vedida li ser wi seywan  
Hindê ko ji pêş ve baxeber bû  
Ewçend ji pişt ve habeser bû  
Sihdan ne diket ji wi li erdan  
Vêk ra dibihist sed xeberdan  
Gûyende dibûn digel cematat  
Pûyende dibûn digel nebatat  
Yek new' ne ma ji cinsi heywan  
Nina [7] nibiw-weta wî iman  
Il-la ko hinek ji ibni adem  
Bûn derxwiri ateşî cehen-nem  
Elqis-se di erd û asimanan  
Hasil di cem'i ins û canan  
Ninin hê şerefeta wî tişteq  
Nabit ji wî zêdetir me pişteq  
Ev bêmededê di im-meta xwe  
Mimtaç kirin bi him-meta xwe  
Wer'a wi we reng dîn qewî kir  
Şer'a wi sirat mistewî kir  
Alem hemî siblî enbiyan e  
Abid hemî pêk ve ewliya he  
Ferdek ji şahbeyî di kub-bar  
Pansed ji dilaweri di kuf-far  
Ew cimle digel yekî seraser  
Ne dibûn bi mehabetê beraber  
Xelkê heye şibhekek di dînî  
Behsê bi cedel bikit ji dînî  
Quran û zeber çî mi'cizat in  
Ayat û siwer çî bey-yinat in  
Bûbekr û Emer çî xweş qerîn in  
Esmah û Eli eceb guzin in  
Ey padîşehî bilindpuye  
Xurşid felek-nişin saye  
Ne'tî te bi ilmi min mihal e

Med-dah ji bo te zilcelal e  
Ez dê çî bibêjim ey şebînaş  
Wes-safi te ye kelamî-lah  
Şaha ji te ra xweş-ism e « yasin »  
Taha ji te ra tilism e « tasin » [8]  
Her ev bes e, ey hebtîbî mixtar  
Bari ji te ra bijite swindaxwar  
Sed car bijite ey keremkar  
Ger dê me hebîn, guneh du sed bar  
Sed merlete gerçî em xerab in  
Ein-ma ji te naimid nabin  
Het-ta bigehête Xaniyê jar  
Napak û pellid û wacibin-nar  
Ew ji bi xerabi im-metini  
Dehwa diketin wes-siyini  
Wî bedemeli weki kilaban  
Bari bike peyrewê şehaban [9]

[1] Em diqeta xwendevanan li ser vê pîrê, li ser vê deşeyê dikîşînin. Xani ev bêje, bi xwe, ji bêjeyan « pêş » û « dest » li hev-xistiye û aniye pê. Xweş bêje ye, bi mana serwer, bilind û mezin e.

[2] Min ev misrehe weke xwe nizanî bû ez bixwînim. Di min-howa ereblî de mirov nikare « k » ji « g » yê ferq bike; Heke ine ew « k » hesiband dibe mekir

نابن جو مکر وجوب وامکان

[3] Zehmet e. Ev « vē » ji ber çî di vē derê de ketiye navê. Ji bo eşkerekirina ayendê di paşiya « ew » de « ē » yek heye û ew bes e. Ji xwe « wē » ya ayendê yanî istiqbal bi « w » yê ye û ne bi « v » yê ye. Ji lewre ine nizani ev « vē » çî bêje ye û wê li hire çî kar e.

Heke ji bo temamkirine weznê ye, bivê nevê « wē » çêtir bû.

[4] Mirov dikare « bigêre » ji bixwîne.

[5] Farisî ye bi mana tijî ye û ne « pîr » a kurdmançî bi mana gelek. Ji lewre me ew bi « u » yê nivisand.

[6] Işaret bal ayeteke quranê ve ye:

فَارَسَلْنَا عَلَيْهِمْ رِيحًا وَجُنُودًا لَّمْ تَرَوْهَا

[7] Yani ne anî. Şikilê kevin: ina, ne ina-nina.

[8] Işaret bi sûretine quranê ve ye:

« يس » û « طس »

[9] Xani ji Pêxehar daxwaz dike ko wî ji wek seyê eshabên kehfê bigelîne bihuştê. Şairê sorî, Şêx Riza di vê babetê de çarîneke gelek spellî gotiye. Çarin bi xwe bi farisî ye. Ewe kurdmançiya wê: Ey pêxemberê Xwedê! berde ez ji wek seyê eshabên kehfê, bi yarên te re herim bihuştê. Ji xwe çawan dike ko ew bere bihuştê û ez herim dojhê. Heke ew seyê eshabên kehfê ye, ez seyê eshabên te me.



## REWŞA DINYAYÊ

**ŞERÊ MISIRÊ** — Hetant ko şerê Efrîqâ bakur di erdê Libyayê de çêdibû jê re şerê Libyayê digotin. Lê ji roja ko qewetên Romel ketine erdê Misirê ji vî şerî re şerê Misirê dibêjin.

Dema şerê Libyayê germ bû û ordiwa ingiltzi a heştan ji çend xetên midafehê xwe das paş û vegeyriya erdê Misirê mister Çorçil li Emêrikê, cem mister Rûzwelt bû. Wextê şikestina Sengeporê ji dîsan Çorçil li Emêrikê bû. Şikestina Libyayê, bivê nevê di Ingilistanê de endîşeyine kûr û mezin anî bûn pê. Di meclisê de 22 nimuendana teqrîrek dan û ji hikûmetê izahat xwestin û pê mesela ewlehiya hikûmetê verakirin. Çorçil serekwezîr û wezîrê midafehê ye; yanî her sê wezaretên cengê: herbi, behri û hewayî di bin emirê wî de ne. Ev niminende û hinên din dibêjin, ji xwe berê ji hinan got, Çorçil serekwezîrekî pêşdest û serderte ye; lê her du wezîfan yanî serekwezîrî û wezîriya midafehê pev re nikare pêk ve bîne; ji lewre divêt Çorçil ji wezaretê midafehê istifa bikit, li şûnê yekî din tayin bikit û bi xwe bi serek wezîriyê bes bikit. Herçî Çorçil vê pêşnihadê qebûl nakit û dibêjî, helanî ko ez serekwezîr im divêt wezaretê midafehê di destê min de bimimit, an ne ez ji serekwezîriyê ji xwe didim paş. Lê miletê inglîzî nikare ji Çorçil bigere. Ji her ko ew bi xurtiya vên û dilê xwe di wextine gelek teng de dilqewînî da miletê xwe û ew ji sistî û newmidîyê xelas kirîye.

Emê di van stûnan de berî ewilî qala nitqa Çorçil bikin û paşê kirdeyên şerê Libya û Misirê bibêjin. Li 2ê Tirmehê, Çorçil pistî ko çavên xwe li şerên Libyayê ên borî gerand, qala hezîmeta îro kir û got:

— Ne ez, ne milet, ne hikûmet, ne erkenherbiyê bawar ne dikir ko Tobriq di rojekê de bikeve destê dijminan. Serfermandar Okinlêk bi xwe ji ev tişt ne tanî bira xwe. Berî bi rojekê Okinlêk telegrafek şandi bû Londrê û tê de goti bû ko li Tobriqê eskerine kafi hiştî bûn û bi texmin wan eskeran wê hikuriya 90 rojî herevaniya Tobriqê bike.

Ez hingê li Emêrikê bûm. Li 21ê Hizêranê gava diketim oda mister Rûzwelt û li ketina Tobriqê serwest bûm qey banê qesra reîscimhûrî keti bû serê min. Digel vê hindê ne mizakereyên xwe bi Rûzwelt re pêş ve bir û nemaze meseleyên jêrîn me gihande qerarê:

Çûn û hatina esker, vapor û balafiran di navbera Emêrikê û di welatê me de. Têvdirên gerek ji bo vaporên me yên ko bi destê dijmin têne binav kirin û çêkirina vaporên nû.

Serekwezîr di sa vegeyriya ser pîrsa şerê Misirê û got:

— Hin heke ko hikûmetê îtîham dikin û dibêjin ko me tiştên lazîm di wext û zemanî de rênêkirîne welatên rohelatê nizing. Lê ne welê ye. Di nav du salên paşîn de me çek û eskerên jêrîn şandine welatên rohelatê nizing: 950 000 esker, 4500 tang, 6000 balafir, 5000 top, 50 000 mltralyoz, 100 000 kemyon. Di vî navê de me 2000 tang ji rêkirîne welatê ûris.

Çorçil, di pey re da zanin ko beriya êrişê elemanan ji general Okinlêk re goti bû ko kumanda ordiwa heştan rast bi rast bêxe destê xwe. Lê Okinlêk pê qail ne bû bû û fermandariya wê ordîne di destên general Riçî de hiştî bû. Lê piştî şikestinê û ji 26ê Hizêranê ve Okinlêk kumandê bire destê xwe. Serekwezîr gotina xwe pêş ve bir û got:

— Di Libyayê de me karê xwe kiri bû û Romel dest bi êrişê ne kira Okinlêk bi xwe wê dirêji Romel bikira. Min got ko me karê xwe kiri bû. Belê roja ko Romel dirêji me kir qewetên ber du aliyên bi vî terzî bûn: Bi Romel re 90 000 esker hebûn (50 000 elemanî, 40 000 talyanî) eskerên me 100 000 bûn. Berbert 5 tangên mihwerê me 7 tang û li berbert 5 topên elemanî û talyanî me 8 top hebûn. Di hewan de em li dijminê xwe serdest bûn. Lê xesarîne mezin gihastîne ordiwa me. Heta niho me 50 000 peya wînda kirîne; pirê wan hêsir çûne. Li 21ê Hizêranê di eniya Birbaşim de, serê sibehê 300 tangên me keti bûn qada şer. Êvarê ji vî sê sed tangî, bi tenê 70 tang vegeyriyane warê xwe.

Lê şerê Libya û Misirê hêj xelas ne bûye. Me ewlehiya xwe da general Okinlêk û em bawer in ko Okinlêk sezayî ve ewlehiyê ye.

Ji milê din serekwezîr da zanin ko ev şeş meh in, her meh 50 000 esker di rîya behîrê re, nivroyê Efrîqayê, Pozê Imîdê li xwe ha didin, tûn dikevin ordiwa inglîzî.

Çorçil beriya ko gotara xwe biqedîne, careke din da zanin ko reşma van hezîmetan û binavhûna vaporan Ingiltîre û hevalbendên wê dê bigehin zefera paşîn.

Meclisê çepilk li serekwezîrê xwe li hev xistin û hikûmeta Çorçil bi 475 dangan ewlehiya meclisê stand. 25 dengên mixalîf.

Eve gotare Mister Çorçil a bêja. Em hên niho ser qada şer.



Piştî ko asêgela Bîrhekîm an Bîrlaşîm kete destê elemanan raweşa şerê Libyayê gelek gubêrî. Ordîwa Ingilîzî a heştan terka xeta Xgzalet-Bîrhekîm da û kişîya hela taxûbên Misîrê. Bi tenê fermandarê îngilîzî Riçî qederê 25-30000 esker li Tobriqê biştî da ko Tobriq ew bendera mihîm weke par di destê Ingilîzan û di paşîya Ordîwa Romel de binîne û bi wî awayî birekî ordîwa mihwerê di dora Tobriqê de bisekinîne.

Giraniya ordîwa heştan ji behîrê ber bi çolê li ser xeta Selûm, Kepûçû û Sîdî Emer cih bû û li hêviya dijminê xwe ma. Lê Romel wê carê mîna berê ne kir. Beriya ko îşê Tobriqê safî bike her bi pêş ne çû. Pêgdarên ordîwa wî gihastî hûn heta pêşîya Bardîyayê. Li 20ê Hizêranê Romel ew pêşdar ji ji pêşîya Bardîyayê bi şûn de vegevand û ji rohelê, roavê û ji nivro dirêjî Tobriqê kir.

Ingilîzan Zivistanê pê de Tobriq asê kiri bû. Herwekî Çorçil goşîye hêvîke mezin hebû ko Tobriq çend mehau li her êrişa eskerên mihwerê bisekinîne. Lê ev hêvî ne çû seri. Kelehi ji 24 saetan bêtir nîkari bû li ber êrişa dijmin bisekinîne. Eskerê Rome li 21ê Hizêranê keheha Tobriqê wî temamî zemt kir û mişdarek hêslr, çek û cebîrxane ket destê wan. Romel piştî kelîna Tobriqê qet ne sekini û da pey dijminê xwe da ko jê re fîsende xwe pêkanin û xwesazkirinê nedît. Ingilîzan Berdiye midafeshe ne kir û dev jê berda. Eskerên mihwerê li 24ê Hizêranê gihastî bûn pêşîya xeta Selûm Sîdî Emer û dirêji wê kiri hûn. Piştî şerêkî warqilandinê general Riçî eskerên xwe ji wê xetê jî kîşand, xwe da paş û veşerîya heta Mersîmetrûh. Ji ber ko Riçî dîtî bû ko eskerên wî ji ho midafesha wê xetê hindik bûn û heke li hire şer bikira wê bihata şikestin. Riçî dev ji Sîdî-Berani jî berda; ji ber ko dijmin dikir lê bihata wer. Li 25ê Hizêranê eskerên mihwerê ketin Selûm, Kepûçû û Helfayê. Dimdarên ordîwa îngilîzî dijmin diwarqiland û giraniya ordîwê li Mersîmetrûh cih dibû.

Di wê navê de serfermandar Okinlêk kumanda ordîwa heştan ji general Riçî stândî bû û xisti bû destê xwe. Okinlêk dît ko midafesha xeta Mersîmetrûh jî bi qewetên herdest zelmet e. Ji milê din Romel dikir li baskê ordîwa Ingilîzanê çepê bide û ji par re bikeve piştî xetên îngilîzî. Okinlêk li ber wê weziyetê terka Mersîmetrûh jî da û ordîwa xwe kîşand hela xeta Elemeyn û Qetarê. Ordîwên mihwerê li 30ê Hizêranê ketin Mersîmetrûhê jî. Romel bê etlahî dida pey ordîwa îngilîzî. Dimdarên Okinlêk li pêşîya eskerên Romel disekinîn û ew diwarqilandin. Di wê navê de Okinlêk ordîwa xwe saz dikir û imdada Ingilîzan gihaye qada şer. Di wê xetê yanî di xeta Elemeyn û Qetarê de Okinlêk baskê xwe ê rastê da hû behîrê û baskê xwe ê çepê da hû Qetarê. Qetare gerek e, ji behîrê 50 kîlometir nizimtir. Hundîrê gerê telit û zinar in. Havîne ew zinar welê disincirin ko mirov tê re nikare here; Zivistanê jî av lê tîji dibê. Ji ber wê yekê baskê Ingilîzan ê çepê bi wê gerê jî talûka têwerhatinê xelas dibû. Ji milê din dirêjahîya wê xetê jî 60-60 kîlometir e. Ji lewra jî midafesha wê jî xetên berdayî û bêpîwan gelek bêsanîtir e.

Okinlêk eskerên xwe lê de cih kir û li hêviya dijminê xwe ma. Romel bi qewetên xwe ên mîkanîkî li 2ê Tîrmehê gihaye pêşîya xeta Elemeynê û

dirêji wê kir. Di êrişa pêşin de herçend Romel di deverêkê de ew xet jî qelaştî be jî Ingilîzan ew bi şûn de vegevand û di wê xetê de asê bûn û jê ne teblîtin. Piştîre Ingilîz rabûn herhicûman û hin kozikên elemanan zemt kirin.

Ji çarê mehê wê Romel dev jî êrişê berda û teçebîs ket destê Ingilîzan û wan çend caran dirêji xetên Romel kir. Lê heta 10ê mehê her du alîyan xwe gelek tev ne da û kerkes cihê xwe de ma. Li gora nûçeyên paşin Ingilîzan qewetîne mezin anîne wê qadê. Herhal di wan rojan de divêlê şerê Libyayê jî nû ve germ bibit. Bi wê êriş û pêşveçûna ordîwên mihwerê Misîr ketî hû ber talûkeke mezin. Lê Okinlêk bi tahîya xwe a paşin ew talûke da derbas kirin.

ŞERÊ ŪRIS — Bi şerê Libyayê re şerê Ūris jî germ bû. Îşê Sevestopolê di hefta wê mehê a pêşin de safî bû û eleman ketinê. Lê Ūris di Sevestopolê de şerêkî ecêb kirin. Herwekî stranê gotiye: (Bostê lawê bava bi lire be). Mîdallhên Sevestopolê-pîştî ko bîgav man û terka tahiyên bajêr ên derve dan û kelin hundîrê kehelê ev telêgraf jî Stalin re rêkirin: « Emê heta mirov û berikê paşin şerê xwe bikin. Lê heke dijmin kete hundîrê kehelê em ji te hêvî dikin emir bidî topçiyên me ko topên me li kehelê girêbidin û me jî digel dijmin bikujin. Ev mirin ji me re jî jîynê bi rûmettir e ».

Bi wî awayî elemanan nivgîrîwa Kîrimê bi temînî xiste destê xwe.

Êdî tu şik ta de ne ma ko êrişa elemanan a mezin, ya ko diviya bû li Bîharê dest pê bike, dest pê kirîye û xeserêke mezin gihastîye Ūrisan. Ordîwa Timoşenko jî ber elemanan kişîya û eleman gihastîne Çemê Don û lê derbas bûn.

Ji yekê Tîrmehê ve nûçeyên Ūris û elemanî dida zanîn ko elemanan jî navbera Kürsk û Xerkovê dest bi êrişê kirine û di hemla pêşin de êrişa elemanan şanî xurtîya xwe da. Di navbera Ūris û elemanan de şerîne xwindar çêbûn. Ūris bîgav man û xetên xwe jî dest dan û di nav pênc şeş rojan de ordîwa elemanî gihaye çemê Don, lê derbas bû û kete bajarê Voronêjê. Bi wê pêşveçûna elemanan raweşa Ūrisan gelek xerab bû. Ji ber ko Voronêj li ser rîya rêhesîna Mosko û Rostovê ye û horiyên petrolê jî tê re diborin. Ji milê din çemê Don jî Ūrisan re bi qasî çend asêgehan hêja bû.

Ūris bi xwe lê mikur tîn û dibêjin ko raweşa wan xeternak e û elemanan qewetîne mezin li awa Don derbas kirine û lê pirin çêkirine.

Radyowa Moskoyê li 8ê mehê digot weziyet xeternak be ji Ūris di şerê Don de ji desthilatîninê ne ketine û nakevin jî. Ji milê din danezîna rûsî di de zanîn ko ordîwa Ūrisan rabûye ber hicûmê û li her du baskên ordîwa elemanî dide.

Eleman di aliyê Kelênîne de jî rabûne hicûmê û li gora danezanên rûsî di wê entiyê de jî şerîne mezin çêlîbin û di yek rojêkê de gundek an gîrek çend caran jî destê Ūrisan dikeve destê elemanan û Ūris wî dîsa bi şûn de vedigerînin.

ŞERÊ ROAVÊ — Li roavê şerê balafîran dom dîke. Balafîrên îngilîzî bi sedan di ser Manşê re derbas dibin û li bejê û febrîkeyên elemanî û li yên ko di bin hikîmê elemanan de ne didin. Wê paşiyê Ingilîzan di mideta heftekê de sê caran li Brêmênê xistine û xesarîne mezin gihandine bajêr û febrîkan.

## HEDISÊN

### CENABÊ PÊXEMBER

REHMET Û SILAVA XWEDÊ LÊ BE

678 — Ezê ji we re tiştê ko ji nimêj, roj û sedeqê bi xêrtir e rê we bidim? Lihevanîna du mirovan ji wan çêtir e; tevlokl asasê din û millet xera dike.

679 — Mirovê ko gava qenciye dike bi qenciya xwe dixweş dibe û gava xirabiyê dike dilteng dibe, bi xirabîya xwe dixweş nabe mirovekî pak û bawermend e.

680 — Heke tu hîni zanînekê bûyi, divê ji xelkê re bîdî zanîn.

681 — Tiştê ko ji te re hate gotin, her wekî hatiye gotin ji xelkê re ji wiha qul bike, kê m û zêde meke.

682 — Zanî wînda nabe lê carna zana kê m dibin, ew nezanên ko li cihê zana rû-dînin, îşê xwe û yê hevalê xwe tev da şaş dikin, tiştêki jî hev nagerînin.

683 — Malê we pir be hindik be pê ari-kariya belengaza bikin, yê ko bi tenê ji zêde-hiya malê xwe ari-kariya xelkê dike min a ew peya ye ko piştî ko zîkê wî xweş têr dihe xwerinmayîya xwe dide birçiya.

684 — Mirovek hat ba cenabê Pêxember û got: şîretêkê li min bike, lê hîla kin be ne dirêj be; cenabê Pêxember gote wî: me xeyide, xulqê xwe teng meke!

685 — Paşgotinî ji dan û standina faizê xirabtir e,

686 — Dayende, ango yê ko dide Xwedê ye, ez bi tenê par dikim.

687 — Ji pêş min ve tu cara paşgotinîya xelkê mekin û ji min re mebejin filan di heqê te de an di heqê filan kesî de tiştêki xerab gotiye: ez dixwazim wadê hon tèn cem min bi çavê rehmê li we binêrim.

688 — Nîşanê minafîqa çar in: gava dipeyivîn derewa dikin, ko wad dan li wada xwe diqulipin, ne xwediyê gotîna xwe ne, gava ji wan re emanetek tê dayîn xainiyê pê re dikin û di doz û dawa xwe de tadayî û nelheqiyê dikin.

689 — Di sînga we de perçeyek goşt heye, heke ew pak û safî ye her tiştê we qenc e, heke ew xirab e, her tiştê we neçak e; ew perça goşt dil e.

690 — Gava dikin tembî û şîreta li xelkê bikin wexta wê xweş bizanin, wextin hene xelk ji şîreta aciz dibin û wextin hene şîret û gotîna we diçe heta dilê wan.

## BINGEHEN

### GRAMÊRA KURDMANCI

— 16 —

### PRONAVÊN XWEMALÎN

114 — Pronavên xwemalîn ew pronav in ko li navdêrên ko dikevin şûna wan îşaret û fikireke xwemalîyê bi wan ve dikin. Bi gotinên din ew pronav xwediyên tiştên ko di qisetê de qala wan hate kirin şanî didin. Ev pronavên ha ji du pronavên tével tène pê; ji pronaveke îşarki û ji pronaveke din, bi gelemperî pronaveke kesin.

115 — Yekejmar. Yekejmara vê pronavê li gora zayendê tiştê ko mirov xwediyê wî ye bi pronavên qersene « yê » û « ya » tête pê û pronavên din didin pey.

ÊN NÊR

ÊN MÊ

yê min, xwe

ya min, xwe

yê te, xwe

ya te, xwe

yê vî, vê, wî, wê

ya vî, vê, wî, wê

yê me, xwe

ya me, xwe

yê we, xwe

ya we xwe

yê wan, wan

ya wan, wan

116 — Gelejmar. Gelejmara vê pronavê bi pronava qersene « yên » dest pê dike û pronavên din didin pey.

GELEJMARA HER DU ZAYENDAN

yên min, xwe

yên me, xwe

yên te, xwe

yên we, xwe

yên vî, vê, wî, wê

yên wan, wan

117 — Herwekî tête dîtin ew pronavên hevedidanî bi her birekî xwe, di qisetê de wezîfeyîne tével dibînin. Birên pêşin yanî pronavên îşarki en qersene, şanî wan tiştan dikin ko me qala wan kirine û em xwediyê wan in. Herçî birên paşîn, pronavên ko dane pey wan şanî kes yanî xwediyên didin. Ji ber vê yekê pronavên pêşîn ji mêjer û zeyendê tiştan û pronavên paşîn ji mêjer û zayendê xwediyên tène bijartin.

destmalê min ya min destmalên min yên min  
gopalê min yê min gopalên min yên min

Di kesên seyim de pronavên ko xwediyên şanî didin ji zayend û mêjerê pêve dîr û nîzinghûna kesan jî didin zanîn. « vî, vê, wan » nîzing « wî, wê, wan » dîr. Herçî xwe kerem bikin fedkirin mada: 87

118 — Di zîmanê kurdmanci de, ji ên jorin pêve, hin pronavên din ên xwemalîn hene û tène çekirin jî. Herwekî: yê kê, ya tukesî, yên kîjanê, ya lînekan, yê filanan h.d.

(dûmahik heye)

C. A. BEDİR-XAN

## PROVERBES

54 — Benıştê méré pla, çiroka méré qenc e.

Le mastic du lâche, c'est l'histoire du brave.  
C'est à dire: le lâche se fait valoir en racontant les exploits du brave).

55 — Gul bû, baran lê ket, şil bû.

La fleur éclos, la pluie vint et la mouilla.

56 — Gundê bincame tê de, çu cara ava nabit.  
Le village qu'habite un hypocrite ne sera jamais prospère

57 — Heçl ne li şer e şer e.

Qui n'est pas à la guerre est un lion.

58 — Heçl dur e bi nûr e.

Tout ce qui est loin brille.

59 — Heçl li hespê hevalan siwar e, her 1 peyar e.

Qui monte les chevaux de ses amis va toujours à pied.

60 — Hemi kera bi wişkê majo.

Ne conduis pas tous les ânes de la même manière

61 — Herkes giriyê wi bi miriyê wi tê.

Chacun pleure ses morts.

62 — Her şerikl eqilekl.

A chaque tête sa raison.

63 — Hevalê qijikê nûkilê wl her di gû de ye.

L'ami de la pie a toujours le bec dans la crotte.

64 — Hêlîna teyrê kor, Xwedê çêdike.

Dieu bâtit le nid de l'oiseau aveugle.

65 — Hirçek li rezekî bi sû hat, wê salê çel kël mehûj zêde bûn.

Un ours se sâcha avec une vigne. On récolta, cette année-là quarante boisseaux de raisin sec en plus.  
( L'ours, brouillé avec la vigne, s'abstint de la visiter et de manger le raisin. )

66 — Ji bona çavekl, dibebnim çiyayekî.

A cause d'une source, j'aime une montagne.

67 — Ji mêra nav dimîne, ji ga çerm.

Les hommes laissent un nom, les boeufs, une peau.

68 — Jiu keleh e, mêr girtl ye.

La femme est une citadelle, l'homme, un prisonnier.

69 — Jinikê xewn bi méré xwe re didlt, kezîya xwe li ser yarê xwe kur dikir.

La femme se vit en rêve avec son mari; elle coupait ses cheveux pour son amant.

70 — Iljo serê xwe di pirça xwe dide, dibê: « ox, çi nerm e »

Le hérisson se frotte la tête sur ses piquants, et dit: « oh! qu'ils sont doux. » (chacun se croit parfait).

71 — Keçik ziyaret in.

Les jeunes filles sont des lieux de pèlerinage.

( C'est à dire: elles sont très entourées ).

72 — Ken ji dilê geş tê, baran ji ewrê reş tê.

Au coeur joyeux le rire, au nuage noir la pluie.

73 — Ker bi gem û hefsar, mêr bi soz û qerar.

L'âne a un mors et un licou, et l'homme, une parole et une promesse.

74 — Ker û şûr, bazara meriyê kor.

Âne et sabre, commerce d'aveugle.

75 — Ko agir bi çiyê ket, ter û hişk tev de digewitin.

Que la foudre tombe sur la montagne, humide ou sec, tout brûle.

( Le malheur frappe indistinctement tout le monde ).

76 — Ko ecelê mûriyê hat, çeng û perê wê çêlibin.

Lorsque la fourmi se prépare à mourir, il lui pousse des griffes et des ailes.

( Se dit des ambitieux qui causent leur propre perte, en se lançant dans des entreprises au-dessus de leurs forces ).

77 — Ko kela şorbê çû, behayê keskê bi berêk e.

La soupe écumée, l'écumoire ne vaut plus qu'un sou.

78 — Ko ker kete heriyê, xwedl wê rehêje teriyê.

Que l'âne tombe dans la vase, son maître le tirera par la queue.

79 — Kor çito li Xwedê dinêre, Xwedê ji werge lê dinêre.

Comme l'aveugle voit Dieu ainsi Dieu le voit.

80 — Li dlwari mişk hene, di mişkê de guî hene.

Dans le mur il y a des souris, elles ont des oreilles.

81 — Li kerê inîrl digere ko solî wi jê jêke.

Il cherche les ânes morts pour prendre leurs fers.

( Se dit d'un avare ).

82 — Malan mal bar kir, terziyan go: « Derziya me di serê me ra ye. »

Les tentes levaient le camp, des tailleurs dirent: « Nous portons notre aiguille sur la tête. »

( Se dit de pauvres gens dont le bagage est léger ).

83 — Mala zarok tê de, şeytan naçe tê de.

Maison qui a un enfant, le diable n'y va.

84 — Mala zêra xerab dibit, mala kura xerab nabit.

Maison qui a l'argent pour richesse peut être ruinée, maison qui a des fils pour richesse ne le peut.

85 — Mal mala aşiqa ye, simbêl simbêlê sôbaşi ne.

Sa maison est celle d'un bohémien, ses moustaches, celles d'un soubachi.

( Soubachi: directeur de police; ce proverbe s'applique aux gens qui n'ont rien, mais se donnent grande allure ).

86 — Mastê patza bidin ezîza, şîrê bihara bidin neyara.

Donnez le lait caillé d'automne à qui vous est cher, le lait de printemps, à vos ennemis.

( Le lait de printemps est généralement mauvais ).

( A suivre )

TAWÛSPARÊZ

Kiriyyiya Hawarê 500 Qirûşên Sûrl

Xwedî û gerîndeyê bepirsiyar: Mîr Celadet Ali Bedir-Kan. Şam—Sûriye

Directeur Propriétaire: Emir Djéladet Aali Bedir-Khan, Damas-Syrie

ŞAM—1942 — ÇAPXANA SEBATÊ

## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Tefsîra Qurane	Dr. K. A. Bedir Xan
Ezmên dibarandin	Xelilê Genco
Diwana Melê	Qedri Cemil paşa
Mehfûr	Silêmanê Ferho
Dê an Xûşk	Nûredîn Ūsif
Memozîna Xanî	Herekol Azîzan
Rewşa Dinyayê	Nêrevan
Ava Dîclê	M. F. Botî
Gramêra kurdmancî	C. A. Bedir Xan
Hedîsên Pêxember	Dr. K. A. Bedir Xan
Proverbes	Tawûsparêz

### TEFSÎRA QURANÊ

158 — Heke hon mirin an di riya Xwedê da hatine kuştin, honê vegerin ba Xudayê xwe, û ev ji we re xeyr e.

159 — Pêxemberê min... Bihînsîrehiya te bi wan re, ji kerema Xuda ye; heke te dilê xwe teng bikira û zorê li wan bidaya, ewê ji dora te belav bibûna. Qisûrê wan ewîw bike û ji bo wan diayê bike da ko Xwedê tobe bide wan. Gava tu dest bi îşkê dikî, bi wan re bişewire û ko te qerara xwe da, êdî ji Xudayê xwe hêvîdar be, Yezdan, ji hêvîdarên xwe hez dike.

160 — Gava Xuda ji kerema xwe nisretê dide we, êdî kes nikare zora we bibe; heke wî nisret ne da, ji wî pê ve ma kî dikare artkariya we bike. Ji ber wê yekê divê mirovên bawermend ji Xudayê xwe hêvîdar bibin; kerem û comerdîya wî bixwazin.

161 — Pêxemberê Xuda, tu cara di belavkirina talanê de bêbextiyê nake. Her kesê ko vê bextreşiyê dike, di roja piştawiyê de wê neheqîtiyê di pêş xwe de dibîne. Her kes li gora emelê xwe tê ceza an mikafat kirin û ji tu kes re neheqîttî naye kirin.

162 — Mirovên ko li gora emrê

Xuda dimeşin, ma kengê mîna wan in ko bêbextiyê dikin û Xuda ji wan dixeyidê. Cihê wan dojeh e û dojeh çi cihêkî têr tirs û ezab e.

163 — Cihê mirovên çak, li nik Xuda bilind e. Yezdan emelê zelamên camêr û peyayên bêbext dibîne.

164 — Xuda bi mirovên bawermend re gelek keremkar û comerd bû. Wî, ji wan re ji mîletên wan pêxember şandin da ko ew ji wan re ayetên Xuda bixwînin, wan ji gunehên wan paqij bikin û ji wan re kitab û hikmetê bidin zanîn. Berê ew mîletên he, nezan bûn û riya xwe şaş kiri bun.

165 — Herçend jî, di şerê Bedirê de ji dijminên we heftê mirov hati bûn kuştin û heftiyên din jî hêsîrên we bû bûn, dema şerê lhidê de ko ji we heftê zelam hate kuştin, we hema got: Ev çima hat serê me? pêxemberê min, bêje wan: Ev îşe destê we ye, Xwedê ji we standi bû. Xuda bi her tiştî dikare.

166 — Ew tiştên ko di roja şerê lhidê de qewimîne bi destûra Xuda çêbûne, Xuda dixwest mirovên bawermend nas bike;

167 — Û dixwest ko mirovên durû jî bêne zanîn. Ji wan re dihate gotin: werin di riya Xwedê da dest bi şer û kuştinê bikin.... Werin artkariya koma şerkeran bikin. Wan digot: Me îşe şerî bizaniya, me artkariya wan bikira, lê ji xwe ev ne şer e, hon xwe rast bi rast davêjin mirinê. Ne wisa bû... lê ew di wê rojê de ne nîzîkî baweriya pak lê cîranên kufrê bûn. Ew tiştên ko ne di dilê wan de ye hema bi zimanê xwe dibêjin. Xwedê tiştên ko ew di dilê xwe de vedîşêrin pê dizane.

## EZMÊN

### LI SER SERÊ ME PEYA DIBARANDIN

Ev salek û tişte e ko elemanan bi siwanvaniyan girava Girtê vegirt. Vê paşiyê yewnanekî ko di vê baranê de şil bûye ji rojnamevanekî îngilîzî re qala şerê Girtê kiriye û gotiye:

— Berî hatina elemanan bi du rojan min terka Efnê da bû û ez bati bûm Giritê. Hikûmet ji hati bû Giritê. Hikûmet di giravê de teşkilat çêdikir û jê re memûr diviya bûn; lê ew bi dest ne dikişin. Li Efnê ez binek bi işê laşê mijûl bû bûm. Min xizmetên xwe pêşkeşî hikûmetê kir û min wazîfeyê girtê ser xwe.

Li 20ê Gulanê bi şefeqê ve ez ji Xaniyê rabûm û çûm gundê Kiryoniro. Min bihîstî bû ko di wî gundî de mîxdarek zeyt heye. Gava ez geştiyîm gund reîsê belediyê hêj hişyar ne bû bû. Ez li ber xanekê rûniştîm û di sariya sibê de min qehwa xwe vediwar. Rojêke Bi-harê e spehî bû. Ez ketî bûm texmîna û mitalan. Dengê topên balafirşiken yê ko ji Sodayê berdidan ez hişyar kirim. Xwediyê xanê bi erin got: Ma ne şerm e; li Xanyayê didin, ji xelkê sivîl çî dixwazin.

Pişta demekê topan xwe lal kir; lê viz û vingîna balafirên nîzing dibû. Gelek ne bori me dengê horiya talûkê bihîst. Xelkê gund di gastiya gund de çihane hev û li ezîzên difedkirin. Balafir ref bi ref dihatin. Bi carekê de me dit ji halatîrekê çend balafirên din peyda bûn û ew jê veçetiyan. Lê gava me rind bala xwe da me zant ko ew ne balafir, lê tiştîna din in.... belê ew insan bûn, esker bûn, ji balafirên derdiketin û dihatine me. Ew siwanvanî bûn.

Ji herê de ji me re gotî bûn; heye ko dijmin siwanvaniyan berdit ser Giritê. Lê me bawer ne dikir. Êdî me ew bi çevên xwe diti bûn.

Jin û kurê min li Xaniyayê bi tenê bûn. Ez ji nav gundiyan derketim û min da rê û ez ketim nav darên zeytûnê. Balafir di ser daran re difirîn û siwanvanî bera erdê didan. Ez tirsîyam ko nekevim destê wan. Ez di vê mitalê de bûm min dit yek kete nîzingî min, hema 4-5 gav ji min dûr. Mêrik pê li erdê kir, ne kir çav bi min kir, da tişta xwe, û bera min da. Destê min birîn bû; min xwe li erdê pehin kir. Dengê timatûk û mitralyozan nav di min dida. Ingilîz û siwanvaniyan rahiştî bûn hev. Gava pitpita mitralyozan bi dûr ket ez ji sibê xwe derketim. Erd ji cendekan tijî

## DIWANA MELÊ

— 30 —

Dilberê fro seher avête cerkê min du dox  
Yek li sîne, yek li dil da lew ji min tîn ax û ox  
Ah û oxên min ji dil tîn ew ji ber tîra qizil tîn  
Yan ji kovanên di kul tîn jê dizên her xûn û zox  
Xûn ji dil co co rawan tê wek eqîq û erxewan tê  
Lê ji dest selwa ciwan tê ew şepala şeng û şox  
Ew şepala şox û şengê kafira rom û firengê  
Da me ber cibtek xedengê zalimê kuştîm bi dox  
Zalimê kuştîm şepalê nazîkê qencê delalê  
Bûn hicaba zilf û xalê herçe'e ala û tox  
Nitrik û tayên bi rişî yê di zêrin pê veweyî  
Min du fêris din di pêşî mirwet û insaf yox  
Lew herifim ez ji meylê şibheli sehl û sihêlê  
Mihbet û eşqa dellilê ez kirim yekser pilox  
Dest nebêlim ez ji dinê şibhi Ferhad û Şîrinê  
Dê ji ber eşq û evinê min dirêçit ev kilox  
Sihbela çerx û sema tê wek Melê sed mibtela tê  
Zemzem û ava heyatê mişterî sed şêx û şox

— 31 —

Heyheya reqs û sema tê ya çî xweş bestiyê çerx  
Ko di bircê bi sema têt û li ser dest çûye berx  
Sofiyên ber di tewafê hec-ceril-eswed-de qesd  
Gul û sinbil bi sema tîn hem-miyan zemzem û çerx  
Neqşî elmas ger elmas cîcî bîni girtiye herf  
Xetî yaqût e li yaqût şikênandî qey li neix  
Kerixin em di qiyânê wê ji dil perde dirand  
Arifî wextim û me'rûf bila bête ew ji kerx  
Da binasi xeterên rê tû nehi xafil jîwî  
Dicle ye lê di pîr in, berderî pêl in û berx  
Pîr şîar e di şîrê de û Mela bû şalîroş  
Lew nişan min mede ferxê ko li nik min bûye ferx.

bû bû. Min nîzingî li cendekên nûzelandiyan kir. Di cizdanên wan de resimên dê û bav, jin û zorowên wan hebûn. Min li wan temaşa kir û çavên min hêstir kirin. Şer ne tişteki qenc e. Lê zarowên min.... Min ji nû ve da rê û ez gihastim Xanyayê Ezmên bê etlahî siwanvani dibarandin Gelekê wan diketin dora balafirgehu Malêmê. Ev balafirgehu ji bajêr delî kilomêtir dûr bû. Welê xuya dikir ko elemanan dixwest di dora balafirgehê de bigihin hev û jê bikevin bajêr.

Ingilîz û yewnanîyan bi mîranti şer dikir. Lê gelek caran li xwe heyirtî diman. Eleman dadiketî her derê. Mîfrîzekî îngilîzî dema ko şerê tofeke siwanvaniyan dikir, tofeke din diketî piştî wan an teîştî wan. Ji lewre wan ne dizantî berî ewilî şerê kê bikin. Ji milê din eleman bi siwanvaniyan re di şikilê eskeran de qirdikî jî berdidan erdê. Carina esker diçûn ser qirdikan û siwanvaniyên rastî ji par re li wan dixistin. Digel wê hindê xwînsariya îngilîzan û mîraniya xelkê Girtê gelek bi kêr hatin. Mîrên kal tişgên xwe ên jengirtî jî bin erdê derdixistin; hin bi tişgên neçîrê

## MEHFÛR

Ji « MAURICE BOUCHOR » HATE WERGËRANDIN

Li wextê berê siltanê Stenbolê, bi xulam û berdevkên xwe ve çû bû welatê kurdan. Kurê wî jî pê re bû. Rojekê ew gihastî bûn gundekî mezin. Gund bi mîrgine fireh dorgirtî bû. Şehnêdêra wî gundî bû. Xelkê kêf dikir û tîcîran hûrmûr difrotin. Nemaze mehfûrên spehl, mehfûrên rengereng yên ko di wî welatî de çêdikirin.

Çavê kurê siltanê bi keçikeke delal û bedew ket û pê re axaft. Piştî ko dût û dirêj pê re da û stand kurik gote havê xwe ko dilê wî heye wê bike jina xwe.

Siltan li kurê xwe vegerand û got: Kurê min vi îşî meke, ma ev keçik kl ye gundike kurd. Min ji te re li Stenbolê keça paşaki hazir kiriye. Di payitextê me de jê dewlementir paşa nîne.

Kurik bi edeb û terbiye li havê xwe vedigerand, lê pê li erdê dida û ji keçika kurdmanc ne digeriya. Kurik digot heke divê ez dikarim ji bo vê keçikê hemî emrê xwe di vî gundî de bibortnim. Siltan dît ko jî derdê kurê xwe re ji keçikê pê ve tu derman nîne. Siltan şande pey keçikê û ew anî hafa xwe û jê re got: min qîma xwe bi te anî, ezê te bikim hûka xwe, tu çi dibêji?

Keçikê bi edeb û terbiye, lê bê gur û gef gote siltanê: Ezbenî, kurê te çi îşî dike?

Siltan hate kerbê û got: Ma tu din hûyf

dirêjî stwanvaniyan dikir. Jin û zarowan bi ço û kevira bera wan dida. Ji xwe carina eleman beriya ko bigehin erdê bi berikên mitralyozan di hewayê de dihatin kuştin. Te dît çend stwanvanî daketine zeviyekê. Xelk li wan kom dibûn, bi tîfing, şejderb, kêr û ço bi wan diketin, ew dikuştin. Bivê nevé ji xelkê jî hin dihatin kuştin.

Hefa êvarê esker û ehaliyan şerê stwanvaniyan kir û bi texmîn heçî daketi bûn erdê tev de hati bûn kuştin.

Fermandariya îngilzî êvarê danezanek belav kir û da zanîn ko îngiliz hakimî weziyetê ne. Lê dawîya barana însên ne dibat û eleman guh ne didan telefâtê. Di destê eskerên elemanî de çekine xerîb hebûn. Bi qeweta wan çekan û bi fedakarîne mezin mihaciman zora midafûhan bir. Herçî midafûh xwe dan peravan, li vaporan siwar bûn, çûn; da ko di deverîne din de û ji nû ve şerê dijmin bikin.

XELILÊ GENCO

keçê, li karê kurê min dipirist, ma tu nizanî ko ew kurê siltan e...

Keçikê dîsan bi rahetî vegerande siltanê û got-ê: Ezbenî ez kurê siltanê çi ye nizamîni heke kurê te karek, sinhetek heye ez wî dikim, an ne nol....

Kirin ne kirin keçikê qîma xwe bi mîrektî bêsînhet ne anî. Siltan vegeriya Stenbolê, kurik di gundê kurdmancan de ma û hîni çêkirina mehfûran bû. Piştî ko kurê padişê bû hostekî serdeste, keçik qîma xwe pê anî û tev de çûn Stenbolê. Siltan bi kurê bûka xwe şa bû û daweta wan kir.

Rojek ji rojan kurê siltanê bihîstî bû ko jî derveyî bajêr di rexîreke kevin de aşxaneke nû vebûye û tê de xwarînine gelek qenc û tamdar çêdikin. Kurik cilên siltanî jî xwe xistin û cilîne tîcîran li xwe kirin û berê xwe da aşxanê. Gava gihîştî-ê xwedî gelek îqedrê wî girt û jê re sîniyek xwarin anî. Bi rastî xwarînine qenc bûn. Kurê padişê jî her sehenê pariyek dibir û tam dikir ko erd di bin wî de hejiha û raxera odê digel sîniya xwarîne dakete jêr. Kurik bi carekê de dît ketiye zêr-zemîneke tari û ezman hew jê xuya dike. Ji nişkekê ve çar pênc peya bi xenceran pê ketin û dikirin wî bikujin. Kurik xwînsariya xwe wînda ne kir û gote wan:

— Zêr û zivê min hemî jî we re ye. Lê bi kuştina min çi bi dest we dikeve. Ez ne bi tenê tîcîrê mehfûran im, lê ez zanim mehfûran jî çêkim. Li şûna ko hon min bikujin, min bi xwedî bikin, ez dikarim ji we re mehfûran çêkim.

Diz pê qail bûn û jê re tevnek vegirtin, hîrl û tîştên din ên gerek jî jî kurê padişê re anîn. Bi vî awayî şahzade xêra sinbeta xwe jî mirîne xelas bû.

Em bîna sereya siltanê. Dinya bû êvar û gava kurê siltanê venegeriya serayê xulam û berdevk belav bûn çar goşeyên payitextê û lê gerîyan. Tukesî şopa wî hilnanî. Li serayê şîna şahzadê girêdan.

Herçî şahzade, di hepsa xwe de şev û roj li mehfûra xwe dixebitî û qet serê xwe jî xebatê ranedikir. Bi tenê carina xew lê giran dibû û saetek an didowan di xew re diçû, qey da bû ser rêkê û dikir rojekê berî rojekê bigehe dawîya riya xwe.

Şahzade, bi vî awayî şeş mehên xwe di hepsa dizan de temam kir. Lê di vî midetî de jî mehfûreke mezin û spehl çêkir û ew da destên dizan û gote wan:



— Eve ji we re mehfüreke delal, wê bibin û ji paşakt re bifroşin. Hej çêtir wê rast bi rast bibin seraya siltên. Siltan gelek hejt mehfüran dike. Mehit ko wê ji sed zêrî kêmîtir bifroşin.

Didwan ji dizan cilên təciran wergirtin, mehfür kirin piştî xwe û ketin kûçe û kolanên bajêr û gihastin ber seraya padîşê û ketin hewşa wê. Siltan gava çav bi mehfürê kir ew gelek eciband, sed zêr pê dan û ew kiri.

Mehfür raxistin diwanxanekê de û xelkê serayê lê kom bûn. Keçika kurdmanç, jina şahzadê gava mehfür dt, di wê de neqş û kullikên mehfürên welatê xwe nas kirin. Keçik li neqşên mehfürê hûr bûn û bi derbekê de got: « Bi Xwedê ev mehfür ji welatê min têt, an yê ko ev çêkiriye li her tevnên welatê min xebitiye ». Çavên keçikê hêstir dikirin. Keçik li her neqş û kullikên mehfürê cihê cihê fedkirt û ji nişkekê ve qir kir û got: « Werin fedkirin, eve navê wî di ji me re çi dinivîstine ». Xelkê serayê tev de li cihê ko keçika kurdmanç şant wan dida nihêrtin û dtin ko gotina keçikê rast e. Şahzade li nav gulekê navê xwe û cihê ko lê girtî bû nivîsandî hûn.

Bi emirê siltan esker gihane hev û berê xwe dan pira kevîn û bi ser şikefta dîzan de girtin û deriyê hesinî yê ko diz tê re dadiketin biniya erdê şkenandin û gihastin zêrmîna ko şahzade bi xwe tê de bû. Şahzade li her tevnê rûniştî, dest bi çêkirina mehfüreke din dikir. Eskeran diz hemî girtin, ew kelemçe kirin û Şahzade derexistin ber tawa rojê. Siltan û bûka wî ji di pey eskeran re gihastine devê şikeftê. Xelk li wan kom bûn, herkesî xelashûna

şahzadê şahnet dikir. Şahzade jina xwe di himbêza xwe de diguwaşt û digot-ê: Ji ber evîna te ez hîni senhetê bûme û xêra vê sinhetê min xwe ji mirinê xelas kir û dîsan gihastime te.

Siltan ji nû ve dawetn kurê xwe heft şev û heft rojan bi reqş û govendan da şahnet kirin

SILÊMANÊ FERHO

## DÊ AN XÛŞK?

Ji • FRANK STOKTEN • HATE WERGERANDIN

Li golekê, xortek dê û xûşka xwe di sendalekê de digerin. Dinê bihar e. Bayekî şêrin li ser rûyê avê e şin pêlên sivik cêdike û wek dergûşekê sendalê dihejine. Di bin şirgermiya tavê de kullikên doraliyên golê bi giranî hildibin. Wek xanimên çeleng û xemilandi bi pozhilindî li hev dinêrin û ji xwe pêve tu kesî naecibînin

Sendal, bi stran û ken ji peravan dût dikeve. Xort li dê û xûşka xwe dinêre; ji şa û kêfxweşbûna wan, xwe çîqa bextiyar dizuhe û heşmetkar li diya xwe a pir, lê hîn çeleng û nartî û li xûşka xwe a ciwan, şepal û dilber temaşa dike.

Ji nişkave, ji livîna yekê ji wan sendal diqûlibe û her sê ji dikevin avê. Ji xort pêve ne dê ne ji xûşk bî melavaniyê nizanin.

Xort hewar û zarînen wan dibihîse û cigera wî dipêrite. Her diwan pevne nikare xelas bike; ewê yekê ji wan bibijêre: kî gelo? Xûşk an dê?

Ez dikim nakim tu tişt tê dernaxinin  
Ka hon ji pê mijûl bibin û hinekî xwe biêşinin..  
NÛREDÎN ÛSIF

## MEMOZÎNA

### EHMEDÊ XANÎ

— 4 —

ISTIDAVI ŞEFAST Û ISTIŞFA'I  
MEXFÛRET E JI CENABÊ SAHIB  
SERIBI ŞEFAET BI SÛRETÊ  
MÎRACÊ DA BI BAL HEZRETI  
IZ-ZET

Ey wassileyî wicûdî kewneyn  
Şayesteyî qurûbî qabî qawseyn  
Şabîncê e textîgîhî Medîne  
Nîf'îzî jî te ewqeder me dîne  
Şeyra felekan li nik te gawek  
Tewra melekan jî te silavêk  
Yeşîlqîlqemera te yek îşaret  
Dûkîl-besera te yek îbaret  
Ey padîşehî serîrî tewlak  
Baba here nîmanê çalak  
Îzzetî jî te re biraq û refref  
Têlî bî te re berîste refref

Da refî bibin jî ber te perde  
Bê perde digel Xwedê xeber de  
Bêje tu qedîr û zilcelal î  
Bêje tu qedim û layezal î  
Em fant û jar û miştî xak in  
Hadi ne tu bî xwe em helak in  
Ew-wel te jî bo çi da me tazîm  
Danî li ser me taci tekrîm  
Teşrîfî xîlafetê te da me  
Gava te emanetê xwe da me  
Meldîmî te bû ko em nezânin  
Qedrî wê emanetê nizanin  
Herçî te jî bo me kir irade  
Yek zer-re me lê ne kir ziyade  
Huşa jî kemalî refeta te  
Dûr e jî celal û rehmeta te  
Kufr û gunehan bîkî behane  
Laîq te bitin ewê şehane  
Yekrû ne li nik te kaf, û îman  
Yeskû ne li nik te xuld û neyran  
Qehrâ xwe bîkî eger tu zahîr  
Cen-net li me de bibête agir

Wer feyz bîkî şehabî rehmet  
Dûzex li me dê bibête cen-net  
Ger kafîr û ger gunahkar in  
Bilcîmle jî te inîdwar in  
Kes nîne jî kafîr û isatan  
Mezher nebitin jî bo sîfatn  
Kafîr biwîn em bî ismî qeh-har  
Xêf-far e ko em kirin gunehkar  
Kufre tu meger neşî bibexîr  
Ger dê gunehan bî me ne hexîr  
Dê şad bibin li me şeyatîn  
Mesrûr bibin gelek melain  
Qet xeyret e ey penahî alem  
Qet laîq e ey şebanî adem  
Ev gurgî leînî bedserencam  
Jêk ra bikelin me şîbbî eînam  
Elqîs-se bîkî ko dêwî serkeş  
Tenha û tenê biçîte ateq  
Lîlcîmle me cimle xas û aman  
Asê û şeqî û natemaman  
Têk ra bî şefaeta xwe xas ke  
Vêk ra me jî agirî xelas ke.



## REWŞA DINYAYÊ

**PIRSA ENIYA NÛ** — Ji roja ko êrişa elemanan dest pê kir û di nîvroyê eniya ûris de ordiweñ rûst bêgaman û ji ber elemanan kişiyana pirsra enike nû ji nû ve têtê gotin û çapên hevalbendan li ser vê pirsê gelek dişekin. Ji xwe vê paşiyê gava Çorçil çû bû Emêrikê bi Rûzwelt re ev mesele ji hate mizakerê kirin û di dawiya mizakerê de her du hikûmetan da bû zanin ko di sala 1942 an de li Ewropayê enike nû wê bête danin; yanî eşkerên ingliz û yê hevalbendên wî wê dakevin beja Ewropayê û şerê elemanan bikin.

Li 16ê Tirmehê radyowa Londrê da zanin ko eşkerine kenedî û inglizî di dora behira Bîranyayê de manawre mezîn çêkirine. Ev manawre bi wî awayî çêbûne: Esker li vaporan siwar bûne û ketine behirê. Piştê ev esker di bin himayeta stolê de vegeyriyane bejê û dirêjî peravên Bîranyayê kirin. Di peravan de eşkerine din hebûn, heçko ew dijmin bûn. Eşkerên ko ji behirê hatine zora wan birine û daketine bejê. Radyowa Londrê gotiye ko manawre bi miwefeqiyeke mezîn gihastiye dawiyê. Vê radyowê bi ser ve zêde kir û got: Eşkerên ko ev manawre çêkirine, sibe wê herin û dakevin beja Ewropayê. Çapa yanî metbûata sondxwariyan di vê manawre de delêletên çêkirina eniya nû dibinin. Ev çap bi xwe pê li erdê dide û dibêje êdî wext e, eniya nû divê rojêke berî rojêke bête danin.

**PIRSA HINDISTANÊ** — Herwekî xwendevanên me dizanin di Sibata vê salê de Sir Staford Krips çû bû Hindistanê û bi navê hikûmeta xwe bi serekên Hindistanê ên mili ketî bû mizakeran. Ingiltere dil dikir bi hindiyên re li hev bêt û işê Hindistanê safî bikit. Ingiltere ji hindiyên re wada istiqlalê dîda. Lê ev istiqlal piştî şerî jwê bihata telbiq kirin û beta dawiya şer Hindistan di bin vegertina inglizan a eskerî de wê bimaya. Hindiyên ji ber van sebeban pêşnîhada inglizên bi şûn de avêt û her tişt weke xwe ma.

Bivê nevé japonan kêfa xwe ji vê qerara hindiyên re gelek anî û hêz da bû propoganda xwe. Lê heta vê dawiyê li Hindistanê sezayî gotinê tu tişt ne qewimî bû.

Vê paşiyê Gandî serekê hindiyên ê bi nav û deng xwe tev de û li 13ê mehê encimana kongrê a icraf qerareke dîr û dirêj belav kir. Di vê qerarê de encimen bi kurtî dibêje: Divê ingliz ji Hindistanê rabin û herin. Piştî çûyina inglizan li Hindistanê hikûmeteke milî de bête saz kirin û di vê hikûmetê de ta û qewimên Hindistanê tev de de bêne nîmandin. Inglizên ko dil dikin, bi şertê ko wek hindîki bêne hesêb, dikarin li Hindistanê bininin. Digel vê hindî hindî hi tu awayî naxwazin di warê şer û cîdalê de işê ingliz û henalbendên wî biwarqilînin. Ji ber vajî ve piştî ko ingliz ji Hindistanê kişiyên Hindistan wê arîkariya Çînê ji bikit.

Qerara encimênê ev e. Li 7ê Tebaxê kongre wê bigehit hev. Hingê ev qerar ji kongrê re de bête ber pê kirin. Heke Londrê ev qerar tesdiq kir û ingliz ji Hindistanê ranebûn hingê hindî ji nû ve dest bi grêvina bikin yanî bê şer û çek ewê bixwazin ingliz aciz bikin.

**STOLEKE FRENŞÊ** — Gaya mitareka frensîz û

## AVA DICLÊ

**- LI BEXDAYÊ LI BER ŞET HATE GOTIN -**

Ava Diclê em dizanin tu ji Kurdistanê te Ka selamên wî welatî bê diyarî holê te Tu çire hinde melûlî hêdû hêdû ber me te Rengê te seylo û tari we bê mişmiş teyl te Bihî dikim te Ava-Diclê wek kirasê Usif te Her bi xwina genc û lawan lewma hinde jarî te Aava-Diclê tev de xwin i, her ji xwina kurdî te Bin te de hesti kilox in sed hezar ser ser de te Nexmeya şîna xelidan pêl bi pêl te û te Ber bi van xortên welatî her bi av û nale te Tu li nav asteng û nalan we ji nav palên çiyân te Serbejêrî kerbelayê we bo behrê diçî û te Ka Cizira mîr Bedir-Xan tu ji nav Birca-belek te Ew cihê ewçend bi deng bû lro bê jin û mirî te Tu ji nav şer û piliqan û ji nav axa b'bihn te. Her hijî tu Ava-Diclê her bi nav û dengî te

M. E. BOTÎ

elemanî çebû, birek ji stola frensîzan ya Behîra-spî, li Skenderiyê bû. Inglizan ne hişt ko ev stol ji Skenderiyê rabe û here bendereke din. Emiralê stolê ji qehûl ne kir ko derbasî aliye Degol bibe. Ji lewre inglizan stol girt û ew ji çek kir û hikûmeta Ingiltere da zanin ko keştîyên vê stolê heta dawiya şer li Skenderiyê wê bimînin; stol bi zabit û deryavanên xwe ve li Skenderiyê ma.

Vê paşiyê gava ordiwa Romel ket axa Misirê û rewşa inglizan di vê qadê de bû xeternak hikûmeta Vişiyê emîr da emiralê stolê û got heke eleman ketine Skenderiyê bila cehda xwe bike ko jê rabe û stolê bigehîne bendereke frensîzî. Û heke ev firsend bi dest ne ket weke berê û di bin bandêra frensîzî de li Skenderiyê binînin.

Bivê nevé ingliz û emêrikani pê hesiyân. Li ser vê yekê li 3ê Tirmehê Emêrikê notak daye Vişiyê û jê xwest ko ev stol di Behîra-sor û di Behîra-hindî re xwe bigehîne bendereke emêrikani. Vişiyê ev pêşnîhad yanî teklîf bi şûn de avêt. Emêrikê pêşnîhadîke din ji Vişiyê re ber pê kir û got bila stol xwe bigehîne girava Martinîkê. Ev girav inistemlikeke frensîzî ye û li Emêrikê ye. Vê paşiyê emêrikaniyan dest daniye ser giravê. Vişiyê ev pêşnîhad ji bi şûn de avêt û da zanin ko ev stol ji benderên Frensê pê ve naçit tu deran. Li ser vê yekê Rûzwelt got: Edî ingliz işê xwe wê bizanin û heke elemanan nizingî li Skenderiyê kir ingliz an stola frensîzî bi xwe re bibin, an wê bin av bikin; ji xwe binavkirina vê stolê hêsani ye, ji ber ko qameyên topên stolê jê hatine hilanin.

Nimînendevên Vişiyê dibêjin ko heke inglizan dirêjî vê stolê kir; stol ewê li ber xwe bide û beye ko keştîne din bigehin hawara wê.

**ŞERÊ ÛRIS** — Herçend êrişa Timoşenko ya meha Gulanê, di mintîqa Xerkovê de, êrişa elemanan bi şûn de hiştî be jî ev hicûm ji destpêka Tîr mehbê ve bi tevî germî û giraniya xwe dest pê kiriye û piştî çend rojan xuya bû ko armanca elemanan a pêşîn Qevqas û bi taybetî petrolên Bakoyê ne.

Elemanan beriya hîcûma mezin — hîcûma ko di pêşiya vê mehê de dest pê kir — erd jê re xwez kirîye. Armanca vê erdxwezîkirinê birlina rêhesinan bû, yên ko Rostovê bi Moskoyê re girêdidin. Bi vî awayî Qevqas ji imdadê ko jê re ji Moskoyê bihata wê mehrûm hiwa. Ji ber vê yekê ji yekînekên ordîwa von Bok ji Xerkovê derketin berê xwe dan çemê Donê û piştî serine diwar li çem derbas bûne û li 27ê Hîzêranê ketine Kûbyanskê. Kûbyansk dikeve nivro-rohelê Xerkovê û jê 70 kilometir dûr e. Di Kûbyanskê de çend rêhesin digihin hev.

Herçî yekînekên ordîwa von Kleyst ew ji ji Poltavayê rabûne û berê xwe dan rohelê û li 24ê Hîzêranê ketine Izyomê, bajarek li ser çemê Donê. Bi vî awayî elemanan eniya xwe ber bi rohelê birlî bû û ew di hindava Tagenrogê de rast kiri bû.

Li 20ê Hîzêranê elemanan ji bakurê Xerkovê, ji hindava Korskê ji rabûne hîcûmê û li gora danezanên wan di nav pênc rojan de 250 kilometir pêş ve çûne û gihastine çemê Don. Elemanan li çemê Don ji derbas bûne û li 6ê Tirmehê dane zanûn ko Voronêj ketiye destê wan. Ūrisan derew bi aliyê vê nûçeyê ve da û got ko Voronêj di destê wan de ye. Lê Ūrisan mikur hat ko eleman li Don derbas bûne û gihastine wi milê avê.

Ji milê din eleman ji Biyelgorodê ji rabûne hîcûmeke din û jê ve ji qesta Don kirine. Ū berê xwe dane Pavlovskê. Vê ordîwê di nivê rê de berê xwe ji rohelê bada, xwe li bakur girt û li 8ê Tirmehê yekînekên vê ordîwê ketine Starayarskolê. Li 11ê mehê Ūrisan da zanûn ko bi hemtê xwe hajarên Kentemîron û Lizîyansk vala kirine û jê kişiyane.

Her du ordîwên elemanî yên ko ji Xerkov û Poltavayê rabû bûn du armanca da bûn her çavên xwe; li rohelê Stalingrad û li nivro Rostov.

Ordîwa ko berê xwe da bû Stalingradê li 16ê mehê gihaste Bogûçarê, li ser çemê Don. Ūris jê û ji bajarê Morovdayê ji kişiyan. Elemanan piştî ko ev her du bajar standin bi qewetên xwe ên mîlkantî dan pey Ūrisan û xwe li Stalingradê girtin. Li 20ê mehê elemanan qederê 100 kilometir nîzingî li Stalingradê kir û li hîre sekinîn. Welê dixuye ko Ūrisan li pêşiya Stalingradê xetke midafehê çêkirîye û dilê wan heye li hîre pê li erdê bidin û şerê elemanan bîkin. Stalingrad bajarekî mezin û merkezeke sînahî ye. Heke elemanan Stalingrad — bi navê xwe ê kevin Çarîçîn — stand ewê bigihin çemê Volgê, Volga Ūrisan a miqedes.

Piştî rêhesîna Mosko - Rostov, Volga di navbera Qevqas û Rûsya bakur de rêke behri ye. Volga çemê Ewropayê ê dirêjtir e; 3400 kilometir. Heke eleman girahştine Volgê ewê tê re dakevin behira Qezwînê û bi vî awayî Rûsya bakur ji Rûsya nivro yekcar wê qut bibe. Ji lewre divêt ko Ūris di pêşiya Stalingradê de pê li erdê bidin.

Em bîr ser ordîwa elemanî ya ko berê xwe da bû nivro û armanca wê vegirtina Rostovê bû. Vê ordîwê, ji ber ko Ūris di gelek cihan de bîr ko li ber elemanan bisekinin ji ber dikîşiyan, bêelahlî meşîya û li 19-20 Tirmehê li aliyê nivro ji derbasî çemê Don bû, çem li xwe ba da û ji rohelê berda Rostovê. Ji xwe birekî vê ordîwê ji bakur dadiket Rostovê. Mexseda elemanan li Rostovê wer hatin û girtina midafîbên wan bû. Ji xwe par elemanan

Rostov vegirti bû; lê Tîmoşenko ew bi şûn de vegerrandi bû. Ji hingê ve Ūrisan Rostov asê kirîye.

Li 24ê Tirmehê herçend danezanên elemanî zemtîkirina Rostovê da bin ji zanûn Ūrisan ev nûçe ne beliyand yanî jê re belê ne got û ew tesdîq ne kir. Elemanan li 25ê mehê ji gotine ko Novoçersk ji ketiye destê wan. Lê Ūrisan piştî du rojan da zanûn ko ev her du bajar vala kirine û jê rabûne.

Herwekî ji raveka jorin dixuye elemanan bi çend baskan dirêjî ordîwa Tîmoşenko kirîye. Jê mexsed xistîna vê ordîwê nav çenberê bû. Lê vê carê plana elemanan ne çû serî. Tîmoşenko di wext û zemanî de xwe da paş. Ji xwe welê dixuye ko Tîmoşenko ji herwekî Okinlêk li Misirê kirîye, ji bona ko nekeve deravekî teng xwe dide paş hetanî ko cihêkî wek Eleyemeyn peyda bike. Ū li wê derê êrişa elemanan bisekinîne, xwe pêk bîne û paşê rabe berhicûmê.

Eleman bi vê bicûmê di nav çar heftan de, li ser enîkê 600 kilometir firefî 600 kilometir pêş ve çûne. Lê herwekî me got, elemanan nikarî bû ordîwa Tîmoşenko bigire. Tîmoşenko li nivro xwe da paş. Lê li bakurê eniyê di mintîqa Voronêjê de rabû berhicûmê û piraniya ordîwa elemanî ji milê Don yê robelê avête roavê û pirên ko elemanan lê çêkirî bûn ew ji xerab kirin û bajar bi temamî xistine destê xwe. Êrişa Ūrisan di mintîqa Voronêjê de dom dîke û pîsporên eskerî dibêjin ko ev êriş ji bo baskê ordîwa von Bok ê çepê xetereke mezin e.

Herçî elemanan, herwekî me got li nivro ji di çend deran de li çemê Don derbas bûne û li vî milê avê ketine û xwe ji bo êrişa Qevqasê kar dikin.

ŞERÊ MISIRÊ — Herwekî ine di hejmarê 46an de gotî bû fermandarê îngilîzi general Okinlêk kişîya bû heta xeta Eleyemeyn-Qetara, û li hîre li pêşiya elemanan sekinî bû û hîcûma wan sekinandî bû. Bi vî awayî Okinlêk ji gerokîya Romel re sêncek danî bû û teşebîs xistî bû destê xwe.

Okinlêk piştî ko imdadine mezin gihastine wi û ordîwa xwe saz kir ji 20 heta 25ê mehê du caran dirêjî xetên mîhwerê kir û di dirêjahîya eniyê de gir û mitîkê hêja xistine destên xwe û eskerên xwe tê de cih kirin. Herçî eleman di midafehê de dîman û ji xwe re tabîye û kozîk dikolan. Okinlêk ji baskê elemanan vî çepê, yanî ji behîrê ji dirêjî xetên mîhwerê kir û stolê bi topên xwe ên dîtravêj tabîyên wan bombarau kir.

Li gora fikira pîsporên eskerî vî carê îngilîz wê rabin hîcûmê û ordîwa Romel ji erdê Misirê derin û wê veşerînin Libyayê. Heye ko heta Trablîsêrbê.

ŞERÊ PESIFÎKÊ — Li Pesifîkê çey şer sekinîye. Ji tevgera balafîrên her du alîyan pê ve hêjayî gotinê tiştek nîne. Li gora nûçeyên ko ji wê eniyê tîrî sondxwarî xwe kar dikin û vî carê qewetên emêrikîni û îngilîzî wê rabin hîcûmê.

Herçî şerê Çînê, ev şer dom dîke û japon zora xwe didin Çînîyan.

ŞERÊ ROAVÊ — Li roavê yanî di navbera îngilîz û elemanan de şerê balafîran e. Îngilîz bi refîne ji çend balafîran bihevketî diçîn ser Elemanyê û Frensa vegertî û erdê din yên ko îro di destê elemanan de ne û li bajarên wan ên sînahî û li Wargeh û benderên wan didin.

## BINGEHËN GRAMËRA KURDMANCI 17 — RENGÐËR

119 — Rengdêr ew bêje ye ko bi navdêrê ve dibe û wesfekl wê dide zanin; an wê navdêrê di mana wê de tayîn û texsis dike. Herwekî gava em « hespê reş, hespê beza, hespê xurt » dibêjin « reş, heza, xurt » rengdêr in; ji ber ko ew yek bi yek wesfekl navdêra hêsp didin zanin. Disan di gotinên « ev hesp, çar hesp, kijan hesp, hin hesp, hespê min » de bêjeyên « ev, çar, kijan, hin, min » rengdêr in; çûnki ev ji navdêra hêsp di mana wê ne dixesistnin û diyeinên.

120 — Ji raveka jorin dixuye ko rengdêr du cisin in: yên ko navdêran diwesifin û yên ko mana wan tayîn û texsis dikin. Ji ên pêşin re rengdêrên wesfîn dibêjin û ew xwerû rengdêr in. Ên mayîn di esilên xwe de bêjeyîne diin in û gava di komekê de bi navdêrê ve dibin, wezîfa rengdêrê dibinin û navdêrên xwe li gola tewangên xwe didin tewandin û gava navdêr ji komekê dikevin û ew bi serên xwe diminin hingê vedigerin esilên xwe.

121 — Di nav navdêran de bi tenê ên wesfîn yên ko xwerû rengdêr û ji bêjeyên neguhêrbar in; gava bi tena xwe ji dimtin nayîne tewandin û veqetandekê ji nabin. Lê herwekî di cil û devera wê de de bête ravekirin vê qeydê ji awerteyin hene.

122 — Di zimanê kurdmanci de şeş texlîf rengdêr hene:

- 1 — Rengdêrên wesfîn
- 2 — Rengdêrên îşarki
- 3 — Rengdêrên jmarin
- 4 — Rengdêrên pîrsiyarki
- 5 — Rengdêrên nebinavkiri
- 6 — Rengdêrên xwemalin

123 — Ji van rengdêran, ên wesfîn dikevin paşîya navdêran û bi du awan bi wan ve didin. Ên xwemalin hergav didin pey navdêrê û veqetandek dikeve navbera wan. Herçî îşarki, pîrsiyarki û ên nebinavkiri dikevin pêşîya navdêran û bêt tu tiştî bi wan ve dibin. Ên jmarin, hinek ji wan dikevin pêşî û hineka din paşîya navdêran.

### RENGDÊRÊN WESFÎN

124 — Rengdêrên wesfîn gava bi navdêran ve dibin wesfekl wan didin zanin, angu wan diwesifînin.

Wekî niho, bêjeyên « reş, spehl, bibind » rengdêrîne wesfîn in; ji ber ko gava bi navdêran ve dibin, wesfekl wan didin zanin. Her-

## HEDÎSËN CENABÊ PËXEMBER

REHMET Û SILAVA XWEDÊ LÊ BE

691 — Windabûna zanîn û zanaya, pîr bûna nezanî û nezana, zehfbûna serxweş û zinakera ji elametên qiyametê ne.

692 — Yê ko pêşnimêj e bila xelkê ji nimêj û ibadeta xwe aciz me ke, ne pîr bike, ne hindik bike, bi can û bîst bike; bila bîne bîra xwe ko di cemaetê de nexweşin hene, jûrin hene û mirovin hene ko îşê wan bilez e.

693 — Hedîsa qudsî, angu Xwedê li ser zimanê Pêxemberê xwe gotiye: Kelîma şehîdetê keleha min e; yê ko wê bêje, wê têkeve keleha min û yê ko dikeve keleha min ji ezabê min xelas dibe.

694 — Her rastiyê bibêjin; yên ko ew dibihîsin pê kêxweş dibin an ne, ew ne îşê we ye; xema vi tiştî mexwin.

695 — Ji welatê xwe hez bikin; hejkirina welêt ji îmanê lê.

696 — Dilê sêwî û zaroya dilê bêkes û bêçareya xweş bikin. Heke we ev tişt kir hizandin ko Xwedê we dê bigihîne xweşiyê.

697 — Her bixebitin, ji bona we ji xebatê çêtir û hêjatir tu tişt nîne; hon pê dinya û axireta xwe ava dikin.

698 — Berî îş û xebata xwe pêkbtin û piştre dest bi diayê bikin.

699 — Bê destûra Xwedê kes nikare arikariya kesekî bike.

700 — Mirov ne bi diaya xelkê lê bi emelê xwe digehe rehî û qenciya Xwedê.

701 — Mirovê ko bi kêrî dinyayê naye, bi kêrî axiretê ji naye.

702 — Nanê xwe ne ji xebata xelkê lê ji keda xwe bixwin.

kwekt: « Min hespê reş dtî. Ev hespê ha reş e. Ez li ber gola spehlî rûniştî me. Bi min ev gol spehlî ye. Felemêz hilkişîya bû ser vê dara bilind. Ev dar gelek bilind e ». Mîna ko ji van mîsalan dixuye rengdêrên wesfîn di komekê de piştî navdêrên xwe peyda dibin û hi du awayên têvel bi wan tene girêdan.

1 — Bi veqetandekê: tişînga qenc, şejderba dagirtî, mehneke boz, xantkî nizim, mêreklî baş, mirovine xirab, jînine spehlî, destmaleke sor, çelêka doşê. Hingê rengdêr bireserê navdêrê ye.

2 — Bi lêkera bûnê: ev tişîng qenc e, ew xantî nizim e, şejderb ne dagirtî ye, hespê min beza ye, mehîna ko hat avis e. Hingê rengdêr pêveberê lêkera bûnê ye.

## PROVERBES

37—Mezinahiya gund di pehnahiya rê ve xuya ye.  
On reconnaît la grandeur du village à la largeur de la route.

88 — Mêr çem e, jin gol e.

L'homme est une rivière, la femme un lac.

89 — Mêr bê xweyl dibin, jar dibin; jin bê xweyl dibin, har dibin.

Homme seul devient faible; femme seule devient chaude.

90 — Min darek avêt kewê, li kewê ne ket, kew li darê ket.

J'ai lancé un bâton sur une perdrix; ce n'est pas le bâton qui est tombé sur la perdrix, mais la perdrix, sur le bâton.

91 — Mirin ne hêjayî şîné ye.

La mort ne vaut pas le deuil.

92 — Mîrîşka birçî di xewna xwe de garis dibîne.

Poule affamée rêv de maïs.

93 — Mîrîşk avê vedixwe û li Xwedê dimeyizîné.

Poule qui boit regarde vers Dieu.

94 — Mîrovê tironek her dimire, ê mêr car kê.

Le poltron meurt à chaque instant, le brave, une seule fois.

95 — Mîr dimire, xîzan dimîne.

Le prince meurt, le pauvre reste.

96 — Naveklî giran di gundekî wêran.

Grand nom dans village en ruine.

97 — Pere xulameklî qenc, lê axakî xîrab e.

L'argent est un bon valet, mais un mauvais maître.

98 — Pîvaz çîqas îrk bin, serê wan mezin dibin.

Plus les oignons sont espacés, plus ils ont la tête grosse.

( Qui vit retiré se croit un grand personnage ).

99 — Qorîna qulingî jî derdan e.

La grue crie parce qu'elle a mal.

100 — Rovî di ber mêwê re çû, devê wî ne gîha tîrîh go: « Tîrş e ».

Le renard vint à passer devant un cep, il ne put atteindre les raisins, et dit: « Ils sont aigres ».

101 — Rovî tîr e, tîrî tîrş e.

Le renard n'a pas faim; le raisin est aigre.

102 — Royê kiçîk lê herîklî jî avê mezinî lê sekînlî çetîr in.

Ces petits ruisseaux qui coulent valent mieux que grandes eaux qui dorment.

103 — Serê gurlî di bin kum de çetîr e.

Mieux vaut que tête teigneuse reste sous le bonnet.

104 — Serê heft newalan newalêkê ye, serê heft gotinan gotînekê ye.

À l'origine de sept vallées, il y a une seule vallée;

à l'origine de sept paroles, un mot.

105 — Sê gidî hene li dinê, yê li hevraza vedixwe qelûnê, yê mala xwe datîne rex mala bavê jinê, yê bi rê va diçe bi tinê.

Il y a trois fous au monde: celui qui fume la pipe

à la montée; celui qui plante sa tante à côté de celle

du père de sa maîtresse, celui qui chemine seul.

106 — St u sê kilamê hirçê ne, li ser dara

hirmê ne.

L'ours a trente trois mots à dire, tous au sujet du poirier. ( Les ours aiment les poires ).

107 — Şeva tarî di êvarê de kîş e.

Nuit sombre s'annonce dès le soir.

108 — Şev yek e, diz hezar.

Il n'y a qu'une nuit, mais mille voleurs.

109 — Şêr dikiuje, rovi dixwe.

C'est le lion qui tue, mais, le renard qui mange.

110 — Şêr li zozana dihîrmijê, gur li binê beriyê miha berdidê.

Que le lion rugisse sur l'Alpe, le loup poursuivra les brebis dans la plaine.

111 — Şor li mirdaran, siplî li qîrpalan.

Aux lâches les insultes, aux haillons les poux.

112 — Tajîyê Mihê koro herdidanê kîroşka, diçû qijika.

Le lévrier de Mehê koro, on le lâchait sur les lièvres, il poursuivait les pies.

113 — Te beran gurand, ma birayê berên ulne?

Tu as écorché le bélier, n'a-t-il donc pas de frères ( qui chercheront à le venger ? )

114 — Teyr haş e, bi refê xwe re.

Oiseau ne vaut qu'en vol.

115 — Teyrin hene goşt dixwin, hin hene goştê wan dixwin.

Il y a des oiseaux qui mangent la viande, et d'autres qu'on mange la leur.

116 — War ew war e, lê bihar ne ew bihar e.

C'est bien le même camp, mais pas le même printemps.

117 — Xewa miriyau tê, xewa birçîyan naye.

Qui est mort peut dormir, mais non qui a faim.

118 — Xeyalê aşvên av e.

Le rêve du meunier, c'est l'eau.

119 — Xêr bi rêz e, şer bi rêz e.

Le bien a son tour, le mal aussi.

120 — Xîzanî kirasê hesinî.

Misère, chemise de fer.

121 — Xwîn nabe av.

Sang ne devient pas eau. ( On ne peut pas pardonner une offense grave. )

122 — Ya şex Misûr dox dirêj e, naçe tûr.

O cheykh Mesur, la queue est trop longue pour entrer dans la musette. ( Tu ne peux pas nous en faire accroître ).

123 — Yekî li zîkê yekî dida, digo: « A yîştâ min! »

On frappait quelqu'un sur le ventre, il disait: « Ah! mon dos! ».

( A suivre )

TAWÛSPARÊZ

Kiriyariya Hawarê 500 Qirûşên Sûrî

Xwedî û gerîndeyê bepirsiyar: Mîr Celadet

Alî Bedîr-Xan - Şam—Sîriya

Directeur Propriétaire: Emir Dîjêladet Aalî

Bedîr-Khan, Damas-Syrie

ŞAM—1942 — ÇAPXANA SEBATE

## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir Xan
Reşbelek	Bavê Cemşid
Diwana Melê	Qedri Cemil paşa
Nêçira hirçan	Osman Sebrî
Memozîna Xani	Herekol Azizan
Rewşa Dinyayê	Nêrevan
Gramêra kurdîmancî	C. A. Bedir Xan
Gotînên şopewer	Osman Sebrî
Heyran	Stranvan
Coutumes	Tawûsparêz

### TEFSÎRA QURANÊ

168 — Ew tirsonek û minafiqên ko di roja şerê lhidê de ji bajarê Medîne derneketi bûn, wan di heqê mirovên di xwe de yên ko di rîya Xuda de hatî bûn kuştin digot: Heke wan biya me bikirana, ne dihatin kuştin. Bêje wan: Heke gotina we rast e, gava mirin nîziki we dibe ka hon canê xwe jê xelas bikin.

169 — Yên ko di rîya Xwedê da ketine, hon wan mirî mehesibînin. Canfedayên rîya Xwedê ne mirî ne, Xuda wan bi xwedî dîke.

170 — Ew gihane kerema Xwedê û pê dilxweş û bextiyar in û ew dixwazin ji hevalên xwe re ko di rîya Xwedê da xwe didin kuştin mizgîniya xweşiyê bigehînin û ji wan re bidin seh kirin ko ji bo wan ne tîrsa roja pişdawayê û nê ji xem û axin heye, cihê wan bilind e û qedrê wan wê bête girtin.

171 — Mizgîniya kerem û nimeta Xwedê digehe wan û ew seh dikin ko Xuda sewaba qencî û mêraniya wan ne ji bîr dîke û ne ji dihêle ko ew wînda bibe.

172 — Yên ko di şerê lhidê de, piştî ko birîndar bûne, dîsa li gora emrê

Xuda meşiyane û yên ji wan ko bindestiya Xwedê û pêxemberê di wî kirine û tiştine qenc pêk anîne û ji xirabiyê xwe dane paş, ewê bigehin xeyreke mezin.

173 — Binin bira xwe gava mirovên minafiq kom bû bûn û ji şerkerên rîya Xuda re digotin: Dest bi şerî me kin, dijminên we gihane hev, hon hindik in, ew pir in, hon qels in ew xurt in, hon bi wan nikarin; gotina fitnekaran, bawerîya şerkerên rîya Xuda hej qaimtir dikir, dest û lepên wan dişidiya; dilê wan xurt dibû û guh li gotina fitnekaran ne didan û vedigerandin wan û digotin: Xuda besî me ye; jê xweştir arîkar peyda na be.

174 — Bi arikariya Xwedê ew ji mêdana şerî bê xisar û zehmet zivirin û bi mêraniyê ketin pey emrê Xwedê. Kerem û comerdiya Xwedê mezin e.

175 — Bi wê gotinê lblîs dixwest arikarên xwe bitirsîn! Ma ne kifş e? Heçî ko pey bezma Mihemed ne çûne şerî, arikariya Şeytên kirine. Her wekî hon mirovên bawermend in, ne ji lblîs û hevalên di wî, lê ji min bitirsîn.

176 — Dilê te, ji emelê kafirên ko xeyreta hev dikişînin û di xirabiyê de pêşî ji hevûdu distînin xemdar ne be. Ew nikarin ji Xuda û bindestiyên wî re tu zererê bigehînin.

Xuda ji wan re, di roja pişdawayê de ji xweşiyê parekê ji na de wan. Ji bona wan êşeke mezin heye.

177 — yên ko bawerîya xwe a pak bî kufre difiroşin û dikin bihayê wê, ji Xuda re tu zererê na kin, ji bo wan ezabektî dijwar heye.



Jİ CEMŞİD Û SÎNEMXANÊ RE  
YÊN KO BERÊ XWE DANE ZOZANAN Û ÎRO  
DI HAVINGEHA ZEBEDANÊ DE NE [1].

Zaronol

Diya wehûrmûrên we didan hev; hon kar dibûn. Me ji we re gotî bû ko honê herin Zebedanê. We ji min pirst: Zebedanî çi ye, ew jî wek bajarê Şamê ye?

Min ji we re gotî bû; no Zebedanî ne bajar e, Zebedanî zozan e, havingeh e. We dîsan pirst, ma zozan çi ye? Minê ji we re bidaya zanîn, lê nizanîm çi kete navê û ştexaliya me hate birlin.

Niho guh bidin, ezê ji we re di stûnên Hewarê de bibêjim zozan çi ye. Ji xwe hêj çêtir e ko ez hi we re, di vê babetê de, li ber destê Hawarê biştexilim. Bi vî awayî jî hevalên we yên ko li derveyî Kurdistanê bûne û heyama zozanan ne dîtine û ew ne bihîstine ewê jî lê serwest bibin.

Li wextê berê kurdmanc koçer bûn. Gava ez kurdmanc koçer bûn dibêjim, jê mexsed ne ew e ko kurdmancan gund û bajar nîn bûn. Kurdmancan qesr û bircine welê hebûn ko ew jî hezar salan de heta îro li ser hîmên xwe sekinî ne.

Heta vê paşiyê jî birekî kurdmancan di koçeriyê de dijîn û vê jiyînê di ser jiyînaî demanî re digirtin. Çire? Ezê paşê evî jî ji we er bibêjim.

Ez dizanim honê niho jî min bipirsîn, ma koçer jî çi ye û koçerî çi teva ye? Koçer jî wan xelkan re dibêjin ko Havlî û Zivistanan di cihekî de rûnanin û cih û warê xwe li gora sar û germbûna bayî diguhêrtin; li Zivistanê tene germiyanan û li Havînê vedigerin havingehan û diçin zozanan. Sinheta van xelkan jî cotî kariyê bêtir şivanî ye; pez bi xwedî dikin. Herçî xelkê ko ji bervajî ve salê pê de di cih û gundekî de rûdinin û nemaze bi cotkariyê mijûl dibin jî wan re jî demanî dibêjin.

Koçer di tevinê de jî xurt in.

Herçî demanî, ew jî salê pê de di gundên xwe û di bin banan de ne diman. Nemaze yên ko di dora gundên wan de mêrgan hebûn. Biharê, ewan konên xwe li wan mêrgan vedigirtin û havingehên xwe lê de çêdikirin.

Lê. zarono, ez dibînim ko em jî zozanan

Reşbeleka zarowan a pêşîn di hejmara Hawarê a 44an de belav bûye.

Sir-ri wehdet ji ezel girtiye het-ta bi ebed  
Wahid û ferd e bi zatê xwe wî nînin çu eded  
Di qedem da ezel û eyn û ebed ber du yek in  
Sermedyet we dixwazit ne ezel bit ne ebed  
Ferq e wahid ji ehed lê di meqamê semedê  
Bi heqîqet ko bîkin ber du çi wahid çi ehed  
Yek e derya tu bizan qenc çi mewc û çi jî hebab  
Di esil da ko hemî av e çî av û çî cemed  
Aftabi ehedly-yet di xwe de girtiye kewn  
Ne ko ewrek heye lê girtiye çehvên me remed  
Hisn û zatê bit û latan jî cemada semed e  
Jî mîsala senemê weko teclaya semed  
Xeyri derya niye sehra bi heqîqet em-ma  
Jî rûyê kef û kemê ev av biye şibî zebed  
Kul-li yewmin huwe fî şe'n nebi xaffî jê  
Her peyapey jî şûnan digirit feyz û meded  
Ger dê Adem bîdiya sir-ri îlmî Iblîs  
Hînema ebsere keb-bere hîne we seced [1]  
Çî zeman û çî mekan û çî cihat û çî hîdûd  
Çî meqadr û tefasîl û hesab in çî eded  
Çî minafat û lîzûm in çî qiyas û çî mîsal  
Ev çî tewlîd û çî terkîb e çî rûh in çî cesed  
Ser bi eczê dîderit qew-wetê der-rakeyî ma  
Yerce'el qelbû qelîlen we meta qame qe'ed [2]  
Heyret û ecz û serencam di babê nezerê  
Key bi xalîq nezerê qasri mexlûq resed  
Guftigûyl me'rîfetê çendî Mela peyda kî  
Gewhera me'rîfetê nagihete kes bîxered

(١) حینا اصره کبر حینا وسجد

(٢) یرجع القلب قلیلا ومتی قام قعد

Di nîvîştî Hawarê de

یرجع القلب کلیلا ومتی قام قعد

Yerce'il qelbû kelîlen we meta qame qe'ed

bi dûr ketine; lê me dev jê bernedaye. Bi tenê piştî ko salên min gihastîne pênçîhtî riya zozanan jî min re hînek zehmet e. Ji ber ko riya wan bilîndcihan kaş e, hevraz e,

Zozan, zozanî... bîhuştî koçerên mîran. Zozan, ev çî gotîneke spehî û şerîn e. Di kelîla Havînê de bi tenê bi bilêvkîrîna wê can û giyanê mirov honik dibe û bi xiyala wê mirov hişkahiya tebetê ter û heşîn dibîne. Belê zozan... zozan... bîhuştî şivan û bêrîvanan. Nizanîm çawan bû ko heta niho min ji we re qala zozanan ne kir.

Birakî we hebû; ew nûxwiriye min bû; wê ew ne dit. Min navê mamekî we lê kiri bû: Sefder. Derdekî bêderman pê ket û herwekî hon dibêjin û wek manî ko ewî navê wî hil-digirt, çû cem Xwedê. Sefder şeşmehî û di nav dergûşê de bû; jî xwe tucaran li ser piştî xwe ranebû, min jê re digot: « Sefder, koçer çûne zozanan ». Sefder bêl ko bizane kêfa xwe jî vê gotîne re tant û dikenî. Ev gotin bîr û

tirba wî ye. Ji ber ko kekê we berî ko zimanê wî bigere çû bû nik Xwedê û ne wek Sinem-xanê «Ez sîtiya Bota me» ne jî wek Cemşid «Ez merê qenc im» gotî bû.

Lêbelê, zozan, zozan... warê siwarên serhedan.

Ji germiyanan diçine zozanan.

Zivistan e, welatê kurdan di bin poşiya berfê a sîl de nixumandî, nivistî ye. Koçer û dêmanî gibaştine hev; li ber tîfkê qelûnê dikişnin. Terş di şkestî û zivîngan de, dewar di atewî û saxuran de ne. Jin li aliyê malê nanên xwe bi tenûrê ve didin, hiriwê dirêsin, goran çêdikin û jî zarowan re dilorînin, der-gûşên wan dihejînin.

Di civatînan de koçer jî dêmaniyan bêtir dipeyivî û tiştên ko di riyên zozanan de ditine jî civatîştînan re qise dikin.

Bi vî awayî digehin Biharê; koçer û dêmanî cejina Newrûzê bi hev re şahnet dikin, qewitiyên xwe li hev dikin; xatir jî hev di xwazin; heta bi Patzê.

Seqem şikestiyê; zora sermayê çayê; di lêf û pesaran de giyanermik dest bi şînbûnê kiriyê; hirç jî kunên xwe hatine der û lê digerin.

Sibe roja barkirinê ye. Koçer, tev de, jin û mêr, pîr û ciwan wek ordîwa ko seferberîya wê hate tîlan kirin, xwe kar dikin. Karê seferêkê dîr, seferêke welê ko bert her bi jor û her ber bi bilindcihan e; pê bi pê, gav bi gav jî ez-mên re nîzîngîr û jî nîzmiyê dîr, hildikişin... hildikişin...

Kitkitên konan li erdê raxistî ne... stûn, şelt, gulîçk, çasir, nêvber, têj, perispan, kêlik, xurb, çîl, berçîl, ping, sing, bersing, tîrîj, çap h.d.... Li rex wan tîr, tûr, xurçik, meşk û hevân; diz û dizik, den û qersûnek in. Herçî beroş, aênî, cîfîl û bergeş; jî xwe ew jî herî çend rojan de nik spiker in. Jin li wan tekberan kom bûne, toz û ritana wan diweşînin, li wan hûr dibin, derzî û şûjî bi destî ve, wan didûrin, û pl ne dikin.

Li aliyê hewşê şingîniya çakûç û simtiraşan e; dewar li rex hev sekîni, li dor lingên xwe li ber solbend radikin û solên xwe jî bo kuç û ferşên zozanan nû dikin.

Wê şevê li koçerên ko rojê pê de xebitîne, xew giran bûye. Lê berçî dewar, wek zarokên ko kêfa xwevî solên xwe ên nû re antoe şevê pê de lingên xwe li erdê didin û pîkolîyê dikin; kêfxweş in. Ji rûniştîna Zivistanê tîrxan bûne.

Bi sariya sibê ve karwan bi rê ketiye. Karwanekî welê qey tu dibêjî bajarek e, bi

ling bûye û bi rê ve diçe. Ma çi heye ko ne pê re ye.

Ji xwe şivan keriyên xwe berîya karwên ajotîne û seyên gurxenek li gurên birçî yên ko li riya pez kemîn bûne, qelîblîne û hevûdin dirandîne.

Karwan dimeşe... sîpanîne berfê, yên ko jî dîr ve, bi tîrjîn tavê ên pêşîn, wek plpo qîne şikestî diçirîşin, dest bi xuyakirinê dikin. Di hin deran de berf heliyaye û erd di spîtabîya berfê re wek qulên çarşeveke spîûkevin reş dike.

Tayên berfê jî rûyê erdê radibin û wek peline sîl, xwe her bi bilindcihan ditewînin. Kullikên ko xwe di bin germiya berfê de veşartî bûn, adarîk, pelezêsk; pîtanîk, fîrtak û gangîlok, ev bûkên Biharê — mîna çiçikên mîrîşkan yên ko jî qalîkên xwe ên sîl der dibin — sor, sîl, mor û xumrî serî hildidin.

Bûkên nû, yên ko bi nûxwiriyan xwe ve jî bo cara pêşîn di vê rê re diçin bi her zarîna berşîrên xwe disekinî û devên zaroyên xwe didin ber singên xwe. Herçî jinên sere bi çavîne mîhîrvan li wan fedikîrin û dibêjin «Heq di destê wan de ye, me jî holê ne dikir, me jî bawer ne dikir ko, heke zaro hinek girîyan heye ko tifaqek li wan biqewime. Lê piştî ko wan jî çendek anîn, ew jî ewê bizanînin ko êşa ko zarowan nagirîne jî êşa ko wan digirîne xedartir e» û karwan jî deştê bi hewa dikeve, karwanvanî şa û bi kêf in... distîrên... dinehwîrtînin... Zozanvaniyan zozanên dilê xwe diçerandin...

Koçer diçin zozanan û jî nû ve digehin warên ko tê de ne kêç, ne mêş ne jî pêşî hene. Hewa saf û sivik e, sîra bê giraniya bedenên wan şîştîye. Koçer jî nû ve çîst û çalak in; xwîn di rayên wan de ne wek ava çeman lê wek ava şîp û avşaran diherike. Lingên ko niho di ser şehar û saxuran re xwe zer kerîne di laşên wan de tu movîkên tîrxan ne hiştîne.

Koçer diçin, diçin... zozanan. Rêberê wan berfê; dane şopa berfê. Berf dihele, ew dîdin pey... Heta roja ko berf jî nû ve dest bi ketîne dike. Koçer hingê jî ber berfê dikîşin. Biharê, wan da bû pey berfê. Patzê, berf dide pey wan û wan dadixîne jêr. Qey berf naxwaze ko koçer pê lê bikin û sînga wê a sîl bi reşikên xwe reş bikin. Koçer jî ji ya wê dikin, pê lê nakin û xwe didin deştê.

Belê zaronol koçer bi vî awayî Bihar û Havîna xwe di zozanan de dibortînin û Patzê



## NEÇIRA HIRÇAN

Li Mirdêsa di gundê Xêştûrê da bi navê Mela Ell nêçirvanek hebû. Rojekê Mela Ell çû bû nêçira kewan û sê kew kuştî bûn. Di vegera mal da rastî hirçekî kûti bû û di navbera wan da pevçûneke xweş bû bû. Ji bo ko xwendevanên me agahl ser û berê vê pevçûnê bibin divê em rê bidin gotina nêçirvan. Mela Ell got:

Wê rojê ez çû bûm nêçira kewan û min sê kew kuştî bûn. Di vegerê da ji bo vehesînê ez li ser kanikê rawestiyam. Hîa ez nih rûniştî bûm ko min hirçekî nêr li pêşberî xwe dit. Herwekî em ji hirçan dizanin; heya mirovek teng nekeve ser, an bi birln neke nizingî mirov nabîn. Lê vî hirçî welê ne kir. Ne ez teng kelî bûm ser wî û ne jî min ew bi birln kirî bû. Tevî vê yekê hat û li pêş min rawestî. Tu deng jê ne dihat, her li çavên min dinêrî. Xweya bû tişteke di dilê wî da heye. Tifinga min ne vala bû, lê tu berik jî tê da tine bûn. Herwekî adet e ji bo nêçira hirçan em du berikan dêxine tifingên xwe. Îro ji bo nêçira kewan min çend zo balme (xurdek) xistî bûn ê. Bi vî zikê tifingê min ne dikarî bela xwe di hirçî bida û bi rihelî jî jê filitîn dişwar bû. Wî her li çavên min dinêrî; lê nêrnek bi neyarî.

Êvar nîzîng bû, ji bo min çayîna diviya bû. Heya şev reş bûye min nikarî bû welê mat li pêş hirçî bimîn; her tevgerê diviya bû. Hingê hate bîra min: Ne be ko hirçî ji birçîna berê xwe da be min û çav li xwarina goştê min be? Li

---

vedigerin germiyanan. Û kurdmanc hejl vê jiyînê, hejl koçeriyê dikin. Çire? Ji her ko koçerî azahl ye û kurdmanc bendeyên azehiyê ne û azahl di bajarên wan de ne maye.

Ji ber ko bajar, bajarên Kurdistanê ketine destên dewletên biyani û memûrên ne ji wan. Bajar bajarên wan, lê qanûn û nizam, qanûn û nizama romiyan... Kurdmanc jî wan qanûn û nizaman derevîn û bi tenê koçeriyê ew jî qanûnên bajarên, jî nizamên dewletên vegertiyan xelas dikirin û ew digihan-din bilindihên çiyân, çiyayên ko ber bi ez-manan sert hildidin û nizingî li Xwedê dikin.

Belê zaronol jî ber ko qanûn û nizamên romî ketî bûn bajarên wan, kurdmanc xwe didan çiyân û xwe distastin qanûn û nizamên Xwedê. Herçî li jiyîna Kurdmancan a civakî hişyar in rînb dizanin ko kurdmancan xêra eşîrî û koçeriyê ziman û nijadê xwe pak û weke xwe hilanîne.

BAVÊ CEMŞID

ser vê ramanê min kewek di tûrê xwe yê nêçirê da bi derxist û avête pêş wî. Hirçî termê kew bi rihelî rakir û da ber difna xwe bin kir û paşê berjêr avêt. Bi vî awayî min her du kewên din jî yek bi yek avêtine ber, wî jî ew her du kewana di par ra gihandine yê pêşîn. Vê carê êdî tişteki ko min bavetanayê ne ma bû. Bê givîşk çavên wî li min bûn. Hêdika min dest bire ser tifingê. Wî qes da min nasî bû ko di pê ra xwe avête ser min.

Ji ber ko kantî di navbera me da bû bert ko ew xwe bigehtne min, min berê tifingê li slînga wî saz kir. Bi dengê tifingê ra hornek ecêb bi ser ket û hirçî xwe gihand min. Berê, tifing jî dest min girt du ta kir û avête wê giharê hînga xwe tevlê min kir. Standin û du ta kirina tifingê du sê saniyan ne ajotî bû. Bê ko ez rêke felatê biramim, min xwe di himbêza hirçî da dît.

Erê çiqas ko neyarê min hirçekî nêr bû; lê ez bi ged û hêlên xwe jê ne kêmîr bûm. Min jî dest di nava wî ra bir û me hev û din kuf kir. Heke mikûna hirçî hebûya ko min jî xwe bi dîr xe; tegez wê bi çepên min bigirta û ez li kuçekî bidama. Lê min nava wî zemt kirî bû û diviya bû piştî wî deynim erdê. Sereki dirêj me hev û din bir û anî. Dawî bi piraniya tîfkirina ser çavên min, ez şaş kirim û nava xwe di nav çepên min da bi derxist. Hînga rahîste milê min û du sê caran ez li erdê xistim. Êdî tu ya xêrê di cendekê min da ne ma bû û min nema dikarî bû li ber xwe bidim. Wê demê hirçê delal hate beuda min û kulmikan.

Êdî nema min dikarî bû çavê xwe rakim. Beri her tiştî pencek li serê min da û çermê serê min daxiste dor guhên min. Paşê bi dilê xwe jî şîg û piştî min da. Sereki ez welê di nav lepên xwe da vepûrisim, dawî min dît ko dev jî min bernade; êdî min xwe li mirinê na.

Gava hirçî dit ko ez nema dilebitim, jî lêlanê geriya û guhê xwe da ser hevîla min. Min qenc bihna xwe bi xwe da girt, ne deng û ne jî piştî jî min ne dihat. Dema ez di wî hali da dîtîm ez hiştîm û çû. Lê jî xilxila xilîkên ber lingên wî min zant ko dîr ne çaye.

Sereki ez welê mam û ne dipizivim. Gava dît ez napizivim cardin vegert ser min. Min dîsa bihna xwe bi xwe da girt. Vê carê wek bijîşkê ko dixwaze nexweşiya nexweşê xwe fêr bibe dîr û dirêj cendekê min palmisand û guhê xwe da ser difna min. Dawî ko bawerîya xwe bi mirina min anî, hema di rex min da bi çepolan gorek di nav xîçilan da veda û ez rakîşandim ê. Dîsa bi kevîr û xîlika

ser min por kir. Qey ko bi wê ji dilê wî rihet ne bû bû ko, dixwest zinarekî mezin ji bi ser min da wer ke; da ko ji derketina min bê qisawet bimlue.

Di rex me da zinarekî zehf mezin hebû, çû xwe da paş û zor kir. Zinar gelekî mezin bû, hikmê wî lê ne dibû. Eger ew ji bi ser min da tot kiri bûya êdî دنیا ko min bidîya ew hînga bû. Sed xêra Xwedê ko zora wî li zinêr ne bû û dev ji min berda û çû. Heya giha serê çiyê dengê pelepela wî di guhê min da bû. Ji ber ko zora wî li zinêr ne bû hû ewçend kiz dibû û ji erna dikire lewelew.

Pişti ko di gaza çiyê da wer bû êdî nema deng jê hat, şev ji qirîya bû, kevir û xilîkên ko bi ser min kirîbû ne gelek bûn. Min da xwe û ez rabûm. Cendekê min herwekî bi mirkut bête kutan, ciheki rihet tê nema bû. Beri her tiştî min çermê serê xwe di dor guhên xwe da rakir û herdu serî anîn berhev û destmala xwe di ser ra girêda. Paşê min her sê kewên xwe bi tîfînga dutabûyî va li erdê hilanîn û berê xwe da mal.

Herwekî em ji hîrçan dizanin goştê taze û nih naxwin. Çi gava çend roj bi ser da

çûn, û genî bû bîr ketê; dê hînga bixwe Me, q-seda ko cendekê min vedîşart jî, ji bo wê yekê bû. Ew zinarê ko dixwest bi ser min da tot ke jî, ji bo ko tu cinawirên din berî hatina wî goştê min nexwin.

Dem a hîrçî ez vedipûm ser hev û li min dixist min sonda tola xwe xwarî bû; lê çawan careke din ez û wî, emê raste hev bihatana? Hîrç di çiyê da pir in; paşê min dê ew çilo binastna?

Di vegeza mal da awayê ko ez pê tola xwe ji wî hîrçî hilnim hate bira min. Ji xwe piştî çend rojan ji bo xwarina goştê min ê genî wê bihatana cihê ko ez tê da veşartî, hînga tol girtin gengaz bû. Berî her tiştî zûka dermankirina birnên min diviya bû.

Bi niv şev gihame mal û min birnên xwe dane derman kirin û pêçandin. Roja sisiyan ez di nivînê da bi derketim û tevî hîrayê xwe hatime ser gora ko hîrçî ji min ra çêkiri. Me di sa gor weke berê kir û li pêşberî gorê jî kozikek ava kir.

Ji wê rojê da min û birayê xwe me dev ji kêr û îş berda û ji sibê heya êvarê di wê kozikê da çavdariya gorê û hatina hîrçî kir.

## MEMOZINA EHMEDE XANÎ

— 5 —

ESYARI MEDIHETA TEWAIFÊ DI  
KURDAN E, BI ŞECAET Û XÊRETÊ  
Û IZHARABEDBEXTÎ Û BÊ TALIIYA  
WAN E DIGEL HINDE ŞECAET Û  
HEMIYETÊ

Saqî tu ji bo Xwedê kerem ke  
Yek cir'ei mey di camî cem ke  
Da cam bi mey cihan-nîma bit  
Herçî me irade ye xuya bit  
Da keşif bibit li ber me ewnal  
Kani dibitin miyesser iqbal  
Idbarî me wê giha kemalê  
Aya biwe qabilî zewalê  
Ya her wibe dê lîstîva bit  
Het-ta weko dewr mintîha bit  
Qet mimkin e ev ji çerxî lewleb  
Talî bibitin ji bo me kewkeb  
Bextê me ji bo me ra bibit yar  
Carek bibitin ji xab hişyar  
Rabit ji me jî cibanpenahek  
Peyda bibitin me padîşabek  
Şîrî hinera me bête danî  
Qedri qeîema me bête zanî  
Derdê me bibînitin îlacê  
Îlmê me bibînitin rewacê  
Ger dê bebiwa me serfirazek  
Sahib keremek sixan-niwazek  
Neqde me dibûye sik-ke mekûk  
Ne dima wihe bêrewac û mekûk

Herçend ko xalis û temîz in  
Neqdin bi sik-keyî ezîz in  
Ger dê hebiwa me padîşahêk  
Lafiq bidîya Xwedê kulahek  
Tayîn bibiwa ji bo wî textek  
Zahîr ve dibû ji bo me bextek  
Hasil bibiwa ji bo wî tacek  
Elbelt-te dibû me ji rewacek  
Xêinxwarî dikir li me yetîman  
Tinane derî ji dest leîman  
Xalib ne dibû li ser me ev rûm  
Ne dibûn xerabey di dest bûm  
Mehkûmî eleyh û sialik  
Mezlûb û mitîrî tirk û tacîk  
Em-ma ji ezel Xwedê wisa kir  
Ev rûm û ecem di ser me ra kir  
Tebeiy-yetî wan egerçî ar e  
Ev ar li xelkê namidar e  
Namûs e li hakim û emîran  
Tawan çî ye şair û feqîran  
Herçî bire şîrê destî him-met  
Zebt kir ji bo xwe hîmirî dewlet  
Lew-ra ko cihan wekî erûs e  
Wî hikim di destê şîrî rûs e  
Lê eqd û sêdaq û mihr û kabîn  
Lîtf û kerem û eta û beşîn  
Pîrsî ji dinê min ev bi hikmet  
Mihra te çî gote min go him-met  
Hasil ko dinê bi şîr û îhsan  
Texîr dibit ji bo wî îhsan  
Ez mame di hikmeta Xwedê da  
Kurdmanc di dewleta dinê da  
Aya bi çî wechl mane mebrûm  
Bîfîcmîe ji bo çî bûne mekûm

Wan girt bi şîrî şehîrî şîhret  
Texîr kirin biladî him-met  
Her mîreklî wan bi bezlî Hatem  
Her mîreklî wan bi rezmî Hîstem  
Bîfîkir ji ereb heta ve gurcan  
Kurdmancî ye bûye şîbî bîrcan  
Ev rûm û ecem bi wan hisar in  
Kurdmanc hemî li çar kenar in  
Her dû terefan qebîlî kurdmanc  
Mo tîrî qeza kirîne amanc  
Goya ko li serhedan kîlîd in  
Her taife sed dîkin sedîd in  
Ev qalzîmî rûm û behrî taçîk  
Hîndê ko bikin xîrûc û tehrîk  
Kurdmanc dibîn bi xûn mîlet-tex  
Wan jêk ve dîkin misalî berzex  
Cwanmêrî û him-met û sexawet  
Mêrînî û xêret û celedet  
Ew xetme ji bo qebîlî ekrad  
Wan dane bi şîr û him-met û dad  
Hîndê ji şecaetê xeyûr in  
Ewçend ji min-êtê nîfûr in  
Ev xêret û ev îliw-wî him-met  
Bu manî'î hemlî hari min-net  
Lew pêk ve hemîşe bê tîfaq in  
Daim bi temer-rid û şîqaq in  
Ger dê hebiwa me it-tîfaqek  
Vêk ra bikîra me îngîyadek  
Rûm û ereb û ecem temamî  
Hemîyan ji me ra dikir xulamî  
Tekmil dikir me dîn û dewlet  
Tehsil dikir me îlm û hikmet  
Temytz dibûn ji bev meqalat  
Mîmtaz dibûn xndan kemalat

# REWŞA DINYAYÊ

**PIRSA HINDISTANÊ** — Li 7ê Tebaxê kongra Hindistanê di Bombayê de gihaye hev. 10 000 nîmî-nande di kongrê de hazir bûn. Mehatma Gandî qederê saet û nîvekê peyivî û ji lebatan re sebebên gihanheva kongrê da zanin. Kongrê piştê dest bi mîzakera qerara encimena icraî kir. Encimênê qerar da bû ko ingilîz ji Hindistanê derkevin û îstîqlala Hindistanê bête îlan kirin. Kongrê ev qerar bi pîranîyêke mezin tesdîq kir û ji milê din qerar da heke ingilîz ji welatê wan derneketin xelkê Hindê dest bi layana medenî bikin.

Ingilîzan dît ko bîstehî yanî asayîşa Hindistanê wê xerab bibe. Li ser vê yekê û li 9ê mehê waliyê Hindistanê Gandî, Nehrû, Mewlana Azad û ji lebatên kongrê qederê 250 peya dan girtin. Li ser vê yekê di bin bajaran de esker û ehalîyan li hev xist. Lê eskeran zora ehlîyan bir.

**ŞERÊ MISIRÊ** — Di şerê Misirê de tiştekî nû nîne. Welê dixuye ko her du alî ji xwe ji bo êrîşeke nû kar dikin. Bi tenê di Behira-sî de ji 11ê mehê heta 14an şerêkî behirî û hewayî çêbû. Vaportîşeke ingilîzî ji Cebeltariqê diçû Maltayê. Dema qesê di ber Sicilyê re diborî balafirên mihwerê bi ser qesê de girtin û stola talyanî jî xwe tevî vî şerî kir. Elemanan û talyanan got ko di vî şerî de ji cenkeştî û barkêşên ingilîzî qederê panzdeh keştîyan hatine bin av kirin, qesê jî hev de ketiye û jî vaporan hin vejeriyane Cebeltariqê û çendek gîba hin jî Maltê, tu xêr di wan de ne maye.

Li 14ê Tebaxê ingilîzan der heqê vî şerî danezanek belav kir û got ko eleman û talyan mîbalekê dikin û rastî ev e: Di vî şerî de balafir-bilgîra ingilîzî « Iğîl » bi 22000 ton mezin û krewzora Mençester bi deh hezar ton mezin û hin vaporên barkêş binav bûne û xesar gihastîye hinan; lê qesê xwe gihandiye Maltê. Ingilîzan jî krewzoreke talyanî û du noqar xeriqandine.

**ŞERÊ PESİFKÊ** — Li Pesîfikê ji 7ê vî mehê ve emêrikanî dirêjtî japonan dikin.

Li ser rîya Emêrîkê û Ewîstralyayê komek girav

Roja heştan piştî rohelat bi du saetan hirç di gaza çiyê da bi derketî û berê xwe da gora min. Tîfîngên me di dest me da bûn; lê ne wek berê ji bo neçîra kewan dagirtî, vî carê ji bo kuştina hirçektî nêr. Me her yekî du berik êxistî bûnê. Rast hate ser gorê û dest bi vedanê kir. Gava gor vala dît, borîn ketê û rabû ser lîngên paşîn. Wê hingê bû ko dûyê du tîfîngan di kozîkê da dirêjtî pêstra hirçî bû û pê ra deng jê vemîrî.

Piştî vî bi du rojan min kavilê hirçê xwe di diwana axayê Mirdêsan Hecl Ebûzer axa da raxistî bû. Herçî kesên ew kavil dîtî digotin: « Me hîn hirçektî holê mezin ne dîtîye ». Vê gotina han hinekî şerma bindestiya min direvand û min bi xwe ra digot: Bindestî ne jî plîsiya min, lê ji pîrxurtiya hirçî bûye.

OSMAN SEBRÎ

heye, ji wan re giravên Silêman dibêjin. Japonan ev girav di vî şerî de xistine destê xwe. Li 7ê Tebaxê qewetên emêrikanî bi hin yekîneknên ewîstrallî ve dirêjtî wan giravan kir û esker derxistê hinan. Li bej, li behir û li hewayê şer e. Lê heta niho jî vî şerî tu netîce ne hate rû.

Japon dibêjin eskerên emêrikanî yê ko ketine bejê ji warên xwe qut bûne, ji her ko vaporên emêrikanî vejeriyane wargehên xwe. Lê emêrikanîyan da zanin ko îşê giravên Silêman heye ko gelek dom bike û beriya netîca qetî emêrikanî hev danezanan belav bikin.

**ŞERÊ ÛRIS** — Bi pêşveçûna ordiwekî elemanî, di qada nivro de rewşa Rûsyayê hero xeternaktir dibû û Ûris ev venedîşartin. Bi dengekî bilind ev digotin û arîkariya hevalbendên xwe dixwestin. Ev bûne deh panzdeh roj rojnema û radyoman digot ko Çorçîl ji bona vî yekê çûye Moskoyê. Lê Londrê ev nûçe teyîd ne dikir. Li 17ê Tebaxê hikûmeta Ingilîterê bi awakî resmî da zanin ko Çarçîl çûye Moskoyê û digel nîmîmendeyê Emêrîkê Mr. Herîman bi darî Stalîn ketiye û ji bo şikestina elemanan û zefera sondowariyan tevdirêrî gerek mîzakere kirine. Welê têtê texmîn kirin ko di vî hedûdîtinê de mesela eniya nû jî hate mîzakere kirin.

Herçî qada şer, di eniya bakûr de Ûris êrîşî dikin û eleman di mîdafesê de ne. Lê di eniya nivro de êrîşa elemanan dom dike û ordiwekî elemanî gihastîne qûntar û deriyên çiyayên Qevqasê.

Piştî ketina Rostovê, elemanan jî alîkî berê xwe da rêhesina ko Stalîngradê bi bendera Novorostskê re girêdide û ji aliyê din bi qewetên ko li nivro derbasî çemê Don bû bûn qesta rohelê kir.

Baskê ko berê xwe da bû nivro piştî ko peravên behira Azovê yê rohelê paqîj kirin li 2ê Tîrmehê gihastê bajarê Yêskê û rêhesina Stalîngrad-Novorostskê birî û li 4ê mehê gibaştê çemê Kûban û pîrîn avêtane ser çem. Ûrisan gelek berevaniya mîntîqa Kûbanê kiri be jî eleman li 9ê Tîrmehê ketine bajarê Kresnodarê, merkeza Kûbanê û jê avêtine Meykopê. Li Meykopê birine petrolê hene. Ûrisê begav man, agir bi bîrên petrolê xistin û terka Meykopê jî dan. Bi vî awayî elemanan nîzingî li peravên Behira-reş yê rohelê jî kir. Baskêkî ordiwa elemanî piştî vegertina Maykopê berê xwe daye Grosniyê, mîntîqeke petrolê.

Herçî baskê ko berê xwe da bû rohelê di dirêjahiya çemê Manêç de meşiya û berê xwe daye behira Qezwinê. Eleman bi vî awayî di wextekî kurt de gelek pêş ve çûne û bakurê welatên Qevqasê tev de vegirtine. Lê Stalîngrad hej ne kotîye destê wan û ev bûne 3 hefte dora Stalîngradê de şerine diwar çêdibin. Li 15ê mehê elemanan da zanin ko di hindava Stalîngradê de eskerên elemanî di her derê de gihastîne Çemê Don. Dîlê elemanan hebû di Stalîngradê re bigebin Volgê. Lê gava dîtine ko Stalîngrad gelek li her xwe dide niho dikin di Esterxanê re bigebin devê Volgê û wê riyê jî bigirin.

Li gora nûçeyên paşîn eleman di hindava Stalîngradê de li enîşka çemê Don jî derbas bûne û gihastîne wî milê avê. Bi vî awayî elemanan 60 kîlometîr nîgingî li Stalîngradê kriye. Herçî Grosnî, di vî mîntîqê de jî Ûris begav man û xwe dane paş. Di navbera elemanan û petrolên Grosniyê qederê 200 kîlometîr maye. Şam: 15 Tebax 1942 NÛREVAN

# GOTINËN ŞOPEWER<sup>(1)</sup>

## BEXT

Bi navê bext tiştek heye ko carina di rewşeke keşnedî da xwe dinimîne û bihayê kira wê hingê wînda dike. Lê bext ne rasthatî-neke durtî kirê ye. Ew hawîla kireke kevn e; ko di demeke nepayî û di rengê rasthatîne da li mirov bi dertê. Kireke baş, bextçakîyê û kireke nebaş bextereşîyê tînin pêş xwedîyê xwe.

Ne bi tîne kirên mirov, carcaran kirên hav û kalan jî di kirasê « bext » da têne pêş kur û neviyan.

## TIRSA MIRINÊ

Kesên ko dimirin digihin Xudayekê dilovan. Ji ber vê yekê tîrsa mirinê jî mirovên bawermend ra şermeke mezin e.

## ŞOPA TERBIYÊ

Terbiye ji sê tiştan pêve hemî sinçiyên<sup>(2)</sup> mirov herwekî bixwaze diguhêzîne.

mêranî — tîrs  
comerdî — çikost  
xêrxwazî — bedxwazî

Ev her sê tiştên han di afirandina mirov da çilo bin welê dimînin Terbiye tucaran nikare mirovekî mêr, tîrsok û comerd, çikost û xêrxwaz jî, bedxwaz hîke. Ji vê pêve herçî sinçiyên mirov hene bi terbiyê têne guhartin û mirebî çawan bixwaze dikare berê şagirdê xwe wê da biguhêzîne.

Bi tîne yek heye ko ji van her sê sinçiyên jorin şopa heval an mirebî çêçêkî kêman zêde dike; lê bicarê nikare bade.

OSMAN SEBRI

[1] Şopewer: Her tiştê ko lê hikim û manake kûr heye û di bîr û mejîyê mirov de şopina dibîle û zû zû nayete jî bîr kirin.

[2] Sinçî: Bi mana exlaq û seciyê ye. Yanî xesletên mirovan ên zîkmakî û ên destexistî. Sinçî xwerû kurdmançî ye. Ma te li sinçiyê wî nihêri, ne tu sinçî ye.

## HEYRAN

Heyran lşev meçe, li hire be

Wê bê pêşîya heyranê min nijda şemer û ereb e  
Wê te bikujin xelk ê bêjin Eysmelana reben

[biye serê loman û sebebe

Ser serê min hat heyran mehvanê paşmeşrebê.  
Heyran Xwedê xerab bikê keşanê

Xaniyê Mîr Ehmedê min raserî kolanê

Minê divê ezê şeva nîvê şevê herim tewafa

[xal û nîşanê gerdenê

Devê min şemîtî ketî bi ser lefika kitana

[Eysmelanê.

Heyran tu l xirab l

Tu li derê mala dabê min rûdînî qet ranabî

# BINGEHËN

## GRAMËRA KURDMANÇI.

— 18 —

125 — Rengdêrên wesfîn li gora bastûrêw xwe an sade an hevedidant ne. Ên sade ew in ko di zimên de şiklekî wan l sabit heye û ji bêjeke bi tenê têne pê. Wek: sor, girtî, niviz, qels, nerm, xurt, şikestî, weza, dirêj, kurt, fireh, pehin, bilind, teng h.d.

Ên hevedidant ew in ko jî bêjeyên têvel tênepê. Ev rengdêrên ha di zimânê kurdmançî de bê pivan in û di dema xebirdan an nivîsandîne de hinên din, jî nû ve têne saz kirin. Mîna: pozberan, çavbelek, dilteng, xweşçivat, nûza, dîlşikestî, kêmxew, sorboz, warxweş, destvala h.d.

126 — Bi gelemperî rengdêrên wesfîn di komekê de bi navdêrên xwe ve peyda dibin. Lê gava navdêrên wan ne bi wan re ne, yanî ew jî komekê kelîne, hingê navdêr bi veqetandekên ko rengdêr bi wan ve dibûn têne nimandin. Herwekî di madeyên (64,68)an de hate gotin veqetandek dikeve pêşîya rengdêrê û wezîfa pronavê dibîne. Heke di qisetê de, jî berê de, çêl li hêsp û mehnê hati be kirin, hingê mirov li şûna ko bibêje: « ez hespê boz dibînim » an « ez mehnê boz dibînim » dikare bibêje: « ez ê reş dibînim » û « ez a reş dibînim »

127 — Lê carina navdêr jî qisetê yekcar dikeve û rengdêr wek pronavekê li şûna [wê radihe Hingê rengdêr, jî ber ko wezîfa navdêrê dibîne û wesfê xwe ê rengdêrîn wînda dike, wek navdêrê tete tewandin û veqetandek bi paşîya wê ve dike.

Stranê gotiye:

Tîrsim bîmîrim ne bînim esmera min

Riya Mêrdîne bi kaş e, delala min.

Bêjeyên « esmer » û « delal » her du jî rengdêr in. Lê ji ber ko li hire bûne navdêr û şanî jin an keçîkekê didin veqetandeka mê bi van ve bûye. Heke me malîkên stranê vegerandin esilên wan, hingê navdêr vedigerin şûnên xwe û rengdêr bi serên xwe û bê veqetandek dimînin:

Tîrsim bîmîrim ne bînim yara min a esmer

Riya Mêrdîne bi kaş e, yara min a delal.

Tu we bîkî, ezê bêjim bab û brayên xwe ev

[sêwîyê heyrana jî min venabî.

Heyran digo keçîkê ez xirah im

Êz derê mala bebê te rûdînim qet ranabim

Ti nebejî bab û brayên xwe, ti bêjî xunkarê

[dîne îslamê ez jî te venabim.

## COUTUMES ET TRAITS DE MOEURS

124 — Em bûne kirtvê hev, xwîna me li dawa hev ketiye.

Nous voilà « kirtv », le sang de chacun de nous a taché le pan du vêtement de l'autre.

Le « kirtv » est celui qui tient dans ses bras l'enfant que l'on est en train de circonscrire. La « kirtvati » établit entre les membres des deux familles intéressées ( ils deviennent « kirtv » les uns par rapport aux autres ) des liens analogues à ceux de la parenté par le sang.

125 — Konê reş kêmaniyê qebûl nake.

Tente noire ne souffre aucun manquement.

Allusion à l'hospitalité dont les nomades sont si fiers.

126 — Mêvanê yeki, mêvanê gundeki.

L'hôte d'un habitant est celui de tout le village.

127 — Şal û şapik şixlê saxê.

Pantalon et gilet de Chakh,

( Les tissus de Chakh sont renommés. )

128 — Reşik pelin, devî xwar.

Les espadrilles larges et la bouche de travers.

129 — Bavê keça siltan e.

Qui a des filles est un roi.

( Il peut en effet faire le bonheur ou le malheur des prétendants. Allusion aux difficultés qu'éprouvent dans certaines régions, les jeunes gens à se marier, en raison de la dot élevée qu'ils doivent verser au père de la fiancée ).

130 — Bê şêx û pîr meçe diwana mîr ko tu nekevl halê feqîr.

Sans cheykh ni pîr, ne va pas chez l'émir, si tu n'en veux pâtir.

( Il ne faut pas s'adresser aux grands sans être recommandé. Les cheykh et les pîrs, chefs religieux servent souvent d'intercesseurs ).

131 — Çavzer hebin, çavreş pîr in.

Pour peu qu'il y ait des yeux marrons des yeux noirs sont trop nombreux.

( Les yeux marrons, considérés comme un signe de beauté, sont, au Kurdistan, plus rares et par conséquent plus appréciés que les yeux noirs ).

132 — Dawel feriki, berhûrî hetiki.

Après la noce, la « berhûrî » a honte.

( C'est à dire : chaque chose en son temps. La « berhûrî » est la matrone qui accompagne la mariée jusqu'à la chambre nuptiale ).

133 — Dewletiya bi lez, rez û pez.

Fortune rapide: vigne et moutons.

( Au Kurdistan, la culture de la vigne et l'élevage du mouton permettent de réaliser de gros profits, les bonnes années ).

134 — Dijminê bêv nabê dostê lêw.

L'ennemi du père ne devient pas l'ami du fils.

( Allusion aux querelles héréditaires qui divisent les tribus kurdes ).

135 — Ez mineta axê jî li xwe nakim.

Même envers mon agha, je ne veux pas avoir de dette de reconnaissance.

136 — El êla min e, nav navê Bişarê Momin e.

C'est ma tribu, et le renom revient à Becharé.

( Se dit en parlant de quelqu'un qui profite du travail des autres ).

137 — Go ziyaretê: « min gelek cara bi derewa bi te swind xwariye ». Go: « Mi jî gelek cara mala te xerab kiriye, lê tu bi xwe nizani. »

Il dit au sanctuaire: « Souvent j'ai fait sur toi de faux serments! » Le sanctuaire répondit: « Et moi, je t'ai souvent joué de mauvais tour à ton insu! » ( Les ziyaret sont les sanctuaires locaux — tombeaux ou cénotaphes de saints, sources, grottes etc. — qui avoisinent la plupart des villages kurdes. C'est par eux que l'on jure. Beaucoup sont entretenus par de saints personnages qui en perçoivent les revenus et recueillent les offrandes des pèlerins — d'où la réponse du sanctuaire dans notre proverbe. )

138 — Gundek e, gûdorek e.

Un village, un melon.

( Se dit d'un repas où les invités sont trop nombreux et le menu trop maigre. )

139 — Gundê bê rez, û konê bê pez, û mîrê dibê ez û ez, hemî ne tu tişt in.

Village sans vigne, tente sans moutons, homme qui dit: « moi, moi ».

( Tout cela ne vaut rien. cf. No 133 ).

140 — Heçl bi mal e, bi xwaltik û xwal e.

Qui a une maison a aussi tantes et oncles maternels.

( Qui a une famille a quelqu'un pour le soutenir ).

141 — Heçl jinekê blue, divê tûrek pereyê wî an barek derewên wî hebe.

Qui prend femme doit avoir un sac d'argent ou un ballot de mensonge.

142 — Her kezlerek simbêlsorek li pey e.

Derrière chaque chevelure blonde, il y a une moustache rousse.

( La chevelure blonde pour les femmes, et la moustache rousse pour les hommes, constituent autant d'attraits physiques ).

143 — Hirç û govend, rovi û sûk, koçer û pivaztirşk.

L'ours et la danse, le renard et le marché, le nomade et l'oignon confit.

144 — Jina werin jî mala, xwarzî bê ser xwala. Prends femme dans une bonne famille, les neveux ressemblent à leurs oncles maternels.

145 — Kerê got: « Xwedê kir ê ez ker im, ne koçer im? »

L'ânesse dit: « Grâce à Dieu, je suis une ânesse et non pas un nomade! »

( Allusion à la bêtise proverbiale des nomades ).

( A suivre )

TAWÛSPARÊZ

Kiriyariya Hawarê 500 Qirûşên Sûrt  
Xwedî û gerinendeyê bepirsiyar: Mîr Celadet  
Alî Bedir-Xan. Şam—Sûriye

Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aali  
Bedir-Khan, Damas-Syrie

ŞAM — 1942 — ÇAPXANA SEBATÊ .



## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Tefsîra Qurane	Dr. K. A. Bedir Xan
Memozîna Xanf	Herekol Azizan
Civat	Reşîd kurd
Kenediyê pêşîn	Cemilê Tacdo
Telqîna Ezdîyan	Feqîrê telqînbêj
Marça canhezaran	Osman Sebrî
Li pêşberê yarê	Osman Sebrî
Sê salên şer	Hawar
Diwana Melê	Qedrî Cemil paşa
Ji Rastedar re	Şebistan
Şibirên zarokan	Osman Sebrî
Rewşa Dinyayê	Nêrevan
Medhelokên japonî	Hawar
Coutumes	Tawûsparêz

### TEFSÎRA QURANÊ

178 — Kafîr bila kêfxweş û dilgeş mehin û ji xwe re ne bêjin ko ev jiyîn û emrê dirêj û mîhlela mezin, ji bo wan çak e. Me ev tişt da wan da ko gunehê di wan zêdetir bin. Ew, di roja pişdawayê de bi serkeşîya xwe heyran û bêçare dê himînin. Ji bona wan ezabekî giran û cegersûz heye.

179 — Xuda mirovên bawermend he-ta wextekî di tengasiyê de dihêle herwekî tengasiya we a hazîrî, da ko tê de êdî qenc û xirab ji hev veqelin; û ne qesda Xwedê ye ko ew ji we re nependiyên hikmeta xwe bide zanin. Lê Xuda li gora daxwaza xwe, ji hin pêxemberên xwe re hikmeta veşartiyên xwe dide seh kirin. Baweriya xwe bi Xuda û bi pêxemberên di wî binin. Heke hon bawermend in û ji Xudayê xwe tirsîyar in, bizanin ko Xwedê sewabeke mezin digihîne we.

180 — Divê mirovên çavteng û destgirtî xweş bizanin: Heke ew ji malê ko Xuda da wan, di rîya Xwedê da na din, ew çavtengîya wan bi kêrî wan naye û ew ji wan re ne tu xêr e, lê belê ew birnek e, xirabiyek e.

Malê wan di roja pişdawayê de wê bibe nîrê stoyê wan ê gunehkar. Mîrat-xwerê erd û ezmanan Yezdan e, her-

kes dê wê here û ew dê bimîne. Xuda ji emelên we xeberdar e.

181 — Xudagotîna wan bihistiye; wan digot: Xuda belengaz e, em dewlemend in. Em vê gotîne qeyd dikin û ji bîr na kin ko wan pêxemberên Xuda bê rê kuştîne. Emê wan bêxîne dogehê û ji wan re dê bibêjin: lezeta agirî tam bikin; çawan e?

182 — Ev dê bibe zecayê kuştîna pêxemberên Xuda, an ne, Xuda bi evdên xwe re ne zalim e.

183 — Mezinên cihîyan digot: Mêze bike, Xuda emrê xwe bi me da, divê em heta ko pêxemberekî welê bê ko gava em qurbenekê şerjê dikin û berdidin mezelekê, bi emrê wî ji ezmen agirek datê û wê qurbanê dişewitîne; bawariya xwe bi tu kesî neyînin.

Pêxerberê min... bêje wan: Berî min, ji we re bi dellîl, hicet û mûcizan, her wekî hon dibêjin pêxember hatin. Heke hon rastdil in, çîre we ew kuştin?

184 — Heke ew bi gotîna te qail nabin û derew bi alî te ve didin, tu xemdar mebe, ji ber ko ew bi gotîna pêxemberên berî tejt û bi kitêb û hicetên Xwedê ên din ji qail ne bû bûn.

185 — Her nefes lezeta mirinê wê tam bike. Di roja pişdawayê de her kes li gora emelê xwe berpirsiyar dibe; yê ko ji ezabê dogehê xelas dibin û digehin nînela bihuştê çiqas bextiyar in. Jiylîna dinyayê xew û xewnek e û xapandîna demekê ye.

186 — Xuda we, bi can û malê we dê biceribîne. Yê ko ji wan re berî we kitêbên Xuda hati bûn şandin, yanî xudankitêb û dîn-nezan jî; bi çend awayî wê bêne qehirandin û ezibandin. Heke hon sebr dikin û ji Xudayê xwe tirsîyar dibin û di rîya rastiye de pê didin erdê, êdî aşîkar dibe ko hon, li gora emrê Xuda meşîyane.

## MEMOZINA EHMEDE XANI

- 6 -

SEBEBA NEZMA KITAB E BI VI  
EZMANI DI SURETE ŞEKWAYI JI  
DEWRANE Ū GILIYA JI EBNAYI  
DI ZEMANE KO LI BAL WAN  
YEKSAN E HINERA DANAYI  
DIGEL EYBA NADANI

Xani ji kemali békemali  
Meydana kemali dîte xali  
Hasil ji inad eger ji bédad  
Ev bîdhet e ger xîlafi mi'tad  
Safi şemirand vexwar dîrdi  
Manendi derî lîsanî kurdî  
Înaye nîzanî Ū intîzamê  
Kêşaye cefa ji boyl amê  
Da xelk ne bêjîtin ko ekrad  
Bê me'rifet in bê esl Ū binyad  
Enwa'î milêl xudan kitêb in  
Kurmanc b'tenê di bê hesêb in  
Henî ehlî nezer nebên ko kurdmanç  
Egqê ne kirin ji bo xwe amanc [1]  
Têk da ne di talib in ne metîûb  
Vêk ra ne mihîb-bin ew ne mehbûb  
Bê behre ne ew ji eşqbazî  
Parîz ji heqîqî Ū mecazî  
Kurmanc ne pir di bê kemal in  
Em-ma di yetim Ū bê mecaz in  
Fîlcimle ne cahil Ū nezan in  
Belkî di seflî Ū bê xudan in  
Ger dê hebiwa me ji xudanek  
Alkeremek letfedanek  
Îlm Ū hiner Ū kemal Ū iz'an  
Şî'r Ū fesele Ū kitab Ū dîwan  
Ev cîns biha li ba wî me'mûl  
Ev neqê biha li nik wî meqbûl  
Min dê elema kelamî mewzûn  
Alî bikira li banî gerdûn  
Bîna ve rîba Melê cîzerî

Pê hey bikira Elî Herfî  
Keyfek we bîda Feqîhê teyran  
Çet-ta bi ebed bîmaya heyran  
Çî bîkîm ko qewî kesad e bazar  
Nînin ji qîlmaq ra xerîdar  
Xesma ko di vê esîr da himyan [2]  
Maşûq Ū hebîb e bo me hemiyan  
Yani ji teme' dirav Ū dînar  
Heryek ji me ra we bûne dîldar  
Ger îlim temam bîdî bi pûlek  
Bîfrosî tu hikmetê bi solek  
Kes nakete meyterê xwe Camî  
Ranagîritin kesek Nîzamî  
Wextê ko me di zemane evreng  
Fîlcimle li ser diravî bû ceng  
Hez kir me bibîne kîmiyager  
Gava ko me di ne hû miyes-aer  
Teshîye me pêlekê emel kir  
Teshîyey cewherî deşel kir  
Qelbê me ne kir qebûl hîle  
Qet bû fîrez Ū ne bû wesîle  
Dîn çû Ū ne ket bi dest me dînar  
Paşê ji neçarî bwîne sef-far  
Sîfrê xwe î xef me eşkera kir  
Qirtasiye bû me lê dia kir  
De'wet kirîya bi sidq îcabet  
Bû wasîtayî qezayî hacet  
Ev pûl egerçî bê beha ne  
Yekrû ne Ū saf Ū bê behane  
Bê hîle Ū xurde Ū temam in  
Meqbûlî miamilî ewam in  
Kurmancî ye sîrî e bê guman e  
Zêr nîne bîbîn sipdeman e  
Sîfrê me î sor e aşîkar e  
Ziv nîne bîbîn ko kemeyar e  
Neqde me mebeje kem beha ye  
Bê sik-keî şahî şehrewa ye  
Ger dê bibiwa bi derb menqûş  
Ne dîma wîhe hê rewac Ū meşûş  
Mehbûb e bîkes ne namzade  
Lew bextî slyah Ū namîrad e  
Qirtasiyeya me hê penahan

Bê derbî qebûlî padîşahan  
Me'lûl e li ba gelek elîman  
Meqbûlî e li Ba gelek bekîman  
Lê hakimî wext î me'rifetnak  
Mesmû' ne kir bi sem'î îdrak  
Mirê ko bi navê mirza ye  
Mezha nezera wî kîmiya ye  
Qelbî di zekel dîket bilûrfî  
Pûlî di deşel dîket flûrfî  
Sed bar hebin flûstî ehmer  
Derhal dîket bi yek nezer zer  
E'lay dîket bi qehrî edna  
Ednay dîket bi lîf e'la  
Paşan dîgîrit wekî esîran  
Aza dîkîtin wekî feqîran  
Her roj hezar bê newayan  
Her lehze bi lîf sed gedayan  
Zengin dîkîtin bi destî him-met  
Hikmet ew e nakîtin çu min-net  
Ger dê wî nezer bîda me carek  
Iksîrî tewec-cîha mîbarek  
Ev qewî hemî dîkîrîne eşar  
Ev pûl hemî dibûne dînar  
Em-ma nezara wî zede am e  
Lew xas nezer ji dil ne da me  
Ew rehunelî xas e bo ewamî  
Yareb tu bîdî wî her dewamî.

[1] Nakeve sorê mirov ko Xani xelet bibêje Ū xelet bîniyîsîne. Digel vê hindê di vê misrehê de «eşq» xelet e. Ji ber « eşq » li hire bîreser e, Ū bîreserê lêkerên gergu-hêz di zemanên borî de nayîne tewadîn. Ji lewre şîkilê rast « Eşq ne kirin ji bo xwe amanc » e. Lê ji bo timamkirîna weznê mirov dikare bibêje: Wan eşq ne kirin ji bo xwe amanc.

[2] Himyan bi mana « heban » e; Ū li hire bi mecazî cîzdanê perê Ū pere bi xwe' ye.

KURD Ū CIVAT:

## CIVAT

- 1 -

Di kurdmançî da ji kombûn Ū civîna çend mirovan ra civat tê gotin.

Lê ji gutlek mirov ra wê çaxê civat dibêjin ko ew gutil bo cihanîna dozêkê an galaz Ū dehkekê civîya be; Ū xurtî Ū serdeatiya libatan li ser hev hebe. Bi kurtî: « raman Ū armançeke civatê hebe »

Eger raman Ū armanç ji civatê dûr be ewê bête gotin ko « dehbe jî pev ra dijîn Ū dixebitin. »

Lê ne wisa ye; xebat Ū civîna dehbeyan bi ajotîneke nehiştî ye. Pêşiyên wan çawan bûn ew jî wek wan in Ū ewê her we bin.

Civîna mirovan bi heş Ū jîregiyê ye;

havlî şehrazayîyê ye, bi zanîn Ū bîngeb e, her civîneke mirovan pêşveçûneke. Eger civatên mirovan jî wek yên dehbeyan bi neheştî biwa; béguman ev pêşveçûna wisa mezin pêk ne dihat Ū emê wek pêşiyên xwe di şikeftî Ū qulên dar Ū beran de bûna. Jê pêve civatên mirovan xweyî dtrok in. Ji dehbeyan ra dtrok tune ye.

Ji Dehbeyan cîbê bûneke mirovan di heye: ko mirov bi destkirin: anl tiştan bi heşê xwe dibînin Ū bi destên xwe saz dikin.

Mirov; bi destkîran kar Ū xebatên xwe hêsan dikin; wek gîsin. Gîsin niho li pêş çavên me tişteklî pir piçûk Ū kême bêja ye. Lê gava em kûr bînerîn hêsanîyêke mezin bi me ra dike. Her destkîr li gora karê xwe pir an hindîk hêsanîyê dike.

Hêjayîya civatê yek jê ev e ko destkîran, li nik xwe diparêze Ū awayê xehata wan jî



# KENEDIYÉ

## PÊŞIN, YÊ KO PÊ LI ERDÊ FRENSE KIRIYE

Herweki xwendevanên me dizanin û di Rewşa dinyayê de ji wê bixwînin ingilîz û hevalbandan li 19ê Tebaxê esker derxistinê erdê Frensê, mintîqa Diyêpê. Diyêpê di Behira-Mansê de bendereke frensî ye. Li vê seferê eskerên ingilîzî, emêrikani, kenedî û frensîzên şerevani pardarî kirine.

Balafirvanekî emêrikani bi navê Jozêf Barûland ji di vî şertê de hazir bûye. Barûland keleheke firolek tajot. Keleha firolek textlîtek balafireke bombavêj e. Ji her xurtî û mezina-hiya wê ev nav lê kirine û jê re keleha firolek gotine.

Barûland di heqê vê seferê de bendek nivîsandîye û tê de gotiye:

Pênc kelehên firolek pardariya vê seferê dikirin. Ji balafirgeheke Ingilîterê ew bi nîzameke welê rabûn û bi rê ketin ko mirov lê heşmetkar dima. Kelehên firolek di ortê de bûn. Herçî spîtfeyer û neçîrvanên frensîzî, kenedî, polonî, belçîkî û holendî dor li wan girti bûn. Ev refê teyrên hesinî gelek ne borî xwe gihandê ser erdê Frensê. Herkesî jî berê de wezîfa xwe nas kirî bû. Kelehên firolek di bin hefadiya neçîrvanên de bi ser balafirgehên Abêvilê de girtin û ew dan ber bombeyên xwe. Ji bona ko balafirên elemanî nikarin bi lîrê bikevin û bi ser eskerên me yê ko dikirin dakevin bejê de herin û daketina wan biwarqilînin.

Gava me bi ser balafirgehên Abêvilê de girt saet bû bû heşt û niv. Qederê bîst deqîcan me bombeyên xwe barandîne balafirgehên dijmin. Di vê navê de bêtelek, yanî telêgrefeke

---

libatan ra rava dike. Bê guman e ko civat ne biwa parastina destkiran ne diçû sert. Herîşt ji wendabûn û mirinê ra heyirandî bû.

Me jî van pîrsên jor ev pêjor yanî netîce derxist ko civatên mirovan û dehbeyan wan jî hev dût dixê û warekî bêja û bilind jî civanên mirovan ra çêdike.

1 — Civat, havîla raman û armançê ye ko bîngeha wê jî heşt û jîregiyê tê.

2 — Xweyî dirok e anî civat bi tevgera xwe jîna xwe heman heman jî xwe ra dirokekê çêdike.

3 — Destkirên libatên xwe diparêze û jî xelkê ra awayê xebata wan rava dike.

(dûmayîk heyê)

REŞÎD KURD

bêtel, gihaste me. Bêtelê digot ko eskerên me gihastîne peravê û balafirên elemanî bi ser wan de girtiye û şerekî hewayî di navbera balafirên her du alîyan de dest pê kirîye. Me jî berê xwe da wê hindavê. Di ser peravên Frensê re qedere 900-1000 balafir gîba bûn hev, dirêjî hev dikirin, pêşî jî hev distandin û li hev didan. Hew te dit balafirek wek teyreki bask-şikestî ber bi jêr dibû, xwe noql avê dikir; an di toza reşahiye de dibû ewreki ecacê û wînda dibû. Lê herçî kelehên firolek tu tişt bi wan nehati bû. Ji ber ko ew qenc dihatîne hemandin û berikên ko ji dût ve dibatînin nikarî bûn di zirhên wan re derbas bibînin.

Di şerê hewayî de reşma ko xesarîne mezin gihastî bînin hevalbandan jî ew serdest bûn. Lê divê mirov mikur bêt ko balafirên elemanî tev de ne ketî bûn vî şerî. Birekî wan bi ser vapor û filûqeyên me de girti bûn û dikirin bendî daketina wan bibînin. Di destpêkê de miwefeq bûne jî. Lê topên stolê balafirên elemanî bêgav hiştin ko ew bilind bibîrin. Bi vî awayî jî tesîra wan kêmkirin.

Saet bû bû nehî û bîst, min dûrebîna xwe li qeraxê behîrê rast kirî bû. Du balafirên me û didowên elemanî li hev didan. Vaporeke piçûk di bin himayeta bîst balafirên emêrikani, jî tipê liberator, nîzingî li bejê kirî bû. Balafirên neyar dirêjî vapor û balafirên dikir. Min bihîna xwe di xwe de girt. Bombe diketin dora vaporê û stûnîne avê jî behîrê ber bi ezmanan rûdibûn. Di vê navê de, min dit ko gulokîne reş jî vaporê li behîrê gêr bûn. Ma ew ne eskerên me bûn. Min dûrebîna xwe di çavên xwe re dikir; qey bi şîdandîna dûrebîne minê çêtir bidîta.

Ez ne şaş bûm; ew eskerên me bûn. Belê eskereki kenedî bi destî ve tîfîngeki timatîk, bi qayîşa navtengê wî ve bombe, pê li reşahiye kirî bû û qesta pêş dikir. Ê kenedî qedere du deqîcan bi tena xwe hera dijminên ko jî çeperan agir dikirin da û ajote ser wan. Dijmin dikir, ne dikir ne dibîngafte wî. Di pey wî re rewteki kenedî dakete bejê û dirêjî çepera dijmin kir. Min kenediyê xwe nema didit; ew tekilî hevalên xwe bû bû. Lê piştê min seh kir ko kenediyê min bi destbembekê depoxaneke dijmin berhewa kirî bû. Li ser vê yekê dijmin terka çeperên xwe ên pêşin da bû.

Piştî ko em vegeyîyan Ingilîterê min li kenediyê xwe pîrsî. Kenediyê min bi bîrtînîne sivîk bîrtîndar bû bû û ketî bû xestexanê.

CEMİLÊ TACDO

## TELQINA EZDIYAN

Mird, kesol Ser te dar e, bin te dar e  
Wê beye ser te melek Ezrail û Cebrail e. Wê  
ji te bike pirs û sewal e. Nebe nebe, tu jê  
bikt fikar e.

Mird, kesol Telqin e, asin e. Wê beye ser  
te nikt û nikin e. Wê pirs bike, bêje: tu ji  
ktjan dîn e. Tu bêje ez î êzdt me, bi şêx û bî  
feqlr û merebt me. Şêxê min şêx Adl ye, melek  
Fexedîn, melek Secadîn e, Şêxê Şemsaniya,  
şêxê Şexisna, şêxê Ebûbekra ye, şêxê Şeteriqa  
ye; her du kurên Sitiya Zln e. Li ser kaniya  
sipi rûniştî ne, hec û tewafa méré êzdt ne.

Mird, kesol Telqin e, asin e. Wê beye ser  
te nikt û nikin e, Wê pirs bikê, bêjê tu ji  
ktjan dîn e. Tu bêje ez î êzdt me. Bi Mûsa  
pêxember re derketime serê Çiya Tûresîn e.  
Bi İsa pêxember re çûme Quds û Xellî e. Bi  
Mihemed pêxember re çûme Meke û Medtne.

Mird, kesol Ser te kevir e, bin te kevir e.  
Wê beye ser te melek Ezrail û Cebrail e.  
Deyne her wan Mishefa-reş û nan û pentr e.  
Eger pê qall ne bûn, rabe bi gopalê feqlr e.

Mird, kesol Ewil bi dev bû, paşî wê bibe  
bi ev. Wê rabê Madî, wê hillinê bang û sela-  
watê, wê xirab bikê dêr û mizgeft û çadî; û  
kesek ne bejê bi İsa û Mûsa û Mihemed.  
Xelk wê bibêjê bi siltan Êzî û siltan şêx Adl.  
Amln, amln Xwedê arikarê dîn.

## MARŞA CANBÊZARAN

JI SEYDAYÊ CEGERXWÎN RA

Ez benî, piştî ko me ev marş herpeyî we kir divê  
tu me nekî dizê rezê xwe. Gelek silav û xweşî.

Kurdê gelparêz, Ji bo serxwebûn  
Divê birjînî, Bi comerdî xwîn  
Him divê xebat, Ji bona welat  
Da bihin Xudan, Rêzik û qanûn  
« Serbilindî dewlemendî divêtin xebat »  
« Bê dijwari bê xwînxwarî em naçin welat »  
Me armanc yek e, Girtina welêt  
Ji dil me diçe, Sed agir û pêt  
Çavên xwe veke, Hey xortê cîwan  
Neyar ne bişt xwîn, Di rehên me mêt  
« Serbilindî dewlemendî divêtin xebat »  
« Bê dijwari bê xwînxwarî em naçin welat »  
Divê hon her yek, Mîna gurê har  
Sînga xwe vekin, Bajon ser neyar  
Min ji we navê, West û rawestîn  
Di rêya welêt, Em giş canbêzar  
« Serbilindî dewlemendî divêtin xebat »  
« Bê dijwari bê xwînxwarî em naçin welat. »

OSMAN SEBRÎ \*

## LI PÊŞBERÊ YARÊ

Delala min!

Di rûpelên jîna xwe da ev bû cara di-  
dowan ko bi her pêlên hezkirinê dikevime.  
Bê şivşk nişqa paşin, perê tava teyroka te li  
min da.

Di vê da ez nizanîm gelo heqê te û min  
li ser min e; an heqê min û gazindan li ser  
tel Divê ko vê yeka han tu ji hev bi derêxl...

Yê ko ez dizanîm, heke ne ji te bûya;  
biliudl û ziraviya hezkirinê min ne dizanî,  
hila ji Melê Cizerî her bikirana zarîn...

Heke êş bi xwe ne di canê mirov da bit,  
bi zarîna kesan mirov agahi qasa êşê nabî.  
Di vê yekê da mineta te li ser min.

Dîsa heke ne ji te bûya, ev derdê mal-  
kambax û nih ji min ra. li kû dîhat? Di vê  
da jî gazinda min li te.

Erê, ev bû cara didowan ko pêlên hez-  
kirinê min davên ber xwe û dibin; lê kû da  
dibin, vê derê ez jî nizanîml...

Hîn ez jî her pêlên hezkirinekê (hezki-  
rina welêt) nefilîtt bûm ko, bi her pêlên ya  
dîn jî ketim. Nizanîm ko ev rasthatin jî bextça-  
kiya min e, an jî bextereşiyê?.. Divê, ez vê  
yekê jî feylesofekt evînl bipirsim.

Bi tinê di deina pîrskirinê da min gotinek  
heye, nizanîm ko çi qas der wê heq biêxe destê  
min?! Ew jî ko min hez kiriyê; lê ez tê bi der-  
naxînim, ka hemberê vê hezkirina xwe hatime  
hez kirin, an na?....

Daylana min! ez naxwazim wek evinkerên  
mayî pesna rûçik û sinçiyên te bidim.  
Heke min welê kir, dûr û nizik, pir û  
hindik ez jî dikevîm ser şopa wan. Di dînê  
da ya ko bi min xweş êt ew e ko: rîya min ji  
ya hemî kesan cîda be. Bi tinê, ji bona te min  
pesnek heye ko ew jî: her tu daylana min î.

Zerîya min! heke di vî zemanî da bawerî-  
ya min bi rabûna mirîyan tine bûye jî, ji tro  
pêve min bawerî bi wê yekê heye.

Dergehê dilê min, yê ko weke tehtan bi  
tu tîltsman venedibûn, nêrineke te ew dergeh  
bi gengazî vekir. Canê min, yê ko her digel  
jîne şer bû û ji hev bêzar bû bûn; heyîna te  
ew jî hev ra kirin yar.

Heke Meshî miriyên xwahîşgerên jîne di-  
vejandin, te xweşektî xwahîşgerê mirinê li jîne  
vegerand. Erê, çi qas ko tu ne Meshî bi jî,  
bemîn tu meshî yî.

Ez di çavên te da kaniya jîne dibînim.  
Heke tu bi xwe ne jîn bi jî, teqez tu fehreştaya  
jîne yî.

OSMAN SEBRÎ

## SË SALËN ŞER

1 ILON 1939 — 1 ILON 1942

Ev şerê ha, şerê ko iro dinya tê de keftelêftan dike û li hev dixê li 1ê Îlona 1942an gihastiye sala xwe a sisiyan û pê li a çaran kiriye.

Heke mirov bûyerên şerê 1914-1918an gihandine bûyerên saln 1939an dibîne ko ev şerê ha ji dûmahika şerê 1914an pêve ne tu tişt e.

Di şerê 1914an de zora elemanan çû bû û Elemanyê bi miaheda Sêvrê şertên sondxwariyan qebûl kiri bûn. Sondxwariyan Elemanyê û hevalbendên wê, nemaze Ewistiryayê, ji çek kiri bûn û cexrafya Ewropayê bi kem kirina hin dewletan û bi zêdekirina hinên din guharti bûn. Sondxwariyan imperatoriya Ewistiryayê yekcar ji ortê rakir û hin erdên Elemanyayê jê weqelandin û mistemlekeyên wê jê standin.

Elmanyê bi vî halî razî bû bû, Heta roja ko wezîrxariyeyê wê, Strêseman, di civatmiletan de bi nîmîvendeyên Frensê û Britanyayê bi dev xweş kir û bû qehremaneke aşt û bîstehiya dinyayê. Stêreseman di piştê vê perdeyê re ji welatê xwe re, ji bo Elemanya mezin xebate ke zor dixebitî.

Ji milê 1914an Hitler bi teşkilatên xortan, ji Elmanyayê re ordiweke bêçek lê talimkirî saz dikir û xortên Elmanyayê di dora xwe de digihandine hev. Hitler bi xortên xwe ên talimkirî di nav Elemanyayê de hikûmeteke din anî bû pê. Di sala 1933an de Hitler bû serekwezîrê Elmanyayê û piştî mirina Hindenburg Hitler serekwezîrî û serekdewletî di şexsa xwe de gihandine hev û navê fûrer, rêberê elmanan li xwe kir.

Sondxwariyan tevgerên Hitler diditîn û bivê nevê bîra armaçên Hitler dibirin; lê sênc danetanin tevger û kirdeyên wî. Carê ko Hitler mixalefeta miaheda Sêvrê dikir sondxwariyan xwe digihandine wî an nîmîvendeyên wî, pev re didan û distandin, li hev dihatin û di her lihevhatinê de, tiştê ko Hitler digotê diçû serî. Di vê navê de ji destê Hitler ê rastê, Göring, ordûke mezin saz dikir û febrîkeyên elemanî her texlî çek û posat, tang û balafir çêdikirin. Sondxwariyan ne digotê Hitler tu van çek û posatan ji boyî çî û ji bona çekê çêdiktî; te çî daye ber çavên xwe. Belê sondxwariyan ne ev digotin ne jî xwe kar dikirin.

Bi vî awayî Hitler yeko yeko pê li madeyên miaheda Sêvrê kir û ew miaheda çirand, ji

## DIWANA MELE

— 33 —

Îde û her kes ji dîdara te lê pîroze îd  
Ez tenê mehrûmî didarim bi sed menzel beld  
Her seher dê bêjîm ez çanan hi ahan ra ji dil  
Barekêl barî bi ts'adin eleyha yewm îd  
Dergehê lufîa te xanim ma li mehrûman vebî  
În-ne kelben bastîen dehren ziraen bîlwezd  
Pîre merd îm aşîq îm îro mirada min bibexz  
Ya hebîbî ya miradî ya mîna qelbîl murîd  
Ferre eqîl mîn lehbîn misîlî Bazîn ew îqab  
Zabe rûhl misîlî ma inhelle fîn narîl celîd  
Dem'û eynî min bekaîn misîlu main fî sikûb  
Naru qelbî min xîramîn fî deramin fîl weqîd  
Dil jî her narê mecazê bîl heqîqet bû preng  
Naru qelbî fî hewaha misîlî narîn îlhedîd  
Key xelas ez dûxez hîcra te ya bîm ey cîwan  
Her nefes dareîd sela û ne'îre ê hel mîn mezîd  
Kî dizanît mîn jî rîmbazan dema oîlme tîn  
Têne dil sed rim jî wan û sîne têne sed cerîd  
Mîn jî seffênan jî nîva meqtelê rim tîne dil  
Lê li wan destan nehîn Xwîn wî xezaye ez şehîd  
Mîshefa husn û cemaîlê sûreta xal û xetan  
Ma telewna xeyre herfîn la bî qur'anîn necîd  
Gerçî her daîm jî mîhra neynîka dîl' bedre mîn  
Wek hîlala subhê ez carînan tîm nabadîd  
Ma bî l'îen canfeza navê me hînît carekî  
Bîd-dua hel-lîx' tehiyatî lî Selma ya berîd  
Tu j'melê hotî bipîrs esrarê eşqê hel dîket  
Vê muemayê çî zanîn sed mela û mustefîd  
Er bî kuştîn wer bî hîştîl emr û fermana te hit  
Ehmedu ebduñ reqîqun waqîfun beynel eblîd.

nû ve esker xiste mîntîqa Rûrê, yeklîtiya Elmanyayê û Nemsê îlan kir, birên welatê xwe yên ko jê hati bûn bîrtîn bi şûn de vegeandî, dewleta Çekoslovakyayê jî ortê rakir û ew erd kîre du wîlayet û ew xîstîn bin himâyeta Elemanyayê. Sondxwariyan ev tişt hemî qebûl dikirin û digotin eman aşîtiya dinyayê bila xerab nehit, û agir bî barûtê nekevî.

Dor gihastî bû mesela Danzigê. Hitler dixwest di navhera Danzig û erdê elemanî û di erdê Polonyayê re rêkê bidî çêkirin. Polonya pê qall ne dibû. Li ser vê yekê li 1ê Îlona sala 1939an ordîwa elemanî berda erdê Polonyayê û vî şerê hêeman dest pê kir û ev sê sal in bê etîahl dom dike û kes nîzane ewê kengê xelas bibê.

Di sala sisiyan de kirdeya giranetir şerê Japonayê ye.

Li 7ê Kanûna-paşîn sala 1941ê japonan ji nişkekê ve bi ser giravên Emêrikayê de girtin û derbeke xurt li stola wê dan. Bi vî awayî Emêrike jî rast bi rast kete şer û agirê şer xwe gihande dinya nû jî.

Bi hênceta vê dorsalê Hawar lista jêrîn belav dike û kirdeyên vî şerî ên giranetir

dîne bira xwendevanên xwe.

Xwendevanên ko vê lîstê bixwînin ewê bibînin ko eleman di destpêkê de, serdest bûn; beye ko hetantîro jî, di gelek deran de serdest in. Lê û nemaze piştî ko Ûris û Êmêrîke jî ketine şer îşê elemanan zehmet bûye. Zeman jî elemanan bêtir hevalê ingilîzan e.

### SALA 1939

#### ILON

- 1 — Elemanan dirêjî Polonyayê kir û gewetên mēkanîktî ên elemanî şerê xwe ê brûskî. Ji bo cara pêşî di vî welatî de ceriband. Ordiwa polonî ya ko hêj seferberiya xwe temam ne kiri bû, di tu deran de karîweke xwe şerê elemanan bike û li 27ê Îlonê Polonyê bê qeyd û şert teslîm bû.
- 3 — Ingilîz û frensîz bi temînata xwe ve meşîyan û li Elmanyayê îlanherb kirin.
- 17 — Piştî ko elemanan ordiwa polonî jî hev de xist, ûrisan jî dirêjî Polonyayê kir û digel elemanan ev welat lēk vekirin.

#### ÇIRIYA PAŞÎN

- 30 — Ûrisan dirêjî Fenlandiyayê kir. Rûsya mezin mîdektî dirêjî bi Fenlandiya piçûk mîjûl bû û zora wê bir. Gelo hingê ûrisan ne dixwest qeweta xwe şanî bidin. Li 13ê Adara 1940î di navbera ûris û fenlandîyan de aştî çêbû û Fenlandiyê jî nivroyê welatê xwe hin erd dane Ûris.

### SALA 1940

#### NÎSAN

- 9 — Di yek rojê de elemanan avête ser Norvêj û Denîmarkê. Denîmarkê dest hilnani û teslîm bû. Norvêjê li ber xwe da û ingilîz û frensîz çûn hawara Norvêjê. Di behir û hewan de di navbera eleman û hevalbendan de şerî çêbûn; hevalbendan esker derêxiste bejê jî. Lê, li dawiyê jê kişîyan û eleman di Norvêjê de cih bûn.

#### GULAN

- 10 — Elemanan berda ser Belçîkê û Holendê. Van her du dewletan dest bire xwe û ingilîz û frensîz jî çûne hawara wan.
- 14 — Ordiwa holendî piştî ko xesareke mezin gihastê çekên xwe danî û teslîm bû. Qralîça wê digel hikûmeta xwe çû Ingilîterê.
- 28 — Belçîke jî piştî ko 18 rojan şerê elemanan kir şikest û teslîm bû. Qral di welatê de ma; ne çû derve.

#### HIZÊRAN

- 5 — Di vê rojê de şerê erdê Frensayê dest pê kir.
- 10 — Gava talyanan dît ko Frense diqê ew jî

## JI ŞEBISTAN

### JI RASTEDAR RE

Rastedar ezgorî

Reşbeleka te gihaste destên me û gelek bihîna me pê hat. Tu pîrsa me û pîrsa welêt dîkt. Bi vê pîrsiyariyê tu birînen me daxêvînt. Lê çî xem. Ji xwe birîna ko naêşe û naribe mirov li dermanê wê nagere. Nemaze birînen me, ew birînen ko devên wan ne hatine hev û her dixwazin baxêvin. Belê gulî bide ez jî te re bibêjin.

Herçî welat û halê welêt: Rîyên bê rêwî, rêwîyên nebîrê... bixêriyên bêdû, gundên kavil... ne pez û ne şivan... zevîyên rût; bēnder bûne mērg, kelehên bê segman, newalên tērovî, zozanên bê şer, dawetên bê def û govend...

Herçî em, çî bêjîme te. Xwezî te ne pîrsiya û min jî ne gota. Belê em bi xwe, bê serek û bê peya, bê xulam û bê mêvan; destên vala, zendên bêxebat, dēmên qermeçî, bêxwêbdana eniyê piştên qor...

Belê bûk û zava; lê dil hemî zingargirti. Ne Gulavêjek, ne Ronahîk, jî xwe kes naye Hawara me.

Xwezî bi we; sed xwezî... Belê hawar li nav we dabiketiye, di tariya şevê de bi Ronahiya Gulavêjê hon pêş û paşê xwe dibînin.

### ŞEBISTAN

ketin şer û li Frensê û Ingilîterê îlanherb kirin.

- 22 — Relscînhûrê Frensê istifa kir merêşal Pēten hikîtin xiste destê xwe.
- 24 — Hikûmeta merêşal Pēten bi eleman û talyanan re mîterekêk înzâ kir û şerê erdê Frensê bi vî awayî gihaste dawîya xwe.
- 28 — Ûrisan bê şer û bi lihevhatîneke kotek Besejabiye û Bûkovînyê jî Romanyayê standin.

#### TÎRMEH

- 3 — Di Wehranê de stola ingilîzî bi tehmata ko Laval stola frensîzî teslîmî elemanan bike dirêjî stola frensîzî kir û xesareke mezin gihande wê.

#### TEBAX

- 8 — Elemanan bi halafîran dest bi bicûma Ingilîterê kir. Carîna balafîrên elemanî bi şev û roj li Londrê didan. Xelk da-diketîin zêrzermînan û bi hezaran bombe di ketin ser paxîltextê Ingilîstanê. Ev şerê hewayî heta 5ê Çiriya-pêşî dom kir. Elemanan dixwest bi vê hicûmê ingilîzan

bimelistinin û ji desthilatnê bixin. Lê ingiliz li her sekinin û eleman jê geriyen.

- 19 — Talyanan di Efrîqayê de dirêji Somalîstana ingilizî kir. Ji ber ko di vê mistemlekê de eskerên britanî gelek hindik bûn talyan di çend rojan de ketinê.

#### ILON

- 15 — Merêşal Grazyanî, fermandarê talyanî, ji tixûbên Libyayê dirêji Misirê kir û kete Sidi-Berani. Lê jê bi pêş ve ne çû. Italyayê ev pêşveçûn bi cejiinê mezîna şahnet kir.

- 27 — Ji vê tarîxê ve heta 24ê Çiriya-paşîn, Japon, Mecer, Romanyê û Slovakyê, li pey hev, ketin peymanê elemanan.

#### ÇIRIYA PÊŞIN

- 28 — Talyanan di erdê Ernavdîlîxê re dirêji Yewnanîstanê kir. Di pêşiyê de talyan keti bin hin gundên yewnanan jî; piştî yew nanan ew bi şûn de vegeandin û ketin erdê talyanan.

#### KANÛNA PÊŞIN

- 9 — Ingiltzan xwe kar kir û avête ser talyanan û ew ji erdê Misirê derxistinê û dane pey. General Wêvel talyan ajotîna heta Biugazyê. Vi şerî heta 6e Sibatê 1941ê dom kir, ingiltzan bajarê Biugazyê zemt kir û gihastin tixûbên Trablîşêrbê.

#### SALA 1941

#### KANÛNA PAŞIN

- 12 — Ingiltzan dirêji imperatoriya Hebesîstanê kir û zora talyanan bir. Li 20ê Gulanê ingiliz ketin Edîsababayê, payitextê Hebesîstanê. Impertorê hebeşî Hêlaselelî vege-riya welatê xwe û ji nû ve li ser textê pêşiyên xwe rûnişt.

#### ADAR

- 2 — Bîrxurîstan ji kete tifaqê sêbendî, tifaqê eleman û talyan û japonan û di roja xwe de eskerên elemanî derbasî erdê Bîrxanîstanê bûn.

- 11 — Emêrikê qanûna deyn û artîkariyê danî. Li gora vê qanûnê Emêrike heçî dewletên ko şerê Elemanyayê dikin ji wan re çek û aletên cengê bi deyn dide.

- 25 — Yûgoslavye ji kete tifaqê sêbendî. Bi şerî ko eskerên elemanî derbasî erdê wê nebin.

- 27 — Li Yûgoslavyayê ordîwê hikûmeta ko tifaqê sêbendî imza kirî bû xist û hikûmeta nû ciwaba elemanan da.

#### NISAN

- 3 — Fermandarê elemanî Romelî ji tixûbên Trablîşêrbê berda ser ingiltzan. Ingiltz vegeriyan heta tixûbên Misirê. Lê asêgêha

### ŞIHIRÊN ZAROKAN:

#### DIBISTAN

« JI EKREM BEGÎ RA »

Destpêk bi navê Yezdan	Ev e diçim dibistan
Divê êdî bixwinim	Bo rastiye bibnim
Da her tiştî bizanim	Heya ko pê bikanim
Berî vêya gelê min	Nezan ma hûn mîr û jin
Daketi bûn hêla jêr	Reben pepûk û bêkêr
Lê ji îro bi şûn da	Di nav bajar û gunda
Herçî kurde wê bixwin	Da ko bibe xweyî şû
Welatê xwe bistine	Neyafan jê derine
Em in xweyî war û şûn	Doza me ye serxwebûn
Ji bo me ye hêla jor	Hildin ma kesk û sor
Serxwe nabe kurdistan	Bê xwendin û dibistan

#### BIHAR

Gava dinê dibe bihar	Dîbişkivîna devî û dar
Zozan lêne gihartin zû	Mîna cilêa bûkên di nû
Nêrgîz, sosin, kulîk û gul	Dîrevînin xeman ji dil
Dinya dibe wek gola şîn	Çîçek didin sed rengî bin
Xesma sibana birbangê zû	Tev radibin ew teyr û tû
Yêk ra dikin şahî û saz	Hîşyar dibin kulîk û baz
Bîlbîl dibe dengbêjê wan	Dîkit qirîn ji dil û can
Pîroz dikin rojên di hev	Hin xweştir e biharê sev

#### TEVDÎRA MIŞKAN

Li welatê Mêrdînê	Di nav gundê Cilînê
Pisîkêkî xurt û şeng	Bû bû xudan nav û deng
Mîşk ne hiştin di malan	Gîş revîn qul û çalan
Kîjanê wan dihat der	Pisîk xwe zû davêt ser
Welê ma bûn mat û gêj	Yekî wan î boçdirêj
Digot: gelê hevalû	Em girtî man di çalan
Rêkê bo me çar bikin	An jî li vir bar bikin.
Mîşk ne man tev dicivin	Bo vê yekê peyivîn
Her yekî yek digotin	Kezeb jî xwe dîsotin
Yekî wan î risipî	Digot ev emîn rê di
Du zengîlan bibinin	Bidin yekî bişînin
Heke li kû pisîk di	Bila têxe stoyê wî
Çîgav dengê zengilê bê	Bi zanîbin ko ew tê
Bi lez û hêz veşirin	Nema bon kes dimirin.
Gîşkan digot: welê ye	Tevdîreke li rê ye.
Lê di nav xwe kes ne din	Ko wî karî biqedin
Pisîk serbest bîliştin	Wî jî her ew dikuştin.

OSMAN SEBRÎ

Tobriqê ji dest ne dan û tê de asê bûn.

- 6 — Elemanan avête ser Yûgoslavye û Yewnanîstanê. Ingiliz çûn hawara wan. Vi şerî heta dawîya vê mehê dom kir. Elemanan ev her du welat vegirtin. Ordîwa ingiltzî vege-riya Misirê, lê birekî wê da- ket girava Gîrlîê Qral û hikûmeta yewnanî jî di wê giravê de cih bûn.

- 13 — Ūris û japonan peymanêke nelîhevîxistinê imza kir.

- 19 — Iraqî bi hênceta ko ingiltz gelek esker anîne erdê Iraqê, li ingiltzan rabûn û bû şer. Ingiltzan zora iraqîyan bir û li 3ê Gulanê li Iraqê her tişt vege-riya halê xwe ê berê.

## GULAN

- 19 — Her Hês wekilê Hitler bi balafirekê ji Elmanyayê rabû û çû Ingilîterê. Elemanan got, Hês dîn bûye.
- 20 — Eskerên elemanî bi balafîran daketîne girava Girtî û heta dawîya mehê şer kirin û girav vegirtin. Qralê Yewnanîstanê çû Ingilîterê.
- 20 — Cenkeştîya elemanî Bismarkê cenkeştîya îngiltîzî Hûd bin av kir.
- 27 — Ingiltîzan ji Bismark bin av kir û heyfa Hûdê jê hilanî.

## HIZËRAN

- 6 — Ingiltîz û golîstan dirêjî Libnan û Sûriyê kirine. Vî şerî heta 14ê Tirmehê dom kir û di wê rojê de general Denz çekên xwe dantî.
- 22 — Elemanan dirêjî Sovyêtîstanê kir û şerê dinyayê ê mezintir dest pê kir. Ordiwên rûstî û elemanî rahîstîne hev.

## TÎRMEH

- 7 — Emêrtkê esker derêxîste girava Îslandayê. Îslande li bakuroavê Ewropayê ye û bi taca Denlmerkê ve girêdayî ye.
- 12 — Ūris û ingiltîzan peymaneke hevalbendîyê imza kirin.
- 14 — Eleman di Behira-reş de ketîne bendera Nikolayêfê.
- 19 — Di navbera japon û frensîzan de lihevhatînek hate imza kirin û eskerên japonî ketîne mistemlika frensîzî, Hindiçniyê.
- 25 — Ūris û ingiltîzan dirêjî Ecemîstanê kir. Eceman qedere 72 saetan şerêkl derewin kir û çûn rayê û teslîm bûn.

## TEBAX

- 13 — Mr. Etlî di meclîsê de da zanî ko Mr. Çorçîl di cihêkl Etlantîkê de gihaye Mr. Rûzwelt. Her du mirovdewletan di wê hevûdîtînê beyanamak belav kir. Ji wê beyanamê re beyanama Etlantîkê gotine. Ev beyanama dîde zanî ko piştî şerî sondxwarî heqê her miletî wê bidin. Ji ber ko kurdmanç jî miletek in, bivê nevê ji wada wê heyanamê para xwe wê bigirin.
- 26 — Ūris di bakur û di eniya Smolenskê de rabûne berhicûmê û dirêjî elemanan kirîne.
- 27 — Eleman di Ūkranyayê de ketîne Dinyepetrovskê.
- 28 — Ūris ji Tallînê, bi navê xwe ê kevin Réval, kişîyan. Tallîn di behira Baltîqê û di Estonyayê de ye.
- 30 — Fenlandî ketin bajarê Vipûriyê; bi navê xwe ê kevin Viborg.

## İLON

- 8 — Mister Rûzwelt di meclîsê de da zanî ko eskerên sondxwariyan daketîne girava Spîçbergê.
- 10 — Mister Rûzwelt da zanî ko cenkeştîyên emêrtkant yê ko di Etlantîkê de digerin emir standîne, heke noçar, balafîr û cenkeştîyên elemanî têkîll wan hûn li wan xî.
- 19 — Eleman ketîne Kiyêvê, payitextê Ūkranyayê

## ÇIRIYA PÊŞIN

- 16 — Ūrisan terkê bendera Odêsayê da.
- 19 — Elemanan dirêjî Moskoyê kir. Mosko wek Leningradê li ber wê hicûmê sekîni, elemanan tu bavil jê ne kirin.
- 25 — Eleman ketîne bajarê Xerkovê.

## ÇIRIYA PAŞIN

- 18 — Ingiltîz di qada Lîbyayê de rabûne hicûmê û dirêjî xetên Romel kirine. Eskerên Romel û yê talyanan nikari bûn li ber ingiltîzan bisekinin û ji ber baz dan. Vî şerî heta 18ê kanûna paşî sala 1942an dom kir.
- 22 — Elemanan da zanî ko ketîne bajarê Rostovê.
- 29 — Destpêka şerê nivgirava Krimê.
- 29 — Ūris li elemanan vejeriyan, û di qada nivro de bajarê Rostovê bi şûn de vejerandin. Bi wê zefere êrlşa Ūrisan ya Zivîstanê dest pê kir û elemanan di dirêjahiya eniyê û di deverîna de xwe dane paş. Ūrisan di dora Moskoyê de eleman bi şûn de vejerandîne.

## KANÛNA PÊŞIN

- 7 — Japonan ji nişkekê ve bi ser giravên Emêrtkant de girtin. Di giravên Hewayê de xesareke mezin gihaste stola emêrtkant. Dîsan di wê rojê de qewetên japonî ji Hindiçniya frensîzî dirêjî Siyamê, bi navê xwe ê nû Taylandê kirîne. Piştî şerê ko du sê saetan ajot japon û taylandî li hev hatin û eskerên japonî derbasî erdê Taylandê bûne.
- 8 — Japonan di Hindiçniyê re dirêjî mistemlika îngiltîzî Melêzyayê kir. Şerê Melêzyayê heta dawîya Sibatê dom kir û japonan ev nivgirav bi temamî vegirt û gihastin pêşberê Sengenporê û li peravên avtenga Melaqayê topin dantî da ko li Sengenporê xî. Dîsa di wê rojê de eskerên japonî di bin himayeta stolê de daketîne giravên Filîplînê. Emêrtkaniyan qedere pênc meban beravaniya Filîplînê kir û li 6ê Gulana sala 1942an japonan giravên Filîplînê tevî de vegirtin.



- 18 — Japonian dirëjt Honkongë kir. Honkong di nivrorohelatë Çinë de asëgeheke ingilizli ye ù të de bendereke eskeri heye. Ingillzan Honkong heta 26ë vë melië midafehe kir.
- 31 — Òrisan di Krimë de Kerç ù Teodosye bi şûn de veğerandine.

SALA 1942  
KANÛNA PAŞIN

- 3 — Òrisan Maloyoroslovç ji elemanan standine.
- 10,11 — Òrisan eleman ji Mojayësk ù Lodinovoyë derëxistine.
- 18 — Ordiwa ingilizli eleman ù talyan ji erdë Lihyayë rêş kir ù kete Bingazyë. Romel veğeriya tixûbën Trablisxerbë ù ji Egadabyayë wë ve qerar girt.
- 19 — Òrisan Mojayësk bi şûn de veğerand.
- 20 — Eleman ji nû ve ketin Teodosyayë ù Òrisan jë kişiyân.
- 23 — Japonan esker derëxiste Gîna-nû ù birektî giravë zemt kir ù avetë ser giravën Silëman ù Îrlanda-nû.
- 25 — Romel li ingillzan veğeriya ù li 6ë Sibate gihaste pêşiya Xezalë. Ingillzan ew li wë derë seklind.

SIBAT

- 1 Japoni li avtenga ko Sengeporë ji Melëzyayë diqetine derbas bûne ù rast bi rast dirëjt Sengeporë kirne. Sengeporë heta 8ë Sibate li her xwe da. Japonan piştî ko Sengepor saft kiravetë ser giravën Hin distana holendi
- 14 — Piştî serine no holendiyân çekën xwe dant ù japonan girava Simatrë bi temami vegirt.
- 27 — Japonan ji giravën Hindistana holendi, esker derëxiste Cavayë. Holendiyân heta 7ë Adarë şer kir ù di vë tarixë de çekën xwe dantn.

NISAN

- 5 — Balafirën japoni li nivroyë Hindistanë, dirëjtî girava Seylanë kirine
- 22 — Bombavëjën emërikantî di ser Japonyayë re friyan, payitext ù çend bajarën wë dane ber bomban ù jë berë xwe dan rohelë ù çûn li balafgeheke Çîna nevegirtî dantn.

GULAN

- 4 — Di Birmanayayë de eskerën japoni gihastine Mendelayë ù bi vi awayi riya Bûrmayë hate birtn.
- 5 — Balafirën ingiltzi hi refine ji sed balafirân bihevketî dest bi lëxistina Elmanyayë kir,

## REWŞA DINYAYË

ESKERËN SONDXWARIYAN DI BEJA EWROPAYË DE — Beriya niho ji ingilizan çend çaran eskerën ko ji wan re kumandos dibëjin, derëxistine peravën Frensayë. Lë tucaran ew esker li bejë ji du sê saetan bêtir ne diman ù mixdarë wan ji ne ewçend zëde hû. Lë vë carë li 19ë Tehaxë eskerën sondxwariyan bi pirahî ù hi tangan re hatin ù li nizingi Diyëpë daketin bejë. Ev hemle ewçend xurt hû ko xelkë got qey ingiltzi ù sondxwari dikin eniya nû vekin.

Li gora danezanën britani hemle bi awayë jêrin çëbûye ù plana sondxwariyan reziña zesarën ko gihastiyë qewetën wan çûye serî.

Li 19ë Tehaxë, serë sibehë di saet heftan de vaporën ko eskerën bejë lë siwar hû bûn, di bin himayeta stol ù stol di bin himayeta balafirân de ji benderën Britanyayë bi rê ketin. Gava eleman bi wan hesiyan stol ù vaporën sondxwariyan qederë deh milan nizingi li erdë Frensë kiri bûn. Balafirën elemani derketin pêşiya neyarën xwe ù drëji stol ù balafirën sondxwariyan kirin.

Di nav vi şerë behri ù hewayi de qeflek ji eskerën sondxwariya daketin bejë. Eskerën vi qefleyi kenedi bûn. Piştî ko lingën kenediyân erd girt ù wan ù elemanan rahiste hev kelekine xweser tangën xwe derëxistine reğahiyë ù tangan ji digel piyadeyën kenedi dirëji elemanan kir. Di pey kenediyân re ingiltzi, emërikani ù frensizen şerovani pë li erdë kirin ù xwe li armancë girtin.

Reziña her dişwari ù talûkeyë eskerën sondxwariyan di bejë de xwe saz kirin jû berdan ser çeper ù kozikën elemanan. Eskerën kenedi yën ko giranlya hemlë tanin pë qedrë du kilomëtiran pêş ve çûn ù gihastine riya ko digehine bendera Diyëpë. Eskerën vë hemlë piştî ko depozaneke dijimin ù betarîke peravîn lal kirin piştî nivro saet heftan de qefle terka beja Frensë da ù veğeriya Britanyayë.

Hin tangën sondxwariyan gihasti bin devën kûçeyên bajër ji, ji ber ko tangën elemani dikirin li wan bêne hev, fermanarë hemlë ew bi şûn de veğerandin.

Ji gotinën ingillzan welë dixuye ko ev êrîşeke keşfi hû ù sondxwariyan havileke mezin jë kirive. Mixdarë eskerën ko daketine bejë bi temami ne hati be ji seh kirin bi texmin ew 15-20000 peya bûn.

ù Havinë pë de vë êrîşë dom kir.

7 — Di Behira-Mercanë de stolën japoni ù emërikantî li hev da. Japon şikestin ù ji ber stola emërikantî kişiyân.

13 — Òrisan Kerç ji dest da.

13 — Òrisan dirëjtî Xerkovë kir. Li 19ë vë mehë eleman li òrisan veğeriyan ù rabûn berhicômë.

29 — Romel ji xetën Xezalë rabû hicômë ù ingiltzan xwe da paş ù kişiyân erdë Misirë. Okinlëk, fermanarë ingiltzi ordiwa heştan kişand heta Elemeynë ù êrîşa elemanan li ber vë xetë şikest.

HIZËRAN

4 — Di dora girava Midweyë de stola emëri



**ŞERÊ MEDAGASKARÊ** — Li 5ê Gulana sala 1942an îngilzan avêtî hû ser girava Medagaskarê û di bakurê giravê de bendera Diyêgo-Siwarêş zemt kiri bû. Hingê îngilzan bi standîna vê benderê bes kiri bû. Lê vê paşiyê îngilzan ji bo ewlehiya riyên vaporen xwe ji nû ve esker rêkirine giravê û ew esker li 11ê mehê daketîne nivronohelê giravê û bendera Morondavayê zemt kirine û jê berê xwe dane hundirê wêlê Tananarivê, merkeza giravê.

Waliyê Medagaskarê yê ko di bin emirê Vişiyê de ye li ber xwe da. Lê îngilzan niqawemeta frensîzan şkênand û ber bi pêş çûn. Welê dixuye ko îngilz heta çend rojan zora frensîzên giravê wê bibin.

**ŞERÊ MISIRÊ** — Li 1ê Îlonê bi şefeqê ve Romel di eniya Misirê de rabû hicûmê û li ser dirêjahiya eniyê dirêji xetên îngilzî kir. Lê li 3ê mehê Romel nemaze zora xwe da nivroyê eniyê û di nav Birelmerîzê û Birelmerîrê re ketê nav zeviyên lexem-kîrî, yanî erdê ko dijmanan lê torpil û lexem dani hûn. Romel bi fedakarîne mezin di nav wan zevîyan re qedere 13—14 kilomêtiran ber bi pêş çû. Lê ordîwa îngilzî a heştan ne hişt ko eskerên Romel jê wê ve herin.

Ordîwa heştan piştî ko êrişa Romel sekinand rabû berhicûmê û talyan û eleman bi şûn de ve gerandin. Li 8ê Îlonê Romel vegeheriya bû çeperên xwe ên pêşin. Bi vi awayî êrişa Romel şikest û ordîwa îngilzî bi xurtî di cilên xwe de sekîni. Ji hingê ve di wê eniyê de şerê balafirên li hevaxistina topçivan e.

Bi tenê li 14ê mehê eskerîne kumandôş daketîne erdê Tobriqê û hin depoxane û avahiyên eskerî berheba kirine û stola îngilzî hin vaporen mihwerê di benderê de bin av kirin.

**ŞERÊ ÛRIS** — Ûris xwe bidin pay ji bi mêrani

kani li stola japonî xist û xesareke mezin gihande wê. Disan di vê rojê de japonan esker derêxist giravên Elêûtênê.

27 — Eleman ketine Kûbyanskê.

#### TIRMEH

1 — Elemanan di navbera Kûsrk û Xerkovê re dest bi hicûma mezin kir. Hicûma ko jê ve hicûma Biharê dibêjin.

4 — Ûrisan Sevestepol ji dest da û eleman ketin ê. Bi vi awayî şerê Kîrmê safî bû.

7 — Şerê Çînê sala xwe a pêncan qedand û kete a şeşan. Vi şerî li 7ê Tirmeha 1937 an dest pê kiri bû.

8 — Eleman ketine Starayarskolê.

24 — Ûrisan Rostov ji dest da.

#### TİFBAX

7 — Emêrikaniyan esker derêxiste giravên Silêman. Bi vi awayî di Pesîfkê de emêrikaniyan dest bi êrîşê kir.

9 — Eleman ketine Krasnodarê, Krasnodar di Behira-reş de benderike rûsî ye.

19 — Îngilz û sondxariyan esker derêxiste Diyêpê.

û qehremanî şer dikin û xesarîne mezin digehînin dijminên xwe. Ji bo sobata ûris mirov dikare bibêje ko eskereki elemanî ji bona ko rûseki ji rîya xwe bide alî, dareke ko rayên wê di bin erdê re çûne hildikişîne.

Piştî ko eleman gihastîne quntar û negehên çiyayên Qevqasê êrişa elemanan gelek kêr kiriyê.

Li aliyê nivro elemanan ji du baskan berdaye welatên Qevqasê. Baskekî di peravên Behira-reş re xwe li bendera Novorosiskê rast kiri bû. Vi baskî li 2ê Îlonê hendera Enapayê vegirt û zora xwe da Novorosiskê. Danezanên elemanî da zanin ko ordîwa elemanî li 4ê Îlonê ket Novorosiskê jî. [Lê ûrisan derew bi aliyê vê niçê ve da û piştî xuya kir ko wê rojê eleman bi tenê asêgeha bajêr zemt kiri bûn û şer di kûçeyên bajêr û di benderê de dom dikir. Lê piştî çend rojan ûris bêgav man û jê kişiyân û di nivroyê Novorosiskê de ketine xetine nû û di berevaniyê de pê didin erdê.

Baskê di herê xwe da bû Grozniyê. Grozni merkezeke petrolê ye. Eleman di vê qadê de jî bi zehmet û gelek hêdi ber bi pêş diçin. Li gora danezanên paşin ordîwên elemanî hêj ji Grozniyê 40-50 kilomêtir dûr in û di bilindcîhên Qevqasê de berfê dest bi ketinê dibe.

Herçî Stalingrad, şer di dora wê de xurt bûye, Stalingrad li ser çemê Volgê bajarekî mezin e. Erdê. bajêr di perên çem re qedere 40 kilomêtir dirêj dibe. Eleman gelek zorê didin Stalingradê. Ji ber ko Stalingrad ji alîkî merkezeke sinabî, ji aliyê din niifta Volgê ye. Bi standîna Stalingradê Rûsya nivro ji Rûsya bakur qut dibe.

Elemanan ji nivro, ji bakur û ji roavê berdaye Stalingradê û bi qewetîne mezin dirêji bajêr dikin. Piştî delê mehê ordîwên elemanî di bakur û di nivro re gihastîne Volgê. Hesêb Stalingrad kete bin wihaserê. Lê vîna berevaniyên bajêr bi tu tiştî naşkê. Belê cih li ûrisan teng bûye; lê ûris di vê tengiyê de ji bi dilfirêhî şerê xwe dikin.

Li 12ê Îlonê serfermandariya rûsî heçî pirên Volgê hene tev de dane berhewa kirin û rîya vegeêrê li eskerên xwe birin. Serfermandarî di emirê xwe de dibêje, ji bo midafihên Stalingradê vegeer ne maye, divêt Stalingrad heta mirov û herikê paşin şerê xwe bikir. Midafihên Stalingradê welê jî dikin.

Li 13ê Îlonê eskerên elemanî gihastîne dora bajêr û ketine devên kûçe û koldnan. Ji hingê ve şer di nav bajêr de çêdibe û ûris bajarê xwe kûçe bi kûçe, xanî bi xanî midafehe dikin; carina eleman di levin hin mezelen avahikê, di hinên din de hêj ûris hene. Ûris terka van mezelan nadin û di liwana avahiyê de li dijminê xwe diqelîbin û didin sîngên hev.

Ev şer dimîne şerên kurdmancî. Ma li wextê berê şerevaniyên kurdmanc aş û asêgeh li hev quî ne dikrin û tê de ne diketin sîngên hev û bi xenceran li hev ne dixistin?

Piştî ko ûrisan rê li xwe birin hawar û gaziya bajêr bi balafirên têt. Heye ko. Stalingrad bikeve destê elemanan. Lê bi vê midafehê ûrisan plana elemanan bi gelekî guhartine û bicihanîna wê warqilandinê.

Mirov bê hemtê xwe li vê mêraniyê ecêbmayî dimîne. Di dema şikestîne de ji li berxwedan ne karê her camêri ye.

ŞAM: 15 Îlon 1942

NÊREVAN

## BRÉZILYE

Brézilye ji kete şer. Brézilye yek ji cimhûriyetên Emêrika nivro ye. Ji Emêrika nivro re Emêrika latîn ji dibêjin. Ji ber ko xelkê wê bi piranî ji nivroyê Ewropayê û nemaze ji Spanye û Portekizê çûne wan deran û di wan welatan de qerar girtine.

Brézilye ji wek piraniya dewletên Emêrika nivro quthiriya xwe ji mihwerê kiri bû; lê mîna Şîlî û Erjantînê hêj ne keti bû şer. Vê paşiyê noqarên mihwerê ji nû ve çar vaporên Brézilyayê bin av kirine. Li ser vê yekê Brézilye ji rabû ji Eleman û İtalyayê re ilanherb kir. Di nav erdên Emêrikayê de erdê Brézilye ji her derê bêtir utzingî Ewropayê ye. Ji wî awirt ve ji şerevaniya Brézilyayê kirdeyeke girane ye. Bi vê hêncetê me dil kir xwendevanên Hawarê li ser bin tiştên wî welatî serwest bikin.

Di sala 1500î de emiralekî portekizî Brézilye keşif kir û Brézilye bû mistemlekeke wê dewletê. Di sala 1815an de Mîr Bêdro, kure qralê Portekizê bû xidiwê wî welatî û di sala 1822an de Bêdro istiqalala Brézilyayê îlan kir û Brézilye bû welateke bi ser xwe. Lê di sala 1889an de di Brézilyayê de îxtilalek çêbû; xelk li qral rabûn, ew ji text existin û cimhûriyet îlan kirin. Ji hingê ve Brézilye ji wek dewletên Emêrikê ên din cimhûriyetek e.

Rûyê erdê Brézilyayê 3 275 510 kilomêtir çarçik e û nifûsa wê 43 milyon e. Paytextê Brézilyayê Riyodêjanêro ye. Zimanê resmî û zimanê piraniyê portekizî ye. Lê herçî wilayetên nivro, tê de bi elemantî û talyanî ji xeber didin.

Brézilye di nav cimhûriyetên Emêrika nivro de a dewlementir e. Di erdê wê de zêr, hesin, manganêz, komir, elmas h. d... peyda dibin. Herçî hatinên wê: qehwe, kekao, birinc, penbû, tenbakû û şekir in. Di Brézilyayê de rêline welê hene ko hêj insan pê li wan ne kiriye. Dibêjin ko darên wan rêlan qederê hezar sall têra dinyayê dikin. Çemê Amazon-çemê dinyayê e dirêjtir ( 6420 kilomêtir dirêj ) tê re dibore.

Qehwa Brézilyayê zehf û bi nav û deng e. Ji qehwa dinyayê hemî ji sedî 65 ji Brézilyayê dertê. Qehwa Brézilyayê tîk de 66 milyon kîs in. Ji wan 66 milyon 16 milyon di hundirê welêt de dimînin û a mayîn rêdikin derve. Ji ber zêdahiyê, carina qehwa wî welatî kêmbiha dibe. Ji lewre hikûmet ji sedî 30 partî ji cotkaran bi behakî nizim dikire û wê dişewitîne.

Di Brézilyayê de xizmeta eskertî mecbûrtî

ye û midetê xizmetê neh sal in. Di sala 1939an de yanî wextê ko şer dest pê kir di ordiya Brézilyayê de 6548 zabit û 73275 esker hebûn. Herçî stola wê ji zirehpûşek, 17 bertorpiyor 4 noqar, 4 torpiyor, 6 torpilçîn û ji çend vaporên petrolkêş bi hev diket. Lê Brézilye ji hingê ve ordû û stola xwe xurt kiriye. Vê dewletê piştî şertî di balafirvaniyê de ji zêde kiriye Ji bo vê yekê hikûmeta Brézilyayê ji İtalyayê mamosteyên balafirvaniyê ji anl bûn. Lê piştî ko İtalye di rex Elemanyayê de kete şer ew mamoste vegeyriyanê welatê xwe.

Reiscimbûrê Brézilyayê Citalyo Fergas çirokeke delal û cazibedar heye. Fergas di xortaniya xwe de şivanê ber pez bû. Xweş li bîtrê pif dikir û distrand. Dilê keçikekê pê keti bû. Lê keçikê pê qall ne dibû, ji ber ko Fergas ne ji maleke nas bû. Fergas jê re digot: « Keçê, tu îro min uaktî ji ber ko ez şivan im, lê rojêkê tiwê poşman bibi. Belê tiwê bibtî ko tu bi reiscimbûrê Brézilyayê yê ayendê qall ne bûyi » Keçik li vê gotinê dikenî, heji Fergas dikir, lê qall ne dibû ko bihe jina şivanekî.

Fergas ji şivaniyê derbasî ordiwê bû û midekî tê de ma. Ji ordiwê jî derket û kete dibistana biqûqê û bû evkat. Di pey re ji xwe re rojnameyek ji derêxist û li dengê xwe geriya û deng pê ket. Fergasê şivanî di parlamenê de bû nîmînde yanî mehûs.

Di sala 1930î di Brézilyayê de ji her zêdahiya qehwê bihraneke iqtisadî çêbû. Fergas ji emelan, ji xwe re, bizbek çêkir û namzediya xwe dawl riyasetê. Lê namzediya wî ne çû serî û yekî din bû reiscimbûr. Lê Fergas imîda xwe ne hîrt.

Fergas gava dît ko îş bi qenclî çênebû, rabû hevalên xwe ên kevin, şivan, dane hev û ji Sên-pawloyê dirêjtî Riyodêjanêrovê kir. Di navbera şivanên Fergas û eskerên hikûmetê de şer çêbû Şivanên Fergas zora polls û eskeran bir, reiscimbûr danin û li şûna wî Fergas bû reiscimbûrê diktator. Ev donzdeh sal in Fergas reiscimbûrê Brézilyayê ye û dostika wî ya wextê şivaniyê jina memûrêkî adettî ye.

XELÎLE GENCO

## ÇEND İMEDHELOKÊN JAPONİ

Kêm caran mirovê xurt ne hişk e. Sefera sed kilomêtirî bi gawekê dest pê dike. Heçî zane xeber bike, dizane derewan jî bike. Di edebê de zêdekirin bêdebtî ye. Dizê peran dikin heşsan, dizê erdan dikin siltan. Çêtir e ko mirov di fenekê de xurt be, li şûna ko di çendekan de qels be. Pisingên xelkê ji mirov re mişkan nagirin. Riz û çayasar bêne xwanin jî pirsên sar nayine daxwarin.

## COUTUMES ET TRAITS DE MOEURS

146 — Mîr terka baz û şahîn kir, sîsyang û tîlûr kirine şewirdarê xwe.

L'émir a délaissé le faucon, il a pris pour conseillers la bergeronnette et la tourterelle.

147 — Nan û plvaz û nexweş çavreşî ye.

( Qui a ) du pain et des oignons et se prétend malade est un gourmand.

148 — Ne gayê min li garanê ye, ne galgala nanê gavên dikim.

Mon boeuf ne fait pas partie du troupeau, je ne parle pas de ce que mange le bouvier.

( C'est à dire: je ne me mêle que de ce qui me regarde, et n'ai pas à pâtir du reste. Dans beaucoup de villages kurdes, les troupeaux sont gardés par un berger communal ).

149 — Ne jina belaş, ne xulamê bê meaş, ne erdê kaş.

Ni femme épousée sans payer la dot, ni valet sans gages, ni terre en pente.

150 — Şeb û şekir li cem şivana yek e.

Alun et sucre candi, c'est tout un pour le berger.

151 — Şekir ne xurdê şivana ye.

Le sucre n'est pas nourriture de berger.

( Allusion à la vie rude que mènent les bergers kurdes ).

152 — Şex ne l batin e, kul bi serî hatine.

Le chaykh n'est pas miraculeux, mais il a de l'expérience.

153 — Şikeft bi dengbêja de ket, dest bi mamika kirin.

Les dangbêj ( troubadours ) s'étant trouvés dans une caverne, ils se mirent à réciter.

( Ils profitent de l'écho qui donne plus de force à leur voix ).

154 — Şûrê Misrê bikeve avê de jeng nagirê. Sabre d'Égypte qui tombe à l'eau ne rouille pas.

( Les sabres égyptiens et damascains étaient particulièrement estimés ).

155 — Şûr Şam, xencer mam, jin dotmam.

Sabre de Damas, poignard pareil à un oncle paternel; pour femme la cousine.

156 — Tu li berlya Mêrdînê li siwara dipirsl. Tu cherches des cavaliers dans la plaine de Mardine.

( La plaine de Mardine est un pays de cavaliers par excellence ).

157 — Xerîbî ne tu çek e, piyê xwe tê re meke. L'exil n'est pas un vêtement, n'y mets pas l'épaule.

( Allusion à la répugnance qu'ont les Kurdes à s'expatrier ).

158 — Xwarzî tèn li xwalan weke ciwanî tèn li fehlan.

Les neveux ressemblent à leurs oncles maternels, comme le poulain à l'étalon.

159 — Xwîn bi xwîné naye şîştin, xwîn bi avê tête şîştin.

Le sang ne peut laver le sang, mais l'eau l'efface. ( Allusion aux vendettas qui ensanglantent le Kurdistan ).

160 — Jina werîn ji malê mezin, pê bide bezar û hin, da jê bikevin Mîr Şem û Qeretaclê min.

Prend femme dans une grande maison, paie mille et plus; elle enfantera Mir Cham et Qaratâdjîn.

( Voir No 144 Mir Cham et Qaratâdjîn sont deux héros de la légende de Mamé Alân ).

161 — Méré bi du jina dervegan e.

Qui épouse deux femmes fait le portier.

## PHENOMNES METE OROLOGIQUES

162 — Şeva çîrln, kew diçêrln.

Les nuits d'Octobre et Novembre ( sont si claires que ) les perdrix vont en champs.

163 — Nabêna Temûz û Tebaxê, ecêb e ko agir nagire axê, ne li hir, lê li orta Hevlêr û Şaxê.

Entre juillet et août, c'est merveille que le feu ne prenne pas à la terre, non pas ici, mais dans les parages de Havlar et de Chakh.

( Se dit au Botân, contrée montragneuse et fraîche ).

164 — Adar e, berfê avê guliva darê, ne ma heya danê êvarê.

En mars, la neige couvre les branches des arbres Mais fond avant le soir ( se dit chez Dakchûrl ).

165 — Adar e, dew li dar e ne li vir, lê li çiyayê Şingalê ( an: li Hop û Hekarê ).

Dès Mars, on fait du lait caillé, pas ici, mais au Sindjar ( ou: à Hop et Hakkari ).

( Se dit chez les Haverkan qui habitent une région où il fait encore froid en mars ).

## ENIGMES

166 — Av e, ne av e, marê mirî di nav e, teyrê zêrln hindav e. ( lampe )

C'est de l'eau sans en être avec un serpent au milieu et au dessus, un oiseau d'or ( la lampe ).

167 — Çar bira berdidin pey hev, yek nagihe yekî ( serbiat ).

Quatre frères qui se poursuivent sans jamais s'atteindre ( les pointes des quatre aiguilles à tricoter ).

168 — Du bira hene, her li hev dinêrin ( kuçê tişkê ).

Deux frères qui se regardent toujours ( les chenets ).

169 — Ez di devekl ve diçim, di sisiya ve derdikevim ( kiras ).

J'entre par un orifice, je sors par trois ( la chemise ).

170 — Hinde tiliyekê tejl xeniyekl ( ronahl ).

Gros comme un doigt, plein la maison ( la lumière ).

171 — Jinek heyê, bi du mêra ye ( dam ).

Une femme à deux maris ( le jeu de dames ).

172 — Kok di erdê de, serî di te de, orte di kerê de ( genim ).

La racine en terre, la tête en toi, la tige en l'âne ( le blé ).

( A suivre )

TAWÛSPARÊZ

Kiriyariya Hawarê 500 Qirdşên Surt

Xwedî û gerîndeyê bepirsîyar: Mîr Celadet

Ali Bedir-Xan . Şam—Sûriye

Directeur Propriétaire: Emîr Djêladet Aali

Bedir-Khan, Damas-Syrie

ŞAM — 1942 — ÇAPXANA SEBATÊ

## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Tefsira Quranê	Dr. K. A. Bedir Xan
Gramêra kurdmançî	C. A. Bedir Xan
Dîwana Melê	Qedri Cemil paşa
Klêopatre	Bişarê Segman
Memozîna Xanî	Herekol Azizan
Malikeke Hafîz	Farîsîxwîn
Marşa Felatê	Osman Sebrî
Rewşa Dinyayê	Nêrewan
Pîroziya Cejinê	Şêx Memdûh
Enîgmes	Tawûsparêz

### TEFSÎRA QURANÊ

187 — Wê demê binin bira xwe... Mezinên xudankitêban ji Xuda re swind xwari bûn ko ew hicetên pêxemberitiya Bezma Mihemed venaşêrin û wan pêş xelkê dikin. Lê wan piştê ji bo xatirê çend peran bextê xwe reş kir û swinda xwe avêt pişt guhê xwe. Ew dan û standina wan bi çiqasî kirêt û ne hêja ye.

188 — Guh mede wan... Ew nefa xwe bi tiştên ko pêk ne anîne li ber xelkê mezin dikin û zirtê xwe didin û dixwazin ko xelk jî pesnê wan bide. Wan xwe ji cezayê Xuda xelas ne kiriye, ji bona wan êşeke giran heye.

189 — Erd û ezman milkê Xwedê ne û Xuda bi her tiştî dikare.

190 — Di afirandina erd û ezmanan de û di çûn û hatin û kurt û dirêjbûna şevan de, ji bo mirovên birewer hikmetine hêja hene.

191 — Ew, di rabûn, rûniştin û raketinê de Xudayê xwe ê mezin tînin bira xwe û bi hikmeta afirandina erd û ezmanan mijûl dibin û dibêjin: Xudanê me, te erd û ezman bê sebeb ne afirandine; me baweriya xwe bi te girtiye, me ji ezabê dojhê biparêze.

192 — Xudayê me... mirovê ko tu davêjlî agirê dojhê, perîşan û şermisar diki. Ji ezabdarên nefa xwe re tu artîkar nîne.

193 — Xudanê me... Me dengê Quranê

û pêxemberê ko li ser riya rastî û baweriyê banî me dikir bihîst. Wî digot: baweriya xwe bi Xwedê binin; me jî baweriya xwe pê anî. Xudanê me, di gunehên me bibore û sûcên me ewî bike, canê me di dema standinê de, bike hevalê canê qencîkeran.

194 — Xudanê me... Sewaha ko te mizgîniyayê bi pêxemberên xwe re bi me da, bide me û me di roja pişdawayê de serpeze û şermisar meke. Tu mezin î, bextê xwe xira naktî.

195 — Xudanê wan, ji kerema xwe li wan vegeand û got: Ez qenciya kirin û emelê we nas dikim û ew li cem min wînda nabe. Qencîker jin an mêr bin, di nav wan de tu ferq nîne, ew weke hev in. Yê ko ji bo parastina dîne xwe ji welatê xwe hatine derêxistin û di riya min de hatine eşandin û dest bi şerfî kirin û gihane mirinê; ez di gunehên wan diborim û wan digihînim bihuştên têr av û kanî. Ev şabaşa Xuda ye û tu şabaş ji ya Xwedê ne spehitir e.

196 — Di dinyayê de dewlemendî, çûn û hatin û zirt û fortê kafiran bila we nexapînin.

197 — Ev tiştên he, kêmqedr in, dawîya wan kafiran ketina dojhê ye; dojhê cihêkî têr şerm û ezêb e.

198 — Lê yê ko ji Xudayê xwe tirsîyar in, li gora emrê Xuda dimeşin, xweylî bext in, ji dîn û welatê xwe hez dikin, xebatker in, derewan nakin, pakbeden û pak dil in, qenciye dikin û ji xirabiyê dest dikişînin, destvekirî ne, ne çavteng in, artîkariya feqîr û sêwîyan dikin; ji bona wan bihuştên têr av û kanî hene û ew her tê de dimînin. Di wan bihuştan de, ji bo wan, ji bal Xwedê ve her tiştên çak û pak pêda dibin. Ji bo bawermendan ji kerem û rehmeta Xuda xweştir tu tişt nîne û her tiştê ko ji bal Xuda ve ye baş e.

## BINGEHËN GRAMËRA KURDMANCI

— 19 —

### DERECEYËN RENGDERËN WESFIN

128 — Rengdêrên wesfîn, wesfê navdêran bi dereceyên tével dikarin bidin zanîn. Bi gotîrên min ev rengdêrên ha di qisetê de ji awirê mana û bastûrê ve di şikilîne tével de tene dîtî. Wekl niho gava mirov dixwaze wesfê bezabûna hespekl bide zanîn dikare bibêje:

1 — Ev hesp heza ye.

2 — Ev hesp (ji ê din) bezatir e.

Di komeka pêşîn de rengdêra beza, wesfê navdêra hêsp gava ev bi tena xwe û bezabûna wî adetl ye, ne kêm û ne ji zêde ye, dide zanîn. Di vi hall de rengdêr di halê adetl de ye.

Herçl komeka diwim, tê de rengdêra beza di şikileklî dîn de ye û « tir » ek pê ve bûye. Bi « ve » « tir » rengdêr dikeve halê kemper, yanî miqayesê. Belê gava em « Ev hesp bezatir e » dibêjin; hespê ha hatiye dayîn ber hespeklî dîn û ji ê din bezatir derketiye. Ji lewre parklta « tir » ê bêt ko navdêra rengdêrê bi navdêreke dîn bête kemperandin yanî miqayese kirin, bi rengdêrê ve nabe.

QEYDE — Ji bo çêkirina kemperiya dengdêran li rengdêrên adetl « tir » ekê zêde dikin. Herwekt: qenc-qencîr, bilind-bilintir, spehl-spehlîr, sor-sortir, dirêj-dirêjtîr, fireh-firehtîr, xurt-xurtîr, beza-bezatir h. d.

129 — Ji milê din rengdêrên wesfîn di halên xwe ên adetl û kemper de bi zêde kirina hin pirsan, nemaze hokeran di mana xwe de kêm û zêde dikin.

1 — Ev hesp beza ye.

Ev hesp hinek beza ye.

Ev hesp gelek beza ye.

Ev hesp yekcar beza ye.

Ev hesp ne ewçend beza ye.

Ev hesp bi qasî hev beza ne.

2 — Ev hesp (ji ê din) bezatir e.

Ev hesp (ji ê din) hinek bezatir e.

Ev hesp (ji ê din) gelek bezatir e.

Ev hesp (ji ê din) yekcar bezatir e.

Ev hesp (ji ê din) ne ewçend bezatir e.

Ev hesp ji hev ne bezatir in.

130 — Disan ji aliyê din rengdêrên wesfîn ên adetl gava « ne » yek dikeve pêşiya wan bi awaktî dîn mana dibin û dikevin şikilê nerênî. Herwekt: dagirtî-nedagirtî. Ev tîfîng dagirtî ye. Ev tîfîng nedagirtî ye.

Lê heke « ne » bi rengdêrê ve ne bûye

## DIWANA MELE

— 34 —

Ney çekera gerden ji ac disa ji reş tozên semed Qewse li bala ferq û tac keybir reşandin bê eded Keybir reşandin bê hisab misri ko dan siqal û tab Sed Ristem û Efrasyah kuştin li wan ker kir cesed Sed padîşah û Xisrewan can dan ji eşqê wan rawan Şirin û libse erxewan min di li bejna serwî qed Min dîn li bejna er'erin tayên zîbad û enberin Bayê seba da cenberin zîf çûne ser nûra semed Zîf çûne ser nûra zelal carek were bayê şimal Biskan ji ser demê vemal zilfan ji ber cotê esed Seb-harê cotê cadiwan îro ji remza ebrîwan Dil girt û da ber gashiwan ker kir li miskînan kebed Dil girt û da ber xenceran kuştin nigara dilberan Me ji destê zilma esmeran dad û meded dad û meded Dilber ji le'len Xwey şefaf da min meya gulgin û saf Deryayê eşqê qaf û qaf peyweste têtin cezur û med Husna minez-zeh bê misal ser da libasê xet û xal Sergeste beyran maye lal ehmed ko di nûra ehed El-lah ji nûra sermedi yek qetreyek da Ehmedî Şirîni û remzek we di medhûsi ma bet-ta ebed

hingê rengdêr ne nerênî ye. Bi rastî gava em « ev tîfîng nedagirtî ye » dibêjin jê mexsed ew e ko tîfîng vala ye. Lê heke me « ev tîfîng ne dagirtî ye » dibêjin jê mexsed ew e ko tîfîng hêj ne hatiye dagirtin. Yanî nerênî ji rengdêrê bêtir li lêkerê hikim dike.

### RENGDÊRËN ÎŞARKÎ

131 — Ev rengdêrên ha dikevin pêşiya navdêran û li wan îşaret dikin. Rengdêrên îşarkî ji pronavên îşarkî ên pîvene « ev, ew » pêve, ne tu tişt in û gava navdêrên wan ji komekê dikevin ew vedigerin ser eslên xwe û wezîfeyên xwe ên bingehîn dibînin; herwekt di unsalên jêrîn de tete dîtî:

Ev mirov îro ji bajêr hat.

Ev îro ji bajêr hat.

Ewî mirovê ko tu dîtî birayê min e.

Ewê ko tu dîtî birayê min e.

Evan mirovan gote min ko tu çûyt neçîrê.

Evan gote min ko tu çûyt nêçîrê.

132 — Me di mada 57an de gotî bû ko navdêrên nêr bi guhartina « a » û « e » ya wan bi « ê » kê ji tene tewandin û di hin derên Kurdistanê de ev navdêr gava yekeymar in yekcar nayîne tewandin. Lê heke rengdêreke îşarkî daye ber navdêrê hingê navdêr ji kîjan mêjer û zayendî be ji lî gora qeyqa gelemper tete tewandin. Ji lewre mirov nikare bibêje « Ez vi hêsp, an, vi hesp dibînim » divêt bibêje « Ez vi hespt dibînim ». Herwekt: vi hespt, van hespan — wî hespt, wan hespan — vê mehinê, van mehinan — wê mehinê, wan mehinan. (dûmahik heye)



## KLËOPATRE

Klëopatre melika Misirê bû. Jiylîna xwe di evîn û hezkirinê de derbas kiri bû. Beriya wê Zilêxa hebû. Zilêxayê jî hez dikir; hezkirineke kûr û hûr. Ji Zilêxayê ve mihbeta dilan yek bû, ne dibû dîdo. Dilê Zilêxayê bi Ûsif pêxember keti bû. Zilêxayê ewçend jê hez dikir ko rojekê gava pêş Ûsif ve sêv dixwarin kêr da bû destên xwe.

Klëopatrayê gelek caran û jî gelek kesan hez dikir. Lê evînên wê gelek ne tajotin. Şevekê, kêr caran heta bi salekê. Lê bi Autonyo re Klëopatré sebir bi xwe da û di evîna wî de jî salê wê ve jî çû.

Belê melika bedew carina şevekê, şeveke kin, spîşevêkê hez dikir.

Klëopatré di kelkela Havînê de, roja xwe di qesira xwe a penceregirtî de derbas dikir û ber bi êvarê, bi çêri û berdevkên xwe ve derdiket beşçeyên xwe ên bernil û temaşa hespên avê dikir.

Hespên avê bi xwe, jî germê pelixî, cangiran û lingqerimî derdiketin qeraxan û devên xwe ên fîrehmezîl bi vekêşan vedikirin û di dora mehtnan de bi lavekariya evînê digeriyan; bi pozên xwe ên hestîspeliin pişt mehtnên xwe dixurand û talastin; ew kêfxweş dikirin û bi şahlke şehwetengz digel wan dadiketîni avê; tê de wînda dibûn. Piştî bihinekê, di wî milê avê de du sehvirên reş û libevbadayî xuya dikirin.

Klëopatre, ra û damarên canê wê jî ve temaşayê şidandî û vegirtî, di ber xulamkoleyên xwe re derbas dibû, diçû qesira xwe.

Carina çavên wê bi xulamkolekî rift û lewend diketin. Wê şevê, ew xulamkole diçû xizmeta xanima xwe; piştî wê dida erdê, berê wê dida Xwedê û canê xanima xwe ê hişkbiyî, heta ko ew sist û nerm dikir difirkand û ew bedena zîvîn, di nav çiban de, bi milên xwe ên zexm badida û distrand. Bi vî firikandin û badanê qey hestiyên melikê dihelîyan û canê wê ê nerm dibû gutlek hevîr; hevîreki hinde çir ko deng jê dihat. Klëopatre kêfxweş, ewçend xweh dida û germ dibû ko dilmest û bêhiş di xew re diçû; germiya Havînê di germiya canê wê de wînda dibû.

- Sibetir ew xulamkole peyda ne dibû. Kelkê serayê jî hev lê dipirsîn. Digotin, bi wezîfakê çûye beriyê. Lê carina çêriyên xewgeha Klëopatré di sêlûna hemama melikê de çend

çilop xwîna didtin bi tîrs, ker û lal li wan difedkirin û xuldamkole nema jî beriyê vedigeriya.

Rojekê, Klëopatré, di dtwanxana xwe a mezin û zêrheft de xwe li ser textê xwe dirêj kiri bû û jî hêsebiyê li dora xwe difedkiri û wek masiyê ko ketiye hejê bê kêş û fesal xwe tev dida. Sidonye, çêriya wê a azadkiri, li ber lingên wê rûniştî, guhdariya emrên wê dikirin.

Klëopatré bajêna xwe bi xurtî hejand û her bi jor rakir. Çêri û koleyên ko li pêş wê ve qor girti bûn, mana îşaretê seh kirin, xwe xwar kirin erdê, raxer maç kirin û di pişt perde û stûnan re wînda bûn. Klëopatré gote Sidonyê:

— Ya Sidonye, tu nizant çiqas bihîna min teng dibe. Dîtirsîn ko sira ko di dilê xwe de vedîşerim bi hilavêtîna dilê min wê sînga min der bike û wê bikeve her çavên dînya û alemê...

Sidonyayê pêyên xatûna xwe ramîsand, rûyê xwe di ejuyên wê da û got:

— Xamîma min! tu destûra çêriya xwe didi ko hişkexîlê û li dermanê xanima xwe bigere. Carina giyaki adett dermanê derdeki zexm e. Ma ew çî sirê ko xanima min têsîne?...

Klëopatre: Tu qenc dizant Sidonye ko ez gelek hejî te dikim û dilê min her bi te ve ye. Ev du sal in min tu jî çêriyê azad kiri û min tu, di vî qesirê de, kiri miroveke aza û serbest; jî her mirovên aza azatir û serbestir. Û disan min destûra te da ko tu li gora kêfa xwe jî xwe re li mîreki bigerî da ko ez wî jî tê re binim. Te jî xwe re evdeki reşik bi-jart. Min ew jî azad kir. Çîre, jî ber ko hejî te dikim.

Sidonye: Belê ezgortî, ez pê dizanim û dixwazim sezayî wê hezkirinê bibin. Û min Hamo, evdê reşik jî xwe re neqand...

Klëopatre: Belê Hamo, ev evdê reşik, jîna mîreki Hebeşistanê ew jî min re diyarî, rêkiri bû. Hamo di deryavaniyê de şebraza derket û li Skenderiyê di cenkeştîyan de dixebite. Lê Hamo êdî ne kole ye, mîreki aza ye û yê te ye. Çawan Sidonye tu bextiyar î?

Sidonye: Belê ez gortî ez bextiyar im, lê bextiyariya min bi tenê hingê tekûz dibe, gava min xatûna xwe jî bextiyar dît...

Klëopatré destekî xwe danî ser serê Sidonyayê û ne hişt ko gotîna xwe bibe serî. Sidonye lê fedkiri. Du hestîrên germ û girover wek du daneyên mirariyan di ser hinariken Klëopatré re ketin koşa Sidonyayê.

Sidonyê rabîste her du lingên xatûna xwe

û ew li ser hev çend caran maç kirin. Sîdonyê gote xatûna xwe: Ez gorî, ka bêje min çi dest daye te... sînga min tîrba sir û dildiziya te ye.

Klêopatre: Ma ew xortê ha, ew ferman-darê romanî; yê ko heta bi Skenderiyê ez pê re rawestiyam naye bîra te. Belê ew ferman-darê romanî, yê ko daye pêşiya ordîwa xwe û xwe li welatên Mad û Faris girtiye...

Sîdonye: Mark Antonyo, ma ne ew e. Çawan nayete bîra min. Ew mirovê bextiyar. Belê bextiyar; lê ne ji ber ko serdarekî romanî ye; lê ji ber ko dilê melîka Misirê meyildariya wî kiriye û tro melîke rîya wî dipê.

Klêopatre: Belê Sîdonye, we ye, herwekî te gotiye; lê vegera wî bi derengî ket. Antonyo soza xwe da min, ewê jîna xwe a romanî berde û li şûna wê ezê bibim jîna wî. Emê herdu li ser textekî rûnin. Serên me di bin tacekê re wê bigehin hev; robelat û roava her du welat jî ewê bindestiya me bikin.

Sîdonye: Min hêvt ji Xwedê heye ko daxwazên xatûna min tev de biçin serl.

Klêopatre: Tu çi qas delal î, Sîdonye, Xwedê jî te bibihîse. Kes nizane, dinya ye, te dît tifaqek lê qewimî... way li min ax, ezê... ma ezê çi bikim; ma bêt wî ez dikarim. De rabe em jê re diayê bikin, jî Xwedê hêvtar bibin...

Klêopatre û Sîdonye deverû li erdê dirêj dibin. Di sîkûna şevê de dengê van her du jinikan wek zarîna şîrmjeklê geh bilind û geh nizlm dibe. Heye ko Xwedê ew deng bihlîstî bin.

Antonyo mîzefer, serdest, bi mal û menal, bi hêstr û xulam jî seferê vedigere; terkê jîna xwe a romanî Oktavyayê dide û li şûna wê Klêopatrê mehîr dike. Lê Antonyo newêre wî lî di nav qewm û milelê xwe de îlan bike. Dîtirse ko xelkê wî lê rabin, jê higerin û bibin dijminên wî.

Lê Antonyo pêşkepkî xurt heye: Oktavyo. Oktavyo birayê Oktavyayê, yanî bûrayê Antonyo ye. Oktavyo jî alîkî li beyfa xweha xwe digere û jî aliyê din dixwaze di Romayê de fermandarê tekane bîmîne Antonyo bi nav û deng û bîmêraniya xwe di ser wî re ye. Oktavyo teqîsir nake û di şehnedêrekê de jî xelkê Romayê re dide zanîn ko Antonyo jîna xwe a romanî berdaye û melîka Misirê, Klêopatre xistiye şûna wê.

Jî milê din Klêopatrê bi xwe zor dida Antonyo û dixwest ko ziwaca wan bête îlan kirin. Di ber çavên reyîyetên Klêopatrê ev zîwac jî melîkê re rûnmeteke mezin bû.

Antonyo, wî usîqê seyda nema karî bû li

ber îsrara Klêopatrayê bisekine. Di sala 36an beriya miladê, Antonyo bi name û qasidan jî rohelê heta roavê da zanîn ko jîna xwe a romanî berdaye; bûye mêrê melîka Misirê û Klêopatre ketiye şûna Oktavyayê.

Meclîsa Romayê giha hev; romaniyan bi yekdengiyê Antonyo xalî îlan kirin û jî Oktavyo re swinda sêdaqetê xwarin,

Çar sal ketin navê, beriya miladê bi 32 salan; bû şer. Eskerên Oktavyo û yê Antonyo li hev dixistin. Klêopatrê daweta çêriya xwe a azadkîrî şahnet dikir. Ji wê dawetê re torînen dewletên dost, gîregîrên welêt tev de hati bûn vexwendin. Klêopatre mêrê çêriya xwe Hamo, ew Hamoyê ko melîkê ew azad kîrî bû û xistî bû rêza torînan, jî xelkê re dida nas kirin.

Jî milê din Antonyo jî rabû, jî bo kêfxweşiya Klêopatrayê Hamoyê rêşîk kîre naxudayê[1] cenkeştîke romanî, cenkeştîya ko Antonyo bi xwe tê de hati bû Misirê.

Herçî cejin û şahînetên serayê hebûn, Hamo di hemîyan de hazîr dibû û Klêopatre bêt Sîdonyayê ne diçû tu seyranan û çêriya azadkîrî hergavî li ber textê melîkê xuya dikir.

Sîdonye jînikê şehraza û xudan vên û mekîr bû. Klêopatrê gelek caran pîrsa xwe pê dixist, pê dişewîrî û jî ya wê dikir.

Rojekê Klêopatrê axîn û keserek li xwe anî û gote Sîdonyayê:

— Sîdonye, dihl ez û Oktavyo em di bexçê qesîrê de digeriyan. Oktavyo ez kîşandim ber siha darekê û ez li rex xwe rûniştandim. Oktavyo mîdekl xwe ker kîr qet xeber ne da. Bi tenê bi awîrine kûr, lê bişivîşkî li min dinihêrt. Ez rind pê dihesiyam ko tu xeyalxana wî re tîştîne hewîlnak derbas dibûn û wan ew tîşand. Min xwe nema ragirt û jê pîrsî. Ewî jî her-tîşt gote min. Belê Antonyo dîtirse ko demek wê hebe, ez jî wî û evîna wî acîz bibim û ezê dil bikim ko jê elbas bibim Hîngê ezê îehrê bidim ê. Tu dizanî Sîdonye dijminên me zehf in, li ber fîkan sekinîne û li fîrsendekê digerin; da ko bavêjin nav min û wî. Dîtîrsim ko lingîne rêvîn pê li kaniya evîna me a zelal bikin û wê ava zelal bişeyloyînin û me tê de bixeniqlînin.

Sîdonye: Ez gorî, heq di destê te de ye. Lê nabe ko tu newmîdî bibî û xwe bê tevdlîr bavêjtî himbêza qederê. Rome yê ko xiyahet û bêbextî lê kirîne, wan bê eaza nahîle; zû an dereng cezayê wan dide. Antonyo bêbextî

[1] Naxuda: kumandarê vaporê; keptan.



## MEMOZINA EHMEDE XANI

- 7 -

FIHRISTI SERAĀKAZI KITAB,  
EXBAR Ū EŞ'ARI NET'I ELQAB  
Ū ASAR E DI SŪRETI 'ITIRAF  
Ū IQRAR BI ECZ Ū INKISARI  
DIGEL 'ITIZARA GUFTARĒ.

Saqi bike camii asimani  
Raha weko rūhi cawidani  
Da em bigerin dimaġi can ter  
Yek lezbe bi rahi rūbperwer  
Saqi tu birēje camii mina  
Ava ko dikit zemirē bina  
Şadab bigere qelbi mehzūn  
Medbāş bigere eqli meczūn  
Saqi bike kaseya micewher  
Wē şireyi me'sera miteh-her  
Yaqtū mizab ū le'l ū sey-yal  
Wī dir-ri xweşab ū xemr ū tel-lal  
Dirdaneyē xwe hirēje navē  
Yani erqa weki gulavē  
Dem dem bide desti meyperestan  
Xelkē ko hinik ji dil di destan  
Da camii dilan bibit mires-se'  
Bezma terebē bibit misen-ne'  
Vē meclisē meyxwira mudamē  
Mestane bike ji new mudamē[1]  
Mimkin ko ji fezyi bē nihayet  
Yek qetre bibit li min inayet  
Neş'a qedeha meya mirew-weq  
Keyfa ineba rezī bi rewneq  
Ewreng bikit di nefesē tesir  
Hasil bibitin di qelbi teşwir  
Yanf bikevēte canī şewşek  
Hel-ta bigehēte qelbi zewşek  
Tesiri nefes bibit ji ho min  
Tesirī nefes bibit ji bo min  
Tesfiyeya dil bibit me hasil  
Hewdeng bibim digel enadii  
Miridē dili mirde bēte perwaz  
Bē perde bibit terane awaz  
Dem şibheti bilbilan binalit  
Geh şibhi enedilan bikalit  
Ahan ko we re bikit sehergah  
Hemwara digel nesimē hemrah  
Sed xūnceyi dil ji ber bi ker [2] bin  
Sosin bi zeban ū ba xeber bin  
Bigokū bibigikin ji xaran  
Xūnriz bibin di mey hezaran  
Sorgul bigirin bi egki şebnem  
Bilbil bikenin li rexmi hemdem  
Saqi bide min şerabi gulgūn  
Bē deng ū def ū sedayi qanūn  
Da şehne ū mihtesib nebīnin  
Şahī hicivin çu xem neminin  
Teşwīş biçin ji qelbi mehzūn  
Distan bibim ez ji nū digergūn  
Mexmār bibim bikirme lafan

Serxweş bibim bikim guzafan  
Bekēf neşim çu ez bibējim  
Diwane bibim duran birējim  
Bedhal bibim şiran bi der dim  
Bēqal ji batine xeber dim  
Teşbihi neyē bikim teren-nim  
Tūtisifet ez bikim tekel-lim  
Da keşf bibin ji min keramat  
Meşhūd bibin li min meqamat  
Şu'be ji meqami dil bi awaz  
Gulgeşt bikim geweşt ū şehnaz  
Bē deng ji xewri dil bi aheng  
Sed weng sed ebdan weki çeng  
Mamendi ribabi bē kemaçe  
Deng bē ji defa me bē tebaçe  
Zihre bibibit newayi iş-şaq  
Req-qas bibit li ewc nih taq  
Sazi dili kul bi zēr ū bem bit [3]  
Sazendeyi eşqi Zin ū Mein bit  
Şerha xemi dil bikim fesane  
Zinē ū Memi bikim behane  
Neşimē we [4] ji perdeyē derinin  
Zinē ū Memi ji nū vejimim  
Me'lūl biwin hebib ū aşiq  
İro he weki tehbii haziq  
Derman bikim ez ewan dewa kim  
Wan bē mededan ji nū ve rakim  
Derdē di dilē Memē ciger-riş  
Zina ji derūni tili cefakēş  
Wē perdegiya efife mestūr  
Wē bēgunelha ji telmetē dūr  
Meşbūr bikim bi terz ū işlūb  
Mimtaş hibin mihtib ū mehşūb  
Ewreng bikin ji nū serefrāz  
Da bēne temaşeyi nezerbaz  
Dilber li Memi bikin girine  
Aşiq bikenin bi derdē Zinē  
Hemderd bikin bi wan sefayē  
Bē derd bikevne helwelayē  
Xelkē ko sine ū ji dil saf  
Pakizesirişt ū ehli insaf  
Bilcimle bikin ji bo me tehsin  
Bējin ko bi qenci hate tedwin  
Xelkē ji « yihib-bibim » digergūn  
Herç ji ezal bi wī « yihib-hūn »  
Da bēn ū bikin hikayetē gūş  
Hindek bikirin xwe pē seramūş  
Hindek bikirin bi can sema'e  
Hin pē bikirin ji dil weda'e  
Lē hēvi dikim ji misteidan  
Herfan negirin li mistefidan  
Ev name eger xerab e ger qenc  
Kēşaye digel wē ne du sed renc  
Newbawe ye tifi e newreside  
Herçend nehin qewi guzide  
Lē min ji rezan ne kir temet-ti'  
Mamendi dizan bi kes teteb-bi'  
Newrestī hedlqeyi şad e  
Me'sūm e efl e xanezad e  
Nūbar e eger şirin eger tal

Metbū'e ji rengi newi' elfal  
Min hēvi heye ji ehli halan  
Teqbih nekin ewan tifalan  
Ev meywe eger ne avdar e  
Kurmanci ye ev qeder li kar e  
Ev tifi e eger ne nazenin e  
Nūbar e bi min qewi şerīn e  
Ev meywe eger ne pir lezle e  
Ev tifi e bi inin qewi eziz e  
Mehşūb ū libas ū guşware  
Milkē di min in ne mistear e  
Elfaz ū meani ū ūbarat  
Inşa ū mebanl ū işarat  
Mewzū' ū meqasid ū hikayet  
Merniūz ū menaqib ū dirayet  
İslūb ū sifāt ū mana ū lefz  
Esla ne kirin me yek ji wan qerz  
Bilcimle netayici di fikr ip  
Dūşize ū newerus ū biker in  
Yareb mede destē xelki nasaz  
Vē şahidē dilribayi ten-naz  
In-mid ew e ji ehli irfan  
Ew dē ne girin li min çu herfan  
Teşni' nekin weki xeyrūn  
İslah bikin li min qisūran  
Eshabi kenial perdepūş in  
Erbabi xerez di pirxirūş in  
Me'mūl ew e ji ehli razan  
Ew dē ne kirin bi min tinazan  
Ez pilewer im ue gewheri me  
Xodreste me ez ne perweri me  
Kurmanc im ū kubi ū kenari  
Van çend xeberēn di kurdwari  
Imza bikirin bi hisn ū eltal  
İsxa bikin ew bi semi' insaf  
Eshabi xerez ko guh bidērin  
Eyban bi kerem li min veşērin  
Ava riwē şairi nerējin  
Ger mimkin e yēke qenc bibējin  
Selw ū xeletan nekin te'ec-cib  
Te'wil bikin ji bo te'es-sih.

### NOT

[1] Di vē malikē de du « mudam » hene ū her du ji bi erebi ne. « mudam » a pēşin bi mana hergav e. « mudam » a didowan bi mana şerabē ye. « ji new mudanē » yanī ji nū ve serabē.

[2] Ker bi mana perçe, kerl ye ū « k » tē de ji « k » ya adeti stūrtir e. Ji bo şanikirina stūriyē mirov dikare «h» yekē bide ber ū di şikilē «kber» de binivistne.

[3] « zēr » an « zir » ū « bem » du gotinēn mūsîqiyē ne. «zēr» bi mana zirav ū «bem» bi mana stūr e. Herwekl bi farisî tiz ū pes dibējin.

[4] « Nexmē we » ye an « nexmē wan » e. Ji ber ko qala Mem ū Zinē dike ū berē xwe didē xwendevanan.

li Romayē kiriye. Lē qedera te bi qedera wī ve bēxi destē xwe.

girēdayi ye. Divēt tu evina xwe di singa wī  
de bi xwedī bikl ū divēt ewlebiya Antonyo

Kléopatre: Belé, lē çawan ū bi çı awayi.  
Ji diht ve ez bala xwe didim ū tēte bira min

ko midetek e Aantonyo destê xwe nade tu firaxên xwarinê yên ko min jê ne xwarine û piyana ko min jê vexwarîye nake devê xwe. Jê dixuye ko di her tiştî de jehrê dibîne.

Sîdonye: Sibe ezê ji te re rêke welê şantî bikim ko mêrê te ê romanî. wê bizane ko jinika ehmeqîr dikare mêrê jîrtir bixapîne.

Weke hero, Antonyo û Klêopatre, berî ber bi behirê, di şehnîştîna qesirê de rûniştî, şîva xwe dixwarin. Klêopatre ji her firaxê partîk dibir û piştî ew dida mêrê xwe. Piştî ko xwarin û vexwarin; ketin himbêza hev û xwe li ser textekî dirêj kirin. Klêopatre li bêjîna mêrê xwe a zirav wek dargertîngeke ter aliya bû û ew li stînga xwe dişîdand û rûyê wî bi şopa maçîkan sor dikir.

Her du jî serxweş bû bûn. Pîyanên şerabê, li ser hev, bi ser xwe ve dikirin. Klêopatre rahişte piyanêke mezin û ew heta bi nivî vexwar. Gava nivî din dida Antonyo, serê xwe, hinek hejand û pelek ji gula ko bi pora wê ve bû ket nav piyana şerabê. Antonyo ev piyan jî wek piyanên din bire ber devê xwe. Klêopatrê destê wî girt û bi tîrs û lîerz da her qîran û got: « Vê şerabê vemexwe ». Rû û eniya Antonyo tîk ve çûn. Antonyo bi tîrs û xezeb li Klêopatrê dinihêrî. Klêopatrê banî Sîdonyê kir û piyan da ê. Sîdonyê koleyek ant û piyan da destê wî. Bi emrê Klêopatrê kole şeraba piyanê vexwar û piştî çend deqîtan mir.

Klêopatrê milên xwe ên zîvîn li stoyê Antonyo gerand û got: « Hey sersem, tu dibînî, min dilê xwe li te xerab bikira; min dikarî bû bi pelê gula serê xwe jehirê bi te dim û te bikujim ».

Antonyo deng ne kir lê qenc zant ko pelê gula serê Klêopatrê jehirdar bû û heke Klêopatrê bixwesta bû çî awayî hebe karî bû jehirê bidîyê.

Jin û mêr xwe bi tenê kirin, çîra vemirandin û ketin himbêza hev. Bi tenê heyveke çardeşevî wek rûyê miroveklî li xwe heyirtî di nav perdeyên qesirê re li wan temaşa dikir.

Şer dom dikir. Eskerên Oktavyo û yên Antonyo di bej û behiran de li hev dixistin. Didowê Ilonê, 31 sal beriya miladê.

Kenkeştîyên Oktavyo û yên Antonyo û Klêopatrê di behîra Yewnanîstanê, di Ekzyomê de gihane hev û li hev dan. Ji nişkekê ve kenkeştîyên misrî bi şûn de vegeyîyan. Stola Oktavyo da pey. Yên Antonyo direvîn. Di wê

rojê de xuya kir ko Oktavyo wê zora Antonyo bibe û kîşwerên rohelê û roavê bêxe destên xwe.

Herçî Klêopatre, di nav blîst û çar saetan de hist û çar caran li mêr û yarê xwe diqulipî ew dixist xeydê, ji xeydê radikir û ew tavête dexsê; ew li ber lingên xwe digêrand û ew di taya evîne de sermest û bêhiş dikir.

Ma dîsan ne ev Klêopatra yewnani bû ko qeyserê Romayê Jûlyûs Sêzarûs xisti bû dawa evîna xwe û paşê lê qulipî û bêbextî lê kirî bû.

Niho dora Antonyo bû. Antonyo jî ketî bû tora yewnaniyê û îro dibû qurbana xiyaneta wê, Niho Klêopatrê Oktavyo da bû ber çavên xwe, bûra û neyarê mêrê xwe. Oktavyoyê ko zora Antonyo dibir. Evîna û zeferdariya Antonyo kevin bû bû; wêk diwarên qesireke, zêrhellî yên ko zêrên xwe diweşîne erdê û ew di bin lingûn de dibin ax û xwellî.

Jê re mîzefereklî nû û agîreklî sor û bê xwellî diviya bû. Ew mîzefereklî jî Oktavyo bi xwe bû. Oktavyo Mîsîr û kîşwerê wê de bîstanda û wî ew bidana ser imperatîriya Romayê. Klêopatre wê bibiwa melîka Romayê jî.

Antonyo bêbextiya Klêopatrayê bir dibir, lê birbîrlîneke bi derengî; tîr jî kevanê flîtlî bû.

Ev bû bû salek ko kenkeştîyên Klêopatraye di Eksîyomê de sîkestî bûn û ji ber stolan Oktavyo baz da bûn.

Yekê Tebaxê, sih salî beriya miladê.

Eskerên Oktavyo gîhaştî bûn deriyên Iskenderîyê û li eskerên Antonyo digeriyan.

Ev şerê dawîn bû. Heke Antonyo nikariya eskerên Oktavyo. bişkenîne û ordîva wî bi şûn de vegeztîne Oktavyo wê biketa payîtexta Mîsîrê û heta tîrbên firewnan jî jê re bejin û sto wê xwar bikirana. Berî herkesî melîka Mîsîrê Klêopatrê.

Klêopatre ditîrst; ma Antonyo bi bêbextiya wê ne hesiya bû. Klêopatrê xwe di hewranîkî reş pêça û ji derîkî qesirê î nizim derket û gote Sîdonayê:

— Min jî te pêve tukes navê!

Sîdonyê: Ma Hamo?...

Klêopatrê: Hamo... belê, bila ew jî bi me re bêt. Sîdonye min bibe û min di nav tartîtiya tîrbên qral û imperatoran de veşêre. ( berê xwe da Hamo ) Te emrên min bi temamî bi cih anîne?

Hamo: Belê ezbenî, ne kumandarên eskerên bejî, ne jî yên behirê jî ya Antonyo nakin, kes dest nabe xwe....

Klêopatre: Sîdonye, Hamo! min sehiw

girtiye; ez ditirsim. Belê ez ditirsim ko Antonyo bide pey min û min bigehline cezayê ko ez sezayî wî me.

Klêopatré şeva xwê di nav tîrbên hikimdarên Misirê de derbas kir. Leşker û stola Oktavyo zor dida deriyên Skenderiyê.

Mark Antonyo, li Klêopatré digeriya; lê ew peyda ne dikir. Antonyo didit ko her tişt wînda bûye. Antonyo şûrê xwe kişand û ew di qelbê xwe, di wî qelbî re ko hêj evîna Klêopatré tê de xwe tev dida derbas kir û ew fermandarê navdar bê nav û deng, bê şan û rûmet mir.

Oktavyoyê mîzefer ket Skenderiyê û emir da ko melîka Misirê a bedew, wê melîka ko qeyser û fermandarên Romayê tac, şûr û rûmetên xwe datanin ber lingên wê, jê re binin û bi keziyan bi ereba wî ve girêbidin û di kûçeyên Skenderiyê de rakiştin.

Klêopatré ev bihîst û zant ko himaya, bi tenê bi wî awayî wê bigihaşta Oktavyo.

Esker û berdevkên Oktavyo ketin kûçe û kolonên bajêr û li melîkê geriyan. Lê li şûna Klêopatra zindî, cendekê wê peyda kirin.

Hamo, jê re marekî reş l dirêj peyda kiri bû. Klêopatré deverû xwe li erdê dirêj kir û mar herda ser xwe. Mar jî wek aşiqên wê di dora wê de geriya, canê wê ê tenik çend caran bihin kir, di bin berzîka wê re xwişiya, li navtanga wê aliya û xwe gihand pora melîkê û jê daket bin erziha wê; sing û berê wê tev da, gerdena wê kire devê xwe; ew hedena narin û nazanîn carekê, du caran li çermê xwe ê reş şidand.

Klêopatré heta hingê xwe tev ne da bû. Gava bi germiya devê mar hesiya bi carekê de xwe hilavêt. Bi vê tevdanê di bin melîkê de cih li mar teng bû. Mar bi gerdena melîkê pihêt girt û bi zengelora wê veda.

Klêopatra ko di himbêza aşiqên rift û lewend de bi xwedî bû hu û kumê gelek camêran xisti bû balgihê xwe, bi maçîka marekî reş l sîk, hê xwedî û xudan mir.

Herçî Hamo û Sîdonye, kelaşên van her du xadimên sadiq û wefakar li ber cendekê xatûna xwe nobet digirtin.

Dihok: 12 Tebax 1942 **BIŞARÊ SEGMAN**

### MALIKEKE HAFIZ

Dîwana Hafîzê şîrazî, çî bi şîhir çî bi tesewîf, gelek bi nav û deng e. Em lro jî wê dîwanê, malîkekê berpeyî xwendevanên xwe dikin. Heke me ev malîk bi şîrehî wergerande kurdanciyê, Hafîz dibêje:

Haciyê reben daye rîya kehbê û diçe. Herçî ez, di cihê xwe de rûniştî, lê ez dixwazim rû û dîndar bibim.

Ewî herê xwe daye xêf û li çar diwarên wî digere. Herçî ez, armanca min xwediyê xêf ye û ez lê digerin.

## MARŞA FELATÊ

Daxwaza me ramana me girtina welat  
Me jin navê bi bindestî her divê felat  
Welatê me Kurdistan e pêgera şeran  
Ew qada şer û nijdan e landîka mêran  
Ji navê me tete zanîn şelpeş mêranî  
Ma hewceye ko em bêjin elhan dizanî  
Ji Keyqubad heya digihê Astiyaxê zor  
Med serdest bûn di Asya da li jêr û li jor  
Bîzdandî bûn Selahedîn heft qiran bi şîr  
Piştî wî jî di me rabûn pir şah û emîr  
Me bav û kal ketine xew sereklî dirêj  
Dirêjî nav welêt bûne pir destên qirêj  
Me fêl ev e ko bibirîn wan destên zorker  
Di welêt da qet naxwazî hevî û berber  
Sêzde sal in xwîn dirêjî jî xwe û neyar  
Me dest kêşa jî xebatê û cot û cobar  
Xebata me her de ev bit şer û mîrkuştin  
Di welêt da jî neyarî kesê nehîştin  
Em leşker in sondxwarîne jî bona welat  
Me jin navê bi bindestî her divê felat.

Şam: 28 Tîrmeh 1938

OSMAN SEBRI

## REWŞA DINYAYÊ

ŞERÊ ŪRIS — Par ūrisan eleman jî Rostovê bi şûn de vegevavî bû û pê êrişa ūrisan ya Zivistanê dest pê kiri bû. Isal eleman li Stalîngradê, piştî ko ketine bireklî bajêr, sekînine. Ev bû qedere mehekê ko eleman ketine kûçe û kolonên bajêr û di nav xanî, qîşle û febrîkan de şerê ūrisan dikin. Herçî ūris ne bi tenê li ber xwe dîdin, lê radîbin berhîcûman jî û carina avahtiyên ko berî nivro jî dest dane, piştî nivro wan bi şûn de vedigirînin.

Li 9ê mehê êrişa elemanan sekîni. Çîre û êriş yekar sekîniye an piştî çend rojan ewê jî nû ve dest pê bike? Ev ne xûna ye. Li 9ê mehê elemanan danezanek belav kir û tê de got: Ji ber ko ordîwa elemanî di bajarê Stalîngradê de niqteyên mîhîm xistîne destên xwe jî lro û pêde di şerê vî bajarî de tabîye de bête guhartin. Me topîne mezin anîne Stalîngradê. Emê bi van topan taxên bajêr ên mayînan yên ko hêj di destên ūrisan de ne texrîb bikin.

Bi rasti jî jî hingê ve danezanên şer qalc şerê segmanan nakin. Herçî danezana elemanî ya 13ê mehê yekar qaîa şerê Stalîngradê ne kir.

Eleman herçend gihastî bin Stalîngradê jî li bakur û li nivro erdên dora bajêr di destên ūrisan de ye. Ordîwa elemanî piştî ko li çemê Don derbas bûye wek pozekî ber bi Stalîngradê û li dora wê dirêj bûye. Yanî ordîwa elemanî bajar mîhasere kiri be jî jî rohelê pêve her sê aliyên bajêr berdayî ne û ordîwa Tîmoşenko jî dûr ve û nemaze jî bakur û jî nivro li ordîwa elemanî wer hatiye. Herçî hêla bajêr a rohelê; jî xwe di wê hêlê re çemê Volgê derbas dibe.

Tîmoşenko li bakur û li nivro ev bûne qedere du heftan rabû berhîcûmê. Di destpêkê de hate bawer kirin ko Tîmoşenko bi van berhîcûman dixwaze

barê mîdafîhên Stalingradê sivik bike. Lê piştê xuya kir ko plana Tîmoşenko jê meztir û firehtir e. Ordîwa Tîmoşenko çî li bakur çî li nîvro herê xwe daye çemê Don. Bi vî awayî Tîmoşenko dixwaze bikeve piştê ordîwa elemanî ya ko di Stalingradê de ye û wê jî giraniya wê qut bike. Li gora nûçeyên kaniyên rûsl pêşdarên ordîwa Tîmoşenko di hin deran de gîhaştine çemê Don.

Herçî şerê çiyayên Qevqasê, di vê qadê de jî, vê paşiyê elemanî hesêb hikari bûn pêş ve herin. Di vê qadê de ordîwa elemanî bi du baskan lêk hebû ye. Baskekî peravên Behira-reş girtiye û qesta nîvro dike. Ev baskekî ha dike nake xwe nagehine Toapsê-Nemaze piştî ko stola rûsl esker daxistine navbara Novorostsk û Toapsê eskerên romanî yên ko di vî baskî de ne bêgav mane û jî êrişê derbasî mîdafehê bûne û ûrisan bi herbicûmekê çend gund bi şûn de vegevandine.

Di nîveka vê qadê de ordîwa elemanî jî Ar-mavîrê ve rîya besin û aboriyên petrolê girtiye û dirêjî, wek zimanekefî hatiye beta Mozdokê û jê dirêjî Grozniyê dike. Herwekî xwendevanên me dizanin di Grozniyê de birên petrolê hene. Di van panzdeh rojên paşin de elemanî her bi bîrên petrolê ve bi tenê 22 kilomêtiran pêş ve çûne. Di vê qadê de jî ûris radîbin herbicûmê û xisarîne mezî digehînin elemanî û carîna dikevin çepê û kozîkên wan jî.

Heke me çavên xwe li kirdeyên şerê ûris gerand em dibînin ko isal miqawemeta ûris li gora par gelek xurt bûye û birba êrişê elemanî kêm kiriye.

**ŞERÊ PESÎFÎKÊ** — Di vê qadê de eskerên emê-rikanî û ewîstrali şerê xwe xweş dikin. Di giravên Sîlêman de eskerên emêrikanî yên ko daketine bejê pê didin erdê. Di Gîna-nû de ewîstraliyan Japon-şkenandine û didin pey û wan jî Pormorsî bi dût dixin. Pormorsî jî bo hevalbendan ehemiyeteke mezî heye. Japonan jî mêj ve dixwest Pormorsî bexîn destên xwe û bi vî awayî hêj bêtir nîzingî li Ewîstralyayê bikin û pê rîya Ewîstralye û Emêrikê bibire. Lê plana japonan ne çû serî û niho jî Pormorsî bi dût dikevin û ewîstrali nîzingî li Kaka-dayê dikin. Li gora nûçeyên paşin eskerên ewîstrali jî Kakodayê bi tenê 18 kilomêtiran dût in.

**ŞERÊ ROAVÊ** — Şerê vê eniyê şerê, balafran e û di vî şerî de ingilîz bi temamî serdest in. Ba-lafirên ingilîz bi şev û bi roj di ser Elemanyayê û di ser welatên ko elemanî ew vegirtine re difirin û xesarîne mezî digehînin bajarên wan welatan. Vê paşiyê merêşal Görîng di gotareke xwa de qala van êrişan kiriye û gotiye: Ingilîz niho li bajarên me didin. Lê piştî ko me îşê ûris safî kir emê berê xwe bidin Ingilîterê.

Ji vê gotîna Görîng dixuye ko balafrên elemanî ancaz dikarin şerê ûrisan bikin û di yek wextî de nikarin dirêjî Ingilîterê jî bikin. Ji xwe Hitler ne dixwest ko di çend eniyên de şer bike. Lê qelsiya talyan û xurtîya ûrisan ew bêgav bişt û fro ordîwên elemanî li Efrîqê jî şer dikin.

**ŞERÊ MISIRÊ** — Di vê eniyê de jî nemaze şerê balafran e. Balafrên ingilîzî û emêrikanî li benderên efrîqayî wek Bingazî û Tobriqê û li benderên girava Gîrlê didin. Herçî elemanî talyan, ew jî zorê didin. Maltayê. Bombardîmanên Maltayê sist kiri bûn. Lê ji 11ê vê mehê ve balafrên mihwerê jî nû ve giravê

bi xurtî bombaran dikin. Li gora danezanên ingilîz li 12ê mehê di van bombardîmanan de ingilîzan 30 balafrên mibwerê avêtine erdê û pencyên din birindar kirine.

Ingilîz û emêrikanîyan vê paşiyê gefek esker, top, tang û balafrî anîne qada Misirê. Welê dixuye ko dewletên mihwerê jî dikin esker û cebîrxanê bînin vê qadê. Ji lewre balafrên wan li Maltê didin da ko di vê navê de vaporqefeyên wan jî Siçilyayê derbasî benderên efrîqayî bibin.

Şam: 15 Çiriya-pêşîn 1942

NËREVAN

## PIROZIYA CEJINÊ

— Ji xweyîyê Hawarê re —

Roj bête der, al sor û zer, ev ro li ser banê te bit  
Herdem hijî bi kêf û xweşî cejna te jî pîroz bibit  
Herdem şeva te ron bibit j'dil şahiya te xweş bibit  
Çend roj hene her cejna bit cejna te jî pîroz bibit.

Hindî ko ev dinya hebit b'rûyê bilind b'demê sîfî  
Her hakim û şahê me bi cejna te jî pîroz bibit  
L'beşkê gulên l'nav simbilan seyran bikî şahê dilan  
B'kêf û sema dût bi j'xema cejna te jî pîroz bibit.

Heyva li ser te çarde bit daft Bihar l'erdê te bit  
L'te çî miraz e her we bit cejna te jî pîroz bibit  
Hindî ko padişah hebin hemî li ber payê te bin  
Daft di ferwara te bin cejna te jî pîroz bibit.

Dora me hat hon b'kin zebat ev ro l'welat rojê helat  
Ala veda şewqê li me da cejna te jî pîroz bibit  
Çak hilkevî roj derkevî dijmln b'revî yan jî b'kevî  
Memdûh divêt ev hale bit, cejna te jî pîroz bibit.

Dibok: 20 İlon 1942

Şêx Memdûbê Brîfkant

## ENIGMES

173 — Ser bi jêr dibe, tijî dibe, ser bi jor dibe  
vala dibe (Kum).

On le renverse, il s'emplit, on le redresse, il se vide  
(le bonnet).

174 — Serî di te de, kok di de de (guhane).

La pointe en toi, la racine dans la mère (le sein)

175 — Sêniya savarê li ser guhê darê (hinar).

Un plateau de blé cassé sur la branche de l'arbre (la grenade).

176 — Şaşika delala gindirî newala (zîpik).

Le turban des belles roula dans les vallées (la grêle).

177 — Şev têt, şemal têt, gah têt, gopal têt, jî

nik padişah û siltanan têt (hêv).

La nuit vient; le flambeau vient, des fois il est courbé;

cela vient de chez les rois et les sultans (la lune).

TAWÛSPARÊZ

Kiriyariya Hawarê 500 Qirûşên Sûrî

Xwedî û gerîndeyê bîpîrsiyar: Mir Celadet

Ali Bedir-Xan. Şam—Sûriye

Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aall

Bedir-Khan, Damas-Syrie

ŞAM — ÇAPXANA SEBATÊ — 1942

## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Tefsira Qurane	Dr. K. A. Bedir Xan
Diwana Melê	Qedri Cemil paşa
Mîr û Nêrçirvan	M. Rûmî Silêman
Tiştên danezanan	Xelilê Genco
Selahedin	Bişarê Segman
Silav li sifra hazir e	Cegerxwîn
Warê min ne f kor e	Osman Sebri
Şûşa Dilan	Bişarê Segman
Memozîna Xanî	Herêkol Azizan
Gramêra kurdmançî	C. A. Bedir Xan
Mezin û Mezinatî	Osman Sebri
Rewşa Dinyayê	Nêrevan

### TEFSÎRA QURANÊ

199 — Ji xudankilêban, heçî ko bawerî xwe bi Xwedê û bi Qurana ko ji we re dahatiye û bi Tewrat û Incila ko ji wan re hate şandin, anîne û ji Xudayê xwe tirsîyar in û bi ayetên Xuda tiştine erzan nakirin, qedrê ayetên Xuda digirin, sewaba wan li nik Yezdan heye. Xuda hisabê emelên evdên xwe zû diqedîne.

200 — Geli bawermendino.... Gava dikevin tengiyê, xwe sist û pis mekin, xudansebr bin, dilê xwe xurt bikin, hêj mêrtir bibin, berê xwe bidin dijminên din û welatê xwe, sinorên welatên xwe bi peyari be bi siwari be ji dijminên xwe biparêzin, gava zorê didin we, pê bidin erdê, ji Xudayê xwe tirsîyar bin, li gora emrê wî bimeşin da ko hon serfiraz û serbilind bibin û bigehin felat û xelasê.

### IV

### SÛREYÊ JINAN

SED Û HEFTÊ U PÊNC AYET IN,  
DI MEDÎNÊ DE DAHATIYE

BI NAVÊ XUDAYÊ PAK Ê DILOVAN Û MIHRIVAN

1 — Geli mirovino.... Ji Xudayê xwe tirsîyar bibin, ew e ko hon ji nefseki, Cenabê Adem, afirandin û ji perasûya Adem, jina wî Hewa xuliqand û ji wan her diwan, jin û mêrên bê hejmar anîne wicûdê. Ji Xwedê bitirsîn, hon bi navê Xwedê ji hev û du hêviya qenciye bikin;

qedrê mirovên di xwe bigirin. Xuda we disitirine, ew sermîyanê we ye.

2 — Gava sêwî digehin bilûkê, malên di wan bidin wan, û malên wan ên hêja bi yên xwe, ên nehêja meguberhînin; û malê wan têkîlî malê xwe mekin û mexwîn; ev xwarina malê sêwîyan guncheki geleki giran e.

3 — Heke hon, ji qenci û edaleta xwe ne ewle ne, sêwîyan ji xwe re mekin jin, ji jinên ko hon diecibînin, ji xwe re werînin, yek, dido, sisê an çaran. Eger hon disa ne ewle ne ko bikarin, di nav heyna jinên xwe de, bi edaletê bimeşin, ji xwe re cêriyekê werînin.

Anîna jineke bitenê an-standîna cêrikê îşê we û meşa we li gora edaletê sivik dike.

Mehra jinikê, jê re, bi dilxweşiyê bidin, heke jinik jê bi rizayê xwe parekê vedigerine we, jê bibin û bixwîn û pê şa bibin.

4 — Divê bergerê sefîh û bodileyan, malê wan nedin destê wan, ew mal emaneta Xuda ye, lê divê ji wî malî nefeqe û heqê cilêu di wan bidin û bi sefîh û bodileyan bi delalî haxêvin û bimeşin.

5 — Geli well û bergerên sêwîyan... Eqlê sêwîyan heta gîhaşlîna wan bicerîbinin, ko dema gîhaştîne hat û bûne panzde salt û btrewer û îşên xwe seh kirine, malê wan bidine wan. Malê sêwîyan bi fikrên xirab, weke sibe sêwî dê mezin bibe û malê xwe ji min bistîne, lez mexwîn, pê destbelaviyê mekin. Heke bergerên sêwîyan dewlemend in, divê ew bi navê heqê bergeriyê, ji malê wan tu tiştî nestînin, heke hewcedar in, jê bila tiştêkî kêmtir, li gora malê sêwî û nefeqa xwe bibin; ko sêwî mezin bûne û hon malê wan teslîmî wan dîkin, divê şahid hazir bibin. Bizanin ko hisabdarê mezin-tir Xuda ye; diristî û nediristîya emelê we, ew dizane; ji Xudayê xwe tirsîyar bibin.



## DIWANA MELE

— 35 —

Ah li destê vê sirê dil ji mey hewale kir  
Herç li min kirî mela cama meya du sale kir  
Şeng û nebatê meşiha misk û zîhadê weşiha  
Rûmeli dibê peyane hêj zêde li min delale kir  
Çîçek û gul sehergehan nesterin in dil xergerhan  
Têr da ji misk û mawerê mahe xunav û jale kir  
Dême û biskê xumriyan taw di zilfê sutriyan  
Mane temami kesk û sor bedre li dorê hale kir  
Dûr kirim ji sinbilan çiçek û bişkok û gul  
Dil ji, me rengê bilbilan şibhetê dağ û lale kir  
Pîrê mekan ji şîşe e da me sefineke meyê  
Şikir ji Xwedê ko qelzemek min ji xwe ra qebale kir  
Xunce leba j' rengê gulê dême li ser nîma melê  
Şibhetê bilbilan seher lew me fîxan û nale kir

— 36 —

Derê meyxane ya eşqê seher arif ziyaret kir  
Bi abê çêrmê xûna dil wîdû' best û teharat kir  
Werîna cama hilalê da ji êksê mahî nû bînt  
Ko xanê mîhr û cergê çerx û xan roze xaret kir  
Di mîzan qewşê mahê nû bi wechê dilberê min di  
Ji çêrmê goşê e ebrû bi dewrê cam îşaret kir  
Bi ehsaran nezer min çû ji çerxê qewşê ebrûyan  
Şikîrxwazim ko çawan kari ber eynê hesarî kir  
Ji ber dême niqab avêt û destûra tewaşê da  
Bi se'yi beyti İcramê û min ewêd ziyaret kir  
Di dîdarê hezaran can nîsarê meqdemê yar im  
Kesê canan bi can bînit di eşqê wî ticaret kir  
Bi dînarê denî zînar da yarê xwe neftroşî  
Kesê Yûsif srotî wî di alem da xîsaret kir  
Tenê ew secdeya şikrê tebit mîhrab û qewşênan  
Ko dilq û çemil sec-cade bi wê avê xesaret kir  
Di behsa le'le leh her xam narit teb'e elmasî  
Welê te'sîr û feyz û mîhr û tedbîrê heraret kir  
Di İcaza beyanê da suxen ger hête însafê  
Dîzanît mîxteser herkes melê sibir û îbarete kir.

## TIŞTEN

### KO DI DANEZANAN DE TÊNE GOTIN

Ev şer ji nû ve me hîml erdnîgariyê dike.  
Lê carina di danezanên şerevaniyan de navine  
welê hene ko di xerîtan de jî peyda nabin.  
Ji ber ko ew deverine welê ne ko an tê de  
rûniştiman nînin an hebîni jî gelek hindik in  
û carina jî ew rûniştiman koçerên ereban in  
û di reşmêlan de rûdînin. Ji xwe jî vî vesfî  
xuya ye ko em lro qala qada şerê Misirê di-  
kin. Ev in çend serenavên qada şerê Misirê:  
EL-DEBEH — Satsyoneke rêhesinê ye. Li  
roavayê Elemeynê û jê heftê kîlometîrî dîr e.  
Di dora stasyonê de çend konên ereban  
hene. El-Debeh nemaze bi ava xwe a vexwar-  
bar heja ye. Ji Bircilerêbê heta hire tu av bi  
qasî ava El-Debehê ne şêrin e. Di şehrayê de  
navê El-Debeh gelek caran têtê peyda kirin.  
El-Debeh bi mana keftar e. Ji lewre heçî erdê  
ko bi gir û mitikên rex hev xarûmaro ne  
bedewî navê El-Debeh lê dikin.

XEZAL — Di beristanên Erebistanê de

## MİR Û NÊÇIRVAN

Dibêjin rojekê mirê Botan bi çend siwarên  
xwe re derketi bû geştê. Mir û peyayên xwe  
gihan navsera çiyakî bilind. Mîr nêrt ko peyak  
li ber kevirekî mezin rûniştiye. Mîr ji hogirên  
xwe re got; em herin cem vî peyayî ka ew  
çî dikê. Çûn cem peyê; mir jê pîrs kir û got:

M — Peyayê delal tu li ber vî berçî çî dikî

N — Ez nêçirvan im ezbenî

M — Kanî tajî û tolên te?

N — Ez li ber kewan im ezbenî

M — Ma tu çawan bê living kewan bigirî?

N — Kewê min ê ribat heye

M — Çawan tê bi kêw kewan bigirî?

N — Min dav li dora wî vedane; kewê  
min wê bixwîne, kewên çiyê hemî wê bikevin  
davê ez jî ezê wan bigirim.

M — Tu çî xwarinê didî kewê xwe

N — Ez kuliyan didim ê ezbenî

Mîr li kêw nêrt û got: Hey heywanê bê-  
namûs, tu çawan heval û hogir û welatiyên  
xwe bi destê xwe jî dijîminan re dikî davan.  
Dijîminê ko tu jî cem 1, te dikê rekibê û eger  
tu aza biwayî tî hemî tişt bixwaran, tiştên  
heja û bêhejmar.

Mîr şûrê xwe derant û kew ker ker kir û  
gole xelkê dora xwe:

— Ez jî kesê ko heval û hogirên xwe bi  
destê xwe dikê davan dijîmin hez nakim. Heqê  
wî kest kuştin e.

Ji vê çîrokê têtê zanî ko em ev kew in.  
Ne xwe jî me re Mîr û şûr divêtin. Bêl wan  
yekîtiya me çênabê.

RASTO

Telşelr: 10-10-1942 M. EMİN SİLEMAN

mîrov gelek caran rastî navê Xezalê têt. Ereb  
li deverên ko tu avahlgeh lê nînin û tê de  
xezal peyda dibin, navê xezalê lê dikin.  
Bîrel-xezal, Utra xezalan; Derbel-xezal, Riya xe-  
zalan; Erdel-xezal, Erdê xezalan. Xezala ko di  
danezanên qada şerê Misirê de têtê dîtin dikeve  
roavayê Elemeynê û jê 35 kîlometîran dîr e.

DÊR-EL-MENASÎB — Dêr hewekî nas e  
îbadetgaha îlehan e. Lê erebên çolê navê dêrê  
li deverine din jî dikin; li xîrban û li komên  
kevir û teht û şaxuran. Herçî Dêr-el-menasîb li  
bakurê Himêmatê korteke mezin e û di dora  
wê de latin hene. Ji lewre ev nav lê kirine.  
Heke me ev nav bi kurdmançî mana kir, em  
dikarin bibêjin Dêra kevîrên daçîkandî.

CALO — Di orta Libyayê de waheke ke-  
vin e, û dikeve nîvro-rohelê Bingaziyê. Talyanan  
tê de jî bo mîhacîrên talyanî yên ko jî İtal-  
yayê hatine, xanî û jî bo eskerên xwe çîşle  
çêkirine. Bertî hezar salî melikên fatimî têtê de  
qesîrîn çêkîrî bûn û ew carina dibatîin Caloyê û  
midekî xweş lê dimarî. Calo di qûma şehrayê  
de dimîne giravekê. Av, mîrgîne xweş lê hene.  
Berîya şer kerîne pez û dawaran têtê de diçêrin.

## SELAHEDÎN Û RIÇARDÊ ŞÊRDIL

Selahedîn kurd bû Kurdekl hêja, zana, xurt û zexim, camêr û dilqewlîn, xudan vên û rûmet.

Ewropayîyan tu siltanê rohelê danantîne ber qran û imperatorên xwê, ji Selahedîn pêve

Belê Selahedîn kurd bû; dikari bû xizmeta miletê xwe, xizmeta miletê kurd bike .. ne kir.

Dikari bû heylna miletê xwe bêxe ser hîmine qewlî û wî bike milet û dewleteke biserxwe û abadîn... ne kir.

Dikari bû miletên din di xizmeta miletê xwe de bixebitîne û miletê xwe li şûna miletên din bigehîne kişwerkişayîyê..... ne kir.

Dîsan, Selahedîn, serdarê kurd, siltanê ereb dikari bû di xizmeta ereban de jî kurdîtiya xwe car caran bianiya birê, ew bigota xelkê û ew-nav, nav bi tenê payidar hikira... Selahedîn ev jî ne kir.

Selahedîn, îslamiyet di ser milet û nijadê xwe, di ser hertîştî re girt û qewmê xwe, bijarteyên miletê xwe di rîya îslamiyetê de bi kuştin da û miletê ereb bi eskerên ko jî çiyayên Kurdistanê dadihatî, gihanê kişwerkişayîyê.

Mihemed pêxemberê Xwedê bû; nezan û nexwendî. Xwedê ew gihanê û elîmand û bi destê wî misliaman li dinyayê belav kir.

Îslamiyet qelîha bû. Zora mirên erehan li her êrtşa şevalyeyên ewropayî ên zirehpûş çû bû. Hespên tazi ji her hespên rimbazên fireng baz didan. Erehan ji avahîyan xwe da bû paş. Qralên Frengistanê keti bûn erdê miqedes.

Selahedîn, ew kurdê bixwegihayî, jî çiyayên Kurdistanê, daket beriyên Erehanê, zora şevalyeyên ewropayî bir û destê xwe da îslamiyeta ko gihastî bû cankeşiyê; destê wê girt û ew rakir, îslamiyet jî piyan sekinand. Şopa ola Mihemed jî nû ve şên û ava kir. Erehan vegerîyan bajar û şarîstanan.

Riçardê Şêrdil qralê İngilistanê bû. Mêreki qenc; bi dil û vên û bi destê xwe şer. Wek hemî qralên Frengistanê Riçard jî li ber Selahedîn ji desthilanîne ket. Lê Selahedîn dostê neyarê xwe, dostê neyarê qenc bû. Riçard nexweş ket. Selahedîn kete belgihê bijtskan û ew derman kir.

Riçard dîsan wek hemî qralên ewropayî, gava jî welatên rohelê, jî erdê miqedes vedigeriya welatê xwe, dilê wî bi hîrmet û beyraniyeta Selahedîn hiltavê.

Selahedîn xizmeta îslamiyetê kir, qralên

Ewropayê şkenandin. Erehan pê serevraz bûn. Sergevazê kurd bû malê erehan, siltanekî erew.

Di dînsitana Selahedîn de tu şopên kurdîtiyê ne diyar in, ji navê kelehekê pêve. Di çiyayên elewîyan de kelehek heye, navê kurdan lê ye. Erehan jê re Hîsnel-Erad dibêjin: Keleha kurdan. Şerevaniyên kurd şûrkêrên xaçê jê derêxisti bûn û ew bi xwe tê de asê bû bûn. Heta hingê navê kelehe « krak lê şevalyê » yanî keleha şevalyan bû.

Gava segman Wilyem gotina xwe gihanê dawiyê, axa û serbendê wî Roger Pîkon jê pirist:

— Ji tiştê ko tu dibêjt ewle yî?

Wilyem bi edeb, xwe li ber Pîkon xwar kir û got: Belê ez bent!

Pîkon bihinekê sekinî, xwe ker kir û paşê serê xwe hilda û gotê Wilyem:

— Tu dibêji ko te xwela min nas kiriye, ma gelo ewê jî tu nas kirî?

— Çawan ez nas ne kirin ez bentî, me ew rojên şerîlî anîne birn xwe. Rojên ko li Skoçlandê di qesira bavê serbend de; min xizmeta we dikir.

— Jê pê ve, çi gote te?

— Biserlîtiya xwe, çawan hêstîr bûye û lîro di çi ezahî de ye

Divêt em wê xelas bikin, hetanî ko xwela min di hêslîyê de ye bila jî min re her xweşt û rahettî heram bit.

— Belê ez bentî emê wê xelas bikin; divêt em wê xelas bikin...

— Îşev ezê meselê berpeyî qralê xwe Riçardê Şêrdil bikim, ka ray û tevdira wî çi ye?

Pîkon di oda xwe de wek şereklî birîndar dîçû wî serî û dihate vî serî.

Pîkon jî xwela xwe Mariyê ecêb hez dikir. Roja ko qralê İngilistanê niyeta seferê kiri bû û herê xwe da bû erdê miqedes Pîkon jî keti bû ordîwa wî. Xwela wî Mariyê ne dixwest brangê xwe bi tenê bihîlle, rahû ew jî pê re hat.

Selahedîn di Teheriyê de ordîwa elîlên xaçê şkenandin bû, keti bû Qudsê şerîf, Misir û Sûriye bi şûn de veqerandi bû. Selîbtî jî hev de keti bûn.

Xelera şikestina selbîyan gihanê welatên Ewropayê. Xelkê Ewropayê bi hev kefin. Jamên dêran lêdîdan, li def û tepilkan dixistin û bangêran xelk diezimanandin cîbada xaçê. Reqetên mêran, pîr û ciwan, her bi qerargahan ve diherikin. Ji qralên Ewropayê sê miran pardariya vê seferê dikirin: Barbarûsê elemanî,



Filip Ogostê frensizl û Rîçardê ingilizl ê şerdil. Ordûke bêqeder boş û mezin, bi terş û dewar û bi her hacetên cengê keti bû vaporan û berê xwe da bû erdê mîqedes.

Ji tarîxa Îsa 1189 û ji tarîxa Mihemed 585 sal bi şûn de ma bûn.

Qranê elemanl bi rê ve keti bû behirê û tê de emirê Xwedê kiri bû. Stola selbiyan gihastî bû pêşberê keleha Ekayê. Seltbiyan bi ser kelehê de girt û piştî şerêkî no ketin ê. Di vi şerî de Pîkon birîndar bû. Rimek di polê wî ê çepê re derbas bû bû. Pîkon biri bûn xer-texanê. Siwarên ola Mihemed gava ji kelehê kişiyân hêslr bi xwe re biri bûn. Di nav wan de xweha Pîkon, Marl ji hebû.

Ji mîlada Îsa pêxember heta hingê 1191 sal keti bûn navê.

Navê Mariyê kirin Sireya. Marl di qesira Selahedîn de digel çerl û nedmên wî radibû û rûdinişt. Selahedîn piştî ko li çiroka keçikê serwest bû qewitt li peyayên xwe kir ko qedirê wê bizanin û wê nerencnin.

Lê keçika reben wek mîkewa di rikehê de girtî, di nav caşan re temaşa dinya azahiyê dikir. Deştên ko ji ber hev dikişiyân û digihastin qûntarên çiyê, rêlên ko di pal û pesaran re dikişiyân û bi ser pehnavan de diketin; keriyên xezalan yên ko ji ber siwar û tajiyan direvîn û xwe didan qelaçan...

Di vê navê de xulamê Pîkon, segman Wilyem bi nameke Rîçardê şerdil çû bû ba Selahedîn. Xulamê sadiq kir ne kir û bi darî xweha axsyê xwe ket. Mariyê jê re biserhatiya xwe got. Wilyem li tevdirekê geriya ko Marl an Sireyayê bîrevîne. Lê jê re tu îmkân ne hate ditin. Pasbanên qesirê çivîkek ne dihiştin ko bêt wan bifire û bikeve derveyî qesirê.

Wilyem her tişt ji Pîkon re goti bû. Pîkon qesta qralê xwe kir û mesela xweha xwe jê re da zanîn. Rîçard wad da ê ko ji xelusa xweha wî re wê bixebite û gote wi:

— Pîkon, divêt tu bizant ko Selahedîn mîreklî qenc, alîcenab xudan bext û rûmet û bi rebenan re dilovan e. Ma naye bira te roja ko di dora Yafayê de siwarên me li selefên mîr Sêvdîn qelîbl bûn û hespê min di bin min de hati bû kuştin, kurê Selahedîn çî bi min kir. Belê gava ez ji hespê xwe ketim ne ajote ser min; êrlîşa siwarên xwe sekinand û du hespê khêl ji min re rêkirin û hetanl ko ez li hespî siwar ne bûm dirêjlî min ne kir. Û gava ez li hespê xwe siwar bûm dora xar û tiradê ji min re hişt. Pîkon neyarên me mîrine qenc û xudan bext in; ji rêzika şerevaniyê der

Ji DIWANA CEGERXWÎN

## SILAV LI SIFRA HAZIR E

Ey sûtreyê bê nav û deng	Dijmin li ser belafir e
Pir leşker û top û tifeng	Seyda ew e ê mabir e
Sed sal in ev Zeyd û Emîr	Ceng e digel rîşa melê
Mertal di dest wanda bihûst	Gurzê di dest wan agir e
Şêxê bi tac û teylesan	Wergirtiyê rengê Xidir
Rûniştiye l'Birca-belek	Şahê ecem şah Nadir e
Ew sofiyê dil û reben	Serqot û xas û tazî ye
Digirt bi hewar û fîxan	Şêxê min Evdîlqadir e
Carek li pêx ew nanîre	Da zani be rast û derew
Kincê li şêx çox û qumaş	Kincê li soft çadir e
Axa bi deh gundê xwe ve	Bawer dike Keyxusrew e
Talanker û diz û keleş	Wî daye ser rêça gur e.
Halê me kurmancan ev e	Em dê çilo serbest bîjin
Herçî ko çöye guh medê	Silav li sifra hazir e
Seydayê rast û rihaf ye	Lewra Cegerxûn namidar
Zana dizanin ew kl ye	Yên ker dibêjin kafir e.

CEGERXWÎN

tu tiştî nakin. Bila dilê te li gotinên min rûnît. Ezê ji Selahedîn re binivîslim û tiwê bibitnî ko ewê xweba te azad bikit û wê vegerinî te.

Pîkon çû destên qralê xwe û got ê:

— Ezbenl, hêviya min jî ev e. Ji xwe carekê Selahedîn di civata mîreknê erehan de ne goti bû; heya niho tukesl li ereban wek Ûsifê Selahedîn bi edil û kerem hikim ne kiriye. Rîçard rabû û ev nanîe ji Selahedîn re nivîsand:

Tacidaral

Hilgirtiyê nameya min eskerek ji eskerên min ên qehreman e. Ev qehremanê ha çend caran di meydana şerê û rûmetê de xwe gihandiye qehremanên te û şûrê xwe hingastiye berçeq û kewkebên siwarên te. Xweha wî ketiye destên siwarên te û îro hêslra te ye. Navê wê Marl bû, we navê Sireyayê lê kiriye. Qralê Ingilîstanê ji hikimdarê misilmanan hêvl dike ko wê azad bike û vegerine brayê wê. Heke hikimdarê misilmanan pê qall ne bû, hingê bila brayê wê jî hêslr bigire û li cem xwe bihille. Tiştê ko Xwedê gihandiye hev ji hev meke û tu teyri ji hêlîna wî bi dîr meêxe.

Ezê li hêviya qerar û bersiva te himinim. Bi tenê beriya qedandinê dixwazin bînim bira mîrê misilmanan ko Emer kurê Xetab gotiye: « We kengê xelk bêslr kirine; xelkê ko ji diyên xwe aza hatine dinyayê ».

Roger Pîkon li hespê xwe siwar bû û wek bayeklî kur qesda merkeza Selahedîn û hepîxana xweha xwe kir. Xulam û berdevkan ew birin hafa serdarê kurd, siltanê erew. Selahedîn piştî ko name xwend kenî; Pîkon rûniştand û jê re got:

— Xortê qenc, ezê bi bîchaniina daxwaza qralê te gelek kêfxweş bibim. Li min gelek

# WARÊ

## MIN NE Î KOR'E

Di Kurdistana roava û wlayeta Meletiyê da eşira Bêzikan heye. Nivê vê eşirê yê pirtir li nivroyê Ferêt di wlayeta Ribhayê da dimine ko jê ra Bêzikê Omaxacê dibêjin. Ji ber ko Ferêt ev eşir kiriye du cihan, malmezînan her du cihan cida ne. Pîr caran neyarî ji di navbera van malmezînan da çêdibe.

Mala Ûsiv axa ji malmezînan Bêzikê jorin û mala mênaxsan eşirê ne. Vê paşiyê di vê malbatê da bi navê Hemê Qadir axa mêrek rabû bû ko di wî welatî da rû bi mênaxsan va ne hiştî bû. Bavê Hemê, Qadir axa sê kur hebûn. Hemê, Emer û Mistefa.

Birayê biçûk Mistefa him delaliyê bav û biran û him ji bi desthilanîna xwe ji Hemê ne kêmîr bû.

Rojekê Mistefa ji bo derbazbûna Ferêt diçe ser gemiyê û li wir raste Seyid Weqas

xweş e ko ev name bi destê şerevanîkî qralê Ingilîstanê gihastiye min. Ez bi silavîne esker silavan li wî şerevaniyî dikim û jê re dibêjim ko min ne adet e, ez daxwazên Rîçardê şêrdil bi şûn de bavêjim. Heke dinyayê carekê Şêrdilek û Selahedînek afirandiye ev ne tu hêcet e ko carekê din ji mênaxsan wek wan dê biafirîne.

Berdevkana Marî gihandi bû Pîkon. Pîkon xwe li destên Selahedîn xwar kir û ew ramîsan. Hêstîrên şahiyê ji çavên Pîkon diherikîn Selahedîn ji Rîçard re nama jêrîn rêkir:

Tacidaral

Me xatîrê qasidê te herwekî sezayî wî, sezayî her mêrê qenc e, girtî zani. Qasidê te şilavên min, silavên wî mirovê ko di qadên ser de qedir û hinera te zani, ji te digehîne.

Me ji ya ta ne kirî û ew bi xweha wî re hêstîr ne girtî. Ji ber ko di mal û qesîrên me de bi tenê ji hêstîrên qadên ser re cih heye. Hêstîr bi tenê ew in ko di dema peveçûnê de ji ber bêgavîyê xwe tavêjin bextê dijminê xwe. Qasid mênaxsan; mênaxsan ji nabin hêstîr.

Me xweh vegerande birê. Xwedê wan bi hev şa bike.

Selahedîn bi qewlê Emerê Xetab ve çû da ko Rîçardos ji bikare ji ya pêxeberê xwe İsa bike û erdên ko ji xwedîyan standîne vegertne xwedîyan. Ma Meslîh ne gotiye: « tiştên qeyser bidîne qeyser; tiştên Xwedê bidîne Xwedê ».

Dihok: 9 İlon 1942

BIŞARÊ SEGMAN

tê, ko ew jî ji malmezînan Bêzikê Omaxacê ye.

Ji ber ko di berê da neyariyeke biçûk di navbera van her du malbatan da hebû, li ser gemiyê zû li hev radibin û her du bi şaşaran bera qefsînga hev didin. Berikên Seyid Weqas pêsîra Mistefa dihingêvin û bê can dikeve erdê. Seyid Weqas jî, berî ko gazî bi ser gihê li Ferêt derbas dibe û diçe mala xwe.

Qadir axa jî tê cendekê kurê xwe dibe mal û ji her alî dost û nasên wan berê xwe didin Semsatê, mala Qadir axa ji bo serxweşiyê.

Lê çiqas ko Seyid Weqasê çû bû mal jî ji tîrsa Hemê xew ne ketî bû çavan û ji mala xwe jî baz da bû. Mênaxsan Hemê ewçend deng da bû ko Seyid Weqas reya revê ji şaş kiri bû. Piştî çar rojan Seyid Weqas ji xwe bê hêvî bû û berê xwe da mala Qadir axa û dexaletê.

Çaxê nivro bû, dema taştîya mênaxsan; Qadir axa li odê hêreyî danîna sifirê û Hemê jî li metbexê çavdariya rakirîna şiraqan dikirin. Di wê gavê da bû ko Seyid Weqas li pêş mala Qadir axa xewînî. Kesek bi xwe ra ne ani bû, ko ev şareta xweavetîne bû.

Xulaman li hêla odê xeber da bûn Qadir axa û li hêla malê haya Hemê kiri bûn.

Li ser vê yekê ko ne dihat bîra kesi bavê bi kur ve xwe ne tertilandin û her yekî qesda yê din kir. Qadir axa di dilê xwe da digot, Hemo î serhişk e, heye ko gotînine sar bide rûyê Seyid Weqas, an tiştîne lêde. Hemo jî dizant ko Qadir axa bi mîhrvaniya bavtiyê dexaleta xwîniyê kurê xwe qebûl neke û bi wê yekê navê camerî û dilgîrsiyê li ser mala Ûsiv axa rake.

Di navbera qesra odê û malê da kur û bav raste hev hatin. Ji devê herduyan bi hev ra ev gotin bi derket:

— Ewê Seyid Weqas têye û xwe davêje mala me. Divê em tê biborin.

Piştî ko her yekî fikra ê din nasî, Qadir axa yê ko heya wê hingê hêstîrek bi çavan ne ketî bû, du hêstîran di nav bijangan ra da der. Dema Hemê hêstîr, li çavên bavê xwe dîtî, got:

— Baval ma ewçend ji te ra giran e ko tu di xwîna kurekî xwe biborî?!.. Ma ji bo vê digirî?!...

Qadir axa bi dilê xwe ê xurt li Hemo vegevand û got:

— Na Hemo, di borta xwîna kurekî ji min ra ne ewçend dijwar e. Lê gava min tu li ser vê reya camerî dîtî ji kêfxweşîyan ev hêstîr bi çavên min ketin. Sebebê kêfxweşîyan min ev e ko, min zaniye warê min ne İkor e..

OSMAN SEBRÎ

## ŞÛŞA DILAN

« Yade dil ketiye ray lê nabê »  
« Şûşa dilan şikestiye cebar nabê »

— Vêna, tu bi serê xwe kl, bêje min tu ji min hez dikî?

— Çawan ez ji te hez nakim, ez perestîşkara te me...

— Tu ji min re sond dixwî ko evna te sadiq û abadîn e?

— Hezar sondî dixwim.

— Hingê ezê bi dileklî rahet û xatircem herim qada ser, û ezê bizanîm û jê ewle bibim ko di pey min re yek heye, tu heyl, ko dilê wê bi min ve ye û ji min re diayê dike û hêvdara Xudayê xwe ye ko ez mizefer bibim û vegerim bêm û xwe bavêjim himbêza wê...

Lokûs ev tişt gotin û Vêna kişande himbêza xwe û ew li ser eniya wê maç kir û vegeiriya qerargahê.

Niv saêt kete navê. Di xewgeha Vênayê de, xortekî din, wek Lokûs rift û bilind, ji piyan disekinî û pê re taxaft.

— Vêna, tu bi serê xwe kl, bêje min, tu ji min hez dikî?

— Çawan ez ji te hez nakim, ez perestîşkara te me.

— Tu ji min re sond dixwî ko evna te sadiq û abadîn e?

— Hezar sondî dixwim...

— Hingê ezê bi dileklî rahet û xatircem herim qada ser û ezê bizanîm û jê ewle bibim ko di pey min re yek heye, tu heyl, ko dilê wê bi min ve ye û ji min re diayê dike û hêvdara Xudayê xwe ye ko ez mizefer bibim, vegerim bêm û xwe bavêjim, himbêza wê...

Lagos ev tişt gotin û Vêna kişande himbêza xwe û ew li ser eniya wê maç kir û vegeiriya qerargahê.

Ma ew çî xilqeteke ecêb bû ko ji du mêran hez dikir û ji her diwan re digot ez ji te hez dikim...

Me got ecêb, lê heke mirov da eqilê xwe dibîne ko tê de tu ecêb nîne. Gelek jin hatine ditin ko ji du zilaman pev re hez kirine; gotine ko ji wan hez dikin.

Lê herçî Vênayê, ewê digot ko ji wan her du xortan hez dikir û ji dil û hi rastî dil, an dilên xwe da bû wan û di rîya wan de amadeyî her fedakariyê bû. Ev ecêb bû. Lê jê ecêbtir, wan her du xortan jî pê dizantî û pê qatî dibûn û ji hev ne didexistin. Belê van xortan soz da bû hev û gotî bû: « Emê heta

dawiyê li hêviyê bîmlîn. Bivê nevé Vêna rojekê yeke ji me ewê di ser ê din re bigirit. Hingê ye ko Vênayê bijartiye ewê li nik bîmlîne û ê din divêl terka welêt bidit ».

Di qesira Klêopatrayê, di wê hêlina evlîne de halê Lokûsê romanî û ye Lagosê yewnanî bi vl karî bû û her du ji halên xwe razî bûn û xwe bextiyar dihesibandî. Herçî Vênayê, carina xwe seh dikir û tucaran di dilê xwe de bi du evlînan ne dihesiya û ji xwe re digot; di her dileklî de evtnek.

Ma ev Vêna, xwedîya wê evlîna hevalcêw klî bû, ji kû hati bû û çawan ketî bû qesira mellka Misirê?

Tukest pê ne dizantî, ji yeke pêve. Lê ew jî ji nişkekêve emirê Xwedê kir û boriya Vênayê di tariya nenasiyê de wînda bû. Ew mirov jî nişkekê ve mirî bû û di qesirê de gotî bûn jehîr pê dan ê. Hinan jî digot, ya ko jehîr da ê Vêna ye. Vênayê dixwest ji dîdevaniya wî xelas bibe.

Navê mîrik Emro bû. Emro ereb bû. Emro piştî ko qeyser Jûliyûs Sezarûs ketî bû Skenderiyê, hali bû Misirê û Vêna jî bi xwe re aul bû.

Vêna, hingê delî salt bû. Klêopatré ew ditî û ecibandi bû û ew jî xwe re kirî bû nedîme. Nedîmeyên din jê didexistin û di nav hev de digotin: « Ev keçîk xweha mellkê ye. Betlamyos hej jinikeke ereb dikir. Vêna jê peyda bûye. Betlamyos jinika ereb kuştî û keçîk bi miroveklî xwe re şande derveyî Misirê û qewittî lê kir ko beriya mirîna wî keçîk venagerîşt Misirê. Mîrik keçîk birî û çû. Piştî deh salan Betlamyos mir. Klêopatré bû mellka Misirê. Peyayê Betlamyos, Emro, digel keçîkê yanî Vênayê vegeiriya Misirê ».

Ev kurtî û pistî bi guhên mellkê ve jî bûn. Klêopatré gelek enîrî û li nedîmeyên xwe hate xezebê, ew ceza kirinî û jî rikê wan ve qedirê Vênayê hêj çêtir girt. Klêopatré ji milê din rabû Vêna jî yar û mîrê xwe Mark Antonyo re da nas kirinî û jê re got ko Vêna keça fermandareklî bavê wê ye. Di qesirê de piştî Klêopatrayê Vêna xudan gotin bû.

Vêna mexlûqeke xerîb bû. Di wê de du can û giyanên bervajiyên hev dijîn, yek ji ê din cida û yek ji ê din veşartî û jê re nenas. Vêna di yek wextî de digirtî û dikentî. Lê di Vênayê de ji her tiştî xerîbtir evlîna wê bû. Ma çawan dibû ko di yek wextî de ji Lokûsê romanî û ji Lagosê yewnanî hez dikir; hez-kirineke kûr û rastîn. Vênayê carina gub dida dilê xwe û diditî ko ji her diwan weke hev

hez dikir û ne dikar! yekl di ser ê din re bigire.

Klêopatré, wê canbaza evîné bi halê Vênayê dizani û şîret lê dikirin û digot:

— Vênal pîpoka dilê xwe bi du evlnan meêşîne. Evînek dilê keçikan bi xwedl dike. Lê ji yekê bêtir wî diperrîne û wî rêvîn û bêkêr dike. Dil nema bi xweşiya evîné dihese.

Vêna dida eqilê xwe; gotinên melikê rast diditin. Lê dilê wê jê re digot ko di wî de evîneke bi tenê heye.

Lokûs û Lagos piştî ko ji Vênayê xatir xwestin veşerîya bûn qerargahên xwe û bi eskerên xwe ve berê xwe da bûn qadên şer.

Vêna xwe di ibadetgaha xwe de bi tenê kiri bû û ji her du aşiqên xwe re dia dikir. Ji Yezdan lavelav dikir û digot: Min ew sipartine te, tu wan bisitirîne.

Sê hefte ketin navê; qasidek ji qada şer hat û da zanî ko dijmin şikestiye û ordiya Misirê a mîzefer daye pey. Lê dîsa wî qasidl da bû zanî ko di navbera dijmin û misriyan de şerine no çêbûne û kuştîyên misriyan zehf bûn û serbend Lokûs jî di nav kuştîyan de bû.

Wek herkesî Vêna jî bi mirîna Lokûs hesiya. Xencereke Vênayê hebû. Ew pişt-xencereke zêrhell û diyariya Klêopatrayê bû. Vênayê herwekl tiştektî adettî bikira, bêt ko destên wê bilerizin û gonê wê biguhêre xerxer ji kalan kişand û ew di sînga xwe rakir.

Vênayê xencer di aliye çepê rakirî bû û şilfa xencerê hîngaftî bû nivê dilê wê. Xwîna sor di sînga wê a spî re diviziqtî û di ser raxera xewgeha wê re diherikî. Vêna devbiken ji piyan disekinî û temaşa xwîna xwe a sor û germ dikir.

Cêrlî û xulam pê hesiyan; deng bi qesirê ket. Xelkê qesirê di dora wê de li hev gihane hev. Kalîn û bijîsk Vêna li ser textê wê dirêj kirin û ew seh kirin. Dilê wê nema hiltavêt. Lê Vêna dijtî û bi xelkê dora xwe re dida û distand. Xelk lê ecêbmayî man. Ma çawan dibû, bêt ko dilê wê hilavêje dijtî. Hin jê tirsîyan; digotin: Vêna an yekcar rehmanî ye, perçektî-yezdani ye, an yekcar şeytani ye. Kurt û piston ji nû ve dest pê dikir, ma ev keçika xerlîxîlqet ji kû hati bû? Ji însan an ji cinan daketî bû? Tukestî pê ne dizani.

Çend hefteyên din ketine navê, Devê birîna Vênayê hati bû hev, lê teptepa dilê wê nema veşerîya bû. Vêna gava di xew re diçû xelk bi tirs û hêdika nzinglî wê dibûn, gubên xwe didan milê sînga wê a çepê. Vêna bihîna xwe

didî û distand, lê dilê wê nema hiltavêt. Xelkê terka wê didan; bi tirs û lerz diçûn ibadetgahê, dia dikirin û digotin: Xwedê me jê bisitirîne...

Lagos di qadekî din de şer dikir. Qasidê wê qadê jî hat. Ordîwa Misirê zora dijminan birî bû. Lê Lagos bi birîneke xedar birîndar bû bû û bi rê ve emirê Xwedê kiri bû.

Vêna gava pê hesiya, bêt tu teredidê rahişte xencera xwe û ew di sînga xwe rakir. Lê vê carê ne di aliye çepê lê di aliye rastê re. Di sînga wê re disan xwîna sor vîziqtî, lê vê carê Vênayê nema kari bû ji piyan bisekine; ket erdê û beriya ko kalîn û bijîsk bêne ser, Vênayê çavên xwe ji ronahiya dinyayê re girtî bû, dilê wê hew hiltavêt û bihîna wê li ber wê çikiya bû. Vêna mirî bû.

Klêopatre gelek li ber ket; şîna wê da girêdan û di ber dara şîna wê re jî çavên xwe du hêstirên germ herikandin.

Klêopatré dixwest jê yadigarekê hilîne. Emirî bijîskan kir ko dilê Vênayê derînin û jê re binî. Bijîskan sînga Vênayê kelaşt. Tê de çî bibînin, li şûna dilektî du dil, yek li aliye çepê, yek li aliye rastê. Hîngê herkest zanî çawan Vênayê, cihê cihê jî du mirovan hez dikir. Vênayê di her dilektî xwe de evîneke din bi xwedî dikir. Bijîskan dilên Vênayê kirîne şûşekê de û berpeyl Klêopatrayê kirin. Klêopatrayê ew şûşe danî ibadetxana xwe.

Evlîna Klêopatrayê vemirî bû. Antonyo, mîr û aşiqê wê, xwe kuştî bû. Klêoparayê mar berda bû ser xwe. Oktavyoyê mîzefer Misir vegirtî bû.

Oktavyo gava qesira Klêopatrayê seh dikir di ibadetxanê de şûşa her du dilên Vênayê tê de peyda kir. Kalîn û bijîskan jê re got:

— Ev her du dil di sîngekê, di sînga Vêna delal de hiltavêtin. Vênayê bi yekî hejl Lokûsê romantî û bi ê din hejl Lagosê yewnantî dikir. Vêna di hej wextî de bi yekî dikenî û bi ê din digirî...

Kalînan çîroka Vênayê ji Oktavyo re dîr û dirêj qise kir. Oktavyo deng ne kir, lê heye ko li ber xwe ketî û bi xerxwarî emirê ko di heqê Klêopatrayê de da bû anî bira xwe [1].

Serdarê mîzefer, piştî ko biserhatiya Vênayê seh kir şûşa dilan ji ibadetxana Klêopatrayê rakir û ew şande Romayê.

Tartîx jî ... ji mîlada Îsa pêxember re hej sîh sal diviya bûn.

Dihok: 29 Îlon 1942

BIŞARÊ SEGMAN

[1] Di hejmarê Hawarê a 501 de çîroka Klêopatrayê bixwînin û li biserhatiya Klêopatrayê serwest bibin.

## MEMOZINA EHMEDÊ XANI

— 8 —

MEBDEI MEQAL E DI NET'A HAKIMÉ BIHTAN XUDAN IQBAL  
SMIR ZEYNEÐIN IBINI EMIR EDU-  
DAL DIGEL WESFA HER DU  
HEMŞIKEYÊN DI WÎ DI SAHIB  
EMAL ZIN Û SITI DI BÊ MISAL

Veş-qaşî şehîfeyî hikayet  
Veş-qaşî sebîkeyî riwayet  
Kêşa bi wî terhî resm û ayîn  
Lê da bi wî terzî derb û tezyîn  
Go padîşahêk zemani sabîq  
Rabû di bikûmeta xwe falq  
Ecnasî mîlet mittî û minqad  
Nesla wî ereb emîrî ekrad [1]  
Textî wî Cîzîr û bextî mes'ûd  
Tali' qewî meqamî mehnûd  
Rûm û ereb û ecom dîferman  
Meşhûr bi navê mirê Bihtan  
Aba' û îzam û ced-dî walid  
Mensûb û miselselî di Xalid [2]  
Ceb-barî felek ji wî hezerkar  
Meslûl ji sel-li seyflî ceb-bar  
Zînetdehî milk û zîni dîn bû  
Navê wî emîr « Zîndîn » bû  
Mîrî jî wî ra bi zîni miwes-sel  
Zînet ji wî ra bi dîni mi'er-ref  
Asarî şecaeta wî şahî  
Dağîrte ji mah heta bi mahî  
Mahiyet-tî wî medarî dinya  
Şahî-yetî wî şî'arî iqba  
Mihtacî sexaweta wî Hatem  
Mexlûbî şecaeta wî Rîstem  
Hatem jî kemalî hîm-şeta wî  
Tomarî sexaweta xwe girtî  
Eql û hîner û sexa û meydan  
Zebt û neseg û nîzam û diwan  
Dîndarî û dewlet û diyanet  
Serdarî û şewlet û siyanet  
Meşbûn ji heryekî xezînek  
Meknûn ji heryekî defînek  
Bê îsîr jî bo wî ra miyês-ser  
Bê xusîr jî bo wî ra miqed-der  
Enwa'î newadîr û cewahîr  
Elwanî nefasî û zewahîr  
Mecmûeyî mîlmînatî meqsûd  
Wacîb kirî bûn li nik wî mewcûd  
Hesîl bi wî mid-dea û mellûb  
Wasîl bi wî mişteha û mehbûb  
Sehna keremê ji nazenînan  
Cen-net tîjî bû ji hûr û eynan  
Hûrê, wî di cen-netê gelek bûn  
Xulmânî wî di hezretê melek bûn  
Lê xadeyî dîdîmanî dewlet  
Newdaweî bosîtanî if-fet  
Şehzade du bûn li nik wî şahî  
Xurşîd du bûn li nik wî mahî  
Yanî ko ji wî nejadî alf  
Hemşîre du bûn di laibalt  
Yek serwî rîyazî rasîft bû  
Wê nav bi rasîft Sîtî bû  
Ya dî ji dil û hînavî mîr bû

Wê nav ji nisfînavî mîr bû  
Rawî wihe gote min miem-ma  
Ew hûr bi navê Zîni misem-ma  
Yek zêde şîrîn ziyade mehbûb  
Yek rûhî qîlûb û hûr û meqlûb  
Yek esmer û ya diwî zerf bû  
Yek hûrî û ya diwî perî bû  
Ew hûr û perî di bêbedel bûn  
Lewra ko ji nûrî lemyezel bûn  
Hîsna ruxî wan kesî ne di bû  
Zîra jî cemalî sermedî bû  
Leb le' û semen îzar û gulrux  
Rewneşîkenî bitanî xul-lux  
Zîlfeyn misalî tîni sinbil  
Xed-deyn ji rengî rûyê sorgul  
Ew sorgul û sinbilê di azad  
Bîşkiştî li qed-dî serw û şîmşad  
Sorgul ji xwe da li' ser rehîştî.  
Sinbil bi xwe pêk ve dahêristî  
Hîsna xetî rux ji xet-tî yaqût  
Çaha zezenê ji sîbrî harût  
Goya kirî bû ji mişk bêzî  
Rem-malî felek nîqatrîzî  
Xal û nîqet û beyaz û hemre  
Beyt û hecer û tewafl û emre  
Ebrû' ji kemani qewsî eflak  
Mîjgan bi kemanî jî sehmi sem-mak  
Sermayeî weşeta cinûnan  
Mermûz di deşeta iyûnan  
Mebhût dibûn di terfetel-'eyn  
Keş-şafî rimûz hikmetel-'eyn  
Cebbet dinîma ji terfî ekîlî  
Goya ko li ifş cenabî cebîrîl  
Wîstayî li îstîwayê daflm  
Xurşîd di xîdmeta wî qaîm  
Herçî bîdiya rex û binagûş  
Fîlhal bi der dida ji bo hûş  
Gerden te digo di destî saql  
Qarûre ye pur şerabî baql  
Yan şîbhettî şîşeya nebatê  
Yan menbelî kehniya heyatê  
Serpençe û naxunî mîken-na  
Rencendêf xatîrî mîten-na  
Xelkê ko didîtin ew kemergah  
Hazîr dikîrin ji xewrî dil ah  
Zahîr dikîrin ko zend û bazîn  
Edî ne diman gîlî û gazîn  
Herçend ko her du şîbhî can bûn  
Ew her du bi hisîni tew'emran bûn  
Herçend Sîtî we nazenîn bû  
Lê Zîni ji misalî hûrî eyn bû  
Herçend Sîtî sitareweş bû  
Lê Zîni bi ruxan bêvegeş bû  
Herçend Sîtî wekî qemer bû  
Zîni mîhîr-sîfet ziyade ter bû  
Ew her dî wekî du şebçîraşan  
Gava dimeşîne baş û raxan  
Nalan dikîrin cemad û heywan  
Talan dikîrin nebat û insan  
Koff ji cewahîran mîkel-lel  
Koter ji nîtrîkan miselsel  
Ew zînet û xemlî û qîştî û benhel  
Ez piş û pes û yemîn û qenbel  
Gava dimeşîn perî digel wan  
Walîb dikîrin welê dixelwan  
Ger şex in û ger mela û mîr in

Derwêş û xent û ger feqîr in  
Kes nîne ne talîbî cemalê  
Kes nîne ne raxîbî wisalê  
Hîn raxîbî hisîni layezal in  
Hîn talîbî qalîbê betal in  
Lîken hemîyan yek e yeqîn dost  
Ferqa ko heye ji mexz ta post.

### NOT

[1,2] Seyda, gava em seyda dibêjin bîfî ko bi nav bikîni jê mexsed seydayê kurdmanciyê, Seyda Mihemed Hemze, midirê dibistanê Hesiçê ye.

Seyda Memozîn li Stenbolê da bû çap kirin. Di wê çapê de li ber van her du malikan hejmarên notan hene lê not bi xwe nînin.

Vê paşiyê Seyda hati bû Şamê. Min ev tişt jê pîrsî û ewî jî gote min: « Min hingê not jî danî bûn û tê de gotî bû ko li gora nivîşteke din ev her du malik bi awayê jêrin in:

- 1 — Ecnasî mîlet mittî û minqad  
Kurdê kurê kurd emrê ekrad
- 2 — Aba' û îzam û ced-dî purnam  
Mensûb û miselselî di Behram.

Lê xwediyê çapxanê ye ko bi kurdmanci nîzanî bû pê qaîl ne bû û gote min: tiştê ko di minhoyê de nîne ev nîkarim çap blîkm ».

Herwekî nas e ye ko esilên mîrekên Kurdîstanê gîhandîne eraban xwediyê Şerefnamê, Şerexfanê bidlistî ye. Ma mîr Şerêf çîre holê kiriyê, ji wî mîrekên Kurdîstanê heryekî re, li gora kêfa xwe, pêşîktî ereb peyda kiriyê?

Tiştê ko berî pêşîn tête bîrê ev e: Hingê ev tişt baw bû û şerafet bi aliyê eraban ve didan. Ji lewre Şerexfan jî ji bona ko mîrên Kurdîstanê jî şerafetê meh-rûm nebin esilên wan gîhandîne eraban.

Lê bawar kirin ne welê ye. Ji ber ko mirov berî herkesî qencî û şerafetê jî xwe re dixweze. Şerexfan holê ne kir, malbata xwe jî vê şerafetê mehrûm kir û esilê mîrekên Bidlistî, pêşiyên Şerexfan, jî erêbiyê prastiye û ew gîhandî-yê Nûşîrewanê xwerû arî û îranî. Xwedê gunehên mîr Şerêf bixêrîne.

Çîroka Şerexfanê bidlistî kevin e. Lê wê paşiyê kitêbeke kurdî û frensîzî derket, kilêbeke hêja. Xwediyê wê kitêbê jî tiştîne kurdan bi aliyê eraban ve dîde û ji bona bajarê Cîzîrê, Çîzîra Botan, Çîzîra Mîr Şerêf « Cezîret îbnîl Êmer » ya eraban dibêje. Ma jî Cîzîrê xwerûtir bajarê kurdan heye.

Mîr Şerêf bert sê sed û hin salan mîrekên me dikîrin ereb. Îro kurdîzanekî frensîz — kurdîzanekî welê ko jî ber kurdparêziya wî welatîyên wî jê re dibêjin kurd — bajarên kurdan pêşîktî ereban dîke. Bextreşo mîletê kurd...



## BINGEHËN GRAMËRA KURDMANCI

— 20 —

133 — Gava çend navdêr didin pey hev, herwekî mirov dikare her navdêrê bi rengdêra xwe a îşarki şanî bide, li gora zayend û mêjerê navdêran, dikare bi yek rengdêra îşarki ji bes bike. [1]

Navdêrên ko dane pey hev ne ji yek zayendi, lê ji yek mêjerî ne û her du ji yekejmar in. Rengdêra îşarki ji zayendê navdêra paşîn e û bi tenê navdêra paşîn tête tewandin. Vê tîrê û vî kevantî bide min.

an: Vî tîr û kevantî bide min.

Tu vî hespî û vî mehinê dibînî?

an: Tu vî hesp û mehinê dibînî?

Tu vî mihê û vî berantî dibînî?

an: Tu vî mih û berantî dibînî?

Navdêrên ko dane pey hev ne ji yek mêjerî ne. Her navdêr bi rengdêra xwe tête nîşan kirin û yek nikare bikeve cihê a din û li şûna wê rabe.

Tu vî hespî û van mehtnan dibînî?

Tu vî mihê û van beranan dibînî?

### RENGDÊRËN JMARÏN

134 Remgdêrên jmarîni ji hin jmarnavan pêve ne tutişt in û gava bi navdêran ve dibin an mêjer û mişdar an rêza wan didin zanîn. Ji vî awirtî ve ev rengdêrên ha du celeb in: jmarîni û rêzîni.

135 — Ên jmarîni dikevin pêşiya navdêran û mêjer an mişdarê wan didin zanîn û navdêrên xwe li gora tewangên xwe didin tewandin: Deh mirov hatin. Deh mirovan got. Çel mirov hatin. Çel mirovî got. Çel û pênc mirov hatin. Çel û pênc mirovan got. Min deh rîtilî goşt kirin. Ezê deh rîtilî goşt bikirim. Ezê deh rîtilan bikirim. Ezê çel rîtilî bikirim. Ezê deh rîtilî û niv pirtiqal bikirim. Ezê deh rîtilî û nivan bikirim. Ezê deh û nivan bikirim. Tu ji vî sed xaniyî kljanî diêcibînî?

136 — Ên rêzîni dikevin paşiya navdêran û rêza wan di qisetê de didin zanîn. Ev rengdêrên ko wek ên wesfîni didin pey navdêran gava navdêrên wan ji qisetê dikevin veqetandekên wan li şûnê radibin: Ji hire heta stûna çaran bijmêrtne û li her wê biakine. Ev e sagirtê çaran, ê heftan li kû ye? Mehtna min di bezê de a pêncan derket. Di vî rêzê de siwarê siyayan birayê min, ê şeşan pismamê

[1] Kerem bikin fedkirin mada 58an.

## MEZIN Û MEZINATÎ AN SERGEVAZ Û SERGEVAZÎ

Ez vê bendê ji zanîma gelparêz  
Rewşen Bedîr-Xan re berpê dikim

Ez dibêjim belkî ne hewce ye ko em ser-pilkî bipirsîn û bêjin: Ma gelo, mezin ji kê ra tête gotin û mezinatî çi ye?. Çi kesê tu bixwazî vê pirsê jê biktî, an dilbihewesê mezinatîyê ye, an jî bûye teriya yekî ji wan. Her yek bi dîtina eqlê xwe mezinatîyê di hinan da û bi awaktî dibîne. Bi zanîna hinekan, aşayek, begek, paşayek, mîrek, weztrek an padîşahêk yek mezin in. Lê qesda me ji mezinatîyê ne ev celeb mezinatî; bi tenê sergevazî ye. Ji van her şeş birên ko me jimartî pêve gelek birên din jî hene ko doza mezinatîyê dikin û jê ra mezin jî tête gotin; lê ne sergevaz. Sergevaz ew mirov in ko mîletan divejînin û radikin, an di vê rê da şopîne kûr û mezin dihêlin.

Herwekî dilbihewesên serkevazîyê jî pir in divê em pir û hindik li ser vî rûçikê han û wergirtiyên wî, ramanên xwe berpeyî xwendevanan bikin. Di vî warî da me kurdan gotinek heye dibêjin: « mirovek bêjayî hezar mirovî ye; lê hezar mirov ne bêjayî mirovektî ye ». Herwekî ifratî ji min ra bûye sinçiyekî naveqet, di vê yekê da jî gelekî pêş da diçim û dibêjim: « mirovek bêjayî miletektî ye; lê miletek pir çaran ne bêjayî mirovektî ye ». Tête gotin ko: ev celeb mirov jî mîletan radibin û ne mîlet jî van mirovan, têne pêl. Ev gotin çiqas ko rast e jî tevî rastiya xwe dişa gotina me ya jortî pûç nake.

Sergevazî wek mezinatîyên mayî bi xebat

min e. Min ev kitêb heta rûpelê wê ê bîst û çaran xwend.

ŞANEK — Jmarnavên « dîdo » û « sisê » gava dikevin pêşiya navdêrê û dibin rengdêr jî « dîdo » kîta paşîn û jî « sisê » kîta pêşîn dikevin û ev her du jmarnav dibin « du » û « sê »

Du mirov hatin. Du mirovan xwar.  
Sê mirov hatin. Sê mirovan xwar.

### RENGDÊRËN PIRSİYARKÎ

137 — Hin pronavên pirsîyarkî gava dikevin pêşiya navdêran dibin rengdêr û ji wan re rengdêrên pirsîyarkî dibêjin. Ev rengdêr bi tenê di komekên pirsîyariyê de têne dîtîn: Kljan mirov hatî? Tu kljan mirovî dibînî? Kljan jînikê gotî? Kljan mirov hatin? Çend mirovan xwar? Tu çend mirovan dibînî? Ev çi tîşt e? Tu çi tîştî dixwazî? Tu jî çi kesî yî? Tu çûyî kû derê?

û xwe westandinê nakeve dest tu kesan, hêrgiz bê wî mirovê ko ji ho wê yekê hatiye afirandin. Lê mezinatiya din bi west û xebatê dikeve destê wan kesan ko herî her tiştî xwe dibînin, xwe difikirin û ji bo xwe ne. Herçî sergevaz in, tenê û bi tenê armanca xwe diramin.

Mirov çiqas rûpelên dîrokê tev dide, sergevazên ko hatine, an li ser rakirina mileteklî û an jî ji bo danîna ol û mezhebekê xebitîne. Hinekên ji wan karên xwe birine serî û hinekan jî temamî kirina wî karî ji hevalên xwe ra liştine. Bi çav pesnedarên wê rê, ev herçîdu bir, ji hev nayêne veqetandin, ko hêjayî girisandinê ne (te'zîm). Ev mirovana dil û çanên xwe bicarekê û bê hîle didin armanca xwe û bê wê armanca di dinê da li pêş çavên wan tu tişt nexawine. Havalên kirên wan ewçend mezin in ko mirov bê raman destê şîna Xwedê di nav da dibîne. Heke mirov ji wan ra pêyayên Xwedê bêje, gotin gelekî xweş di cihê xwe da. Di rûpelên dîrokê da biserhatiyên sergevazên ko me xwandî dadewer dibin zînatker dibin, bawermend dibin nebawermend dibin; kirên wan ji kirên Xwedê ne. Çima ko kirên wan, rê û rêzikên rûyê dinê ji awakî diguhêzin awakî din.

Rûçikên sergevaziyê jî, li ser bawerî, dema ko tê da radibin û cihê ko tê da dijn, serpişkî ji hev cida dibin; lê di binatiyê da yek in. Bi çav zanîna min yê bîngehl ev in.

1 — Bawarmendin: bi rastî û gîhana armanca xwe.

2 — Zana ne: di nasîna nefsiyeta xwe û heval û hemberên xwe da.

3 — Têgihêştî ne: di serwest bûna doraliyên xwe da hişyar in.

4 — Xweyl vîn in: herçiya dîxwazîn bê dudillî dikin.

5 — Xweyl şîna in: ji bo kirîna her tiştî qewtê di can û dilê xwe da dibînin.

6 — Mêrxas in: reya tirsê tucar bi dilê wan nakeve.

7 — Zorbaz in: xurtiyê bi temamî di xwe da dibînin û xurtiyê li xurtan dikin.

8 — Dilovan in: li ser bindesta.

9 — Dil'eximin; tu boblat û lehlî dilên wan nahêjt in.

10 — Dûrbîn in: ji ditîna çawan bêtir, bi dil û mêjûyên xwe agahên rastiyene.

11 — Hûrbîn in: mezin piçûk tutişt li ber bînahiya wan nayête veşartin.

12 — Çavekirî ne: nazapîq û nayêne xapandin.

13 — Bire ne: di antîciha daxwazên xwe da zor şidiyayî ne.

14 — Rastin: di dilên wan yê girs da rêyên xar û çoleçiv nîn in.

Tête gotin ko ev rûçikên han bi pir kesan ra tene ditin. Erê em nabêjin ko xelk hemî ji van rûçikên han bi carekê bê parin. Her yekî, hinek ji van, yanê dido, sisê, çar, pênc an şeş û heft li nik digehin hev û peyda dibin. Lê hemî bi hev ra, uo. Çima ko gava ev rûçikên me jinartî hemî di gada yekî da gihêştin hev û tikûz bûn, hemî ew mirov dihe sergevaz.

Hemî sergevazên ko gelên ketî rakirine an ol û mezheb danîne ji van rûçikên han hemîyan ne bê par bûne. Lê ew jî gîştîk ne yek in. Hinekên wan xurt û jêhatî bûne, ko kirên gelek mezin an şopên kûr û fireh li pê xwe liştin e. Ên mayî ewqas der pêşda neçîn e.

Di vir da, ez canîerî an berpirsiyariya kêm û zêde bûna han davêjime ser gel an hevalên wan. Piştî ko ev hemî rûçikên me jinartî di sergevazekî da tikûz bûn, hindikiya havila kirên wî ji békêriya kesên dora wî ye.

Rabûna sergevazan: heye ko hinek bipîrsin û bêjin; gelo sergevaz çawan û çî demê radibin?...

Bi çav min, sergevaz zayîyên dem û mehçetê ne. Çî gava dem û mehçet gihêştine hev, ji wan sergevazekî tete pê. Ev hewcebûn ewçend pêş de diçe ko, xelk ji xwe bê hevî dibe û çav dide destê şîna Xwedê. Yanê dîxwazîn ko Xwedê li nik xwe sazê wan bigerxe. Ev daxwaz ewqas pir dibe ko [ gotin neyê şermandin ] êdî guhên xelkê dirêj dibin Hînga, Xwedê peyaktî xwe dajo pêş, ko hemî rûçikên sergevaziyê tê da tikûz in. Ew peya bê west û rawestî dixe bite û xwe dide nasîna. Dema xelk wî dinase, bi her awayî xwe dispêrinê. Ew jî wan berve felat, azalî û serdestiyê dajo.

Qet tu caran ji bîra min bi dermakeve ko, em kurd jî hewce û çavnerê sergevazekî ne. Çî gava ew sergevaz ji me rabû, teqez ev rûpelên bextereşîya me dê bêne wergerandin û di dîroka jîna gelê kurd da wê rûpelîne bextiyariyê bêne vekirin.

Ez dibêjim belbî ew roj ne gelekî dîr be. Pir mikûne ko sergevazê me yê pêşende li diyarê qada xehata welêt, li hêviya roja xwe rawestî he. Em kurd dibêjin: ( Kaniya ko tim av jê hatiye bi car namîçiqe ). Gelê kurd yê ko tê da sergevaz rabûne, ne dîr e ko di rojêke wekî iro da sergevazekî bizê.

OSMAN SEBRI



# REWŞA DINYAYÊ

**ŞERÊ MISIRÊ** — Ji 23ê Çiriya-Pêşîn ve di eniya Misirê de êrîş e, êrîşa îngilîz û hevalbandan e.

• Fermandariya îngilîzî vî carê beriya ko dest bi êrîşê hîke xwe bi temamî kar kiriye, her tevdir ditine û bi her awayî serdestî, di bej û behir û hewan de, xistiye destên xwe. Jû pêve fermandariyê ji bo êrîşê wextekî gelek f minasib ji hijartiye. Ji alkî bayê sehrayê honik bûye, ji aliyê din qewetên elemanî, nemalez ên hewayî di eniya ûris de mijûl in. Digel vî hindê heye ko ji qewetên mihwerê re ji welêt hin imdad û piştmer hati bin. Ji ber ko ji 11ê Çiriya-Pêşîn û ji nû ve balafirên elemanî li mallayê dişindandin.

Di vî êrîşê de tektika, yanî awayê şer, inglîzîyan ji tektikên şerên vî eniyê biferq e. Piştî ko inglîzî kîşiya bûn xeta Qetara û Elemeynê bêpivaniya sehrayê ji ortê rabû bû. Ji lewre tang û herçî qewetên mîkanîkî weke berê nikarî bûn tev bigerin, menaweran çêkin û bikevin paşiya xetên dijmin û lê wer bèn.

Ji ber sebebên jorin fermandariya inglîzî vî carê bi eskerên piyade dest bi hîcûmê kir. Li 23ê Çiriya-Pêşîn, şerê 1nê, di tava heyvê de, topçiyên inglîzî dest bi lîxistana xetên mihwerê kir. Balafirîyan jî pardariya wê bombaranê dikir. Qewetên mihwerê pîşya xetên xwe bi zeviyên torpil û lîxeman girti bûn. Ji piyadan re diviya bû van torpil û lîxeman ji ber rîya xwe rakin. Di vî îşî de topçî û balafirîyan jî arîkariya piyadan dikir, wan jî bi gule û bombeyên xwe ew torpil û lîxeman dîteqandin. Welê dixwîye ko ji bona vî yekê balafirên inglîzî û yê hevalbandan, carina di rojekê de, ji sed carî bêtir di ser xetên dijmin re dişirîyan.

Heta 30ê Çiriya-pêşîn şer bi vî awayî dom kir û piyadeyên britanî piştî bombaranên topçî û balafirîyan di hin deran de erd ji torpil û lîxeman paqîj kirin û berdan xetên dijmin. Nemalez di qada bakur de britaniyan xetên dijmin qul kirin û neqebîne fireh xistin destên xwe. Tangên britanî di van neqeban re derbas bûn û zora xwe dan tangên elemanî û talyanî; bû şerê tangan, şerê kîsoyên fola. Di vî şerî de xesarîne mezîn gîhaştine tangên her du alîyan û inglîzî qedere çar pînc kilomêtiran pêş ve çûn û hin gir û mitik xistine destên xwe. Stola inglîzî jî pardariya vî şerî dikir û bi topên xwe ên dîravêj li baskê dijmin ê çepê û li rîyên piştîniyê dida.

Bi vî awayî sefha hîcûma inglîzîyan a pîşîn qedîya bû û inglîzîyan xetên mihwerê di pînc deran de neqeb kiri bûn. Sisê li aliyê eniyê yê hakur û dido, li aliyê eniyê yê nîvro. Qewetên hevalbandan ev neqeb hêdî hêdî fireh dikirin.

Neqeba ko eskerên ewîstrâlî di roavayê Elemeynê, nîziqî girê Eqaqîrê vekiri bûn ji hemîyan mezintir û firehtir bû. Li 3ê Çiriya-Paşîn Romel ji bo girtina vî neqebê jî qewetên elemanî liwayek piyade û liwayek tang pêş ve ajot. Liwa elemanî di bin himayeta tangên û di piştî gir re qesta pêş kirin. Herçî ewîstrâlî di bin himayeta tangên ko di peravan re dimeşîyan û di bin himayeta topên

stolê de baskê liwa elemanî ê çepê li xwe hadan û kirin li liwa elemanî wer bèn. Romel di pêşberê vî weziyetê de refek stûka bi ser ewîstrâlîyan de rêkir û ji milê din pîncî tangên din jî şande hawara piyadeyên xwe, da ko liwa piyade yekcar neyete pêçandin. Lê tangên inglîzî ên ihtiyat li tangên Romel der bûn û ew bi şûn de vegerandin. Ewîstrâlîyan zor dida elemanan.

Li 4ê vî melê Romel bi xwe di qada nîvro de bi emeliyateke lehiwandîne mijûl dibû. Di qada navin de kumande di destên genêralê talyanî Maryîl de bû. Romel emirî wî kir ko di navbera Dêrîlîncar û Riweşatê yanî di qada navin de rabe berhîcûmê û barê qewetên bakur sivik bike. Talyanîyan weke hergav û elelîşî nikarî bû bi karê xwe rabîn. Genêralê talyanî gava vî hali dibîne bêtî ko pîrsa xwe bi Romel bîxe radihe menawreke din çêdike û eskerîne din yê ko li baskê wî ê çepê bûn û ber bi nîvro yê eniyê şargeh bû bûn radike hîcûmê.

Inglîzî bi ber şikan aekîni bûn û li hêviya vî tiştî bûn da ko bizanin di pîşiya vî eskerî de erdên nelexemkirî kîjan in. Eskerên mihwerê gava qesta pêş dikin; inglîzî wan erdan dibînin û eskerên frensîzî, nûzelandî û yewnanî di bin himayeta tang û balafirîyan de berdidin qewetên mihwerê.

Romelê ko di dawîya qada nîvro de bû pê hesandî. Romel bi balafirîyan xwe di ser qada şer re şirîya. Li aliyê bakur ewîstrâlîyan zor dida elemanan û dikirin li wan wer bèn. Di navbera Riweşat û Hînoematê re 500 tangên britanî pê li xetên mihwerê dikirin. Herçî aliyê nîvro, lê re jî frensîzî, nûzelandî û yewnanî dikirin di bakurê Qetarê re li baskê mihwerê ê çepê bizivirin.

Romel li ber vî xeterê giraniya tangên xwe di bin fermandariya genêral Rîlter von Tûma da dadixe qada şer. Lê Romel bi vî tevdirê jî tu havil nake. Ji ber ko li aliyê bakur herçî perav û girên dorê keti bûn destên britaniyan û di wê qadê de tangên mihwerê nema dikarî bûn xwe tev bidin. Britanî di neqaba ko di nîvro de çêkiri bûn; lê re jî ber bi pêş çû bûn û bi vî awayî her du baskên qewetên mihwerê berdayî ma bûn. Li ser vî yekê di dirêjahiya eniyê de qewetên mihwerê ji ber britaniyan radibûn û xwe didan paş.

Sibetirê fermandariya britanî danezanek belav kir û tê de got ko piştî şerê ko 12 rojan ajotiye qewetên mihwerê şikistine û baz dane. Li gora raporên pîşîn di van 12 rojan de 9000 hêsr ketîra destên britaniyan û ordîwa britanî 250 tang û 270 topên mihwerê şikandîne û 300 balafirîyan wê avêtîne erdê.

Di van 12 rojan de balafirîyan hevalbandan 9000 carî dirêjî qewetên mihwerê kirine.

Romel piştî ko ordîwa wî di xeta Elemeynê de şikist û baz da berê xwe da Mersî-Metrûh û li paş xwe çend firçeyên talyanî ên piyade hiştine da ko ew êrîşa britaniyan biwarqîllînin. Di vî navê de Romel ordîwa xwe wê bikira xeteke nû û ji nû ve şerê britaniyan bikira. Lê ev plana Romel jî çê çû şerî. Firçeyên talyanî berî ko bi karê xwe rabîn xwe teslîm kirin û ji inglîzîyan re gotin; eleman revîn û em di çolê de bi tena xwe hiştin. Here wêlê jî wan re pasban û notîrvanîyan di qada bûn da ko wan jî tada neyaran biparêzin

Bi vi awayi bñtaniyan gelek nizingi li giraniya ordiwa Romel kiri bú. Di pé;beré vé weziyeté de Romel qederé sed tang ú çil stúka rekirin ber bñtaniyan. Dema ko van tang ú balafiran şeré bñtaniyan dikir giraniya ordiwa Romel ji Mer.s-Me'rúh rabú ú beré xwe da Sdt-Berani. Lé bñtaniyan etlahf ne dida. Li 9é mehé bñtaniyan ke'in Mer.s-Me'rúh ú jé dane pey qewe:én mihweré. Peraşú'ísten frensizi beriya ordiwa Romel ji balafiran dakeline balafirgehén Mer.s-me'rúh ú balafiran neyar li erde xerab kirin ú li 11é mehé ordiwa heştan ke e Sdt-Berani. Romel beré xwe da bú Tobriqé; Tobriqa ko çend çaran bú bú aşegeha bñtaniyan.

Li 13é mehé ordiwa heştan kete Tobriq ú Bardiyayé. Romel di Helfayé re beré ordiwa xwe da Lihyayé, ber bi Derna ú Bingaziye. Li gora danezaneké bñtaniyan ya ko li 15é mehé hate belav kirin xera qewe:én mihweré he'a niho kuşf, birindar ú he'sr 75000 peya ne. Çek ú posa:en ko ke'ine desten bñtaniyan be hed ú hi ab in. Qewelen mihweré direvin, ordiwa heştan daye pey. Li gora texmina hawirén hevalbandan ordiwa heştan ú qewe:en emérkanf yén ko di Túnisé re ten di Trablis-xerbé de wé bigehin hev ú bakuré Efrîqayé ji talyan ú eleman reş bikin. Lé vé çaré bi malis-tinke wer pak bimalin ko şopa solén neyar ji ji çuma Efrîqayé wé hixirifnin.

FAS Ú TÛNIS Ú CEZAIİR — Li 8é vé mehé, roja Yekşembé, pişf nîvê şevê, saet sıseyan de radyowén emérkanf banf guhdarén xwe dikirin ú digotin: Elo... elo... ev der Boston... Weşington... Şikago... Filadalfiya... ye... guhdarén delal ji ber radyowén xwe ramebin; pişf çend deqfçeyén din Mr. Rüzwelt bi xwe ji we re nünçeyine mihim wé bidit zanfn.

Ew çend deqfçe li guhdaran borfn, Mr. Rüzwelt peyiví ú ji diné ú alemé re da zanfn. Ko eskerén emérkanf di Etlanfk ú di Behira-spf re daketine Fas ú Cezairé. Mr. Rüzwelt di gotara xwe de ji milé:é frensizi re got ko ji vé hereke:é mexsed deréxistina qewetén mihweré ji bekuré Efrîqayé ye. Ji Milé din derekcihmüré Emérkanf ji frensizan re dida zanfn ko ew erden frensizi her frensizi in ú ewé her frensizi biminin. Rüzwelt ji eskerén frensizi re yén ko di Fas ú Cezairé de ne digot ji bo qelandina dijminé mişterek arika-tiya eskerén min bikin ú herçf zabit ú kúmandarén we ne divé: xwe bexin bin emiré fermandaré min.

Gava Rüzwelt li ber mikrowa radyowé daxaft 500 vaponén barkés, tişf çek ú esker, 500 çenke tişf digel çend vaponén balafrhilgir di çariya şevé de bédeng ú ji ker ve nzingi li re:aniyê kiri bün ú esker, top, tang, mitralyoz ú her xelîl haca:en cengé dadixistin peravén Fas ú Cezairé. Balafrnan jf di ser erden wan welatan

re diliriyani ú ji xelké ú ji eskerén frensizi re beyaname tavélin.

Serfermandaré hemlé genéral Eyzenhawer jf bi beyanaman şifret bi eskerén frensizi kirin ú ji wan daxwaz kir ko arikariya wî hikin ú bi eskerén wî re şeré eleman ú talyanan bikin ú wan ji Efrîqayé derinin.

Ji milé din genéral De Gol şerek ú: erfamandaré Frensa şerevanf li ber radyowa Londre peyiví ú ji frensizen Efrîqa bekur daxwaz kir ko arikariya genéral Eyzenhawer bikin. Genéral Ka'rú, nimfnende ú fermandaré Frensa şerevanf, di wela:en rohale é nzing de, ji ber radyowa ruhelat ev tişf bi xwe tekrar kirin.

Digel vé hindé eskerén frensizi di hin deran de dest birine xwe ú bú şer. Lé vi şerî gelek dom ne kir ú li 11é mehé bi emiré Emíral Darlan eskerén frensizi çekén xwe danfn ú vegeriyani qişleyén xwe. Lé lé Emíral Darlan wekilé meréşal Pé en ye ko li Efrîqayé bú ú şeré emérkaniyan dikir pişf ko elemanan diréji erde Fransa nevegirf kirine bi emérkaniyan re mitarekék imza kir ú bú hevalé wan.

Li ber vé weziyete ú li 11é mehé Hiler emir da ú ordiwa elemanf dest bi vegirina Frensa nevegir f kir. Hiler da zanfn ko dilé ingiliz ú emérkaniyan heye di nîvro re diréji Ewropayé bikin: ji lewre eskerén elemanf wé dakevin he'a peravén Frensé yén nîvro, yanf Behira-spf. Talyanan jf esker deréxistin girava Korfikayé.

Herwekf me got Darlan derbasf aliyé hevalbandan bú ú da zanfn ko meréşal Péten ji ber ko rast bi rast ketiye bin hikimé elemanan nema dikare fikira xwe bibéje. Lé fikira Pé:en, parastina Fas ú Túnis ú Cezairé ye. Darlan paşf ko beyaname belav kir genéral Jirokire serfermandaré qewetén frensizi yén Efrîqa bakur.

Lé De Gol hereketa Darlan venenasf ú da zanfn ko Frensa şerevanf bi teşkilata ko li bakuré Efrîqé çédibe ne eleqedar e.

Herçf meré:al Péten wî jf bi radyowé da zanfn ko Darlan bémriya wî kiriye ú bewart agir ú brúskén eskerén frensizi daye betal kirin. Ji milé din Pé:en dibéje ko ne di bin hikimé tukesf de ye ú fikira xwe bi serbesif dikare eşkere bike.

Herçf şer, di pey emérkaniyan re ingilizan jf esker deréxiste: Fas ú Cezairé ú pişf mitareké ingiliz, frensizi ú emérkanf beré xwe dane Túnisé. Elemanan bi balafir ú vaponan esker derxistine Bizerte, bendereke Túnisé. Hevalbandan niho di Túnisé de bera elemanan didin. Herçf eskerén frensizi yén ko li Túnisé bün wan jf rahişte elemanan.

Ji milé din ordiwa heştan daye pey Romel ú wî ber bi Bingazeyé ve tajo. Bi vi awayi eleman di navbera du agiran de mane.

Şam: 15 Çiriya-paşin 1942

NEREVAN

ŞAM — ÇAPXANA SEBATE — 1942

## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Gawestiyayî	Qedrf Cemil Paşa
Civat	Reşid Kurd
Heke Te Divêt	Şiretbêj
Keleha Şahîn	Bişarê Segman
Diwana Melê	Qedrf Cemil paşa
Pendname	Cegerxwîn
Şahê Ecem	Farîsîxwîn
Mirdêsan	Osman Sebrî
Gêlo Dem Ji Zâr e?	Osman Sebrî
Beyta Kewê	Mela Enwer
Heyat	Hisên Emlîne Perixanê
Pira Genderê	Osman Sebrî
Marşa Keyanî	Cegerxwîn
Rojên Derbasbûyî	Qedrf-Can
Xanîmekê Ciwan	Cegerxwîn
Roviyê Ker	Osman Qedrf
Le Mariage	Tawûsparêz

### GAWESTIYAYÎ Û KOÇERÊN KURDAN

Berf dora sed saflê pirê kurmancan koçer bûn. Havînên xwe li çiyayên Kurdistanê ên heftreng û di nav gul û gullîkan da dibihartin. Pez û dewarên xwe bi nefel û giyayên zozanan xurt û qelew dikirin. Zivistanê, berê xwe didan nîvro, ji ber pûk û herfa zozanan direviyan, dihatin germiyanan, biniya çiyayên Kurdistanê. Ji Ferêt heta Dicle li vê deşta hana fireh ci ci koçeran datanîn.

Di vê çûn û hatina koçemalî da gayên zexm û xurt, hûr û mûrên malên wan hil-digirtin. Yekcaran çend malan ji ber qelsbûna gayên xwe nikarî bûn tevî êla xwe bimeşin, ji wan vediqetiyân; di cîkî tîr av û giya da çend rojên xwe dibihartin. Paşê diçûn digihîştin heval û hogirên xwe. Hinek ji wan gawestiyan heyfa xwe ji warê xwe ê nû ra dianîn û li wê ci digirt û diman.

Ji ber wê ye ko di pey terikandina koçeriyê ra em dibinîn, birek ji eşrêkê di germiyanan da ye; birekî din li çiyê bi ci bûye. Ev ji hev

veqetîn bi sebebêke din be ji ji wan ra gawestiyayî tê gotin. Wek remzekê hatiye nas kirin; gawestiyayî ew in ko ji eşra xwe a bingehîn veqetiyane.

Ger em li eşrên deşta biniya Mêrdîne binêrin, wek eşrên Kîkan û Deqoriyan yên ko eşrên giran in emê bibînin ko tev da ne ji havekî ne, ji eşrên din gihane hev.

Mesela Deqoriyê Amûdê: bi xwe birekî de çiyên welatê Wanê ne. Ew bi xwe ji herwekî min got ne ji havekî ne, di nav wan da birê Seyida heyê ko di Kurdistanê da se çar bir in. Qebîla rehmetî Seyîdxan ji yek ji wan e, qebîla Gabara qismekî ji çiyayê Şingalê ye, kîkan ji wisa ye. Tê da Remf, Kosekan û Omeriya hene. Evana tev da ji eşrên din in, Ev di wê wexta koçeriyê da ji eşra xwe bi çî bawayî be, veqetiyane û di nav Deqoriyan û Kîkan da mane; bûne kîkî û deqorî. Pirê eşrên Cezira Sîriyê wiha ne.

Lê; herçî eşrê xerexna ko fro temam bi erehî dipeyivin; gelo ji kû ne? Evana ji çiyayê Têrika dahatine biniya germiyana Mêrdîne. Di rê da gayê hinên wan westiyane û li dora Dêrikê mane. Yên ko li dora Dêrikê mane ko fro bi navê qebîla Rûta deng dayîne, bi xwe xwerû kurmanc in ev û xerexna pismamê hev in; êdî çawan bûye ko xerexna zimanê xwe winda kirine, divêt ev bête kolan.

Bi min çîroka gawestiyan ev e.

**QEDRÎ CEMİL PAŞA**



# CIVAT

— 2 —

## CIVAT NE HAVILA LIBATAN E

Berê hati bû gotin ko civat xwedi dîrok e û pêşve diçe. Li ser vê rastiye em he guman bawer dikin ko « karê civatê ne ji neheşiyê ye.»

Civat, bi çend girêkan girêdayi ye ko tevger û ajotina xwe di stnorê van girêkan da tekûz dike. Gava civat ji tixûbê wan derkeve ji civatê dikeve. Ji ber vê yekê civat her di stnorê van girêkan da ye:

Pêgirt (adet), şerde (terbiye), ol (diyanet), zêw, gewzîn (bedîyat) h. p.

Ma kes kare bêje: vana libatan çekirine û pêkînen civatê ji libat in?

Ji xwe civatok ji ber vê gumanê bi şûn de maye û di vi homanê paşin de bi awayê kl qels di rêza zanistiyê de cih girtiye.

Çiqas pisporên rohilat û roavayi hebûn di vê gumanê de bûn. Wan bawer dikir ko civat di dest libatan de lizkeke e. Digotin: libat çawa bixwazin bergiya jina civatê dikarin biguherînin. » Hin bûyer ji heman li vê dorê bi bawerîya me dîzîzin. Pir caran hatiye ditin ko rajorekl (metbû) xurt û zorker dîroka gelekl li ser rêzikên gewza xwe ajotiye û gel bivê nevê rajêriya (itaet) wi kiriye. Bi pîrsek wî xwe di gêdnêkirin mirinê wer kiriye.

Gava dîrokê li rû em di çav xwe rakin wisa tê ditin. Lê ko em kûr binerîn û em bigihên bîngeha hûyeran emê bibînin ko gumana me ji leylanekê pêve ne tu tişt e.

Bo nasîkirina libatan divê ko em xwe bigihênin bîngeha jina civata ko ev rajor gihandiye.

Serxwerabûna kurdan ne îşê peyayekî ye. Heke peyayekî daye pêş kurdan yê ko ew rakiriye û ajotiye kurd in, dîtî, perîşant û giyanê gelê kurd e, serxwerabûneke bindestî li ber serdestiya zorker e. Yê ko ola holşewikî di nav ûrisan da daniye dîsa ne Lênlî e; birçîtî, perîşant û şerpezeyiya gelê ûris e.

Gava van hûyeran em kûr di çavên xwe rakin emê bibînin ko bûyer û homan hin bi hin di giyanê civatê de raman û awanîna nû pêk tîne û libat ji hi hêsantî hînlî rajêriya van bûyeran dibin an bo cihanîna van bûyeran ji nîşkave pêl dide, li hev dikeve.

Kêf û gewza me bi xwe di bin xurtiya civatê de ye. Em awayê jînlê û gewzê ji civatê hînlî dibînin. Ji lîz, ereq, tûtin, cilên hevrlîşim bez kirin û ne bezkirin ilim bi havila civatê

# HEKE TE

## DIVÊT TE DOST HEBIN

Ji KITÊBEKE INGILÎZÎ BI NAVÊ  
« HOW TO WIN FRIENDS »

Li gora vê kitêbê yê ko dixwaze dostên wî hebin divêt şertên jêrtî bîne cih:

1 — Bi xelkê dora xwe eleqedar bibin. Ew pê şa dibin û meyildariya we dikin.

2 — Li şûna ko ji ber fikirên wan gazindan ji xelkê bikin; gub bidin gotina wan û bala xwe bidin ko wan seh bikin. Ev guhdariya xêrxwaz dihe sebaba dostaniya wan.

3 — Çiqas ji we hat ewçend bi xelkê re mekevin cedelê.

4 — Heke hon ketin cedelê û we bi xelkê re da ber hev, di cedelê de nerm bibin û fikira xelkê bi qedir bizanin. Xelk ji wê qedirê fikira we bizanin.

5 — Heke te dît ko te xelet kir û tu xapiyayî, li ser xeletê mesekine, zûka mikur were.

6 — Guhdarekl qenc û bisebir be. Rê bide xelkê ko qala nefsê xwe bikin. Xelk ji vi tiştî gelek hez dikin.

7 — Gava te yek nas kir, navê wî qenc ji ber bike û dema ko pê re daxevî navê wî her û ber bîne ser zimanê xwe. Ji guhê xelkê re ji navên wan çêtir û ahengdar mûstqî nîne.

8 — Heke tu bêgav mayî û divêt kêmahiya yekî bidî rûyê wî; berî ewilî çel li wesfên wî ên qenc bike. Gava te dît ko kêfa xwe ji te re anî kêmahiya wî sivik bike û wê bi çend pîrsan jê re bibêje; hêf ko li ser wê gelek bisekînlî. Bi vi awayî ew rûyê xwe ji te ba nade û li kêmahiya xwe hisyar dibe.

9 — Di dema mîbahesê de gotina xelkê bi tu awayî mebere. Rê bide wan ko tûrikê xwe vala bikin. Ko tûrikê xwe vala kirin ewê çêtir guhdariya te bikin.

10 — Her rûken be. Xelk ji rûyên bimad direvin, lê nîzîngiyê li rûyên biken dikin.

## ŞÎRETBEJ

ye; ne bi xwestin û hezkirina libatan e. Giş bi pîrsek nuh derketî, texlîl, ji milê civatê ji libatan ra tê pejjirandin (qebûl).

Ji xwe şerdeya mirov nîşanê civata xwe hildigre. Hiş, jîregî, şarezaiya libat ji giyanê civata wî tê. Şerde, rabûn û rûniştin û mîraniya kurdeklî tavil kurdîtiya wî xuya dike.

Dûmak: Civat ne havila libatan e, bi vajayî libat havilên civatê ne.

(Dûmayîk heve)

REŞÎD KURD.

## KELEHA ŞAHİN

Yemame kete d'wanxana xatûna xwe Zeynoyê, melfka Tidmirê. Zeyno di d'wanxanê de wek pilinga ko riyên felatê lê hatine girtin, bê sebr û çeraxer diçû, dihat. Zeynoyê gava çav bi Yemamê kir; sekinî, berê xwe da wê û got ê:

— Yemame ez fro ji her wextî bêtir hew. cedari xizmeta te me. Di van deravên dişwar de diyêtu tu fedakariya xwe careke din, heye ko ji bo cara paşîn, şanî min bidî.

— Ez gorî, min çend caran ji xatûna xwe re gotiye û ez bawer dikim ko baniwa min delêletên we jîdfitine ko di vî dilî de du evîn hene û ev dil bi tenê ji bona wan hiltavêje. Evîna welêt ya ko di xesxê xanima min de têtê pê. Û evîna Rebî kurê Cabir, ew siwarê ko şûr û mirtal û canê wî hevîdarê firsendekê ne, da ko xwe ji bo text û tacê melikê feda bike. Ka bêje ezgorî çi emîr û çi ferman e?

— Yemame, text û tacê ko tu dibêjî di talûka mehiwbunê de ne. Eskerên Romayê gihaxtine devên deriyên paytextê. Ez melfka Tidmirê, ji min re diyêtu welatê xwe ji xerabiyê û miletê xwe ji hêstiriyê xelas bikim.

— Ez çawan dikarim xizmeta xanima xwe bikim?

— Lozê hide xwe û here nik Rebî kurê Cabir, yarê xwe û fermandarê Keleha-Şahîn. Diyêtu tu xwe pê re di kelehê de hepis bikî da ko keleha beta dawiyê li ber xwe bide. Û heke kelehên paytextê ên din bikevin destên dijmin jî bila Rebî teslim nebit û heta segmanê xwe ê paşîn şerê romaniyan bikî. Heke tu pê re bî Rebî tucaran naçe rayê.

— Herwekî xanima min gotiye ewê holê jî bibe..

— Yemame! ji bir meke eskerên me di rastê de bişkên û kelehên din bikevin destên dijmin jî Keleha-Şahîn diyêtu li ber xwe bide û heke romanî rojekê ketin ê, bila tê de ji cendekan pêve tu kesî nebin.

— Bi xatirê te ez gorî, hetanî ko destê segmanekî birîndar di qevda şûr û xencerê de ye romanî naKevin Keleha-Şahîn.

Tidmir.. ew şaristana ko di orta beyabanê de wek guleke ter û taze serî hildida; di bin hikimê Romayê de bû. Di wextê Zeynoyê de Tidmir ji nîrê romaniyan xelas bû bû û bû bû paytextê kişwerê rohelê.

Lê tiştê ko qeyserên din ji dest da bûn, Orfilyanos dixwest wan bi şûn de vegeftine.

## DIWANA MELE

— 37 —

Xelkino li min kin şretê ew dilbera zêrîn kemer  
Min di di halê xelîetê hat der ji bircê wek qemer  
Hat der ji birc û penceran dil girt û da ber [xenceran

Ev reng e halê dilberan lew aşiqan xwîn bû ceger  
Qelb û ceger min bûn birîn lewra ko jê tîn [av û xwîn

Ey can were halim bibîn da rûh ji qalib bête der  
Canê min bête ser cesed mizgîn bi afaqan resed  
Alem hemî pê bin hesed însan û cîn û canewer  
Alem hemî tîk bûne sef seyirîn li şahê min bi xef  
Hatîn temaşa çarteref şatir xumar tayin di ber  
Hat padîşahê pir sipah qamet elfî demîşibhê mah  
Dad û meded sed ah û ah zilf û eqarîp, tene ser  
Kuştîme xelkino eqrebê mestim ji şewqa xebxêbê  
Tali' tenê min d'kewkebê fro eqarib tene der  
Fro eqarîb hate xar çû nivê baxê gulzar

Ew be çeyê her lê bihar lew bilbijan lê qal û şer  
Lê hed ji dil nalf û keyb da baxçeyê rîdwan [û xeyb

Wan naliyan nînin çeyb sohtîne em dil bû seqer  
Sohtin li min cerg û hinan werdên di dor [girtin xunav

Zilfhate ser lêkir belav bayê nesim wextê seher  
Tirsim mixalîf ba ditê zilfên di dora cebhetê  
Rakit qiyam wê saetê alem bibit zîr û zeber  
Zahir dibêjin pendegtr da dil nedî zilfa hesr  
Şibhê melê d'mînf esr guh dère qewlê mu'teber

Orfilyanos qalî ne dibû ko Tidmir deriyê wela-  
tên rohelê di destên ereban de bimîne. Orfilyanos  
da pêşiya ordiwa xwe û dirêjî Tidmirê kir.  
Zeyno bi eskerên xwe ve derket pêşiya qeyser  
û serdarê romanî.

Orfilyanos ji nav xelkê derketi bû. Ew kurê  
gundîkî bû; ne pîsaxa ne jî pîsmîr. Lê mérékî  
qenc û çeknas. Orfilyanos wek segmanekî adêfî  
kete ordiwê û di gelek şeran de bi mîranî û  
şehrazahiya xwe serevraz bû. Piştî çend salan  
bû fermanderekî xudan gotin û ji eskerên xwe  
hebandî.

Di vî wextî de Romayê mezinên xwe ji  
nav mirovên hêja û xudanvên dibijartin. Orfî-  
yanosê segman bû fermandar, bû qeyser.

Zeyno... keça mîrê ereban bû; keça Emro,  
Emroyê iraqlî. Navê wê Zeyneb bû, ereban jê  
re digot Zeba, romaniyan jî Zenobî, kurdan jî  
Zeyno digotin ê. Bavê wê, Zeynowa bedew da  
bû mîrê Tidmirê. Mêrê wê mirovekî bêvên  
û kêmîdil bû; serdestiya Romayê li ser xwe



qebûl dikr û wek relyekî xweyîkî dida  
Jûlyanos û Ewgûstos.

Mêrê Zeynoyê mir û Zeyno li ser textê  
Tidmirê bi tena xwe ma. Zeynowa dilqewîn  
bû melika Tidmirê û çavên xwe da kişwer-  
kişayiyê. Ciwab da qeyserên romanî; welatê  
xwe ji bin nîrê Romayê derêxist. Ordiwên wê  
giha-tin erdê Misirê, stolên wê di Behirên spî  
û sor de welatine nû vedigirtin.

Romayê ev hal xerab didft. Civata rîspi-  
yan qerarek da û got: Yek ji wan her du  
stêrkan divêt ji ezmanê rohelê bête êxistin.  
Ordiwa Orliyanos berê xwe da Tidmirê.  
Zeyno terka payîtextê xwe da û çû pêrgîna  
neyarê xwe ê tacidar; bû şer.

Zeyno di sala 267an de li ser textê Tidmirê  
rûnişt bû. Di sala 272an de eskerên wê û yên  
Romayê li hev dixistin.

Zeyno şûr bi dest, dabû pêşiya eskerên  
xwe û di destê û sehraşên Erebiştanê de bi  
mêranîke kêm dîtî şerê romaniyan dikir. Lê  
Xwedê jê re hez ne kiri bû. Rêxma her mê-  
ranî û fedakariyê ordiwa Zeynoyê ikeşti bû  
û Zeyno vegeriya bû Tidmirê û tê de asê bû  
bû. Romanî ji her alî li Tidmirê çarnîkar hati  
bûn. Zeyno pê dihesiya; didft ko demên pa in  
nîzîng bûne. Zora wê dê biçîwa. Dida eqilê  
xwe; ma intihar ne çêlir bû.

Dema, Yemame cêriya bedew, yar û day-  
lana Reblî kurê Cabir keti bû afa baniwa xwe,  
Zeynowê ev tişt didan eqilê xwe û bê sebir û  
qerar di dîwanxana xwe de diçû, dihat. Belê di  
wextekî welê de Zeynoyê goti bû Yemameyê  
ko Cabir heta peyayê xwe ê pa-in di Keleha-  
Şahîna de pê bide erdê. Yemamê lê vegerand  
û goti bû:

— Ezgorî tu xatircem be, heta ko destê seg-  
manekî kor tê de xwe tev dide romanî nakevin  
Keleha-Şahîna.

Yemamê terka xanima xwe da û qesta  
Keleha-Şahîna kir. Reblî kurê Cabir di kelehê  
de tidarîka xwe dikir. Sed mîrên mîrxas xwe  
ji mirin û hatinkuştinê re kar kiri bûn. Kurê  
Cabir ji jorê bircê de, gava çav bi daylana xwe  
kir; deng lê kir û got ê.

— Te xêr e Yemame. Di vê demê de di van  
deran de tu li çi digerî. Ma tu nizanî ko vê  
êvarê an sibe romanî li birca me wer bîn û  
emê tê de, di bin mîhaserê de bimînin. Û na-  
keve serê min ko keleha me ji deh rojan  
bêtir li ber êrîşa dijmin bikare bisekine.

Yemamê lê vegerand û got ê: Kurê Cabir,  
mîrxasê mîrxasan; deriyên kelehê ji canê min,

## PENDNAME

Hingî geriyam ez li dinê min qe nedî  
Kes misli me bê yar û bira, dost û xwedî  
Rêzek me nivîstî me nema eyb û fedî  
Rabû ji xewê der seherê da semedî  
Ya reb tu ji bo mîletê kurdî mededî.

Ey kurdê li dor şax û çîyan deşt û newalan  
Çawan dikujî yar û biran dost û hevalan  
Her wextî dikêşim keser û derd û mitalan  
Dijmin ji xwe ra ger bibine keys û fesalan  
Dê Jehreke qatîl wekî selwa bi wê dt.

Xweşxwanê di min çûne semawati felek  
Hişyar dikirin cin û şoyatîna û melek  
Rabin ji xewa cehlê vekin çavên di belek  
Men aşê cehûlen sibulen narî selek  
Ev cehl û nîfaqa me hemî bê xeredî.

Rabin ji xewa cehlê bikin cehd û şer e.  
Lewra me bi guh seh kiriye ev xebere  
Bêrf ko emir kir bî îbadet ji me re  
Go evdê mino rabe çi bikî ez bi te re  
Hêvî me heye em bigirin vî beledî.

Ger hêvî heye vî beledî em bigirin  
Rabin herçî ko kurdin tevî hûr û gir in  
Malê xwe bibin top û teyaran bikin  
Serbestî bibin, yan li dinê em bimirin  
Min her-êfî firaqîl wetenî wel-hesedî.

Herçî ko me gotî ji we ra guh bidinê  
Alem hemî insan e ji bil me bi tinê  
Bê top û teyare, bi tenê man li dinê  
Ciz'ek ko ji îmanê ye hib-ba wetenê  
Lew pêteke agir ji weten da kebedî.

Şer'a nebewî hikmê hedîsa wî hilat  
Bo şêx û melan ma li dinê fitr û zekat  
Herçî ko Cegerxwîn e nema sebr û tebat  
Zanim ko heye piştî heyatê ra memat  
Lewre ko nehim xeyrî Xwedê kes ebedî.

### CEGERXWÎN

dergehên dilê xwe ji gîyanê min re veke. Ez  
hatime nik te; ezê nik te, ezê nik we bimînin.  
Ev keleb ne mîna te gotiye bi derbasbûna  
rojan; lê bi tenê bi xelashbûna dilopên xwîna  
me dikare bikeve destên dijminan. Kurê Cabir,  
rihniya çavên Yemamê; ji min re sondê bixwe  
ko tu kesê zindî terka kelehê nadit. Belê ji  
min re sondê bixwe ko kelehên Tidmirê tev de  
bikevin jî keleha me heta segmanê paşin dê li  
ber xwe bidit.

Kurê Cabir: Bi serê te ê delal hezar sondî  
dixwim ez....

Deriyên kelehê vekirin. Yemama bedew,  
cêriya Zeynoyê, dayîana Cabir kete hundir.

Romaniyan Tidmir mihasure kir. Segman û siwarên wan ên zirehpûş berda birc û keleşan. Keleş li pey hev diketin destên wan; ji Keleşa Şahîn pêve. Keleşa-Şahîn, keleşa cabir û Yemamê, bi sed mêrên xwe ên sondxwarî li ber wan disekinî. Belê Keleşa-Şahîn li ber êrîşa romaniyan, wek dara ko li ber hayê kur disekine, disekinî. Lê keleş ji wek wê darê hin bi hin li xwe dişkênand û serê xwe xwar dikir.

Wê rojê, segmanên keleşê, bi rojê ve bi tevdaneke neadeti xwe tev didan. Ma çi li wan qewimî bû. Yemamê ev tişt ji xwe dipirist. Yemame gelek li hêviyê ne ma. Kurê caebir nizingî lê kir û got ê:

— Yemamê nîzamin tu bîr dibî, keleşa me gihastiye çi hal? Zadê me ne maye. Segmanên me li şûna tîran rotikan dixin ber kevanên xwe. Ji milê din ez dibînim ko eskerên min dikin li min rabin.

Yemame: Belê Rebt ez bîr dibim. Gava min soza xwe da bû melika xwe, min hesabê wî tiştî, hesabê her tiştî kiri bû. Digel vê hindê min gote melika xwe ko heke rojekê romant ketine Keleşa-Şahîn, tê de tu peyayê zindî nabînin.

Rebt: Min ji soza xwe daye te. Û beke rojekê dijmin keleş vegirt ezê intihar bikim. Lê...

Rebt li hîre dengê xwe birl û gotina xwe ne bir serî. Yemamê destê wî girt û hêdika jê pirist: Û lê...

Rebt: Romaniyan qasidê xwe ji min re şandiye. Şertine bişeref berpeyl me dikin. Eskerên min ji keleşê berê xwe bidin sehayê û berkes bi aliyê xwe de wê here.

Yemamê: Û tu...

Rebt: Ez ji... Belê min ji hêstr nagirin.

Yemame bihinekê sekinî û paşê gote Cabir: Heta sibê em bidin eqilê xwe. Bi spêdê ve em ji dikarin qasidê xwe ji fermandarê romanî re bişînin.

Rebt û Yemame ji hev bi dûr ketin. Rebt wek mirovekl şermisar serê xwe kiri bû her xwe û hêdî hêdî dimeşiya.

Sibetirê gava roj hildihat, tîrêjen wê di keleşê de ji Yemamê pêve, ne didan tu peyayê zindî.

Yemamê bi şev jehir xisti bû ava keleşê. Rebt û eskerên wî, hemiyan jê vexwari bû. Yemame li ser soza xwe sekinî bû. Romaniyan biketena keleşê jî, tê de tu peyayê zindî wê peyda ne kirana.

Yemame xencer bi dest, di ber cendekan re borî, li wan hûr bû, ew wek biştskekl seh kirin. Rih di tiwan de ne ma bû. Piştî ko qalliya xwe pê ant; li ber cendekê yarê xwe sekinî, xencer di sînga xwe rakir û ket ser keleşê Rebt kurê Cabir. Xwîna Yemamê a sor û germ li wan aliya, qey wê xwîne ew digihandin hev.

Delî roj keti bûn navê. Fermandarê romanî hêj li hêviya bersiva Rebt bû. Qasidê wî xuya ne dikir. Roja deban romaniyan didit ko di ser keleşê re kurt û qertel û dubrakin dişîrin. Ma çi li ehlê keleşê qewimî bû.

Romaniyan nizingî li keleşê kir. Bibin bi keleşê keti bû. Romaniyan ne keleşek lê gornistanek zemt kiri bû.

Tarix jî, ji milada Îsa pêxember re hêj 272 sal diviya bûn.

Dibok: 25 Çiriya-Paşîn 1942

BIŞARÊ SEGMAN

## ŞAHÊ ECEM

### HER DU JIN Û CÊRIYA WÎ

Rojekê şahê ecem li ser textê xwe ê gewherkirî aldayî, bi hilketineke şairane bi nezim û wezin ober dida û şîhir digotin.

Şah du jin û cêrike delal habû. Jina wî a ezîn ya ko navê wê ( Cihan ) bû li milê wî ê astê û jina wî a piçûk bi navê ( Heyat ) ê li milê lî ê çepê rûniştî bûn. Herçî cêrî navê wê ( Beqa ) û ew li pêşberê wan ji piyan disekinî.

Şah her du milên xwe li navtangên jinên xwe eranadin û bi pêtên çavên xwe cêrî himbêz kir û got:

Ez di nav du dil û du dilberan de rû-igtî û tê de li xwe beyirî me. Nizanim kijanê i ser a din re bigirim û dilê xwe pê girêbidim.

Jina mezîna Cihanê serê xwe niha ser sermilê h û got:

Tu padîşahê cihanê yî, cihan te daxwaz

dike. Kar û îşên padîşahê cihanê bi tenê bi cihanê dikarin herin serî.

Jina piçûk Heyatê jî da eqilê xwe û got:

Belê cihan xweş û rind e, lê ji xweşiya cihanê re heyat divêtin. Heke heyat nîne cihan bêl wê bi kêrî çi têt.

Şah gotinên her du jinên xwe jî ecibandi bûn. Dikir ko wan bi awakî mikafat bike. Lê di vê navê de Beqa ko ji piyan sekinî bû destûra xwe xwest ko ew jî hiştêkile. Şah destûra wê da û Beqayê got:

Cihan û heyat her du ji xweş in, lê her du ji fant ne; tro hene sibe nînin. Tu ji xwe re -beqayê . bixwaze ko abadîni bi tenê di beqayê de ye.

Şah kêfa xwe ji gotina Beqayê re gelek ant; ew rakîşandê xewgaha xwe; devê wê ji mirariyan, paşila wê ji mîhbet û ewînê tîjî kir.

PARISIXWÎN



## MIRDĒSAN Û GAWESTIYĒN WAN

Berl çend rojan Xwediyê Hawarê li ser bêjeya gawestî hin tişt ji min pirsî bû. Ji ber ko gawestiyên eşira me Mirdês ji hebûne û nemaze ez bi xwe ji gawestiyên wê eşîrê me; pir û hindik dikarim di wî warî da bipeyivim. Ji bo ko bikaribim fikireke baş bidime xwendevanên xwe, divê ez çêçêkê li ser emareta ko eşira Mirdês jê daketiye baxivim.

Mirdês, berê di kurdîstana bakur da navê emareteke mezin bû ko mirê wê li bajarê Egilê rûdinîşt. Îro ew nav li ser sê eşîran bi tenê maye ko ew eşîr koçerên Mirdêsan bûne. Piştî ko emareta Mirdês di hev da ket û bû sê kerîyan, êdî xurtiya xwe wenda kir û roj bi roj herve qelsiyê bi gavên mezin diçû. Herwekî min ji şerefnamê, dîroka malbatê û çîrokên di nav eşîrê da zaniye; destpêka di hevda ketina wê emaretê bi hûyina sê ciyan dest pê kirte.

Dema malbata mirê Mirdês pir û mezin dibû, pismîrên ko çav didan mezinatiyê jî zêde dibûn. Dilbîhewesên mezinatiyê di nava Egilê û bin guhên mîr da nikaribûn herçiya di dilên xwe da binin cih. Ji bo antîciha van daxwazan, di her hilma mîr da derketin divya bû. Wan jî wêlê dikir. Yek bi yek di Egilê da bi der diketin û berên xwe didan gund û bajarên keviyên emaretê. Bi wî awayî jî xwe ra heval û piştîmêr diditin û destê xwe didane ser lêleke emaretê û nema mirê Egilê dinasin. Gêlkê van pismîran nikarî bûn daxwaza xwe bibin serî û di wê rê da serên xwe didan der. Hinekên wan jî mîna mîrêkên Çermûk û Paloy jê ra li hev dihat û di rex emareta Mirdês da yek emaretên biçûk tanin pê.

Di van ketin û rabûnên han da koçerên Mirdêsan digel mirê Egilê rast mabûn û jê neqetiya bûn. Lê mixabin ko wê rastiyê gelekî neajot. Di nivê habîlîska hejdehan da, pismîrên di nav koçerên da jî ji mirê Egilê kiz bûn. Wê carê wekî hîrsal zivistana xwe li deşta Gewran û biniya Diyarbekirê ne borandin; lê bi çarekê jî welatê Mirdês bi dîrketin û daketin beriya Reqayê.

Ji wê bi dîrketinê Xweya bû ko dilê koçerên Mirdês û vegera welatê Egilê tine bû. Hin zivistana xwe li beriya Reqayê kuta nekiri bûn ko pismîrên di nav koçerên da jî li hev keti bûn. Ji v n pismîran Ewdil-Hey begê tevi

## GELO DEM JI ZÊR E?

Ev meselokek welêye ko ên wê nizanin gelekî hindikin. Tevî wê eykê dem di pir kesan va radi-bire bê ko bala xwe bidinê. Ev meselok li ser zarê her kesî digere û tê bîra hemîyan; lê tevî wê yekê gava mirov hala xwe dide kar û xebata wan, xweya dike ko qîma xwe pê nînin aqî tê nagehên. Heke em bihesibîn in, dê bibînin ko sêyikeke emrê mirov vala diçe. Ji ber ko herkes sêyikek emrê xwe dinive, sêyikekê jî dixebite sêyika mayî vala diçe.

Li ser meseloka jorîn û wî hesabê han, hinekan jî zanan gotiye: « kesê ko sêyikeke emrê xwe bê destkewtin vala berde, ew jî nezane bihayê demê ye. Ev celeb mirov nizanin, ka dem jî zêr e an jî axê ye ».

Ev gotina han gelekî bi cih e. Lê gelo ew kesên ko sêyikeke emrê xwe dinivin û her du sêyikên mayî bê kar û xebat, her tor tor digerin, demê jî çî dizan in?.. Derbeqê van celeb mirovan da, mirov çî bêje hindik e. Bi tenê dikarim bêjim ko: zîvar ne ew kese ko bê mal û dirav e; zîvar ew e ko dema xwe vala dibore û di bihayê wê nagehê. Heke jî wan ra reben û bextereş jî bête gotin heja ye.

OSMAN SEBRÎ

hezar mali berê xwe da welatê Qonyê deşta Heymanê. Ew hezar mal îro li wî erdî bineclî bûne, ko bi wan ra Mirdêsê Ewdil-Hey dibêjin. Ên mayî jî divegera zozanan da bûbûn du biran Birek tevî Hacı Delt begê (1) çûbû Qerejdaşê û li vir derbasî piştî Diyarbekirê bûbû û li wir cih girti bû; ko bi wan ra jî Mirdêsê Têrikan (2) dibêjin. Birê mayî tevî Mihemed efendi di piştî beriya Reqayê da li qiracê Qeregêçyan mabû ko, bi wan ra jî Mirdêsanê gawestiyên hatiye gotin.

Mirdêsanê gawestî wek her du birên mayî di warên pêşin da bineclî ne bûne. Pirî nêçûye, qiracê Qeregêçyan berdane û hilkiştine, welatê

(1) Îro jî malbata axayên Mirdêsanê Têrikan li gundê Hacıdeliyê rûdinin ko bi navê mezinê wan e pêşin bi nav bûye.

(2) Gava êla Hacı Deli begê giha bû Qerejdaşê, pûg û şilîne mezin lê qewimi bûn ko zarok, kar û berxên xwe di nava tîran da avêtibûn ser dewêr û biribûn zozanan. Li ser wê bi wan ra jî Têrikan hatiye gotin.

Dûmahîk di rûpelê 11 han da ye )

## BEYTA KEWÉ

HER BER LI CIHÉ XWE YÉ BI SENG E.

Béjin careké kewek li jor Wan,  
Derkefti bú bo sehran ú geryan;  
Hate gund li ber gundí dipirál  
Da bizanít çí ye ka halé kewan.  
Ta ko gehíste li binya Géman,  
Nik hinde kewa yé býe mévan.  
Nav wan de wl dítt ribadékt çak.  
Bi bejn ú bala ştrín e ezman.  
Mévani gelek xwezt díxwestin,  
Ribad bibltin xizim dígel wan.  
Got: Wan çí ye halé we li vére?  
Hún çawan díjtn li vére çawan,  
Yékarl eve gúndekt híşk e.  
Ték da xirebest ú kevr ú zldan.  
Eve saetek e ez li ník we  
Ser min teng býe erd ú ezman.  
Ser min ev saet býe hezar sal  
Ax bo te Wané hizar car ax Wan.  
Got: kewé ribad me heyf e tro  
Tu li nav evan xíz ú tozan  
Zor ez bi xem im ji ber te bira.  
Tu li vére bíbl li navl gúniyan  
Wey ez nemlnim bo vl leşe-ter  
Geviaké biket li ser stírdan  
Mixabin ji bo te lawé taz e.  
Mixabin ji bo te katé reyhan  
Tu bimírl li vl erdt bi jeng l  
Bé seng ú biha bíbl li ník wan  
Niho zor nexweşiyé díblnt  
Li vé kora ko bé dexl ú bé dan  
Tu beste were biçne Wané  
Min xwíşkek heye bi hisn ú zor can.  
Dé dem te bíbé next ú herwe  
Ew d'íntl giraniya xwe zéran  
Xwíşka nin Zileyxa ye li wextl  
Ninin wekt wé di navl Gurcan  
Belkt wekt wé li beheşte nlnin  
Nav heml perl nav heml húrían  
Zor şox e we zor şeng ú şepal e  
Bejneq heye wek esmína cowan  
Démek wé heye ji rojé rontir,  
Du çavét belek bi kil ú derman  
Ev zífét xelek keftine ser ró  
Didan sipltir in ji terg ú gíşkan  
Ev birhá gelek restír in j'qetran  
Ev gerdena wek xezal ú xifşan  
Ev lévét wekt gúştírka Sileyman  
Ev kezí wekt téley ú armúş  
Ev xalé bi qelem hatine kéşan  
Ev zend ú milén hev wekt şíşey  
Mala gelekan ya kirye wéran

## HEYAT

Eva pîrek heşte salt; qelúz býe písta wé  
Meh ú sala şikandiye díl ú çeng ú baskén wé  
Zeman derxist ji dilan eşq, ji çavén wé şewq  
[ ú núr;  
Emré wéna xilas býe, xiyala wé pírl li dúr  
Rengé wéna, zer býe wek pelén darén Palzé  
Ken nizané, dalm ebús, dalm nexweş falzé  
Çehré wéna perfşan e, madé wéna kíríye  
Tírşa qebré d'xiyalé de, karé wéna gírl ye  
Lé dísa ew díbé kanf ava jfné li kú ye  
Ew betífl, ew kesírl, ew zila ko híşk býe  
Ew díxwazé bi vl canf li dínyayé her bíjfl  
Díbé xwezka, min bídtá dínya roník hín dt jfl  
Ey yé ko héj d'çax ú dema xortaniya xwe de ye  
Eqíl dí ser, qewet li míl, pelén eşqé díl de ye  
Ev píreka heşte-salt ko díxwazé héj bíjfl  
Nízam çima ji heyaté tu qehírl, tengíjfl.

HISEN EMINE PERIXANE

Ey lawé ko qenc ú genc ú taze  
Padişahé heman ú rewşa malan  
Tu heste biçn behešta dínya  
Tu were bíbln evan rábaran  
Tú biméze evan herane kaniyan  
Evl avét weki cemed ú befran  
Van co ú deravét weki zívl  
Yén ten díxişin dí navé mérşan  
Evl nevelt ú géze giya  
Wan luxmét giya li binya keviyan  
Wan nérgiz ú sínbil ú hílalan  
Sorgul ú esmín ú binefşan  
Nesrín ú gule níxin ú gulzer  
Sosina şere li gel búklnan  
Tu sipédé ta díblte évar  
Here bígerhe bi xwe li şéran  
Min hene hezar bira ú píşmam  
Ev pékve wekt píling ú şéran  
Pékve díbin xulam ji bo te  
Heml díbine ji bo te qurhan  
Díbéjin gote wl Ribadé Géman  
Got: weye çiya díkey díferman  
Belé ev bereşşkét cihé min  
Xweştír in gelek ji gíyayé zozan  
Bin gúngil ú tevriyét Gémané  
Ez nadem bi heml Şam ú Wanan.  
Pírejineka ji welaté min bífl  
Çétír e ji hemú kíjét li Gurcan  
Her ber li cibé xwe yé bi seng e  
Ev metel ji méj hatí vegéran  
Lewra ez tíraşeké ji Géman  
Nadem ne bi Wán ú Başkalan.  
Amédiyé: 5-7-1942 MELA ENWER

## PIRA GENDERÊ Û HEMÛŞÊ KULIK

Di nîvroyê Meletîye û qeza Gextê da bi navê Hilofê çiyak heye. Çemên Gextê û Genderê di rohelatê wî da dikevin ser hev. Berf tēkilbûna herdu çeman, di wexta Romaniyan da, li ser çemê Genderê, bi navê çem, pirek hatiye çêkirin ko tro jî; hemberê wê pirê di welatê kurdan da nîne. Pire di ziquwekî welê teng da hatiye çêkirin ko navbera du çiyay gihahdiye hev. Bi xêra vê pirê mirov bê dijwarî ji çiyayê Hilofê derbazî hêrikên Alikan dibe. Ne ji ber boşiya çem, bi tenê ji ber bilindiya cih, pire gelekî bilind batiye çêkirin. Bê zêdeyî mirov dikare bêje ko sed mêtir bilindiya pira Genderê heye.

Di serhêl û binhêlên vê pirê ra eşra Reşîyan cih girtiye. Vê eşrê diwazde bav, û her bavekî malmezînek heye. Ji van bavên Teşîkan û Alikan di dorhêlên pirê û kûntarên çiyê da dimînin. Herçî Ziravîk di nîvroyê van herdu bavên da li destê bi cih bûye, ko Hemûşê Kulîk mezinê wî bavi bû.

Berf he-tê-nod salt, di navbera Ziravîkan û Alikan da şerîne dijwar çebû bûn. Ji ber ko di van şeran da ji her du aliyên mērine pir hati bûne kuştin, ji bo rakirina tolê pir çaran rê li mērxasên hev dibirin. Di nav van rê birînan da, sê-çar çaran Alikan rê li-Hemûşê Kulîk aşayê Ziravîkan birî bû. Lê Hemûşê kulîk, mēre qenc, siwarê rimbaz û şûrhîngêv. her carê di van rêbirînan da du-sê mēr ji Alikan dikuyt û bi selameti ji nav neyaran bi derdiket.

Van serdestiyên Hemûşê kulîk çawan ko ji alîkî tîrsa wî diêxist dilê Alikan ji hêla din agirê hildana tolê jî di dilê wan da zêde dikir. Lê nema Alikan diwêrîn li erdê rast, cihê ko lingê hespan li çargavê bişixule, xwe berdîn pêşîya Hemûşê kulîk.

Rojekê Alikan bihîsti bûn ko Hemûşê kulîk hatiye nava Teşîkan û di vegerê da reya wî bi pira Genderê dikeve. Hînga rîsipiyên wan goti bûn ko: « Vêcar emê kari bin tola xwe bistînin. Hemûşê mikare li ser pirê bi siwarî êrîşê bîne peyayên me ». Çima ko ser pirê ne f raste, û di her hêlekê va heya nîvî pêpiling in; di kîjan hêlê va be heya nîvî hevraz û ji nîvî bi şûn da sernişûv e. Ji ber vê dewar gelekî bi dijwarî li ser dime-in. Alikan dixwest neyarê xwe ê mērxas Hemûşê kulîk di derbendeke holê da zemt bikin.

Li ser vê ramana ban, Alikan bi şev çil

## MARŞA KEYANÎ

Her bijîn al û key xwendegah û sera  
Her bijîn xurt û kurd ên ji dil ên bira

Hil de zû dest û mil  
Pate lēxin ji dil  
Vaye key tē sera  
Lser sera, lser sera.

Bê welat, bê felat em çî ne kurdino  
Bê civat bê xebat em çî ne kurdino

Lê xelc, bê Ferat  
Bê izîr, bê xelat  
Bê sera bê kelat  
Em çî ne kurdinol

Tfp û kom ko nebin em çî ne bê ewa  
Teng û top ko nebin em çî ne bê ewa

Top û kom kewt û gē;  
Teng û top bidine pê;  
Vaye dijmin revî  
Herne wa, herne wa.

Pehlewan ko nebin kengê pêk tēn hemî  
Xwendevan ko nebin kengê pêk tēn hemî

Xortino berne ceng  
Rengê Ristem bi deng  
Da bijîn xurt û rind  
Serbilind em hemî.

Amûdê: 16-11-942

CEGERXWÎN

peyayên jêhatî şandi bûn ser pirê û ber ve sibê her hêleke pirê bîst peyan xwe di nav lat û zinaran da veşarti bû.

Hemûşê kulîk yê ko tîrsa neyar di dil da dh ne dî bû, di vegerê da peyayên xwe bi katekî lez û giran şandi bûn nav Ziravîkê rohelatê çemê Gextê û bi tenê vegerî bû mal.

Demê gha bû nîvê pirê ber çil peyayên Alikan di vir û wê va herdu dergehên pirê jê standi bûn û berê tîfingan dirêjê kiri bûnû goti bûn ê:

— Hemû ol vê carê tuyê çî bikî û bi kû da herf??...

Hemûşê kulîk bê raman û tertîlî berê hêsp cda bû çem:

— Vê carê jî vir da. Tegez ji destketina; neyar çetîre.

Goti bû û du zengûyên xurt avêti bûn navtenga hêsp, û hêsp jî xwe avêti bû çem.

Hemûş ewçend siwarekî ecêb bû ko, xwe şaş ne kiri bû. Berf ko bigehê avê bi deh gazan xwe ji ser hêsp hol kiri bû, ko herwekî ji bilindiya deh gazan bikeve nav avê. Hesp mir: lê Hemûş bi vê xurtiya dilê xwe ji destê neyarên xwe bi selameti filift.

Herê, ji bo ko nekevin destên neyaran kurdan xwe di cihên holê jî davêtin.

OSMAN SEBRÎ

## ROJÊN DERBASBÛYI

Piştf jiyineke sê salan jiyineke tal û şêrtin ez ji Amûdê bi dîr diketim... Çend hevalên min ên fedakar û çend sûxeyên min ên wefakar dora timobîla me girti bûn.. Yek, du heval xuya ne bûn; Xwedê zane ne ji bê bextî, dihe ko ji diltengiya jihevqetandinê çavên wan bar ne bû bû û ne hati bûn...

Bi kel û girtî min û hevalan destên xwe di hustiweş hev re bir û anîn. Me hevdû dişart Xwedê.. Bi germiyeke wisan me destên hev diguwaşt ko dilên me ji hev re digotin: Emê her û her heval û bira bimeşin...

Gava timobîl bi rê ket, bê hemd çend hêşir i çavên min herikîn.. Ji alîkî, ji hevalan bi dîr diketim, ji aliyê din birfina hêta min ez di-êşandim; giyanê min dihejiya; min ne zanf hû şa vê birnê ewê çiqas dom bike û ewê çi li êniya min binivîsel!

Gelek rojên xweş û pir rojên reş min li Amûdê derbas kirin.. Paşiya paşin ez hûm zelûlê serencameke kirê.

Gava diçûm dibistanê û vedigeriyam, delîkek teva du cewrên xwe li ser rîya min xuya dibûn û bi min da direyan. Cewrêkî gurtî bû, çavêk wî kwîr bû, rîşekê nevyê rûyê wî şewitandi bû.. Cewrîkê din kurnî bû, mîna bi ne xweşiya firengiyê le i be, gava direya kewitîn û kaz kaza wî, nola kwîsiyê lablabîk di berde ma be, bi der diket..

Belê van cewrikan timî dixwestin rîya min bibirin.. min jî guh ne dida wan.. ne di hate bîra min ko rojekê hestiyekî bavêjim ber wan û xwe ji wan biparêzim. Rojekê ji nişkave cewrîkekî — Xwedê zane ê kwîr bû — ji jpaş ve bi hêta min girtî û ez birnî kirim...

Tixtoran ji min re hewa guhastin û cih guherandin berpêş û « Eyndfwer » nîşan kirin..

Timobîla me hêdî hêdî ji Amûdê bi der ket û paşê lezand; hevalan, hetanf em ji hev wenda bûn destên xwe ji min re kil dikirin.. Timobîl, her ko diçû, xwe diguwaşt.. li aliyê çepê çiyayên Kurdistanê li alî rastê çola Cezîrê û şorezara Erebiştanê diherikîn.. xunaveke bê deng hêrik hêrik dibariya. Şîfêr digot: Xwedê bike baran boş nebare û em xwe bigihînin Qamişloke..

Xwedê em ji herf û çiravê parastin, baran ne bariya.. Lê hetanf em gihîştin Qamişloke xwenavê rûyên me dialast..

Bi lez û bez min xwe gihand cem tixtor..

Birfina min pansiman kir û hinek derman da min. Roja din em gihîştin Dêrikê, li ba hevalekî bûm mewan, lê bi şev xewnîne bi çîrs ez vediciniqandim. Birfina min diêşiya.

Sibehê ez li timobîlekê geriyam, bi dest ne ket, vêcar li ser hespan me berê xwe da « Eyndfwerê ». Piştî du saetan em gihîştin wir.. Ji xortên wir Fetahê mele Sadiq û Mihemedê mele Ehmed derketin pêşya min û bi rûkenf û bi dilgermî destê min guvaştin..

Di yekê Adarê de gihîştin « Eyndfwerê ». Herkesî ji min re digot: bextê te baş e, tu di serê Bihare de hatî vir, ji tro pêve Bihar e, Bihara Eyndfwerê mîna Bihara zozanên kurdistanê ye..

Ev fala ko herkesî ji min re vedikir wisan dernekt.. hi hêjmar, mehek û sê rojan, bi şev û bi roj baran bariya. Bi hezar dijwartî min xwe digihand dibistanê.. Snxteyên dibistanê, mîna yê Amûdê, pirê wan kurd bûn. Ji lewra me zû hevdû nas kir û me zû ji hev hez kir..

Qederê mehekê min nikarî bû dora xwe bidî'a, bişev baran.. bi roj baran... êdf canê me bawî bû hû, hundirê me zingar girti bû.. Birfina min jî hêj dixebitî.. min bawer ne dikir ko ewê kînga rehet bibe..

Piştf mehekê bi şunda, nîva, roj bi derket, giya şîn bû, gul û çiçekên rengereng xuya kirin.. min fam kir ko Bihara « Eyndfwerê » Bihareke welatî ye. Li hember: Çiyayê Cûdfwargehê Nûh pêxember di bin de çemê « Diclê » diherike.. li berê çem « Cizîra Botan » welatê Mem û Zînê xuya dike. Ev her sê bergehên dîroktî di jfîyina min de wergerandîneke mezin çêkirin û giyanê min bi axa wê derê ve girêdan.. Di rojên baranê de, dost û hevalan ji min re digotin: Malava bihna xwe teng meke tro sibe, haran ê bisekine, êdin Bihar e, emê herin « Pira bafet » seyranê, tiwê bibinî çî ciheklî xweş e çi ciheklî xweş.. Min û hevalan çend seyran çêkirin. Vêcar dora « Pira bafet » bixwe hati bû. Rojekê, me xwarina xwe bi xwe re bir û em çûn « Pira bafet » pira dîroktî (dibêjin di zemanê Mîr Mihemedê yekdest de ava bûye) Bi rast jî ciheklî pîr xweş bû. Diclê, di bin lingên me re diherikî.. Birca belek rind xuya dibû.. li ser Cûdf berfa sîplî diçiristî..

Hetanf êvarê em li wir man.. Hevalê yekta û rûşêrî Mibemedê Melê mîna hergav weke şalûlekî dikirî şeqeşeq Ji dîwana Cizerî perçên dîlşewat dibijart û destê xwe bi aheng kil dikir û digot:

## ROVIYÉ KER

Şerekt pîr nêçîrvan Girtin derbend û gavan  
 Nedîşetin timawir Ne mirov û cinawir  
 Tirsand çavê hemiyân Kes nedîhişt wan ciyan  
 Şerê me é sregevaz Dît rovîkl belengaz  
 Rabû bange rovl kir Digot: kuro were vir!..  
 Roviye bi tirs û xem Dişewişt dihat cem  
 Bi sed fên û duşed los Jê ra dikir panciros  
 Şer dil bi wl şewitl Ew ji çiçkl tewitl  
 Got: ezulam bûme jar Nema bi min dibit kar  
 Şer gote wl: zor çak e Li nik min be xem nake  
 Her roj heye min nêçîr Dîxwin "a feqîr  
 Bila tu ji ji wan bi Li nik min dergevan bi.  
 W rojê şer rê birl Reya karwên 'dînîrl  
 Çavên rovl li rê man Hew dît ko tê bazirgan  
 Şer dengêkl gurmijl Erd û ezman tev hejl  
 Got roviye jar û qels: Li min binêr ho teres;  
 Tu çavên min çer dibîn? Rowl got: wêk ar û xwîn.  
 Lê pârta min çawa ye? Wekl sîxên pola ye.  
 Hinga piştî van zirtan Şer xwe berda pêşkarwan

« Me di dil de heye narek ko disijit seqerê »  
 « Erzihala ko nivîst me bi xûna cegerê.. »  
 Bîrîna min hêdl hêdl rehet dibû.

Edin wexta girtina Dîbistanan hat.. ji alîkl  
 kêvxwes, ji aliyê din dilnêxwes bûm. Ezê  
 vegeyiyama Şamê, minê hevalên xwe ên li wir  
 û ên li ser rê bidftana.. Lê destê min ji Eyndf-  
 werê û hevalên Eyndfwerê ne dibû.. Şairekl  
 çiqas rast gotiye: « Gava meriv li cihekl  
 dimîne, bi insan û axa wê derê ve bi benên  
 nexuyayî tê girêdan, klnga meriv ji wir diçe, ev  
 benên ha dilê meriv ber bi xwe ve dikîştin  
 û diêşnin... »

Gava ji « Eyndfwerê » derketim minna roja  
 « Amûdê » qirika min tije gîrl bû bû..

Roj, meh, sal.. çiqas zû derbas dibin. Ev  
 bûn du sal — nê kêm, ne zêde — ji wan ci-  
 han, ji wan hevalan bi dîr ketime.. li cihine  
 wisan dimînim ko ne « here » ne « were »  
 dibîm: guhê min ji vê ahenga pîrestêş bê  
 par maye.. li dora xwe dinêrim ji berdêla Cûdl  
 û Diclê leylandine xapnok dibînim.

Hevalekl dewsa Mehemedê melê, ew dewsa  
 vala, tijt bike nîne — Xwedê giyanê wl bîhuş-  
 tîn bike — sûtê min jî ne Biro û Remo nin  
 ji diyariya wan deran bi tenê tiştekl bi min re  
 maye; di hêta min da hêj jehra diranê wl  
 cewrikl dilive. Ew cewrikê bê xwedî, ew cew-  
 rikê serberdayl..

Cideyde: 10-11-942

QEDRÎ-CAN

Siyar, peya tertilln Hesp û qatir bertilln  
 Ji şer ne çû kês û taw Kustin du hespên qelaw  
 Dewêr reya xwe girt çû Syar û Peyan dida dû  
 Hinga rovl hate wir Zikê xwe jê têr dikir  
 Şaş bû ji vê tevdlrê Mat ma li vê nêçîrê  
 Serekl ma li nik şer Her roj dixwar du dan têr  
 Çav bûn fena çavê gur Di para bû wek sîxur  
 Jê nepixln teng û daw Digot: holê dibit raw  
 Berê vê min nezani Çawan dibit mêranl  
 Ne hewce me rûyê şer Ne xwe didim hêla jêr  
 Şerme kesên bi rûmet Bixwin nanan bi minet  
 Ji kêfa van xeyalan Berê xwe da newalan  
 Dakete nav geliya Wê rojê her geriya  
 Çaterêyek dibîrl Dîbû rovkl gurt  
 Yezeliye li ber kaş Gotê: kuro sibe xweş.  
 Roviye bi fên û fût Gurt bû bû qels û rût  
 Serl hilda çî binêr Roviyekl zexm û têr  
 Hatiye pêş, wê gavê Jê ra dike silavê  
 Rabû jê ra silav kir Digot: siba te xweştir  
 Yê zexim kirê nedikir Ko destê yê jar bigir  
 Diniçandê bi çavan Giran giran da gavan  
 Roviye jar bîr dibir Dema şaret lê dikir  
 Berê xwe vegeandê Di para xwe gîhandê  
 Gotê: ev e ez hatim Çendak e bê zebatim  
 Ez nêçîrê nikarim Lê ji te hêvîkar im  
 Tu hevalekl rind l Yek pariyan bi min dl.  
 Roviye zexm nepixl Du sê dangan dikuxt  
 Pîr oflaz şor dikirin Gotinên şer bir birin  
 Digote wl: « zor çak e Li nik min be xem nake  
 Her roj heye min nêçîr Dîxwin zîvar û feqîr  
 Bila tu jî ji wan bi Li nik min dergevan bi.  
 Roviye jar ecêb ma Ji gotinên kerê hall..  
 Lê çî bike zîvarl Her bûye stoxtwarl  
 Digot, hemln diêşim Dê derdê vî bikêşim  
 Wê rojê ew gerln tev Heya li wan dibû şev  
 Yê jar digot: de rabe Bê dizl me şol nabe  
 Yê xurt pozê xwe rakir Digot te mal ava kir  
 Ma tu zani ez kl me? Ne wekl te rovl mel..  
 Min tirsandîngelek mêr Bûme piştîmêr ji bo şer  
 Gelek nema bo sibê Dê xwe berdîm nivê rê  
 Karwdnekl bela kim Mala te pê ava kim.  
 Yê jar digot: hevalol Holê mebej delalo..  
 Em nabin piştîmêrê şer Natîrsin ji me tu mêr  
 Ji xwe meke şivîşkan Em in dizên mirîşkan.  
 Roviye xurt enîrl Hilkişîşt mîrmîrl  
 Gotê: kuro he sebv Ma te nînin eql û çav  
 Çawan holê dibêjt Çawan ji xwe dirêjt  
 Min navê tu carek din Bişkênt rûmeta min!..  
 Li palekê veketin Heya sibê raketin  
 Sibê her du bi rê bûn Ber ve reya karwên çûn  
 Gîhane serhêla rê Dîtin ev e mîrek tê  
 Kalekl dest bi dar e Li kerê xwe siwar e  
 Roviye xurt kire qîr Qulê dikir cîreçîr  
 Got roviye jar û qels: Li min binêr ho teres!

Min çav û pûrtçawan in? Got: ne wektî ye sanin.  
 Roviye xurt pingirî Xînzî xînzî dinirî  
 Çavên zerik xez dikir. Piştî ye qels gez dikir  
 Digot: kuro kerê nêr Bo min bibêj pesna şêr.  
 Ye qels digot: bila be; Lê b'daxwaza min nabe  
 Di wir da roviyê xurt Berê xwe li mêrik girt  
 Êriş dikir kol dibûn Dûman li ser hol dibûn  
 Çû pêş mêrik rawestî Ew jî li ber dawestî  
 Dema ket ber hikmê dêr Mêrik rabû mîna şêr  
 Darê xwe girt hilanî Di navçava wî danî  
 Rovî bi semt lerizî Serê dûvik dilhezî  
 Çavan jî zo avêt der Ev e halê kesê ker  
 Roviye jar digot: axî Ma min negot, malkambax  
 Ji xwe meke şivlşkan Em in dizê nîrîşkan  
 Em rovi ne, nabin şêr Cûhesin qet dibit zêrlî.  
 Lê te ne b'hist, bi kerî Da der kavil û sertî  
 Piştî ko têr gillî kir Revî xwe da nava kir.  
 OSMAN ASBRÎÊ

## XANIMEKE CIWAN

Ey xanimem fermû were hicrê mitala  
 Da şerhê bikim ho te evan şîr û xiyala  
 Destên te bi destam li derê qesrê wîzaret  
 Alem dicivî nêrefe ser taclî miel-la  
 Em leşkerê kl destî bi ser darî tîving e  
 Em resmê selam bo te dikî ber meh û sala  
 Pêçame li ser çerxê dîreksona teyara  
 Destê te î nazik ke birim ewcel bala  
 Ger ser xwe nejlî xanimem pîçe xeyalî  
 Bê ceng û edeb marûzekem hiç û betala  
 Em hucreyekim bo te wektî xwendegêha kurd  
 Şeb ta bi seher derstî didim eynê miel-la  
 Ger şubretî dame ke Cegerxwîn û ciwanî  
 Bûm serwerê kala bi xwe dilgirtiyê nala  
 Amûde 16-11-42 CEGERXWÎN

### ( Dûmahîka rûpelê 6an )

Gextê, kuntarên çiyayê Bêlî ( Çiyayê Nêmrûd ).  
 Vê derketina Mirdêsê gawestî di qiracê Qere-  
 gêçyan da çirokek xweş heye. Maîr ko wê  
 balibe talê dê biniwîsim. Di demên biçûkiya  
 xwe da, min ev çîrok jî devên kal û rîsîpiyên  
 eşrê bihîstî bû; Lê qenc di bîra miu da nema  
 bû. Piştî ko jî welêt bi derketim, rasthatinê  
 careke diin jî nû va çîroka derketina Mirdêsanê  
 gawestî jî qiracê Qeregêçyan bi ser û berên  
 wê va jî min ra da zanî. Ji bo xweşiya wê,  
 dê herpêyî xwendevanên xwe bikim.

Di sala 1930 î da, dîsa jî ber hin tevger  
 min rûyê xwe jî hikûmetê bada û çûme nav  
 eşra erebê. Iniz, miala mirê wan Miçîm kurê  
 Mihêd. Hingê rehme-lê Evdilqadirê kurê Dîrî  
 jî li ber tîrkan bazda bû û hatî bû nik Miçîm.  
 Dirêjiya rojê di bin sila konan da em bê kar  
 û xebat bûn. Rojêkê Evdilqadir gote min:

— Piştî du rojan me dil heye em xezî  
 bibin. Heke te dil heye hevaliya me bikî, em  
 dê bi hev ra herin.

Piştî dan û standineke biçûk gotinên me  
 Çû bûn serhev, min jî xwe jî çûyina wê  
 xeziyê ra kar dikir. Roja sisêya em çil sîwar bi  
 awakî nijdevanî di rex hev ra li şnorê tîrkan  
 raperî û me berê, xwe dabû nîveka welêt.  
 Serêvarê em raste keriyek xezal hatin û me da  
 pey wan. Piştî teqegurteke kurt em li hev civîn,  
 bi tenê du xezal hatî bûn kuştin. Belbî ev cara  
 pêşin bû ko yekî wektî min î çiyayî dikir li  
 erdê beriyê goştê xezalan li ser kozên gewrîgê  
 bibirêje. A rast ez bi qasî zarokekî biçûk bi vê  
 xwarinê dilxweş dibûm. Hîn me berê xwe li  
 rê rast nekirî bû ko min jî Evdilqadir pîrî:

— Pîsmam em dê goştê xezalan kinga û li  
 kû bixwin?

— Piştî saeteke din û li ser xirbê we Mir-  
 dêsan. Çima ko li wir av di sarîncan da têtê  
 dîtin.

Evdilqadir, begekî nexwanda; lê gelekî jî  
 û serwestî bû. Çiqas çîrokên dîrokî bibîstî bûn;  
 hemî bi kar û mak dîzanî. Ji xwe di rê û  
 rêzanên e-Iran da şarezayekî welê di nav eş-  
 ran da kêmkê peyda dibûn. Hîn ko kês  
 hat bû, jî xwe derbas kirin ne karê êqil bû.  
 Min jê pîrî, he ka derheqê vê çîroka ko min  
 biçûkî bihîstî da çî dizane. Camêr çîrok di  
 ser û berên wê ve jî min ra holê got:

« Teqez te niha jî devên kal û rîsîpiyên  
 malbat û eşrê bihistiye. Piştî ko koçerên mir-  
 dêsan berê xwe dane zozanan, gayên we li vir  
 westiyane û di çûna vî qiracî da bi cih bûne.  
 Ên we yê ganewestî ko Têrikan in xwe dane  
 piştî Diyarşekirê. Ji xwe birê we ye ko çûne  
 Heymanê, Mirdêsê Evdil-îley, tu jî mi çêtir  
 dîzanî ».

Tevî ko min çîrok berê jî bibîstî bû, min  
 dixwest carekê jî ji devê Evdilqadir bibihîsim.  
 Min jê pîrî:

— Gelo sebebê çûyîna Mirdêsanê gawestî  
 ko va erda berdane û çûne çiyê jî dîzanî?

— Çawan nîzanîm. Lê te dil heye ko bê-  
 bextiya Qeregêçyan jî devê min bibihîstî; dîsa  
 jî xem nake dê bêjim. Ma ne me zora we  
 biriyê; dixwaze bila bi bebextî be.

Rebmetî bi kenê xweyê nas vegûrizî  
 û got:

« Piştî ko Mirdêsê gawestiyayî bi Têrikan  
 va jî hev qetin, honê gawestî di çûna vî qir-  
 racî da bi cih bû bûn, û we ev xirbê ko bi



Mirdésan bi nav bûye, ava kiri bû. Lê vê yeka han demekî dirêj dom ne kir. Sê-çar sal bi ser da ne çûn ko di navbera Qeregêçyan û Mirdésanê gawestî da şerekî pîrf dijwar çê bû. Ji her du aliyan bi dehan mîrxas û egîd hati-bûn kuştin. Van her du eşran nema dikari bûn di erdekî da rûniştana. Hikûmet û hin eşrên dorê ketibûn navberê. Dawî qerar dabûn ko herçî eşra ko mîrên wê gelek hatine kuştin dê bimîne û ya din wê li wî erdî barke. Li ser vê qerare, Qeregêçyan bi şev cendekên kuştîyan we Mirdésan di gorên wan da bi derxisti bûn û seyên kuştî êxisti bûn şûna wan, û cendekên Mirdésan di nav ên xwe da raveyî hikûmetê kiri bûn. Gava hikûmetê goristanên herdu eşran vekirin, di a Qeregêçyan da 20-30 kuştî, û di a Mirdésan da deh seyên kuştî dîti bûn. Hînga hikûmetê pê da bû piştî Mirdésan û di qirêc da bi derxisti bûn û wan jî bere xwe da bû çîyayê Bêli, cihê ko tro jê ra Mirdésan tête gotin ».

Bi kutabûna çfrokî Evdilqadir ra me xwe ghandî bû ber pagên xirbê Mirdésan. Herçî jî me peya dibûn, doxhefsarê mihîne davêtine zendê û jî bo birajîna goştê xezalan tûpên gewrîgê dicivandin.

Eşrên ko bi navê Mirdês têne xwendin di sê cihan da rûdinin. Cihê yelê, Mirdêsê Evdil-Hey di deşta Heymanê da, ko tevayîya wan deh gundin. Cihê didowan, Mirdêsê Gawestî di nîvroyê Meletiyê û qeza Gextê da, ko tevayîya wan nîzika sed gundî ye. Cihê sisêyan, Mirdêsê Têrikan in, ko tevayîya wan digehê dora dused gund.

Ji van pêva jî li welatê Serhedê ( Qere killse ) bi navên Osman komî; Şe'bo û Bazar-cixê sê gundên Mirdésan hene ko, berî sed salî li welatê Heymanê jî Mirdêsê Evdil-Hey vaçetin e. Îro jî emareta Mirdês a mezin bi tenê ev her sê eşr û her sê gund wî navî diparêzin.

Herçî bêjeya gawestî, herwekî jê dixewine jî koçerên ko bi semet qelsiya ga û barbirên xwe jî êl û eşrê bi şûnda mane ra hatiye gotin. Ji xwe heya îro jî barbir û erebekeşên xelkê Serhedê hîn ga û madegin. Heye ko hin bavên hin eşran jî ber hin sebebên din, jî êl û eşra xwe qetibin an bi şûnda mabin, dîsa jî bi navê gawestî hatibin navandin.

OSMAN SEBRÎ

## LE MARIAGE CHEZ LES KURDES

Comme partout en Orient, le célibat c onsti tue au Kurdistan un état anormal. On se marie très jeune: les garçons, à partir de 15 ou 16 ans; les filles, dès 12 ans. Chacun a autant de femmes que ses moyens le lui permettent. Charaf Khân, qui écrivait au XVII<sup>e</sup> siècle nous dit que la plupart de ses compatriotes prenaient quatre épouses et que les plus riches entretenaient encore un nombre égal de concubines ( Charafnâme p. 33 ). De nos jours, les gens du peuple se contentent généralement de deux femmes; seuls les chefs en ont quatre, comme le permet l'Islam. L'exemple récent du fameux Simko et de ses 14 épouses ne peut être considéré que comme tout à fait exceptionnel. Il est de règle de se remarier lorsque la première femme est stérile: si pareille mécompte arrive à un agha es vassaux se cotisent pour lui permettre de choisir une seconde épouse.

Les conjoints doivent être de naissance égale ( hinkûfen hev ) et les familles nobles prennent soin d'éviter toute mésalliance. Il y a peu de temps encore les représentants de l'ancienne aristocratie déchu se refusaient, même appauvris et menant une existence obscure au pied de leurs citadelles en ruines, à donner leurs filles aux grands propriétaires terriens qui formaient la nouvelle classe dirigeante, créée et soutenue par le gouvernement ottoman. Le même préjugé existait chez les nomades à l'encontre des sédentaires. Enfin la loi yezidie, qui interdit tout mélange entre les différentes castes des « chaykh, » des « pir » et des « murid » a transformé en prescription religieuse cette exigence de la coutume. Chez les Kurdes musulmans, les chansons populaires se font souvent l'écho du désespoir de jeunes filles contraintes par leurs parents à des unions indignes d'elles.

Il va sans dire que les bouleversements sociaux qui ont suivi la révolte de 1925 et sa répression ont considérablement atténué la rigueur de ces conceptions.

Dans les classes populaires, les époux appartiennent d'ordinaire à la même tribu souvent au même village et à la même famille, seules, les maisons de chefs ou de notables pratiquent le mariage intertribal. Les alliances contractées servent alors, soit à renforcer une entente politique, soit à sceller une réconciliation. Il arrive en effet, mais assez rarement;



que; pour mettre fin à une vendetta, les proches du meurtrier accordent gratuitement la main d'une de leurs filles à l'un des parents de la victime.

Suivant la coutume kurde, le cousin germain possède des droits sur la main de sa cousine; il doit être préféré à tout autre prétendant, et ce n'est que s'il renonce expressément à elle que la jeune fille peut épouser un étranger ou un autre membre de la famille. Toute infraction à cette règle risque de provoquer de graves conflits: rapt meurtres ou guerres.

Des lois et des préjugés aussi rigides s'opposent souvent aux désirs des jeunes gens, et font que les enlèvements sont chose fréquente au Kurdistan. Les amoureux dont la passion est contrariée se mettent d'accord pour réaliser leurs vœux malgré la mauvaise volonté des leurs; comme l'opposition rencontrée vient généralement du père de la jeune fille ils vont se réfugier soit chez le jeune homme si la famille de ce dernier est assez puissante pour faire respecter son choix, soit chez un chef voisin qui sera tenu par les devoirs de l'hospitalité de prendre les fugitifs sous sa protection, et qui tâchera d'arranger les choses à l'amiable. Cependant, comme le rapt entraîne le déshonneur de tous les proches de la belle, ceux-ci acceptent rarement l'idée d'un compromis; ils cherchent à se venger, soutenus par leur clan. Un premier meurtre en cause inévitablement un second: la plupart des inimitiés séculaires qui font s'affronter les tribus n'ont pas d'autre origine.

Signalons, pour terminer cette introduction, que la répudiation, bien que permise par l'Islam, n'est pas entrée dans les moeurs kurdes. Presque partout, on la considère comme une pratique honteuse. Un mari qui se sépare de sa femme se couvre de ridicule; il n'a plus d'autre ressource que de quitter son village ou son clan.

Fiançailles et mariage comportaient jadis des usages fort compliqués dont beaucoup sont tombés en désuétude. Nous tâcherons de décrire aussi complètement que possible ceux qui subsistent encore, ou dont le souvenir est parvenu jusqu'à nous.

Les travaux en plein air, chez les sédentaires, la vie des camps chez les nomades, les fêtes et les danses font que, non seulement il n'existe aucune séparation sociale rigide entre garçons et filles, mais qu'il leur est facile de se

rencontrer chaque fois qu'ils le veulent. Amourettes, rendez-vous clandestins forment le principal thème des chansons populaires.

Pourtant, malgré la liberté dont ils jouissent, les jeunes gens n'ont pas la faculté d'exprimer ouvertement leurs préférences, au moment des fiançailles. C'est le père, assisté d'un conseil de famille, qui choisit sa future bru. Le fils n'est pas présent à la réunion, mais on le consulte parfois indirectement; pourtant s'il a déjà contracté un premier mariage, il peut faire connaître sa volonté, ou même demander qu'on lui donne une seconde épouse.

RÛDÎNÎ.

Lorsqu'une famille jette son dévolu sur une jeune fille qu'elle ne connaît guère, soit qu'elle n'appartienne pas à la même tribu, soit qu'elle habite un village éloigné, elle délègue une ou deux femmes (rûdî), qui vont s'installer pour quelques jours chez les parents de la belle: elles observent discrètement ses manières, étudient ses qualités et ses défauts. Une fois satisfaites, elles s'en retournent, mais sans dévoiler le but de leur voyage.

HERÊ KIRIN. (accordailles).

Si elles remportent une impression favorable de ce premier contact, on charge un intermédiaire de sonder les intentions de la famille et de s'assurer qu'elle ne rejettera pas une demande éventuelle. Alors, le père ou le frère aîné du prétendant, ou encore un notable ami, se présente à son tour chez la future fiancée. Il offre soit une arme, soit un cheval, dont le prix sera déduit du « qelen ». L'acceptation de ce cadeau constitue un accord tacite. Le dicton déclare: « herê kirin nivê mehrê ye » (les accordailles sont la moitié du mariage).

XWEZGIN OU ŞERANÎ (demande en mariage, ou cérémonie des sucreries).

A quelque temps de là, au cours d'une seconde visite, qui doit avoir lieu de nuit, le père ou le frère aîné du jeune homme, accompagné pour la circonstance de quelques-parents, présente officiellement la demande en mariage. Il offre des rasins secs et des sucreries qu'il a apportés; (d'où le nom de la cérémonie: « şeranî » douceurs) puis, après quelques moments de conversation, il fait comprendre ses intentions. La formule consacrée est la suivante: « Me divê tu barê me li me kî » (Nous voudrions que tu nous charges de notre fardeau) ou encore: « Me divê tu li me kirasekî bibirî » (Nous voudrions que tu coupes une chemise à notre taille). On répond: « Li ber qebelê we ye » (cela dépend de vous). Le demandeur

réplique: « Tu jî bê minetf » ( Nous sommes votre disposition ). On fixe alors le montant du « qelen, » dot que la famille du fiancé doit verser à celle de la fiancée, et qui a déjà été discuté par des intermédiaires (1). Celui-ci comprend généralement une certaine somme, payable en espèces ( hişkperê ) ou, le plus souvent, en nature ( sele ), et des cadeaux ( xelat ). La somme à payer est évaluée en « kls » ( bourses; chaque « kls » vaut cinq livres-or ) mais si l'on convient de s'en acquitter en nature, on attribue aux objets ou au cheptel qui en représenteront l'équivalent, un prix supérieur à celui qu'ils ont en réalité. Le « xelat » comprend généralement des armes, des vêtements, de la vaisselle, etc.

Le montant du « qelen » varie suivant la notoriété de la famille de la fiancée ( pour les filles de maisons princières, il s'élevait jusqu'à 1000 bourses, soit 5000 LT or ); toutefois, si le prétendant est d'un rang supérieur au sien, le père fait souvent remise d'une partie, voire de la totalité de la dot. D'une façon générale, le taux du « qelen » est relativement bas dans les pays de montagne, alors qu'il est considérable ( de 150 à 200 LT ) dans les la plaine, où les femmes travaillent davantage.

La cérémonie de la « xwezgînf » achevée, les futurs conjoints deviennent « xwestf » ( promis ). Signalons que, de nos jours, le « berê kirin » n'est plus guère pratiqué; il se confond avec la « xwezgînf », et la tendance prévaut de plus en plus de verser une partie du « qelen » dès la demande en mariage ( survivance du cadeau que l'on faisait au moment du « herê kirin » ).

DESTGİRAN ( fiançailles ).

On laisse s'écouler plusieurs mois, après la « xwezgînf, » un an parfois. Enfin, le père du fiancé convie ses proches et ses amis, ainsi que leurs femmes, et tous se rendent chez la promise, emportant de quoi préparer un repas ( dans les familles riches, on envoie les provisions la veille, avec des domestiques qui s'occuperont de la confection du menu ). Tandis que les hommes causent, les femmes font cuire le déjeuner. Le banquet achevé, on étend sur le sol un manteau ou un tapis, et chacun des assistants y dépose un présent en argent. Le père du prétendant ramasse le produit de la quête et en remet une partie à la future bru. La cérémonie

(1) Toutes ces négociations par intermédiaires ont pour but d'éviter des brouilles entre les deux familles, en cas de désaccord.

achevée, les jeunes gens sont « desgîrtf » ( fiancés ). Un peu plus tard, lorsque la dot aura été versée en entier, ils deviendront « qelenda ». Alors seulement, la mère et les parentes de la fiancée iront faire les achats à la ville et commenceront à s'occuper du trousseau ( cihaz ).

DAWET ( les noces ).

Les noces ont généralement lieu au printemps ou en automne, c'est à dire lorsque la vente du bétail ou celle des récoltes permet de disposer d'un peu d'argent liquide.

XEYL — EVANÎ ou BERBÛRÎ ( cortège nuptial ).

Quelques jours avant le mariage, les parents et les amis du fiancé se rendent à la ville, où ils font emplette de cadeaux à son intention. A leur retour, ils s'installent chez lui, pour une nuit, parfois pour quelques jours, le temps de consommer les vivres qu'ils ont apportés. Ils vont ensuite, toujours munis de provisions, chez le père de la fiancée, et le mettent en demeure de leur livrer sa fille: « Divê tu bûka me kar bikf. » ( Il faut préparer notre mariée ). On leur répond: « Eve bûk, ehlê wê qafl bikin û bibin » ( Voici la fiancée, obtenez le consentement de la famille, et emmenez-la ). Les délégués distribuent alors des cadeaux à tous les gens de la maison, y compris les domestiques, afin de vaincre leur opposition.

Le lendemain, de bon matin, les femmes habillent la mariée; on la fait monter à cheval. Il est de bon ton qu'elle pleure au moment du départ, ou tout au moins qu'elle fasse semblant de pleurer. Pour la consoler, les assistants lui chantent un épithalame ( hevalê ):

Ez xerîba Xwedê me, — Li ber pencê rojê me, — Hesreta mala bavê me, — Porên xwe venakim, — Hinê pê wer nakim, — Şîştina dayikê jî bîr nakim! — Guliyên min bîst û şeş in, — Şîştina dayikê çî xweş e, — Xaniyê bavê bûkê wiha bi kort e, — Van dilopan şort û şort e; — Xwehê megrî, zava xort e.

Je suis une étrangère devant Dieu — Je suis la victime du destin, — La cause du chagrin de mon père. — Je ne dénouerai plus ma chevalure, — Ni ne la teindrai au henné; — Je n'oublierai jamais le temps où ma mère me lavait — J'ai vingt-six tresses — Qu'il est doux d'être lavée par sa mère! — La maison du père de la mariée n'est qu'une bicoque, — Il y pleut à grosses gouttes! — Soeur, ne pleure pas, le marié est jeune!

Ou encore ( ce second hevalê se chantait autrefois chez les Kurdes de Damas ):

Le hevalé, çavreşé, biribqeytané; — Heval hatin te bibino. — Hatin, hatin! Giş ereb in, giş jî tat in! — Hatin ber mala, min bibino. — Hine binin, di tiştê kin, — Kevçî kevçî avê lêkin! — Li destê bûkê, bert zavê kin — Mala zavê wer kort e; — Van mizriban şort û şort in! — Bûkê megrî, zava xort e.

Amie, amie, les yeux sont noirs, les sourcils sont minces comme des fils! — Les compagnons sont venus te chercher. — Les voici, les voici! Tous sont arabe, tous sont vassaux! — Ils sont venus à la maison, m'enlever! — Apportez du henné, mettez le dans un bassin, — Versez l'eau à pleines cuillerées, — Oignez-en les mains de la mariée, puis les mains du marié. — La maison du marié est une mesure. — Il y pleut à torrents par les gouttières. — Mariée, ne pleure pas, le mari est jeune!

Enfin, le cortège de « Xêlvanan » se met en route au son des fifres et des tambours. Il ne comprend aucun de proche de la mariée, sauf une servante et une vieille femme de ses parents, la « pîrik », qui l'accompagnera jusqu'à la porte de la chambre nuptiale. Tout le long du chemin, on chante, on tire des coups de feu. Sur le parcours, les jeunes gens du village attaquent la caravane et volent tout ce qu'ils peuvent. Il arrive parfois que l'alerte soit sérieuse, et qu'un prétendant évincé choisisse ce moment pour enlever l'héroïne de la fête. C'est alors une vraie bataille qui a lieu. Un proverbe fait allusion à des incidents de ce genre: « Bûk li hespê ye, kes nizane nesba kê ye » (la mariée est à cheval, nul ne sait encore à qui elle appartiera).

Les « xêlvanan » arrivés à la porte de la maison nuptiale, la belle-mère s'avance à la rencontre de sa bru, et la prie de mettre pied à terre. Celle-ci refuse tout d'abord, et ne se laisse fléchir qu'après avoir reçu un cadeau. Au moment où elle franchit le seuil, on brise à ses pieds une cruche pleine de pièces de monnaie.

De son côté, le « zava » (marié) s'est levé de bon matin. Son garçon d'honneur (brazava) et ses amis l'ont habillé en grande cérémonie. Ils chantent, à cette occasion, des couplets dont le texte ne nous est malheureusement pas parvenu. Le « zava » est dès lors l'émir du village (mîrê gund): il a plein pouvoir sur tout le monde, frappe d'amendes les hommes mariés, les charges d'accusations burlesques, et les condamne à des peines ridicules. Les célibataires qui forment sa garde du corps

se chargent d'exécuter les sentences qu'il prononce.

Chez les musulmans, la cérémonie religieuse (mehr) a généralement lieu dès l'arrivée de la fiancée. Le mollah demande par trois fois au jeune homme ou à son représentant (veklî) « Te keça... qebûl kiriye bi jinînf? » (Acceptes-tu pour femme la fille de...) Celui-ci répond: « Belê, min keça... qebûl kiriye bi jinînf » (Oui, j'accepte la fille de... pour femme). Se tournant ensuite vers la jeune fille (ou vers son « veklî »), il s'assure de son consentement (la formule employée est: « Te... qebûl kiriye bi mîrînf? » « Acceptes-tu... pour mari? »). Quatre témoins sont obligatoirement présents; tous les assistants doivent rester immobiles, les mains posées à plat sur les genoux, de sorte que nul ne puisse nouer l'aiguillette au fiancé pendant l'accomplissement du rite. Notons que, très souvent, la bénédiction nuptiale est donnée au domicile de la mariée, avant le départ de la « xêlvani ». Les conjoints sont alors représentés par des mandataires.

Le « mehr » terminé, on expose le trousseau de l'épousée. Les assistants tâchent de dérober de menus objets qu'ils portent au « zava », en échange de récompenses. La victime sera vengée un peu plus tard. En effet, lorsque le mari se dirigera, le soir, vers la chambre nuptiale, de mauvais plaisants le dépouilleront d'une partie de ses vêtements et iront les remettre à sa femme.

La journée se passe en festins et en réjouissances. Des invités sont venus de tous les villages voisins, et même des tribus éloignées. Les jeunes gens organisent des danses, des jeux et des compétitions sportives. Ainsi, les meilleurs tireurs exercent leur adresse sur une pièce de monnaie (« polikê bûkê », le sou de la mariée); le vainqueur du tournoi reçoit un prix de la main du « zava ».

La nuit venue, le garçon d'honneur conduit l'époux auprès de sa femme: c'est la cérémonie du « gerdek ». Autrefois, chez les gens du peuple, le mari annonçait la consommation de l'hymen en tirant un coup de feu, puis il sortait pour rejoindre les danseurs. Cet usage, décrié de tout temps, est tombé en désuétude.

Le lendemain des noces, le « zava » revêt un costume neuf que lui a offert sa femme, et va se promener avec ses camarades. Comme il a cessé d'être prince du village, les hommes mariés se vengent à ses dépens des mauvais

tours qu'il leur a joués la veille.

Quant à la nouvelle épousée, elle reçoit ses amies, venues lui remettre leurs cadeaux. La « pîrek » montre aux visiteuses le mouchoir taché de sang, qui prouve que tout s'est normalement passé. Le mari et les beaux-parents la récompensent de ses services par un présent. Enfin, les jeunes gens du village se font annoncer à leur tour; ils remettent à la mariée le produit de la chasse qu'ils ont organisée le jour même en son honneur. Elle leur offre de l'argent, des souvenirs.

C'est en général le second jour que se terminent les réjouissances. Pourtant, chez les familles aisées, elles peuvent se prolonger. Les mariages princiers duraient une semaine, et donnaient lieu à des fêtes splendides ( voir dans Mem û Zîn la description de celui de Tâdjîn avec Seti ). Au début du XIX<sup>e</sup> siècle, des noces à la cour d'Ardelan coûtèrent 100. 00 tomans ( 40.000 pour le trousseau et 60.000 pour les réceptions ), soit plusieurs millions de francs. On employa, à cette occasion, 1400 kg. de sucre pour la confection des pâtisseries.

Quinze jours après le mariage, les parents de la jeune femme vont faire visite à ceux de leur gendre; ils leur remettent quelques cadeaux. Un peu plus tard, la nouvelle mariée va passer quelque temps chez son père; ce séjour terminé, les amis de son époux vont la chercher; ils lui restituent, à cette occasion, tout ce qui avait été volé lors du pillage de la « xêlvant »; elle rend chaque objet à son propriétaire.

Dès le retour de la femme au foyer conjugal, les époux cessent d'être considérés comme « bûk û zava » ( jeunes mariés ), ils deviennent « jin û mêr » ( mari et femme ).

On ne peut s'empêcher de remarquer que certaines coutumes, comme la visite des beaux-parents à la famille de leur gendre, les présents qu'ils font à cette occasion, et la restitution des objets volés à la « xêlvant » donnent à penser que le « qelen » n'était à l'origine qu'un sorte de dépôt de garantie dont remise était faite ( un an après le mariage, suivant certaines traditions ) si l'épouse était satisfaite de sa nouvelle vie. Telle est, en tout cas, l'opinion de certains informateurs.

..  
Pour terminer, il ne sera pas sans intérêt de noter quelques usages qui semblent particuliers aux Yezidis du Cheykhân, et dont la description est empruntée au livre récent de Lady Drower, Peacock Angel ( Londres, 1941 ):

Bien que le mariage dépende des parents, la jeune fille, pressentie, peut refuser un parti qui ne lui plait pas.

Durant les deux jours qui précèdent les noces, la fiancée ne doit porter que du blanc. Le jour du mariage, elle se couvre d'un voile rouge.

La veille de la cérémonie, elle se passe les mains au henné; toutes ses amies font de même: un bassin plein de ce produit est porté de maison en maison; après s'être servies, les femmes y jettent quelques pièces de monnaie.

Lorsque la mariée arrive au domicile conjugal, sa belle-mère lui remet une cruche pleine de sucreries; elle doit briser le vase sur le pas de la porte; les assistants se disputent les dragées, qui portent bonheur. Au moment où elle s'apprête à franchir le seuil, on égorge un mouton à ses pieds.

L'office de la « pîrek » est rempli par la soeur de l'Autre Monde de la mariée, et celui du « brazava » par le frère de l'Autre Monde du « zava ». Le « brazava », en compagnie de deux amis passe la nuit à la porte des époux. C'est à lui que le mari remet le mouchoir taché de sang.

Le mariage consommé, la jeune femme doit rester sept jours dans la chambre nuptiale; lorsqu'elle est obligée de sortir, il lui faut prendre garde de ne franchir ni ruisseau, ni flaque d'eau.

Au bout de ses sept jours de réclusion, elle sort avec quelques amies. Elles emportent des dattes et sept sortes de grains (1) blé, lentilles, avoine, petits pois, fèves, pois chiches, qu'elles font bouillir sans assaisonnement. Elles gagnent ensuite un ruisseau ou une rivière; la mariée y jette sept poignées du mets qui a été préparé, puis tout le monde traverse l'eau et l'on s'installe pour consommer les provisions dont on s'est muni.

Aucune femme en état d'impureté ( femme qui a accouché depuis moins de quarante jours, ou qui a ses menstrues, ou dans la maison de laquelle quelqu'un est mort récemment ) n'a le droit de s'approcher de la mariée.

#### TAWÛSPARÊZ

(1) L'autour n'en cite que six.

---

Kiryariya Hawaré 500 Qirûân Sûri  
Xwedt û gerîndeyê bapîrsiyar: Mîr Celadet  
Alî Bedîr-Xan - Şam-Sûriye  
Directeur Propriétaire: Emîr Djêladet Aalî  
Bedîr-Khan, Damas-Syrie

ŞAM — ÇAPXANA SEBATÊ —

## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Tefsîra Qurane	Dr. K. A. Bedir Xan
Gramera kurdmançî	C. A. Bedir Xan
Evin	Osman Sebri
Diwana Melê	Qedri Cemil paşa
Beydaña Kurdî	E. Şêrkoh
Memozîna Xanî	Herekol Azizan
La vie universitaire au Kurdistan	— Tawûsparêz

### TEFSÎRA QURANÊ

6 — Mîrata dê û bav û îletan kêm, be, zêde be, jê li gora emrê şerîetê, ji bo mîran parek û ji bo jinan parek heye.

7 — Di dema parkirina mîratê de, heke hin ji mirovên kesê mirî yên ne mîratwer û hin sêwî û belengaz hazir in; divê hon dilê wan ji bi dana tişteki xweş bikin û pê qedrê wan bigirin.

8 — Welî û bergerên sêwîyan û hemî kesên ko sêwîyan dihewînin, divê ji Xuda bitirsin û sêwîyan neşînin û tu xirabiyê li wan nekin, divê ew binin bira xwe, sibê heye ko zaroyên wan ji sêwî biminin.

9 — Yên ko bê heq û sebeb, malê sêwîyan dixwin, divê bizanin ko ew agirî dadiqurtînin û ew digihin perengên dojhê.

10 — Gava ji we kesek dimire, emrê Xuda li ser parên mîratxweran ev e: Kurik du paran û keçik parekê dibin. Heke zaro hemî keçik in û dido ne, an hêj zêdetir in, du parên mîratê di nav wan de tene belav kirin; heke keçikek bi tenê ye, nivê mîratê dibe; ko zaro an neyîyên kesê mirî hene, ji dê û bav, her yekê ji mîratê şeşyekê distînin; lê eger tu zaroyên kesê mirî ninin, û ew bi tenê mîratxwerên mîrathiştî ne, seyekek ji dê re û ê mayî ji bavi re ye. Heke xweh

û bira, an zirxweh û zirbirayên hiştêmîratî hene, vê gavê dê şeşyekê distîne. Berî belavkirina mîratê wesiyetdêr divê jê deynê mîrathiştî bide û wesiyetên di wî bine cih.

Ev emrên Xuda li ser parkirina mîratê ne; li gora emrê Xwedê bimeşin; hon nizanin di dinya û axiretê de ji mirovên di xwe, kl ji we re nîziktir e; vî tiştî Xuda dizane.

11 — Heke tu zaro ninin, nivê mîrata jinkê, ji mîrê wê re ye. Heke zaroyên wê hene, çaryeka mîratê mîrê wê dibe. Berî belavkirina mîratê, wesiyetdêr divê jê deynê mîrathiştî bide û wesiyetên wê bine cih.

Heke tu zaro ninin, çaryeka mîrata mîrî, ji jina wî re ye, heke zaro hene heqê jinikê heştekek e. Heke mîrathiştî ne dê û bav û ne ji zaro hiştîye, wê gavê xweh û bramakên wî, ji mîrata wî behrekê distînin. Heke xweh an brayekî wî heye şeşyekê dibe, heke bira an xwehên wî, ji yekî zêdetir in, seyekekê dibin û ev di nav xweh û birayên wî de tene belav kirin.

Berî belavkirina mîratê, wesiyetdêr divê jê deynê mîrathiştî bide û wesiyetên wî bine cih. Na he ko mirov bert mirina xwe, ji yekî biyanî re, ji malê xwe ji seyekekê bêtir wesiyetê bike û bi mikurhatina deynên derewîn, zererê bigehîne mîratxwerên xwe. Ev emrên Xuda ne, divê mirov emrên Xuda bine cih. Xuda zana û dilnêrm e.

12 — Ev stnorên emrên Xuda ne, yên ko bindestiya fermanên Xuda û pêxemberê di wî dikin; divê bizanin, Xuda wan digehîne bihuştên tîr av û kanî û ew tê de her dimînin û ev ji bona wan serfiraziyeke mezin û hêja ye.



# BINGEHËN

## GRAMËRA KURDMANCI

— 21 —

### RENGDËRËN NEBINAVKIRI

138 — Rengdêrên nebinavkirî dikevin pê, ya navdêran û wan nebinavkirî dikin. Di zimanê kurdmançî de gelêk rengdêrên nebinavkirî hene. Yê ko ji hemîyan bêtir têne bi kar êxistin ev in: Tu, her, herçî, filan, gelek, hemî, hevqas, çend. h. p.

Hemî mirovan digot. Îsal gelok fêkî hene. Min jê re tu derman peyda ne kir. Kêm û zêde her kêr dibire. Min fro filan jinik dît. Ji terşê me çend kavir mirine. Li cem min hevqas pere hene. Herçî mîrên qenc bi bêbextiyê tola xwe venakin.

### RENGDËRËN XWEMALÎN

139 — Rengdêrên xwemalîn ji hin pronavên kesin û hin pronavên îşarkî têne pê; dikevin paşîya navdêran û xwediye kes, tişt an heywanên ko qala wan di qisetê de tete kirin didin zanîn. Ev rengdêr birê pronavên xwedînan ên paşîn bi xwe ne; û li şûna ko bidin paşîya

pronavên qersene ( yê, ya, yên ) rast bi rast dane pey navdêran.

min, xwe	me, xwe
te, xwe	we, xwe
vî, vê, wî, wê xwe	van, wan, xwe

Ev rengdêrên ha û navdêrên wan bi veqetandekê digihin hev. Veqetandek jî li gora mêjerê zayenda navdêrê tete bijartin.

Hespê min, mehnên te, kiteba vî, qelemên wê, xaniyê me, çiyayê we, kurên van, keça wan.

140 — Lê heke navdêrên van rengdêran bi awakî ji qisetê ketine, hingê li gora mêjerê û zayenda navdêrê yek ji pronavên qersene ên îşarkî vedigere şûnê û rengdêr dihe pronaveke xwemalîn. Herwekî gava em « Ev rasteka min e, kanî ya te dibêjin » mexsed « Ev rasteka min e, kanî rasteka te » ye. Ji bo kurtî û spehîtiyê em hejeya « rastek » dubare nakin.

Çend misalên din: Min destmala xwe peyda kir, te jî ya xwedî. Kiteba min ji ya te stûrtir e. Erdê wan avî ye; lê yê me bejî ye. Ev çû hespê xwe anî; tu jî here yê xwe bîne.

Şanek — Heke rengdêrên xwemalîn tev de ji yek mêjerî ne hingê mirov dikare kutebir bike û bibêje: « Hespê min û te anin » Li şûna ko bibêje « Hespê min û hespê te anin » an « Hespê min û yê te anin ».

Ji BINËN ROJËN KEVIN:

## EVÎN

Hê warê ko biyan bû  
 Yanzde salan ji bo min  
 Ne hezkirîna delalan  
 Ne serdilk ne yar û jin  
 Ew pêl ji emrê şîrîn  
 Borî di deryayê xem  
 Tev diltengî zivari  
 Bi dijarî û elem  
 Wek rêwiyê pirwestî  
 Bêzar bû bûm ji jîne  
 Kê hîr dibir binêre  
 Lî deştera evîne  
 Me got qey derd û kulan  
 Arê di dil temirand  
 Çira bihara jîne  
 Bi zorbakî vemirand  
 Nediya bû ew rê ji min  
 Ma bûm di kuncê tarî  
 Tim bilêkek birekuj  
 Bi ser dil da dibarî  
 Kurmê wî nav evîn bû  
 Di bistanê ciwanî  
 Bi derd û kul û hesret

-Ket xew serê xwe danî  
 Bihar holê kuta kir  
 Çû dawiya havîne  
 Hişyar ne bû bi carek  
 Bê hevî bû ji jîne  
 Îsal ku her du paîz  
 Gîhane hev bi reşî  
 Me dît kapa hextê me  
 Dumfir hatin bi xweşî  
 Di parîzên welatî  
 Me dît ji bo xwe sorgul  
 Weke Memê cegerxwîn  
 Ji bo wê bûme bilhil  
 Demikî ez vehistim  
 Di sîdara gula sor  
 Bûm pinpinî û venişî  
 Li ser tilan dor bi dor  
 Derdên ko yanzde salan  
 Me bê awa civandin  
 Wê xweşdema li nik wê  
 Hemî ji me revandin  
 Erdê ko wê tê geştê  
 Bo min dera miqedes  
 Hêjayî Hind û Çîn e  
 Di rex wê da yek nefes

Leyla çî şermisar e  
 Li pêşberê delalê  
 Zîn hingî pesnedar e  
 Bo periya cemalê  
 Me pesna wê ne qesd e  
 Nîne şîrînzimanî  
 Ew rewşa şeng û oflaz  
 Çavmat dihêle Xanî  
 Heke Feqî bidîta  
 Dê dest li ber bibesta  
 Melê bi sed kul û derd  
 Wê lêva xwe bigesta  
 Ew jî ji bo me pir dît  
 Felekê, kir neyarî  
 Rahîşt milê me avêt  
 Nav girava Sent-Marî  
 Lê sed girîn û hesret  
 Bilbil wê dem û gavê  
 Nedtî ji bo xwe birbang  
 Dimk ne gîhand xunavê  
 Hê pirpirokê sermest  
 Çavên belek tu kuştin  
 Bigirî û xwîn birêje  
 Gelek dîr e gîhêştin.  
 Medegesker - Sent-Marî 10-2-936  
 OSMAN SEBRÎ

## V JMARNAV

141 — Jmarnav ew bëje ne ko mëjer an miðdarë tiştan, bi awayên tével didin zanîn û di qisêtê de bi navdêrekê ve dibin an dikevin gûna wê; wê diniminin û lê vedigirin.

142 — Jmarnav mëjer û miðdaran an yek-car binavkirtî dikin û wan welê didin zanîn, an bêt ko wan tayîn bikin, wan bi awakî mibbein pêş me dikin. Ji vî awirtî ve jmarnav du celeb in:

1 — Jmarnavên binavkirtî: çar, ê çaran, çaryek, ji çaran yek, çareçar, ê çarim.

2 — Jmarnavên nebinavkirtî: gelek, hindik, pir, bêtir, zehf h. p.

### JMARNAVÊN BINAVKIRÎ

143 — Jmarnavên binavkiri ji di nav xwe de bi çar biran lewa dibin:

1 — Jmarnavên bingehîn

2 — Jmarnavên rêzîn

3 — Jmarnavên birewîn

4 — Jmarnavên komelîn

144 — Herçî jmarnavên adetî ji yekê heta dawiyê tev de jmarnavên bingehîn in û jmarnavên mayîn tev de ji van têne der.

145 — Jmarnav ji ber bastûra xwe ve an sade an hevedidani ne.

Ûn sade ew in ko ji hejmareke bi tenê hatine pê: çar şeş, yanzdeh, bist, hezar, mîlyon b. p.

Ûn hevedidani ew in ko ji yekê bêtir hejmaran hatine pê. Ev hejmarên ha bi giha-neka « û » bi hev têne girêdan: bist û çar, sed û bist, neh, hezar û neh sed û çil û yek, şeş hezar û pênc sed û çil û heşt, du mîlyon û sed hezar û pênc, sed û neb. Herwekî ji mîsalên jorin dixuye herçî yekinekên wek sed, hezar, mîlyon h. p. gava dubare, sêbare... dibin navbera wan û navbera hejmara ko wan daye pey hev gihamka « û » nakeve: sê sed, deh hezar, panzdeh mîlyon, çil û pênc mîlyon h. p.

### TEWANGA JMARNAVAN

146 — Jmarnav ji ber ko ji bêjeyên guhêr-bar in, gava di qisêtê de dibin bireser, têne tewandin û navdêrên ko didin pêşiya wan didin tewandin.

147 QEYDA GELEMPER — Di tewangê de esil jmarnavê sade ye. Ji lewre di jmarnavên bevedidani de tewang li goreyî hejmara paşîn têtê çêkirin.

Û gava ev jmarnav dikevin pêşiya navdêran, navdêr ji tewanga hejmara paşîn dibin û

## DIWANA MELE

— 38 —

Cana jî cemala te miqeddes qebez im ez  
Ger xûb û perzadî nezerke tebes ira ez  
Mîslê mehê nû ger te divêtin me bibîni  
Mêze bike camê çî dizanî çî kes im ez  
Ya xme ji me can kir ko tecellayê li dil da  
Min ruhî di qalib tu yî tenba qefes im ez  
Hubba te ye min radihêjîni ko binalim  
Şeb ta bi seher nale ji rengê ceresim ez  
Min go mehê nû çaşiniyê ebrûyê yar e  
Go min çî hed-de şubhetê ne'lê feres im ez  
Saql ji ezel yek du qedeh bade bi min da  
Heta bi ebed mest û xumar û teles im ez  
Cana tu i min can gulê bê xar û kerem bi  
Min net ko ne wek bilbilê mihnet ebes im ez  
Sed cewr û cefa dî bi me naçin ji derê te  
Yekser tu nebatî lewhê tebê mekes im ez  
Ger te divêtin bibîni ser tu bike ferman  
Da wê saetê ser bibirim xweş meqes im ez  
Ser ta bi qedem ez bisojim şibhê melayî  
Perwane sifet sohtime bê sewt û hes im ez

— 39 —

Tûr im bi dil pêyrewê Mûsayim ez  
Ateşperes û nûr û tecel-la yim ez  
Bari ji wî ilm ko xeberdarî kirim  
Îro tu bizan Adem ê esmayim ez  
Înşayê ilûmê ledinî çunkî me zani  
Zanî bi heqîqet ko çî însayim ez  
Herfên reqemê lewhê wicûda me bixwen  
Da qenc bibîni ko çî îmlayim ez  
Zahir tu perşaniyê halê me mebin  
Mecmû'e di zate xwe tu xrayim ez  
Alem çîye îrab û hirûf û kelfîmatin  
Ew niqte di nefs xwê û meinayim ez  
Sed Nîl û Firatin diretî qelbê me da  
Pê nahesim qelzem û deryayim ez  
Sed neqil û riwayet di meya safî mûyek  
Îro ko ji pîrê xwe bi fetwayim ez  
Peyweste tu her bangê nekî şibhetê ney  
Bê yar û ney û saz ko nay û ney im ez  
Herçî te bivêtin ji me wer can bi xwe bi  
Cana bike ferman wewestayim ez  
Sed şîş ji dil dane ji mîhra te mela  
Lew her bi fîxan misli ney nayim ez.

pê ditewin.

Ez çaran dibînim. Ez çar hespan dibînim.

Ez sihî dibînim. Ez sihî hespî dibînim.

Ez sihî û çaran dibînim.

Ez sihî û çar hespan dibînim.

Emê li jêr, tewanga jmarnavan, bi rêzê ve, digel xweseriya her hejmarê, yeko yeko û kom bi kom bibêjin.



## BEYDAXI KURDI

— PÊŞKÊŞ BO GENÇ Û LAWAN —

Beydaxî kurdî heta ne binim  
Hiç sorêj nabê derdî deronim  
Çend sale le dil daxî Kurdistan  
Kunî tiya biwa cerg û sineman.  
Helsin ba birwên hiç ranewestin  
Le rê weten da komel bibestn.  
Yeزدanî gewre le ser-hemo man  
Yeزدanî gewre gewrey leşker man.  
Îmro rojêke rojî helistan e  
Destî yek bigrin he birayan e  
Xakî Kurdistan reng be xwên  
Ta bedest ne çê em nav û em şwên  
Piyan xerqî û jin xerqî xum bê  
Xwîn û xum û şîn ha bo weten bê  
Kurdîş le dinya heta diyar bê  
Dijmînyan kwêr û dostîyan şad bê  
Kake tu megrî kurd le xem derçû  
Wa bizane rojêk weko şev helçû  
Ya xwa her bişl lawanî kurd  
Le bo xakî kurd bijîn hezar cav  
E. ŞERKOH

## LA VIE UNIVERSITAIRE AU KURDISTAN

La société kurde traditionnelle offre, à qui a la patience de se pencher sur elle pour l'étudier, bien des aspects inattendus. C'est ainsi que l'une de ses classes les plus importantes, celle des «feqeh» (étudiants en sciences religieuses), a jusqu'à présent échappé aux observateurs occidentaux.

On imagine trop volontiers un Kurdistan exclusivement peuplé de nomades pillards, et plongé dans la barbarie. La réalité est tout autre, et l'histoire nous apprend que la plupart des capitales de ces petites principautés, dont quelques unes subsistèrent jusque vers 1840, étaient autant de métropoles intellectuelles pour ces régions dont elles constituaient en même temps les centres économiques et politiques. La munificence des émirs y attirait maîtres et élèves. Charaf Khân énumère, dans son «Charafnâme», les fondations pieuses (mosquées, écoles, etc.) constituées par ses ancêtres, à Bitlis. Elles sont fort nombreuses. Il possédait lui-même une riche bibliothèque.

## MEMOZINA EHMEDÊ XANÎ

— 9 —

TEHSINA QIMAŞ Û KALAYI  
WALAYI HISNA HEBIBAN E,  
IMÛMEN TERÎZA CEWHERÎ BE-  
HAYI CEMALA SÎTÎ Û ZINAN E  
MEXSÛSEN.

Hindê ko di qeyserê di dinya  
Vêk da ne xudan meta' û kala  
Mecmûi xezalnê di qeyser  
Het-ta veke dexmiya Sikender  
Dur-ri di defalîni di xaqan  
Le'la ko di xatema Silêman  
Herçend ziyade ter beha bin  
Bilcîmle bi cizî' hisin nabin  
Hisna li rexî Sîtî û Zînê  
Bo behrêkê aleyê evîné  
Pêla ko digirte pêl û mewcan  
Rojâ dikete heziz û ewcan  
Sed can û dil û ciger disotin  
Xelkê bi mesel ji wan digotin  
Şems û qemaran qiran e pêk ve  
Lew mişterî ev cihan e pêk ve  
Sey-yadî cemalî wan xezalan  
Sey-yadî sedayî wan delalan  
Del-lal sîfet gelek sîfet şêr  
J'efîxan û ji malîyan ne bûn têr  
Rojan û şevan gelek dinallin  
Het-ta ko digel melek' dikallin  
Hisna nebitin çu hed û îyayt  
Nabit ji xwe aşiqan nihayet  
Lê aşîq û bulbewes cida ne

Hin faldexwaz û hin feda ne  
Cananteleb in hinek ji bo can  
Hin canteleb in ji bo wî canan  
Hin wesli-cebin ji rengê Tacdîn  
Hm derd-guzin wekî Mem û Zîn.

— 10 —

ETFI INAN Û LICAME BI  
SERENCAMI KELAM.

Da bine bi ser hikayeta pêş  
Xelkê ko ji derdî eşq dilrîş  
Herçend ko bê hed û qiyas bûn  
Amî û xewadim û xewas bûn  
Liken ji xwe ademi di mintaz  
Sed law sîhê qed û serefrax  
Herçek bi meqam hisin - rojek  
Herçek bi kelim sinesojek  
Herçek bi kemal hedri mahek  
Herçek bi cemel sedri şahek  
Em ji hemî aşîq in û talib  
Ew ji hemî talib in di rakib  
Liken ne bi ditin û şehadet  
Belkî bi bihistin û riwayet  
Bilcîmle di xizmeta emir bûn  
Filcîmle ji sir-ri hev xebir bûn  
Serhelqeyî wan perî-misalan  
Sertaci ewan melek-xisalan  
Tacdîn digotin-ê ciwanek  
Guhderzî zemane pehlewaneke  
Nesl û neseb û beseb eyan bû  
Ser-defter û serwerê kuran bû  
Bahê wî digotinê Sikender  
Liken ereban digo xezanfer  
Lewra ko bi şîrî şîbhi şêr bû

Rojâ şerî ew hezare mêr bû  
Tacdîn du bira hebûn di qel-laş  
Manendî du şehbazi cem-niaş  
Datm dîlî dijminan disotin  
Yek Arîf û yek Çeko digotin  
Em-ma wî ji cîmle xas û aman  
J'ewçend bira û hab û unaman  
Lawek kiri bû bira ji bo xwe  
Ne l'ez îelet im çira ji bo xwe  
Rojâ ko ewî bira ne dîta  
Teşbihî şeva çira ne dîta  
Dinya li wî têk dibûye tari  
Roj bû ko li wî dikir tewari  
Enhazî fereh şerîki xem bû  
Sergeşteyî xem bi navî Mem bû  
Mem ji li wî aşîqek tamam bû  
Ne şîbhi bira û hab û man bû  
Herçend birayê axiret bû  
Te digo ko dinê û axiret bû  
Tacdîn weledê wezîrê diwan  
Mem ji xelefî dehrê diwan  
Ew her du ciwan welêk aşîq  
Ew her du bira we pêk ve sadiq  
Yek Qisî zemanê yêk Leyla  
Yek Wamiqî esr û yêq Ezra  
Ew yar ji dil ne serseî bûn  
Reh şîbhethî mîbr û mişterî bûn  
Yarî û birayî û mewaxat  
Nabit bi riyaî û meqal  
Yarî ne hêsantî ye cefa ye  
Meqsûd ji yariyê wefa ye  
Axir tu eger nekî wefayê  
Ew-wel mede ber xwe wê cefayê.

La petite ville de Djezir comptait, à elle seule, huit madrasas ( Medresa Sor, Medresa Mir Evdali, Medresa Seré Meydané, Medresa Beyrañu, Medresa Mishefa Reş, Medresa Ser Sûrê, Medresa Nebî Nîh ), dont la plus importante groupait, il y a un siècle, quatre cents étudiants et une quarantaine de professeurs, tous payés et nourris par le prince de Botân. Actuellement, aucune d'entre elles ne subsiste. Amadiyé, dont les souverains se rendirent de tout temps célèbres par leurs libéralités envers les gens de science, fut, au Moyen Age, et jusqu'à une période récente, une pépinière de littérateurs, de théologiens et de canonistes ( cf. Charafnâme, pp. 27-28 ). Des cinq écoles qui y existaient ( celles de la Grande Mosquée, de la Nouvelle Mosquée, de Qabhân, d'Imâm Qâsem, et de Murâd Khân ), deux seulement restent encors ouvertes de nos jours: Qabhân et Murâd Khân. Un seul cheykh enseigne alternativement, dans la première, l'été, et dans la seconde, l'hiver. Ajoutons que la Grande Mosquée disposait d'une bibliothèque de 1000 volumes, qui fut incendiée en 1920. Plus heureuse, la madrasa de Qabhân conserve encore une collection de 2000 manuscrits, réunie au XVI<sup>e</sup> siècle par Sultan Husayn, prince de Behdinân. En plein vingtième siècle, les écoles traditionnelles d'Aqr, de Zakho, et de Dehok, au Kurdistan irakien, sont encore florissantes. Enfin, un très grand nombre des manuscrits arabes et autres conservés à Mossoul furent copiés par des scribes kurdes.

Il est à noter que, de nos jours, la force attractive que représentaient les cours locales ayant disparu, l'enseignement tend à se disperser dans les villages; les maîtres hébergent, moyennant une pension modique, les élèves qui viennent, parfois de fort loin, écouter leurs leçons. La plupart des bourgs du Kurdistan irakien renferment des écoles fondées et entretenues par des cheykh, qui y professent de père en fils. De même, en Djeziré syrienne, quelques docteurs réputés ont fait de leurs villages respectifs autant de petits centres intellectuels, qui attirent des étudiants de tous les coins du pays, et même de l'étranger.

Cet éparpillement a d'ailleurs des conséquences néfastes. En effet, alors qu'autrefois, les maîtres, groupés dans les centres urbains, étaient amenés à se spécialiser dans telle ou telle matière, ils sont, aujourd'hui, contraints d'inculquer simultanément à leurs auditeurs

des notions sur l'ensemble des disciplines traditionnelles de l'Islam. Il va sans dire qu'eux-mêmes ne les possèdent pas toutes à un degré égal. Le programme des cours, fort chargé, comporte d'abord la totalité des « douze sciences » ( duwazde ilm ): grammaire arabe, logique, les diverses branches de la rhétorique, exégèse du Coran, hadith, droit canon, arithmétique, géométrie. Sont enseignés en outre, des rudiments d'histoire et de médecine, les classiques kurdes ( surtout Malâyé Djeziri et Ahmadé Khâni ). Il y a une cinquantaine d'années, les élèves étaient tenus, par surcroît, d'étudier certains poèmes persans ( dont le « Pendiâme » de Aitar, et le « Mathnawi » de Djelâl ed Din Roumi ).

Les méthodes pédagogiques en usage sont les mêmes au Kurdistan que dans le reste de l'Orient: le maître lit et commente à ses élèves des ouvrages dont ceux-ci s'efforcent de retenir le texte par coeur. La plupart des manuels employés sont en arabe; les explications se donnent en kurde. Toutefois, on utilise aussi des traités rédigés en kurmandji; nous citerons les plus connus: le « Terkib » de Mala Ali ( nahou ), le « Tefstra Kurmanci » ( sarf ) le « Nehc ol Enam, » de Mela Xelilê Serti ( aqide ), la Eqide et le « Nâbîr » de Ahmadé khâni.

Il est intéressant de constater que quelques efforts sont faits pour insuffler une vie nouvelle à ce système d'éducation désuet: en Iraq, quelques cheykh commencent déjà à professer exclusivement en kurde, et en faisant usage des caractères latins.

Les étudiants, les « feqeh », se recrutent indifféremment dans tous les milieux: paysans, citadins, gens de tribus. Après avoir appris le rudiment, ainsi qu'un peu d'arabe chez le « mamoste » ( maître d'école ) de leur village natal, ils se rendent auprès du professeur de leur choix, mais de préférence dans une contrée éloignée. La tradition prétend en effet que leur travail est beaucoup plus profitable s'ils se trouvent séparés de leur famille et de leurs amis. La scolarité, dont la durée varie, bien entendu, avec l'intelligence des élèves, est en général fort longue ( une quinzaine d'années, parfois ). Elle est sanctionnée par des examens, à la suite desquels le candidat obtient de son cheykh une « idjaze » ( licence ). Ce diplôme est délivré pour une ou pour plusieurs matières, suivant les cas. De nos jours, il est le plus souvent général, l'enseignement portant simultanément sur toutes les sciences. Ayant obtenu

ses parchemins, le « feqeh » a droit au titre de « seyda », qui se donne aux personnes instruites, et, tandis qu'il ne portait jusqu'alors aucun costume distinctif, il peut désormais revêtir la redingote ( djubè ) des cheyhks, et coiffer le bonnet rouge, orné du turban de mousseline blanche. Il regagne alors son pays, et y devient cadi ou mollah.

Il arrive cependant qu'après avoir terminé son stage chez un premier maître, l'étudiant s'inscrit de nouveau chez un second, voire successivement chez plusieurs autres. Beaucoup passent de nombreuses années de leur vie à parcourir le Kurdistan, en quête de science. Certains même s'expatrient, et vont jusqu'à Damas et à Pagdad.

C'est surtout sur la charité publique que comptent les « feqeh » pour subister au cours de leur long apprentissage. Jadis, les fondations pieuses leur assuraient, dans les centres urbains, logis et nourriture; mais la plupart d'entre elles ont disparu. Il leur faut, maintenant, quêter dans les campagnes, au moment des fêtes ( celle du « sersal », en particulier ) et des récoltes. Les dons en nature, et plus rarement en argent, qu'ils reçoivent à ces occasions leur permettent de s'acquitter de la redevance qu'ils doivent verser au cheykh, et de vivre tant bien que mal.

La corporation des « feqeh », en pleine décadence à l'heure actuelle, était autrefois puissante et redoutable. Plus turbulents encore que leurs confrères d'Europe, les étudiants kurdes formaient partout des groupes organisés et bien armés. Ils épousaient les querelles de leurs maîtres, et des batailles rangées se déroulaient fréquemment entre disciples d'ulémas rivaux. Nombreuses étaient aussi les interventions de la jeunesse universitaire dans les affaires publiques. Elle représenta, jusqu'au milieu du XIX<sup>e</sup> siècle, le parti de la réaction, contre les innovations religieuses et sociales des cheyhks de confréries, avides d'étendre leur influence spirituelle, et par là, leur pouvoir politique. Ce furent, cependant, les chefs de « tariqa » qui gagnèrent la partie, en s'appuyant sur les éléments populaires. Les ulémas durent, à partir de 1830-40, s'affilier, eux aussi à l'ordre le plus puissant, celui des naqchbandis (1), afin de sauvegarder leur situation, ce qui mit fin

(1) L'influence qu'ils exerèrent, dans un sens modérateur, sur l'évolution des doctrines de cet ordre fut considérable, même en dehors du Kurdistan.

au conflit. De nos jours, tout jurisconsulte ou théologien kurde est, en même temps, directeur spirituel; il enseigne à ses élèves les doctrines du soufisme, aussi bien que le hadith ou le droit canon.

Suivant le droit coutumier kurde, les « feqeh » se trouvaient rangés sous l'obédience du chef ou du prince qui les avait accueillis sur ses domaines. Ils lui devaient, par conséquent, le service militaire, même lorsqu'il en résultait pour eux l'obligation de porter les armes contre leur propre tribu. Par contre, ils avaient droit à une double part de butin, ( en tant que combattants, et en tant que religieux ). Les étudiants participaient d'ailleurs volontairement à la plupart des campagnes. Charaf Khân rapporte ( Charafnâme, p. 452 ) que son aïeul, partant en guerre contre un lieutenant de Chah Ismaïl ( au XVI<sup>e</sup> siècle ), se vit offrir l'aide d'un docteur de Bitlis, qui se joignit à lui avec 500 « feqeh ». Un peu plus tard ( vers 1530 ), l'émir Babân, Hâdji Cheykh, battit trois fois de suite les troupes de Chah Tahmasp, avec une armée composée exclusivement d'écoliers, encadrés par leurs maîtres ( ibid. p. 366 ).

Ardents à combattre les ennemis de l'extérieur, surtout lorsque ceux-ci étaient des persans chiites, les « feqeh » ne l'étaient pas moins à participer aux luttes purement locales des factions. Vers 1177 H, Suljeymân Pacha Bâbân, qui avait reçu de Karim Khân le gouvernement du Kurdistan iranien, fut assassiné par l'un d'entre eux.

La guerre ne constituait évidemment pas le seul délassement des jeunes intellectuels kurdes: ils savaient aussi choisir des divertissements plus innocents — les seuls qu'il leur soit encore possible de pratiquer.

Le congé hebdomadaire du vendredi, la fin des examens ( ceux-ci ont lieu dès que l'étude d'un ouvrage est terminée ), et les diverses fêtes sont mis à profit pour organiser des veillées ( sérangest ) ou des promenades à la campagne, égayées par des jeux ( les plus pratiqués sont le « bir » et le « ségavî » ), des danses et des chants ( on chante surtout les poèmes de Malâyê Djezirî ).

Le jeudi soir, en particulier, les « feqeh » se réunissent pour danser la « hêlîte », ou « bêlûte ». C'est une sorte de quadrille, qui se caractérise par la lenteur de son rythme, et qui n'est en honneur qu'au sein de la corporation estudiantine. Les exécutants, se tenant

dar la mains, se rangent sur deux files parallèles, qui se font face. Les deux groupes, font simultanément les mêmes pas, de manière à s'avancer à la rencontre l'un de l'autre, puis à s'éloigner. Les figures comportent: 1° Trois battements; jambe droite croisant la jambe gauche, puis la gauche croisant la droite, enfin, la droite croisant la gauche. 2° Petits pas en avant, légèrement croisés. 3° Révérence, accompagnée d'une flexion du genou droit. 4° Petits pas en arrière, légèrement croisés. 5° Battements, pas en avant, révérence, etc.

Ces évolutions sont guidées par des trophes que chante l'un des deux groupes, tandis que l'autre répond à chaque vers par un refrain. On lira un peu plus loin quelques spécimens de ces compositions, souvent pleines de fraîcheur.

Les seuls textes dont je dispose sont malheureusement modernes et contaminés par la légèreté des autres « govend » Kurdes. Leur inspiration diffère considérablement de celle des anciennes « bêlîte », beaucoup plus sérieuse, parfois même pieuse.

Les rythmes des pièces traduites sont les suivants: n° 1, cinq pieds (2 et 3; temps forts: 2, 5), n° 2, sept pieds (4 et 3; temps forts: 1, 4, 6); n° 3, vers, sept pieds (3 et 4; temps forts: 2, 4, 6), refrain, 4 pieds; n° 4, huit pieds (4 et 4; temps forts 1, 3); n° 5, sept pieds (3 et 4; temps forts: 2 et 6), refrain, trois pieds; n° 6, huit pieds (4 et 4; temps forts: 1, 3), refrain, quatre pieds.

Je dois enfin prévenir le lecteur qu'en certains endroits, ma traduction du n° 4 s'écarte considérablement du sens littéral du texte; il était impossible d'obtenir autrement une version française acceptable.

#### TAWÛSPARÊZ

##### I

Keçkê, te bid'nê	Mirê Cizirê.
Xwişkê, te bid'nê	Mirê Cizirê!
Hero sed siwar	Têne nêçirê.
Hero sed siwar	Têne nêçirê.
Kanl ew soza	Te ya l'ser birê?
Kanl qerara	Te ya l'ser birê?
Keçkê te bid'nê	Mirê Hizanê!
Xwişkê, te bid'nê	Mirê Hizanê!
Hero sed siwar	Têne meydanê.
Hero sed siwar	Têne meydanê.
Kanl ew soza	Te ya l'ser birê?
Kanl qirara	Te ya l'ser birê?

Nous te donnerons, fillette,

Au prince de Djezir!

Nous te donnerons, soeurlette,

Au Prince de Djezir!

Toujours cent chevaliers

Qui viennent à la chassel

Toujours cent chevaliers

Qui viennent à la chassel

Où donc est ton serment

Prêté au bord du puits?

Où sont donc les promesses

Faites au bord du puits?

Nous te donnerons, fillette,

Au Prince de Hizan!

Nous te donnerons, soeurlette,

Au Prince de Hizan!

Toujours cent chevaliers

Qui entrent dans la licel

Toujours cent chevaliers

Qui entrent dans la licel

Où donc est ton serment

Prêté au bord du puits?

Où sont donc les promesses

Faites au bord du puits?

##### II

Bircê Bidîsê reş in,	Cotek kevok lê d'meşin.
Ramisanê keçkoka	L'mala bavi çi xweş in!
Bircê Bidîsê spi ne,	Cotek kevok jê frîne.
Ramisanê keçkoka	L'mala bavi şerîu e.

Les tours de Bitlis sont noires,

Deux pigeons s'y promènent.

Ah! Que baiser les fillettes

Chez leur père est douce chose!

Les tours de Bitlis sont blanches,

Deux pigeons prennent leur vol.

Ah! Que baiser les fillettes

Chez leur père est douce chose!

##### III

Leylanê, b'hoy Leylanê, b'hoy Leylanê!  
 Leylanê, b'hoy Leylanê, b'sing dermanê!  
 Leylanê, b'wisa wisa, b'hoy Leylanê!  
 Hal-hala li nav garisa, sing dermanê!  
 Fincana b'dest fehrisa, b'hoy Leylanê!  
 Fincana b'dest fehrisa, b'sing dermanê!  
 Leylanê, b'çima-çima, hoy Leylanê!  
 Hal-hala l'nav genima, sing dermanê!  
 Fincana b'dest hakima, hoy Leylanê!  
 Fincana b'dest bakima, b'sing dermanê!

Leylanê, ho Leylanê, ho Leylanê  
 Leylanê, ho Leylanê, ta gorge est mon élixir!  
 Leylanê, comme ci, comme ça, ho Leylanê!  
 Haro dans les maïs, ta gorge est mon élixir!  
 Tu es la coupe entre les mains des braves, ho Leylanê!  
 Tu es la coupe entre les mains des braves, ta gorge  
 est mon élixir!

Leylanê, pourquoi, pourquoi, ho Leylanê!

Haro parmi les blés, ta gorge est mon élixir!

Tu es la coupe entre les mains des princes, ho  
[Leylané]

Tu es la coupe entre les mains des princes, ta  
[gorge est mon élixir]

#### IV

Gundo béri, béri, béril Gundo, ber xopano béril!  
Gewram rind e, pez da béri, Gundo ber xopano béril!  
Bi qoziyé çava l'min dinéri, Gundo, ber xopano béril!  
Gundo, bériya berx û miya, Gundo, pez û kar û béril!  
Wey l'péşingé av û biya, Gundo, ber xopano béril!  
Gewram rind e, mër koti ya, Gundo, berx û kar û béril!  
Gundo, bériya lezlez e, Gundo, ber xopano béril!  
Wey l'péşingé av û heze, Gundo, ber xopano béril!  
Gewram rind e, mër terez e, Gundo, ber xopano béril!  
Gundo, ber'ya peze çole, Gundo, ber xopano béri  
Wey l'péşingé av û çol e, Gundo, ber xopano béri  
Gewram rind e, mër şindol e, Gundo, ber xopano béri

Gens du village, allez traire, allez traire, allez  
[traire!]

Gens du village, allez donc traire le bétail!  
Ma mie est belle, elle trait ses brebis,  
Gens du village, allez donc traire le bétail!  
Elle me regardait du coin de l'oeil,  
Gens du village, allez donc traire le bétail!  
Gens du village, il faut traire agnelles et brebis,  
Gens du village, il faut traire chevrettes et brebis!  
Holà! Au bord de l'eau, près des saules,  
Gens du village, allez donc traire le bétail!  
Ma mie est belle, son homme est un gredin,  
Gens du village, allez donc traire le bétail!  
Gens du village, il faut traire bien vite!  
Gens du village, allez donc traire le bétail!  
Holà! Au bord de l'eau, près des roseaux  
Gens du village, allez donc traire le bétail!  
Ma mie est belle, son homme est un ruffian!  
Gens du village, allez donc traire le bétail!  
Gens du village, allez traire les brebis de la  
[plaine,

Gens du village, allez donc traire le bétail!  
Holà! Au bord de l'eau, dans la steppe,  
Gens du village, allez donc traire le bétail!  
Ma mie est belle, son homme est un rien qui  
[vaill,

Gens du village, allez donc traire le bétail!

#### V

Masfko, per beleko, Yar Yeman!  
Vé avé şeylo meko, Dost Yeman!  
Dost rind e, j'xew rameko, Yar Yeman!  
Dost rind e, j'xew rameko, Dost Yeman!

Petit poisson, nageoires blanches et noires,  
Amie, de grâce!  
Ahl ne trouble pas cette eau, Amie, de grâce!  
Ma mie est belle, ne l'éveille pas, Ami, par pitié!  
Ma mie est belle, ne l'éveille pas, Ami, de grâce!

#### VI

Wey l'ser banf,  
Lo kuro dno,  
Desté rasté l'min hilanf,  
Îşaret kir, min nezanf,  
Wey l'ser banf çek dişwiştin,  
Xorté xelkê l'çolê hiştin,  
Wey l'ser banf çek kutane,  
Zend û bazin tev hildane,  
Xorté xelkê l'çolê mane,  
Wey l'ser banf!  
Wey l'ser banf!  
Wey l'ser banf!  
Wey l'ser banf!  
Wey l'ser banf!  
Wey l'ser banf!  
Wey l'ser banf!  
Wey l'ser banf!  
Wey l'ser banf!

Là-haut sur la terrasse, là-haut sur la terrasse,  
Grand fou, là-haut sur la terrassel!

Elle a levé vers moi la main droite,  
Là-haut sur la terrassel!

Elle m'a fait signe, et je n'ai pas compris,  
Là-haut sur la terrassel!

Là-haut sur la terrasse, elle lavait son linge,  
Là-haut sur la terrassel!

Les manches retroussées,  
Là-haut sur la terrassel!

Ayant laissé les pauvres gas dans la campagne,  
Là-haut sur la terrassel!

Là-haut sur la terrasse, elle battait son linge,  
Là-haut sur la terrassel!

Les manches relevées,  
Là-haut sur la terrassel!

Les pauvres gars sont restés dans la campagne,  
Là-haut sur la terrassel!

### ROJA NÛ

Xwendevanên delal mizgîniya me li we. Piştî Hawar û Ronahiyê honê bi rojnameke kurdî, Roja-nû ji şa û kêfxweş bibin. Hejmara we rojnameê a pêşîn di van çend rojan de wê derkeve. Roja-nû wek Hawar û Ronahiyê ne bi tenê edebî û civakî ye. Lêbelê Roja-nû rojnameke siyasî ye. Honê tê de ji her texlîl nivîsaran pêve danezan û nuçeyên şer ên dawîna ji peyda bikin. Ji niho de bon dikarin kiriyarê Roja-nû bibin. Ji bona vê yekê ji hema bi kartekê nav û adrêsa xwe ji xwediye wê re bidin zanin. Ewe adrêsa Xwedî:

Dr. Kamiran Ahi Bedir-Xan

Xwediye Roja-Nû — Avahiya Ebû-Efif

Meydana Bircê — Bêrût

Ji bo postê bi erebî divê holê bête nivîsandina:

الدكتور كامران آهي بدرخان

صاحب الجريدة الكردية « روجا نو »

بنابة ابو عفيف — صاحبة البريد — بيروت

Kiriyariya Hawarê 500 Qirûşên Sûrî

Xwedî û gerinendeyê bepirsiyar: Mir Celadet

Ahi Bedir-Xan, Şam-Sûriye

Directeur Propriétaire: Emir Djêladet Aali

Bedir-Khan, Damas-Syrie

ŞAM — ÇAPXANA TEREQIYÊ — 1943



## DI VÊ HEJMARÊ DE

Teîstra Qurane	Dr. K. A. Bedir Xan
Dlwana Melê	Qedri Cemil paşa
Pêş kevin	Cegerxwin
Cejlînpîrozî	Osman Sebri
Ji wan re	Yehyayê Seyda
Sersala min	Osman Sebri
Mela Ehmed	Selim Hisênî
Gramêra kurdmançî	C. A. Bedir Xan
Memozîna Xanî	Herekol Azîzan
Pêloşî û sistî	Hesen Hîşyar
Mela Ewdîlmeclid	Selim Hisênî
Chansons	Tawûsparêz

## TEFSÎRA QURANÊ

13 — Yên ko serhişkiyê li ber Xwedê û pêxemberê di wî dikin, tadakerên sino-rên Xuda dibin, divê bizanin, Xuda wan tavêje agirê dojhê û ew tê de her dimînin û ji bo wan ezabekî dijwar heye.

14 — Ko yekê ji jinên we zina kir, banî çar şahidan bikin, heke wan li ser zinakirina wê şehdetî da, jina xwe li cem xwe bigirin heta mirina wê û bermedin ko ew ji malê derkeve; an li hêviya riya ko Xuda, dê şant we bide, bimînin.

15 — Divê hon, her kesê ji we ko zîneyê dikin biêşînin û biezîbinin. Heke ew tobedar dibin, êdî dest ji ezibandînin û eşandîna wan bikişînin; Xuda ji tobedaran re tobê dide, di gunehên mirovan dibore, Xuda piyar e.

16 — Xuda di gunehên gunehkarê ko ji nezaniyê, gunehêkê dîke û zû poşman û tobedar dibe, dibore. Xuda zana û fêris e.

17 — Toba Xwedê ne ji bona wan e ko di gunehkariya xwe de pê didin erdê û dest ji gunehan nakin û gava mirin dest tavêje wan dibêjin: Ez ketim bextê Xwedê; û dîsa ne ji bo wan e ko kafir dibin, kafir dimînin û kafir dimîrin û di roja pişdawayê de dest bi toban dikin. Me ji bona wan ezabekî dijwar û cegersûz pêk aniyê.

18 — Gelî bawermendino... Di belavkirina mîratekt de heke jinek bû para

we, wê bi zorê mebin û ji xwe re mekin jin, ev ji we re ne helal e. Heke wê jinikê zina ne kir, mehra ko jê re hate dayn jê mestînin û wê meşîdînin û me reuclînin û heke ew ji xwe re merêkî dibijêre mani'l ziwaca wê mebin. Bi jinên xwe re nerm bin, qedrê wan bigirin, zorê li wan medin, gava hon ji wan dienirin ji, bi wan re gulçin bipeyivin. Heke dilê we, ji jinên we sar dibe û hon êdî heji wan nakin ji, sebrê bidine xwe û xwe ragirin, pir caran hon ji tiştekt hez nakin, lê di dawiyê de dibînin ko Xwedê bi wî tiştî, xweşiyê digehlne we.

19 — Heke dilê we, ji jina we sar bû, û we ew bê sûç û sebeb berda û we jîneke din ani; ji qelenê jina xwe a berê tu tiştî ji xwe re bi şûn da medin veqerandin, heke we jê re qentarek zêr da be ji; ji ber ko ev gunehêke eşkere û kêmasiyeke mezin e.

20 — Çawan dibe ko hon jê tiştektî bistînin; gotina we bû bû yek û can û bedena we, giha bûn hev.

21 — Jinbavên xwe, ji xwe re mekin jin, ev tiştektî kirêt e û Xwedê jê dienire; meger we ev tişt beri dahatina emrê Qurane kiri be; Xuda di gunehên we dibore.

22 — Ji we re, mehirkirina dê, dot, xwişk, met, dêza, brazê, xwarzê, dayn, xweha şîr û xwesûya we heram e. Ji we re mehirkirina zirkeçên we jî, heke ew keçik di mala we û di bin terbiyeta we de ne heram e; meger ko hon bertî nîzîkbûna jînekê, jînekî dimire an hon wê berdidin; wê gavê mehkîrîna keça wê, ji we re helal e.

Mehîrkîrîna jinên kur, nevlî û nevtîrkîrîna we û civandîna du xwişkan di mehirekê de ji we re, ne helal e, meger ko ev tişt, bertî dahatina emrê Qurane çêbûne. Xuda di gunehên gunehkaran dibore, Xwedê piyar e.

# DIWANA MELE

— 40 —

Aşiq er carek ji balayê bidit berqa mecaz  
Dê li nik sahtb dilan heta ebed bit serfiraz  
Keşf û esrarê sifetan bê mihebet nabitin  
Saretê esma divêtin da bikin jê fehmê raz  
Samia husni cemale dê ji ilmê bête eytn  
Eşq da jê hilbitin kê di heqetqet bê mecaz  
Husn û hub bê yek-du nabin dê bikin şah û geda  
Nûrê nadit şuleya mehmûd û bê sem'a ayaz  
Me'neya eşqê dizani ayeta husnê bixwin  
Da tu herfên mehbetê yek yek ji hev kl tmtiyaz  
Aşiqan bê gav lew kalîn ji dil tén şubhê re'd  
Wan ji balayê dibariu wek birûskan remz û naz  
Kl xeber dit dê ji eşqê û ji ber usta girit  
Gerçl ew rahê diraze sine sûz û cangudaz  
Aferîn sed aferîn hê, min ji wan ra aferîn  
Ey ji tîrên dilberan daîm di dil peykan û gaz  
Guh bide awaz û ney weqtê sema tén inuxpeçe  
Fehmê razl ger dikf çawan dinalin çeng û saz  
Ew dilê min wek kebûter nabitin kes lewme kit  
Lew di vê torê we da keftl me dtin sed şebbaz  
Wer dilo da çin temaşaya ciwananê çlmen  
Wi hilatî ser bi naz û sayeban danin niyaz  
Zilf û sinbil, mişk bûy û bisk sosin surşlrln  
Ser û bala sebzepûş û gul nîsan û xuncebaz  
Nêrgizên gamet di zimrûd sergiran hatin xeram  
Çar etrafan bi ref ref lê bi meş tén siy û qaz  
Dil be kl dem ez ji wan her yek bi nazan dil dibim  
Dilribayên canfezayê dilberin aşiq gudaz  
Eqd û îhramê dema dilber xweyfbî ferzi eyn  
Secdeyek ber wan dubirhan nagirit cih sed nemaz  
Îde û mirê me tro dergehê lîtfê vekir  
Go mela: hingl bixwazî dê bidim bes tu bixwaz

— 41 —

Ji re'na nêrgizê tey mest û xwînlîz  
Zeman bû ehdi ceng-englz û Cenglz  
Te canê min divêt ey canê alem  
Ji min bistin bi le'lên xwey şeker-rêz  
Du ember bûn li şimşadê vebesti  
Lê bestin lew hewa bû enberamîz  
Ji axa aslanê meskenê bûn  
Lê dağan da bibitl xweş sebatêz  
Tenê Ferhad dizanî lezetê eşqê  
Ko wl can daye Şlrlnê, ne Perwêz  
Pêt û tabê hezar eşkence da dil  
Ji Şirazê nigabê mest Tebrêz  
Îlahî nêrgiza meymest û nazik  
Ji destê xwar û bedxwahan biparêz  
Ko lê têt ew qebaya asimant  
Letif û şeng û nazik wek belalîz

# PÊŞ KEVIN

— Barê giran li ser milê xortan e —

Xortino werin em bi pişt û mil  
Bo welat xebat em bikin ji dil.  
Serxwebûn divê bo me ber demê  
Pêş kevin hemî, pêş kevin hemî.  
Bo me her divê yekî û mejî  
Her bijl welat, ber bijl bijl.  
Serxwebûn divê bo me her demê  
Pêş kevin hemî, pêş kevin hemî.  
Em bi nav û deng, her bikin xebat  
Serbilind hemî em biçin welat.  
Serxwebûn divê bo me her demê  
Pêş kevin hemî, pêş kevin hemî.  
Min divê welat, min divê serek  
Serbilind bijltn, em hemî gerek.  
Serxwebûn divê bo me her demê;  
Pêş kevin hemî pêş kevin hemî.  
Xortno em hemî ceger bi xwîn in,  
Yan mirin divê yan bilind bijltn.  
Serxwebûn divê bo me her demê  
Pêş kevin hemî, pêş kevin hemî.

CEGERXWÎN

Jl BIRÊN ROJÊN KEVIN

## CEJNEPIROZIYA WELATO

Dizanim cejna hat fro heval û hogîrên te gîşk  
Direvin himbêza bavan nola berxan û makan pişk  
Bi vé va hevde cejnên me kuta bûn holê dîrl hev  
Ko bextê reş weka termê rojên me kirine tarîşev  
Te fro ne dê ye ne hav hemf biyan stoxwarî  
Tu bê qey ev ne bes bûn ko bû mivanê te zîvar f  
Di ber all va dilteng i birînên te bê derman in  
Ji bir meke di rojên teng mîranî zirt û halan in.  
Tu lawê mîletê kurd f, ji bo te rojêke şayf  
Heye di çexa dinyayê wê gav ewr ê dibîn sayf  
Mezin be da ko wê rojê ez û tu gurmikan b'hevdltn  
Bi pozên çaplîyên devreş newal û devîyan tev dîn  
Neyaran bikujin bê van bi carê tovê wan raktin  
Welatê ko xopan bûye ji nû va şên û ava kin  
Di xarin alek rengin di nav gorna bavê min  
Dê hingê bêjim cejna te pîroz be li ser çavê min.  
Hema 16-1-934 OSMAN SEBRÎ

Sewaşek rête, disa alemê dil  
Bi cadûyê du çesmê fitne-englz  
Xebals teb'e cahil seksuruşt e  
Yeqln ew ker ji canan lew diket bêz  
Mela canê te çawan peblewan ker  
Li tayên xumriyan zilfên dilawêz  
Ji husna bê nişan nadî nişanek  
Nişant ger ji dil ne gira bi perhêz  
Mebîn'ger ev bi suret ademîne  
Hemî darin ji agir ra kirt rêz



# JI WAN RE

## KO KETINE RENGÊ BIYANIYAN

Perfcar hin ji me an ne ji me lê tev de ketine kiras û rengê biyaniyan, li civatan bi me re rûdinin guft û go û doza xelkê dikin.

Herçendî em bersefa wan didin ji ew hingê tek û tena ne. Ji bo pêsteva her kesî, divê em di Hawarê de bersefa wan bidin.

Belê em dikarin pesinê nijadê kurd bi awayê zanistî û dfrokî bersefa her çavnebarî bidin. Ew jî nikarin bidine mandelê « inkar ». Ji ber ko ev gotin rast û dirist in.

Gava xelkê goştê kulfî û gumgumokan dixwar, me gotşê pezkoviyên dixwar. Dîsa gava ew di bin konê reş de mezin dibûn em di koşk û seran de li ser mehîr û xalîçan rûdiniştin. Qesirên me ên hendesekarî hebûn. Herwekî ji heden û awahiyên me ên kevnare dixuyin.

Heyama ko xelkê pût û senem ji xwe re dikir armanç; dîsa me xudanê şev û rojan

dinasf. Di destpêka îslamiyê de direfşa Mihemêd dîsa me hilda jor. Ji xwe cenabê pêxemher ne gotî bû ko heke ilim herê bigtje pêwirê, dîsa lawên iran wê destê xwe biginin-ê.

Di awayê şer de lawên kurd dîsa xûnrêjên cihanê ne. Ne bi tenê text û kevelê osmanî, lê yê herkesî dîsa kurdan berz kiriye.

Belê em dikarin bibêjin kesê ko nanê kurd bixwe û li erdê wan bisekine divê li me çep nezivire. Divê ew zani bin ko rojên reş û teng di pêşiya wan de hene û kes nikare wan wê rojê biparêze. Roja ko perengê dojeha dilên xortên kurd wan û yên ji wan meztir jî dê bibirêje.

Belê ji birbir re divê nehêle ko dergehê tobe bête girtin û ew bikevin ber setma ayê kurd. Hêvî dibe ko ev belgihbiyanî navên xwe bi xetê reş di diroka me de xêz nekin.

Herkes ji me rîya xwe dizanê. Herwekî gotiye: Qencfiro bi xwe kiro, xirabkiro bi xwe kiro.

YEŔYAYÊ SEYDA

Amûde: 15/5/1943

## JI BIRÊN ROJÊN KEVIN

### SERSALA MIN

« JI QEDRÎ CAN RA »

Îsal sala me qut hû  
Sîw sisê bûne sîw çar,  
Bi ax û wax û küffin  
Û diltengî bû êvar.  
Bi dilekî şikestî  
Min deftera xwe anî,  
Tevî qelem divitê  
Li pêşherê xwe danî.  
Û çûme bazara dil  
Da tişteki hihîsim,  
Rûpelekî defterê  
Reş bikim binivîsim.  
Darên di geliyê dîl  
Ji rûkî hû bûn hîlor,  
Ji newalên di nav da  
Dihêrikîn xwîna sor.  
Ne man tu dest û bant  
Qe tişteki qenc ne dit,  
Li hin darek hîlorê  
Welatoyê biçûk dît.  
Ew jî bi hesreta dê  
Dikizî û dikellî;  
Di nav arê biyanê  
Li ser piştê vezellî...  
Min got: Welato rabe  
Kijî jî bo me şerm el

Digot: bavo tu n'zanî  
Xwîna diyan çî germ e.  
Min heşt salan tu ne dî  
Hinde li min kar ne kir,  
Van du salên jî bo dê  
Ji wan heştan zêde kir.  
Bi ser vê yeka han da  
Wek terma reş zivari,  
Ket ewrekî malkambax  
Bi ser min da dibarî.  
Mafir jî bo welêt in  
Divê ez wan bikêsim,  
Ne herwekî hevalan  
Hin zêdetir biêsim..  
Berê bêhna xwe ragirt  
Paşê kûfin bi ser ket,  
Pelekî dûtî tûj û tehl  
Ji bêvilê bi der ket.  
Di wir da min hilanî  
Qelemoka hesinî  
Ev giloka jî derdan  
Li destê xwe dizinî.  
Bi dilekî pir şewat  
Min berê xwe da ezmên,  
Ev çend bêjeyên jêrin  
Berpê kirin bo Yezdên:  
« Yezdan te qet ne da vî  
Biçûkî bêhneke xweş;  
Ji roja te afirand  
Holê timî bextereş!

Wî şeş salan ne dît bav  
Du salan ne bav û dê;  
Dirêjiya heşt salan  
Wilo maye çav li rê.  
Piringekî maziye  
Hinavê wî disoje,  
Veqetîneke hi dâm  
Niveka dil diroje.  
Yekcaran bêhn geş dibê;  
Lê bi hezring û keser  
Gava dayikê nahîn  
Dîsa serî dikev ber..  
Bi navê te ev tira  
Zirava min dibire,  
Ma jî ho çêlîkî wa  
Ev dijwarî ne pir e?!...  
Vê hêreya bi şewat  
Ji jinê bêzar kirin,  
Du hêstirên kezexur  
Di wir da hişyar kirin  
Lanet li te be salê,  
Min jî te ne dît xweşî  
Diwazde mehên te holê  
Derbaz kirin bi reşî.  
Bi vê va neh lanet in  
Ji neh salan dixwînim,  
Di sersala dehan da  
Ka çî xewnê dibînim...  
Hema 31/12/1933

OSMAN SEBRÎ

## MELA EHMED

Şairek ji Heyderan e, di mihacirîya xwe de hati bû qeza Nisêbtîne. Ji ber ko evîna welat û millet di dilê wî de şax da bû, eşek lê peyda bû bû û di vê nesaxîya xwe de dîwanek ji şîran û qesdan çekirîye; heye qedere (300-400) rûpelî. Niho ji ew dîwan bi xetê wî ê dest li cem kurê wî ye; navê wî M. Emîn e.

Ew ji li nahiya Amûdê li gundê (Xalit) dersên şerîfê dixwîne. Ji ber ko di stûna klasîkan an şairan de navê wî min ne dît, û mîr ji dibêje van veşartiyên wiha divê hon ji min re bidin nas kirin; lewra me îro dest pê kir û wan peşkêşî mirê mezin dikim ezbenî. Ewe yek ji qesdeyên wî:

Ela ya ey-yûltes-saqî ji zatê te recakar im  
Werfîn camek meya saffî ji hicrê mest û guzar im  
Melûl im bê qeder saqî mifer-reh bim bi camê ra  
Mirada min ji destê te badeya sor û gulgon e  
Belê wextê seher îro xiyala firqetê xwarim  
Xerîb im pir keder saqî binûsim ez bi fecrê ra  
Binûsim badeya saffî ji bê hoşî wekî rabim  
Xewasê qelzema eşqî im ji yaqûta xebardar im  
We lîken bê xeber saqî mişew-şew him bi  
[ derbê ra  
Xewasê qelzema kûr im di behran da me di  
[ dur-rek

Nehin min taqeta weslê ji kerba dil birindar im  
Belê şam û seher saqî bi feryad im ji şewqê ra  
Ji eşqê mest û sekran im ji hinga elest im ez  
Me noşî badeya mey lê heta îro weha jar im  
Hezîn im rengê zer saqî ji van tîr di cergê da  
Dil û cergê min bû ates ji şewqa mah û simayî  
Disojim mislî perwanê cenahê cemê didar im  
Vejandim ser teser saqî berê sal da tu mahê ra  
Ji cergê min dibarin tîr ji qewşê ferq û hicran e  
Meraqa wesletê kuştim ji ser ta pê wekî nar im  
Xideng û mawezê saqî li min têtin ji qetlê ra  
Ji fikra sûreta gulgon di behrê xem ne hatim ez  
Wekî bilbil bi efxan im meh û salan dilingar im  
Eman ey leb şeker saqî ne ma taqet ji sebrê ra  
Wekî bilbil bi xemdarî gulistan min li bîr in her  
Peya-pey xem dibarin dane dane zubdeyê ek-

[ dar im  
We fehmfî qed neşer saqî telef çap û mal vê ra  
Ji hicara vê demê dîn im li kû pîrê-mexan kanî  
Bipirsim hal û esraran çî reş eşqê bi dîldar im  
Bibînim ez eger saqî didim rûh ez bi mejdê ra  
Ji derbê firqetê Ehmed dinalît mislê kerbînî  
Ji destê mehbê û eşqê muqîmê eşkê xunbar im  
Dertin rux ey qemer-saqî peyala heyderî jê ra.

Şandox: SELÎM. Ş. M. HISENÎ

## BINGEHÊN

### GRAMÊRA KURDMANÇÎ

— 22 —

148 — NÎV. Gava ev jmarnav bi serê xwe ye û bi tişteki din ve ne girêdayî ye bi « f » yê tete tewandin: nivî bide min, nivekî bide min, bi nivî bike.

Lê heke jmarnaveke din an navdêrek bi nivî ve bûye hingê « niv » li goreyî tewanga wan tete tewandin û ji ber ko hikim li wan nake her navdêr bi tewanga xwe a xweser ditewe.

Ji yek û nivê (nîvan) bêtir.

Ji çar û nîvan bêtir.

Ji çil û nivî bêtir.

Niv zebesî (zebeşekî) bide min.

Niv sêvê (sêvekê) bide min.

Bîst û niv zehşî (zêheşekî) bide min.

Bîst zebesî û nîvan bide min.

Bîst û niv sêvê (sêvekê) bide min.

Bîst sêv û nîvan bide min.

Zebesî û nivî (nivekî) bide min.

Sêv û nivê (nivekê) bide min.

Min ev hesp bi bîst zêr û nivekî kirî.

Min ev hesp bi bîst zêr û nîvan kirî.

Min ev hesp bi çel zêr û nivî kirî

Bi goştê niv bizîne em têr nabin.

149 — YEK. Ev jmarnava ha bi « ê » yê tete tewandin: Ji yekê, bîst û yekê, çel û yekê, sed û yekê, hezar û yekê, mîlyon û yekê...

Lê gava « yek » dikeve pêşîya navdêrekê lê hikim nake û zayendê xwe nadiyê. Ji lewre navdêr li goreyî tewanga xwe ditewe: Ji yek hespî, yek mehîne, bîst û yek zebesî (bîst û zebesekî) bîst û yek sêvê (bîst û sêvekê).

Çend misalên din: Min ji hezar û yekê bêtir hesp henê. Ez sed û yek bespî û hezar û yek çêlekê dibînim. Ji bîst û yekê heta sê sed û yekê bijmêrine. Min ev hesp bi çil û yek zêrî (bi çil û zêrekî) kirî. Min bîst beranên xwe bi sih û yek bizîne (bi sih û bizînekê) guhart. Birayê min ev xanî bi sed û zêrekî (bi sed û yek zêrî) firot.

150 — Jmarnavên dido, sisê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh, deh, yanzdeh, dwanzdeh, sêzdeh, çardeh, panzdeh, şanzdeh, bevdeh, hejdeb, nozdeh, bîst, bi « an »ê tene tewandin: Ji çaran, heştan, dehan; bîstan, bîst û pêncan, sed û nehan, sê sed û heftan, hezar û şanzdehan, bezar û çil û siseyan..... bêtir.

Ev jmarnavên ha tewangên xwe didin navdêrên xwe û wan ji wek xwe ditewînin: Bi şeş zêran, ji heft bizinan, di nav hevdeh keçikan de, bi çel û heşt eskeran ve, ji du sed û nozdeh çêlekan, ji hezar û heştê û çar hespan.

## MEMOZINA EHMEDÊ XANI

— 11 —

DESTANA BEYANA NEWRÛZA SILTANI,  
TESMIYE MÛSÛMÎ SIRÛR Û ŞADIMANI  
BI MERSÛMÊ QEDÎMÎ KURDISTANÊ KO  
WAN DIGOTE SERSAL Û ED DIKIRIN  
BI ÎDI WISAL

Xel-laql cihan ji feyzi fitret  
Hey'ati felek bi wechi qudret  
Bê qalib û bê mihit û miqyas  
Bê alet û bê mişir û meqras  
Evçende mîez-zem û midew-wer  
Evrenge misen-neh û miker-rer  
Înane bi marezâ wicûdê  
Kêşane bi menzera şihûdê  
Hikmet ew e, ev hemî li kar in  
Hindek di peya û bin siwar in  
Hindek di betî û hin serî in  
Hindek di mûn û hin menî in  
Hin midbir in û hinek mideb-bir  
Hin miqhil in û hinek miqşed-dir  
Hin katib in û hinek di istad  
Hin mitrib in û hinek di cel-lad  
Hin rojperest in û hin şebefrûz  
Hin xus-serevin û hin xemendûz  
Hindek di misali Zîn zeri ne  
Hin şibhi Memî û hin mişteri ne  
Bilcimle miseyqel û minir in  
Hin padişeh in, hinek wezîr in  
Hindek ji teber-rika tehlî  
Ew têne bi niqteya rebîfî  
Tecdidî dikin ji bo me salê  
Gava weko têne fîdalê  
Danayi miem-meri kuhensal  
Evrengehe go ji bo me ehwal  
Got adeli pêşî û zemanan  
Ev bû li hemî cih û mekanan  
Wextê weko şehsiwari xawer  
Tehwil dikir di mahi Azer

Yanf ko dihate birci sersal  
Qet kes ne dima di mesken û mal  
Bilcimle diçûne der ji malan  
Heta digehiştê pir û kalan  
Roja ko dibûye lîdi newrûz  
Tazîm ji bo dema dilefrûz  
Sehra û çemen dikirne mesken  
Bêda û demen dikirne gulşen  
Xesma ezeb û keçên di bakir  
Elqis-se cewahîrên di nadir  
Têk da di mîzey-yen û mileb-bes  
Vêk ra li tefer-ricê mirex-xes  
Liken ne bi lîlmet û bi min-net  
Belkî bi teriqî zêr û sim-net  
Lewre ko ewan xêrez ji geştê  
Meqsûd ji çayîna bi deştê  
Ew bû ko çî talib û çî metlûb  
Yanf du teref mihîb û mehbûb  
Ev her du celeb ko hev bibinin  
Kufwê di xwe ew ji bo xwe binin.

— 12 —

BIDERKETINA ŞEHRIYAN E DI DEŞTÊ JI  
BO SEYRANA SERSAL Û GEŞTÊ

Dewra felekê ji bextî fêrûz  
Disan ko nima ji nû ve newrûz  
Mebni li wê adetê mibarek  
Şehri û sipahiyan bi carek  
Bajar û kelat û xanî berdan  
Teşblh bi nijdiyan û cerdan  
Sef sef dimeşîne, kûb û deştan  
Ref ref dixweşîne seyr û geştan  
Esnaff'imem sîxar û kub-bar  
Qeşa ve ne ma di şehri dey-yar  
Hindek bi peyari çûne başan  
Hindek bi siwarî çûne raşan  
Hindek bi tebayî û bi kesret  
Hindek bi hevalî û bi wehdet  
Rabûne ve xanim û xewatin  
Wan ji tîji gul kirin besatin

Hûran kire meskenê xwe çan-net  
Bê perde û bê melal û min-net  
Dûşize û duxter û rewalan  
Pakize izar û zîlf û xalan  
Etrab û kewaibê di ezra  
Merdan û nîrabihiqê di zîba  
Eshabi qimaş lîfî rixsar  
Erzabi metahî hisni dîdar  
Wan lêk dikirin metah yek erz  
Texmîn dikirin bî tûl û w'eloz  
Sewdakerî eqş bûn di bazar  
Hem bayîlî hisn û hem xeridar  
Sersalî û bakir û rewalan  
Sedsalî ciwan û pîr û kalan  
Sersal li resm û rahî malûd  
Gêran diçû meqami mehmûd.

— 13 —

MIREXES RÛNA WIŞAQAN BI GULGEŞTA  
SERSALÊ REXBETKIRA WAN E BI BAZA-  
RA HISIN Û CEMALÊ

Qendili minir dêri ezreq  
Mişkati hemil kirin mirew-weq  
Sersal ko bû ji nû ve me'mûr  
Mir daye gerê di taze destûr  
Destûr ko bû ji bo wişaqan  
Rabûn hemî şibheti îşaqan  
Têk çûne bi marezâ mezadê  
Dildadeyî meqsed û miradê  
Îl-la bi tenê Memo û Tacdîn  
Wan dane xwe dixterane tezyîn  
Yanf di dema ko bûye tehwil  
Ew her du bira di came tehdîl  
Istebreq û sindisin di ber da  
Çend mehcer û miqrime bi ser da  
Kakûl kiri bûne tir-re her sê  
Perçem kiri bûne zilf û gezû  
Wan lew kiri bû libas tesrif  
Da qet nebitin li wan çu teklîf  
Pişîde libasi dilberanî  
Seyran dikirin bi sergirani.

151 — Jmarnavên sih, çil, pênçî, şest, heftê, heştê, not, sed bi « f » yê têne tewandin: Ji çill, şestî, notî, sedî, pênçî sedî, neh sedî, sed û çilî, hezar û du sedî, heft hezar û heşt sedî, çar mîlyon û sedî... bêtir.

Ev jmarnavên ha ji tewanga xwe didin navdêrên xwe û wan ji wek xwe ditewînin: Bi sih zêrî, ji çil bizîni, di nav heftê keçikî de, bi not eskerî ve, ji sed û pênçî çeleklî...

152 — HEZAR. Ev jmarnav ji gava bi serê xwe ye bi « f » yê tête tewandin û hikim li navdêra xwe jî dike.

Ji hezarî, ji yek hezarî, ji hezareklî bêtir. Ez hezar hespî dibînim, ez hezar mehtî dibînim.

Lê gava hezar bi jmarnaveke din ve bûye dikeve bin hikimê wê û li gora şewanga wê hejmarê tête tewandin: Ji çar hezaran, bîst hezaran, çel hezarî, çel û pênç hezaran, sde

hezarî, sed û deh hezaran... bêtir.

Ji milê din jmarnava hezar gava ne bi serê xwe ye û daye pey jmarnaveke din navdêra xwe nema dikare bitewîne. Min ev tişt bi hezar zêrî, çar hezar zêr, çel hezar zêr, çel û pênç hezar zêr, sed û deh hezar zêr kirî.

Vient de paraltre  
HISTORIQUE SOMMAIRE  
DU  
CHAR DE COMBAT  
LE MAITRE DU CHAMP DE BATAILLE  
par le  
Commandant L. FOUQUET  
des F. F. L.  
Ouvrage édité et diffusé par les soins du  
service de propagande des forces françaises  
combattantes en moyen orient.  
DANS TOUTES LES LIBRAIRIES

## PÊLOŞI U SISTI

Biranol Ev pêloşî û sistiya me' mirineke tevayî şanî dide. Belê çak bizanin û xwe mexapnîn. Xebata azadiya welêt ne ev e û tukes bi vê rêveçûnê ne gihaye qonaşê. Herwekî di nivîsara berî vê de jî min gotî bû tiştê ko nabe, kesan ne ditiye. Ezê bûyereke xwe dîtî ji we re ber pêş bikim:

Ji ber kc ez li Cizrê di Amûdê de dikançî me, divayên xwe pertel û tiştan derim ji Helabê dikirim, tînim. Herwekî berga rîya min Hesçe û Dêra-Zorê ye; tevi rêwîyan em ji Dêrê gihîştî bûn hember Reqayê. Makîna me di heriyê de ma û makîneke din jî hat û li me sekî. Li gora adetê tevi ajotek, em her du alt (12) peya lê kom bûn û me zor dida xwe. Lê me tu havil ne dikir. Ez lê varqîlm û min bi tenê (5) peya niqandin û ew dane sondê ko emê xwe ji dil û can bidin-ê.

Piştî peymanê me xwe ji dil da makîne û wek qertel ji newalê çeng kir jor û lê siwar bûn û gihîştin daxwaza xwe.

Em jî tiştê tewş û bekêr re merd in. Her keyakî me ê nexwende sê an çar rojnameyên biyaniyan bi çîl kaxedî dikire û Hawara zîman û tîpên xwe nakire. An dikire heq nade. An jî bi gote-gotê hêj dide. Herwekî gotiye: Yê bûkê ne zar e, ne zîman e; yê xesûyê ne dîn e ne îman e.

Malxirabinol carekê çavên hişyariyê vekin û li xelkê binihêrin. Ma hon jî her tiştî dide-xîsin: çîma jî tiştê qenc û pêşveçûna xelkê û neyarê xwe naqehirin?

Yezdan zanî û çav daye, jî bo dîtin û naskirinê. Yê me bi tenê jî bo bindestî û çav-pêhinkirinê. Ma hon nabînin adel û awayê pêşveçûna xelkê tev de jî me hewîsn û me jî bîr kirine. Herwekî di stûnên jêrîn de li bember hev dî bi rêz in:

IRO YÊN WAN  
Sala nuh  
Roman  
Mûsiql

BERÊ YÊN ME  
Nuhroz  
Çîrok û dîrokên me  
Saz, stran, bîlûr, dihol  
û zirna kevnare  
Wek roja Sîfî dane  
Tacdîn. Herwekî Ehmedê xanî gotiye:  
Texterewan wekî gemî bû  
Behra di bin de ademî bû.  
Ji mala mîr heya mala  
Tacdîn merov sekînl.  
textê wê bi hewa dan  
hev, heya gihandin  
mala zavê.

Ialqbal û dawet û intixab

## MELA

### EV DILMECÎDE KEN'ANÎ

Mela Evdilmecîdî ji xelkê welatê jore. Heyamê sala 1925an ew jî daketî bû Cizrê û bi awayê melan ew jî li nahîya Amûdê li gundê « Gundor » disekî.

Merovekî jî hevîna welêt û millet ne bê xeber bû. Benga Hişyar li ( Sinceqa Sadûn ) dibistana kurdî vekir. Pir caran nav di şagirtan dida, eger rê pêketa dikarî bû li gora xwe xebata welatê xwe bike. Lê mixabin mirinê jê re ne dûman. Ji ber vî qasî me dikir ko bi rûpelên Hawarê navê wî bête nivîsandin. Ji ber ko mêr dimire eger navê wî namîne. Û jî bo ko zendeyî jî ji xwe hevîdar bin. Vaye qesdîk jî qeşîdeyên wî ko bi evîn gotiye:

Cana were der jî niqab û jî hicabê bê şek te hebînim  
Ez hesretê te mame di vê qehr û ezabê pîr mest û

[ bezin im  
Beybûde meke emrê ezîzî di beqayê xursîdê semayê.

Eşqa te dilem sotî çî hacet bi itabê her subbe ê' dîn im

Pesnê te bi min qeyd û kemen zulfû ey şahê nigara

Suhtî te li min qelb û ceger ez bi şerabê ez nûrê

[ cebîm im  
Te divê tu li min berq û birûskan bireşî wer

[ min bihebînl  
Wer zîllê siyah derxe bi mawerd û kulabê dîl xerqê-

[ yî xwîn im  
Te divê ko min zir û zeber kî di hewayê wer der jî serayê

Te divê ko qiyamet li me bi xwe rabit da ez te

[ bibînim  
Ger bête sîmaa'n bi qidûma te mîbarek sed car

[ mîharek  
Rûhem ne mîzgîna beşîrê wê cewabê latq wê dibîniim

Hel-ta ko me niy-yet pencan di me biçkînl rûhem

[ derînl  
Bel ta bi qiyamet ez di nêv ax û tirabê nalin û enîm înu

Caran sûndê dixwim ez b' brûyê bilalê ser çeşmê xezalê

Şeb ta bi seher sebr û qerar bê te me nayê dil helîrê

[ enîm im  
Ken'anî tu bi eşqê mesojî cegerê reş ba'eqle mişew-waş

Kena'nî we şîabî çî nûşî şerabê der îlmê yeqîn im.

Amûdê: 8-4-1943

Şandox: SELÎM Ş. M. HİŞYAR

Dans  
Mîahede  
Tallîma siwarî  
Mobtlye

Dîlana Cerg-û Bez. Keç  
û xort tev de dikevin-ê.  
Soz û bextê eştran  
Terada cejin û şahîyan  
ya şerevaniyên me.  
Mehfûr û xalçeyên me  
ên bi neqs.

Heçî-zane jî xwe zane; heçî nizane baqê  
nîska ye.

HESEN HIŞYAR

## CHANSONS

La première des deux pièces qui suivent est une chanson de guerre yezidie, que j'ai recueillie chez les Bchérés. Elle est certainement très ancienne, puisqu'elle fait allusion à un combat livré par la tribu des Khaletân, groupement jadis puissant, mais qui a disparu depuis plusieurs siècles. Elle présente donc, bien qu'incomplète, un très grand intérêt historique.

La seconde est un « lavij » des Berwaris (Botân), comme les autres chansons de la même province que l'on a lues dans les nos 28 et 41 de Hawar, elle a pour thème un dialogue entre deux amoureux. Le printemps des cimes sert de toile de fond à cette idylle; chaque strophe est introduite par une évocation de paysages alpestres: hauts sommets dont la neige est en train de fondre, torrents qui dévalent des montagnes, oiseaux migrateurs dont les vols strient le ciel, le coucou qui chante déjà.

### ŞERÊ, XALITA

Delana, xweş Delanal  
Pêşiya malê me şer e, paşiya malê me ferman a!  
Şerê feqrê Êzîdiya, sofiyê Misilmana  
Xweştir e ji şerê nêrî û beranal!

Delana Başo, wa bi şitil!  
Çend peyayê Mala Zoro li serê girê Qereçerî  
[bûne gutil,  
Derbekê dane Hesarê cibo û Bimbaê Mîro,  
[Miço ê mala Şex İsa.  
Ji mala havê mi qelandin tovê bist û pênc  
[mêrên rimbîqetîl.

Delana Başo, li berê bendê!  
Mertela destê Hesarê cibo giran e, kete zendê.  
Şerê feqrê Êzîdiya û Sofî Misilmana  
Xweştir e ji reqs û govendê!

Lê darê! Delanal  
Pêşiya malê me şer e, tîlî ferman a!  
Pêşiya eşrê Êzîdxan çûye tîla Botana.

Delana Başo, bi qirkor e!  
Hespê Bişarê Zoro di meydanê de bore bore.  
Derbekê dane li Hesarê Cibo, Bimbaê Mîro,  
Ji mala havê min qelandin tovê bist û pênc  
[şêxê serbîporel

### LA GUERRE DES KHALETAN

Delana, beau Delanal  
Devant nos tentes, la guerre! Derrière nos  
[tentes, la proscription!  
La bataille que livrent les Faqirs yezidi aux  
[soufis musulmans

Est plus belle à voir que les combats des boucs  
[et des béliers (1).

Delâna Bâcho, couverte de broussailles!  
Quelques guerriers du clan de Zoro se sont  
[groupés sur le tertre de Qaratcheri.  
Ils ont touché Hesârê Djebo et Bumbaê Mîro,  
[Micho du clan de Cheykh İsa,  
Ils ont enlevé à la maison de mon père la  
[semence de vingt-cinq braves aux lances  
[meurtrières.

Delâna Bâcho, face à la falaise!  
Le bouclier que Hesârê Djebo porte au bras est  
[trop lourd, il a glissé sur son poignet.  
La bataille que livrent les Faqirs yezidis aux  
[Soufis musulmans  
Est plus belle à voir que la danse et la ronde!

O Delanal  
Devant nos tentes, la guerre! Derrière, nos  
[tentes, la proscription!  
L'avant-garde de la tribu d'Ezîdkhân (2) a ga-  
[gné les collines de Botân.

Delâna Bâcho... (3).  
Le cheval de Bechârê Zoro renâcle sur le pré.  
Ils ont touché Hesârê Djebo, Bumbaê Mîro,  
Ils ont enlevé à la maison de mon père la  
[semence de vingt-cinq cheykh's à la tête  
[chevelue (4)

### LAVIJ

Ezê li Xana Gosehê fikirîm, alkî jê heriftî.  
Ezê li dora girê Niskîn fikirîm, sosin û beybûn  
[tê re bişkiiftî.  
Xwezika wî lawî; du yar li gundî hebin, êk yar  
[be, ya dî dezgirtî!

Ezê li Herekolê fikirîm, ne mane kevî.  
Dora Kanî Ferşikê nêrim, porjan lê bîne dar  
[û devî.  
Ezê terka lawikê xwe nadim heta Korkendî!  
[bihele,  
Ji min û lawikê min re bibe gakeî û zevî!

Ezê li Mergûmarê fikirîm, mîrê hemî besta.  
Li Herekolê fikirîm, keviyo lê bîne mîna tîlyê  
[desta.  
Xwezika min behr' li bejna bilind hebiya,  
Bila Xwedê emanetê xwe ji min bixwesta!

(1) Les « faqirs » forment chez les Yezidis une caste religieuse. Ces vers renferment une allusion aux combats d'armement, jadis fort prisés au Kurdistan.

(2) C'est à dire des Yezidis. Il y a là une indication précise sur les anciennes migrations des Khaletis.

(3) Le sens de « qirkor » m'échappe.

(4) Les « faqirs » portent la barbe et les cheveux longs.

Ezê li Arnosê fekîrîm, mîrê hemî çîya,  
Lêbî jê derbîne, diçin ser milkê Kaxpiya,  
Ezê çengilê keleşgewra xwe bigrim, bîrevînim,  
[ bibim nav malê Qoçebegiya.

Ezê li Axîyolê fekîrîm, çî çiyakî xezeb el  
Ezê li Arnosê fekîrîm, qentarê nêriya lê bine  
[ celebe.  
Evînika xelkê dinya alemê hemî li ser dev û  
[ lêvan in,  
Ya min, rebena Xwedê, tinê ji dil û kezeb el

Qulingo, Xwedê kî ezê nîzanim ne tu koçer f,  
[ ne holis f.  
Tavikî baran dibarê, piçkê berfê ser çengê te  
[ diqerîst,  
Dema rêka te li Cizra Bota bikevit,  
Tu ji ber min ve keyfa zerî esmera bipîrîst.

Goyîno, xirabo, çîre dengê te li min nayê?  
Tu sibeha dixwînî li gumbeta Cûdî,  
Êvara xwe tavêjtî berojî Şaravayê.  
Tu kirasê belgê mishafê wergîrî, bawerîya mi  
[ li te nayê!

#### LAVIJ

LE JEUNE HOMME.

Je contemple le khân de Goseh, un côté  
s'en est écroulé.

Je regarde les alentours du tertre de Nes-  
kin (5), lis et paquerettes y fleurissent.

Comme j'envie le gars qui, dans son village,  
a deux amoureuses, l'une pour maîtresse, et  
l'autre pour fiancé!

LA JEUNE FILLE.

Je contemple le Harakol (6), il n'y subsiste  
trace de neige.

Je regarde les alentours de la source de  
la Pierre Plate, le chardons y poussent,  
drus comme des arbres, touffus comme des  
buissons.

Je ne renoncerai à celui que j'aime que  
lorsque fondront les neiges du Korqandil (7),

Et lorsque nous aurons, moi et celui que  
j'aime, au sommet de cette montagne, notre  
labour, notre champ.

LE JEUNE HOMME.

Je contemple le Mergoumâr, prince de  
tous les prés inondés.

Je contemple le Harakol, il n'y subsiste  
traces de neige, que minces comme les doigts  
de la main.

Puissé-je avoir part (à l'amour) de m'a-

(5) L'un des sommets du Harakol.  
(6,7,10,12,13) Hautes montagnes du Botân.

mie à la taille sveltel

Et que Dieu me réclame alors ( l'âme )  
qu'il m'a prêté!

Je contemple l'Arnos, reine de toutes les  
montagnes,

Des torrents en dévalent, qui submergent  
les terres de Kakhpiya (8).

Prenant le bras de ma belle, je la veux  
enlever; je la conduirai parmi les tentes des  
Qotchebegi (9)!

LA JEUNE FILLE.

Je contemple l'Aghiyol (10), quelle mon-  
tagne terrible!

Je contemple l'Arnos, les bouquetins mâles  
y défilent de cent façons.

L'amour des autres n'est que de bouche  
et de lèvres.

Pauvrette, le mien seul est de tout cœur!  
LE JEUNE HOMME.

O grue (11), pour l'amour de Dieu, es-tu  
nomade, es-tu sédentaire?

Il bruine, les flocons de neige se glacent  
sur tes ailes.

Si ta route passe par Djezira Botân,  
Informe-toi, en mon nom, de la santé des  
jolies bunes.

LA JEUNE FILLE.

Coucou, maudit coucou, pourquoi n'en-  
tends-je pas ton chant?

Chaque matin, tu chantes à la cime du  
Djoudi (12),

Et le soir, tu gagnes le Chârâvâ (13).

Si même tu portais une tunique faite avec  
les feuillets du Coran, je me méfierais de toi!(14)

#### TAWÛSPARÊZ

(8) Village de la plaine.

(9) Tribu nomade du Botân, réputée pour la beauté de  
ses femmes.

(11) La grue est souvent évoquée dans les poésies populaires  
kurdes. On lui demande en général, comme ici, de porter des  
messages.

(12) D'après la légende, le coucou aurait jadis été un homme.  
Ayant assassiné son frère il fut changé 'en oiseau. Il crie:  
' Keko, keko: » ( Frère! Frère! ), ou encore: « Kê kuşt? Kê kuşt? »  
( Qui a tué? Qui a tué? ). Cet oiseau a donc mauvaise presse  
dans le folklore kurde.

L'usage existait autrefois de porter des chemises, sur lesquelles  
étaient brodés des versets du Coran, afin de se préserver du  
danger.

Kiriyaariya Hawarê:

Jibo Sûriyê 5 lireyên sûri - Ji bo welatên din li rêkî ingiltzî

Xwedî û gerindeyê bîpirsiyar: Mîr Celadet

Alî Bedir-Xan, Şam - Sûriye

Directeur Propriétaire: Emir Djéladet Aali

Bedir-Khan, Damas-Syrie

ŞAM — ÇAPXANA TEREQIYÊ — 1943



DI VÊ HEJMARÊ DE

Tefsîra Qurane	Dr. K. A. Bedir-Xan
Lwis Pastör	Herekol Azizan
Diwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Daylan	Osman Sebrî
Memozîna Xanî	Herekol Azizan
Diljarê Xemgîn	Ehmed Nami
Hawar e	Salih Bamernî
Pênivîs	Mirzangî Belbeşîni
Şeytanqûnî	Osman Sebrî

## TEFSÎRA QURANÊ

23 — Mehrkirina jinên xelkê ji we re heram e, meger ko ev di meydana şerî de ketine destê we û bûne cêriyên we. Dot û jinên din hemî, ji we re, bi emrê Xuda hatine helal kirin, da ko hon dest ji zinayê bikişînin, û di riya helalê de, bi peryên xwe, li gora daxwaza dilê xwe, ji xwe re jin û cêriyên helal werînin.

Gava hon, ji xwe re jinan ditînin û nîzîkî wan dibin, divê hon mehra wan, herwekî hate gotin û heke dil dikin hêj zêdetir ji bidin wan; heke hon, bi wan re li hev tînin, û jê parekê an mehra ko ji we birin, bi temami vedigerînin we, standina wê, ji we re nabe tu guneh, Xuda zana û fêris e.

24 — Heke destê we teng e, û hon nikarin, ji xwe re jineke misilman û aza werînin, bila cêriyeke misilman pêda bikin û bi destûra xwediyê wê, ji xwe re bînin û li gora adet û edaletê mehra wê bidin xwediyê wê. Xuda bawerîya we û halê we dizane. Herwekî hon hemî aza û cêrî, ji hev û dû hatine afirandin, heye ko hin ji we ji hinên din çêtir in.

Cêriya ko zewicî divê qedrê namûs û şerefa xwe bigire; mirovekî din, ji

xwe re neke dost û yar, û zinayê neke; heke cêrî paş ziwacê, van tiştan dike, cezayê wê, nivê cezayê jineke aza ye:

Destûra anîna cêriyan herçend ji, ji mirovan re hate dayin, ko bê jin nikarin bisekinin, û ji kirîna zinayê ditirsin; lê herhal ne anîna cêriyan û şebir kirin ji we re bixêrtir û çêtir e. Xuda delal û rehîm e.

25 — Xuda dixwaze hikim û emrên xwe şanî we bide û we bigehîne riya yên herî we, riya Ibrahîm û Ismaîl a rast. Xuda rêberîya we dike, da ko hon xwe ji gunehan bidin paş. Xuda ji tobebaran re tobê dide, Xuda delal û fêris e.

26 — Xuda dixwaze ko hon tobekar bibin û ew di gunehên we bibore; xudankitêb û dîn-nezan dil dikin, we ji riya rastîyê derînin.

27 — Herwekî mirov qels hatine afirandin Xuda dixwaze barê mirovan sivik bike.

28 — Geli bawermendan..... Malê hev û dû bê heq û bê rê mestînin û mexwin, meger ev, di riya ticaretê de û bi rîza her du terefan çêdibe. Nefsa xwe mekujin û bi kuştîna mirovên din, canê xwe medîna kuştin. Xuda bi we re delal û dilnerm e.

29 — Yên ko van tiştan dikin, divê bizanin ko emê wan bavêjin agirê do-jehê, û gihandina wan a wê derê ji me re ne tu zehmet e.

30 — Heke hon destên xwe, ji gunehên mezin dikişînin, em gunehên we ên piçûk ji ewî dikin, û we degihînin bihuştê.



LWIS PASTÖR [ LOUIS PASTEUR ]

1822 — 1895

Gava em çêl li mirovên ko xizmeta Însaniyetê kirine dikin, ne gerek e em bibêjin ko wan mirovan di yek wextî de xizmeta milletê xwe jî klirine. Milletê wan jî birekî Însaniyetê ye. Ji lewre heçiyê ko xizmeta milletê xwe dike, xizmeta Însaniyetê jî dike. Bi tenê mirovine welê hene ko bi keşf û îcadên xwe rast bi rast û bila wasite xizmeta Însaniyetê dikin. Herkes jî wê xizmetê rasterê fêdê dibîne. Pastör ji wan mirovan e ko jî keşfên wî Însan, heywan her candar fêdedar bûye û heta roja qiyametê jî ewê jê fêdedar bibin.

Lwis Pastör li 27ê Kanûna-pêşîn, sala 1822an li Fransê, di bajarê Dolê de ji deya xwe bûye. Bavê wî di ordiwa Napoléon de esker bû û bi mêraniya xwe deng da bû. Gava felek li Împeratorê Fransê geriya û Bonapart şikest û neyarên wî ew û eskerên wî hêsr girtin bavê Lwis qebûl ne kir ko sûrê xwe veke û bispêre dijmin.

Bavê Lwis digot ez sûrê xwe nadim. Xuya dikir ko mirin da bû ber çavên xwe. Zabitêkî nemsewî gava ezm û qerara wî eskerî dît, jê geriya û destûr da ko sûrê wî pê re bimîne.

Ji piştî wî bavê mêr mêrekî qenc daketî bû. Lê kur ne şerê Însanan; lê şerê nexweşiyên dê bikira.

Lwis hêj du salî bû. Êvaran, gava bavê wî ji xebatê vedigeriya mal kurê xwe dikir ser ejnûyên xwe, jê hez dikir û digot-ê: « Kurê min, di jiyîna eskeriyê de min gelek meşqet kişandine. Min divêt tu bi xwînî, bibî zanakî xurt. Min navê ko tu jî wek min zehmetê bikişî » . Deya wî dikenî û bi ser ve dikir û digot: « Belê divêt kurê me bixwîne » .

Dê û bavê Lwis gava ev tişt digotin, bivê nevê wan jî wek kurê xweê dusalî tiştê ko ayendê jê re vedîştart ne dizanîn.

Di vê navê de famîlya Pastör guhasti bû bajarê Êrbwayê. Ji ber ko bêv di wî bajarî de debaxaneyek hebû. Lwis jî dest bi xwendinê kiri bû û diçû dibistanê; lê ne ewçend heweskar bû. Li dibistanê jî xwendinê bêtir bi çêkirina resimên heval û mamosteyên xwe mijûl dibû. Carina jî li şûna ko here dibistanê, diçû ber çemekî û masî digirtin. Lwis di resim û neqşê de gelek xudan-qabiliyet bû. Dibêjin ko lê bixebitiya wê bibiwa resamekî mezîn.

Bavê Lwis li ber halê kurê xwe diket, şret lê dikirin û nûxweriyê xwe dihêvotê xwendinê. Ji xwe gelek ne bori zanayê ayendê dev ji resim û masfvanîyê berda û meyla xwe da xwendinê.

Lwis bû bû şanzdeh salî. Bavê wî rabû

û ew jî bo xwendinê rêkire Parisê. Lê bihîna Lwis, li Parisê teng bû û zûka bêriya gundê xwe kir. Lwis di vê babetê de ji bevalekî xwe re gotiye: « Ax min careke din bihîna debaxanê bihîna bikira. Ez dibêjim qey bihîna min pê wê vebiya »

Lwis li Parisê gelek dom ne kir vejeriya gundê xwe. Bavê wî vê carê kurê xwe rêkir bajarekî nzingf gundê

wan. Vê carê Lwis xebitî û yekcar meyla xwe da xwendinê; nemaze hikmet û kîmyayê.

Lwis di sala 1847an de şehadetname tibiyê girt. Pastör hingê 25 salî bû. Pastör beriya ko şehadetê bigire, hêj di dibistanê de dest bi keşfê kiri bû. Du madeyên kîmyewî yên ko beriya hingê wek madeyîne xweser dihatine besêb îsbat kir ko ew made ji yek eslî ne.

Pastör piştî ko şehadetname girt di ûniversîta Strasbûrgê de bû bû miawînê seydayê kîmyayê. Êdî Pastör terka kîmyaxanê ne dida. Dibêjin ko di roja ziwaca wî de rexma kî vewendî tev de hati bûn û her tişt hazir bû bû; Pastör xuya ne dikir. Lê geriyên û ew di kîmyaxanê de peyda kirin. Pastör ji bîra kiri bû ko roja ziwaca wî ye.

Pastör jî Strasbûrgê hati bû Parisê û di sala 1867an de di Sorbonê de dersa kîmyayê digot.

Cerahî yanî qelagtîna bedena mirov sin-hetekî kevin e. Lê heta keşfên Pastör gelek caran nexweş bi emeliyatê diketin û dimirin. Li gora statîstîkên wî wextî jî mirovên emeliyatbûyî jî sedî çil xelas ne dibûn. Ji lewre gava digotîne nexweşan divêt em ji te re emeliyatê çêkin; zû zû pê qail ne dibûn. Nexweşan-digot: « Ma çîre bila sebeb em xwe bidin ber êşa emeliyatê. Ma dawî dîsan ne mirin e. Ji me re çêtir e ko em bê emeliyat bimirin » .

Belê hingê piraniya nexweşan bi tesra emeliyatê dimirin. Lê ne di dema emeliyatê de an piştî wê. Lêbelê piştî du sê heftan. Yanî emeliyat qenc çêdibû, devê birîne, carina, di hate hev û piştî, ji nişkekê ve xwîn jehri dibû, canê nexweş diwerimî û nexweş emirê Xwedê dikir.

Ma çîre? Heta hingê keşf ne dizanî. Heta hingê bijîşkan bawer dikir ko mikrob di her derên nexweşan de xwe bi xwe û bî sebebeke derveki peyda dibin; di canê nexweş de zêde dikin û wî dikujin.

# DIWANA MELE

— 42 —

Tu dızanî bi Xwedê min tu xeyalî şeb û roz  
Bi xeyala xwe mudam min tu li balî şeb û roz  
Her bi mizan direşnin cegerê tîr û xedeng  
Ji neşeq salqe me j'qewesê hîlatê şeb û roz  
Mîslê goşîn te rawan nala ji dil tén miskîn  
Em nizanin tu çi ra herwe dînalî şeb û roz  
Te ji feryad û fîxanan bi xwe bilbil ker kir  
El-lah el-lah ji çi derdî weh dikalî şeb û roz  
Da ko dilber qedemê lê binelîit rewşen' kit  
Lê tu xwîné ji çavan vedimallî şeb û roz  
Te tenê zewq û sefa kir be çunîn dilberê ra  
Sernixwîn geh şîbhê nûn geh wekî dalî şeb û roz  
Fetweya pîr û melaya tu bi îlahmê bihê  
Wê meyê her we dînoşî bi helalî şeb û roz.

— 33 —

Çin çin kîrin zilfên siyah keskê atlas e qeba  
Edî nişan nadin xweya têkil kîrin badê seba  
Min dî seba daye seher medarê bedrê kir bi ker  
Qews û zehê jê hate der dîsa bi zilfan ra teba  
Îro li me bedra temam enber feşand û sed selam  
Ey Hudhudê şîrînkela emhlen we sehlen merheba  
Min dilberê wek dur heye mehbûbek şîrînsur heye  
Husn û cemalê pîr heye Belqîs sîfet mesken Seba  
Me d'vê ko dîsa dilberê hey hey li îslûba berê  
Keşî bi ji toqa pencerê bê û biçî teşbîhê ba  
Şûx û şepala meyperest ew zalîma hişyar û nest  
Wê nameyê xef de bi dest fi tey-yuha neşr û nebat  
Bêj wê şîrîna surperî durdaneya ez mîşterî  
Ka ebd û peymanî berî bê feyde çû teşbîhê ba  
Meyşekera spî dest û zend zanîm bi halê name xwend  
Lêwan tebesîm kir ji qend mastîm keban û fir û ba  
Dilber bi halê name dî nasî ko nişana me dî  
Nûnek mixalîf tî nedî hel qelbiha nehwi s-seba  
Qasîd bi meqsûda me hat ba mijde û emr û berat  
Nişan hînarîn hem xelat şehzadeya gulûn qeba  
Îro mecalê hate wext dîsa ciwan bû min dî rext  
Ew lamîa danî ji text ma kane şerçîn xwe leba  
Selwa rawan zêrîn werez ç'çek melê dîn yek neşeq  
Yaqûtiha yuhkî şefeş yuhkî uqûden kewkeba.

Lê Pastör hi vê nezeriyê qaîl ne dibû.  
Zanayê mezin bi eîqîda xwe a nû ket kîmya-  
xanê û li mikrobên ko mirovan dikujin gerîya  
û piştî xehateke zor îsbat kir: mikrobên ko  
mirovên emeliyatbûyî dikujin xwe bi xwe û ji  
canê wan peyda nahin, ew mikrob ji derve  
tên, dikevin hundirê canê mirov, tî de zêde  
dibînin û nexweşan dikujin. Ew mikrob ji wek  
tozê di hewayê de difîrin bi dest û aletên  
emeliyatê ve dibînin.

Piştî ko sebeb batî bû eşkere kîrin tevdir  
hêsanî bû. Diviya bû dema ko beden dibate  
qelaştin nehflin ko mikrobên derve bikevin  
hundirê bedenê. Mikrob tiştine ewçend hûr in  
ko bi çavan nayîne dîtin. Lê mirov bêt ko  
wan bibîne dikare wan mebiw bike. Derma-  
nîn hene ko mikrobên dikujin. Oda emeliyatê

bi wan dermanan tete şwîştin, aletên emeliya  
tê ji tene kelandin û sotin û bi vî awayî ew  
jî ji mikrobên tene saff kirin. Herçî bişîşk  
destên xwe bi dermanan dişon û lepikine  
kewçûk yên ko hatine kelandin bi destî ve  
dîkin. Bi vî awayî rê ji mikrobên re çênabe ko  
bikevin hundirê bedenê û zererê bigehnin me.

Nezeriya Pastör ev bû. Wek her tiştê nû  
ev nezeriyê jî kete ber eksê 'xelkê. Bişîşkên  
wî zemanî henekê xwe pê kirin. Lê piştî tec-  
rîbene ge'êr ( mite'ed-dîd ) gava rastiya neze-  
riya mikrobên hate seh kîrin xelk li dora Pastor  
civîyan û qedirê wî zanîn. Edî nexweşên eme-  
liyatbûyî bi piranî dijîn û kêrî caran dimirin.  
Xwedê dizane heta niho, çend mirov xerâ  
nezeriya Pastör ji mirîné xelas bûne.

Pastör piştî ko, nezeriya mikrobên danî  
û ev nezeriyê çû serî, xerâ vê nezeriyê gelek  
tiştî keşîf kirine. Di nav hinên din de mikrobên  
ko nexweşiyên diguhêşînin û wan bi peyayên  
sax dixin. Di vê navê de Pastör dermanê seyê  
har û yê dîsteryayê jî peyda kir. Ev her du  
nexweşî jî nexweşîne mikrobîn in. Pastör  
mikrobên wan keşîf kir û ji bona wan mik-  
roban dermanîne welê xurt peyda kir ko ew  
bi wan dermanan tene kuştin. Wan dermanan  
bi şîringê dikin bedena mirov û ew têkîllî  
xwîné dibînin û wan mikrobên dikujin û ne-  
xweşan sax dikin.

Fransê welatê hevrişîm e. Di nîvro-yê  
Fransêyê de xelk kûrmê hevrişîm bi xwedî  
dikin. Hevrişîmê Liyonê bi nav û deng e.

Di wextê Pastör de nexweşîk bi kûrmên  
hevrişîm ketî bû; kûrm pê dimirin. Ev tişt jî  
bo xelkê nîvro-yê Fransê afetek bû. Wezîrê zira-  
etê li ber vê afetê bêgav ma û miracett  
Pastör kir.

Pastör rabû çû nîvro û leboratwarekê, tî de  
danî û qederê çar salan hê etlahî bi şev û roj  
xebitî û dermanê vê nexweşiyê peyda kir û  
gundiyên hevrişîmkar jî feqîrî û xîzîniyê xelas  
kirin. Hîngê hevrişîmê Fransê li salê sih mîlyon  
fîreng kar tanî.

Di vê hengamê de bû ko keç û bavê  
Pastör emîrê Xwedê kirin. Pastör bi xwe jî ji  
ber vê xebatê û mirîna keç û bavê xwe gelek  
perîşan bû bû û nexweş ketî bû. Ewçend ko  
gelek caran xelkê wî jê îmda xwe dibîrîn. Lê  
Xwedê dixwest ko Pastör hêj xîzmeta însani-  
yetê bike û qasîdê xwe jê re nêkerî.

Dîsa di wextê wî de nexweşiyek bi mirîş-  
kan ketî bû û bi hezaran mirîşk pê dimirin. Jî

# DAYLAN

## JI BIRËN ROJËN KEVIN

Hê ji min dil herişandê  
Suhtiyê arê te me,  
Hiq û aqil şewişandê  
Sews û hîmarê te me.  
Bêt li min binhêr çi roj e,  
Eşq hinavaş, pîr disoje,  
Kir li min dinya te doje  
Zar ko neyarê te mel..  
Her çima ji min bi naz ??  
J'bestê kambax her digazf,  
Bes nîne ev xêrnexwazf?  
Xweş mîvandare te me.  
Bo çi evqas bê iman ??  
J'pirsa halan cangiran !!  
Hinde sal in ko dizanf,  
Keti ber barê te me..  
Daylanê b'navê Xuda kf,  
Destê min bigrf û rakf,  
Dil xopên bûye avakf,  
Gêj û şingjarê te me..  
Çer dikim tu nayê rayê  
Can ji bo te kir fedayê  
Bîr bibe roja Belayê  
Ez xerîdarê te me.

Min çelen da bû Humayf,  
Dil û can b'heftê belayf,  
Ger çiqas pirtir hêja yf,  
Ma ne xemxwarê te mel...

Hê çira şewlê li dil da  
D'histanê reyhan û gul da  
Navê me bilbil te hilda  
J'hîngê va pergende me.  
Sosina nava welat f  
Wey li ser çavên me hatf.  
Rô li min fro hilatf  
Rûgeş û pîrxend eme.  
Pîrs û sokendan di bîr im,  
Canecan û dil esfr im,  
Lê bizan ko hê feqîr im,  
Ser di her şermende me.  
Matê wê rewşa pilengf  
dişkênin bazik û çengf,  
Her tu serdar û celeng f  
Mîr tu f ez kole me.  
Min berf j'eniya keleş bû,  
Him Sefa û berê reş bû,  
Hec tikûz Merwe pê weş bû,  
Tehtë bîra Zemez e  
Ebrû te xençer mîsal in,  
Wek tîran bijang heval in,  
Dilketi ji dest dinalin,  
Sofiyê b'cerbeze me.

Çavên te kaniya mirazan,  
Dame ber pençên du bazan,  
Wekî rimbazên Berazan,  
Ez kirî exterme me.  
Dildize çenga qiloft,  
Difnê teyrîn cerg disoft,  
Wî zarê şîrîn digoft,  
Sorgula tewrinde me.  
Sê deqan j'dêmf venîştin,  
Hêreker tev da ne hiştin,  
Hin revandin bin dikuştin,  
Yek ji wan şerpeze me.  
Lêv yaût didan mirarî,  
Mest kirim pelka giharî,  
Wek mesîh miriyan dikarî  
Vejnî, ez mirde me.  
Dilbewardê b'xêr û bêrê,  
Biskherîrê ser bi zerê,  
Kirime dergehvanê dêrê,  
Dêr tu f ez keşe me.  
Veger himbêzê xwe têxim,  
Tayê dil b'pêta te vêxim,  
Can bi canan ra bi rê xim,  
Ma tu hê qey ez hemel...

Madegeskar: Sent-marî 15-3-936

OSMAN SEBRÎ

milê din bi pez re jî nexweşiyek peyda bû bû.

Hikûmetê ji nû ve berê xwe da Pastor. Pastor mirîşk derman kirin û li nexweşiya pêz hûr bû. Hêb bi pêz keti hû.

Nexweşiya pêz ji berê de nas bû û dîktor û beytaran ew li gora xwe derman dikirin; lê tu havil jê çenedibû. Pastor piştî ko li ser nexweşiyê vebû rabû ji her welatê Ewropayê dîktor û pîspor ezimandin û civatek danî. Pastor 50 pezên nexweş anîn. 25ên wan pîsporên din bi isûlê xwe derman kirin. Herç hîst û pîncên mayî Pastor ew li gora keşfa xwe derman kirin. Ji pîzikên wan hinek edap girt û ew edap li pezên nexweş şîringe kir. Pîsporên din dikenîn. Lê piştî çar rojan pezên ko wan derman kiri bû tev de mirin û yên ko Pastor derzî li wan xistî hûn hemî jî sax bûn.

Pastor piştî wê zefêrê xwe yekcar da nexweşiya seyan, seyên har. Heta hîngê dermanê segestî şewitandin bû. Piştî gesticinê heta bi nîv saetê cihê gestî bi besinekf sor disotin. Lê tu bavil jê çenedibû, nemaze zaroyên gestî, tev de dimirin.

Pastor ji zarotiya xwe ve bala xwe da bû hariyê. Gava neh salî bû, di dora gundê wan de gurekf har peyda bû bû. Wî gurî dev li

heywan û insanan kiri bû. Heywan û insanên gestî tev de miri bûn. Di nav wan de lawikek hebû. Lawik anî hûn dikana hesînkerekf û ji pêşçavên Pastor ve birîna wî soti bûn. Pastor ev menzera hezîn qet ji bîr ne dikir û ji hîngê ve kiri bû serê xwe ko jî wê êşa xedar re tevdîrekê bibîne.

Edî Pastor li seyên har digeriya. Heçî deran de saxlûxa yekî didan; diçû wê derê; gilîza wî tanî û ew tehlîl dikir. Piştî tecrîbeyîne gelêr Pastor rabû ji gilîza seyê har seromek çêkir û ew di canê kêvroşkekê şîringe kir û paşê ji wê kêvroşkê re gilîza seyê har da vexwarin. Kêvroşk ne mir. Ev serom li ser gelek kêvroşkan ceriband ne yek jî ne mir. Ev miwefeqiyeteke mezin bû. Lê derman diviya bû li ser însên bihata ceribandî.

Di sala 1885an û di meha Çiriya-pêşîn de, di çiyayên Jûrayê de şeş xortî li ber pez bûn. Seyekî har dirêjî wan kir. Zarokan ji ber baz da. Seyê har xwe gihande piçûktirê wan û ew avêtê erdê. Birayê wî gava çev hal dît li se zivirî û birayê xwe ê piçûk bi zor xelas kir. Lê seyê har dev lê kiri bû û diranên wî di zenda wî a çepê re çû bûn. Lawik anî bajêr, hakimê bajêr şîret li dê û bavê wî kirin

MEMOZINA  
EHMEDÊ XANÎ

— 14 —

MILAQÎ-BÛNA TACDÎN Û MEMÎ  
YE BI SÎTÎ Û ZINÊ, MISTEX-  
REQ-BÛNA WAN E DI BEHIRA  
EŞQ Û EVÎNÊ.

Wan her du guri di came tebdil  
Wextê dikirin di şehri tehvil  
Nagah ecayibek nima wan  
Yek ciz' ji eql qet ne ma wan  
Ditin di mehel-le û zikakan  
Her kûçe û xurfe û şibakan  
Sed taze ciwan ji rengê serwan  
Diba û herir û xez di ber wan.  
Pansed ji keç û kur û rewalan  
Ewçend ji qismi pîr û kalan  
Enwa'î mizek-ker û mien-nes  
Hindek di birehne, hin mileb-bes  
Hindek di eali û ekabir  
Hindek di qdanî û esaîir  
Pêxwas binek, binek di serkol  
Kaşo ji pîyan û ser weki hol  
Sermerst hinek, hinek di serxweş  
Dembeste hinek, hinek di demkeş  
Gûyende hinek, binek di xamûş  
Pûyende hinek, hinek di medhûş  
Hin came-derîde, hin di serxweş  
Hin eql-remide, hin mişew-weş  
Hindan dikirin şîxan û feyad  
Hin bûne ji qeydi eql' azad  
Heryek di meqamekî digergûn  
Heryek di cefayekê cegerxûn  
Ev her du demek veman tehey-yir  
Bûn xerqeyi lic-ceyl tefek-kir  
Tacdîn sekinî û pîrsiyar kir  
Pîrsa xwe bi êk yextiyar kir  
Go ey xidîrê rehî hidayet  
Bêj' ev çi bela ye bê nihayet  
Wî got du şehlewendi şed-dad  
Îro li vî xelkê bûne cel-lad.  
Herçî ko dibînin ew du serxweş  
Filhal dikin nîba mişew-weş  
Wan go te ne di ko ew çi reng in  
Wî go du kur in, ziyade şeng in  
Wan go ko bi şîr şesper in ew  
Ya ne bi xedeng û xencer in ew

Wî go ko bi kemzê û bi awir  
Xelkê dikujin weki bi keybir  
Wan pîrs dikir ko gur libînin  
Da bo xwe bi merdî dest hilînin  
Her du di wî karî bûn ko nagah  
Ditin ko ji mehzi qudretîl-lah  
Ew ber du puser weki du peyker  
Tebende bi şekli şahi exter  
Yek hey'et û şikl û yek libas in  
Em-ma di wî şehri reng nenas in  
Stret-melek in surperi ne  
Ne bayî'n ew ne mişteri ne.  
Van her du biran ko ew du ewbaş  
Ditin dil û can vedan bi şabaş  
Ewreng giriyan cinûn û waleh  
Edî qe ne bûn ji eql ageh  
Ne fehîm û xîred ne eql û ne hûş  
Gêr bûn li ser zemîne medhûş  
Filcimle ji eql û canî têr bûn  
Filhal ji dîr ve her du gêr bûn  
Wan her du ferîşteyên di kub-bar  
Ditin du melek ziyade dildar  
Mehpare ne lîken aştan in  
Dildarin e lê ceger kebab in  
Teşbih bi seydi nîm bîsmil  
Bê şîb'h gihane hali mişkîl  
Naçar bezîne ser-şikaran  
Fekrine rixê di wan nigaran  
Zanîn ko ne seydi serserî ne  
Serxêli sipahi dilberî ne  
Westan û nezer kirin bi diq-qet  
Wan hate bi qelbî rehî û rîq-qet  
Elqîs-se ji hisnî wan xezalan  
Rehmet kete qelbî wan rewalan  
Sir-ra dilî kir bi hev teel-lîq  
Nûra rixî wan bi hev tees-şîq  
Mekşûf terîqî aşînayî  
Rûban qe ne kîr ji hev cidayî  
Yekrengî û sirf alemî keyb  
Zahir dikir it-tîhadî lareyb  
Hîb-bê we kirin bi hev girîstar  
Hisnê we kirin bi hev telebkar  
Te digo ko çi qalib û çi meqlûb  
Her çar çi talib û çi meqlûb  
Bê şîbhe yek in çi ten çi erwah  
Ew mit-tehid in çi can çi eşbah  
Hîb-ba di dilan we kir helawet  
Bu'zza di dilan we kir edawet  
Nîsbet bi me hadis in edim in  
Lîken ji heqîqeta qedim in

Lewra ko cinûdi can mûezen-ned  
Çêbûne di lîmî heq mûxel-lêd  
Hin mu'telif ih binek mixalîf  
Hin mixtelîf in hinek mu'alîf  
Wan mu'telifan bi yek ve lîfet  
Axîr we kirin ne ma çu kulfet  
Yanî ko ewan gurê di xûnxwar  
Gava wehe dîtin ew birîndar  
Ew her du bi sed dilan hebândin  
Rûniştin û her du wergerandin  
Gavek seyirin li bejn û balan  
Pêlek heyirin li zilf û xalan  
Gotin ecêb ev keçên di kê ne  
Yan her du me'lakê di Xwedê ne  
Ev meywe li kê cihî giha ne  
Ev gul di çi gulşenê nîmame  
Serwên di çi cûybarê kê ne  
Teyrên di çi murxîzarê kê ne  
Mawerd ji hêstîrê di gulgûn  
Rihîlî li ruxê di wan di pur-xûn  
Eşqê kirî bûn wisane hişyar  
Wan we ko bizanin ew çi est in  
Lewra ko nîzanin ew çi nesl in  
Engûştîrê di wan ciwanan  
Kêşan ji esabî dîwanan  
Xatem ji enamîlê d'xwe kêşan  
Danîne cihan ji boyl nişan  
Yaqût bi nîlîriyan gehûrlin  
Elmas bi şûşeyê d'belorin  
Sersal û xweşî ji dest bi der dan  
Eşqê xwe bedelî kirin bi derdan  
Nagah ecanîbin xuya bûn  
Nakam kirin wedah û rabûn  
Man her du bîra weki du seydan  
Pabestî selasilan û qeydan  
Rabûn ko şevêk siyah û tarî  
Şems û qemeran kirî tewarî  
Reh şîbhetî murxî nîm bîsmil  
Bê qew-wet û bê tiwan û bê dil  
Serwanî dewar û ser'û mehrûr  
Sewda û fîad û xebî û mexmûr  
Sed car diketin asîtanan  
Het-ta ko gihane aşîyanan  
Herçend gehîştîne meqaman  
Em-ma ko li wan du telx-kaman  
Roj û şev û wext û silb û êvarî  
Yeksan dinîma li wan bi yekcar.

ko zaroyê xwe bibin Parisê cem Lwîs Pastor.  
Hemî zarok mirî bû, lê heye ko...

Pastor gava lawik dit hinek dudilî kir. Lê  
ji ber ko di lêwik de tu hêvî ne ma bû  
Pastor rabû û şîringe li nexweşê xwe da. Xewa  
lêwik dihat lê xewa diktor ne dibat; gelo wê çi  
bibiwa? Pastor dermanê hariyê peyda kiri bû.  
Lawik sax bû û ji hingê ve ji mirovên segestî,  
beke hatine derman kirin, ji sedî bi tenê yek  
dimire. Lê beriya Pastor ji sedî sed dimirin.

Pastor' bi vî awayî beta dawîya emirê xwe

bi keşîfan xerik bûye û ji dinyayê re xizme-  
tîne mezin kirine.

Di sala 1870î de fransîzan ji elemanan re  
pênc mîlyar freng tezmînat da bûn. Yekî ji  
hevçaxên Pastor gotiye: « Keşîfên Pastor ber-  
berî wan pênc mîlyon frangan in ko fransîzan  
daye elemanan ».

Pastor li 28ê Îlona sala 1895an piştî nîvro  
emirê Xwedê kiriye.

Civata ko navê wî lê ye « Ênstîtû Pastor »  
di vî warî de xebata vî fransîzê mezin pêş ve  
tajo.

HEREKOL AZÎZAN

## DILJARE XEMGIN

Dilo jaro ji xew rabe, ji derdê miletê xemgin  
Xebatê plr bike fro, bi serbestî bibe zengîn  
Me Tacdîn û Çeko nînin, xeberdarê me bê Gurgîn  
Bi tole û balafir rabin, bîzozanê dilê xemgin  
Erê xortê ciwan pîrsê li dapîra xwe qet nakê  
Welatê me gelek rind e, eger carek temaşa kê  
Li hawîrê cihan meyzê, xerita wî xuya nakê  
Mixabin mîletê kurdî, welatê te bibê xemgin  
( Dîtîrsim eyî weten bimrim, ne bînin bextiyar l tû )  
Lî bin pencê neyaran tim, bi ah û nal û zar f tû  
Bi wê xwîna şehîd û xa, ziyân rihîtin bi xakê tû  
( Binosin ba ll ser qebrim, weten xemgin û ez xemgin )  
Şev û rojan bi ahîna, tu bes nakî ji van nala  
Çl mîkrob e li canê te, ko dewra wê dû sed sala  
Here nik Nafîzê kurdî, bişîşk e ew bi ehwala  
Welatê min heta kengê, bi vê janê dibê xemgin  
Gelek mîlet bi vl derdî ketin lê wan hebû pisyar  
Xebat û xwendinê zû zû, mezanê wan kirin serdar  
Bi mîranî bi xwîndari, welatê xwe kirin hişyar  
Bi daxwaza xwe dil şa bûn, ji bel me kes nema xemgin  
Heylî bo me çl hêja ye, ne arvane ne ji dore  
Hewar û gazî yet dûr in, ne me zêr e ne me zor e  
Nezanî çendî dijwar e, ji wê xweştir tenê gore  
Hezar ya melkî û xanf, di vê rê de mirin xemgin  
Xebata bê sipas vêk re, bikin kurdê cihan alem  
Wekî dil paqijî bo me, yekîtî ji divê her dem  
Bi vl terzî welatê me, dizanim dê bijî an dem  
Bedir-xan û Silahedîn, şehîdên we ne bin xemgin  
Çiqas derdê Xudê dane, li hember wî beye derman  
Dibîstanan bi lez çekin, hepîsxana bikin wêran  
Nemaza xwendinê pir kin, ji bo me her ev in derman  
Bijî her dem welatê min, weke Namî ne be xemgin..

EHMED NAMÎ

## HEWAR E

Zozana mezin ya bê xudan e  
Xortên welatî yet jêk cîda ne  
Serkol û rûs in ne dexl û dan e  
Evro bewara şêrê cerdan e  
Hewar e, hewar, sed car hewar e  
Zozan û çîmen mane beyar e  
Xoyî û biyanî pêk ve neyar e  
Pilingêt geriya mane bêçar e  
Zeriyêt welatî ji birsa pîs bûn  
Lawên zozanan serkol û rûs bûn  
Pilingêt geriya bindest û xfs bûn  
Sihiyêt şêran bê deng û fs bûn  
Vemirîya guriya çavêt pilingan  
Nivandin girtin cardê nihinga  
Xarin vekuştin beta qulinga  
Xîn hate xwarê kefte delinga  
Biheştâ şêra bû behr û talan  
Şêr û Rûstemêt welatî ne man  
Hemî nivîstin ketine nav tirban  
Neyara rakir fermana kurdan  
Welat nemînim birin dijwar in  
Xoyî biyanî dûpişk û mar in  
Kul û birînê te sed hezar in  
Rondikêt çava wek tava dibarin  
Talan kir cihê şêr û Rûsteman  
Biheştâ kurdan tijî kir ji xema  
Tazî û şîfî ye l'ser çiya û çema  
Xudê me bibe nexoşî ne ma  
Welat netirse hezar hezar fî  
Bo jîna neyara jehrê di mar in  
Guriya evîniya te sofin xarin..  
Nav şer û gurmêna şêrê har in.

SALIHÊ BAMERNÎ

## PÊNIVÎS

Ofl pênivîs navekî şîrîna e. Di hemî deman  
de herê doşan e. Pênivîs serbest e, çl bête  
bîrê dê binivîse. Digerit li hemî cihan, diçite  
nav mîletan; serhatîna wan dinivîse, çak û  
xerabê wan dibêje, şerm naket.

Pênivîs paşîrê ev serhindê dibit şîr û  
mortal le destê xirapan dide.

Ho pênivîsol ge mîletê min xir zanf ban  
tu çend bilind î; nûke derdê xwe dajo te bêjin.

Ah pênivîs tu serbest î; çl bilê û bikî jîna  
te gelek e. Çiko serbest î naberdî, tu dikeviye  
ber lepên çak û xirapan. Lê navê te her  
pênivîs e.

Dê hinde caran bêjim, kuro werin wek  
pênivîsî bibin hfna rîfînda wî bin da we bibit  
di nav geliyan, kôyan, deriyan, zigê esman de.  
Da ko pênivîs herê serbest e. Çl dibêjin gell  
xwendevanên genc e kurd?...

E' zanim hon dibêjin aye pênivîsên Xudê

bo mîletê din daye, hûn kafîr in, ber delên:  
«Pênivîs, pênivîs em nivîsandîna kafîra nakîna».  
Ez dibêjime wan ma? Xudê Quran bo çl ne da  
mîletekî din, bo be Meke, Medîne rêkird? Ma-  
dam em çagên (ehd) wî ne?... Bo be tîpê  
tazî şand?...

We diyar e, Xudê çl zeban nizanî xênî  
tazî, ha? No, we niye; em di nav qarê da asê  
hûne ber wê fikrê. Xwedê rêkirdiye hîrdî  
zalim, mirovxwer, pûtperest, zendîq bûn, pa  
le manê ji wan ra Xudê bi tîpê tazî binart.

Madamkî Xudê Mihemd hênda pêxember-  
ran rêkirdiye bo serfiraziya mîletê erdên xir  
çima lêketin û ta bûne, mirov ber sahê mîletê  
furs. Çira? Ma herçî pêxemberî bebû ber nav  
mîletê tazî dibû. Qazî Xudê tazî xweş tivêt?  
No, hindî Xudê dizanî çl mîletekî xirap in her  
di nav da pêxember rakird. Herçî bit tîş û kar  
li wextê xwe de, da em bibîn mirov arîkariya  
pênivîsî bikin. MÎRZANGO BELBÊŞÎNÎ



# ŞEYTanQŪNI

— 1 —

« Şey'anqŭn: wekî her mîletî li nik me kurdan jî der heqê xerafatan da baweriyek heye. Li goreyî wê baweriyê, hîn mirî piştî mirinê radibin. Gava ew mirî navê kîjan mirovî hildin, ew jî dimire. Ji bo vê yekê kîjan miriyê ko şeytanqŭnî bibe bi merê dikujbin. Ji ber ko dibêjin, şeytanqŭnî bê merê bi tu tiştî nayê kuştin ».

Di hejmara Ronahiyê a 14 an da bi navê (terşê şevê) min bendek belav kiri bû. Di wê bendê da min hîn xerafeyên ko di nav kurdan da cih girtî jimarti bûn. Şeytanqŭnî, ji wan xerafan yek e. Îro min divê çirokeke qewimî li ser vî navê han binivîsim.

Li Serhedan feqeyên kurdan gelek hebûn. Dema ev feqe digehêştin Mela-camî (navê kitêbekê ye), ji bû pêşvebirina xwandin û zanîna xwe, hinekên wan diçûn Îranê û destûra xwe ji zanayên Îranê ên fêris distandin. Bi vê yeka han di nav heval û hogirên xwe da dilgir dibûn.

Bokeyên vê çirokê feqe Emer û feqe Hesen, piştî ko Mela-camî xwandî bûn, ji bo pêşvebirina zanî û standina destûra xwe berên xwe dabûn Îranê, li gundekî bû hûn mîvan û ev çirok li wan qewimî bû. Ji bo ko xwandevan qenc serwest bibin, emê rê bidin gotîna feqî Emer:

Dema em gihêştin sinorê Îranê bi êvara dereng ra em li gundekî bûne mîvan. Ji ber ko di gund da ode nîne, gundî mîvanên xwe dibin mizgeftê û her yek ji gundiyan jê ra nan û şivê dibe. Em jî rast çû hûn mizgeftê. Me bi gundiyan va bi hev ra nîmêja şivan kir û hîn me nan dixwarin ko dengê girtî û şivê bi ser gund ket. Gundiyan ko ji me ra nan anf bûn bi hev ra ev gotin dikirin:

— Kurê mixtar çû rebma Xwedê!.

— Çi kurekî çak û dilpaqijî. pir jî ne ajot..

— Di topa gund da kurekî welê peyda ne dibû.

Ji van gotinên han me zanf ko kurê mixtar piştî bekêfîyeke du sê rojan emra Xwedê kiriyê û canê xwe sipartiyê rubistîn. Bivê nevê hinek ji diltengîya gundiyan hati bû me jî. Nemaze, mirov î li ser rêkê be, di rîya xwe da raste miriyan were, ne tişteki xweş e.

Saetek ne borî ko rîsipiyekî gund ji aliyê mixtar va hate cem me. Ji me ra digot: heke hûnê şev li ser cendekê kurê mixtar xetmek quran bixwînin, emê cendek bişon û rakin mizgeftê. Mixtar wê di ber westa we va, du zêran bide we. Berê me î li welatê

biyaniyan bû û ji me ra dirav diviya bû. Ma qîma xwe bi vê gotinê anf. Piştî saetekê cendekê mirî anîn nik me û ber kes çû mala xwe. Me her dîyan jî destmêja xwe nuh kir û her yekî di hêleke cendek da çok berdane erdê û dest bi xwandinê kir.

Cihê em tê da, mezeleke biçûk, di rex mizgeftê da bû. Ev mezela ko ji du kunên biçûk pê va tişteki di diwarên wê da tine bû, bi tenê ji bo raketina mîvanan hati bû çêkirin. Pixêrî di nîvêka diwarê enîya derî da veketî bû. Cendek di nava tabûteke textinî da, serî herve agir û ling bi derî da bûn. Me her du hevalan weke kewê neçrê li pêşberî hev bi dengêkî nîvbişind quran dixwand.

Şev gîha bû nivî ko dengê xirtiniyekê li pêş min hat. Berê, min ne xwest ko bi gubên xwe hawer bibim. Lê pir ne ajot ko ew deng careke din bat. Êdî ji min ra şivîşk çebû hûn ko ew dengê han ji tabûteki dihat. Ji tirsan, nema çavên min dixwastin li rûpelên quranê binêrin. Min çiqas ceħda xwe dikir ko binêrim, herwekî binek bi zor çavên min badine ser tabûteki. Eqilê min li hev ketî bû. Heke hevalê min, ne ji pîrmijûlayiya wî hûna de tertilîna min hîr bibira. Lê xwandina bi dengê xurt, ew agahî halê min ne kir. Tu ne çû, careke din dengê xirçinê hi tabûteki ket. Ji her ko vê careki çavê min î li tabûteki bû, livîna dergehê tabûteki ê nîvbişmarkirî bi her çavên min ket. Ji tirsan dilê min, wekî teyrê ko bi dafan dikeve û bol dişe, xwe li ber devê min dixist. Ji ber ko hevalê miu feqe Hesen î bi çaveki bû û cendek li bêla çavê kor hati bû, tişteki ne didî.

Bi bawîka nuhkirina destmêjê ez bi derketim derva û min derî di ser feqe Hesen û cendek ra girt û li paş kuneke diwêr gubdariya balê wan kir. Bîstek ne çû ko tabûteki carekê liviya. Hînga feqe Hesen her tişt zanf û zûka revî ber derî. Lê mixabin ko derî girtî dît. Carekê bi hêl rahîşte derî û hezand, hînga du sê dangan gazî min kir. Di vê navberê da hû ko cendek xwe qenc tev da û derê tabûteki li ser xwe rakir. Bi rast hêreke ziravqelsû bû. Hema pê ra qerqer (kefen) jî bi ser serê xwe va anf û daxiste bin çengên xwe. Her du çav jê sor û mîna xûnê bû hûn. Kef û kopik bi dor dêv da dihat û hi destan bin tişt digotîne feqe Hesen. Feqeyê bi çaveki ji tirsan dîn bû bû. Wî her dixwend û pufe ser cendek dikir.

Lê cihê ko xwandina feqecendek bikuje û wî jê xilas bike; hîn xurtir dikir. Dema cendek

dît ko feqe guh nade daxwaza wî, hema rabû ser xwe û qesda feqe kir û bervê çû. We gavê dengêkî welê bi feqe ket ko kevir li ber dibûne kerî. Bi lez û bez dişa derî rahêjand û du sê dangan gazî min kir. Dema min lê venegerand û cendek jî nîzîkî lê kir, hêla derî berda û baz da. Lê kû da biçûyal jî her çar dîwaran derbaz bûn ne mikûn bû. Çiqas cara cendekê reben berê xwe didayê ko here cem, feqe qîrek dida xwe û gazî jî Hezretî şêx dikir. Çi serê we biêşînim; tu ewliya û enbiya ne man ko feqe Hesên gaziye nekir. Bi her qîrekê ra xwe li diwarêkî davête dîwarê din. Pê da pê da feqe Hesên diwestî û cendek xurt dibû. Dawî, cendek feqe Hesên li kuncêkî asê kir û girt. Feqe li ber mirinê jî dest bire xwe û kulmek di pê ra li ser çavê cendek da û pê ra xiste erdê. Xûneke ecêb di dev û bêvilên cendek ra avêt û feqe Hesên jî ji tirsan wekî sofîyê bi cerbeze diricîfî.

Vê hêreya han dil û hinavên min zîz kirin. Êdî jî mêj va ji sinorê henekan borî bû. Bê ko ji tirsan, derî vekim, ez hilkişim ser xênî û di pixêriyê ra min rahişte destê feqe Hesên û hilkişande jor. Pir ne ma, cendek rabû ser xwe û piştî şhadetê, ji Xwedê ra sipas kir. Paşê bi dengêkî bilind holê gazî me kir.

— Gelê biran hûn kû da çûnê?.. Ji bo Xwedê be werin cem min.

Hîn min dikirî lê vegerînin ko feqe Hesên destê xwe da ser devê min û got:

— Kuro, ma tu ji rîya Xwedê ketiye?!.. Ev cendekê han şeytanqûnî bûye. Ma qey tu nizanî ko şeytanqûnî çî ye? an te divê bibî sebeba serê mel..

Feqe Hesên di gotina han da ne fî nebeq bû. Tirsan ko bi ser ketî, ev gotina wî ne dighande warê şermê. Lê tirsan min ne ewçend bû. Ji xwe dema wî û mirî (cendek) hev û din di nava mezêlê da dibirin û tanîn, li derve jî pirkenîne zikê min êşîya bû. Hêdika min destê xwe da ser gurmikê û gotê: Ne heweeyî hinde, tirs e. Mirî navê me nîzane. Bi destelepê jî, ew yeke û em dudu ne. Bi ser da me xençer hene. Heke dilê wî heye xwe bide ber devên xençeran, bê şik destên me dikarin bilivin.

Feqe Hesên heya wê hîngê guh bi xwe da girtî bûn û li çavên min dinêrîn. Gava gotinên min qedîyan, hinekî ricîfî û got:

— Feqe Emer dilê min ditirsiye. Ji wê pê va li nik me mer jî nîne ko pê cendek bikujin. Ma şeytanqûnî bi xençeran dimire?!..

— Çawan? wekî keran dimirin. Lê metirse, dibê ko camêr ne mirî bû û bi xûnê ketî be. He xwe ragire, mêrik xwe bi qîr û zariyan kuşt; ez binêrim ka çî bewalê wî ye.

Mêrik her qîr û zarîn bû, bê atlahî gazî me dikir. Min hinekî dilê feqe Hesên rihet kir û ez çûm diyarê pixêriyê. Miriyê me di nîvê mezêlê da rawestî û her gazî me dikir. Bi dengêkî xurt min gotê:

— Te xêr e û çî dixwazî?

— Bira, ez tişteke naxwazime. Bi tenê min divê tu werî cem min. Ez ne mirime. Xweya ye ez bi xûnê ketime. Werin yek torpan bidin ko ez li xwe kim û mizgîniyê bidîne bavê min û bêjin, kurê te ne miriye. Dê bexşîşeke heja bide we.

— Ezê çawan bawer bibim ko tu şeytanqûnî ne bûye?

— Te çî divê, ezê welê bikim.

— Qurana min bi tûrê nên va li wir in, heke te dane min, dê zanîbim ko tu şeytanqûnî ne bûye.

Mêrik bê dudilî çû quran û tûrê nên anîn û di pixêriyê ra dirêjî min kirin. Hinga dilê min rûnişt ko camêr ne mirî bûye û bi xûnê ketiye. Ez rabûm batim jêr û derê mezêlê vekir û çûm cem. Piştî ko feqe Hesên bi rihetiya mêrik bawerî anî, bi dudiliyê mezî hate cem me. Hîn jî carcaran diricîfî.

Me her yekî hinekî kinc jî xwe kirin û dane mêrik. Tevî bergera wî, ji tirsan ko gundî ne bêjin şeytanqûnî bûye û nekujin, min bi şev haya kesî ne kir. Sibê dema hatin ko cendek berin goristanê, mêrik di nav me da rûniştî dîtin. Êdî şika kesî jî rihetiya wî ra ne ma bû. Piştî ko havê mirî tevdira min zanî, xwe avête himbêza min û got:

— Heke ne ji tewitîna te bûya, me dê lawik bi destê xwe bikuştin. Mafr ko te lawê min ji vî halî û ez jî ji ara kuştîna wî xelas kirim, ezê dilê te geş bikim.

Piştî ko sê rojan em li nik xwe kirin mîvan, bi dilxweşî û rûmet bi rê kirin. Gava em li wî gundî bi rê ketin me heryekî pênc zêrên zer bexşîş berda bûn kîsê xwe.

OSMAN SEBRÎ

Kiriyaariya Hawarê:

Ji bo Şûriyê 5 li reyên sûrî - Ji bo welatên din li xelkî ingiltz

Xwedî û gerîneudêyê bepirsiyar: Mir Celadet

Allî Bedir-Xan, Şam - Sûriye

Directeur Propriétaire: Emir Dîjêladet Aalî

Bedir-Khan, Damas-Syrie

ŞAM — ÇAPXANA TEREQIYÊ — 1943



## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Tefsîra Quranê	Dr. K. A. Bedir-Xan
Yûng Simpson	Herekol Azizan
Şeytanqûnî	Osman Sebri
Diwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Mêşingîvî	M. E. Botî
Keça Şîrê	Osman Sebri
Kitêba Tolê reb	Cemşid
Memozina Xanî	Herekol Azizan

### TEFSÎRA QURANÊ

31 — Minêkariya dewlemendi û siûda xêkê ko Xwedê bi wan hinan ji hinên din dewlementir û bextiyartir kiriye, ne kin. Dest ji hesûdiya xurti û xweşhaliya mirovan berdîn. Mêr ji qenciya xwe û jin ji, ji qenciya xwe behirdar in. Lavekarê kerem û comerdiya Xuda bibin; Xuda her tiştî dizane.

32 — Me miratxwerên dê û bav û mirovên di wan û destbirayan şanî we dan, ji miratê parên wan bidin û bizanin ko Xuda her tiştî dibîne û şahidê wan e.

33 — Mêr bi tevdîr, sebr û giraniya xwe û bişdana mebr û nefeqeyê jinan, ji wan zêdetir in û Xuda mêr kirine çavnêrê jinan. Jinên çak ji Xudayê xwe tirsîyar in, qedrê mêrên xwe digirin, gava mêrê wan ne hazir in, her weki Xuda ew parastine, ew ji wiha bi dilpakîyê nefsa xwe ji gunehan û malê mêrê xwe ji xirabîyê diparêzin.

Heke hon ji asêbûna jinên xwe ditirsîn, şîretan li wan bikin, ko wan guh ne da, bi nexeberdanê an bi nenizikbûna wan, wan birencinin û ko disa dest ji serhişkiyê bernadin, wan biêşinin; lê heke wan dest ji serhişki û serkeşiyê berdan di suçên wan biborin û bizanin ko yê mezintir Xuda ye û

Xuda ji zilm û xêdrê hez nake.

34 — Geli bawermendino... Heke hon dibinin ko, jin û mêr bi hev nakin û hon ji hev bûna wan ditirsîn, ji mala her diwan, navbîran bişinin ba wan, da ko ew bi destûr û kerema Xuda, wan li hev binin; Xuda bihistiyar û fêris e.

35 — Ji Xudayê xwe re perestişê bikin û tu kest mekin hevber û bempayê wî. Geli bawermendino... qedrê dê û bavê xwe bi her awayî bigirin, dilê mirovên di xwe û sêwîyan xweş bikin, ji parsek, belengaz, rêwîngî û cîranên xwe ên dîr û nîzik re — ew mirovên di we bin an ne — arîkariyê bikin, xweşhaliya wan bixwazin; hevalê hevalên xwe bibin, dilê xadim û xulamên meşkinin, wan meşşinin, û bi wan re comerd bin. Xuda ji nefesmezînan û ji yên ko fortê xwe didin hez nake.

36 — Yên ko çavteng û destgirtî ne û li xelkê şîreta çavtengi û destgirtîtiyê dikin û nîmeta ko Xuda da wan vedişêrin, divê bizanin ko ji bo kafîran ezabekî dijwar heye.

37 — Yên ko ji malê xwe, seba dîtina xelkê bi riyakariyê comerdiyê dikin û baweriya xwe bi Xuda û bi axiretê nayênin, wan ji xwe re şeytan kiriye heval, şeytan çî hevaleki kirêt e.

38 — Ma çî dibû, heke wan baweriya xwe bi Xuda û bi roja pişdawiye bîaniyana û ji malê ko Xwedê da wan, dî rîya Xuda da hidaya? Xuda wan û veşartiyên dilê wan nas dike.

39 — Xuda ji tu kesi re neheqiyê nake û Xwedê qedrê qenciyeke piçûk ji, digire û ji kerema xwe, ji xwediyê wê qenciye re, sewabeke mezin dide.

## SÖR CËMS YÜNG SIMPSON

« SIR JAMES YOUNG SIMPSON 1811—1870 »

Heke sttriyek di tiliya nie ra bû û hevaleyê me dike wî bi kêra xwe rake em rûyê xwe diçemixînin, diranên xwe li hev dişidin û bê sebr û qerar dixwazin zûka ji destên hevalê xwe xelas bibin. Çire? Ji ber ko em lêşin û êş tişteki giran e.

Lê yên ko di xestexanan de zikê wan diçelşin, dest an lingekî wan dibirin, heke ne hatana benc kirin ewê çî ezab bidîtana. Em tro dibêjin ewê çî ezab bidîtana. Ji ber ko tro tu ezabî nabinin. Lê berê wan ezabine giran didîtin. Ji ber ko hingê benc nîn bû û emeliyat dest û lingên nexweş girêdayî û gelek caran ew hi xwe bi masa emeliyatê ve girêdayî çêdikirin. Lê tro xêra Simpson di wextê emeliyatê de nexweş bi tu tiştî nahesin; çavên xwe digirin û dikevin xeweke giran.

Berî sedsalêkê di xestexaneke Ingilîstanê de çagirteki tîbî emeliyat dikirin. Şagirtê reben dida ber qîran û di nav ezabine giran de xwe ditewand. Li ber serê wî xortek sekîni bû û lê temaga dikir. Wî xortî di dilê xwe de digot: « Ma gelo îmkân nîne ko mirov di wextê emeliyatê de dilê nexweşan ji bîr ve bibe û wan binivînine da ko bi êşên emeliyatê nehesisin ».

Ev xort Cëms Yüng Simpson, ji gundê Baskêtê, kurê nanopêjêkî bû.

Cëms piçûkê heft bîran bû û di sala 1811an di meha Hizêrnê de ji deya xwe bû bû.

Cëms di dibistana gundê xwe de xwend û gava bû çardesali çû Êdnbürgê. Gundê wî nîzingî wî bajarî bû; jê bi bîst kilomêtiran dûr. Cëms ji gundekî piçûk keti bû bajarekî mezin. Li ber çavên wî Êdnbürg bajarê dinyayê e meztir bû. Cëms bi xwe di xatiraten xwe de dibêje: « Ez piçûk, feqîr û hov gihasti bûm Êdnbürgê. Min tukes nas ne dikir ko sebira xwe pê bînim ».

Cëms ji hêkesiyê zûka bêriya gundê xwe kiri bû. Kiri bû ko vegere gundê xwe. Lê gava rabûn salê bi pêncî dolari arikariya wî kirin dev ji vê fikirê berda û xwe da xwendinê; ket dibistana tîbiyê. Di sala 1830î de, hêj nozdeh salî, Cëms çehadetname hekîmiyê girt û bû Dr. Simpson.

Cëms hêj 26 salî bû ko deng pê ket. Heçî gundiyeî dora Êdnbürgê hene dihatin balê û Dr. Simpson gundiyeî feqîr herwe derman dikirin. Du salên din ketin navê û Dr. Simpson di tîbiya Êdnbürgê de bû seyda.

Di sala 1847an de Dr. Simpson di Skotlandê de bû bijîşkê melîke Viktorye. Piştî ve tayfne Simpson xwe yekcar da keşifa bencê.

Di sala 1846an de Dr. Simpson seh kiri bû ko bijîşkine emêrikanî ji bo nivnandina nexweşan tecrîbeyina çêdikin û bi esrê dilên nexweşan ji bîr ve dibin. Berî ewilî ev tişt gelek bi talûke bû, yanî nexweş carina pê dimirin û ji aliyeî din hisên mirov bi temamî ne dihatin razandin.

Simpson diviya hû tişteki welê peyda bike ko nexweş pê yekcar bêhiş bikevin û lê tu talûke nîn be.

Di sala 1847an de Simpson texlîtek kongrê çêkir û bijîşkine welêt lê ezimandin. Simpson ji hevalên xwe re nezariyat û tecrîbeyên xwe dan zanin. Piraniya hevalên Simpson bi gotinên wî qail ne bûn; lê jê re gotin, Xwedê ji te re li hev bîne û xebata te bibe serî.

Simpson hero li ser nefsa xwe tecrîbeyine giran û bixeter çêdikirin û xwe dixist talûka mirinê.

Dostekî Simpson hebû, jê re digotin Lëon Blaygar. Dr. Blaygar kîmyagerekî serdeste bû. Simpson rojekê çû bû ziyareta dostê xwe. Dr. Blaygar ji wek Simpson bi keşifa bencê mijûl dibû. Wê rojê Dr. Blaygar dikir ko tecrîbekê çêke. Simpson gava pê hesiya ji hevalê xwe re pêşmihad kir ko benca wî li ser nefsa xwe biceribîne. Blaygar pê qail ne bû û got, berî ewilî em wê li ser kêvroşkan hiceribînin. Rabûn du kêvroşkan anîn û ew derman bi wan dane bibin kirin. Her du kêvroşkan bêhiş raketin.

Simpson gava ev netîce dît gelek kêfxweş bû û gote miawinê xwe, de were em ji ji wî dermanî bihin bikin.

Miawinê wî pê qail ne bû; lê vegeand û got: « Ka em hibînin ewê çî ji kêvroşkan bibe; piştê... »

Midekî li hevîyê man; kêvroşkan bişyar ne bûn, mirin. Ji miawinê wî ne biwa bê şik Simpson ji wê biketa xeweke welê ko jê nema hişyar.

Çarê Çiriya-paşin sala 1847an bû. Di leboratwara Simpson de du bijîşken din hazir bûn. Dr. Keyt û Dr. Donkan, her du jî miawinên wî. Stimpson heneke nû çêkiri bû û diviya bû wê biceribîne.

Lê tecrîbe ne li ser kêvroşkan, lêbelê li ser nefsa diktoran bi xwe de bihata çêkirin. Dr. Keyt dest pê kir û qederek ji wî dermanî bihin kir. Piştî du deqîqan Keyt bêhiş keti bû erdê. Simpson û Donkan da bûn pey. Her sê bijîşk bi encameke nenas ve xwe li erdê dirêj

# ŞEYTANQÛNÎ

— 2 —

Di binhêla İzolê-bendê û serhêla Şroyê da li pal û quntarên çiyê gelek gundên biçûk hene ko rûniştmanên van gundan ji 10-15 malan pirtir nabin. Di van gundên han yekî da bi navê mala Ebês çar bira hebûn ko bi qenciya ji hev ra, di nav gundên dorhêlê da hali bûn nasîn. Ên ko çakî û dilovaniya wan ji hev ra dîtî, tevî zîvîriya wan dikari bûn bêjin ko her çar kurên Ebês bextiyartirên xelkê wî cihî ne. Tevî ko ev birayên han ji hev cida rûdîniştin, malên wan ji hev ne dihatin nasin. Mirov bi çûya mala kîjanî ji wan; birayê din tê da didî, an bi hev ra li nav zeviyeke di xebatê da didîtin.

Her wekî felekê ji kesî ra dûm ne kiriye; an mîna ko kurd dibêjin: çira kesî heya sibê vekêfî ne maye, rojekê bi mirina biçûkê biran

kiri bûn. Ji zindiyên bêtir diman miriyan. An ewê vejeriyana jinê û însaniyetê ji êşa emeliyatê de xelas biwa an her sê jî di xizmeta însaniyetê de de qurban biçûwana.

Di wê demê de jina Simpson digel keça xwe û xwarziya dîktor deriyê leboratwarê vekirin û ketin hundir. Gava her sê peya li erdê dîtin nizanî bûn çî bikirana, bi çî awayî arîkariya wan bikirana. Lê ji xêra Xwedê re gelek ne borî Simpson çavên xwe vekir, rabû ser xwe û jî peyan sekînî. Hevalên wî jî pê re.

Simpson xebata xwe biri bû serî; êdî nexweş jî ber emeliyatê ne direviyan û jîna gelek mirovan xêra bencê wê bihata xelas kirin.

Lê wek her tiştî keşîfa nû benca Simpson jî kete ber ekîsa hinan. Ewçend ko hinan digot benc mixalîfî diyanetê ye û istîfalkirina wê guneh e. Lê bencê bî xwe, bi rehakarîya xwe cihaba wan dida û rastî, bi gavine mezin pêş ve diçû.

Dr. Simpson yê ko jî êşa xelkê re derman peyda kiri bû di dawîya emirê xwe de bi nexweşîke welê ket ko şev û roj jê teşîha.

Dr. Simpson di sala 1870î û li 6ê Gulanê de çû rehmeta Xwedê. Qralîçe Viktoriyê emir kiri bû ko wî di gortistana Westminsterê, gormistana şeh û şebîngahan de veşêrin. Lê ji ber ko di wesîyetnama xwe de cihê veşartinê xwe şanfî da bû Simpson li Wirstenê hate veşartin.

Îro xêra vî îngilîzê mezin zikê mirovan diqelêşin û, kezêb, û gurîlikên wan dibirin, didirûn û nexweş heta dawîya emeliyatê bi tu tiştî nahesin.

HEREKOL AZİZAN

Alo şîn û girî, riya xwe êxiste mala kurên Ebês Hîn ro negîha bû nîveka ezmen ko bi arîkariya cînarên cendekê Alo sipartî bûn axa sar û kêleke bilind di hêla serî da daçikandi bûn. Birayên Alo jî, piştî ko li ser gora birayê xwe veşêrin; bi mêvanê serxweşiyê mijûl dibûn.

Di nava wê malbatê da a ko agirê veqetîne dîl jê sotî û peritandî, jî hemîyan pirtir, jîna Alo a ciwan Zêzê bû. Dema tiyên wê bi mîvan û cînarên ko hatine serxweşiyê mijûl bûn; wê biçûkê xwe ê yeksalî dabû ber himbêza xwe û jê ra li ser sêwfbûna wî dinelwirandin. Ji ber ko nexweşiya Alo jî du rojan pirtir ne ajotî bû; mirina wî jî Zêzê ra mîna ecêbeke nedî û nebinayî dihat. Piştî ko êvarê perên xwe ên reş di ser dinê ra vegirtin û hemî tinawîran xwe avêtine xewgehên xwe; Zêzê çaxê di ber himbêzê, ew jî di ber êrgûn da, şîna Alo jî nû va bi ser xisti bû. Heya şev gîha bû nîvî, Zêzê bîstekê jî girîn û kizîne vala nema bû û geh gotin davête ser peyayê malê (Alo) û geh tanîn ser biçûkê salê (kurê wê ê yeksalî û berhimbêz).

Şev gîha bû nîvî ko li paş dêrî dengê bi guhê Zêzê ket; navê wê hildidan û digot:

— Zêzê, were dêrî veke ez hatim.

— Tu kîyî ko ez dêrî vekim ? !

— Ez Alo me. Ma tu dengê min nas nakt ? ..

— Wey qeda bi te û bavê te keve; tu bi mirinê nemayî, şeytanqûnî jî bûyî ? ! ....

Ji bo ko em bizani bin, Alo çawan jî gorê bi derketiye û piştî ko hatiye paş dêrî çîlo gazi jîna xwe kiriye, çî lê qewimiye; divê em rê bidin gotina wî.

Dem a çîrok gîha wê derê, piştî ko kenekî tehil riya xwe bi rûyê Alo xist, çend gepên xurt jî qelûna xwe kişandin û got:

— Bê şik min bîra mirina xwe û kûrayîya gorê ne dibir. Hew min dît, bêvilên min şewitîn û aveke germ û nerm bi ser dev û sînga min da herikî. Min hinekî xwe tev da, cihê ko ez fî tê da î teng û tarî bû. Tu ne çû min dît bêhna min jî çikiya. Hînga min bîr bir ko ez î di gorê da me. Min zûka qerqes bi ser xwe va anî ko di jêr va bi vekirina gorê mijûl bibim. Lê gava Xwedê bixwaze yekî jî tengiyê bi derxe, bê west jî dike. Hîn min destên xwe li tehlên ser xwe negerandi bû ko pê ra teqayek di tala serê min da vebû û bayekî sar di pê ra li nav çên min ket. Ronahiya hîvê siya cinawirê bi her çavên min xist. Ji ber ko teqa di ser serê min ra e fere bû, min nivê cendekê xwe tê ra bi der

xist. Cinawir ji min tirsî û baz da. Heke ez ne f şaş bim, hirç bû.

Bi gengazî ez ji gorê bi derketim. Min qenc bala xwe dayê, gor hati bû vedan. Dawî çî dibe ez ji gora teng bi derketim û min qerqer (kefen) li nava xwe pêça. Xûna ko ji bêvilên min hati bû dest, piştr û qerqerê min reng da bû. Têvî ko min serçavên xwe ne didît, her hal min dizanî ko wek ê cinawirên leşxwer bûye; lê bê ko ez li şuştinê bifikirim, li navgoristanê, min berî da mal. Gava ez gihame paş derf, dengê giriye jina min dihat. Hîngê ji min ra şik ne ma bû ko jina min gelekî hej min dike. Lê gava min gaziye kir û ez nasim, bi carekê dîn bû û ji riya Xwedê derket. Wê dizanî ko ez şeytanqûnî bûme. Çiqas ez di bergeriyim bê feyde bû. Hînga min xwest ko derf bişkênim û di hundir kevim. Ji ber ko her du rojên nexweşiyê ez pir qels xisti bûm, beya min derf rahêjand; Zêzê darekî zexim qeraseyî paş derf kir. Êdî xwe westandin tewş bû. Piştî ko bi bergerê ne bû; min dixwast, Zêzê bi gurintiyên biqêşlînim. Bi vê ramanê bû ko min gotê:

— Keça malmêratanî ma qey tu dizanî ko ezê nikari bim werim. Heke derf ne bû ezê di pixêriyê ra dakevim.

Bi vê gotinê ra min derf berda û çûme ser pixêriyê. "Heya min xwe di pixêriyê ra berda, Zêzê derf vekir û bi nava gund da revî. Min dizanî ko reva Zêzê wê çî belayê ji min ra bine. Vêcar min qerase li paş derf asê kir, lê pir mikûn bû ko ew jî weke min di pixêriyê ra dakevin. Tiştêkî ko min xwe pê biparasta diviya bû. Min serekî dora xwe çav kir. Dergûşa kurê min ê yeksalî bi ber çavê min ket. Bê ko zarok bitirse min hîdika rakir û da himbêza xwe. Berf wê demê tucaran ne dihat bîra min ko bira û pismamên min wê bixwazin min bikujin, lê bi xêra vî gedeyê biçûk ezê ji mirinê bifilîtim.

Hîn ez ji van ramanan kuta ne bû bûm ko dengê bira û pismamên min hat. Berê xwe dane derf û zor kirin, Zêzê digot: Qerase daye paş derf. Hûn dikarin di pixêriyê ra dakevin cem wî.

Tu nema hemiyên xwe di pixêriyê ra berdane xênî, her yekî merek bi dest da bû. Êdî mecala raman û tevdran nema bû. Hema min piştî xwe êxiste qunceki û biçûkê bi dest xwe da ji devê merên wan ra kire armanc. Di kîjan helê va ko devê merekê dirêjî min dibû, min cendekê biçûk dida ber û digot:

— Heke dilê we bi min naşewite qencê bila bi biraziye we bişewite.

## DIWANA MELE

— 44 —

Şahîdê cilwe nîma qudsiyê fêrûze lîbas  
Heçî rengê te nîşan det tu nîşanê xwe binas  
Husin bê ayneyê eşqê tecel-îl naderit  
Eşqê mehmûdî di me'na nemekê husnê eyaz  
Herçî rengê te bivêtin xwe bibînlî lîl-lah  
Nezerê wer bide kasê çî xweş ayneyê kas  
Tu şerabê bi xurabê bi nehangin bide mey  
Dê kifayet bi çî rengî me bikin koze û tas  
Remz û razê ney û nayê ko sîna ne hemî  
Ji mîhalane bi eqlê xwe bizanî jî qiyas  
Wê biket mezlete her dem li herifan bi cedel  
Bî du caman ji xweyên şîretê ebyed û weswas  
Destêgirê te ne bit Xidrê înyet jî qedem  
Nangehê aba heyatê bi du esker lîyas  
Tu binê mahê nû û destê qezayê hey û hêy  
Ne li zerê felekê belkî li umrê me ye das  
Turkê xûnrêj û xunarê me bi yek xemzeyekî  
Zuhdê çîl sale li min zêr û zeber kir jî esas  
Ji lebbê le'lê şekrbarî qe nekîr pîrsek melê  
Misriyan gezme reşandin ko kişandin elmas

Zarokê biçûk ji barbar û qirêna dengê me  
pir tirsî, ew jî bi hel û deng digiriya. Vêcar  
Zêzê ne ji tirsê canê min; lê ji tirsê ko belanin  
ji kurê wê ra çêbin her carê xwe davête ser  
destê yekî û pê em diparastin.

Piştî ko niv saetê me li ber hev da bi şûn  
da, bi navê Qasim cînarekî me jî bi gelş û  
qirêna me ra hişyar bû û hat Dema Qasim  
kete hundir, min gaziye kir û gotê:

— Qasim! bira û pismamên min dîn bûne  
û dikin min bikujin. Ma bûn jî bê namûs bûne  
ko deng nakin?! Piştî ko vana min li ber çavên  
we bikujin, xelk ê ji we ra çî nebêje?..

Gotina min li Qasim pir kar kir ko xwe  
avête pêş û got:

— Gelê cînanan! hûn hemî ji xênî bi der-  
kevin; girtin û kuştina vî li min.

Bi gotinê ne ma û hat bira û pismamên  
min hemî di xênî da bi derxistin û paşê di  
ber êrgûn da runişt û gote min:

— Heke te divê, zarok têxe dergûşê û were  
ber êgir da em binekî bipeyivin:

Ji xwe biçûk ji tirsan ji xwe çû bû, min  
ew danî dergûşê û çûme ber êgir û li pêşberê  
Qasim runiştim. Piştî dayin û standineke kurt  
Qasim bawer bû ko ez şeytanqûnî ne bû me û  
bi xûnê ketime. Hînga gazî bira û pismamên  
min kir. Her yekî ko dihatê pêş min, ji şerman  
bi erdê da diçû, êdî nema dikari bûn li çavên  
min binêrin; her bi merên di dest xwe da  
erd dikolan.

Hele Zêzê, heyê çend mehan ser-rast  
nikari bû ber ve min binêre.

OSMAN SEBRÎ

## MÊŞHINGIVÎ

Di Kurdistanê de li cihê Botan, li Qeza Şernex eşîrek heye navê wê eşîra kendaliya ye. Eşîreke gelek piçûk û hindik e, hi xweylkirina peze-çûr û bi dihindana wan gelek meşhûr û bi nav û deng e. Lê nemaze û sê behran bi pis-pûrî û serve-bûna meşên hingivî hêj meşhûrtir û bi nav û dengtir in.

Herwekî ez bi xwe di sala 1938an de wextê li welêt bûm ez û çend mirov û pismamên xwe li gelfî û niwalên çiyayê pişta Şirnex dirgerayîn. Me dît ko çend zelum ên bi gopal, das, bivir û çelte bi milîve wê li nav keleşestan de, giya, kuç û ferşan de digerin û tèn û diçin.

Wextê min hoganê dît min ji wan pirs kir; pismam ma çi li hewe qewimiye ko hûn vê spēda hinde sar û cemidî li nav van giyan û vê erda xwisgirtî û şil digerin tèn û diçin.

Gotin: pismam aniha tu dibînî dinya fro Bihar e û erd hemî kesk û heşîn bûye. Vêca wextê meşên hingivîye; meş hingivî hingivîye xwe dikin çêkin. Ji lewre em ho kin-ev li me qewimiye.

Îca min ji wan re got: ka xêra xwe niha ji min re bêjin ka hûn çawan çêdikin û dizanin û serve dibin.

Gotin: Biha're pismam, meşên hingivî de bèn li erdê tîr av, gul, kulîlk û giya bigerin û danin, tîr avê vexwin û ji gul, kulîlk û giyayên bi bihin û bihindar barikên xwe çêkin û bi'lingen xwe've girêbidin û bişidînin, bi-frin û paşê biçin mal û cihê xwe û hingivîye xwe çêkin.

Vêca em ji de bèn li wan bigerin û hêre bikin. Wextê me holê dîtin emê xwe li hîviyê bigirîn heta firin, û çûyîn. Heke me dît nivz sitlekê an du fitlan firin û çûn hingê em dizanin cihê wan nîzfk e û ne dûre. Heke me dît sê çar fitlan bilind bû û xwe dewir da û firî bingê em dizanin cihê wê dûr e. Dibit ko riya saetkê hebît emê lê bigerin û pê biçin; heta em vedikevin û serve dibin. Vêca emê tij û hûr lê binêrin ko berê xwe kû ve da û çû. Emê xwe bi wê hindamê bigirin û herin. Em winda nakîn heta em rast biçin ber devê qula wan bisekinin: vêca emê dest birîna mêşa xwe bikin; mêşa xwe bibirin, hingivîyê xwe jê derêxin û biçin mala xwe.

Dibêjin rojekê Mihemed begê mîrê Botan li zozanê Herekolê bû; ji civata xwe re got: Me divêt em vê heftayê herin seyrana xwe li Kêla-Memê bikin.

Kêla-Memê zozanê goyan e; gelek bilind û xweş e; pez gelek lê qelew û xûrt dibin. Çiya û avên wê gelek bi xêr û bîr in.

Ji Bîrên Rojên Kevin:

## KEÇA Ş'ÎRÊ

Bû çil roj ko min tu li pêş xwe nedî  
Me can çû ji derdan were ca gidî  
Xwedê ez êxistim qurek bê jimar  
Bo dûma jîna min hinartî tu par  
Dema xem didin pêl ji derya ê dil  
Diçin tèn di rehan tivanc tîr û kul  
Wê gavê f sews im, bişşekê çeleng  
Divê dil gîyar ke bi daxên pereng  
Te nadim bi Leyla û şîrîn Zînan  
Bi te ez ez im hêl mizgefta dînan..  
He fermû were pêş du pîrsan bibêj  
Me bexşa ji bo te dîl û can ji mêj  
Yarê me Rondo kes ne hişt giş kirin  
Destgirtî ji bo te anê şair in!..  
Ji ber ko sêrser bûn û bê war û çûn  
Ji lewre biskên te di talanê çûn  
Zînatê mezin bû li min û te yar  
Ji bîr va nakim qet vê eşê tu car.

Heles 11-2-934

OSMAN SEBRÎ

Rabûn kar û barê xwe kirin, xwe pêk anin û çûn li Kêla-Memê danîn û dest bi seyrana xwe kirin.

Mîr Mihemed digel civata xwe li nav mêrg û çîmenekî tîr av û giya de li ser kaniyeke sar û cemidî rûniştin. Dîtin ko mêşek ya hingivî ji jor de hat û li ser avê danî.

Di nav civata mîr de zilamekî geverî hebû. Gever gundek li cihê Botan, li qeza Şernex, li qûntara çiyê û zozanê Çiravê ve ye.

Wî zilamê geverî got: Mîrê min ev mêşa he ya hingivî mêşa min e û ji gundê min Gever hatiye.

Mîr got: Te çawan zanî ko mêşa te ye?

Zilamê geverî got, ez dizanim ya min e. Ka em rabin biceribînin. Heke mêşa min dernekê bila mîr serê min lêbidit.

Rabûn mêş girtin û piçik ermişim bi lingê wê ve girêdan û berdan. Mêşa gewir firî, çû.

Mîr rabû xulamekî xwe f rast û dirist digel mîrikê geverî rêkir. Her du vêk re çûn. Geverê; li her dinbaşka mêşan rûniştin. Dîtin ko ew mêşa nîşankirî di ser gurbika xwe re difirî.

Vegeriyan nik mîr û mesele jê re gotin. Mîr ji geverî pirsî: Te bi çi rengî zanî ko mêşa te ye?

Mîrikê geverî got: Mîrê min gava min dît mêş rabû û bilind bû û xwe dewir da û berê xwe da nişûr û bilind firî; hingê min zanî ew mêşa min e.

Mîr rabû geverî xelat kir.

M. E. BOTÎ



## KITËBA TOTË REB

«Eslê çtrokê li ser papiros [1] nivisandî hatîye dtlîn  
« BERIYA İSA PËXEMBER BI 1300 SALI »

« Ez Ahûre me, keça melik Menib-Betah. Zilamê li ber min rûniştî ew ji birayê min Ninûferk-Betah e. Em her du, ji dê û bavêki bûne. Dê û bavê me ji me pêve tu wêrt nîn bûn.

Wextê ez gihastim çaxê ziwacê diya min ez birim hafa melik. Ez hingê spehî û bedew bûm.

Melik got: Li keça me Ahûrê temaşa bikin; bûye jin. Wextê ziwaca wê ye. Emê wê bidin kê?...

Min gelek heji birayê xwe dikir û min dixwest ez wi bikim. Min diya xwe serwextî kiri bû. Diya min rabû, gote melik:

— Ahûre ji birayê xwe hez dike. Li gora adetên me divê em wan bi hev şa bikin.

Melik lê vegerand û got:

— Te bi tenê du zaro hene. Çire dixwazi wan bi hev re bizewicîn. Ma ne çêtir e ko em Ahûrê bidin kurê serdarê me û ji kurê xwe re keça fermandereki din binin. Bi vi awayî tu keç û kurê xwe bi bûk û zavaki zêde dikî.

Diya min bi xeyd lê vegerand û got:

— Tu bi min re cedelê dikî, ji ber ko min bi tenê du zaro hene. Lê tu ji bir diki kê adet dixwaze em bira bi xwêhê re bizewicîn.

Firewin gote wezirê qesirê: Îşev Ahûrê bibin qesira birayê wê û ber celeb perû û diyari pê re.

Ez çûm qesira Ninûferk û bûm jina wî. Firewin emir kir qewmê xwe. Dawêta min şahnet kirin û ji min re xelatine giranbeha anîn. Ninûferk rojê pê de mêvan dihewandin û bi şev bi min re dima.

Kurikek ji min re çêbû. Yê ko li rex min rûniştî ye. Me navê Mêhit lê kir. Ji kêfa firewin re payan ne dilate dtlîn.

Mijûlahiya Ninûferk gera di nav tirban de bû. Ninûferk diçû Mênfisê di nav tirban de digeriya û kêlên firewinan dixwendin. Li tabûtên waz hûr dibû; li xetên sehre yên ko li wan bûn hûr dibû.

Rojekê ji peresto Betah re ayinek çêkiri bûn. Ninûferk ji pardariya ayinê kiri bû. Piştî nimêjê bi ayinvaniyan re gava vedigeriya, li ber tirban disekini û kêlên wan dixwendin.

[1] Textilek giya heye jê re papiros dibêjin. Misriyên kevin li ser pelên wî giyayî dinivisandin.

Kaleki çav pê kir û kent. Ninûferk jê pirst:

— Tu çire li min diken!

Wî kallî lê vegerand û got:

— Ez li te nakenim. Lê gava ez dibînim ko tu tîl van deran û van xetên kêw û jar dixwîni kenên min tîn. Heke tu dixwazi tişteki hêja bixwîni bi min re were ezê te bişînim derekê û li wê derê kitêba ko Tot, gava dakete erdê, bi destê xwe nivisandîye bixwîne.

Di wê kitêbê de du neştêde hene. Heke te a pêşîn xwend erd û ezman, şev û roj, av û çiya tev de dikevin bin sehra te. Tiştên ko teyr û mar dibêjin seh diki û di biniya behiran de çûn û hatina misiyan dibîni.

Dema ko tu neştêda diwemin bixwîni tu dikevi şikilê ko piştî mirinê pê bikivi. Di ezmanan de rojê bi mewkîba xwe a rebanî û hêvê di şikilê xwe ê rastin de dibîni.

Ninûferk — Bi serê milik ji min re bibêje ew kitêb li kê ye. Tiştê ko devê te digire ji min bixwaze...

Kalo — Min ji te sed polikên zêr û du tabût divêtin; ji tabûtên ko ji bona kahînen dewlemend çêdikin.

Ninûferk emir kir sed zêr dane kalo û du tabût ji jê re çêkirin.

Kalo got: Kitêba ko ez dibêjim di orta Nil, di Qestê de ye. Kitêb di nav çend sendûqan de ye. Sendûqeke hesinî, tê de yeke tûnc, di nav tunc de yeke ji dara qurnefilê, tê de sendûqeke ebanos, di nav wê de yeke zivin, di nav zivin de yeke zêrin û kitêb di nav sindûrika zêrin de... Di dora sendûqê de dû-pişt û marin hene, di nav wan de şehmarek ji heye. Ew hemî hefadiya sendûqê dikin.

Ninûferk ji perestîgahê vegeriya nik nim, çiroka kitêba Totê reb ji min re da zanin û bi ser ve zêde kir:

— Piştî ko min kitêb bi dest xist ez nema terka erdê bakur didim.

Min kir ne kir, birayê min ji fikira xwe ne geriya û qesta firewin kir û çiroka xwe jê re got:

— Ji bo wê yeke ji min re sefineyek divêtin. Ezê xweha xwe Ahûrê digel kurê wê Mêhit bi xwe re bibim.

Firewin sefine da wî. Em lê siwar bûn û me berê xwe da Qestê. Kahîl û serkahîne İzis tev de derketin pêşiya me û hatina me şahnet kirin. Em daketin bejê û çûn ziyareta mabeda İzis. Ninûferk ji İzis re gayek û qazek qurban kir. Qederê çar rojan em bûm nevanên wan. Birayê min ziyaretên xelkê welêt qebûl

dikiran. Herçl plrekên wan dihatin nik min.

Roja pêncan Nînûferk hinek şîma xwest, Jê re şîmake saft anîn. Nînûferk rabû ji şemayê aefneyek digel bîr û deryavanan çêkir û lê xwend. Sefîna şîma a heftill bû sefîneke rastîn û deryavanan ew di avê de livandin. Birayê min lê siwar bû; deng li deryevanan kir û got: «Berê min bidin cihê ko kitêb lê ye». Berê wî dan cihê kitêbê û Nînûferk ji me veqetiya.

Piştlî sê rojan gihastin sendûqa ko kitêb tê de bû. Di dora wê de bi hezaran mar û dûpişt hebûn. Nînûferk diayek xwend û li wan pif kir. Tev be bêhiş ketin; ji şehmêr pê ve. Şehmêr serê xwe hildida û dirêji birayê min dikir. Nînûferk şehmar bi şûrê xwe kir du kert. Lê gelek ne borî her du kert gihane hev û ve carê mar di şikilekî hêj bi heybetir de vejiya. Nînûferk dîsan ev kuşt; mar dîsan vejiya. Li cara sîseyan Nînûferk gava mar kire du kert û çend mist qûm xistin navbera her du kerriyan. Vê carê mar bi temamî mir.

Nînûferk bal sendûqê ve çû. Pev hev senduqên hesinî, tûncî, darên darçîn û ebanos û yên zîvîn û zêrîn vekirin. Kitêb di naç sindûrika zêrîn de bû.

Nînûferk kitêb vekir û neşîda pêşîn xwend. Erd û ezman av û ax sehîrin. Nînûferk tiştên ko teyr û mar digotin seh kir; di kurahiya behîrê de masî û cenawîrên behîrê tev de ditin.

Nînûferk neşîda diwemîn xwend. Roj û hêv û stêr ketine mewkibeke biheybet û di şikilên xwe ên rastîn de lê xuya bûn. Bi xwe jî ketî bû şikilê ko piştî mirinê pê biketa.

Nînûferk kitêb hilanî vegeyriya şikilê xwe yê vê dîniyayê û gote deryavanan: «Min bibin nik Ahûrê».

Piştlî sê rojan gihastine erdê ko ez lê bûm. Ez di keviya avê de li hêviya wan bûm: niv mirî. Sê şev û sê rojan min ne xwar, ne jî vexwarî bû. Ez çûm pêşiya wan û min gote birayê xwe:

— Bi serê melik bikî, ka wê kitêbê, kitêba ko me jî ber wê ewçend zehmet kişandine, bide min; ez lê temaşa bikim.

Nînûferk kitêb gihande destên min. Min her du neştêde xwedîm. Bi min re jî herweklî bi birayê min re çebû bû, bû.

Birayê min rabû çend pelên papîrûs anîn û her du neştêde li ser wan nivisandin. Nînûferk paşê kasek şerah anî û pelên papîrûs tê de

helandin û şerab vexwar. Bi wî awayî her du neştêde herf bi herf, pirs bi pirs jî ber klîrin.

Di roja xwe de em vegeyriyan Qeftê û me li cem Îzîs şahînetêke mezin çêkir; pez şerjêkirin û xelk ezmandin. Paşê em çûn û li seftinê siwar bûn.

Lê li ser tiştê ko li kitêba wî qewimî bû agehlî bi Tot ketî bû. Tot rabû giliya birayê min li cem Ra, Rebê Rojê kir û got:

— Nînûferk-Betah; kurê melik Mentib-Betah, qanûn û şerleta min nehîbandiye. Pê li meskenê min kiriye, sendûq û kitêba şehîrê biriye, pasvanê ko lê miqate dibû, kuştiye.

Rebê Rojê lê vegevand û got: Ew û xelkê dora wî tev de ji te re ne; tu bi dilê xwe yî, çi jî wan dixwazî bikî, bike.

Ra destên xwe hejandin û got: Nînûferk-Betah bi selameti nagehe Menfisê. Ne ew ne xelkê wî.

Di vê demê de kurê min Mêhlî jî bin siwanê hol bû, xwe hingafte banê seftinê û ket avê.

Qirin bi xelkê seftinê ket. Birayê min ji mezela xwe derket û ji kurê xwe re neşîdeyek xwend. Lawik jî binê avê vegeyriya banê seftinê. Birayê min neşîdeke din xwend. Zîmanê lawik geiriya û tiştê ko pê re bû ji me re got.

Digel kurê xwe ê mirî em vegeyriyan Qeftê. Me ew herweklî sezayî kurên melîkan e tehlîl kir, yanî derman xistin can û binava wî û di Qeftê de veşart.

Birayê min got: Divê em lezê bidin xwe û rojekê berî rojekê bigelin cem bavê me firrewin; beriya ko bi tiştê ko li me qewimî bihese.

Em li seftinê siwar bûn û gihastin cihê ko kurê me tê de bin av bû bû. Ez jî bin siwana meklî hol bûm, ketim avê. Nînûferk diayin jî min re xwendin û ez vegeyriyam banê seftinê. Sefîne vegeyriya Qeftê. Bi aynîne şahane birayê min ez li rex kurê xwe veşartim.

Birayê min vegeyriya seftinê û jî nû ve birê ket. Gava nîzingî li cihê ko ez û kurê xwe em tê de bin av bû bûn kir; jî xwe re got:

— Ma ne çêtir e ko ez vegeyrim Qeftê û bi Ahûrê re bême veşartin? Gava melîk jî min pirsî, kanî zarowên min ezê çi ciwabê bidim-ê. Ma ez dikarim jê re bibêjim min ew bi kuştin dane û ez zindî vegeyriyame cem te.

Birayê min piştî ko ev tişt jî nefsa xwe re gotin emir kire xulamên xwe û jê re



## MEMOZÎNA EHMEDÊ XANÎ

— 15 —

*Hişyariya Memî û Tacdîn e ji bê-  
hişî û mexmûriya şeraba eşqê,  
aqahî û zexberdariya wan e ji  
sebeb û wasteyî wamqê*

Ew dûxteyî çêşm her du şahîn  
Ew sûxteyî per Memo û Tacdîn  
Xweş çûne şikari kebû û qazan  
Nagah bi ser ve şibhi bazan  
Nûrêk ftîlî li wan jî nageh  
Êdî qe ne ma ewan çu ageh  
Hîndê ko di heftiya hemil bûn  
Ew-zêde di wehşî û xebil bûn  
Ew-hefte li wan ko bûye salif  
Xo kerdeyî eşq bûn muallif  
Rabûne-ve rojekê bi êk ve  
Fekirîne bi reng û rûyê êk ve  
Eşqê kiri bûn wisa mîbed-del  
Wan êk û du nas ne kir ji ew-wel  
Ew-wel dikirin ji hev texer-rub  
Paşê ko kirin bi hev teqer-rub  
Dîtin xwe bi paçe bend û zingil  
Perwaz û firin mîhal û mişkil  
Eskûfêke zilmêtê bi ser da  
Celfûyeke îlfetê bi ber da  
Bê te'me û bê şerab û bê çav  
Bê meqsed û bê mirad û bê gav  
Mestane ji rengî çêşmî dîldar  
Moxmûr û siyahî û mest û bîmar  
Manendî dîhan yar dil-teng  
Nalîn ji reha dilê wekî çeng  
Gotin eceb em kû bûne bîmar  
Ya bûne di key serî birîndar

Ya ne wihe cem çîra nikarîn  
Mecrûh û zelf û dîlşîkar in  
Evrengehe wan dikir tefeh-hus  
Mahiy-yeti hali xwe teces-sus  
Tacdîn fikirî di destbîrayî  
Teyisît-guherek wekî çîrayê  
Yağûteke mislî dancêyî nar  
Meş-el-sifet e ji bo şeva tar  
Manendî şemal ew teyisî  
Hek-kakî bi navê Zîn nivîsî  
Destê xwe dirêj kirî, ko bînit  
Îa qenc nezer bikî bibînit  
Mem jî fikirî di dest Tacdîn  
Elmaseke bêheba û texmîn  
Lê navê Sîti kirî kitahet  
Istadekî sahibî meharet  
Ser-raf eger bibête b'qrat  
Texmîn bikîtin bi wezn û qîrat  
Bazar bikî jî bo Felatûn  
Mecmûi xezainê di Qarûn  
Sema semenê di wan nigînan  
Nabî bi wîqûhî dûrebînan  
Mayîn di-teec-cib û tehey-yur  
Daman û gelek kirin tefek-kur  
Zanîn ko sewahibê nigînan  
Herçî kirî kir Sîti û Zînan  
Roja weko bû îd tehvil  
Ew jî geriyane came tebdîl  
Çawa xemîline ev keçanî  
Ew jî geriyane cil giranî  
Ew bûn kome di rûzi newrûz  
Mislî meh û mihri alem-efrûz  
Ew her du ne ey di dest vemiştin  
Ew her du ne ey dexel dikuştin  
Ew bûne di şehri bûyî cel-lad  
Ew bûne ko xelk jî dest bi feryad  
Ew bûne ko van bi dil hebandin  
Ew bûne li van ceger kewandin

Wan her du biran bi eql û texmîn  
Bê gaibe qatîlê xwe zanîn  
Tacdîn li nik hebû şûrêk  
Eşqê di wî hiştî bû qisûrêk  
Go rabe bira jî nav nivînan  
Bas ah bike jî ber birnan  
Ein şer in û ew di xwe xezal in  
Pir eyb e ko 'em jî dest binalin  
Mem puxteyî eşq bû tamamî  
Got-ê go bira meger tu xam f  
Da zen ne biri mices-sem im f  
Ser ta bi peyan miqes-sem 'im ez  
Ev cîsim li min bûye muxet-tet  
Ew xet hemî bûne muneq-qet  
Te'sir û rengê eşq û wemqan  
Bit-tul di tûl û erz û îmqa  
Yek niqte nehîn jî derd xalî  
Hêja tu dibê çîra dinalî  
Dil bûye mehel-li eşq hala  
Vî halî divê mehel-li vala  
Nîne eceb er bibim hilûlî  
Min maye jî sûretê heyûlî  
Şahînehê eşq bê xerez hat  
Nîne eceb er bibim hilûlî  
Ev hal û mehel û cîsm û cewher  
Eşqê jî xwe ra kirin mixex-xer  
Can û ceger û dil-û hinawan  
Dest û ser û pê û pişt û çavan  
Wel-fah yekî ne maye rahet  
Bil-lah yekî ne maye taqet  
Bizdandîne wan jî min elaiq  
Bilcîmle dibên ko nehnû zalîq  
Napîrsî li halê min tu zalîq  
Hêja tu dibêjî ez menalim  
Evrengehe wî ko kir tezel-lum  
Tacdîn qe ne ma jî bo tekel-lum  
Ew mane digel ewan birnan  
Behsa me li ser Sîti û Zînan.

perçak caw anin. Nînûferk kitêba sehirê tê de  
pêça, ew kire berbejînek û li sînga xwe pihêt  
girêda. Sefîne ji gîhaştî bû dera ko em tê de  
bin av bû bûn. Nînûferk di bin seywanê re  
bi der ket û noqî avê bû.

Deryavanan da ber qîran û got: Ax felekê  
çî felaketêke mezin aniya serê me. Katibê  
ferzanê, zanayê bilîndpaye çû, heywax....

Sefîne gîhaştê Menfisê. Firewin pê hesiya.  
Şîna Nînûferk girêdan. Firewin û kalînen wî  
hewranîne reş wergirtin; hatin ketin sefinê.  
Firewin jî xelkê sefinê dipirsî û digot; ma kes  
nîne ko cîhê ko kurê min tê de xerîqîye şanî  
min bide... Kest ne dizanî lê veqerine.

Bêrên sefinê radikirin. Yek di nav wan  
de giran bû bû, bi rahetî ranedibû. Du peyan  
rahişlîn-ê û bi zor jî avê xelas kirin Nînûferk  
bi xurtiya sehir û zandîna xwe bi hêrê ve bû  
bû û xwe gîhandî bû Menfisê. Kitêba Totê reb  
li ser sînga wî xuya dikir.

Firewin ko çav bi kitêbê kir got: Vê  
kitêbê jî ser sînga wî rakirin.

Xelkê dora wî gotin: Tacidara jî me  
zêde ye, lê tiştê ko hate serê me bela vê ki-  
têbê ye. Nînûferk miroveklî mezin, xudan ray  
û tevdir bû...

Firewin jî geriya; qey tîrst. Nînûferk 16  
rojan di tehnîte de, 35 pînc rojan kitankirî û  
70 rojî kafenkirî hiştin û paşê veşartin.

Ev e tiştê ko jî her kitêba Totê-reb li me  
qewimiye ».

CEMŞID

Kiriyariya Hawarê:

Ji bo Sûriyê 5 lîreyên sûrî - Ji bo welatên din li êkî ingilîzî

Xwedî û gerînendeyê bepîrsiyar: Mir Celadet

Alî Bedir-Xan, Şam - Sûriye

Directeur Propriétaire: Emir Dîjêladet Aalî

Bedir-Khan, Damas-Syrie

ŞAM — ÇAPXANA TEREQIYÊ — 1943

## KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

### DI VÊ HEJMARÊ DE

Tefsîra Qurane	Dr. K. A. Bedir-Xan
Şeytanqûnî	Osman Sebri
Diwana Melê	Qedri Cemil Paşa
Gulistan	Farisixwîn
Memozîna Xanî	Herekol Azizan
Ya Reb	Cegerxwîn
Sefera Sicilyayê	Nêrevan
Hêviya-Nuh	Osman Sebri
Ez û Yar	Cegerxwîn
Çeteyên Rûsî	Smaînê Serhedî
Feryad	M. E. Botî
Panama	Qadirê Ferman

### TEFSÎRA QURANÊ

40 — Roja ko emê ji her mileteki li ser emelê kafiran şahideki binin, û Pêxemberê min, emê te ji bikin şahidê emelê wan, gelo wê demê halê kafiran wê çilo bibe?

41 — Di wê rojê de, yên ko kafir bûne û li ber Pêxemberên Xuda serhişki kirine, wê bixwazin ko erd di bin lingê wan de biheze û ji hev bibe û ew bikevinê û tê de winda bibin; lê ew kengê dikarin gotin û emelên xwe ji Xuda veşêrin.

42 — Gelt bawermendino . . . Gava hon serxweş in, heta ko serxweşiya we ne bore û gotina xwe nizanin, niziki nimêjê me bin; gava hon bi cinobe dibin, beriya ko destmêja xwe a mezîrakin ranebin nimêjê. Heke hon nesax in, an rêwîngî ne û ji her du rîyan tiştek derketiye, an hon niziki jinan bûne û ko av bi dest we na keve bi axa pak teyemimê bikin, rû û destên xwe pê bifirikin. Xuda îşê evdên xwe sivik dike û di gunehên wan dibore, xuda piyar e.

43 — Ma hon nabinin û birewer na bin ko zanayên-cuhîyan seba xatirê çend peran metna Tewratê diguhêrinin û dixwazin we ji rîya rastiye derinin.

44 — Xuda dijminên xwe nas dike; bizanin ko artîkarî û sermiyaniya Xwedê beşî we ye.

45 — Ji cuhîyan hin hene ko cihê kilaman diguhêrinin û dibêjin: Me bihistiye û me isyan kiriye; an ew ji dil inkar di kin û bes bi zimanê xwe mikur tèn û emrên kitabê qebûl dikin û bi ser ve zêde dikin û dibêjin; tu me dibihîsi, lê em te na bihîsin, li me binêre, da ko em bêjine te û gotinên te fehimî bikin. Ew hi wan gotinan dijûnker dibin û henekê xwe bi dinê Xuda dikin.

Heke wan bigota: Me emrê Xuda bihist û me îtaet kir, gotina me bibihîse û li me binêre, ev di heqê wan de çêtir dibû, lê seba kufre, Xuda ji wan standiye, laneta Xuda li wan e, bi tenê çendek ji wan bawermend bûne.

46 — Geli cuhîno . . . Beriya ko emê rûyê we biçilmisinin û halê we xira bikin û laşê we bidewisinin û we mina mirovên ko di roja şembê de masivanî kirine, bêxine laneta Xwedê, baweriya xwe bi Qurana ko kitêba we Tewratê tesdiq dike binin û bizanin ko emrê Xuda tê cihê xwe.

47 — Xuda, di gunehên mirovên ko hevberê wi, tişteki dikin nabore. Xwedê di gunehên xelkê ên din, ew guneh piçûk an mezîrakin, li gora daxwaza xwe dibore û ji gunehkaran re ewî û toban dide, lê yê ko ji Xuda re tişteki dike hevber û hempa, divê bizane ko wî destê xwe xistiye gunehêki giran û pê gunehkar bûye.

48 — Ma tu cuhî û filan na bin, ew xwe bi xwe nefsa xwe ji gunehan paqîj dikin . . . Lê ne were ye, Xuda bi tenê li gora daxwaza xwe, evdên xwe ji gunehan paqîj dike.

Xuda di cezadanê de, ji tu kest re bi qasî niqutekê ji zilmê nake.

# ŞEYTANQÛNÎ

## AN TABÛTA ŞEŞCENDEK

— 3 —

Di serê kanûna pêşin, sala 941 an da kem-yonek ji Şamê bi derket û berê xwe da Der'ayê. Nava kemyonê ji malê ticaran dagir-tî û li ser pişta wê tabûtek hebû. Ev tabûta han li ser siparîşa kefxoyê gundekî, li Şamê hati bû çêkirin û li ser pişta vê kemyonê ji kefxoy ra diçû. Dema kemyon bigehêsta, Ho-ranê, dê tabût bidana siparîşkerê wê.

Gundiyeş ko li ser rîya Der'ayê, wek hemf gundiyeş li ser şehrhan, ji bo gîbana cihê ko diçinê pir caran xwe didin ser rê û çav-nêriya hatina tomobîlên barkêş dikin; da ko bi bihayekî hindik xwe bigehnin qesdegeha xwe.

Dinê sar û ezman tîji ewr bû bû. Hîn timobil jî Şamê hîst klometran bi dûr ne keti bû ko rêwiyek di devê rê da destê xwe ji şo-fêr ra radike. Ji ber ko di nava kemyonê da cih tîne bû şofêr, rêwî li ser pişta kemyonê siwar dike û bi rê dikeve. Pir naçe ko dergehê ezmên vedibe û baraneke xurt di ewran da tê xwar. Rêwiyê li ser pişta kemyonê, ji bo ko xwe ji ber baranê bide alî, deriyê tabûtê ra-dike, tê da vedizele û derî li ser xwe digire.

Ën ko bi rîyan da peya çûne qenc dizanin ko piştî wê sînê vezelîn xewê tîne. Nemaze di bin peşkên baranê û li ser pişta kemyonê, wek zarokên di landikê da mirov bêbemd jî xwe diçe. Rêwiyê delal jî bi vezelîna ra dikeve xew.

Piştî di xewvaçûna rêwiyê pêşin bi hinekî, sê rêwiyên din siwar dibin û di pê wan ra jî dudu. Lê ev her pênc rêwiyên han, hezra miriyekî di nava tabûtê da dikin. Dizanin ko gundiyeş di xestexanê da miriyê û di nav tabûtê da li xelkê wî vedigerînin. Bi vê ramana han, di dorhêla tabûtê da pal didin û dipeyivin.

Dema rê dikeve erdê Horanê, ji neçakiya rê, di cih cihan da kortalin bê fesal çêbûne. Ji ber ko baranê ev kortalên han tîji av kirî-ne, nema bi ser rê va ferq dibin. Ji lewre şofêr lê hişyar nabe û dolapeke timobilê dikeve nav kortalekê û bû hemd diçenge. Bi çengîna ra timobil pir xurt diheje û rêwiyê di tabûtê da hişyar dibe.

Rêwiyên li dorhêla tabûtê, herwekî tîrsa çengîna û hejîna timobilê tîra wan nekiri be ko di nişkava devê tabûtê vedibe û kesê ko tê da mirî dizanîn, li ser xwe rûdine û ji tîrsa he-jîna timobilê pel pel li dora xwe dinêre.

Her pênc rêwiyên mayî dizanin ko miriyê di tabûtê da şeytanqûnî bûye. Timobil li ser

# DÎWANA MELE

Dil yek e dê eşq yek bit aşiqan yekyarê bes  
Qible di yek bit qulûban dilberêk dildarê bes  
Min di henda zilfêkê dil da bi destê pîrê eşq  
Lew di eşqê da ko best ilham û yek zen-narê bes  
Terh û terzê pût e zen-nar û çelîpa yek bi yek  
Lew me zen-nar û çelîpa yek tenê yek carê bes  
Hin ji nik derê ve tîn, qesta kenîştê hin dîkin  
Ne ji wan imî ne ji wan, min derê xem-marê bes  
Gerçî tîn reqs û semayê her sed nêşeker  
Min di bezma şîrşîranan ev şîrin reftarê bes  
Wel çî wala gewlîer in hatin libasê cîsm û can  
Min ji wan horî surîştan ew perî rixsarê bes  
Hewce sihre Samîrî nîm im ko zilfan reş bikin  
Çeşnê henda dilribayan kokîla eyarê bes  
Bilbilan sed kil di çavîn, çav li sed gul vedîkin  
Min di baxê gulîzaran yek gul û gulnarê bes  
Min di baxê gulîroşan di ecêb resnekê xerîb  
Xarê teb'an gul di dest in gulperestan xar e bes  
Ew cefa çû der ji hed zilma te bir heta .bi Çin  
Rehnekê carek bike hey! zalimê azar bes  
Xerqê deryaê gunah in teşne e lutfâ heq in  
Rehmetê amûzîkar û şefqeyê xef-farê bes  
Ehlê dinyayê seraser dijûmînê mîh bin mela  
Piştîmêrê min Eli e Heyderê ker-rar e bes.

40-50 kilometirî dibeziye ko her pênc bi hev ra jî tîrsan xwe zer dîkin û tavêjin xarê. Her-wekî e şeşan (ê ko di tabûtê da bû) naxwaze ji wan vebe, ew jî xwe ji pê wan davêje xarê. Tevî şikestina dest û jîngên her pênc rêwîyan. dema dibînin miriyê şeytanqûnî jî xwe li pê wan avêt; dixwazin li erdê jî birevin. Lê hey-hat ko nema rev bi kesî dibe; ji ber ko tu kes bi selametî ne giha bû erdê.

Gava şofêr dibîne ko her şeş rêwiyên li ser pişta kemyonê bi hev ra xwe avetin, zûka disekine û vedigere ser wan. Lê ne wekî herê wan li ser lingan vê carê hinekan deverû û hinekan jî li ser piştê dibîne. Dema sebebê xwe avetinê jî wan dipirse, her pênc dihejin:

— Me miriyekî di tabûtê da dizanî. Gava timobil çengîya û derê tabûtê vekir, me got qey şeytanqûnî bûye û me xwe avêt.

Hînga şofêr diçe ser e şeşan (ê ko di tabûtê da bû) û dibêje:

— Ev camêrên han jî te tîrsan û xwe avetin; lê te ji bo çî xwe avêtî?!

— Çaxa timobil çengîya û ez hişyar bûm, min nîzanî bû ko çî qewimiye. Lê gava min dît ên dora min xwe bi lez û bez davêjin, ji min ra welê hat ko agir bi timobilê ketiye; hema bê atlahê min jî xwe li pê wan avêt.

Şofêr her şeşan dîsa li dorhêla tabûtê girêdide û tevî tabûtê dibe her xestexana Der'ayê. Bi vî awayî tabûta ko ji ho rakirina cendekekî hati bû çêkirin; di rojekê da şeş cendek li dora xwe civandin.

OSMAN SEBRÎ

# GULISTAN

## GULISTANA SADIYÊ ŞIRAZI

Sadî ji şairên Îrana kevin e. Di dawiya sedsala şeşan a hîcrî û di heyama Se'd kurê Zengî (ji etabikên farisî) de li Şîrazê ji diya xwe bûye. Bavê wî nisbetê bal navê etabekê wî wextî ve navê Sadî lê kirîye.

Dibêjin ko Sadî 102 salan emir kirîye. Ji van 102 salan 12 bi zarotiyê, 30 bi xwendin û hînbûne, 30 bi ger û eskeriyê û sibên din ji bi taet û îbadetê derbas kirine.

Di nav eserên wî de Gulîstan û Bostana wî ji hiemîyan bi nav û dengtir in. Ev her du eser li gelek zimanên ewropayî hatine wergerandin.

Sadî ji ber xwendinê gelek di dinyayê de geriyaye; çûye Misir û Hindê jî. Dema di welatê Şamê de digeriya, li nîzingî Trablîs-şamê ketiye destên ehlên-selib û bû hêsr. Di hêsrîya xwe de di xendekên keleşa Trablîsê de wê emelekî xebitiye.

Gulîstana Sadî tev de hikemiyat in. Sadî hikmet û felsefa xwe bi hêncela çirokan gotiye û paşê ew di hin malîkan de xulase kirine. Me dil kir ko ji xwendevanên xwe re hin çirokên Gulîstanê ber pê bikin.

Sadî Gulîstana xwe bi dibaçê û heşt fesilan tev vekirîye. Heye ko hin xwendevanên me dil bikin kurdmançî û farisîyê deynin ber hev. Ji lawre li rex her çirokê me fesila wê îşaret kir.

Di wergerandinê de me ji tefzê bêtir guh daye manayê. Ji lawre heye ko di tefzê de, carina esil û terciime li hev dernekevin.

— 1 —

FESIL: 1

**ÇIROK.** Dibêjin rojekê Nûşêrewanê adil çû bû neçîrê. Li wextê taşê jê re neçîrek dibiraştin. Xwê nîn bû. Rabûn lawikek rûkirin gundekî; da ko ji wan re xwê bine. Nûşêrewan gotê lawik:

— Heqê xwê bide û bibe. Da ko cem xelkê nebe adet tiştan bê pêre ji gundan bibin. An ne gund xerab dibin.

Berdevkana got: Ma ji lîriheke xwê çi ziyana çêdibe?

Nûşêrewan: Asasê zilmê li dinyayê bindik bû; heçî hat tiştêk lê zêde kir. Bi vî awayî zilim gihastê halê xwe ê îro.

Heke mir ji hexçê xelkê xwe sêvek xwar Peyayên wî dara sêvê ji kokê ve radikin. Heke siltan bi standina pênc hêkan sitemkarî kir Leşkerê wî hezar mirîşkî dikin şîşan.

Ji sitemkarê bed re dinya namîne Lê lanêta xelkê lê dibe payedar.

— 2 —

FESIL: 1

**ÇIROK.** Yek hebû di sinheta pehlewaniyê de bi ser ketî bû. Di vê sinhetê de sê sed û

şêst fen û bend dizanîn û hero bi fenekê diçû navê.

Di nav şagirtên wî de xortekî çeleng hebû. Hosê meyildariya wî dikir. Rabû ji sê sed û şêst hinerên xwe sê sed pêncî û neh hiner hînfî wî kirin. Hinereke bi tenê şanî wî ne da.

Lawik di pereçongiyê de hewqas xurt bû ko tukeşî pê ne dikarî. Şagirt bi vê xurtiyê ewçend ji xwe razî bû ko rojekê gote melîk: Bi zexmiyê ez ji hosteyê xwe ne kêmtir im. Di hinerweriyê de em beramberê hev in. Bi tenê ew bi emir ji min mezintir e, û ez elimandime.

Melîk ji vê kêmedebiyê kêfxweş ne bû; madê xwe kir û emir da ko hoste û şagirt biçin nava hev.

Di meydanake fîreh de hoste û şagirt hera hev bidana. Rikinên dewletê û giregîrên welêt di meydana de li hev gihane hev. Lawik wêk filekî mest bi der ket. Bi derbeke welê hemle kir ko di pêşiya wî de çiyakî hesinî biwa ewê ji cih bileqîya.

Hoste zanî ko lawik bi zexmiya bazûyên xwe serdestî wî ye; rabû bi fena ko şanî şagirtê xwe ne kiri bû, dirêjî wî kir. Lawik nizanî bû li wê fenê bigerîne. Hoste şagirtê xwe bi du destan girt, rakir ser serê xwe û avêt erlê.

Qirên bi xelkê ket. Melîk emir kir ko hoste xelat û lawik ceza bikin. Ji ber ko li ber hosteyê xwe rabû û pê nikarî.

Lawik got: Xudawendal hoste bi zexmiya xwe zora min ne bir. Lê di sinheta pereçongiyê de fenek hebû ko ew ji min veqartî bû. Îro bi wê fenê dirêjî min kir û ez xistim erdê.

Hoste got: Ji xwe min ew fen ji bona îro hilanî bû. Hekeîman gotiye; ji dostê xwe re ewçend qewetê mede, da ko heke rojekê bûye neyarê te, nikare te.

Te ne bihistiye, yê ko ji şagirtê xwe cefa ditiye çi got ye:

An wefekarî di vê dinyayê de nîn bû An di vî zemanî de tukeşî pê emel ne kir.

Kes ji min hînî travejiyê ne bû Ko dawiyê ez ne kirim armanca xwe.

— 3 —

FESIL: 1

**ÇIROK.** Padişahêk bi xulamekî [1] *ecemî* re di keştîkê de rûniştî bû. Xulam tucaran derya ne dîtî bû û zehmeta keştîyê ne kişandi bû. Dest bi girî û zariyê kir; lîzê bi canê wî ket. Gelek pê re xweş kirin tu havil jê çenebû. Padişah ji vî halî gelek aciz dibû; lê tu çare jê re ne dihate dîtîn.

Di keştîyê de yekî çeknas hebû. Rabû gote

**MEMOZINA  
EHMEDË XANI**

— 16 —

*Mlawedela Sitt û Zinê ji sersal û  
yeşlê, islittaa dayê li macera û  
serquzestê*

Ew jê veşerin bi vî libasî  
Hazir şeliyan ko kes ne nasi  
Herçend kirin libas tehdîl  
Em-ma ne dibûn ji hall tehwiî  
Eşqê kiri bûn wisan mibed-del  
Êdî ne diçûne halê ew-wel  
Qet kes ne diqo Sitt û Zin e  
Xelkê we dizanin ecnebi ne  
Dayneke wan hebû zemani  
Teşbîhî belayî asimani  
Zala felekê li ber zebûn bû  
Wê nav ji pirê Heyzebûn bû  
Ew hat ji xelîetê bi ser da  
Fekirî ko cilê di wan di ber da  
Rûniştine bê mezaq û meşreb  
Winda kirine zeqen di xehxeh  
Yanî di tehey-yir û melal in  
Mehpare di haletê webal in  
Culwa hûyî cûcemi di taze  
Rengê sementî be cayî xaze  
Kafûr misil izar qanî  
Sorgul geriyane zeferanî  
Zanî ko perî di bê libas in  
Mehbûb mehleb-hetê unas in  
Go ey hewesa dil û hinavan  
Heryek ji we ruhniya du çavan  
Hafîz ji we re meger Xwedê bit  
Canê me ji bo we ra fedê bit

Hon hinde miqey-yed in di qeydê  
Îro bi tenê ko çûne seyrlê  
We zû şemirand ji bo çi sersal  
Hon rast bibên ko hûye ehwal  
Bêjin ko miqedime çi reng e  
Ev heyret e ya xeyalî beng e  
Hon bo çi hezin in ey metaya  
Ninin çû netice bê qezaya  
Hon bêjine min kû hû qeziy-ye  
Kengê li me xef dibit xebiy-ye  
Ez dê nihe renîlekê birêjim  
Ismî û zemirî ez bihêjim  
Yan zûşe û mendela xwe danim  
Mahiyetî halî dê bizanim  
Wan gotine dayeyê nihantî  
Em sibhe ko çûne der ji xanî  
Herçî li me bû duçar û peyda  
Hazir kiriya cinûn û şeyda  
Axir ko bed-dî çûye der çûr  
Cewrê li me aqibet nima dûr  
Em ji geriyau melûl û unexbûn  
Hatine ve em xefîf û mecnûn  
Dayîn bi teen-nî û tewel-la  
Çû pal ve daye wan tesel-la  
Ko hon bi cenal şehriyar in  
Heryek ji we şah û xundikar in  
Ki bit ko nebit milî û mihtac  
Ki bit ko nedit we bê teleh bac  
Herçî we hebandî ey perîzad  
Hisna we dikî ji bo we miqad  
Xesma di vî şehri bit we diildar  
Ez dê wî bikim niho xerîdar  
Bêjin kî ye da biçim bibinim  
Hazir bigirim ji bo we binim  
Wan gotine Heyzebûnî sahir

Derdê li me ey tebbî mahir  
Bê şibhe dewa ji dest te têtin  
Teqrîr eger ji dest me bêtin  
Teqrîr û eda kirin mihâl e  
Tedbir û dewa kirin betal e  
Hindê hene kîj û kur di Bibtan  
Belkî di cemil bêjn û bihtan  
Kes nîne bi lîf û hisin meşhûr  
Il-la ko di deftera me mestûr  
Yanî hemî rû bi rû me dine  
Hindê di vî şehri ademî ne  
Êr-he du keç xerîqî şîha  
Ser ta bi qidem di bêq û dîba  
Zibende ji şiklî şahî-xawer  
Tabende ji rengî mahî enwer  
Nageh li me bûn duçar û zahîr  
Gêr bûn ji dîr ve her du nadîr  
Em çûne bi ser binên ko kî ne  
Fekirin ne wek me ademî ne  
Telhîq melek we ya perî bûn  
Ew her du wekî du camî Cemşîd  
Em her du misalî mah û xurşîd  
Gava we ko pêk ve hûn miqabil  
Misbah û zicac bûn miadiî  
Qarûre ji ba necim mine/kis bû  
Nûrek me bi qelîlî miqtebes bû  
Qendil û stîle ger ji wan bû  
Agir ji ruxê me her diwan bû  
Zeytê me û agirê me dîsa  
Ber bû me we dil pê eyîsa  
Suhtin xwe bi xwe nizan çi hal e  
Hişyarî ye, xewîn e, ya xeyal e.

padîşah, heke melîk ferman kir ez dikarim  
wî ker bikim.

Padîşah got, gelek qenc dibe. Wî zilamî  
got: wî bavêjin behirê da ko çend caran noqî  
avê bibe.

Bi pora xulam girtin û ew anîn qûna  
keşîyê û kirin ko wî bavêjin deryayê. Xulam  
bi du destan bi qûna keşîyê girt û lê hi'a-  
wistî ma. Gava veşeriya ser keşîyê çû di  
quncikekê de rûnişt û nema deng kir.

Padîşah ji tevdîra merîkê çeknas re gelek  
kêfa xwa anî û got-ê: Ilîkmeta tevdîra te çi ye?

Ewî zilamî got: Vî xulamî ezabê binavbûnê  
tam ne kiri bû, ji lewre qedirê selameliya keş-  
tiyê ne dizanî. Qedirê asiyetê ew peya dizane  
ko bi nesaxiyê ketiye.

Ey mirovê têr, hanê cehin bi te ne xweş e.  
Tîştê ko nik min spehî ye, ew tîşt bi xwe ji bo te  
[kirê e.

Ji hûriyên bihuştê re araf dojehe [1]  
Ji dojehnîşînan bipîrs: ji bo wan araf bihuşt e.

**FARISXANÎN**

[1] Xulam li hire bi mau lawik e.

[2] Araf, di navbera dojehe û bihuştê de bend an diwarek e.

**YA REB**

Di tarîka şeva hicran ciraek suhtim ez ya reb  
Ji ser he!a piyan îro bi carek veketim ya reb  
Nema min sebr û aramek ji ber jana evîna dil  
Evin behre welê tenha bi ber pêlan ketim ya reb  
Ji dilber dîr ketim lewra be!a ser daye can û dil  
Temaşa nakitin dilber ko ez bê taqet im ya reb  
Meger pîrsê li min naket welê ew tê xeyala min  
Şev û rojan bi nalfn im bi ah û hesret im ya reb  
Şev û rojan hi kovan im bi bilbil ra bi efşan im  
Enîsê xunçê baxan in ji gul ez dîr ketim ya reb  
Digel bilbil dinalim ez evin im wek hilalim ez  
Şikestî rengê dal im ez di halê hirqetim ya reb  
Di gora eşqê borî me yeqûn ez pîrê Torî me  
Wekî Elî Herîrî me di qeyda hicret im ya reb  
Meger ez Ristemê kurd im firaqê ez nexweş  
[kerdim  
Cegerxwîn im siyacerd im di kunca xelwet im  
[ya reb

**CEGERXWÎN**



## SEFERA SICILYAYÊ

QEWETÊN SONDXWARIYAN ÇAWAN  
DAKETINE GIRAVÊ

Piştî ko sefera Efrîqayê gihaste dawiyê û sondixwariyan erdên Misir, Bingazî, Trablîs-xerb û Tunîsê ji eskerên mihwerê paqij kirin herkes di gubdariyê de bû. GeŶo sondixwariyan di kû re dirêjî keleha Ewropayê bikin...

Balafirên inglîzî û emêrikanî ji wargehên Efrîqa bakur radibûn, Îtalye nemaze girava Sicilyayê didan ber bombeyên xwe. Vê bombaranê bi heftan ve ajot.

Li 8 û 9ê Tirmehê balafirên girava Sicilyayê, bêtlahtî 48 saetan bombaran kir. Ajansan ev nûçe belav kir. Herkesî dipirsî gelo sondxwarî dikin dakevin giravê.

Li 9ê Tirmehê piştî nîvro li saet dehan nobetdarên peravê di nîvro-rohelatê giravê de noqaveke inglîzî dîtî bûn. Noqav nîzingî li bendera Başînoyê dikir. Dinya hêveron, derya sakin bû. Betariyên peravîn topên xwe li noqavê girêdan. Noqav bin av bû. Lê piştî çend deqetqan noqavê ji nû ve da rû.

Disa di wî wextî de sê balafirên talyanî di ser xelîca Cîlayê re difiriyân. Nobetdarên di nîzingî xelîcê de ji du noqav dîtî bûn.

Wan her sê noqavan di navbera Efoła, Başîno û di xelîca Cîlayê de kûrahiya behirê qam dikirin. Li saet yanzdehan xeber gihaste serfermandariya ordiwên sondxwariyan ko di wan peravan de ber bi qeraxê kûrahiya behirê, di hin ciban de, ji niv gazê kêmîr e.

Talyanan li xwe hişyar bû bûn. Ronavêjên giravê sînga ezmên û dûrahiya behirê hê etlahtî didan ber ronahiya xwe.

Li saet yanzdehan 560 balafirên bombavêj di ser wan peravan re firiyân; balafirgeh û betariyên peravîn dane ber bomban.

Şev çû bû nivê şevê. Gulokine sipî ji balafirên dibûn û diketin erdê. Ew sîwanvanî bûn. Di pey wan re balafirên eskerguhêz nîzingî li erdê giravê dikirin.

Ew sîwanvaniyên pêşîn da bû ber xwe û ew ji cihê ko dixwestin lê peya bibin, bi dûr xistin. Lê heyveronê arîkariya wan kir û bi peyarî vegeriyane armanca xwe. Lê sîwanvanî hindik bûn û talyanan ew dîtî bûn. Li hev xistin. Sîwanvanî bégav man, cihê xwe ji dest dan û bi çûn de kişiyân. Talyanan dikir ko li wan wer bihatana. Di vê navê de çend balafirên eskerguhêz gihastine ser û eskerên ko ji wan peya bûn, çûne hawara sîwanvaniyan. Ji talyanan jî selefek siwar gihastî bû cihê

## HÊVIYA NUH

Razame li ber dergehê meyxaneyê naçim  
Sermesif û bê heq  
Mîna keseyê sondxwarî paresteyê xaç im  
Wergirtî cilê reş  
Mîn xaç û pûtên xwe wekî İbrahîm şikandin  
Ez bûm bi serê xwe  
Mîn şêx û mela sofi û derwêş qewitandin  
Ji pêgî derê xwe  
Me hêvî mezin bû ji mezin rîspî û kulan  
Heyhat û hezar ax  
Sist bûne rehên şêr û piling, gur û şepalan  
Tev bûne malkambax  
Kes nîne ji dil bo gelê Kurd bike xebatê  
Wek Rîstem û İhsan  
Bi destê zorê veke riya jin û felatê  
Dilgeş bike kurdan  
Gava ko me dît dem holê bêkêr hat ji bo me  
Zendê xwe vemalan  
Xebata welêt karekî dijwar û bi dom e  
Gazî ji hevalan  
Me hêvî ji kesî nema bê xortên welatî  
Ew hîmê welêt in  
Ën tîra neyar Cerg û hinav jê sot pahtî  
Tev agir û pê tin  
Yektî me divê me rê ew e, em dê biçin her  
Yezdan arîkar bit  
Serdestî ji bo me ne pir e em dê bibin, ger  
Cihan bi neyar bit.  
OSMAN SEBRÎ

pevçûnê. Lê inglîzian zora talyanan bir, ew bi çûn de avêtin û cihê ko berî midekî ji dest da bûn bi çûn de vegeandî û lê asê bûn.

Tevgera balafir û sîwanvaniyan heta siseyê sibehe sekîf. Dor gihastî bû stolê. Stol di bin himayeta balafirên de nîzingî li peravê kiri bû. Krewzorên giran û sivik bi torpiyor û bertorpiyoran dorgirtî xwe gihandî bûn mesafa endaxte û topên xwe li betariyên peravîn girêda bûn.

Saet bû bû pêncê sibehe. Stolê betariyên talyanî, yên ko di nav darên zeytûnan de veşartî bûn, ji Katanê heta Başînoyê ker û lal kiri bûn.

Li saet pêncan eskerên bejê pê li erdê giravê kiri bûn. Li mintîqa Cîla-Lkatayê emêrikanî û li peravên Başînoyê du şirgêyên kenedî peya bû bûn. Pêşdarên ordîwa heştan jî daketi bûn mintîqa Seragozayê.

Saet bû bû heştê sibehe, 9 Tirmeh roja Şembiyê. Yanî ji wextê ko sîwanvaniyên pêşîn daketi bûn giravê heq saet borî bûn. Sîwanvanî

di bakurê Cîla û Başroyê de sê balafirgeh xisti bûn destên xwe. Qewetên emêrikanî di peravê de serpirek saz kiri bûn û tê re çekîne giran daxisti bûn bejê û tangên emêrikanî bajarê Cîlayê zemt kiri bûn.

Li wextê nîvro hawara eskerên mihwerê hati bû û mihweriyên di bakurê Cîlayê de dirêj emêrikanîyan dikir.

Di mintîqa ordiwa heştan de britaniyan li bakurê Efolayê û di nîvro yê Seragozayê de du serpir saz kiri bûn û di wan re ordiwa heştan dadiket bejê. Eleman û talyanan xwe dan paş û di bajarên li jor binavkirî de asê bûn. Eskerên inglîz ketin Efolayê û mihweriyên berê xwe da Talîrîdayê.

Heta 12ê Tîrmehê roja Duşembê sondxwariyan di peravan de enske bi 150 kilomêtirî fîrehanî bûn û qedere 15 bajar xisti bûn destên xwe. Lê kûrahiya eniyê ji çend kilomêtiran ne bêtir bû.

Roja Duşembê, serê sibehê di hewêrka (mintîqe) firqa talyanî a 48an de şerine no çebûn. Eskerîne elemanî bi qedere sed tangên giran gihastî bûn wê hewêrka, hewêrka emêrikanîyan. Mihweriyên bi xurtiya tangên xwe, emêrikanî vegevandî heta qeraxê. Cenkeştîyên inglîzî û yewnanî yên ko li ber bajar bûn bera tanga dan û ew bi şûn de vegevandî û hin ji şkenandin.

Di vî navê de sîwanvanîne kenedî daketin paşîya ordiwa mihwerê û kirin ko rê li wan bibirin. Bi wî awayî û heta nîvro emêrikanî xwe ji nû ve saz kirin û berê xwe dan Lîkayatê û dest bi êrişê kirin.

Kenedî û inglîzî di roavayê Efolayê de gihane hev. Ji milê din baskê kenedîyan ê çepê piştî dida ordiwa emêrikanî.

Ber bi êvarê, di hewêrka Ogústayê de elemanan avêcê ser ordiwa inglîzî a heştan; bi mexseda ko rîya deşta Katanê li wan bigire. Inglîzî begav man û di hin deran de xwe dan paş; elemanan deverîne ko ketî bûn destên inglîzîyan bi şûn de vegevandî. Şerî bi şev ji di ronahiya tava hevê de dom kir. Betaşîyên solê bera elemanên ko nîzîngî peravê dibûn dida; sîwanvanî ji dadiketî paşîya elemanan.

Bi vî awayî inglîzîyan xwe ediland, Ogüste ji nû ve stand. Elemanan xwe da paş û bêf ko bêne mihasure kirin kişîyan û di devê deşta Katanê de şargeh bûn.

Herçî talyan in, di nav van her sê rojan de, ji 20 000 bêtir hêsr dan û ew ji bi şûn de kişîyan.

## EZ Û YAR

Pêjna me kir û hove ne da rengê xezalan  
Dûr ket û nêrî her du bîrî rengê hilalan  
Min got: tu çîma dûr direvî, qey me nenasî?!.  
Go: şerm û fehêt e me ji van dost û hevalan  
Min got: tu were da bi edeb biçme tewafê  
Yek bose ji qews û birowan bo me helal e.  
Go: ma te diyê fîtwa te vî qewlê qedîm e.  
Min gotê: bi min qewlê qedîm xewn û xeyal e  
Ez miftiyê eşq im bi xwe fîtwa min evîn e.  
Go: miftiyê eşqê tû fî fîtwa te betal e.  
Min got: tu fî Laleş, bi xwe hatim te bibûsim.  
Go: xirqe û bendik te ne bin ew jî mibal e.  
Min gotê: Gegerxûn e ji derdê te dinalî.  
Go: rast e Gegerxûn e di benda me delal e.  
Destê xwe bi min da û me her ser bi piyan bir  
Go: na, tu Gegerxûnê min fî hilkişê bal e.

### CEGERXÛN

Edî lingên eskerên sondxwariyan di giravê de erd girti bû; hemla sondxwariyan çû bû serî û sondxwarî hêdî hêdî girav vedigirtin; heta ko gihane bakur rohelalê giravê. Li hire di pêşîya Katanê de hinek sekiîn. Elemanan Katan asê kiri bû û dixwestin şerê xwe tê de xweş bikin.

Di vî navê de herwekî xwendevanên me dizanin Mûsolînî istifa kir û dengêkî aşî an teslîmbûnê belav bû.

Sondxwarî piştî ko midekî li hevîya vî dengî man û bihîna xwe dan li 2ê Tebaxê ji nû ve dest bi êrişê kirin.

Qewetên mihwerê di dora çiyayê Êtnayê de asê bû bûn. Ev çîya, ji xwe re kiri bûn talde. Di êrişê sondxwariyan a nû de inglîzîyan ji nîvro dirêjî Katanê; emêrikanîyan jî ji bakur roava dirêjî Misînê dikin. Bi vî awayî Êtna, talda qewetên mihwerê di navbera her du qewetan de dimîne. Herçend qewetên sondxwariyan di baskên talde re pêş ve diçin; ewçend cih li eskerên mihwerê yên ko di talde de ne, wê teng bibe.

Katan li ser ketinê ye, emêrikanî zorê didin rîya Misînê; şer dom dike.

Şam: 4 Tebax 1943 NÊREVAN

Piştî ko me ev bendî nivîsand radyowan elam da ko Katan ketiye.

Roja ko Katan ketiye di eniya rohelê de ji ûrisan zefereke mezin xiste destên xwe. ûrisan bajarê Orêlê zemit kir û berê xwe da Briyanskê. Ji milê din ûris zorê didin eniya Xerkovê jî.

Welê dixuye ko şerê Ewropa a mezin ne dûr e. Sondxwarî ji roavê, ûris jî rohelê bi derbeke xurt elemanan li erdê dirêj bikin.



## ÇETEYÊN RÛSÎ

Dema ko Ordiwa rûsî di eniyan de şerê neyarê xwe dike, xelkê çekhilgir jî çetan dîtinîn pê û dirêjî eskerên elemanî dikin.

Adet e, carina fermandarên mezin rojnamevan diezimînî qerargaha xwe. Merêşalê elemanî Von Klûg jî hin rojnamevan ezimandi bûn nik xwe. Di nav wan de bi navê Ernest Ştrarenber, yekî îşveçî hebû. Rojnamevanê îşveçî der heqê vê ziyaretê di rojname xwe de gotiye:

Li yekê Tîrmehê, êvarê ji me rojnamevanan re goti bûn ko merêşal von Klûg û genêral von Hot sibe her sê firqeyên zîrehpûş yên ko nû'hati bûn eniyê wê teftîş bikin. Sê rojnamevan jî di wê teftîşê de wê hazir biwan. Ez di nav wan sîseyan de bûm.

Bi roavê ve em li timoblê siwar bûn û me terka Orêlê da û di nivroyê wê de, em gihaxtine gundekî. Em di otêlake piçûk de bi çih kirin. Xwediyê otêlê yekî nemsewî bû.

Di otêlê de ji me pêve çend zabitên elemanî hebûn. Ew jî ji bo temaşa firqeyên zîrehpûş ên nû hati bûn.

Kulnêl Heynrîx jî me re goti bû ko selefîne siwarên mecerî û romanî di bin gundê ko em lê bûn re nobet digirtin. Ji ber ko çeteyên rûsî car-caran jî wê bindavê dirêjî wan dikir.

Di nav me de rojnamevanekî talyanî hebû; bi navê Emîlyo Batriyonî, mixabirê « Popolo di Roma ». Emîlyo gava gotinên kulnêl bihistin dil kir ko vegere Orêlê. Hinek tîrs gîha bû-yê. Kulnêl gote mixabirê talyan: Nijdevanên rûsî nîzîngiyê li gund bikin jî nikarin bikevin gund. Ji ber ko ji siwarên mecerî û romanî pê ve di dora gund de top hene.

Me bi derengî şiv xwar û çûn oda xwe. Em her sê rojnamevan di odekê de rêketana. Di ode de tu text û dikek hebû. Ez û talyan heryek jî me xwe gihande textekî. Hevalê me ê sîseyan xwe li dikê dirêj kir. Piştî çend deqîtan hevalê min ê talyanî deng li min kir û got ko ditîrse. Min bi çend pîrsan dilqewnî da-yê; lê bêfêde.

Wexit çû bû nivê şavê. Saetê jî nîzîngî li yekê dikir. Ji nişkê ve me dengê tişîng û mîtralyosan kir. Nijdevanên rûsî bi ser gund de girti bûn. Hevalê me ê talyanî yê ko xew bi çavên wî ne keti bû, jî ode baz da, berê xwe da jêr da ko ji xwe re zêrzmînekê peyda bike. Me jî da pey.

Zabitên elemanî jî di salona otêlê de giha bûn hev. Kulnêl bi ken gote min: Tu di bîstî heq di destê hevalê te ê talyan de bû. Lê siwarên me çeteyî sekinandine û bera wan didin.

## FERYAD

Kanî Cehfer, kanî Ewnî, ka Reûfê pîr hiner  
Dûr ketin axa welatî gorî we ev leş û ser  
Ey Hesen pê re Bîrahîm hûn bi xerixwarên welêt  
Bîn dikim axa rîya we dil de her ev eş û pê.

Her jî qehran ez dinalim min niye sebr û tebat  
Çendî rabim, çendî rûnim her dibêjim ax welat  
Em dizanî feyde, nadit bo me gotin bê kirin  
Me hene hindek welatî ew ne mîr û çavşîr in.

Min nivîsî bo we dîrok bê ji sala çil û sê  
Rêz bi rêz şagirt bixwînin kengê bêne medresê  
Navê we hildin bibêjin serwer e bêraq û al  
De bila gorî welatî bit herçî can û herçî mal.

Bes dixwazî serferaz bit, ev welatî her gav û çax  
Bigerîn em tola welatî ger li dest û ger li çax  
Dijmînen vî qewmê kurdî ev nezani her sebeb  
Tev perîşan û belengaz çûne Bexda û Heleb.

Lawê kurdan her jî bakur bê gunah ew diçine Faw  
Bûye pêgeh bome kurdan ax jî derdê qewmê Faw  
Em dizanî halê Eyran, Anadol û Faw ev e  
Her li ser vî qewmê kurdî lewre em her diçine Faw e.

Derbê paştê me ye wek Rîstemê kurdî pehlewana  
Sed sipas bo lawê kurdan paştê rastî diçine Faw  
Botiyê bêkes tîne her digêrî çol û beyar  
Da bibinî rojekê lawên delal bûn dost û yar.

Mûsil 30/2/943.

M. E. BOTÎ

Kulnêl dikir jî otêlê derkeve û here xeta  
agir. Min jê hêvî kir ko min jî bi xwe re bibe.  
Kulnêl dîsa bi ken gote min: Welê dixuye ko  
tu natîrsî; lê nijdevanên rûsî segmanîne  
qenc in.

Dinya tarî bû. Ji lewre brûska tiştîngan  
xweş xuya dikir. Di gund de xelk hindik bûn.  
Gelekê wan beriya hatina elemanan revî bûn.  
Yên ko di gund de ma bûn li ser dengê tiştîngan  
derketi bûn gastnê. Eskerên mecerî ew  
vedigerandin xaniyên wan. Kulnêl li onbaxtî  
gall, jî ber ko li jinikeke avis da bû.

Ji me re du hesp anîn; li yekî ez, li ê  
din kulnêl siwar bû û em bi rê ketin. Me  
berê xwe da bû nivroyê.

Piştî çarek saetê em gihaxtî bûn ber  
qerargaha firqa siwarî. Her tişt qediya bû.  
Qemyonek li ber me sekinî. Zabitêkî mecerî  
elam da kulnêl ko di pevçûnê de çar peya û  
jinikek hêsr kiri bûn. Kulnêl dil kir ko he-  
stran îsticwab bike lê her peyêcan jî xwe ker kir.

Gava em gihaxtî qerargahê me zanî ko  
nijdevanan dirêjî depoxaneke cebîrxanê kiri bû  
û berî ko siwar bigihinê agir pê xisti bûn. Ji  
mecer û romanîyan hevdeh û jî ûrîsan heft  
kuştî hebûn. Ji kuştîyên ûrîs dido pîrek bûn.

SMAÎNÊ SERHEDÎ

# PANAMA

## JAPONAN EV KENAL DÊ BERHEWA BIKIRA

Emêrika bi du birên mezin lêk ve dibe: Emêrika bakur, Emêrika nîvro. Ev her du bir heta sala 1914an bi bejtengêkê bi hev ve girêdayî bûn. Emêrike di navbera du behîrên mezin de ye: Atlantîk û Pasîfîk. Vapora ko ji bendereke Emêrika bakur ya rohelê radibû û dikir ko here bendereke Emêrika bakur ya roavê jê re diviya bû dakeve heta xelaseka Emêrika nîvro, bej li xwe ba bide û ji nû ve berê xwe bide bakur. Ev sefer ne îşê rojan, lê îşê meh û heftan bû. Di sala 1914an de şirketeke emêrikani bejtenga Panamê gul kir û kenalek, wek kenala Swêyê, anî pê. Ji hingê ve vapor ji bona ko ji rohelê derbasî roavê bibin, û ji ber vaji ve, nema Emêrika nîvro li xwe ha didin; di kenalê re derbas dibin.

Erdên dora kenalê milê dewletên yekbûyî (dewleta cimhûriyetên emêrika bakur ên yekbûyî) ne. Emêrikê di wextê aşiyê de jî di kenalê de esker bi xwedî dikir. Lê piştî ko bû şer hikûmetê ew esker zêde kirine. Tirs hebû ko japon xirabîna di kenalê de bikin wî wê hîretimînin.

Herwekî ji çirokiya jêrîn dixuye dilê japonan hebû; lê ji wan ne hatiye. Rojnameyên emêrikani dibêjin:

Di destpêka sala 1940î de memûrekî japonî, bi navê Oti Maygoşî; hati bû Emêrikê û di kunselosxana japonî ya Şikagoyê de bi cih bû bû. Digotin katibê konsilosxanê ye. Piştî çar mehan Maygoşî bi emîrê hikûmeta xwe çû Panamayê û bû wekîlê konsilos.

Maygoşî piştî ko gihast Panamayê nexweş ket û nexweşîya wî qederê du mehan ajot. Di vê midetê de Maygoşî bi peyayine welê re dida û distand ko li cem polîsê ew peyayine bişibhe dihatin hesêb. Ji lewre teşkilatên emêrikani yê casûsiyê da bûn pey wekîlkonsilê japonî.

Li 23ê Çiriya-paşîn 1941ê li gora rapora ko gihastî bû hikûmeta Emêrikayê Maygoşî casûsekî xeternak bû û hikûmeta wî ew bi wezîfeke mihim rêkiri bû Emêrikayê.

Polîsên sîrî ew du caran di dora kenalê de û li nîzingî hawîzên ko ve paşiyê hati bûn çekirin, dîtî bûn. Ber bi dawîya vê mehê miraqîbên emêrikani yê Panamayê bêteleke şifrekirî girti bûn. Bêtel ji bo casûsê « nîmere: 72 » bû. Di bêtêlê de digotin, ji karê te mezinên te razî ne; her tiştê xwe hazir bike, li ser emîrê ko tu ji me bistîni û di wextê ko emê şanf te bidin de divêt tu kenalê berhewa bikî.

Edî ji emêrkaniyan re diviya bû bizanin ev telêgraf ji kîjan hikûmetê dihat û casûsê

« nîmere 72 » kî ye. Li 2ê Kanûna-pêşîn serekê bercasûsiya emêrikani û zabîtekî bilîndpaye ji bo îşê telêgrafê hati bûn Panamayê. Li 3ê Kanûnê ji serekê bercasûsiyê re mektûbeke bêimza hati bû. Di wê mektûbê de digotin ko casûsê « nîmere 72 » Oti Maygoşî, wekîlkonsilê japonî yê Panamayê ye. Xwediyê mektûbê jê pêve digot heke Maygoşî û hevalên wî beriya 7ê Kanûnê ne hatine girtin ewê xerabîne mezin bikin.

Sibetirê Oti Maygoşî çû bû ziyareta waliyê emêrikani û jê re goti bû ko ji ber sebebên sîhî ji konsiliyê istîffa kiriyê û dike vegere welatê xwe. Ji lewre hati bû nik walf da ko jê xatir bixwaze.

Herçî memûrên bercasûsiyê lîsta mirovên ko dikirin dest daniyana ser hazir kiri bûn û li 6ê Kanûnê, wextê eşayê Maygoşî û hevalên wî dê bigirtana.

Maygoşî berî girtina xwe bi çend saetan bi niyeta hikûmetê hesiya û bi balafrekê terka Panamayê da û xwe ghande Emêrika nîvro.

Herçî hevalên wî tev de hatine girtin. Bi wan re hin xerfeyên kenalê û dînamîti jî hate dîtin. Hevalên Maygoşî mikur batine û her tişt gotine. Ji gotinên wan xuya dikir ko Maygoşî ji Tokyoyê emir girti bû ko li 6-7 Kanûnê bi nivê şevê ve kenala Panamayê berhewa bike. Maygoşî li gora wî emîrî haziriya xwe kiri bû û talîmatin da bûn peyayên xwe.

Ji xwe li 6-7 Kanûnê japonan ji nişkekê ve dirêjî Emêrikayê kiri bû; avêti bû ser Perharbûrê.

Tiştê ko rojmayên emêrikani gotiye ev e. Ji aliyê japonan jî qala Maygoşî dikin. Radyowî japonî da zanîn ko Maygoşî bêt ko wezîfa xwe bi cih bîne terka Panamayê daye. Ji lewre ew bi xwe û sê hevalên wî bi îdamê mehkûm bûne û hirakîrî kirine. Yanî xwe bi xencerên xwe kuştine.

Rojnameyên emêrikani ev nûçe jî belav kirine. Lê dibêjin ev nûçe ne rast e, Maygoşî zindî ye, ev hîleke japonan e; da ko memûrên me şaş bikin û şopa peyayê xwe wînda bikin.

**QADIRE FERMAN**

Kiriyaariya Hawarê:

Ji bo Sûriyê 5 li rêyên sûri - Ji bo welatên din li ektî ingilîzi

Xwedî û gerinendeyê bepirsiyar: Mîr Celadet

Alî Bedir-Xan, Şam - Sûriye

Directeur Propriétaire: Emir Djeladet Aali

Bedir-Khan, Damas-Syrie

**ŞAM — ÇAPXANA TEREQIYÊ — 1943**



[www.arsivakurdi.org](http://www.arsivakurdi.org)